Wie aufgenommen Riya Rastdariyê # 1 A Xwedê peyiviye 5000

Guhdarên delal!

**Silameta Xwedê** bi we re be! Em bi navê Xwedayê aştiyê silavan li we dikin. Daxwaz û armanca Xwedayê aştiyê ev e ku her kes riya rastiyê fêm bike û wê qebûl bike. Wî ew rê kifş kir, da ku em her û her bi wî re di aştiya rastîn de bijîn. Em gelek dilgeş in ku em dikarin îro li ser Riya Rastdariyê ji we re bipeyivin. Navê vê bernameyê Riya Rastdariyê ye, çimkî em dixwazin binêrin ka Nivîsarên Pêxemberan ji me re çi dibêjin. Li gor van nivîsaran, mirovên gunehkar çawa dikarin li ber Xwedê rast derkevin?

Tu li ser kîjan riyê diçî? Tu li ser riya rastdariyê, an li ser riya nerastiyê diçî? Gelo ma tu dixwazî bizanî riya rastdariyê ya ku Xwedê ji bo me amade kiriye çi ye?

Peyva Xwedê dibêje: «**Xwezî** bi wan ên ku **tî** û **birçiyên rastdariyê** ne, çimkî ewê bên têrkirin.»

Belkî hin hene, dibêjin: «Ji xwe em riya rast yanî riya rastdariyê dizanin. Ji me re ne lazim e ku em li nivîsarên pêxemberên berê binêrin û bi wan ve mijûl bibin. Tiştê ku em dizanin, têra me dike!»

Eger fikrên te weha bin, ji kerema xwe bibihîze ka Xwedê bi devê Silêman pêxember çi gotiye: «Rê heye ku di çavê mirov de rast xuya dibe, lê di dawiyê de ew riya mirinê ye.»

Di Zebûrê de, Dawid pêxember gelek tişt li ser hewcedariya me ya ji bo zanîna riya rastdariyê nivîsîne. Wî got:

«Tu **kesê rast tune**, tenê yek jî tune. Hemû ji rê derketin, hemû bi hev re bêkêr bûn. Tu kesê ku qenciyê dike tune, yek tenê jî tune.»

Loma Dawid dua kir, di Zebûrê de got: «Ya Xudan, riyên xwe bi min bide zanîn û rêçikên xwe hînî min bike. Di rastiya xwe de rê nîşanî min bide.»

Eger Xwedê di riya rastiyê de rêberiya me neke, em tu caran nikarin riya rastdariyê bizanin.

Em wek zarokekî ne yê ku li Stembolê windabûye, an jî em wek miyekê ne ya ku li çolê windabûye. Lê belê Kitêba Pîroz ji me re dibêje ku Xwedê «naxwaze ku kesek helak bibe, … lê dixwaze ku hemû mirov xilas bibin û bigihîjin zanîna rastiyê.»

**Hevalê delal, ya herî girîng ev e ku tu bizanî ku tu di riya rastiyê de diçî, yanî di wê riya ku te bibe ba Xwedê de diçî. Tiştek ji vê girîngtir tune.**

Di van bernameyên me de, emê hûr û kûr li gor Nivîsarên Pîroz li vê riya rast, yanî li riya rastdariyê bikolin. Emê li gor **rêza dîrokê** li serhatî û pêxemberîtiyên pêxemberên Xwedê binêrin. Destpêk û dawiya Peyva Xwedê heye. Ji ber vê yekê, Xwedê ji ku derê dest pê kiribe, em jî dixwazin ji wir dest bi serhatiyên Peyva wî bikin.

Emê li ser Xwedê û li ser pêxemberên wî gelek tiştên balkêş û girîng hîn bibin. Emê bibînin ku **gelek pêxember** hebûn, lê dîsa jî **yê ku peyvên xwe dixist devê wan, yek e, yanî Xwedê ye**. Di Nivîsarên Pêxemberan de **gelek serhatî** hene, lê **peyam û mesaja wan hemûyan yek e**. **Dabaş Mizgîniya Xwedê ye ya ku dibêje, mirov çawa dikare di çavên Xwedê de bibe yekî rast**.

Loma em ji we hêvî dikin ku hûn qenc guhê xwe bidin hemû bernameyên Riya Rastdariyê. Wek ku peyva pêşiyan dibêje: «Xweyiyê sebrê be, padîşahê Misrê be.»

Herweha Peyva Xwedê ji me re dibêje ku Xwedê «wan ên ku li wî digerin xelat dike.» Ji bo wan ên **ku ji dil û can** li Xwedê digerin, ev soz hatiye dayîn: «Eger hûn ji hemû dilê xwe li min bigerin, **hûnê min bibînin**.»

Di bernameyên Riya Rastdariyê de, em dixwazin zanîna xwe ya li ser Xwedê zêde bikin. Gelo tu dizanî ka cewhera Xwedê çawa ye? Ma tu serhatiya Îblîs dizanî? Gelo tu dizanî Xwedê çima mirov afirandin?

An ka çawa guneh ket vê dinya xweş a ku Xwedê afirandiye? Ma te serhatiya Nuh û tofana di dema wî de xwendiye? Gelo tu dizanî ka pêxemberên Xwedê çi nivîsîne? Te bihîstiye ka çima ji Birahîm re Dostê Xwedê tê gotin? Ma tu dikarî ji heval an ji zarokên xwe re peyxamên pêxemberan şîrove bikî?

Beriya niha bi çend hezar sal Eyûb pêxember pirs kir, got: «**Mirov çawa dikare li ber Xwedê rast derkeve?**» Gelo, tu bersiva pirsa Eyûb dizanî?
Ma tu dizanî ka **tu bi xwe** çawa dikarî li ber Xwedê rast derkevî? Eger tu bixwazî ku bersiva pirsên weha bizanî, ji kerema xwe guhê xwe bide bernameyên Riya Rastdariyê.

Bi rastî Peyva Xwedê kûr e, jîndar e û bi hêz e. Û tiştekî din jî heye: Peyva Xwedê tiştekî venaşêre. Ew nîşanî me dike ka mirov û cewhera mirov çawa ye. Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Tu afirîn tune ku ji wî veşartî ye. Lê her tişt li ber çavê wî yê ku divê em hesab bidinê, tazî û vekirî ye.»

Hê rastiyeke girîng heye ku divê îro em li ser wê bifikirin. Ew rastî jî ev e: **Xwedê peyiviye!** Xwedayê herî bilind peyivî. Ew bi mirovan re peyivî û Xwedê dixwaze bi **te** re jî bipeyive. Eger Serokwezîrê welatê te ji te re nameyekê bişîne, ma tê wê bixwînî? Ma tê bixwazî ku tu bizanî ka wî ji te re çi nivîsiye? Ma tê bala xwe bidiyê?
Eger Xwedayê herî bilind bi me re bipeyive, hê çiqas bêtir lazim e ku em bala xwe bidin gotinên wî!

Xwedê çawa bi mirovan re peyivî? Di Kitêba Pîroz de dibêje:
«Di demên berê de Xwedê gelek caran û bi gelek awayan, bi rêberiya **pêxemberan** ji bav û kalan re gotiye.» Erê, Xwedê bi taybetî bi devê **pêxemberan** ji mirovan re got. Di demên bihûrtî de Xwedê hin mirov ji xwe re hilbijartin ku peyvên wî bidin bihîstin û wan binivîsin jî.
Peyva Xwedê dibêje: «Divê berî her tiştî hûn vê bizanin ku tu pêxemberîtiya Nivîsara Pîroz ne ji şîrovekirina ji ber xwe çêkirî ye.

Çimkî pêxemberîtî tu caran bi daxwaza mirov nehatiye; lê belê mirovan bi rêberiya Ruhê Pîroz, peyv ji Xwedê gotine.»

Xwedê bixwesta, wî bi xwe dikaribû Kitêba Pîroz binivîsiya, an jî dikaribû bi destê milyaketên xwe ev kitêb bida nivîsîn. Lê belê Xwedê weha nekir. Xwedê mirovên vê dinyayê hilbijartin, da ku peyvên wî binivîsin. Em ji wan mirovan re dibêjin **pêxember**.
Ew pêxember hinekî dimînin sekretêr. Tiştê ku Xwedê dixwest ku ew binivîsin, Xwedê xist hişê pêxemberan û wan jî ew tişt ji bo Xwedê nivîsandin.
Lê belê Xwedê hişt ku her pêxember bi peyvên xwe binivîse. Xwedê bi ruhê xwe rêberiya wan kir, lê wî şexsê pêxemberan înkar nekir.

Di Kitêba Pîroz de ne tenê peyvên ji devê Xwedê hene, lê fikir û duayên mirovên wek min û te jî hene. Di serhatiyên Kitêba Pîroz de em dibînin ku Xwedê çawa bi mirovan re dide û distîne. Bi vê yekê ew dixwaze nîşanî me bike ku ew bi xwe kî ye û çawa ye û em çawa dikarin nêzîkî wî bibin.

Çima Xwedê ji bo nivîsandina Kitêba Pîroz, bi ruhê xwe rêberiya pêxemberan kir?
Wî weha kir, da ku xelkê hemû nifşan bizanin, Xwedê çi got û çi dixwaze.
Xwedê bi pêxemberan re peyivî, ji ber ku **ew dixwaze** bi tiştên ku wan nivîsîn **bi min û bi te re bipeyive**. Her tiştê ku Xwedê berê bi devê pêxemberan got, îro jî ji bo me kêr tê.
Xwedê ji her yek ji me dixwaze ku em peyama pêxemberan bizanin.

Me di bernameya xwe ya din de li ser pêxember û nivîsarên pêxemberên Xwedê gotibû. Me dîtibû ku Xwedê bi devê pêxemberan ji mirovan re peyivî. Wî weha kir, da ku xelkê hemû nifşan bizanin, Xwedê çi got û çi dixwaze. Xwedê bi pêxemberan re peyivî, ji ber ku **ew dixwaze** bi tiştên ku wan nivîsîn **bi min û te re bipeyive**. Her tiştê ku Xwedê berê bi devê pêxemberan got, îro jî ji bo min û te kêr tê.

Belkî hin hene, difikirin û dibêjin: «Ha! Ev ji me re ne lazim e ku em bizanin pêxemberên berê çi gotine. Peyvên wan ji bo me ne girîng in. Kardestiya her pêxemberî di dema wî de hebû. Pêxemberek dihat, peyvên Xwedê digot û dimir. Yekî din radibû, kardestiya xwe pêk dianî û diçû. Ji me re ne lazim e ku em bizanin pêxemberê pêşî çi got, çimkî em ne di dema wî de ne.»
Ma tu weha difikirî? Bi rastî fikrên Xwedê qet ne weha ne!
Guhê xwe bidê, Xudan li ser vê yekê çi dibêje. Dibêje:
«Beriya ku erd û ezman bibihûrin, herfek an nuqteyeke biçûk ji Şerîetê winda nabe, heta ku her tişt bê cih. Loma kî ku ji van emran ê herî biçûk bişkêne û bi wî awayî hînî mirovan bike, wê di Padîşahiya Ezmanan de jê re yê herî biçûk bê gotin. Lê kî ku van emran bîne cih û hîn bike, wê di Padîşahiya Ezmanan de ji wî re mezin bê gotin.»
Ew peyvên ku te niha bihîstin, li ser Şerîeta Mûsa dibêjin.
Niha guhê xwe bide van peyvan jî. Dibêjin: «Tevahiya Nivîsara Pîroz ji bîhna Xwedê ye û ji bo hînkirin, lêhilatin, rastkirin û ji bo perwerdekirina di riya rastdariyê de bi kêr tê.»
Bi rastî, her tiştê ku pêxemberan nivîsî girîng û hêja ye, çimkî wan ew tişt nivîsandin, da ku em riya rastdariya ku Xwedê amade kiriye, bizanin..

Gelo tu dizanî pêxemberên Xwedê çi nivîsandin? Xwedê dixwaze ku em peyva wî bizanin û li gor wê bikin jî! Nivîsara Pîroz dibêje:
«Bi vî awayî peyva pêxemberîtiyê ji me re hê bêtir qayîm hat deranîn… wek çiraya ku di tariyê de ronahî dide, hûnê qenc bikin ku hûn bala xwe bidin peyvên pêxemberîtiyê.»

Erê, rast e, carna mirovên ku li hember Peyva Xwedê radibin, dibêjin: «Tu kes nikare jê piştrast be! Kitêba Pîroz tije xeletî ye! Hatiye xerakirin!»
Lê vê qenc bizane: **Yê ku li hember Peyva Rastiyê radibe, li hember Xwedê radibe**. Tu kes nikare bi hêkê şêrr bi latê re bike.
Peyva Xwedê lat e û tu jî hêk î!

«Xwedê hevalê rastiyê ye.» Mirov nikare Peyva Xwedê ya rast biguhere, lê Peyva Xwedê ya rast dikare mirovan biguhere. Xwedê mezin e û dikare Peyva xwe ya herheyî biparêze. Xudan bi xwe ev yek di Încîlê de got, got: «**Erd û ezman wê bibihûrin, lê peyvên min tu caran nabihûrin**.»

Gelek mirov li hember Peyva Xwedê radibin, ji ber ku ew peyv hal û rewşa dilê wan eşkere dike û tîne ber ronahiyê.
Guhê xwe bidin van gotinên Xwedê; ew li ser Peyva xwe weha dibêje:
«Peyva Xwedê **jîndar** û bi **bandûr** e. Ji her şûrê dudev hê tûjtir e. Û heta can û ruh, hem jî movik û mejî ji hev veqetîne, lê diçe; **dîwana niyet û ramanên dil dike**.»
Erê, Peyva Xwedê jîndar û bi bandûr e; ew bi dilê mirov re dipeyive.
Nivîsarên Pîroz di tevahiya dinyayê de berhevkirina herî kevin a nivîsaran e, lê dîsa jî ew heta îro ji her kesî re li ser rastiyê dibêjin.
Tiştek ji Peyva Xwedê girîngtir tune. Ew wek nan û şîr e. Em hemû dizanin ku nan û şîr ji bo bedenê qenc e. Lê eger ez nan û şîr nexwim, feyda min ji wan tune. Divê ez bixwim.

Bi vî awayî jî divê ez bi Peyva Xwedê mijûl bibim, çimkî ew ji bo dil û canê min wek xwarinê ye. An na, feyda wê ji bo min tune. Loma Xwedê dibêje: «Mirov ne bi nên tenê dijî, lê bi her peyva ku ji devê Xwedê derdikeve dijî.» Bi tenê «yên ku tî û birçiyên rastiyê ne» wê bên têrkirin.
Gelo tu birçiyê Peyva Xwedê yî? Ew wek xwarinê ye, wek nan û şîr e. Ew ne xwarina bedenê, lê xwarina dil û can e.

Loma em ji wan ên ku ji Xwedê ditirsin û siyaneta Peyva wî digirin re dibêjin: Bixebitin ku hûn guhê xwe bidin van bernameyên Riya Rastdariyê.
Bi vî awayî zanîna we ya li ser Xwedê, li ser Peyva wî û li ser gotinên pêxemberan wê zêde bibe. Hûnê bibînin ku em çawa dikarin li ber Xwedayê pîroz rastdar derkevin. Xwedê peyiviye – û ew dixwaze bi we re jî bipeyive!

Beriya ku em bernameya xwe xilas bikin, divê em tiştekî din jî qenc şîrove bikin. Em di bernameyên xwe de qet tiştekî ku ne di Nivîsarên Pêxemberên Xwedê de ye, qebûl nakin. Ew mirovên ku ev bername amade kirine, ji bilî rastiya ku Xwedê di Nivîsarên Pîroz de ji me re gotiye, tu rastiya din nas nakin.

Gotina Yûhennayê kurê Zekerya tam rast e. Wî di Încîlê de got: «Eger ji yekî re ji ezmên neyê dayîn, ew nikare tiştekî bistîne.»

Em qet newêrin ku em ji zanîn an şehrezayiya xwe bi xwe piştrast bin. Em bi tenê ji Peyva Xwedê piştrast in. Daxwaza me ev e ku em tiştê ku Xwedê bi devê pêxemberan di Nivîsarên Pîroz de daye zanîn, ji we re bêjin.

Gelo tu dizanî ka Xwedê di Nivîsarên Pêxemberan de çi got? Ma tu tî û birçiyê Peyva Xwedê û rastdariya rastîn î? Xwedê di Peyva xwe ya pîroz de, xwe daye naskirin û riya xwe ya xilasiyê kifş kiriye.

Em we vedixwînin ku hûn bi me re li Nivîsarên Pîroz bikolin da ku hûn bi rastî bizanin Xwedê çi gotiye. Peyva Xwedê ji me re dibêje:

«Ji berê ve her çi hatibe nivîsîn, ji bo perwerdebûna me hatiye nivîsîn, da ku bi sebir û bi handana Nivîsarên Pîroz **hêviya** me hebe.»

Xwezî bi me eger em hemû ji vê yekê piştrast bin. Xwedê peyivî û ew dixwaze ku her kes guhê xwe bide peyvên wî û bijî! Tu pîr bî an tu ciwan bî, tu jin bî an tu mêr bî, tu dewlemend bî an tu belengaz bî, Xwedê ji her yek ji we re dibêje: «Guhê xwe bidinê û werin ba min! Bibihîzin û canê we wê bijî.»

Guhdarên delal,
Xwedê hez bike di bernameya ku bê de emê de li ser vê dabaşê bipeyivin:
Cewhera Xwedê çawa ye?

Heta careke din em bi vê gotina Xwedê silavan li we dikin a ku dibêje:
«Guhê xwe bidinê û werin ba min! Bibihîzin û canê we wê bijî.»

Em di bernameyên xwe de yek bi yek serhatiyên pêxemberên Xwedê ji we re dibêjin. Herweha em dixwazin li Nivîsarên Pîroz jî yên ku ji aliyê wan pêxemberan ve hatine nivîsandin, bikolin. Çimkî di van nivîsaran de, Riya Rastdariyê ya ku Xwedê ji bo xilasbûna mirovan amade kiriye, kifş dibe. Xwedê bi devê wan, ji me re dibêje ka mirov çawa dikare li ber Xwedê rast derkeve.

Me di bernameya xwe ya pêşî de li ser Nivîsarên Pêxemberan gotibû. Em hîn bûn ku gelek pêxemberan Nivîsarên Pîroz nivîsandine, lê dîsa jî yê ku dide nivîsandin yek e. Di dawiya wê bernameyê de me ji we re fikreke girîng hişt ku hûn li ser bifikirin: Ew fikir ev bû: **Xwedê peyivî**. Xwedê bi devê pêxemberan ji mirovan re digot û ew dixwaze ku em guhê xwe bidin wî. Xwedê bi Nivîsarên Pêxemberan bi me re dipeyive. Xwedê xwe naguhere û Peyva wî jî nayê guhertin. Di her nifşî de Xwedê Peyva xwe parast: Nivîsara Pîroz xera nabe. … Dinya wê derbas dibe … lê peyva Xudan her û her dimîne.
Tiştê ku Nivîsarên Pîroz dibêjin, ev e.

Îro em dixwazin li **parçeyê pêşî yê Nivîsarên Pîroz** binêrin, yanî emê li **Tewratê** binêrin.
Xwedê ji Mûsa re got ku ew vê kitêbê binivîse û jê re got ku çi lazim e tê de bê nivîsandin û Mûsa ev tişt nivîsîn. Ji dema Mûsa heta îro kêm û zêde 3500 sal derbas bûne. Tewrat bi xwe berhevkirina 5 kitêban yanî **parçeyan** e. Navê kitêba pêşî **Destpêkirin** e û tê de 50 derî hene. Wek ku ji navê kitêbê kifş dibe, ew ji me re dibêje ku di Destpêkê de çi çêbûye.

Ji bo me gelek girîng e ku em kitêba pêşî ya Tewratê qenc bizanin, çimkî di vê kitêbê de **Xwedê bingeh danî,** da ku em bi zelalî fêm bikin ku ew di kitêbên pêxemberan ên din de çi dibêje.

Çaxê ku em kitêba Destpêkirinê bixwînin, emê gelek rastiyên kûr û girîng hê bêtir fêm bikin. Emê li ser Xwedê û li ser cewhera wî hîn bibin. Emê li ser milyaketan û Îblîs, li ser ezmên û erdê, li ser heywan û mirovan bixwînin. Emê bibînin ku guneh çawa ket dinyayê û çawa êş û helakbûn bi xwe re anîn. Herweha emê qenc bala xwe bidin riya xilasiyê ya ku Xwedê amade kiriye, da ku gunehkar bikarin vegerin ba Xwedê û têkiliya mirovan a bi Xwedê re hebe.

Di serhatiyên pêşî de, emê mirovên pêşî, gunehê pêşî û mêrkujê pêşî bibînin. Emê li ser dînê pêşî yê xelet, li ser pêxemberên pêşî û li ser miletên pêşî bixwînin.
Emê li ser serhatiya Adem û Hewayê, li ser serhatiya Qayîn û Habîl, li ser serhatiya tofana Nuh û li ser Birahîm pêxember bifikirin û emê bibînin ka çima jê re Dostê Xwedê hat gotin. Emê li Simayîl û Îshaq, Esaw û Aqûb û Ûsiv û birayên wî binêrin. Ev tiştên ha hemû û hê gelek serhatiyên din jî di vê kitêba pêşî ya Tewratê de hene.
Loma, hevalên delal, em ji we hêvî dikin ku hûn bi baldarî guhên xwe bidinê, çimkî niha em dixwazin bi rêzê ve dest bi xwendina Nivîsarên Pêxemberan bikin.

Di kitêba pêşî ya Tewratê de, di deriyê yekê, ayeta pêşî de dibêje:
**Di destpêkê de Xwedê erd û ezman afirandin**.
Xwedê dest bi van gotinan kiriye. Loma divê em li vê derê dest bi dersa Nivîsarên Pîroz bikin. Li vê derê Xwedê dest bi Kitêba xwe dike û dibêje: Di destpêkê de Xwedê erd û ezman afirandin.

Di vê ayetê de tiştek heye ku divê em li ser bifikirin. Ma beriya ku Xwedê erd û ezmên biafirîne, çi hebû? Ma beriya ku dinya hebe, çi hebû? Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku ji bilî Xwedê tu tişt û tu kes tunebû.
Ji ber vê yekê dibêje: Di destpêkê de, Xwedê...

Destpêka her tiştê ku em dibînin an jî em dikarin dest bidinê, heye. Loma, beriya dewr û demên dirêj, hinga ku hê erd, ezman, behr û dar nebûn, ew hebû. Di destpêkê de, beriya ku Xwedê erd û ezmên biafirîne, roj, heyv û stêr jî nebûn. Di destpêkê de, ne mirov û ne jî milyaket hebûn. Di wê demê de tu tiştên wek ku em îro wan nas dikin, nebûn; bi tenê **Xwedê** hebû.

Ji ber vê yekê em di ayeta pêşî ya kitêba pêşî ya Nivîsarên Pîroz de van gotinan dixwînin: Di destpêkê de **Xwedê** erd û ezman afirandin.
Nivîsarên Pîroz nabêjin: Di destpêkê de Xwedê **û** milyaket ..., an: Di destpêkê de Xwedê **û** mirov...
Na. Nivîsarên Pîroz dibêjin: Di destpêkê de, **Xwedê** ...
Di destpêkê de, çaxê ku hê tiştek nebû, beriya ku milyaket an mirov hebin, hingê bi tenê yek hebû: Ew yek jî **Xwedayê zindî** bû yê ku niha jî Yê Zindî ye û bê destpêk û bê dawî ye.

Di nav mirovan de hin hene, dibêjin: Ez nikarim Xwedê bibînim, loma Xwedê tune.
Em dikarin çend pirsan ji mirovên ku weha difikirin, bipirsin. Ma te tu caran atomek dîtiye? Ma te tu caran hewa dîtiye? An gelo ma te carnan ba dîtiye? Tu nikarî bayê bibînî, lê dîsa jî tu dizanî ku ba heye, çimkî tu dikarî bibînî, ba çi dike. Tu dikarî bibînî ku dar li ber bayê dihejin, lê ba bi xwe nayê dîtin.
Tu nikarî bayê di destê xwe de bigirî, lê tu dikarî bi hênikahiya wê bihesî.
Bi vî awayî jî em nikarin Xwedê bibînin, çimkî Xwedê ji aliyê mirovan ve nayê dîtin. Lê belê **em dizanin ku Xwedê heye çimkî em dibînin ku wî çi afirandiye**. Nivîsarên Pîroz dibêjin:  Hê ji afirandina dinyayê ve hêza wî ya herheyî û Xwedêtiya wî, bi ser ku nayên dîtin jî, bi tiştên ku hatine çêkirin bi zelalî tên dîtin û fêmkirin. Loma **hêceta wan tune**.

Tiştekî din ê ku em dikarin ji ayeta pêşî ya Tewratê hîn bibin, ev e: **Destpêka Xwedê tune**. Di destpêkê de Xwedê nehatiye afirandin.
Xwedê, Xudanê herheyiyê ye. Destpêka her tiştê ku em li ser vê dinyayê dibînin heye, lê destpêk an çavkaniya Xwedê tune. Malbata wî tune, yekî din wek wî tune; tu kes ew neafirandiye û wî bi xwe jî xwe neafirandiye. Ji ber vê yekê em di Nivîsarên Pîroz de dixwînin: Di destpêkê de, **Xwedê**.
Yê ku bê destpêk e, ew bi tenê ye. Yê ku her û her hebû û heta hetayê heye, tenê ew e. Navê wî Xudan e.
Wek ku îro ew heye, ew duh jî hebû. Wek ku ew duh hebû, ewê her û her bimîne. **Xwedê tu caran xwe naguhere**.

Guhdarên delal! Pir sipas ji bo ku we qenc bala xwe daye vê bernamê.
Ji kerema xwe di bernameya ku bê de jî bi me re bin. Hingê emê hê bêtir li ser cewhera Xwedê, yanî li ser qerektêrê Xwedê hîn bibin.
Xwedê bi we re be!

Me di bernameya xwe ya din de dît ku Nivîsarên Pîroz li ser Xwedê çi dibêjin. Ji bo vê yekê me ayeta pêşî ya Tewratê xwend a ku dibêje: Di destpêkê de Xwedê erd û ezman afirandin. Erê, Xwedê afirandarê erd û ezmên e.
Lê belê hê tiştekî din heye ku em dikarin ji vê ayetê hîn bibin. Bêgûman mana vê ayetê ev e jî: **Xwedê mezin e**! Xwedayê ku her tişt afirandiye, ji her tiştî û ji her kesî meztir e. Ew Xweyiyê tevahiya afirînê ye û ji ber vê yekê em dikarin ji dil û can bêjin: Xwedê mezin e! Tu kes wek wî tune. Ew ji her tiştî meztir e - ji behrê, ji bayê, ji rojê û ji stêran meztir e. Ew ji hemû ruh û mirovan zanetir û hêzdartir e. Her û her ew hêjayî rûmetê ye. Wek ku yê xanî ava dike ji xênî meztir û girîngtir e, wusa jî Xwedê ji her tiştî bilindtir e, çimkî wî her tişt afirandiye. Xwedê çiqas mezin e! Ew bi hêza xwe dijî û hewcedariya wî tune ku tiştekî ji aliyê kesekî ve bistîne an yek alîkariya wî bike. Xwedê ji her tiştî meztir e. Qet **tiştek** tune ku jê re lazim be û **kesek** jî tune ku jê re lazim be.
Yê Mezin ew e!

Heçî em in, em mirov in û hewcedariyên me gelek in. Her roj divê em bîhna xwe bistînin û berdin, divê em bixwin û vexwin, lazim e ku em razin. Tav û baran, nan û şîr, av û nan, cil û xanî, dost û heval, pere û gelek tiştên din ji me re lazim in. Hewcedariyên me çiqas gelek in!
Lê heçî Xwedayê afirandarê her tiştî ye, tu hewcedariya wî tune. Ew tî an birçî nabe, ew tu caran naweste; ew ne wek mirovan e ku bedena wî hebe. Hêz û qeweta wî tu caran kêm nabin, destpêk û dawiya wî tune. Ew Xwedayê herheyî ye, **ew Xwedayê karîndarê her tiştî ye.**

Li vir pirseke girîng heye: Madem ku Xwedê ne wek mirovan e û bedena wî tune, hingê Xwedê çawa ye, cewhera wî çi ye?

Ji bo vê pirsê di Nivîsarên Pîroz de bersiveke zelal heye. Dibêje: Xwedê **ruh** e û yên ku diperizin wî, divê bi ruh û bi rastiyê biperizin wî.

Xwedê çawa ye? **Xwedê ruh e**. Mirov hem beden e û hem jî ruh e, lê Xwedê tenê ruh e. Ruhê Xwedê ne bi cihekî ve giredayî ye, ew li her derê ye. Xwedê di ser her tiştî re ye û di ser her kesî re ye. Ew her tiştî dibîne. Ji bo çavên wî şev wek rojê ye. Eger tu xwe di odeya xwe de veşêrî, Xwedê li wir e û ew te dibîne. **Xwedê her tiştî dizane**. Ew fikrên te dizane û nêta dilê te jî dizane. Xwedê mezin e!

Em careke din dipirsin: Xwedê çawa ye? Tiştê ku em îro li ser vê yekê hîn bûne, em dikarin bi awayekî kin bêjin: **Xwedê qet ne wek tu kesê din e**. Xwedê bê hember e û tu kes wek wî tune.

Di bernameyên ku bên de emê hê bêtir li ser qerektêrê Xwedê hîn bibin. Di Nivîsarên Pîroz de, bi sedan navên Xwedê hene. Ew Xudan e, Yê Herî Bilind e, Karîndarê her tiştî ye, Afirandar e, Serkaniya Jiyanê ye, Ronahî ye, Yê Rast e, Yê Dilbirehm e, Xwedayê hezkirinê ye, Xwedayê rastîn û jîndar e!

Em ya rast dibêjin, Xwedayê ku di destpêkê de erd û ezman afirandine, **Yê Mezin** e. Nivîsarên Pîroz li ser wî dibêjin:
Ey kûrahiya dewlemendî, şehrezayî û zanîna Xwedê!... Çimkî her tişt ji wî ye, bi wî ye û ji bo wî ye. Bila rûmet her û her ji wî re be. Amîn.
Ew yê Xwezikdar e, Hukumdarê tenê ye, Padîşahê padîşahan û Xudanê xudanan e. Ew bi tenê bêmirin e û di ronahiya ku tu kes nikare nêzîk bibe de rûdine. Û ji mirovan tu kesî ew nedîtiye û nikare bibîne. Hurmet û karîna herheyî ji wî re be! Amîn.

Di beşeke din de pêxemberê Xwedê Mûsa, di straneke xweş de pesnê Xwedê dide, dibêje:
Ya Xudan, Xwedayê karîndarê her tiştî, karên te mezin û ecêb in;

Ya Padîşahê miletan, riyên te rast û dadperwer in.
Ya Xudan, kî natirse û rûmetê nade navê te? Çimkî bi tenê tu pîroz î.»

Mezinahiya Xwedê bêsînor, bê destpêk û bêdawî ye. Tiştê ku ayeta pêşî di Peyva Xwedê de dibêje, tam ev e, dibêje: Di destpêkê de **Xwedê**!

Îcar, guhdarên delal, em dixwazin rastiya ku me îro bihîst, bixin bîra xwe. Rastî ev e: Di destpêkê de Xwedê.
Di destpêkê de bi tenê Xwedê hebû, loma jî **bi tenê Xwedê** dikare ji me re bêje, di destpêkê de çi çêbû. **Bi tenê Xwedê** dikare ji me re eşkere bike, piştî mirinê wê çi çêbe. Û **bi tenê Xwedê** dikare ji me re diyar bike ku ew bi rastî kî ye.

Erê, em dizanin ku hin dibêjin: Tu kes nikare Xwedê nas bike û tu kes nikare bizane piştî mirinê wê çi çêbe.
Lê belê Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku **mirov dikare Xwedê nas bike** û dibêjin mirov dikare **bizane ka ewê piştî mirinê here ku derê**. Çimkî Peyva Xwedê dibêje:
Ez van tiştan ji we re dinivîsim, da ku hûn **bizanin** jiyana we ya herheyî heye û da ku em Yê Rast nas bikin … Xwedayê rast û jiyana herheyî ev e...
Tiştên ku çavan nedîtine û guhan nebihîstine û di fikra mirov re derbas nebûne, Xwedê ew ji bo wan ên ku ji wî hez dikin, amade kirine.» Lê **Xwedê ew bi Ruh ji me re kifş kirin**. Çimkî Ruh li her tiştî, li tiştên Xwedê yên kûr jî dikole.

Guhdarê delal, tu îro bernameya me dibihîzî. Gelo tu dizanî Xwedê kî ye û çawa ye? Gelo tu bi xwe wî nas dikî?
Ma tu dibêjî: Xwedê yê ku Afirandarê mezin e, ji me hemûyan dûr e û mirov nikare wî nas bike? Ma bîr û baweriya te ev e?
Dostên delal, Xwedê dixwaze ku tu wî nas bikî û dixwaze ku tu her û her li ba wî bî.

Nivîsarên Pêxemberan hînî me dikin ku ew têkiliya di nav me û Xwedê de çawa çêdibe; ew dibêjin ku em çawa dikarin nêzîkî Xwedê bibin. Divê em hem hiş û dilê xwe û hem jî guhên xwe ji Xwedê û peyvên wî re vekin.
Ji kerema xwe guhê xwe bide van gotinên Xwedê: Peyva wî ya pîroz dibêje: Ey hemû kujên dinyayê li min vegerin û rizgar bibin, çimkî Xwedê ez im û yekî din tune.

Hevalno, em pir spas dikin ku we guhdariya peyvên me kir.
Xwedê hez bike di bernameya ku bê de, emê li ser dabaşeke balkêş bipeyivin.
Emê li ser Îblîs û milyaketan bipeyivin. Ma tu dizanî ku ew çawa çêbûn?
Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin:
**Xwedê ruh e û yên ku diperizin wî, divê bi ruh û bi rastiyê biperizin wî.**

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Me di bernameya xwe ya berî vê de, ayeta pêşî ya Nivîsarên Pîroz xwend. Li wê derê dibêje: Di destpêkê de Xwedê erd û ezman afirandin.
Me dît ku ji bilî Xwedê, destpêka her tiştî heye. Di destpêkê de, tu tişt nebû, bi tenê yek hebû û ew Xwedayê zindî bû. Ew di destpêkê de hebû. Xwedê Xudanê herheyiyê ye. Xwedê mezin e û bê hember e. Ne destpêka wî û ne jî dawiya wî heye. Tu hewcedariyên wî tunin. Tu tişt jê re nabe asteng û tu kes tune ku bikare sînor ji wî re deyne. Xwedê ruh e û di eynî demê de li her derê ye. Ew di ser her tiştî û di ser her kesî re ye. Her der bi wî tije ye. Ew her tiştî dibîne. Ew her tiştî dizane. Ew yek e û bi rastî, ew Xwedayekî mezin e! Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Ew bi tenê bêmirin e û di ronahiya ku tu kes nikare nêzîk bibe de rûdine. Û ji mirovan tu kesî ew nedîtiye û nikare bibîne. Hurmet û karîna herheyî ji wî re be! Amîn.

Di dersa îro de em dixwazin hîn bibin ka Peyva Xwedê **li ser Îblîs û li ser milyaketan** çi dibêje. Gelo tu li ser serhatiya milyaketan tiştekî dizanî? An ma te li ser serhatiya Îblîs, cin û ruhên nepak bihîstiye?
Eger Xwedê ji me re negota, meyê nezanibûya. Lê Xwedê di Peyva xwe de li ser van tiştan ji me re dibêje. Loma em dixwazin hûr û kûr lê binêrin, da ku em rastiya li ser Îblîs û milyaketan bizanin.

Ji kerema xwe bînin bîra xwe ku me gotibû, emê di bernameyên Riya Rastdariyê de, bi rêzê ve li Nivîsarên Pêxemberan binêrin, yanî ji destpêkê heta dawiyê. Ji ber vê yekê di bernameya bihûrtî de em li ser Xwedê bi xwe hîn bûn, çimkî di destpêkê de Xwedê bi tenê hebû. Xwedê hez bike, emê di dersa ku bê de ji we re bêjin ka Xwedê çawa erd û ezman afirandine. Lê belê beriya ku Xwedê dinyayê û her tiştê ku tê de ye biafirîne, wî tiştekî din çêkir: Wî **pêşî milyaket afirandin**.

Peyva Xwedê gelek tiştan li ser milyaketan dibêje. Îro em dixwazin bi tenê li xalên herî girîng binêrin. Peyva Xwedê ji me re dibêje ku beriya demeke dirêj, Xwedayê ku ruh e, **gelek ruhên din, yanî milyaket** afirandin.
Nivîsarên Pîroz dibêjin ku hemû milyaket ruhên xizmetkar in. Xwedê milyaketên xwe dike ba û xizmetkarên xwe dike pêta êgir.

Yanî Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku wek ku Xwedê ruh e, milyaket jî ruh in. Milyaket bi ba û êgir re tên rûbirûkirin. Em nikarin bayê bibînin. Tu kes nikare dest êgir bide. Wusa jî em nikarin milyaketan bibînin an bigirin. Xwedê ew ne wek mirovan bi beden afirandin. Em mirov bi beden û bi ruh in, lê belê milyaket bi tenê ruh in. Loma em nikarin wan bibînin.

Gelo Xwedê çiqas milyaket afirandin? Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê çi dibêjin? Ew dibêjin ku Xwedê bêhejmar milyaket afirandin. Li jor, li ber Xwedê gelek milyaket hene, hijmara wan bi hezaran hezar û bi deh hezaran deh hezar e.

Xudan Xwedayê me mezin e! Xwedayê karîndarê her tiştî, ji xwe re bi hezaran milyaketên bedew, qenc û şehreza  afirandin. Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku milyaketên Xwedê hêzdar in. Qeweta wan ji ya me meztir e. Dîsa jî wek hemû afirînên din, hêza wan ne bêsînor e. Ew nikarin di eynî demê de li her derê bin û ew her tiştî nizanin. Ew hatine afirandin û bi tenê yek heye ku neafiriye û ew yek jî Xwedê ye.

Tiştekî din heye ku divê em qenc fêm bikin: Çaxê ku Xwedê milyaket afirandin, ew hemû bi hev re pîroz bûn. Di destpêkê de milyaketên xerab nebûn. Di destpêkê de Îblîs jî tunebû. Ruhên xerab an milyaketên xerab nebûn. Xwedê tu tiştê xerab neafirand.
Lazim e em vê rastiyê jî ji bîr nekin: Xwedê dikare her tiştî bike, lê belê Xwedê tu caran tiştekî xerab çênake. Xwedê xerabiyê nake, ji ber ku ew bi xwe tam **qenc** e. Xwedê nikare xeletiyan bike, ji ber ku ew **bêkêmahî** ye.

Guneh li ba wî tune, çimkî ew **paqij** û **pîroz** e. Her tiştê ku Xwedê dike, an dibêje, an difikire, tam qenc û bêkêmahî ye. Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin: Xwedê bi tiştên xerab nayê ceribandin û ew bi xwe jî tu kesî naceribîne.

Madem ku ev wusa ye, xerabî ji ku derê tê û çawa derket? Emê di bernameya ku bê de li vê dabaşê binêrin, lê belê pêşî tiştekî din heye ku divê em li ser milyaketan hîn bibin.

Xwedê **çima** milyaket afirandin? Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê milyaket afirandin, da ku ew li ba Xwedê bin û her û her di şahiya ezmên de **pesnê wî bidin û xizmetê jê re bikin**. Xwedê xweyiyê wan e, ji ber ku ew afirandarê wan e. Ew hemû li jor, ji rojê, ji heyvê û ji stêran gelek wêvetir li ezmên, li ba Xwedê ne.
Gelo we dizanibû ku **cihekî taybetî heye ku Xwedê lê rûdine**? Rast e, di bernama me ya bihûrtî de em hîn bûn ku Xwedê li her derê ye. Lê Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku cihekî pir xweş, pîroz û tije ronahî jî heye ku Xwedê di hemû rûmeta xwe de lê rûdine. Pêxemberên Xwedê ji vî cihî re dibêjin ezman, an jî **bihişt**.
Ew der cihê Xwedê û cihê milyaketên wî yên pîroz e.

Tiştekî din heye ku divê em li ser milyaketan bizanin: Hemû milyaket ne wek hev in. Hin milyaket li ezmên li dor textê Xwedê ne. Hinên din hene ku alîkariya mirovan dikin û wan diparêzin.
Û herweha milyaketên din, mesele **Cibrayîl** û **Mixayîl**, li ber Xwedê radiwestin û Xwedê wan ji bo kardestiyên taybetî dişîne vê dinyayê.

Mesele em dizanin ku Xwedê milyaketên xwe şandin, da ku Lût xilas bikin. Xwedê Cibrayîl şand ba Meryemê, da ku jê re Mizgîniya bûyîna Mesîh bêje.

Îsa Mesîh carekê li ser milyaketan weha jî got:

Hay jê hebin ku hûn yekî ji van biçûkan kêm nebînin. Çimkî ez ji we re dibêjim ku milyaketên wan li ezmanan hergav li rûyê Xwedê dinêrin.

Me dît ku Încîl dibêje: Ma hemû milyaket ne ruhên xizmetkar in ku ji bo xizmeta wan ên ku wê xilasiyê mîras bistînin hatine şandin?
Gelo ma tu di nav wan mirovan de yî yên ku wê xilasiyê mîras bistînin?

Guhdarên delal, Xwedê hez bike, emê di bernameya ku bê de li ser Îblîs û milyaketên wî bêjin. Ma tu vê serhatiyê dizanî?

Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin: Ma hemû milyaket ne ruhên xizmetkar in ku ji bo xizmeta wan ên ku wê xilasiyê mîras bistînin, hatine şandin?

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Em di bernameya xwe ya berî niha de li ser milyaketan peyivîn û me dît ku milyaket ji aliyê Xwedê ve hatine afirandin, da ku ji wî re xizmetê bikin.
Me dît ku hemû milyaket ne wek hev in û berpirsiyariyên wan ên cûre cûre hene.

Hin milyaket serweriya milyaketên din dikin. Di nav wan de milyaketek hebû ku navê wî Lûsîfêr bû. Belkî te ev nav bihîstiye? Ev navekî kevin ê ji bo stêra sibê ye, çimkî ronahiya wê ji ya stêrên din bêtir şewqdar e.
Eger tu serhatiya Lûsîfêr bizanî, tu dizanî Îblîs ji ku derê tê.

Nivîsarên Pîroz dibêjin ku di nav milyaketan de Lûsîfêr yekî gelek bedew, hêzdar û şehreza bû. Xwedê ew tişt hemû dan wî û diviya ku Lûsîfêr her û her pesnê Xwedê bida, guhê xwe bida wî û jê hez bikira, ji ber ku Xwedê ew afirand û ew gelek pîroz kir.

Lê di Nivîsarên Pêxemberan de em dixwînin ku rojekê dilê Lûsîfêr bi **pozbilindî** û **quretiyê** tije bû. Wî ji xwe re got:
Ezê derkevim ezmanan;ezê textê xwe bilind bikim ser stêrên Xwedê...
Ezê derkevim ser cihê bilind ê ewran û ezê xwe bikim wek Xwedayê herî bilind!

Li ser van gotinên qure qenc bifikirin. Her tiştê ku yê Lûsîfêr bû, wî ji Xwedê standibû.
Lê dîsa jî wî dixwest ku siyaneta Xwedayê herî bilind ji xwe re bistîne. Û ne tenê Lûsîfêr, lê **gelek milyaketên din** jî li hember Xwedê rabûn, pişta xwe dan wî, li pey Lûsîfêr çûn û wek wî guneh kirin.
Lê belê Xwedê her û her Xwedê ye û Xwedê her nêta Lûsîfêr û milyaketên wî dizanî. Wek ku me di bernameya bihûrtî de bihîst, tu kes nikare tiştekî bi dizî

bike ku Xwedê pê nezane, ji ber ku Xwedê hê beriya ku tiştek çêbe, bi her tiştî dizane. Xwedê ew gunehê di dilê Lûsîfêr û di dilê milyaketên wî de dît.
Îcar hingê çi çêbû? Gelo Xwedê çi kir? Ma Xwedê wê destûr bida ku Lûsîfêr cihê Xwedê bistanda? Ma Xwedê wê guneh qebûl bikira? **Ma Xwedê wê bi yekî gunehkar, pozbilind û qure re bimabûya**? Na, tu caran!
Nivîsarên Pêxemberan hînî me dikin ku Xwedê Xwedayê me paqij û pîroz e û ew tu caran xerabiyê qebûl nake.
Ew siyanet û rûmeta xwe nade tu kesî din. Xwedê bê hember e û tu kes nikare cihê wî bigire. Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin:
**Xwedê Lûsîfêr û milyaketên wî ji ba xwe avêtin**. Lûsîfêr û ew milyaketên ku li pey wî çûn, êdî nikaribûn li ezmên li ba Xwedê biman, çimkî wan guneh kir û li hember Xwedê rabûn.
Ji  ber vê yekê Xwedê Lûsîfêr û milyaketên wî yên xerab avêtin derve. Xwedayê pîroz dîwana her kesê ku li hember wî radibe, dike û wî ceza dike.
Wek ku gotina pêşiyan dibêje: Yê ku bilind bifire, wê nizim bikeve.

Lûsîfêr êdî ne wek stêreke şewqdar e, lê bû **dijmin** û di Kitêba Pîroz de jê re Îblîs tê gotin.
Erê, Lûsîfêr bû dijminê Xwedê û wek ku hûn dizanin, Îblîs û milyaketên wî heta îro jî Xwedê û her tiştê qenc red dikin. Ew Peyva Xwedê red dikin û wê înkar dikin. Îblîs li hember Xwedê şêrr dike û dixwaze ji planên Xwedê re bibe asteng, çerxa wan xera bike. Lê belê Xwedê hakimê mezin e û tu kes nikare wî, yanî tu kes li hember wî bi ser nakeve.

Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê Îblîs û milyaketên wî ji ezmên derxistin û ji bo wan **agirê dojehê** amadekirî ye. Rojek wê bê ku Xwedê wê Îblîs, milyaketên wî û hemû yên ku li pey wan diçin, bavêje wî agirî. Hatiye nivîsîn: Bi şev û roj, her û her ezab wê li wan bê kirin.
Lê belê Nivîsarên Pîroz hînî me dikin ku Îblîs hê ne di agirê dojehê de ye.

Peyva Xwedê dibêje ku **Îblîs di dinyayê de ye** û li hember Xwedê şêrr dike. Ew yê xerabkar e. Ew dixwaze karên Xwedê xera bike. Ew dixwaze mirovên ku Xwedê afirandine helak bike, da ku ew bi wî re bikevin dojehê.
Peyva Xwedê dibêje ku **piraniya mirovan di bin destê Îblîs de ne, lê ew vê yekê nizanin**, ji ber ku Îblîs wan **dixapîne**.
Nivîsarên Pîroz dibêjin: Îblîs bi xwe jî xwe dixe sûretê milyaketê ronahiyê.
Ew dixwaze mirovan bixapîne, da ku ew guhê xwe nedin Peyva Xwedê. Ji ber vê yekê zilamekî Xwedê got:  Li ser hişê xwe bin û hişyar bin. Neyarê we Îblîs, wek şêrekî ku dihumîne digere, ka ewê kê daqurtîne.
Hay ji xwe hebin! Îblîs dixwaze we helak bike, da ku hûn her û her dûrî Xwedê bin.

Lê belê şikir ji Xwedê re, çimkî wî Peyva xwe daye me, da ku em bikarin ji hêz û qeweta Îblîs xilas bibin. Kitêba Pîroz dibêje: Hûnê rastiyê bizanin û rastî wê we azad bike.

Gelo, tu rastiya ku dikare te ji fen û xefikên Îblîs xilas bike, nas dikî?
Divê em ji bîr nekin ku **Îblîs** ji me şehrezatir e. **Lê Xwedê** ji Îblîs sed qat zanetir e. Qeweta **Îblîs** ji ya me meztir e, **lê** qeweta **Xwedê** gelek di ser qeweta Îblîs re ye.
Ma tu Peyva Rastiyê ya ku dikare te ji qeweta Îblîs xilas bike, dizanî? Gelek mirov hene, ew naxwazin peyvên Xwedê û rastiya wî bibihîzin. Lê belê çima xelk naxwazin guhê xwe bidin rastiya Xwedê? Ji ber ku Îblîs ew xapandine û şîretan li wan dike ku baweriya xwe bi tiştên nerast bînin. Rast e, em dizanin ku rastî her gav ne bi dilê mirovan e: **Rastî her gav tehl e**.

Lê belê, eger tu rastiya Peyva Xwedê bizanî û jê bawer bikî, tê ji qeweta Îblîs xilas bibî. **Rastiya Xwedê derewên Îblîs** ji mirovan re diyar dike û wan ji destê wî xilas dike. Lê divê tu rastiyê bizanî û jê bawer bikî!

Guhên xwe bidin van peyvên Xwedê yên ku dibêjin: Hezkirîno, ji her ruhî bawer nekin, lê ruhan **biceribînin ka ew ji Xwedê ne an ne**. Çimkî gelek pêxemberên derewîn derketin dinyayê. ... Pêxemberîtiyan kêm nebînin. Her tiştî ji hev derxin, tiştê qenc hişk bigirin. Xwe ji her cûreyê xerabiyê dûr bixin.
**Ma bi rastî tu dizanî pêxemberên Xwedê çi gotine**? Tu Peyva Rastiyê fêm dikî? Ma tu ji dil û can baweriya xwe bi Peyva Xwedê tînî?

Dostên delal! Ji kerema xwe guhê xwe bidin bernameya ku bê. Hingê emê binêrin ka çawa Xwedê erd û ezman afirandine. Eger pirsên we li ser dabaşa îro hebin, ji kerema xwe ji me re binivîsin. Li dawiyê, emê navnîşana xwe bêjin.

Em ji bo bernameya ku bê jî li hêviya we ne. Heta hingê, li ser vê gotina Xwedê qenc bifikirin a ku dibêje:

**Hûnê rastiyê bizanin û rastî wê we azad bike.**

Xwedê bi we re be!

Di bernama xwe ya derbasbûyî de, me xwend ku pêxemberên Xwedê li ser milyaketan û li ser Îblîs çi nivîsandine. Em hîn bûn ku di destpêkê de Xwedê bi hezar hezaran ruh afirandin û navê wan kir milyaket. Di nav wan de milyaket Lûsîfêr hebû. Rojekê wî di dilê xwe de xwe bilind kir û Xwedê kêm dît, dixwest cihê Xwedê bigire. Gelek milyaketên din jî li pey wî çûn û bi wî re guneh kirin. Lê Xwedê wan ên ku li hember wî rabin qebûl nake. Loma wî Lûsîfêr û milyaketên xerab ji ba xwe avêtin. Navê Lûsîfêr hat guhertin û bû Îblîs. Mana vî navî Dijmin e. Xwedê ji bo Îblîs û milyaketên wî, agirê dojehê yê ku tu caran natemire amade kir. Rojek wê bê ku Xwedê wê Îblîs û hemû yên ku li pey wî diçin, bavêje wî agirî. Lê belê hê Îblîs nehatiye avêtin dojehê. Ew li dinyayê ye û dixebite ku mirovan bixapîne, da ku ew jî helak bibin.

Îro emê li dersa çaran a Nivîsarên Pêxemberan binêrin. Di kitêba pêşî ya Tewratê de, yanî di kitêba Destpêkirinê de, di deriyê yekê, ayêta yekê û diduyan de, Nivîsarên Pîroz dibêjin:
«Di destpêkê de Xwedê erd û ezman afirandin. Erd virt û vala bû, li ser rûyê kûrahiyê taristanî hebû û Ruhê Xwedê li ser rûyê avê diliviya.» (Destpêkirin 1:1+2)

Di destpêkê de, çaxê ku Xwedê erd û ezman afirandin, li ser rûyê erdê tu tiştê jîndar nebû. Her der virt û vala bû û tarî bû. Nêta Xwedê ev bû ku mirovan biafirîne, yanî afirînên ku Xwedê nas bikin, ji Xwedê hez bikin û her û her guhê xwe bidin wî. Lê belê beriya ku Xwedê mirov biafiranda, plana wî ew bû ku dinyayeke pir xweş çêke ku mirov tê de bi silamet û bi rihetî bijîn.

Loma îro emê bibînin ka Xwedê çawa dinya afirand û ji bo mirovan amade kir.

Ma Tewrat çi li ser afirandina erd û ezmên dibêje? Dibêje: Xudan di şeş rojan de erd û ezman û derya û her tiştê di wan de çêkir. (Derketin 20:11)

Niha em dixwazin li deriyê pêşî yê Tewratê binêrin, da ku em hîn bibin ku Xwedê di wan şeş rojan de çi afirand.

1) Li ser roja pêşî, Tewrat weha dibêje:
«Erd virt û vala bû, li ser rûyê kûrahiyê taristanî hebû û Ruhê Xwedê li ser rûyê avê diliviya. Xwedê got: «Bila ronahî çêbe.» Û ronahî çêbû. Xwedê dît ku ronahî qenc e. Hingê Xwedê ronahî ji tariyê veqetand. Xwedê navê ronahiyê ‹roj› û yê tariyê ‹şev› danî. Bû îvar û bû sibeh, ev roja yekê bû.» (Destpêkirin 1:2-5)

Yanî di roja pêşî de Xwedê emir kir, got: Bila di tariyê de ronahî hebe! Erd wek gokeke mezin e û Xwedê emir li erdê kir ku di nav 24 saetan de carekê bizivire. Ji ber vê yekê li dor 12 saetan roj e û li dor 12 saetan şev e. Xwedê di roja pêşî de tiştê çiqas mezin çêkir: Wî ronahî ji tariyê cihê kir.

2) Heçî roja diduyan e, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
Xwedê got: «Bila di navbera avan de qubeyek çêbe, da ku wan ji hev veqetîne.» Îcar Xwedê qubek çêkir û ava di bin qubê de, ji ava li ser qubê veqetand. Û ev weha çêbû. Xwedê navê qubê ‹ezman› danî. Bû îvar û bû sibeh, ev roja diduyan bû.» (Destpêkirin 1:6-8)

Yanî di roja diduyan de Xwedê ezman, yanî atmosfêr li dor erdê afirand. Atmosfêr ji hewa ku em distînin pêk tê. Atmosfêr her tiştî û her kesî ji germiya tavê û ji gelek tiştên din diparêze. Bêyî wî atmosfêrê ku Xwedê di roja diduyan de afirandiye, mirov wê nikaribûya ku li ser rûyê erdê bijiya.

3) Di roja sisiyan de Xwedê behr, bej û her tiştê şîn, yanî giya, dar û pincar afirandin.

Guhê xwe bidinê ku Tewrat li ser vê yekê çi dibêje:
Xwedê got: «Bila ava di bin ezmên de li derekê bicive û axa zuwa bê dîtin.» Û ev weha çêbû. Xwedê navê axa zuwa ‹erd› û navê ava civiyayî ‹derya› danî. Xwedê dît ku ev qenc e. Hingê Xwedê got: «Bila erd şînayiyê bide: Giyayên ku tov didin û darên ku tovên wan di wan de ye û li gor cûreyên xwe fêkî didin.» Û ev weha çêbû. Bû îvar û bû sibeh, ev roja sisiyan bû.» (Destpêkirin 1:9-11.13)

Yanî di roja sisiyan de Xwedayê Afirandar ê şehreza derya, rûbar û çemên avê û bi hezaran jî çûreyên daran bi fêkiyê wan ve û hemû cûreyên giyê afirandin. Xwedê çiqas xwarinên xweş ên cûr bi cûr afirandin: Wî sêv, hinar, pirteqal, zebeş, bacanên sor, zeytûn, birinc, genim û hê gelek cûreyên xwarinên din afirandin.
Û Xwedê li ser hemû tiştên afirandî got ku ew qenc e! Her tiştê ku Xwedê çêdike û diafirîne, qenc e, bêkêmahî ye û temam e.
Me beriya niha dît ku tenê tiştek heye ku Xwedê tu caran nake; yanî wî tu caran tiştekî pîs û xerab nekiriye û nake, ji ber ku **Xwedê qenc e**!

Belkî hin ji we dipirsin, dibêjin: Madem ku  Xwedê qenc e, çima li ser rûyê erdê evqas xerabî û şer heye? Çima dinya tije zordarî ye? Çima zarokên min nexweş dikevin? Eger bi rastî Xwedê qenc be, çima xerabî ji dilê mirovan derdikeve? Erê, ev pirsên girîng in û Nivîsarên Pîroz bersîvên rast û zelal didin. Di bernameyên ku bên de emê li ser van tiştan bifikirin. Lê ji bo îro em bi tenê vê rastiya girîng bînin ber çavên xwe: Xwedê qenc e, loma **her tiştê** ku Xwedê afirandiye jî qenc bû.

Ji kerema xwe, em deqiqekê li ser qenciya Xwedê hinekî bifikirin. Xwedê di roja sisiyan de dar afirandin. Gelo tu dizanî Xwedê çima dar bi fêkiyê wan ve afirandin? Ma ew ji wî re lazim bûn? Ma Xwedê ew dar û hemû fêkiyê xweş û şîrîn afirandin, da ku ew birçî nebe? Na! Xwedê afirandarê her tiştî ye û ew tu caran tî an birçî nabe. Tu tişt tune ku jê re lazim be.

Îcar çima Xwedê dar afirandin? Nivîsarên Pîroz ji me re diyar dikin ku Xwedayê qenc, her tişt ji bo wî mirovê ku wê di roja şeşan de biafiranda, çêkir.

Gelo tu bi qenciya Xwedê dizanî? Ma tu dikarî zebeşekî bixwî, an jî bîhna xweş a gulekê bîhn bikî bêyî ku tu qenciya Xwedê bibînî?
Ma tu dikarî li darekê binêrî bêyî ku tu şikir ji Xwedê re bikî? Wî ew afirandin, çimkî dar nebin, jiyan ne tu jiyan e! Bêyî daran emê çawa êgir bikin û emê çawa xaniyan an keştiyan çêkin? Bêyî daran di germiya rojê de siya me wê nebe ku em pê hênik bibin!
Bêyî daran, li ser vê dinyayê jiyan çênabe. Lê belê dar bi tenê parçeyekî biçûk ji hemû tiştên afirandî ne. Xwedê ji bo me bi hezaran tiştên qenc afirandine, da ku em pê şa û rihet bibin. Xwedê dixwaze ku em qenciya wî bibînin û qebûl bikin.

Guhdarên delal, bernama me ya îro li vir bi dawî dibe.
Xwedê we pîroz û bimbarek bike û heta bernama ku bê, vê gotina ku Xwedê ji me re dibêje, ji bîr nekin, çimkî ew bi devê Dawid pêxember dibêje:

Tam bikin û bibînin, Xudan çi qenc e.
Xwezî bi wî mirovê ku xwe spartiye wî! (Zebûr 34:8)

Me di bernama xwe ya berî vê de li afirandina erd û ezmên nêrî. Me dît ku Xwedê di her sê rojên pêşî de çi û çi afirandin:

- Di roja pêşî de Xwedê ronahî ji tariyê cihê kir.
- Di roja diduyan de wî ezman, yanî atmosfêr û hewa ku em distînin, afirand.
- Di roja sisiyan de jî Xwedê derya, bej û her tiştê şîn, yanî giya, dar û pincar afirandin.

Herweha, me ji afirandina wan tiştan dît ku qenciya Xwedê çiqas mezin e.

Niha em dixwazin bi roja çaran berdewam bikin.

4) Di roja çaran de Xwedê weha got:
«Bila di quba ezmên de ronahî çêbin, da ku rojê ji şevê veqetînin û ji roj, demsal û salan re bibin nîşan. (Destpêkirin 1:14)

Erê, Xwedê tenê emir kir û li ezmên roj, heyv û stêr çêbûn. Xwedê peyveke din got û dinyayê dest pê kir, li dor rojê zivirî. Wî careke din peyvek got û heyvê dest pê kir li dor dinyayê zivirî.

Ma Xwedê bi çi awayî her tiştê li ser rûyê erdê afirand? Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê çi dibêjin?
Dibêjin: Erd û ezman bi peyva Xwedê hatine damezrandin; wusa ku tiştên tên dîtin, ji tiştên nayên dîtin çêbûne. (Îbranî 11:3)
Û dibêjin: Di destpêkê de Peyv hebû. Peyv bi Xwedê re bû û Peyv bi xwe Xwedê bû. Ew di destpêkê de bi Xwedê re bû. Her tişt bi wî afirî û bêyî wî qet tu tişt neafirî. (Yûhenna 1:1-3)

Me berê jî bihîst ku di roja pêşî de Xwedê peyivî û got: **Bila ronahî çêbe!** û hingê ronahî çêbû.
Di roja diduyan de Xwedê got: **Bila qubeyek çêbe!** û hingê qubeyek çêbû.

Di roja sisiyan de Xwedê careke din peyivî û tiştê ku wî got, çêbû û derket holê. Ma Xwedê bi çi awayî her tiştê li ser rûyê erdê afirand?  Xwedê **peyivî**, wî **got** û tiştekî din nekir. Ji bilî peyva wî, tiştek ne lazim bû.
Wî bi tenê bi gotina xwe emir kir û yek bi yek her tişt çêbû. Xwedê her tişt bi peyva xwe afirand.
Tiştekî din jî heye: Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê bi peyva xwe ne tenê her tişt **afirand**, lê belê bi peyva xwe ya hêzdar her tiştî **xweyî jî dike**.

Heyv û hemû stêr bi hêza peyva Xwedê li ezman di gerên xwe de disekinin. Roj bi qeweta peyva Xwedê di wextê xwe de hiltê û diçe ava. Jiyana me wê çiqas zehmet bûya eger me nezanibûya ka roj wê sibe û dusibe derkeve, an dernakeve! Lê belê Nivîsarên Pîroz dibêjin: **Xwedê dilsoz e** (Korîntî I, 1:9). Em dikarin pişta xwe bi peyva wî ve girê bidin. Ew peyv û soza xwe naguhere û her û her eynî dimîne. Nivîsarên Pîroz dibêjin: Peyva Xudan her û her dimîne (Petrûs I, 1:25)

5) Di roja pêncan de Xwedê bi hezaran cûreyên teyr û masiyan afirandin.
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
Xwedê got: «Bila av ji keriyên afirînên jîndar tije bibe û bila li jor, li quba ezmên teyr bifirin.» Îcar Xwedê hûtên mezin ên deryayê, hemû afirînên jîndar ên ku av bi wan tije ye û teyrên firek li gor cûreyên wan afirandin. Û Xwedê dît ku ev qenc e. Hingê Xwedê ew bereket kirin û got: «Berdar bin, zêde bibin û ava deryayan dagirin û bila teyr li bejê zêde bibin.» Bû êvar û bû sibeh, ev roja pêncan bû.» (Destpêkirin 1:20-23)

6) Heçî roja şeşan e, Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê heywan û mirov afirandin.
Emê di programeke din de hê bêtir li ser vê dabaşa girîng bipeyivin û bibînin ku Xwedê çawa û çima mirovê pêşî afirand.

Di bernameya din de em li ser qenciya Xwedê peyivîn. Me dît ku pêxemberê Xwedê Dawid çi nivîsandiye. Wî got: Tam bikin û bibînin, Xudan çi qenc e. Hevalên delal, ma bi rastî we ev qenciya Xwedê dîtiye?
Her roj em gelek cûreyên xwarinê dixwin û ew hemû ji aliyê Xwedê ve hatine dayîn, lê belê ma bi rastî me qenciya Xwedê dîtiye û fêm kiriye?
Eger bi rastî tu bixwazî qenciya Xwedê fêm bikî, divê ku tu guhê xwe bidî Peyva Xwedê û jê bawer bikî. Nivîsarên Pîroz dibêjin: ‹Mirov ne bi nên tenê dijî, lê bi her peyva ku ji devê Xwedê derdikeve dijî.› (Metta 4:4)

Di dersa ku bê de emê bibînin ku mirov ne tenê beden e, lê belê canê wî jî heye. Peyva Xwedê ji bo canê me wek xwarinê ye. Peyva Xwedê qenc e û keremeke mezin e, lê belê lazim e em birçiyê wê bin.

Gelo ma canê te birçiyê naskirina Xwedê û zanîna Peyva Xwedê ye?
Eger tu birçiyê Peyva Xwedê bî, tê rastiya Xwedê bibînî û ew rastî wê li ser vê dinyayê aştiya rast bixe navbera te û Xwedê û wê li ezmên mîrasa ku narize bide te.
Em dizanin ku ev yek rast e, çimkî Xwedê bi xwe soz da û got: Xwezî bi wan ên ku tî û birçiyên rastiyê ne, çimkî ewê bên têrkirin. Amîn. (Metta 5:6)

Pir sipas ji bo ku we qenc guhê xwe dayê.
Ji kerema xwe di bernameya ku bê de jî bi me re bin. Hingê emê ne tenê bibînin ku Xwedê **çawa** mirovê pêşî afirand, lê ya hê girîngtir, emê bibînin ku Xwedê **çima** mirov afirandin.

Heta careke din em bi van gotinên Xwedê silavan li we dikin ên ku dibêjin:
‹Mirov ne bi nên tenê dijî, lê bi her peyva ku ji devê Xwedê derdikeve dijî.› (Metta 4:4)
‹Xwezî bi wan ên ku tî û birçiyên rastiyê ne, çimkî ewê bên têrkirin.› (Metta 5:6)

Guhdarên hêja

Belkî em gelek li ser her tiştî disekinin û pircar dikin, lê hûn dizanin, mirov çiqas qenc û zêde hevîrê xwe bistire, nanê wî hevirî ewqas xweş dibe. Ji lewre ev yeka ku em li ser peyvên Xwedê û li ser tiştên ku Xwedê afirandine û kirine, disekinin, zirarê nade we, lê wê feydê bide we.

Hûn bimînin di xêr û xweşiyê de.

Me di bernama xwe ya berî vê de dît kû Xwedê çawa erd û ezman, behr û her tiştê kû tê de ye afirandin. Xudan Xwedê bi tenê bi peyva xwe di şeş rojan de her tişt afirand.

Herweha me dît ka çima Xwedê dinya afirand. Wî ew ji bo wan mirovan çêkir, ên kû dixwest ji bo rûmeta xwe biafirîne. Xwedê çiqas dilovan e kû wî ji bo mirovan cihekî evqas xweş û bedew çêkir, da kû ew di xêr û xweşiyê de bijîn!

Îro em dixwazin li Nivîsarên Pîroz binêrin û hîn bibin, Xwedê **çawa** mirovê pêşî afirand.
Bi alîkariya Xwedê, emê fêm bikin kû wî **çima** mirov afirandin.
Di Tewratê de, yanî di Kitêba Destpêkirinê de, di deriyê pêşî, ayêta 26'an de, Peyva Xwedê dibêje:
Xwedê got: «Niha em di sûretê xwe de, wek kû mîna me be, mirovan çêkin. Bila ew bibin serwerê masiyên avê, teyrên ezmên, heywanên kedî, serwerê hemû erdê û hemû heywanên kû li ser rûyê erdê dişêlin.»
**Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand,**
**Di sûretê Xwedê de wî ew afirand,**
**Nêr û mê wî ew afirandin.** (Destpêkirin 1:26-27)

Li ber çavê me, rastiyeke pir mezin û ecêb heye û divê her kes vê yekê fêm bike: **Xwedê zilamê pêşî û jina pêşî di sûretê xwe de afirandin**. Qenc li ser vê yekê bifikirin, ev çiqas ecêb e!
Xwedê mirov afirand, da kû wek wî be! Bi rastî, mirov di nav hemû afirînan de yê herî girîng e. Bi tenê mirov di sûretê **Xwedê** de hatiye afirandin.
Îcar çaxê kû Peyva Xwedê dibêje: «Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand», mana vê çi ye?
Di deriyê diduyan, ayêta heftan de, Nivîsarên Pîroz dibêjin:

«Xudan Xwedê mirov ji axa erdê çêkir û bîhna jiyanê pif kir pozê wî. Û mirov bû afirînekî jîndar», yanî canê jîndar. (Destpêkirin 2:7)

Di vê ayetê de em dibînin kû Xwedê pêşî mirov afirand, yanî bedena wî afirand û hingê bîhna jiyanê pif kir pozê wî, da kû jîndar be. Mirov ne bi tenê afirînekî bedenî ye, lê hem bedena wî û hem jî canê wî heye. Xwedê mirov di du gavan de afirand: Careke din guhê xwe bidin Nivîsarên Pîroz: Gava **pêşî** ev bû:
«Xudan Xwedê mirov ji axa erdê çêkir.»
Gava **diduyan** jî ev e: Xwedê «bîhna jiyanê pif kir pozê wî. Û mirov bû afirînekî jîndar.»

Ji Nivîsarên Pîroz em hîn dibin kû Xwedê çawa mirov afirand: Pêşî wî beden çêkir. Çima pêşî wî beden afirand? Pêşî wî beden çêkir, ji ber kû **can** di bedenê de cih distîne.
Ma te dizanî kû bedena te ji bo te, yanî ji bo canê te wek xanî ye, yanî çadira wî ya ji bo demekê ye ? Loma Nivîsarên Pîroz hîn dikin, dibêjin: Bedena me *« **konê** me yê dinyayî ye.»* (Korîntî II, 5:1)
Xwedê bedena mirov afirand, da kû canê mirov tê de cih bigire.

Xwedê bedena mirovê pêşî ji çi çêkir? Nivîsarên Pîroz dibêjin kû Xwedê ew ji axa erdê afirand.
Îro em dizanin kû toza axê ji 20 tiştên seretayî pêk tê. Zaneyên van tiştan ji me re dibêjin kû ew 20 sereta hemû di bedena mirov de hene.

Loma pêxemberê Xwedê Dawid di Zebûrê de dibêje:
«Xudan afirandina me dizane û tê bîra wî kû em toz in.» (Zebûr 103:14)

Erê, bedena mirov ji toza axê, yanî ji axa erdê hatiye afirandin, lê belê ew ne bêqîmet e. Di bedena mirov de ji kêmahî ve **heftê milyar** parçeyên herî biçûk kû em jê re dibêjin şane, yanî şanik, hene.
Ew hemû bi hev ve girêdayî ne û li gor planeke hevgir a bêkêmahî dixebitin.

**Bi rastî bedena mirov kerameteke mezin e**. Xwedê, mejî, dil, kezeba sor, zik, kezeba reş, rovî, hestî, goşt, çerm, guh, çav, poz an bevil, dev û gelek tiştên din xistine bedena me.
Her endam "dizane" kû kardestiya wî çi ye. Ji Xwedê pê ve kê dikaribû ev yek bikira. Loma Dawid pêxember got:
«Ez ji te re şikir dikim, çimkî ez bi awayekî tirsehêz û newaze hatime çêkirin. Kirinên te newaze ne, canê min vê yekê qenc dizane.» (Zebûr 139:14)

Erê, bedena mirov kerameteke gelek mezin e. Lê belê ma Xwedê bedena mirov di sûretê xwe de afirand? Na! Ev çênabe, çimkî Xwedê bi xwe ruh e. Xwedê bedena mirov di sûretê xwe de çênekir. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê çi dibêjin? Dibêjin: «Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand».
Mana vê çi ye? Mana vê ev e kû Xwedê canê mirov di sûretê xwe de afirand.

Me berê dît kû çaxê Xwedê ji axa erdê bedena mirov afirand, ew bê jiyan bû, yanî wek termekî bû. Xwedê çima pêşî bedena mirov afirand û hingê canê mirov xist wê? Gelo çima Xwedayê karîndarê her tiştî mirov bi carekê neafirand, yanî wî çima bi du gavan mirov afirand? Ji bo hemû afirînên din Xwedê wusa nekir. Belkî Xwedê weha kir da kû mirov hîn bibe kû qeweta wî ya li ser jiyanê tune. Mirov nikare ji xwe re jiyanê peyda bike û mirov nikare tiştekî jîndar biafirîne. Xwedê Xudanê jiyanê ye û jiyan bi tenê bi wî tê dîtin.
**Jiyan** ne ji mirov derdikeve, **jiyan diyariya Xwedê ye**.
Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Xudan Xwedê mirov ji axa erdê çêkir û bîhna jiyanê pif kir pozê wî. Û mirov bû afirînekî jîndar.»
Bedena kû Xwedê afirand dest pê kir, jiya. Çima jiya? Ji ber kû Xwedê, yanî Xudanê jiyanê, jiyan da canê mirov.
**Jiyana kû bi Xwedê re bû, êdî di hundirê mirov de bû jî**. Bi vî awayî mirov bû afirînekî jîndar. Îcar tiştê kû Xwedê di sûretê xwe de afirand, çi bû? Erê, canê mirov bû. Xwedê canê mirov di sûretê xwe de afirand.
Gelo te dizanî çend babetên Xwedê hene kû di ruhê mirov de jî hene?

Beriya kû em dersa îro xilas bikin, em dixwazin li ser sê babetên Xwedê bifikirin ên kû babetên mirov in jî.
Çaxê kû em li ser van her sê tiştan bifikirin, emê hê bêtir hîn bibin ka mana van gotinên Nivîsarên Pîroz çi ye yên kû dibêjin: «Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand.»

Gelo ew her sê babet kîjan in?

Ya pêşî: Xwedê **ruh, hiş û bîr** daye mirovan, da kû ew bikarin Xwedê nas bikin.

Ya diduyan: Xwedê **dil** xist hundirê mirovan, da kû ew bikarin ji Xwedê hez bikin.

Ya sisiyan: Xwedê **azadiya bijartinê** da mirovan, da kû ew guhê xwe bidin Xwedê û li gor wî bikin.

Tam wek kû Xwedê xweyiyê hiş û bîr, dil û azadiya bijartinê ye, wusa jî wî hiş û bîr, dil û azadiya bijartinê da mirovan.

Di bernameya kû bê de emê li mana van her sê babetan binêrin.

Heta careke din em bi vê gotina Xwedê silavan li we dikin a kû dibêje:
«Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand»

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Di bernameya din de me bihîst kû Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand. Me dît kû sê babet hene ew hem babetên Xwedê û hem jî babetên mirovan in.

Ya pêşî: Xwedê **ruh, hiş û bîr** daye mirovan, da kû ew bikarin Xwedê nas bikin.

Ya diduyan: Xwedê **dil** xist hundirê mirovan, da kû ew bikarin ji Xwedê hez bikin.

Ya sisiyan: Xwedê **azadiya bijartinê** da mirovan, da kû ew bi daxwaza xwe guhê xwe bidin Xwedê û li gor wî bikin.

Niha em dixwazin bifikirin ka mana van tiştan çi ye.

1) Xala pêşî: Xwedê hiş û bîr da mirovan; ew dikarin bi wan, Xwedê nas bikin û Xwedê mirov bi hiş û bîr afirand, ji ber kû Xwedê dixwaze kû di nav Xwedê û mirov de têkiliya kûr û bi mane hebe.
Çaxê kû em li ser jiyana pêxemberê Xwedê Birahîm dibihîzin, em dibînin kû jê re digotin **Dostê Xwedê**. Birahîm Xwedê nas dikir û têkiliya wî ya kûr bi Xwedê re hebû.
Lê belê ne tenê heqê Birahîm heye kû bibe dostê Xwedê. Em jî dikarin bibin dostên Xwedê. Xwedê dixwaze kû têkiliya me bi wî re hebe. Loma wî ruh da mirovan kû bikarin bi Ruhê Xwedê re bidin û bistînin.

Belkî em dikarin vê yekê bi vê pirsê hê zelaltir bikin: Gelo di nav mirov û heywanan de çi ferq an cihêtî heye? Bersiv ev e: Ruhê mirov û hiş û bîra mirov heye, lê yê heywanan tune.
Ji xwe heywan nikarin vê bernameyê fêm bikin, lê çima weha ye? Ji ber kû hiş û bîra heywanan ne wek ya mirovan e.

Guhdarên delal, ma çima hûn dikarin gotinên me fêm bikin? Ji ber kû ruhê we ruhê mirovan e û hiş û bîra we jî wek ên me ne.
Ruhê mirov bi awayekî wusa jî hatiye afirandin kû bikare bi Ruhê Xwedê re bide û bistîne.

Ji xwe em dizanin, heçî zanîn û şehrezayî û hiş û bîra mirov e, ew nagihîjin Xwedê. Çimkî şehrezayiya Xwedê gelek kûr e û zanîna wî di ser ya mirovan re ye. Tiştê kû divê em fêm bikin ev e: Xwedê ruh da mirov, da kû hevpariyeke kûr û bi mane di nav mirov û Xwedayê jîndar de hebe.
Heywan nikarin Xwedê nas bikin û Xwedê naxwaze kû em wek heywanekî bin. Hişê heywên heye, lê ew nikare li ser Xwedê bifikire. Devê heywên heye, lê ew nikare ji bo xwarina kû Xwedê roj bi roj dide wî, jê re şikir bike. Çavên heywanan hene, lê ew nikarin Nivîsarên Pîroz bixwînin. Guhên wan hene, lê ew nikarin guhê xwe bidin Peyva Xwedê. Lê heçî mirov e, ew dikare Xwedê nas bike. Erê, ji ber kû tu mirov î, tu dikarî guhê xwe bidî vê bernameyê û **tu dikarî Xwedê nas bikî**.
Xwedê tu weha afirandiyî, da kû têkilî û hevpariya te bi Afirandar re çêbe. Eger tu baweriya xwe bi wî bînî û riya wî ya xilasiyê qebûl bikî, ev têkilî wê çêbe. Wî ji bo rastderketina te her tişt amade kiriye.

Emê di bernameyên kû bên de bi zelalî riya Xwedê şîrove bikin, lê tiştê kû pêwist e em îro fêm bikin, ev e: Xwedê ruh da mirov û bi vî ruhî mirov dikare Xwedê nas bike.

2) Xala diduyan: Çaxê kû Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand, wî tiştekî din xist hundirê mirov. Wî dil da mirov. Xwedê dil da mirov, da kû mirov bikare ji Xwedê hez bike. Em niha ne li ser vî dilê kû xwîna me digerîne dibêjin, em li ser fikir û canê te dibêjin. Em li ser nêt û ramanên dilê te dibêjin. Xwedê dikare hez bike û bienire, ew şa dibe, dilbirehm e û xemgîn dibe.

Xwedê tu weha afirandiyî kû tu jî bikarî ji kesekî hez bikî, an bienirî, tu bikarî şa bibî, dilbirehm bî û xemgîn bibî.
Tiştên kû Xwedê jê hez dike, ew dixwaze tu jî ji wan tiştan hez bikî. Tiştê kû ew jê nefret dike, ew dixwaze kû tu jî jê nefret bikî. Ew dixwaze kû em ji dil û can ji wî hez bikin. Loma wî mirov di sûretê xwe de afirand û dil xist hundirê wî.

3) Xala sisiyan: Xwedê tiştekî din jî daye mirovê kû wî di sûretê xwe de afirandiye. Xwedê azadiya bijartinê da mirov. Xwedê destûra her kesî dide kû riya xwe hilbijêre û Xwedê bi xwe jî çawa bixwaze dikare li gor daxwaza xwe tiştekî bike, an jî neke.
Çaxê kû Xwedê mirov afirand, wî heq û destûr da mirov kû di tiştên biçûk û mezin de ji xwe re hilbijêre kû dixwaze çi bike.

Eger Xwedê bixwesta, wî dikaribû mirov wusa biafiranda kû wî her gav bi mecbûrî li gor daxwaza Xwedê bikira.
Lê belê Xwedê azadiya bijartinê daye mirov û berpirsiyariya mirov heye kû ya rast hilbijêre û li gor daxwaza Xwedê bike. Xwedê nexwest kû mirov wek makînekê be, mirov ne roboter e.
Xwedê mirov ne di sûretê rojê de çêkir. Roj her roj hiltê, lê belê ew nikare ji bo vê yekê biryara xwe bide, an riyeke din ji xwe re hilbijêre. Roj bi mecbûrî her roj li gor daxwaza Xwedê dike, lê halê mirov ne wusa ye.
Mirov afirînekî taybet e. Xwedê ji xwe re mirov afirand û Xwedê dixwaze kû em bi **dilxwazî** ji wî hez bikin. Ew dixwaze kû em bi **dilxwazî** pesnê wî bidin. Bi rastî, berpirsyariya kû mirov ji destê Xwedê standiye, mezin e.
Divê mirov ji xwe re hilbijêre ka ew li gor daxwaza Xwedê bike an li pey Îblîs here. Divê ew biryara xwe bide ka ew ji Peyva Xwedê hez bike an wê kêm bibîne û red bike.

Hezkirina Xwedê tu caran ne bi darê zorê ye. Xwedê tu caran zorê li mirov nake kû baweriya xwe bi peyva wî bîne an guhê xwe bide wî an li gor daxwaza wî bike. Hezkirina bi mecbûrî ne tu hezkirin e. Xwedê dihêle û destûrê dide mirov kû ji xwe re riya kû bixwaze hilbijêre.
Lê her kesê kû Padîşahiya Xwedê red bike, wê di Roja Dawî de bê dîwankirin. Çimkî Xwedê mirov ji xwe re afirand; Nivîsarên Pîroz bi zelalî li ser wê yekê dibêjin.

Erê, em ne ji bo xwe, lê ji bo Xwedê li ser vê erdê ne. Em ne ji bo qezenckirina peran an ji bo tiştekî din an ji bo filan kes û bêvankes li ser rûyê erdê ne.
Xwedê em ji bo xwe, yanî ji bo rûmet û şahiya xwe afirandin.
Xwedê em di sûretê xwe de afirandin, da kû em bikarin her û her wî nas bikin, ji wî hez bikin û li gor daxwaza wî bikin. Erê, ew dixwaze kû ev yek heta hetayê weha be. Xwedayê herheyî, ji her yek ji me re canekî herheyî daye.
Daxwaza Xwedê ev e kû îro têkiliya we bi wî re hebe, îro, sibe û heta hetayê.
Ji bo vê yekê Xwedê mirov di sûretê xwe de afirandin.

Ji kerema xwe heta bernameya kû bê li ser vê ayeta ji Peyva Xwedê bifikirin.
Ew ayet tîne bîra me ka Xwedê ji bo çi mirov afirand. Dibêje: «Xudan Xwedayê me yek e. Ji Xudan Xwedayê xwe bi hemû dilê xwe, bi hemû canê xwe, bi hemû hişê xwe û bi hemû hêza xwe hez bike.» (Marqos 12:29.30)

Xwedê we pîroz û serfiraz bike û bila ew dil û hişê we veke, da kû hûn mane û girîngiya vê gotinê qenc fêm bikin:

Xwedê got: «Ji Xudan Xwedayê xwe bi hemû dilê xwe, bi hemû canê xwe, bi hemû hişê xwe û bi hemû hêza xwe hez bike.» (Marqos 12:30)

Wie gelesen Riya Rastdariyê 6 A 4800

Em bi dersên xwe berdewam dikin û îro emê li ser Adem û Hewayê bipeyivin û li ser roja wan a pêşî hîn bibin.

Me berî niha di Tewratê de ev ayet xwendibû ya ku dibêje: Xudan di şeş rojan de erd û ezman û derya û her tiştê di wan de çêkir. (Derketin 20:11)
Her weha me dît ku Xwedê mirovê pêşî di roja şeşan de afirand. Mirovê ku Xwedê afirand, bi beden û bi can bû. Xwedê bedena mirov ji axa erdê çêkir û canê da mirov. Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand, yanî ruh û hiş û bîr da wî, da ku mirov bikare Xwedê nas bike. Xwedê dil jî da wî, da ku ew bikare ji Xwedê hez bike. Xwedê azadiya bijartinê jî da mirov, da ku ew bikare ji xwe re hilbijêre ka ew dixwaze li gor emrê Xwedê bike an neke.

Piştî ku Xwedê mirov afirand, karûbarê wî yê din hê hebû. Wî hê xebata xwe xilas nekiribû û ji karê afirandinê hê bîhna xwe venekiribû. Em niha dixwazin li ser van karên wî hîn dibin. Ji bo vê yekê emê ji Tewratê, ji deriyê diduyan ê kitêba Destpêkirinê ayeta heftan bixwînin. Li wê derê Nivîsarên Pîroz dibêjin:

Xudan Xwedê, mirov ji axa erdê çêkir û bîhna jiyanê pif kir pozê wî. Û mirov bû afirînekî jîndar.
Xudan Xwedê li Rojhilat, li Êdenê baxçeyek çandibû û mirovê ku çêkiribû danî wê derê. (Destpêkirin 2:7+8)

Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê ji bo mirovê ku afirandibû baxçeyekî xweş amade kir. Navê baxçe baxçê Êdenê bû. Carna jê re baxçê bihiştê jî tê gotin.

Hin mirov guman dikin dibêjin ku ev baxçe di ezmên de bû, lê belê Nivîsarên Pîroz bi zelalî dibêjin ku ew baxçe li ser rûyê vê erdê bû. Dibe ku Êden li herêmekê bû ku îro li Îraqê an jî li Kurdistanê ye.
Di Nivîsarên Pîroz de her car baxçê Êdenê yê ku li ser erdê bû û bihişta ku li ezmên li ba Xwedê ye ne eynî ne.

Piştî vê ayetê, di Nivîsarên Pîroz de dibêje:
Xudan Xwedê ji axê darên cûr bi cûr deranîn yanî gihandin, darên ku dîtina wan spehî û xwarina wan qenc bû. Di navenda baxçe de dara jiyanê û dara zanîna qencî û xerabiyê jî hebû.
Îcar çemekî ku baxçe av dida ji Êdenê derdiket û li wir ji hev vediqetiya û dabeşî çar milan dibû.
Navê çemê pêşî Pîşon e; navê çemê diduyan Gîhon e; navê çemê sisiyan Dîcle ye û çemê çaran Firat e.
Xudan Xwedê mirov, yanî Adem, bir û danî baxçê Êdenê, da ku wî biçîne û lê bibe xweyî. (Destpêkirin 2:9-15, kinkirî)

Erê, Xwedê ji bo mirovê pêşî, yanî ji bo Adem, cihekî pir qenc amade kir ku li wê derê bi xweşî bijî. Xwedê ew danî baxçeyekî tije darên ku fêkiyê wan xweş û ji bo xwarinê pir qenc bû. Di wî cihê bedew de her tişt temam û bêkêmahî bû.

Adem ji wan hemû tiştên nedîtî nikaribû çavên xwe bineqandan. Dengê bilbilan dihat guhên wî û bîhna gulan tevahiya baxçe tije dikir. Xwedê her tişt ji bo şahî û kêfa Adem amade kiribû.
Me bihîst ku Xwedê karûbarên girîng spartin Adem. Kardestiya wî ew bû ku li baxçe bibe xweyî û bi tiştên ku ji bo vê yekê lazim bûn ve, mijûl bibe.

Lê belê di baxçê Êdenê de tiştê herî mezin ev bû ku Xwedê bi xwe di hênikahiya rojê de dihat baxçe da ku bi mirovê ku di sûretê xwe de afirandiye re, bipeyive.

Gelo çima Xwedê dihat serdana Adem? Ew dihat ba wî, ji ber ku Xwedê mirov afirand, da ku di nav Xwedê û mirov de hevparî hebe. Nêta Xwedê ew bû ku ew bi xwe û mirov bi hev re bin, bi hev re bipeyivin, bi hev re şa bibin û her û her dostaniya wan berdewam bike.
Erê, daxwaza Xwedê ev bû ku hevpariya mirov a bi Xwedê re heta hetayê hê şîrîntir û xurtir bibe.

Niha tiştekî din heye ku divê em li ser vî baxçî bizanin. Di navenda baxçe de Xwedê du darên gelek girîng çandibûn. Yek ji wan dara jiyanê û ya din dara zanîna qencî û xerabiyê bû.
Xwedê di baxçe de dara jiyanê çand, da ku mirov bîne bîra xwe ku ew ji bo jiyana herheyî hatiye afirandin. Heçî dara zanîna qencî û xerabiyê bû, Xwedê ew di navenda baxçe de çand, da ku Adem biceribîne, ka ewê guhê xwe bide emir û gotina Xwedê, an na. Guhê xwe bidin van peyvên Nivîsarên Pîroz. Ew dibêjin: Xudan Xwedê li mirov emir kir û got: «Ji her dara baxçe tu dikarî bixwî, lê ji dara zanîna qencî û xerabiyê, nexwe. Çimkî gava ku tu ji wê bixwî, eseh tê bimirî.» (Destpêkirin 2:16-17)

Çima Xwedê li Adem emir kir ku ji dara zanîna qencî û xerabiyê nexwe? Ma Xwedê çavtengiyê dike? Na, qet nake! Bi rastî, li ser Xwedê weha tê gotin: Ew bi comerdî dide hemûyan (Aqûb 1:5).
Xwedê ji Adem re got ku ew dikare ji bilî darekê ji hemû darên din bixwe. Ma ev, emrekî giran bû? Na, ne tiştekî giran bû. Xwedê, ji kerema xwe her tiştê ku ji bo jiyaneke rihet û xweş lazim bû, da Adem. Tiştek ji Adem kêm nebû. Lê Xwedê li gor plana xwe ya bêkêmahî ceribandineke sivik danî ber Adem, da ku Adem hezkirina xwe ya ji Xwedê bi guhdarîkirinê kifş bike.
Xudan di Peyva xwe de dibêje: «Eger yek ji min hez bike, wê gotina min bigire. Yê ku ji min hez nake, gotinên min jî nagire.» (Yûhenna 14:23+24)

Xwedê dilê Adem hêre kir û dixwest ku hezkirin û dilsoziya Adem biceribîne. Ji ber vê yekê wî ev emrê sivik da wî.
Xwedê mirov neafirand ku wek mekînekê be. Xwedê mirov bi ruh, dil û azadiya bijartinê afirand, da ku ew ji xwe re hilbijêre ka ew dixwaze ji Xwedê hez bike û li gor emrên wî bike, an ne.

Gelo Xwedê ji Adem re got ku eger ew ji wê darê bixwe, çi wê çêbe? Erê, Xwedê jê re got. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
«Ji dara zanîna qencî û xerabiyê, nexwe. Çimkî gava ku tu ji wê bixwî, eseh tê bimirî.» Yanî Xwedê bi zelalî ji Adem re got ku eger guhê xwe nede emrê wî, ewê bimire. Xwedê ji mirovê ku afirandibû pir hez dikir, loma wî ew bi gotinên ku xelet nayên fêmkirin hişyar kir, got: Adem, eger tu guhê xwe nedî min, tê bimirî, ji ber ku qanûna min a pîroz dibêje: Canê ku guneh bike, yê ku wê bimire, ew e. (Hezekiyêl 18:20)

Belkî hin hene ku dipirsin: Gelo guneh çi ye?
Nivîsarên Pîroz dibêjin: Guneh li hember Şerîetê rabûn e. (Yûhenna I, 3:4) Her neheqî guneh e. (Yûhenna I, 5:17) Loma yê ku bi ya qenc dizane û nake, jê re guneh e. (Aqûb 4:17) Guneh ev e ku her yek ji me ket ser riya xwe. (Îşaya 53:6) Yanî me dev ji riya Xwedê berda û em ketin ser riya xwe bi xwe.
Her tiştê ku ne li gor daxwaza Xwedê ye, yanî bi daxwaza Xwedê re li hev nagire, guneh e û mirov ji Xwedê vediqetîne.

Hevalno, divê ku em li vir bisekinin. Heta bernameya ku bê, qenc li ser van gotinên Xwedê bifikirin ên ku dibêjin: Yê ku bi ya qenc dizane û nake, jê re guneh e. (Aqûb 4:17)

Me di bernama xwe ya din de dît ku di navenda baxçê Êdenê de du darên taybetî hebûn: Dara jiyanê û dara zanîna qencî û xerabiyê. Xwedê li mirov emir kiribû û gotibû: «Ji her dara baxçe tu dikarî bixwî, lê ji dara zanîna qencî û xerabiyê, nexwe. Çimkî gava ku tu ji wê bixwî, eseh tê bimirî.»
Bi vê yekê Xwedê dixwest bibîne ka Adem wê guhê xwe bida emrê wî, an nade wî. Gelo Adem wê li gor daxwaza Xwedê bikira an wê li hember emrê Xwedê rabûya û guneh bikira?
Beriya niha me dît ku Nivîsarên Pîroz li ser guneh çi dibêjin.

Çi wê bê serê wan ên ku li hember Xwedê guneh dikin? Peyva Xwedê dibêje: Canê ku guneh bike, yê ku wê bimire, ew e. (Hesekiyêl 18:20)
Di ayeteke din de dibêje: Meaşê ku guneh dide, mirin e. (Romayî 6:23)
Gelo mirin çi ye? Hin hene ku dibêjin: Mirin ev e ku mirov êdî tune dibe, haya wî êdî ji tu tiştî tune, tiştek ji wî namîne û her tişt xilas dibe. Lê belê çaxê ku em bala xwe didin Nivîsarên Pêxemberan, em dibînin ku ev ne wusa ye. Di Nivîsarên Pîroz de mana mirinê veqetîn e jî. Yanî em dikarin bêjin: Mirin ev e ku mirov ji jiyanê tê veqetandin.

Çaxê ku Xwedê ji Adem re got: «Eger tu ji fêkiyê dara zanîna qencî û xerabiyê bixwî, eseh tê bimirî», mana vê ev bû: Adem, eger tu ji vê darê bixwî, tê bimirî, yanî tê ji min bêyî veqetandin. Hingê êdî hevpariya di nav min û te de çênabe, yanî namîne. Ez pîroz im û ez tu caran guneh qebûl nakim û ew ên ku riya min red dikin, nikarin nêzîkî min bibin. Gava Lûsîfêr û milyaketên wî guneh kirin min ew avêtin û çaxê ku tu guneh bikî, ezê te jî bavêjim. Û çaxê ku tu ji fêkiyê vê darê bixwî, bedena te jî wê pîr bibe û li dawiyê tê bimirî. Lê belê ne tenê bedena te wê bimire, lê canê te jî wê here wî cihê ku ji bo Îblîs û milyaketên wî hatiye amadekirin. Li wê derê tê her û her ji min veqetayî bî.

Ji van tiştan em fêm dikin ku guneh sê cûreyên veqetandinê pêktîne: Ya pêşî tu li ser vê erdê ji Xwedê têyî veqetandin. Yanî ji ber gunehê ku ketiye dilê te, têkiliya te ya bi Xwedê re xera bûye.
Ya diduyan: Çaxê tu bimirî, bedena te û canê te wê ji hev veqetin. Bedena te wê birize û tu bi xwe, tê rastî Xwedê bêyî, da ku dîwana te bê kirin.
Ya sisiyan: Tu bi xwe, tê ji bo her û her ji Xwedê dûr bî, tê jê bêyî veqetandin û tê bikevî gola êgir.

Eger em Peyva Xwedê qebûl bikin, em fêm dikin ku mirin çi ye: Mirin ew e ku mirov ji Xwedayê jiyanê tê veqetandin. Xwedê serkaniya jiyanê ye, lê guneh mirov ji Xwedê vediqetîne. Xwedê pîroz e û li ba wî qet guneh tune û nikare hebe jî.
Mirov wek çiqilê darê ye. Çaxê ku çiqil tê birîn û avêtin, ew êdî ne parçeyeke darê ye û hişk dibe, çimkî tu jiyan di wî de tune.
Rast e, pelên çiqilê darê di cih de hişk nabin, lê dîsa ew mirî ne. Wusa jî mirovê ku guneh bike, ji serkaniya jiyanê tê birîn, tê avêtin û jiyan di hundirê wî de namîne. Hêdî hêdî ew ber bi mirinê ve diçe.
Bi vî awayî jî eger te afûbûna gunehan ji destê Xwedê qebûl nekiribe, belkî tu dibêjî Ez sax im, rihet im, lê belê Nivîsarên Pêxemberan dibêjin ku di çavê Xwedê de tu ji ber neheqî û gunehên xwe mirî yî. (Efesî 2:1) Neheqiyên we hûn ji Xwedayê we veqetandin; gunehên we rûyê wî ji ber we veşart. Mirovê weha wê wek şivika mêwê bê avêtin derve û hişk bibe. Hingê ew tên civandin, tên avêtin nav êgir û dişewitin. (Yûhenna 15:6)

Çiqilê ku hatiye birîn, êdî nikare fêkî bide. Halê gunehkar jî di çavê Xwedê de weha ye. Tiştê ku dike, li Xwedê xweş nayê, çimkî têkiliya gunehkar ya bi Xwedê re tune, çimkî ew ji serkaniya jiyanê hatiye veqetandin.

Eger halê gunehkar neyê guhertin, ew tenê  dikare li benda dîwana Xwedê ya dadperwer bimîne. Lê şikir ji Xwedê re, wî di Nivîsarên Pêxemberan de ji me re şîrove kiriye ku çawa em dikarin di çavên wî de rast bên hesabkirin.
Mirov dikare bizane ku gunehên wî hatine afûkirin. Di dersên me yên ku bên de emê hê bêtir li ser van tiştan hîn dibin.

Beriya ku em vê dersê xilas bikin, em dixwazin li ser dabaşeke din bipeyivin. Di Nivîsarên Pîroz de ji me re tê gotin ku Xwedê çawa jina pêşî afirand. Ji kerema xwe guhê xwe bidinê:
Hingê Xudan Xwedê got: «Ne baş e ku mirov tenê bimîne, ezê alîkareke li gor wî çêkim.»
Îcar Xudan Xwedê wusa kir ku mirov bikeve xeweke giran û ew raza. Hingê Xwedê ji parsûyên wî yek deranî û cihê wî bi goşt dagirt. Xudan Xwedê ji wî parsûyê ku jê standibû jinek çêkir û ji mirov re anî. [23] Mirov got:
«Niha ev ji hestiyên min hestî
Û ji goştê min goşt e.
Wê ji wê re ‹jin› bê gotin,
Çimkî ew ji mêr hat standin.»
Ji ber vê yekê mêr wê dev ji dê û bavê xwe berde, bi jina xwe re bibe yek û herdu wê bibin bedenek. Mirov û jina xwe, herdu jî tazî bûn û ji hev şerm nedikirin. (Destpêkirin 2:18.21-25)

Ji van ayetan em fêm dikin ku jinanîn û mêrkirin plana Xwedê bû. Xwedê zilamek afirand û jinek jî afirand, da ku ew herdu ji hevdû hez bikin, bi hev re bijîn, zarokên wan hebin û di mala xwe de rûmetê bidin Xwedê.
Xwedê ji Adem hez dikir û dixwest ku ew bi awayekî bêkêmahî şa bibe û ji ber vê yekê diyariya pir qenc û xweş da wî: Xwedê jinek da wî.
Daxwaza Xwedê ev bû ku Adem jina xwe xweyî bike, xema wê bixwe, siyaneta wê bigire û wek xwe ji jina xwe hez bike.

Hê bêtir, daxwaza Xwedê ev bû ku têkiliya jin û mêr bi wî bi xwe re jî hebe, yanî ew bi hev re wî nas bikin, ji wî hez bikin û her û her guhê xwe bidin wî.

Weha Xwedê karê afirandinê temam kir. Li ser vê yekê Nivîsarên Pîroz dibêjin: Xwedê hemû tiştên ku çêkiribûn dîtin û bi rastî ew gelek qenc bûn. Bû êvar û bû sibeh, ev roja şeşan bû.  Weha erd û ezman bi hemû hêmanên xwe ve temam bûn.

Xwedê ew karê ku dikir di roja heftan de xilas kir; di roja heftan de wî ji hemû karê ku kiribû bîhna xwe vekir. Û Xwedê roja heftan pîroz kir û ew bi pîrozî cihê kir. Çimkî Xwedê di wê rojê de ji hemû karê afirandinê bîhna xwe vekir. (Destpêkirin 1:31-2:3)

Xwedê çima di roja heftan de bîhna xwe vekir? Ma ji ber ku ew westiyayî bû? Na, Xwedê tu caran naweste. Nivîsarên Pîroz dibêjin ku wî bîhna xwe vekir, çimkî wî kar û xebata xwe xilas kiribû. Her tişt temam û bêkêmahî bû. Loma Xwedê di roja heftan de ji karê xwe bîhna xwe vekir. Û heta îro jî di heftiyê de heft roj heye. Xwedê nîşanî me dide ku em jî bîhna xwe vekin û xwe bi xebatê nekujin.

Hevalno, em pir spas dikin ku we guhdariya peyvên me kir. Xwedê hez bike emê di bernameya ku bê de bibihîzin ku guneh çawa ket dinyayê.

Heta hingê li ser van peyvên Xwedê kûr bifikirin ên ku dibêjin:

Meaşê ku guneh dide, mirin e; lê diyariya Xwedê, bi Xudanê me Mesîh Îsa jiyana herheyî ye. (Romayî 6:23)

Xwedê bi we re be!

Wie gelesen Riya Rastdariyê 7 A 4820

Me di dersên xwe yên berî niha de dîtibû ku Xwedê çawa herdu mirovên pêşî, jin û mêr, afirandin. Nivîsarên Pîroz dibêjin:
«Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand,
Wî ew nêr û mê afirandin. (Destpêkirin 1:27)

Xwedê can da jin û mêr ên pêşî, wî ruh da wan, da ku bikarin Xwedê nas bikin. Wî dil da wan, da ku bikarin ji Xwedê hez bikin û azadiya bijartinê da wan, da ku ew bikarin ji xwe re hilbijêrin ka ewê li gor emrê Xwedê bikin an nakin.
Herweha me dît ku Xwedê li ser vê dinê baxçeyekî pir xweş yanî baxçê Êdenê, amade kir û mirovên pêşî danîn wir.
Xwedê, her tiştê ku ji bo jiyaneke xweş û serfiraz lazim bû, da zilamê pêşî Adem û jina pêşî Hewayê. Daxwaza Xwedê ev bû ku mirov wî nas bikin, ji wî hez bikin û her û her pesnê wî bidin.

Me dît ku Xwedê li gor plana xwe ya bêkêmahî ceribandineke sivik danî ber mirovên ku wî afirandibûn. Di navenda baxçe de Xwedê dara zanîna qencî û xerabiyê çand û emir li Adem kir, jê re got:
«Ji her dara baxçe tu dikarî bixwî, lê ji dara zanîna qencî û xerabiyê, nexwe. Çimkî gava ku tu ji wê bixwî, eseh tê bimirî.» (Destpêkirin 2:16)

Çima Xwedê Adem bi vî awayî ceriband? Nêta Xwedê ev bû ku fikrên dilê Adem kifş bibin. Xwedê ew neceriband ku ew guneh bike, lê ew ceriband, da ku wî pîroz û qayîm bike.
Divê em ji bîr nekin, mirovê ku Xwedê afirandibû, bê guneh û bê leke bû, lê ev nayê wê manê ku hezkirina wî an qerektêrê wî bêkêmahî bû.
Xwedê Adem ceriband, da ku hezkirina wî bibîne. Eger Adem di ceribandinê de bi ser keta û li gor emrê Xwedê bikira, wê kifş bibûya ku wî ji dil û can ji

Xwedê hez dikir. Herweha, eger Adem di ceribandinê de bi ser keta û guneh red bikira, ewê bi ceribandinê xurtir bibûya, çimkî Nivîsara Pîroz dibêje ku «ragirtin tecrûbê û tecrûbe jî hêviyê tîne.» (Romayî 5:4)

Îro emê li deriyê sisiyan ê Kitêba Destpêkirinê binêrin. Ev ayetên ha ji me re dibêjin ku guneh çawa ket dinyayê. Eger em bi peyama wî deriyî bizanin, emê fêm bikin ku çima dilê mirov xwehr û xerab e û çima dinya tije êş û jan e.
Me berê jî dît ku di destpêkê de Adem û Hewa di baxçê Êdenê de bûn, yanî di baxçê bihiştê de bûn. Li wir tu kêmahiya wan nebû û ji bo şahî û dilxweşiya wan her tişt amade bû. Ya herî qenc jî ew bû ku Xwedê ber êvarê dihat serdana wan û di hênikahiya rojê de bi wan re dipeyivî. Xwedê dihat ba wan, çimkî daxwaza wî ew bû ku di nav wan de têkilî û hevpariyeke kûr û xurt hebe.

Lê heçî Nivîsarên Pîroz in, ew ji me re dibêjin ku yekî din jî di baxçe de hebû. Ma tu dizanî ew kî bû? Ew Îblîs, yanî dijminê Xwedê bû.
Îblîs dît ku Xwedê erd û her tiştê tê de afirand. Îblîs dizanibû ku Xwedê emir li Adem kiriye ku ji dara zanîna qencî û xerabiyê qet nexwe. Wî ne tenê dîtibû û bihîstibû, lê wî di dilê xwe de planeke pîs amade kiribû ku karên Xwedê yên qenc xera bike.
Îblîs dixwest ku mirov biceribîne, da ku ew li gor emrê Xwedê neke, lê guneh bike, ji Xwedê bê veqetandin û helak bibe.
Heçî Xwedê bû, wî qenc bi nêt û fikrên Îblîs dizanî, lê haya Adem û Hewayê ji wan tiştan nebû.

Rojekê, çaxê ku Adem û Hewa nêzîkî dara zanîna qencî û xerabiyê sekinî bûn, Îblîs di şiklê mar de nêzîkî wan bû û bi wan re peyivî. Kitêba Pîroz dibêje: «Di nav hemû heywanên kûvî yên ku Xudan Xwedê çêkiribûn de, yê hîlebaz mar bû. Mar ji jinê re got: «Ma bi rastî Xwedê gotiye: ‹Qet ji fêkiyê dareke baxçe nexwin?›» (Destpêkirin 3:1)

Divê em deqiqekê bisekinin, bifikirin: Çima Îblîs di şiklê mar de hat?
Bersîva Kitêba Pîroz ev e, dibêje: «Di nav hemû heywanên kûvî yên ku Xudan Xwedê çêkiribûn de, yê bi aqil mar bû.»
Îblîs ew e yê ku diceribîne û ew di şiklê yekî zane de ji wan re xuya bû.
Îblîs ne di şiklê cinawirekî mezin de hat ba Adem û Hewayê û ji wan re negot: «Xêra Xwedê li we be, ez dijminê Xwedê Îblîs im!» Wî ji wan re negot: «Ez îro hatime ku we biceribînim, da ku hûn dev ji Xwedayê jîndar berdin û helak bibin!»
Na, Îblîs weha nake. Ew çawa ji wan re xuya bû?
Di şiklê afirînekî zane û spehî de xuya bû. Wî biryara xwe dabû ku bi devê mar ji wan re bêje, ji ber ku hingê, di wê demê de, beriya ku guneh bikeve dinyayê, di nav hemû heywanan de yê herî bi aqil mar bû.

Îblîs heta îro jî weha ye. Ew hîlebaz e. Ew her gav tiştên ku pêşkêş dike, wek tiştên gelek baş dide zanîn. Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Îblîs bi xwe jî xwe dixe sûretê milyaketê ronahiyê. (Korîntî II, 11:14)

Ji ber vê yekê Xwedê me bi peyva xwe hişyar dike û dibêje: «Hay ji pêxemberên derewîn hebin. Ew di postê miyan de tên ba we, lê di hundir de ew gurên har in.» (Metta 7:15)
Îblîs xapînek e; ew her gav mirovan ji rê derdixe. Ji ber vê yekê ew ji Adem û Hewayê re di şiklê marê şehreza de xuya bû.
Ji ber vê yekê ew ne bi Adem, lê bi Hewayê re peyivî. Wî hêvî dikir ku xapandina wê, wê hêsanîtir be, çimkî wî dizanî ku Xwedê beriya afirandina Hewayê ji bo wê darê emir li Adem kiriye.
Lê Hewayê jî bi vî emrê Xwedê dizanî.
Îblîs pir bi aqil e û wî qenc dizanî ku armanca wî çi ye. Ew weha difikirî: Eger Hewa qebûl bike ku ji dara zanîna qencî û xerabiyê bixwe, hingê belkî Adem jî wek jina xwe bike û bala xwe nede emrê Xwedê.

Nivîsarên Pîroz weha dibêjin: «Mar ji jinê re got: «Ma bi rastî Xwedê gotiye: ‹Qet ji fêkiyê dareke baxçe nexwin?›» Gelo te bihîst ka Îblîs ji Hewayê re çi got? Wî got:
«Ma bi rastî Xwedê gotiye: ‹Qet ji fêkiyê dareke baxçe nexwin?›»
Gelo tu dibînî ku Îblîs dixwest çi bike?
Îblîs dixwest ku Hewayê li ser peyva Xwedê ya zelal, bixe şikê.
Loma wî got: «Ma Xwedê … gotiye? Ma bi rastî Xwedê gotiye?»
Heta roja îro jî Îblîs tam eynî tiştî dike. Ew li hember Peyva Rastiyê şêrr dike. Çimkî ew dizane ku qeweta Peyva Xwedê heye ku wî bindest bike û derewên wî eşkere bike.
Îblîs dizane ka çawa ronahî tariyê winda dike, wusa jî rastî derewê dûr dixe.
Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin: Wek çiraya ku di tariyê de ronahî dide, hûnê qenc bikin ku hûn bala xwe bidin peyvên pêxemberîtiyê, yanî peyvên Xwedê. (Petrûs II, 1:19)

Hevalno, em pir spas dikin ku we qenc guhdariya peyvên me kir.
Ji kerema xwe di bernameya ku bê de jî bi me re bin. Hingê emê bi serhatiya Adem û Hewayê berdewam bikin û emê bibînin ma Îblîs wê bikaribûya ew ji riya rast derxistan. Heta hingê, li ser vê gotina Xwedê qenc bifikirin:

Wek çiraya ku di tariyê de ronahî dide, hûnê qenc bikin ku hûn bala xwe bidin peyvên pêxemberîtiyê. (Petrûs II, 1:19)

Me di bernameya din de dît ku Îblîs çawa di şiklê mar de ket baxçê Êdenê û xwest ku Adem û Hewayê biceribîne, da ku guhê xwe nedin peyva Xwedê û guneh bikin. Wî ji Hewayê re got: «Ma bi rastî Xwedê gotiye: ‹Qet ji fêkiyê dareke baxçe nexwin?›» Ji xwe Xwedê weha negotibû, lê bi vî awayî Îblîs dixwest ku Hewayê li ser peyva Xwedê ya zelal, bixe şikê.

Niha em guhê xwe bidin dawiya peyivîna di nav jinê û Îblîs de. Nivîsara Pîroz dibêje:
«Jinê ji mar re got: «Em dikarin ji fêkiyê darên li baxçe bixwin; lê heçî fêkiyê dara ku di navenda baxçe de ye, Xwedê gotiye: ‹Jê nexwin û dest nedinê, an naxwe hûnê bimirin.›» Mar ji jinê re got: «Hûn qet namirin. Çimkî Xwedê dizane gava ku hûn ji wê bixwin, hingê çavên we wê vebin, hûnê bibin wek Xwedê û qencî û xerabiyê bizanin.» (Destpêkirin 3:2-5)

Çi tiştek ecêb e! Gelo Xwedê çi ji Adem û Hewayê re gotibû? Gotibû: «Eger hûn ji vê darê bixwin, eseh hûnê bimirin.» Îblîs çi got? Got: «Hûn qet namirin!» Yanî daxwaza Îblîs ne tenê ew bû ku Hewa bikeve şikê. Wî ne tenê pirs kir, got: Ma bi rastî Xwedê weha gotiye?
Na, wî eşkere û bêyî ku fihêt bike, Peyva Xwedê înkar û red kir û got: «Xwedê xelet ji we re gotiye.»
Guhdarên delal, hûn li ser vê yekê çi difikirin? Ji van herduyan kîjanî li gor rastiyê got, Xwedê an Îblîs?
Nivîsarên Pîroz dibêjin ku Xwedê Yê Rast e û nikare derewan bike. Lê heçî Îblîs e, ew qet rastiyê nabêje, «çimkî rastî li ba wî tune. Çaxê ku ew derewan dike, ji tiştên xwe bi xwe dibêje; çimkî ew derewkar e û bavê derewan e.» (Yûhenna 8:44)

Tiştekî din jî heye: Divê em ji bîr  nekin ku Îblîs ne tenê derewkar e, ew xapînek e jî. Ew bi aqil e û hîlebaz e. Ew rastiyê û nerastiyê tevlihev dike.
Çaxê em di vê serhatiyê de li gotinên Îblîs dinêrin, em dibînin ku ev yek rast e. Wî ji Adem û Hewayê re got: «Gava ku hûn ji wê darê bixwin, hingê çavên we wê vebin, hûnê bibin wek Xwedê û qencî û xerabiyê bizanin.»
Çaxê ku Îblîs got: «Hûnê bibin wek Xwedê», ev dereweke mezin bû. Çimkî yê ku gunehan dike, ne wek Xwedê, lê belê wek Îblîs e. Lê çaxê ku Îblîs got: «Hûne qencî û xerabiyê bizanin», wî rast got. Çimkî piştî ku wan guneh kir, wan dizanibû ku xerabî çi ye. Lê belê Îblîs ji wan re negot ku zanîna vê yekê wê çiqas tehl be û wê jiyana wan çiqasî xera bike.
Xwedê gotibû: «Gava ku tu ji wê darê bixwî, eseh tê bimirî.» Lê Îblîs got: «Eger hûn ji vê darê bixwin, hûn qet namirin».
Îblîs derewkar e. Loma wî weha got û Peyva Xwedê înkar kir.

Hingê wext ji bo Adem û Hewayê hat ku an Peyva Xwedê an jî peyva Îblîs ji xwe re hilbijêrin. Bijartin ev bû: Ka ewê ji Peyva Xwedê an ji peyva Îblîs bawer bikin? Ka ewê rastiya Xwedê an derewên Îblîs qebûl bikin? Ka ewê li pey Xudanê ronahiyê an li pey xudanê taristaniyê herin?

Emê ji Nivîsarên Pîroz bixwînin, da ku em bibînin ku wan çi kir.  Kitêba Pîroz dibêje:
«Jinê dît ku fêkiyê darê ji bo xwarinê xweş e û li çav spehî xuya dibe û ji bo şehrezabûnê dil diçe wî; wê hinek jêkir û xwar. Wê da mêrê xwe yê ku pê re bû jî û wî jî xwar.» (Destpêkirin 3:6)

Çiqas ecêb e! Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand, da ku mirov bikare wî nas bike, ji wî hez bike û her û her li gor emrên wî bike. Lê belê mirov çi kir?

Ma wî ewqas ji Xwedê hez dikir ku li gor emrên wî bikira? Na! Wî ji xwe re hilbijart ku li gor peyvên Xwedayê hezkirinê, neke. Wî biryara xwe da ku li pey dijminê Xwedê û li pey dijminê mirov Îblîs here û guhê xwe da wî.

Ev roj çi rojeke xemgîniyê bû! Bav û kalên me pişta xwe dan Xwedê û ji fêkiyê dara zanîna qencî û xerabiyê xwarin. Wan dizanibû ku Xwedê ev yek qedexe kiriye, lê dîsa jî weha kirin.
Di nav xelkê de tê gotin ku «Nexweşiya vegir li ser nexweşê pêşî tenê namîne.»
Bi vî awayî Kitêba Pîroz eynî tiştî dibêje:

«Guneh bi destê yek mirovî, mirin jî bi destê guneh ket dinyayê; bi vî awayî mirin di nav hemû mirovan de belav bû, çimkî hemûyan jî guneh kir.» (Romayî 5:12)
Bivê nevê, hal ev e! Wek ku gotina pêşiyan jî dibêje: «Kur li bavê xwe tê.»

Ez û tu, em hemû kurên Adem in. Em gunehkar hatine dinyayê û divê em bimirin, çimkî bavê me Adem e. Mirovê pêşî yê ku emrê Xwedê şkênand, bavkalê me ye û em tam wek wî ne.
Kî ji me dikare bêje ku wî tu caran emrekî Xwedê neşkênandiye? Tu kes nikare weha bêje. Yek jî tune ku bikare bêje: Min emrê Xwedê neşkênandiye.
Xasîtiya me ya gunehkar ji Adem tê. Loma em nikarin emrên Xwedê wek ku lazim e, pêk bînin.
Gunehê ku di Adem de bû, wek nexweşiyeke vegir di nav hemû mirovan de belav bû. Erê, «Nexweşiya vegir li ser nexweşê pêşî tenê namîne!»

Lê belê dîsa jî hêvî û derfet heye, çimkî Peyva Xwedê vê jî dibêje:
«Bi neheqiya yek mirovî, hemû mirov sûcdar derketin; weha jî bi karê rastdariyê yê yekî, ji bo hemû mirovan rastdarî û jiyan hat.» (Romayî 5:18)
Îro wextê me nemaye, lê di dersên ku bên de emê hê bêtir li riya rast a xilasiyê binêrin. Çimkî Xwedê ew amade kiriye, da ku gunehkar bikarin li wî vegerin.

Hevalên delal, bernama me ya li ser Riya Rastdariyê ji bo îro ev bû. Pir spas ji bo ku we qenc guhdariya bernameya me kir.

Di bernameya ku bê de em dixwazin bibînin ka çi hat serê Adem û Hewayê. Emê bibînin, ka piştî ku wan guneh kir û ji riya rastdariyê derketin û ketin ser riya neheqiyê, çi çêbû?
Xwedê we pîroz û bimbarek bike û heta bernameya ku bê, vê rastiyê ji bîr nekin a ku dibêje:
«Guneh bi destê yek mirovî, mirin jî bi destê guneh ket dinyayê; bi vî awayî mirin di nav hemû mirovan de belav bû, çimkî hemûyan jî guneh kir.» (Romayî 5:12)

Wie gelesen Riya Rastdariyê 8 A 4985

Cara din em ji Tewratê hîn bûn ku Xudan Xwedê mirovên pêşî di sûretê xwe de afirandin. Me bihîst ka çima Xwedê ew afirandin. Xwedê dixwest ku mirov bi hemû dilê xwe û canê xwe û bi hemû hêza xwe ji wî hez bikin û bi vî awayî her û her têkiliya wan a kûr bi Xwedê re hebe.

Me dît ku Xwedê ceribandineke sivik danîbû ber Adem, da ku kifş bibe ka Adem ji Xwedê hez dike û wê guhdariya wî bike, an na. Beriya ku jina pêşî bê afirandin, Xwedê ev emir li Adem kiribû û gotibû: «Ji her dara baxçe tu dikarî bixwî, lê ji dara zanîna qencî û xerabiyê, nexwe. Çimkî gava ku tu ji wê bixwî, eseh tê bimirî.» (Destpêkirin 2:16-17)
Bi vî awayî Xwedê Adem hişyar kir ku cezayê neguhdariyê wê mirin be û mirov wê ji Xwedê bê veqetandin. Xwedê ji Adem hez dikir û dixwest ku têkiliya di nav Xwedê û mirov de her û her bimîne. Lê belê me dît ku Adem û Hewayê guhê xwe dan dengê Îblîs û li gor emrê Xwedê nekirin. Wan ji fêkiyê dara ku Xwedê qedexe kiribû, xwar.

Îro em dixwazin ji Tewratê hîn bibin, ka piştî gunehkirina Adem û Hewayê çi hat serê wan.
Kitêba Pîroz weha dibêje: «Çavên herdûyan jî vebûn û fêm kirin ku ew tazî ne. Wê gavê pelên hêjîran dirûtin û ji xwe re kirin berkoşk.» (Destpêkirin 3:7)

Piştî ku Adem û Hewayê guhê xwe nedan Xwedê, tiştê ku pêşî wan kir çi bû? Ew xebitîn ku şerma xwe û sûcê xwe veşêrin!
Me berê bihîstibû ku di destpêkê de, beriya ku Adem û Hewa ji fêkiyê dara zanîna qencî û xerabiyê bixwin, ew «tazî bûn û ji hev şerm nedikirin.»
Lê niha fikrên wan ên li ser bedena wan ne wek berê ne. Niha ew li ber Xwedayê pîroz şerm dikin û bi sûcê xwe dihesin.

Wan êdî dizanî ku Xwedê wê dîwana wan bike. Loma wan dixwest ku şerma xwe veşêrin: Wan ji pelên dara hêjîrê berkoşk dirûtin û bedena xwe nixumandin. Lê belê wan pelan qet nikaribû di dilê wan de sûcê wan xîş bikin.

Piştî vê yekê Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
«Piştre Adem û jina xwe dengê lingên Xudan Xwedê yê ku di hênikahiya rojê de, di nav baxçe de digeriya bihîstin. Wan, di nav darên baxçe de xwe ji ber Xudan Xwedê veşart.» (Destpêkirin 3:8)
Beriya ku ew neguhdariyê bikin, Adem û Hewa bi bihîstina dengê Xwedê pir şa dibûn. Lê niha tirs ket dilê wan û wan fihêt dikir û dixwestin ku xwe di nav darên baxçe de ji ber Xwedê veşêrin!
Çima tirs ketibû dilê Adem? Çima wî xwe veşart?
Bersiva van pirsan eşkere ye: Eger yek bikeve xaniyê cîranê xwe ku diziyê bike û ew dengê xweyiyê xênî bibihîze, ewê çi bike? Ji xwe ewê bixebite ku xwe veşêre!
Adem jî bi vî awayî destê xwe dirêjî wî tiştî kir, yê ku Xwedê jê re qedexe kiribû û gava wî dengê Xwedê bihîst, xwe veşart. Adem qenc dizanibû ku wî emrê Xwedê şkandiye.

Gelo diviya ku Adem ji Xwedê bitirsiya? Bêguman diviya! Xwedê bi zelalî jê re gotibû: «Gava ku tu ji fêkiyê dara zanîna qencî û xerabiyê bixwî, eseh tê bimirî.»
Gelo Xwedê wê li gor gotina xwe bikira? Gelo bi rastî Adem wê bimira? Ma bi rastî Xwedê wê wan mirovên ku wî afirandine, ceza bike? Tu çi dibêjî?
Qenc e ku em Îblîs bînin bîra xwe. Çaxê ku Îblîs desthilatî û hukumdariya Xwedê red kiribû, Xwedê çi bi wî kir?
Xwedê ew ji ba xwe avêtin û êdî wan nedikarî nêzîkî Xwedayê pîroz bisekinin. Ne tenê ev, lê Xwedê ji bo wan agirê herheyî jî amade kir.

Wek ku Îblîs kiribû, Adem jî wusa kir: Wî desthilatî û hukumdariya Xwedê red kir.
Ma Xwedê wê bigota: «Xem tune! Tenê fêkî bû, ne tiştekî mezin bû...»
Ma Xwedê wê Adem rûspî derxista û dîwana wî nekira? Na, qet nabe! Xwedê pîroz e û Xwedê gunehan ceza dike.
Zilamekî pir bi aqil carekê got: «Yê ku xerabiyê ceza neke, emir dike ku xerabî bê kirin!»
Xwedê tu caran guneh û xerabiyê qebûl nake. Ewê wan ceza bike. Habaqûq pêxember weha nivîsiye: «Ya Xwedayê min, Pîrozê min …Çavên te ji nêrîna xerabiyê paqij in û tu nikarî neheqiyê ragirî.» (Habaqûq 1:12.13)
Erê, «Xudan wê dîwana gelê xwe bike. Tiştekî tirsehêz e ku mirov bikeve destê Xwedayê jîndar.» (Îbranî 10:30.31)

Xwedê pîroz e û ji ber vê yekê ewê dîwana her gunehî bike û her gunehî ceza bike.
Adem û Hewayê guneh kiribûn, loma «Xudan Xwedê gazî mirov kir û got: Tu li ku derê yî?» (Destpêkirin 3:9)

Piştî ku Adem guneh kir, Xwedê çi kir? Xwedê li wî geriya, gazî wî kir û got: «Tu li ku derê yî?»
Gelo **Adem** li **Xwedê** digeriya? Na! Adem xwe ji ber Xwedê veşart!
Çima Xwedê gazî Adem kir? Ma wî nizanibû ku Adem li ku derê ye? Bi rastî, Xwedayê ku her tiştî dibîne, qenc dizanibû ka Adem li ku derê xwe veşartiye. Xwedê gazî Adem kir, çimkî wî dixwest ku Adem gunehê xwe qebûl bike û li ber Xwedê eşkere bike. Erê, Adem guhê xwe nedabû Xwedê û emrê wî şkandibû, lê dîsa jî Xwedê jê hez dikir.
Çaxê ku Xwedê got: «Tu li ku derê yî?», bersiva Adem çi bû?
Kitêba Pîroz dibêje:

«Adem got: «Min li baxçe dengê te bihîst û ez tirsiyam çimkî ez tazî bûm û min xwe veşart.» Xwedê got: «Kê ji te re got ku tu tazî yî? Ma te ji wê dara ku min li te emir kiribû û gotibû: ‹Nexwe!› xwar?» Mirov got: «Ew jina ku te ji min re anî, wê ji wê darê da min û min xwar.» Hingê Xudan Xwedê ji jinê re got: «Eva ku te kir çi ye?» Jinê lê vegerand û got: «Mar ez xapandim û min xwar.» (Destpêkirin 3:10-12)

Gelo te bihîst bersiva wan çi bû? Her yek ji wan xebitî ku xwe rûspî derxe û sûc xist stûyê yekî din.
Adem got: «Ne sûcê min e!» û gazin ji Xwedê û Hewayê kir: Ew jina ku te ji min re anî – sûcê wê ye! Û heçî Hewa bû, wê got: «Lomeyan ji min neke, ne sûcê min bû – mar ez xapandim!» Lê belê Xwedê dilê mirovan dizane û wî dizanî ku herdû jî sûcdar in.
Yê ku fêkiyê darê da xwarin, ne Xwedê bû û ne jî Îblîs bû. Îblîs dikare mirovan biceribîne û wan ber bi xerabiyê ve bidehfîne, lê belê ew nikare bi zorê guneh bi mirovan bide kirin. Erê, Îblîs Hewa xapand, lê dîsa jî tiştê ku wê kir, li ber Xwedê guneh bû. Heçî Adem bû, wî bi hemdê xwe bijart ku bi ya xwe bike: Wî emrê Xwedê bi zelalî dizanibû, lê wî hilbijart ku ji riya rastdariyê dûrkeve û di riya xerabiyê de here.
Wî ne tenê ev guneh kir, lê bi ser wî gunehî de zêde jî kir û sûcê xwe xist stûyê yên din.
Heta îro jî, xelk li riyekê digerin ku sûc û gunehên xwe bixin stûyê hin mirovên din, lê Xwedê rastiyê dizane. Ew bi Nivîsarên Pîroz ji xelkê re dipeyive û ji wan dipirse: Tu li ku derê yî? Bersiva min bide! Te çi kir? Çima tu bawer nakî? Çima tu li gor peyvên min nakî? Çima tu qenciya min kêm dibînî? Çima tu dixebitî ku tu sûc û gunehên xwe bixî stûyê mirovên din?
Di Kitêba Pîroz de weha nivîsî ye:
«Xudan dibêje: Her çok wê li ber min bitewe
Û her ziman wê eşkere bike û bêje: ‹Tu Xwedê yî.›
Îcar her yek ji me wê li ser xwe hesab bide Xwedê.» (Romayî 14:11.12)

Me di bernameyên berî niha de dît ku Adem û Hewa ji aliyê Îblîs ve hatin ceribandin û guhê xwe nedan Xwedê, yanî emrê wî şkandin.
Dîsa jî Xwedê li wan digeriya, çimkî ew Xwedayê hezkirinê ye.
Me dît ku hem Adem û hem jî Hewayê dixwestin ku sûcê xwe bixin stûyê yekî din. Lê ji xwe hem Xwedê û hem jî Adem û Hewayê qenc dizanîn ku ew mirovên pêşî bûn ku guneh kiribûn û Xwedê wê ev guneh ceza bikira.

Em niha bala xwe bidin peyvên Xwedê û bibînin ka Xwedê çawa dîwana mar, Hewa û Adem kir. Kitêba Pîroz dibêje:

Xudan Xwedê ji mar re got:
«Ji ber ku te ev yek kir, di nav heywanên kedî û yên kûvî de, yê nifirlêbûyî tu yî.
Tê li ser zikê xwe rêve herî û di hemû rojên jiyana xwe de tê axê bixwî.
Ezê dijminahiyê bixim navbera te û jinê, navbera dûndana te û dûndana wê.
Ewê serê te biperçiqîne û tê bi pehniya wî ve bidî.»

Û ji jinê re got:
«Ezê êşa te ya zarokanînê gelek zêde bikim û bi êşê tê zarokên xwe bînî.
Dilê te wê mêrê te, lê ewê bibe serwerê te.»

Û ji Adem re got:
«Ji ber ku te guhdariya peyva jina xwe kir û ji wê dara ku min li te emir kiribû û gotibû, ‹Nexwe!› te xwar, ax ji rûyê te ket bin nifirê;
Tê di hemû rojên jiyana xwe de bi zehmet ji wê bixwî.
Ax wê stirî û diriyan ji te re derxe. Tê giyayên çolê bixwî.
Heta ku tu bizivirî wê axa ku tu jê hatiyî standin,
Tê nanê xwe bi xwihdana eniya xwe bixwî. Çimkî tu ax î û tê biziviri axê.»
(Destpêkirin 3:14-19)

Gelo tu dibînî çi ber ji gunehê wan derket? Berê wî êş, jan û keder bû, stirî û dirî, zehmet û xwîhdan, nexweşî û mirin bû. Erê, «meaşê ku guneh dide, mirin e.» (Romayî 6:23)
Ji kerema xwe bînin bîra xwe ka Xwedê çi gotibû. Eger Adem û Hewayê ji fêkiyê dara qedexkirî bixwaran, çi wê bihata serê wan?
Xwedê weha gotibû: «Gava ku hûn jê bixwin, eseh hûnê bimirin.»
Gava Adem û Hewayê ji fêkiyê wê darê xwarin, ma ew di wê rojê de hatin veşartin? Na! Gelo ew di wê gavê de mirin? Erê, ew mirin. Tam di wê gavê de Adem û Hewa bi mana ruhanî mirin, çimkî têkiliya wan a bi Xwedê re êdî nema.

Me berê bihîstibû ku mana mirinê ev e ku mirov ji Xwedê tê veqetandin.
Gava ku Adem û Hewayê guneh kirin, wan xwe ji Xwedê, yanî ji serkaniya jiyanê, veqetand. Çaxê ku wan biryara xwe da ku guhê xwe bidin Îblîs û li pey wî herin, wan hevaltiya bi Xwedê re winda kir û para wan a jiyana ji Xwedê nema.
Ew bûn dijminên Xwedê, çimkî wan aliyê dijminê Xwedê Îblîs girt. Têkiliya wan a bi Xwedê re nema, ew têkilî mir.
Ji xwe em vê yekê qenc dizanin: Eger hevalê te bibe alîkarê dijminê te, hingê ew hevalê te bi xwe jî dibe dijminê te, ma ne wusa ye? Hevaltiya di nav te û wî de xera dibe, dimire. Gotina pêşiyan jî weha dibêje: «Dijminê bavan nabe dostê lawan.»
Îblîs dijminê Xwedê ye û eger tu guhê xwe bidî Îblîs û li pey wî herî, tê çawa bibî hevalê Xwedê? Guneh, mirov ji Xwedê vediqetîne.

Lazim e ku em tiştekî din jî bînin bîra xwe û fêm bikin. Ew jî ev e: Çaxê em hatin vê dinyayê, em hemû «ji ber neheqî û gunehên xwe mirî bûn» (Efesî 2:1) û «ji jiyana Xwedê re biyanî» bûn. (Efesî 4:18)
Erê, ji xwe ev yek li me xweş nayê, lê tiştê ku Peyva Xwedê dibêje, ev e.

Gava Adem guneh kir, ew di cih de bû yekî gunehkar. Ademê gunehkar bû bavê hemû mirovên din. Loma ji ber gunehê Adem hemû zuriyeta wî, yanî hemû dûndana wî gunehkar in. Wek ku tê gotin: Kur li bavê xwe tê.

Herweha, gunehê Adem ew ji Xwedê veqetand. Ew Ademê ku emir û desthilatiya Xwedê qebûl nekir, bavê hemû mirovên li ser rûyê vê erdê ye. Loma hemû zarokên Adem heta îro jî, çaxê ew tên dinyayê, ew ji Xwedê veqetayî ne. Erê, «Nexweşiya vegir li ser nexweşê pêşî tenê namîne.»

Peyva Xwedê tam vê yekê dibêje. Dibêje:
«Guneh bi destê yek mirovî, mirin jî bi destê guneh ket dinyayê; bi vî awayî mirin derbasî hemû mirovan bû, çimkî hemûyan jî guneh kir.» (Romayî 5:12)
Bavkalê me Adem xwe ji Xwedê veqetand û ew mîna çiqilekî ku hatiye birîn e. Eger çiqil êdî bi darê ve ne girêdayî be, çi wê bi wî bê? Ewê hişk bibe û bimire. Û heçî kiziyên wî çiqilê ku ji darê hatiye birîn e, ma ew şîn dimînin? Erê, ji bo demeke kin wek ku sax in xuya dibin, lê belê ew mirî ne û zû hişk dibin, çimkî ew ne bi darê ve, lê bi çiqilê birî ve girêdayî ne. Bi vî awayî hemû zarokên Adem wek kiziyên çiqilê birriyî ne. Ji ber ku Adem guneh kir, ew wek çiqilê hişk e û em bi wî ve girêdayî ne. Gunehê bavkalê me Adem derbasî me hemûyan bû. Xasîtiya wî, bû xasîtiya me û wek ku ew di bin xezeba Xwedê de ye, em jî di bin xezeba Xwedê de ne.
Dawid pêxember di Kitêba Zebûrê de nivîsiye: «Va ye, gava ku ez ji dayik bûm, di hevênê min de guneh hebû û hê di malzaroka diya xwe de, ez bi guneh bûm.» (Zebûr 51:5)

Guneh wek nexweşiya AIDS'ê ye. AIDS nexweşiyeke pir xeter e û li tevahiya dinyayê belav bûye. Çaxê ku AIDS bikeve hindurê mirov, ew tu caran jê dernakeve. Mirovên ku bi vê nexweşiyê ketine, carna AIDS'ê digihînin zarokên xwe, mesele çaxê ku hê zarok di malzaroka diya xwe ya nexweş de ye, AIDS carna zarok digire.

AIDS mirovan dikuje û heta îro jî ji bo vê nexweşiyê derman tune.
Guneh jî wusa ye. Ev bela di tevahiya dinyayê de belav bûye. Ew mirovan dikuje û her û her helak dike. Heçî mirov e, tu çare ji destê wî nayê.

Lê belê şikir ji Xwedê re, çimkî Xwedê bi xwe çare peyda kir ku em hem ji qeweta guneh û hem jî ji cezayê guneh xilas bibin.
Ji bo vê yekê divê em bawer bikin ku çareya vê yekê li ba Xwedê heye û divê ku em vê çareyê qebûl bikin.
Xwedê hez bike, di bernameya xwe ya ku bê de, emê bibînin ka Xwedê çawa sozeke mezin û newaze dabû Adem û Hewayê. Ev soz li ser hatina Xilaskarekî mezin bû yê ku wê bihata vê dinyayê da ku gunehkar ji guneh, ji Îblîs û ji dojehê xilas bikiran.

Em pir sipas dikin ku we guhdariya peyvên me kir. Heta bernameya ku bê, qenc li ser van peyvên Dawid bifikirin. Wî got:

«Va ye, gava ku  ez ji dayik bûm, di hevênê min de guneh hebû û hê di malzaroka diya xwe de, ez bi guneh bûm.» (Zebûr 51:5)

Bila Xwedê we pîroz û bimbarek bike!

Me di bernama xwe ya berî vê de dît ku Adem û Hewa çawa bi xwarina fêkiyê dara zanîna qencî û xerabiyê, ji riya Xwedê derketin. Mirovê ku di sûretê Xwedê de hatibû afirandin, biryara xwe da ku guhê xwe bide dijminê Xwedê Îblîs. Beriya ku Adem û Hewa guneh bikin, her cara ku Xwedê dihat baxçe ku bi wan re bipeyive, ew pir şa dibûn; lê niha çaxê ku wan dengê Xwedê bihîst, tirs ket dilê wan, wan pir fihêt kir û ew xebitîn ku xwe ji ber Xwedê veşêrin. Lê belê Xwedê li wan geriya, bi wan re peyivî û ji wan re diyar kir ku gunehê wan wê zehmet, êş û jan, stirî û dirî, nexweşî û mirin bianiya vê dinyayê.

Ji ber vê yekê, ji wê rojê û heta îro, siya mirinê li ser dûndana Adem e.
Hemû zarokên Adem gunehkar tên dinyayê û hê di malzaroka dayikê de cewhera wan xerab e.
Me bivê û nevê, cewhera bavkalê me Adem bû cewhera me jî. «Kur li bavê xwe tê.» Gunehê Adem bû sedem ku em hemû jî gunehkar bên dinyayê. Bi rastî «Nexweşiya vegir li ser nexweşê pêşî tenê namîne.»
Û wek ku gunehê Adem ew ji Xwedê veqetand, gunehê me jî em ji Xwedê veqetandine. Tiştê ku Kitêba Pîroz dibêje, ev e:
«Guneh bi destê yek mirovî, mirin jî bi destê guneh ket dinyayê; bi vî awayî mirin derbasî hemû mirovan bû, çimkî hemûyan jî guneh kir.» … «Hemûyan guneh kir û ji rûmeta Xwedê bêpar man.» … «Neheqiyên we hûn ji Xwedayê we veqetandin; gunehên we rûyê wî ji ber we veşart.»
Erê, ev ne mizgîniyeke xweş e, lê belê hal ev e. «Rastî her gav tehl e.»

Di vê serhatiyê de em dibînin ku çawa gunehê Adem hemû mirov ji Xwedê veqetandin. Roja ku Adem neguhdarî kir, Adem (û hemû mirovên ku wê jê derketana) ji padîşahiya ronahiyê derketin, ketin padîşahiya taristaniyê.
Para wan a di Padîşahiya Xwedê de nemabû. Ji ber gunehê wan, para wan di padîşahiya Îblîs de bû; wî ew kirin hêsîr û paleyên xwe. Ji bilî xulamtiya guneh,

bi ser de tirsa mirinê jî ket dilê wan. Û piştî mirinê, ji bilî cezayê bêdawî yê di gola êgir de, wan nikaribû li benda tiştekî din bimînin û tu hêviya wan nemabû.

Eger serhatiyên Kitêba Pîroz bi vê serhatiya xilas bibûna, diviya ku me ev kitêb bigirta û dest bi şîn û girînê bikira.
Hingê emê bibûna wek yekî di behrê de windabûyî yê ku hêviya wî ya xilasbûnê tune. Eger Xwedê ji zarokên Adem re riya xilasiyê venekira, emê her û her helak bibûna. Lê belê, şikir ji Xwedê re! Serhatiyên Nivîsarên Pîroz bi serhatiya gunehê Adem xilas nebûn.
Rehm û kerema Xwedê mezin e û wî li gor dilovaniya xwe ji zarokên Adem re riya xilasiyê vekir!
Peyva Xwedê dibêje:
«Li dera ku guneh lê zêde bûye, kerem hê bêtir zêde bûye.» … «Netirsin! Ez hatime, ku ez mizgîniya şabûneke mezin bidim we, ku ji tevahiya gel re ye.» … «Çimkî kerema Xwedê ya ku ji hemû mirovan re xilasiyê tîne, xuya bû.»

Wek ku me dît, Xwedê pîroz e û dîwana gunehkaran dike.
Xwedê rast e û ji ber vê yekê gunehan ji bîr nake, nabêje: «Xem tune!» Ew her gunehî ceza dike û cezayê guneh hem mirin e û hem jî ew e ku mirov her û her ji Xwedê veqetayî be. Xwedê her û her eynî Xwedê ye û cezayê guneh jî nayê guhertin.
Lê îro em dixwazin ji Nivîsarên Pîroz hîn bibin, ka plana Xwedayê pîroz ji bo xilaskirina gunehkaran çi ye. Xwedê wê çi bikira, da ku mirov bikariya ji cezayê guneh xilas bibûya?
Loma emê îro hîn bibin ku Xwedê ne tenê Yê Pîroz e, lê Yê Birehm û Yê Keremdar e jî. Xwedê, yanî dadgerê me, dixwaze bibe Xilaskarê me!

Îro emê bibînin ka Xwedê çawa dest bi diyarkirina plana xwe kir. Roja ku Adem û Hewayê guneh kirin, wî dest pê kir û li ser riya xilasiyê ji wan re got.

Em niha di Tewratê de, yanî di kitêba Destpêkirinê de, di deriyê sisiyan ayeta 15'an de dixwînin. Xwedê ji Îblîsê ku xwe xistibû şiklê mar re weha got: «Ezê dijminahiyê bixim navbera te û jinê, navbera dûndana te û dûndana wê. Ewê serê te biperçiqîne û tê êrişê pehniya wî bikî.»

Di vê ayêtê de gelek rastiyên kûr û girîng hene. Pêxemberên Xwedê ew hin bi hin hûr û kûr şîrovekirin. Lê em dikarin niha dabaşa wê weha bi kurtvebirî bêjin: Xwedê li vir dest bi diyarkirina plana xwe dike. Plana wî ew bû ku wiyê Xilaskar yanî Rizgarkar bişanda vê dinyayê, da ku wî zarokên Adem ji desthilatiya Îblîs xilas bikiran. Di vê ayetê de Xwedê cara pêşî li ser hatina vî Xilaskarê pîroz got.
Di vê ayetê de li ser vî Xilaskar û Mehdervanî, çar xalên rast û girîng tên gotin:

Ya pêşî: Xwedê diyar kir ku ew Xilaskar wê zarokê keçikekê be. Dê û bavê me hemûyan hene, lê belê Xilaskarê ku Xwedê wê bişanda, wê bi hêza Xwedê ji keçikekê çêbûya.
Çênedibû ku Xilaskarê dinyayê ji zarokên Adem bûya, çimkî hemû zarokên Adem gunehkar in. Xilaskarê gunehkaran diviya bê guneh be. Diviya ku ew ji ezmên, yanî ji ba Xwedê bihata.
Yanî tiştê ku pêşî em ji vê ayetê hîn dibin ev e: Xwedê soz da ku Xilaskarê pîroz wê bê. Ew Xilaskar wê ji keçikekê çêbe û ewê ne kurê zilamekî be.

Ya diduyan: Xwedê di wê roja ku Adem û Hewayê guneh kiribûn de, hê tiştekî din ji wan re diyar kir. Heçî ew Xilaskarê ku Xwedê wê bişanda bû, Xwedê ji Îblîs re got: «Tuyê êrişê pehniya wî bikî.» Bi wan gotinan, Xwedê da zanîn ku Îblîs wê cefayê bide Xilaskarê dinyayê. Di dersên ku bên de emê bibînin ku çawa pêxemberên Xwedê gotin ku Îblîs wê çawa nav li mirovan bide ku tehnan bidin Xilaskar, cefayê bidin wî û wî bikujin.
Em dibînin, Xilaskarekî ku ji aliyê mirovan ve cefa û tengahiyê dikişîne, wê di plana Xwedê de cihê girîng bistîne.

Diviya Xilaskarê dinyayê bibûya gorî û di ber gunehan de bimira, da ku mirov vegerandan ba Xwedê. Yê Rast wê ji bo me yên nerast bimira. Wî wê bi dilxwazî jiyana xwe bida, da ku cezayê guneh yê ku mirin e bikişanda.

Ya sisiyan: Rastiya sisiyan a li ser Xilaskar ev e ku Xwedê ji Îblîsê ku di şiklê mar de bû re got: Xilaskar «wê serê te biperçiqîne.» Ji bo Îblîs, ev mizgîniyeke tehl bû, lê ji bo hemûyên ku dixwazin ji hêza Îblîs, ji hêza guneh û ji hêza dojehê xilas bibin, ev mizgîniyeke pir xweş e! Xwedê li vir cara pêşî got ku di dawiyê de Xilaskar wê bi ser keve, wê Îblîs bindest bike û zarokên Adem ji xulamtiya guneh xilas bike.

Ya çaran: Xwedê got ku du nifşên mirovan wê hebin: Xelkê ku li pey Îblîs diçin û xelkê ku li pey Xwedê diçin. Nifşê ku li pey Îblîs diçe ew mirov in, ên ku ji Peyva Xwedê bawer nakin. Nifşê ku li pey Xwedê diçe ew mirov in ên ku Peyva Xwedê qebûl dikin, jê bawer dikin û baweriya xwe bi Xilaskarê dinyayê tînin û hêviya xwe bi wî ve girêdidin.

Guhdarên delal! Em ji bo bernameya ku bê jî li hêviya we ne. Hingê emê li dawiya vê serhatiyê binêrin.
Xwedê bi we re be!

Riya Rastdariyê 9 B 4890

Me di bernama xwe ya din de dît ku ji destpêkê ve plana Xwedê ya ji bo xilaskirina mirovan hebû. Xwedê di wê roja ku Adem û Hewayê guneh kirin de ji wan re li ser xilaskarê ku wê bihata dinyayê; çar tişt gotin:
Xwedê da zanîn ku ew Xilaskar wê zarokê keçikekî be.

Wî got ku Îblîs wê cefayê bide Xilaskarê dinyayê û got ku Xilaskar wê Îblîs bindest bike û zarokên Adem ji xulamtiya guneh xilas bike.
Herweha Xwedê kifş kir ku du nifşên mirovan wê hebin: Nifşê ku li pey Îblîs diçe ew mirov in, ên ku ji Peyva Xwedê bawer nakin. Nifşê ku li pey Xwedê diçe ew mirov in ên ku Peyva Xwedê qebûl dikin, jê bawer dikin û baweriya xwe bi Xilaskarê dinyayê tînin û hêviya xwe bi wî ve girêdidin.

Yanî wê roja ku Adem û Hewayê guneh kirin, Xwedê dest pê kir, got ku ewê çawa ji bo gunehkaran riyeke newaze veke, da ku ew rizgar bibin.
Di bernameyên ku bên de emê hin bi hin bibînin ku hemû pêxemberên Xwedê çawa hatina wî Xilaskarê pîroz diyar kirin ê ku wê gunehkar ji destê Îblîs xilas bikirana.
Eger tiştê ku te niha bihîst, ji te re ne gelek zelal be jî, xeman nexwe; emê hêdî hêdî li gor rêza dîrokê pêşve herin û hin bi hin mana wan serhatiyan wê zelaltir bibe. Vê gotina pêşiyan bîne bîra xwe: «Xweyiyê sebrê be, padîşahê Misrê be.»
Gelo, ji bo fêmkirina Peyva Xwedê sebra te heye?
Eger wek ku tu li zîv digerî û wek ku tu li defîneyan (xezîna veşartî) dikolî, tu li şehrezayiyê bigerî, hingê tê zanîna Xwedê bibînî.

Niha em dixwazin di Tewratê de dawiya serê sisiyan ê kitêba pêşî bixwînin.
Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Xudan Xwedê ji Adem û jina wî re cilên çermîn çêkirin û li wan kir. Hingê Xudan Xwedê got: «Va ye, mirov bû yekî mîna me, çimkî êdî bi qencî û xerabiyê dizane. Nebe ku destê xwe dirêjî fêkiyê dara jiyanê bike, jê bixwe û her û her bijî.»
Loma Xudan Xwedê ew ji baxçê Êdenê derxist, da ku wê axa ku jê hatibû standin, biçîne. Piştî ku wî mirov derxist, wî li aliyê rojhilata baxçê Êdenê hin Kerûb, yanî hin milyaket û şûrekî agiravêj ê ku bi her aliyî ve dizivire bi cih kirin, da ku riya dara jiyanê biparêzin.»

Li vir deriyê sisiyan xilas dibe. Di van ayetan de çend tiştên girîng hene û beriya ku em bernameya xwe xilas bikin, em dixwazin hinekî li ser wan bifikirin.
Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Xudan Xwedê ji Adem û jina wî re cilên çermîn çêkirin û li wan kir.»
Ma tê bîra we, çaxê ku Adem û Hewayê ji fêkiyê dara zanîna qencî û xerabiyê xwarin, wan çi kir? **Wan ji pelên dara hêjîrê ji xwe re berkoşk dirûtin** û li xwe kirin, da ku şerma xwe li ber Xwedê veşêrin. Ma Xwedê ew cilên ku wan ji xwe re çêkirin, qebûl kir? Na, wî ew qebûl nekirin! Çima Xwedê ew cil qebûl nekirin? Ji ber ku Xwedê dixwest hînî Adem û Hewayê bike ku ew bêkêmahî ye û nikare karên mirov ên bi kêmahî qebûl bike. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê dibêjin: «Em hemû bûn wek yekî murdar û hemû kirinên me yên rastdar wek cilekî qirêjî ne.» Tiştek tune ku mirov bikare bi wî gunehên xwe ji ber Xwedê veşêre.

Lê belê Xwedê bi xwe ji bo mirovan tiştek kir. Xwedê heywan gurandin û ji çermê wan ji bo Adem û Hewayê cil çêkirin. Erê, cara pêşî Xwedê bi xwe heywanek serjêkir, kir gorî. Bêguman dîtina wê yeka ku çawa xwîna heywanan hat rijandin, li Adem û Hewayê qet xweş nehat û ew bêzar kirin. Lê belê bi rijandina xwîna heywanan, Xwedê hînî wan kir ku «meaşê ku guneh dide, **mirin** e» û «bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.»

Divê cezayê gunehan bê dayîn. Cezayê guneh jî mirin e. Bêyî ku guneh bihata cezakirin, Xwedê li gunehê wan nedibihûrî. Diviya di ber gunehkaran de heywanekî bêqisûr û paqij bihata gorîkirin, bimira. Riya Xwedê ya afûkirinê tenê ev e, çimkî Xwedê hem rast e û hem jî ji mirovan hez dike.
Bi vî awayî, yanî bi wê goriya pêşî, Xwedê anî bîra mirovên pêşî ku cezayê guneh mirin e. Ew gorîkirina heywên mînaka Xilaskarê ku wê bihata dinyayê bû. Wiyê di ber gunehên mirovan de xwîna xwe birijanda.

Di bernameyên ku bên de emê hê bêtir li ser van tiştan hîn bibin. Îro ji bo me bes e, em bînin bîra xwe ku Xwedê xwîna heywanan rijand, da ku şerma Adem û Hewayê veşêre.

Piştî vê yekê Xwedê Adem û Hewa ji bihiştê, yanî ji baxçê Êdenê derxistin. Wî milyaketekî bi şûrê bi pêt bi cih kir, da ku ew wê riya ku diçe dara jiyanê biparêze. Çaxê ku Adem û Hewayê ji fêkiyê ku Xwedê ji wan re gotibû: «Jê nexwin!» xwarin, wan ji xwe re riya mirinê hilbijart. Ji ber vê yekê wan êdî nikaribû kêfê ji baxçê Êdenê û ji bereketa wî bistînin.

Me berê dît ku Xwedê çawa Îblîs ji ba xwe avêt, ji ber ku Îblîs guneh kiribû. Niha em dibînin ku Xwedê Adem û Hewa, ji ber gunehê wan ji bihiştê derxistin. Xwedê her gav Xwedê ye; ew Yê Pîroz e û ew her tiştê ku ne pîroz e, ceza dike.

Divê em van herdu rastiyan bixin dilê xwe: Ya pêşî ev e: Xwedê Yê Rast e. Xwedê tu caran guneh qebûl nake. Lome wî dîwana Adem û Hewayê kir û ew ji baxçe derxistin.
Ya diduyan jî ev e: Xwedê Yê Keremdar e. Qet heqê Adem û Hewayê tunebû ku rehm û kerema Xwedê bistînin. Ew bi tenê hêjayî dîwana Xwedê bûn. Lê belê Xwedê naxwaze ku mirov helak bibin. Ji ber vê yekê wî soz da ku ewê Xilaskar bişîne. Wî Xilaskarî wê gunehkar ji taristaniya padîşahiya Îblîs rizgar bikirana û ew bibirana ronahî û rûmeta padîşahiya Xwedê

Nexapin! Rehm û kerema Xwedê û rastdariya wî, ne li hember hev in. Xwedê yek e û çaxê ku ew tiştekî dike, ew hem li gor kerema xwe û hem jî li gor rastdariya xwe dike. Di dersên ku bên de emê hê bêtir bibînin ku rehm û kerema Xwedê û rastdariya wî her gav li hev tên. Bêyî ku Xwedê dev ji rastdariya xwe berde, ew rehmê li gunehkaran dike.
Îro em li ser soza Xwedê ya newaze peyivîn a ku wî hê di roja ku Adem û Hewa ji riya Xudan derketibûn de, ji wan re gotibû.

Em hêvî dikin ku hûn di bernameyên ku bên de jî bi me re bin, da ku hûn hê zelaltir fêm bikin ku mana soza Xwedê ya li ser wî Xilaskarê ku wî wê bişanda, da ku gunehên me bibexişîne, çi ye.

Pir spas ji bo ku we qenc guhdarî kir.
Ji kerema xwe di bernameya ku bê de jî bi me re bin. Hingê emê li jiyana herdu kurên Adem û Hewayê yên pêşî binêrin, yanî emê li serhatiya Qayîn û Habîl binêrin.

Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin:

**«Li dera ku guneh lê zêde bûye, kerema Xwedê hê bêtir zêde bûye.»**

Xwedê bi we re be!

Di bernameya ya din de, me dît ku piştî gunehê Adem û Hewayê, Xwedê dest pê kir, plana xwe ya xilasiyê ji mirovan re got. Ew Xilaskarê ku wê dûndana Adem ji destê Îblîs û ji qeweta guneh û dojehê xilas bikira, wê bihata vê dinyayê. Herweha me dît ku Adem û Hewayê ji xwe re cilên ji pelên hêjîran dirûtin, lê Xwedê ev yek qebûl nekir. Xwedê hînî wan kir ku gunehkar nikarin sûc û şerma xwe li ber Xwedayê pîroz veşêrin. Xwedê dîwana gunehkaran dike û bi tenê ew bi xwe dikare wan ji sûcê wan xilas bike. Me dît ku çawa Xwedê bi xwe heywan serjêkir, kir gorî û ji çermê wan ji bo Adem û Hewayê cil çêkirin. Cara pêşî Xwedê bi xwe heywan kir gorî û ji bo vê yekê wî xwîn rijand.
Me bihîst, Xwedê diyar kir ku li ser rûyê erdê du nifşên mirovan, yanî du malbatên mirovan wê hebin: Yên ku baweriya xwe bi Peyva Xwedê tînin û yên ku Peyva Xwedê qebûl nakin.

Îro emê li herdû kurên Adem û Hewayê yên pêşî binêrin. Qayîn guhdariya Xwedê nekir, gotina wî red kir; lê heçî Habîl bû, wî baweriya xwe bi Xwedê anî.

Me dît ku Adem û Hewa ji bihiştê hatin derxistin. Xwedê ew ji ber gunehê wan ji baxçê Êdenê avêtin. Wan ji ber sûcê xwe êdî nikaribû bi bereketa bihiştê şa bibin. Gunehê wan têkiliya wan a bi Xwedê re xera kir. Lê dîsa jî Xwedê ji wan hez dikir û xema wan dixwar.

Niha emê ji Tewratê bixwînin. Di Kitêba Destpêkirinê de, di deriyê çaran de, weha dibêje:
«Adem çû ba jina xwe Hawayê û ew bizaro bû, **Qayîn** anî û got: «Bi alîkariya Xudan min mirovek qezenc kir.» Hawa dîsa bizaro bû û birayê wî **Habîl** anî. Habîl bû şivanê pêz û Qayîn bû cotkar.»

Piştî demekê, êdî du kurên Adem û Hewayê hebûn û ew jî wek dê û bavên xwe gunehkar bûn. Wek nexweşiyeke vegir, guneh di nav zarokên wan de jî belav bû. Qayîn û Habîl gunehkar hatin dinyayê. Kurên wî «di sûretê wî de bûn.» «Kur li bavê xwe tê.»
Çaxê ku Qayîn û Habîl hatin dinyayê, di hevênê wan de guneh hebû. Zarok mezin bûn û di zanînê de pêşve çûn. Qayîn bû cotkar û ji xebata giran netirsiya. Habîl jî bû şivan. Herdûyan jî li ser Xwedê dizanîn. Wan dizanibû ku Xwedê heye û ew pîroz e û ji gunehan nefret dike.
Diviya ku wan herdûyan bizanibûya **ku tenê bi riya goriyê yanî bi riya xwînrijandinê ew dikarin nêzîkî Xwedê bibin.**

Rojekê wan herdûyan biryar da ku biperizin Xwedê û goriyekê pêşkêşî wî bikin. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê dibêjin:
«Piştî demekê Qayîn ji berê erdê anî û ji Xudan re pêşkêş kir. Habîl jî, ji nixuriyên pezê xwe, ji bezê wan, anî. **Xudan bi Habîl û pêşkêşa wî şa bû. Lê bi Qayîn û pêşkêşa wî şa nebû**. Qayîn pirr hêrs ket û rûyê xwe tirş kir.»

Em niha bala xwe bidinê ku li vir çi çêbû. Du mirovan dixwest ku biperizin Xwedê. Herdûyan jî gorî pêşkêşî Xwedê kir. Lê belê Kitêba Pîroz dibêje:
«Xudan bi Habîl û pêşkêşa wî şa bû, lê bi Qayîn û pêşkêşa wî şa nebû..»
Çima Xwedê pêşkêşa Habîl qebûl kir û pêşkêşa Qayîn qebûl nekir? Gelo, di nav wan herdû pêşkêşan de ferq hebû?

Erê, bi rastî di nav pêşkêşa Qayîn û Habîl de ferqek mezin hebû. Qayîn ji berê erdê anî ber Xwedê, yanî wî şînahî, zad, an jî fêkiyê daran anî.
Heçî Habîl bû, wî ji Xwedê re ji bezê pezê xwe anî, yanî wî berx kirin gorî, xwîna wan rijand.

Çima Xwedê goriya Habîl qebûl kir? Ma Xwedê ji zad û şînahiyê an ji fêkî hez nake? Ne xêr, sedem ne ev e. Lê belê çima Xwedê Habîl rastdar derxist?

Bersiva vê pirsê ev e: Habîl goriya ku li gor daxwaza Xwedê bû, pêşkêş kir; lê Qayîn tiştekî li gor daxwaza xwe bi xwe pêşkêş kir.
Gelo Xwedê ji bo lêbihûrtina gunehan çi dixwest? Wî jiyana heywanekî bêleke dixwest, yanî dixwest ku xwîna heywanekî bêleke bê rijandin. Habîl bi baweriyê goriyeke weha pêşkêşî Xwedê kir. Kitêba Pîroz vê yekê erê dike û dibêje: «Bi **baweriyê**, Habîl goriyeke ji ya Qayîn çêtir pêşkêşî Xwedê kir. Bi wê baweriyê ew mirovekî rast hat erêkirin, çimkî Xwedê diyariyên wî erê kirin.»
Habîl ji Xwedê bawer dikir, lê Qayîn weha nekir.

Çaxê ku em dibêjin: «Filan kes ji Xwedê bawer dike», an: «Filan kes baweriya xwe bi Xwedê tîne», mana vê çi ye?
Bawerkirin ev e ku mirov li Xwedê ewle bibe heta ku bi gotina wî bike jî. Çaxê ku mirovek baweriya xwe bi Xwedê tîne, ew gotinên Xwedê rast hesab dike û wan qebûl dike jî. Eger tu bêjî: «Ez baweriya xwe bi Xwedê tînim», lê dîsa jî tu ji gotinên wî, yanî ji Nivîsarên Pîroz bawer nekî, hingê baweriya te ne tu bawerî ye. Çimkî Xwedê û peyvên Xwedê yek in. Eger tu ji Xwedê bawer bikî, tê ji gotinên wî jî bawer bikî û li gor wan bikî jî. Û eger tu ji gotinên Xwedê bawer nekî, tu Xwedê bi xwe qebûl nakî.

Belkî yek wê bipirse: «Çima Xwedê emir kir ku heywan bên gorîkirin? Çima Xwedê got: Bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.» (Îbranî 9:22)
Sedem ev e: Xwedê di Şerîeta xwe ya pîroz de diyar dike ku **cezayê guneh, mirin e.**
Ji ber vê yekê divê ku xwîn bê rijandin. Xwedê negot: «Berdêla gunehan fêkî ye an şînahî an zad e.» Herweha Xwedê negot: «Berdêla ji bo gunehan ev e ku hûn dua bikin an rojiyê bigirin an xêran bikin.»
Na, tiştê ku Xwedayê pîroz di Kitêba Pîroz de dibêje, ev e: Cezayê gunehan **mirin** e.

Xwedê di Nivîsarên Pêxemberan de nîşanî me dide ku her mirov, yanî hemû zarokên Adem gunehkar in. Loma her gunehkar bi deynekî mezin deyndarê Xwedayê pîroz e. Divê ku gunehkar bimire û hingê di dojehê de her û her vî deynê xwe bide. Deynê guneh pir mezin e û tu nikarî evqas kirinên qenc bikî ku bi wan, gunehên te li ber Xwedê bên xîşkirin. Cezayê guneh mirin û dojeh e û kirinên qenc tu caran nikarin vî deynî bidin.

Mesele em bêjin ez bi 200 milyon dolar deyndarê cîranê xwe me, lê belê qet perên min tunin. Loma ez diçim ba wî û jê re dibêjim: «Ez deyndarê te me û deynê min gelek e. Lê ez çi bikim, perên min tunin û ez nikarim deynê xwe bidim. Lê belê pêşniyara min heye, em dikarin weha bikin: Ezê her roj bêm û hewşa mala te bimalim. Ezê heta roja mirina xwe weha bikim û bi vî awayî ezê tevahiya deynê xwe bidim.»
Gelo tu çi difikirî? Ma tu dibêjî ku deynxwazê min wê bi vê yekê razî bibe? Belkî ew hêrs bibe, belkî ew li min bikene, lê em herdû dizanin ku ew tu caran vî tiştî qebûl nake. Çima qebûl nake? Ji ber ku ez nikarim bi vî awayî, yanî bi gelek kirinên qenc ên biçûk, deynê xwe yê mezin bidim.

Guhdarên delal, pir sipas ji bo ku we qenc guhê xwe da vê bernameyê.
Xwedê hez bike, emê di bernameya ku bê de careke din li ser Habîl û Qayîn bipeyivin.
Heta hingê Xwedê bi we re be!

Me di bernameya xwe ya ji berî vê de li serhatiya zarokên Adem û Hewayê, Habîl û Qayîn nêrî. Me dît ku hemû gorî yanî qurban li Xwedê xweş neyên. Mirov nikare li gor kêfa xwe tiştekî pêşkêşî Xwedê bike, lê belê divê mirov guhê xwe bide daxwaza Xwedê û li gor emrên wî pêşkêşên xwe hilbijêre.
Me tiştekî din jî dît: Xwedê negot: «Berdêla gunehan fêkî ye an şînahî an zad e.» Herweha Xwedê negot: «Berdêla ji bo gunehan ev e ku hûn dua bikin an rojiyê bigirin an gelek xêran bikin.» Na, tiştê ku Xwedayê pîroz di Nivîsarên Pîroz de dibêje, ev e: Cezayê gunehan **mirin** e.
Loma tu kes nikare bi kirinên xwe yên qenc deynê gunehên xwe bide. Bi tenê tiştek heye ku dikare gunehan xîş bike. Ew jî ne xêr, ne jî kirinên qenc an pere ne, lê belê mirin e. Cezayê guneh mirin e û ew e ku dîwana mirov ji aliyê Xwedê ve bê kirin. Loma Xwedê gunehê Adem û Qayîn xîş nekir, çimkî wan dixwest ku bi kirinên destê xwe vê yekê pêk bînin. Lê belê plana Xwedê ew bû ku guneh bi xwîna goriyekê bên xîşkirin. Diviya yê bêsûc di ber yê sûcdar de bimira.

Afûbûna gunehan ne li gor fikirîna mirovan e, lê li gor plana Xwedê ye. Bi berdêla goriyan, Xwedê derî vekir, da ku ji bo dûndana Adem afûbûn û xilasî hebe.
Di demên berê de, li gor emrê Xwedê diviya ku her gunehkar heywanekî bêleke pêşkêşî Xwedê bikira û serjêkira. Heywana ku bêqusûr bû, di ber gunehkar de dimir. Ji ber wê xwîna ku dihat rijandin, Xwedê çavên xwe li gunehên Adem û zuriyeta wî dineqand û ji bo demekê gunehên wan dihatin nixumandin. Lê belê xwîna heywanan nikaribû deynê gunehên mirovan bida, ji ber ku ji xwe heywan ne wek mirovan hêja ne.

Ji ber vê yekê Nivîsarên Pîroz dibêjin ku gorîkirina heywanan «tenê siya wan tiştên qenc» ên ku wê bihatan bû. «Çimkî xwîna conega û nêriyan nikare gunehan rake.»

Îcar heçî gorîkirina heywanan e, tiştê herî girîng ê ku divê em bînin bîra xwe, ev e ku ew tenê mînaka wî Xilaskarê ku wê bihata vê dinyayê bû. Wî Xilaskarî wê rast û rast deynê gunehên Adem û zuriyeta wî bida. Xwedê soz da ku ew Xilaskar wê bê û çaxê ku ew bê, ewê bi carekê ji bo gunehan cefa bikişîne, da ku me bigihîne Xwedê û em jiyana herheyî bistînin.
Di Încîlê de weha dibêje: «Hemû pêxember li ser wî Xilaskarî şahidiyê dikin, **her kesê ku baweriyê bi wî bîne, bi navê wî efûbûna gunehan distîne**.»

Me dît ku di dema nifşên berê de, li gor plana Xwedê ji bo xilasbûnê gorî lazim bûn. Lê Qayîn bala xwe neda plana Xwedê. Qayîn li gor fikrên xwe kir û ji xwe re riyeke din bijart. Wî kirinên destê xwe pêşkêşî Xwedê kir. Wî berê erdê, yanî berê zeviyê ya ku tê de xebitîbû, anî ber Xwedê. Lê belê ew erd di bin nifirê de ye û xwîna berê erdê tune.
Ma Xwedê wê pêşkêşeke weha, yanî «goriyeke bê xwîn» qebûl bikira? Na, Xwedê qebûl nekir û ji xwe goriya bê xwîn ne gorî ye.

Heçî Habîl bû, wî ji nixuriyên pezê xwe anî ber Xwedê û ew serjêkirin, yanî wî xwîna wan rijand û ji Xwedê re şewitand. Ji ber vê goriyê, wijdana Habîl di çavê Xwedê de paqij bû. Wî dizanî ku ew bi xwe hêjayî mirinê ye, lê berxê bêqusûr di ber wî de mir.
Bi vî awayî Habîl baweriya xwe kifş kir. Goriya ku wî pêşkêşî Xwedê kir, bû mînaka wî Xilaskarê ku wê bihata vê dinyayê, da ku di ber gunehkaran de bimira û cezayê gunehên wan bikişanda.

Em dixwazin dabaşa dersa îro bînin bîra xwe û ji bo vê yekê emê pirseke pir girîng bipirsin: Çima Xwedê pêşkêşa Qayîn qebûl nekir?
Ma Qayîn ji Habîl gunehkartir bû? Na, sedem ne ev bû. Herdû jî gunehkar bûn. Herdûyan pêşkêş anîn ber Xwedê. Qayîn ne mirovekî xwedênenas bû. Belkî hin mirov dibêjin ku pêşkêşa wî hê xweştir bû. Fêkî,  şînahiyên nû û zadê erdê pir xweş in! Lê berxekî serjêkirî li ber çavên hemûyan xweş neyê dîtin.
Erê, rast e, guneh jî li ber çavên Xwedê xweş nayê dîtin û Xwedê bi zelalî riya afûbûnê diyar kiriye û gotiye: **«Bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.»** Xwedê Qayîn û pêşkêşa wî qebûl nekir, çimkî Qayîn riya rastdariyê ya ku li gor plana Xwedê ye, qebûl nekir.

Tu kes nikare bi riya xwe here ba Xwedê. Riya Rastdariyê ya ku Xwedê amade kiriye, yek e û divê mirov di wê riyê re here ba Xwedê. Tenê Riya Xwedê bêkêmahî û tam rast e.
Eger mamoste ji xwendevanekî bipirse, bêje: «Du caran dido dibin çiqas?», bi tenê bersiveke rast heye. Du caran dido dibin çar. Eger xwendevan bêje: «Sisê!», hingê bersiva wî xelet e. Herweha yek bêje «Pênc!», dîsa xelet e. Û eger yekî din bêje «Çar û nîv!», ew jî xelet e. Du caran dido bi tenê dibin çar. Erê, rewş ev e.
Heçî Riya rast a Xilasiyê ye, ew jî yek e. Xwedê ew pêk anî û em dizanin ku Xwedê yek e û riya ku gunehkar bi Xwedayê pîroz re li hev bê jî yek e.
Ev rê bi goriyeke tam bêkêmahî û tam temam hatiye amadekirin.

Guhdarê delal, ma tu dizanî ku Peyva Xwedê li ser goriya pîroz a ku Xwedê ji bo xîşkirina gunehên me pêk aniye, çi dibêje? Ma tu dizanî ku Xwedê bi xwe Xilaskarekî bi hêz şand ser rûyê erdê, da ku gunehên te her û her afû bibin û dilê te li ber Xwedê safî û paqij bibe?
Di bernameyên me yên ku bên de, emê hê bêtir li ser vî Xilaskarê newaze hîn bibin. Nivîsarên Pîroz li ser wî weha dibêjin: «Xilasî bi tu kesê din tune; çimkî

di bin ezmên de, di nav mirovan de, navekî din nehatiye dayîn ku em bikarin pê xilas bibin.» (Karên Şandiyan 4:12)

Guhdarên delal, bernameya me îro li vir xilas dibe. Xwedê hez bike, emê di bernameya ku bê de, bi serhatiya Qayîn û Habîl berdewam bikin.

Heta hingê hûn jî vê qanûna Xwedê ya bingehîn bînin bîra xwe ya ku dibêje:
**«Bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.»**

Xwedê bi we re be û we serfiraz bike!

Di bernameya din de, me li ser kurên Adem û Hewayê Qayîn û Habîl bihîst. Me dît ku wan herdûyan dixwest ku biperizin Xwedê û gorî pêşkêşî wî kirin. Qayîn ji berê erdê anî û ew pêşkêşî Xwedê kirin. Lê heçî Habîl bû, wî ji pezê xwe berx serjêkir, kir gorî. Nivîsarên Pîroz li ser vê serhatiyê dibêjin ku Xudan Habîl qebûl kir, lê Qayîn qebûl nekir.

Çima Xwedê Habîl qebûl kir, lê Qayîn qebûl nekir? Ji ber ku diviya li gor riya Xwedê ya rastdariyê goriyeke bi xwîn bihata dayîn. Xwedê Habîl rast hesab kir, çimkî Habîl ji Peyva Xwedê bawer kir û li gor daxwaza Xwedê heywanek kir gorî. Heçî Qayîn bû, wî weha nekir û Xwedê pêşkêşa wî qebûl nekir.

Îro em dixwazin li dawiya serhatiya Habîl û Qayîn binêrin. Gelo ma tu dizanî piştî ku Xwedê pêşkêşa Qayîn qebûl nekir, çi çêbû? Di Kitêba Destpêkirinê de, di deriyê 4'an, ayeta 5'an de Nivîsarên Pîroz weha dibêjin: «Qayîn pirr hêrs ket û rûyê xwe tirş kir.»
Çima Qayîn hêrs ket? Bersiva vê pirsê ne zehmet e. Mesele, eger min xerabî kiribe û yek ji min re bêje: «Te tiştekî xelet kiriye! Ji riya xwe ya xerab vegere û ya qenc bike!», hingê ezê çi bikim? An ezê xwe nizim bikim û peyvên wî bi nefsbiçûkî qebûl bikim û dev ji xerabiyê berdim, an ezê hêrs bikevim û ji mirovê ku weha gotiye, aciz bibim û di riya xwe ya xerab de berdewam bikim.

Xwedê li Qayîn hilat, yanî ew hişyar kir, da ku fêm bike, pêşkêşa di destê wî de di çavê Xwedê de ne rast e. Armanca Xwedê ev bû ku Qayîn tobe bike û ew wek Habîl berxekî bêqusûr bike gorî. Xwedê bi gotinên xwe riya rast, yanî riya afûbûnê nîşanî Qayîn da, lê wî di pozbilindiya xwe de nexwest vê yekê qebûl bike. Di cihê wê de, ew hêrs ket û xemgîn bû.

«Xudan ji Qayîn re got: «Tu çima hêrs bûyî û te çima rûyê xwe tirş kiriye? [7]
Eger tu ya qenc bikî, ma ew nayê bilindkirin? Eger tu ya qenc nekî, guneh li ber dêrî di kemînê de letaye û daxwaza wî tu yî. Lê tu bibe serwerê wî.»
Çima Xwedê weha ji Qayîn pirsî? Xwedê weha kir, ji ber ku wî nedixwest ku Qayîn helak bibe. Xwedê dixwest ku Qayîn li ser riya rast here û guneh neke. Xwedê Qayîn hişyar kir, çimkî dijminekî pir zordar dixebitî ku Qayîn û zuriyeta wî helak bike. Navê wî dijminî **guneh** e!

Guneh çi ye? Guneh di tevahiya dinyayê de pirsgirêka herî mezin e. Guneh wek mar e, tije jehra kujdar e. Wek çirûskeke biçûk e, lê dikare daristanên mezin bişewitîne. Guneh xetîreya Îblîs e – ew bi guneh dinyayê dişewitîne! Peyva Xwedê dibêje: «Yê ku bi ya qenc dizane û nake, jê re guneh e.» ... «Guneh li hember Şerîetê rabûn e … Yê ku guneh dike ji Îblîs e, çimkî Îblîs ji destpêkê ve guneh dike.»
Guneh ew qewet e ya ku di endamên bedena me de dixebite û li hember tiştê rast û qenc şêrr dike.
Her tiştê ku bi emir û daxwaza Xwedê re li hev nayê, guneh e. Eger em guhê xwe nedin Peyva Xwedê û li gor gotinên Xwedê nekin, ev guneh e. Eger ez di riya xwe bi xwe de herim, ev guneh e.

Gelo dawiya wan mirovên ku di riya xwe bi xwe de diçin û baweriya xwe bi Xwedê naynin û li gor Peyva wî nakin, çi ye? Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Ew mirov wê ji ba Xudan û ji rûmeta qeweta wî bên avêtin û cezayê helakbûna herheyî bikişînin.»
Mirovên ku ji xwe re riya xilasiyê ya ku Xwedê diyar kiriye hilbijêrin, wê jiyana herheyî bistînin. Lê mirovên ku dilê xwe hişk dikin û rastiya Xwedê qebûl nakin, wê xezeba Xwedê bibînin û bên dîwankirin.  Lê belê Nivîsarên Pîroz dibêjin ku Xwedê «naxwaze ku kesek helak bibe, lê dixwaze ku hemû tobe bikin» û xilas bibin.

Xwedê nexwest ku Qayîn di gunehê xwe de helak bibe. Daxwaza Xwedê ew bû ku Qayîn tobe bike, ji riya xerab vegere û ji xwe re riya rastdariyê hilbijêre.

Wek ku me di bernameya din de dît, Xwedê plana xwe ya ji bo mirovan kifş kiribû. Li gor vê planê, gunehkar dikarin li ber Xwedê rast derkevin. Habîl ji Peyva Xwedê bawer kir. Xwedê dibêje, «meaşê ku guneh dide, mirin e» û «bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.»
Habîl dizanî ku ew gunehkar û mirovekî bi sûc e û goriya ku wî pêşkêş kir, baweriya wî ya bi Xwedê kifş kir. Ew heywanê ku wî ji Xwedê re kir gorî, mînaka wî Xilaskarê ku wê bihata vê dinyayê bû. Xwedê bi xwe wê ev Xilaskar bişanda, da ku di ber gunehên mirovan de bibûya goriyeke bêkêmahî. Bi vê goriyê, gunehên mirovan wê her û her xîş bibûna.
Heçî Qayîn bû, wî dizanî ku Xwedê heye, lê dilê wî ji Xwedê dûr bû. Di Kitêba Pîroz de dibêje ku «kirinên wî bi xwe xerab bûn». Di çavên Xwedê de perizîna Qayîn pûç bû, çimkî wî riya Xwedê qebûl nekir.

Piştî ku Qayîn dît ku Xwedê pêşkêşa wî qebûl nekir, wî çi kir? Emê niha li vê yekê binêrin. Kitêba Pîroz dibêje: «Qayîn ji birayê xwe Habîl re got: ‹Em herin deştê.› Çaxê ku li deştê bûn, Qayîn li hember birayê xwe Habîl rabû û ew kuşt.»
Gelo Qayîn çi kir? Ma wî tobe kir? Ma wî guhê xwe da peyvên Xwedê? Na!
**Qayîn guneh bi ser gunehê xwe de zêde kir, li hember birayê xwe rabû, li wî xist û ew kuşt.**

Hişê mirov vê yekê nastîne! Ji dêla ku wî xwîna heywanekê birijanda, wî xwîna birayê xwe rijand! Tu li ser vê yekê çi dibêjî? Kê ev fikir xistibû hişê Qayîn ku birayê xwe bikuje?
Qayîn guhê xwe dabû kê? Bi rastî, Qayîn guhê xwe dabû Îblîs. Kitêba Pîroz li ser Qayîn weha dibêje: «Çima wî ew kuşt? Ji ber ku kirinên wî bi xwe xerab bûn, lê yên birayê wî rast bûn» û dibêje ku Qayîn «ji Yê Xerab bû û wî birayê xwe kuşt.»

Me dît ku Xwedê diyar kiribû ku li ser rûyê erdê du nifşên mirovan, yanî du cûreyên wan wê hebin, yanî mirovên ku li pey Xwedê diçin û mirovên ku li pey Îblîs diçin. Habîl yê Xwedê bû, çimkî wî baweriya xwe bi Peyva Xwedê anî û li gor wê kir. Qayîn yê Îblîs bû, çimkî wî ji peyvên Xwedê bawer nekir.

Heçî hûn in, guhdarên delal, ma hûn di riya Habîl de diçin û baweriya xwe bi Peyva Xwedê tînin, an hûn di riya Qayîn de diçin û ji peyvên Xwedê bawer nakin?

Dostên delal,

Xwedê hez bike, emê di bernameya ku bê de serhatiya Habîl û Qayîn xilas bikin.

Heta hingê, li ser vê hişyarkirina Xwedê qenc bifikirin a ku dibêje:

«Yê ku bi ya qenc dizane û nake, jê re guneh e.» ... «Yê ku guneh dike ji Îblîs e, çimkî Îblîs ji destpêkê ve guneh dike.»

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Me di bernama xwe ya berî vê de dît ku Qayîn dilê xwe li ber Xwedê girt. Çaxê ku Xwedê ew hişyar kir, wî qet guhê xwe neda wî, lê rabû û birayê xwe yê biçûk Habîl kuşt.

Ji kerema xwe niha guhê xwe bidin peyvên Xwedê. Piştî ku Qayîn birayê xwe kuşt, Xwedê ji Qayîn re çi got?
«Xudan ji Qayîn re got: ‹Birayê te Habîl li ku derê ye?» Qayîn got: ‹Ez nizanim. Ma ez nobedarê birayê xwe me?› Xwedê got: ‹Te çi kir? Dengê xwîna birayê te ji axê gazî min dike. Tu niha ketî bin nifirê. Ew axa ku devê xwe vekir, da ku xwîna birayê te ji destê te bistîne, wê ji destê te bibe. Radio contains the old rendering! Êdî çaxê ku tu axê biçînî, ew berê xwe nade te. Tê li ser erdê firar û gerok bî.›»

Yanî Xwedê Qayîn ceza kir û jê re got: «Êdî çaxê ku tu axê biçînî, ew berê xwe nade te.» Gotina pêşiyan jî dibêje: «Dera giriyê mirov jê heyî, gazinda wî jî jê heye.»
Xwedê Qayîn ceza nekir, da ku Qayîn helak bibe, lê ew ceza kir, da ku rê bide wî ku ew tobe bike, ji rastiyê bawer bike û xilas bibe.
Lê belê ma Qayîn çi kir? Ma wî tobe kir? Na, wî tobe nekir. Kitêba Pîroz dibêje: «Qayîn ji ba Xudan çû û li rojhilata Êdenê li welatê Nodê digeriya.» Qayîn peyvên Xwedê red kirin, pişta xwe da Xwedê û jê dûr ket, di jiyana xwe de cihê neda Xwedê.
Bala xwe bide vê yekê: **Ne Xwedê xwe ji Qayîn dûr xist, lê belê Qayîn xwe ji Xwedê dûr xist!**

Îro jî gelek mirov wek wî kurê Adem in. Ew jî di riya xwe de diçin û dilê xwe li ber Xwedê digirin û guhê xwe nadin dengê wî. Ew bi devê xwe dibêjin: «Xwedê mezin e!», lê di dilê xwe de ew ji xwe re dibêjin: «Xwedê dûr e! Tu kes nikare wî nas bike!»

Lê belê Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê ji tu kesê ji me ne dûr e, çimkî yê ku jiyanê û her tiştê din dide, ew e. Ew ji kakerrîka dilê me nêzîktirî me ye. Xwedê te nas dike û ew dixwaze ku tu jî wî nas bikî!
Lê gelo çima rewş wusa ye ku piraniya mirovan Xwedê bi awayekî kûr nas nakin? Peyva Xwedê li ser vê yekê weha dibêje: «Ronahî hat dinyayê, lê mirovan ji ronahiyê bêtir ji tariyê hez kir, çimkî kirinên wan xerab bûn. Her kesê ku xerabiyê dike, kîna wî ji ronahiyê heye; ew ber bi ronahiyê ve nayê, da ku kirinên wî xuya nebin.»

Mirov Xwedê nas nakin, çimkî wek ku Qayîn kir, ew jî pişta xwe didin peyvên Xwedê. Pêxemberê Xwedê Dawid nivîsî, got: «Peyva te çira gavên min û ronahiya riya min e.» Eger hûn pişta xwe bidin ronahiya Peyva Xwedê, hûnê di tariya gunehan de bimînin û hûn tu caran Xwedê nas nakin. Hûnê bifikirin ku Xwedê dûrî we ye. Lê belê Xwedê dixwaze ku tu bizanî ew nêzîkî te ye. Ew li rex te ye, ew li ber te ye, ew li pişt te ye û ew li her aliyê te ye. Xwedê pir ji te hez dike û dixwaze ku di nav te û wî de têkiliya kûr hebe.
Divê ku tu ne wek Qayîn bî; wî dilê xwe hişk kir û riya Xwedê ya rastdariyê red kir. Lê Xwedê dixwest ku Qayîn tobe bike û heta îro jî Xwedê emir li her kesî dike ku tobe bike û ji peyvên wî bawer bike.

Guhdarê delal, gelo tu dizanî mana tobekirinê çi ye? Mana tobekirinê ew e ku mirov fikrên xwe û kirinên xwe biguhere. Çaxê mirov tobe dike, ew ji Xwedê re eşkere dike, dibêje: «Ez li ser riya xilasiyê ya ku te pêk aniye, xelet fikirîm.» Peyva Xwedê dibêje ku mirov qet nikare xwe ji dîwana Xwedê ya rast xilas bike.
Tobekirin ev e ku mirov van peyvên Xwedê qebûl bike, li Xwedê vegere û riya Xwedê, yanî riya xilasiyê, qebûl bike.

Mesele em bêjin: Zilamek dixwaze bi otobûsê ji Diyarbakrê here Adanê. Ew ji xwe re bilêtê dikirre û siwar dibe. Otobûs diçe diçe û piştî demekê zilam pê dihese ku bi rastî otobûs diçe bajarê Vanê.
De vêca, eger ew zilam bixwaze here Adanê, divê ku ew çi bike? Divê ew qebûl bike ku ew diçe aliyê nerast; divê ew zû ji otobûsê derkeve û bikeve otobûseke ku bi rastî diçe Adanê. Tobekirin ev e. Du tişt hene, ku girîng in: Divê mirov tiştê şaş û xelet red bike û tiştê rast û qenc qebûl bike.
Bêyî van herdûyan, tobekirin çênabe. Divê ku pêşî mirov ji xwe, ji gunehên xwe, ji pûtên xwe û ji hewldana xwe ya ku dixwaze Xwedê pê razî bike, vegere, yanî xwe ji wan tiştan dûr bixe.
Ya diduyan: Divê mirov vegere ba Xwedê, yanî nêzîkî wî bibe, û peyvên wî qebûl bike, çimkî ew ji me re dibêjin ka mirov çawa dikare xilas bibe.
Tobekirina rastîn ev e.

Heçî Qayîn bû, wî tu caran weha tobe nekir. Qayîn di riya xwe de berdewam kir. Wî riya xilasiyê ya ku Xwedê pêk anibû, qebûl nekir. Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin: Yên ku li ser riya Qayîn diçin, wê helak bibin. Ji bo wan tariya reş a her û her tê hilanîn.

Dostên delal, em ne wek Qayîn bin! Peyva Xwedê dibêje: «Eger hûn tobe nekin, hûn jî, hûnê hemû helak bibin.» Xwedê bi van peyvan me hişiyar dike, çimkî hemûyên ku ji gunehên xwe nehatine paqijkirin, eseh wê bên dîwankirin.

Bila di vî tiştî de tu mirov xelet nefikire: Bi saya kirinên xwe, tu kes li ber Xwedê rast dernakeve. Gelek mirov bawer dikin û dibêjin: Eger em bi hemû qeweta xwe li gor emir û qanûnên dînê xwe bikin, emê di Roja Dawî de ji dîwanê xilas bibin. Lê belê tu dîn tune ku bikare mirovan li ber Xwedê rast derxe. Peyva Xwedê weha dibêje:
«Bi kirina Şerîetê tu kes li ber Xwedê rastdar dernakeve…Em hemû bûn wek yekî murdar û hemû kirinên me yên rast wek cilekî qirêjî ne;

em hemû wek pelçiman diqermiçin û wek hewayê, gunehên me, me hildidin, dibin... Hûn bi riya baweriyê, bi keremê xilas bûn û ev ne ji we ye, diyariya Xwedê ye. Ev ne ji kirinan e, da ku tu kes pesnê xwe nede.»

Hevalno, em pir sipas dikin ku we guhdariya vê serhatiya girîng kir.
Xwedê hez bike, di bernameya ku bê de, emê li ser pêxemberê Xwedê Henox ê ku ji dûndana Adem bû, bipeyivin.
Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin:
«Xwedê bîhna xwe li we fireh dike û naxwaze ku kesek helak bibe, lê dixwaze ku hemû tobe bikin... Eger hûn tobe nekin, hûn jî, hûnê hemû helak bibin.»

Xwedê we pîroz bike û hûn di kirinên xwe de serfiraz bibin!

Me di bernameyên xwe yên berî niha de li ser kurên Adem û Hewayê Qayîn û Habîl bihîst. Me dît ku wan herdûyan jî pêşkêş ji Xwedê re anîn, da ku biperizin wî. Habîl baweriya xwe bi Xwedê anî û goriya wî bi dilê Xwedê bû, lê dilê Qayîn dûrî Xwedê bû. Xwedê goriya Habîl qebûl kir, lê pêşkêşa Qayîn qebûl nekir. Xwedê gazî Qayîn kir ku tobe bike, lê Qayîn hêrs ket û rabû birayê xwe kuşt.

Îro em dixwazin di kitêba pêşî ya Tewratê de li deriyên çar û pêncan binêrin. Peyva Xwedê ji me re dibêje ku «Adem bû bavê kur û keçan.»
Lê belê Xwedê bi tenê serhatiya dido ji wan ji me re daye zanîn: Serhatiya malbata Qayîn û serhatiya malbata Sêt. Heçî Sêt bû, ew yek ji birayên Qayîn ên biçûk bû.

Emê pêşî **li malbata Qayîn** binêrin. Qayîn ji nav mirovên xwe ji xwe re jin anî û çend zarokên wan çêbûn. Lê belê, wek ku gotina pêşiyan dibêje: Kur li bavê xwe tê. Zarokên Qayîn wek bavê xwe difikirîn, digotin û dikirin. Wek ku bavê wan kir, **wan jî guhê xwe neda peyvên Xwedê**. Ew gelekî zane û jîr û jêhatî bûn, lê belê wan Xwedê nas nedikir. Wan hêjatî da tiştên vê dinyayê û ew ji xwe re hilbijartin. Ew yên pêşî bûn ku bajar ava kirin, wan halet, bilûr, çeng û gelek tiştên din jî çêkir. Mesele Tûbal-Qayîn zilamekî ji zuriyeta Qayîn bû. Ew gelek zîrek bû û ji tûnc û hesin haletên cûr bi cûr çêkirin. Lê belê karê mirov qenc be jî, ew dilê mirov qenc nake!

**Lamex** di nifşê heftan de ji zuriyeta Adem bû. Lamex di riya bavkalê xwe Qayîn de diçû û ew hê ji wî jî xerabtir bû. Lamex yê pêşî bû ku du jin ji xwe re anîn û wek Qayîn bû mêrkuj. Kitêba Pîroz dibêje ku wî du mirov kuştin û hingê pesnê xwe da, got ku ew ji Qayîn jî zordartir e! Wek ku Qayîn û zarokên wî kirin, peyv û daxwaza Xwedê qet ne xema Lamex bûn jî.

Lamex zilamekî ezperest bû, ew pozbilind û qure bû. Wî ne ji Xwedê, lê belê ji vê dinyayê hez dikir.
Erê, Lamex mirovekî wusa bû, çimkî wî ji xwe re riya Qayîn hilbijart û bû xulamê Îblîs – lê ew bi vê yekê nehesiya.
Emê niha Lamex ji bo demekê bihêlin, lê emê di bernameya ku bê de careke din li serhatiya wî binêrin.

Şikir ji Xwedê re, serhatiya Qayîn û zûriyeta wî ya xerab ne dawiya Nivîsarên Pîroz e!
Peyva Xwedê serhatiya **malbata Sêt** jî bi me dide zanîn û dibêje: «Ji ber ku Qayîn Habîl kuşt, Xwedê di şûna wî  de zarokekî din» da Adem û Hewayê.

Navê wî kurî Sêt bû. Mana Sêt ev e: Yê ku cihê kesekî din digire. Xwedê Sêt hilbijart, da ku cihê Habîl bigire. Çima diviya ku yekî cihê Habîl bigirta? Bersiva vê yekê ev e: Di baxçê Êdenê de, Xwedê soz da ku yek wê bihata vê dinyayê. Wiyê Îblîs bindest bikira û zuriyeta Adem ji qeweta Îblîs xilas bikira. Habîl baweriya xwe bi Xwedê anî, lê wî Xilaskarî êdî nikaribû ji malbata Habîl bihata, çimkî Îblîs xist dilê Qayîn ku Habîl bikuje. Lê belê şehrezayiya Xwedê ji ya Îblîs gelek meztir e. Plana Xwedê hebû, da ku zuriyeta Adem ji gunehên wan xilas bike û tu kes nebû ku bikariya li hember nêt û daxwaza Xwedê rabûya. Îblîs jî nedikarî. Loma Xwedê kurekî din da Adem û Hewayê, da ku ew cihê Habîlê ku hatibû kuştin bigirta. Bi vî awayî **plana Xwedê** hin bi hin pêşve diçû.

**Sêt bawermendekî dilpak bû**. Wek birayê xwe, wî riya xilasiyê ya ku Xwedê amade kiribû, bijart. Wek hemû mirovên din, yanî wek tevahiya dûndana Adem, Sêt jî gunehkar hat vê dinyayê. Lê belê wî baweriya xwe bi Xwedê û bi sozên Xwedê anî.
Wî zarokên xwe jî di baweriyê de perwerde kirin û rastiya Xwedê ji wan re got. Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Ji Sêt re jî kurek çêbû û wî navê wî Enoş danî. Di wê demê de xelkê dest bi gazîkirina navê Xudan kir.»

Yanî em dibînin ku ji Adem du malbat derketin: Malbata Qayîn û malbata Sêt.
Ma tu dizanî ku ew du malbat mînaka çi ne?
**Ew dimînin du cûreyên mirovan** û ew herdû jî ji dema Adem û heta îro jî li ser rûyê vê dinyayê hene. Di çavê Xwedê de bi tenê du cûreyên mirovan hene. Li ber wî ne mirovên bi çermê reş an bi çermê spî hene, ne jî Ereb, Tirk an Kurd an miletên din hene; Xwedê cihêtiyê naxe nav jin an mêran an nav belengaz û feqîran. Li ba Xwedê, xatirgirtin tune.
Lê belê ew mirovan ji hev digire, dixe nav du komelên cihê. Ew herdû komelên mirovan, çi ne?
**Mirov hene ku baweriya xwe bi Xwedê û bi peyvên wî tînin** û **mirovên din jî hene ku baweriya xwe bi Xwedê û bi peyvên wî naynin**. Mirov hene ku Xwedê **nas dikin** û mirov hene ku wî **nas nakin**. Mirov hene ku di riya **ronahiya** rastiyê de diçin û mirov hene ku di riya **taristaniyê** de diçin. Mirov hene, dizanin ku gunehên wan **hatine efûkirin** û mirov hene ku gunehên wan **nehatine efûkirin**.
Her kesê ku baweriya xwe bi Xwedê bîne û ji xwe re riya rastdariyê hilbijêre, wê xilas bibe û bikeve bihiştê. Sêt di nav van mirovan de ye. Her kesê ku riya rastdariyê ya ku Xwedê pêk aniye, red bike, wê helak bibe û bikeve dojehê. Qayîn û malbata wî di nav van mirovan de ne.

Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Adem 930 salî bû û hingê ew mir. Di wan deman de, mirov gelek dijiyan, yanî emrê wan gelek dirêj bû, lê wek hemû mirovên din, ew jî hemû mirin.
Wek ku Xwedê ji wan re gotibû, **Adem û Hewa mirin**.
Em dizanin ku Xwedê ew ne afirandin, da ku bimirin. Çaxê ku wî mirovên pêşî afirandin, daxwaza wî ev bû ku ew bijîn. Çima Adem û Hewa mirin? Ji ber ku wan li hember Xwedê guneh kir – û berê guneh mirin e.

Hevalno,
divê ku em li vir bernama xwe bibin serî. Gelek sipas ku we qenc guhê xwe da vê bernameyê.
Xwedê hez bike, emê di bernameya ku bê de li serhatiya zilamê Xwedê Henox binêrin û emê jiyana wî bi jiyana Lamex re rû bi rû bikin.

Heta hingê ji kerema xwe li ser vê gotina Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin a ku dibêje: Meaşê ku guneh dide, mirin e; lê diyariya Xwedê, bi Xudanê me Mesîh Îsa jiyana herheyî ye.

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Me di bernama xwe ya din de hem li jiyana Lamex û hem jî li jiyana Sêt nêrî. Lamex di riya Qayîn de diçû û hê ji wî xerabtir bû. Heçî Sêt bû, me dît ku wî di plana Xwedê de cihê Habîl girt. Xwedê kurekî din da Adem û Hewayê, da ku ji dûndana Sêt xilaskarê ku wê mirov ji hêza Îblîs, ji hêza guneh û ji hêza mirinê xilas bikiran, bihata.

Îro emê li serhatiya zilamekî ku ji malbata Sêt bû, binêrin. Navê wî **Henox** bû û wî baweriya xwe bi Xwedê anî, bû pêxemberê Xwedê. Carna jî jê re dibêjin Îdrîs. Di deriyê pêncan ê kitêba pêşî ya Tewratê de, em li ser malbata Henox weha dixwînin:
**Adem** bû bavê Sêt; **Sêt** bû bavê Enoş. **Enoş** bû bavê Qênan; **Qênan** bû bavê Mahalalêl. **Mahalalêl** bû bavê Yarêd û **Yarêd** jî bû bavê Henox. Yanî Henox di malbata Sêt de piştî Adem ji nifşê heftan bû.

Wek hemû mirovên din, Henox jî gunehkar hat dinyayê. Lê belê em di Nivîsarên Pîroz de dibînin ku «Henox sê sed salan bi Xwedê re jiya» û dibêje ku «Henox li Xwedê xweş hat.»
Yanî hem têkiliya kûr di nav Henox û Xwedê de hebû û hem jî jiyana Henox bi dilê Xwedê bû. Ev çi şahidiyeke qenc e!
Mirov çawa li Xwedê xweş tê? Eger mirov qebûl bike ku ew gunehkar e û baweriya xwe bi Xwedê û sozên wî bîne û riya xilasiyê ya ku wî amade kiriye qebûl bike, hingê ew li Xwedê xweş tê.

Di rojên Henox de ne tiştekî hêsanî bû ku mirov bi Xwedê re bijî, çimkî ew dem demeke pir xerab bû. Pirraniya mirovên dema Henox li kêfa xwe digeriyan û jiyana wan pir murdar bû. Heçî Henox bû, wî dizanî ku Xwedê mirov neafirandine, da ku ew jiyana xwe murdar bikin, lê belê paqij û pîroz bibin. Henox dizanî ku rojekê Xwedê wê dîwana hemû mirovan bike.

Wî ji rastî û rastdariyê hez dikir û ji neheqiyê nefret dikir. Bêgûman gelek mirovan Henox kêm didît û belkî cefa didan wî, lê Henox dizanî ku tiştek ji silameta Xwedê girîngtir tune.
Xwedê Henox hilbijart, da ku di wê dema xerab de bibe xulam û pêxemberê wî.
Di Încîlê de li ser Henox weha tê gotin:
«Henoxê ku piştî Adem ji nifşê heftan e … weha pêxemberîtî kir: Va ye, Xudan bi deh hezarên xwe yên pîroz ve hat, da ku dîwana hemûyan bike û ji bo hemû kirinên nepak ên ku wan bi nepakiyê kirine û ji bo hemû tiştên hişk ên ku gunehkarên nepak li hember Xudan gotine, bala her yekî bikişîne ser sûcê wî.»

Di serhatiya Henox de hê tiştekî din jî heye ku balkêş e: Ew nemir. Rast e, Henox nemir. Peyva Xwedê li ser wî weha ji me re dibêje. Dibêje: «Henox sê sed salan bi Xwedê re jiya û ji ber çavan winda bû, çimkî Xwedê ew bir ba xwe.»

Xwedê li gor plana xwe û bi qeweta xwe rasterast Henox bir ba xwe, yanî bêyî ku Henox mirinê tam bike, ew bir ezmên.

Çima Xwedê weha kir? Xwedê bi jiyana Henox hînî me dike, ka fikrên wî li ser wan mirovên ku bi rastî ji wî bawer dikin û di her tiştî de lê digerin ku li wî xweş bên, çi ne. Nivîsarên Pîroz dibêjin: «**Bi saya baweriyê, Henox ji bo ku mirinê nebîne, hat hilkişandin**. Ew nehat dîtin, çimkî Xwedê ew hilkişandibû. Û beriya hilkişandina wî, **şahidî hat kirin ku ew li Xwedê xweş hatibû**. Û **bê bawerî çênabe ku mirov li Xwedê xweş bê**, çimkî yê ku nêzîkî Xwedê bibe, divê bawer bike ku Xwedê heye û wan ên ku li wî digerin xelat dike.»

300 salan Henox jiyaneke ku li Xwedê xweş hat jiya, çimkî wî baweriya xwe bi wî dianî, jê hez dikir û li gor wî dikir. Pirraniya mirovên li dor wî qet xema daxwaza Xwedê nedixwarin. Lê Henox li Xwedê xweş hat û rojekê Xwedê gazî wî kir û di cih de Henox xwe di bihiştê de dît. Ew gihîşt rûmeta mala Xwedê û her û her li ba Xwedê dimîne.

Di vê yekê de, Xwedê tiştekî pir girîng nîşanî me dide: Eger wek Henox baweriya te tunebe, tu nikarî li Xwedê xweş bêyî! Lê belê eger baweriya te wek baweriya Henox be, Xwedê wê te rastdar derxe û êdî ne lazim e ku tu ji mirinê bitirsî. Çimkî tu dizanî ku Xwedê ji bo te mirin bindest kiriye. Eger tu guhê xwe bidî peyvên Xwedê û ji wan bawer dikî, çaxê dawiya jiyana te bê, tê herî ba Xwedê û wek Henox, tê her û her li ba wî bimînî. Lê belê divê tu fêm bikî ka Xwedê li ser riya xilasiyê çi got û divê tu bi gotinên wî bawer bikî, yanî divê tu wê riya ku Xwedê ji bo mirovan amade kiriye, qebûl bikî.

Em niha dixwazin çend xalên herî girîng bînin bîra xwe û ji bo vê yekê emê li Lamex û li Henox ên ku herdû ji mala Adem bûn binêrin û wan rû bi rû bikin.

**Lamex û Henox herdû jî piştî Adem ji nifşê heftan bûn**. Lamex ji **malbata Qayîn** bû û Henox ji **malbata Sêt** bû. Lamex û Henox ji eynî nifşî bûn, yanî di eynî demî de dijiyan, lê qerektêr, rê û daxwazên wan qet ne eynî bûn. Wek ku ronahî ji taristaniyê cihê ye, wusa jî jiyana Henox ji jiyana Lamex cihê bû.

Lamex baweriya xwe bi Xwedê neanî û guhê xwe neda peyvên wî. Lê belê Henox baweriya xwe bi Xwedê anî û ji peyvên wî bawer dikir û hez dikir.

Lamex di riya Îblîs de, di riya nepakiyê de diçû, lê Henox bi Xwedê re di riya pîroziyê de diçû.

Lamex bala xwe neda riya xilasiyê ya ku Xwedê ji bo mirovan amade kiribû, lê belê Henox bala xwe da riya rastdariyê.

Lamex di jiyana xwe de li kêfa xwe digeriya, lê Henox li jiyaneke xwedayî, yanî li jiyaneke bi  Xwedê re digeriya, çimkî wî dizanî ku jiyan diyariya Xwedê ye.

Lamex di gunehên xwe de mir û çû cihê ezabê, lê belê Xwedê Henox rahişt, bir ba xwe.

Li vê derê ji bo me pirseke girîng heye. Pirs jî ev e: Gelo tu bêtir wek Lamex î, an tu bêtir wek Henox î?
Gelo tu ji malbata Qayîn û mirovên wî yî, an tu ji malbata Sêt û mirovên wî yî?
Baweriya te wek baweriya Henox e, an tu wek Lamex di riya xwe de diçî?
Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin:
«Xwe bi xwe biceribînin û sihêtiya xwe bikin, ka gelo hûn di baweriyê de ne»…«Bê bawerî çênabe ku mirov li Xwedê xweş bê».

Hevalên delal, pir spas ji bo ku we qenc guhdariya gotinên Nivîsarên Pîroz kir. Divê em niha bernama xwe bi dawî bikin, lê di bernameya ku bê de, emê li pêxemberekî din binêrin; emê li ser serhatiya Nuh pêxember ji we re bêjin.

Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin:
**«Bê bawerî çênabe ku mirov li Xwedê xweş bê, çimkî yê ku nêzîkî Xwedê bibe, divê bawer bike ku Xwedê heye û wan ên ku li wî digerin xelat dike.»**

Xwedê bi we re be!

Riya Rastdariyê 13 A

Me di dersên xwe yên li ser Kitêba Pîroz de dît ku di destpêkê de,
çaxê ku Xwedê erd û ezman afirandin, her tişt qenc bû.
Lê belê gava ku mirovê pêşî Adem guhê xwe neda Xwedê û neguhdarî kir,
bi destê wî xerabî ket dinyayê û dinav hemû mirovan de belav bû.
Erê, «Nexweşiya vegir li ser nexweşê pêşî tenê namîne.»
Me di bernameya din de bihîst ku ji Adem du malbat derketin, yanî malbata Qayîn û malbata Sêt. Malbata Qayîn baweriya xwe bi Xwedê neanî, lê belê di nav malbata Sêt de hin mirovên ku ji peyvên Xwedê bawer kirin, hebûn.
Henox yek ji zuriyeta Sêt bû. Piraniya mirovên wî nifşî li pey Îblîs çûn û jiyana wan xerab bû. Lê Henox di jiyaneke pîroz de bi Xwedê re dijiya.

Îro em dixwazin li ser zilamekî din hîn bibin. Ew jî di nifşekî xerab de di riya Xwedê de diçû. Ev zilam nevîçirkê Henox, Nûh pêxember bû.
Me berê dîtibû ku di wan deman de mirov ji me gelek bêtir dijiyan. Ma tu dizanî kîjan mirov ê herî emirdirêj bû? Mirovê herî emirdirêj kurê Henox Metûşela bû; emrê wî bû 969 sal. Ev Metûşela bapîrê Nûh pêxember bû. Yanî ji Adem heta Nûh bûbû deh nifş. Çaxê ku Nûh 500 salî bû, ew bû bavê Sam, Ham û Yafet.

Tiştê ku emê îro lê binêrin, wê ji bo me gelek bi kêr, yanî bi feyde be. Çimkî dema Nûh jî di gelek tiştan de wek dema me bû. Di dema Nûh de, rûyê erdê tije guneh bû. Nivîsarên Pîroz dibêjin ku «xerabiya mirovan li ser erdê gelek bû. Her roj hemû nêt û fikrên dilê wan tenê pîs bûn.» (Destpêkirin 6:5)

Dilê zarokên Adem bi fikrên xerab, zîna, çavbirçîtî, xerabî, hîlebazî, bêedebî, çavnebarî, çêr, quretî, fuhûşî, dizî, kuştin û bêaqiliyê tije bû. (li Marqos 7:21-22’an binêre)
Mirovan ew dinya ku Xwedê ji bo wan afirandibû, xera dikir.
Dîn û diyanetên wan hebûn, lê ew ne ji dil bûn.

Kêfên wan ên bedenî xwedayên wan bûn û gunehên wan her gav zêde dibûn.

Ji kerema xwe guhê xwe bidin van peyvên Tewratê:

> Xudan got: «Ruhê min her û her bi mirov re namîne, çimkî ew xwîn û goşt e. Ji niha û pê ve, rojên emrê wî wê sed û bîst sal bin… Xudan dît ku xerabiya mirovan li ser erdê gelek e. Her roj hemû nêt û fikrên dilê wan tenê pîs bûn.Xudan poşman bû ku li ser erdê mirov çêkirin û di dilê xwe de êşiya. Xudan got: «Ezê mirovên ku min çêkirine, heywanan û heywanên ku bi erdê ve dişêlin û teyrên ezmên ji ser rûyê erdê xîş bikim Çimkî ez li afirandina wan poşman bûm.» (Destpêkirin 6:3.5-7)

Yanî em li vir dibînin ku nêta Xwedê ew bû ku mirovan ji ber gunehên wan ji rûyê erdê xîş bike, yanî wan hemûyan helak bike.
Lê belê em dibînin ku Xwedê li gor rehm û kerema xwe 120 salan li mirovan sebir kir, yanî ji bo demeke dirêj fersend da wan ku tobe bikin û helak nebin.
Lê piştî wê demê, êdî Xwedê wê dîwana her kesê ku nexwesta tobe bike û her kesê ku riya Xwedê ya rastdariyê qebûl nekira, bikira.

Em dikarin ji van 120 salan tiştekî li ser qerektêrê Xwedê hîn bibin.
Xwedê bi bîhnferehî gelek sebir dike, lê dawiya sebra wî jî heye!
Xwedê mirovan hişyar dike û bi wan re dipeyive, da ku tobe bikin, lê ew heta hetayê weha nake. Loma Xwedê di dema Nûh de got:

> «Ruhê min her û her bi mirov re namîne, çimkî ew xwîn û goşt e. Ji niha û pê ve, rojên emrê wî wê sed û bîst sal bin.»

Yanî em dibînin ku Xwedê demekê sebir dike, lê eger mirovên gunehkar tobe nekin, ewê dîwana wan bike. Di vê yekê de em du babetên Xwedê dibînin:
Ya pêşî bîhnferehî û sebra Xwedê ye û ya diduyan xezeba Xwedê ye.

Xwedê qenc e û ew dikare bîhna xwe gelek fereh bike, lê belê ew dadperwer e jî û xezeba wî jî dikare gelek rabe.

Hin mirov hene, ew difikirin, dibêjin:
Xwedê li ser serê mirovan disekine û bi darê zorê wan ceza dike.
Li gor fikra wan, Xwedê zû hêrs dikeve û kêfa wî ji wê yekê re tê ku ew li mirovan bixe û wan bide tengahiyê. Lê belê Xwedê ne wusa ye.

Hin mirovên din difikirin, dibêjin ku Xwedê tu caran hêrs nakeve û xezeba wî tune. Li gor bîr û baweriya wan, ew her gav gunehên mirovan afû dike û ji bîr dike. Ew her gav dibêjin: «Xwedê qenc e! Xwedê dilbirehm e!»
Lê belê Xwedê ne wusa ye jî.

Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê çawa ye.
Xwedê hem qenc û hem jî rast e. Ew dikare hem bînferehiyê bike û hem jî hêrs bikeve.
Xwedê qenc e û dilbirehm e, loma ew bi bîhnferehî sebir dike. Lê Xwedê rastîhez û dadperwer û pîroz e jî, loma gunehên mirovan xezeba wî radikin.
Xwedê hem Xilaskar û hem jî Dadger e.
Pêxemberên Xwedê li ser vê yekê gelek tişt nivîsandine. Mesele gotine:

> «Vî tiştî ji bîr nekin ku li ba Xudan rojek wek hezar salan e û hezar sal jî wek rojekê ne. Wek ku hinek guman dikin, Xudan di soza xwe de bi derengî nakeve, lê belê bîhna xwe li we fireh dike û naxwaze ku kesek helak bibe, lê dixwaze ku hemû tobe bikin. Lê Roja Xudan wê wek dizan bê.» (Petrûs II, 3:8-10)
>
> «Xudan wê dîwana gelê xwe bike. Tiştekî tirsehêz e ku mirov bikeve destê Xwedayê jîndar… Hay ji xwe hebin û yê ku dipeyive red nekin…
> Çimkî Xwedayê me agirek e ku dixwe û tune dike.» (Îbranî 10:30.31; 12:25.29)

Di Zebûrê de em dixwînin ku «Xwedê dadgerekî dadperwer e û her roj xezeba xwe dibarîne.» (Zebûr 7:11)

Di Încîlê de dibêje:

«Xezeba Xwedê ji ezmên li hember hemû nepakî û neheqiya wan mirovên ku bi neheqiyê ji rastiyê re dibin asteng, xuya dibe…
Dîwankirina Xwedê li gor rastiyê ye …
Ma tu guman dikî ku tê ji dîwana Xwedê birevî?
An ku tu zêdehiya qencî, sebir û bîhnfirehiya wî kêm dibînî?
Ma tu nizanî ku qenciya Xwedê te ber bi tobekirinê ve dibe?
Lê tu bi rikdarî û dilê xwe yê bêtobe ji bo Roja Xezebê ya ku dîwana Xwedê ya dadperwer xuya bibe, li hember xwe xezebê dicivînî.
Çimkî ewê li gor kirinên her kesî bide wî..» (Romayî 1:18; 2:2-6)

Erê, Xwedê dadgerekî dadperwer e û li ba wî xatirgirtin tune.
Xwedê hez bike emê di bernameya ku bê de bi mînaka jiyana Nûh pêxember bibînin ka mirov çawa ji xezeba Xwedê xilas bibe.

Heta hingê, li ser van peyvên Încîlê qenc bifikirin ên ku dibêjin:
Ma tu nizanî ku qenciya Xwedê te ber bi tobekirinê ve dibe? (Romayî 2:4)

Xwedê bi we re be!

Riya Rastdariyê 13 B

Me di bernama xwe ya din de dest bi serhatiya Nûh pêxember kir.
Me dît ku mirovên di dema Nûh de çiqas xerabî kirin û ji Xwedê dûr ketin.
Me bihîst ku Xwedê guneh, sûc û rikdariya mirovan dît û got: «Ezê mirovên ku min çêkirine, heywan û heywanên ku bi erdê ve dişêlin û teyrên ezmên ji ser rûyê erdê xîş bikim. Çimkî ez li afirandina wan poşman bûm.»
Me dît ku Xwedê li gor rehm û kerema xwe 120 salan li mirovan sebir kir, yanî ji bo demeke dirêj fersend da wan ku tobe bikin û helak nebin.
Lê belê mirovan tobe nekir û ew li Xwedê nezivirîn. Ew ji xezeba Xwedê netirsiyan.

Di nav hêrsa mirov û xezeba Xwedê de ferq heye. Belkî mirov zû hêrs bikeve, lê hin bi hin hêrsa wî diçe heta carna ew sedema hêrsbûna xwe ji bîr jî dike.
Lê belê xezeba Xwedê ne wusa ye. Çiqas dem derbas bibe jî, xezeba Xwedê bi derbasbûna dem kêm nabe. Xwedê dadgerê rast e û ew qet tiştekî ji bîr nake. Xezeba wî ya li hember wan ên ku tobe nakin, kêm nabe, lê bervajiyê wê, zêde dibe. Loma Kitêba Pîroz dibêje: «Lê tu bi rikdarî û dilê xwe yê bêtobe ji bo Roja Xezeba Xwedê li hember xwe xezebê dicivînî.»

Mirovên dema Nûh ji xwe re xezeba Xwedê civandin. Lê belê di wê demê de jî zilamek hebû ku ji hemû dilê xwe ji Xwedê hez dikir û guhê xwe dida peyvên wî. Ew zilam Nûh bû.

Nivîsarên Pîroz weha li ser wî dibêjin:  Nûh li ber Xudan kerem dît.
Nûh mirovekî rast û di dema xwe de bêkêmahî bû. Nûh bi Xwedê re dijiya.
(Destpêkirin 6:8.9)

Çima Nûh li ber Xwedê rehm dît? Ma ew hêjayî rehma Xwedê bû?

Ma heqê wî hebû ku rehm li wî bê kirin? Na, ew rehma ku heqê mirov be, ne tu rehm e, ji ber ku rehm her gav diyariyek e.
Çima Nûh di çavên Xwedê de rehm dît û mirovên din ev rehm nedîtin?
Gelo Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê çi dibêjin? Nivîsarên Pêxemberan dibêjin ku Nûh ji Xwedê bawer dikir û mirovên din bawer nekirin. Nûh guhê xwe da peyvên Xwedê, lê mirovên din guhê xwe nedan emrên Xwedê.
Erê, wek hemû zarokên Adem, Nûh jî gunehkar bû, yanî hevênê guneh di wî de jî hebû. Lê belê Xwedê Nûh mirovekî rast hesab kir, çimkî wî baweriya xwe bi Xwedê anî.
Nivîsarên Pîroz dibêjin: Nûh mirovekî rast û di nav nifşê dema xwe de bêkêmahî bû. (Destpêkirin 6:9)
Me gelek caran dît û di serhatiya Nûh de jî ev rast e: Bêyî ku mirov baweriya xwe bi Xwedê bîne û bêyî ku riya xilasiyê ya ku wî amade kiriye qebûl bike, ew nikare di çavê Xwedê de rast û bêkêmahî bê dîtin.

Rojekê Xwedê ji Nûh re got:
«Dawiya hemû mirovan hat. Çimkî ji sedemê wan erd tije zordarî bûye.
Ezê wan ji rûyê erdê helak bikim. [14] Loma ji xwe re ji dar gemiyekê çêke.
Di gemiyê de odeyan çêke û wê ji derve û ji hundir ve zift bike. [15] Divê tu weha çêkî: Dirêjahiya gemiyê 150, firehî 25 û bilindahiya wê 15 metre be.
[16] Ji bo gemiyê ban çêke … û deriyê gemiyê bixe tenişta wê. Gemiyê sê qat çêke.
[17] Va ye, ezê li ser erdê ava tofanê rakim û her tiştê ku li ser erdê bîhna jiyanê di wan de heye, ezê helak bikim. Hemû yên li ser rûyê erdê wê bimirin. [18] Lê ezê peymana xwe bi te re girê bidim. Tu û kurên te û jina te û bûkên te bi te re, hûnê bikevin gemiyê. [19] Ji hemû afirînên jîndar, ji her cûreyî dido dido – nêr û mê – bibe gemiyê, da ku ew bi te re sax bimînin…
[21] Ji her cûreyê xwarinê bi xwe re bibe û embar bike, da ku ji bo we û wan bibe xwarin.»

Yanî Xwedê ji Nûh re got ku ewê çawa li ser rûyê erdê tofanekê rake û her kesê ku tobe neke û ji peyvên Xwedê bawer neke, wê helak bibe.
Xwedê ji Nûh re got ku gemiyeke mezin çêke, da ku ew ji tofanê xilas bibe. Diviya gemî 150 metreyan dirêj bûya; ewê ji bo Nûh û mala wî û ji bo gelek heywanan cihekî xilasî û rizgariyê bibûya. Xwedê ji Nûh re got ku di gemiyê de gelek odeyan çêke, lê belê ji bo ketina hindurê gemiyê, deriyek tenê hebû.

Yanî peyxama Xwedê ji bo mirovên di dema Nûh de ev bû:
Her kesê ku bixwaze ji cezayê tofanê xilas bibe, divê di vî deriyî re derbas bibe.
Her kesê ku di vî deriyî re derbas bibe, wê xilas bibe.
Yên ku di vî deriyî re derbas nebin, wê helak bibin.

Nûh jî dest bi çêkirina gemiyê kir. Ew xebateke pirr giran û mezin bû.
Diviya ku Nûh û kurên xwe bi sedan dar bibirîna, dep û cax çêkiran, bizmar lêxistan û ji derve û ji hundir ve zift bikiran. Demeke dirêj her roj Nûh û mala xwe ji bo çêkirina gemiyê xebitîn. Lê Nûh ne tenê gemî çêdikir. Wî, xelkê nifşê xwe hişyar jî dikir. Belkî wî bi peyvên weha ji wan re digot:
«Guhê xwe bidinê! Xwedê ji min re got ku divê ez we hişyar bikim, çimkî ji ber gunehên we, hêrsa Xwedê pirr rabûye. Wî biryar daye ku bi tofanekê hemû mirovên ku tobe nekin, ji rûyê erdê xîş bike. Lê belê Mizgînî li we:
Xwedê bi kerema xwe ji min re got ku divê ez gemiyekê çêkim, da ku ji bo hemû mirovên ku ji gunehên xwe vegerin û ji peyvên Xwedê bawer bikin re, bibe cihê xilasiyê.»
Bi vî awayî Nûh xelk hişyar dikir û ji wan re digot: «Gelek girîng e ku hûn ji riyên xwe yên xerab vegerin, xwe ji vî nifşê xerab dûr bixin û peyvên Xwedê qebûl bikin.»

De vêca guhdarên hêja, hûn çi difikirin? Ma mirovên di dema Nûh de guhê xwe dan peyvên Xwedê? Ew bi devê pêxemberekî ku bi wan re dipeyivî hatin hişyarkirin, lê wan guhê xwe nedayê!
Emê di bernameya ku bê de li bersîva vê pirsê binêrin. Xwedê hez bike emê hingê serhatiya Nûh berdewam bikin û bibînin ka Xwedê çawa mirovên ku ji peyvên wî bawer kirin, parastin û xilas kirin. Û emê bibînin ku Xwedê çawa dîwana wan mirovan kir ên ku bawer nekirin.

Hevalno, em pirr spas dikin ku we guhdariya peyvên me kir. Niha ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin:

Wek ku hinek guman dikin, Xudan di soza xwe de bi derengî nakeve, lê belê bîhna xwe li we fireh dike û naxwaze ku kesek helak bibe, lê dixwaze ku hemû tobe bikin. Lê Roja Xudan wê wek dizan bê. (Petrûs II, 3:8-10)

Xwedê bi we re be!

Riya Rastdariyê 14 A

Me di bernameyên xwe yên din de ji destpêka serhatiya Nûh pêxember bihîst.
Nûh ji Adem heta hingê di nifşê dehan de dijiya û dema wî demeke pirr xerab û pîs bû.
Lê Nûh bi Xwedê re dijiya. Me dît ku Xwedê li ser gunehên zarokên Adem gelek xemgîn bû, çimkî xerabiya mirovan li ser erdê gelek bû. «Her roj hemû nêt û fikrên dilê wan pîs bûn.» (Destpêkirin 6:5)
Loma Xwedê bi xezeba xwe ya pîroz biryar da ku ewê hemû gunehkarên ku tobe nekin, ji rûyê erdê xîş bike.

Lê belê Nûh di çavên Xwedê de rehm dît, çimkî wî ji Xwedê hez dikir û ji peyvên Xwedê bawer dikir. Loma rojekê Xwedê ji Nûh re got: Min biryar da ku ezê hemû mirovan helak bikim, çimkî ji rûyê wan, rûyê erdê bi xerabî û neheqiyê tije bûye.
Tofaneke mezin wê rabe û bi vê tofanê ezê her tiştê ku bîhna jiyanê tê de heye, helak bikim. Heçî tu yî, divê tu ji bo xwe û ji bo mala xwe gemiyekê çêkî,
da ku hûn ji tofanê xilas bibin.

Demeke dirêj Nûh bi mala xwe ve xebitî heta ku gemiyeke mezin amade bû.
Lê Nûh ne tenê gemî çêdikir, herweha wî mirovên li derdora xwe jî hişyar dikirin,
ji wan re digot: «Ji gunehên xwe vegerin, tobe bikin û li Xwedê bizivirin!
Xwedayê rastdar wê dîwana dinyayê bike!»

Ma gelo xelkê dema Nûh tobe kirin û ji gunehên xwe vegeriyan, baweriya xwe bi Xwedê û bi peyvên wî anîn?
Di wê demê de li ser erdê bi hezar hezaran zarokên Adem hebûn.
Gelo çendan ji wan ji peyvên Xwedê bawer kirin û ketin gemiyê?

Bersîva Kitêba Pîroz ev e: Di wê gemiyê de bi tenê «çend kes, yanî heşt nefs ji avê derketin, xilas bûn.»

Gelo çend mirovan baweriya xwe bi Xwedê anîn? Heşt mirovan bawerî anî:
Nûh û jina xwe, sê kurên wî û sê bûkên wî.
Hemûyên din ji peyvên Xwedê bawer nekirin.
Hinan qet bala xwe neda gotinên Nûh pêxember, hinên din pêxember kêm dît.
Ew difikirîn, wan digot: Gelo ma ew dîn bûye? Çima ew di cihekî bêav de gemiyeke evqas mezin çêdike? Bêguman wan ji hevdû re digot: «De werin! Binêrin, evê ha çi dike? Ew di çolê de gemiyekê çêdike!
Aqilê Nûh ne li serê wî ye! Ma av wê çawa bikeve vir? Qet çênabe!
Û ji vê pê ve jî em dizanin ku Xwedê qenc e; çawa ewê tofanê rake?
Ewê çawa wan mirovên ku wî bi xwe afirandine, helak bike?
Nûhê delal, ma tu dîn bûyî?»
Lê belê Nûh qet bala xwe nedida wan gotinan, çimkî ew piştrast bû ku peyvên Xwedê rast in. Wî dîsa xebata xwe berdewam dikir û ew hişyar dikirin, digot:
«Tobe bikin! Xwedê wê li gor rastdariya xwe dîwana dinyayê bike!
Çima hûn peyvên Xwedê qebûl nakin? Ma hûn dixwazin helak bibin?»

Rojekê xebata Nûh û ya mala wî xilas bû. Di Tewratê de em weha dixwînin:
«Nûh her tişt wek ku Xwedê jê re gotibû kir.» (Destpêkirin 6:22)
Gemî amade bû. Her tişt temam bû. Bi tenê ev mabû:
Diviya ku Nûh bi mala xwe ve biketa gemiyê. Cara dawî Nûh ji xelkê re got:
«Guhê xwe bidin Xwedê! Tobe bikin û bawer bikin! Werin, bikevin gemiyê!
Zû tofan wê bê! Hê wext heye! Derî hê vekirî ye! Her kesê ku di vî deriyî re derbas bibe, wê xilas bibe.
Lê eger hûn nexwazin bên, hûnê çawa ji dîwan û xezeba Xwedê birevin?»
Bi gotinên weha Nûh ji dil û can ew hişyar kirin, lê wan qet guhê xwe nedayê.

Loma di deriyê 7’an de Nivîsarên Pîroz dibêjin:

Xudan ji Nûh re got:

«Bi hemû maliyên xwe ve bikeve gemiyê, çimkî min tu di nav vî nifşî de rastdar dîtî. Ji bo ku ew li ser hemû rûyê erdê sax bimînin, ji hemû heywanên helal ji xwe re heft–heft, nêr û mê, û ji heywanên heram dido–dido, nêr û mê û weha jî ji teyrên ezmên heft–heft, nêr û mê ji xwe re bistîne.

Piştî heft rojan ezê çil roj û çil şevan baranê bibarînim; ezê her tiştê jîndar ê ku min çêkiriye, ji ser rûyê erdê xîş bikim.»

5 Nûh her tişt li gor emrê ku Xudan lê kiribû kir.» (Destpêkirin 7:1-5)

Çima Nûh bi mala xwe ve ket gemiyê? Ma ji ber ku wan ewreke tarî dît?
Ma ji ber ku ne tav bû? Na, çaxê ew ketin hundir, hewa xweş bû.
Lê çima ew ketin hundir?
Sedem tenê ev bû: Ew ketin hundir, çimkî wan ji peyvên Xwedê bawer dikir.
Belkî li derveyî gemiyê hin mirov hebûn, ji xwe re digotin:
«Ez ji Xwedê bawer dikim, lê ez qet nakevim hundirê vê gemiyê!
Ez ji Xwedê bawer dikim, lê ez nikarim gotinên Nûh qebûl bikim!»

Gelo emê li ser mirovên weha çi bêjin? Divê em bêjin ku bi rastî wan ji dil û can ji Xwedê bawer nekir, çimkî wan guhê xwe neda gotinên pêxemberê wî.
Wan nexwest ku tobe bikin. Ew ji gunehên xwe venegeriyan û wan riya xilasiyê ya ku Xwedê bi destê Nûh peyda kiribû, qebûl nekir.
Belkî wan bi devê xwe pesnê Xwedê dida, lê dilê wan dûrî Xwedê bû.

Nivîsarên Pîroz weha berdewam dikin, dibêjin:

«Ji ber ava tofanê, Nûh û kurên wî û jina wî û bûkên wî pê re ketin gemiyê. Wek ku Xwedê li Nûh emir kiribû, ji heywanên helal û ji heywanên heram, ji teyran û ji hemûyên ku li ser axê dişêlin, nêr û mê dido–dido ketin gemiyê ba Nûh... Piştre Xudan derî girt.» (Destpêkirin 7:7-9.16)

Gelo we bihîst ku Xwedê çi kir? Piştî ku Nûh bi mala xwe ve ket gemiyê, Xwedê çi kir?

Kitêba Pîroz dibêje: «Piştre Xudan derî girt.»

Yanî roja xezeba Xwedê ya mezin hat. Xwedê bîhna xwe li nifşê wê demê fireh kiribû û demeke dirêj sebir kiribû, lê niha êdî dawiya bîhnfirehiya wî hatibû û bi tenê xezeba wî mabû.

Xwedê derî girtibû û çaxê ku Xwedê derî bigire, tu kes tune ku bikare veke. Riya xilasiyê hatibû girtin.

Loma Nivîsarên Pêxemberan dibêjin:

> Guhê xwe bidinê û werin ba min! Bibihîzin û canê we wê bijî. [6] Li Xudan bigerin hê ku dikare bê dîtin; gazî wî bikin hê ku ew nêzîk e. [7] Bila yê xerab ji riya xwe vegere û mirovê bedxwaz dev ji fikirên xwe berde. Bila ew li Xudan vegere û ewê rehmê li wî bike; bila ew li Xwedayê me vegere, çimkî ewê bi zêdehî afû bike. (Îşaya 55:3.6.7)

Guhdarên delal, gelek spas ku we qenc guhê xwe daye. Heta bernameya ku bê, wan gotinan bînin bîra xwe yên ku dibêjin:

> Guhê xwe bidinê û werin ba min! Bibihîzin û canê we wê bijî. [6] Hê ku Xudan tê dîtin, lê bigerin, hê ku nêzîk e, gazî wî bikin. [7] Bila yê xerab ji riya xwe vegere û mirovê bedxwaz dev ji fikirên xwe berde. Bila ew li Xudan vegere û ewê li wî rehmê bike; bila ew li Xwedayê me vegere, çimkî ewê bi zêdehî afû bike. (Îşaya 55:3.6.7)

Riya Rastdariyê 14 B

Me di bernama din de bihîst ku Nûh çawa mirovên nifşê xwe hişyar kirin, lê wan qet guhê xwe neda peyvên Xwedê.
Nûh li gor emrê Xwedê gemiyeke mezin çêkir û çaxê ku her tişt amade bû, ew bi mala xwe û bi heywanan ve ket hundir. Piştre Xudan bi xwe derî girt.
Mirovên ku baweriya xwe bi peyvên Xwedê neanîn, li derve man.
Êdî riya xilasiyê hatibû girtin.

Hingê Xwedê wek ku gotibû, li ser rûyê erdê tofan rakir.
Ezman bû tarî û ba rabû. Ewrên tarî civiyan, ezmên kir xurexur û birûskan lêda û erd hejiya. Hemû zarokên Adem ji tirsa dilerizîn.
Heta ku hewa xweş bû û her tişt rihet bû, ji wan re hêsanî bû ku ew ji Xwedê re meydanê bixwazin û henekên xwe bi wî bikin. Lê belê çaxê dîwana Xwedê dest pê kir, devê wan hat girtin.
Saeta wan hat: Dîwana Xwedê ya rast gihîşt wan û êdî cih û derfet nema ku xwe ji ber Xwedê veşêrin.

Baran dibarî, çavkaniyên erdê derbûn, derya, rûbar û çem bilind bûn û tofan rabû. Lehî ketin gund û bajaran. Yên ku di cih de di avê de nexeniqîn, bi xof û tirs reviyan cihên bilind.
Wan ên ku Nûh kêm didît û peyvên Xwedê qebûl nedikirin êdî fêm kirin ku Xwedê bi peyvên pêxemberê xwe Nûh rastî ji wan re gotibû.
Lê belê vê yekê êdî alîkariya wan nekir çimkî tu fersenda wan nema ku bikevin gemiya Nûh. Dema xilasiyê êdî xilas bûbû. Belkî hinan gazî Nûh dikir, gotin:
«Ey Nûh, derî veke! Alî me bike! Me jî xilas bike! Erê, te rast digot!
Niha em bawer dikin, bi rastî em bawer dikin!» Lê belê êdî dereng bû.
Xwedê derî girtibû û roja xilasiyê beriya hingê bû. Roja dîwanê êdî hatibû û Xwedê biryar dabû ku her tiştî qirr bike.

Bêguman mirovan dua dikir, ew digirîn, wan li dêrî dixist, wan hingê rastiya Xwedê jî qebûl dikir, lê bi wan hemû tiştan wan nedikarî biryara Xwedê biguhertan. Çaxê ku Xwedê derî bigire, yanî riya xilasiyê bigire, tu kes tune ku bikare veke.

Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku baran bêrawestin çil roj û çil şevan barî û av bilind bû, heta ku serê çiyan hatin nixûmandin. Bi tenê gemiya Nûh di ser avê re diçû.

> «Her tiştê ku li ser erdê diliviya helak bû. Ji mirovan heta bi dewaran, heta bi heywanên ku dişêlin û heta bi teyrên ezmên, her tiştê ku li ser erdê jîndar bû, tev hatin xîşkirin. Tenê Nûh û yên ku di gemiyê de pê re bûn man.»
> (Destpêkirin 7:21.23)

Ma Xwedê tiştê ku gotibû, kir? Erê, ji xwe wî tam wusa kir.
Ma wî dîwana wan gunehkarên ku tobe nekirin, kir? Bêguman wî dîwana wan kir. Wek ku gotibû, wî dîwana her kesê ku ne di gemiyê de bû, kir.

Guhdarên delal, divê em li vir hinekî bisekinin. Xwedê hez bike emê di bernameya ku bê de serhatiya Nûh xilas bikin.
Lê belê divê em niha bala xwe bidin derseke girîng. Xwedê di vê serhatiya Nûh de tîne bîra me ku Rojeke din a Dîwanê wê bê. Rojekê, Xwedê wê dîwana hemû mirovan bike. Û ew dîwana ku wê rojê bê, wê ji dîwana di dema Nûh de hê girantir be.
Ji kerema xwe guhê xwe bidin van gotinan. Pêxemberekî Xwedê li ser wê rojê weha gotiye:

> «Hingê min textekî mezin ê spî û yê li ser wî rûniştibû dît. Erd û ezmên ji ber wî bazdan û cihek ji bo wan peyda nebû. Û min yên mirî, yên biçûk û mezin, li ber text sekinî dîtin. Kitêb vebûn û kitêbeke din a ku Kitêba Jiyanê ye vebû. Mirî, li gor kirinên xwe yên ku di kitêban de nivîsî bûn, hatin dîwankirin…Û navê kê di Kitêba Jiyanê de nivîsî nehatibe dîtin, hat avêtin nav gola êgir.» (Peyxama Yûhenna 20:11-12.15)

Hevalê delal, ma tu bi cesaret li ser Roja Dawî ya bi tirs difikirî?
Ma tu dizanî ku navê te di Kitêba Jiyanê de hatiye nivîsîn?
Gelo tu di deriyê xilasiyê re derbas bûyî? Xwedê ev ji te re vekiriye.
Peyva Xwedê dibêje:
«Va ye, dema meqbûl niha ye; va ye, roja xilasiyê niha ye.» (Korîntî II, 6:2)
Me dît ku Xwedê bîhna xwe li mirovên dema Nûh gelek fireh kir û fersend da wan, ku tobe bikin, bawer bikin û xilas bibin. Lê di dawiyê de, wî ew derî girt. Ji bo wan ên ku li derve mabûn, bi tenê dîwan û xezeba Xwedê mabû.

Li ser wê roja ku Xwedê wê li gor rastî û dadperweriyê dîwana hemû mirovan bike, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
«Ka diz bi şev çawa tê, Roja Xudan wê wusa bê. Gava ku xelk dibêjin: «Dinya aştî û ewledarî ye», hingê wek êşa jina bizaro, helak wê ji nişkê ve bê ser wan û qet nikarin xilas bibin.» (Selanîkî I, 5:2.3)

Xwedê ji bo hemû zarokên Adem deriyê xilasiyê vekiriye. Lê ji bilî wan mirovên ku derbasî vî deriyî bibin, tu kes xilas nabe.

Guhdarê delal, ma tu bi vî deriyê ku Xwedê ji bo gunehkaran vekiriye, dizanî?
Gelo tu riya rizgariyê ya ku Xwedê ji bo te amade kiriye, dizanî?
Di rojên Nûh de kî xilas bû?
Erê, bi tenê ew mirovên ku di deriyê gemiyê re derbas bûn, hatin rizgarkirin.
Heçî Roja Dawî ye, wê eynî weha be. Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê deriyek tenê amade kiriye, da ku zarokên Adem, yanî gunehkar pê xilas bibin.
Ma tu bi vî deriyî dizanî?
De nexwe guhê xwe bide van peyvên wî Xilaskarê ku Xwedê şand vê dinyayê.
Wî got:
«Derî ez im; yê ku bi destê min bikeve hundir, wê xilas bibe.» (Yûhenna 10:9)

«Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, yê ku guhê xwe dide gotinên min û ji yê ku ez şandime bawer dike, jiyana wî ya herheyî heye; ew nayê dîwankirin, lê ew ji mirinê gihîştiye jiyanê.» (Yûhenna 5:24)

Dostên delal, îro bernama me li vir bi dawî dibe, lê Xwedê hez bike, emê hê gelek tiştên din li ser vî Xilaskarê ku Xwedê şand dinyayê bibihîzin. Vî xilaskarî weha got:
«Derî ez im; yê ku bi destê min bikeve hundir, wê xilas bibe.» (Yûhenna 10:9)

Em pirr spas dikin ku we guhdariya peyvên me kir û em ji bo bernameya ku bê jî li hêviya we ne. Heta hingê, li ser vê pirsê qenc bifikirin. Di Kitêba Pîroz de dibêje:
«Eger em li ber vê xilasiya evqas mezin xemsar bin, emê çawa birevin û xilas bibin?» (Îbranî 2:3)

Îro em dixwazin bi serhatiya pêxemberê Xwedê Nûh berdewam bikin.
Pêşî emê bînin bîra xwe ku di dema Nûh de xerabiya mirovan zehf gelek mezin bû. Her nêt û fikra mirovan xerab bû. Loma Xwedê biryar da ku li ser erdê tofanekê rake û her gunehkarê ku ji gunehên xwe venegere, yanî li Xwedayê rast nezivire, helak bike.

Di vî nifşê xwehr û xerab de zilamek tenê hebû ku bi dilê Xwedê bû. Navê wî zilamî Nûh bû. Wî ji Xwedê hez dikir û ji Xwedê û ji peyvên wî bawer dikir. Loma rojekê Xwedê emir li wî kir ku gemiyeke mezin çêke, da ku ew bi mala xwe ve û bi her cûreyê heywanan ve ji tofanê xilas bibe.
Nûh bi kurên xwe ve demeke dirêj xebitî, heta ku gemî amade bû. Di eynî demê de wî xelk jî hişyar dikir da ku ew tobe bikin û ji peyvên Xwedê bawer bikin. Lê tu kesî guhê xwe neda wî, çimkî wan bawer nedikir ku tofan wê rabe.

Lê rojekê gemî temam û xilas bû û saet hat ku Xwedê dîwana mirovên xerab bike. Xwedê bîhna xwe li mirovên neguhdar fireh kiribû, lê dawiya sebra wî êdî hatibû. Xwedê ji Nûh re got ku ew bi mala xwe ve bikeve gemiyê û emir lê kir ku ji hemû heywanên helal heft–heft nêr û mê bi xwe re bibe û ji heywanên din jî dido–dido, nêr û mê bi xwe re bibe. Ew hemû li gor emrê Xwedê ketin gemiyê. Nivîsarên Pîroz dibêjin ku *«piştre Xudan derî girt.»* Xwedayê ku ji bo zarokên Adem, yanî ji bo dûndana Adem deriyê xilasiyê vekiribû, niha bi xwe derî girt. Roja rehm û kerema Xwedê êdî derbas bûbû û roja xezeba wî ya tirsehêz hatibû.

Hingê baranê dest pê kir barî, birûskan lêda, ewran kir xurexur, erd hejiya û tofaneke mezin rabû. Her kes reviya û li cihên bilind digeriyan, lê tu kesî nikaribû ji ber xezeba Xwedê bireviya. Ew mirovên ku Nûh kêm dîtibûn û peyvên Xwedê red kiribûn êdî dizanîn ku peyvên Xwedê rast bûn. Lê belê êdî ji

bo wan bûbû dereng. Wextê xilasiyê derbas bûbû. Xwedê êdî deriyê gemiyê girtibû.
Çil roj û çil şevan baran barî û çavkaniyên erdê der bûn, av bilind bû, heta ku serê çiyan jî hatin nixumandin. Bi tenê gemiya Nûh di ser avê re diçû.
Nivîsarên Pîroz dibêjin:
*«Her tiştê ku li ser erdê diliviya helak bû. Ji mirovan heta bi dewaran, heta bi heywanên ku dişêlin û heta bi teyrên ezmên, her tiştê ku li ser erdê jîndar bû, tev hatin xîşkirin.* ***Tenê Nûh û yên ku di gemiyê de pê re bûn man.****»*

(Destpêkirin 7:21.23)

Yanî Nivîsarên Pîroz dibêjin ku Xwedê tam li gor gotina xwe kir. Wî gotibû ku ewê gunehkaran ceza bike û wî wusa kir. Her kesê ku li **derveyî** gemiyê mabû, helak bû. **Xwedê dilsoz e û tiştê ku dibêje dike**.

Halê wan ên ku di hundirê gemiyê de bûn, çawa bû? Ma Xwedê Nûh û mala wî ji bîr kir? Nexêr. Xwedayê ku xema teyrên ezmên jî wusa dixwe ku bê destûra wî yek ji wan nakeve erdê, ew jî ji bîr nekirin.

Nivîsarên Pîroz dibêjin:
*«Xwedê, Nûh û hemû heywan û dewarên ku pê re di gemiyê de bûn, anîn bîra xwe û ba li ser erdê rakir û av nizim bû… Di roja hevdehê meha heftan de gemî li ser çiyayên Araratê rûnişt.»* (Destpêkirin 8:1.4)

Yanî em dibînin ku Xwedê Nûh û hemûyên ku di gemiyê de bûn anî bîra xwe. Wî ba rakir, da ku av kêm bibe. Xwedê wusa kir ku gemî li ser çiyayên Araratê rûnişt.
Nûh bi mala xwe ve salek sax û heftiyekê di gemiyê de ma û hingê av ji erd kişiya û kêm bû û vegeriya cihê xwe yê berê.
Loma Xwedê ji Nûh re got: *«Tu û jina xwe, kurên xwe û bûkên xwe, hûn tev ji gemiyê derkevin.»* (Destpêkirin 8:16)

Li ser vê yekê Nûh, maliyên wî û hemû heywan ji gemiyê derketin. Piştre Nûh ji Xudan re gorîgehek çêkir. Wî ji heywan û teyrên helal anî û ew li ser gorîgehê ji Xudan re pêşkêş kirin, kir goriya şewitandinê.

Çaxê ku Nûh ji gemiyê derket, tiştê ku pêşî wî kir çi bû? Gelo we bihîst? Wî çend heywanên bêqusûr gorî kirin, yanî li ser gorîgehê şewitandin û bi vî awayî şikir ji Xwedê re kir, çimkî Xwedê ew ji helakbûnê xilas kiribûn.
Tofana mezin piraniya gunehkaran ji rûyê erdê xîş kiribû, lê dîsa jî kurmê guneh di dilê zarokên Adem de dima. Loma diviya ku Nûh û dûndana wî hê jî di ber gunehên xwe de ji Xwedê re heywan bikiran gorî, çimkî *«bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.»* (Îbranî 9:22)

Me dît ku gorîkirina heywanan bingehê wê riya xilasiyê bû ya ku Xwedê dabû zanîn. Goriyên ku bavkalên me di demên berê de pêşkêşî Xwedê kiribûn, mînaka wî Xilaskarî bûn ê ku wê bihata vê dinyayê ku xwîna xwe birijanda û bi wî awayî deynê gunehên zarokên Adem bida.
Yanî çaxê ku Nûh û piştî wî kurên wî heywan kirin gorî, wan anî bîra xwe ku *«meaşê ku guneh dide, mirin e»* û *«bêyî rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.»* Ew qanûna Xwedê nedihat guhertin.

Nivîsarên Pîroz weha berdewam dikin, dibêjin:
*«Xudan bi bîhna goriyên şewitandî kêfxweş bû ... Xwedê Nûh û kurên wî bimbarek kirin û ji wan re got: «Zêde bibin û rûyê erdê tije bikin... Ezê* ***peymana xwe*** *bi we re qayîm bikim. Êdî tevahiya mirovan bi ava tofanê nayê qirkirin. Êdî tofana ku erdê helak bike, hew çêdibe... Nîşana* ***peymana*** *ku ez dixim nav xwe û we û her afirînê jîndar ê ku bi we re ye, her û her ji bo hemû nifşan ev e: Min* ***keskesor*** *xistiye ewran, ewê di nav min û erdê de bibe nîşana* ***peymanê****. Kengê ez ewran bînim ser erdê û keskesor di ewran de bê dîtin, ezê* ***peymana*** *di nav xwe û we û her cûreyê afirînên jîndar de bînim bîra xwe. Êdî careke din av nabe tofan ku her tiştê jîndar helak bike.»* (Destpêkirin 8:21; 9:1.9.11-15)

Di van ayetan de peyvek heye ku  Xwedê çar caran dibêje. Gelo tu pê hesiyayî? Ew peyv **peyman** e. Xwedê çar caran ji Nûh re li ser peymana xwe got. Di Peyva Xwedê de mana peymanê ev e ku Xwedê sozeke taybetî dide mirovan. **Xwedê her gav peymanên xwe digire**. Xwedê dilsoz e û ew dilsoziya xwe ji zarokên Adem re kifş dike. Loma wî li gor dilovaniya xwe bi Nûh û bi dûndana wî re peymanek girêda û got: *«Êdî careke din av nabe tofan ku her tiştê jîndar helak bike.»*
Soza Xwedê ev e. Û soza Xwedê ne tenê peyvên şêrîn in, lê wî soza xwe bi nîşanekê erê kir: Wî keskesor xist ewran.

Her cara ku em keskesorê di ewran de bibînin, Xwedê tîne bîra me ku dilsoziya wî ji bo her nifşî ye.

Gelek spas ku we qenc guhê xwe dayê. Xwedê hez bike emê di bernameya ku bê de, serhatiya Nûh pêxember xilas bikin.
Heta hingê, Xwedê bi we re be!

Me di bernameya din de dît ku piştî tofanê Xwedê peyman bi Nûh û bi dûndana wî re girêda. Wî ji wan re got: *«Zêde bibin û rûyê erdê tije bikin… Ezê* ***peymana xwe*** *bi we re qayîm bikim. Êdî tevahiya mirovan bi ava tofanê nayê qirkirin. Êdî tofana ku erdê helak bike, hew çêdibe.... Nîşana* ***peymana*** *ku ez dixim nav xwe û we û her afirînê jîndar, her û her ji bo hemû nifşan ev e: Min* ***keskesor*** *xistiye ewran, ewê di nav min û erdê de bibe nîşana* ***peymanê****. Kengê ez ewran bînim ser erdê û keskesor di ewran de bê dîtin, ezê* ***peymana*** *di nav xwe û we û her cûreyê afirînên jîndar de bînim bîra xwe. Êdî careke din av nabe tofan ku her tiştê jîndar helak bike.»* (Destpêkirin 8:21; 9:1.9.11-15)

Erê, heta îro jî piştî baranê em carna keskesorê dibînin. Gelo ma te dizanî ku ev keskesor nîşana dilsoziya Xwedê ye?
Her cara ku em keskesorê di ewran de bibînin, Xwedê tîne bîra me ku dilsoziya wî ji bo her nifşî ye.

Xwedê keskesor xist ewran, da ku bi vê yekê peymana xwe erê bike. Wî di peymana xwe de soz da ku av qet careke din nebe tofan ku hemû mirovan helak bike. Bi rastî Xwedê peymana xwe digire! Ew tam dilsoz e.

Heçî jiyana Nûh e, hê çend serhatiyên din di Kitêba Pîroz de li ser hatine nivîsandin û hûn dikarin wan di Tewratê de, di Kitêba Destpêkirinê, deriyê 9'an de bixwînin.

Piştî tofanê, Nûh 350 salan jiya û çaxê ew gelek pîr bû, ji vê dinyayê bar kir û çû ba Xwedê.

Em gihîştin dawiya serhatiya Nûh pêxember û em dikarin bi çend pirsan tiştên herî girîng bînin bîra xwe.

Di nav Nûh û mirovên din ên dema wî de çi ferq hebû? Yanî Nûh çi kir ku ew li Xwedê xweş hat? Bi rastî wî tiştek tenê kir: **Nûh ji peyvên Xwedê bawer dikir**. Loma Nûh bi mirovên din ên nifşê xwe re helak nebû. Ji kerema xwe guhê xwe bidinê ku Xwedê çawa jê re şahidî kir. Di Kitêba Pîroz de dibêje:

*«**Bi baweriyê**, Nûh, gava ew li ser **tiştên ku hê nedihatin dîtin** ji aliyê Xwedê ve hat hişyarkirin, bi tirsa Xwedê ji bo xilasiya mala xwe gemiyek çêkir. **Bi vê baweriyê** wî dinya sûcdar derxist û bû wêrisê wê rastdariya ku **ji baweriyê** tê.* Çimkî *bê bawerî çênabe ku mirov li Xwedê xweş bê.»* (Îbranî 11:7+6)

Em zelal dibînin ku Nûh bi baweriyê li Xwedê xweş hat. Nûh baweriya xwe bi Xwedê anî û wî bawer kir ku gotinên Xwedê rast in. Nûh li peyvên Xwedê ewle bû û li gor wan kir. Hemû yên din weha nekirin, lê dîsa jî Nûh bawer kir. Loma Xwedê ew ji wî nifşê xerab xilas kir.
Guhdarê delal, ma bi rastî tu ji gotinên Xwedê bawer dikî?
Erê, daxwaza Xwedê ji bo me hemûyan ev e ku em wek Nûh ji peyvên wî bawer bikin!

Xaleke din jî heye ku divê em ji bîr nekin. Ev tişt di serhatiya Nûh de ji baweriya Nûh hê girîngtir e. Gelo tu dizanî ew çi ye? Ez li ser **dilsoziya Xwedê** dibêjim.
Çima dilsoziya Xwedê ji baweriya Nûh hê girîngtir e?
Bersiv ev e: Eger ne bi dilsoziya Xwedê bûya, yanî eger Xwedê li ser sozên xwe nemabûya û peymanên xwe negirtan, hingê tu feyda baweriya Nûh wê nebûya.

Eger em li filan kes û bêvan kes ên ku ne dilsoz in ewle bibin, em hemû qenc dizanin wê çawa be… Mesele em bêjin hevalê te ji te re bêje: «Sibe ezê 20 kîlo birinc bidim te.» Tu ji gotina wî bawer dikî, yanî tu lê ewle dibî. Lê eger ew birinc ji te re neyne, hingê wê çawa be? Tu razî nabî, hêviya te wê bişkê – û belkî tu birçî bimînî!

Bawerî û ewledariya te wê pûç derkeve, çimkî hevalê te li gor soza xwe nekir. Tu li yekî bêbawer ewle bûyî.

Heçî Xwedê ye, ew ne weha ye. Nivîsarên Pîroz dibêjin:

*«Eger em dilsoz nemînin jî,*

*Ewê dilsoz bimîne,*

*Çimkî ew nikare xwe bi xwe înkar bike. … «Hemû mirov wek giyê ne û hemû rûmeta wan jî wek kulîlka giyê ye. Giya hişk dibe û kulîlka wî dikeve.* [25] *Lê peyva Xudan her û her dimîne.» … Yê ku baweriyê bi wî bîne, qet nayê şermkirin.»*

(Tîmotêyos II, 2:13; Petrûs I, 1:24-25; 2:6)

Erê, *«Xwedê dilsoz e!»* (Korîntî I, 1:9)

Ew her gav li ser soza xwe dimîne û her gav tiştê ku wî gotiye, wê bike jî.

Di serhatiya Nûh de em zelal dibînin ku Xwedê her tişt tam li gor soz û peyvên xwe kir. Me dît ku Xwedê, her kesê ku di hundirê gemiyê de bû, xilas kir û dîwana her kesê ku li derveyî gemiyê bû kir.

Me dît ku Nûh riya xilasiyê ya ku Xwedê pêk anibû, qebûl kir û bi goriyê şikir ji Xwedê re kir. Nûh bi mana goriyê dizanî, loma wî heywanên helal û bêqusûr pêşkêşî Xwedê kirin.

Me bihîst ku Xwedê keskesor xist ewran, da ku Nûh û hemû mirovên din tu caran ji bîr nekin ku ***«Xwedê dilsoz e!»***

Guhdarê delal, eger tu her tiştê ku me îro got ji bîr bikî jî, divê tu vê yekê qet ji bîr nekî: **Xwedê dilsoz e**! Ew tu caran peyva xwe naşkêne.

Tiştê ku Xwedê soz dide, ew dike. Erê, belkî carnan dihêle dereng, lê dîsa jî ew dilsoz e û wê li gor gotina xwe bike.

*«Xwedê dilsoz e! …* û *yê ku baweriyê bi wî bîne, qet nayê şermkirin.»*

(Korîntî I, 1:9; Petrûs I, 2:6)

Tiştê ku dikeve ser milê me ev e ku em baweriya xwe bi wî bînin, peyvên wî bi nefsbiçûkî qebûl bikin û ji vê serhatiya Nûh pêxember hîn bibin û hem jî wek Nûh bikin. Çaxê ku her kesî peyvên Xwedê kêm didîtin û red dikirin, Nûh dîsa ji gotinên Xwedê bawer dikir, guhê xwe dida wî û bi maliyên xwe ve xilas bû.

Hevalno, em pirr spas dikin ku we qenc guhdariya vê serhatiyê kir. Xwedê hez bike di bernameya ku bê de, emê li ser dûndana Nûh bipeyivin û emê hîn bibin ka sedemê wê yeka ku gelek ziman di nav mirovan de derketin, çi bû.

Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin:
***«Xwedê dilsoz e! … û yê ku baweriyê bi wî bîne, qet nayê şermkirin.»***

(Korîntî I, 1:9; Petrûs I, 2:6)

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Me dîtibû ku Xwedê dûndana Adem bi tofanê ji erdê xîş kir, çimkî xerabiya wan her gav zêde dibû. Bi tenê Nûh pêxember bi mala xwe ve ji wê helakbûnê xilas bû, çimkî wî ji peyvên Xwedê bawer dikir.

Me dît ku sê kurên Nûh hebûn: Navên wan Sam, Ham û Yafet bûn.
Hemû milet ji wan her sê kurên Nûh derketin. Ez û tu, Kurd, Ereb, Tirk, Fars û hemû miletên din ji zarokên Nûh in.
Yanî ji ber ku Nûh baweriya xwe bi Xwedê anî û li gor emrê Xudan kir, em îro hene. Bi vê yeka ku wî mala xwe ji tofanê xilas kir, wî ez û tu û em hemû jî ji qirbûnê xilas kirine.

Xwedê ji her sê kurên Nûh, ji xwe re Sam hilbijart, da ku ew Xilaskarê ku wê bihata dinyayê, ji zuriyeta wî bihata. Loma di Kitêba Pîroz de bêtir li ser dûndana Sam tê gotin, çimkî ji malbata wî hem pêxemberên Xwedê hatin û hem jî Xilaskarê vê dinyayê ji mala wî rabû.

Xwedê Nûh û kurên wî bimbarek kirin û ji wan re got: «Zêde bibin û rûyê erdê tije bikin.»
Piştî demekê, careke din bi hezaran mirov li ser erdê zêde bûn, lê ew dîsa diketin pey gunehan û xerabî dikirin.
Nûh û kurên wî jî gunehkar hatin dinyayê, çimkî ew ji dûndana Adem bûn.
Çaxê ew ketin gemiyê, hevênê guneh bi wan re ket gemiyê. Û çaxê ew jê derketin, rayê guneh hê di dilê wan de hebû. Tofanê cewhera mirov neguhert.
Loma hemû mirovên ku piştî tofanê hatin dinyayê, gunehkar bûn, çimkî ew ji dûndana Nûh bûn û Nûh bi xwe jî ji dûndana Adem bû.

Çend sed salan piştî tofanê, mirovan qet bala xwe neda Xwedê û daxwaza wî.
Xwedê bîhna jiyanê, tav û baran û xwarin dida wan, lê wan qet şikir jê re nedikir.

Kitêba Pîroz weha dibêje: «Bi ser ku Xwedê dizanin jî, bi Xwedêtî rûmet nedanê û ne jî jê re şikir kirin; lê belê fikirîna wan bû pûçîtî û dilê wan ê fêmkor tarî bû. Wan digot: «Em zana ne», lê bêaqil derketin… Wan rastiya Xwedê bi derewê guhert, ji Afirandar zêdetir perizîn tiştên afirandî û ji wan re xizmet kirin.»

Wek ku Qayîn û malbata wî kiribû, dûndana Nûh jî weha kir: Wan dev ji rastiyê berda û li pey neheqiyê ketin. Ew dîndar bûn, lê wan guhê xwe nedida peyvên Xwedê.

Di wê demê de zilamek hebû ku navê wî Nemrûd bû. Ew ji dûndana kurê Nûh Ham bû. Nemrûd nêçîrvanekî jêhatî bû û ew çend sed salan piştî tofanê dijiya. Mana navê Nemrûd ev e: Yê serkêş.
Nemrûd yekî biaqil bû, lê belê wî guhê xwe nedida peyvên Xwedê û di riya xwe de diçû.
Nemrûd çend bajarên mezin dan avakirin; Babîl û Nînewe jî di nav wan de bûn.

Emê niha di deriyê 11'an ê Kitêba Destpêkirinê de li wî bajarê Babîlê binêrin. Kitêba Pîroz weha dibêje:

> «Zimanê hemû mirovên dinyayê yek bû û peyivina wan jî yek bû.
> Çaxê ku wan ber bi Rojhilat ve koç kir, li herêma Şînarê deştek dîtin û li wir cîwar bûn.
> Wan ji hev re got: «Werin, em ji xwe re bajarekî û birceke ku serê wê bigihîje ezmên ava bikin, da ku em nav û dengê xwe derxin û em li ser rûyê hemû erdê belav nebin.»

Yanî nêta wan ew bû ku bajarekî gelek mezin û tê de birceke gelek bilind ava bikin. Çima wan dixwest weha bikin?
Mirovên wê demê dixwestin navê xwe bilind bikin, yanî dixwestin nav û dengê xwe derînin. Wan ji xwe re digot: «Eger em hemû bi hev re bimînin, hêza me wê mezin bibe û hingê em çi bixwazin, emê bikin û em ji hev belav nabin.»

Lê belê ev qet ne li gor emrê Xwedê bû. Xwedê ji zarokên Nûh re gotibû ku li ser erdê belav bibin û dinyayê tije bikin.
Lê pirraniya dûndana Nûh tenê dixwest li gor fikrên dilê xwe bikin.
Dilê wan tije pozbilindî û quretî bû û di fikrên xwe de ew li hember Xwedê rabûn. Di vê yekê de ew wek Îblîs fikirîn.
Lê belê Kitêba Pîroz dibêje: «Kî xwe bilind bike, wê nizim bibe û kî xwe nizim bike, ewê bilind bibe» û «tiştê ku di nav mirovan de bi qedir e, li ba Xwedê mekruh e.»

Mirovên ku xwe bi rûmet dikin an xwe didin perizîn, di çavê Xwedê de guneh dikin. Çimkî li ser erdê û li ezmên bi tenê navek heye ku bê bilindkirin û ew jî navê Xwedê ye.

Lê di wê demê de mirovan rûmet nedidan Xwedê. Wan guman kir ku Xwedê û peyvên wî ji wan re ne lazim in. Li gor bîr û baweriya wan, heqê tu kesî nebû ku tiştekî ji wan re bêje. Ruhê wan ruhekî serxwebûn û serhildanê bû. Gelo sedema ku di nav mal û miletên vê dinyayê de şer heye, çi ye? Ma ne ev e ku mirov difikirin, dibêjin: «Ez bi xwe dizanim! Heqê tu kesî tune ku tiştekî ji min re bêje! Adetên me yên herî baş in! Dînê me yê herî qenc e! Gelê min ji hemûyên din çêtir e!»
Ew dibêjin: «Divê li gor daxwaza min be! Divê perên min ji yên din zêdetir bin.» Her gav mirov li ser xwe difikire û dibêje: Ez, ez, ez!
Ev ruhê ezperestiyê dibe sedema şer û pevçûnê. Lê Xwedê ji vî ruhî nefret dike, çimkî bi tenê navê wî hêjayî rûmetê ye.
Loma ew dibêje: «Ez Xudan im, navê min ev e. Ez rûmeta xwe nadim yekî din.»

Bêguman gelek ji wan mirovan dîndar bûn, lê wan peyvên Xwedê diavêtin pişt guhên xwe.
Çaxê ku Xwedê ev dît, wî çi kir? Ma wî çavên xwe li xerabiya wan neqand?

Ma gelo wî ew mirovên ku li hember wî rabûbûn, qebûl kirin? Na, wî ew qebûl nekirin.
Kitêba Pîroz dibêje: «Xudan hat jêr, da ku wî bajarî û wê birca ku mirovan çêdikirin, bibîne. Wî got: «Ew yek nîjad in û zimanê wan hemûyan yek e. Wan dest bi vê yekê kiriye û êdî tu tiştê ku bixwazin bikin ji wan re namîne zehmet. Werin, em dakevin jêr û li wir zimanê wan tevlihev bikin, da ku ew zimanê hev fêm nekin.» Îcar Xudan ew ji wir li ser rûyê hemû erdê belav kirin û wan dev ji avakirina bajêr berda. Ji ber ku bû «bal–bala» mirovan, jê re gotin: «Babîl» çimkî Xudan li wir zimanê hemû mirovên dinyayê tevlihev kir. Xudan ew ji wir li ser rûyê tevahiya dinyayê belav kirin.»

Xwedê plana wan mirovan tevlihev kir. Wan nikaribû ji bo rûmeta xwe bircekê ava bikin.
Heta wê rojê, zimanê hemû mirovan yek bû. Lê di wê rojê de Xwedê zimanê wan tevlihev kir, wusa ku wan êdî hevdu fêm nekir û planên wan pûç derketin.
Bi vî awayî Xwedê ew li ser rûyê tevahiya dinyayê belav kirin.
Erê, Xwedê mezin e û tu kes nikare li hember wî rabe.

Guhdarê delal, tu navê kê bilind dikî? Ma tu dixebitî ku navê xwe bi xwe, an navê pêxemberekî bilind bikî, an tu dixebitî  ku navê Xudan Xwedê bi tenê bilind bikî?

Xwedê dibêje: « Bila yê zane bi zanebûna xwe pesnê xwe nede û bila yê hêzdar bi hêza xwe pesnê xwe nede û bila yê dewlemend bi dewlemendiya xwe pesnê xwe nede, [24] lê yê ku pesnê xwe bide, bila bi vê yekê pesnê xwe bide ku ew min fêm dike û min nas dike ku ez Xudan im. Ez li ser rûyê erdê dilovanî, dadperwerî û rastdariyê dikim, çimkî kêfa min ji van tiştan re tê.»

Xwedê bi we re be!

Bi alîkariya Xwedê, em îro dixwazin **bi kurtvebirrî li hemû serhatiyên Tewratê ên ku me heta niha gotine, binêrin**.
Tewrat ji Nivîsarên Pîroz ên ku pêxemberên Xwedê nivîsîne, beşê pêşî ye.
Tewrat gelek girîng e, çimkî ew **bingehê** peyama Xwedê ye.
Bi Tewratê, em dikarin her tiştê din ê ku em dibihîzin, biceribînin û bibînin, ka ew ji Xwedê ye, an ne.
Di Tewratê de pênc kitêb hene. Kitêba pêşî Destpêkirin e.
Di kitêba Destpêkirinê de 50 derî hene. Em di bernameyên xwe de niha gihîştin deriyê 11'an.

Gelo tê bîra we ku di ayeta pêşî ya Nivîsarên Pîroz de, yanî di ayeta pêşî ya Tewratê de çi nivîsî ye? Li wir dibêje: *«Di destpêkê de Xwedê erd û ezman afirandin.»*
Xwedê Xwedayê herheyiyê ye. Beriya ku erd hebe, Xwedê hebû. Xwedê Ruhê Herheyî ye û tu destpêka wî tune. Loma di Tewratê de ayeta pêşî dibêje: *«Di destpêkê de* ***Xwedê****»*

Piştre me dît ku Xwedê hê beriya afirandina erd û ezmên, bi hezaran ruhên hêzdar afirandin û ji wan re got **milyaket**. Me dît ku di nav milyaketan de navê yekî ji wan **Lûsîfer**, yanî *yê şewqdar*, bû. Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku rojekê Lûsîfer xwe bilind kir, Xwedê kêm dît û dixwest ku cihê Xwedê bistîne. Gelek milyaketên din jî li pey wî çûn û bi wî re guneh kirin.

Lê belê Xwedê qet tu caran guneh qebûl nake û ji ber vê yekê wî Lûsîfer û milyaketên wî ji ba xwe avêtin. Navê Lûsîfer jî bû Îblîs, çimkî ew bû dijminê Xwedê.

Xwedê ji bo Îblîs û milyaketên ku li pey wî ketin, agirê dojehê çêkir û ew agir tu caran venamire. Nivîsarên Pîroz dibêjin ku di Roja Dawî de Dadgerê rastîn, yanî Xwedê bi xwe wê Îblîs û hemûyên ku guhê xwe dane wî, bavêje wî agirî.
Piştî vê yekê me dît ku **Xudan çawa erd û ezman afirandin**.
Di nav şeş rojan de wî bi tenê bi emrê peyva xwe, erd û ezman û her tiştê li ezmên û li ser rûyê erdê afirand. Xwedê her tişt ji bo **mirovê** ku wê bihata afirandin çêkir. Ji hemû afirînan yê herî girîng mirov e, çimkî ew di sûretê Xwedê de hatiye afirandin.
Armanca Xwedê ew bû ku di nav wî û mirovan de têkiliyeke kûr û şêrîn hebe. Loma Xwedê mirov bi **can**, bi **rûh** û bi **dil** afirand, da ku ew Xwedê nas bike û jê hez bike. Xwedê **azadiya hilbijartinê** jî da mirov, da ku ew bikare li gor daxwaza xwe guhê xwe bide Xwedê, an nedeyê.

Di deriyê Tewratê yê diduyan de me dît ku Xwedê **baxçê Êdenê** ji bo mirovê pêşî **Adem** amade kir. Xwedê li gor dilovaniya xwe her tiştê ku ji bo jiyanê lazim bû, da Adem, da ku ew bi aştî û bi serfirazî bijî.

Çaxê ku Xwedê Adem afirand, wî jê re got: *«Tu dikarî ji her dara baxçe bixwî, lê ji dara zanîna qencî û xerabiyê, nexwe. Çimkî gava ku tu ji wê bixwî, eseh tê bimirî.»* (Destpêkirin 2:16+17)
Yanî Xwedê ceribandineke sivik danî ber Adem. Daxwaza Xwedê ew bû ku di nav wî û mirov de têkiliyeke şêrîn hebe. Xwedê nexwest ku ew têkilî bi mecbûrî be, loma wî desthilatî da Adem ku ew ji wî hez bike û li gor emrê wî bike, an neke.

Herweha me dît ku Xwedê zû diyariyeke pir qenc da Adem, yanî wî jinek da Adem. Xwedê jina pêşî ji parsûyekî ku wî ji Adem standibû, afirand û hingê pêşkêşî wî kir. Adem jî navê wê **Hewa** danî.

Îcar di nav şeş rojan de Xwedê tevahiya xebata afirandinê xilas û temam kir. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin: *«Xwedê hemû tiştên ku çêkiribûn dîtin û bi rastî ew gelek qenc bûn.»* (Destpêkirin 1:31)
Di roja heftan de Xwedê ji hemû karên xwe bîhna xwe vekir û bi her tiştê ku wî çêkiribû, pirr şa bû.

Di deriyê sisiyan de me dît ku **guneh** çawa ket dinyayê. Nivîsarên Pîroz ji me re gotin ku rojekê Îblîs ket baxçê Êdenê. Adem û Hewa nêzîkî wê dara ku li gor emrê Xwedê destûra wan nebû ku ji fêkiyê wê bixwin, bûn. Îblîs di şiklê **marekî biaqil** de hat ba wan û got:
*«Ma bi rastî Xwedê gotiye: ‹Qet ji fêkiyê dareke baxçe nexwin?›» Jinê ji mar re got: «Em dikarin ji fêkiyê darên li baxçe bixwin; lê heçî fêkiyê dara ku di navenda baxçe de ye, Xwedê gotiye: ‹Jê nexwin û dest nedinê, an na hûnê bimirin.›» Mar ji jinê re got: «Hûn qet namirin. Çimkî Xwedê dizane gava ku hûn ji wê bixwin, hingê çavên we wê vebin, hûnê bibin wek Xwedê û qencî û xerabiyê bizanin.»* (Destpêkirin 3:1-5)

Yanî me dît ku Îblîs peyvên Xwedê înkar kirin! Gelo Xwedê ji Adem re çi gotibû? Gotibû: Eger hûn ji fêkiyê vê darê bixwin, *«eseh hûnê bimirin.»* Lê belê Îblîs çi got? Wî got: *«Hûn qet namirin!»*
Diviya ku Adem û Hewayê ji xwe re hilbijartan ku divê ew li gor kê bikin. Gelo, wan çi biryar da? Ma wan ji gotinên Xwedê an ji gotinên Îblîs bawer kir? Wax li me! Wan xelet biryar da. Nivîsarên Pîroz kifş dikin ku Adem û Hewayê ji gotinên Îblîs bawer kirin; wan dizanî ku Xwedê xwarina fêkiyê wê darê qedexe kiriye, lê dîsa jî wan jê xwar. Îblîs Hewa xapand, wê guhê xwe da wî û emrê Xwedê şkênand. **Adem jî bi hemdê xwe neguhdarî kir, bi ya Îblîs kir û emrê Xwedê şkênand**.

Loma Kitêba Pîroz dibêje:

*«Guneh bi destê yek mirovî, mirin jî bi destê guneh ket dinyayê; bi vî awayî mirin derbasî hemû mirovan bû.»* (Romayî 5:12)

Dawiya wê serhatiyê ew bû ku **Xwedê** li gor gotina xwe kir û **Adem û Hewa** ji baxçê Êdenê **avêtin**. Lê belê beriya ku wan derxe, wî soz da wan ku ewê **Xilaskarekî** bişîne, da ku zarokên Adem ji qeweta Îblîs, ji qeweta guneh û ji qeweta mirinê xilas bike.
Hingê Xwedê **heywan serjêkirin** û ji çermê wan ji Adem û Hewayê re cil çêkirin û li wan kirin. Bi wan heywanên serjêkirî, Xwedê hînî Adem û Hewayê kir ku *«meaşê ku guneh dide, **mirin** e»* û *«bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.»* (Romayî 6:23) (Îbranî 9:22)

Erê, heta îro jî mirov bêriya baxçê Êdenê dikin û li hêviya têkiliya kûr a bi Xwedê re dimînin. Rast e, guneh êş û jan, xerabî û neheqî anîn dinyayê û mirov ji Xwedê dûr xistin, lê belê ji destpêkê ve soza Xwedê hebû ku rojekê Xilaskarê dinyayê wê bê û wê mirovan li Xwedê bizivirîne.

Dostên delal!
Ji kerema xwe guhê xwe bidin bernameya ku bê jî. Hingê emê bi kurtvebirrîn li dersên li ser jiyana Qayîn û Habîl û li ser jiyana Şît, Henox û Nûh binêrin. Em ji bo wê bernameyê jî li hêviya we ne. Heta hingê hûn bimînin di xêr û xweşiyê de.

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Di bernameya din de me dest pê kir û me bi kurtvebirrî li hemû serhatiyên Tewratê nêrî yên ku me heta niha gotine. Me dît ku Xwedê çawa erd û ezman afirandin, me li ser Adem û Hewayê bihîst û me dît ku guneh çawa ket nav mirovan û Xwedê çawa Adem û Hewa ji baxçê Êdenê derxistin.

Di deriyê çaran de me li ser zarokên Adem û Hewayê yên pêşî **Qayîn** û **Habîl** bihîst. Me dît ku Habîl ji pezê xwe heywanên bêleke serjêkirin û pêşkêşî Xwedê kirin. Qayîn jî ji berê erdê pêşkêşî Xwedê kir. Li ser vê yekê Nivîsarên Pîroz dibêjin: *«Xudan bi Habîl û pêşkêşa wî şa bû. Lê bi Qayîn û pêşkêşa wî şa nebû.»*

(Destpêkirin 4:4-5)

Xwedê gazî Qayîn kir û ew hişyar kir, lê belê Qayîn hêrs ket û rabû, birayê xwe yê biçûk kuşt. Dilê wî dûrî Xwedê bû, wî guhê xwe neda Xwedê, tobe nekir û peyvên Xwedê qebûl nekirin.

Piştî van tiştan Xwedê kurekî din da Adem û Hewayê; navê wî **Şît** bû.
Şît wek birayê xwe yê kuştî Habîl baweriya xwe bi Xwedê anî.
Me dît ku ji Adem du malbat derketin, yanî malbata Qayîn û malbata Şît.
Dûndana Qayîn baweriya xwe bi Xwedê neanî, lê di nav dûndana Şît de mirovên ku ji Xwedê bawer kirin hebûn. Yek ji wan **Henox** bû.
Henox di nifşekî pirr xerab de bi Xwedê re dijiya. Nevîçîçirkê Henox **Nûh** pêxember bû û me dît ku Xwedê di dema Nûh de biryar da ku hemû dûndana Adem bi tofanekê ji rûyê erdê xîş bike, çimkî ew pirr **xerab** bûn û gunehên wan çiqas dihat, zêde dibûn.
Di wê dema xerab de **bi tenê Nûh baweriya xwe bi Xwedê anîbû**. Loma Xwedê jê re got ku ji xwe re gemiyeke mezin çêke, da ku ew bi mala xwe ve û bi gelek heywanan ve ji tofanê xilas bibe.
Xwedê demeke dirêj bîhna xwe li gunehkarên wî nifşî fireh kir û Nûh hem gemî çêdikir û hem jî mirovên li dor xwe hişyar dikirin.

Lê belê tu kes nebû ku tobe bikira. Bi tenê Nûh bi mala xwe ve guhê xwe dan peyvên Xwedê û ji wan bawer kirin.
Di dawiyê de Xwedê wek ku gotibû kir. Wî dîwana wan mirovên ku ji rastiyê bawer nekirin kir. Ji bilî Nûh û mala wî, her kesê din di **tofana mezin** de helak bû.

Sê kurên Nûh hebûn: **Sam**, **Ham û Yafet**. Ji wan her sê kurên Nûh hemû miletên dinyayê derketin. Me dît ku careke din piştî demekê dûndana wan jî dev ji Xwedê û ji peyvên wî berdan. Di bernameya din de me dît ku xelk çawa civiyan û dixwestin ku bajarekî mezin û birceke bilind ava bikin. Xwedê ji wan re gotibû ku li tevahiya dinê belav bibin, lê mirovan weha nexwest. Loma Xwedê zimanê wan tevlihev kir û weha ew ji hev belav bûn. Navê wî bajarî bû **Babîl** û mana vî navî jî *tevlihevî* ye.
Bi kurtvebirrîn tiştê ku me heta niha ji Tewratê bihîst ev e.

Di van hemû serhatiyan de tiştên herî girîng çi ne? Xwedê bi van tiştên ku di destpêka demê de çêbûn, çi hînî me dike?
Li vir em dixwazin behsa du tiştan bikin:
Dersa pêşî ev e ku **mirov sûcdar e**, yanî ew di çavên Xwedê de **ne rast e**.
Dersa diduyan ev e ku **Xwedê** bi xwe **rast e**!

Di van serhatiyan de me gelek caran dît ku **mirov sûcdar e û qet ne rast e**.
Bi vê yeka  ku Adem di baxçê Êdenê de ji fêkiyê dara ku Xwedê qedexe kiribû xwar, me ev yek bi zelalî dît. Çaxê ku kurê Adem ê mezin Qayîn goriya xwe pêşkêşî Xwedê kir û guhê xwe neda peyvên Xwedê, me dît ku wî eynî tişt kir. Me dît ku dûndana Qayîn eynî di riya bavê xwe de diçû û çaxê ku xelkê xwest ku birca Bajarê Babîlê ava bikin, me careke din ev yek dît.
Bi kurtvebirrîn, serhatiya zarokên Adem ev e ku mirov ne rastdar e, lê belê sûcdar e.

Nivîsarên Pîroz vê yekê weha dibêjin: *«**Hemû** di bin hêza guneh de ne… **Tu kesê rast tune, tenê yek jî tune**… **Hemû ji rê derketin**, hemû bi hev re bêkêr bûn. **Tu kesê ku qenciyê dike tune, yek tenê jî tune**.* (Romayî 3:9.10.12)

Wek ku me sûcê mirovan dît, wusa jî me **rastdariya Xwedê** dît.
Kitêba Pîroz ji me re dibêje: *«Xwedê **ronahî** ye û li ba wî qet tarî tune.»*
(Yûhenna I, 1:5)

Bi vê yeka ku Xwedê Lûsîfer, yanî Îblîs ji ber quretî û serhildana wî ji ba xwe derxist, me rastdariya Xwedê dît. Bi vê yeka ku Xwedê Adem û Hewa ji ber neguhdariya wan ji baxçê Êdenê derxistin, me eynî ev rastdariya Xwedê dît. Dema ku Xwedê soz da ku wê xilaskarekî pîroz bişîne dinyayê, da ku deynê gunehên zarokên Adem bide, wî rastdariya xwe diyar kir. Me dît ku qanûna ku dibêje *«bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin»* jî nîşaneke rastdariya Xwedê ye. (Îbranî 9:22)

Gava ku Xwedê pêşkêşa Habîl qebûl kir û ya Qayîn red kir, wî rastdariya xwe kifş kir. Dilê Qayîn ji Xwedê dûr bû û goriya wî li Xwedê xweş nehat.
Bi vê yeka ku Xwedê bîhna xwe gelek fireh kir, da ku mirov tobe bikin û piştî demeke dirêj, tofan rakir ku mirovên neheq helak bike, me rastdariya Xwedê dît. Û gava Xwedê zimanê mirovên ku li Babîlê li hember wî rabûn, tevlihev kir, me eynî ev rastdariya Xwedê dît.

Erê, Xwedê rast e û **li gor pîvana xwe ya rast dîwana mirovan dike**.
Kirinên mirov ên qenc jî ne bêkêmahî ne, loma mirovên sûcdar û gunehkar nikarin bi saya kirinên xwe nêzîkî Xwedê bibin. Xwedê dîwana her tiştê ku guneh tê de heye, dike û tiştekî weha tu caran qebûl nake.
Nivîsarên Pîroz dibêjin:
*«Xwedayê me agirek e ku dixwe û tune dike… Xudan wê dîwana gelê xwe bike.» Tiştekî tirsehêz e ku mirov bikeve destê Xwedayê jîndar.»* (Îbranî 12:29; 10:30.31)

Yanî Xwedê di van deriyên pêşî yên Tewratê de ji me re dide zanîn ku ew bi xwe rastdar e, yanî rastdariya wî bêkêmahî ye.
Gelo ma mana vê ev e ku Xwedê mirovê sûcdar tu caran qebûl nake?
Yanî ma ji me re qet hêvî nemaye? **Na, şikir ji Xwedê re, hêvî û derfet heye.**
Xwedê li gor rehm û kerema xwe riya xilasiyê amade kir.
Bi vê riyê zarokên Adem ên sûcdar dikarin li ber Xwedê rastdar derkevin.
Gelo, ma tu vê riya ku Xwedê ji bo me amade kiriye, dizanî?
Eger tu hê zelal fêm nekî, tu di bernameyên ku bên de jî bi me re be!
Xwedê hez bike emê hingê li serhatiya Birahîm pêxember binêrin; ji wî re *dostê Xwedê* hat gotin. Di serhatiya wî de emê hê zelaltir bibînin ka mirov çawa dikare li ber Xwedê rast bê hesabkirin.

Em niha bi van gotinên Xwedê silavan li we dikin û hêvî dikin ku hûn qenc li ser wan bifikirin. Kitêba Pîroz dibêje:
***«Ji berê ve her çi hatibe nivîsîn, ji bo perwerdebûna me hatiye nivîsîn, da ku bi sebir û bi handana Nivîsarên Pîroz hêviya me hebe.»*** (Romayî 15:4)

Em di dersên xwe yên bihurtî de li ser Xwedê û li ser Riya Rastdariyê hîn bûn. Me li serhatiyên Adem û Hewayê, Qayîn û Habîl, Şît û Henox, Nûh û nifşê wî, Nimrod û Birca Babîlê nêrî.
Me dît ku bi tenê hinekan ji bavkalên me li gor emrê Xwedê kir û di Riya Rastdariyê de çûn. Piraniya mirovan li pey Îblîs û riya wî ya neheqiyê çûn.

Îro emê bala xwe bidin serhatiya zilamekî bi nav û deng.
Wî di Peyva Xwedê de û ji bo plana Xwedê ya xilasiyê cihekî girîng stand.
Di Kitêba Pîroz de jê re weha tê gotin: «Dostê Xwedê» û «Bavê hemû bawermendan». Gelo tu dizanî ew kî ye? Ew pêxemberê Xwedê Birahîm e.
Nivîsarên Pîroz dûr û dirêj li ser wî dipeyivin. Navê wî di Nivîsarên Pîroz de ji kêmahî ve 300 caran derbas dibe.
Loma Xwedê hez bike, emê hem îro û hem jî di bernameyên ku bên de di Nivîsarên Pêxemberan de lêkolînekê bikin, da ku em hîn bibin ka ew li ser «Dostê Xwedê» çi dibêjin.

Îro emê li destpêka serhatiya Birahîm binêrin û emê bibînin ka Xwedê çawa gazî Birahîm kir ku li pey wî here û emê bibînin ka çima Xwedê gazî wî kir.

Beriya ku em dest pê bikin, divê hûn bizanin ku pêşî navê Birahîm ne Birahîm bû, lê Avram bû. Di bernameyên ku bên de emê bibînin ka çima Xwedê navê Avram guhert, kir Birahîm.
Lê ji bo îro emê bînin bîra xwe ku pêşî navê Birahîm Avram bû.
Di kitêba pêşî ya Tewratê, di deriyê 11'an de em dibînin ku Avram ji dûndana Sam bû. Gelo tê bîra we ku Sam, Ham û Yafêt kî bûn?
Ew her sê kurên Nûh bûn û wek ku me got, Avram ji malbata Sam bû.
Navê bavê Avram Têrah bû. Di Nivîsarên Pîroz de weha dibêje:
«Têrah bû bavê Avram, Nehor û Haran. Haran bû bavê Lût.» (Destpêkirin 11:27)

Lût kurê birayê Avram ê mezin bû. Bavê Lût miribû. Navê jina Avram Saray bû. «Saray bêber bû, zarok jê re çênedibûn.» (Destpêkirin 11:30)
Bavê Avram û Sarayê eynî bû, lê diya wan ne eynî bû.

Avram li bajarê Ûrê rûdinişt. Ûr bajarekî welatê Kildaniyan bû û îro dikeve başûrê Îraqê. Ew bajar ne gelekî dûrî Babîlê bû, yanî ne gelekî ji wî cihî dûr bû yê ku mirovan dixwest ku birceke bilind tê de ava bikin. Xelkê Ûrê û yê li der û dorê hemû pûtperest bûn. Wek hemû zarokên Adem, Avram jî di taristaniya guneh de hat dinyayê. Ne bavê Avram Xwedayê rast nas dikir û ne jî Avram bi xwe.
Lê belê Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku rojekê Xudan Xwedê xwe ji Avram re eşkere kir û bi wî re peyivî.
Di dem û zemanên bihûrtî de Xwedê carna rast û rast bi dengê xwe bi mirovan re dipeyivî, çimkî hê Kitêbên Pêxemberan di destê wan de nebûn.
Îro Xwedê di Nivîsarên Pîroz de ji mirovan re dipeyive. Loma îro ne pêwist e ku em dengekî ji ezmên bibihîzin, an dîtinekê bibînin an jî rastî milyaketekî bên, ku em Riya Xwedê ya Rastdariyê nas bikin.
Çaxê ku em Nivîsarên Pîroz dixwînin, an guhê xwe didin wan, hingê em guhê xwe didin dengê Xwedê.

Niha emê bibihîzin ka Xwedê çi ji Avram re got. Di deriyê 12’an, ayeta pêşî de, em weha dixwînin: «Xudan ji Avram re got: «Ji welatê xwe, ji ba gelê xwe û ji mala bavê xwe derkeve û here wî welatê ku ezê nîşanî te bidim.» (Destpêkirin 12:1)

Gelo te bihîst ka Xwedê çi emir li Avram kir? Wî jê re got ku ji mala bavê xwe derkeve, xatirê xwe ji mirovên xwe bixwaze, ji welatê xwe derkeve û here welatekî ku Xwedê wê nîşanî wî bida.
Li gor fikrên mirovan, daxwaza Xwedê ne tiştekî hesanî bû, lê belê plana Xwedê ew bû ku bi vî awayî Avram gelek pîroz û bimbarek bikira.

Em niha careke din ji ayêta pêşî û heta ya sisiyan dixwînin, da ku em fêm bikin ka çima Xwedê gazî Avram kir û jê re got ku ji mala xwe derkeve û here welatekî din.

Di Tewratê de weha dibêje: «Xudan ji Avram re got: ‹Ji welatê xwe, ji ba gelê xwe û ji mala bavê xwe derkeve û here wî welatê ku ezê nîşanî te bidim.

Ezê te bikim miletekî mezin û ezê te bereket bikim. Ezê nav û dengê te derînim û tê pîroz bî. Yên ku te pîroz bikin, ezê wan pîroz bikim. Û yên ku nifirê li te bikin, ezê nifirê li wan bikim. Hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.›» (Destpêkirin 12:1-3)

Çima Xwedê emir li Avram kir ku here welatekî din? Bersîva vê yekê ev e: Plana Xwedê ew bû ku wî ji Avram û dûndana wî miletekî nû rakira, da ku ji wî gelê nû pêxemberên Xwedê bihatan û Xilaskarê dinyayê jê derketa. Loma Xwedê soz da Avram û jê re got: «Ezê te bikim miletekî mezin …û tê pîroz bî…û hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.»

Di van peyvan de rastiyeke mezin heye. Gelo te ev yek fêm kir? Xwedê Avram bijart, da ku ew bibe bavê wî nifşê ku Xilaskarê dinyayê wê jê derketa. Xwedê soz da ku ewê Xilaskar bişînê û got ku ewê bibe Xilaskarekî ji bo hemû eşîr û miletên vê dinyayê. Her kesê ku baweriyê bi wî Xilaskarî bîne, wê ji hukumdariya guneh û ji desthilatiya Îblîs û ji agirê herheyî xilas bibe.

Yanî kifş dibe ku Xwedê gazî Avram kir, da ku plana wî pêş ve here. Û wek ku me bihîst, plana Xwedê ew bû ku Xilaskar bê dinyayê, da ku gunehkaran rizgar bike.

Xwedê xwest ku Avram bibe bavê wî gelê ku Xilaskarê dinyayê wê jê derketa.

Soza ku Xwedê da Avram û peymana ku Xwedê bi wî re girêda ev bû.

Şertê wê ev bû ku Avram ji welatê xwe derketa û biçûya wî cihê ku Xwedê wê nîşanî wî bida.

Ma tu çi difikirî? Gelo ma Avram guhê xwe da emrê Xwedê? Peyva Xwedê weha dibêje:
«Avram wek ku Xudan jê re gotibû çû. Lût jî bi wî re çû. Çaxê ku Avram ji Heranê derket, heftê û pênc salî bû. Wî bi xwe re jina xwe Saray, biraziyê xwe Lût û hemû malê xwe yê ku li Heranê bi dest xistibû û yên ku bûbûn xulamên wî, bi xwe re birin. Ew ber bi welatê Kenanê ve ketin rê û gihîştin wê derê.»
(Destpêkirin 12:4-5)

Çima Avram li gor emrê Xwedê kir û pişta xwe da mirovên xwe û dînê wan? Sedemê vê yekê bi tenê ev bû: Avram li Xwedê ewle bû. Avram nizanibû ka ewê here ku derê, lê wî ji gotinên Xwedê bawer kir. Xwedê gotibû: «Derkeve! Eger tu herî, ezê te pîroz û bimbarek bikim.»
Avram li Xwedê ewle bû û wek ku Xwedê jê re gotibû, dev ji welatê xwe berda û çû. Xwedê jî li gor dilsoziya xwe bû rêberê wî, ew bir welatê Kenanê, yanî ew bir welatê Îsraêl û Filistînê.

Erê, dîroka gelê Xwedê bi Avram û bi jina wî Sarayê dest pê dike. Ew li Xwedê ewle bûn û Birahîm hem bû bavkalê bawermendan û hem jî bû bavkalê wî gelê ku Xilaskarê dinyayê wê jê derketa. Xwedê bi vî awayî plana xwe pêş ve bir.
Guhdarên delal, heta bernameya ku bê, van gotinan bînin bîra xwe yên ku dibêjin:

«Hemû eşîrên li ser rûyê erdê, wê bi te pîroz bibin … Avram wek ku Xudan jê re gotibû çû.»

Xwedê bi we re be!

Me di bernama xwe ya din de dest bi serhatiya Avram, yanî bi serhatiya Birahîm kir û me dît ku ew di plana Xwedê de cihekî pir girîng distîne.
Me bihîst ku Xudan ji Avram re got: «Ji welatê xwe, ji ba gelê xwe û ji mala bavê xwe derkeve û here wî welatê ku ezê nîşanî te bidim.» (Destpêkirin 12:1)
Malbata Avram li bajarê Ûrê rûdinişt, lê Xwedê gazî wî kir ku here welatekî din. Avram bi xwe nizanibû ew welatê nû li ku derê ye, lê wî ji Xwedê bawer kir, ket rê û piştî demekê gihîşt welatê Kenanê.

Piştî vê yekê Nivîsarên Pîroz dibêjin:
«Avram di welêt de digeriya… Hingê Kenanî li welêt dijiyan. Xudan li Avram xuya bû û got: «Ezê vî welatî bidim dûndana te.»» (Destpêkirin 12:6-7)

Li vir em dibînin ku Xwedê ne tenê soz dabû Avram ku ewê bibe bavê miletekî nû, lê soz da wî ku wê welatekî nû jî bide wî. Loma Xwedê jê re xuya bû û jê re got: «Ezê vî welatî bidim dûndana te.»

Careke din em li vir tiştekî ku di ser şehrezayiya mirovan re ye dibînin. Ji xwe her gav li tevahiya Kenanê gelek mirov hebûn û ew xelkê wî welatî bûn.
Çawa çêdibû ku Avram û dûndana wî bibûna xweyiyê wî welatî? Avram 75 salî bû, jina wî 65 salî bû û tu zarokên wan nebûn!
Ev yek wê çawa çêbûya? Ma zarokên wan wê ewqas bûna ku bikarîna ew welat bixistan destê xwe?

Em dikarin ji bo vê soza Xwedê mînakekê bêjin. Mesele, em bêjin, zilamekî pîr ê ku tu zarokên wî tune ji welatekî dûr bê Kurdistanê. Ew bi jina xwe ya pîr ve tê, lê jina wî nikare zarokan bîne. Çaxê ku ew digihîjin Kurdistanê, yek tê û ji wan re dibêje: «Rojekê tevahiya Kurdistanê wê ya we be!» Ji xwe zilamê pîr wê bikene, bêje:

«Henekên te pir xweş in! Zarokên me wê çawa bibin xweyiyê Kurdistanê? Ji xwe zarokên me tunin! Ez yekî kalepîr im; zarokên min tunin û jina min jî zarokan nayîne – û tu ji min re dibêjî ku dûndana te wê zêde bibe û wê bibe xweyiyê Kurdistanê? Ma tu çawa vê yekê ji min re dibêjî?»

Belkî em li ser vê meselê dikenin, lê belê eger em li gor bîr û baweriya mirovan bifikirin, soza ku Xwedê dabû Avram, weha bû. Avram pîr bû, zarokên wî nebûn û jina wî jî nikaribû zarokan bîne.
Niha guhê xwe bidin wê soza ku Xwedê da Avram. Di Nivîsarên Pîroz de weha dibêje:

«Ezê hemû vî welatê ku tu dibînî, ji bo her û her bidim te û dûndana te. Ezê dûndana te wek toza erdê zêde bikim. Wusa ku mirovek bikare toza erdê bijmêre, wê bikare dûndana te jî bijimêre. Rabe, li seranserê welêt bigere, çimkî ezê wî bidim te.» (Destpêkirin 13:15-17)

Gelo Xwedê li ser soza xwe ma? Ma Xwedê Avram kir miletekî mezin? Gelo Xwedê welatê Kenaniyan da dûndana Avram? Bê şik, Xwedê tam li gor soza xwe kir. Di dersên ku bên de emê bibînin ku Avram bû bavê miletê Îbraniyan û piştî çend sedsalên din, Xwedê ew welat da wan û ew bû welatê Îsraêl.

Em niha vegerin ser mijara Avram û Nivîsarên Pîroz. Ew dibêjin:

«Avram li wî cihê ku Xudan lê xuya bûbû, gorîgehek çêkir.
Piştre wî ji wir da rê û ew ber bi çiyayên rojhilata Beyt–Êlê ve çû û konê xwe danî. Li wir wî ji Xudan re gorîgehek çêkir û perizî Xudan.» (Destpêkirin 12:7-8)

Çaxê ku Avram gihîştibû welatê nû ê ku Xwedê nîşanî wî dabû, tiştê ku pêşî wî kir çi bû? Avram pêşî gorîgehek çêkir, heywanek serjêkir û li ser gorîgehê

şewitand. Wek ku Habîl, Şît, Henox û Nûh dikirin, Avram jî bi eynî awayî heywan dikirin gorî û diperizî Xwedê.
Çima Avram weha kir? Avram dizanî ku Xwedê bi wî awayî tê perizîn.
Şerîeta Xwedê di dema Avram de eynî bû û dibêje: «Bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.» (Îbranî 9:22)
Wek hemû zarokên Adem ên din, Avram jî gunehkar bû.
Lê belê Xwedê çavên xwe li gunehên Avram neqandin, ji ber ku Avram ji Xwedê bawer kir û di gorîkirinê de xwîna heywanan rijand.
Ev jî bû mînaka Xilaskarê pîroz ê ku wê bihata dinyayê, da ku di cihê gunehkaran de bibûya gorî û bimira.

Wextê me nemaye, lê tiştê ku em îro hîn bûne, gelek girîng e û divê ku em vê yekê ji bîr nekin. Gelo hûn niha fêm dikin, ka çima Xwedê gazî Avram kir? Xwedê çima dixwest ku Avram dev ji mirovên xwe û ji welatê xwe berde û here cihekî din?
Erê, plana Xwedê ew bû ku wê Avram bikira miletekî nû, da ku ew ji bo hemû miletên dinyayê bibûya çavkaniya bereketê. Gazîkirina Avram parçeyeke plana Xwedê bû.
Hê di bexçê Êdenê de, çaxê ku Adem û Hewayê guneh kiribûn, Xwedê li ser vê planê gotibû.
Gelo tê bîra we ku Xwedê soz da ku rojekê yek wê bê vê dinyayê ku zarokên Adem ji qeweta Îblîs rizgar bike? Piştî du hezar sal / salan, yanî di dema Avram de jî, Xwedê ev soz ji bîr nekiribû. This is strange, ask Cemil

Îro me dît ku Xwedê li gor dilsoziya xwe gazî Avram kir, da ku ew bibe bavê miletekî ku Xilaskarê dinyayê jê rabe.
Ji ber vê yekê Xwedê ji Avram re got:
«Ezê te bikim miletekî mezin û ezê te bereket bikim. Ezê nav û dengê te derxim û tê pîroz bî. Yên ku te pîroz bikin, ezê wan pîroz bikim. Û yên ku nifirê li te

bikin, ezê nifirê li wan bikim. Hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.» (Destpêkirin 12:2-3)

Gelo niha hûn van tiştan qenc fêm dikin?
Bi destûra we, emê niha çend pirsan bêjin; ew bi awayekî zelal dabaşa me ya îro kifş dikin.
Ya pêşî ev e: Çima Xwedê gazî Avram kir û jê re got ku ji welatê xwe derkeve, here welatekî din?
Bersîv ev e: Plana Xwedê ew bû ku Avram bike miletekî nû.
Pirsa diduyan ev e: Çima Xwedê dixwest ku Avram bike miletekî nû?
Bersîva vê jî ev e: Plana Xwedê ew bû ku ew pêxemberan, Nivîsarên Pîroz û di dawiyê de Xilaskarê pîroz bi saya wî miletê nû ji mirovan re bişîne.
Yanî em dibînin ku bi gazîkirina Avram, Xwedê plana xwe ya ji bo xilaskirina mirovan pêş ve bir.

Hevalên delal, divê ku em li vir bernama xwe bi dawî bikin. Lê di bernameya ku bê de, emê binêrin ka çima ji Avram re «Dostê Xwedê» tê gotin.

Heta hingê, li ser vê gotina Xwedê qenc bifikirin a ku dibêje:

«Ezê te bikim miletekî mezin û tê pîroz bî. Hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.» (Destpêkirin 12:2-3)

Xwedê bi we re be!

Me di dersa xwe ya din de dest bi serhatiya Birahîm kir û em hîn bûn ku navê wî pêşî Avram bû.
Me dît ku Avram li welatê Kildaniyan ê ku îro dikeve welatê Îraqê, hat dinyayê. Miletê wî welatî pûtperest bûn, lê Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku rojekê Xudan Xwedê ji Avram re xuya bû û jê re got ku ji mala bavê xwe derkeve û here welatekî ku Xwedê wê nîşanî wî bidabûya.

Gelo tê bîra we ka çima Xwedê emir li Avram kir ku here welatekî din?
Sedem ew bû ku Avram li gor plana Xwedê bibe miletekî nû û ji wî miletê nû pêxemberên Xwedê derkevin û di dawiyê de Xilaskarê dinyayê bi xwe jî ji wî miletê nû rabe.
Yanî me dît ku Xwedê bi gazîkirina Avram, plana xwe ya xilasiyê pêşve bir, da ku Xilaskar bê vê dinyayê.
Ji ber vê yekê Xwedê ji Avram re got: «Tê pîroz bî… û hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.» (Destpêkirin 12:2-3)

Me dît ku Avram li gor peyva Xwedê kir û ji bajarê xwe derket, lê wî hê jî nizanibû ka Xwedê wê wî bibe ku derê. Çaxê ku Avram ket ser rê, ew 75 salî bû. Wî jina xwe Saray û Lût, yanî kurê birayê xwe yê mezin û hemû hebûna xwe û hemû xulamên xwe, bi xwe re birin û ber bi welatê Kenanê ve çû.
Welatê Kenanê îro bi navê welatê Îsraêl û Filistînê tê naskirin.

Çaxê ku Avram gihîşt welatê Kenanê, Xudan ji nû ve jê re xuya bû û jê re got: «Ezê vî welatî bidim dûndana te.» (Destpêkirin 12:7)
Yanî me dît ku Xwedê ne tenê soz da ku Avram bike miletekî nû, lê soz da wî ku welatekî nû jî bide dûndana wî, da ku ew tê de rûnin.

Çi tiştekî ecêb e! Avram û jina xwe herdû jî pîr bûn û zarokên wan jî nebûn. Ma ev soza Xwedê wê çawa bihata cih? Emê wê bersîva ku Xwedê dide vê pirsê, zû bibînin.

Niha em dixwazin di serhatiya Avram de pêşve herin. Em di Tewratê de, kitêba Destpêkirinê dixwînin. Di deriyê 13'an de emê bibînin ku di nav Avram û biraziyê wî Lût de çi çêbû. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

«Avram bi keriyên heywanan û bi zîv û zêr pirr dewlemend bû. …
Ew cih bi cih çû heta Beyt–Êlê, heta wî cihê ku di nav Beyt–Êlê û Ayê de ye;
di destpêkê de wî konê xwe li wê derê danîbû û li wir gorîgeh çêkiribû.
Li wir, Avram perizî Xudan.
Kon, pez û dewarên Lûtê ku bi Avram re çûbû jî hebûn.
Erd têra wan nedikir ku bi hev re rûnin, çimkî malê wan pir bû û êdî nikaribûn bi hev re bimînin. Di nav şivanên Avram û şivanên Lût de pevçûn çêbû. ….
Îcar Avram ji Lût re got: «Bila di nav min û te de û di nav şivanên min û şivanên te de pevçûn çênebe, çimkî em bira ne. Ma hemû welat ne li ber te ye?
Em ji hev veqetin. Eger tu herî aliyê çepê, ezê herim aliyê rastê;
eger tu herî aliyê rastê, ezê herim aliyê çepê.»
Lût serê xwe bilind kir û dît ku deşta Çemê Urdunê heta bi Soarê wek baxçê Xudan, wek welatê Misrê şîn û bi av bû. (Hingê hê Xudan Sodom û Gomora wêran nekiribûn.)
Lût hemû deşta Urdunê ji xwe re hilbijart û ber bi Rojhilat ve koç kir. Bi vî awayî ew ji hevdû veqetiyan: Avram li welatê Kenanê û Lût li bajarên deştê rûnişt û bi aliyê Sodomê ve konên xwe vedan. Lê belê xelkê Sodomê xerab bû û li dijî Xudan pir guneh dikirin.»

Li vir em dibînin ku Lût erd û zeviyên avî ji xwe re hilbijartin û erdê dêm ji apê xwe re hişt. Lê belê cihê ku Lût ji xwe re hilbijart di diyarê Sodomê de bû û Sodom tije guneh û xerabî bû!

Lût li gor daxwaza xwe hilbijart, lê Avram daxwaza Xwedê hilbijart. Xwedê hez bike emê piştî du dersên din bibînin ka çi hat serê Lûtê ku li gor daxwaz û xwestekên xwe kir. Di dawiyê de, Lût her tişt winda kir: Wî hebûna xwe, jina xwe, keçên xwe, şahiya xwe û şahidiya xwe ya qenc winda kir. Heçî Avram bû, wî her tişt di destê Xwedê de hişt û Xwedê ew gelek pîroz û bimbarek kir.

Serhatiya Lût û Avram çawa dikare bi kêrî me bê?
Em dikarin pirseke biçûk ji xwe bipirsin: Ka gelo em bêtir wek Avram an wek Lût in? Ez li xwe binêrim: Ma ez wek Lût li tiştên vê dinyayê digerim, an ez wek Avram li tiştên Xwedê û li tiştên dinya ku bê digerim? Rewşa me jî weha ye, divê em biryara xwe bidin û hilbijêrin. Daxwaza min heye û daxwaza Xwedê heye. Bê şik yê şehreza wê ji xwe re daxwaza Xwedê hilbijêre. Nivîsarên Pîroz dibêjin:
«Mirovek hemû dinyayê bi dest bixe jî, lê jiyana xwe winda bike, çi feyda wî heye?» (Marqos 8:26)
«Ji dinyayê û tiştên ku di dinyayê de ne, hez nekin… Çimkî dinya û xwesteka wê derbas dibe, lê yê ku daxwaza Xwedê dike her û her dijî.» (Yûhenna I, 2:15.17)
Ew tiştê ku tu ji hemû tiştên din bêtir dixwazî, çi ye? Tiştên vê dinyayê ne, an tiştên Xwedê yên herheyî ne?

Em niha vegerin serhatiya Avram. Kitêba Pîroz dibêje:
«Piştî ku Lût ji ba wî veqetiya, Xudan ji Avram re got: «Niha serê xwe rake û ji cihê ku tu lê yî, li bakûr û başûr, li rojhilat û rojava binêre. Ezê hemû vî welatê ku tu dibînî, ji bo her û her bidim te û dûndana te. Ezê dûndana te wek toza erdê zêde bikim. Wusa ku mirovek bikare toza erdê bijmêre, wê bikare dûndana te jî bijimêre. Rabe, li seranserê welêt bigere, çimkî ezê wî bidim te.»

Avram konê xwe hilanî û hat Hevronê, li darmaziyên Mamrê rûnişt û li wir gorîgehek ji Xudan re çêkir.» (Destpêkirin 13:14-18)

«Piştî wan tiştan, Xwedê di dîtinekê de ji Avram re weha got: «Netirse, Avram. Ez ji bo te mertal im, ez xelatê te yê gelek mezin im.»
Avram got: «Ya Xudan Xweyiyê min, tê çi bidî min? Ez bê zarok diçim.
Malê min wê ji vî Eliyezerê Şamî re bimîne.»
Avram berdewam kir û got: «Te dûndan neda min. Loma xulamê mala min wê bibe wêrisê min.»
Hingê peyva Xudan ji Avram re hat, got: «Ew nabe wêrisê te. Lê yê ku wê ji pişta te be, wê bibe wêrisê te.»
Û Xudan ew deranî derve û got: «Li ezmên binêre. Eger tu bikarî stêran bijmêrî, wan bijmêre. Dûndana te wê evqas be.» (Destpêkirin 15:1-5)

Çi tiştekî ecêb e! Avram û jina xwe pîr bûn û zarokên wan tune bûn. Lê dîsa Xwedê ji nû ve soz da wî û li ser miletekî mezin ê ku wê ji pişta wî derketa, got. Ev çawa dibe?
Avram wê çawa bibûya bavê miletekî mezin? Bersîva rast bi tenê ev e: Xudan Xwedê, Xwedayê karîndarê her tiştî ye. Xwedê mezin e! Tiştek tune ku ji bo wî zehmet be! Tiştê ku Xwedê dibêje, ew dike jî.

Guhdarên delal, di bernameyên ku bên de emê binêrin ku Xwedê çawa ew soza xwe anî cih. Û emê binêrin ka gelo Avram ji Xwedê bawer kir, an bawer nekir. Loma ji bo bernameyên ku bên jî bi me re bin.
Heta hingê, li ser van gotinên Kitêba Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin:
«Mirovek hemû dinyayê bi dest bixe jî, lê jiyana xwe winda bike, çi feyda wî heye?» (Marqos 8:26)

Me di bernama xwe ya din de dît ku Avram bi Lût re bi xêr û silamet gihiştibû welatê Kenanê. Lê belê di nav şivanên Avram û Lût de zû pevçûn çêbûn, çimkî keriyên wan pir mezin bûn û erd têra wan nedikir û wan nikaribû ku ew bi hev re bimînin.
Lût biraziyê Avram bû û jê ciwantir bû, lê Avram peşniyarî wî kir ku Lût pêşî cihê xweş ji xwe re hilbijêre û Lût jî cihê herî qenc û bi av ji xwe re bijart. Hingê Lût rabû, bi keriyên heywanên xwe ve çû û konên xwe di nav gunehkarên Sodom û Gomorayê de danîn.

Piştî vê yekê Xwedê ji Avram xuya bû û jê re got:
«Netirse, Avram. Ez ji bo te mertal im, ez xelatê te yê gelek mezin im.
Li ezmên binêre. Eger tu bikarî stêran bijmêrî, wan bijmêre. Dûndana te wê evqas be.» (Destpêkirin 15:1-5)

Lê belê em dizanin ku di wê demê de qet zarokên Avram û Sarayê nebûn!
Xwedê sozeke ku li gor bîr û baweriya mirovan çênabe dabû Avram!
Gelo Avram ji Xudan bawer kir? Guhê xwe bide van peyvên Nivîsarên Pîroz.
Ew dibêjin: «Avram ji Xudan bawer kir û wî ev yek jê re rastdarî hesab kir.» (Destpêkirin 15:6)

Çiqas xweş e ku Xwedê sozeke ku li gor hişê mirovan li derveyî aqil e, da Avram. Lê belê dîsa jî, bersîva Avram çi bû? Wî ji Xwedê û ji soza wî bawer kir! Îcar Xwedê li ser vê yekê çi kir? Ji ber baweriya Avram, Xwedê ew rast hesab kir!

Bi rastî, eger tu bixwazî di çavên Xwedê de rast bî, divê dilê te bi vê rastiya kûr pir şa bibe!
Çima Xwedê Avram mirovekî rast hesab kir?

Ma Avram bi xwe zilamekî rast bû? Na, tu caran! Di dersa ku bê de emê bibînin ku Avram wek hemû zarokên Adem gunehkar bû.
Nexwe çima Xwedê Avram rast hesab kir?
Xwedê Avram mirovekî rast hesab kir, ji ber ku Avram ji peyva Xwedê bawer kir!

Eger yek ji Xwedê bawer bike, divê em vê yekê çawa fêm bikin?
Belkî hûn dizanin ku Nivîsarên Pêxemberan bi zimanê Îbranî hatibûn nivîsandin. Bi Îbranî peyva bawerkirinê „AMAN" e. Gelek mirov di dawiya duakirinê de dibêjin: Amîn.
Mana vê ev e ku mirov dibêje: «Erê, ev rast e» an jî «Belê, ez vê yekê qebûl dikim.» Mana bawerkirinê ev e. Çaxê ku Xwedê soz da Avram, bersîva Avram a ji dil ev bû: «Amîn! Erê, ev rast e! Ez ji peyvên te bawer dikim!»
Ji ber vê peyva biçûk Amîn, yanî ji ber qebûlkirina peyva Xwedê, Xwedê Avram rast hesab kir.

Hûn li ser vê yekê çawa difikirin? Gelo hûn jî dixwazin ku Xwedê we wek Avram rast hesab bike?
Hingê divê wek ku Avram ji Xwedê bawer kir, hûn jî weha ji Xwedê bawer bikin. Zehmet be jî, divê hûn ji peyvên Xwedê bawer bikin.
Belkî mirovên te, an dost û hevalên te Peyva Xwedê qebûl nekin, lê dîsa jî divê tu Peyva Xwedê qebûl bikî. Xwedê dixwaze cilên rastdariyê li te bike; ew dixwaze desthilatiyê bide te ku tu her û her li ba wî bijî, lê divê tu ji Peyva Xwedê bawer bikî! Nivîsarên Pîroz dibêjin:
«Bê bawerî çênabe ku mirov li Xwedê xweş bê.» (Îbranî 11:6)
«Hûn bi riya baweriyê, bi keremê xilas bûn û ev ne ji we ye, diyariya Xwedê ye. Ev ne ji kirinan e, da ku tu kes pesnê xwe nede.» (Efesî 2:8-9)

«Nexwe em li ser Birahîmê ku li gor bedenê bavkalê me ye çi bêjin? Eger Birahîm ji ber kirinên xwe rastdar derketibe, heqê wî heye ku pesnê xwe bide, lê belê ne li ber Xwedê. Ma Nivîsara Pîroz çi dibêje?
«Birahîm ji Xwedê bawer kir û ev yek jê re rastdarî hat hesabkirin.» (Romayî 4:1-3)

Avram ji peyvên Xwedê bawer kir. Loma Xwedê rastdariya xwe ya bêkêmahî da wî. Û di vê yekê de tiştê herî newaze ev e:
Ev peyvên Nivîsarên Pîroz ên ku dibêjin: «Birahîm ji Xwedê bawer kir û ev yek jê re rastdarî hat hesabkirin» ne tenê ji bo Avram in. Ew ji bo me jî tên gotin. Eger em ji Mizgîniya Xwedê bawer bikin, Xwedê wê rastdariya xwe ya bêkêmahî bide me jî. Ji xwe ev Mizgînî li ser wî Xilaskarî ye yê ku piştî demeke dirêj ji malbat û dûndana Birahîm hat vê dinyayê.

Tu li ser van tiştan çi dibêjî? Gelo bi rastî tu ji Xwedê bawer dikî?
Qenc guhê xwe bidin:
Pirs ne ev e ku tu bawer dikî ku Xwedê heye, an tu bawer dikî ku Xwedê yek e.
Li ser van tiştan Kitêba Pîroz dibêje: «Ma tu bawer dikî ku Xwedê yek e? Tu qenc dikî. Cin jî bawer dikin - û dilerizin.» (Aqûb 2:19)
Îblîs bi xwe jî dizane ku Xwedê yek e.
Lê belê baweriyeke weha nayê wê manê ku Xwedê wê gunehên te afû bike û te rastdar hesab bike.
Tiştê ku Xwedê dixwaze ev e ku tu ji Peyva Xwedê bawer bikî û wê qebûl bikî.
Xwedê dixwaze bi Nivîsarên Pêxemberan bi te re bipeyive.
Ew dixwaze ku tu Mizgîniya xilasiyê nas bikî û jê bawer bikî, çimkî di Mizgîniyê de ew nîşanî te dide ku tu çawa dikarî li ber Xwedayê pîroz rastdar bêyî derxistin û her û her li ba wî bijî.

Hevalên delal, gelo Xwedê cilên rastdariya xwe daye we?
An bi tenê we cilên dîn û diyanetê li xwe kirine?

Gelo hûn guhê xwe didin peyvên Xwedê yên dilsoz?
An hûn guhê xwe didin peyvên mirovan ên ku zû derbas dibin?
Ma tu dizanî ku Nivîsarên Pîroz li ser Riya Rastdariyê ya ku Xwedê amade kiriye, çi dibêjin? Ma tu ji vê yekê bawer dikî?

Heçî Avram bû, wî ji peyvên Xwedê bawer kir. Erê, ji bo Avram mana vê ew bû ku ew xatir ji dîn û diyaneta bavê xwe û ji mirovên xwe bixwaze.
Lê belê tam ji ber vê yekê jê re dostê Xwedê hat gotin. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
«Birahîm ji Xwedê bawer kir û ev jê re rastdarî hat hesabkirin û jê re dostê Xwedê hat gotin.» (Aqûb 2:23)
Hevalê delal, gelo ma tu jî dostekî Xwedê yî?

Divê em îro li vir bernama xwe bi dawî bikin. Em pir sipas dikin ku we qenc guhdariya bernama me kir.
Em ji bo bernameyên ku bên jî li hêviya we ne; hingê emê li serhatiya Avram û Simayîl binêrin.

Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin:
«Birahîm ji Xwedê bawer kir û ev jê re rastdarî hat hesabkirin û jê re dostê Xwedê hat gotin.» (Aqûb 2:23)

Xwedê we pîroz û serfiraz bike û dilekî nefsbiçûk bide we ku hûn bikarin wek Birahîm bawer bikin.

Di herdû dersên din de me di Tewratê de li serhatiya Birahîm pêxember nêrî. Di destpêkê de navê Birahîm Avram bû û emê di bernameya îro de bibînin ka çima Xwedê navê Avram guhert, kir Birahîm.

Beşê pêşî yê bernameya îro serhatiyeke xemdar e, çimkî Avram tiştekî ne li gor daxwaza Xwedê kir. Mirov hene dibêjin ku pêxemberên Xwedê tu caran tu guneh nekirin. Lê belê Peyva Xwedê diyar dike, dibêje: «Tu cihêtî tune: Hemûyan guneh kir û ji rûmeta Xwedê bêpar man»
û weha jî dibêje: «Eger em bêjin: ‹Me guneh nekiriye›, em wî derewker dikin û peyva wî bi me re tune.» (Romayî 3:22.23) (Yûhenna I, 1:10)
Me di bernameyên berî niha de dît ku çawa gunehê Adem derbasî hemû mirovan bû. Her kesî guneh kir, bila pîr be, an xort be, bila jin be, an mêr be, bila pûtperest be, an pêxember be, ew hemû gunehkar in.
Bi tenê yek heye ku ji guneh bêrî ye, yanî bi guneh nehatiye lewitandin: Ew jî ew Xilaskarê ku Xwedê şand vê dinê ye; Xwedê ew şand dinyayê, da ku gunehkaran xilas bike. Guneh ew ne lewitand, çimkî ew ji jor, yanî ji ba Xwedayê pîroz hat.
Di bernameyên din de me dît ku Xwedê soz da Avram ku ewê wî bike miletekî mezin û got ku ji wî miletî Xilaskar wê rabe.
Me dît ku hem Avram û hem jî jina wî Saray herdû pîr bûn û tu zarokên wan nebûn. Dîsa jî Avram dudilî nebû û ji peyvên Xwedê bawer kir.
Lê belê îro emê bibînin ku deh salan piştî vê soza Xwedê, Avram dixwest ku ew bi xwe tiştekî bike, da ku ew bigihîje wê sozê. Lê belê sedemê ku Avram weha kir, ew bû ku sebra wî nemabû û gelek pirsgirêk ji wê yekê derketin.

Niha emê di Tewratê de bixwînin, ka çawa Avram û Saray xebitîn ku wî kurê ku Xwedê ji wan re soz dabû, peyda bikin.
Di Kitêba Destpêkirinê, deriyê 16’an de Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

[1] Jina Avram Sarayê jê re zarok neanîn. Cêriyeke wê ya Misrî hebû, navê wê
Hacer bû. [2] Sarayê ji Avram re got: «Va ye, Xudan nehişt ku ez zarokan bînim.
Îcar here ba cêriya min. Belkî ji min re ji wê zarok çêbin.»
Avram bi gotina Sarayê kir. [3] Îcar piştî ku Avram deh salan li welatê Kenanê
rûnişt, jina wî Sarayê, cêriya xwe ya Misrî Hacer anî û da mêrê xwe Avram, da
ku jê re bibe jin. [4] Avram jî çû ba Hacer û ew bizaro bû. Çaxê wê dît ku bizaro
ye, wê sitiya xwe biçûk dît.
[5] Hingê Sarayê ji Avram re got: «Ev neheqiya ku li min bûye, bila di stûyê te de
be. Min cêriya xwe xist berê te û çaxê wê dît ku ew bizaro ye, ez di çavê wê de
biçûk bûm. Bila Xudan di nav min û te de hakim be.»
[6] Avram ji Sarayê re got: «Va ye, cêriya te di destê te de ye. Tu her çi dixwazî,
bi wê bike.» Îcar Sarayê tengahî da wê û Hacer ji ba wê reviya.

Li vir em dibînin ku gunehê Avram di mala wî de devjenî û tehlî derxistin holê. Ji ber ku Hacer bi zaro bû, Sarayê çavnebarî dikir; Hacer jî aciz bû, çimkî Sarayê tengî dida wê. Loma Hacer ji ber Sarayê reviya, çû çolê.

Li ser vê yekê Nivîsarên Pîroz dibêjin:
[7] Milyaketê Xudan ew li çolê li ser kaniyekê dît. Ew kanî li ser riya Şûrê bû. [8]
Milyaket jê re got: «Ey cêriya Sarayê Hacer, tu ji ku derê têyî û bi ku derê ve
diçî?»
Wê got: «Ez ji ba sitiya xwe Sarayê direvim.»
[9] Milyaketê Xudan jê re got: «Li sitiya xwe vegere û serî li ber wê deyne.»
[10] Û milyaketê Xudan berdewam kir: «Ezê dûndana te pirr û pirr zêde bikim,
wusa ku ji pirbûnê neyê hijmartin.»
[11] Milyaketê Xudan berdewam kir û jê re got:
«Va ye, tu bizaro yî û tê kurekî bînî. Tê navê wî Simayîl deynî. Çimkî Xudan
hawarkirina te bihîst. [12] Ewê di nav mirovan de bibe mirovekî kûvî;
Destê wî wê li dijî her kesî û destê her kesî wê li dijî wî be.

Ewê li hember hemû birayên xwe derkeve.»
Hacer li gor gotina milyaketê Xwedê kir û li sitiya xwe Sarayê vegeriya.
Nivîsarên Pîroz weha berdewam dikin, dibêjin:
«Hacer ji Avram re kurek anî û Avram navê wî kurê ku wê anibû, Simayîl danî.
Çaxê ku Hacer ji Avram re Simayîl anî, Avram heştî û şeş salî bû.»
(Destpêkirin 16:15-16)

Îcar Simayîl çêbû, yanî ew Simayîlê ku bû bavê hemû Ereban çêbû. Xwedê xema wî dixwar û ew xweyî kir û wî di plana Xwedê de cih girt; lê belê Simayîl ne ew kur bû yê ku Xwedê soz dabû Avram. Plana Xwedê ya ji bo Avram nehatibû guhertin û hê eynî bû: Xwedê wê Avram bikira miletekî mezin. Li ba Xwedê lezgînî tune; sebra Avram nemabû, lê belê sebra Xwedê herdem heye. Xwedê her gav li ser soza xwe dimîne; tiştê ku ew bêje, ewê di wextê xwe de bike. Em di Kitêba Pîroz de dibînin ku piştî çêbûna Simayîl Xwedê 13 salan bêdeng ma û qet tiştek ji Avram re negot. Lê piştî wan 13 salan, Xwedê ji nû ve bi Avram re peyivî.

Guhdarên delal, emê di bernama ku bê de bibînin ka Xwedê piştî wan 13 salan çi ji Avram re got.
Lê ji bo îro, em dixwazin wan her sê tiştan bînin bîra xwe:

1) Li ba Xwedê lezgînî tune; ew dereng namîne û ew her gav soza xwe tîne cih.
2) Eger sebra mirov nemîne û ew biceribîne ku ew bi xwe tiştekî bike, da ku ew bigihîje sozên Xwedê, gelek pirsgirêk wê derkevin.
3) Avram pêxember bû, lê wî jî tiştekî ne li gor daxwaza Xwedê kir, ji ber ku ew jî wek hemû mirovên din li ber Xwedê gunehkar bû.

Dostên delal, em gelek spas dikin ku we qenc guhdarî kir.
Heta bernameya ku bê, qenc li ser wan gotinên Nivîsarên Pîroz bifikirin ên ku dibêjin:

«Tu cihêtî tune:  Hemûyan guneh kir û ji rûmeta Xwedê bêpar man»
«Eger em bêjin: ‹Me guneh nekiriye›, em wî derewker dikin û peyva wî bi me re tune.» (Romayî 3:22.23) (Yûhenna I, 1:10)

Xwedê bi we re be û we ji xerabiyê biparêze!

Me dît ku Xwedê soz da Avram ku ewê wî bike miletekî mezin û got ku ji wî miletî Xilaskar wê rabe. Herweha me dît ku hem Avram û hem jî Saray pîr bûn û zarokên wan nebûn. Me di bernama din de bihîst ku wan çawa dixwest ku ew bi xwe tiştekî bikin, da ku ew bigihîjin sozên Xwedê.
Lê belê ji dêla ku bigihîştan soza Xwedê, di mala Avram de gelek pirsgirêk derketin.
Xwedê 13 salan bêdeng mabû, lê piştre ew ji nû ve bi Avram re peyivî.

Emê niha ji deriyê 17'an bixwînin. Ji kerema xwe guhê xwe bidinê ka Xwedê piştî wan 13 salan çi tiştê newaze ji Avram re got. Kitêba Pîroz weha dibêje:

1 Çaxê ku Avram not û neh salî bû, Xudan xwe nîşanî Avram da û jê re got:
«Ez ‹Êl Şeday›, yanî ‹Xwedayê karîndarê her tiştî› me. Di riya min de here û
bêkêmahî be. 2 Ezê peymana xwe di nav xwe û te de girêdim û ezê te gelek zêde
bikim.»
3 Avram xwe deverû avêt erdê û Xwedê bi wî re peyivî û got:
4 «Va ye, ev peymana min bi te re ye: Tê bibî bavê gelek miletan.
5 Êdî tu bi navê ‹Avram› (yanî ‹Bavê Mezin›) nayî gazî kirin. Lê navê te wê
‹Birahîm› be (yanî ‹Bavê Gelek Miletan›), çimkî min tu kirî bavê gelek miletan.
6 Ezê te gelek berdar bikim; milet wê ji te derkevin û padîşah wê ji te rabin. 7
Ezê peymana di nav xwe û te û dûndana te de bi hemû nifşên wan re her û her
qayîm bikim. Ezê Xwedayê te û dûndana te bim.
8 Ezê hemû welatê Kenanê yê ku tu niha bi xerîbî lê rûdinî, bidim te û dûndana
te, da ku her û her bibe milkê wan û ezê Xwedayê wan bim.»
9 Û Xwedê ji Birahîm re got: «Divê ku tu û dûndana xwe û hemû nifşên wan,
peymana min bigirin. 10 Peymana min a di nav min û te û dûndana te de ya ku
divê hûn wê bigirin, ev e: Divê her mêrê di nav we de sinet bibe.

[11] Divê hûn bên sinetkirin û ewê bibe nîşana peymana di nav min û we de.
[12] Di hemû nifşên we de divê her kurê heşt rojî bê sinetkirin…»

Xwedê weha jî  ji Birahîm re got:
«Heçî jina te Saray e, êdî bi navê ‹Saray› gazî wê neke. Lê navê wê wê ‹Sara›
be. [16] Ezê wê bimbarek bikim; êrê, ezê ji wê kurekî bidim te. Ezê wê bimbarek
bikim û ewê bibe diya gelek miletan; padîşahên miletan wê ji wê çêbin.» [17]
Birahîm xwe deverû avêt erdê, keniya û di dilê xwe de got: «Ma ji mêrekî sed
salî re kurek çêdibe? Ma Sara ya ku not salî ye wê zarokan bîne?»
[18] Birahîm ji Xwedê re got: «Xwezî Simaîl bikariya li ber te kerem bidîta!»
[19] Xwedê got: «Bila, lê belê jina te Sara wê ji te re kurekî bîne û tê navê wî
‹Îshaq› deynî. Ezê bi wî re û piştî wî bi dûndana wî re peymana xwe ya herheyî
berdewam bikim.
[20] Heçî Simayîl e, min tu bihîstî: Ezê wî bimbarek bikim, ezê wî berdar bikim û
ezê wî gelek zêde bikim. Ewê bibe bavê diwanzdeh mîran û ezê wî bikim
miletekî mezin. [21] Lê sala ku bê di vî wextî de, ezê peymana xwe, bi kurê ku
Sara ji te re bîne, bi Îshaq re qayîm bikim.»

Em li vê derê bisekinin û bifikirin. Me dît ku Avram guhê xwe da şîreta jina xwe û çû ba cêriya wê Hacer. Tiştê ku Avram kir, xelet bû.
Kurê Avram û Hacerê Simayîl ne parçeyeke plana Xwedê ya xilasiyê bû.
Plana Xwedê ev bû ku bi kurê Avram miletekî nû dest pê bike û hemû miletên dinyayê bi wî miletî pîroz bibin. Lê belê dilnesoziya mirovan nikare plana Xwedê xera bike.
Loma wek ku me xwend, çaxê ku Avram 99 salî bû, Xwedê careke din jê re xuya bû û soza xwe erê kir. Wî got: «Ez Karîndarê her tiştî me… Tê bibî bavê gelek miletan. Êdî tu bi navê ‹Avram (yanî ‹Bavê Mezin›) nayî gazî kirin. Lê navê te wê ‹Birahîm‹ be (yanî ‹Bavê Gelek Miletan›), çimkî min tu kirî bavê gelek miletan.»

Xwedê li gor plana xwe ya bêkêmahî navê Avram guhert, kir Birahîm û navê Sarayê jî guhert, kir Sara; mana Sarê jî ‹Keça Mîr›, an ‹Xanim› e.

Ev çi tiştekî ecêb e! Xwedê navên nû da wan, da ku kifş bibe ka wê çi çêbe. Avram bû Birahîm, yanî wê bibûya bavê gelekan; Saray bû Sara, yanî Keça Mir an Xanim.
Mana vê kifş e: Xwedê wê kurek bida wan û ji wî kurî wê miletek bida wan. Ji wî miletî padîşah û pêxember wê rabûna û li dawiyê Xilaskarê dinyayê wê ji wî miletî bihata.
Bi rastî, Xwedê hêjayî rûmet û pesnên herheyî ye! Wî soza xwe ya ku ji Birahîm re dabû, ji bîr nekir.

Îcar piştî ku Xwedê soza xwe erê kir û careke din got ku ewê kurekî bide Birahîm, Birahîm çi kir? Nivîsarên Pîroz dibêjin ku Birahîm xwe deverû avêt erdê, keniya û di dilê xwe de got: «Ma ji mêrekî sed salî re kurek çêdibe? Ma Sara ya ku not salî ye wê zarokan bîne?» Birahîm keniya!

Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
«Birahîm di bêhêvîtiyê de bi hêvî bawer kir û bû «bavê gelek miletan». Wek ku hatibû gotin: «Dûndana te wê weha be.» Çaxê ew fikirî ku hema bêje bedena wî miriye - çimkî ew li dor sed salî bû - û Sara nikare zarokan bîne, ew di baweriyê de qels nebû. Ew bi bawernekirinê li ser soza Xwedê dudilî nebû, lê belê di baweriyê de hêzdar bû û rûmet da Xwedê. Ew tam piştrast bû, soza ku Xwedê daye, dikare bike jî.» (Romayî 4:18-21)

Ji xwe Birahîm dixwest ku bizane Xwedê wê ji bo kurê cêriya Sarê Simayîl çi bike. Li ser vê yekê Xwedê jê re got:
«Heçî Simayîl e, min tu bihîstî: Ezê wî bimbarek bikim û ezê wî gelek zêde bikim. Ewê bibe bavê diwanzdeh mîran û ezê wî bikim miletekî mezin.

Lê ezê peymana xwe, bi kurê ku Sara ji te re bîne, bi Îshaq re qayîm bikim… Ezê bi wî re û piştî wî bi dûndana wî re peymana xwe ya herheyî berdewam bikim.» (Destpêkirin 17:20.21.19)

Xwedê bi vî awayî careke din erê kir ku pêxember wê ji dûndana Îshaq derkevin û di dawiyê de Xilaskar bi xwe wê ji dûndana wî rabe. Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de bibînin ku Xwedê kurê sozkirî, yanî Îshaq da Birahîm û Sarê.

Bi rastî, Xwedê dilsoz e. Tiştê ku ew dibêje, ew dike jî. Ji bo wî, tiştekî bi zehmet tune. Guhê xwe bidin van gotinên Încîlê yên newaze:

«Ey kûrahiya dewlemendî, şehrezayî û zanîna Xwedê! Ma kî dikare dîwankirina wî fêm bike! Ma kî dikare riyên wî salix bide!
Ma kê bi fikra Xudan zaniye? An kî jê re bû şîretkar?
Ma kê pêşî tiştek daye wî ku bi şûn ve bistîne?
Çimkî her tişt ji wî ye, bi wî ye û ji bo wî ye. Bila rûmet her û her ji wî re be. Amîn.» (Romayî 11:33-36)

Pirr sipas ji bo ku we qenc guhdarî kir.
Bila Xwedê we pîroz bike û hiş û bîrê we veke ku hûn tu caran van peyvên Xwedê ji bîr nekin; di Kitêba Pîroz de dibêje:
«Eger em dilsoz nemînin jî, ewê dilsoz bimîne,
Çimkî ew nikare xwe bi xwe înkar bike.» (Tîmotêyos II, 2:13)

Xwedê bi we re be!

Riya Rastdariyê 21 A
Inserted corrections after reading. Check the green parts.

Me di xwendina Tewratê de dît ku Xwedê soz dabû Birahîm ku ewê bibûya bavê miletekî nû. Ji wî miletî pêxemberên Xwedê wê bihatan û Xilaskarê dinyayê wê ji wî gelî rabûya. Lê heta hingê jina Birahîm Sara hê zarok neanibûn û ew herdû jî gelek pîr bûn.

Îro emê li serhatiyeke din binêrin. Pêşî emê bibînin ku sê kes hatin serdana Birahîm. Lê belê ew her sê kes ne mirov bûn. Dido ji wan milyaket bûn û yê sisiyan Xudan Xwedê bi xwe bû.
Belkî hin dibêjin ku Xwedê nikare di şiklê mirovan de ji Birahîm re xuya bûbe, lê ew mirov ji bîr dikin ku Xwedê mezin e û qet tiştek tune ku ji bo wî zehmet be. Ew Karîndarê her tiştî ye.

Îro emê ji kitêba Destpêkirinê, deriyê 18’an bixwînin; Kitêba Pîroz weha dibêje:

1 Li darmaziyên Mamrê, Xudan xwe nîşanî Birahîm da. Birahîm di germa rojê
de li ber deriyê konê xwe rûniştî bû. 2 Wî çavên xwe hildan û dît ku sê zilam
nêzîkî wî rawestabûn. Çaxê ku wî ew dîtin, ji ber deriyê kon bezî, çû pêşiya wan
û heta bi erdê xwe tewand 3 û got: «Ya mîrzayê min, eger min li ber te kerem
dîtibe, heta ku tu li ba xulamê xwe nemînî, derbas nebe. 4 Bihêlin ku hinek av
bînin, lingên xwe bişon û li bin vê darê bîhna xwe vekin. 5 Madem ku hûn hatin
ba xulamê xwe, ez pariyek nan bînim, bidin ber dilê xwe; piştre li riya xwe
herin.» Wan jî got: «Baş e, bila wek ku te got be, wusa bike.»
6 Birahîm bi lez çû û …dew, şîr û golikê ku amade kiribû anî û danî ber wan.
Çaxê ku wan dixwar, ew jî li ba wan li bin darê rawesta.
9 Wan ji Birahîm re got: «Ka jina te Sara li ku derê ye?» Wî jî got: «Ew li wir li
kon e.» 10 Yekî ji wan got: «Sala ku bê di vê demsalê de, ezê vegerim ba te û
kurekî jina te Sara, wê hebe.» Sarê li  deriyê kon li pişt wî guhdarî dikir.

11 Birahîm û Sara bi nav salan ve çûbûn û êdî pîr bûbûn. Sara ji adeta jinan
hatibû birîn. 12 Sara di dilê xwe de kenî û got: «Ma piştî vî emrî, şahî wê ji min
re çêbe? Bi ser de, malxwê min jî kal bûye.»
13 Xudan ji Birahîm re got: «Çima Sara keniya û got: ‹Ez pîr bûme, ma bi rastî
ezê zarokan bînim?› 14 Ma ji bo Xudan tiştekî zehmet heye? Sala ku bê di wextê
kifşkirî de ezê vegerim ba te û kurekî Sarê wê hebe.»
15 Hingê Sarê înkar kir û got: «Ez nekeniyam», çimkî tirsiya. Lê wî got: «Belê,
tu keniyayî.»

16 Zilam ji wê derê rabûn û wan li aliyê Sodomê nêrî; Birahîm jî ji bo ku wan rê
bike, bi wan re diçû…
20 Hingê Xudan jê re got: «Giliyê bajarên Sodom û Gomora pirr mezin e û
gunehê wan gelek giran e. 21 Ezê herim jêr û bibînim ka tiştên ku kirine bi qasî
ku ji min re hatiye gilîkirin xerab e, an ne, da ku ez bizanim.»
22 Zilam (yanî herdu milyaket) ji wê derê zîvirîn û bi aliyê Sodomê ve çûn.
Lê Birahîm hê jî li ber Xudan rawesta bû. 23 Birahîm nêzîkî wî bû û got:
«Ma tê yên rast bi yên xerab re tune bikî? 24 Belkî di nav bajêr de pêncî kesên
rast hene! Ma tê wî cihî tune bikî? Ma ji bo pêncî kesên rast ên tê de, tu li bajêr
nabihûrî? 25 Dûrî te be ku tu weha bikî! Dûrî te be ku tu yê rast jî bi yê xerab re
bikûjî û yê rast bibe wek yê xerab. Ma dadgerê hemû dinyayê edaletê nake?»
26 Xudan got: «Eger ez di bajarê Sodomê de pêncî kesên rast bibînim, ezê ji bo
xatirê wan tevahiya wî cîhî bihêlim.»
27 Birahîm lê vegerand û got: «Ez toz û xweliya ber lingê te me; dîsa min ziravê
xwe qayîm kir ku ez bi Xudan re bikevim peyivînê: 28 Em bêjin, ji pêncî kesên
rast, pênc kêm bin! Ma ji ber pênc kesan tê tevahiya bajêr wêran bikî?»
Xudan got: «Eger ez li wê derê çil û pênc kesan bibînim, ez wêran nakim.»

29 Birahîm careke din ji wî re got: «Belkî li wê derê tenê çil kes peyda bibin.»
Xudan got: «Ji bo xatirê çil kesî ez tiştekî nakim.»

30 Hingê Birahîm got: «Bila Xudan nexeyide, ezê dîsa bêjim: Belkî li wê derê sî
kes hene.»
Xudan got: «Eger ez li wê derê sî kesî bibînim, ez tiştekî nakim.»
31 Birahîm got: «Dîsa min ziravê xwe qayîm kir ku ez bi Xudan re bikevim
peyivînê: Em bêjin li wê derê bîst kes hene!»
Xudan got: «Ji bo xatirê bîst kesî, ez wêran nakim.» 32 Birahîm got: «Bila Xudan
nexeyide, ezê bi tenê careke din bêjim. Belkî li wê derê tenê deh kes hene.»
Xudan got: «Ji bo xatirê deh kesan ez wêran nakim.»
3 Piştî ku Xudan peyivîna xwe bi Birahîm re xilas kir, ew çû û Birahîm jî
vegeriya cihê xwe.

1 Ew herdu milyaket jî êvarê gihîştin Sodomê. Lût di dergehê bajêr de rûdiništ.
Gava wî ew dîtin, rabû ser lingan, çû pêşiya wan, xwe tewand erdê 2 û got:
«Mîrzayên min, de kerem bikin mala xulamê xwe. Peya bibin û şeva xwe derbas
bikin. Lingên xwe bişon, şevê derbas bikin û sibê zû rabin, li riya xwe herin.»
Wan got: «Na, emê şeva xwe li meydanê derbas bikin.» 3 Lût pirr li ber wan
geriya, heta ku ew vegeriyan ba wî û ketin mala wî. Wî ji wan re ziyafet çêkir,
nanê şkeva peht û wan jî xwar. 4 Lê, beriya ku ew razin, mirovên bajêr, yanî
mirovên Sodomê, ji xortan heta bi pîran, ji her derên bajêr, hemû xelkê, dora
mala Lût girtin. 5 Wan gazî Lût kir û gotin: «Ew mirovên ku îşev hatine ba te, li
ku derê ne? Wan ji me re derxe, da ku em bi wan re razin.»

Binêrin guhdarên hêja, hûn dibînin, mirovên li bajarê Sodomê çiqas xerab bûn?
Erê, dûrî hazir û guhdaran, di nav xelkê Sodomê de gelek zilamên qûnde hebûn.
Di çavên Xwedê de ew şehwetên şermezariyê ne û pirr guneh in.

Lût derket derve ba wan û derî li pişt xwe girt 7 û got: «Ey birayên min,  vê
xerabiyê nekin. 8 … Tiştekî bi van zilaman nekin, çimkî ew hatine bin siha banê
min.» 9 Wan got: «Biqeşite!» Û gotin: «Evê ha yekî xerîb e û dixwaze xwe bike
hukumdar? Niha emê ji wan zêdetir xerabiyê bi te bikin!» Wan pirr zor li Lût kir

û nêzîk bûn ku derî bişkênin. [10] Lê mêvanan destên xwe dirêjî Lût kirin, ew kişand hundirê malê ba xwe û derî dadan. [11] Hingê wan hemû mirovên li ber derî, ji biçûkan û heta bi mezinan kor kirin; wusa ku hew dikarîn derî bibînin.

Erê, guhdarên delal Xwedê çiqas rast û dadperwer e! Ew zû mirovan ceza nake û jiyana mirovên rast di çavên wî de gelek hêja ye. Loma ew bi du milyaketên xwe ve hat ku Lût û mala wî ji helakbûnê biparêze.

Di bernama ku bê de emê bibînin ka Lût çawa hat xilaskirin û çi hat serê gunehkarên ku di bajarên Sodom û Gomorayê de rûdiniştin.

Heta careke din em bi vê gotina Xwedê silavan li we dikin a ku dibêje:
«Ji bo xatirê deh kesên rast, ez bajêr wêran nakim.»

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!
Heta benama ku bê, hûn bimînin di xêr û xweşiyê de.

Me di bernama xwe ya din de dît ku Xudan bi du milayketan ve ji Birahîm re xuya bû. Wî ji Birahîm û ji Sarê re soz da ku piştî saleke din kurekî wan wê hebe. Xwedê ji Birahîm re got jî ku ewê bajarên Sodom û Gomorayê wêran bike. Li ser vê yekê Birahîm bi awayekî nedîtî ji Xudan hêvî kir ku wan bajaran xera neke. Xudan jî qebûl kir û got: Eger deh mirovên rast tê de hebin, ez wan bajaran hilnaweşînim, yanî wêran nakim.
Herweha me dît ku piştre ew herdu milyaket çûn Sodomê û bûn mêvanên Lût. Çaxê ku zilamên bajêr êrîşî mala Lût kirin, milyaketan ew parast û zilamên li ber dêrî kor kirin.

12 Hingê wan herdu zilaman, yanî herdu milyaketan ji Lût re got: «Ma hê mirovên te yên din li vir hene? Zavayên xwe, kur û keçên xwe, her kesê xwe ji
bajêr derxe. 13 Emê vê derê wêran bikin çimkî giliyê wan li ba Xudan giran
bûye. Xudan em ji bo wêrankirina vî cihî şandine.» 14 Lût derket, ji zavayên xwe
yên ku dergistiyên keçên wî bûn re got: «Rabin, ji vê derê birevin. Çimkî Xudan wê vê derê wêran bike.» Lê zavayên wî guman kirin ku henekan dike.
15 Çaxê ku bû serê sibê, milyaketan lez lê kirin û jê re gotin: «Bi lez rabe, jina xwe û herdu keçên xwe yên li vir bibe. An nexwe, tu jî, tê di nav cezayê bajêr de
helak bibî.» 16 Lût bi giranî rabû, lê Xudan li wan rehm kir: Zilaman bi destê
Lût, jina wî û herdu keçên wî girtin û ew deranîn, birin derveyî bajêr. 17 Çaxê ku
ew deranîn derve, jê re gotin: «Ji bo canê xwe birevin. Li pey xwe nenêrin û li vê deştê nesekinin. Birevin çiyê, an nexwe, hûnê helak bibin.»

24 Hingê Xudan ji ezmên bi ser Sodom û Gomora de agir û kewkurt barand. 25
Wî ew bajar û hemû deşt û her kesê ku li wan bajaran rûdinişt û gul û giyayên wê axê serûbino kirin.
26 Lê jina Lût li paş xwe nêrî û bû stûneke xwê.

[27] Birahîm serê sibê zû rabû, çû cihê ku li ber Xudan rawesta bû. [28] Li aliyê
Sodom û Gomora û li hemû derdora deştê nêrî û dît ku dûyê erdê wek dûyê
hêtûnê derdiket.
[29] Çaxê ku Xwedê bajarên deştê wêran kirin, wî Birahîm anî bîra xwe û çaxê wî
bajarên ku Lût tê de rûdinişt serûbino kirin, Lût ji nav wê serûbinokirinê deranî.

Erê, guhdarên hêja, ev serhatiya giran a helakbûna bajarên Sodom û Gomorayê ye. Xwedê dîwana wan bajaran kir û ew ji ezmên bi êgir û kewkurtê şewitandin. Îro kavilên (kevirên) Sodomê li welatê Îsraêlê di bin Gola Mirî de veşartî ne. Çaxê ku mirov bikeve pey gunehan, her gav bela û xerabî ji wan gunehan derdikeve. Eseh Xwedê wê dîwana gunehan bike!

Emê di dema xwe ya ku îro ji me re maye de, di Tewratê de berdewam bikin û bibînin ku Xwedê çawa soza xwe anî cih û wek ku beriya gelek salan ji wan re gotibû, kurek da Birahîm û Sarê.
Di deriyê 21'ê de Kitêba Pîroz dibêje:

[1] Xudan wek ku gotibû, kerem li Sarê kir û peyva xwe anî cih: [2] Sara bizaro bû û
di wî wextê ku Xwedê soz dabûyê de, di kalîtiya Birahîm de jê re kurek anî. [3]
Birahîm navê kurê xwe yê ku Sarê jê re anibû, Îshaq danî. [4] Çaxê ku kurê wî
Îshaq heşt rojî bû, Birahîm li gor emrê Xwedê ew sinet kir. [5] Dema ku kurê wî
Îshaq jê re çêbû, hingê Birahîm sed salî bû. [6] Sarê got: «Xwedê rûyê min
kenand; her kesê ku bibihîze, wê bi min re bikene. [7] Ma kê wê ji Birahîm re
bigota: ‹Sara zarokan dimêjîne›? Dîsa min di kalitiya wî de, jê re kurek anî.»

Xwedê soz dabû Birahîm û Sarê ku wê kurekî bide wan û piştî demeke dirêj wî ev soza xwe anî cih û tiştê ku gotibû, kir. Her kesî dizanî ku Sara nikare zarokan bîne, lê wê li gor soza Xwedê, kurek anî. Wan navê wî Îshaq danî. Mana Îshaq ev e: Ew dikene. Lê belê her kes bi bûyîna Îshaq şa nebû.

Di Kitêba Pîroz de em weha dixwînin:

[8] Îshaq mezin bû û ji şîr hat vekirin; roja ku Îshaq ji şîr hat vekirin, Birahîm
ziyafeteke mezin çêkir. [9] Lê çaxê Sarê dît ku kurê Hacera Misrî yê ku wê ji
Birahîm re anibû, tinazên xwe dike, [10] wê ji Birahîm re got: «Vê cêriyê û kurê
wê ji ba xwe bavêje. Çimkî kurê cêriyê bi kurê min Îshaq re nabe wêris.» [11] Ev
yek li Birahîm giran hat, ji ber ku Simayîl jî kurê wî bû. [12] Lê Xwedê ji Birahîm
re got: «Bila ev yek ji sedemê kurik û cêriyê di çavê te de ne tiştekî xerab be!
Guhê xwe bide her tiştê ku Sara ji te re dibêje. Çimkî dûndana te wê bi Îshaq bê
gazîkirin. [13] Û ezê kurê cêriyê jî bikim miletek, çimkî ew jî dûndana te ye.» [14]
Dotira rojê Birahîm serê sibê zû rabû, rahişt nên û kunikek av û danî ser milê
Hacerê. Kurik jî dayê û ew rêkir.

Çûyîna Simayîl, Birahîm gelek êşand. Lê çareyeke din nebû, çimkî Xwedê jê re eşkere gotibû ku ew miletê nû û pêxember û Xilaskarê dinyayê wê ji dûndana Îshaq bin – ne ji dûndana Simayîl.

Simayîl di wê demê de kêm û zêde 15 salî bû. Wî tinazên xwe bi Îshaq kir û qedrê plana Xwedê negirt. Wî fêm nekir ku Xwedê wê dûndana Îshaq bikira miletekî mezin da ku bi vî awayî ji hemû miletan re xilasî û lêbihûrtina gunehan bihata pêşkêşkirin.

Piştî van tiştan, çi bi Simayîl hat?

Di Tewratê de em dibînin ku Hacer û Simayîl bi hev re çûn aliyê Misrê û di çolê de rûniştin. Simayîl jineke Misrî ji xwe re anî û bû bavê Ereban.

Xwedê li ser Simayîl gotibû:

«Destê wî wê li dijî her kesî be

Û destê her kesî wê li dijî wî be.

Ewê li hember hemû birayên xwe derkeve» û wusa li hember derket jî.

Wek ku hûn dizanin, heta îro di nav Ereb û Cihûyan de beranberî û dijminahî heye.

Lê belê Xwedê hem ji Ereban û hem jî ji Cihûyan û hem jî ji hemû miletên vê dinyayê hez dike û dixwaze ku her kes tobe bike û li wî vegere.

Hevalên delal, wextê me nemaye, lê em bawer dikin ku we careke din dît ku Xwedayê rastîn û zindî, Xwedayekî dilsoz e. Ew li ser soza xwe dimîne; peyvên wî pûç dernakevin. Ji ber vê yekê wek ku gotibû, wî dîwana bajarên Sodom û Gomorayê kir. Loma jî wî ji Birahîm re got ku divê kurê xwe Simayîl ji ba xwe derxe, da ku plan û armanca Xwedê ya ku nayê guhertin, bê cih.

Em pirr sipas dikin ku we guhdariya peyvên me kir. Ji kerema xwe guhê xwe bidin bernameya ku bê jî. Hingê emê li serhatiya herî girîng a di jiyana Birahîm de binêrin, yanî emê li serhatiya gorîkirina kurê wî binêrin.

Heta hingê, li ser vê gotina Xwedê qenc bifikirin a ku dibêje:

«Ey kûrahiya dewlemendî, şehrezayî û zanîna Xwedê! Ma kî dikare dîwankirina wî fêm bike! Ma kî dikare riyên wî salix bide!» (Romayî 11:33)

Xwedê we pîroz û bimbarek bike û ji bo şehrezayî û zanîna xwe, hiş û bîra we veke!

Heta niha êdî me di Tewratê de, li ser çend serhatiyên pêxemberê Xwedê Birahîm bihîstiye. Îro emê bala xwe bidin dersa herî girîng a di jiyana wî de, yanî emê li ser wê yeka ku Xwedê ji Birahîm xwest ku kurê xwe bike gorî, hîn bibin.

Me di bernameya din de dît ku Xwedê çawa di kalîtiya Birahîm û Sarayê de zarokek da wan. Bi vî awayî Xwedê soza xwe anî cih.
Navê kurê wan Îshaq bû. Xwedê soz dabû Birahîm ku ji dûndana Îshaq miletekî nû wê rabe û hemû miletên li ser rûyê erdê wê bi wî miletî pîroz û bimbarek bibin.
Herweha me dît ku Simayîl û diya wî Hacer çûn aliyê Misrê û li wir rûniştin. Yanî di wê demê de bi tenê Îshaq li mal mabû û ew jî kurê Birahîm ê li gor soza Xwedê bû.

Rojekê Xwedê ji Birahîm xwest ku tiştekî pirr ecêb û giran bike.
Di Tewratê de, di Kitêba Destpêkirinê, deriyê 22'an de, weha nivîsî ye:
1 Piştî  demekê, Xwedê Birahîm ceriband û jê re got: «Ey Birahîm!»
Birahîm got: «Va me ez.»
2 Xwedê got: «Rahêje kurê xwe yê yekta, delalê xwe Îshaq û here herêma Moriyayê. Li wê derê li ser çiyayekî ku ez ji te re bêjim wî wek goriyeke şewitandinê pêşkêş bike.»

Gelo we bihîst ku Xwedê çi ji Birahîm re got? Wî emir lê kir ku ew kurê xwe yê delal bibe çiyayekî dûr û wî bike goriya şewitandinê! Xwedê çawa dikarî tiştekî weha jê re bigota? Birahîm 25 salan li hêviya soza Xwedê ma, yanî li hêviya kurê xwe ma û niha Xwedê jê re dibêje: «Wî serjêke, bike gorî!»
Niha qenc bala xwe bidinê. Ma Birahîm çi bersiv da Xwedê? Gelo ew aciz bû û li hember Xwedê rabû? Çimkî gelek zehmet bû ku ew peyvên Xwedê bên qebûlkirin!

Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
3 Birahîm serê sibê zû rabû, êzingên ji bo goriya şewitandinê qelaştin û kurtan li kerê xwe kir; wî du xulam û kurê xwe Îshaq bi xwe re birin û rabû çû cihê ku Xwedê jê re gotibû.

Sê rojan Birahîm bi kurê xwe û bi du xulamên xwe ve ber bi wî çiyayê ku Xwedê ji wî re gotibû ve çû. Çaxê ku ew nêzîkî wî cihî dibûn, dilê Birahîm kul û kovan bû, çimkî wî dizanî ku diviya ew kurê xwe li wê derê bike gorî.
Erê, çaxê ku em îro vê serhatiyê dibihîzin, ji xwe em  dizanin ku Xwedê li dawiyê çi kir; em dizanin ku ev ceribandineke baweriya Birahîm bû, lê belê Birahîm bi xwe ev yek nizanibû. Emrê Xwedê ji bo wî zehf gelek zehmet bû û ceribandina herî giran bû.

Nivîsarên Pîrohz weha berdewam dikin. Dibêjin:
4 Di roja sisiyan de Birahîm serê xwe bilind kir û ew der ji dûr ve dît.
5 Birahîm ji xulamên xwe re got: «Hûn li vir li ba kerê bimînin. Ezê bi kurik ve herim wê derê; emê biperizin û vegerin ba we.»
6 Birahîm êzingên ji bo goriya şewitandinê danîn ser pişta kurê xwe Îshaq û wî bi xwe rahişt êgir û kêrê û herdû bi hev re çûn.
7 Di rê de Îshaq ji bavê xwe re got: «Ya Bavo!»
Birahîm got: «Bêje, kurê min.»
Îshaq got: «Vane agir û êzing; lê berxê ji bo goriya şewitandinê li ku derê ye?»
8 Birahîm got: «Kurê min, Xwedê bi xwe wê berxê ji bo goriya şewitandinê peyda bike.» Û herdû bi hev re li riya xwe çûn.

9 Çaxê ew gihîştin cihê ku Xwedê jê re gotibû, Birahîm li wê derê gorîgehek çêkir û êzing li ser wê nijilandin.
Wî kurê xwe Îshaq girêda û li ser gorîgehê ew danî ser êzingan. 10 Birahîm destê xwe dirêj kir û rahişt kêrê, da ku kurê xwe serjêke.
11 Lê belê milyaketê Xudan ji ezmên gazî wî kir û got: «Birahîm, Birahîm!»

Wî got: «Va me ez.»
[12] Milyaket jê re got: «Destê xwe dirêjî kurik neke û tiştekî bi wî neke. Niha ez dizanim ku tu ji Xwedê ditirsî. Te kurê xwe, yê yekta ji ber min venegirt.»

[13] Birahîm serê xwe bilind kir û dît ku li pişt wî di nav diriyan de beranek bi strûhên xwe hatibû girtin. Birahîm çû beran anî û di cihê kurê xwe de ew kir goriya şewitandinê.
[14] Birahîm navê wê derê ‹Xudan wê peyda bike› danî û heta îro jî tê gotin: «Di çiyayê Xudan de, wê bê peydakirin.»

Bi rastî, ev serhatî gelek girîng e û lazim e em qenc fêm bikin.
Di vê serhatiyê de sê alî hene: Ya pêşî serhatî bi xwe ye, yanî tiştên ku di dîrokê de çêbûn; ya diduyan jî ev e ku mînakek tê de heye; ya sisiyan jî mana pêxemberîtiyê ye. Yanî divê ku em sê xalên giring qenc fêm bikin:
1) Çi çêbû?
2) Mana vê goriyê çi ye, yanî gorî ji bo çi mînakek bû?
3) Birahîm li ser bûyereke din a ku wê di paşerojê de çêbûya çi got?

Eger em ji aliyê dîrokî ve li vê serhatiyê binêrin, em fêm dikin ku Xwedê baweriya Birahîm ceriband û kurê wî ji mirinê xilas kir. Ji bo vê yekê Xwedê beranek peyda kir û ew beran di ber Îshaq de mir.
Ev yek kêm û zêde beriya 4000 sal li ser çiyayekî çêbû. Îro bajarê Orşelîmê li ser wî çiyayî ye. Bi kurtvebirîn, aliyê dîrokî yê vê serhatiya Birahîm ev e.

Heçî mînaka ku di vê serhatiyê de ye, Peyva Xwedê ji me re dibêje ku em hemû tam wek kurê Birahîm in.
Wek ku diviya Îshaq bimire, wusa divê em jî hemû bimirin, çimkî em hemû gunehkar in, û li gor dîwana Xwedê ya rast cezayê gunehkariyê mirin e.
Lê belê me dît ku Xwedê li gor rehma xwe ya mezin kurê Birahîm ji mirinê rizgar kir. Herweha Xwedê li gor rehma xwe ya mezin hat hawara me jî:

Wî ji bo me riya xilasiyê amade kir, da ku em jî wek Îshaq xilas bibin.
Gelo ev riya xilasiyê çi ye? Ev serhatiya Birahîm hînî me dike ku riya xilasiyê ya ku Xwedê amade kiriye, riya goriyê ye.

Me îro dît ku Xwedê beranek peyda kir û ew beran di ber kurê Birahîm de mir. Beran bi xwe zindî bû; bi tenê bi struhên xwe di nav diriyan de hatibû girtin. Yanî Xwedê qurbaneke bêqusûr û bêkêmahî peyda kir, da ku bikare cihê Îshaq bigire.
Di bernameyên pêşî de, em di destpêka Tewratê de li ser riya xilasiyê ya ku Xwedê amade kiriye hîn bûn. Gelo tê bîra we ku ew rê çi bû?
Piştî gunehê Adem û Hewayê, Xwedê bi xwe heywanek serjêkir û ji çermê wî ji wan re cil çêkirin. Bi vê yekê Xwedê kifş kir ku ne bi xwînrijandinê be, mirov nikare li ber Xwedê bijî û herweha da zanîn ku ne bi xwînrijandinê be, afûbûna gunehan çênabe.
Loma her kesê ku dixwest li ber Xwedê bijî û afûbûna gunehên xwe bistîne, diviya ku heywaneke bêkêmahî serjêkira û wek goriya şewitandinê pêşkêşî Xwedê bikira.
Diviya ku heywaneke bêqusûr di ber mirovê sûcdar de bimira. Riya lêbihûrtina gunehan a ku Xwedê hilbijartibû, ev bû. Wî soz dabû ku ewê gunehên her kesê ku weha bike, bibexişîne. Bi vî awayî hem rastdariya Xwedê û hem jî rehm û kerema Xwedê bi cûreyekî bêkêmahî tên cih û hev digirin.

Guhdarên hêja, di bernama ku bê de emê hê bêtir li ser van tiştan bipeyivin û herweha emê li mana pêxmberîtiyê ya vê serhatiyê jî binêrin. Ji kerema xwe di bernama ku bê de jî bi me re bin….

Xwedê tevî web e!

Di bernama berî vê de me li serhatiya Birahîm û Îshaq nêrî. Yanî me bihîst ku Xwedê ji Birahîm re gotibû ku diviya ew kurê xwe bikira gorî.
Me dît ku di vê serhatiyê de sê alî hene:
Ya pêşî serhatî bi xwe ye, yanî tiştên ku di dîrokê de çêbûn. Xwedê baweriya Birahîm ceriband û kurê wî ji mirinê xilas kir. Ji bo vê yekê Xwedê beranek peyda kir û ew beran di ber Îshaq de mir.
Ya diduyan jî ev e ku mînakek tê de heye. Wek ku diviya Îshaq bimira, wusa divê em jî hemû bimirin, çimkî em hemû gunehkar in. Me dît ku Xwedê li gor rehma xwe ya mezin kurê Birahîm ji mirinê rizgar kir. Herweha Xwedê li gor rehma xwe ji bo me jî riya xilasiyê amade kir, da ku em jî wek Îshaq xilas bibin. Em hîn bûn ku riya xilasiyê ya ku Xwedê amade kiriye, riya goriyê ye.

Li vê derê divê ku em tiştekî din jî bînin bîra xwe: Nivîsarên Pîroz dibêjin ku gorî yanî qurban «ne xuyabûna rastîn a tiştên qenc ên ku wê bên e, lê bi tenê siya wan e…Çimkî xwîna conega û nêriyan nikare gunehan rake.» (Îbranî 10:1.4)
Xwîna heywanan nikare gunehan xîş bike çimkî ji xwe heywan û mirov ne wek hev in û ne wekhev giranbiha ne jî.
Yanî em ji vê yekê hîn dibin ku beranê ku di ber kurê Birahîm de li ser gorîgehê mir, bi tenê mînakeke Xilaskarê pîroz ê ku wê bihata vê dinyayê bû.
Ew Xilaskar wê di ber hemû gunehkaran de bimira, da ku Xwedê li her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, bibihûre.
Bi kurtvebirîn, mana mînaka gorîkirina wî beranî ev e. Ew tîne ber çavên me ku Xwedê soz da ku wê Xilaskar bişîne dinyayê ku gunehkaran ji dîwana rast a Roja Dawî xilas bike.

Heçî mana pêxemberîtiyê ye, çaxê ku Birahîm bi kurê xwe ve hilkişiya çiyê, gelo ma tê bîra we ku Birahîm ji wî re çi got?
Wî jê re got: «Xwedê bi xwe wê berxê ji bo goriya şewitandinê peyda bike.»

Û gelo tê bîra we, piştî gorîkirina beran Birahîm çi got?
Birahîm navê wê derê ‹Xudan wê peyda bike› danî.
Û Mûsa pêxember ê ku Tewrat nivîsî, bi ser ve zêde kir û got: «Û heta îro jî tê gotin: ‹Di çiyayê Xudan de, wê bê peydakirin.›»
Çima Birahîm weha got? Ka çima Birahîm got: «Xudan wê peyda bike»?
Çima wî negot: «Şikir ji Xwedê re! Wî gorî peyda kir, şikir jê re!»?

Dostên delal, ev pirs gelek girîng e, çimkî di bersiva wê de Mizgîniya Peyva Xwedê heye û divê ku her kes vê fêm bike û qebûl bike.

Çima Birahîm got: «Xudan wê peyda bike»?
Sedem ev bû: Birahîm li ser serhatiyeke din got a ku wê li eynî çiyan çêbûya.
Birahîm got: «Ez pesnê Xwedê didim, çimkî wî beranek peyda kir, da ku di ber kurê min de li ser gorîgehê bimire.
Lê belê ez ji we re dibêjim ku rojekê eynî li ser vî çiyayî Xwedê wê goriyeke din peyda bike. Ew gorî wê ji beranê ku îro kurê min ji kêrê û ji êgir xilas kir, gelek meztir be. Erê, qeweta vê goriyê wê hebe ku zarokên Adem ji mirina herheyî û ji agirê bêdawî xilas bike. Xwedê wê Xilaskarê pîroz bişîne û ewê bibe gorî û bimire. Yê bêsûc wê ji bo sûcdaran bimire, da ku her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, helak nebe.»
Çaxê ku Birahîm got: «Xwedê bi xwe wê berxê ji bo goriyê peyda bike», wî ev mizgîniya Xwedê ya ku ji bo hemû mirovan e, da bihîstin.

Beriya ku em vê serhatiyê bigihînin dawiyê, divê her yek ji me qenc bizane ku kêm û zêde 2000 sal piştî vê pêxemberîtiya Birahîm, Xwedê ev gotin anîn cih.
Birahîm got ku Xwedê wê xilaskar bişîne, da ku ji bo gunehkaran bibe gorî û Xwedê bi dilsoziya xwe tam weha kir.
Em îro nikarin gelek li ser vê yekê bisekinin, lê eger we Încîl xwendibe, hûn serhatiya Xilaskar dizanin. Hûn dizanin ku ew ji keçikekê çêbû û tam wek ku Xwedê gotibû, ew keçik ji dûndana Birahîm û Îshaq bû.

Li ser vê dinyayê, bavê wî Xilaskarê ku wê bihata da ku ji bo me bimira, tunebû. Ew ji ezmên hat û ne ji dûndana Adem bû; hevênê guneh di wî de nebû. Ew bê kêmahî bû û ji guneh bêrî bû.
Loma ew bû goriyeke temam, bêkêmahî û li gor dilê Xwedê.
Wî cihê me stand û di ber me de, di ber gunehkarên dûndana Adem de mir û sûcê me xîş kir.
Çaxê ku em bigihîjin Încîlê, emê bibînin ku navê vî Xilaskarî ‹Îsa› ye. Mana navê Îsa ev e: ‹Xwedê xilas dike›.
Di Încîlê de emê bibînin ku Xwedê pêxemberekî din şand, da ku xelkê ji bo hatina Xilaskar Îsa amade bike. Navê wî pêxemberî Yûhenna, yanî Yahya bû.
Rojekê Yûhenna dît ku Îsa ber bi wî ve tê û got: «Va ye! Berxê Xwedê yê ku gunehên dinyayê radike.» (Yûhenna 1:21)
Çaxê ku Yûhenna pêxember Îsa dît, wî çima got: «Va ye! Berxê Xwedê»?
Ji ber ku Îsa hat dinyayê da ku wek berxekî xwîna xwe bi gorîtî li ser xaçê birijîne û gunehan rake; loma wî weha got.
Wek ku beranê ku di ber kurê Birahîm de mir, Xilaskar hat, da ku di ber tevahiya dûndana Adem de bimire. Îsa goriya dawî û bêkêmahî ye. Birahîm li ser wî gotibû: «Xwedê bi xwe wê berxê ji bo goriyê peyda bike.»

Di Încîlê de emê bixwînin ku Îsa çawa bi dilxwazî xwe teslîmî dijminên xwe kir û wan çawa ew xaç kir. Xilaskar Îsa yê ku Xwedê şandibû dinyayê, mana pêxemberîtiyê û mana mînakî ya wê goriya Birahîm anî cih.
Loma tam beriya ku bimire, Îsa li ser xaçê bi dengekî bilind got: «Temam bû!»
Û piştî sê rojan, Xwedê bêkêmahîtî û qeweta gorîbûna Xilaskar erê kir û ew ji nav miriyan rakir! Erê, Îsa mana serhatiya goriay Birahîm bi awayekî bêkêmahî anî cih.

Tiştekî din heye: Gelo ma we dizanî ew cihê ku Îsa di ber gunehkaran de lê mir, eynî ew çiya ye yê ku Birahîm di ber kurê xwe de beran serjêkiribû?
Ma hûn dizanin cihê wan herdû goriyan li ku derê ye? Erê, ew der Orşelîm e.

Hevalên delal, hûn li ku derê bin, Xwedê tembîhê li we dike ku hûn ji fikrên xelet û ji kirinên pûç vegerin û hêviya xwe bi tenê bi vê goriya dawî û bêkêmahî ve girê bidin.
Xwedê ev yek pêk anî û Nivîsarên Pîroz jî li ser vê yekê weha dibêjin:
Xilaskar Îsa «li ser xaçê, gunehên me di bedena xwe de hilgirtin, da ku em li hember gunehan mirî bin û ji bo rastiyê bijîn. We bi birînên wî şîfa dît.» (Petrûs I, 2:24)
Îro me dît ku Birahîm û kurê xwe ew goriya ku Xwedê ji bo wan peyda kiribû, qebûl kirin. Lê tu çi dikî? Gelo te ew goriya ku Xwedê ji bo te pêk aniye, qebûl kiriye?

Pirr sipas ji bo ku we qenc guhê xwe da vê bernamê. Heta careke din li ser gotineke Xwedê qenc bifikirin. Di Kitêba Pîroz de dibêje:
«Xwedê bi xwe wê berxê goriyê peyda bike…Di çiyayê Xudan de, wê bê peydakirin.» (Destpêkirin 22:8.14)

Em ji bo we bextewarî û serketinê dixwazin. Xwedê bi wer e be!

Me di bernama xwe ya din de li serhatiya goriya Birahîm nêrî.
Încîl, yanî Mizgînî, bi awayekî kin û xweş dabaşa vê serhatiyê dide fêmkirin, dibêje:
«Gava ku Birahîm hat ceribandin, bi baweriyê wî Îshaq pêşkêş kir. Wek yekî ku sozên Xwedê standiye, kurê xwê yê yekta pêşkêş dikir. Ji wî re hatibû gotin: «Ji Îshaq dûndana te wê zêde bibe.» Birahîm fikirî ku Xwedê dikare ji nav miriyan jî rake û wî bi awayekî mînakî wek ku Îshaq ji nav miriyan bistîne, ew bi şûn ve stand.» (Îbranî 11:17-19)

Di her pênc bernameyên berî niha de me li serhatiyên Birahîm pêxember nêrî. Di Tewratê de hê gelek serhatiyên Birahîm ên din jî hene, lê mixabin wextê me tune ku em wan hemûyan niha bêjin. Lê beriya ku em serhatiya wî bihêlin û li serhatiya kurê wî binêrin, lazim e ku em bala xwe bidin sozeke ku Xwedê ji Birahîm re dabû.
Rojekê Xwedê ji Birahîm re got ku wê çi bê serê zuriyeta wî. Xwedê got:
«Qenc bizane ku dûndana te wê li welatê xerîbiyê bibe kole. Çar sed salan wê zordestî li wan bê kirin. Lê ezê dîwana wî gelê ku wê tengahiyê bide wan bikim. Piştre ewê ji wî welatî pirr dewlemend derkevin.» (Destpêkirin 15:13.14)

Xwedê bi wan gotinan diyar kir ku dûndana Birahîm wê li welatê Misrê bibe kole. Herweha Xwedê soz da ku piştî 400 salan wê wan ji bin destê Misriyan xilas bike.
Piştî çar bernameyên din, emê bibînin ku Xwedê çawa ew pêxemberîtiyên bi hûrgilî anîn cih. Ka Xwedê çawa ji Birahîm re gotibû, tam wusa kir jî.
Piştî wan pêxemberîtiyan, Nivîsarên Pîroz di deriyê 25'an de dibêjin:
«Birahîm her tiştê xwe da Îshaq.
Emrê Birahîm sed û heftê û pênc sal bû û di pîrbûniyeke spehî de nefesa xwe ya dawî da û mir; çû tevî gelê xwe bû.

Kurên wî Îshaq û Simaîl ew di şkefta Maxpêla de, li pêşberî Mamrê, di zeviya Efron de, di zeviya ku Birahîm ji Hîtan kirrîbû de veşartin.
Birahîm û jina wî Sara, li wê derê hatin veşartin.» (Destpêkirin 25:5.7-10)

Îcar dostê Xwedê Birahîm ji vê dinê çû ba Xwedayê xwe.
Erê, Birahîm li ser vê dinê Xwedayê xwe nas dikir û jê hez dikir û piştre çû ba wî û ew rû bi rû dît.

Em dersa xwe ya li ser Birahîm çawa bibin sêrî û divê ku em çi jê hîn bibin? Ji bo vê yekê em dixwazin li van herdû pirsan û li bersîvên wan binêrin:

Pirsa me ya pêşî ev e: Xwedê çima ji Birahîm re got ku ew here welatekî din?
Bersîv jî ev e: Plana Xwedê ew bû ku ji Birahîm miletekî nû rake. Ji nav wî miletê nû, Xwedê wê Xilaskarê dinyayê deraniya.

Pirsa diduyan ev e: Xwedê çima Birahîm rast hesab kir û ew li ba xwe qebûl kir?
Bersîva vê yekê jî ev e:
Xwedê ew rast hesab kir, ji ber ku Birahîm ji gotinên Xwedê bawer kir. Çaxê ku Xwedê tiştên zehmet jî jê re gotin, dîsa wî bawer kir. Birahîm ne bi xêr û kirinên xwe yên qenc, lê bi baweriyê xilas bû. Baweriya wî jî çawa kifş bû? Bi wê yeka ku wî ji sozên Xwedê bawer kir kifş bû.
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
«Birahîm ji Xwedê bawer kir û ev jê re rastdarî hat hesabkirin û jê re dostê Xwedê hat gotin.» (Aqûb 2:23)

Di Kitêba Destpêkirinê de, di deriyê 25'an de, pêşveçûna plana Xwedê berdewam dike, diçe ser kurê Birahîm Îshaq.
Emê niha di Tewratê de serhatiya Îshaq û kurên wî yên cêwî bixwînin. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

«Serhatiya kurê Birahîm Îshaq ev e: Birahîm bavê Îshaq bû.

Çaxê ku Îshaq çil salî bû, wî keça Betûyêl, yanî xwişka Laban Rebeka ji xwe re anî. (Betûyêl li Mezopotamyayê rûdinişt û hem Betûyêl û hem jî Laban Aramî bûn.)
Îshaq ji bo jina xwe ji Xudan lava kir, ji ber ku ew bê ber bû. Xudan duaya wî bihîst û jina wî Rebeka bizaro bû. Zarokan di zikê wê de hevdû dehf dan.
Wê got: «Eger wusa be, ez çima dijîm?» Û çû ji Xudan sedemê dehfdana di zikê xwe de pirs kir. Xudan jê re got:
«Di malzaroka te de du milet hene, ji zikê te du netew wê ji hev cihê bibin;
Yek wê ji yê din hêzdartir bibe û yê mezin wê ji yê biçûk re xulamtiyê bike.»

Çaxê ku dema zarokanîna wê hat, va ye, di zikê wê de cêwî hebûn. Yê ku pêşî çêbû çûr bû, her aliyê wî bi pirç, wek kurk bû. Loma navê wî Esaw (yanî yê bi pirç) danîn. Piştî wî, birayê wî çêbû û di dema çêbûnê de destê wî pehniya Esaw digirt. Loma navê wî Aqûb (yanî yê pehnîgirtî, an jî hîlekar) danîn.
Çaxê ku Rebeka ew anîn, Îshaq şêst salî bû.
Kurik mezin bûn. Esaw bû nêçîrvanekî jîr, bû zilamê çolistanan.
Aqûb bû mirovekî bê pêjin, di kon de rûniştî.» (Destpêkirin 25:19-27)

Yanî Rebeka du kur ji Îshaq re anîn û navê wan kir Esaw û Aqûb. Rast e, ew cêwî bûn, lê belê qet ne wek hev bûn! Çaxê ku Esaw mezin dibû, li tiştên li ser rûyê erdê difikirî, li tiştên demdemî û pûç digeriya, lê belê Aqûb li tiştên jor, li tiştên ku li ba Xwedê her û her dimînin digeriya. Ew sozên ku Xwedê ji bapîrê wî Birahîm û ji bavê wî Îshaq re dabûn, ne xema Esaw bûn. Lê belê Aqûb wusa nekir.

Esaw kurê nixurî bû. Loma li gor fikrên mirovan diviya ku Esaw para nixurîtiyê bistanda û bûbûya bavê miletê nû yê ku Xwedê ji Birahîm û ji Îshaq re li ser gotibû.
Lê belê, beriya ku ew bên dinyayê, Xwedê ji diya wan, yanî ji Rebekayê re got:
«Yê mezin wê ji yê biçûk re xulamtiyê bike.» (Destpêkirin 25:23)

Xwedê li gor pêşdîtiniya xwe diyar kir ku mîrasa nixurîtiyê û dûndana miletê nû wê ne ji Esaw, lê ji Aqûb rabe. Heçî Aqûb bû, diviya ku li hêviya Xwedê bima û her tişt di destê Xwedê de bihişta, çimkî ji xwe hêza Xwedê hebû ku di wextê xwe de mîrasa wî bidaya wî.

Lê belê Aqûb li benda Xwedê, yanî li hêviya Xwedê nema.

Erê, wek ku sebra bapîrê wî Birahîm nemabû ku li benda Xwedê bimîne, Aqûb jî wusa kir. Birahîm dixwest ku li gor fikrên xwe bigihîje soza Xwedê; loma ew xebitî ku wî kurê  ku Xwedê ji wan re soz dabû, peyda bike.
Heçî Aqûb bû, wî dixwest li gor fikrên xwe mîrasa nixurîtiyê bixe destê xwe. Emê di bernama ku bê de binêrin ku Aqûb çi kir ku mîrasa birayê xwe yê mezin bixe destê xwe.

Heta hingê em li hêviya we ne.  Em ji bo we serfirazî û bextewariyê dixwazin. Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dest bi serhatiya Esaw û Aqûb kir. Me dît ku ew herdu cêwî bûn, lê Esaw yê nixurî bû.
Dîsa jî Xwedê got ku «Yê mezin wê ji yê biçûk re xulamtiyê bike.» (Destpêkirin 25:23)
Diviya ku Aqûb li hêviya Xwedê bima û her tişt di destê Xwedê de bihişta, çimkî ji xwe hêza Xwedê hebû ku di wextê xwe de mîrasa wî bidaya wî.

Lê belê me bihîst ku Aqûb li benda Xwedê nema.
Emê niha bixwînin ku Aqûb çi kir ku mîrasa birayê xwe bixe destê xwe.

Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
Rojekê çaxê ku Aqûb şorbe çêdikir, Esaw bê hal ji çolê hat. Wî ji Aqûb re got: «Bi lez ji vî tiştê sor bide min ku ez bixwim, ji ber ku ez bê hal im.»
Lê Aqûb jê re got: «Pêşî mafê nixurîtiya xwe bifiroşe min.»
Li ser vê yekê Esaw got: «Va ye ez dimirim. Çi feyda min ji nixurîtiyê heye?»
Aqûb jê re got: «Pêşî ji min re sond bixwe.»
Esaw sond xwar û mafê nixurîtiya xwe firot Aqûb.
Hingê Aqûb nan û şorbenîsk da Esaw. Esaw xwar û vexwar û rabû çû.
Bi vî awayî Esaw mafê nixurîtiya xwe kêm dît. (Destpêkirin 25:29-34)

Gelo tu fêm dikî ku Esaw çi kir? Wî mafê nixûrîtiya xwe ji bo pariyê nên û şorbekê firot!
Divê ku em bînin ber çavê xwe ku mafê nixurîtiyê çi bû.
Di wê demê de bav kurê xwe yê nixurî bi bereketeke taybetî pîroz dikir û ji Xwedê dixwest ku ew hêzdar û bi rûmet bibe û serwertiyê bike. De îcar dema ku bav dimir, yê nixurî ji birayên xwe yên din duqat zêdetir mîras distand.

Lê belê Esaw mafê nixurîtiya xwe kêm dît û ew ji bo pariyê nên û şorbekê firot!

Em li ser kurekî nixurî yê ku weha dike çi bêjin? Ji bo tiştekî weha bi tenê gotinek heye ku mirov dibêjin. Ew dibêjin: «Ma tu dîn î?»
Ma li ser tevahiya rûyê erdê mirovek heye ku weha bêaqiliyê bike?

Lê belê Esaw ne tenê bereketa bavê xwe û mafê nixurîtiyê kêm dît.
Çaxê ku Esaw weha kir, wî bereketa Xwedê û xezînên ezmên, yanî xezînên bihiştê jî kêm dîtin.
Tiştên ku Esaw kêm dîtin, ji hemû xezînên dinyayê giranbihatir bûn:
Mafê Esaw hebû ku bibûya endamê wî miletê nû yê ku Xilaskar wê jê bihata dinyayê, lê wî ev yek kêm dît! This needs checking!

Xwedê di vê serhatiya Esaw û Aqûb de ji me re çi dibêje û çi hînî me dike?
Xwedê me hişyar dike, da ku em di riyên Esaw de neçin û xezînên Padîşahiya Ezmên bi kêfên vê dinyayê yên demdemî neguherin.
Ji kerema xwe qenc guhê xwe bidinê ku Peyva Xudan li ser vê yekê çi dibêje:
«Mirovek hemû dinyayê bi dest bixe jî, lê canê xwe winda bike, çi feyda wî heye? An dikare çi di ber canê xwe de bide?» (Metta 16:26)
«Hay ji xwe hebin, bila tu kes ji kerema Xwedê bêpar nemîne. … Nebe ku kesek wek Esaw be, yê ku mafê nixurîtiya xwe bi xwarinekê firot.» (Îbranî 12:15.16)

Esaw ji kerema Xwedê bêpar ma, çimkî wî tiştên Xwedê girîng hesab nekirin.
Loma Xwedê me hişyar dike, ji me re dibêje: «Di rêça Esaw de neçin!
Bereketên min kêm nebînin! Ew bereket ji bo we ne!»

Tu li ser vê yekê çi dibêjî? Gelo ma tu dixwazî bereketên Xwedê bistînî?
Xwedê ji te hez dike û dixwaze te pîroz û bereket bike, lê divê tu wî qebûl bikî û divê tu di jiyana xwe de cihê pêşî bidî wî. Peyva Xwedê ji xwarinê û ji peran giranbihatir hesab bike! Çaxê tu weha bikî, tê mana van gotinên Nivîsarên Pîroz fêm bikî. Ew dibêjin:

«Tiştên ku çavan nedîtine û guhan nebihîstine û di fikra mirov re derbas nebûne, Xwedê ew ji bo wan ên ku ji wî hez dikin, amade kirine.» (Korîntî I, 2:9)

Xwedê dixwaze me bi zêdehî pîroz û bimbarek bike.
Ew dixwaze li hemû gunehên me bibihûre.
Ew dixwaze dilê me yê xerab biguhere.
Ew dixwaze me paqij bike.
Ew dixwaze cesaret, şahî, hezkirin û silameta xwe bixe dilê me.
Û bi rastî hê gelek bereketên din jî hene ku Xwedê dixwaze bide her zarokê Adem. Lê belê divê ku tu ji hemû dilê xwe li tiştên jor ên ku her û her dimînin, bigerî.
Yê ku ji kûrahiya dilê xwe, bereketa Xwedê ya herheyî nexwaze, tu caran wê nastîne. Gotina pêşiyan dibêje: «Yê ku hingiv bixwe, mêş wê pê ve bidin.»

Hevalê delal, ma tu dixwazî bereketa Xwedê bistînî?
Eger tu bixwazî, divê tu li Peyva Pîroz bigerî, da ku tu sozên Xwedê bizanî.
Gelo tu sozên wî dizanî?
Bi rastî ew soz ewqas mezin û newaze ne, aqilê mirov zû nagihîje wan.
Ma tu ji bo wan sozan xeman dixwî, an tu tenê li tiştên vê dinyayê digerî?
Kitêba Pîroz hînî me dike ku tenê du cûreyên mirovan hene:
Hin ji wan ji dinyayê û ji tişt û kêfên dinyayê hez dikin û yên din jî li tiştên jor û li daxwaza Xwedê digerin. Heçî tu yî, tu li çi digerî?

Ji kerema xwe guhê xwe bide Zebûra pêşî ku ew çi dibêje. Ew dibêje:
1 Xwezî bi wî mirovê ku bi şîreta xeraban rêve naçe,
Di riya gunehkaran de nasekine û di civata tinazkeran de rûnane.
2 Lê belê dilê wî bi Şerîeta Xwedê şa dibe,şev û roj li ser Şerîeta wî kûr difikire.
3 Ew wek wê dara ku li ber ava ku diherike hatiye çandin e;
Ew fêkiyê xwe di demsala xwe de dide û pelên wê naçilmisin.
Dest diavêje çi jî, jê re qenc pêk tê.

[4] Yên xerab ne weha ne,lê wek kaya hûr in a ku berbayê diçe.
[5] Ji ber vê yekê yên xerab di dîwanê de û gunehkar di civîna rastan de nasekinin.
[6] Çimkî çavê Xudan li riya rastan e,lê belê riya xeraban tune dibe, diçe.

Dostê delal, heçî tu yî, tu di kîjan riyê de diçî? Gelo tu di riya wan mirovên ku sozên Xwedê hesab dikin de diçî? An tu wek Esaw î yê ku sozên Xwedê ji bo tiştên vê dinyayê yên demdemî firotin? Peyva Xwedê bi van gotinan me hişyar dike, dibêje:

«Mirovek hemû dinyayê bi dest bixe jî, lê canê xwe winda bike, çi feyda wî heye? An dikare çi di ber canê xwe de bide?» (Metta 16:26)
«Ji bo xwarina pûç nexebitin, lê ji bo xwarina ku ji bo jiyana herheyî dimîne bixebitin.» (Yûhenna 6:27)
«Hay ji xwe hebin, bila tu kes ji kerema Xwedê bêpar nemîne. … Nebe ku kesek bê tirsa Xwedê û wek Esaw be yê ku mafê nixurîtiya xwe bi xwarinekê firot.» (Îbranî 12:15.16)

Guhdarên delal, divê ku em li vir bernama xwe bi dawî bikin.
Xwedê hez bike, emê di bernameya ku bê de li ser serhatiya Aqûb bipeyivin.
Heta hingê, li ser vê hişyarkirina Xwedê qenc bifikirin a ku di Kitêba Pîroz de nivîsandî ye:

«Hay ji xwe hebin, bila tu kes ji kerema Xwedê bêpar nemîne. … Nebe ku kesek wek Esaw be, yê ku mafê nixurîtiya xwe bi xwarinekê firot.» (Îbranî 12:15.16)

Me di bername xwe ya din de li ser cêwiyên Îshaq û Rebekayê, yanî li ser Esaw û Aqûb xwend. Esaw ew sozên ku Xwedê dabûn bavkalê wî Birahîm, kêm dîtin û mafê xwe yê nixurîtiyê ji bo şorbeyekê firot!
Heçî Aqûb bû, wî sozên Xwedê tiştekî pirr hêja dîtin. Lê belê mana vê ne ev e ku Aqûb mirovekî bêkêmahî bû! Mana Aqûb bi xwe yê ku dixapîne ye. Îro em dixwazin di Tewratê de pêşve herin û binêrin ka çawa Xwedê Aqûbê xapînek guhert, kir Aqûbê zilamê Xwedê.

Bi rastî Aqûb yekî xapînek bû. Nivîsarên Pîroz kêmahiyên pêxemberan venaşêrin û ji me re dibêjin, ku Aqûb çawa birayê xwe yê mezin du caran xapand, da ku mafê nixurîtiyê jê bistîne.
Loma Esaw di hêrsa xwe de dixwest ku birayê xwe Aqûb bikuje.
Diya wan Rebeka pê hesiya û gazî Aqûb kir, ew xewle kir û jê re got ku divê ew bireve, here ba xalê xwe Laban Û jê re got ku divê li ba xalê xwe bimîne, heta ku hêrsa Esaw derbas bibe. Heçî Laban bû, ew dûrî welatê Kenanê li Heranê rûdinişt.

Niha em dixwazin di Tewratê de, di Kitêba Destpêkirinê deriya 28’an de bixwînin, da ku em bibînin çaxê ku Aqûb ji mala bavê xwe Îshaq reviya û çû mala xalê xwe Laban, çi hat serê wî.
Kitêba Pîroz dibêje:

10 Aqûb ji Bîrşêbayê derket û ber bi Heranê ve çû. 11 Giha cihekî û li wir şeva
xwe derbas kir, çimkî roj çûbû ava. Wî rahişt kevirekî ji wir, xist bin serê xwe û li wir raza.
12 [Wê şevê] wî xewnek dît: Li ser erdê pêpelûnkek çikilandî hebû û serê wê
digihîşt ezmên. Milyaketên Xwedê bi wê ve berjor û berjêr dibûn. 13 Xudan ser
wî re sekinî û got: « Xudan Xwedayê bavê te Birahîm û Xwedayê Îshaq ez im.

Ezê vî welatê ku tu li ser radizî, bidim te û dûndana te. [14] Dûndana te wê wek
toza erdê zêde bibe. Tê li rojhilat û rojava, li bakûr û başûr belav bibî. Hemû
eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te û bi dûndana te pîroz bibin. [15] Va ye, ez bi te re
me. Tu herî ku derê, ezê te biparêzim û ezê te vegerînim vî welatî. Çimkî ez te
bernadim heta ku ez wan tiştên ku min ji te re soz dane bikim.» [16] Aqûb ji xewa
xwe hişyar bû û got: «Xudan bi rastî li vî welatî ye û min ev nizanibû.» [17]
Tirsiya û got: «Ev der çiqas bi hêbet e! Ev ne tiştekî din e, lê mala Xwedê ye û
dergehê ezmên e.»
[18] Aqûb serê sibê zû rabû û rahişt kevirê ku xistibû bin serê xwe, ew wek
kêlikekê çikiland û rûn ( zeyt) bi ser de kir. [19] Navê wê derê "Beyt–Êl" yanî
"Mala Xwedê" danî.

Îcar Xwedê di xewnê de li Aqûb xuya bû û eynî soza ku dabû bavkalê wî Birahîm û bavê wî Îshaq, da Aqûb jî. Yanî jê re got ku wê zuriyeta wî bike miletekî mezin. Erê, me bihîst ku Aqûb mafê nixurîtiyê bi hîle stand. Li vir em dibînin ku piştî wan hemû tiştan Xwedê bi xwe bereketa nixurîtiyê da Aqûb. Tu heqê Aqûb nebû ku bibe bavê miletê nû yê ku Xilaskarê dinyayê wê jê rabûya. Ew ne hêjayî vê yekê bû, lê belê Xwedê Xwedayê rehm û keremê ye; ew tiştên qenc dide wan ên ku ne hêjayî tiştê qenc in.

Aqûb di xewna xwe de çi dît? Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
Aqûb dît ku «li ser erdê pêpelûnkeke çikilandî hebû û serê wê digihîşt ezmên. Milyaketên Xwedê bi wê ve berjor û berjêr dibûn.»
Pêpelûnka di xewna Aqûb de, pêpelûnkeke ecêb bû; ew gelekî mezin bû û ji rûyê erdê digihîşt ezmên, yanî digihîşt heta ber Xwedê.

Bi vê xewnê Xwedê tiştekî girîng nîşanî Aqûb kir. Xwedê dixwest ku têkiliya kûr û şêrîn bi Aqûb re deyne. Herweha Xwedê bi vê yekê kifş kir ku Xilaskarê ku wê bihata dinyayê wê wek pêpelûnkekê bûya, yanî wê di nav erd û ezmên de riyek vekira û ew bi xwe wê di nav Xwedê û mirovan de bibûya navberkar.

Heta îro gelek mirov hene, dibêjin: Ez dikarim bi saya xêr û kirinên xwe yên qenc herim bihiştê – ewê pêpelûnka min bin.
Lê belê Peyva Xwedê dibêje ku di nav Xwedê û mirovan de pêpelûnkeke tenê heye. Ew pêpelûnk ne ji aliyê mirovan ve dest pê dike, lê ji ezmên, ji ba  Xwedê dest pê dike.

Em hemû, yanî hemû zarokên Adem nikarin bi qeweta xwe hilkişin ezmên û herin ba Xwedê; ev yek ji destê me nayê. Sedema vê yekê gunehê me ye. Heta ku em gunehkar bin, em qet nikarin li Xwedayê pîroz xweş bên. Lê belê Xwedê tije rehm e û zehf gelek ji mirovan hez dike. Loma wî ji bo zuriyeta Adem riya xilasiyê amade kir.

Ji ber vê yekê mana pêpelûnka xewna Aqûb ev e ku Xwedê soz da ku rojekê navberkar, yanî Xilaskar wê bê vê dinyayê, da ku gunehkaran xilas bike. Ew navberkar wek pêpelûnka xewna Aqûb a di nav erd û ezmên de ye.
Çaxê ku Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê hînî me dikin, tam weha dibêjin:
«Çimkî tenê Xwedayek heye û di nav Xwedê û mirovan de jî bi tenê navberkarek heye, ew jî Mesîh Îsayê mirov e, yê ku xwe ji bo hemûyan kir berdêl… da her kesê ku baweriyê bi wî bîne helak nebe, lê jiyana wî ya herheyî hebe.» (Tîmotêyos I, 2:5-6; Yûhenna 3:16)

Peyva Xwedê li ser vê yekê gelek zelal dibêje: Ne bi navberkarê pîroz ê ku Xwedê ji ezmên şandiye be, tu kes nikare here ba Xwedê.

Guhdarên delal, gelo hûn dixwazin bi çi riyê herin ba Xwedê? Ma hûn dixwazin di wê riya ku we bi xwe amade kiriye re herin ba wî? An hûn bi şahiyeke mezin wê riya ku Xwedê bi xwe amade kiriye, ji xwe re hildibijêrin?
Mirov çiqas bixwaze jî, ew nikare bi destê pêpelûnkên xwe bi xwe bigihîje ezmên!
Hevalno, em pir spas dikin ku we guhdariya peyvên me kir.

Xwedê hez bike, di bernama ku bê de, emê hê bêtir li serhatiya Aqûb binêrin. Emê bibînin ku Aqûb, yanî yê xapînok, bi xwe jî hat xapandin û emê bibînin ku Xwedê navekî nû li Aqûb kir.
Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin:
«Çimkî tenê Xwedayek heye û di nav Xwedê û mirovan de jî bi tenê navberkarek heye, ew jî Mesîh Îsayê mirov e, yê ku xwe ji bo hemûyan kir berdêl… da her kesê ku baweriyê bi wî bîne helak nebe, lê jiyana wî ya herheyî hebe.» (Tîmotêyos I, 2:5-6; Yûhenna 3:16)

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Di bernama din de me bihîst ku Aqûb xewneke ecêb dît. Wî pêpelûnkek dî a ku serê wê digihîşt ezmên.
Me dît ku bi rastî di nav Xwedê û mirovan de pêpelûnkeke tenê heye.
Herweha me fêm kir ku Xilaskarê ku Xwedê wê bişanda, wê ji bo mirovan wek pêpelûnkekê bûya. Wî Xilaskarî wê di nav erd û ezmên de riyek vekira û ew bi xwe wê di nav Xwedê û mirovan de bibûya navberkar.

Niha emê bibînin ku piştî van tiştan çi hat serê Aqûb. Peyva Xwedê dibêje: «Mirov çi biçîne, wê wî bidirû.» (Galatî 6:7)
Û ka çawa me dît ku Aqûb birayê xwe yê mezin xapand, niha emê bibînin ku Aqûb wê ji aliyê xalê xwe Laban ve bê xapandin.

Emê niha di deriyê 29'an de bixwînin:
Aqûb mehek sax bi Laban re rûnişt. 15 Hingê wî ji Aqûb re got: «Ji ber ku tu
mirovê min î, ma tê belaş ji min re xizmetê bikî? Ji min re bêje, ka meaşê te çi be?»
16 Du keçên Laban hebûn. Navê ya mezin Lêa bû û navê ya biçûk Rahêl bû.
17 Çavên Lêayê kêm / qels bûn, lê Rahêl bi bejn û bal bû û dîtina wê spehî bû.
18 Dilê Aqûb ket Rahêlê û wî got: «Ezê ji bo keça te ya biçûk Rahêl heft salan ji te re xizmetê bikim.»
19 Laban got: «Wê bidim te, ji min re çêtir e ku bidim zilamekî din. Bi min re bimîne.»
20 Aqûb heft salan ji bo Rahêlê xizmet kir. Ji ber ku wî gelek jê hez dikir, ew sal li ber çavên wî wek çend rojan bûn.
21 Hingê Aqûb ji Laban re got: «R ojên xizmeta min temam bûn, jina min bide
min, da ku ez herim ba wê.» 22 Laban hemû mirovên wê derê civandin û
ziyafetek çêkir. 23 Lê êvarê keça xwe Lêa jê re bir. Aqûb çû ba wê…
25 Sibehî dît ku  va ye, ew Lêa bû.

Aqûb ji Laban re got: «Ev çi bû ku te bi min kir? Ma min li ba te ne ji bo Rahêlê xizmet kir? Çima te ez xapandim?»
[26] Laban got: «Li ba me çênabe ku keçika biçûk beriya ya mezin bidin mêr.
[27] Heftiya wê temam bike û di ber xizmeta heft salên din de, ezê Rahêlê jî bidim te.»
[28] Aqûb wusa kir, heftiya Lêyayê temam kir û Laban keça xwe Rahêl jî da
Aqûb… [30] Aqûb çû ba Rahêlê û wî ji Lêayê bêtir, ji Rahêlê hez dikir. Îcar Aqûb heft salên din li ba Laban xizmet kir.

Yanî Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Laban çawa xwarziyê xwe Aqûb xapand. Erê, tiştê ku çêbû ne tiştekî qenc bû. Lê belê em dizanin ku jiyana Aqûb di destê Xwedê de bû û Xwedê wê her tişt qenc derxista.
Li dawiyê Aqûb bû bavê 12 kuran. Aqûb bîst salan di mala xalê xwe de ma û di wê demê de Xwedê di hezkirina xwe de hişt ku ew bikeve çend tengahî û ceribandinên mezin, da ku Aqûb perwerde bike û wek ku zêr di êgir de tê helandin, baweriya wî safî û paqij bibe.

Piştî wan bîst salan Xwedê li Aqûb xuya bû û jê re got:
«Vegere welatê bav û kalên xwe, ba mirovên xwe; ezê bi te re bim.» (Destpêkirin 31:3)

Aqûb rabû, her tiştê xwe bar kir û bi mala xwe ve ket rê. Ew ber bi welatê Kenanê ve çûn, yanî çûn welatê ku Xwedê soz dabû ku wê bida Birahîm, Îshaq û Aqûb û zuriyeta wan.

Di wê rêwîtiyê de Xwedê bi awayekî taybetî ji Aqûb re xuya bû û navê wî guhert. Niha guhê xwe bidin gotinên Nivîsarên Pîroz:
Aqûb bi serê xwe ma û mirovekî heta serê sibê pê re gulaş girt.
[25] Çaxê dît ku zora Aqûb nebir, li serê sêvoka wî xist û çaxê bi gulaşê diçûn hev, serê sêvoka Aqûb tehinî.
[26] Wî ji Aqûb re got: «Min berde, da ku ez herim. Va ye serê sibê hat.»

Aqûb got: «Heta ku tu min bimbarek nekî, ez te bernadim.»
27 Wî jê re got: «Navê te çi ye?» Wî got: «Aqûb e.»
28 Wî got: «Êdî ji te re Aqûb nayê gotin, lê navê te wê Îsraêl be. Ji ber ku tu bi Xwedê û bi mirovan re li ber xwe da û te zora wan bir.»
29 Aqûb pirs kir û got: «Ji kerema xwe, navê xwe bêje.»
Wî got: «Tu çima navê min dipirsî?» Û wî ew li wir bimbarek kir.
30 Aqûb navê wê derê Penîêl, yanî „Rûyê Xwedê“ danî û got: «Min Xwedê rû bi rû dît û dîsa canê min sax ma.»

Ev serhatî mirovan ecêbmayî dihêle, lê gelek dersên girîng tê de hene.
Çima Xwedê bi Aqûb re gulaş girt? Xwedê weha kir, da ku Aqûb fêm bike ku ew li ber Xwedê bêhêz e. Xwedê nîşanî wî kir ku hemû qeweta rastîn û hemû şehrezayiya rastîn bi tenê ji Xwedê tê.
Bereketên herî qenc bi tenê ji bo wan mirovan in ên ku dizanin ku ew bi qeweta xwe nikarin li Xwedê xweş bên. Aqûb dest bi fêmkirinê kir ku ew li ber Xwedê çiqas bêhêz bû.
Wê şevê, Xwedê navekî nû li Aqûb kir. Ew navê nû Îsraêl bû. Mana navê Aqûb ev e: Yê ku dixapîne. Lê mana navê Îsraêl ev e: Yê ku bi Xwedê re padîşahtiyê dike.
Navê wî miletê nû yê ku Xwedê wê ji zuriyeta Birahîm, Îshaq û Aqûb rakira, wê Îsraêl bûya. Wek ku tê zanîn, gelê Îsraêl jî tam li gor soza Xwedê ji diwanzdeh kurên Aqûb derket. Û ji vî miletê Îsraêl jî Xilaskar hat vê dinyayê.

Belkî hin wê bipirsin: Çima Xwedê Aqûb, yanî mirovekî ewqas xapînek hilbijart ku bibe bavê gelê ku Xilaskarê dinyayê wê jê rabûya?
Bersîva Nivîsarên Pîroz ev e; dibêjin:

Xwedê, ji bo ku şehrezayan bide şermkirin, tiştên dinyayê yên bêaqil bijartin; û Xwedê, ji bo ku yên hêzdar bide şermkirin, tiştên dinyayê yên qels bijartin.

Xwedê, ji bo ku tiştên ku hene betal bike, tiştên dinyayê yên bê rûmet û kêm tên dîtin, tiştên ku tunin, bijartin. Wusa ku tu kes li ber Xwedê pesnê xwe nede. (Korîntî I, 1:27-29)

Aqûb xapînek bû. Li gor qeweta wî bûya, tu caran nikaribû wusa bikira ku jiyana wî li Xwedê xweş bihata.
Di dilê wî de, tiştê qenc tunebû. Bi tenê tiştekî qenc tê de hebû û ew gelek girîng bû: Aqûb ji Peyva Xwedê bawer dikir.
Aqûb fêm kir ku sozên Xwedê çiqas hêja û giranbiha ne.
Ji bo wî di dinyayê de ya herî girîng ev bû ku bereketên wan sozan bistîne. Û Xwedê jî xwe bi wî da naskirin û ew pîroz û bimbarek kir. Xwedê li gor plana xwe ya herheyî dilê Aqûb guhert, mirovekî xapînek kir zilamekî rast ê Xwedê, ew kir Îsraêl.

De vêca ma hûn li ser van tiştan çi difikirin?
Wek ku Aqûb fêm kir, gelo we jî fêm kiriye ku hûn nikarin li Xwedê xweş bên?
Ji kerema xwe guhê xwe bidin Peyva Xwedê ku ew çi dibêje. Ew dibêje:
«Xwezî bi wan ên ku bi ruh belengaz in, çimkî Padîşahiya Ezmanan ya wan e.» (Metta 5:3)
«Xwedê li hember pozbilindan disekine, lê keremê li nefsbiçûkan dike. Loma xwe di bin destê Xwedê yê hêzdar de nizim bikin, da ku di wextê xwe de we bilind bike.» (Petrûs I, 5:5-6)

Guhdarên delal, Xwedê hez bike, emê di bernameya ku bê de li ser serhatiya newaze ya kurê Aqûb Ûsiv bipeyivin.
Heta bernameyeke din em bi vê gotina Xwedê silavan li we dikin a ku dibêje:

Xudan bêriya vê yekê dike ku keremê li we bike; ewê rabe ku rehmê li we bike, çimkî Xudan Xwedayê dadperweriyê ye. Xwezî bi hemûyên ku li hêviya wî dimînin. (Îşaya 30:18)

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Îro emê li serhatiya kurên Aqûb binêrin û bi taybetî emê bala xwe bidin Ûsiv. Ûsiv kurê Aqûb ê yanzdehan bû.

Em di Tewratê de, ji kitêba Destpêkirinê deriyê 37an dixwînin:
2 Serhatiya dûndana Aqûb ev e: Ûsiv xortekî hevdeh salî bû û demekê bi birabavên xwe re, bi kurên Bîlha û Zîlpa re li ber pêz alîkar bû. Ûsiv ji bavê wan re peyvên xerab li ser wan digot.
3 Îsraêl ji hemû kurên xwe zêdetir ji Ûsiv hez dikir, çimkî Ûsiv di pîrîtiya wî de jê re çêbûbû. Wî kirasekî belek jê re dabû çêkirin.
4 Birayên wî dîtin ku bavê wan ji hemû birayên wî bêtir ji wî hez dike, loma wan ji wî nefret kir û nikaribûn gotineke xweş jê re bêjin.
5 Rojekê Ûsiv xewn dît û ew ji birayên xwe re got; hingê wan hê bêtir jê nefret
kir. 6 Wî ji wan re got: «Ka guhê xwe bidin vê xewna ku min dîtiye:
7 Me di nav zeviyê de melû girêdidan. Ji nişkê ve meluya min rabû û daçikilî. Melûyên we dora ya min girtin û xwe li ber tewandin.»
8 Birayên wî jê re gotin: «Ma çavê tê lê ye ku tu li ser me bibî padîşah? An ma bi rastî tê serweriyê li me bikî?» Û ji ber xewn û gotinên wî hê bêtir jê nefret kirin.

9 Careke din wî xewnek dît û ew jî ji birayên xwe re got: «Min xewneke din dît. Min dît ku roj û heyv û yanzdeh stêran xwe li ber min tewandin.»
10 Çaxê wî ev ji bav û birayên xwe re got, bavê wî li wî hilat û jê re got:
« Ev xewna ku te dîtiye çi ye? Ma nexwe ez û diya te û birayên te emê bên, ku xwe li ber te heta bi erdê bitewînin?»
11 Îcar birayên wî çavnebarî birinê. Lê bavê wî ev tişt di dilê xwe de girt.

12 Birayên wî çûn, da ku keriyê bavê xwe biçêrînin.

[13] Îcar Îsraêl ji Ûsiv re got: «Birayên te pêz diçêrînin. De were, ez te bişînim ba
wan.» Ûsiv got: «Bila.»
[14] Aqûb ji wî re got: «Here, binêre ka birayên te baş in û pez baş e? Ji min re
xeberekê bîne.»

Ûsiv li pey birayên xwe ket û ew li Dotanê dîtin.
[18] Lê wan hê ji dûr ve Ûsiv dît û beriya ku ew bigihîje ba wan, şêwira kuştina wî
kirin. [19] Wan ji hevûdu re got: «Va ye, xewndîtiyê me tê. [20] De werin, em wî
bikujin û bavêjin nav bîrek ji van bîran. Emê bêjin ku dehbeyekî xerab ew xwar.
Hingê emê bibînin ka xewnên wî wê bibin çi.»
[21] Rûbên ev bihîst û ew ji destên wan rizgar kir. Wî ji wan re got: «Em wî
nekujin. [22] Hûn xwînê nerijînin; wî bavêjin vê bîra li çolê, lê destên xwe dirêjî
wî nekin.»
Rûben weha got, da ku wî ji destên wan rizgar bike û li bavê wî vegerîne. [23]
Çaxê Ûsiv hat ba birayên xwe, wan kirasê Ûsiv, ew kirasê wî yê belek, jêkirin û
ji ser wî derxistin. [24] Ew girtin û avêtin bîrê. Bîr vala bû û tê de av tune bû.
[25] Hingê ew rûniştin ku xwarina xwe bixwin. Çaxê wan serê xwe rakir, dîtin ku
kerwanekî Simaîliyan ji aliyê Gîleadê ve dihat. Deveyên wan bi biharatê,
belzem û bixûrê barkirî bûn û diçûn Misrê.
[26] Cihûda ji birayên xwe re got: «Eger em birayê xwe bikujin û xwîna wî
veşêrin, ma emê çi bi dest bixin? [27] Werin em wî bifiroşin Simaîliyan û bila
destên me lê nekevin, çimkî ew birayê me ye, goştê me ye.»
Birayên wî guhê xwe dan gotina wî [28] û gava bazirganên Midyanî di wir re
derbas dibûn, wan Ûsiv ji bîrê kişand, derxistin û ew bi bîst zîvî firotin
Simaîliyan. Wan ew birin Misrê.
[29] Çaxê Rûbên vegeriya ser bîrê û dît ku Ûsiv ne di bîrê de ye, ji qehran wî cilên
xwe çirandin. [30] Ew zivirî ba birayên xwe û got: «Kurik ne li wir e. Ezê niha çi
bikim, ez bi ku ve herim?»
[31] Îcar wan rahişt kirasê Ûsiv, nêriyek serjêkirin û kiras li xwîna wî dan.

[32] Wan kirasê belek ji bavê xwe re bir û gotin: «Me ev dîtiye, binêre, ma kirasê kurê te ye an na?»
[33] Wî ew naskir û got: «Kirasê kurê min e. Dehbeyekî xerab ew xwariye. Bêguman, Ûsiv hatiye perçe perçe kirin.»
[34] Aqûb cilên xwe çirandin, xirarî li pişta xwe girêda û gelek rojan şîna kurê xwe
girt. [35] Hemû keç û kurên wî xwestin ku di ber dilê wî de bên; lê nexwest xemrevîn bibe û got: «Ezê bi şînê dakevim nav diyarê miriyan ba kurê xwe.»
Û bavê wî ji bo wî giriya.

[1] Ûsiv hat birin Misrê. Potîfarê Misrî yê ku karbidestekî Firewn û serdarê parêzgeran bû, ew ji Simaîliyên ku ew anîbûn wir, kirrî.
[2] Xudan bi Ûsiv re bû û ew serfiraz dikir. [3] Mîrzayê wî dît ku Xudan pê re ye û di her karê ku dike de, Xudan wî bi ser dixe.
[4] Îcar Ûsiv di çavê wî de qencî dît û bû xulamê ber destê wî. Wî ew danî ser
mala xwe û her tiştê xwe da destê wî [5]
û ji wê demê û pê ve, Xudan bi saya Ûsiv mala yê Misrî bimbarek kir. Di nav malê û di zeviyan de, di her tiştên wî
de bereketa Xudan hebû. [6]
Îcar wî her tiştên xwe bi hêviya Ûsiv ve hiştin; ji nanê ku dixwar pê ve, xema xwe ji tiştekî din nedianî.
Bejin û bala Ûsiv berbiçav bû û dîtina wî spehî bû.
[7] Piştî van tiştan jina mîrzayê Ûsiv çav avêt wî û jê re got: «Bi min re raze.»
[8] Lê wî ev yek red kir û ji jina mîrzayê xwe re got: «Mîrzayê min her tiştê xwe
bi hêviya min ve hiştiye. [9]
Di vê malê de ew ji min ne meztir e. Ji te pê ve, tiştek ji ber min venegirtiye, ji ber ku tu jina wî yî. Ez çawa vê xerabiya mezin bikim û li hember Xwedê guneh bikim?»
[10] Û bi ser ku her roj digot jî, Ûsiv guh nedida hêvîkirina wê ku li ba wê raze an pê re bimîne.
[11] Rojekê Ûsiv ket hundirê malê, ku karê xwe bike. Ji xizmetkarên malê tu kes
li hundir tunebû. [12]
Wê jê re got: «Bi min re raze» û ebayê wî girt.

Lê wî ebayê xwe bi destê wê ve berda û reviya, derket derve. [13–14] Çaxê wê dît
ku wî ebayê xwe bi destê wê ve berda û reviya derve, gazî xizmetkarên mala
xwe kir û ji wan re got:
«Binêrin, mêrê min ev zilamê Îbranî anî ba me, ku me bihetikîne. Ew hat ba min
ku bi min re raze, lê min bi dengekî bilind kir qîrîn. [15] Gava wî bihîst ku ez
qîriyam û min kir hawar, wî ebayê xwe li ba min hişt û reviya, derket derve.»
[16] Heta mîrzayê wî hat malê, wê ebayê wî li ba xwe hişt. [17] Hingê ji wî re jî eynî
tişt got. …
[19] Çaxê mîrzayê wî ev yek bihîst, hêrsa wî bi van gotinan rabû. [20] Mîrzayê Ûsiv
ew girt û xist zîndanê, yanî xist wî cihê ku girtiyên padîşah lê girêdayî bûn.
[21] Lê Xudan bi Ûsiv re bû û qencî lê kir û di çavê serkarê zîndanê de kerem da
wî. [22] Serkarê zîndanê hemû girtiyên di zîndanê de xistin bin destê Ûsiv.
Berpirsyarê her tiştê ku li wê derê dihat kirin, ew bû, çimkî Xudan pê re bû
û her tiştê ku Ûsiv dikir jê re li hev dianî.

Bi vî awayî serhatiya kurê Aqûb Ûsiv dest pê dike. Eger em bixwazin tiştê ku me niha bihîst, bi kurtvebirîn bêjin, em dikarin weha bêjin:
Ûsiv ji rastiyê hez dikir û ji neheqiyê nefret dikir.

Guhdarên delal, divê ku em li vir bernama xwe bi dawî bikin.
Heta bernama ku bê, Xwedê bi we re be!
Hûn her şad û bextewar bin!

Me di bernama xwe ya beriya vê de dît, ku Ûsiv bi bejin û bala xwe berbiçav û spehî bû. Lome jina mîrzayê wî dixwest ku ew bi wê re raze.
Lê Ûsiv qet qebûl nekir û jê re got: «Ez çawa vê xerabiya mezin bikim û li hember Xwedê guneh bikim?»
Çaxê ku wê jinê dît ku Ûsiv qet bi wê re zîna nekir, wê giliyê Ûsiv kir û ew da avêtin zîndanê. Lê heçî Ûsiv bû, wî qenc dît ku ew bikeve hebsê, ne ku ew demeke kurt bi kêfên guneh şa bibe.

Ûsiv dizanibû ku mirov nikare hem ji Xwedê re û hem jî ji guneh re xulamtiyê bike. Ev herdû tişt li hev nagirin.
Ûsiv dilê xwe dabû Xwedê, loma wî ji rastiyê hez dikir û ji xerabiyê nefret dikir. Xwedê Ûsiv rast hesab kir, çimkî Ûsiv ji gotinên Xwedê bawer kir. Wî ji Xwedê qewet distand ku li hember guneh bi ser keve û di vê dinya xerab de jiyaneke rast bijî.

Ûsiv guhê xwe dida Xwedê û Xwedê tevî Ûsiv bû. Ûsiv bi guneh şa nedibû, çimkî xweyiyê dilê wî Xwedê bû.
Nivîsarên Pîroz vê yekê weha diyar dikin û dibêjin:

«Tu kes nikare xulamtiyê ji du axayan re bike; çimkî an ewê ji yekî nefret bike û ji yê din hez bike, an jî ewê qedrê yekî bigire û yê din biçûk bibîne.» (Metta 6:24)
«Xwedê ronahî ye û li ba wî qet tarî tune. Eger em bêjin: «Hevpariya me bi wî re heye» û hê jî em di tariyê de rêve herin, em derewan dikin û em li gor rastiyê nakin.» (Yûhenna I, 1:5.6)

Ew mirovên ku bi rastî dixwazin jiyaneke li gor daxwaza Xwedê bijîn, ji Peyva Xwedê bawer dikin. Ew dixwazin li gor Peyva Xwedê bikin jî.
Lê belê yên ku li Xwedê nagerin, di bin destê guneh de ne.

Belkî ji derve wek mirovên dîndar xuya dibin, lê dîsa jî fikrên wan, daxwazên wan û gotin û kirinên wan di bin hukumê guneh de ne. Dibe ku ew dixwazin dev ji gunehan berdin, lê hêza wan tune, çimkî guneh ji wan xurttir e.
Di dilê wan de hêza Ruhê Pîroz tune, çimkî Xwedê Ruhê xwe dide wanên ku ji Peyva wî bawer dikin û riya xilasiyê ya ku wî amade kiriye, qebûl dikin.

Guhdarê delal, ma bi rastî Xwedê bi hêza xwe dilê te nû kiriye?
Gelo te Mizgîniya Xwedê ya li ser Xilaskarê dinyayê qebûl kiriye?
Erê, hêza wî heye ku dilê te ji hemû gunehên te paqij bike.

Niha emê di Tewratê de berdewam bikin û emê bibînin ku Xwedê çawa rewşa Ûsiv guhert. Di deriyê 41'ê yê Kitêba Destpêkirinê de weha dibêje:

1 Piştî du salên sax, Firewn xewnek dît: Ew li ber keviya çêm sekinîbû.
2 Ji çêm heft çêlekên xweşik û qelew derketin û di nav qamîşan de çêriyan.
3 Piştî wan, heft çêlekên din derketin; ew tehl û lewaz bûn û wan, her heft
çêlekên xweşik û qelew xwarin.
Hingê Firewn hişyar bû 5 û dîsa bi xew ve çû. Cara diduyan wî xewn dît:
Di tayekî genim de heft simbilên tije û qenc derketin. 6 Piştî wan, heft simbilên
pûç û ji bayê rojhilat kizirî, zîldan. 7 Simbilên pûç, simbilên tije û qenc
daqurtandin.
Firewn hişyar bû û fêm kir ku xewn bû 8 û wê sibehê bêkêf bû. Wî şand pey
hemû sêrbazên Misrê û gazî hemû yên şehreza kir. Wî xewna xwe ji wan re got,
lê kesekî ku bikariya ew ji Firewn re şîrove bikira, peyda nebû.
9 Hingê serekmeyger ji Firewn re got: «Îro sûcê min tê bîra min.
10 Carekê Firewn li xizmetkarên xwe hêrs ket û ez û sereknanpêj, em herdû
radestî girtîgeha serdarê parêzgeran kirin. 11 Me herduyan di eynî şevê de xewn
dît. 12 Li wê derê bi me re koleyê serdarê parêzgeran, xortekî Îbranî hebû.

Me jê re got û wî xewnên me şîrove kirin. 13 Çawa ji me re şîrove kiribe, wusa
çêbû. Ez li karmendiya xwe hatim vegerandin û ew hat daleqandin.»
14 Firewn şand pey Ûsiv û ew bi lez ji qula reş hat derxistin. Wî rih û porê xwe
kur kirin, cilên xwe gûhertin û derket ba Firewn.
15 Firewn ji Ûsiv re got: «Min xewnek dît, lê kesek tune ku wê şîrove bike.
Min bihîst ku kengê tu xewnan bibihîzî, tu dikarî şîrove bikî.» 16 Ûsiv li Firewn
vegerand û got: «Ev yek li ba min tune; Xwedê wê bersîva xêrê bide Firewn.»

Li ser vê yekê Firewn xewna xwe ji destpêkê û heta dawiyê ji Ûsiv re got.
Piştre wî ji Ûsiv re got:
24 … Min ev ji sêrbazan re got, lê kesekî ku şîrove bike derneket.»
25 Ûsiv jê re got: «Xwedê, tiştê ku dixwaze bike, bi Firewn da zanîn.
26 Heft çêlekên qenc heft sal in û heft simbilên qenc heft sal in.
27 Heft çêlekên jar û heft simbilên pûç jî heft sal in.
29 Va ye, li hemû welatê Misrê heft salên firehiyê wê bên.
30 Piştî wan, heft salên xelayê wê bên û xela wê welêt xera bike. 31 Ji ber wê
xelaya ku piştre bê, firehî wê neyê bîranîn; çimkî xela wê pirr giran be.
32 Xewn ji aliyê Firewn ve du caran hat dîtin; mana vê ev e ku Xwedê biryara
xwe daye û wê zû bike. 33 Bila niha Firewn li mirovekî şehreza û aqilmend
bigere û bila wî deyne ser welatê Misrê. 34 Bila Firewn vê yekê bike: Bila
karmendan deyne ser hemû welêt û di heft salên firehiyê de, ji dexlê welatê
Misrê pêncyekê bistînin. 35 Bila hemû dexlê van salên qenc ên ku tên, kom bikin
û genim di bajaran de, di bin destê Firewn de berhev bikin, ku bibe zadê hilandî.
36 Ev xwarin wê di heft salên xelayê de bibe zadê hilandî, da ku welat bi xelayê
xera nebe.»

37 Ev gotin di çavê Firewn de qenc bû. 38 Wî ji mezinên xwe re got: «Ma em
dikarin yekî wek vî zilamê ku ruhê Xwedê di dilê wî de ye peyda bikin?» 39
Firewn ji Ûsiv re got:

«Madem ku Xwedê ev tiştên ha hemû bi te dan zanîn, zilamê wek te şehreza û
aqilmend tune. 40 Tê li ser qesra min bî û hemû gelê min wê bi gotina devê te
bike. Bi tenê heçî tac û text e, ew yên min in. 41 Binêre, ez te datînim ser hemû
welatê Misirê» 42 û wî mora xwe ji tiliya xwe derxist û xist tiliya Ûsiv.
Ji kitanê tenik cil li wî kirin û zincîreke zêr bi stûyê wî ve kir.
43 Wî ew li ereba ku ji bo cihgirê wî bû siwar kir û di pêşiya wî de bi qîrîn gotin:
«Li ber wî çok bidin!» Û Firewn ew danî ser hemû welatê Misrê.
46 Çaxê Ûsiv li dîwana Firewnê padîşahê Misrê rawesta bû, sî salî bû. Ûsiv ji
dîwana Firewn derket û li seranserê welatê Misrê geriya.
47 Di heft salên firehiyê de axê bi kulman dexil da. 48 Ûsiv li Misrê hemû
xwarina heft salan lod kir.

53 Heft salên firehiyê li welatê Misrê xilas bûn û 54 wek ku Ûsiv gotibû, heft
salên xelayê dest pê kirin û li hemû welatan xela çêbû; lê li Misrê nan hebû. 55
Çaxê birçîbûnê dest pê kir, xelkê ji bo nên hawara xwe gihand Firewn.
Firewn ji hemû Misriyan re got: «Herin ba Ûsiv. Tiştê ku ew ji we re bêje
bikin.» 56 Ûsiv hemû cihên lodên xwarinê vekirin û difirot Misriyan.
Û ji her derê milet ji bo kirrîna genim hatin Misrê, ba Ûsiv. Çimkî li her derê
xela giran bûbû.

Dostên delal, em niha gihîştine dawiya bernama xwe; di bernama ku bê de emê bibînin ku plana Xwedê ji bo Ûsiv û ji bo mala bavê wî Aqûb çi bû.

Xwedê bi we re be! Hûn bimînin di xêr û xweşiyê de!

Me di bernama din de bihîst ku piştî du salên sax Firewn xewn dîtin.
Firewn gazî hemû sêrbaz û şehrezayên xwe kirin, lê tu kes tunebû ku bikariya xewnên wî jê re şîrove bikiran.
Di dawiyê de serekmeyger hem xewna xwe û hem jî Ûsiv anîn bîra xwe û ji Firewn re li ser Ûsiv got.
Ûsiv bi lez hat gazîkirin, Firewn xewnên xwe jê re gotin û jê hêvî kir ku xewnan şîrove bike. Tam wek ku Ûsiv got, wusa jî derket: Pêşî heft salên firehiyê hatin û piştî wan heft salan, heft salên birçîbûnê hatin.
Li Misrê di salên firehiyê de gelek genim hatibû komkirin û çaxê ku xelayê dest pê kir, xelk dihat ba Ûsiv û wan ji wî xwarin dikirrî.
Lê belê li welatê Kenanê jî xela giran bû û xwarin nema.
Loma emê niha vegerin Kenanê ba Aqûb û mala wî.

1 Çaxê Aqûb hîn bû ku li Misrê genim heye, wî ji kurên xwe re got:
«Çima hûn li hevûdû dinêrin?»
2 Û got: «Binêrin, min bihîstiye ku li Misrê genim heye. Herin wir û genim ji me
re bikirrin, da ku em bijîn û nemirin.»
3 Îcar deh birayên Ûsiv daketin Misrê, da ku genim bikirrin. 4 Lê Aqûb birayê
Ûsiv Binyamîn bi birayên wî re neşand, ji ber ku got: «Belkî zirarek bigihîje
wî.»
5 Îcar kurên Îsraêl jî di nav wan ên ku ji bo kirrîna genim dihatin de bûn. Çimkî
li welatê Kenanê jî xela hebû.

6 Wezîrê li ser welêt Ûsiv bû; yê ku ji hemû xelkê welêt re genim difirot, ew bi
xwe bû. Birayên Ûsiv jî hatin û li ber wî deverû çûn ser çokan.
7 Ûsiv birayên xwe dîtin û ew naskirin. Lê belê wek ku ew yekî biyanî be,
bi wan re hişk peyivî û ji wan re got: «Hûn ji ku derê tên?»
Wan got: «Em ji welatê Kenanê tên, da ku em xwarinê bikirrin.»

[8] Ûsiv birayên xwe nas kirin, lê birayên wî ew nas nekirin. [9] Ew xewnên ku wî li ser wan ditibûn, hatin bîra wî.

Guhdarên delal, gelo hûn fêm dikin ku çi çêdibû? Em li vir dibînin ku birayên Ûsiv li ber birayê xwe yê biçûk diçin ser çokan. Tam wek ku wî di xewna xwe de dîtibû, wusa jî derket! Wan ew kêm didît, jê nefret dikirin û wan dixwest ku wî bikujin – lê belê di dawiyê de ew li ber wî çûn ser çokan!
Ûsiv di cih de birayên xwe nas kirin, lê wan ew nas nekir, çimkî ji kêmahî ve 20 salan wan ew nedîtibû.

Di bernama xwe ya ku bê de, Xwedê hez bike emê li dawiya serhatiya Ûsiv binêrin û emê bibînin ku Ûsiv çawa xwe bi birayên xwe da naskirin.

Lê niha em dixwazin hinekî li ser vê pirsê bifikirin:
Gelo Xwedê dixwaze bi serhatiya Ûsiv û birayên wî çi hînî me bike?
Dersa vê bernameyê ji bo me çi ye?
Bersiv ev e:
Xwedê dixwaze ku em fêm bikin ku serhatiya Ûsiv û birayên wî mînakek e.
Tiştê ku di nav Ûsiv û birayên wî de çêbû, wê di nav Xilaskarê dinyayê û dûndana Adem de jî çêbe.
Dostên delal, eger bi tenê tiştek di bîra me de bimîne, bila ew jî ev be:
Ûsiv mînaka Xilaskarê ku Xwedê wê bişanda vê dinyayê bû.
Bi rastî di serhatiya Ûsiv de ji kêmahî ve 100 tişt hene ku mîna siya serhatiya Xilaskar in ê ku piştî 1800 salan hat vê dinyayê. Ji xwe wextê me tune ku em li wan hemûyan binêrin, lê em dixwazin bala xwe bidin sê xalên girîng:

1) Me dît ku birayên Ûsiv çawa ew kêm dîtin û xewna wî qebûl nekirin.
Wan jê nefret dikir, ew şermezar kirin û firotin jî! Eynî tişt hat serê Xilaskarê ku Xwedê şand vê dinyayê. Xelkê vê dinyayê hem Xilaskar û hem jî Mizgîniya wî red kirin; wan ew şermezar kir, cefa dan wî, ji bo sî zîvan ew dan destê dijberên wî û di dawiyê de xelkê ew xaç kir.

2) Ya diduyan ev e: Di destpêkê de Ûsiv kêm hat dîtin, wî tengahî dîtin û ew hat avêtin zindanê. Lê li gor wext û plana Xwedê, padîşahê Misrê Firewn ew kir cihgirê xwe, ew kir hukumdarê tevahiya welêt û bi her kesî da zanîn: «Eger hûn bixwazin ji xelayê û ji mirinê xilas bibin, herin ba Ûsiv, yanî herin ba wî yê ku jiyanê diparêze!»
Bi vî awayî Xwedê li ser wî Xilaskarê dinyayê yê ku wî ji bo me şandiye, dibêje: «Herin ba Xilaskarê ku min destnîşan kiriye. Ew bi xwe serkaniya jiyanê ye
û ewê jiyana we biparêze. Eger hûn xwe nizim bikin û wî qebûl bikin, dilê we tu caran birçî nabe û canê we wê her û her bijî.»

3) Mînaheviya sisiyan, yanî liberhevdanîna sisiyan jî ya di nav Ûsiv û Xilaskarê dinyayê de, ev rastiya giran e:
Di dawiyê de, birayên Ûsiv li ber wî çûn ser çokan, yanî wan desthilatiya wî qebûl kir. Ji bo wan riyeke din tune bû; diviya ku wan xwe li ber wî eynî şexsê ku wan înkar kiribûn û şermezar kiribûn, bitewanda.
Peyva Xwedê dibêje ku heta îro gelek mirov Xilaskarê dinyayê kêm dibînin, wî înkar dikin û şermezar dikin. Lê belê rojekê ewê vegere vê dinyayê, da ku li gor rastî û dadperweriya xwe, dîwana dinyayê bike.
Hingê her kes wê bizane ku bi rastî Xwedê ew kiriye Xilaskar û Dadgerê dinyayê.

Erê, Kitêba Pîroz dibêje ku bi navê Îsa, hemû yên li ezmên, li erdê û di bin erdê de, wê herin ser çokan û ji bo rûmeta Xwedê her ziman wê bêje: Îsa Mesîh Xudan e.

Dostên delal, heçî hûn in, hûn çawa dikin?
Gelo ma we Xilaskarê ku Xwedê destnîşan kiriye, qebûl kiriye?
Xwedê ew şand, da ku we ji dîwana Roja Dawî û ji cezayê herheyî xilas bike.
An, bêyî ku hûn biryara xwe bidin, hûn dixwazin li benda Roja Dawî bimînin?
Hingê wê dereng be, çimkî hingê te bivê û nevê, tê bi zorê li ber wî herî ser çokan.

Bernama me li vir bi dawî dibe, lê qenc e ku hûn hê bêtir li ser mijara me ya îro bifikirin. Xwedê hez bike emê di du bernameyên ku bên de serhatiya Ûsiv xilas bikin û emê binêrin ka Ûsiv wê li birayên xwe bibihûre an ne.

Bila Xwedê we pîroz û bimbarek bike û dilê we veke, da ku hûn peyvên wî fêm bikin. Peyva Xwedê dibêje:

«Bi vî awayî peyva pêxemberîtiyê ji me re hê bêtir qayîm hat deranîn.
Heta ku sibe zelal bibe û stêrka sibê di dilê we de derkeve, wek çiraya ku di tariyê de ronahî dide, hûnê qenc bikin ku hûn bala xwe bidin peyvên pêxemberîtiyê.» (Petrûs II, 1:19)
Xwedê we biparêze, hûn her şad û bextewar bin.

Me di herdu bernameyên xwe yên berî vê de li ser serhatiya kurê Aqûb Ûsiv bihîst.
Me dît ku neviyê Birahîm Aqûb bû bavê diwanzdeh kuran û Ûsiv kurê wî yê yanzdehan bû.
Ew hemû bi hev re li welatê Kenanê rûdiniştin, yanî di wî welatî de yê ku Xwedê soz dabû Birahîm ku wê bida wî û dûndana wî.
Di xortaniya xwe de Ûsiv xewnek dît; wî dît ku birayên wî yên mezin rojekê wê li ber wî biçin ser çokan.
Lê belê birayên wî yên mezin aciz bûn û ji wî û ji xewnên wî nefret kirin û rojekê wan ew bi xulamtî firot bazirganên ku diçûn Misrê.
Lê Xwedê bi Ûsiv re bû û ew ji tengahiyên wî xilas kir; Xwedê şehrezayî da wî ku mana xewna padîşahê Misrê Firewn şîrove bike.
Herweha Xwedê nîşanî wî da ku xelaya heft salan wê bê û çawa diviya ku xwarin ji bo wan salan bihata hilanîn, da ku xelk ji birçîbûnê nemiran.
Loma Firewn Ûsiv kir hukumdarê herî mezin ê welatê Misrê.

Me dîtibû ku tam li gor peyva Xwedê û li gor şîrovekirina Ûsiv piştî heft salên firehiyê, li Misrê û li Kenanê jî xelayeke giran rabûbû. Lê belê ji ber wê kerem û şehrezayiya ku Xwedê dabû Ûsiv, li Misrê bi firehî genim hebû.

Çaxê ku Aqûb bihîst ku li Misrê genim heye, wî her deh birayên Ûsiv ên mezin şandin Misrê, da ku ji xwe re genim bikirin. Lê belê Aqûb birayê Ûsiv ê biçûk neşand, ji ber ku ew ditirsiya, wî digot ku tiştek wê bê serê wî.

Piştî van tiştan me dîtibû ku her deh birayên mezin gihîştibûn Misrê û me dît ku ew çawa li ber Ûsiv çûn ser çokan. Bi vê yekê xewna Ûsiv ya ku wî berî gelek salan dîtibû, hat cih.

Ûsiv di cih de birayên xwe nas kirin, lê wan ew nas nekir, ji ber ku ji kêmahî ve 20 sal bû ku wan ew nedîtibû. Li gor bîr û baweriya wan, Ûsiv miribû.

Niha emê bibînin ka Ûsiv çawa xwe bi birayên xwe da naskirin. Wî hema di cih de xwe neda naskirin, çimkî wî dixwest ku pêşî wan biceribîne da ku bizane ka dilê wan ê xerab û xapînok hatiye guhertin, an ne.
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
Ûsiv birayên xwe dîtin û ew naskirin. Lê belê wek ku ew yekî biyanî be, bi wan re hişk peyivî û ji wan re got: «Hûn ji ku derê tên?»
Wan got: «Em ji welatê Kenanê tên, da ku em xwarinê bikirrin.» (Destpêkirin 42:7)

Ûsiv gelek tişt ji wan pirsîn, ew sûcdar kirin û got: «Hûn çasûs in!» û ew avêtin girtîgehê. Ûsiv xwest ku ew li ber Xwedê li ser jiyana xwe û li ser halê dilê xwe bifikirin.
Piştî sê rojan, Ûsiv destûr da wan ku vegerin welatê xwe, lê wî yek ji wan di girtîgehê de hişt û ji yên din re got ku bi birayê xwe yê biçûk Binyamîn ve vegerin Misrê.

Piştî gelek mehan, birayên Ûsiv ên mezin vegeriyan Misrê û kurê Aqûb ê biçûk Binyamîn jî bi xwe re anîn.
Çaxê ku gihîştin, ew dîsa hatin ber Ûsiv û dîsa wan ew nas nekir. Ûsiv emir kir ku wan bibin mala wî. Li ser vê yekê birayan dest pê kir, gelek tirsiyan, lê belê Ûsiv ji bo wan ziyafeteke mezin çêkir û li birayên xwe emir kir ku ew hemû, ji yê herî mezin û heta bi yê herî biçûk, li gor emrê xwe li ser sifrê rûne.
Hingê wan xwarina ji masê Ûsiv xwar û ji Binyamîn re ji birayên din pênc caran zêdetir xwarin dan. Belkî Ûsiv careke din ew ceribandin, da ku bibîne ma ka wek ku wan çavnebariya wî kiribû, ew çavnebariya birayê xwe yê biçûk Binyamîn jî dikin, an na. Lê belê tu kesî çavnebariya yê din nekir û ew hemû bi hev re şa û dilgeş bûn.

Piştî ku wan têr xwar û vexwar, Ûsiv li xulamên xwe emir kir ku têrrên birayên wî bi genim dagirin û got ku piyana wî jî di têrra Binyamîn de veşêrin.
Piştî ku bira rabûn û ji bajêr derketin, Ûsiv şahneyê mala xwe şand pey wan, ku wan sûcdar bike û bêje: «Hûn diz in!»
Wî jî zû ew dîtin, û ji wan re got: «We çima di şûna qenciyê de xerabî kir? Ma piyana ku mîrzayê min pê vedixwe ne ev e?»
Wan jê re got: «Mîrzayê me, tu çîma weha dibêjî? Dûrî xulamên te be ku em tiştên wusa bikin. Piyan li ba kîjan xulamê te bê dîtin, bila ew bimire û em jî ji mîrzayê xwe re bibin kole!»
Şahne li wan vegerand  û got: «Baş e, bila wek gotina we be. Piyan li ba kê bê dîtin, bila ew bibe koleyê min û hûn ên din bêsûc bin.»
Şahne ji yê mezin dest pê kir û heta yê biçûk di hemû têrran de li piyanê geriya. Piyan jî di têrra Binyamîn de hat dîtin. Li ser vê yekê birayên Ûsiv ên mezin kirasên xwe çirandin. Her yekî kerê xwe bar kir, vegeriyan bajêr û li ber Ûsiv çûn ser çokan.
Ûsiv ji wan re got: «Eva ku we kiriye çi ye? Ma we guman kir ku hûn dikarin min bixapînin?
Hingê kurê Aqûb ê çaran Cihûda jê re got: «Ma em ji mîrzayê xwe re çi bêjin? Ma em çawa xwe bêsûc derxin? Xwedê sûcê xulamên te derxist.
Va ye, em koleyên te ne, hem em û hem jî yê ku piyan pê re hatiye dîtin.»

Lê belê Ûsiv ji wan re got:
«Dûrî min be ku ez weha bikim! Zilamê ku piyan pê re hatiye dîtin, ewê bibe koleyê min. Lê hûn ên din bi xêr û silamet herin ba bavê xwe.»
Li ser vê yekê Cihûda derket pêş, nêzîkî Ûsiv bû û jê re got ku bi wê yeka ku diviya Binaymîn jî bi wan re here Misrê, dilê bavê wan Aqûb çiqas bi keder bû. Cihûda pêşniyar kir ku ew bi xwe dixwaze di cihê Binyamîn de bibe xulamê Ûsiv.

Çaxê ku Ûsiv dît ku ew poşman bûne û ji gunehên xwe yên berê vegeriyane û dît ku ew çiqas xema bavê xwe û birayê xwe yê biçûk dixwin, hingê wî zanî ku bi rastî birayên wî tobe kirine.
Û wî zanî ku êdî wext hatiye ku xwe bi birayên xwe bide naskirin!

Dostên delal, emê li vir bernama xwe bi dawî bikin. Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de bibînin ku Ûsiv çawa xwe da naskirin û li hemû birayên xwe bihûrt.

Erê, Ûsiv gelek tengahî û cefa dîtin, lê di her tiştî de plana Xwedê hebû. Ûsiv di her halî de guhê xwe da Xwedê û di rewşa xerab de jî li hember plana Xwedê ranebû. Loma bi destê wî ne tenê malbata wî, lê gelek mirovên din jî ji xelayê hatin xilaskirin.

Heta bernameya ku bê, li ser vê soza Xwedê ya newaze kûr bifikirin. Xudan weha dibêje:
Ew planên ku ez ji bo we li ser difikirim, ez wan dizanim; ew ne planên xerabiyê, lê planên aştiyê ne, da ku ez paşerojeke bi hêvî bidim we.
(Yêremya 29:11)
Di bernama ku bê de jî em li benda we ne, heta hingê her şad û bextewar bin.
Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dît ku Ûsiv birayên xwe ceribandin, da ku bibîne ka dilê wan ê xerab hatiya guhertin, an ne. Çaxê wî dît ku çavnebarî di dilê wan de nemaye, wî biryar da ku xwe bi wan bide naskirin.

Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

1 Êdî Ûsiv xwe hew girt û li ber hemûyên ku li ba wî bûn qîriya û got:
«Her kesî ji ba min derxin!»
Piştre 3 Ûsiv ji birayên xwe re got: «Ez Ûsiv im. Gelo bavê min hê jî sax e?»
Lê birayên wî nekarîn bersîva wî bidin, çimkî li ber wî man cemidî.
4 Hingê Ûsiv ji birayên xwe re got: «De werin, nêzîkî min bibin.»
Ew nêzîk bûn û wî got: «Ez birayê we Ûsiv im, yê ku we firot Misriyan.
5 Ji ber ku we ez firotime vir, ber xwe nekevin û bila li we zor neyê.
Çimkî Xwedê ji bo parastina jiyanê ez di pêşiya we de şandim.
6 Ev niha du sal in ku li welêt xela heye. Hê pênc salên din hene ku çandin û
dirûn çênabe. 7 Loma Xwedê ez di pêşiya we de şandim, da ku li ser erdê
jêmayiyekê ji we re bihêle û da ku bi rizgariyeke mezin jiyana we xilas bike. 8
Îcar yê ku ez şandime vir, ne hûn in, lê Xwedê ye; wî ez kirim mîrzayê hemû mala Firewn û serwerê tevahiya welatê Misrê.
9 Bilezînin, vegerin ba bavê min û jê re bêjin: ‹Kurê te Ûsiv dibêje: Xwedê ez
kirime serwerê hemû Misrê. Nesekine, dakeve ba min. 10 Tê li herêma Goşenê
rûnî; tu û kurên te, pezê te, dewarên te û her tiştê te, hûnê nêzîkî min bin. 11 Ezê
te li wê derê xweyî bikim. Çimkî xela wê hê pênc salên din bikişîne.›
12 Va ye, hûn bi çavê xwe dibînin ku yê ji we re dibêje ez bi xwe me.
13 Her tiştê ku we dît, ji bavê min re bêjin. Bilez bavê min berjêrî vir bikin.»

Ûsiv xwe avêt stûyê birayê xwe Binyamîn û hemû birayên xwe ramûsandin û li ser stûyê wan giriya. Piştre birayên wî bi wî re peyivîn. (Destpêkirin 45:1-14)

Piştî vê yekê birayên Ûsiv xwe amade kirin, da ku vegerin mala bavê xwe.
Li gor emrê Firewn, Ûsiv, erebe dan wan û ji bo rêwîtiya wan, xwarin jî da wan.

Ew ji Misrê derketin, hatin welatê Kenanê ba bavê xwe. Wan ew haydar kir û gotin: «Ûsiv hê jî dijî û serwerê hemû welatê Misrê ye.» Aqûb ji wan bawer nekir. Lê çaxê wî erebeyên ku Ûsiv ji bo ku wî hilgirin şandibûn dîtin, canê Aqûb vejiya û wî got: «Bes e; kurê min Ûsiv hê jî dijî. Beriya ku ez bimirim, ez herim wî bibînim.» (Destpêkirin 45:25-28)

Aqûb bi hemû mala xwe ve ji welatê Kenanê derket û ber bi Misrê ve çû. Di rê de wî goriyek pêşkêşî Xwedê kir û li wir Xwedê ji nû ve bi wî re peyivî û got:

«Ez Xwedê me, Xwedayê bavê te me. Netirse ku tu herî Misrê. Çimkî ezê te li wê derê bikim miletekî mezin. Ezê bi te re dakevim Misrê û ezê te careke din derînim. Destên Ûsiv wê çavên te bigirin.» (Destpêkirin 46:3-4)

Piştî rêwîtiyeke dirêj, Aqûb gihîşt Misrê. Ew çiqas şa dibû ku wiyê kurê xwe yê delal piştî van hemû salan ji nû ve bidîta!
Hingê Aqûb bi mala xwe ve li Misrê, li herêma Goşenê, rûnişt. Ew zêde bûn û bûn miletekî mezin. Aqûb hê 17 salan li Misrê rûnişt û hingê êdî bavê diwanzdeh eşîrên Îsraêl ji vê dinyayê bar kir, çû ba Xwedayê xwe.
Ûsiv û birayên xwe û tevahiya gelê Misrê 70 rojan şîna wî girtin.
Hingê kurên Aqûb bavê xwe li welatê Kenanê, di gora bavkalê wî Birahîm de veşartin.

Piştî mirina bavê wan, birayên Ûsiv gotin: «Belkî Ûsiv kîn ji me hilaniye û wek hemû neqenciyên ku me lê kiribûn, ew jî li me bike.» Lê Ûsiv ji wan re got: «Netirsin. Ma ez di cihê Xwedê de me? Nêta we ew bû ku hûn xerabiyê li min bikin, lê nêta Xwedê qencîkirin bû, da wek ku îro dike, ew gelek mirovan bihêle.

Êdî netirsin. Ezê we û zarokên we xweyî bikim.» Bi vî awayî ew di ber dilê wan de hat û dilê wan rihet kir.
Emrê Ûsiv bû sed û deh sal. Hingê wî ji birayên xwe re got: «Ez li ber mirinê me. Lê eseh Xwedê wê we ji vî welatî derîne, bibe welatê ku ji Birahîm, Îshaq û Aqûb re bi sond soz daye.» Ûsiv bi birayên xwe sond da xwarin û got:
«Eseh Xwedê wê li we bigere û hingê divê hûn hestiyên min ji vir derxin.»
Îcar Ûsiv sed û deh salî mir; ew mûmya kirin û li Misrê xistin tabûtekê.
(Destpêkirin 50)

Erê, kitêba Destpêkirinê bi vî awayî xilas dibe, dibêje: Îcar Ûsiv mir û wan ew li Misrê xistin tabûtekê.

Di destepêka vê kitêbê de me dîtibû ku Xwedê çawa jiyan afirand, lê belê ev kitêb bi serhatiyeke mirinê xilas dibe.
Ji ber gunehê Adem, mirin hat nav hemû mirovan. Te bivê û nevê, «meaşê ku guneh dide, mirin e.» (Romayî 6:23)
Diviya ku mirovekî qenc jî, yanî Ûsivê ku payenavê wî „Yê ku jiyanê diparêze“ bû, bimira, çimkî ew jî ji dûndana Adem bû û hevênê guneh di dilê wî de jî hebû.

Xwedê ronakbîrî, yanî aqilmendî da Ûsiv û alîkariya wî dikir, loma Ûsiv dikarî ku di xelayê de jiyana miletê Misrê û jiyana mala xwe biparêze.
Lê belê wî nikaribû jiyana wan ji mirinê bi xwe biparêze. Dîsa jî em dikarin ji dil û can pesnê Xwedê bidin, çimkî di Kitêba Destpêkirinê de em li ser soza Xwedê ya newaze dixwînin.
Xwedê soz da ku ewê Xilaskarekî bêkêmahî bişîne vê dinyayê û got ku ewê mirinê jî bindest bike. Erê, guneh mirin aniye dinyayê. Lê Xwedê soz da ku ewê Xilaskarekî bişîne, da ku ew dûndana Adem ji serkaniya guneh û ji cezayê guneh xilas bike. Serkaniya guneh hem Îblîs e û hem jî dilê mirov ê xerab e.

Cezayê guneh jî mirin û dojeh e. Lê belê Xilaskarê ku Xwedê şand, ew hemû bindest kirin û ew dikare jiyana wan ên ku baweriya xwe bi wî tînin, biguhere. Guhdarên me yên delal, gelo hûn wî Xilaskarê ku hem Îblîs, hem guneh û hem jî mirin û dojeh bindest kirine, nas dikin? Ew jiyana herheyî pêşkêşî hemû mirovan dike. Şert tenê ev e ku ew baweriya xwe bi navê wî bînin û li pey wî herin. Mizgîniya Xwedê li ser vî Xilaskarî weha dibêje:
«Pesin ji Xudan Xwedayê Îsraêl re, ku ew hat serdana gelê xwe û wî ew bi berdêl xilas kir. Wî strûhekî xilasiyê ji me re rakir, çawa ku wî hê ji berê ve bi devê pêxemberên xwe yên pîroz gotibû. (Lûqa 1:68-70)
Amîn!

Xwedê hez bike emê di bernama xwe ya ku bê de, li kitêba diduyan a Tewratê binêrin. Navê wê Derketin e …

Xwedê we pîroz û bimbarek bike! Heta bernameya ku bê, li ser vê ayeta ku dabaşa kitêba  Destpêkirinê tîne bîra me, kûr bifikirin. Ew weha dibêje:

«Li dera ku guneh lê zêde bûye, kerema Xwedê hê bêtir zêde bûye.» (Romayî 5:20)
Yanî: Guneh çiqas di dinyayê de zêde bûbe, kerem û alîkariya Xwedê jî ewqas zêde bûye ku me ji guneh xilas bike û biparêze.

Xwedê we biparêze û hûn her şad û bextewar bin!

**Riya Rastdariyê 28 A 4500**

Em hê di Tewratê de lêkolînê dikin. Wek ku hûn dizanin, Tewrat beşê pêşî yê Nivîsarên Pîroz e û ji pênc kitêban pêk tê.
Kitêba pêşî ya Tewratê kitêba Destpêkirinê ye û di bernama xwe ya din de em bi dersên xwe gihîştin dawiya kitêba Destpêkirinê.
Îro emê dest bi kitêba diduyan, yanî emê dest bi Kitêba Derketinê bikin.
Di vê kitêbê de emê bibînin ku mirovên gelê Îsraêl çawa li Misrê bûn kole û Xwedê ew çawa ji xulamtiyê xilas kirin.

Lê belê beriya ku em dest bi vê serhatiya newaze bikin, em dixwazin careke din bînin bîra xwe ka em di kitêba pêşî ya Nivîsarên Pîroz de çi hîn bûn.
Gelek girîng e ku em qenc bizanin Kitêba Destpêkirinê çi hînî me dike, çimkî Xwedê di vê kitêbê de bingehek danî, da ku em her tiştê ku pêxemberan di kitêbên din de gotine, bi zelalî fêm bikin û jê bawer bikin.

Gelo ma peyvên pêşî yên kitêba Destpêkirinê tên bîra we? Li wir weha dibêje: «Di destpêkê de Xwedê erd û ezman afirandin.»
Ev tiştekî girîng e. «Di destpêkê de Xwedê...» Çaxê ku hê tu tişt nebû, bi tenê Xwedê hebû. Piştî wê me dîtibû ku Xwedê bi emrê peyva xwe û bi qeweta Ruhê xwe, bi milyonan milyaketên pîroz afirandin.
Xwedê milyaket afirandin, da ku her û her xizmeta wî bikin û pesnê wî bidin.
Di nav milyaketan de yekî spehî û şehreza hebû; navê wî Lûsîfer bû.
Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku rojekê Lûsîfer qurre û pozbilind bû; wî di dilê xwe de Xwedê kêm dît û bi milyaketên din ve ew li hember Xwedê rabû. Lê belê tu kes nikare li dijî Xwedê derkeve û Xwedê tu caran wan ên ku wî red dikin, qebûl nake.
Loma Xwedê Lûsîfer û milyaketên wî ji ba xwe avêtin û navê Lûsîfer bû Îblîs, yanî neyar an dijmin.

Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku di Roja Dawî de, dadgerê rast Xwedê wê Îblîs û milyaketên wî û hemû yên ku li pey wan diçin, bavêje agirê dojehê.

Piştî vê yekê me dîtibû ku Xwedê çawa ji bo mirovên ku wê çêkiran, erd afirand. Ji her tiştê ku Xwedê afirandiye, mirov yê herî girîng û giranbiha ye, çimkî mirov di sûretê Xwedê de hatiye afirandin.
Xwedê dixwest ku têkiliya kûr û şêrîn di nav wî bi xwe û mirov de hebe.
Loma wî can da mirov. Yanî wî ruh da mirov, da ku bikare Xwedê nas bike; wî dil da wî, da ku bikare ji Xwedê hez bike û azadiya bijartinê da wî, da ku ew bikare li gor emrê Xwedê bike.
Piştre me bihîst ku Xwedê ceribandineke sivik danî ber jin û mêrê pêşî.
Xwedê ji Adem re gotibû: «Ji her dara baxçe tu dikarî bixwî, lê ji dara zanîna qencî û xerabiyê, nexwe. Çimkî gava ku tu ji wê bixwî, eseh tê bimirî.»
Yanî, roja ku tu jê bixwî, tê her û her ji min bêyî veqetandin!

Lê belê me dîtibû ku çawa Adem û Hewayê guhê xwe dan Îblîs; wan ji xwe re hilbijart ku li gor peyvên Îblîs bikin û wan ji fêkiyê dara zanîna qencî û xerabiyê xwar. Erê, Xwedê ev qedexe kiribû, lê dîsa jî wan xwar.
Loma Kitêba Pîroz dibêje: «Guneh bi destê yek mirovî, mirin jî bi destê guneh ket dinyayê; bi vî awayî mirin derbasî hemû mirovan bû, çimkî hemûyan jî guneh kir.» (Romayî. 5:12)
Erê, tam rast e ku «Nexweşiya vegir li ser nexweşê pêşî tenê namîne.»
Ji ber gunehê Adem, em hemû bûn gunehkar.
Ji ber gunehê Adem, divê em hemû bimirin û li ber dîwana Xwedê bisekinin.

Piştî van tiştan me dîtibû ku Xwedê Adem û Hewa ji baxçê Êdenê derxistin.
Sedema vê yekê, gunehê wan bû. Lê belê beriya ku Xwedê wan derxe, wî ji wan re got ku ewê Xilaskar bişîne dinyayê, da ku zarokên Adem ji hukumdariya Îblîs û ji cezayê guneh rizgar bike.

Plana Xwedayê keremdar a ji bo xilaskirina gunehkaran hebû. Plana wî ew bû ku wiyê şexsekî bêkêmahî, yanî bê hevênê gunehê Adem, bişanda dinyayê.
Wî Yê Rast wê bi dilxwazî ji bo ceza û deynê gunehên zarokên Adem xwîna xwe birijanda. Bi wî awayî Xwedayê rast wê li gor heq û rastiyê li gunehên mirovan bibihûriya.
Erê, soza ku Xwedê dabû Adem û Hewayê, sozeke newaze bû!

Piştî vê yekê me dît ku Xwedê çawa ev soz bi serjêkirina heywanan erê kir û ji çermê wan heywanan ji bo Adem û Hewayê cil çêkirin.
Bi vê yekê Xwedê nîşanî wan kir ku «meaşê ku guneh dide, mirin e» û kifş kir ku «bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.»

Piştre em li ser kurên Adem û Hewayê yên pêşî hîn bûn.
Me dît ku Habîl çawa  ji pezê xwe berxekî bêleke serjêkir û ji Xwedê re kir gorî.
Me dît ku ev jî mînakeke Xilaskarê ku wê ji bo gunehkaran bihata vê dinyayê bû.
Heçî Qayîn bû, wî li gor fikrên xwe bi xwe berê erdê pêşkêşî Xwedê kir.
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin: «Xudan bi Habîl û pêşkêşa wî şa bû. Lê bi Qayîn û pêşkêşa wî şa nebû.» Çima Xwedê pêşkêşa Qayîn qebûl nekir?
Ji ber ku dilê Qayîn ne rast bû û loma jî goriya wî ne li gor dilê Xwedê bû.
Xwedê ji Qayîn hez dikir û dixwest ku ew tobe bike û Riya Rastdariyê ya ku Xwedê amade kiribû, qebûl bike. Lê belê Qayîn pirr hêrs ket û birayê xwe yê biçûk Habîl kuşt.
Pirraniya dûndana Adem di riya Qayîn de diçû û heta bi dema Nûh Nivîsarên Pîroz dibêjin ku «Xudan dît ku xerabiya mirov li ser erdê gelek e. Her roj her nêt û fikrên dilê wî tenê pîs bûn.»
Ji ber ku dilê mirov xerab bû, Xwedê biryar da ku tofanê bişîne, da ku gunehkaran ji rûyê erdê xîş bike. Di wê dema xerab de, bi tenê Nûh ji Xwedê bawer dikir.

Loma Xwedê jê re got ku gemiyeke mezin çêke, da ku ji bo hemûyên ku bikevinê, bibe cihê xilasbûnê. Çaxê ku Nûh gemî çêdikir, Xwedê demeke dirêj bîhna xwe fireh kir, lê belê ji mirovên din tu kesî tobe nekir û di dawiyê de bi tenê Nûh bi mala xwe ve ket gemiyê. Û tam wek ku Xwedê soz dabû, her kesê ku di gemiyê de bû, helak nebû, lê hat xilaskirin.

Guhdarên delal, em li vir bernama xwe bi dawî dikin, lê vê rastiyê tu caran ji bîr nekin: Xwedê dilsoz e û mirovê ku plana xilasiyê ya ku Xwedê amade kiriye qebûl bike, wê xilas bibe.

Heta roja ku bê biminin di xêr û xweşiyê de! Xwedê bi we re be!

Me di bernama xwe ya din de anî bîra xwe ku em di kitêba pêşî ya Tewratê de heta niha çi hîn bûne.
Me bi kurtvebirrîn li serhatiyên afirandina erd û ezmên, li serhatiya Adem û Hewayê, li pêşkêşa Qayîn û Habîl û li tofana di dema Nûh de nêrî.
Di her serhatiyê de me dît ku Xwedê çi bêje, ewê wî tiştî bike jî. Ew her gav sozên xwe tîne cih û mirov dikare her gav ji peyvên Xwedê piştrast be.
Tewrat li ser vê yekê weha dibêje:
19 Xwedê ne mirovek e ku derewan bike;
Ew ne zarokekî Adem e ku ji fikra xwe vegere.
Ma ew dibêje û nake? Ma ew soz dide û nayne cih? (Hijmartin 23:19)

Erê, ew peyvên ku Mûsa di Tewratê de nivîsîne, tam rast in.
Herweha me dît ku plana Xwedê her gav ew bû ku mirov helak nebin û di tariya gunehan de nemînin, lê ber bi ronahiya Xwedê ve biçin.
Wek ku Xwedê di dema Nûh de gazî mirovan kir, ew îro jî gazî me hemûyan dike ku em li wî vegerin û plana wî ya xilasiyê qebûl bikin.

Em niha vegerin serhatiyên Kitêba Destpêkirinê:
Sê kurên Nûh hebûn; ew Sam, Ham û Yafêt bûn. Birahîm pêxember ji dûndana Sam bû.
Me dîtibû ku Xwedê çawa emir li Birahîm kir ku ji welatê xwe derkeve û here welatê Kenanê. Plana Xwedê ew bû ku ji Birahîm miletekî mezin rakira û ji wî miletî pêxember wê rabûna û xilaskarê dinyayê wê jê derketa.
Loma Xwedê ji Birahîm re soz da û got: «Ezê te bereket bikim… û hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.» (Destpêkirin 12:2.3)

Û tam wek ku Xwedê soz dabû, Birahîm di kalîtiya xwe de bû bavê Îshaq.
Îshaq jî bû bavê Aqûb û Aqûb bû bavê diwanzdeh kuran.

Xwedê navê Aqûb guhert, kir Îsraêl û bi kurên wî, gelê Îsraêl rast û rast dest pê kir. Miletê mezin ê ku Xwedê ji Birahîm re soz dabû, ew bû.

Di bernameyên bihûrtî de, me li serhatiya newaze ya kurê Aqûb Ûsiv nêrî. Birayên wî yên mezin ji wî nefret dikirin, çimkî Aqûb pirr ji Ûsiv hez dikir. Lê belê Xwedê Ûsiv bereket kir û ew kir serwerê tevahiya welatê Misrê. Çaxê ku li Misrê û li Kenanê jî xelayeke giran rabû, Aqûb û kurên wî bi gelek mirovên din re ketin tengahiyeke mezin.
Dema bihîstin ku li Misrê genim heye, birayên Ûsiv çûn Misrê.
Hingê me dîtibû ku Ûsiv çawa xwe bi birayên xwe da naskirin, li wan bihûrt û gazî bavê xwe kir ku ew bi hemû mala xwe ve bê Misrê û li herêma Goşenê rûne. Yanî me dîtibû ku li dawiya kitêba Destpêkirinê, zarokên Aqûb êdî ne di welatê Kenanê de bûn, yanî ew ne li wî welatê ku Xwedê ji wan re soz dabû ku wê bida wan, diman. Ew hemû hatibûn Misrê.
Lê belê ev çêbû, da ku gotinên Xwedê bên cih: Wî beriya demeke dirêj ji Birahîm re gotibû: «Qenc bizane ku dûndana te wê li welatê xerîbiyê bibe kole. Çar sed salan zordestî wê li wan bê kirin. Lê ezê dîwana gelê ku wê tengahiyê bide wan bikim. Piştre ewê ji wî welatî pirr dewlemend derkevin.»

Di her tiştê ku hat serê zarokên Aqûb de, destê Xwedê li ser wan bû. Xwedê ji Birahîm re gotibû ku welatê Kenanê wê welatê dûndana wî be.
Lê wî çima hişt ku nevîçirkên Birahîm li Misrê rûnin? Xwedê dixwest ku bi vê yekê rûmet û qeweta xwe diyar bike. Çaxê ku wî bi zendê xwe gelê xwe Îsraêl ji Misrê xilas bikira, her kesî wê bidîta û fêm bikira ku ew bi xwe Padîşahê padîşahan û Xudanê xudanan û Karîndarê her tiştî ye.

Guhdarên delal, em dixwazin di demê xwe yê mayî de ji destpêka Kitêba Derketinê bixwînin. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

[6] Ûsiv û hemû birayên wî û ew qern hemû mirin. [7] Û zarokên Îsraêl ber dan û
zêde bûn û bi zêdehî xurt bûn û welat bi wan tije bû. [8] Îcar padîşahekî nû yê ku
nizanibû Ûsiv kî bû, li ser Misrê rabû.
[9] Wî ji gelê xwe re got: «Ev gelê zarokên Îsraêl ji me bêtir û ji me xurtir e; [10]
Îcar werin, em bi aqilmendî biçin wan, naxwe wê zêde bibin û heye ku çaxê bibe
şer ew jî bi dijminên me re bibin yek û bi me re şer bikin û ji welêt derkevin.»
[11] Îcar cefaker danîn ser serê wan, da ku bi karên giran wan bidin tengiyê.
Wan ji bo Firewn, bajarên embaran Pîtom û Ramses çêkirin.
[12] Lê belê çiqas cefa dan wan, ew ewqas bêtir zêde bûn û bêtir belav bûn û ji ber
zarokên Îsraêl tirs ket dilê Misriyan. [13] Îcar xelkê Misrê zarokên Îsraêl bi
awayekî dijwar xebitandin. [14] Di hemû karên wan de yên ku bi kotekî bi wan
didan kirin, di zeviyan de û bi her cûreyê xebatê û bi xerc û kelpîçan, bi karên
giran jiyana wan tehl kirin. [15] Û padîşahê Misrê bi wan pîrikên Îbraniyan ên ku
navê yekê Şîfra û navê ya din Pua bû re peyivî û ji wan re got:
[16] «Dema hûn ji pîrekên Îbraniyan re bibin pîrik û dema hûn wan li ser kursiyê
zarokanînê bibînin, eger ew zarok kur be, divê hûn wî bikujin, lê belê eger keç
be, bila ew bijî.»
[17] Lê belê pîrik ji Xwedê ditirsiyan û li gor emrê padîşahê Misrê nekirin û kur
sax hiştin. [18] Loma padîşahê Misrê gazî pîrikan kir û ji wan re got:
«Çima we ev tişt kir, we çima zarokên kur sax hiştin?»
[19] Wan ji Firewn re got: «Jinên Îbraniyan ne wek jinên Misriyan in; ji ber ku ew
sivik in û ji berî ku pîrik bigihîjin ba wan, ew zarokên xwe tînin.»
[20] Xwedê qencî li pîrikan kir; gel zêde bû û ew bi zêdehî xurt bûn. [21] Û ji ber ku
pîrik ji Xwedê ditirsiyan, Xwedê ew kirin xweyî mal û xanî.
[22] Hingê Firewn li hemû gelê xwe emir kir û got: «Her kurê ku çêbe bavêjin nav
çemê Nîlê û her keçikê sax bihêlin.»

Deriyê pêşî yê Kitêba Derketinê li wir xilas dibe.

Xwedê hez bike, emê di bernama ku bê de bi vê serhatiya ecêb bidomînin û emê bibînin ku Xwedê çawa zilamekî rakir ku gelê Îsraêl ji destê padîşahê Misrê Firewnê xerab, rizgar bike. Gelo hûn navê wî zilamî dizanin? Erê, navê wî Mûsa pêxember e.

Pirr spas ji bo ku we qenc guhdarî kir. Xwedê we pîroz û bimbarek bike û heta bernama ku bê, vê peyva Xwedê bînin bîra xwe ya ku dibêje:
«Ji berê ve her çi hatibe nivîsîn, ji bo perwerdebûna me hatiye nivîsîn, da ku bi sebir û bi handana Nivîsarên Pîroz hêviya me hebe.» (Romayî 15:4)

**Riya Rastdariyê 29 A 5000**

Em di bernama xwe ya din de gihîştibûn dawiya kitêba Destpêkirinê û me dest bi kitêba diduyan, yanî dest bi Kitêba Derketinê kiribû. Duaya me ev e û em ji Xwedê hêvî dikin ku ew ronahiya xwe bixe hiş û dilê me, da ku em dersên vê kitêbê jî qenc fêm bikin.

Me dîtibû ku di destpêka Kitêba Derketinê de, dûndana Birahîm, Îshaq û Aqûb, yanî gelê Îsraêl li welatê Misrê rûdinişt, yanî ew dûrî wî welatê ku Xwedê wê li gor soza xwe bidabûya wan bûn.

Di deriyê pêşî yê Kitêba Derketinê de em weha dixwînin:
Navên kurên Îsraêl ên ku bi Aqûb re hatibûn Misrê – her yek bi xelkên mala xwe ve – ev in: Rûbên, Şimûn, Lêwî û Cihûda, Îsexar, Zebûlon û Binyamîn, Dan û Neftelî, Gad û Aşer. Û hemû dûndana Aqûb bi hev re heftê mirov bûn; Ûsiv ji xwe li Misrê bû.
Ûsiv û hemû birayên wî û ew qern hemû mirin. Zarokên Îsraêl ber dan, û zêde bûn û bi zêdehî xurt bûn û welat bi wan tije bû.

Îcar padîşahekî nû yê ku nizanibû Ûsiv kî bû, li ser Misrê rabû. Wî ji gelê xwe re got: «Ev gelê zarokên Îsraêl ji me bêtir û ji me xurtir e; îcar werin, em bi aqilmendî biçin wan, naxwe wê zêde bibin û heye ku çaxê bibe şer ew jî bi dijminên me re bibin yek û bi me re şer bikin û ji welêt derkevin.»
Îcar cefaker danîn ser serê wan, da bi karên giran wan bidin tengiyê. Wan ji bo Firewn, bajarên embaran Pîtom û Ramses çêkirin. Lê belê çiqas cefa dan wan, ew ewqas bêtir zêde bûn û bêtir belav bûn û ji ber zarokên Îsraêl tirs ket dilê Misriyan. Îcar xelkê Misrê zarokên Îsraêl bi awayekî dijwar xebitandin. Di hemû karên wan de yên ku bi kotekî bi wan didan kirin, di zeviyan de û bi her cûreyê xebatê û bi xerc û kelpîçan bi karên giran jiyana wan tehl kirin. (Derketin 1:1-14)

Em li vir hinekî bisekinin. Ji dema mirina Ûsiv û heta hingê, ji sê sed salan bêtir derbas bûbû. Niha Firewnekî din bûbû hukumdarê Misriyan û wî Firewnî her tiştê ku Ûsiv ji bo gelê Misrî kiribû, ji bîr kiribû. Wî Firewnî pir tengahî dida gelê Îsraêl û ew ji xwe re kirin kole. Xebat û koletiya wan gelek dijwar bû! Belkî Îsraêlî difikirîn, ji xwe re digotin: «Xwedê dev ji me berdaye! Wî ew soza ku wî dabû bavkalê me Birahîm ji bîr kiriye. Emê çawa bibin miletekî mezin û hêzdar?»
Lê belê Xwedê ew ji bîr nekiribûn. Ji xwe ew tu caran tiştekî ji bîr nake. Bi rastî Xwedê hingê jî tiştên ku wî berî demeke dirêj soz dabû, gav bi gav anîn cih.

Erê, Xwedê dilsoz e! Ew  peymanên xwe digire. Tiştê ku ew bêje, ewê bike û dereng namîne. Xwedê bi xwe ew plana rakirina miletekî nû saz kir û daxwaza wî bû ku ji wî miletê nû pêxember bihatan û Xilaskarê dinyayê ji wî rabûya - û tu tişt tune ku bikare ji plana wî re bibe asteng.

Çaxê ku Xwedê cara pêşî plana xwe diyar kir ku wê miletekî nû rake, wî ji Birahîm û Sarê dest pê kir. Gelo tê bîra we ku hingê ew herdu jî kal û pîr bûn? Dema ku Birahîm sed salî bû, ew bû bavê Îshaq. Îshaq bû bavê Aqûb û Aqûb jî bû bavê 12 kuran. Ji wan 12 kurên Aqûb, ew miletê nû, yanî eşîrên gelê Îsraêl rabûn. Gava wan bar kir, çûn Misrê, hijmara wan 70 kes bûn. Lê niha, piştî 300 salan, ew bûn miletekî mezin û hijmara wan ji milyonekê zêdetir bû.
Ma Xwedê soza xwe anî cih? Ma Xwedê Birahîm kir miletekî mezin? Erê, Xwedê li gor soza xwe ew kir miletekî mezin. Xwedê dilsoz e û ew tu caran ji peyva xwe venagere. Şikir ji Xwedê re! Ew hêja ye ku em pesnê wî bidin!

Îro emê bibînin ku Firewn çawa zordarî li eşîrên gelê Îsraêl kir û ew kirin koleyên xwe. Herweha emê bibînin ku Xwedê qet nehişt ku Firewn gelê Îsraêl bin dest bike, an jî hejimara wan kêm bike.

Bervajiyê wê, her cara ku Firewn dixwest wusa bikira, Xwedê alîkariya gelê xwe dikir û ew hê bêtir serfiraz û zêde dibûn.
Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku ji  ber vê yekê Firewn pirr aciz bû û hêrsa wî rabû. Wî li hemû gelê xwe emir kir û got: «Her kurê ku di nav gelê Îsraêl de çêbe bavêjin nav çemê Nîlê ...» (Derketin 1:22)
Gelo hûn çi difikirin? Kê ev plana pîs xist dilê Firewn? Erê, bêgûman, destê Îblîs tê de bû.
Çima Îblîs dixwest ku gelê Îsraêl hem bindest bike û hem jî helak bike?
Sedem ev bû: Îblîs dizanî ku Xwedê soz daye ku wê xilaskarekî bişîne vê dinyayê, da ku dûndana Adem ji qeweta guneh û ji dojehê xilas bike.
Îblîs dizanî ku ew Xilaskar wê ji gelê Îsraêl rabe! Loma wî xist dilê Firewn ku tengahiyê bide gelê Îsraêl û eger çêbe, wan helak û qirr bike, yanî hemû kurên wan ên ku çêbin, bavêjin nav çemê Nîlê.
Lê belê hêza Xwedê ji ya Îblîs meztir e û wî zilamek ji nav eşîrên Îsraêl hilbijart ku gelê xwe yê bijartî ji destê Firewn rizgar bike. Gelo hûn navê wî zilamî dizanîn? Erê, ew xulamê Xwedê Mûsa pêxember bû.
Lê belê dê û bavê wî Amram û Yoqebed jî bi zirav bûn, çimkî ew «ji fermana padîşah netirsiyan.» (Derketin 6:20; Îbranî 11:23)
Di deriyê diduyan ê Kitêba Derketinê de, em li ser zaroktiya Mûsa dixwînin. Kitêba Pîroz weha dibêje:

Zilamekî ji mala Lêwî çû û keçikeke Lêwiyan ji xwe re anî. Ew jinik bi zaro bû û kurek anî; wê dît ku ew spehî ye û sê mehan ew veşart. Lê dema êdî nikaribû wî veşêre, ji çîtikan selikek ji wî re stand, bi qîrûziftê ew zift kir, zarok xist wê û danî nav çîtikên tenişta çemê Nîlê. Û xwişka wî ji dûr ve disekinî, da ku bibîne ka wê çi pê bê.
Îcar keça Firewn çû ser çemê Nîlê da ku xwe bişo û cêriyên wê di tenişta çemê Nîlê de digeriyan; wê di nav çîtikan de selikek dît û navmaliya xwe şand, ku wê

bîne. Wê ew vekir, zarok dît û va ye, zarok digiriya. Û dilê wê pê şewitî, got: «Ev yek ji zarokên Îbraniyan e.»

Hingê xwişka wî Meryemê ji keça Firewn re got: «Ma ez herim û ji nav Îbraniyan gazî jinikeke bi şîr bikim, ku ew ji bo te zarok bimêjîne?»
Keça Firewn got: «Here!» û keçik çû, gazî diya zarok kir. Keça Firewn ji diya zarok re got: «Rahêje vî zarokî û ji bo min wî bimêjîne; ezê heqê te bidim te.» Jinikê jî rahişt zarok û şîr da wî. Çaxê zarok mezin bû, wê ew ji keça Firewn re anî û ew bû kurê wê; wê navê wî ‹Mûsa› danî, got: «Ji ber ku min ew ji nav avê derxist.» (Derketin 2:1-10)

Serhatiya bûyîna Mûsa ev e. Qenc li ser vê yekê bifikirin! Çaxê ku kurên din dihatin kuştin, yanî dihatin avêtin nav çemê Nîlê, Mûsa ji aliyê diya xwe ve hat mêjandin û ji aliyê keça Firewnê xerab ve hat parastin. Erê, di tevahiya jiyana Mûsa de, destê Xwedê ew parast. Plana Xwedê ew bû ku Mûsa wê gelê Îsraêl ji koletiya wan rizgar bikira.
Şehrezayiya Xwedê çiqas mezin e, bi rastî şehrezayiya wî ji ya mirovan û ji ya Îblîs gelek meztir e!

Di bernama din de me li zaroktiya Mûsa pêxember nêrî. Me dît ku Mûsa pêxember di demê tengahiyê de li Misrê hat dinyayê. Firewn ji gelê Îsraêl ditirsiya û emir kir ku hemû kurên wan ên ku çêbin, di cih de bên kuştin. Bi vî awayî Îblîs dixwest ku plana Xwedê xera bike. Îblîs qet nexwest ku piştî demekê Xilaskarê dinyayê ji wî gelî rabûya, loma nêta wî ew bû ku gelê Îsraêl helak bike. Lê belê Firewn bi ser neket, çimkî şehrezayiya Xwedê ji ya mirovan û ji ya Îblîs gelek meztir e!
Me dît ku Mûsayê biçûk ji aliyê keça Firewnê xerab ve hat qebûlkirin û wê ew kir kurê xwe. Meryemê, yanî xwişka Mûsa, ji keça Firewn re got ku ew jineke zaroşîr nas bike û bi vî awayî ji diya Mûsa hat xwestin, ku wî bimêjîne.
Niha emê bi serhatiya Mûsa pêxember berdewam bikin.

Piştî ku Mûsa ji şîr hat vekirin, gelo hûn dizanin ew li ku derê mezin bû? Erê, ew li mala Firewnê ku zordarî li gelê Îsraêl dikir, mezin bû.
Vê carê jî plana Xwedê ew bû ku Mûsa gelê xwe ji bin destê Firewn xilas bikira. Xwedê li gor plan û daxwaza xwe keça Firewnê zalim hilbijart, da ku Mûsa biparêze. Xwedê dizanibû ku mala Firewn wê ji bo Mûsa cihê herî qenc û ewledar be! Herweha Xwedê dizanî ku diviya Mûsa hînî gelek tiştan bibûya û fêm bikira, da ku ji bo xizmeta wî bihata perwerdekirin û ji bo gelê xwe bibûya rêberekî şehreza.
Li ser vê yekê Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Mûsa di hemû şehrezayiya Misriyan de hat hînkirin, di gotinên xwe û di kirinên xwe de hêzdar bû.» (Karên Şandiyan 7:22)

Lê hê hin tiştên din jî hebûn ku diviya ew hîn bibûya:
«Di wan rojan de, çaxê Mûsa mezin bû, ew derket ba gelê xwe û barên wan dît û yekî Misrî dît ku li birayekî Îbranî dixist. Mûsa li dora xwe nêrî û çaxê dît ku kesek tune, yê Misrî kuşt û di nav seylakê de veşart. Roja din jî derket, dît ku du Îbranî bi hev re şer dikirin. Wî ji yê ku xerabî dikir re got: «Çima tu li hevalê

xwe dixî?» Wî got: «Kê tu li ser me kiriyî serdar an hukumdar? Wek ku te yê Misrî kuşt, ma tu difikirî ku tu min jî bikujî?» Mûsa tirsiya û ji xwe re got: «Bi rastî ev yek hat zanîn.»
Çaxê Firewn ev yek bihîst, ew li kuştina Mûsa geriya, lê Mûsa ji ber Firewn revî û di welatê Midyanê de ma û li ser bîrekê rûnişt.» (Derketin 2:11-15)

Yanî em dibînin ku pêşî Mûsa dixwest ku bi hêza xwe gelê xwe rizgar bike.
Lê belê riya Xwedê ne ew bû. Xwedê bi xwe wê gelê xwe rizgar bikira. Xwedê dixwest ku di vê yekê de Mûsa xulamê wî be. Rizgariya gelê Îsraêl wê ne bi destê Mûsa, lê bi destê Xwedê çêbûya. Mûsa bi xwe bi tenê zilamekî lewaz bû. Eger Xwedê qewet nedabûya wî, qeweta wî wê nebûya ku gelê Îsraêl ji destê Firewn xilas bikira.

Îcar Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku 40 salan Mûsa li çolê, di diyarê Midyanê de rûnişt. Li wê derê, di wî cihê zuwa û germ de Xwedê gelek dersên girîng hînî wî kirin. Di Peyva Xwedê de ayetek heye, weha dibêje:
«Ewê ku di tiştekî hindik de dilsoz e, ew di tiştekî gelek de jî dilsoz e; lê ewê ku di tiştekî hindik de ne dilsoz e, ew di tiştekî gelek de jî ne dilsoz e.» (Lûqa 16:10)
Beriya ku Xwedê berpirsiyariyê bide Mûsa ku bibe rêberê tevahiya gelê wî, diviya ku pêşî ew di tiştên biçûk de dilsoz derketa.
Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku di wî diyarê ji Misrê dûr de, Mûsa bû şivan; wî jinek ji xwe re anî û bû bavê du kuran. Demeke dirêj, yanî çil salan wî bi dilsozî şivantiya keriyê pezê xezûrê xwe kir. Di wê demê de Xwedê di çolê de Mûsa perwerde kir ku rojekê şivantiya gelê Îsraêl bike.
Erê, plana Xwedê ya ji bo Mûsa û gelê Îsraêl, mezin û newaze bû!

Piştî van tiştan, Nivîsarên Pîroz dibêjin:

«Piştî gelek rojan, padîşahê Misrê mir; lê zarokên Îsraêl ji ber koletiyê nalîn û hawar kirin û zarîna wan a ji ber koletiyê gihîşt ba Xwedê. Xwedê nalîna wan bihîst û ew peymana ku bi Birahîm, bi Îshaq û bi Aqûb re girêdabû, anî bîra xwe. Xwedê zarokên Îsraêl dîtin û halê wan zanî.» (Derketin 2:23-25)

Îsraêlî li Misrê demeke dirêj kole bûn. Zordariya ku li wan hat kirin gelek giran bû! Lê belê Xwedê ew ji bîr nekirin. Plana wî ew bû ku gelê Îsraêl ji koletiyê rizgar bike.
Belkî hin hene ku dipirsin: Çima Xwedê dixwest ku gelê Îsraêl ji bin destê Firewn rizgar bike? Ma ji ber ku ew ji mirovên din çêtir bûn? Na! Mirovên gelê Îsraêl wek mirovên Misrê û wek hemû mirovên din gunehkar bûn.
Îcar çima planeke taybetî ya Xwedê ji bo gelê Îsraêl hebû? Sedem bi tenê dilsozî û rehma Xwedê bû.

Em careke din ayetên dawî dixwînin. Ew weha dibêjin: «Xwedê nalîna wan bihîst û ew peymana ku bi Birahîm, bi Îshaq û bi Aqûb re girêdabû, anî bîra xwe. (Bala xwe bidin dilsoziya Xwedê!) Xwedê zarokên Îsraêl dîtin û halê wan zanî.» (Derketin 2:24,25) (Bala xwe bidin rehma Xwedê!) Erê, Xwedê li gor dilsozî û rehma xwe peymana ku wî bi Birahîm re girêdabû anî bîra xwe. Xwedê ji Birahîm re gotibû:

«Ezê te bikim miletekî mezin û ezê te bereket bikim… û hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.» (Destpêkirin 12:2.3)
«Qenc bizane ku dûndana te wê li welatê xerîbiyê bibe kole. Çar sed salan wê zordestî li wan bê kirin. Lê ezê dîwana gelê ku wê tengahiyê bide wan bikim. Piştre ewê ji wî welatî pirr dewlemend derkevin.» (Destpêkirin 15:13.14)
Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de bibînin ku Xwedê çawa bi awayekî newaze ji Mûsa re xuya bû û gazî wî kir ku here Misrê û gelê Îsraêl ji koletiyê

xilas bike. Tam wek ku Xwedê berî demeke dirêj ji Birahîm re soz dabû, wusa kir jî.

Pirr spas ji bo ku we qenc guhdariya vê bernamê kir. Heta careke din em bi vê gotina Xwedê silavan li we dikin a ku dibêje:
«Şikir ji Xudan re bikin, gazî navê wî bikin; kirinên wî di nav miletan de bidin bihîstin. Ew peymana xwe û gotina xwe ya ku emir kiriye, ji bo hezar nifşan digire; ew wê peymana ku wî bi Birahîm re girêdabû û sonda ku wî ji Îshaq re xwaribû tîne bîra xwe.» (Zebûr 105:1.8.9)

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Erê, me di bernama xwe ya din de dît ku padîşahê Misrê Firewn ferman da ku hemû kurên gelê Îsraêl ên ku çêbin, bên avêtin nav çemê Nîlê, da ku ew bimirin.

Lê belê hêza Xwedê ji ya Îblîs meztir e û wî xerabiya ku Firewn dikir, betal kir. Keça Firewn zarokekî nûbûyî di selikekê de di çemê Nîlê de dît û xilas kir. Dilê keça Firewn lê şewitî û ew ji xwe re kir kur û navê wî Mûsa danî.
Îcar Mûsa di mala Firewn de mezin bû, yanî ew di mala wî zilamê ku dixwest gelê Îsraêl helak bike de, mezin bû.
Xwedê li gor şehrezayiya xwe her tişt amade kir ku bi destê Mûsa gelê xwe ji destê padîşahê zordar rizgar bikira. Çaxê ku Mûsa 40 salî bû, ew ji ber Firewn revî, çimkî wî zilamekî Misrî kuştibû û Firewn dixwest ku Mûsa bikuje.
Mûsa çil salan di çolê de ma, jin ji xwe re anî û bû şivanê pezê xezûrê xwe.

Niha em dixwazin bi vê serhatiyê berdewam bikin. Emê bibînin, ka çawa Xwedê ji Mûsa re xuya bû, da ku wî bişîne Misrê û gelê xwe ji destê Firewn xilas bike. Em niha di Tewratê de ji kitêba Derketinê, deriyê sisiyan dixwînin:

1 Mûsa pezê xezûrê xwe kahînê Midyanê Yetro diçêrand û kerî bir pişt çolê û hat
çiyayê Xwedê Horeb. 2 Û milyaketê Xudan di nav diriyekê de di pêta êgir de ji
wî re xuyabû. Mûsa dît ku dirî bi êgir dişewitî, lê xilas nedibû.
3 Mûsa got: «Ez herim û li vê pêşdariya mezin binêrim, dirî çima naşewite, xilas
nabe.»
4 Xudan dît ku Mûsa ji bo dîtinê derket û Xwedê ji nav diriyê gazî wî kir û got:
«Mûsa, Mûsa!» Wî got: «Va me ez.»
5 Xwedê got: «Nêzîkî vir nebe; çaroxên xwe ji lingên xwe derxe, ji ber ku ew
erdê ku tu li ser disekinî axa pîroz e.» 6 Û got: «Ez Xwedayê bavê te me,
Xwedayê Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûb im.»
Li ser vê yekê Mûsa rûyê xwe nixumand çimkî ew ditirsiya ku li Xwedê binêre.

[7] Xudan got: «Bi rastî, min zehmet û cefayê gelê xwe yê di Misrê de dît û min hawara wan a ji ber cefakeran bihîst, ji ber ku ez kederên wan dizanim.
[8] Ez hatim xwar, da ku ez wan ji destê Misriyan rizgar bikim û wan ji wî welatî bibim welatekî qenc û fireh, welatê ku şîr û hingiv tê de diherike, cihê Kenaniyan …
[9] Va ye, hawara zarokên Îsraêl gihîştiye ba min û hem jî ew tengahiya ku
Misriyan daye wan, min dît. [10] Loma niha here, ezê te bişînim ba Firewn, da ku
tu gelê min zarokên Îsraêl ji Misrê derînî.»
[11] Lê Mûsa ji Xwedê re got: «Ez kî me ku ez herim ba Firewn û zarokên Îsraêl ji Misrê derînim?»
[12] Xwedê got: «Bi rastî ezê bi te re bim; û ev wê ji te re nîşan be ku min tu şandiyî: Çaxê tu gel ji Misrê derînî, hûnê li vî çiyayî ji Xwedê re xizmetê bikin.»
[13] Lê Mûsa ji Xwedê re got: «Çaxê ez herim ba gelê Îsraêl û ez ji wan re bêjim: ‹Xwedayê bavên we ez şandim ba we› û ew ji min re bêjin: ‹Navê wî çi ye?› ma hingê ez ji wan re çi bêjim?»
[14] Xwedê ji Mûsa re got: «Ez ew im ê ku EZ IM» û got: «Weha ji zarokên Îsraêl re bêje: ‹EZ IM, ez şandim ba we.›»
[15] Xwedê ji Mûsa re ev jî got: «Weha ji zarokên Îsraêl re bêje: ‹Xwedayê bav û kalên we, Xwedayê Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûb Xudan ez şandime ba we.› Her û her navê min ev e û di hemû nifşan de ezê bi vî navî bêm bîranîn.»

Xwedê di vê serhatiyê de ji Mûsa re çend tiştên girîng gotin û em dikarin li ser qerektêrê Xwedê ji kêmahî ve çar tiştan hîn bibin:

1) Ya pêşî, em hîn dibin ku Xwedê pîroz e. Çaxê ku Mûsa pêta êgir a diriyê dît, ew şaş ma û nêzîkî wê bû, da ku bibîne ku ew çi ye. Hingê wî dengê Xwedê bihîst, yanî Xwedê gazî wî kir. Mûsa ji tirsa lerizî û newêrî ku çavên xwe rake.

Çima tirs ketibû dilê Mûsa?

Bersiv ev e: Mûsa li ber Xwedayê pîroz sekinî bû. Xwedê pîroziya xwe bi van gotinan da zanîn, got: «Nêzîkî vir nebe; çaroxên xwe ji lingên xwe derxe, ji ber ku ew erdê ku tu li ser disekinî axa pîroz e.»
Erê, bi rastî Xwedayê ku ji Mûsa re di pêta êgir de xuya bû, pîroz e.
Xwedê dixwaze ku her kes vê yekê fêm bike û qebûl bike. Heçî ew milyaketan ên ku li ber Xwedê disekinin, Nivîsarên Pîroz dibêjin: Bi şev û bi roj ew bê rawestin dibêjin: «Pîroz, pîroz, pîroz!
Xudan, Xwedayê karîndarê her tiştî,
Yê ku Hebû, Yê ku Heye û Yê ku Wê Bê.» (Peyxama Yûhenna 4:8)
Milyaketên Xwedê qenc dizanin ku Xwedê pîroz e. Guhdarên delal, ma gelo hûn jî vê yekê qebûl dikin?

Divê ku em hinekê li ser mana vê yekê bifikirin.
Xwedê pîroz e, loma wî Adem û Hewa ji baxçê Êdenê, yanî ji bihiştê derxistin, çimkî wan guneh kir.
Xwedê pîroz e, loma wî pêşkêşa Qayîn qebûl nekir.
Xwedê pîroz e, loma wî di dema Nuh pêxember de, bi tofanekê mirov ji ser rûyê erdê xîş kirin.
Xwedê pîroz e, loma wî li Babîlê zimanê mirovan tevlihev kir û ew ji hev belav kirin, çimkî wan dixwest ku ew li hember emrê wî rabin.
Xwedê pîroz e, loma wî di dema Birahîm de agir bi ser bajarê Sodomê de barand, çimkî kêfa wan ji guneh û xerabiyê re dihat.

Heyf û mixabin heta îro jî gelek mirov pîroziya Xwedê qebûl nakin û siyaneta Xwedayê pîroz nagirin. Ew qet fêm nakin ku Xwedê kî ye. Ew nizanin ku Xwedê çiqas paqij e, yanî bêkêmahî ye û bi tevahî pîroz û paqij e.

Çawa em vê yekê dizanin? Li mirovan binêre û tê bibînî ku ew çawa gunehan dikin û çawa kêfa wan ji guneh re tê.
An jî bala xwe bidê, tê bibînî ku bawerî di jiyana gelek mirovan de wek ebayekî ye; carna ew wî ebayî li xwe dikin û carna jî ji xwe dikin û qet li Nivîsarên Pîroz nanêrin û fêm nakin rastiya Xwedê çi ye.
Gelek mirov navê Xwedê bi pûçîtî dibêjin, her gav bêyî ku bifikirin dibêjin «Bismallah!», an «Îşallah!» Lê belê ew di jiyana xwe de qet xema daxwaza Xwedê naxwin û li ser vê yekê qet nafikirin.
Bi tiştekî din jî kifş dibe ku mirov pîroziya Xwedê fêm nakin: Ew li riyên xwe digerin, da ku li ber Xwedê rast bên hesabkirin û riya rastdariyê ya ku Xwedê amade kiriye, red dikin.
Hin dibêjin: «Em dikarin bi rojîgirtinê, bi nimêjkirinê û bi şuştinê û destnimêjan, xwe bi xwe paqij bikin.»
Lê belê em di Nivîsarên Pêxemberan de zelal dibînin ku şuştinên ji derve nikarin me di çavê Xwedayê pîroz de paqij bikin, çimkî ew dixwaze ku dilê mirov û tevahiya jiyana wan paqji be.
Hevalno, Xwedê pîroz e! Loma wî ji Mûsa re got: «Nêzîkî vir nebe; çaroxên xwe ji lingên xwe derxe, ji ber ku ew erdê ku tu li ser disekinî axa pîroz e.»

Erê, guhdarên delal, heta bernama ku bê qenc li ser vê rastiyê bifikirin:
Xwedê pîroz e û ew dixwaze ku em jî pîroz bibin.

Xwedê bi we re be û we pîroz û serfiraz bike!

Em di bernama din de li ser pîroziya Xwedê fikirîn.
Me dît ku mana pîroziya Xwedê ew e ku ew bi xwe bi tevahî paqij û pîroz e û loma ew gunehan qet qebûl nake.
Herweha me dît ku gelek mirov pîroziya Xwedê qebûl nakin: Kêfa wan ji guneh re tê, ew navê Xwedê bi pûçîtî dibêjin û baweriya wan wek ebayekî ye: carna ew wî ebayî li xwe dikin û carna jî ji xwe dikin û gotinên rast ên Peyva Xwedê qet ne xema wan e. Dîsa jî ew bawer dikin ku ewê bikarin li gor riyên xwe li ber Xwedê rast derkevin.
Lê belê di Nivîsarên Pîroz de zelal kifş dibe ku plana xilasiyê ya ku Xwedê amade kiriye yek e û ne bi karên mirovan ên qenc ve girêdayî ye.

Niha em dixwazin li xala diduyan binêrin:

2) Ya diduyan ev e: Xwedê ne tenê Yê Pîroz e, lê belê ew Yê Dilsoz e jî, yanî Yê ku Peymanan digire ye! Gelo te bihîst ku Xwedê pêşî ji Mûsa re çi got?
Wî got: «Ez Xwedayê bavê te me, Xwedayê Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûb im.» (Derketin 3:6)
Bi rastî, ev gotinên ha ji bo her kesê ku dixwaze nêzîkî Xwedê bibe, şahiyeke mezin in. Eger tu li hêviya têkiliya bi Xwedê re bî, vê yekê bîne bîra xwe: Xwedayê pîroz peymana xwe bi Birahîm, Îshaq û Aqûb re girêda.
Xwedê, Yê Dilsoz e; ew qet tu caran dev ji dostên xwe bernade û wan tu caran naxapîne. Piştî çend sed salan Xwedê qenc dizanibû ku soza wî ya ji bo Birahîm, Îshaq û Aqûb û dûndana wan çi bû.

Heçî tu yî, gelo kêfa te ji dilsoziya Xwedê re tê? Gelo di nav te û Xwedayê ku bi Birahîm, Îshaq û Aqûb re peyivî de têkilî heye?
Eger tu bixwazî di vê dinê û di dinya ku bê de ji dil şa bibî, ev pirseke girîng e.
Bala xwe bidê: Em napirsin: Ma dîn û diyaneta te heye, an ne?

Çimkî bi pêkanîna qanûnên oldariyê tu kes li ber Xwedayê pîroz, rastdar dernakeve.
Loma em dipirsin: Gelo têkiliya di nav te û Xwedê de çawa ye?
Ma tu ji Mizgîniya riya xilasiyê ya ku Xwedê amade kiriye, bawer dikî?
Ma te fêm kiriye ku pêkanîna qanûnên dîn û têkiliya bi Xwedê re du tiştên cihê ne?

Îro bi hezaran dîn û diyanet hene. Pispor ji me re dibêjin ku di welatê Brezîlyayê de ji kêmahî ve 4000 dîn û mezheb hene. Ev çiqas ecêb e! Ma bi rastî 4000 xwedê hene? An ma bi rastî 4000 riyên ku biçin ba Xwedê hene?
Nexêr, qet ne wusa ye!
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin: «Tenê Xwedayek heye û di nav Xwedê û mirovan de jî bi tenê navberkarek heye.» (Tîmotêyos I, 2:5)
Lê belê çima li ser rûyê erdê bi hezaran dîn û mezheb hene? Sedem ev e: Piraniya dûndana Adem bingehê rastiyê yê ku Xwedê danî, red kirin; yanî wan peymana ku Xwedê bi Birahîm, Îshaq û Aqûb re girêdabû, qebûl nekir.
Ew nizanin Xwedê çi soz dabû Birahîm û dûndana wî. Loma ew li ser navberkarê ku wê bihata, da ku zarokên Adem ji qeweta gunehan û ji cezayê gunehan xilas bikira, nizanin.
Ew hem Peyva Xwedê nizanin û hem jî nizanin ku Peyva Xwedê nikare bê guhertin. Bi rastî, ew mirov Yê Dilsoz nas nakin û li ser wî nizanin.

3) Ya sisiyan rehma Xwedê ye. Loma Xwedê li ser gelê Îsraêl ji Mûsa re weha got. Got: «Bi rastî, min zehmet û cefayê gelê xwe yê di Misrê de dît û min hawara wan a ji ber cefakeran bihîst, ji ber ku ez kederên wan dizanim.
8 Ez hatim xwar, da ku ez wan ji destê Misriyan rizgar bikim û wan ji wî welatî bibim welatekî qenc û fireh …» (Derketin 3:7.8)

Çima plana Xwedê ew bû ku gelê Îsraêl rizgar bike û wan bibe welatekî qenc? Ma gelê Îsraêl hêjayî vê yekê bû? Ma ew ji miletên din qenctir bûn?
Nexêr! Qet ne wusa ye. Lê çima Xwedê dixwest ku wan rizgar bike û wan pîroz û bimbarek bike?
Sedem bi tenê ev bû: Xwedê dilsoz e û dilbirehm e. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê dibêjin: Xwedê nalîna wan bihîst û ew peymana ku bi Birahîm, bi Îshaq û bi Aqûb re girêdabû, anî bîra xwe. [25] Xwedê zarokên Îsraêl dîtin û halê wan zanî. (Derketin 2:24.25)
Erê, Xwedê Yê Dilbirehm e!

4) Tiştekî din heye ku divê em bala xwe bidinê. Di serhatiya diriyê ku dişewitî de me dît ku Mûsa ji Xwedê pirsî ku bizane navê wî çi ye. Gelo ma çêdibe ku cewhera Xwedê bikare di navekî tenê de bê dazanîn?
Xwedê çiqas mezin û bilind e, ew çiqas pîroz û dilsoz û bi rehm e! Çavên mirov nikarin wî bibînin! Ew Xwedê ye; wî her tişt afirandiye, her tiştî dibîne, her tiştî dizane û dikare her tiştî bike. Çi nav wê têra Xwedayekî weha bike?
Hin dibêjin ku navê Xwedê ev e: Xwedê, an jî Allah. Ji xwe ev rast e, Xwedê Xwedê ye! Lê belê navê Xwedê ne Xwedê ye. Ez mirovek im, lê belê navê min ne mirov e. Navê me hemûyan ê taybetî heye û bi vî navî em tên naskirin, yanî em tên zanîn. Gelo navê Xwedê çi ye?
Xwedê çi bersîv da Mûsa? Em careke din vê ayetê bixwînin. Xwedê ji Mûsa re got:
«Ez ew im ê ku EZ IM» û got: «Weha ji zarokên Îsraêl re bêje: ‹EZ IM, ez şandim ba we.›» [15] Xwedê ji Mûsa re ev jî got: «Weha ji zarokên Îsraêl re bêje: ‹Xwedayê bav û kalên we, Xwedayê Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûb Xudan ez şandime ba we.› Her û her navê min ev e.»

Navê Xwedê yê ku cewhera wî ya herheyî dide zanîn çi ye?
Ma we bihîst? Navê wî ev e: EZ IM, yanî Xudan!

Erê, Tewrat bi zimanê Îbranî hatiye nivîsîn û bi Îbranî peyvên EZ IM û XUDAN gelek nêzîkî hev in.

Di Nivîsarên Pîroz, yanî di Nivîsarên Pêxemberan de bi sedan nav û payenavên Xwedê hene, lê ew nav, yanî Xudan ji yên din hemûyan bêtir tê gotin. Ji 6500 caran bêtir pêxemberan ji Xwedê re gotiye Xudan.
Xwedê Xudan e, ew Yê  Ez Im e, yanî Yê Herheyî ye, Yê ku Hebû, Yê ku Heye û Yê ku Wê Bê ye. Destpêka wî tune. Dawî an xilasbûna wî jî tune. Sînorên wî tune. Yekî din wek wî tune. Ew ser bi xwe ye û bi qeweta xwe ew heye.
Wek ku ew duh hebû û wek ku ew îro heye, ewê her û her weha bimîne.
Ew nayê guhertin. Navê wî Xudan e.

Guhdarên delal, gelo hûn Xudan qenc nas dikin? Ma hûn bi pîroziya wî dizanin? Gelo hûn bi dilsoziya wî şa dibin? Xudan peymanên xwe digire û di têkiliyên xwe de dilsoz e. Ma we rehma wî standiye? Gelo hûn ji Peyva wî bawer dikin? Ma têkiliya we bi Xwedayê Birahîm, Îshaq û Aqûb re heye?
Gelo tu Xudanê ku ji nav diriyê bi Mûsa re peyivî, nas dikî?

Em pirr spas dikin ku we qenc guhdariya peyvên Xwedê kir.
Xwedê hez bike emê di bernameya ku bê de, serhatiya Mûsa pêxember berdewam bikin û emê bibînin ku Xwedê ew çawa şand ba padîşahê Misrê Firewnê xerab.

Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin.
Xwedê ji Mûsa re got:
«Ez ew im ê ku EZ IM! …Ez Xudan im! …  Her û her navê min ev e.»
(Derketin 3:14.15;6:2)

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Îro dîsa emê bi kitêba diduyan a Tewratê berdewam bikin.
Di vê kitêbê de serhatiyên gelê Îsraêl û Mûsa pêxember tên gotin.
Di bernameyên din de me dîtibû ku padîşahê Misrê Firewn çawa tengahî da gelê Îsraêl û ew kirin koleyên xwe.
Lê belê nêta Xwedê ew bû ku xerabiya Firewn bisekinîne.
Ji bo vê yekê wî gazî zilamekî ji nav gelê Îsraêl kir, yanî wî gazî Mûsa kir ku gelê Îsraêl ji destê Firewn xilas bike.

Me dîtibû ku Mûsa di hemû şehrezayiya Misrê de hatibû perwerdekirin. Dema ku Mûsa bû 40 salî, wî dixwest ku li gor nêt û fikrên xwe gelê xwe rizgar bike. Lê belê ji vê yekê bi tenê pirsgirêkên nû derketin û diviya ku Mûsa ji ber Firewn bireviya û xwe di çolê de veşarta. Bi vî awayî Xwedê dixwest ku Mûsa hîn bibe ku ew bi xwe mirovekî bêhêz e û heta ku ne bi destê Xwedê be, tu qeweta wî tune ku bikare gelê Îsraêl rizgar bike.
Mûsa piştî revîna xwe, çil salan di çolê de ma û bû şivanê pezê xezûrê xwe.

Rojekê, çaxê ku Mûsa 80 salî bû, Xwedê li çiyayê Sînayê di diriyê de jê re xuya bû. Agir girtibû diriyê, lê agir ew nedişewitand. Çaxê ku Mûsa ev dît, ew gelek lê şaş ma û çû ku bibîne, ka ev çi tiştekî ecêb e. Hingê wî dengê Xwedê bihîst ê ku got: «Ez Xwedayê bavkalên te me, ez Xwedayê Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûb im.» Mûsa ji tirsan lerizî û newêrî ku çavên xwe rake.
Hingê Xwedê jê re got: «Çaroxên xwe ji lingên xwe derxe, ji ber ku ew erdê ku tu li ser disekinî axa pîroz e. Bi rastî, min zehmet û cefayê gelê xwe yê di Misrê de dît û min hawara wan a ji ber cefakeran bihîst, çimkî ez kederên wan dizanim. [8] Ez hatim xwar, da ku ez wan ji destê Misriyan rizgar bikim.
Niha here, ezê te bişînim Misrê, da ku tu gelê min derînî.»

Niha emê di Tewratê de berdewam bikin û bibînin ka Xwedê çawa gotina xwe xilas kir û Mûsa şand ba padîşahê Misrê.
Di deriyê sisiyan de, me bihîstibû ku Xwedê çawa soz da Mûsa ku wê şehrezayî û desthilatiyê bide wî, da ku her tiştî rast û rast ji Firewn û ji gelê wî re bêje.
Lê belê di deriyê çaran de emê bibînin ku Mûsa ditirsiya û qet nedixwest ku here.

Di Kitêba Derketinê, deriyê çaran de, Nîvîsarên Pîroz weha dibêjin:

1 Hingê Mûsa lê vegerand û got: «Lê ew ji min bawer nakin û guhê xwe nadin gotina min, çimkî ewê bêjin: «Xudan xwe nîşanî te nedaye!»
2 Hingê Xudan jê re got: «Evê ku di destê te de ye çi ye?» Wî got: «Şivdar e.»
3 Xudan got: «Wî bavêje ser erdê.» Û şivdar bû mar û Mûsa ji ber wî reviya.
4 Xudan ji Mûsa re got: «Destê xwe dirêj bike û di dûvê wî re bigire.»
Wî destê xwe dirêj kir, ew girt û di destê wî de bû şivdar.
5 Xudan got: «Vê yekê bike, da ew bawer bikin ku Xwedayê bav û kalên wan, Xwedayê Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûb Xudan xwe nîşanî te daye.»

10 Lê Mûsa ji Xudan re got: «Ax, ya Xudan, ez ne mirovekî zanebêj im, ne duh, ne pêr, ne jî ji hinga ku tu bi xulamê xwe re peyiviyî ve, çimkî ez mirovekî zimangiran im û ez nikarim xweş bipeyivim.»
11 Hingê Xudan jê re got: «Yê ku devê mirov çêkiriye, kî ye? Yê ku mirov lal an kerr, an bi çav an kor çêkiriye, kî ye? Ma ne ez Xudan im? 12 Û niha here û ezê bi devê te re bim û tiştê ku tu bêjî ezê hînî te bikim.»
13 Lê Mûsa got: «Ax, ya Xudan, ez lavan ji te dikim, bi destê wî zilamê ku tê bişînî bişîne.»
14 Hingê Xudan li Mûsa hêrs ket û got: «Ma Harûnê ji mala Lêwî ne birayê te ye?

Ez dizanim ku ew qenc dipeyive. Hem jî va ye, ew derketiye ku bê pêşiya te û
dema ew te bibîne, dilê wî wê şa bibe. [15] Ji wî re bêje û peyvan bixe devê wî.
Ezê bi devê te û bi devê wî re bim û ezê tiştê ku hûnê bikin, hînî we bikim… [17]
Û vî şivdarê ku tê nîşanan pê bikî bigire dest xwe.»

[18] Hingê Mûsa çû, vegeriya ba xezûrê xwe Yetro û jê re got: «Ez hêvî ji te
dikim, bihêle ku ez herim û vegerim ba birayên xwe yên li Misrê û ez bibînim
ma ew hê sax in.» Yetro ji Mûsa re got: «Here, oxira te ya xêrê be.» …
[20] Îcar Mûsa rahişt jina xwe û kurên xwe û ew li kerê xwe siwar kirin û vegeriya
Misrê. Û Mûsa şivdarê Xwedê di destê xwe de bir.
[21] Û Xudan ji Mûsa re got: «Dema tu vegerî herî Misrê, hay jê hebe ku tu van
hemû karên min ên mezin ên ku min dayîn / dane destê te, li ber Firewn bikî; lê
belê ezê dilê wî hişk bikim û ew gel bernade. [22] Û tê ji Firewn re bêjî : ‹Xudan
weha dibêje: Îsraêl kurê min ê nixurî ye [23] û ez ji te re dibêjim: «Kurê min berde,
da ku biperize min.»

[27] Û Xudan ji Harûn re got: «Here çolê pêşiya Mûsa.» Û ew çû, li çiyayê Xwedê
rastî wî hat û ew ramûsand. [28] Û Mûsa ew hemû peyvên Xudan ê ku ew şandibû
û ew hemû nîşanên ku li wî emir kiribûn ku bike, ji Harûn re gotin.
[29] Îcar Mûsa û Harûn çûn û hemû rihspiyên gelê Îsraêl kom kirin.
[30] Harûn ew peyvên ku Xudan ji Mûsa re gotibûn hemû gotin û li ber çavê gel
nîşan çêkirin. [31] Wan bawer kir û dema bihîstin ku Xudan hatiye serdana gelê
Îsraêl û tengahiya wan dîtiye, xwe tewandin û perizîn wî. (Derketin 4:1-5; 10-15; 17-23; 27-31)

[1] Piştre Mûsa û Harûn çûn û ji Firewn re gotin: «Xwedayê Îsraêl Xudan weha
dibêje: «Destûra gelê min bide ku ew herin û ji min re di çolê de cejnê çêkin.»
[2] Lê Firewn got: «Xudan kî ye ku ez guhê xwe bidim gotina wî û destûra Îsraêl
bidim? Ez Xudan nas nakim û ez destûra Îsraêl jî nadim.»

Erê, guhdarên delal, em dixwazin li vir hinekî bisekinin. Em dibînin ku Xwedê bi devê Mûsa û Harûn ji Firewn re peyivî. Ma Firewn ji peyvên Xwedê bawer kir? Na, wî qet bawer nekir! Gelo we bihîst ku bersîva Firewn çi bû? Wî got: «Xudan kî ye ku ez guhê xwe bidim gotina wî û destûra Îsraêl bidim? Ez Xudan nas nakim û ez destûra Îsraêl jî nadim.»

Firewn Xudan nas nedikir. Firewn û tevahiya xelkê Misrê dîndar bûn, lê belê wan Xwedê nas nedikir. Xema wan bi tenê ew bû ku li pey dîn û diyaneta bav û kalên xwe biçin. Naskirina Xwedayê rast û zindî, yanî naskirina Xwedayê Birahîm, Îshaq û Aqûb qet ne xema wan bû. Firewn û xelkê Misrê li adetên xwe, li pûtên xwe, li nivîştiyên xwe û li rêberên xwe yên dîn ewle dibûn, lê wan Xudan nas nedikir û bala xwe nedidan Peyva wî ya herheyî û li Xwedayê rast ewle nebûn.

Guhdarên delal, em li ser xwe çi difikirin? Ma hûn wek Mûsa pêxember Xudan nas dikin, an hûn wek Firewn wî nas nakin?

Xudan weha dibêje: Bila yê zane bi zanebûna xwe pesnê xwe nede û bila yê hêzdar bi hêza xwe pesnê xwe nede û bila yê dewlemend bi dewlemendiya xwe pesnê xwe nede, [24] lê yê ku pesnê xwe bide, bila bi vê yekê pesnê xwe bide ku ew min fêm dike û min nas dike ku ez Xudan im.

Xwedê bi we re be!

Me di bernama din de bihîst ku Xwedê gazî Mûsa kir ku here Misrê û gelê Îsraêl ji bin destê Firewn rizgar bike. Me bihîst ku pêşî Mûsa qet nexwest û bi Xwedê re gotûbêj kir, lê di dawiyê de wî li gor emrê Xwedê kir û bi birayê xwe Harûn re çû, li ber Firewn sekinî û jê re got: «Xwedayê Îsraêl Xudan weha dibêje: «Destûra gelê min bide ku ew herin û ji min re di çolê de cejnê çêkin.»
2 Lê Firewn got: «Xudan kî ye ku ez guhê xwe bidim gotina wî û destûra Îsraêl bidim? Ez Xudan nas nakim û ez destûra Îsraêl jî nadim.»

Erê, Firewn Xudan nas nedikir û wî eşkere got ku ew Xwedê nas nake. Naskirina Xwedê ne xema Firewn bû.

Loma em di deriyê şeşan de weha dixwînin:
1 Xudan ji Mûsa re got: «Niha tê bibînî ku ezê çi bi Firewn bikim; çimkî bi destekî xurt ewê destûra gelê Îsraêl bide û bi destekî xurt ewê wan ji welatê xwe derxe.»
2 Û Xwedê ji Mûsa re peyivî û jê re got: «Ez Xudan im. 3 Û ez bi navê Xwedayê
karîndarê her tiştî ji Birahîm, Îshaq û Aqûb re xuya bûm; lê belê ez bi navê xwe
Xudan ji wan re kifş nebûm. 4 Min bi wan re peyman jî girêdaye ku ez welatê
Kenanê, welatê ku tê de xerîb bûn, bidim wan. 5 Û min nalîna gelê Îsraêl ê ku
Misriyan di koletiyê de girtiye bihîst û min peymana xwe anî bîra xwe.
6 «Ji ber vê yekê ji gelê Îsraêl re bêje: Xudan ez im û ezê we ji bin barên
Misriyan derînim û ezê we ji koletiya wan rizgar bikim û we bi zendê dirêjkirî
azad bikim û dîwana Misriyan bikim. 7 Ezê we bikim gelê xwe û ezê Xwedayê
we bim. Hûnê bizanin ku Xwedayê we Xudan ê ku hûn ji bin barê Misriyan
deranîne, ez im. 8 Ezê we bînim wî welatê ku min sond ji Birahîm, Îshaq û Aqûb
re xwariye, ku ez wî bidim wan û ezê we bikim wêrisê wî welatî; Xudan ez im.»
(Derketin 6:1-8)

[4] Lê belê Firewn guhê xwe nade we û ezê destê xwe deynim ser Misrê û ezê
lekên xwe, yanî gelê Îsraêl ji Misrê derînim û dîwana Misriyan bikim.
[5] Ezê destê xwe dirêj bikim ser Misrê û ezê gelê Îsraêl ji nav wan derînim; hingê
Misrî wê bizanin ku Xudan ez im.»
[6] Îcar Mûsa û Harûn wusa kirin; wek ku Xudan li wan emir kiribû, wusa kirin. [7]
Û çaxê ku wan ji Firewn re got, Mûsa heştî salî bû û Harûn heştî û sê salî bû.

Yanî em dibînin ku plana Xudan ew bû ku ew bi cezayên mezin dîwana Firewn û gelê Misrê bike. Xwedê wê li gor dadperweriya xwe, ew êş û tengahiya ku Misriyan dabûn gelê Îsraêl vegerandan ser wan. Û bi kerametên mezin ên ku wê bi destê Mûsa bihatana çêkirin, Xwedê wê rûmet û qeweta xwe bida zanîn. Hingê hemû Misriyan û tevahiya dinyayê wê fêm bikiran ku Xudan Xwedayê ku bi Birahîm, Îshaq, Aqûb û Mûsa re peyiviye, bi rastî Xwedayê rast û zindî ye.

Wek ku me berî niha dît, Xwedê dilbirehm e û naxwaze ku di nav mirovan de yek jî helak bibe. Bervajiyê vê, ew dixwaze ku her kes tobe bike û rastiyê bizane û qebûl bike. Sedemê kerametên ku Mûsa wê bikiran ew bû ku Peyva Xwedê bê erêkirin. Nêta Xwedê ew bû ku her kes bi zelalî bizane Xwedayê ku bi Mûsa re peyiviye, Xwedayê rast û zindî ye.

Divê em bînin bîra xwe ku li Misrê bi sedan pût hebûn û dihatin perizîn. Misriyan ew hemû xwedê hesab dikirin, lê belê Xwedê dixwest ku ew fêm bikin ku bi rastî Xwedayê rastîn yek e. Xwedê dixwest ku ew bizanin, Xwedayê rastîn ew e yê ku peymana xwe bi Birahîm, Îshaq û Aqûb re girêdaye. Wî soz da wan ku ew wan bike miletekî mezin. Ji wî miletî hem pêxember û Nivîsarên Pîroz wê bihatan û hem jî Xilaskarê dinyayê wê ji wî gelî bihata.

Lê belê Firewn bala xwe neda vê yekê û nexwest ku Xwedayê rastîn nas bike. Xwedê bi devê pêxemberên xwe Mûsa û Harûn jê re got, lê belê ew yek qet ne

xema Firewn bû. Loma wî weha bersîv da û got: «Xudan kî ye ku ez guhê xwe bidim gotina wî û destûra Îsraêl bidim? Ez Xudan nas nakim û ez destûra Îsraêl jî nadim.» (Derketin 5:2)

Erê, dema ku Firewn got: «Ez Xudan nas nakim», wî rast got. Wî Xwedayê ku bi Birahîm, Îshaq û Aqûb re peymaneke herheyî girêdabû, nas nedikir.
Firewn dîndar bû, lê têkiliya wî ya bi Xwedê re qet nebû. Dilê Firewn girtî û hişk bû û rastiya Xwedayê rastîn nikaribû biketa dilê wî.
Loma wî qet bala xwe neda Peyva Xwedê; çaxê Mûsa û Harûn peyvên Xwedê jê re gotin, wî qet guhê xwe neda wan.

Heta îro jî piraniya mirovan di riya Firewn de diçin. Ew gelek tiştan li ser Xwedê dibêjin, lê di dilê xwe de ew qet bala xwe nadin Peyva Xudan. Ji ber vê yekê ew Xwedê nas nakin.
Ew li ser Xwedê çend tiştan dizanin, lê ew Xwedê bi xwe nas nakin.
Dîn û diyaneta wan heye û wek ku bav û kalên wan ji wan re gotin, wusa dikin.
Lê belê têkiliya wan a bi Xwedayê zindî, yanî bi Xwedayê ku ji Mûsa re xuya bû re, tune.

Eger niha em li ser xwe bi xwe tiştekî bêjin, emê çi bêjin? Gelo hûn Xudan nas dikin? Ma bi rastî tu dizanî ku wî bi devê pêxemberên xwe çi gotiye? Gelo tu bi dilekî vekirî û bi sergiranî guhê xwe didî Nivîsarên Pêxemberên Xwedê? Ma bi rastî tu Xudan Xwedê nas dikî? Gelo tu ji hemû dilê xwe ji wî hez dikî? Ma tu dixwazî li gor peyvên wî bikî, an tu wek Firewn î û tu bi tenê li gor dîn û diyaneta bav û kalên xwe dikî?
Yanî tu difikirî, dibêjî: Ji bo ketina Padîşahiya Ezmanan ev tiştên ha têra min dikin?

Ey dostên delal, bila tu kes ji me ne wek Firewn be, çimkî Firewn guhên xwe kerr kirin û nexwest ji peyvên Xwedayê zindî bawer bike.
Ji kerema xwe guhê xwe bidin vê hişyarkirina Peyva Xwedê:
Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Birano, hay ji xwe hebin ku bi tu kesî ji we re dilekî xerab û bêbawer ê ku we ji Xwedayê jîndar bizivirîne, peyda nebe.» (Îbranî 3:12)
Eger îro tu dengê wî bibihîzî, tu wek Firewn dilê xwe hişk neke û nebêje: «Xudan kî ye ku ez guhê xwe bidim gotina wî?»

Pir sipas ji bo ku we qenc guhdariya gotinên Xwedê kir.
Xwedê hez bike emê di bernameya ku bê de bibînin ku Xwedê çawa belayên dijwar anîn ser Firewn û miletê wî, da ku ew fêm bikin ku Xudan ew e.
Ji kerema xwe di bernameya ku bê de jî bi me re bin.

Heta hingê bila ev peyvên Xwedê di bîra we de bimînin. Nivîsarên Pîroz dibêjin:

«Eger îro hûn dengê wî bibihîzin, dilê xwe hişk nekin.» (Îbranî 3:15)

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

«Tu kes nikare bi hêkê şêrr bi latê re bike.» Ev gotina pêşiyan bi awayekî kin dabaşa dersa îro tîne ber çavên me. Çaxê ku hêk li latê bikeve, çi wê biqewime? Eseh, hêk wê bişkê û lat wê eynî wek berê bimîne. Mûsa li ser Xudan Xwedê weha got: Ew lat e, kirinên wî bêkêmahî ne û hemû riyên wî rast in.

(Dubarekirina Şerîetê 32:4)

Îro emê bibînin çaxê ku Firewn dixwest li hember Xwedê şêrr bike, çi hat serê wî.

Me di bernama xwe ya berî vê de dît ku Xwedê Mûsa û Harûn şandin ba Firewn, da ku ew gelê Îsraêl ji bindestiya wan rizgar bikin û ji Misrê derînin.
Wan ji Firewn re got: «Xwedayê Îsraêl Xudan weha dibêje: ‹Destûra gelê min bide ku ew herin û di çolê de ji min re cejnê çêkin.›»
Lê belê Firewn ji wan re got: «Xudan kî ye ku ez guhê xwe bidim gotina wî û destûra Îsraêl bidim? Ez Xudan nas nakim û ez destûra Îsraêl jî nadim.»
(Derketin 5:1-2)
Bi van gotinan kifş dibe ku Xwedê biryar dabû ku gelê Îsraêl xilas bike û Firewn biryar dabû ku gelê Îsraêl bernede û dixwest ku ew di koletiya wî de bimînin.
Lê belê em vê gotina pêşiyan tînin bîra xwe ya ku dibêje: «Tu kes nikare bi hêkê şêrr bi latê re bike.»

Em niha vegerin kitêba diduyan a Tewratê û emê di kitêba Derketinê de bibînin ku çawa Firewn dixwest bi Xwedê re şêrr bike. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

10 Mûsa û Harûn çûn ba Firewn û wek ku Xudan emir kiribû, wusa çêkirin; û
Harûn şivdarê xwe li ber Firewn û li ber xulamên wî avêt ser erdê û bû mar. 11
Hingê Firewn gazî efsûnkeran û mirovên şehreza kir û sêrbazên Misrê jî bi
sêrbaziya xwe wusa çêkirin. 12 Û her yekî şivdarê xwe avêt erdê û ew bûn mar;
lê belê şivdarê Harûn şivdarên wan daqurtandin. (Derketin 7:10-12)

Bala xwe bidine ku ew ‹gulaşa› di nav Firewn û Xwedê de çawa dest pê kir. Li aliyekê em Firewn û sêrbaz û zilamên wî yên şehreza dibînin û li aliyê din em Mûsa û Harûn dibînin. Piştî ku şivdarê Harûn bi kerameteke Xwedê bû mar, sêrbazên Firewn jî bi zanîna sirrên sêrê kerametek çêkirin: her yekî şivdarê xwe avêt erdê û ew bûn mar; lê belê şivdarê Harûn şivdarên wan daqurtandin.

Em li ser vê yekê çi bêjin? Em dizanin ku kerametên ku Mûsa û Harûn dikirin, ji Xwedê bûn. Lê belê sêrbazên Firewn jî keramet kirin. Serkaniya hêza wan ji ku derê bû? Ma Xwedê ev hêz da wan? Na, tu caran! Xwedê li hember xwe ranabe! Îcar hêza wan sêrbazan ji ku derê bû? Sêrbazên Firewn hem hostayên xapandinê bûn û hem jî ji Îblîs hêz distandin.

Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Îblîs gelek bi aqil e û ji xapandinê pir hez dike. Hêza wî mezin e û ew dikare kerametên newaze çêke. Lê belê di heman demê de Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê di asteke bê sînor de ji Îblîs hêzdartir e. Loma şivdarê Harûn şivdarên sêrbazên Firewn daqurtandin. Lê belê vê serhatiyê dilê Firewn nerm nekir: Wî tobe nekir û qet guhê xwe neda peyvên Xwedê.

Ji kerema xwe guhê xwe bidinê ku Nivîsarên Pîroz çi dibêjin. Ew dibêjin:
14 Xudan ji Mûsa re got: «Dilê Firewn hişk e, naxwaze gel berde. 15 Îcar sibehî li
teniişta çemê Nîlê bisekine û çaxê ew here ser avê, here ba wî; wî şivdarê ku
hatibû guhertin, bûbû mar, bigire dest xwe. 16 Jê re bêje: ‹Xwedayê Îbraniyan
Xudan ez şandim ba te û dibêje: Gelê min berde, da ku di çolê de ji min re
xizmetê bike; lê va ye heta niha te guhê xwe nedayê. 17 Loma Xudan weha
dibêje: ‹Tê bi vê yekê bizanî ku ez Xudan im: Va ye, ezê bi vî şivdarê ku di
destê min de ye li ava çemê Nîlê bixim û wê bibe xwîn....
20 Û Mûsa û Harûn wek ku Xudan emir kiribû, wusa çêkirin; û li ber çavê
Firewn û li ber çavên xulamên wî şivdarê xwe bilind kir û li ava çemê Nîlê xist;
û ava çemê Nîlê hemû bû xwîn. 21 Û masiyên di çemê Nîlê de mirin; û bîhn bi

çemê Nîlê ket û Misriyan nikaribûn avê ji çemê Nîlê vexwin; û li hemû welatê
Misrê xwîn hebû.
[22] Lê belê sêrbazên Misrê jî bi sêrbaziya xwe weha çêkirin; û wek ku Xudan
gotibû, dilê Firewn hişk bû û guhê xwe neda wan. [23] Û Firewn vegeriya, çû mala
xwe û ev ji xwe re nekir xem. [24] Û hemû Misriyan ji bo ava vexwarinê li tenişta
çemê Nîlê kûlan, çimkî nikaribûn ji ava çemê Nîlê vexwin.

[25] Û piştî ku Xudan li çemê Nîlê xist heft roj temam bûn. [1] Hingê Xudan ji Mûsa
re got: «Here ba Firewn û jê re bêje: ‹Xudan weha dibêje: «Destûra gelê min
bide, ku ji min re xizmetê bike. [2] Û eger tu nexwazî destûra wan bidî, va ye, ezê
bi beqan li hemû diyarê te bixim [3] û çemê Nîlê wê bi beqan bikele, ewê derkevin
û bên mala te û oda te ya razanê, ser nivîna te û wê bikevin malên xulamên te,
ser gelê te û wê bikevin firnên te û nav teknên te yên hevîrê. (Derketin 7:14-17; 7:20-8:3)

Lê belê Firewn guhê xwe neda hişyarkirinên Mûsa.
[5] Hingê Xudan ji Mûsa re got: «Ji Harûn re bêje: ‹Destê xwe bi şivdarê xwe ve li
ser çeman, li ser coyan û li ser golan dirêj bike û beqan derxe ser welatê
Misrê.›»
[6] Û Harûn destê xwe li ser ava Misrê dirêj kir, beq derketin û welatê Misrê
nixamtin. [7] Lê sêrbazan jî bi sêrbaziya xwe weha çêkir û beq derxistin ser welatê
Misrê.
[8] Û Firewn gazî Mûsa û Harûn kir û ji wan re got: «Lavan ji Xudan bikin, bila
beqan ji ser min û ji ser gelê min rake; ezê destûra gelê wî bidim, ku goriyan ji
Xudan re serjêke… [12] Û Mûsa û Harûn ji ba Firewn derketin û Mûsa ji ber wan
beqên ku anîbûn ser Firewn hawar kir Xudan. [13] Xudan jî li gor peyva Mûsa kir
û beq di mal, hewş û di zeviyan de mirin. [14] Û wan ew li ser hev nijiladin, kom
kirin; û bîhn bi welêt ket. [15] Lê belê çaxê Firewn dît ku dawiya beqan hat, wek
ku Xudan gotibû, wusa dilê xwe hişk kir û guhê xwe neda wan.

Erê, guhdarên delal, nîşan û belayên pêşî yên ku hatin serê Firewn û gelê Misrê ev bûn. Firewn hem hêz û hem jî rehm û kerema Xwedê bi çavên xwe dît, lê dîsa jî wî Xwedayê rast qebûl nekir û emir û gotinên wî red kirin. Firewn û mezinên wî qet guhê xwe nedan pêxemberê Xwedê Mûsa. Loma Xwedê hê gelek belayên din şandin û di dawiyê de Firewn biviya neviya qebûl kir ku ew nikare li hember plana Xwedê rabe.
Guhdarên delal, ma hûn wek Firewn, emir û gotinên Xwedê kêm bibînin, an hûn plana wî ya xilasiyê bi dilekî şa qebûl dikin?

Di bernama ku bê de emê li belayên din ên ku Xwedê anîn serê Firewn û gelê wî binêrin. Heta hingê li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin:

Xwe li ber Xudan nizim bikin, ewê we bilind bike. (Aqûb 4:10)

Di bernama din de me dest bi belayên ku hatin serê Firewn û gelê Misrê kir. Pêşî li gor emrê Xwedê li welatê Misrê tevahiya avê bû xwîn û piştre beqan welat nixamt.
Me dît ku Firewn dilê xwe hişk kir û gotinên pêxemberên Xwedê Mûsa û Harûn qet qebûl nekir.

Loma [16] Xudan ji Mûsa re got: «Ji Harûn re bêje:
Şivdarê xwe dirêj bike û li toza erdê bixe, da ku li hemû welatê Misrê pêşû çêbin.»
[17] Û weha çêkirin û Harûn destê xwe bi şivdarê xwe ve dirêj kir û li toza erdê xist, li ser mirov û heywanan pêşû çêbûn; û di hemû welatê Misrê de hemû toza erdê bû pêşû.
[18] Sêrbazan jî ji bo ku pêşûyan derxin, bi sêrbaziya xwe weha çêkirin, lê belê nikaribûn çêkin; li ser mirov û heywanan pêşû hebûn.
[19] Û sêrbazan ji Firewn re got: «Di vî karî de tiliya Xwedê heye.»
Lê belê wek ku Xudan gotibû, dilê Firewn hişk bû û guhê xwe neda wan.
(Derketin 8:1-8. 12-19)

Gelo we bihîst ku sêrbazên Firewn çi kirin?
Me bihîst ku hinek hêza wan hebû, çimkî wan ew hêz ji Îblîs standibû.
Loma wan bi sêrbaziya xwe dikaribû mîna hin kerametên ku Xwedê bi destê Harûn kiribûn, bikiran;
yanî wan dikaribû hinek av biguhertan xwînê û bi destê wan çend beq jî derketin nav holê.
(Gelo çima wan weha kir? Ma bi rastî sêrbazên Firewn fikirîn ku xwîn û beq hê jî têra Misriyan nakin û diviya ku wan dixwest ku hê zêdetir bikiran?)
Li vir bi zelalî kifş dibe ku hêza wan sêrbazan ne bêsînor bû.
Sêrbazên Firewn nikaribûn belayên ku Xwedayê karîndarê her tiştî anî serê Misriyan, rawestînin an pûç derxin.

Çaxê ku Harûn bi şivdarê xwe li erdê xist û toz bû pêşû, efsûnkeran jî dixwest ku bi sêrbaziya xwe ji tozê pêşûyan çêkin, lê belê wan nikaribû çêkin.
Loma wan ji Firewn re got: «Di vî karî de tiliya Xwedê he ye!»

Bêgûman, hêza sêrbazan kêm bû. Bê şik, hêza Îblîs heye û dikare ji hêza xwe bide mirovan, lê ew hêz tu caran ne di ser hêza Xwedê re ye. Xwedê bi xwe sînor ji hêza Îblîs re datîne.
Tenê Xwedê Karîndarê her tiştî ye. Ji wî pê ve tu kes tune ku bikare her tiştî bike. Tu tişt jê re nabe asteng û mezinahiya wî bêsînor e.
Sêrbazên Firewn hêdî hêdî li ser hêza Xwedê ya bêsînor hîn dibûn, lê belê Firewn qet nexwest hêza Xwedê qebûl bike, an li gor peyvên wî bike.
Firewn wek berê dilê xwe hişk dikir û gûman dikir ku ewê bikare bi Xwedê re şêrr bike û bi ser jî keve!

Piştî van tiştan Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê bi destê Mûsa û Harûn hê heft belayên din anîn ser Misrê.
Heyf û mixabin wextê me tune ku em yek bi yek li wan hemûyan binêrin, lê em dixwazin bi rêzê ve bêjin ku ew çi û çi bûn:

Di bela çaran de mêşên hespan ketin tevahiya welêt û nav malên Misriyan û gelek tişt xera kirin.

Bela pêncan nexweşiyeke pîs bû. Gelek heywanên Misriyan qir bûn, lê belê di nav gelê Îsraêl de tu heywan nemirin.
Dîsa jî Firewn dilê xwe hişk kir û destûra gelê Îsraêl neda ku herin û ji Xwedayê rastîn re xizmetê bikin.

Di bela şeşan de kûnêr li ser Misriyan û li ser heywanên wan çêbûn.
Li ser vê yekê Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Sêrbazan jî ji ber kûnêran nikaribû li ber Mûsa rawestin; çimkî li ser sêrbazan û li ser hemû Misriyan kûnêr hebûn. (Derketin 9:11)

Bela heftan teyrokeke gelek giran bû.
Teyrokeke wusa ji roja ku Misir ava bûbû û heta hingê nehatibû dîtin û hemû zevî û erdên Misriyan xera kirin.

Di bela heştan de kulî derketin ser welatê Misrê û wan her tiştê ku ji ber teyrokê mabû, xwar.

Bela nehan ev bû: Xwedê ji Mûsa re got:
«Destê xwe ber bi ezmanan ve dirêj bike, da ku li ser welatê Misrê bibe tariyeke wusa ku mirov bikare destê xwe lê bide.» (Derketin 10:21)
Sê rojan tu kesî tu tiştek nedît. Lê belê di herêma ku gelê Îsraêl tê de rûdinişt de, ronahî hebû. Di diyarê wan de qet belayek jî tunebû.
Lê dîsa jî Firewn tobe nekir û destûr neda gelê Îsraêl ku herin û ji Xwedayê karîndarê her tiştî re xizmetê bikin. Bervajiyê vê: Firewn ji Mûsa re got:
«Ji rûyê min here! Hay ji xwe hebe, careke din rûyê min nebîne, çimkî roja ku tu rûyê min bibînî, tê bimirî.» (Derketin 10:28)

Xwedê hê belayeke din anî ser Firewn û ser gelê wî, lê belê emê di bernama xwe ya ku bê de li ser vê yekê bipeyivin, çimkî îro wextê me nemaye.

Emê ji dersa îro çi hîn bibin û dabaşa wê çawa bi kurtî bînin ber çavê xwe?

Firewn ceriband ku bi Xudan Xwedê re şêrr bike.
Ma Firewn û sêrbazên wî dikaribûn li hember Xwedê bi ser ketan?
Ma hêza wan têra vê yekê dikir?
Nexêr! Tu kes tune ku bikare li hember Xwedê rabe û bi ser keve.
Hêk nikare şêrr bi latê re bike û bi ser keve!

Xwedê bi vê serhatiyê çi ji me re dibêje?
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin: Ev tiştên ha bi mînaktî hatin serê wan
û ji bo ku ji me yên ku gihîştin dawiya deman re bibin şîret, hatine nivîsîn.
(Korîntî I, 10:11)

Xwedê bi van serhatiyan me hişyar dike. Xwedê dixwaze ku em xwe qenc hêre bikin û guhê xwe bidin peyvên wî.

Guhdarên me yên delal, ma hûn guhê xwe didin Peyva Xwedê?
Ma hûn li gor emrên Xwedê dikin?
An hûn wek Firewn li hember Xwedê şêrr dikin?
Bila dilê we bersiva van pirsan bide! Gelo hûn li gor gotinên Xwedê dikin?
Mana vê yekê ne ew e ku em dipirsin: Ma tu li gor adetên dîn û diyanetan û li gor adetên bav û kalên xwe dikî an nakî. Pirs ev e: Ma tu bi nefsbiçûkî Peyva Xwedê qebûl dikî?
An tu dilê xwe hişk dikî?
Hêk nikare şêrr bi latê re bike. Mirov wek hêkekê ye; hêza wî kêm e.
Peyva Xwedê wek latekê ye, ew qet nayê şkandin.  Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Hemû mirov wek giyê ne û hemû rûmeta wan jî wek kulîlka giyê ye.
Giya hişk dibe û kulîlka wî dikeve, lê peyva Xudan her û her dimîne.
(Petrûs I, 1:24-25)

Peyva Xwedayê zindî wek latekê ye. Yê ku jiyana xwe li ser vê latê ava kiriye, ji bo jiyana xwe bingehekî qenc dîtiye.
Lê belê eger yek jiyana xwe li ser vê latê ava neke, rojekê ew lat wê bikeve ser wî û wê wî parçe parçe û hûr hûr bike.
Hêk nikare şêrr bi latê re bike û bi ser keve. Wusa jî mirov nikare li hember Xwedê rabe, peyvên wî bavêje pişt guhê xwe û ji cezayê ku ewê bide bireve, xilas bibe.

Bernama me li vir bi dawî dibe. Gelek spas ku we qenc guhê xwe dayê. Xwedê hez bike emê di bernameya ku bê de bibînin ku Xwedê çi kir heta ku Firewn destûr da gelê Îsraêl ku ji Misrê derkevin û ji Xwedayê rastîn re xizmetê bikin.

Xwedê we pîroz û bimbarek bike û heta bernameya ku bê, vê gotina ku Mûsa di Tewratê de nivîsiye, ji bîr nekin a ku dibêje:

Ew lat e; kirinên wî bêkêmahî ne û hemû riyên wî rast in.
Xwedê dilsoz e; neheqî li ba wî tune, ew rast û dadperwer e. (Dubarekirina Şerîetê 32:4)

Di bernameyên din de me dît ku Firewn çawa dixwest li hember Xwedê şêrr bike. Gelê Îsraêl li Misrê dibin koletiyê de tengahî didît. Plana Xwedê ew bû ku wan xilas bike, lê nêta Firewn ew bû ku ew di bin koletiya wî de biman.
Me dît ku Xwedê çawa bi destê Mûsa û Harûn neh belayên dijwar anîn serê Misriyan.

Îro emê bibînin ku Xwedê belaya dawî, yanî belaya dehan anî ser Misriyan, da ku êdî Firewn destûr bida gelê Îsraêl ku ji Misrê derketan.
Di bernameya din de me bihîst ku piştî belaya nehan, Firewn ji Mûsa re çi got.
Wî got: «Ji rûyê min here! Hay ji xwe hebe, careke din rûyê min nebîne, çimkî roja ku tu rûyê min bibînî, tê bimirî.» (Derketin 10:28)
Li ser vê yekê Xwedê bi xwe, bi devê Mûsa weha bersiva Firewn da:
4 Mûsa ji Firewn re got: «Xudan weha dibêje:
‹Li dor nîvê şevê ezê derkevim nav Misrê 5 û di welatê Misrê de hemû nixurî wê bimirin, ji nixuriyê Firewn ê li ser têxt heta bi nixuriyê cêriya ku li ser destar e û hemû nixuriyê heywanan jî wê bimirin.
6 Û li hemû welatê Misrê wê hawareke wusa mezin çêbe ku yek wek wê çênebûye û careke din jî çênabe.› 7 Seyek jî devê xwe li hember zarokên Îsraêl venake — ne li hember mirovan û ne jî li hember heywanan —, da ku hûn bizanin ku Xudan cihêtiyê dixe nav Misrî û Îsraêliyan.
8 Hingê ev hemû xulamên te wê bên ba min, wê biçin ser çokan û bêjin: ‹Tu û hemû gelê ku li pey te tê, derkevin!› Piştî wê yekê ezê derkevim.»
Û Mûsa bi hêrsbûneke dijwar ji ba Firewn derket. (Derketin 11:4-8)

Yanî nêta Xwedê ew bû ku ew belayeke ji her nehên din hê meztir bîne ser welatê Misrê. Xwedê bi devê Mûsa ji Firewn re got ku zû hemû nixuriyên Misriyan wê bimirin. Erê, ev çi belayeke dijwar e!

Lê belê ma ew bela wê bihata serê nixuriyên gelê Îsraêl jî? Ma ewê bi nixuriyên Misriyan re bimiran?
Bi rastî nixuriyên gelê Îsraêl jî wek hemû Misriyan gunehkar bûn.
Ma heqê wan hebû ku ji dîwana Xwedê xilas bibûna?
Emê niha bibînin ku plana Xwedayê dilsoz û dilbirehm a ji bo xilaskirina gelê Îsraêl çi bû.
Emê bibihîzin ku Xwedê ji Mûsa re çi got, da ku ew hînî gelê xwe bike, da ku ew ji mirinê xilas bibin.
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
1 Xudan ji Mûsa û Harûn re got: «Ji hemû civîna Îsraêl re bêjin:
‹Di roja dehê vê heyvê de, divê her yek ji xwe re berx an gîskekî bistîne;
li gor bavikên xwe, ji her malê re yekî bistînin…
5 Divê ew bêqusûr, nêr û yeksalî be; hûn dikarin wî ji nav mî an ji nav bizinan
bistînin. [6] Wî heta roja çardehê vê heyvê li ba xwe hilînin û ber êvarê hemû
civîna kombûyî ya Îsraêl divê wî serjêke.
7 Divê ew ji xwînê bistînin û wê li herdû rexderiyên wan xaniyên ku tê de bixwin, bidin û wê li serdera xênî bidin.
8 Divê ew wê şevê wî goştê ku li ser êgir bûye kebab, bi nanê şkeva û bi
pincarên tehl bixwin. [9] Hûn ji wî goştî tu tiştê xav an bi avê kelandî qet nexwin,
lê belê wî bi ser û pê û bi ûr û roviyan ve li ser êgir bikin kebap û bixwin…
46 Divê ew şîv di mal de bê xwarin; ji wî goştî, ji mal dernexin derve û hestiyekê jê neşkênin. (Derketin 12:1.3.5-9.46)

11 Divê hûn wî weha bixwin: Pişta we girêdayî, çaroxên we di lingên we de û şivdarê we di destê we de be; wî bi lez bixwin; ew Derbasbûna Xudan e.
12 Wê şevê ezê di welatê Misrê re bibihûrim û ji mirov û heta bi heywanan ezê hemû nixuriyên Misrê bikujim; ezê dîwana hemû xwedayên Misrê bikim, çimkî Xudan ez im.

[13] Û ew xwîna li ser xaniyên ku hûn tê de ne, wê ji we re bibe nîşan;
çaxê ez xwînê bibînim, ezê ser we re bibihûrim û çaxê ez ji bo helakkirinê li
welatê Misrê bixim, bela wê di nav we de nebe.›» (Derketin 12:11-13)

Em li vir hinekî bisekinin û bifikirin. Gelo ma we plana Xwedê bihîst?
Ma we fêm kir ku Xwedê wê çawa nixuriyên gelê Îsraêl ji mirinê biparastan
û tevahiya gelê xwe ji tengahiya koletiya wan xilas bikira û ji Misrê deraniya?
Erê, plana Xwedê planeke newaze bû!
Lê belê di çavên mirovan de ev plan gelek ecêb bû.
Nêta Xwedê ew bû ku wê gelê xwe bi berdêla xwîna berxekî xilas bikira,
yanî bi xwîna berxekî bêleke û bêqusûr.
Ji bo vê yekê diviya ku wan xwîn li rexderiyên xaniyên xwe bida,
çimkî bi tenê xwîna wî berxî dikarî nixuriyên wan ji mirinê xilas bikiran.

Piştî ku Mûsa û Harûn ev peyvên Xwedê bihîstin, wan hemû rihspiyên gelê
Îsraêl civandin û ji wan re gotin ku divê ew berx çawa bên gorîkirin.
Gava rihspiyan bihîst ku Xwedê wê çawa nixuriyên wan ji belaya mirinê xilas
bike, wan xwe tewand û perizîn Xudan.
Piştre rihspî û tevahiya gelê Îsraêl, hemûyan tam li gor emrê Xwedê kirin.

Nivîsarên Pîroz li ser wê şevê weha dibêjin:
[29] Di nîvê şevê de Xudan li hemû nixuriyên di welatê Misrê de, ji nixuriyê
Firewnê li ser textê xwe û heta bi nixuriyê girtiyê di zîndanê de, û li hemû
nixuriyên heywanan jî, xist. [30] Wê şevê Firewn û hemû xulamên wî û hemû
Misrî rabûn; di Misrê de zarîneke mezin hebû, çimkî malek nebû ku mirî tê de
nebûya. (Derketin 12:29-30)

Gelo ma we bihîst ku di wê şeva tirsehêz de çi qewimî?
Ma Xwedê li gor gotina xwe, dîwana welatê Misrê kir?
Erê, wî tam li gor gotina xwe kir.

Di nîvê şevê de milyaketê Xwedê di Misrê re derbas bû û li hemû nixuriyên Misriyan xist.
Wê şevê di tevahiya Misrê de şîn û girîn û zarîneke mezin hat bihîstin,
çimkî malek nebû ku mirî tê de nebûya.

Lê belê di malên gelê Îsraêl de çi çêbû?
Gelo ma Xwedê nixuriyên wan ji belaya mirinê xilas kirin? Tu çawa difikirî?
Soza Xwedê ev bû, wî gotibû:
«Çaxê ez xwînê bibînim, ezê di ser we re bibihûrim.»
Û tam wek Xwedê emir dabû wan, gelê Îsraêl xwîna berxekî li deriyên malên xwe dan. Loma di nav nixuriyên wan de tu kes nemir.
Lê belê di malên Misriyan de, hemû nixuriyên wan mirin, çimkî wan riya Xwedê ya xilasiyê hilnebijart, yanî wan xwîna berx nerijandin û li serdera xaniyên xwe nedan.
Wan fêm nekir ku riya Xwedê ya xilasiyê bi rijandina xwînê ve girêdayî ye.

Nivîsarên Pîroz weha berdewam dikin, dibêjin:
31 Bi şev Firewn gazî Mûsa û Harûn kir û got:
«Rabin! Hem hûn û hem jî gelê Îsraêl ji nav gelê min derkevin!
Herin, wek ku we gotibû, xizmetê ji Xudan re bikin.
32 Wek ku we gotibû, pezê xwe û dewarên xwe jî bibin û herin! Û min jî pîroz bikin!»
33 Misriyan li gel teng kir ku ew bi lez ji welêt derkevin; çimkî gotin: «An na, emê hemû bimirin!»

Êdî riyeke din ji Firewn re nema.
Mecbûr bû ku vê yekê qebûl bike û bihêle ku gelê Îsraêl ji welatê Misrê derkeve.

[Her şad û bextewar bin; bi destûra Xwedê di bernama ku bê de dîsa emê bi hev re bin.]

Di bernama din de me dît ku Xwedê belaya dehan, yanî belaya herî dijwar anî serê Firewn û gelê wî. Bi şev milyaketê Xudan hemû nixuriyên Misriyan kuştin.
Lê belê ji bo nixuriyên gelê Îsraêl plana Xwedê ya xilaskirinê hebû.
Nixuriyên wan ên ku guhê xwe dan emirê Xwedê û li gor gotina wî xwîn li deriyê mala xwe dabûn, hatin parastin û nemirin.
Bi şev Firewn gazî Mûsa û Harûn kir û ji wan re got:
«Rabin! Hûn hemû ji nav gelê min derkevin!
Herin, xizmetê ji Xudan re bikin û min jî pîroz bikin!»
Û Misriyan li gel teng kir ku ew bi lez ji welêt derkevin; çimkî gotin: «An na, emê hemû bimirin!»

Me di bernameyeke din de dît ku Firewn ji Mûsa û Harûn re gotibû:
«Xudan kî ye ku ez guhê xwe bidim gotina wî û destûra Îsraêl bidim?
Ez Xudan nas nakim û ez destûra Îsraêl jî nadim ku ew herin.» (Derketin 5:2)
Lê di dawiyê de Misriyan biviya û neviya qebûl kirin ku Xwedayê Birahîm, Îshaq û Îsraêl, Karîndarê her tiştî ye; ew ji hemû sêrbaz, pût û xwedayên Misriyan sed qat hêzdartir e.
Hêk nikare bi latekê re şêrr bike. Tu kes tune ku bi Xwedê re şêrr bike û bi ser keve!

Wê şevê gelê Îsraêl ji Misrê derket û beriya ku biçin, gelek tiştên hêja ji Misriyan standin.
Nivîsarên Pîroz dibêjin:
[35] Gelê Îsraêl li gor peyva Mûsa kir û wan tiştên zîv û zêr û cil ji Misriyan xwestin. [36] Û Xudan kerem li gel kir, ew di çavên Misriyan de şêrîn kirin û Misriyan tiştê ku wan xwest, dan wan. Bi vî awayî wan Misrî talan kirin… [40]
Ew demê ku gelê Îsraêl di Misrê de rûniştibû, çar sed û sih sal bûn.
(Derketin 12:35-36.40)

Ev tişt hemû çêbûn, da ku ew peyvên ku Xwedê beriya çend sed salan ji Birahîm re gotibû, bên cih. Xwedê ji Birahîm re gotibû:
«Qenc bizane ku dûndana te wê li welatê xerîbiyê bibe kole.
Çar sed salan zordestî wê li wan bê kirin.
14 Lê ezê dîwana wî gelê ku wê tengahiyê bide wan bikim.
Piştre ewê ji wî welatî pirr dewlemend derkevin.» (Destpêkirin 15:13-14)

Ev serhatiya ku îro em li ser peyivîn, serhatiya Cejna Derbasbûnê ye.
Di vê serhatiyê de gelek tiştên bi mane, yanî gelek xezineyên veşartî hene.
Heyf û mixabin wextê me tune ku em li wan hemû tiştan binêrin, lê belê divê em ya herî girîng bixin hişê xwe. Ya herî girîng soza Xwedê ya ji bo gelê Îsraêl e:
Wî got: Çaxê ez xwînê bibînim, ezê di ser we re bibihûrim. (Derketin 12:13)

Çima nixuriyên gelê Îsraêl bi nixuriyên Misriyan re nemirin?
Ew nemirin, çimkî Xwedê bi saya xwîna berxekî ji bo wan riya xilasbûnê vekir.
Biryara Xwedê ev bû: Eger xwîn li  rexderiyên xaniyên wan bihata xistin, nixuriyên wan wê ji mirinê bihatan parastin.
Lê di hemû xaniyên ku xwîn lê nehata xistin de, nixurî wê bimiran.

Mesele em bêjin eger yekî ji nixuriyên gelê Îsraêl ji bavê xwe pirs bikira, bigota: «Bavo, çima divê ku ew berxê bêqusûr bê serjêkirin?»
Hingê bavê wî wê jê re weha bigota: «Lawo, tu dizanî ku Xwedê emir kiriye ku hemû nixurî bimirin. Lê belê li gor rehma xwe ya mezin, wî ji me re got ku divê em xwîna berxekî bêqusûr li rexderiyên xaniyên xwe bidin.
Eger em weha bikin, ew bela nayê serê me. Berx wê di ber te de bimire.
Wek ku di dema Birahîm de berxek di ber kurê wî Îshaq de hat gorîkirin, emê îro vî berxî di ber te de bikin gorî. Emrê Xwedê kifş e û xelet neyê fêmkirin:
Tenê eger ew xwîna berx li ser rexderiyên xaniyê me bibîne, ewê di ser me re derbas bibe û tu nayêyî kuştin.
Çareyeke din tune, lê belê Xwedê dadperwer û dilsoz e.»

Dostên delal! Divê îro em vê yekê qenc fêm bikin:
Di çavên Xwedê de em hemû an wek nixuriyên Misriyan an jî wek nixuriyên gelê Îsraêl in.
Li gor Şerîeta Xwedê ya pîroz, divê her yek ji me bimire û here ber dîwana Xwedayê dadperwer û cezayê bêdawî bistîne, çimkî me guneh kiriye.
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin: Tu cihêtî tune: Hemûyan guneh kir û ji rûmeta Xwedê bêpar man. (Romayî 3:22.23)
Cezayê gunehan helakbûna bêdawî ye, ew mirov wê ji ba Xudan û ji rûmeta qeweta wî bên avêtin û cezayê helakbûna herheyî bikişînin. (Selanîkî II, 1:9)

Madem ku wusa ye, divê em çi bikin ku em xilas bibin?
Ma Xwedayê rastîn wê çavên xwe li gunehên me mirovan bineqîne û ceza nede me? Na, tu caran ew guneh nahêle bê ceza. Xwedê pîroz e û tu caran gunehan qebûl nake.
Em nikarin gelekî li ser vê dabaşê bisekinin, lê divê ku em vê yekê bînin bîra xwe: Ew berxên ku gelê Îsraêl serjêkirin, da ku belaya kuştina nixuriyan neyê serê wan, ew berx mînaka Xilaskarê ku wê bihata vê dinyayê bûn. Wiyê xwîna xwe birijanda, da ku bi vî awayî deynê gunehên hemû zarokên Adem, yanî deynê gunehên hemû mirovan bida.
Heçî ew Xilaskar e, Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Wî bi carekê ji bo gunehan cefa kişand, da ku me bigihîne Xwedê.
Yê rast ji bo yên nerast mir… Çimkî berxê me yê Cejna Derbasbûnê Mesîh hatiye gorîkirin. (Petrûs I, 3:18; Korîntî I, 5:7)
Yanî xwîna ku Îsraêliyan li rexderiyên xaniyên xwe da, mînakek bû.
Xwîna berx nîşanî me dide ku Xilaskarê vê dinyayê wê xwîna xwe li ser xaçê birijanda. Loma her kî ku baweriya xwe bi wî bîne, wê ji helakbûna bêdawî xilas bibe, yanî di Roja Dawî de, Xwedê wî ceza nake.

Ya guhdarê delal! Gelo ma tu dizanî ku pêxemberên Xwedê li ser xwîna xilaskar çi nivîsandine?

Xilaskarê ku Xwedê şand, xwîna xwe rijand, da ku Xwedayê pîroz û rastîn li gunehên te bibihûre û te xilas bike.
Erê, cezayê guneh mirin e, lê Xilaskar xwîna xwe rijand û mir, da ku tu bijî.
Ma tu ji tiştên ku Kitêba Pîroz li ser xwînê dibêje, bawer dikî?
Dibêje hêza xwîna Xilaskar, yanî hêza mirina Xilaskar heye ku te ji cezayê dojehê xilas bike û her û her li ezmên li ba Xwedê cih bide te.
Ma di Roja Dawî de Xwedê wê ji te re çi bêje?
Ma dîwana wî wê di ser te re derbas bibe?
An tu dixwazî wek Misriyan dilê xwe hişk bikî û rê li ber windabûna xwe vekî?
Îro tu bi vê pirsa girîng re rû bi rû yî; ji bo canê xwe biryara rast bide!

Dostên delal, niha wextê me nema, lê em gelek spas dikin ku we qenc guhê xwe dayê.
Xwedê hez bike, emê di bernameya ku bê de bi serhatiya gelê Îsraêl berdewam bikin û emê bibînin ku Xwedê ji wan re çawa di deryayê de rê vekir.

Bila Xwedê we pîroz û bimbarek bike û mana van peyvên girîng ji we re şîrove bike. Wî got:
Çaxê ez xwînê bibînim, ezê di ser we re derbas bibim. (Derketin 12:13)

[Em li benda we ne ku di bernama bê de jî em bi hev re bin. Xwedê we biparêze!]

Me di bernama xwe ya din de dît ku Xwedê çawa dest pê kir ku gelê xwe ji koletiya Misrê xilas bike û hemû nixuriyên Misriyan kuştin. Lê belê heçî nixuriyên gelê Îsraêl bûn, ew ji wê belaya mirinê xilas bûn, çimkî her mala gelê Îsraêl li gor emrê Xwedê xwîna berxekî bêqusûr li rexderiyên xaniyên xwe dabûn.
Xwedê bi xwe gotibû: «Ew xwîna li ser xaniyên ku hûn tê de ne, wê ji we re bibe nîşan; çaxê ez xwînê bibînim, ezê ser we re bibihûrim.» (Derketin 12:13)

Îcar wê şevê, yanî şeva Cejna Derbasbûnê, hemû eşîrên gelê Îsraêl ji Misrê derketin. Ew şeva Cejna Derbasbûnê ji bo wan şahiyeke pir mezin bû.
Wê şevê ew ji nişkê ve azad û serbest bûn!
Di wê şeva Cejna Derbasbûnê de Xudan Xwedê ew xilas kirin.
Qeyd û zincîrên koletiya wan hatibûn şkênandin.
Xwedê bi xwe soz dabû wan ku ewê di riya çolê de rêberê wan be, heta ku ew bigihîjin welatê Kenanê.
Bêgûman tê bîra we ku beriya demeke dirêj Xwedê sond xwaribû ku wê wî welatî bida dûndana Birahîm, Îshaq û Aqûb. Îro navê welatê Kenanê Îsraêl e.

Îro emê bibînin ku Xwedê çawa gelê Îsraêl ji ordiya Firewn rizgar kir. Guhê xwe bidin vê serhatiya ku di Tewratê de hatiye nivîsîn. Dibêje:

37 Gelê Îsraêl ji jin û zarokan pê ve, li dor şeş sed hezar mêr ji bajarê Ramsêsê bar kirin û bi peyatî çûn Sukotê. 38 Pez û dewar û keriyên heywanan bi wan re zehf gelek bûn û gelek xelkê din ê tevlihev jî bi wan re derket…
19 Mûsa hestiyên Ûsiv jî bi xwe re rahiştin; çimkî Ûsiv sond bi zarokên Îsraêl dabû xwarin û gotibû: «Bi rastî Xwedê wê li we bigere. Hingê divê hûn hestiyên min ji vir bi xwe re bibin.»…

[21] Ji bo ku şev û roj bikarin rêve biçin, Xudan bi roj di stûna ewr de û bi şev ji bo
ku li wan bike ronahî di stûna êgir de li pêşiya wan diçû, da ku rê nîşanî wan
bide. [22] Bi roj stûna ewr û bi şev stûna êgir ji pêşiya gel veneqetiya.
[1] Xudan bi Mûsa re peyivî û jê re got:
[2] «Ji gelê Îsraêl re bêje, bila vegerin û li ber lêva deryayê deynin.
[3] Firewn wê li ser gelê Îsraêl bêje: «Wan di nav welêt de riya xwe şaş kiriye,
çolê hawirdora wan girtiye. [4] Ezê dilê Firewn hişk bikim û ewê bikeve pey wan.
Lê ezê li ser Firewn û li ser hemû ordiya leşkerên wî, hêz û rûmeta xwe nîşan
bidim û Misrî wê bizanin ku Xudan ez im.» Û wan wusa kir.

[5] Çaxê ji padîşahê Misrê re hat gotin ku gel reviya, fikra Firewn û xulamên wî li
ser gel hat guhertin û wan got: «Me çi kir ku me Îsraêl ji xulamtiya xwe berda?»
[6] Firewn erebeya xwe ya şer da amadekirin û ordiya xwe bi xwe re bir [7] û şeş
sed erebeyên bijare û hemû erebeyên Misrê yên şêrr bi serbazê wan ve jî
rakirin…
[9] Îcar Misrî û hemû hespên Firewn û erebeyên wî yên şêrr û siwarên wî
û ordiya wî ketin ser pişta wan; û çaxê gelê Îsraêl li ber lêva deryayê danibû,
gihîştin wan.
[10] Gava Firewn nêzîk bû, xelkê Îsraêl çavên xwe hildan û va ye, Misrî li pey wan
dihatin; gelê Îsraêl gelek tirsiya û hawar kirin Xudan. [11] Wan ji Mûsa re got:
«Ma ji ber ku li Misrê gorr nebûn, te em anîn çolê, da ku em bimirin?
Ev çi ye te anî serê me ku te em ji Misrê deranîn?
[12] Ma ev ne ew e ku me li Misrê ji te re digot: ‹Dev ji me berde, ku em
xulamtiyê ji Misriyan re bikin.› Çimkî me xulamtî ji Misriyan re bikira,
wê ji me re çêtir bûya ji mirina ku em li çolê bimirin.»

Gelo we bihîst ku gelê Îsraêl çi got? Çima ew li Xwedê ewle nebûn?
Madem ku Xwedê ew ji koletiya Misrê rizgar kirin, ma nedikarî wan ji ordiya
Firewn jî rizgar bike? Ji xwe Xwedê dikare rizgar bike!
Lê belê tirsa gelê Îsraêl ewqas mezin bû ku ew li ser wê yekê nefikirîn.

Li ber wan derya hebû, li aliyê çepê û rastê çol û çiya hebûn û li pişt wan
leşkerên Firewn hatin ser wan ku wan vegerînin Misrê an wan bikujin.
Diviya ku wan çi bikira? Ewê çawa rizgar bibûna?
Em niha guhê xwe bidin peyvên Mûsa û emê bibînin ku Xwedê çi kir.

[13] Mûsa ji gel re got:
«Netirsin, veneleqin û wê xilasiya ku îro Xudan wê ji bo we çêke, bibînin;
çimkî ev Misriyên ku hûn îro dibînin, êdî tu caran hûn wan nabînin.
[14] Xudan wê ji bo we şêrr bike û hûnê bisekinin.»
[15] Û Xudan ji Mûsa re got: «Çima tu hawar dikî min? Ji gelê Îsraêl re bêje, bila
pêşve herin.
[16] Tu şivdarê xwe bilind bike û destê xwe li ser deryayê dirêj bike û wê ji hev
veke û gelê Îsraêl wê di nav deryayê re di ser erdê zuwa re derbas bibe. [17] Heçî
ez im, ezê dilê Misriyan hişk bikim û ewê li pey wan bikevin deryayê
û ezê li ser Firewn û hemû ordiya wî, li ser erebeyên wî yên şêrr û li ser siwarên
wî, hêz û rûmeta xwe nîşan bidim. [18] Û Misrî wê bizanin ku Xudan ez im.»

[19] Milyaketê Xwedê yê ku li pêşiya ordiya Îsraêl diçû, cihê xwe guhert û li pey
wan rêve çû; stûna ewr jî li pêşiya wan cihê xwe guhert û li pişt wan sekinî. [20]
Ew hat navbera ordiya Misriyan û ordiya Îsraêl û li aliyê Misriyan ewr û tarî
hebû; lê li aliyê din şêv dikir ronahî; û tevahiya şevê, ordiyek nêzîkî ya din nebû.

[21] Hingê Mûsa destê xwe li ser deryayê re dirêj kir û Xudan tevahiya şevê bi
bayê xurt ê rojhilat derya şûn de vegerand û derya kir bej û av ji hev vebû. [22]
Îcar gelê Îsraêl di erdê zuwa re ket nav deryayê;
av li milê wan ê rastê û li milê wan ê çepê ji wan re bû dîwar.
[23] Misrî jî ketin ser pişta wan û hemû hespên Firewn û erebeyên wî yên şer û
siwarên wî li pişt wan de ketin nav deryayê.
[24] Di nobeta sibehî de Xudan ji stûna êgir û ewr ber bi jêr ve li ordiya Misriyan
nêrî û ordiya Misriyan tevlihev kir. [25] Wî tekerên erebeyên wan xewirandin
û wan ew bi zorê ajotin. Îcar Misriyan got: «Em ji ber Îsraêliyan birevin,

çimkî Xudan ji bo wan bi Misriyan re şêrr dike.»

[26] Xudan ji Mûsa re got:
«Destê xwe li ser deryayê dirêj bike, da ku av li ser Misriyan û li ser erebe û
siwarên wan vegere.»
[27] Îcar Mûsa destê xwe li ser deryayê dirêj kir û ber destê sibehî derya vegeriya
cihê xwe.
Misrî ji ber wê reviyan, lê belê Xudan Misrî veweşandin, avêtin nav deryayê. [28]
Av vegeriya û erebeyên wan ên şêrr û siwar û hemû ordiya Firewn a ku li pey
Îsraêl ketibû deryayê, nixumandin; leşkerekî tenê jî ji wan nema.
[29] Lê belê gelê Îsraêl di nav deryayê de di erdê zuwa re rêve çû;
û av ji bo wan li milê wan ê rastê û çepê bû dîwar. [30] Di wê rojê de Xudan Îsraêl
ji destê Misriyan xilas kir û gelê Îsraêl Misrî li ber lêva deryayê mirî dîtin. [31]
Çaxê gelê Îsraêl karê destê Xudan ê mezin dît, ku wî çi anibû serê Misriyan,
ew ji Xudan tirsiyan û wan ji Xudan û ji xulamê wî Mûsa bawer kirin.

[Erê, di Kitêba Pîroz de dibêje: Xwezî bi wî mirovê ku li Xudan ewle dibe û
xwe dispêre wî.
Heta bernama ku bê Xwedê dilê we her ronahî bike.]

Di bernama din de me bihîst ku Xwedê çawa gelê Îsraêl ji ordiya Firewn xilas kir. Gelê Îsraêl di ser erdê zuwa re di nav deryayê re derbas bû û gihîşt aliyê din. Lê belê çaxê ku leşkerên Firewn hatin ser wan, li pişt wan ketin nav deryayê, av vedigeriya ser wan û ordiya Misrê xeniqî.

Hingê Mûsa û gelê Îsraêl ev stran ji Xudan re gotin.
Gotin: «Ez ji Xudan re bistirînim, çimkî ew zehf gelek bilind e.
Qeweta min û lavijeya min Xudan e; ew ji min re bû xilasî.» (Derketin 15:1.2)

Bi wî awayî wan dest pê kir, ji Xwedê re distrandin û ji bo vê xilasiya mezin pesnê wî didan. Xwişka Harûn û Mûsa, Miryam erbane bi destê xwe girt û jin hemû bi erbanan û bi reqsê li pey wê derketin. Miryam di strana xwe de got: «Ji Xudan re bistirînin, çimkî ew zehf gelek bilind e. Wî hesp û siwarê hesp avêtin deryayê.» (Derketin 15:21)

Dostên delal, ev serhatiya rast û newaze kifş dike ku Xwedê çawa di ava deryayê re ji gelê Îsraêl re rê vekir.
Niha em vê serhatiyê çawa bibin sêrî? Belkî em dikarin li ser vê pirsê bifikirin.
Pirs ev e: Kê dikaribû gelê Îsraêl ji leşkerên Firewn xilas bikira?
Ma wan dikaribû xwe bi xwe xilas bikiran?
Me dît ku li ber wan derya hebû. Li aliyê wan ê çepê û rastê çol û çiya hebûn.
Leşkerên Firewn jî li piştî wan bûn.
Ma gelê Îsraêl dikaribû xwe bi xwe xilas bikira?
Ma ji destê wan dihat ku deryayê li ber we ziwa bikin?
An ji destê wan dihat ku çiyayan nizm bikin an li hember leşkerên Firewn şêrr bikin? Na, qet tiştek ji destê wan nedihat.
Îcar kê dikaribû wan rizgar bike?

Bi tenê Xwedê dikaribû ev yek bikira! Bi tenê Xudan Xwedê dikaribû alîkariya wan bikira û ew xilas bikiran. Loma Mûsa ji wan re got: «Netirsin, veneleqin û wê xilasiya ku îro Xudan wê ji bo we çêke, bibînin!
Bi tenê Xwedê dikaribû wan rizgar bike. Û wî jî ev yek kir.
Loma çaxê ku ew gihîştin aliyê din ê deryayê, wan distrand, digotin:
«Qeweta min û lavijeya min Xudan e; ew ji min re bû xilasî.»

Xwedê bi xwe bû xilasiya wan.
Qet tiştek ji destê gelê Îsraêl nedihat ku bikin, da ku ew ji leşkerên Firewn xilas bibin.
Bi tenê tiştek mecbûrî hebû: Diviya ew li ser wê riya ku Xwedê di nav deryayê de ji wan re amade kiribû, biçûna û piştre pesnê wî bidan, jê re şikir bikiran û biperizîna wî, çimkî wî ew ji mirina bêçare xilas kirin.

Hevalên delal, Xwedê dixwaze her kes bizane ku hemû zarokên Adem wek Îsraêliyan in.
Halê me jî wek halê wan e: Eger Xwedê me xilas neke, hêviya me tune ku em bikarin ji felaketa ku wê bê birevin, xilas bibin.
Belkî li ber me tu derya tune, lê belê mirin û dojeh li benda me ye.
Belkî li tenişta me çol û çiya tunin, lê belê pîroziya Xwedê wek dîwareke bilind e û wê dîwana me bike.
Leşkerên Firewn nayên ser me, lê belê Îblîs û gunehên me li pey me dikevin û dixwazin me her û her helak bikin!

Kî dikare zarokên Adem ji dîwana dadperwer a Xwedê xilas bike?
Kî dikare gunehkaran ji agirê ku tu caran venamire, rizgar bike?
Kî dikare mirovan ji hêza Îblîs xilas bike?
Kî heye ku bikare me ji van hemû tiştan rizgar bike?
Kî dikare me bibe aliyê din ê deryayê, yanî kî dikare me bibe wê dera pîroz a ku navê wê bihişt e?

Bi tenê Xwedê dikare van hemûyan bike! Bi tenê ew dikare me xilas bike.
Tu tişt ji destê me nayê ku em xwe bi xwe an yekî din xilas bikin.

Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
Hûn bi riya baweriyê, bi kerema Xwedê xilas bûn û ev ne ji we ye, diyariya Xwedê ye. Ev ne ji kirinan e, da ku tu kes pesnê xwe nede. (Efesî 2:8-9)

Xwedê li gor rehma xwe ya mezin ji bo hemû zarokên Adem riya xilasiyê amade kir, da ku em ji hêza Îblîs, ji hêza guneh û ji hêza dojehê xilas bibin.
Agirê herheyî li benda hemûyan e yên ku di nav gunehên xwe de dimirin.
Erê, Xwedê dixwaze ku em ji cezayê agirê herheyî xilas bibin, lê ji bo vê yekê divê ku em di riya xilasiyê re herin ba wî.
Rê yek e, çimkî Xwedê riyeke din pêk neaniye û qebûl jî nake.
Gelo hûn riya xilasiyê ya ku Xwedê ji bo we vekiriye, dizanin?
Yên ku di wê riyê de diçin, wê ji hêza Îblîs, ji cezayê gunehan û ji dojehê rizgar bibin.
Gelo tu di riya rastdariyê ya ku Xwedê amade kiriye de diçî, da ku tu rojekê bikevî ezmên û her û her li ba wî di pîroziyê de bimînî?

Bingehê riya xilasiyê ya ku Xwedê ji dûndana Adem re vekiriye, ne xêr û kirinên mirov ên qenc in û ew rê ne bi adet û qanûnên dînekî ve girêdayî ye.
Xwedê weha dibêje: «Ev ne ji kirinan e, da ku tu kes pesnê xwe nede.»
Madem ku wusa ye, ew riya xilasiyê ya ku Xwedê ji bo me amade kiriye, çi ye?
Ew rê riya Xilaskar e. Ew ji ezmên hat, da ku di ber gunehên me de bimire û piştre ji nav miriyan rabe, da ku her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, xilas bibe.
Çimkî em hemû ji sedemê hêza guneh û tirsa mirinê wek koleyan in.
Nivîsarên Pîroz li ser vî Xilaskarê mezin weha dibêje: Xilasî bi tu kesî din tune; çimkî di bin ezmên de, di nav mirovan de, navekî din nehatiye dayîn ku em bikarin pê xilas bibin. (Karên Şandiyan 4:12)

Erê, rast e, Xwedê ji bo we di deryaya gunehan re rê vekir, ku hûn bikarin ji cezayê gunehan xilas bibin û bigihîjin aliyê din, yanî bigihîjin cihê Xwedayê pîroz û ji aliyê wî ve bi şahî bên qebûlkirin.
Lê divê ku tu di vê riya ku Xwedê ji te re vekiriye re bibihûrî.
Heçî ew riya xilasiyê ye, Xilaskar bi xwe weha got:
«Rê, rastî û jiyan ez im. Heta ku ne bi destê min be, tu kes nayê ba Bav [Xwedê]»
«Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, yê ku guhê xwe dide gotinên min
û ji wî yê ku ez şandime bawer dike, jiyana wî ya herheyî heye;
ew nayê dîwankirin, lê ew ji mirinê gihîştiye jiyanê.» (Yûhenna 14:6; 5:24)

Dostê delal, ma tu ji mirinê gihîştiyî jiyanê?

Hevalno, em pir spas dikin ku we guhdariya vê serhatiyê kir.
Xwedê hez bike, di bernameya ku bê de, emê bibînin ku Xwedê çawa di çolê de xwarin ji bo gelê Îsraêl peyda kir.
Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Mûsa pêxember qenc bifikirin. Wî ji gelê Îsraêl re weha got:

«Netirsin, veneleqin û wê xilasiya ku îro Xudan wê ji bo we çêke, bibînin!
(Derketin 14:13)

Me di bernama xwe ya din de dîtibû ku Xwedê çawa gelê Îsraêl ji destê Firewn û ji destê leşkerên wî xilas kir. Çaxê ku gel li ber lêva deryayê danîbû, qet tiştek ji destê wan nedihat ku ji ber ordiya Firewn birevin. Lê belê me dîtibû ku Xwedê çawa av ji hev vekir, da ku ew di ser axa zuwa re di nav deryayê re derbas bibin. Çaxê ku leşkerên Misriyan li pey wan ketin û eynî tişt kirin, ew di deryayê de xeniqîn. Wê rojê Xwedê gelê Îsraêl ji destê gelê Misrê rizgar kir û çaxê gelê Îsraêl hêza Xwedê ya mezin dît, ew ji wî tirsiyan û stranek ji wî re gotin. Wan got: «Ez ji Xudan re bistirînim, çimkî ew zehf gelek bilind e. Qeweta min û lavijeya min Xudan e; ew ji min re bû xilasî.» (Derketin 15:1.2)

Emê niha bi serhatiya gelê Îsraêl berdewam bikin. Di wê demê de gel di navbera Misrê û Kenanê de di çolê de bû. Welatê Kenanê ew welat bû ku Xwedê bi sond soz dabû ku wê bida Birahîm û dûndana wî, da ku bibûya milkê wan.
Emê dîsa ji kitêba Derketinê bixwînin û îro emê bibînin ku Xwedê çawa di çolê de xwarin da gelê Îsraêl. Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê bi xwe bi roj di stûna êwr û bi şev di stûna êgir de li pêşiya wan diçû, da ku rê nîşanî wan bide. Bêgûman, eger Xwedê rêberiya wan nekira û ew xweyî nekiran, ewê di çolê de zû helak bibûna.
Em dixwazin ji bo deqiqekê bînin ber çavên xwe ku halê gelê Îsraêl çawa bû. Ew xelkekî ku ji du milyonan bêtir bûn, yanî ji tevahiya xelkê herêma Diyarbekrê bêtir bûn. Ew hemû bi hev re di çoleke bê av de di nav seylakê de digeriyan. Gelo wan çawa wê xwe xweyî bikira? Kê dikarî ku wan ji tîbûn û birçîbûnê rizgar bike? Wan çawa wê ji bo xwe, ji bo zarokên xwe û ji bo pezê xwe têr av û xwarin bidîtan, da ku ew nemiran? Ma wan dikaribû ji xwe re xwarin peyda bikira? Na! Madem yek hebû ku dikarî xwarinê bide wan, hingê bersiv ev e: Bi tenê Xwedê dikirî avê û xwarinê bide wan û wan xweyî bike.

Ma gelê Îsraêl ji bo vê yekê li Xwedê ewle bû? Ma wan xema xwarin û vexwarina xwe nexwar? Bêgûman diviya ku gelê Îsraêl li Xudan Xwedê ewle bibûya, çimkî wî ji bo wan gelek kerametên mezin kiribûn. Wî ew bi saya deh belayên dijwar ji Firewn û ji koletiyê rizgar kiribûn. Wî nixuriyên wan bi saya xwîna berxekî xilas kiribûn. Wî di deryayê de ji bo wan riyeke ziwa vekiribû. Û piştî van hemû tiştan, ew bi roj di stûna êwr û bi şev di stûna êgir de di pêşiya wan de diçû û wek ku ji Birahîm re soz dabû, rêberiya wan kir, da ku ew bigihîjin welatê Kenanê. Gelo hûn çi dibêjin? Ma gelê Îsraêl ji Xwedê piştrast bû? Ma wan bawer kir ku Xwedê dikare li gor sozên xwe bike? Em niha vegerin Nivîsarên Pîroz û emê bibînin bersiva van pirsan çi ye.

Em di Kitêba Derketinê de ji deriyê 16'an dixwînin. Tewrata Mûsa weha dibêje:
[1] Û tevahiya civîna gelê Îsraêl ji Elîmê bar kirin û piştî ku ji welatê Misrê
derketin di roja panzdehê heyva diduyan de hatin çola Sînê; ew di navbera Elîm
û Sînayê de ye. [2] Û hemû civîna gelê Îsraêl di çolê de li ber Mûsa û Harûn kir
pitepit. [3] û ji wan re gotin: «Xwezî wî çaxê ku hê em li ser sîtilên goşt rûniştibûn
û me têr nan dixwar, em bi destê Xudan li welatê Misrê bimiran; bi rastî we em
deranîne vê çolê, da ku hûn hemû vê civînê ji birçiya bikujin!»
Gelo we bihîst ku wan çi got? Ma eşîrên gelê Îsraêl li Xwedê ewle bûn? Na, ew qet lê ewle nebûn. Wan li ber Xwedê û li ber pêxemberê wî Mûsa pitepit kir. Guhê xwe bidinê, bibihîzin ku Xwedê çi bersiv da wan:

[11] Xudan bi Mûsa re peyivî û got: [12] «Min pitepita gelê Îsraêl bihîst; ji wan re
bêje: ‹Ber destê îvarê hûnê goşt bixwin û sibehî hûnê têr nan bixwin û hûnê
bizanin ku Xwedayê we Xudan ez im.›»
[4] Û Xudan ji Mûsa re got: «Va ye, ezê ji we re ji ezmanan nên bibarînim; û her
roj bila gel derkeve û ji xwe re têra rojekê berhev bike, da ku ez wan biceribînim
ka ewê li gor tembîha min bikin an nakin.

13 Çaxê bû êvar, zerzûl yanî ebdal derketin, warê gel nixumandin; û sibehî li
hawirdora war xûnav ketibû. 14 Û çaxê ew xûnav rabû, va ye, li ser rûyê çolê, li
ser axê, libên biçûk û wek xûsikê yanî wek xizxizokê hebûn. 15 Gelê Îsraêl ev dît
û ji hevdû re gotin: «Ev çi ye?» Çimkî nizanibûn ku ew çi ye. Mûsa ji wan re
got: «Ev ew nanê Xudan e yê ku wî ji bo xwarinê daye we. 31 Gelê Îsraêl navê
wê xwarinê kir ‹Manna›. Ew wek tovê gijnîjê spî bû û tama wî wek nanê duta yê
ku bi hingiv tê çêkirin bû.

Erê, Xwedê bi vî awayî eşîrên gelê Îsraêl di çolê de xweyî kir, heta wê roja ku ew ketin welatê Kenanê. Gelo we bihîst ku xwarin ji ku derê hat? Erê, xwarin ji ezmên hat, yanî ew ji Xwedê hat. Ma gelê Îsraêl hêjayî vê xwarinê bû? Ma heqê wan hebû ku Xwedê Manna ji wan re bişanda? Nexêr! Tu heqê wan tune bû. Çimkî wan bawer nekir, razî nebûn û her gav pitepit kirin. Heqê wan ew bû ku bên cezakirin! Sedemê ku ew ji nêzan nemirin bi tenê rehma Xwedê ya mezin bû.

Niha emê berdewam bikin û emê bibînin çaxê ku rojeke din ava wan nemabû, wan çi kir. Em ji deriyê 17’an a kitêba Derketinê dixwînin. Weha dibêje:

1 Hemû civîna gelê Îsraêl li gor emrê Xudan ji çola Sînê bar kir, ji qonaxê çûn
qonaxê û li Refîdîmê danîn. Lê ji bo gel ava vexwarinê nebû. 2 Loma gel bi
Mûsa re devjenî kir û gotin: «Avê bide me, ku em vexwin!» Û Mûsa ji wan re
got: «Çima hûn bi min re devjeniyê dikin? Çima hûn Xudan diceribînin?» 3 Lê
gel li wê derê tî bû û li ber Mûsa kirin pitepit û gotin: «Çima te em ji Misrê
deranîn? Ma te em deranîn ku tu me û zarokên me û heywanên me ji tîbûnê
bikujî?»
4 Û Mûsa hawar kir Xudan û got: «Ez çi bi vî gelî bikim? Hindik maye ewê min
bidin ber keviran!» 5 Xudan ji Mûsa re got: «Bikeve pêşiya gel û çendan ji
rihspiyên Îsraêl bi xwe re bibe; ew şivdarê ku te bi wî li çemê Nîlê xist, bigire

dest xwe û here. [6] Va ye, ezê li wir, li Horebê, li ser latê, li ber te bisekinim; li latê bixe û av wê jê derkeve, da ku gel vexwe.» Û Mûsa li ber çavên rihspiyên Îsraêl wusa kir.

Yanî av bi zêdahî ji latê derket û li çolê herikî û her kesî têr vexwar û av dan pezê xwe jî. Xudan careke din alîkariya gelê Îsraêl kir û ew ji mirinê xilas kirin.

Bernama me li vir bi dawî dibe. Xwedê hez bike, emê zû dîsa bi hev re bin.
Di bernama ku bê de emê hê zêdetir li ser vê kerameta Xwedê bifikirin.

Heta hingê van gotinên Nivîsarên Pîroz bînin bîra xwe; ew weha dibêjin:

[24] Li qirikan binêrin, ew ne diçînin, ne jî didirûn, ne kewarên wan, ne jî embarên wan hene û Xwedê dîsa jî wan xweyî dike; hûn çiqasî ji teyrikan hêjatir in! [25] Kî ji we bi xemxwarinê dikare kêlîkekê bi ser jiyana xwe ve dirêj bike?
(Lûqa 12:22-25)

Di bernama din de me bihîst ku Xwedê çawa di çolê de gelê Îsraêl xweyî kir û hem xwarin û hem jî vexwarin dan wan.
Me dît ku Xwedê ebdal şandin warê gel, da ku ew bikarin goştê bixwin; herweha wî Manna jî da wan; roj bi roj, çaxê xûnav radibû, li ser rûyê çolê, li ser axê, libên biçûk hebûn ku tama wan wek nanê duta yê ku bi hingiv tê çêkirin bû.
Û çaxê ku gel tî bû, wî bi destê Mûsa pêxember ji latê av ji wan re derxist.
Xwedê bi vî awayî gelê Îsraêl ne tenê çend rojan, ne tenê çend heftiyan, lê belê 40 salan xweyî kir û xema hewcedariyên wan xwar!

Emê li vir hinekî bisekinin û li ser van tiştan bifikirin.
Piştî wan tiştên ku Xwedê li Misrê ji bo gelê Îsraêl kiribûn, ma ew li Xwedê ewle bûn û wan baweriya xwe bi wî anîn?
Ma ji ber wan hemû kerametên ku Xwedê ji bo wan kiribûn, dilê wan tije pesn û şikirdarî bû?
Na, ew qet ne wusa bûn. Ew ji Xwedê ne pistrast bûn. Wan lome kirin, pitepit kirin û her gav ji bîr dikirin ku Xwedê ew ji çiqas talûkeyan xilas kirin.

Xwedê jî çi kir? Xudan Xwedê li gor sebir û dilovaniya xwe ya mezin di çolê de xwarin û vexwarin da wan.
Ma gelê Îsraêl hêjayî vê yekê bû? Ma heqê wan hebû ku ew wan tiştan bistînin?
Nexêr, heqê wan tenê ew bû ku Xwedê dîwana wan bike!
Lê çima Xwedê bi dilovaniya xwe ew xweyî kirin? Ji ber ku Xwedê dilsoz û dilbirehm e. Ew Xwedê ye, ew Yê Dilsoz û Yê Dilbirehm e.
Mirovên gelê Îsraêl gunehkarên nerazî bûn, lê dîsa jî Xwedê ji ber rehma xwe ji bo wan xwarin û vexwarin peyda kirin.
Bi rastî, eger mirov bi xêr û kirinên xwe ji tîbûnê an ji birçîbûnê xilas bibûna, gelê Îsraêl wê di çolê de zû bimira!

Herweha divê em bînin bîra xwe ku Xwedê gelê xwe ne tenê ji ber rehma xwe parast, lê sedemeke din jî hebû, ew dilsoziya wî bû. Xwedê li gor peyv û sozên xwe dike û wî li ser gelê Îsraêl sozên girîng dabûn.
Wek ku me dîtibû, Xwedê soz dabû ku wî wê bi gelê Îsraêl hemû milet û netew li ser rûyê erdê pîroz û bimbarek bikiran, çimkî pêxember û Nivîsarên Pîroz wê ji wî gelî bihatan û Xilaskarê dinyayê wê ji nav wî gelî rabûya.
Erê, Xwedê dilsoz û tije rehm e. Ew Xwedayê rastiyê û Xwedayê hezkirinê ye. Rast e, eşîrên gelê Îsraêl ne hêjayî hezkirina Xwedê bûn. Wan guhdariya wî nekir û pitepit kirin, lê dîsa jî Xwedê dilsozî û dilovaniya xwe kifş kir.
Yanî bi vê yeka ku Xwedê xwarin û vexwarin da wan, wî hezkirina xwe kifş kir.

Belkî hin hene ku dibêjin: Ma çima emê bi van serhatiyên gelê Îsraêl mijûl bibin? Ma ew bi kêrî me tên? Erê. Peyva Xwedê weha dibêje:
Ev tiştên ha bi mînaktî hatin serê wan û ji bo ku ji me yên ku gihîştine dawiya deman re bibin şîret, hatine nivîsîn. (Korîntî I, 10:11)
Wek ku Xwedê gelê Îsraêl di çolê de ji hêza mirinê xilas kir, ew dixwaze hemû zarokên Adem ji hêza guneh û mirinê xilas bike.

Pirsa me ev e:
Gelo diviya ku gelê Îsraêl çi bikira, da ku ew xilas bibûna û di çolê de nemiran?
Bi tenê ev lazim bû: Diviya ku wan ew xwarina ku Xwedê ji ezmên şandibû, bicivandan û bixwaran.
Alîkariya wan, yanî xilasiya wan ji ku derê hat? Ma xilasiya wan bi destê wan çêbû, an jî ji keda wan hat?
Na, xilasiya wan ji ba Xwedê hat. Tu tişt ji destê wan nedihat ku wan xwe ji birçîbûnê û ji mirinê xilas bikira. Tenê diviya ku wan xwarina ku Xwedê ji ezmên ji wan re dişand bicivandan û bixwaran. Riyeke din tune bû.

Nivîsarên Pîroz nîşanî me didin ku em hemû wek gelê Îsraêl gunehkar in.
Tu tişt ji destê me nayê ku em xwe xilas bikin.
Em nikarin ji hêza guneh an jî ji dîwana Xwedayê dadperwer birevin. Belkî em ne wek gelê Îsraêl di çola bêav de digerin, lê bi rastî wek ku siya mirinê di ser wan re bû, weha di ser me re ye jî. Peyva Xudan xelet nayê fêmkirin û dibêje:
Her kesê ku riya xilasiyê ya ku Xwedê amade kiriye red dike, wê di nav gunehên xwe de bimire û bikeve agirê herheyî yê dojehê.
Erê, rastiyên weha hergav tehl in! Ma kî dixwaze di nav gunehan de bimire?
Kî dixwaze bikeve dojehê? Kî dixwaze li hêviya dîwana xwe bimîne?
Ev hemû felaketên dijwar in! Lê belê Mizgînî heye û ew Mizgînî ji me re tê dayîn!
Mirov qet ne mecbûr e ku di nav gunehên xwe de bimire.
Wek ku Xwedê xwarin da gelê Îsraêl, da ku ew bijîn û di çolê de nemirin, weha jî Xwedê xwarin daye me, da ku em hem di vê dinyayê de pîroz bibin û hem di wê dinyayê de her û her bijîn û pîroz û bimbarek bin.

Gelo ew «xwarina» ku jiyana herheyî dide me çi ye?
Ma divê em herin bazarê û li xwarineke taybetî bigerin, da ku em jê hêzê bistînin û bikarin her û her li ba Xwedê bijîn?
Nexêr, xwarineke wusa li bazarê peyda nabe. Lê nexwe ew «xwarin» çi ye û em dikarin wê ji ku derê bistînin?

Hevalno, qenc li ser vê yekê bifikirin:
Kêm û zêde 1500 salan piştî wê bûyera ku Xwedê di çolê de ji ezmên Manna da gelê Îsraêl, wî Rizgarker, yanî Xilaskarê dinyayê şand erdê. «Xwarina» ku jiyana herheyî dide, ew e.
Xwedê ew şand, da ku mirovên vê dinyayê ji hêza guneh, ji hêza mirinê, ji dîwanê û ji dojehê xilas bibin.

Em niha dixwazin qenc guhê xwe bidin peyvên wî Xilaskarî. Çaxê ew li ser erdê bû, wî weha got:

«Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, yê ku baweriyê tîne jiyana wî ya herheyî heye. Nanê jiyanê ez im. Bav û kalên we li çolê Manna xwarin, lê ew mirin.
Ew nanê ku ji ezmên hatiye xwar, da her kesê ku jê bixwe nemire, ev e.
Ew nanê jîndar ê ku ji ezmên hatiye xwar ez im …
Yê ku bê ba min, qet birçî nabe û yê ku baweriyê bi min bîne, tu caran tî nabe.»
(Yûhenna 6:47-51;35)

Dostên delal, li vir em digihîjin dawiya bernama xwe ya îro. Di bernameya ku bê de emê bibînin ku Xwedê çawa di çolê de bi destê Mûsa pêxember her Deh Emrên Mezin dan gelê Îsraêl.

Heta hingê qenc li ser vê gotina Xilaskarê dinyayê bifikirin. Ew dibêje:

«Nanê jiyanê ez im. Yê ku bê ba min, qet birçî nabe û yê ku baweriyê bi min bîne, tu caran tî nabe.» (Yûhenna 6:35)

Me di bernama xwe ya beriya vê de dît ku Xwedê di çolê de eşîrên gelê Îsraêl xweyî kirin, da ku ji nêzan nemirin. Herweha me dît ku gelê Îsraêl her car li hember Xwedê pitepit dikirin, çimkî hem baweriya wan û hem jî dilsoziya wan kêm bû.

Îro emê bibînin ku Xwedê çawa di çolê de ji gelê Îsraêl re xuya bû û Şerîeta xwe ya pîroz da wan. Emê niha ji Tewratê, di kitêba Derketinê de, ji deriyê nozdehan bixwînin. Li vir weha dest pê dike, dibêje:
Di heyva sisiyan de ya derketina gelê Îsraêl ji welatê Misrê, di wê rojê de, hatin çola Sînayê. (Derketin 19:1)
Ma Mûsa û Îsraêlî hingê di rêwîtiya xwe de gihîştin ku derê?
Erê, ew hatibûn ber çiyayê Sînayê. Gelo tê bîra we, çaxê ku Xwedê gazî Mûsa kir û di nav diriyekê de di pêta êgir de bi wî re peyivî, ew li ku derê bû?
Hingê jî Mûsa li ber çiyayê Sînayê bû. Gelo ew serhatî tê bîra we?
Hingê me bihîst ku Xwedê çawa ji Mûsa re got:
«Bi rastî, min zehmet û cefayê gelê xwe yê di Misrê de dît
û min hawara wan bihîst, çimkî ez kederên wan dizanim.
8 Ez hatim xwar, da ku ez wan ji destê Misriyan rizgar bikim…
10 Loma niha ezê te bişînim ba Firewn, da ku tu gelê min, zarokên Îsraêl ji Misrê derînî.»
11 Lê Mûsa ji Xwedê re got: «Ez kî me ku ez herim ba Firewn û zarokên Îsraêl ji Misrê derînim?»
12 Xwedê got: «Bi rastî ezê bi te re bim; û ev wê ji te re bibe nîşan ku min tu şandiyî: Çaxê tu gel ji Misrê derînî, hûnê li vî çiyayî ji Xwedê re xizmetê bikin.»
(Derketin 3:7-8;10-12)

Gelo Xwedê li gor soza xwe kir? Bêguman, wî tam li gor peyvên xwe gelê xwe anî çiyayê Sînayê.

Niha emê bibînin ku Xwedê çawa ji Mûsa re xuya bû û ji serê çiyayê Sînayê ji hemû gelê Îsraêl re peyivî.
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
[3] Xudan ji çiyê gazî Mûsa kir û got: «Weha ji mala Aqûb re bêje û bi gelê Îsraêl bide zanîn:
[4] ‹We dît ku min çi bi Misriyan kir û min çawa hûn li ser baskên eyloyan
hilgirtin û min hûn ji xwe re anîn. [5] Û niha eger bi rastî hûn guhdariya peyva
min bikin û hûn peymana min bigirin, hingê ji hemû gelan hûnê bibin gelê min ê
xumal — çimkî hemû dinya ya min e — [6] û hûnê ji min re bibin padîşahiya
kahînan û miletê pîroz û veqetayî.› Ew peyvên ku tê ji gelê Îsraêl re bêjî, ev in.»
[7] Û Mûsa çû, gazî rihspiyên gel kir û hemû ev peyvên Xudan ên ku li wî emir kirin, danîn ber wan.
[8] Tevahiya gel bi hev re bersiv da û gotin: «Hemû tiştên ku Xudan gotine, emê bikin.»

Gelo we bihîst ku gelê Îsraêl çi bersiv da Xwedê?
Wan got: «Hemû tiştên ku Xudan gotine, emê bikin.»
Ma tiştê ku wan got, rast bû?
Ma bi rastî wan dikarî li gor hemû emrên Xwedê bikin û wan emran bêkêmahî pêk bînin?

Xwedê qenc dizanî her tiştê ku wî ji gelê Îsraêl re bigota, wan nedikarî pêk bianiya.
Bi rastî, tiştê ku Xwedê dixwest ev bû: Wî dixwest ku ew qebûl bikin
ku ew bi hêz û daxwaza xwe qet nikarin li Xwedê xweş bên.
Wî dixwest ku ew xasîtiya xwe ya gunehkar qebûl bikin û herweha wî dixwest ku ew baweriya xwe bi Mizgîniya Xilaskarê ku wê bihata vê dinyayê, bînin.
Xwedê gunehên bav û kalên wan Birahîm, Îshaq û Aqûb afûkirin, çimkî wan ji Xwedê û ji peyv û sozên wî bawer kirin.

Herweha Xwedê dixwest xerabî, sûc û gunehên gelê Îsraêl jî bi saya baweriya wan bibexişîne. Riya xilasbûnê ya ku Xwedê pêşkêşî wan dikir, her gav tenê bi baweriyê bû û her gav bi baweriyê ye: Eger mirov baweriya xwe bi Xwedê bîne û plana Xwedê ya xilasiyê qebûl bike, ewê xilas bibe.
Nivîsarên Pîroz dibêjin: Eşkere ye ku tu kes li ba Xwedê bi Şerîetê rastdar dernakeve. Çimkî hatiye nivîsîn: «Yê rastdar wê bi baweriyê bijî.» (Galatî 3:11)

Lê belê, gelê Xwedê hê difikirî ku ewê bikarin bi hewldana xwe li ber Xwedê rastdar derkevin. Ev çi bêaqiliyeke mezin e!
Wan ji bîr kiribû ku ew gelek caran li hember Xwedê rabûn û hêrsa wî rakirin.
Wan hê fêm nekiribû ku gunehê wan di çavê Xwedê de çiqas mezin e!
Li gor bîr û baweriya wan, gunehên wan ne tiştekî giran û ciddî bûn,
lê belê di çavên Xwedayê rast de, guneh tiştekî mekruh e.
Xwedê rast û pîroz e; ew, tiştên ku ne pîroz û ne bêkêmahî bin, qebûl nake.
Lê belê em qenc dizanin ku gelê Îsraêl ne pîroz û ne jî bêkêmahî bû.
Loma wan guman dikir, digotin: «Hemû tiştên ku Xudan gotine, emê bikin.»
Lê belê plana Xwedê hebû û bi vê planê wî wê nîşanî wan bida ku ew nikarin wan hemû tiştên ku Xwedê gotine, bikin.

Emê niha binêrin ku Xwedê çawa daket ser serê çiyayê Sînayê, çawa rûmet û pîroziya xwe eşkere kir û çawa Deh Emrên Mezin dan eşîrên gelê Îsraêl.

Kitêba Pîroz weha dibêje:
10 Xudan ji Mûsa re got: «Here ba gel û … ji bo roja sisiyan bila amade bibin;
çimkî di roja sisiyan de Xudan wê li ber çavê hemû gel bê ser Çiyayê Sînayê. 12
Û ji bo gel sînor li hawirdora çiyê deyne û ji wan re bêje: ‹Hay ji xwe hebin,
dernekevin çiyê û destê xwe li quntara wî jî nedin; her kesê ku dest çiyê bide,
eseh wê bê kuştin. 13 Bila tu dest lê nekeve, an nexwe divê ku ew bê kevirkirin
an bi tîr bê kuştin; heywan be, mirov be, divê nejî.

[16] Di roja sisiyan de dema bû sibe, xurxura ewran û birûsk çêbûn,
li ser çiyê ewrekî reş sekinî û dengê bilind ê boriyê hat bihîstin
û hemû gel di war de lerizî.
Lê Mûsa gel ji war deranî da ku bibe pêşiya Xwedê û li ber quntara çiyê sekinîn.
[18] Ji hemû Çiyayê Sînayê dû diçû, ji ber ku Xudan di nav êgir de daketibû ser
wî; û dûyê wî wek dûyê hêtûnê derdiket û tevahiya çiyê gelek hejiya. [19] Û
dengê boriyê çiqas dihat xurt dibû..
[20] Û Xudan dageriya hat ser serê Çiyayê Sînayê…

[1] Xwedê ev peyvên ha hemû peyivî û got: [2] «Ez Xudan Xwedayê te me, yê ku tu
ji welatê Misrê, ji mala koletiyê deraniyî.

[3] Li pêşberî min divê tu xwedayên te yên din nebin!

[4] Ji xwe re qet pûtekî çêneke, …Çimkî ez Xudan Xwedayê te me.

[7] Navê Xudan Xwedayê xwe badîhewa neyne ser devê xwe! Çimkî Xudan wî
yê ku navê wî badîhewa tîne ser devê xwe, bê ceza nahêle.

[8] Divê roja Şemiyê li bîra te be, da ku ew ji te re veqetayî û pîroz be!

[12] Qedrê dê û bavê xwe bigire

[13] Kuştinahiyê neke / Nekuje!

[14] Zînayê neke!

[15] Diziyê neke! / Nedize!

16 Li hember cîranê xwe şahidiya derewîn neke!

17 Çavê xwe neavêje mala cîranê xwe! Çavê xwe neavêje pîreka cîranê xwe, an xulamê wî an navmaliya wî an gayê wî an kerê wî an tu tiştê wî.

Erê, guhdarên delal, her Deh Emrên Xwedê ev in û di bernameyên ku bên de emê hê bêtir li ser van hemûyan bipeyivin.
Heta hingê bimînin di aştî û şahiyê de!

Di bernama din de me bihîst ku Xwedê daket ser Çiyayê Sînayê
û bi destê Mûsa pêxember her Deh Emrên Mezin dan gelê Îsraêl.
Gel jî li ber quntara çiyê sekinî.
Ma gelo ew şa dibûn ku Xwedê ji ezman daket ser çiyê, yanî hat nêzîkî wan?
Nexêr, ew ji tirsa lerizîn.
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
18 Gava hemû gel xurxura ewran, birûsk û dengê boriyê bihîstin
û dûyê ku ji çiyê diçû dîtin, ew ji tirsa lerizîn û ji dûr ve sekinîn. [1]
9 Wan ji Mûsa re got: «Tu bi me re bipeyive û emê guhê xwe bidinê, lê belê bila
Xwedê bi me re nepeyive, da ku em nemirin.»
20 Lê Mûsa ji gel re got: «Netirsin, çimkî Xwedê ji bo ceribandina we hat,
da ku tirsa wî li ber we be û hûn guneh nekin.»
21 Îcar gel ji dûr ve sekinî û Mûsa nêzîkî tariya reş dera ku Xwedê lê bû, bû.

Niha divê em bala xwe bidin tiştekî girîng ê ku Xwedê dixwaze bi van ayetan hînî me bike. Divê em vî tiştî qenc fêm bikin: Xwedê pîroz û paqij e û em qet nikarin bi hewldana xwe nêzîkî wî bibin.
Nivîsarên Pîroz hîn dikin ku hemû mirov wek giyê ne (Petrûs I, 1:24)
û Xwedayê me agirek e ku dixwe û tune dike. (Îbranî 12:29)
Çaxê ku agir bikeve giyê, em hemû qenc dizanin ku giya namîne.

Di bernama din de me bihîstibû ku gelê Îsraêl ji Mûsa re got: «Hemû tiştên ku Xudan gotine, emê bikin.»
Wan weha got, çimkî wan fêm nekir ku pîroziya Xwedê çi ye.
Wan gûman kir ku ewê bikarin bi hewldana xwe li Xwedê xweş bên.

Lê belê piştî ku Xwedê li ser serê çiyayê Sînayê ji wan re xûya bû,
fikrên wan gelek hatin guhertin! Gava gelê Îsraêl xurxura ewran, birûsk û agir, hejîna çiyê û dû dîtin û dengê Xwedê bihîstin, ew ji tirsa lerizîn û ji dûr ve sekinîn. [19] Wan ji Mûsa re got: «Tu bi me re bipeyive û emê guhê xwe bidinê, lê belê bila Xwedê bi me re nepeyive, da ku em nemirin.»

Yanî hingê gelê Îsraêl dest pê kir û hinekî fêm kir ku Xwedê çiqas mezin û pîroz e û wan fêm kir ku ew nikarin nêzîkî wî bibin.
Li quntara çiyayê Sînayê ew bi rastiya wan gotinên Nîvîsarên Pîroz hesiyan ên ku dibêjin:
Hemû mirov wek giyê ne (Petrûs I, 1:24)
û Xwedayê me agirek e ku dixwe û tune dike. (Îbranî 12:29)
Çaxê ku ew li ber Xwedê sekinî bûn, ma wan dikaribû ku ew ji Yê Pîroz re bêjin: «Derd tune! Xem nake, hemû tiştên ku Xudan gotine, emê bikin.»
Na, bi rastî wan nikaribû weha bigotan.
Êdî gelê Îsraêl fêm kir ku pirsgirêka wan heye û bi rastî pirsgirêka wan pir zehmet e! Ew bi pîroziya Xwedê û bi hişkîtiya emrên wî hesiyan.
Wan fêm kir ku ew bi xwe ne pîroz in û nikarin Şerîeta Xwedê ya bêkêmahî bigirin û li gor wê bikin. Wan dît ku ew wek giyê ne û bi rastî agir pê ketiye!

Em niha li ser xwe bifikirin. Ma hûn dizanin pîroziya Xwedê çi ye û çawa ye?
Gelo ma hûn qebûl dikin ku Xwedê û Şerîeta wî rast û bêkêmahî ne?
Gelo hûn dibînin ku dilê we û kirinên we di çavê Xwedê de, ne rast û ne bêkêmahî ne, yanî bi qusûr in?
An ma hûn jî wek gelê Îsraêl dikin, dibêjin: «Derd tune, xem nake, hemû tiştên ku Xwedê gotine, emê bikin! Emê bi hewldana xwe, bi xêr û karên xwe yên qenc nêzîkî Xwedê bibin!»

Bi rastî fikrên weha bi fikrên Xwedê re li hev nagirin.

Ma yên ku di nav gunehan de tije nepakî ne, dikarin li ba Yê Pîroz û Yê Paqij rûnin? Na, ew tu caran nikarin!
Ma Xwedê wê nîvqencî û nîvxerabiyê qebûl bike? Na, ew tu caran tiştên weha qebûl nake. Xwedê pîroz e û ew tu tiştê murdar, an nepak qebûl nake.
Bi tenê bêkêmahî li wî xweş tê! Gelo ma we ev tiştên ha fêm kirin?
An hêviya we ew e ku di Roja Dawî de karên we yên qenc wê bi awayekî, karên we yên xerab xîş bikin?
Eger rewş û pirsgirêk wusa bûya, Xwedê wê ne dadgerê rast bibûya!
Dostê delal, li ser vê mijarê hinekê bifikire: Mesele em bêjin, mirovek heye ku wî cîranê xwe kuştiye.
Lê dadger weha dibêje: «Rast e, tu sûcdar î, çimkî te mirovek kuştiye.
Lê belê te çend tiştên qenc jî kirine. Loma ez tu cezayî nadim te, tu serbest î!»
Gelo hûnê li ser dadgerekî weha çi bifikirîna?
Ma meyê jê re bigota: «Aferim, te qenc kir!»
Na, meyê bigota: «Ev dadger qet ne dadgerekî rast û dadperwer e.» Û rast e jî.

Dostên delal, Xwedê dadgerekî rast û dadperwer e.
Ew çavên xwe li gunehan naneqîne. Xwedê dadgerê vê dinyayê ye
û ewê li gor heq û dadperweriyê dîwana her mirov bike.
Qanûna Xwedayê rastdar ew e ku guneh bê cezakirin.
Cezayê guneh hem mirin e û hem jî ew e ku mirov her û her ji Xwedê dûr be.
Xêr û karên me yên qenc tu caran nikarin deynê gunehên me xîş bikin.
Heçî karên me yên qenc in, Nivîsarên Pîroz dibêjin:
«Em hemû bûn wek yekî murdar
û hemû kirinên me yên rast wek cilekî qirêjî ne.» (Îşaya 64:4)

Xwedê wek agir e; ew dixwe û tune dike û karên qenc ên zarokên Adem wek giyayê hişk in. Em qet nikarin bi rastdariya xwe bi xwe li ber agirê dîwana Xwedê bisekinin!

Çaxê ku agirê Xwedê daket ser Çiyayê Sînayê, ma gelê Îsraêl got:
«Bila, emê nêzîkî agirê Xwedê bibin!»?
Çaxê ku Xwedê daket ser serê çiyê, ma wan dixwest hilkişin ba wî?
Dema ku xurxura ewran û birûsk çêbûn û li ser çiyê ewrekî reş sekinî û dû jê derket û tevahiya çiyê hejiya, ma wan diwêrî ku ew nêzîk bibin?
Na, ew nêzîk nebûn, lê ew ji dûr ve sekinîn û ji tirsa lerizîn!
Di nav wan de tu kes nêzîkî çiyê nebû, çimkî hêz û pîroziya Xudan Xwedê ew tirsandin. Lê belê ev tirs tirseke qenc bû, ji ber ku Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Tirsa Xwedê destpêka şehrezayiyê ye. (Gotinên Silêman 1:7)

Dostên delal, îro wextê me hew maye.
Lê belê em ji we hêvî dikin ku tiştê ku we niha bihîst, bila ji bîra we neçe:
Me dît ku Xwedê pîroz e û ewê li gor pîvana pîroziya xwe dîwana mirovan bike.
Ew her û her çavên xwe li gunehan naneqîne û em nikarin bi hêjatiya hewldana xwe nêzîkî wî bibin.

Di bernama ku bê de Xwedê hez bike emê hê bêtir li Deh Emrên Mezin binêrin, ên ku Xwedê di çola Sînayê de li ser çiyayê Sînayê dan gelê Îsraêl.
Em pir spas dikin ku we qenc guhdariya vê bernamê kir.

Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin: Tirsa Xudan destpêka şehrezayiyê ye. (Gotinên Silêman 1:7)

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Me di dersa din de dît ku tevahiya çiyayê Sînayê vehejiya û dû jê derket, çimkî Xudan Xwedê bi êgir û xurxura ewran û bi birûskan daketibû ser wî, da ku Deh Emrên Mezin bidan gelê Îsraêl. Xwedê Îsraêlî hişyar kirin û emir li wan kir ku nêzîkî çiyê nebin, an na, ewê bimiran. Nêta wî ew bû ku gelê Îsraêl hîn bibe ku Xwedayê rast çiqas pîroz e.

Îro em dixwazin hê bêtir yek bi yek li wan her Deh Emrên Mezin binêrin. Em dixwazin li jiyana xwe jî binêrin, da ku em fêm bikin halê me li ber Xwedayê pîroz çawa ye.
Emê di Tewratê de ji Kitêba Derketinê, deriyê 20’an bixwînin.
Piştî ku Xwedê di navenda êgir de daket ser çiyayê Sînayê, wî weha got:
«Ez Xudan Xwedayê te me, yê ku tu ji welatê Misrê, ji mala koletiyê deraniyî.

3 Li pêşberî min divê tu xwedayên te yên din nebin!
Emrê pêşî ev e. Xudan Xwedê got: Li pêşberî min divê tu xwedayên te yên din nebin! Divê ku Xwedayê me ew bi tenê be. Ew rûmeta xwe nade tu kesî din, an tu tiştî din. Xwedê Afirandarê dinyayê ye û ji bilî wî, divê em neperizin tu kesî din.
Lê belê, eger em çavên xwe li vî welatî û li seranserê vê dinyayê bigerînin, emê bibînin ku mirov weha nakin.
Mirov hev bilind dikin û pesnê xwe didin, tu dibêjî qey ew Xwedê bi xwe ne.
Lê belê bi tenê navê Xwedê ewqas pîroz e ku mirov jê bitirse.
Bi tenê ew hêja ye ku em biperizin wî û jê piştrast bin.
Lê belê eger pirsgirêka mirovan hebe, pêşî ew li Xwedê nagerin û dua nakin.
Ma yê ku her tişt afirandiye, her tiştî dizane û dikare her tiştî bike, ne Xwedê ye?
Lê belê dîsa jî mirov pêşî hêviya xwe bi mirovên din ve girêdidin û ji bîr dikin ku

ew jî wek wan lewaz in. Bi vî awayî ew textê Xwedê didin mirovan û yên ku weha dikin, ew xwedayekî din li pêşberî xwe datînin.

Di emrê diduyan de Xwedê weha got:
[4] Ji xwe re qet pûtekî çêneke… Li ber wan xwe netewîne û xizmetê ji wan re neke! …Çimkî ez Xudan Xwedayê te, xwedayekî hesûd im.

Di vî emrî de Xwedê ji me re dibêje ku em xwe ji pûtan dûr bixin.
Bi rastî pût ne tenê heykelên ji kevir, ji hesin an ji dar in ên ku di pûtxaneyan de an di malan de tên perizîn.
Her tiştê ku di navbera me û Xwedê de be, yanî dilê me ji Xwedê dûr bixe, pûtek e.
Ji bo hin mirov, pûtê wan futbol e, çimkî ji bo wan futbol ji Xwedê girîngtir e.
Ji bo mirovên din televizyon pûtek e. Wextê wan tune ku Peyva Xwedê bixwînin an guhê xwe bidinê, da ku daxwaza Xwedê fêm bikin, lê her gav wextê wan heye ku vidyo an filman temaşe bikin.
Ji bo hinên din pûtê wan nivîştî ne. Ew ji hêza niviştiyan piştrast in – wek ku hêza Xwedê têra wan nake, an qet hêza wî ji bo parastina wan tune.
Ji bo hin mirov dewlemendî dibe pûtekî girîng û cihê Xwedê distîne.
Cihê pêşî di jiyana wan de ne Xwedê, lê pere distînin.
Dema pêwist be, neheqî û tiştên din ên ku ne bi dilê Xwedê ne jî dikin, da ku zîv û zêrê wan hê zêdetir bibe. Ji bo mirovên weha, xwedayê wan pere ne.
Ya girîng ev e ku em vê yekê fêm bikin: Her tiştê ku dikeve di navbera me û Xwedê de, pûtek e. Her tiştê ku di jiyana me de ji Xwedê girîngtir be, dibe pût.

Di emrê sisiyan de Xwedê got:
[7] Navê Xudan Xwedayê xwe badîhewa neyne ser devê xwe! Çimkî Xudan wî yê ku navê wî badîhewa tîne ser devê xwe, bê ceza nahêle.

Erê, Xwedê naxwaze ku em navê wî bê sedem bînin ser devê xwe.

Lê belê tu her roj dibihîzî ku yek ji cîranê xwe re soz dide, dibêje: «Înşallah, ezê weha bikim» an: «Xwedê hez bike, ezê bêm ba we», lê belê di dilê wî de qet nêta wî tune ku weha bike. Ew qet li ser daxwaza Xwedê jî nafikire.
Ew tenê weha dibêje ku dilê cîranê xwe xweş bike, an da ku derewa wî kifş nebe. Lê bi rastî, ev yek guneh e.
Hinên din her gav dibêjin: «Bi Xwedê, min ev yek nekir.»
Lê belê di dilê xwe de ew qenc dizanin ku wan tam ev yek kiriye.
Yekî din dibêje: «Xwedê dizane ku ez tu caran vî tiştî nakim», lê bi wan gotinan jî derewan dike. Bi van tiştan navê Xwedê badîhewa bi kar tînin, yanî tînin ser devê xwe.
Loma Peyva Xwedê dibêje: Bila erêya we «Erê» be û naya we «Na» be. Ji vê zêdetir ji Yê Xerab e. Yanî ji Îblîs e. (Metta 5:37)

Di emrê çaran de Xwedê weha ji gelê Îsraêl re got:
8 Divê roja Şemiyê li bîra te be, da ku ew ji te re veqetayî û pîroz be! Şeş rojan kar bike û hemû xebata xwe bike… Çimkî Xudan di şeş rojan de erd û ezman û derya û her tiştê di wan de çêkir, lê di roja heftan de wî bîhna xwe vekir.

Ji wan gotinan em fêm dikin ku Xwedê dixwest ku gelê Îsraêl di roja heftan de bîhna xwe veke û bi vê yekê siyaneta wî bigirin.

Xwedê di emrê pêncan de weha got:
12 Qedrê dê û bavê xwe bigire da ku li welatê ku Xudan Xwedayê te wê bide te, emrê te dirêj be.

Li vir em dibînin ku dê û bavê me hêjayî siyaneta taybetî ne û divê ku em li gor heqê wan qedrê wan bigirin.
Lê belê, eger em li dora xwe binêrin, ma emê bibînin ku zarokên derdora me weha dikin? Çaxê dê û bav wan hişyar dikin, ew bi gotinên req bersivê didin, wan kêmî xwe dibînin û bi riya xwe ve diçin.
Ew qedrê dê û bavê xwe nagirin, ew bi tenê wan aciz dikin.

Lê belê emrê pêncan weha hînî me nake; ew nîşanî me dide ku daxwaza Xwedê ew e ku zarok ji dê û bavê xwe hez bikin, qedrê wan bigirin û guhdariya wan bikin. Çi xwezî bi wan zarokên ku li gor vî emrê Xwedê, qedrê dê û bavên xwe digirin!

Di emrê şeşan de Xwedê got:
13 Nekuje!

Yanî Xwedê dibêje: Kî ku mirovekî bikuje, li hember Xwedê guneh dike, çimkî yê ku can û jiyanê dide mirovan, Xwedê ye.
Yê ku mirovekî bikuje, ji Xwedê nefret dike, çimkî Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand.
Lê belê Peyva Xwedê nîşanî me dide ku kuştin ne tenê ev e ku mirov yekî bikuje. Nivîsarên Pîroz dibêjin: Her kesê ku ji birayê xwe nefret dike, mêrkuj e. (Yûhenna I, 3:15)
Gelek mirov tiştekî din jî ji bîr dikin: Xwedê dîwana mirov ne bi tenê li gor kirinên wî dike, lê belê li gor nêt û daxwaza mirov jî dîwana wî dike.
Xwedê li dil dinêre, loma di çavê wî de nefretkirin û kuştin wekhev guneh in.
Erê, di vî emrî de Xwedê ne tenê li ser kuştinê dibêje, lê ew hînî me dike ku Xwedê ji qurmê kuştinê, yanî ji nefretê, ji çavnebariyê, ji hêrsbûna mirov û ji heyfhilanînê jî nefret dike.

Guhdarên delal, îro em gihîştin dawiya bernama xwe, lê di bernama ku bê de emê li emrên din jî binêrin.
Heta hingê bila ev peyvên Nivîsarên Pîroz di hiş û dilê we de bin; ew dibêjin:

Ez dilovaniyê li hezar nifşên wan dikim ên ku ji min hez dikin û emrên min digirin. (Derketin 20:6)

Di bernama din de me li Deh Emrên Mezin nêrî û em gihîştibûn heta emrê şeşan.
Emê niha bi emrên din ên mayîn berdewam bikin.

Emrê Xwedê yê heftan weha dibêje:
14 Zînayê neke!

Zewac diyariyeke ji Xwedê ye û gelek hêja û bi qîmet e.
Xwedê dizane ku çi ji bo me qenc e. Ew jinê dide mêr û mêr dide jinê, da ku ew bizewicin û naxwaze ku piştre zilam bi dilxwazî li jineke din an jî jin bi dilxwazî li mêrekî din binêre.
Peyva Xwedê dibêje: Her mêr deyndar e ku wek bedena xwe, ji jina xwe hez bike. Û dibêje: Kî ku ji zînayê pê ve bi sedemekî din jina xwe berde û yeke din bîne, zînayê dike. (Efesî 5:28; Metta 19:9).
Wî çaxê ku mirov guhê xwe nadin Xwedê û ne li gor daxwaza wî, lê li gor daxwaza xwe dikin, ew gelek caran di bedena xwe de hêza gunehan dibînin.
Loma carna nexweşiyên giran dikevin ser wan ên ku li derveyî zewacê tên ba hev û sînorên ku Xwedê danîne, kêm dibînin.

Lazim e ku em tiştekî din bînin bîra xwe:
Zîna ne tenê ew e ku em bi bedena xwe dikin, lê belê ew bi fikrên me ve jî girêdayî ye.
Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin: Her kesê ku bi dilxwazî li jinekê binêre, ji xwe wî di dilê xwe de bi wê re zîna kiriye.( Metta 5:28)

Di emrê heştan de Xwedê got:
15 Nedize!

Ev emir pir zelal e.
Lê belê qenc e ku em bînin bîra xwe ku di çavê dadgerê rastîn Xwedê de, dizîkirin ne tenê ew e ku mirovek peran an tiştekî biha yê ku ne yê wî ye, bidize. Eger tenê **nêta** te hebe ku tu bixwazî tiştekî weha bidizî, tu di dilê xwe de bûyî diz. Xwedê li dil dinêre!
Gelek cûreyên diziyê hene. Mesele eger tu ji bo xebata xwe meaşê xwe bistînî, lê belê tu li gor peymana xwe ji bo kardêrê xwe nexebitî û wextê xwe winda bikî, tu diziyê dikî. Çimkî di vî halî de tu ji qezenca kardêrê xwe didizî.

Heçî dizî û her gunehê din e, cezayê wan çi ye?
Erê, cezayê wan tiştan, mirin û ketina dojehê ye û em dizanin ku agirê wê tu caran venamire.

Emrê nehan weha dibêje:
16 Li hember cîranê xwe şahidiya derewîn neke!

Ev emir jî gelek zelal e. Xwedê Xwedayê rastiyê ye û tu têkiliya wî bi derewan tune.
Gelek mirov difikirin, dibêjin: Çêdibe ku ez derewên biçûk bikim, da ku pirsgirêk çênebin û şer dernekeve.
Lê belê li ba Xwedayê Rastiyê derewên biçûk tunin.
Xwedê dibêje: Yê ku derewan dike, li gor Îblîs dike û dimîne wî, çimkî ew derewkar e û bavê derewan e. (Yûhenna 8:44)
Îblîs ji dê û bavê me Adem û Hewayê re tiştên derew gotin û ew heta îro mirovan bi derewên xwe dixapîne. Yê ku derewan dike, wek Îblîs dike.

Di emrê dehan de Xwedê dibêje:
17 Çavê xwe neavêje mala cîranê xwe! Çavê xwe neavêje pîreka cîranê xwe, an xulamê wî an navmaliya wî an gayê wî an kerê wî an tu tiştê wî.

Ev emir ji me re diyar dike ku Xwedê qenc dizane dilê me çiqas xwehr û xerab e. Di dilê zarokên Adem de timahî û çavavêtin heye.
Dilê me yê xerab wusa dike ku em çavên xwe biavêjin pîreka cîranê xwe, an çavên xwe diavêjin tiştekî din ê ku di gûmana me de ji me kêm e.
Ev guneh e, çimkî Peyva Xwedê dibêje:
Me tiştek neaniye dinyayê û em nikarin tiştekî ji dinyayê bibin jî. [8] Lê eger xwarin û wergirtina me hebe, em bi wan razî bin. (Tîmotêyos I, 6:7-8)

Deh Emrên Mezin ên ku Xwedê bi destê Mûsa dan gelê Îsraêl, ev in.

Lê belê beriya ku em dersa îro xilas bikin, qenc e ku em ji xwe bi xwe pirsekê bipirsin û divê her yek ji me bersiva wê pirsê bide.
Pirs ev e: Ma min ew her deh emir girtine? Ma ez her gav bi awayekî bêkêmahî li gor wan her deh emran dikim?
Belkî te bihîstiye ku Xilaskarê vê dinyayê li ser van deh emran çi gotiye.
Wî ew bi vî awayî kin kirin û got ku her deh emir di van herdû emran de kifş dibin: Ew herdû emir jî ev in:

1. «‹Ji Xudan Xwedayê xwe, bi hemû dilê xwe, bi hemû canê xwe û bi hemû hişê xwe hez bike.›
2. ‹Wek ku tu ji xwe hez dikî, ji cîranê xwe hez bike.›
   Hemû Şerîet û pêxember li ser bingeha van herdû emran in.»

Yanî, eger tu bixwazî li dilê xwe binêrî û bizanî ka te li gor her deh emrên mezin kiriye an na, tu dikarî van herdû pirsan ji xwe bipirsî:

Pirsa yekê: Têkiliya min a bi Xwedê re çawa ye? Ma ez ji hemû dilê xwe ji Xwedê hez dikim?

Pirsa diduyan: Têkiliya min a bi mirovan re çawa ye? Ma ez wek ku ez ji xwe hez dikim, ji cîranê xwe jî hez dikim?

Gelo têkiliya te ya bi Xwedê re çawa ye? Bila dilê te bersiva vê pirsê bide! Ma tu ji hemû hişê xwe ji Xwedê hez dikî? Ma tu bi hemû dilê xwe ji wî hez dikî? Gelo ma Xwedê û Peyva wî di jiyana we de cihê herî girîng distînin?

Gelo têkiliya te ya bi mirovên din re çawa ye?
Ma wek ku tu ji xwe hez dikî, tu ji cîranê xwe jî hez dikî?
Ma tu di her tiştî de li siyaneta xwe digerî, an tu hurmetê ji mirovên din re jî dikî? Wek ku tu xema xwe dixwî, ma tu xema cîranê xwe jî dixwî?
Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Her çi ku hûn dixwazin xelk ji we re bikin, hûn jî wusa ji wan re bikin.» (Metta 7:12) Ma tu weha dikî?

Eger ji bo van hemû pirsan bersiva te ne «Erê!» be, bizane ku tu di çavê Xwedê de sûcdar î.
Bi hewldan û kirinên xwe, tu dikarî bi tenê li benda dîwana Xwedê ya rast bimînî.
Ewê her sûc û her gunehî ceza bike. Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Heçî yên tirsonek in, yên bêewle, yên di nav pîsîtiyê de, yên kuştinê dikin, yên zînakar, yên sêrbaz, yên pûtperest û hemû yên ku derewkar in, para wan di wê golê de ye, ya ku bi êgir û kewkurtê dişewite. (Peyxama Yûhenna 21:8)
Xwedê pîroz e û ew qet tiştekî ku ne pîroz be qebûl nake.
Xwedê bêkêmahî ye û ew qet karên bi qusûr qebûl nake.
Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin: Kî ku tevahiya Şerîetê pêk bîne û di tiştekî tenê de bikeve, li ber tevahiya wê sûcdar e. (Aqûb 2:10)

Eger tu bixwazî bi girtina hemû emran li ber Xwedê rastdar derkevî,
bizane ku ev çênabe.

Nivîsarên Pîroz dibêjin: Bi kirina Şerîetê tu kes li ber Xwedê rastdar dernakeve… Hemûyan guneh kir û ji rûmeta Xwedê bêpar man. (Romayî 3:23)

Guhdarên delal, Peyva Xwedê zelal e û xelet nayê fêmkirin:
Hemûyan guneh kir û hemû yên ku pişta xwe bi kirina Şerîetê ve girêdane, di bin nifirê de ne. (Galatî 3:10)

Belkî niha hûn dipirsin:
Madem ku wusa ye, gelo Xwedê çima ev Deh Emrên Mezin dan me?
Madem ku tu kes nikare wan hemûyan bigire, feyda wan çi ye?

Bi rastî ev pirseke girîng e û Xwedê hez bike, emê di bernameya ku bê de li ser vê yekê bipeyivin û emê bibînin bersiva Xwedê ji bo vê pirsê çi ye.

Heta hingê ji kerema xwe li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz qenc bifikirin ên ku dibêjin:
Kî ku tevahiya Şerîetê pêk bîne û di tiştekî tenê de bikeve, li ber tevahiya wê sûcdar e. (Aqûb 2:10)

Heta bernama ku bê, hûn bimînin di xêr û xweşiyê de!

Me di herdu dersên beriya vê de dît ku Xwedê her deh Emrên Mezin dan eşîrên gelê Îsraêl.

Di emrê pêşî de wî got: Li pêşberî min divê tu xwedayên te yên din nebin!

Emrê diduyan ev bû: Ji xwe re qet pûtekî çêneke.

Di emrê sisiyan de Xwedê got: Navê Xudan Xwedayê xwe badîhewa neyne ser devê xwe!

Emrê çaran weha dibêje: Divê roja Şemiyê li bîra te be, da ku ew ji te re veqetayî û pîroz be!

Emrê pêncan ev bû: Qedrê dê û bavê xwe bigire.

Yê şeşan dibêje: Nekuje!

Yê heftan: Zînayê neke!

Yê heştan: Nedize!

Yê nehan: Şahidiya derewîn neke!

Û di emrê dehan de Xwedê got: Çavê xwe neavêje tiştên cîranê xwe!

Her Deh Emrên Mezin ev in.

Xwedê ew bi destê Mûsa pêxember dan gelê Îsraêl.

Bi vê yekê barekî giran ket ser milê wan, çimkî Xwedê bi van emran dibêje:

Yê ku bikare bê kêmahî van emrên min bi tevahî bigire, ew hêja ye ku her û her li ba min bijî.

Lê belê yê ku van hemû emran pêk bîne, lê di xaleke tenê de jê dûr keve, li ber tevahiya Şerîetê sûcdar e û wê her û her ji Xwedê dûr û cihê bimîne.

Yanî Xwedê li wan emir kir ku divê ew di her tiştî de guhdariya wî bikin!

We rast bihîst: Xwedê dibêje: Di her tiştî de divê mirov guhdariya Xwedê bike.

Ma bi rastî ew mirovê ku guneh ketiye hevênê wî, dikare weha bikin?

Ma ew dikarin hemû emrên Xwedê bigirin? Na, ji xwe ew nikarin.

Loma îro pirsa me ya mezin û girîng ev e:

Xwedê çima ew her Deh Emrên Mezin dan gelê Îsraêl?

Ma wî nizanibû ku ew nikarin wan emran bê kêmahî bigirin?
Çima Xwedê barekî evqas giran danî ser milê zarokên Adem?

Me di bernameyeke din de dît ku gelê Îsraêl ji Xwedê re got: «Hemû tiştên ku Xudan gotine, emê bikin.»
Gelê Îsraêl fêm nekir ku hêza wan tune ku bê kêmahî li gor emir û daxwaza Xwedê bikin. Haya wan jê tunebû ku ew çiqas ji Xwedê û ji rûmeta wî ya mezin dûr in.

Nêt û armanca Xwedê ew bû ku bi wan emrên hişk û dijwar ji gelê Îsraêl re kifş bike ku ew qet nikarin bi hêza xwe li wî xweş bên.
Xwedê dizanî ku gelê Îsraêl nikare di riya rast de here û hemû emrên wî bigire, lê Îsraêliyan bi xwe hê ev yek fêm nedikir.
Îsraêlî wek mirovên dîndar ên vê demê bûn: Ew difikirin, dibêjin:
«Xwedê dixwaze ku tenê em hewl bidin û biceribînin û çi ji destê me bê, em bikin. Hingê, di Roja Dawî de, eger karên me yên qenc ji yên xerab girantir bin, ewê me qebûl bike û wê bêje: De werin, her û her li ba min di bihiştê de rûnin!»
Lê belê, mirovên ku weha dibêjin, xelet difikirin û bi Nivîsarên Pîroz nizanin.
Xwedê pîroz û bêkêmahî ye û ew çavên xwe li gunehekî tenê jî naneqîne.

Me ev tişt beriya niha jî dît: Çaxê ku hê Adem di bihiştê de bû, ma diviya ku wî çend guneh bikiran, heta ku jê bihata avêtin?
Ma destûr hebû ku pêşî deh guneh bikiran? An sed guneh, an belkî 1000 guneh bikiran? Nexêr, Adem gunehekî tenê kir û hingê diviya ku ji bihiştê derketa.

Wî gunehekî tenê kir û êdî destûra wî nema ku nêzîkî Xwedê bibe.
Gunehekî têrê dikir ku Adem mecbûr bibûya bimira.
Meaşê gunehekî tenê, agirê dojehê ye.

Erê, Xwedê pîroz e û ew gunehan tiştekî biçûk hesêb nake. Loma ew

di Nivîsarên Pîroz de dibêje: Kî ku tevahiya Şerîetê pêk bîne û di tiştekî tenê de bikeve, li ber tevahiya wê sûcdar e. (Aqûb 2:10)
Madem ku pîroziya Xwedê wusa ye, tiştê ku em dixwazin bizanin ev e:
Çima Xwedê Emrên Mezin dan gelê Îsraêl?
Ma wî nizanibû ku tu kes nikare wan emran bê kêmahî bîne cih?
Niha ji kerema xwe guhê xwe bidin bersiva Xwedê.
Xwedê di Nivîsarên Pîroz de weha dibêje: Bi kirina Şerîetê tu kes li ber Xwedê rastdar dernakeve. Ji ber ku bi Şerîetê guneh tê zanîn. (Romayî 3:20)

Îcar nêt û armanca Deh Emrên Mezin çi ye?
Ma ew hatin dayîn ku gunehên mirovan xîş bikin, yanî afû bikin?
Nexêr, Xwedê dibêje, armanca wan emran ev e ku ew me hişyar bikin û gunehên me bînin ber çavên me.

Gelo we ev yek qenc fêm kir? Ma Xwedê her deh emrên xwe yên pîroz dan Mûsa û gelê Îsraêl, da ku ew bi girtina wan destûrê bistînin ku bikevin bihiştê?
Na, ev qet çênabe. Çimkî Xwedê dibêje: Eger hûn bi tenê carekê emrekî bişkênin, hûnê sûcdar derkevin û hûn nikarin li ba min bimînin.
Ma zarokên Adem dikarin bê kêmahî van hemû emrên Xwedê bigirin? Na.
Ma mirov dikare ji cerê qirêjî ava zelal û paqij vexwe?
Bi vî awayî gunehkar jî nikare emrên pîroz bigire.

Em dubare dikin: Armanca Deh Emran ev e ku bi wan guneh bê zanîn.
Yanî Xwedê deh emir dan, da ku em bizanin guneh çi ye.
Xwedê ew emir nedan me, ku em bi wan ji xezeb û ji dîwana wî xilas bibin.
Xwedê ew emir dan me, da ku nîşanî me bide ku halê me çi ye.
Û halê me kifş e: Em gunehkarên bi sûc in; Xwedê wê dîwana me bike û eger em bixwazin ji sûcên xwe û ji dîwana Xwedê xilas bibin, ji me re Xilaskar lazim e!

Mesele em bêjin: Deh Emrên Mezin wek mekîna rontgenê ne. Çaxê ku mirovek nexweş be û sedemê nexweşiya wî ne kifş be, hingê doxtor wê bi vê mekînê wêneyên hestî û hinavên yê nexweş bikşîne.
Feyda mekîna rontgenê çi ye? Bi rastî feyda wê bi tenê ev e ku ew, tiştê ku di hestî û hinavên mirov de xera bûye an nexweş e, kifş dike.
Bi vî awayî emrên Xwedê yên pîroz wek vê mekînê ne. Feyda wan û armanca wan ew e ku ew, tiştê xerab kifş dikin; yanî ew wan gunehên ku di dilê me de ne, eşkere dikin.

Deh Emrên Mezin çawa dikarin wan gunehên ku di dilê me de rûdinin, kifş bikin?
Ev bi vî awayî çêdibe: Eger ez kirinên xwe, jiyana xwe û dan û standina xwe bi Şerîeta Xwedê ya pîroz re rû bi rû bikim, ezê bibînim ku ez di fikrên xwe de, di gotinên xwe de û di kirinên xwe de çiqas ji Xwedê dûr im.
Çaxê ku pêşî ez li Şerîeta Xwedê binêrim û piştre li xwe bi xwe binêrim, hingê ezê fêm bikim ku min li hember Xwedê û li hember mirovan guneh kiriye.
Herweha ezê fêm bikim ku destûra min tune ku ez bikevim bihişta Xwedayê pîroz a paqij û bêqusûr.

Di nexweşxanê de, feyda mekîna rontgenê ew e ku ew wan tiştên xerab û nexweş ên di hundirê bedena mirov de kifş dike; herweha feyda Deh Emrên Mezin jî ev e ku xerabiya dilê me kifş bikin.
Lê belê mekîna rontgenê qet nikare mirovekî nexweş sax bike.
Herweha Deh Emrên Mezin û tevahiya Şerîetê jî nikarin dilê me ji gunehan paqij bikin.
Dilê me tije guneh e û eger em bixwazin afûbûna wan gunehan bistînin, divê ku em vegerin ba Doxtorê Mezin, yanî divê ku em vegerim ba Xwedê.
Ji ber gunehên ku di dilê me de ne, mirin û cezayê herheyî li benda me ne û ji bilî Xwedê tu kes tune ku plana xilasiyê amade kiribe.

Di bernama ku bê de, emê hê bêtir li vê mijarê binêrin. Heta hingê bimînin di xêr û xweşiyê de.

Mijara me ya îro jî ev e: Xwedê çima her Deh Emrên Mezin dan mirovan? Ma Xwedê nizanibû ku tu kes nikare wan bê kêmahî bigire?
Me di bernama din de dît ku nêt û armanca emrên Xwedê ew e ku ew gunehên me nîşanî me bidin.
Çaxê ku pêşî em li Şerîeta Xwedê binêrin û piştre li xwe bi xwe binêrin, hingê emê fêm bikin ku me li hember Xwedê û li hember mirovan guneh kiriye.
Herweha emê fêm bikin ku destûra me tune ku em bikevin bihişta Xwedayê pîroz.

Belkî niha yek wê bêje: «Hevalê delal, heçî ez im, ez ne wek mirovên din im. Ez mirovekî qenc û rast û dîndar im. Ez diziyê nakim, ez şahidiya derew nakim û ez zînayê nakim.»
Dostê delal, eger tu weha bifikirî, te hê qenc fêm nekiriye ku pîroziya Xwedê çi ye.
Divê tu vê yekê qenc bizanî: Di Roja Dawî de, Xwedê wê te ne bi cîranê te yê xerab re rû bi rû bike. Ewê te bi Şerîeta xwe ya pîroz re rû bi rû bike
û di vê Şerîetê de weha dibêje: Kî ku tevahiya Şerîetê pêk bîne û di tiştekî tenê de bikeve, li ber tevahiya wê sûcdar e. (Aqûb 2:10)
Xwedayê ku dibêje: «Zînayê neke!», weha jî dibêje: «Derewan neke!»
Îcar, eger te zîna nekiribe, lê te di tevahiya jiyana xwe de bi tenê carekê derew kiribe, hingê tê li ber tevahiya Şerîetê sûcdar bî.
Mana vê ev e ku tu nikarî bikevî bihiştê û tê ji Xwedê dûr bî, çimkî Nivîsarên Pîroz dibêjin: Qet tiştekî murdar nakeviyê û yên ku pîsîtiyê dikin û derewan dikin jî, nakevinê. (Peyxama Yûhenna 21:27)

Bêguman qet şik tune: Em bi hewldan û kirinên xwe û bi hêza xwe qet nikarin li Xwedê xweş bên. Loma Peyva Xwedê weha dibêje:

«Hemû dinya li ber Xwedê sûcdar e.… Tu kesê rast tune, tenê yek jî tune… Hemû ji rê derketin …Tu kesê ku qenciyê dike tune, yek tenê jî tune…Tu cihêtî tune: Hemûyan guneh kir û ji rûmeta Xwedê bêpar man. (Romayî 3:19.10.12.22.23)

Madem ku halê me ev e, em çawa dikarin ji dîwana Xwedê ya dadperwer û ji cezayê gunehên xwe xilas bibin? Nexwe divê em çi bikin? Ma qet hêvî tune? Erê, eger em ji hêza xwe û ji hewldana xwe piştrast bin, hêviya me tune.
Lê belê, şikir ji Xwedê re! Wî planeke xilasiyê amade kir, da ku ew bi xwe zarokên Adem ji cezayê gunehan xilas bike.

Em niha dixwazin di Tewratê de bibînin ku Xwedê çi rê amade kir, da ku gelê Îsraêl ji wê nefreta ku Şerîet tîne serê mirovan, xilas bike.
Piştî ku Xwedê Deh Emrên Mezin dan Îsraêliyan, Nivîsarên Pîroz dibêjin:

22 Xudan ji Mûsa re got: «Weha ji gelê Îsraêl re bêje: We dît ku ez ji ezmên bi we re peyivîm... 24 Ji min re ji axê gorîgehê çêkin; goriyên xwe yên şewitandinê û diyariyên xwe yên silametê, miyên xwe û gayên xwe li ser wê bikin gorî; li her dera ku ez lê navê xwe bidim bîranîn , ezê bêm ba we û ezê we pîroz û bimbarek bikim.

Îcar Mûsa di kitêbekê de her tiştê ku Xwedê jê re gotibû nivîsî. Dotira rojê Mûsa rabû û wek ku Xwedê emir li wî kiribû, di quntara çiyayê Sînayê de gorîgeh çêkir. Hingê wî li çend xortan emir kir ku çend conegayan bikin gorî, xwîna wan bixin leganan û goştê wan li ser gorîgehê bişewitin. Hingê Mûsa xwîna conegayan li  gorîgehê, li kitêba peymanê ya ku Emrên Xwedê tê de nivîsî bûn û li civîna gelê Îsraêl reşand û got: «Xwîna vê peymana ku Xwedê bi we re girêdaye, ev e.» (Derketin 24:4-8)

De vêce ma sedemê vê yekê çi bû?

Bi vê yekê Xwedê dixwest ku bianiya bîra gelê Îsraêl ku «bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.» (Îbranî 9:22)
Wî eynî tişt hînî bavkalên wan Adem, Habîl, Nuh, Birahîm, Îshaq û Aqûb kiribû. Ji destpêkê ve her kesê ku dixwest nêzîkî Xwedê bibe, diviya bi riya goriyeke bêqusûr nêzîkî wî bibûya.

Xwedê çima emir kir ku heywanan bikin gorî?
Xwedê weha got, ji ber ku ew bi xwe rast û pîroz e û qanûna wî ya pîroz dibêje ku cezayê her gunehî mirin û helakbûna herheyî ye. Ew guneh, dikare di çavên me de mezin be an biçûk be, xem tune, ceza eynî ye.
Xwedê dizanibû ku gelê Îsraêl nikare wan hemû emrên wî bigire, loma diviya ku wan heywanên bêqusûr jê re bikiran gorî.
Bi vî awayî heywan di ber mirovên sûcdar de dihatin serjêkirin, yanî yê bêsûc cihê yê sûcdar distand û dihat cezakirin.
Me berî niha dîtibû ku heywan û gorî nikarin gunehên mirovan xîş bikin; bi tenê wan gunehên mirovan dinixumandin.
Gorîkirina wan heywanan bi tenê mînak bû, heta wê roja ku Xwedê wê Xilaskarê pîroz bişanda vê dinyayê.
Wî xilaskarî wê bi dilxwazî xwe bi xwe bikira gorî, yanî wê bibûya goriya temam, bêqusûr û ya dawî û wê hemû guneh xîş bikiran.

Em îro çiqas dilşa ne, çimkî em dizanin ku ew Xilaskar hatiye û deynê gunehên me daye û cezayê me kişandiye. Gelo hûn navê wî Xilaskarî dizanin? Erê, ew Îsa Mesîh e.
Mana navê Îsa ev e: Xudan xilas dike. Li ser vê dinyayê, bavê Îsa tunebû.
Ew ji ezmên hat. Wî xasîtiya xwe ne ji Adem û ji zarokên Adem stand, loma ew ne yekî gunehkar bû.
Daxwaza Xwedê çi bûya, Îsa wusa kir. Qet guneh di jiyana wî de nebû û çaxê ku wî xwe bi xwe kir gorî, ew gorî bê kêmahî û bêqusûr bû.

Li wê goriyê dihat ku gunehên hemû mirovên ku baweriya xwe bi wê, yan bi Îsa tînin, xîş bike. Yanî bi tenê ew gorî dikare hemû mirovên ku baweriya xwe bi wê tînin, bibexişîne, yanî dikare gunehên wan xîş bike.
Bi saya vê goriya bêqusûr a ku Xilaskarê pîroz daye, Xwedê wê wan ên ku vê riya xilasiyê qebûl bikin, rastdar derxe. Çimkî yê ku bê sûc bû, cezayê gunehên min û te kişand û di ber me de mir.

Dostên delal, di vê dersê de du xalên girîng hene:

1) Qenc bizanin ku tu kes nikare bi girtina Deh Emrên Mezin, xwe bi xwe xilas bike û bikeve bihiştê. Nivîsarên Pîroz dibêjin: Hemû yên ku pişta xwe bi kirina Şerîetê ve girêdane, di bin nifirê de ne. Ji ber ku weha hatiye nivîsîn:
«Her kesê ku di hemû tiştên ku di Kitêba Şerîetê de nivîsî ne, nesekine û neke, di bin nifirê de ye.» (Galatî 3:10)
Kî ku tevahiya Şerîetê pêk bîne û di tiştekî tenê de bikeve, li ber tevahiya wê sûcdar e. (Aqûb 2:10)
Bi pêkanîna Şerîetê tu kes xilas nabe, çimkî nêt û armanca Deh Emrên Mezin ew e ku guneh bên zanîn, yanî kifş bibin.

2) Ji bo xilaskirina gunehkaran ji bilî Xwedê plana tu kesî din tune.
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin: «Çimkî tenê Xwedayek heye û di nav Xwedê û mirovan de jî bi tenê aştîkerek heye, ew jî Mesîh Îsayê mirov e, [6] yê ku xwe ji bo hemûyan kir berdêl.» (Tîmotêyos I, 2:5.6)
Erê, plana xilasiyê bi tenê Xwedê amade kiriye û bi tenê li ba Xwedê tê dîtin.

Bila Xwedê çavên dilê we ji bo rastiya mijara îro veke. Kitêba Pîroz dibêje:
Bi kirina Şerîetê tu kes li ber Xwedê rastdar dernakeve. Ji ber ku bi Şerîetê guneh tê zanîn. (Romayî 3:20)
Heta sibe hûn bimînin di xêr û xweşiyê de.

Di her sê bernameyên din de me dît ku Xwedê çawa ji serê Çiyayê Sînayê ji nav êgir, xurxura ewran û birûskan ji gelê Îsraêl re peyivî û her Deh Emrên Mezin dan wan.
Herweha me dît ku Xwedê emir li gelê Îsraêl kir ku li quntara Çiyayê Sînayê gorîgehê çêkin û çend heywanên bêqusûr bikin gorî.

Xwedê çima emir kir ku wan heywanan bikin gorî?
Wî wusa kir, ji ber ku Xwedê rast, paqij û pîroz e û ew di Şerîeta xwe de dibêje: Kî ku tevahiya Şerîetê pêk bîne û di tiştekî tenê de bikeve, li ber tevahiya wê sûcdar e.
Yê ku emrên Xwedê bişkêne û li gor Şerîeta wî neke, guneh dike û meaşê guneh mirin e. (Aqûb 2:10; Yûhenna I, 3:4; Romayî 6:23)
Ji ber ku gelê Îsraêl nikaribû li gor wan hemû emrên Xwedê bike, diviya ku wan pêşkêşên bêqusûr bikiran gorî, da ku heywanekî bêqusûr ji bo yê sûcdar bimira.
Li gor Şerîeta Xwedê diviya heywanekî bêqusûr di ber yê sûcdar de bihata gorîkirin û cihê wî bistanda, yanî bibûya berdêl.
Wî heywanî jiyana xwe winda dikir, da ku jiyana yê gunehkar nehata standin.
Bi vî awayî Xwedê rastdariya xwe ji wan re da kifşkirin û nîşanî me dide ku ew ne ji ber kirinên mirovan li gunehan dibihûre; kirinên mirovan guneh nedan bexişandin..
Na, lê belê soz û qanûna Xwedê ew bû: Çaxê ku xwîna bê sûc bihata rijandin, Xwedê wê guneh bibexişandan, yanî dema ku xwîna bêqusûr dihat rijandin, Xwedê li gunehan dibihûrî.

Navê dersa me ya îro ev e: Emrên şkênandî.
Di serhatiya ku îro emê li ser bipeyivin, Mûsa pêxember û gelê Îsraêl hê di çolê de li ber Çiyayê Sînayê rûdinin. Em niha vegerin Tewratê û emê bibînin,
ka piştî dayîna Deh Emrên Mezin çi çêbû.

Em niha di Kitêba Derketinê de ji deriyê 24'an dixwînin.
Nivîsarên Pîroz dibêjin:
[12] Xudan ji Mûsa re got: «Hilkişe çiyê ba min û li wê derê bisekine;
ezê nivîsdekên kevirîn ên Şerîet û emrên ku min ji bo hînkirina wan nivîsîne,
bidim te. [13] Mûsa û berdestiyê xwe Yêşû rabûn û Mûsa derket çiyayê Xwedê.
[14] Wî ji rihspiyan re gotibû: «Heta ku em vegerin, hûn li vir li hêviya me
bimînin. Harûn û Hûr li ba we ne; doza kê hebe, bila here ba wan.
[15] Hingê Mûsa hilkişiya çiyê û ewr çiya nixumand. [16] Rûmeta Xwedê hat xwar
ser Çiyayê Sînayê û ewr şeş rojan çiya nixumand.
Roja heftan Xudan ji nav ewr gazî Mûsa kir. [17] Di çavên gelê Îsraêl de
rûmeta Xudan li ser serê çiyê wek agirê ku dixwe û tune dike xuya dibû.
[18] Mûsa ket nav ewr û hilkişiya serê çiyê. Ew çil roj û çil şevan li ser çiyê ma.

Em li vir hinekî bisekinin. Di dersên ku bên de emê hîn bibin ka Xwedê li ser serê Çiyayê Sînayê çi ji Mûsa re got. Wek ku me bihîst, Mûsa çil roj û çil şevan li ser çiyê ma. Lê belê îro emê bibînin ku gelê Îsraêl li quntara çiyê, di war de çi kir.

Ji xwe ew li hêviya vegerîna Mûsa bûn û em hemû dizanin ku ji bo zarokên Adem ne sivik e ku bi sebrê li hêviya Xwedê bimînin. Ji lewre hêsanîtir e ku mirov dev ji bendewariyê berde, Peyva Xwedê ji bîr bike û bikeve ser riya xwe bi xwe.

Loma tiştê ku emê niha bixwînin, ji bo me gelek girîng e. Ev tişt li ser gelê Îsraêl dibêje, lê ji bo me jî pirr girîng e. Xwedê dixwaze me bi vê serhatiya tirsehêz hişyar bike.

Di deriyê 32'an de em weha dixwînin:

[1] Çaxê gel dît ku Mûsa dereng ma û ji çiyê daneket jêr, gel li dor Harûn civiya û wan jê re got: «Rabe û ji bo me xwedayekî çêke da ku ew li pêşiya me here. Em nizanin ku çi hat serê wî Mûsayê ku em ji Misrê deranîne.»
[2] Harûn jî ji wan re got: «Guharên zêrîn ên jin û keç û kurên we derxin û ji min re bînin!»
[3] Îcar tevahiya gel guharên xwe derxistin û anîn ba Harûn.
[4] Wî ew ji destê wan standin, helandin, bi halet teşe da zêr û heykelê golikekî çêkir.
Xelkê got: «Va ye, Xwedayê ku em ji welatê Misrê deranîne ev e!»

Gelo we fêm kir gelê Îsraêl çi kir?
Beriya çend rojan wan gotibû: «Hemû tiştên ku Xudan gotine, emê bikin.»
Lê niha, piştî çend rojên din, em dibînin ku wan hem emrê pêşî û hem jî emrê diduyan şkênand. Xwedê li serê Çiyayê Sînayê di emrê pêşî de ji wan re gotibû: Li pêşberî min divê tu xwedayên te yên din nebin! Piştre wî emrê diduyan got, got:  Ji xwe re qet pûtekî çêneke!
Lê belê gelê Îsraêl çi kir? Wan pişta xwe da Xwedê û ji xwe re pûtek çêkirin. Wek ku li Misrê dîtibûn, wan ji xwe re heyekelê golikekî çêkir.

Çima gelê Îsraêl evqas zû pişta xwe da Xwedê û Peyva wî ji bîr kir? Bersiv ev e: Wan xwedayekî ku bê dîtin dixwest. Wan dixwest ku bikarin dest bidin xwedayê xwe.
Bi rastî, helwesta wan û ya mirovên îro eynî ye:
Ew Peyva Xwedê înkar dikin û li gor mirovan û li gor adetên mirovan diçin.
Erê, Xwedayê rast nayê dîtin û ji bo mirovan hêsanîtir e ku li pey zilamekî ku bê dîtin herin. Loma gelek mirov li gor fikir û adetên mirovan diçin;
ew dev ji bingehê saxlem berdidin û bala xwe nadin Peyva Xwedê ya rast û dilsoz.

Gelo piştî ku gelê Îsraêl ji xwe re golikekî zêrîn çêkir, çi çêbû?
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

5 Çaxê Harûn ev yek dît, wî li ber golik gorîgeh çêkir û got:
«Sibe cejna Xudan e!»
6 Dotira rojê xelk sibê zû rabû û gorî pêşkêş kirin. Xelk rûnişt, wan xwar û
vexwar û bi harîtî kêf û şahî kirin.

Gelo we bihîst ku Harûn çi kir? Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku wî li ber golik gorîgeh çêkir û got: «Sibe cejna Xudan e!»
Ma ev rast bû? Ma destûra gel hebû ku bi vî awayî biperizin Xudan?
Bêguman ev qet çênedibû.
Gelê Îsraêl xwe ji bo cejnê amade kir, lê belê bi vê cejnê, wan xwe ji Xwedê dûr xist. Ew ne cejna Xudan bû!
Wan ne tenê emrê pêşî û emrê diduyan şkandin, lê wan emrê sisiyan jî şkand ê ku dibêje: Navê Xudan Xwedayê xwe badîhewa neyne ser devê xwe!
Wan digot: Ya Xudan Xwedê! Ya Xwedayê me!
Navê Xudan Xwedê li ser devê wan bû, lê dilê wan dûrî Xwedê bû.
Perizîna wan pûç bû. Dua û gotinên wan bê mane bûn.
Bi rastî, perizîna wan, tenê hêrsa Xwedê rakir!

Di Nivîsarên Pîroz de weha dibêje:
Xwedê ruh e û yên ku diperizin wî, divê bi ruh û bi rastiyê biperizin wî.
(Yûhenna 4:24)
Bi van gotinan zelal kifş dibe ku perizîna wan ên ku li gor rastiyê nakin û guhê xwe nadin peyv û emrên Xwedê, pûç e.
Yê ku rastiya Xwedê qebûl neke, çawa dikare biperize Xwedê?
Erê, Xwedê li dil û li fikrên mirovan dinêre, da ku bibîne, ka perizîna wan rast û ji dil e, an tenê ji lêvan e.

Guhdarên delal, îro wextê me hew maye, lê di bernama ku bê de emê li dawiya vê serhatiyê binêrin.  Heta hingê van peyvên girîng bînin bîra xwe:

Kitêba Pîroz dibêje:

Xwedê ruh e û yên ku diperizin wî, divê bi ruh û bi rastiyê biperizin wî.

(Yûhenna 4:24)

Di bernama din de me dît ku Mûsa hilkişiya Çiyayê Sînayê, da ku emr û qanûnên Xwedê bistîne. Gelê Îsraêl li benda wî ma, lê çaxê ew zû venegeriya, wan ji xwe re pûtek, yanî golikekî zêrîn çêkir û gotin: Vî em ji Misrê deranîne.

Niha emê dawiya vê serhatiyê bixwînin:

Li ser çiyayê 7 Xudan ji Mûsa re got:
«Dakeve jêr, çimkî gelê te yê ku te ji welatê Misrê deraniye, xerabî kir.
8 Ew zû ji vê riya ku min li wan emir kiriye derketin.
Wan ji xwe re heykelê golikekî çêkir, perizîn wî û gorî pêşkêşî wî kirin û gotin: ‹Va ye Xwedayê ku em ji welatê Misrê deranîne ev e!› Min ev gel dît û bi rastî, ew miletekî serhişk e. 10 Niha bihêle ku ez xezeba xwe birijînim ser wan
û wan helak bikim. Ezê te bi xwe bikim miletekî mezin.»
11 Lê Mûsa lavlav li ber Xwedayê xwe Xudan kir û got:
«Ya Xudan çima tu dixwazî hêrsa xwe li ser gelê xwe rakî, yê ku te bi qeweta mezin û bi destê xurt ji welatê Misrê deraniye?
12 Ma çima tê bihêlî ku Misrî bêjin: ‹Wî ew ji bo xerabiyê deranîn ku wan li
çiyan helak bike!› Ji hêrsa xwe vegere û belayê neyne ser gelê xwe.
13 Xulamên xwe Birahîm, Îshaq û Aqûb bîne bîra xwe; te bi heyîna xwe ji wan re sond xwar û got: ‹Ezê dûndana we wek stêrên ezmên zêde bikim û ezê li gor soza xwe tevahiya vî welatî bidim wan û ewê her û her mîrasa wan be.›»
14 Û Xwedê dev jê berda û ev bela neanî ser gelê xwe.
15 Çaxê Mûsa dadiket ku vegere ba gel, herdu nivîsdekên peymanê di destê wî de bûn.
17 Çaxê Yêşû deng û qîrîna gel bihîst, wî ji Mûsa re got: «Dengê şer ji war tê.»

[18] Lê Mûsa got:
«Ev ne dengê serfiraziyê û ne jî dengê binketinê ye, ez dengê stranan dibihîzim.»
[19] Gava Mûsa nêzîkî war bû û golik dît û reqsa wan dît, hêrsa wî rabû û wî nivîsdekên peymanê ji destên xwe avêtin, li quntara çiyê şkênandin.
[20] Wî rahişt golikê ku wan çêkiribû û ew şewitand, hûr hûr kir,
toza wî reşand ser avê û ew av bi gel da vexwarin.
[21] Mûsa ji Harûn re got: «Xelkê çi bi te kiriye ku te sûcekî evqas mezin anî ser wan?»
[22] Harûn got: «Bila hêrsa te ranebe! Tu vî gelî nas dikî, ew her gav ji bo xerabiyê
amade ne. [23] Wan ji min re got: ‹Ji me re xwedayekî ku li pêşiya me here çêke,
çimkî em nizanin ku çi hat serê Mûsayê ku em ji Misrê deranîne.›
[24] Min ji wan re got: ‹Zêrê kê hebe, bila wî derxe.› Wan ew dan min, min jî
ew avêt nav êgir û ev golik derket.»
[35] Û Xudan ji bo wî golikê ku gel bi Harûn dabû çêkirin, belayek anî serê wan û di wê rojê de bi qasî 3000 mirov ketin, yanî mirin.

Piştî vê yekê Xudan ji Mûsa re got ku ji nû ve du nivîsdekên kevirîn peyda bike, çimkî Mûsa yên pêşî şkandibûn.
Xwedê careke din hemû emir û tembihên xwe nivîsandin.
Erê, wî eynî ew emrên ku gelê Îsraêl şkandibûn, çareke din nivîsîn.
Gunehê gel çiqas mezin bû! Wan Şerîeta Xwedê ya pîroz şkand.
Tevahiya xerabiya dilê mirov ji nû ve kifş bûbû.
Xwedê ji bo gelê Îsraêl keramet kiribûn û ew ji Misrê deranibû, lê dîsa jî ew zû zû ji riya rastdariyê derketin.
Wan ji xwe re ne riya ku Xwedê amadekiribû hilbijart, lê ew ketin riyeke din û ji xwe re dînekî li gor dilê xwe çêkirin. Wan pişta xwe bi kirinên destên xwe ve girêdan û pişta xwe dan riya rastdariyê ya ku Xwedê nîşanî wan kiribû.

Ew bi perizîna li gor kêfa xwe şa dibûn.
Navê Xwedê li ser devê wan bû, lê belê dilê wan dûrî wî bû.
Loma wan ji xwe re golikekî zêrîn çêkir, bi karê hostayiya xwe kêfxweş bûn û bi vî awayî pişta xwe dan Xwedayê rast û zindî.

Gelo Xwedê bi vê serhatiya tirsehêz dixwaze çi hînî me bike? Xwedê dixwaze ku em li ser rewşa wê têkiliya ku di nav me û wî de ye hinekî bifikirin.
Belkî hin dibêjin: «Ez ne wek wan Îsraêliyan im.
Min tu caran dev ji Xwedê bernedaye û ez tu caran neperizîme pûtekî.»
Eger hûn wusa bifikirin, gelo hûn piştrast in ku hûn tu caran neperizîne pûtekî?
Belkî te ji xwe re golikekî zêrîn çênekiriye; lê belê pût ne tenê ew heykel in ên ku mirov xwe li ber wan ditewînin. Her tistê ku dikeve navbera te û Xwedê pûtek e.

Dibe ku pûtê te pere bin, an cilên xweşik bin; belkî pûtê te têkiliya bi jinan re ye, an fûtbol e, an televizyon e, an ezperestiya te ye an kevneşopên te ne. Hin mirov pişta xwe bi kespik û niviştên xwe ve girêdidin; ji bo hinên din adetên dîn û mezhebê wan girîng e; li gor wan, nimêj û rojî ji guhdana Peyva Xwedê girîngtir in.
Bila bê dîtin an neyê dîtin jî, her tiştê ku di jiyana te de cihê Xwedê û rastiya wî digire, pûtek e.

Guhdarê delal, tu diperizî kê? Bi rastî te dilê xwe daye Xwedê an te daye pûtekî?
Gelo navê Xwedê bi tenê li ser devê te ye, an di dilê te de ye jî?
Di nav wan  ên ku bi rastî diperizin Xwedê û wan ên ku diperizin pûtan de, ferqekî girîng heye. Ew jî Peyva Xwedê ye.
Li hember Peyva Xwedê ya rast, helwesta te çi ye? Gelo tu Peyva Xwedê dizanî? Ma tu jê bawer dikî? Ma tu jê hez dikî?
An tu wek gelê Îsraêl î yê ku zû ji rê derket? Xwedê li ser wan weha got:

[8] ‹Ev gel bi devê xwe rûmetê dide min, lê dilê wan ji min dûr e.
[9] Bi pûçîtî diperizin min; di hîndariya xwe de, emrên mirovan hîn dikin.›
(Metta 15:8-9)

Gelo Xwedê li ser te çi dibêje? Ma bi rastî tu diperizî wî Xwedayê ku bi destê Mûsa Şerîeta xwe ya pîroz da bihîstin? Gelo ma tu ji Peyva wî bawer dikî? An tu wek Îsraêliyan ji xêr û karên xwe yên dîndar piştrast î?

Li ser van tiştan qenc bifikire; Nivîsarên Pîroz li ser vê mjarê weha dibêjin:

[11] Ev tiştên ha bi mînaktî hatin serê wan û ji bo ku ji me yên ku gihîştin dawiya
deman re bibin şîret, hatine nivîsîn… [14] Ji ber vê yekê hezkirîno, ji pûtperestiyê
birevin. [15] Ez wek ku ji kesên aqilmend re dibêjim, dipeyivim. (Korîntî I, 10:11.14.15)
[8] Lê heçî yên tirsonek in, yên bêewle, yên di nav pîsîtiyê de, … yên sêrbaz, û yên pûtperest in…, para wan di wê golê de ye, ya ku bi êgir û kewkurtê dişewite.
(Peyxama Yûhenna 21:8)

Eger em şahidiya mirovan qebûl bikin, şahidiya Xwedê hê meztir e; çimkî ev, şahidiya Xwedê ya li ser Xilaskar e. Ew hatiye û ji bo ku em Yê Rast bizanin, fêmdarî daye me. [21] Zarono, xwe ji pûtan biparêzin. (Yûhenna I, 5:9.20.21)
Erê, guhdarên hêja, ev peyvên ha ji Kitêba Pîroz in.

Pir spas ji bo ku we qenc guhê xwe dayê. Xwedê hez bike, emê di bernameya ku bê de li ser vê pirsê bifikirin: Ma Xwedayê pîroz dikare di nav mirovên gunehkar de rûne? Emê bibînin ku Xwedê ji bo vê yekê çi plan diyar kiriye.

Heta hingê li ser vê gotina Kitêba Pîroz qenc bifikirin a ku dibêje:
Xwe ji pûtan biparêzin. (Yûhenna I, 5:9.20.21)
Bimînin di aştiyê de!

Di bernama xwe ya berî niha de me dît ku gelê Îsraêl ji Xudan dûr ketibû. Xudan ew ji welatê Misrê û ji xulamtiyê xilas kiribûn, lê belê çaxê ku Mûsa li ser serê Çiyayê Sînayê bû ku emir û tembîhên Xwedê bistîne, Îsraêliyan ji xwe re golikekî zêrîn çêkir û perizîn wî pûtî.
Di bernama îro de emê li serhatiyeke xweştir binêrin, mala Xwedê ava be!
Emê bibînin ku Xwedê bi destê Mûsa ji gelê Îsraêl re got ku divê çawa ji bo Xwedê konekî taybetî çêkin. Bi vê yekê Xwedê hînî wan kir ku ew çawa dikarin nêzîkî wî bibin û biperizin wî.
Dabaşa bernama îro ev e: Konê Civînê, an Konê Perizînê, an jî em dikarin bêjin Konê Peymanê.

Em niha di Tewratê de ji Kitêba Derketinê, deriyê 24'an dixwînin: Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

16 Rûmeta Xwedê hat xwar ser Çiyayê Sînayê û ewr şeş rojan çiya nixumand.
Roja heftan Xudan ji nav ewr gazî Mûsa kir.
17 Di çavên gelê Îsraêl de rûmeta Xudan li ser serê çiyê wek agirê ku dixwe û
tune dike xuya dibû. 18 Mûsa ket nav ewr û hilkişiya serê çiyê. Ew çil roj û çil
şevan li ser çiyê ma. (Derketin 24:16-18)

1 Xudan ji Mûsa re got: 2 «Ji gelê Îsraêl re bêje ku pêşkêşê ji min re bînin. Wê
pêşkêşê, ji her kesê ku bi dilxwazî dide, bistînin. 3 Pêşkêşên ku hûnê ji wan
bistînin, divê ev bin: Zêr, zîv û tunc; 4 risê şîn, binefşî û sor û kitanê tenik; pirça
bizinan, 5 çermê beranan ê sor rengkirî,  darên darcêwî, 6 rûn ji bo çirayan,
giyayên bîhnxweş ji bo rûnê meshkirinê û ji bo bixûra bîhnxweş 7 kevirên eqîqê
spî û cewahir ji bo [cilên serokkahîn]. 8 Bi wan tiştan bila ew ji min re

Pîrozgehekê çêkin, da ku ez di nav wan de rûnim. [9] Li gor mînaka Konê Perizînê û taximên wî ya ku ezê nîşanî te bidim, divê hûn wê tam weha çêkin.»

Erê, guhdarên hêja, pêşî divê em bizanin ku di Konê Civînê de du ode hebûn. Kon bi xwe yek bû, lê perdeyeke pir spehî û giran du parçeyên Kon ji hev vediqetand.

Navê odeya pêşî Cihê Pîroz bû. Bi tenê heqê kahînan hebû ku bikevin wî cihî. (Kahîn zilamên ji malbata Harûn bûn. Xwedê ew hilbijartibûn, da ku ew heywanan bikin gorî û bi vî awayî gunehên Îsraêliyan binixumînin.)
Di vê odeya pêşî de sê tişt hebûn: Gorîgeha zêrkirî ya ku bixûr li ser dihat şewitandin; çiradankeke ji zêrê xas û maseyê zêrkirî yê ku diwanzdeh nanên şkeva ji bo perizîna Xwedê li ser datanîn.

Navê odeya hindûr Cihê Herî Pîroz bû. Çaxê kon temam bibûya, Xwedê wê daketa wê odê û wê ew bi rûmeta xwe tije bikira. Loma navê wê odê Cihê Herî Pîroz bû. Ew wek mînaka bihiştê bû û loma ew ode bi tenê ya Xwedê bû!
Ji ber vê yekê Xwedê ji Mûsa re got ku her kesê ku wê bikeve Cihê Herî Pîroz, wê bimire. Ji bilî Serokkahîn, heqê tu kesî nebû ku biketa Cihê Herî Pîroz û salê carekê tenê destûra wî hebû ku biketa wê odê.
Beriya ku biketa wir, diviya ku wî li gor emrê Xwedê hem ji bo gunehên xwe conegayek û hem jî ji bo gunehên gel nêrî bikiran gorî û hingê bi xwîna wan biketa Cihê Herî Pîroz.

Mûsa li gor emrê Xwedê Sindoqa Peymanê danî Cihê Herî Pîroz.
Ew sindoq ji darê darcêwî hatibû çêkirin û ji her aliyî ve zêrkirî bû.
Di Sindoqa Peymanê de herdû nivîsdekên peymanê bi Deh Emrên Mezin ve dihatin hilandin.

Li ser Sindoqê devikekî zêrîn hebû; navê wî devikî ‹bexşîngeh› bû, çimkî salê carekê Serokkahîn xwîna heywanekî lê direşand, da ku Xwedê gunehên gelê Îsraêl bibexişandan.

Piştre Xwedê nîşanî Mûsa kir ku divê li dor Konê Civînê perdeyek hebe.
Ew perde spî bû, ji kitan bû û 2 metre û nîv bilind bû. Di perdê de deriyekî tenê hebû. Beyî ku di vî deriyî re derbas bibûna, tu kesî nikaribû biketa hewşa Konê Civînê.
Xwedê emir li Mûsa û li gel kir ku di hewşê de, li pêşberî dêrî, gorîgehekê deynin. Yanî çaxê ku mirovek derbasî derî bibûya, pêşî dihat ber gorîgehê.
Ew gorîgeh ji tûnc hatibû çêkirin û ji bo şewitandina goriyan bû.
Bi vê gorîgehê Xwedê nîşanî Îsraêliyan û hemû zarokên Adem kir ku divê ew bi çi riyê nêzîkî wî bibin.
Gelo diviya ku Îsraêlî çawa nêzîkî Xwedê bibûna?
Erê, diviya ku ew bi riya xwîna goriyan nêzîkî Xwedê bibûna.

Her kesê ku dixwest biketa hewşa «Cihê Xwedê» mecbûr bû ku ji bo deynê gunehên xwe heywanek bikira gorî.
Xwedê hînî gelê Îsraêl kir ku tu kes nikare bêyî xwîna goriyê nêzîkî wî bibe.
Loma Xwedê ji Mûsa re got:
Jiyana bedenê di xwînê de ye û min ew ji bo vê yekê kifş kir ku hûn li ser gorîgehê ji bo xwe kefaretê bikin. Çimkî xwîn ji bo jiyana mirov kefaretê dike.
(Qanûna Kahîntiyê 17:11)

Loma çaxê ku mirovekî dixwest biperiziya Xwedê, diviya ku pêşî ji bo lêbihûrtina gunehan heywanek serjêkira, bikira gorî.
Yanî yên ku diperizîn, an conega, an berx an bizin an kevok dianîn hewşa Konê Civînê.

Li ber gorîgeha mezin, wan destên xwe datanîn ser serê wî heywanî, gunehên xwe li ber Xwedê eşkere dikirin û bi vê yekê qebûl dikirin ku heqê wan gunehan, wê mirina wan bi xwe bûya.
Piştî vê yekê wan li rex gorîgehê heywan serjêdikir.
Hingê kahînek dihat, bi tiliya xwe ji xwînê hildida û li gorîgehê û li axa li dor gorîgehê direşand.
Piştre bezê qurbanan li ser gorîgehê ji Xwedê re dihat şewitandin.
Bi vî awayî kefaret dihat kirin, yanî Xwedê gunehên mirovan dinixumandin û dibexişandin, çimkî heywanekî bêqusûr ji dêla yê gunehkar ve dimir.

Diviya ku Îsraêliyan her sal gelek caran weha bikiran, çimkî goriyan nikaribû her û her têra pîroziya Xwedê bikiran. Ew bi tenê ji bo Xilaskarê rastîn ê ku wê bihata, mînakên demdemî, yanî ji bo demekê bûn.
Çaxê ku ew bihata, ewê bi carekê di ber gunehkaran de bimira û bi vî awayî gunehên dûndana Adem wê bi carekê û her û her bi rastî bihatan bexişandin.
Tenê wê goriya dawî wê têra pîroziya Xwedê bikira.

Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

Her kahîn roj bi roj radibe, xizmetê dike û gelek caran eynî goriyên ku qet nikarin guneh rakin, pêşkêş dike. [12] Lê viyê ha [yanî Xilaskar] ji bo her û her tenê goriyek di ber gunehan de pêşkêş kir û li milê Xwedê yê rastê rûnişt.
(Îbranî 10:11-12)

Û dibêjin:

Ji wî re [yanî ji Xilaskar re] nediviya ku ew her roj wek Serokkahînan, pêşî di ber gunehên xwe de û piştre di ber gunehên gel de goriyan pêşkêş bike. Çimkî çaxê ku xwe bi xwe pêşkêş kir, ev yek bi carekê anî cih. (Îbranî 7:27-28)

Xwedê we pîroz û bimbarek bike!

Di bernama din de me bihîst ku Xwedê ji Mûsa û ji gelê Îsraêl re got ku konekî taybetî çêkin ku di nav wan de bibe Cihê Xwedê.
Yanî Xwedê tiştekî pir newaze û xweş got! Daxwaza Xwedê ew bû ku ew di nav gelê Îsraêl de rûne, yanî ew di nav wan mirovên ku gelek caran li hember wî guneh kiribûn de, rûne.
Erê, beriya demeke kin, gelê Îsraêl dev ji Xwedê berdabû û ji xwe re pûtek çêkiribûn! Lê dîsa Xwedê dixwest ku di nav wan de rûne!
Çima Xwedayê pîroz û mezin dixwest ku di nav wan gunehkaran de rûnişta? Çima Xwedayê ku hem ruh e û hem qet tiştek jê re ne lazim e, dixwest ku bi zarokên Adem re bipeyive? Ma ew ji wî dûr neketibûn? Belê, ew dûr ketibûn, lê wek ku me berê dîtibû, Xwedê mirov di sûretê xwe de afirandin, çimkî daxwaza wî ew bû ku di nav wî û mirovan de têkiliya kûr û bi mane hebe.
Gunehê mirov ev têkilî xera kir, lê Xwedê riya rastdariyê amade kir, da ku mirov bikare vegere ba wî.
Sedemê ku Xudan Xwedê dixwest di nav gelê Îsraêl de rûne, hezkirin û dilovaniya wî ya ji bo mirovan bû. Loma wî ev yek ji xwe re kir armanc.
Bi konekî taybetî û bi qanûnên taybetî Xwedê nîşanî dûndana Adem kir ku çawa ew dikarin nêzîkî wî bibin.
Berî niha em hîn bûn ku Xwedê, pîroz, paqij û ji guneh berî ye; loma têkiliya di nav wî û gunehkaran de bi her cûreyî çênabe. Ji ber vê yekê Xwedê emir li gelê Îsraêl kir ku ji bo wî konekî taybetî çêkin, da ku ew bi awayekî ku hêjayî pîrozî û rûmeta wî be, di navenda wan de rûne.
Bi saya vî konî Xwedê wê dersên girîng hînî mirovên ku wê bihatan dinyayê jî bikiran. Bi saya wî konî, wî wê hem tiştên li ser xwe û hem jî li ser Xilaskarê dinyayê bidan zanîn.

Heçî ew konê Xwedê ye, divê em li ser wî çend tiştan qenc fêm bikin:

Xwedê, ne ji ber ku cihê rûniştinê jê re lazim bû, ji wan re got: «Kon ji min re çêkin.»
Nexêr! Xwedayê herî bilind erd û ezman û her tiştê ku tê de ye afirandiye û ew di kon û xaniyên ku bi destê mirovan tên çêkirin de rûnane. Di Nivîsarên Pêxemberan de Xwedê weha dibêje:
Ezman textê min e û erd pêgeha lingên min e.
Mala ku hûnê ji min re çêkin li ku derê ye?
An jî dera ku ez bîhna xwe lê vekim, ku der e?
2 Destê min ev hemû tişt çêkirin û weha ew çêbûn. (Îşaya 66:1-2)

Nexwe çima Xwedê emir li Îsraêliyan kir ku konekî çêkin, da ku ruhê wî û rûmeta wî tê de rûnin?
Wek ku me berî niha got, Xwedê bi vê yekê hînî gelê Îsraêl kir ku ew çiqas ji wan hez dike û çiqas dixwaze ku têkiliya wî bi wan re hebe.
Xwedê bi vê yekê nîşanî wan da ku mirov çawa dikarin hem lêbihûrtina gunehan bistînin û hem jî bên qebûlkirin nav rûmeta Xwedê û her û her di bihiştê de li ba wî bijîn.

Ji bo ku mirov nêt û plana Xwedê bêtir fêm bikin, wî ji bo gelê Îsraêl salê rojek kifş kir ku Serokkahîn bikeve odeya hundir a Konê Civînê, yanî bikeve Cihê Herî Pîroz. Ew roj Roja Kefaretê bû. Roja Kefaretê di cotmehê de bû û wê rojê destûra Serokkahîn hebû ku biketa Cihê Herî Pîroz û xwîn li bexşîngehê, yanî li devikê Sindoqa Peymanê bireşanda. Wek ku me berî niha got, bêyî ku xwîna heywanekî bêqusûr hilda, wî qet nikaribû biçûya Cihê Herî Pîroz.
Beriya ku biçûya hundir jî diviya ku wî hem ji bo gunehên xwe û hem jî ji bo gunehên gelê Îsraêl gorî pêşkês bikiran.
Bi vî awayî Xwedê nîşanî mirovên wî çaxî da, ku Xilaskar wê çawa bê vê dinyayê û xwîna xwe ji bo mirovan birijîne, da ku Xwedê gunehên me afû bibexişîne û me her û her qebûl bike nav rûmeta xwe!

Guhdarên me yên delal, ev dabaşa me gelek kûr û newaze ye, lê belê wextê me nemaye ku em hê bêtir li ser bipeyivin. Dîsa jî, beriya ku em xatiran ji hev bixwazin, tiştekî girîng heye, em dixwazin ku hûn li ser Konê Civînê qenc fêm bikin:
Di Kitêba Derketinê de, di deriyê dawî de weha dibêje:

42 Wek ku Xudan emir li Mûsa kiribû, wusa gelê Îsraêl her tişt kir. 43 Mûsa lê
nêrî û dît ku wan her tişt tam li gor emrê Xudan çêkiribû; û Mûsa ew pîroz û
bimbarek kirin… Hingê êwr Konê Civînê nixumand û rûmeta Xudan Kon tije
kir. 35 Mûsa nikaribû biketa Konê Civînê, çimkî ewr li ser Kon danîbû û rûmeta
Xudan ew tije kiribû. (Derketin 39:42-43; 40:34-35)

Gelo we dît ku çi çêbû? Çaxê ku Konê Civînê temam bû, rûmeta Xwedê danî ser kon û Cihê Herî Pîroz tije kir û şewqa rûmeta Xwedê ronahî da.
Bi rastî ew ronahî ji ya rojê jî zêdetir şewq dida!

Ji van hemû tiştan tiştê ku divê em ji bîr nekin ev e:
Xwedê bi vî konî mînaka bereketên hê meztir ên ku wê bi hatina Xilaskarê dinyayê çêbûna nîşan da. Ew Xilaskar wê ji ezmên bihata û di nav zarokên Adem de konê xwe vedabûya, yanî wê di nav wan de bijiya. Xilaskar bi xwe, Konê Civînê yê rastîn e. Xwedê ew şand ba me, da ku her û her têkiliya kûr û watedar, yanî bi mane di nav me û wî de hebe.
Di Mizgîniyê de, yanî di Încîla pîroz de li ser vê yekê weha hatiye nivîsîn:

Di destpêkê de Peyv hebû. Peyv bi Xwedê re bû û Peyv bi xwe Xwedê bû.
Û Peyv bû xwîn û goşt …û di nav me de konê xwe danî. Me rûmeta wî …dît. Ev e Berxê Xwedê yê ku gunehên dinyayê radike. (Yûhenna 1:1.14.29)

Erê, ew Xilaskar ê ku wê bihata ew e; wî her tiştê ku hem Konê Civînê û hem jî qurban û goriyan bi mînakî hîn dikir, anî cih. Ew ne tenê hat dinyayê û di nav mirovan de jiya, lê wî xwîna xwe jî rijand û xwe di ber gunehên me de kir goriya bêqusûr, da ku her û her têkiliya me bi Xwedê re hebe!

Belkî hûn dibêjin, dersa îro giran bû. Eger hûn wusa bifikirin, bînin bîra xwe ku carna di Peyva Xwedê de tiştên ku zû nayên fêmkirin hene, lê belê dîsa jî ew tiştên giran tam rast in!
Divê em tu caran ji bîr nekin ku Xudan bi xwe dibêje:
Fikrên min ne fikrên we ne û jî riyên we ne riyên min in.
Ezman çiqas ji erdê bilindtir e, riyên min evqas  ji riyên we û fikrên min ewqas ji fikrên we bilindtir in. (Îşaya 55:8-9)

Dostên delal, em gihîştin dawiya bernama xwe ya îro. Di bernama ku bê de em li benda we ne.

Heta careke din em bi vê gotina Xwedê silavan li we dikin a ku dibêje:

33 Ey kûrahiya dewlemendî, şehrezayî û zanîna Xwedê!
Ma kî dikare dîwankirina wî fêm bike! Ma kî dikare riyên wî salix bide!
34 «Ma kê bi fikra Xudan zaniye? An kî jê re bûye şîretkar?»
36 Çimkî her tişt ji wî ye, bi wî ye û ji bo wî ye. Bila rûmet her û her ji wî re be.
Amîn. (Romayî 11:33-36)

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Em bi xwendina Tewratê berdewam dikin.
Wek ku hûn qenc dizanin, Tewrat parçê pêşî yê Nivîsarên Pêxemberan e û ji pênc beşan yanî ji pênc kitêban pêk tê.
Di kitêba pêşî, yanî di Destpêkirinê de me dît ku guneh çawa ket dinyayê û guneh çawa êş û jan, mirin û helakbûn ji mirovan re anî. Lê belê herweha me dît ku Xwedê planek amade kir ku Adem û zuriyeta wî ji cezayê guneh, yanî ji agirê dojehê xilas bike. Em hîn bûn ku Xwedê soz dabû ku wê xilaskar bişanda vê dinyayê ku di cihê gunehkaran de bimira.
Bi vî awayî Xwedê wê gunehên mirovan afû bikiran û dîsa jî dadperwerî û rastdariya xwe biparasta.
Herweha Kitêba Destpêkirinê hînî me kir ku Xwedê çawa Birahîm hilbijart û jê re soz da ku ewê bibe miletekî mezin. Me dît ku li gor vê soza Xwedê hem pêxember wê ji wî gelî rabûna û di dawiyê de hem jî Xilaskarê Dinyayê wê ji wî gelî bihata.
Di kitêba Tewratê ya diduyan de, yanî di Kitêba Derketinê de me dît ku Xwedê çawa dûndana Birahîm ji qeyd û zincîrên koletiyê xilas kir û ew bi destê Mûsa pêxember ji Misrê deranîn, birin çolê. Li Çiyayê Sînayê wî emir û tembîhên xwe dan wan û hînî wan kir ku divê çawa heywanan bikin gorî, da ku bi rijandina xwînê li gunehên wan bê bihûrtin.

Di dersên berî niha de me dît ku Xwedê li Mûsa emir kir ku ji wî re Konê Civînê, yanî Perestgeheke spehî û newaze çêkin, çimkî Xwedê bi vî awayî dixwest di navenda gelê xwe de rûne. Çaxê ku her tişt xilas û temam bû, ewr Konê Civînê nixumand û rûmeta Xudan Kon tije kir. (Derketin 40:34)
Xwedê nîşanî gelê xwe kir ku ew dixwaze çiqas nêzîkî wan be, da ku di nav wî û mirovan de têkiliyeke kûr û bi mane hebe.
Herweha me dît ku dîsa jî bêyî xwîna heywanekî ku bibûya gorî, tu kesî nikaribû nêzîkî wî bibûya.

Ji bo vê yekê Xwedê emir kir ku di hewşa Konê Civînê de gorîgeheke mezin bê çêkirin.
Konê Civînê û gorî bi xwe mînakên Xilaskarê ku wê bihata bûn. Ew Xilaskar wê ji ezmên bihata, wê li ser rûyê erdê bijiya û wê xwîna xwe bi xwe birijanda, xwe bikira gorî, da ku gunehên mirovan bihatan bexişandin.

Di kitêba sisiyan a Tewratê, yanî di Qanûna Kahîntiyê de, Xwedê qanûnên hûr û kûr ji bo pêşkêşkirina goriyan da nivîsandin. Ev kitêb gelek girîng û kûr e, çimkî Xwedê di van qanûnan de hînî gelê xwe kir ku divê heywan û gorî tam çawa bin, da ku li gunehan bê bihûrtin.
Di vê kitêbê de bi taybetî du peyvên girîng hene; bi hev re ew herdu peyv nêzîkî 180 caran derbas dibin û peyama vê kitêbê bi zelalî diyar dikin: yek ji wan peyvan „pîroz“ yanî „paqij“ e û ya din jî „xwîn“ e.
Gelo çima ew herdu peyv di vê kitêbê de her gav tên dubarekirin? Bersiv ev e: Peyama herî girîng a ku divê mirov di vê kitêbê de fêm bike, ev e ku Xwedê pîroz e û bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin. (Îbranî 9:22)
Ev kitêb ji bo gelê Îsraêl girîng bû, çimkî di vê kitêbê de wan dît ku gunehkarekî murdar bi çi awayî dikare nêzîkî Xwedayê paqij û pîroz bibe.
Xwedê qet şik nehişt û bi zelalî nîşanî wan da ku bêyî xwîna goriyekê tu kes nikare nêzîkî wî bibe. Herweha wî nîşanî wan da ku goriyên weha mînakên wî Xilaskarê pîroz bûn ê ku wê bihata vê dinyayê, da ku deynê gunehên wan bida.

Niha em dixwazin li kitêba Tewratê ya çaran binêrin. Navê vê kitêbê Hijmartin e. Di kitêba Hijmartinê de em dixwînin ku gelê Îsraêl li dor saleke sax li quntara Çiyayê Sînayê rûniştin. Di vê salê de Xwedê hem gelek tişt hînî gelê Îsraêl kir û hem jî parçeyekî mezin ê Tewratê bi destê Mûsa da nivîsandin.

Lê belê mebesta Xwedê ne ew bû ku gelê Îsraêl heta hetayê di çolê de bimabûya. Loma rojekê Xwedê emir li wan kir ku rabin û pêşve herin, herin ber welatê qenc ê ku wî soz dabû wan, yanî welatê Kenanê.
Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku di roja ku diviya ew ji çola Sînayê rabûna de, ewrê rûmeta Xwedê ji ser Konê Civînê rabû û di pêşiya wan de çû. Yanî Xudan bi xwe rêberê wan bû;
bi roj di stûna ewr de û bi şev di stûna êgir de li pêşiya wan diçû, da ku rê nîşanî wan bide.
Bi vî awayî gelê Îsraêl li pey ewr diçû heta ku ew gihîştin sînorê welatê Kenanê, yanî welatê ku Xwedê beriya demeke dirêj bi sond soz dabû Birahîm û dûndana wî. Erê, Xwedê soza xwe ji bîr nekiribû. Bi saya hêz ûz dilsoziya Xwedê, gelê Îsraêl gihîştibû sînorê welatê Kenanê.

Lê belê welatê Kenanê ne vala bû. Ji xwe li wê derê gelek milet rûdiniştin û ew hemû jî bi hêz bûn. Gelo Îsraêlî wê çawa biketan wî welatî û ew ji xwe re bikiran mîras yanî bikiran milk?
Tenê çareyek hebû: Xwedê wê ew welat bi milktî bida wan. Tu tişt li ber Xwedê ne zehmet e. Xwedê soz dabû Birahîm û jê re gotibû: Ezê vî welatê Kenanê bidim dûndana te!
Plana Xwedê ew bû ku miletên Kenanê wê ji ber gunehên xwe helak bibûna û hingê Kenan wê biketa destê gelê Îsraêl.
Girîng e ku em bînin bîra xwe ku gunehên miletên Kenanê gelekî giran bûn. Wan gelek xerabî dikirin û ew pûtperest bûn, lê belê ya herî xerab ew bû ku wan zarokên xwe bi xwe jî ji pûtên xwe re dikirin gorî. Xwedê bîhna xwe li wan miletan gelek fireh kiribû, lê wan qet dev ji daxwazên pîs û ji riyên xerab bernedan. Loma mebesta Xwedê ew bû ku welatê wan bida eşîrên Îsraêl.
Di Kitêba Pîroz de dibêje: Ji ber gunehên wan ên giran welat ew milet verêşiyan, yanî ji ew ji ser xwe avêtin. (Qanûna Kahîntiyê 18:35)

Xwedê ji destpêkê ve dizanibû ku wiyê çawa soza xwe bianiya cih.
Rast e, gelê Îsraêl gelek caran li gor emrên Xwedê nekir, lê dîsa jî Xwedê dev ji wan berneda, alîkariya wan kir û bi rêberiya pêxemberê xwe Mûsa, piştî 40 salan ew gihandin sînorê welatê Kenanê.
Bi rastî, Xwedê dilsoz e û mirov her gav dikare ji sozên wî piştrast be.

Dostên delal! Ji kerema xwe guhê xwe bidin bernameya ku bê jî. Hingê emê binêrin ka çawa Mûsa nêrevan şandin welatê Kenanê.
Eger pirsên we li ser dabaşa îro hebin, ji kerema xwe ji me re binivîsin. Li dawiyê, emê navnîşana xwe bidin we.

Em ji bo bernama ku bê jî li hêviya we ne. Heta hingê li ser vê gotina Xwedê qenc bifikirin. Di Zebûrê de dibêje:

6 Xudan ji hemû bindestan re dadperwerî û dilsoziyê dike.
7 Wî riya xwe nîşanî Mûsa kir û karên xwe ji zarokên Îsraêl re dan zanîn.
8 Xudan dilbirehm û keremdar e,
ew zû hêrs nabe e û dilovaniya wî gelek e.
9 Ew her wext li mirov nahile
û hêrsa wî her û her berdewam nake.
10 Ew li gor gunehên me bi me re nake,
û li gor sûcên me nade me.
11 Çimkî ka ezman çawa ji erdê bilindtir e,
kerema wî li ser wan ên ku ji wî ditirsin ewqas mezin e.
13 Dilê bav çawa bi zarokên wî dişewite,
dilê Xudan wusa bi wan ên ku ji wî ditirsin, dişewite. (Zebûr 103:6-11.13)

Xwedê bi we re be!

Emê niha ji Tewratê, ji kitêba Hijmartinê bixwînin û emê bibînin çaxê ku gelê
Îsraêl gihîştibû sînorê welatê sozdayî, çi çêbû. Di deriyê 13’an de Nivîsarên
Pîroz dibêjin:

1 Xudan ji Mûsa re got: 2 Zilaman bişîne, da ku li welatê ku ezê bidim gelê Îsraêl
binêrin. Ji nav her eşîra bavkalên wan, zilamekî serdar bişîne. 3 Li ser vî emrê
Xudan, Mûsa [diwanzdeh zilam] ji çola Paranê şandin … 21Ew ketin rê û …
nêrevaniya welêt kirin.
25Di dawiya çil rojan de ew ji nêrevaniya welêt vegeriyan 26 û di çola Paranê de,
li Kadêşê, hatin ba Mûsa û Harûn û ba tevahiya civîna gelê Îsraêl. Nêrevanan ji
wan re û ji tevahiya civînê re xeber anîn û ji fêkiyê welêt nîşanî wan dan. 27
Wan weha ji Mûsa re got: «Em çûn wî welatê ku te em şandinê û bi rastî şîr û
hingiv jê diherike; berê wî jî ev e. 28 Lê belê xelkê ku li wê derê rûdine, xurt û
bihêz e û bajarên wan mezin û asêkirî ne. Hem jî me li wê derê Anaqî, yanî
dûndana egîdan, dîtin.»… 30 Lê Kalêb [yanî yekî ji nêrevanan,] li ber Mûsa
dengê gel birî û got: «Rabin, em ha niha derkevin û welêt bi dest bixin, çimkî
eseh em dikarin vê yekê bikin.» 31 Lê belê zilamên ku bi wî re çûbûn gotin:«Em
nikarin li hember wan derkevin, çimkî ew ji me xurtir in.» 32 Wan di nav gelê
Îsraêl de li ser welatê ku nêrevaniya wî kirin, agahiyên xerab dan û gotin:
«Welatê ku me nêrevaniya wî kir, xelkê xwe dixwe; hemû mirovên ku me li wir
dîtin, mezin û gir in. 33 Me li wir Nefîlîm, yanî egîd dîtin. Em di çavên xwe de
wek kuliyan bûn û di çavên wan de jî em wusa bûn.» (Hijmartin 13:1-3.21.25-28.30-33)

1 Wê şevê tevahiya civîna gelê Îsraêl dengê xwe hilda û giriya. 2 Tevahiya gelê
Îsraêl li hember Mûsa û Harûn pitepit kir û tevahiya civînê ji wan re gotin:
«Xwezî em li welatê Misrê bimiran, an jî em li vê çolê bimiran! 3 Çima Xudan
me dibe wî welatî, da ku em bikevin ber devê şûr? Jin û zarokên me wê bibin
xenîmet. Ma ji me re ne çêtir e ku em vegerin Misrê?» 4 Û wan ji hev re got:
«Emê ji xwe re serwerekî hilbijêrin û vegerin Misrê.»

[5] Li ser vê yekê Mûsa û Harûn li ber tevahiya civîna gelê Îsraêl deverû çûn erdê.
[6] Kurê Nûn Yêşû û kurê Yefûneh Kalêb yên ku di nav nêrevanan de bûn, cilên
xwe çirandin [7] û ji tevahiya civîna gelê Îsraêl re gotin:
«Welatê ku me nêrevaniya wî kiriye pir qenc e. [8] Eger dilê Xwedê ji me xweş
be, ewê me bibe wî welatê ku şîr û hingiv jê diherike û wê wî bide me. [9] Tenê
serê xwe li hember Xudan ranekin. Ji miletê welêt netirsin, çimkî emê wan
daqurtînin. Ew siya ku wan diparêze, ji ser wan çûye û Xudan bi me re ye. Hûn
ji wan netirsin.»
[10] Lê belê tevahiya civînê xwest ku Yêşû û Kalêb bidin ber keviran. Hingê
rûmeta Xudan li ser Konê Civînê li tevahiya gelê Îsraêl xuya bû [11] û Xwedê ji
Mûsa re got: «Ma heta kengê ev gel wê min kêm bibîne? Min di nav wan de
gelek keramet kirin, lê heta kengê ew qet baweriya xwe bi min neyînin?»
(Hijmartin 14:1-11)

Gelo we bihîst ku gelê Îsraêl çawa guneh kir û Xwedê êşandin?
Gelo we bêbaweriya wan dît? Ma we bala xwe dayê ku wan çawa lome ji Xwedê kirin û fikirîn ku ew li ser soza xwe nemîne?
Wan ji soza Xwedê ya ku wî dabû Birahîm, Îshaq, Aqûb, Ûsiv û Mûsa, bawer nekir. Ew mîna van mirovên îro ne yên ku dibêjin: «Em baweriya xwe bi Xwedê û bi pêxemberên wî tînin», lê bi rastî ew ne ji Xwedê û ne jî ji pêxemberan bawer dikin, çimkî ew ji sozên ku Xwedê bi devê pêxemberan di Nivîsarên Pîroz de dane me, bawer nakin. Bi rastî, ew bêbawerî di çavê Xwedê de gunehekî mezin e!

Niha em dixwazin bi serhatiya nêrevanan berdewam bikin:

[26] Xudan ji Mûsa û Harûn re got: [27] «Heta kengê ew civîna ha ya xerab wê li
hember min pitepitê bike? Min ew gazinên ku ew Îsraêlî li hember min dikin
bihîstin. [28] Ji wan re bêje: ‹Xudan dibêje: Ez bi heyîna xwe sond dixwim, min
gotinên we bihîstin û ezê tam li gor wan bi we bikim:

29 Termên we wê di vê çola ha de bikevin; hemûyên ku emrê wan bîst sal e û di
ser bîstan re ye, yên ku di serjimêrî de hatine hijmartin û li ber min kirine
pitepit, wê bimirin. 30 Ji bilî Kalêb û Yêşû tu kes ji we nakeve wî welatê ku min
bi destê bilind sond xwariye ku ezê we lê bi cih bikim. 31 Lê zarokên we yên ku
we li ser wan got: ‹Ewê bibin xenîmet!› ezê wan bigihînim welatê ku we red kir
û ewê wî nas bikin. 32 Lê heçî hûn in, termên we wê di vê çolê de bikevin… 35
Ez Xudan, ez peyivîm û eseh ezê weha bînim serê tevahiya vê civîna xerab a ku
li hember min kom bûye. Di vê çolê de dawiya wan wê bê û li vir ewê bimirin.

36 Îcar ew zilamên ku Mûsa ji bo nêrevaniyê şandibûn welêt, yên ku vegeriyan û
bi gotina tiştên xerab tevahiya civînê rakirin ser piyan ku li hember Mûsa pitpitê
bikin, 37 ew hemû zilamên ku li ser welêt agahiyên xerab anîn, li ber Xudan bi
belayê hatin kuştin. 38 Ji wan zilamên ku çûbûn welêt, da ku nêrevaniyê bikin, bi
tenê Yêşû û Kalêb sax man. (Hijmartin 14:26-32 û 35-38)

Erê, ew herdû sax man, çimkî wan ji peyva Xudan bawer dikir.
Me dît ku Xudan gelê Îsraêl ji destê Firewn rizgar kir û ew ji Misrê deranîn, birin ber sînorê welatê Kenanê; lê dîsa jî tevahiya gelê Îsraêl qet nexwest ku ji Xudan bawer bike.
Gelo Xwedê bi wan mirovên ku ji peyva wî bawer nekirin, çi kir?
Wî ew ceza kirin û ceza jî ew bû ku diviya ew 40 salan di çolê de bigeriyan û bimiran.
Gelo ew nifşê gelê Îsraêl çima neket welatê Kenanê?
Bersiv ne giran e: Ew neketinê, çimkî wan ji peyva Xwedê bawer nekir!

Dostên delal, eger mirov ji Peyva Xwedê bawer neke, hal pir xerab e û talûke ye jî. Çimkî Xwedê wê her kesê ku nexwaze ji wî bawer bike, ceza bike. Her kesê ku soz û peyvên Xwedê kêm dibîne û pişta xwe dide wan, wî derewkar hesêb dike û nikare bikeve padîşahiya wî ya herheyî.

Daxwaza Xwedê ne ew e ku mirov di bêbaweriyê de helak bibe; lê Xwedê dixwaze ku her kes ji Mizgîniya riya xilasiyê bawer bike, çimkî wî bi xwe ew rê amade kiriye.
Lê belê berpirsiyariya her mirovî heye ku li ser vê yekê biryara xwe bide. Yên ku ji Peyva Xwedê bawer nakin, wê helak bibin. Loma Ruhê Xwedê bi devê pêxemberan, weha me hişyar dike û dibêje:

«Eger îro hûn dengê wî bibihîzin,
8 Dilê xwe hişk nekin,
Wek wê roja ku bav û kalên we serî hildan, gava ku li çolê hatibûn ceribandin…
12 Birano, hay ji xwe hebin ku bi tu kesî ji we re dilekî xerab û bêbawer ê ku we ji Xwedayê jîndar bizivirîne, peyda nebe. (Îbranî. 3:7.8.12; Zebûr 95:7-11)

Guhdarên delal, gelek spas ku we qenc guhê xwe da van peyvên Xwedê. Di bernameya ku bê de Xwedê hez bike emê bibînin ku bi rastî yên ku bawer nekirin, hemû di çolê de mirin. Ka Xwedê çawa gotibû, wûsa çêbû.

Heta cara ku bê, qenc li ser van gotinên Kitêba Pîroz bifikirin ên ku dibêjin:
12 Birano, hay ji xwe hebin ku bi tu kesî ji we re dilekî xerab û bêbawer ê ku we ji Xwedayê jîndar bizivirîne, peyda nebe. (Îbranî. 3:12)

Xwedê ji bo fêmkirina van mijaran alîkariya we bike. Hûn bimînin di xêr û xweşiyê de.

Cara din me di Kitêba çaran a Tewratê de dît ku gelê Îsraêl gihîşt ber sînorê welatê Kenanê, yanî ber sînorê welatê ku Xwedê bi sond soz dabû Birahîm, Îshaq, Aqûb û dûndana wan. Xwedê biryar dabû ku miletên xerab ji welatê Kenanê derxistan û ew bi milktî bida gelê Îsraêl. Lê belê me dîtibû ku pirraniya gelê Îsraêl ji egîdên wan miletan tirsiyan û ji wê soza ku Xwedê wê welatê Kenanê bida wan, bawer nekirin.

Me dît ku Xwedê gelê Îsraêl ji ber nebaweriya wan ceza kir. Wî ji wan re got:
[30] Ji bilî Kalêb û Yêşû tu kes ji we nakeve welatê ku min bi destê bilind sond
xwariye ku ezê we lê cîwar bikim. [31]Lê zarokên we yên ku we li ser wan got:
‹Ewê bibin xenîmet!› ezê wan bibim welatê ku we red kir û ewê wî nas bikin. [32]
Lê heçî hûn in, termên we wê di vê çolê de bikevin. (Hijmartin 14:30-32)

Tiştê ku divê em qenc fêm bikin ev e: Daxwaza Xwedê ew bû ku gelê Îsraêl bi zêdehî pîroz û bimbarek bike, lê ji ber ku wan bawer nekir, ev yek çênebû. Îsraêliyan qet nexwest ku ji sozên Xwedê bawer bikin, loma wî ew ceza kirin. Cezayê wan jî ew bû ku diviya ew çil salan di çolê de bigeriyana, heta ku hemû mirovên ku di ser bîst salî re bûn û ji wî bawer nekirin, bimiran.

Niha em dixwazin di Kitêba Hijmartinê de binêrin ku di dawiya wan çil salan de çi çêbû.

Piştî ku gelê Îsraêl çil salan di çolê de geriya, ew hatin çola Tsînê û ew li Qadêşê cîwar bûn. Qadêş ew der e ku nêrevanan bi gelê Îsraêl re lê nebawerî kiribûn.
Li Qadêşê xwişka Mûsa Miryam mir û hat veşartin. Di wê demê de [2] ji bo
civînê av nema û ew li hember Mûsa û Harûn civiyan. [3] Gel bi Mûsa re devjenî
kir û got: «Dema ku birayên me li ber Xudan mirin, xwezî em jî hingê bimirana!
[4] Çima we civîna Xudan anî vê çolê, da ku em bi heywanên xwe ve bimirin? [5]
Çima we em ji Misrê deranîn, da ku hûn me bibin vî cihê ha yê xerab?

Ev ne cihê çandinê ye, ne jî cihê dara hêjîrê û rez û hinaran e û av jî tune ku em vexwin!» (Hijmartin 20:2-5)

Gelo we gotinên gelê Îsraêl bihîstin? Piştî ku Xwedê malbatên wan ji Misrê rizgar kirin û ew çil salan di çolê de xweyî kirin, ma dilê wan tije şikirdarî û bawerî bû? Na, bi rastî ka dê û bavên wan çi kiribin, wan jî eynî wusa kir. Wan kir pitpit jî! Ji xwe ew li çol û çolistanan bêzar bûbûn lê dîsa jî diviya ku wan bianiya bîra xwe ku ew ji ber nebaweriyê hê neketibûn welatê Kenanê. Rast e, ava wan tunebû. Lê wan çima dua nekir? Wan çima bi cesaret ji Xwedê hêvî nekir? Ma yê ku çil salan ew di çolê de xweyî kirin, nedikarî av bida wan ku ew vexwin?
Ji xwe hêza wî hebû ku her tişt bidabûya wan. Xwedê li gor rehm û kerema xwe li gor hemû hewcedariyên wan her tişt da wan. Lê dîsa jî gelê Îsraêl ji Xwedayê xwe Xudan tam ne piştrast bû.

De ka em berdewam bikin û binêrin ka ev serhatî çawa pêş ve çû. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
6 Mûsa û Harûn ji civînê dûr ketin, çûn ber deriyê Konê Civînê û deverû çûn
erdê û rûmeta Xudan ji wan re xuya bû.
7 Xudan ji Mûsa re got: 8 «Rahêje şivdarê xwe û bi birayê xwe Harûn ve civînê
kom bike û li ber çavên wan li latê emir bike ku ava xwe bide. Weha tê ji bo
civînê avê ji latê derxî, da ku ew û heywanên wan vexwin.»
9 Wek ku Xudan li Mûsa emir kiribû, wî ew şivdarê ku li ber Xudan bû hilda 10 û
Mûsa û Harûn civîn li ber latê kom kirin û Mûsa ji wan re got: «Ey serhildêrno,
niha guhê xwe bidinê! Gelo divê ku em ji vê latê avê derxin?»
11 Hingê Mûsa destê xwe bilind kir û bi şivdarê xwe du caran li latê xist û av bi
zêdehî derket; civînê û heywanên wan jê vexwarin.

[12] Lê belê Xudan ji Mûsa û Harûn re got: «Ji ber ku hûn li min ewle nebûn ku hûn li ber çavên gelê Îsraêl siyaneta pîroziya min bigirin, hûn vê civînê nabin wî welatê ku min daye wan.»

Gelo ma we fêm kir ku çi çêbû? Xwedê çi emir li Mûsa kiribû, da ku ji elaleta gelê Îsraêl re av peyda bibûya ku ew vexwin? Xwedê gotibû: «Li latê emir bike ku avê bide.»
Ma Mûsa li gor vî emrê Xwedê kir û ji latê re got?
Na, Mûsa nepeyivî, lê wî bi hêrsa xwe du caran bi şivdarê xwe li latê xist. Dîsa jî Xwedê li gor kerema xwe av ji latê da derxistin, lê tiştê ku Mûsa kir, li wî xweş nehat. Loma Xwedê ew ceza kir, jê re got: «Ji ber ku hûn li min ewle nebûn (yanî ji ber ku we ji min bawer nekir) ku hûn li ber çavên gelê Îsraêl siyaneta pîroziya min bigirin, êdî hûn vê civînê nabin wî welatê ku min daye wan.»

Belkî hin wê bêjin: «Bi rastî, ev ceza gelek giran bû. Mûsa xerabiyeke mezin nekir... » Lê belê divê em bînin bîra xwe ku Xwedê çi ji mirovan dixwaze: Ew dixwaze ku em ji peyvên wî bawer bikin û li gor gotinên wî bikin. Xwedê tu tiştê ku ne li gor peyva wî be, qebûl nake. Erê, Mûsa jî li gor peyva Xwedê neke, Xwedê wê yekê qebûl nake!

Xwedê cihêtiyê naxe nav mirovan. Mûsa pêxemberekî mezin bû, lê ew jî wek me hemûyan mirovek bû û zarokekî Adem bû. Loma ew jî wek hemûyên din gunehkar bû. Mûsa pêxember jî nikaribû xwe bi karên xwe yên qenc xilas bikira. Wek hemû zarokên Adem ew jî ne bêkêmahî bû û tevahiya rastdariyê pêk neanî.
Diviya ku Mûsa pêxember jî wek hemû Îsraêliyên din bi riya xilasiyê ya ku Xwedê amade kiribû, yanî bi riya goriyan biçûya ber Xwedê.

Bi vî gunehê Mûsa, Xwedê tîne bîra me ku mirov hemû gunehkar in û ji rûmeta Xwedê bêpar man.
Her kes li ber Xwedê sûcdar e. Her kesî guneh kir. Tu kesê rast tune.
Her kes ji riya Xwedê dûr ket. Bi tenê Xilaskarê pîroz ê ku ji ezmên hat, da ku gunehkaran xilas bike, ji guneh bêrî bû.

Em bi serhatiya gelê Îsraêl berdewam dikin û di deriyê 20’an de em dibînin ku birayê Mûsa yê mezin Harûn li ser Çiyayê Horê mir û Îsraêliyan 30 rojan şîna wî girt.
Guhdarên delal, Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de li serhatiyeke pir newaze binêrin. Emê bibînin ka çima Mûsa ji tûnc mar çêkir û mana vê bûyerê çi ye.
Heta hingê li ser van peyvên Xwedê qenc bifikirin:

Bê bawerî çênabe ku mirov li Xwedê xweş bê. (Îbranî 11:6)

Xwedê bi we re be!

Me di bernama din de dît ku çawa Mûsa pêxember guhdariya Xwedê nekir û Xwedê çawa jê re got ku ji ber wê yekê ew nikare bikeve welatê sozdayî.

Niha emê bi serhatiya gelê Îsraêl berdewam bikin.
Piştî vê yekê, di deriyê 21'ê de Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
4 Ew ketin rê û ji çiyayê Horê bi riya Deryaya Sor ve çûn ... Di rê de sebra gel
nema. 5 Gel li hember Xwedê û li hember Mûsa peyivî û got: «Çima we em ji Misrê deranîn, da ku em di çolê de bimirin? Çimkî ne nan û ne av heye û dilê me ji vî nanê ha yê nexweş li hev dikeve!» 6 Li ser vê yekê Xudan marên bi jehr
şandin nav gel û wan bi gel ve da û ji gelê Îsraêl gelek mirin. 7 Hingê xelk hat ba Mûsa û got: «Me bo gotinên xwe yên li hember Xudan û li hember te, guneh kir. Ji Xudan hêvî bike, da ku ew van maran ji me dûr bixe.» Îcar Mûsa ji bo gel dua
kir. 8 Xudan ji Mûsa re got: «Marekî bi jehr çêke û wî deyne ser rotikekî; her kesê ku mar pê ve daye, bila lê binêre û wê bijî.» 9 Mûsa ji tûnc marek çêkir û ew danî ser rotikekî û çaxê ku mar bi mirovekî ve bida û wî li marê tûnc binêriya, dijiya.

Emê hinekî li ser vê serhatiya newaze bifikirin. Ma Xwedê çima marên bi jehr şandin nav gelê Îsraêl? Bêguman sedem gunehê wan bû. Me bihîst ku ew çawa li hember Xwedê û li hember Mûsa peyivîn û xwarina ku Xwedê ji ezmên ji wan re şandibû, kêm dîtin. Sedemê ku Xwedê marên bi jehr şandin nav wan, ew bû û gelek bi vê yekê mirin.

Gelo diviya ku Îsraêliyan çi bikiran, da ku nemiran? Ma wan dikaribû xwe bi xwe xilas bikira? Ma wan bi xwe dikaribû jehr bêtal bikira? Na, qet nikaribûn. Tenê wan dikaribû gazî Xwedê bikin û hawara xwe bigihînin wî. Û wan weha kir jî. Me dît ku ew çawa çûn ba Mûsa û tobe kirin, jê re gotin: «Me bi gotinên xwe yên li hember Xudan û li hember te, guneh kir. Ji Xudan hêvî bike, da ku ew van maran ji me dûr bixe.»

Ma Xwedê mar ji wan dûr xistin? Na, lê belê wî tiştekî hê qenctir kir.
Xwedê ji Mûsa re got ku divê ew marekî ji tûnc çêke û wî deyne ser rotik, da ku her kesê ku li mar binêre, sax bimîne. Ev ew dermanê, yanî ew çareya ku Xwedê dabû wan, bû.
Çaxê ku mar bi mirovekî ve bida, tenê diviya ku wî li marê tûnc binêriya û ew sax dima. Riya xilasiyê ya ku li gor daxwaza Xwedê bû, ew bû: Lê binêriyan û bijiyan!

Xwedê soz da, got ku her kesê ku li marê tûnc ê ku Mûsa daniye ser rotik binêre, wê qenc bibe. Lê belê çi hat serê  wan ên ku lê nenêrî? Bi rastî, ew bi mirina dijwar mirin. Lê belê her kesê ku ji Xwedê bawer kir û li marê tûnc nêrî, ji mirinê xilas bû, çimkî Xwedê weha soz dabû, gotibû: «Her kesê ku mar  pê ve daye, bila [li marê tûnc] binêre û wê bijî.»

Bi rastî, ev serhatiyeke newaze ye! Lê belê ne tenê newaze ye, ew ji bo hînbûna me hatiye nivîsîn. Xwedê bi vê serhatiyê nîşanî me dide ku em hemû wek Îsraêliyan in. Em jî gunehkar in, loma em gelek caran gazinan ji Xwedê û mirovan dikin û di fikir, gotin û karên xwe de li hember wî radibin. Îblîs wek wan marên bi jehr e ên ku bi Îsraêliyan ve dan. Û bi rastî guneh wek wê jehrê ye ya ku Îsraêlî kuştin. Îblîs bi hemû zarokên Adem ve da û jehra guneh hemû mirovan her û her helak dike. Lê belê şikir ji Xwedê re, wî derman amade kir. Erê, cezayê gunehan ew e ku mirov di agirê herheyî de helak bibe û tiştek ji destê me nayê ku em bikarin jê birevin. Lê belê wek ku Xwedê ji bo gelê Îsraêl dermanek amade kiribû, da ku ew ji jehra maran xilas bibin, wusa jî wî çareyek amade kir, da ku zarokên Adem ji jehra gunehan xilas bibin.

Guhdarên delal, gelo hûn dizanin ka Xwedê çi kir, da ku hûn bikarin ji nifira guneh xilas bibin? Ji kerema xwe guhê xwe bidin van gotinên Xilaskarê pîroz:

Kêm û zêde 1500 salan piştî ku Mûsa di çolê de marê ji tûnc bilind kir, danî ser rotik, Xilaskar got:
[14] Çawa ku Mûsa li çolê mar bilind kir, bi vî awayî divê Kurê Mirov jî bê bilindkirin, [15] da her kesê ku baweriyê bi wî bîne, … helak nebe, lê jiyana wî ya herheyî hebe.

Ji vê ayeta Încîlê em hîn dibin ku ew marê tûnc ê ku Mûsa di çolê de bilind kiribû, mînakeke Xilaskarê ku wê bihata vê dinyayê bû. Ew bi dar ve, yanî bi xaçê ve hat daleqandin, da ku Îblîs ê ku xwediyê hêza mirinê ye, bindest bike û mirovan ji jehra wî ya guneh xilas bike. Ev çi Mizgîniyeke xweş e!
Di dersên ku bên de emê bibînin ku Xwedê çawa bi mirin û rabûna Xilaskar ji bo zarokên Adem rê vekir, da ku xilasî, aştî û şahiya herheyî bistînin!
Tiştê ku Xwedê dixwaze ku tu qebûl bikî ev e: Divê tu qebûl bikî ku tu bi xwe nikarî xwe ji hêza guneh xilas bikî. Xwedê ji destpêkê ve li ser xilaskarê ku li ser xaçê mir û deynê gunehên te da, her tişt got.
Ji dil û can ji wê şahidiya Xwedê bawer bike.
Xwedê ji me re dibêje: Li Xilaskar binêrin û hûnê bijîn!
Ji wî bawer bike û Xwedê wê te qenc bike, wê te ji jehra guneh xilas bike û li ezmên ji te re cih veqetîne.

Xwedê ji her kesî re, ji mirovên pîr û xort re, ji jin û zilaman re, ji dewlemend û belengazan re dibêje: Lê binêre û bijî! Li Xilaskarê bihêz ê ku Xwedê şandiye binêre û tê xilas bibî. Lê belê Xwedê weha jî dibêje: Eger hûn lê nenêrin, eger hûn baweriya xwe bi Xilaskarê ku Xwedê şandiye neynin, hûnê di nav gunehên xwe de bimirin. Çimkî ji bo lêbihûrtina gunehan dermaneke din, yanî riyeke din tune.
Şerîeta Xwedê rast e û dibêje: Her kesê ku riya xilasiyê ya ku Xwedê pêk aniye, qebûl neke, wê helak bibe. Xwedê riyeke din nedaye zarokên Adem ku bi wê ji jehra guneh xilas bibin.

Gelo, we li Xilaskarê ku hemû pêxemberan li ser nivîsandiye, nêrî? Eger hûn baweriya xwe bi wî bînin, ewê we paqij bike û wê jiyana herheyî bide we. Careke din guhê xwe bidin van gotinên Nivîsarên Pîroz:

14 Çawa ku Mûsa li çolê mar bilind kir, bi vî awayî divê Kurê Mirov jî bê bilindkirin, 15 da her kesê ku baweriyê bi wî bîne, … helak nebe, lê jiyana wî ya herheyî hebe. (Yûhenna 3:14.16)

Guhdarên delal, îro wextê me nemaye. Gelek spas ku we guhê xwe dayê. Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de li gotinên dawî yên Mûsa pêxember binêrin û bi vî awayî emê dersên Tewratê bigihînin dawiyê.
Heta hingê vê sozê bînin bîra xwe: Xwedê dibêje:
Ey hemû kujên dinyayê, li min vegerin û rizgar bibin. (Îşaya pêxember 45:22)

Di hemû bernameyên bihûrtî de me li Tewratê, yanî li her pênc kitêbên pêşî yên Nivîsarên Pîroz nêrî. Wek ku hûn dizanin, Xwedê bi xwe peyvên xwe xistin hişê Mûsa pêxember, da ku ew wan li gor rastiya wî binivîse.
Ji dema Mûsa pêxember heta niha kêm û zêde 3500 sal derbas bûne, lê dîsa jî Tewrat ji bo me jî xezîneyeke rastiyên girîng û hêja ye.
Di Tewratê de Xwedê bingeh danî, da ku em bikarin li gor pîvana wê, her tiştê ku em bibihîzin biceribînin û bibînin, ka ew ji Xwedê tê an na.
Hîndariya Tewratê rastiya safî ya Xwedê ye. Her hîndariya ku ne li gor rastiya Tewratê be, xelet e. Tevahiya rastiya Xwedê bi her tiştê ku di Tewratê de nivîsî ye re, bêkêmahî li hev digire.
Gelo ma tê bîra we, tiştekî ku Xwedayê karîndarê her tiştî nikare bike, heye? Ma hûn dizanin ew tişt çi ye? Erê, Xwedê nikare derewan bike an peyva xwe înkar bike. Di Tewratê de Mûsa weha nivîsiye:
19 Xwedê ne mirovek e ku derewan bike; ew ne zarokekî Adem e ku ji fikra xwe vegere.Ma ew dibêje û nake? Ma ew soz dide û nayne cih? (Hijmartin 23:19)

Çaxê ku me Tewrat xwend û me li ser wê lêkolîn kirin, Xwedê gelek sirên kûr ji me re vekirin. Îro em dixwazin dabaşên Tewratê xilas bikin.
Lê belê beriya ku em li deriyên dawî binêrin, em dixwazin tiştên ku me heta niha bihîstin, bînin bîra xwe.
Di deriyê pêşî yê Tewratê me dîtibû ku Xwedê çawa mirovê pêşî di sûretê xwe de afirand. Daxwaza Xwedê ew bû ku di nav wî û mirov de têkiliyeke şîrîn û watedar, yanî bi mane hebe.
Loma Xwedê **ruh û hiş û bîr** da mirov, da ku ew bikare wî nas bike.
Xwedê dil da mirov, da ku ew bikare ji Xwedê hez bike û azadiya bijartinê da wî, da ku bikare ji xwe re hilbijêre ka ew dixwaze li gor emrê Xwedê bike, an neke.

Di deriyê sisiyan de me dîtibû ku Adem û Hewayê hilbijartin ku guhê xwe bidin Îblîs. Xwedê ji Adem re gotibû ku divê ew ji dara zanîna qencî û xerabiyê nexwe, lê wan herduyan ji fêkiyê wê darê xwar.
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
«Guneh bi destê yek mirovî, mirin jî bi destê guneh ket dinyayê; bi vî awayî mirin derbasî hemû mirovan bû, çimkî hemûyan jî guneh kir.» (Romayî. 5:12)
Cezayê guneh mirin û helakbûna herheyî ye. Yanî gunehkar wê her û her ji Xwedê dûr be.

Loma me dît ku Xwedê çawa Adem û Hewa ji ber gunehê wan ji baxçê Êdenê derxistin. Lê beriya ku wan derxe, Xwedê ji wan re diyar kir ku planeke wî heye.
Xwedê wê rojekê xilaskar bişanda vê dinyayê û wî xilaskarî wê ji bo dûndana Adem deriyê xilasiyê vekira û wê ew ji desthilatiya Îblîs û ji cezayê guneh xilas bikiran.

Piştî vê yekê me dît ku Xwedê çawa gazî Birahim kir û jê re soz da ku miletekî mezin wê ji wî derkeve. Ji wî miletî wê hem pêxember derketan û hem jî Xilaskarê dinyayê wê jê rabûya.
Me dît ku Birahîm bû bavê Îshaq, Îshaq bû bavê Aqûb û Aqûb jî bû bavê diwanzdeh kuran. Xwedê navê Aqûb guhert, kir Îsraêl û her diwanzdeh kurên Aqûb bûn destpêka gelê Îsraêl. Bi wî awayî soza ku Xwedê dabû Birahîm, hat cihê xwe.
Kurên Aqûb ên mezin birayê xwe Ûsiv firotin; Ûsiv li Misrê bû koleyê Potîfar. Lê belê, mirov çi biçîne, wê wî bidirû. *(Galatî 6:7)*
Me rastiya wê gotina Xwedê dît û me dît ku piştî demekê gelê Îsraêl li Misrê ket tengahiyê, bûn kole. Lê belê Xwedê soza ku dabû Birahîm û dûndana wî ji bîr nekiribû.

Em ji Kitêba Derketinê hîn bûn ku Xwedê soza xwe anî cih: Wî gazî Mûsa pêxember kir û ew şand Misrê, ku gelê Îsraêl ji qeyd û zincîrên koletiya wan xilas bike.

Me dît ku Xwedê bi çi awayekî newaze gelê Îsraêl ji zordariya Firewn û Misriyan xilas kir.
Me bihîst ku Xwedê çawa ew di çolê de parastin û xweyî kirin û ew gihandin ber sînorê welatê sozdayî, yanî ber sînorê welatê Kenanê.
Beriya çend sed salan, Xwedê soz dabû Birahîm ku wê wî welatê Kenanê bi mîlktî bide dûndana wî. Lê belê piraniya gelê Îsraêl ji Kenaniyan tirsiyan û ji soza Xwedê bawer nekirin. Loma gelê Îsraêl di wê demê de nikaribû bikeve welatê Kenanê yê qenc.

Ew ji ber nebaweriya xwe çil salan di çolê de geriyan, heta ew hemûyên ku ji soza Xwedê bawer nekiribûn, mirin. Cezayê ku Xwedê ji ber nebaweriya wan da wan, ew bû. Bêguman, Xwedê dilsoz e, neheqî li ba wî tune, ew rast û dadperwer e. (Dubarekirina Şerîetê 32:4)

Niha em dixwazin rêwîtiya xwe ya Tewratê xilas bikin.
Bînin bîra xwe ku gelê Îsraêl ji ber nebaweriya xwe di çolê de digeriya.
Her kesê ku ji sozên Xwedê bawer nekiribû, yanî her kesê ku bawer nekiribû ku Xwedê wê welatê Kenanê bide wan, miribû. Lê zarokên wan êdî ji nû ve gihîştibûn ber sînorê Kenanê. Piştî wan çil salan, gelê Îsraêl pir li hêviya ketina wî welatî bû.

Îro emê li kitêba pêncan a Tewratê, yanî li Kitêba Dubarekirina Şerîetê binêrin. Di vê kitêbê de Mûsa careke din Şerîet û hemû qanûnên Xwedê hînî eşîrên gelê Îsraêl kir û anî bîra wan ku çiqas girîng e ku ew li gor wê bikin!
Beriya ku gel bikeve welatê sozdayî, Mûsa ji wan re peyivî û ew hişyar kirin.
Em dikarin gotinên Mûsa bi awayekî kin bînin ber çavê xwe. Peyama dawî ya Mûsa ev bû: **Peymana Xwedê ji bîr nekin!**

Bi kurtvebirîn, Mûsa got:
Hay ji xwe hebin û ji bîr nekin ku hûn li Misrê kole bûn.
Ji bîr nekin ku Xwedê hûn di çolê de ji roja ku hûn ji Misrê derketin û heta îro çawa xweyî kirin.
Hûnê zû bikevin welatê Kenanê, lê wan hemû gunehên ku we li hember Xwedê kirin, ji bîr nekin!
Ji bîr nekin ku Xwedê çawa dê û bavên we ji ber nebaweriya wan ceza kirin. Ji ber nebaweriya wan, termê wan di çolê de man. Ji bîr nekin ku Xwedê her gav qencî li dê û bavên we kir, lê belê ew serhişk bûn û wan qet nexwest ji Xudan bawer bikin. **Van hemû tiştan ji bîr nekin!**
Eger îro hûn dengê wî bibihîzin, dilê xwe hişk nekin wek wê roja ku bav û kalên we di çolê de serî hildan.
Gelo hûnê wek bav û kalên xwe bin? Ma hûn jî wek wan naxwazin ji Peyva Xwedê bawer bikin, an hûnê baweriya xwe bi Xwedayê xwe Xudan bînin?
Eger hûn nexwazin ji gotinên Xwedê bawer bikin, Xwedê wê we jî wek bav û kalên we ceza bike. **Vê yekê ji bîr nekin!**

Xwedayê we Xudan wê we bibe welatekî ku şîr û hingiv tê de diherike.
Wî soz dabû bav û kalên we ku ewê wî welatî bide we.
Xwedayê xwe yê ku ev welat daye we, ji bîr nekin, çimkî ‹Mirov ne bi nên tenê dijî, lê bi her peyva ku ji devê Xwedê derdikeve dijî.› **Vê yekê ji bîr nekin!**

Erê, guhdarên delal, mirov zû peyvên Xwedê yên rast ji bîr dikin. Loma Nivîsarên Pîroz je me re jî dibêjin: Sozên Xwedê û Peymana wî ji bîr nekin!

Heta bernama ku bê hûn bimînin di aştiyê de. Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me bihîst ku Mûsa çawa gelê Îsraêl hişyar kir û ji wan re got ku divê ew sozên Xwedê û peymana wî tu caran ji bîr nekin. Xwedê ew xilaskiribûn û çil salan di çolê de xweyîkiribûn.
Xwedê hem soz dabû ku wan bigihîne welatekî qenc û hem jî dixwest ku ew her gav bi tenê li wî û li peyvên wî ewle bin û li gor gotin û emrên wî bikin.
Mûsa ew hemû tişt anîn bîra wan û piştî ku wî gotinên xwe xilas kirin, Xudan jê re got:
«Hilkişe nav çiyayên Abarîmê pêşberî Erîhayê û li welatê Kenanê ê ku ezê bi milkîtî bidim gelê Îsraêl binêre. Tê li ser wî çiyayê ku tê hilkişiyê, bimirî, çimkî we herduyan [yanî te û Harûn] di nav gelê Îsraêl de li ba ava Merîba-Qadêşê di çola Tsînê de li hember min destdirêjî kir û pîroziya min di nav gelê Îsraêl de neparast. Loma tê welêt tenê ji dûr ve bibînî, lê tu nakevî wî welatê ku ezê bidim gelê Îsraêl.

Hingê Mûsa ji deşta Moabê hilkişiya Çiyayê Neboyê. Li wir Xudan tevahiya welêt nîşanî wî da: Ji herêma Gileadê heta herêma Dan, tevahiya herêma Neftelî, herêma Efrayîm û Minaşe, tevahiya herêma Cihûda heta bi Deryaya Spî. Hingê Xudan jê re got: «Welatê ku min bi sond soz da Birahîm, Îshaq û Aqûb û min got: ‹Ezê wî bidim dûndana we›, ev e. Min hişt ku tu wî bi çavên xwe bibînî, lê tu derbasî wir nabî.»
Îcar li gor peyva Xudan, **xulamê Xudan Mûsa li wir, li welatê Moabê mir**. Xudan ew li welatê Moabê veşart; lê heta roja îro tu kes nizane gora wî li ku derê ye. Çaxê Mûsa mir, ew sed û bîst salî bû; çavên wî tarî nebûn û hêza wî kêm nebû. Gelê Îsraêl di deşta Moabê de sî rojan li ser Mûsa giriyan, heta ku rojên şîn û girînê ji bo Mûsa temam bûn.
Yêşûyê kurê Nûn ê ku piştî Mûsa bû rêberê gelê Îsraêl bi ruhê şehrezayiyê tije bû, çimkî Mûsa destên xwe danibûn ser wî. Û gelê Îsraêl guh dida wî û wek ku Xudan li Mûsa emir kiribû, weha dikirin.

Êdî li Îsraêl pêxemberekî din wek Mûsa derneket.
Wek ku Xudan rû bi rû bipeyive, wusa bi wî re peyivî û ew şand welatê Misrê, ku li ber Firewn û hemû xulamên wî û li ber tevahiya welatê wî, wan hemû nîşan û karên mezin bike. Yekî din wek Mûsa tunebû ku li ber çavên tevahiya Îsraêl karên hêzdar û tirsdar bike. Amîn.

Dostên delal, dawiya Tewratê ev e.
Em dizanin, her tiştê ku di Tewratê de hatiye nivîsîn, ji bo feyda me hatiye nivîsîn, da ku em şehreza bin, baweriya xwe bi Xwedê bînin û riya xilasiyê ya ku wî amade kiriye, qebûl bikin.
Bi rastî, Mûsa pêxemberekî mezin bû. Xwedê dev bi dev, yanî wek ku rû bi rû bipeyive bi wî re peyivî.
Wî li gor emrê Xwedê nîşan û kerametên newaze çêkirin.
Xwedê bi destê wî gelê Îsraêl ji zordariya Firewn xilas kir.
Herweha Xwedê bi destê Mûsa, beşê pêşî yê Kitêba Pîroz, yanî Tewrat da me.
Bêguman divê her kes bizane ku Xwedê bi destê Mûsa pêxember çi daye nivîsîn.
Yê ku serhatiyên Tewratê nezane, wê di gelek tiştan de xelet bifikire û dibe ku ew di riya neheqiyê de biçe helakbûnê. Bînin bîra xwe ku Xwedê di Tewratê de bingehê peyam û pêxemberîtiyên xwe danî. Pêxemberên ku piştî Mûsa hatin, li ser vî bingehê ku Xwedê danî, berdewam kirin, heta ku tevahiya Nivîsarên Pîroz temam bûn.

Erê, Mûsa pêxember peyvên kûr, girîng û newaze nivîsîn. Lê belê di nav hemû gotinên wî de, çend peyv hene ku ji hemû yên din girîngtir in.
Ew peyv di Kitêba Dubarekirina Şerîetê deriyê 18'an de tên dîtin. Li wir Mûsa ji gelê Îsraêl re got ku Xwedê wê pêxemberekî din rake; ew pêxember wê ji Mûsa

bi xwe jî meztir bûya û ew bi xwe wê devê Xwedê bûya. Guhê xwe bidin van gotinên pêxemberîtiyê yên Mûsa. Wî ji gel re got:

«Xudan Xwedayê te wê ji nav we, ji nav birayên we, ji bo we pêxemberekî wek min derîne; divê hûn guh bidin wî. Tiştê ku we li Horebê, di roja civînê de, ji Xudan Xwedayê xwe xwest, ev bû; te got: Bila em careke din dengê Xudan Xwedayê xwe nebihîzin û êdî em vî agirê mezin nebînin, ku em nemirin. Hingê Xudan ji min re got: Wan qenc got. Ezê ji bo wan, pêxemberekî wek te ji nav birayên wan derînim. Ezê peyvên xwe bixim devê wî û ewê her tiştê ku ez li wî emir bikim, ji wan re bêje. Îcar yê ku guh nede wan peyvên min ên ku ewê bi navê min bêje, ezê hesab ji wî bixwazim.»

Bi van gotinên Mûsa Xwedê diyar kir ku pêxemberekî din wê ji gelê Îsraêl rabe (ayetên 15.18).
Wî pêxemberî wê Peyvên Xwedê rast û bêkêmahî bigotan (ayetên 18.19).
Ew Pêxember wê di nav Xwedê û mirovan de Navberkar bûya (ayetên 16.17).
Gelo hûn dizanin ku ew Pêxember kî bû?
Ma hûn dizanin **desthilatiya** kîjan Pêxemberî ji ya Mûsa jî bilindtir û meztir bû?
Ma hûn dizanin ku **kerametên** kîjan Pêxemberî ji yên Mûsa jî meztir bûn?
Erê, Mûsa hingê li ser Xilaskarê pîroz ê ku Xwedê wê bişanda got.
Ew ji keçikeke Cihûyan çêbû. Heçî ew Xilaskar e, Xwedê bi devê Mûsa gelê Îsraêl hişyar kir û li ser wî weha got:
«Divê hûn guh bidin wî… Yê ku guh nede wan peyvên min ên ku ewê bi navê min bêje, ezê hesab ji wî bixwazim.»

Dostên delal, divê ku em xwendina xwe ya Tewratê li wir xilas bikin. Bi rastî Tewrat kitêbeke mezin û girîng e û em dixwazin di dawiya vê bernameyê de guhê xwe bidin gotineke din a Mûsa pêxember. Roja ku Mûsa mir, wî ji gelê Îsraêl re weha got:

«Ey ezmanno, guhê xwe bidinê, ezê bipeyivim. Bila erd gotinên devê min bibihîze! … Ezê navê Xudan bidim bihîstin. Hûn pesnê Xudanê me bidin!
Ew lat e, kirinên wî bêkêmahî ne û hemû riyên wî rast in.
Xwedê dilsoz e, neheqî li ba wî tune, ew rast û dadperwer e.»

Em bi wan gotinên Xwedê yên ji devê Mûsa pêxember silavan li we dikin. Gelek spas ku we qenc guhê xwe da wan peyam û pêxemberîtiyên ku Xwedê bi devê Mûsa gotin.
Xwedê hez bike emê niha dest bi wan kitêban bikin ên ku piştî Tewratê tên û bi Tewratê ve girêdayî ne. Emê bibînin ku Xwedê çawa soza xwe anî cih û gelê Îsraêl bir welatê ku şîr û hingiv tê de diherike.

Bila Xwedayê ku bi tenê hêjayî rûmet û bilindahiyê ye we pîroz û bimbarek bike! Erê, Mûsa pêxember rast got:

«Xwedê dilsoz e, neheqî li ba wî tune, ew rast û dadperwer e.»
(Dubarekirina Şerîetê 32:4)

Amîn.
Xwedê bi we re be!

Di bernameya din de me xwendina kitêbên pêşî yên Nivîsarên Pêxemberan, yanî xwendina Tewratê xilas kir.
Me di Tewratê de dît ku guneh çawa ket dinyayê û nifir anî ser mirovan.
Herweha me dît ku Xudan Xwedê soz da ku Xilaskarekî bişîne vê dinyayê, da ku zarokên Adem ji nifira guneh xilas bike. Xwedê li gor plana xwe ya xilasiyê, gazî Birahîm kir û jê re got ku dev ji mala bavê xwe û welatê xwe berde û here welatekî dûr, yanî here welatê Kenanê. Mebesta Xwedê ew bû ku ji Birahîm miletekî mezin rabe û herweha ji wî miletî Xilaskar bê.
Çaxê ku Birahîm gihîşt welatê Kenanê, Xwedê jê re xuya bû, soz da wî û got: «Ezê hemû welatê Kenanê yê ku tu niha bi xerîbî lê rûdinî, bidim te û dûndana te, da ku her û her bibe milkê wan.» (Destpêkirin 17:8)
Îro emê bibînin ku Xwedê çawa soza xwe ya ku wî beriya demeke dirêj dabû Birahîm, anî cih û welatê Kenanê xist destê dûndana Birahîm.
Navê welatê Kenanê îro Îsraêl e.

Di deriyê dawî yê Tewratê de me bihîst ku Mûsa çawa li ser çiyayê ku li ber sînorê welatê Kenanê bû, mir. Piştî mirina Mûsa, cihgirê wî Yêşû, bû rêberê gelê Îsraêl. Xwedê Yêşû kifş kir ku bikeve cihê Mûsa.
Heta niha me çend caran li ser Yêşû bihîst. Yêşû zilamekî rast bû û wî ji her tiştê ku Xwedê gotibû û ji her soza Xwedê bawer dikir.
Çaxê ku piraniya gelê Îsraêl guhê xwe nedan Xwedê, ew dîsa dilsoz ma û ji sozên Xwedê piştrast bû.
Yêşû yek ji nêrevanên gelê Îsraêl bû û çaxê ku ew cara pêşî hatibûn ber sînorê Kenanê, wî û Kalêb ji Xwedê bawer dikirin.
Gelê Îsraêl dixwest ku Yêşû û Kalêb bidin ber keviran, ji ber ku wan herduyan gel hişyar kir û ji wan re gotin ku divê ew soza Xwedê bînin bîra xwe û herin ku welatê Kenanê bistînin.

Eynî ew Yêşû yê ku beriya çil salan ji aliyê gelê Îsraêl ve hatibû redkirin, niha ji aliyê Xwedê ve hat hilbijartin, ku bibe rêberê wan û wan bibe welatê Kenanê!

Îro emê ji Kitêba Yêşû bixwînin. Ev kitêb di nav Tewrat û Zebûrê de ye. Kitêba Yêşû ji me re dibêje ku Xwedê çawa soza xwe ya ku dabû Birahîm, anî cih. Xwedê jê re gotibû: «Ezê hemû welatê Kenanê yê ku tu niha bi xerîbî lê rûdinî, bidim te û dûndana te, da ku her û her bibe milkê wan.» (Destpêkirin 17:8)

Girîng e ku em bînin bîra xwe dema ku Mûsa mir hê welatê gelê Îsraêl nebû. Ew hê di çol û çolistanan de digeriyan û heçî welatê Kenanê bû, gelek milet û eshabe û mêrxas tê de rûdiniştin. Lê belê plana Xwedê ew bû ku ew wan miletan ceza bike û helak bike, çimkî wan miletan bi awayekî pîs gunehên herî xerab dikirin. Li gor plana Xwedê, welatê Kenanê yê pir qenc wê bibûya welatê Îsraêl.

Niha emê binêrin ku Yêşû û gelê Îsraêl çawa ketin welêt, wan ew çawa xist destê xwe û ji xwe re kirin milk.
Di deriyê pêşî yê Kitêba Yêşû de, weha dibêje:

1 Piştî mirina Mûsayê xulamê Xudan, Xudan bi xizmetkarê Mûsa, Yêşûyê kurê
Nûn re peyivî û got: 2 «Xulamê min Mûsa mir, niha rabe, tu û tevahiya vî gelî di
çemê Urdunê re derbasî wî welatî bibin, ê ku ez didim wan, didim gelê Îsraêl.» 3
Wek ku min ji Mûsa re gotibû, her dera ku binê lingê we pêlê bike, min daye
we. 4 Sînorê we wê ji çemê mezin heta bi Deryaya Mezin a li Rojava be. 5 Di
hemû rojên jiyana te de, tu kes nikare xwe li ber te bigire. Ka çawa ez bi Mûsa
re bûm, wusa ezê bi te re bim jî; ez te nahêlim û ez dev ji te bernadim.
6 Hêzdar be û bi zirav be, çimkî tê wî welatê ku min ji bav û kalên wan re sond
xwariye ku ez bidim wan, bi mîrastî li vî gelî leva bikî. 7 Bi tenê hêzdar be û
gelek bi zirav be û hay jê hebe ku tu li gor tevahiya Şerîeta ku xulamê min Mûsa
li te emir kiriye, bikî.

Bi milê rastê, an jî bi milê çepê ve ji wê dernekeve, da ku li her dera ku tu
biçiyê, tu bi ser kevî. [8] Şev û roj li ser wê kûr bifikire û hay ji xwe hebe ku tu
li gor her tiştê ku tê de nivîsî ye, bikî; hingê tê di riya xwe de serfiraz bî û tê bi
ser kevî.
[9] Va ye, ez emir li te dikim: Hêzdar be û bi zirav be, netirse û nelerize,
çimkî tu herî ku derê, Xudan Xwedayê te wê bi te re be.»
[10] Yêşû emir li serleşkerên gel kir û got:
[11] «Di nav war de derbas bibin û emir li gel bikin, bêjin: Ji xwe re zade ji bo
xwarinê amade bikin. Piştî sê rojên din hûnê derbasî vî Çemê Urdunê bibin ku
hûn herin, wî welatê ku Xudan Xwedayê we dide we, ku hûn wî bi milkîtî
bistînin.»

Piştî vê yekê Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Yêşû çawa du nêrevan şandin û ji wan re got: «Herin, qenc li welêt binêrin û bi taybetî li bajarê Erîhayê nêrevaniyê bikin.» Nêrevan jî çûn, ketin Erîhayê û sûra wê ya xurt û bilind dîtin. Bi şev wan xwe li Erîhayê di mala Rexabê de veşart. Lê belê çend mirovan dît ku ew ketin mala wê û ji padîşahê Erîhayê re xeber şandin, jê re gotin:
«Hin Îsraêlî hatin bajêr ku nêrevaniyê bikin».
Loma padîşahê Erîhayê leşkerên xwe şandin ba Rexabê, da ku nêrevanan bigirin, lê Rexabê ew li ser bên veşartibûn.

Piştî ku leşker çûn, Rexab gazî nêrevanan kir û ji wan re got:
«Ez dizanim ku Xwedayê we Xudan, Xwedayê rastîn e. Hem jî ez dizanim ku Xwedayê we wê vî bajarî û tevahiya vî welatî bide destê we.
Miletên welêt bîhîstin ku Xwedê çawa ava Deryaya Sor li ber we zuwa kir û hemû dijminên we helak kirin.
Ez bawer dikim û dizanim ku Xwedayê we Xudan, Xwedayê rastîn e.
Loma ez hêvî ji we dikim ku hûn sond ji min re bixwin ku hûnê min û mala min biparêzin. Çaxê ku hûn bikevin vî bajarî, me sax bihêlin û ji mirinê xilas bikin.»

Herdu nêrevanan lê vegerand û gotin: «Gava Xwedê bajarê te bixe destê me, emê te û hemûyên ku li ba te di mala te de ne, biparêzin.»

Di deriyê sisiyan de Nivîsraên Pîroz ji me re dibêjin ku diviya gelê Îsraêl di Çemê Urdunê re derbas bibûya, lê belê çem fireh û av jî boş bû.
Elaleteke ku sê milyon mirov bû û di nav de jin û zarok hebûn, wê çawa derbas bibûya?
Bersiva vê yekê sivik e, çimkî Xwedayê karîndarê her tiştî yê ku di Deryaya Sor re rê li ber wan vekiribû, hê eynî bû!
Xwedê dîsa rê li ber wan vekir û ew di ser axa zuwa re di Çemê Urdunê re derbas bûn.
Bi vî awayî tevahiya gel gihîşt welatê Kenanê û li ber bajarê Erîhayê yê mezin sekinîn. Ji xwe xelkê Erîhayê hemû derî û dergeh girtibûn. Tu kesî nedikarî biketa bajêr û tu kesî nedikarî jê derketa.

Guhdarên delal, bernama me li vir bi dawî dibe, lê cara ku bê emê bibînin ku Xudan çawa ji Yêşû re xuya bû. Heta hingê bimînin di aştiyê de.

Di bernama din de me dît ku gelê Îsraêl çawa bi awayekî newaze di Çemê Urdunê re derbas bû û gihîşt welatê Kenanê.

Piştre Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Yêşû nêzîkî bajarê Erîhayê bû û çaxê wî serê xwe hilda, wî zilamek dît. Di destê zilêm de şûrê tazî hebû.
Yêşû jê pirsî, got: «Tu hevalê me yî an tu alîgirê dijmin î?»
Wî zilamî got: «Ez serdarê ordiya Xudan Xwedê me.»
Yêşû deverû xwe avêt erdê. Li ser vê yekê serdarê ordiya Xwedê jê re got: «Çaroxên xwe ji lingên xwe derxe, ji ber ku ew erdê ku tu li ser disekinî, pîroz e.» Yêşû jî weha kir.

Dostên delal, gelo hûn dizanin yê ku ji Yêşû re got, kî bû?
Erê, ew Xudan bi xwe bû ku ji bo demeke kin ji Yêşû re xuya bû.
Me berê jî dîtibû ku Xwedê di şiklê mirov de ji Birahîm re xuya bûbû;
ew di şiklê pêta êgir de di diriyê de ji Mûsa re jî xuya bûbû.
Û niha em dibînin ku Xwedê di şiklê serdarê bilind de ji Yêşû re xuya bû.
Xwedê tam wek ku ji Mûsa re got, ji Yêşû re jî got; wî got: «Çaroxên xwe ji lingên xwe derxe, ji ber ku ew erdê ku tu li ser disekinî, pîroz e.»

Xudan Xwedê weha berdewam kir û ji Yêşû re got:
«Min Erîha, padîşah û mêrxasên wê, dan destê te. [3] Hûn hemû mirovên çekdar, carekê li hawirdora bajêr bizivirin. Şeş rojan weha bike. [4] Li ber sindoqa Peymanê divê heft kahîn heft boriyên ji strûhê beranan hilgirin.
Lê roja heftan heft caran li hawirdora bajêr bizivirin û bila kahîn li boriyan bixin.
[5] Çaxê hûn bibihîzin ku ew bi dengê dirêj li boriyan bixin, divê tevahiya xelkê bi dengekî bilind bike qîrîn; hingê sûra bajêr wê di cihê xwe de bikeve û her kes ber bi pêş xwe ve, bila bikeve nav.» (Yêşû 6:2-5)

Piştî vê yekê Xudan ji Yêşû veqetiya.

Di cih de Yêşû çû û ji gelê Îsraêl re her tiştê ku Xudan jê re gotibû, da bihîstin.
Hingê Yêşû emir kir ku ew Sindoqa Peymanê hilgirin û carekê li dor bajêr bizivirin.
Lê belê wî ji wan re got: «Nekin qîrîn, dengê xwe nedin bihîstin û divê peyvek ji devê we dernekeve.»
Piştî ku ew carekê li dor bajêr zivirîn, ew vegeriyan ordîgehê û şeva xwe li wir derbas kirin.
Di roja diduyan de jî ew carekê li dora bajêr zivirîn û vegeriyan ordîgehê.
Şeş rojan wusa kirin.

Lê belê di roja heftan de, ew sibê zû rabûn û heft caran li dor bajêr zivirîn.
6 Di cara heftan de, gava kahînan li boriyan xist, Yêşû ji xelkê re got:
«Bikin qîrîn, çimkî Xudan bajar da destê we.» (Yêşû 6:16)
Wan jî bi dengekî bilind kir qîrîn û dîwar di cihê xwe de hilweşa û her kes ber bi pêş xwe ve çû û zilamên Îsraêl ketin bajêr û bajar standin.

Bi vî awayî Yêşû û gelê Îsraêl di welatê Kenanê de bajarê pêşî bindest kirin.
Wê rojê tevahiya xelkê Erîhayê hat kuştin; bi tenê mala Rexabê wek ku nêrevanan jê re sond xwaribû, sax ma.
Erê, Rexab ji pûtên pûç li Xwedayê rastîn ê gelê Îsraêl vegeriya û jê bawer kir.
Loma ew û tevahiya mala wê helak nebûn.

Gelo çima Yêşû û gelê Îsraêl dikaribûn ew bajarê asekirî bistandan û biketan welatê ku Xwedê ji wan re soz dabû ku wê bida wan?
Ew bi ser ketin, çimkî wan ji Peyva Xwedê bawer kir. Xwedê bi wan ên ku ji Peyva wî bawer dikin re ye.

Çaxê ku bajarê Erihayê ket destê gelê Îsraêl, çima Rexab û maliyên wê bi hemû mirovên din re nemirin?
Ew sax ma, ji ber ku ew ne tenê li hêz û kerametên Xwedê şaş ma, lê wê bawer kir û aliyê gelê Xwedê girt.
Nivîsarên Pîroz vê yekê qenc şîrove dikin û dibêjin:
[30] Bi baweriyê, piştî ku Îsraêlî heft rojan li dora sûrên Erîhayê zivirîn, ew
hilweşiyan. [31] Bi baweriyê, Rexaba fahîşe bi neguhdaran re nehat helakkirin,
çimkî wê nêrevan bi aştî qebûl kiribûn. … [6] Lê bê bawerî çênabe ku mirov li
Xwedê xweş bê, çimkî yê ku nêzîkî Xwedê bibe, divê bawer bike ku Xwedê
heye û wan ên ku li wî digerin xelat dike. (Îbranî 11:30.31.6)

Di deriyên kitêba Yêşû yên din de hûr û kûr ji me re tê gotin ku Xwedê çawa bajar bi bajar tevahiya welatê Kenanê da destê Yêşû û gelê Îsraêl.
Xwedê soza xwe anî cih. Loma em di deriyê 21'ê de dixwînin ku Xudan wek ku
ji bavkalên wan re sond xwaribû tevahiya welêt da gelê Îsraêl. …. [44] Xudan wek
ku ji bavkalên wan re sond xwaribû, ji her aliyî ve rihetî da wan. Ji hemû
dijminên wan yekî jî nikaribû li hember wan bisekiniya, çimkî Xudan hemû
dijminên wan dan destê wan. (Yêşû 21:43.44)

Dostên delal, Xwedê li ser soza xwe ma û her dem li ser soza xwe dimîne.
Tiştê ku wî beriya demeke dirêj ji Birahîm re gotibû, wî anî cih.
Ma wî li gor soza xwe welatê Kenanê da gelê Îsraêl? Bêguman wî tam wusa kir.
Xwedê dilsoz e û li ser sozên xwe dimîne.
Çaxê ku mirov bifikirin, bêjin: «Xwedê dereng dikeve», hingê dîsa ewê li ser soza xwe bimîne. Li gor nêrîna mirovan, belkî wusa xuya bibe, lê ew dim li gor plana Xwedê ye.
Ji bo demeke dirêj mebesta Xwedê ew bû ku welatê Kenanê bida gelê Îsraêl, lê ew li hêviya baweriya wan ma. Wek ku me dît, demeke dirêj kişand heta ku gelê Îsraêl dest bi bawerkirinê kir û ji soza Xwedê piştrast bûn.

Dê û bavên wan, bereketa welatê Kenanê nedîtin û ew neketin wir, çimkî wan ji sozên Xwedê bawer nekir.

Eger em mijarê bînin ser xwe bi xwe, gelo emê çi bêjin?
Pirs ev e: Gelo ma em ji Xwedê bawer dikin?
Bi rastî pirs ne ew e, ma ka hûn bawer dikin ku Xwedê heye, an ka hûn bawer dikin ku Xwedê yek e. Îblîs bi xwe jî bawer dike ku Xwedê heye û Xwedê yek e!
Pirs ev e: Gelo ma tu bi rastî ji Xwedê û ji Peyva wî bawer dikî?
Ma tu ji Xwedê hez dikî? Gelo ma tu ji dil û canê xwe ji Peyva Xwedê bawer dikî?
Gelo ma hûn dizanin sozên Xwedê ji bo wan ên ku bi rastî bawer dikin, çi ne?
Ma bi rastî tu xweyiyê jiyana herheyî yî?
Rast e, piraniya zarokên Adem dibêjin: «Em bawer dikin ku Xwedê heye.»
Lê belê ew mirovên ku bi rastî sozên Xwedê yên mezin dizanin û ji wan bawer dikin, pir hindik in.
Guhdarên delal, Xwedê ji we hez dike û dixwaze bi awayekî ku nayê gotin we bimbarek û pîroz bike, lê divê ku hûn Peyva Xwedê bizanin, jê bawer bikin û li gor wê bikin.
Li ser vê yekê Kitêba Pîroz weha dibêje:
«Tiştên ku çavan nedîtine û guhan nebihîstine û di fikra mirov re derbas nebûne, Xwedê ew ji bo wan ên ku ji wî hez dikin, amade kirine.» (Korîntî I, 2:9)
Û dibêje: Em pirr dixwazin ku hûn nebin tiral, lê hûn bibin mîna wan ên ku bi bawerî û bîhnfirehiyê bûn wêrisên sozên Xwedê. (Îbranî 6:12)

Guhdarên delal, em spas dikin ku we qenc guhê xwe dan serhatiya Yêşû.
Heta cara ku bê, qenc li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz bifikirin ên ku dibêjin:

Em pirr dixwazin ku hûn nebin tiral, lê hûn bibin mîna wan ên ku bi bawerî û bîhnfirehiyê bûn wêrisên sozên Xwedê. (Îbranî 6:12)

Di bernameyên ku bên de em dixwazin li serhatiyeke hezkirinê binêrin.
Erê, tiştekî weha jî di Nivîsarên Pêxemberan de heye.
Di dawiya bernameya din de me dît ku Yêşû bû paşewarê Mûsa, yanî bû cihgirê wî û wî gelê Îsraêl bir welatê Kenanê. Me bihîst ku Xwedê di pêşiya Yêşû û gel de çû, da ku dijminên wan ji ber wan derxe û wî welatê qenc bi milktî bide wan. Yanî piştî wan hemû salan, Xwedê ew soza ku wî dabû bavkalê wan Birahîm, niha anî cih.
Îro emê li kitêba ku piştî Kitêba Yêşû tê, binêrin. Navê wê, Kitêba Hukumdaran e.
Di vê kitêbê de û di kitêbeke din jî emê bibînin ku di wê dema di nav Yêşû û Dawid pêxember de çi çêbû.
Beriya ku em li Kitêba Hukumdaran binêrin, em dixwazin guhê xwe bidin wê peyama ku Yêşû beriya mirina xwe dabû gelê Îsraêl.
Wî bi wan gotinên dawî Îsraêlî hişyar kirin û zirava wan qayîm kir ku ji Xwedayê xwe Xudan hez bikin, guhê xwe bidin peyv û emrên wî û li gor wan bikin. Çimkî yê ku ew ji Misrê deranîn û hem azadî û hem jî welatê Kenanê yê pir qenc da wan, ew Xudan bû.
Di peyivîna xwe ya dawî de Yêşû weha ji wan re got:
15 Eger di çavê we de ne qenc be ku hûn ji Xudan re xizmetê bikin, nexwe îro ji xwe re hilbijêrin ka hûn dixwazin ji kê re xizmetê bikin: An hûnê ji wan xwedayan re yên ku bav û kalên we li wî aliyê Çemê Firat xizmet ji wan re kirin, an jî hûnê ji xwedayên Amoriyên ku hûn niha di welatê wan de rûdinin re xizmetê bikin. Lê heçî ez im, ez û mala xwe, emê ji Xudan re xizmetê bikin.» 16
Hingê xelkê bersîv da û got:
«Em jî, emê ji Xudan re xizmetê bikin, çimkî Xwedayê me ew e.»

Niha em binêrin ka gel bi rastî weha kir, an na. Di Kitêba Hukumdaran de, di deriyê diduyan de, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

7 Di hemû rojên Yêşû de û di hemû rojên rihspiyên ku hemû karên mezin
ên ku Xudan ji bo Îsraêl kirin, dîtibûn de, gel ji Xudan re xizmet kir.
8 Îcar xulamê Xudan Yêşûyê kurê Nûn sed û deh salî mir. 9 Wan ew li çiyayên
Efrayîm veşart.
10 Ew hemû nifş jî çûn ba bav û kalên xwe, yanî ew mirin û nifşekî din rabû
yê ku Xudan nas nedikir û wan bi karên ku wî ji bo Îsraêl kiribûn, nizanibû. 11
Îcar gelê Îsraêl tiştê ku di çavê Xudan de xerab bû, kir û perizîn Baalan.
12 Wan dev ji Xudan Xwedayê bav û kalên xwe yê ku ew ji welatê Misrê
deranîbûn, berda; ew li pey xwedayên din çûn û xwe li ber xwedayên gelên ku li
hawirdora wan bûn, tewandin. Weha wan hêrsa Xudan rakir, 13 çimkî wan dev ji
wî berda û perizîn Baal …

Guhdarên delal, kifş dibe ku gelê Îsraêl zû zû Xwedayê xwe Xudan ji bîr kir û dest pê kirin li pey dîn û diyanetên miletên din ketin.
Lê belê wan miletan hem Xwedayê rastîn nas nedikir û hem jî Peyva Xwedê nizanibûn. Ew diperizîn Baal.
Heçî Baal bû, ew pûtekî miletên Kenanê bû û wan digot ku ew Xwedayê rastîn e. Wan ji dar û keviran heykelên Baal çêdikirin û diperizîn wan. Çaxê ku ew milet diperizîn Baal, wan guman dikir ku ew diperizîn Xwedayê rastîn. Lê bi rastî ew diperizîn xeyal û xwestinên xwe û diperizîn Îblîs. Wan ev yek nizanibû, çimkî Îblîs ew xapandibûn û çavên wan kor kiribûn. Îblîs gelek Îsraêlî jî xapandin û ew ji riya Xwedê dûr xistin. Loma wan jî dest pê kir, pişta xwe dan Xudan Xwedê û wek miletên din perizîn Baal.

Yanî em dibînin ku piraniya gelê Îsraêl dev ji riya ku Xwedê amade kiribû berdan.
Ew Şerîeta Mûsa ya ku Xwedê dabû wan û ew goriyên ku ji bo nixumandina gunehan dihatin pêşkêşkirin, êdî ne xema wan bû.
Ew êdî hew li ser riya rastdariyê çûn, lê ketin ser riyeke xelet û xerab û di riya Baal de çûn.

Çaxê ku Xwedê li ser Çiyayê Sînayê her Deh Emrên Mezin dan Mûsa, wî di emrê pêşî de weha got:

3 Li pêşberî min divê tu xwedayên te yên din nebin! … Çimkî ez Xudan
Xwedayê te, xwedayekî hesûd im; ez gunehê wan ên ku ji min nefret dikin, ji
zarokên wan heta nifşê sisiyan û çaran dixwazim. 6 Lê belê ez dilovaniyê li
hezar nifşên wan dikim ên ku ji min hez dikin û emrên min digirin. (Derketin 20:3.5.6)

Lê belê piraniya gelê Îsraêl siyaneta Xudan Xwedê negirt, ji lewre Xwedê ew ceza kirin.

Li ser vê yekê em di Kitêba Hukumdaran de weha dixwînin:

11 Îcar gelê Îsraêl tiştê ku di çavê Xudan de xerab bû, kir û perizîn Baalan. 14
Hingê hêrsa Xudan li hember wan rabû û ew dan destê nijdevanan û wan
ew talan kirin. Wî ew firotin wan dijminên li hawirdora wan û êdî nikaribûn li
ber wan bisekinin. 15 Wek ku Xudan ji wan re sond xwaribû, her cara ku
derdiketin cengê, destê Xudan li hember wan bû ku bi ser nekevin; ew ketin
tengahiyeke mezin.

Erê, Kitêba Hukumdaran ji me re dibêje ku gelê Îsraêl çawa dilê xwe hişk dikir û her gav ji pey Xwedê dizivirîn, jê dûr diketin.

Loma Xwedê her car ew dan destê dijminên wan û ew ceza kirin, da ku ew sûc û xerabiya xwe bibînin, tobe bikin, li Xwedê vegerin û ji helakbûnê xilas bibin. Her cara ku gelê Îsraêl ji dil û can tobe dikir, Xwedê ji wan re hukumdar radikirin, da ku wan  ji neyarên wan rizgar bikin. Di nav wan de mêrxasên wek Gîdeyon û Şamşon hebûn û wan gelê Îsraêl ji destê dijminan xilas kir. Serhatiya wan û hê ya gelekên din, di Kitêba Hukumdaran de nivîsî ye.

Bi kurtvebirîn, Kitêba Hukumdaran nîşanî me dide ku her cara ku gelê Îsraêl dev ji Xwedê û ji Peyva wî berdida, Xudan ew ceza dikirin, da ku ew ji riya xwe ya xerab û ji gunehên xwe bizivirin û li wî vegerin.

Her cara ku wan tobe dikir, Xwedê ji bo wan hukumdarek radikir, da ku ew bi destê wî ji dijminên xwe xilas bibin. Bi rastî, dabaşa Kitêba Hukumdaran ev e.

Wek ku me got, gelê Îsraêl her gav li hember Xwedê radibû û guneh dikir.
Lê belê, ma xayîntiya wan ji dilsoziya Xwedê re bû asteng?
Ma nebaweriya wan dilovaniya Xwedê û sozên wî betal kirin?
Nexêr! Rast e, Xwedê her gunehkar ceza dikir, lê li aliyê din, wî her gav gelê Îsraêl diparast. Xwedê her gav soza xwe ya ku wî bi sond dabû Birahîm dianî bîra xwe. Wî jê re gotibû: «Bi dûndana te, hemû bavikên li ser rûyê erdê wê bên pîrozkirin.»
Plan û mebesta Xwedê ew bû ku dûndana Birahîm bikira miletekî mezin, da ku ji wî gelî Xilaskarê dinyayê bihata. Tu tiştî nikaribû ji vê planê re bibûya asteng.
Ne gunehên gelê Îsraêl, ne zordariya Firewn û Misriyan, ne hêza miletên Kenanê, ne dîn û diyanetên xelet, ne Baal û ne jî Îblîs dikaribû ji plana Xwedê re bibûya asteng.
Tu tişt nebû ku bikariya ji plana şandina Xilaskarê dinyayê re bibûya asteng û ew Xilaskar wê ji gelê Îsraêl bihata!
Guhdarên hêja, îro em gihîştin dawiya bernama xwe. Heta careke din Xwedê bi we re be.

Di bernama din de me li Kitêba Hukumdaran nêrî û me dît ku piştî mirina Yêşû gelê Îsraêl zû ji pey Xudan Xwedayê xwe vegeriya û dest pê kir perizîn pûtan. Dîsa jî Xudan dev ji wan berneda, lê hukumdar rakirin, da ku ew gel vegerînin ba Xwedayê rast û wan ji destê dijminên wan rizgar bikin.

Niha em dixwazin li kitêbeke din binêrin.
Ev kitêb li ser jinekê dibêje ku navê wê Rût bû. Bi rastî ev serhatiyeke pir xweş û şêrîn e. Ev serhatî guleke bîhnxweş a di çolê de ye, çimkî ev jin di nav nifşekî xerab û xwehr de bû, lê wê ji Xwedê hez dikir.

Em nikarin tevahiya serhatiyê niha ji we re bixwînin, lê em dikarin xalên girîng ji we re bêjin:
Divê pêşî em bizanin ku Rût jinebiyek bû; ew ne jineke ji gelê Îsraêl bû. Ew ji eslê xwe ji gelê Moab bû û di welatê Moabiyan de, di başûrê Îsraêl de rûdinişt. Divê ku em bînin ber çavên xwe ku Moabî pûtperest bûn. Wan hem Xwedayê gelê Îsraêl û hem jî mirovên Îsraêlî kêm didîtin.

Rût ji eslê xwe Moabî bû; lê dîsa jî wê Xwedayê rastîn kêm nedît, lê belê wê ji dil û can baweriya xwe bi Xwedayê gelê Îsraêl anî. Wê bihîstibû ku Xwedê gelek kerametên newaze kiribûn û gelê Îsraêl ji Misrê deranibû. Wê li ser Şerîeta Mûsa bihîstibû û ew li ser riya Xwedê ya rast hîn bûbû. Erê, wê ji dil û can ji Xwedê bawer kir û soz û emrên ku wî dabûn gelê Îsraêl, qebûl kirin.

Heçî Rût û serhatiya wê ye, tiştên herî girîng ev in:
Ew li welatê Moabiyan di nav pûtperestan de rûdinişt. Dê û bavê wê pûtperest bûn. Wê bi xwe jî ji zaroktiya xwe ve li gor dîn û diyaneta dê û bavên xwe dikir. Lê belê Rût êdî nema pûtperest, êdî wê dîn û diyaneta dê û bavê xwe qebûl nekir. Wê biryara xwe da û wê Xwedayê Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûb, Ûsiv, Mûsa û gelê Îsraêl qebûl kir. Bi rastî ev biryar ne tiştekî hêsanî bû.

Pirsgirêk ev bû: Ma diviya ku ew di mala bavê xwe de bima û wê li gor dînê bavê xwe bikira û mêrekî pûtperest bikira?
An diviya ku wê dev ji mala bavê xwe û ji dînê bavê xwe berdabûya û biçûya welatê Îsraêl? Bi rastî ev biryar ne hêsanî bû!

Beriya ku em binêrin ma wê çi biryar da, divê em bizanin ku jintiya wê jî hebû. Navê wê Orpa bû.
Jintiya wê jî li ser Xwedayê gelê Îsraêl bihîstibû. Yanî diviya ku wan herduyan birayara xwe bida û ji xwe re hilbijartan ka ew dixwazin li gor dînê dê û bavê xwe bikin, an li pey Xudan Xwedayê Birahîm, Îshaq û Aqûb biçin.

Wan herdu jinan çi biryar dan? Heçî Orpa bû, wê riya sivik hilbijart.
Wê ji xwe re got: «Ezê li mala bavê xwe bimînim. Ezê mêrekî ku dînê bavê min qebûl dike, bikim.»
Lê belê heçî Rût bû, wê riya zehmet hilbijart. Wê biryar da ku mala dê û bavê xwe bihêle, here welatê Îsraêl. Wê dizanibû ku mirov nikare biperize du xwedayan. Mirov nedikarî biperiziya hem pûtê Moabiyan û hem jî Xwedayê rastîn.
Loma wê jina şêrejin pişta xwe da dînê dê û bavê xwe. Wê biryar da û ji xwe re got: «Çêtir e ku mirov li gor Xwedê bike û guhê xwe nede fikrên mirovan.»
Wê dizanibû ku maliyên wê û dost û hevalên wê, belkî wê biryarê qebûl nekin.
Lê ji bo wê, ya girîng ew bû ku ew ji dil û can li pey Xwedayê rastîn here.
Gotina pêşiyan rast dibêje: «Yê ku hingiv bixwe, mêş wê pê ve bidin.»
Ji lewre ne xema wê bû ku mirovên din wê li ser wê çi bifikirin.
Loma Rût rabû, dev ji mala bavê xwe berda û çû bajarekî biçûk bi navê Beytlehmê û li wê derê ma.
Erê, guhdarên delal, biryara wê tam di cih de bû. Peyvek ya pêşiyan heye, dibêjin: «Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e.» Rût jî şêrejinek bû.

Li Beytlehmê zilamek hebû, navê wî Boaz bû.

Boaz ji dûndana Rexabê bû, yanî ji zarokên wê jinê bû ya ku di dema Yêşû de nêrevan veşartin û di helakbûna bajarê Erîhayê de bi mala xwe ve sax mabû. Boaz zilamekî rast bû; ew dewlemend bû û gelek erdê wî hebû, lê wî hê jin ji xwe re neanibû.

Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Rût çawa li Beytlehmê rûnişt û di dema dirûtinê de her sibe zû radibû, diçû nav zeviyan, da ku li pey paleyan simbilan berhev bike. Rût jineke belengaz bû û zeviyên wê nebûn, lê li gor Şerîeta ku Xwedê dabû Mûsa, destûra belengazan hebû ku bi wî awayî simbilan bicivînin, da ku ew abora xwe bikin.
Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê wusa kir ku Rût ket zeviyên Boazê ji dûndana Rexabê û li wir simbil berhev kirin.

Boaz dît ku ew hat zeviyê wî û ew bi wê re peyivî. Wî zû dît ku Rût jineke rast û şîrhelal e. Boaz zilamekî qenc bû û wî fêm kir ku Rût jineke qenc e.
Gelo hûn dizanin çi çêbû? Erê, dilê Boaz ket wê û dilê wê jî ket wî û piştî demekê Boaz Rût ji xwe re anî.
Heçî Rût bû, wê cihê pêşî dabû Xwedê û li gor peyvên wî dikir û Xwedê ew pîroz û bimbarek kir. Rût bi zaro bû û ji Boaz re kurek anî û wan navê wî Obêd danîn. Obêd jî bû bavê Yêşa û Yêşa bû bavê Dawid.
Heçî Dawid bû, ew padîşahekî mezin ê gelê Îsraêl bû. Herweha ew pêxember bû jî û gelek zebûr nivîsandin.
Di bernameyên ku bên de emê bibînin ku li gor soza Xwedê, Xilaskarê dinyayê wê ji dûndana Dawid rabe. Erê, hemû pêxemberan li ser vî Xilaskarê pîroz ê ku li Beytlehmê hat dinyayê, pêxemberîtî kirin.

Îro me dît ku Xwedê jiyana jineke biyanî guhert. Rût ne ji gelê Îsraêl bû.
Çaxê ku Îsraêliyan dev ji Xwedayê xwe Xudan berda û ketin pey wan pûtên miletên li dora xwe, wê pişta xwe da dînê dê û bavê xwe û li Xwedayê gelê Îsraêl vegeriya.

Xwedê rêberiya wê kir û ew anî Beytlehmê, mêrekî qenc nîşanî wê da û ew kir pîrika bavê Dawidê padîşahê gelê Îsraêl.
Ji destpêkê ve destê Xwedê di her tiştî de bû û wî bi van hemû tiştan plana xwe pêş ve dibir, heta ku rojekê Xilaskarê dinyayê bişanda ser rûyê erdê.
Çimkî diviya ku Xilaskar ji malbata Dawid rabûya û li bajarê Dawid Beytlehmê bihata dinyayê.

Bernama me li vir bi dawî dibe. Cara ku bê Xwedê hez bike emê li serhatiyên Dawid binêrin. Ew ji dûndana Rût û Boaz bû û li Beytlehmê hat dinê.
Îro em bi vê pirsê silavan li we dikin: Gelo hûn mîna kê ne?
Ma hûn mîna Orpayê ne û hûn ji xwe re riya hêsanî hildibijêrin?
An hûn mîna jintiya wê ya şêrejin Rût in? Wê dev ji dînê dê û bavê xwe berda û li Xwedayê rast û karîndar zivirî.

Gelek spas ku we qenc guhê xwe da vê serhatiya rast û girîng.
Heta careke din, ji kerema xwe van gotinên Yêşû bînin bîra xwe.
Beriya ku bimire, wî ji gelê Îsraêl re got:
Îro ji xwe re hilbijêrin ka hûn dixwazin ji kê re xizmetê bikin … heçî ez im, ez û mala xwe, emê ji Xudan re xizmetê bikin.» (Yêşû 24:15)

Me di bernama xwe ya din de dît ku ew salên piştî Yêşû di dîroka gelê Îsraêl de demeke tarî û xerab bûn. Lê me dît ku di dema herî xerab de jî dîsa ronahiya dilsoziya Xwedê dibiriqî. Xudan Xwedê soza xwe ya ku dabû Birahîm û dûndana wî, jî bîr nekiribû. Plana wî eynî dima: Rojekê Xilaskarê dinyayê wê ji gelê Îsraêl bihata.

Herweha me dît ku destê Xwedê di jiyana jineke ku navê wê Rût bû de, kifş dibû. Rût ne ji gelê Îsraêl bû, lê wê ji dil û can baweriya xwe bi Xwedayê gelê Îsraêl anî. Çaxê ku gelek Îsraêliyan pişta xwe da Xwedayê xwe Xudan, wê biryara xwe da ku dev ji dînê dê û bavê xwe berde û li pey Xwedayê rast biçe. Rût rabû, mala dê û bavê xwe hişt û çû welatê Îsraêlê û li Beytlehmê bi cih bû. Li wir Boaz Rût ji xwe re anî. Ew herdu jî mirovên rast û dirist bûn û Xwedê kurek da wan û kurê wan Obed bû bapîrê Dawid pêxember.
Bi vî awayî plana Xwedê pêş ve diçû. Wî soz dabû ku Xilaskarek wê bihata, da ku zarokên Adem ji gunehên wan xilas bikira. Me dît ku Xilaskar wê ji malbata Dawid rabûya û wê li bajarê Dawid Beytlehmê bihata dinyayê. Di bernameyên ku bên de emê hê bêtir bibihîzin ku pêxemberên Xwedê çi û çi li ser wan tiştan digotin û Xilaskar piştî çend sed salan çawa ew hemû tişt anîn cih. Bi rastî, bi tenê Xwedê dikaribû tiştên weha bikiran!

Di Nivîsarên Pîroz de Dawid pêxember gelek bi nav û deng e. Navê wî ji kêmahî ve hezar caran derbas dibe. Gelo hûn li ser Dawid pêxember çi dizanin? Belkî hûn dizanin ku Dawid padîşahekî mezin ê gelê Îsraêl bû û hûn dizanin ku ew pêxember bû û Kitêba Zebûrê nivîsî. Eger hûn van tiştan bizanin, pir qenc e! Lê belê divê ku hûn çend tiştên din jî bizanin. Eger em bizanin ku Dawid padîşahekî mezin bû, lê em nezanin, ka çima ew yekî mezin bû, çi feyda zanîna me heye?
Eger em bizanin ku wî di Kitêba Zebûrê de peyvên Xwedê nivîsandin, lê em nezanin ka wî çi nivîsî, feyda wê çi ye?

Hevalên delal, eger hûn bixwazin li ser Dawid pêxember hîn bibin û ji Zebûran peyvên wî bibihîzin, hingê di bernameyên ku bên de jî bi me re bin.

Gelo hûn dizanin pêxemberê Xwedê yê ku beriya Dawid rabû, kî bû?
Ew pêxember Samûêl bû.
Xwedê Samûêl hilbijart, da ku gelê Îsraêl li Xudanê wan vegerîne, çimkî dilê Îsraêliyan ji Xwedê gelek dûr ketibû.
Kitêba Samûêl di nav Nivîsarên Pêxemberan de girîng e, çimkî tê de serhatiyên Samûêl pêxember û serhatiyên her sê padîşahên Îsraêl ên pêşî tên gotin. Navên wan her sê padîşahan ev in: Şawûl, Dawid û Silêman. (Ji Şawûl re carna Talût jî dibêjin.)

Me dîtibû ku Xwedê rêber û hukumdar dan gelê Îsraêl. Mûsa, Yêşû û Samûêl di nav wan de bûn.
Lê belê padîşahê rast ê gelê Îsraêl, Xwedê bi xwe bû, çimkî wî ew ji Misrê û ji zordariya Firewn xilas kiribûn.
Xwedê emir li gelê Îsraêl kir ku Konekî taybetî jê re çêkin, da ku ew di rûmeta xwe de di navenda wan de rûne; çimkî ew Xudan û Rêberê wan bû û wî dixwest ku Îsraêlî li gor emir û tembîhên wî bi tenê bikin.
Lê belê gelek Îsraêlî bi vê yekê ne razî bûn. Wan nedixwest ku tenê Xudan padîşahê wan be, lê wan dixwest ku wek hemû miletên din bin û padîşahekî wan jî hebe; yanî wan got: Divê ku yek ji nav zarokên Adem bibe padîşahê me.

Di Kitêba Samûêl a pêşî de Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
Hemû rihspiyên gel civiyan û hatin Ramayê ba Samûêl [5] û jê re gotin: «Tu pîr bûyî û kurên te di riya te de naçin. Ji ber vê yekê, li ser me padîşahekî deyne, da ku ew serweriyê li me bike, da ku em bibin wek miletên din.»
[6] Lê belê ev gotin di çavê wî de xerab xuya û wî li ber Xwedê dua kir.
[7] Xwedê jê re got: «Di her tiştê ku ew ji te re dibêjin de, guhdariya wan bike. Wan ne tu red kiriyî, lê belê wan ez red kirime.

[8] Ji roja ku min ew ji Misrê deranîn û heta îro wan weha li min kiriye û ew niha li te jî dikin: Wan dev ji min berda û li pey xwedayên din ketin.
[9] Guhdariya wan bike, lê wan hişk hişyar bike û ji wan re bêje ka heq, qanûn û mafên padîşah wê çi bin.»

Yanî em dibînin ku Xwedê ji Samûêl pêxember re got ku li gor daxwaza wan, padîşahekî deyne ser wan. Rast e, Xwedê nexwest ku zilamek li rex wî bibe padîşahê gelê Îsraêl. Erê, Îsraêliyan padîşahtiya Xwedê red kiribû; lê belê Xwedê daxwaza wan qebûl kir, çimkî padîşahtiya Xwedê ne bi darê zorê ye.

Di deriyê dehan de emê bibînin ku Samûêl zilamekî ku navê wî Şawûl bû, mesh kir, yanî rûn li serê wî da û bi vê yekê kifş kir ku ewê bibe padîşah.

Erê, çaxê ku pêxemberek, an kahînek an padîşahek ji bo kardestiya xwe ya girîng dihat kifşkirin, gelê Îsraêl weha dikir: Rûnekî taybetî bi serê wan de dihat rijandin.
Piştî demekê Samûêl tevahiya gelê Îsraêl civand û ji wan re got: «Ma we ew zilamê ku Xudan bijartiye, dît? Di nav tevahiya gel de hemberê wî tune.» Û tevahiya gel kir qîrîn û gotin: «Bijî padîşah!» (Samûêl I, 10:24)

Di destpêkê de gelê Îsraêl bi padîşahê xwe gelek şa dibû. Ew mêrxas û xurt bû û ew ciwan û ji hemûyên din bilindtir bû. Li gor dîtina mirovan, diviya ku Şawûl bibûya padîşahekî qenc.
Lê belê Xwedê ne wek mirovan li dîtina yekî dinêre. Mirov li rû dinêrin, lê Xudan li dil dinêre.
Şawûl padîşah qenc dest bi kardestiya xwe kir, lê piştî demekê, ew bû yekî pozbilind, çavnebar û ji xwe razî. Şawûl bi lêvên xwe pesnê Xwedê da, lê dilê wî ji Xwedê dûr bû.
Şawûl siyaneta peyvên Xwedê negirt û li gor emrên wî nekir. Wî ne li gor daxwazên Xwedê, lê li gor kêf û xwestinên xwe bi xwe kir.

Loma Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku çend salan piştî ku Şawûl padîşah
hatibû kifşkirin, Peyva Xudan ji Samûêl re hat. Wî jê re got:
11 «Ez poşman bûm / ez jovan im ku min Şawûl kir padîşah, çimkî ew ji pey
min vegeriya û bi gotinên min nekir.»
Samûêl pir aciz bû û tevahiya şevê li ber Xudan dua kir. 12 Dotira rojê ew sibê
zû rabû û çû ku Şawûl bibîne.
13 Çaxê ku Samûêl hat ba wî, Şawûl jê re got: «Xwedê te pîroz bike. Min emrê
Xwedê pêk anî.»
22 Lê belê Samûêl got: «Ma Xudan wek ku ji guhdarîkirina peyva xwe hez dike,
ji gorî û pêşkêşan hez dike? Va ye, îtaetkirin ji qurbanê û guhdarîkirin ji bezê
beranan çêtir e. 23 Çimkî serîhildan wek sêrbaziyê ye û serhişkî wek pûtperestiyê
ye. Ji ber ku te emrê Xwedê red kir, wî jî tu red kirî ku êdî tu nekaribî padîşah
bimînî.»

Guhdarên delal, li ser wan gotinên sergiran qenc bifikirin. Samûêl pêxember got:
«Va ye, îtaetkirin ji qurbanê û guhdarîkirin ji bezê beranan (yanî ji goriyên herî qenc) çêtir e.»

Di bernama din de me dît ku Şawûl bû padîşahê gelê Îsraêl. Lê wî zû dev ji emrên Xwedê berda.

Loma Samûêl hat ba Şawûl, ew hişyar kir û jê re got:

«Ma Xudan wek ku ji guhdarîkirina peyva xwe hez dike, ji gorî û pêşkêşan hez dike? Va ye, îtaetkirin ji qurbanê û guhdarîkirin ji bezê beranan çêtir e.

23 Çimkî serîhildan wek sêrbaziyê ye û serhişkî wek pûtperestiyê ye. Ji ber ku te emrê Xwedê red kir, wî jî tu red kirî ku êdî tu nekaribî padîşah bimînî.»

Yanî Xwedê bi devê Samûêl pêxember ji Şawûl re got ku padîşahtî wê ji wî bê standin û ji yekî din re bê dayîn.

Nivîsarên Pêxemberan li ser vê yekê weha dibêjin:

1 Xudan ji Samûêl re got: «Ma heta kengê tê ji bo Şawûl xemgîn bibî?
Min ew red kiriye ku li ser Îsraêl padîşahiyê neke. Strûhê rûn ê xwe tije bike û
bikeve rê. Ezê te bişînim ba Yêşayê Beytlehmî; min di nav kurên wî de ji xwe re
padîşahek bijart.»
2 Samûêl got: «Ezê çawa biçim? Şawûl bibihîze, wê min bikuje.»
Hingê Xudan got: «Golikekê bi xwe re bibe û bêje: ‹Ez hatime ku ji Xudan re
bikim gorî.› 3 Yêşa jî gazî goriyê bike û hingê ezê wî tiştê ku tê bikî, ji te re
bêjim. Û tê wî zilamê ku ez ji te re bêjim, ji bo min mesh bikî.»
4 Îcar Samûêl ew tiştê ku Xudan gotibû kir, hat Beytlehmê. Rihspiyên bajêr bi
lerizîn ew pêşwazî kirin û gotin: «Ma xêr e?» 5 Û wî got: «Xêr e! Ez hatim ku
goriyê pêşkêşî Xudan bikim. Xwe paqij û pîroz bikin û bi min re werin goriyê.»
Û wî Yêşa û kurên wî pîroz kirin û ew gazî goriyê kirin. 6 Çaxê ew hatin,
Samûêl li [kurê Yêşa] Êliyab nêrî û ji xwe re got: «Bi rastî meshkiriyê Xudan li
pêşberî wî ye.» 7 Lê belê Xudan ji Samûêl re got: «Li dîtina wî û li bejin û bala
wî nenêre, çimkî min ew red kir. Xudan ne wek dîtina mirovan dibîne; çimkî
mirov li rû dinêrin, lê Xudan li dil dinêre.»

8 Hingê Yêşa gazî Abînadab kir û ew di ber Samûêl re derbas kir.
Samûêl got: «Xudan ev jî hilnebijart.»
9 Îcar Yêşa Şama derbas kir. Lê Samûêl got: «Xudan ev jî hilnebijart.»
10 Yêşa weha heft ji kurên xwe di ber Samûêl re derbas kirin. Hingê Samûêl ji
Yêşa re got: «Xudan evên ha hilnebijartin. Ma kurên te hemû ev in?»
Yêşa got: «Hê yê biçûk maye, ew li ber miyan e.»
Û Samûêl ji Yêşa re got: «Rêke pey wî, wî bîne; heta ew neyê vir, em rûnanin
ser sifrê.» 12 Îcar rêkir pey wî, ew anî hundir. Ew bi xwe sor, çavên wî jî spehî û
dîtina wî şêrîn bû. Û Xudan got: «Rabe, wî mesh bike; çimkî ev ew e.» 13 Îcar
Samûêl rahişt strûhê xwe yê rûn û ew di nav birayên wî de mesh kir.
Êdî ji wê rojê û pê ve Ruhê Xudan bi hêz hat ser Dawid.

Erê, bi wî awayî Xwedê Dawid kifş kir ku di pey Şawûl de bibe padîşahê gelê Îsraêl. Lê divê em fêm bikin ku Dawid wê rojê nebû padîşah.
Dawid hê ciwan bû, xortek bû û ew dema ku Xwedê di plana xwe de kifş kiribû ku Dawid li ser gelê Îsraêl bibûya padîşah hê nehatibû. Bi rastî deh salên din kişand heta ku Dawid li ser textê padîşahtiyê rûnişt.

Îcar Dawid vegeriya Beytlehmê ber keriyê bavê xwe û wek berê şivantî kir.
Ew şivanekî qenc û dilsoz bû. Zû bi zû tirs nediket dilê wî, çimkî ew ji Xudan piştrast bû. Mesele, rojekê çaxê wî miyên bavê xwe diçêrandin, şêrek hat û miyek ji kerî bir. Dawid li pey şêr çû, lê xist û berx ji devê wî rizgar kir.
Gava şêr li hember wî rabû, Dawid rihdîna wî girt, lê xist û ew kuşt. (Samûêl I, 17:35)

Dawid ne tenê şivanekî dilsoz û mêrxas bû; herweha wî li çengê jî dixist û stran digotin. Ruhê Xwedê gelek stran xistin devê wî û ew di Kitêba Zebûrê de dan nivîsandin. Erê, Dawid gelek ji Xudan Xwedê û ji Peyva wî hez dikir!

Em dixwazin di dema xwe ya ku îro maye de guhê xwe bidin çend parçeyên zebûrên Dawid.

Bînin ber çavê xwe ku Dawid çawa di mêrga şîn de di nav keriyê bavê xwe de
rûdinişt, li çengê dixist û bi rêberiya Ruhê Xwedê bi stran û lavijeyên şikirdariyê
pesnê Xwedê dida.
Niha guhê xwe bidin peyvên wî:
[1] Ya Serwerê me Xudan, li ser tevahiya dinyayê navê te çiqas bilind e! …
[3] Çaxê ku ez ezmanên te, karên destên te, heyv û stêrên ku te danîne, dibînim ez
dibêjim: [li gor Îbranî dema niha ye, Elberfelder jî weha dibêje]
[4] Mirov çi ye ku tu wî bînî bîra xwe
û kurê Adem çi ye ku tu xema wî bixwî?
[5] Te ew ji milyaketan piçekê nizimtir kir, te taca rûmet û siyanetê da serê wî …
[9] Ya Xudanê me Xudan, li ser tevahiya dinyayê navê te çiqas bilind e!

[105] Peyva te ji bo gavên min çira ye
Û ji bo riya min ronahî ye.
[11]Da ku ez guneh nekim li hember te,
Min di dilê xwe de hilaniye peyva te.
[7] Şerîeta Xudan bê kêmahî ye û dilê mirovan nû dike
Şahidiya Xudan ewledar e û şehrezayiyê dide yê xeşîm.
[8] Tembihên Xudan rast in, şahiyê didin dilan.
Emrê Xudan pak e, ronahiyê dide çavan.
[10] Ji zêr û ji zêrê xas zêdetir dilê mirov diçe wan.
Ji hingiv û ji hingivê palandî şêrîntir in.
[11] Xulamê te jî bi wan hay ji xwe dimîne.
Di pêkanîna wan emran de xelateke mezin heye.

[1] Xudan şivanê min e, tiştek ji min kêm nabe.
[2] Ew min li nav mêrga nû dide mexel û li ber ava rihet rêve dibe.
[3] Ew dilê min nû dike û ji bo navê xwe, di riya rast de rêberiya min dike.

4 Erê, ez di geliyê siya mirinê de bigerim jî, ez ji xerabiyê natirsim,
çimkî tu bi min re yî.
Gopal û şivdarê te dilgeşiyê didin min.
5 Li pêş dijminên min, tu sifrê datînî ber min.
Tu dohn li serê min didî. Fincana min tije ye, ser re tavêje.
6 Erê, di hemû rojên jiyana min de
qencî û dilovanî wê bi min re bin û di hemû rojan de ezê di mala Xudan de rûnim.

Guhdarên delal, gelek spas ku we qenc guhdariya destpêka serhatiya Dawid kir. Cara ku bê emê bi serhatiya wî berdewam bikin û emê bibînin ku ew çawa rastî pêlewanekî hat û Xwedê çawa li hember wî pêlewanî ew bi ser xist!

Heta hingê li ser van gotinên Samûêl bifikirin ên ku dibêjin:

Xudan ne wek dîtina mirovan dibîne; çimki mirov li rû dinêrin, lê Xudan li dil dinêre.» (Samûêl I, 16:7)

Xwedê alîkariya we bike û we jî bi ser bixe.

Di bernameyên berî niha de me dest bi serhatiyên Dawid kiribû.
Guhê xwe bidin van peyvên ku Xwedê li ser wî gotine:
«Min Dawidê kurê Yêşa, zilamekî li gor dilê xwe dît. Ewê hemû daxwazên min bîne cih.» (Karên Şandiyan 13:22)
Me dîtibû ku Xwedê ew çawa padîşahê diduyan ê gelê Îsraêl kifş kiribû, çimkî padîşahê pêşî Şawûl guhê xwe neda emrên Xwedê. Lê hingê di cih de Dawid nebû padîşah.
Lê belê me dît piştî ku Dawid hat meshkirin, ew vegeriya Beytlehmê û wek berê di çol û çolistanan de keriyê bavê xwe diçêrand, çimkî ew xort bû
û hê ew wextê ku wî padîşahtî bistanda nehatibû.

Dersa me ya îro li ser Dawid û Golyat e û emê tê de bibînin ku Xwedê bi Dawid re bû, çimkî Dawid di riya Xwedê de diçû.
Emê niha ji Kitêba Samûêl ya pêşî, ji deriyê 17'an bixwînin. Li wir dibêje:
1 Filistîniyan ji bo cengê ordiyên xwe civandin 2 Îcar Şawûl û zilamên Îsraêl li
hev civiyan û di newala Elayê de ordîgeh danîn û li hember Filistîniyan ber bi
cengê ve pehn bûn. 3 Filistînî li quntara çiyê bûn û Îsraêlî li quntara çiyayê
pêşber bûn û di navbera wan de newal hebû.
4 Ji ordîgeha Filistîniyan pêlewanê ji bajarê Gatê yê ku navê wî Golyat bû
derket. Bejna wî ji du metran bilindtir bû; 5 li ser serê wî kumzirxê tûnc hebû û
wî zirxê tûnc ê polkirî li xwe kiribû; giraniya zirx şêst kîlo bû. 6 Li ser ranên wî
zirxên tûnc hebûn û ser navmilên wî sîxekî tûnc hebû. 7 Destiyê rima wî wek
singê tema tevnkeran bû û serê rima wî hesin bû û giraniya wî heft kîlo bû.
8 Ew rawesta, qîrrek da rêzên Îsraêl û ji wan re got: «Çima hûn derketin ku hûn
ji bo cengê bibin rêz? De ji bo xwe zilamekî hilbijêrin, bila ew dakeve ba min. 9
Eger ew bikare bi min re şer bike û min bikuje, hingê emê bibin xulamên we. Lê
eger ez bikarim wî û wî bikujim, hingê hûnê bibin xulamên me.

Îro ez meydanê ji rêzên Îsraêl re dixwînim; zilamekî bişînin ba min ku em li hember hev şerr bikin.»
[11] Çaxê ku Şawûl û hemû Îsraêliyan ev peyvên yê Filistînî bihîstin, xof ket dilê wan û ew gelek tirsiyan.

Erê, dema ku Golyat tevzê xwe li gelê Îsraêl dikir, Dawid dûrî şêrr miyên bavê xwe diçêrandin, li ser peyvên Xwedê difikirî, li çenka xwe dixist û ji Xudanê xwe re distrand. Lê belê sê birayên wî yên mezin bi ordiya Şawûl re ketibûn şêrr. Rojekê bavê Dawid Yêşa hat ba wî û jê re got:
«Here ordiyê ba birayên xwe, li hal û rewşa wan bipirse û ji min re bêje ku ew çawa ne.»
Dawid jî miyên xwe hiştin ba berevan, sibê zû rabû û ket rê.

Çaxê ku Dawid silav da birayên xwe yên mezin û bi wan re peyivî, Golyatê pêlewan ji rêzên Filistîniyan derket, ber bi rêzên zilamên Îsraêl ve hat, û wek ku di wan 40 rojên berî hingê de kiribû, gef li wan xwarin û ew tirsandin.
Gava Îsraêliyan ew dît, tirs ket dilê wan û ew ji ber wî revîn.
Yekî ji Îsraêliyan ji Dawid re got: «Te ev zilamê ku derket dît?
Bi rastî ew derdikeve ku meydanê ji Îsraêl re bixwîne. De îcar kî wî bikuje, padîşah wê wî pirr dewlemend bike û wê keça xwe bide wî û wê mala bavê wî ji bacdayînê serbest bike.»

Hingê Dawid got: «Ev Filistîniyê sinetnekirî kî ye ku meydanê ji ordiya Xwedayê zindî re dixwîne?»
Birayê wî yê mezin bihîst ku Dawid çi dibêje û hêrsa wî li hember Dawid rabû û wî jê re got: «Çima tu hatiyî? Te ew çend mî li çolê li ba kê hiştin? Ez dizanim ku tu çima hatiyî. Bêguman tu dixwazî şerr bibînî.»

Lê belê leşkerekî peyvên Dawid ên ku wî bi cesaret li hember wî pêlewanî gotibûn bihîstin, çû ba Şawûl padîşah û her tişt jê re got. Şawûl jî şand pey Dawid û pirs jê kirin.

Li ser bersiva Dawid, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
32 Dawid ji Şawûl re got: «Ji ber vî zilamî bila cesareta tu kesî neşkê; xulamê te
wê here û bi vî Filistîniyî re şerr bike.»
33 Lê Şawûl ji Dawid re got: «Tu nikarî herî û li hember vî Filistîniyî şerr bikî; tu
zarok î, lê ew ji xortaniya xwe ve zilamê şerr e.»
34 Dawid ji Şawûl re got: «Xulamê te miyên bavê xwe diçêrandin. Îcar çaxê şêr
an jî hirç dihat û berxek ji kerî dibir, 35 ez li pey diçûm, min lê dixist û berx ji
devê wî rizgar dikir. Û eger li hember min rabûya, min di rihdîna wî re digirt,
min lê dixist û ew dikuşt. 36 Xulamê te hem şêr, hem jî hirç kuştiye û ev
Filistîniyê bê sinet jî wê bibe wek yekî ji wan. Çimkî wî ji ordiya Xwedayê zindî
re meydan xwendiye. Ew Xudanê ku ez ji nav lepên şêr û hirçê xilas kirime, wê
min ji destê vî Filistîniyî jî xilas bike.»
Îcar Şawûl ji Dawid re got: «Here û Xudan bi te re be.»
38 Hingê Şawûl cilên xwe li Dawid kirin û kumzirxê tûnc danî ser serê wî û zirx
li wî kir. 39 Dawid di ser cilên xwe re şûrê xwe da pişta xwe û xebitî ku rêve
here, çimkî hîn nebûbû. Îcar Dawid ji Şawûl re got: «Ez nikarim bi van tiştan
rêve herim, çimkî ez hîn nebûme.» Û Dawid ew ji xwe xistin.

40 Hingê wî rahişt şivdarê xwe û ji gelî pênc berên bestê ji xwe re bijartin û ew
xistin berîka xwêdanka xwe ya şivanan. Berkaniyê wî di destê wî de bû û weha
ber bi yê Filistînî ve çû.
41 Yê Filistînî ber bi Dawid ve dihat, nêzîkî wî bû jî û xulamê wî yê ku mertal
hildigirt, li pêşiya wî bû. 42 Yê Filistînî nêrî û çaxê wî Dawid dît, ew kêm dît,
çimkî ew xort bû.
43 Wî ji Dawid re got: «Ma ez kûçik im ku tu bi dar ser min de têyî?»

Û yê Filistînî bi navê xwedayên xwe nifir li Dawid kir 44 û jê re got:
«Were ba min, da ku ez goştê te bidim teyrên ezmanan û heywanên çolê.»
45 Lê Dawid ji wî re got:
«Tu bi şûr, bi rimê û bi sîxan ser min de têyî; lê belê ez bi navê Xudan Xwedayê
ordiya Îsraêl ê ku tu meydanê jê re dixwînî ser te de têm.
46 Îro Xudan wê te bide destê min û ezê te li erdê bixim û serê te ji gewda te
rakim. Û ezê îro kelaşên ordiya Filistîniyan bidim teyrên ezmanan û heywanên
kûvî û hemû dinya wê bizane ku di nav Îsraêl de Xwedê heye. 47 Û tevahiya van
mirovên civiyayî wê bizanin ku Xudan bi şûr û bi rimê xilas nake; çimkî ceng ya
Xudan e û ewê we bide destê me.»

48 Çaxê yê Filistînî derket û ber bi wî ve hat, Dawid bi lez ber bi rêzên cengê ve
bezî, da ku derkeve pêşberî yê Filistînî. 49 Wî dest avêt xwêdanka xwe,
besteberek derxist, bi berkanî daweşand û li eniya yê Filistînî xist. Kevir di
eniya wî de çû û ew deverû ket erdê.
51 Dawid bezî çû li ser yê Filistînî sekinî, rahişt şûrê wî û ji kalan kişand, ew kuşt
û bi şûrê wî serê wî jêkir.
Çaxê Filistîniyan dît ku pêlewanê wan mir, ew reviyan. 52 Li ser vê yekê zilamên
Îsraêl û Cihûda rabûn û kirin qîrîn û heta dergehên Ekronê ketin pey Filistîniyan.

Guhdarên delal, di bernama ku bê de emê hê bêtir li vê serhatiya newaze binêrin.
Heta hingê bimînin di aştiyê de!

Di bernama din de me dît ku di nav Filistîniyan û gelê Îsraêl de şer derket. Sê birayên Dawid ên mezin bi padîşahê Îsraêl Şawûl re çûbûn şêrr û rojekê Dawid jî ji aliyê bavê xwe ve hat şandin ordîgehê, da ku binêre ka halê birayên wî çi ye. Li wir Dawid dît ku pêlewan Golyat çawa meydan ji ordiya Îsraêl xwend û ew tirsandin û Xwedayê wan Xudan kêm dît.
Lê belê Dawid netirsa û bi bawerî ber bi wî pêlewanî ve bezî û jê re got: «Tu bi şûr, bi rimê û bi sîxan ser min de têyî; lê belê ez bi navê Xudan Xwedayê ordiya Îsraêl ê ku tu meydanê jê re dixwînî ser te de têm.»
Yanî me di vê serhatiyê de dît ku Dawidê xort gelê xwe bi berkanî û bi besteberekî xilas kir, çimkî ew bi baweriyeke xurt ji Xwedayê zindî piştrast bû.

Erê, serhatiya Dawid û Golyat serhatiyeke newaze ye û gelek dersên girîng tê de hene.

Me bihîst ku Şawûl û gelê Îsraêl gelek ji Golyat ditirsiyan. Kesekî ji wan nediwêrî ku bi wî re şer bikira, lê Dawid ji wî netirsa, ew li erdê xist û ew kuşt! Çima tirs ketibû dilê Şawûl û leşkerên wî? Çima Dawid bi cesaret bû û netirsa? Di nav leşkerên Şawûl û Dawid de ferq çi bû?
Bersiv ev e: Dawid ji pêlewan netirsa, ji ber ku wî ji Xudan Xwedê bawer dikir û ew piştrast bû. Şawûl û leşkerên xwe ji Xwedê ne piştrast bûn, loma ew ji pêlewan ditirsiyan.

Şawûl û leşkerên xwe bi tenê dîtin ku pêlewan yekî hêzdar e.
Lê belê Dawid hêza Xwedayê karîndarê her tiştî anî ber çavên xwe.
Erê, Şawûl û leşkerên wî mirovên oldar bûn, lê belê mana vê yekê ne ew bû ku di nav wan û Xwedê de têkiliyeke rast û xurt hebû. Her mirovê dîndar ne dostê Xwedê ye.

Şawûl û leşkerên wî qenc dizanîbûn ku Xwedê heye; herweha wan dizanibûn ku Xwedayê rastîn yek e û mezin e û karîndarê her tiştî ye. Lê belê zanîna wan tiştan nikaribû wan ji Golyatê pêlewan xilas bike!
Heçî Dawid bû, di nav wî û Xwedayê karîndarê her tiştî de têkiliyeke kûr hebû. Dawid Xwedayê zindî nas dikir û bi wî re dijiya. Dawid ji sozên Xwedê bawer dikir. Loma Dawid ji Golyat netirsa.

Guhdarên delal, ma hûn bêtir wek Dawid in, an wek Şawûl û leşkerên wî ne?
Gelo hûn Xwedê nas dikin û hûn dostên Xwedê ne?
An zanîna we ya li ser Xwedê bi tenê di hiş de ye, lê di jiyana rojane de tiştek tune?
Ma hûn Peyva Xwedê ewqas qenc dizanin ku ew dilê we bi şahiyê tije dike?
An hûn bi tenê diceribînin ku hûn şertên dîn û diyanetan pêk bînin?
Gelo têkiliya we ya rast bi Xwedê re heye?
Ma ew têkiliya we ya bi Xwedê re kûr û tije şahiyê ye?
An hûn di bin adetên dîn û diyanetan de westiyane?

Ji kerema xwe guhê xwe bidin van gotinên Zebûrên Dawid.
Wî di wan de li ser têkiliya xwe ya bi Xwedê re weha gotiye:

1 Xudan şivanê min e, tiştek ji min kêm nabe.
4 Ez di geliyê siha mirinê de bigerim jî, ez ji xerabiyê natirsim,
çimkî tu bi min re yî.
Gopal û şivdarê te dilgeşiyê didin min.
6 Erê, di hemû rojên jiyana min de qencî û dilovanî wê bi min re bin
û di hemû rojan de ezê di mala Xudan de rûnim.

Ma hûn jî dikarin weha bêjin? Gelo ma hûn bi awayekî rast Xwedê nas dikin?
Ma Xwedê şivanê canê we ye?

Ma hûn bawer dikin û dizanin ku hûnê li ezmên her û her di mala Xwedê de rûnin?
Dawid ji van tiştan piştrast bû, çimkî wî sozên Xudan Xwedê yên newaze dizanîn.
Wî ne tenê di hiş û bîra xwe de bi wan dizanîn, lê wî di dilê xwe de ji wan bawer dikir.

Baweriya Dawid rast û safî bû. Bingehê baweriya wî ne gotinên mirovên qelp bûn. Bingehê baweriya wî peyvên Xwedê yên dilsoz bûn.
Wî Xwedayî, tu caran dev ji wan mirovên ku xwe dispartin wî, berneda û tucaran dev ji wan bernade jî.

Guhê xwe bidin van gotinên Dawid. Wî di Zebûrê de weha got:

1 Ronahiya min û xilasiya min Xudan e, îcar ez ji kê bitirsim?
Qeweta jiyana min Xudan e, îcar ez ji kê bibizdihim?
3 Eger ordiyek li dor min bigire, dilê min natirse.
Eger şer li hember min derkeve, ezê di vê yekê de jî piştrast bim.
4 Tiştek heye ku ez ji Xudan dixwazim,
ez li vê yekê digerim ku ez di hemû rojên jiyana xwe de
di mala Xudan de bimînim,
spehîtahiya Xudan bibînim
û di Perestgeha wî de li wî heyirî bimînim.
7 Ya Xudan, çaxê ku ez gazî dikim, guhê xwe bide min.
Rehmê li min bike û bersîva min bide!
8 Te got: Li rûyê min bigerin!
Dilê min ji te re got:
Ya Xudan, ez li rûyê te digerim. (Zebûr 27:1.3-4.7-8)

4 Ya Xudan, riyên xwe bi min bide zanîn
Û rêçikên xwe hînî min bike.
5 Di rastiya xwe de rê nîşanî min bide
Û min hîn bike,
Çimkî tu Xwedayê xilasiya min î;
Ez tevahiya rojê li hêviya te disekinim.
6 Ya Xudan, rehm û kerema xwe bîne bîra xwe,
Çimkî ew ji berê û paşê ve ne.
Gunehên xortaniya min
Û neguhdariyên min neyne bîra xwe.
Ya Xudan, li gor kerema xwe
Û ji bo qenciya xwe, min bîne bîra xwe
8 Xudan qenc û rast e,
Ji bo vê yekê rê hînî gunehkaran dike.
9 Ew di dadperweriyê de
Rê nîşanî reben û jaran dide
Û riya xwe hînî rebenan dike.
10 Ji bo wan ên ku peyman û gotinên Xudan digirin
Hemû riyên wî kerem û rastî ne. (Zebûr 25:4-10)

1 Ez ji te hez dikim, ya Xudan, ya qeweta min.
2 Xudan lata min û kelha min û Xilaskarê min e;
Xwedayê min, lata min e; ez xwe bi wî digirim;
Ew mertalê min e ….
29 Bi saya te ez êrîşî leşkeran dikim
û bi Xwedayê xwe re ez di ser sûran re diçim.
30 Heçî Xwedê ye, riya wî bêqusûr e;

Gotina Xwedê safî ye.

Ew ji bo hemûyên ku xwe bi wî digirin, mertal e. (Zebûr 18:1.2.29.30)

Guhdarên hêja, gelek spas ku we qenc guhê xwe da vê bernameyê.

Di bernama ku bê de Xwedê hez bike emê bi serhatiyên Dawid berdewam bikin û emê bibînin ku Dawid çawa bû padîşahê Îsraêl.

Em bi van gotinên zebûra Dawid silavan li we dikin:

Tam bikin û bibînin, Xudan çi qenc e;

Xwezî bi wî mirovê ku xwe spartiye wî! (Zebûr 34:8)

Xwedê bi we re be!

Îro emê bi serhatiya Dawid pêxember berdewam bikin. Beriya du bernameyên din me dît ku Xwedê Dawidê xort hilbijart ku bibe padîşahê Îsraêl ê diduyan. Dîsa jî diviya ku Dawid 10 salan li benda padîşahtiyê bima.
Xwedê padîşahê pêşî Şawûl red kiribû, çimkî emrên Xwedê qet ne xema wî bûn. Lê heçî Dawid bû, Xwedê li ser wî weha got:
«Min Dawidê kurê Yêşa, zilamekî li gor dilê xwe dît. Ewê hemû daxwazên min bîne cih.» (Karên Şandiyan 13:22)
Di bernameya din de me dît ku Dawid li hember Golyatê pêlewan bi ser ket û ew bi berkanî û bi kevirekî biçûk kuşt – çimkî Dawid Xwedayê zindî nas dikir û baweriya wî ya xurt hebû.

Piştî vê serhatiyê, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
6 Piştî ku Dawid li yê Filistînî xist û ew kuşt, dema ku ew vedigeriyan, jin ji hemû bajarên Îsraêl bi lavijeyan û bi reqsê derketin, da ku bi erbaneyan, bi stranên şahiyê û bi tembûran, Şawûl pêşwazî bikin.
7 Jin direqisîn, distirandin û digotin: «Şawûl kuşt hezarên wan, Dawid jî deh hezarên wan.»
8 Şawûl gelek hêrs ket û ev peyv di çavê wî de xerab bû û got: «Deh hezar dan Dawid, bi tenê hezar dan min. Êdî bi tenê padîşahî jê kêm maye.»
9 Ji wê rojê ve Şawûl bi çavê xerab li Dawid nêrî.

Yanî em dibînin ku xelkê pir ji Dawid hez dikir. Çiqas dihat, wan bêtir jê hez dikir, lê belê çiqas dihat jî, Şawûl bêtir ji Dawid nefret dikir.
Dilê Şawûl bi çavnebariyê tije bû û wî dest pê kir, ew di hemû fikir û ramanên xwe de li riyekê digeriya ku Dawid bikuje.
Loma Dawid revî û xwe di çolê de veşart. Ew ne bi serê xwe bû, 400 zilamên din jî bi wî re bûn.
Şawûl di hêrsa xwe de bi leşkeran ve di çol û çolistanan de li Dawid û li zilamên wî digeriya. Çi tiştê ku ji destê Şawûl dihat, wî dikir ku Dawid bigire û bikuje.

Lê belê Xwedê bi xwe jê re bû asteng, çimkî Xwedê bi Dawid re bû.
Dîsa jî Şawûl gelek tengahî da Dawid. Heşt salên sax diviya ku Dawid û zilamên xwe ji ber Şawûl padîşah bireviyan.
Erê, hêrs û çavnebariya Şawûl a li hember Dawid pir mezin bû. Lê belê Dawid ji Şawûl nefret nedikir.
Çima Dawid ji padîşahê ku li kuştina wî digeriya, nefret nedikir?
Dawid nikaribû ji Şawûl nefret bikira, çimkî Dawid, Xwedê nas dikir û bi wî re dijiya. Xwedayê wî ew Xwedê bû yê ku tava rojê hem li ser xeraban û hem jî li ser qencan dertîne û baranê bi ser rast û nerastan de dibarîne.
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

[7] Hezkirîno, em ji hevdû hez bikin; çimkî hezkirin ji Xwedê ye û her kesê ku hez dike, ji Xwedê çêbûye û Xwedê nas dike. [8] Yê ku hez nake, Xwedê nas nake, çimkî Xwedê hezkirin e. …[19] Em hez dikin, çimkî pêşî wî ji me hez kir.
[20] Eger yek bêje: «Ez ji Xwedê hez dikim» û ji birayê xwe nefret bike, derewkar e. Çimkî yê ku ji birayê xwe yê ku dibîne hez neke, nikare ji Xwedayê ku nabîne hez bike.

Wextê me tune ku em li hemû serhatiyên Dawid û Şawûl binêrin, lê niha em dixwazin bala xwe bidin serhatiyeke din jî, çimkî di wê serhatiyê de nefsbiçûkî û hezkirina Dawid pir qenc kifş dibe. Di Kitêba Samûêl a pêşî, deriyê 24'an de weha dibêje:

Hin mirov hatin ba Şawûl û jê re gotin:
[1] «Va ye, Dawid li çola En–Gedî ye.» [2] Li ser vê yekê Şawûl ji tevahiya Îsraêl sê hezar zilamên bijarê bi xwe re birin û çû, da ku li ser latên pezkûviyan li Dawid û zilamên wî bigerin. [3] Şawûl hat ba hevşiyên miyan ên ku li tenişta rê bûn û li wê derê şkeftek hebû. Şawûl ket hundir, ku here destavê. Dawid û zilamên xwe di paşiya şkeftê de rûdiniştin.

[4] Zilamên Dawid jê re gotin: «Binêre, ew roja ku Xudan ji te re gotiye: ‹Va ye,
ezê dijminê te bidim destê te û tê tiştê ku di çavê te de qenc e bi wî bikî›, îro
ye.»
Hingê Dawid rabû û perçeyeke dawa ebayê Şawûl ji dizî ve birrî. [5] Lê piştî wê
yekê, ji ber ku dawa ebayê Şawûl birrîbû, dilê Dawid ew sûcdar kir [6] û wî ji
zilamên xwe re got: «Xudan neke ku ez vê yekê li hember mîrzayê xwe, li
hember meshkiriyê Xudan bikim û destê xwe dirêjî wî bikim, çimkî ew
meshkiriyê Xudan e.»
[7] Bi van peyvan, Dawid pêşiya zilamên xwe girt û nehişt ku ew li hember Şawûl
rabin. Hingê Şawûl ji şkeftê rabû û bi riya xwe ve çû.
[8] Li ser vê yekê Dawid rabû, ji şkeftê derket û li pey Şawûl gazî kir û got:
«Mîrzayê min padîşah!»
Şawûl li pey xwe nêrî û Dawid xwe tewand û deverû çû erdê. [9] Wî ji Şawûl re
got: «Çima tu guhê xwe didî peyvên wan mirovên ku dibêjin: ‹Bi rastî, Dawid li
zirara te digere›?
[10] Îro te bi çavê xwe dît, Xudan di şkeftê de çawa tu dayî destê min.
Ji min re gotin ku ez te bikujim, lê çavê min tu dirxandî û min got:
‹Ez li hember mîrzayê xwe destê xwe dirêj nakim, çimkî meshkiriyê Xudan e.›
[11] Binêre, ey bavo, erê, li dawa ebayê xwe yê ku di destê min de ye binêre.
Ji wê yeka ku min dawa ebayê te birrî û min tu nekuştî, bizane û bibîne ku di
destê min de xerabî û guneh tune. Û bi ser ku tu li canê min digerî ku tu wî
bikujî, dîsa min li hember te xerabî nekir. [12] Bila di navbera min û te de Xudan
dîwanê bike û bila Xudan heyfa min ji te bistîne; lê belê destê min li hember te
ranabe. [13] Wek gotina pêşiyan dibêje: ‹Ji xeraban xerabî derdikeve›, lê destê min
li hember te ranebe.»

[16] Çaxê Dawid ev peyvên ha ji Şawûl re gotin, xilas kirin, Şawûl got:
«Dawid kurê min, ma ev dengê te ye?» Û Şawûl bi dengekî bilind giriya.
[17] Wî ji Dawid re got: «Tu ji min rastir î, çimkî bi ser ku min bi xerabî li te
vegerand jî, te bi qencî li min vegerand.

[18] Te îro kifş kir ku tu qenciyê li min dikî, çimkî Xudan ez dam destê te û te ez
nekuştim. [19] Çimkî eger mirovek dijminê xwe bibîne, ma wê wî bi qencî bi riya
wî ve bişîne?
Ji bo vî tiştê ku te îro ji min re kir, bila Xudan bi qencî li te vegerîne. [20] Va ye,
niha ez dizanim ku eseh tê bibî padîşah û padîşahiya Îsraêl wê bi destê te
bisekine.»

Piştî vê yekê, Şawûl li mala xwe vegeriya.

Erê, di wê rojê de Şawûl fêm kir ku Dawid ne dijminê wî ye, lê ji aliyê Xwedê ve hatiye bijartin, da ku bibe padîşah.
Heyf û mixabin Şawûl ev yek zû ji bîr kir û ji nû ve tengahî da Dawid. Şawûl rastî dizanî, lê li gor zanîna xwe nedikir û piştî çend salên din, ev yek bû sedemê helakbûna wî.

Di bernama ku bê de emê hem li dawiya jiyana Şawûl û hem jî li destpêka padîşahtiya Dawid binêrin. Heta hingê li ser vê gotina Încîlê bifikirin a ku dibêje:

Hêrsbûna mirov rastiya Xwedê pêk nayne. (Aqûb 1:20)

Xwedê bi we re be û we ji her neqenciyê biparêze!

Cara din me dît ku Şawûl dev ji şopandina Dawid berda û li mala xwe vegeriya. Lê zû dilê wî ji nû ve bi çavnebariyê tije bû. Ji ber ku hesûdiya Şawûl ewqas mezin bû, ew heşt salan li pey Dawid ket, lê Xwedê her gav Dawid ji destê Şawûl xilas dikir. Di dawiyê de Şawûl berê tovê xerabiya xwe stand. Nivîsarên Pêxemberan weha dibêjin:

[1] Filistîniyan li hember Îsraêl şer kirin û Îsraêliyan ji ber Filistîniyan bazdan. [2] Filistînî ketin pey Şawûl û kurên wî û wan kurên Şawûl Yonatan, Abînadab û Melkîşûya kuştin. [3] Şer li hember Şawûl germ bû û tîravêjan ew dît û ew ji aliyê wan ve bi awayekî giran hat birindarkirin. [4] Hingê Şawûl ji çekhilgirê xwe re got: «Şûrê xwe bikişîne û wî li min bixe, an nexwe evên bê sinet wê bên û ew wê li min bixin û wê bi min bileyizin.» Lê belê çekvanê wî nexwest, çimkî ew gelek tirsiya. Îcar Şawûl rahişt şûrê xwe û xwe bi ser wî de berda.

Wê rojê Şawûl û sê kurên wî mirin. Di deriyên piştî van de, Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku hin bi hin Dawid bi hêz dibû heta gelê Îsraêl ew kir padîşah. Xwedê soza xwe anî cih û Dawid bû padîşahê Îsraêl.

Dawid padîşahekî rast bû: Wî ji dadperwerî û rastiyê hez dikir û ji neheqiyê nefret dikir. Wî ji hemû dilê xwe ji Xudan Xwedê hez dikir.
Peyva Xwedê û rûmeta Xwedê di jiyana Dawid de cihekî girîng standibûn.
Ew her dem li ser wan difikirî.
Loma çaxê ku Dawid li bajarê Orşelîmê bû padîşahê Îsraêliyan, tiştê ku pêsî wî kir, ew bû ku Konê Civînê, yanî Konê Perizînê û Sindoqa Peymanê anîn Orşelîmê. Orşelîm di dema Dawid de bûbû paytextê welatê Îsraêl, loma wî dixwest ku Konê Perizînê û gorîgeh li wir bi cih bibin.

Piştî ku Dawid Konê Perizînê anî Orşelîmê, plana wî ew bû ku perestgeheke pir spehî bide avakirin, da ku navê Xudan bê bilindkirin.

Mebesta Dawid ew bû ku Sindoqa Peymanê di wê perestgeha nû de bihata danîn.
Bi wî awayî Orşelîm wê bibûya cihê ku Îsraêliyan di ber gunehên xwe de gorî ji Xwedê re pêşkêş bikirana.
Lê belê Xwedê ji Dawid re got yekî din, yanî kurê Dawid wê Perestgeha Xwedê ava bike.
Xwedê nexwest ku Dawid jê re xaniyekî ava bike, lê dixwest ku ew bi xwe malekê ji Dawid re ava bike, yanî wê dûndana ku her û her bimîne, bide wî.
Guhên xwe bidinê ka Xwedê çi peyman bi Dawid re girêda. Wî jê re got:

[12] «Çaxê ku rojên te temam bibin û tu herî ba bav û kalên xwe, ezê piştî te dûndana te rakim; ewê ji pişta te be û ezê padîşahiya wî qayîm bikim. [13] Yê ku wê ji Navê min re xaniyekî ava bike ew e û ezê textê padîşahiya wî her û her qayîm bikim. [14] Ezê ji wî re bibim bav û ewê ji min re bibe kur… [16] Mala te û padîşahiya te wê her û her li ber min bisekinin; textê te wê her û her bimîne.»
(Samûêl II, 7:12-14.16)

Bi rastî ew peyman sozeke pir mezin bû û hişê mirov vê yekê nastîne!
Xwedê ji Dawid re soz da ku mala te û padîşahiya te wê her û her li ber min bisekinin; textê te wê her û her bimîne.»

Ma Xwedê çi got? Padîşahiya Dawid çawa wê her û her bidomanda?
Ma Dawid ne mirovek wek mirovên din bû?
Bersiva van pirsan ev e: Xwedê ji Dawid re soz da ku yek ji dûndana wî wê padîşahiyeke herheyî damezrîne.
Ji dûndana Dawid padîşahek wê bihata dinyayê û wê desthilatî bistanda ku li erdê û li û ezmên her û her padîşah bûya. Navê wî wê bibûya Padîşahê padîşahan, Xudanê xudanan û Serokê aştiyê.
Li dor sê sed salan piştî Dawid û li dor heft sed salan beriya ku ew Padîşahê padîşahan bê, Îşaya pêxember ev gotinên ha nivîsîn:

[6] «Zarokek ji me re çêbû, kurek ji me re hat dayîn; seroktî wê li ser milê wî be.
Navên wî wê ev bin: Şîretkarê newaze, Xwedayê hêzdar, Bavê herheyî,
Serokê aştiyê.
[7] Dawiya zêdebûna aştî û seroktiya wî nayê;
ewê li ser textê Dawid rûne û li ser padîşahiya wî be;
ji niha û heta hetayê ewê wê bi heq û bi rastdariyê qayîm bike û biparêze.
Xîreta Xudanê Ordiyan wê vê yekê bike.» (Îşaya 9:5.7)

Gelo ma hûn dizanin ka di nav dûndana Dawid padîşah de kê desthilatî stand, ku her û her bibe hukumdar û padîşah? Ma hûn dizanin ku di Roja Dawî de kî wê dîwana zarokên Adem bike û her û her padîşah bimîne?
Erê, ew kes Xilaskarê dinyayê ye. Erê, ew kes padîşahê ku ji ezmanan hat xwar e. Ew ji keçikekê çêbû û ew keçik ji dûndana Dawid padîşah bû.
Li ser vî Padîşahê padîşahan Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Xwedê ew gelek bilind kir û navê di ser her navî re da wî. (Filîpî 2:9)

Çaxê Dawid plana Xwedê fêm kir, wî deverû xwe avêt erdê, pesnê Xudan da û got:

[18] «Ya Xudan Xwedê, ez kî me û mala min çi ye ku te ez heta bi vir anîm?
[19] Ya Xudanê min, ma ev di çavê te de tiştek biçûk xuya bû ku te li ser mala
xulamê xwe ji bo paşerojê jî got?
[22] Ya Xudan Xwedê, tu çiqas mezin î! Ji ber ku, li gor hemû tiştên ku me bi
guhên xwe bihîstine, tu kes wek te tune û ji te pê ve Xwedê tune. [28]
Û niha ya Xudan Xwedê, tu Xwedê yî û peyvên te rast in û te ev tiştê qenc ji
xulamê xwe re soz da. [29] Îcar bila niha li te xweş bê ku tu mala xulamê xwe
pîroz bikî, da ku her û her li ber te be.»

Erê, bi wî awayî Dawid ji Xwedê re şikir kir, çimkî Xwedê soz da wî ku Padîşahê padîşahan wê ji dûndana wî rabe.

Eger hûn Nivîsarên Pîroz bizanin, hûnê bizanin ku ji xwe Xwedê parçeyekî vê sozê anî cih. Çimkî di Încîlê de em dixwînin ku hezar salan piştî Dawid Xwedê milyaketek şand ba çend şivanên ku li aliyê Beytlehmê wek ku Dawid kiribû, keriyên xwe diçêrandin. Milyaket ji şivanan re got:

«Netirsin! Ez hatime, ku ez mizgîniya şabûneke mezin bidim we, ku ji tevahiya gel re ye. [11] Îro li bajarê Dawid xilaskarek ji we re çêbûye. Ew jî Xudan Mesîh e. (Lûqa 2:10.11)

Erê, ew Padîşahê ku Xwedê soz dabû ku wê ji dûndana Dawid bihata, hat dinyayê. Em dizanin ku ew niha dîsa li ezmanan e û li benda Roja Dawî ye.
Di wê roja tirsehêz û bi rûmet de ewê vegere, da ku li gor rastî û dadperweriyê dîwana dinyayê bike.
Wê rojê her kes wê bizane soza ku Xwedê dabû Dawid, rast e.
Çimkî hingê her kes wê bibîne ku padîşahiya herheyî heye.
Wê rojê wê bê gotin:
«Padîşahiya dinyayê bû ya Xudanê me û ya Mesîhê wî.
Ewê her û her padîşahiyê bike». (Peyxama Yûhenna 11:15)

Guhdarên delal, pir spas ku we qenc guhê xwe dayê. Di bernama ku bê de Xwedê hez bike emê bi serhatiyên Dawid berdewam bikin û emê li serhatiyeke pir bi kul û keder binêrin… Ji lewre di bernama ku bê de jî bi me re bin.

Xwedê bi we re be û we pîroz û serfiraz bike!

Di bernama xwe ya din de me dît ku Dawid çawa bû padîşahê gelê Îsraêl. Ew padîşahekî rast û dilbirehm bû û wî pirr ji Peyva Xwedê hez dikir. Lê belê heçî serhatiya îro ye, ew ne gelek bi dilê mirovan e. Dawid xerabiyeke gelek pîs kir û Xwedê ev yek qet qebûl nekir. Dawid çavê xwe avêt jina zilamekî din, bi wê re zîna kir û hingê gunehê xwe hê xerabtir û meztir kir û wî dixwest her tiştî jî veşêre.
Belkî hin hene ku dibêjin: Çima di Nivîsarên Pîroz de serhatiyeke weha heye? Nivîsarên Pîroz bi xwe bersiva vê pirsê didin û dibêjin: Her çi hatibe nivîsîn, ji bo perwerdebûna me hatiye nivîsîn (Romayî 15:4) û dibêjin:
Ev tiştên ha ji bo ku ji me re bibin şîret, hatine nivîsîn. Ji ber vê yekê, yê ku guman dike ku qayîm disekine, bila hay ji xwe hebe, ku nekeve! (Korîntî I, 10:11.12)
Xwedê di Nivîsarên Pîroz de gunehên pêxemberan venaşêre, çimkî Xwedê dixwaze ku em ji van tiştan dersên girîng hîn bibin.

Niha em dixwazin vegerin Kitêba Samûêl a diduyan û emê binêrin ku Dawid çawa ket nav gunehan. Di deriyê yanzdehan de, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

1 De biharê de, di dema ku padîşah derdikevin cengê de, Dawid serdarê leşkerên xwe Yoab û hemû Îsraêl bi wî re şandin, ku herin şêrr.
Wan Amonî helak kirin û hawirdora bajarê Rabayê girtin. Lê belê Dawid di Orşelîmê de ma.
2 Rojekê ber êvarê Dawid ji ser kerewîtê xwe rabû û li ser banê qesra padîşah
ser xwe digeriya. Wî ji ser bên jineke ku xwe dişuşt dît û jinik bi dîtina xwe
gelek spehî bû. 3 Îcar Dawid hin şandin û li ser jinikê pirsyar kirin. Jê re gotin:
«Ev jinik jina Ûriyayê Hîtî Batşêba ye.»

[4] Îcar Dawid qasid şandin pey wê, ku wê bînin. Jinik hat ba Dawid û ew bi wê re
raza. … Hingê jinik vegeriya mala xwe. [5] Jinik bi zaro bû û xeber şand ba
Dawid û jê re got: «Ez bi zaro me.»

Piştî vê yekê Nivîsarên Pîroz diyar dikin ku Dawid çawa dixwest gunehê xwe veşêre. Çaxê wî bihîst ku Batşêba bi zaro ye, wî ji serdarê leşkerên xwe Yoab re xeber şand û emir li wî kir ku mêrê Batşêbayê bişîne ba wî.
Heçî Ûriyayê Hîtî bû, ew di ordiya gelê Îsraêl de mêrxasek bû.
Yoab jî li gor emrê padîşahê xwe kir û Ûriya şand ba Dawid.

[7] Dema Ûriya hat ba Dawid, wî jê pirsî got: «Yoab çawa ye? Gel çawa ye?
Ceng di çi rewşê de ye?» [8] Hingê Dawid ji Ûriya got: «Dakeve mala xwe û
lingên xwe bişo.»
Îcar Ûriya ji qesr derket û padîşah diyariyek li pey wî şand. [9] Lê belê Ûriya di
dergehê qesrê padîşah de, bi hemû xulamên mîrzayê xwe re raza û daneket mala
xwe. [10] Çaxê ji Dawid re gotin ku Ûriya daneketibû mala xwe, wî ji Ûriya re got:
«Ma tu ne ji riyeke dûr hatiyî? Çima tu daneketî mala xwe?»
[11] Ûriya ji Dawid re got: «Sindoqa Peymanê û Îsraêl û Cihûda di bin kolikan de
rûdinin; mîrzayê min Yoab û xulamên mîrzayê min cihê xwe danîne çol û
beyaran. Ma ez çawa dakevim mala xwe, da ku ez bixwim, vexwim û bi jina
xwe re razim? Hema bi jiyana te, ez vê yekê nakim.»

[12] Dawid ji Ûriya re got: «Îro jî li vê derê bimîne; sibê ez te bişînim.»
Îcar Ûriya wê rojê û roja din li Orşelîmê ma, lê belê ew daneket mala xwe.
[14] Sibehî Dawid ji Yoab re name nivîsî û bi destê Ûriya şand.
[15] Wî di namê de nivîsî, got: «Di şerrê germ de Ûriya bixin rêza pêşî û xwe ji ba
wî bidin aliyekê, ku ew lê bixin û ew bimire.»
[16] Çaxê ku Yoab dor li bajêr girtibû, Ûriya li hember wî cihê ku dizanî mêrxas lê
ne, danî.

17 Zilamên bajêr derketin û bi Yoab re şerr kirin û ji gel, ji xulamên Dawid hinek
ketin û Ûriyayê Hîtî jî mir. 18 Hingê Yoab ji Dawid re xeber şand û li ser şer
hemû tiştî jê re got. Got: ‹Xulamê te Ûriya jî mir.›»

26 Çaxê jina Ûriya bihîst ku mêrê wê mir, wê ji bo wî şîn girt. 27 Û dema şîna wê
derbas bû, Dawid rê kir pey wê û ew anî mala xwe û ew bû jina wî û jê re kurek
anî. Lê belê tiştê ku Dawid kiribû di çavê Xudan de xerab bû.

1 Îcar Xudan Natan pêxember şand ba Dawid. Ew hat ba wî û jê re got:
«Di bajarekî de du zilam hebûn, yek dewlemend û yê din belengaz bû.
2 Pez û dewarên zilamê dewlemend zehf gelek hebûn.
3 Lê yê belengaz ji berxikeke ku kirrîbû û xweyî kiribû pê ve tiştekî wî nebû.
Û berxik li ba wî û bi zarokên wî re mezin bûbû û ji pariyê wî dixwar, ji piyana
wî vedixwar û di berê wî de radiza û wek keça wî bû.
4 Îcar rêwiyek hat ba zilamê dewlemend û wî dilneda ku ji miyên xwe an jî
dewarên xwe hilde û ji bo wî rêwiyê ku hatibû ba wî amade bike. Lê wî berxika
zilamê belengaz stand û ew ji bo wî zilamê ku hatibû ba wî amade kir.»

5 Hingê hêrsa Dawid li hember wî zilamî gelek rabû û wî ji Natan re got:
«Hema bi navê Xudanê zindî ew zilamê ku ev yek kiriye, yê kuştinê ye.
6 Ji ber ku wî ev yek kiriye û dilê wî lê neşewitiye, divê ew berxikê çar qet bi
şonde bide.»
7 Hingê Natan ji Dawid re got: «Ew zilam tu yî. Xudan Xwedayê Îsraêl, weha
dibêje: ‹Min tu bi padîşahtî li ser Îsraêl mesh kirî. Min tu ji destê Şawûl xilas
kirî. 8 … Min mala Îsraêl û mala Cihûda dane te. Û eger ev hindik bûna, minê hê
çiqas din bida te. 9 Çima te ya ku di çavê Xudan de xerab bû kir û peyva wî kêm
dît? Te Ûriyayê Hîtî bi şûr kuşt û te jina wî ji xwe re anî, bi şûrê Amoniyan te
Ûriya da kuştin. 10 Niha ji bo vê yekê şûr tu caran ji mala te dernakeve, çimkî te
ez kêm dîtim û te jina Ûriyayê Hîtî ji xwe re anî.› 11 Xudan weha dibêje: ‹Va ye,
ezê ji mala te bi xwe li hember te xerabiyê derînim.

Ezê li ber çavên te rahêjim jinên te û bidim cîranê te û li ber çavê vê rojê, ewê bi jinên te re raze. [12] Çimkî te bi dizî kir, lê belê ezê vî tiştî li ber çavê hemû Îsraêl û roj nava rojê bikim.›»

[13] Hingê Dawid ji Natan re got: «Min li hember Xudan guneh kir.»

Natan ji Dawid re got: «Xudan gunehê te paqij kir, tu namirî. [14] Lê belê ji ber ku te bi vê kirinê fersendeke mezin da dijminên Xudan, da ku çêran bikin, ew zarokê ku ji te re çêbûye, eseh wê bimire.» [15] Hingê Natan çû mala xwe.

Erê, guhdarên delal, serhatiya Dawid û Batşêbayê ev e û qenc e ku em van ayetên Zebûrê bînin bîra xwe yên ku dibêjin:

Ya Xudan, te ez ceribandim û tu min nas dikî.
Tu rabûn û rûniştina min dizanî; tu fikirîna min ji dûr ve fêm dikî.
Haya te ji derketina min û ji raketina min heye û tu hemû riyên min qenc dizanî.
Ya Xudan, hê peyvek li ser zimanê min neyî, tu wê bi tevahî dizanî. (139:1-4)
Ya Xwedê, tu bêaqiliya min dizanî û gunehên min ji te ne veşartî ne. (69:6)

Guhdarên delal, di bernama ku bê de emê hê bêtir li vê serhatiyê û li mana wê binêrin. Ji kerema xwe hingê jî bi me re bin, ku em bi alîkariya Xwedê tiştên bi kêr hîn bibin!

Di bernama me ya din de me dît ku Dawid padîşah çavê xwe avêt jina zilamekî din, bi wê re zîna kir û hingê gunehê xwe hê xerabtir û meztir kir û wî dixwest her tiştî jî veşêre. Me dît ku Xwedê ev yek qet qebûl nekir û pêxemberê xwe Natan şand ba Dawid, da ku wî hişyar bike. Me bihîst ku Natan meseleyek ji Dawid re got û bi vî awayî ji Dawid re şîrove kir ku wî çi tiştê xerab kiriye. Dawid jî gotina Natan pêxember qebûl kir, gunehê xwe eşkere kir û li ber Xwedê tobe kir. Dîsa jî kurê Dawid ê ji Batşêbayê li gor biryara Xwedayê pîroz mir.

Di deriyên ku bên de, Nivîsarên Pîroz kifş dikin ku ji vî gunehê Dawid di mala wî de hê gelek xemgînî û tengahiyên din derketin. Lê belê Peyva Xwedê weha dibêje: «Li dera ku guneh lê zêde bûye, kerem hê bêtir zêde bûye.» (Romayî 5:20) Loma em di wextê ku îro ji me re maye de binêrin ka Xwedê çawa kerem li Dawid kir û li hemû gunehên wî bihûrt.

Çima Xwedê gunehên Dawid bexişandin?

Gelo we bersiva Dawid bihîst? Çaxê ku Natan pêxember jê re got: «Ew zilam tu yî», wî çi got? Bi rastî Natan pêxemberekî bi zirav bû; loma wî dikaribû ku weha ji padîşahê mezin Dawid re bêje. Lê belê Dawid çi bersiv da? Ma Dawid Natan pêxember avêt zîndanê? Ma ew da kuştin? Nexêr. Bi rastî gelek padîşah hebûn ku weha kirin, yanî pêxember avêtin zîndanê an jî kuştin. Lê belê Dawid weha nekir. Ma Dawid got: «Ew tişt daxwaza Xwedê bû»? Ma wî got: «Xwedê qenc e! Ew dizane ku min gelek tiştên qenc jî kirine; ez hêvî dikim ku ew xerabiyên min bibexişîne.» Ma Dawid tiştekî weha got? Nexêr, Dawid qet weha negot. Bersiva wî tenê ev bû: Min guneh kir! «Min li hember Xudan guneh kir.» Eger em bixwazin hê bêtir fêm bikin ka Dawid çawa gunehê xwe li ber Xwedê eşkere kir, hingê divê em di Kitêba Zebûrê de bixwînin. Piştî ku Natan çû ba Dawid û ew hişyar kir, ji bo ku ew çûbû ba Batşêbayê û bi wê re razabû, Dawid zebûrek nivîsî. Di wê zebûrê de Dawid xwe li ber Xwedê şkênand, dua kir.

Di Zebûr 51 de, Dawid weha got:

[3] Ya Xwedê, li gor dilovaniya xwe, keremê li min bike;
Li gor rehma xwe ya gelek, zêdegaviyên min xîş bike.
[4] Min ji sûcê min yekser bişo û min ji gunehê min paqij bike.
[5] Çimkî ez neguhdariyên xwe dizanim û gunehê min hergav li ber min e.
[6] Li hember te, bi tenê li hember te min guneh kir û di çavê te de min tiştê xerab kir. Wusa ku tu di gotinên xwe de dadperwer bî û çaxê tu hukum bikî, tu rast bî.
[7] Va ye, gava ku ez ji dayik bûm, di hevênê min de guneh hebû
û hê di malzaroka diya xwe de, ez bi sûc bûm.
[8] Erê, tu di dil de rastiyê dixwazî
û tu di hundirê min de şehrezayiyê bi min didî zanîn.
[9] Min bi gûrizê paqij bike, ezê paqij bibim;
min bişo, ezê ji berfê jî spîtir bibim. …
[12] Ya Xwedê, di hindurê min de dilê paqij biafirîne û di dilê min de ruhê rast nûvejen bike…
[19] Qurbanên ku li Xwedê xweş tên, ruhê şkestî ye;
ya Xwedê, dilekî şkestî û poşman tu kêm nabînî.

Bi vî awayî Dawid tobe kir û ji gunehê xwe vegeriya. Dawid li ser gunehê xwe gelek xemgîn bû. Wî xwe li ber Xwedê nizim kir û dilê wî şkest.
Dawid ne mîna mirovên din bû ên ku dîndar in lê dîsa jî roj bi roj di nav gunehan de dijîn. Rast e, Dawid ketibû çala gunehan, lê wî qet nedikarî di nav gunehan de bijiya, çimkî wî ji Xwedê hez dikir û dizanî ku Xwedê ronahî ye û li ba wî qet tarî tune. (Yûhenna I, 1:5)

Piştî ku Dawid tobe kir û ji gunehê xwe vegeriya, gelo Xwedê çi jê re got? Ma Xwedê jê re got: «Zû rabe, xêr û kirinên qenc bike û ezê gunehên te xîş bikim»? Nexêr, Xwedê weha negot. Xwedê bi devê Natan pêxember jê re got: «Xudan gunehê te paqij kir, tu namirî.» (Samûêl II, 12:15)

Piştî wan tiştan, Dawid di Zebûrê de li ser xwezikdariya wan mirovên ku Xwedê gunehên wan bexişandine, nivîsî û got:

«Xwezî bi wî yê ku li neheqiyên wî hatiye bihûrtin û gunehên wî hatine nixumandin.
Xwezî bi wî mirovê ku Xudan ji wî re guneh hesab nake û di ruhê wî de hîle tune.» (Zebûr 32:1.2; Romayî 4:7)

Erê, Xwedê gunehê Dawid bexişand û ew rastdar hesab kir. Û wek ku me dît, sedema vê yekê ne xêr û karên wî yên qenc bûn. Xwedê li gunehê wî bihûrt, lê belê mana vê ne ew bû ku qet zehmet, xemgînî û tengahî ji wî gunehî derneketin. Na, lê mana wê ew e ku di Roja Dawî de Xwedê gunehên Dawid nayne bîra xwe. Ew guneh ji kitêbê hatin xîşkirin!

Çawa çêdibû ku Xwedê weha bikira? Gelo ma Xwedê çawa dikarî gunehan bibexişîne û dîsa jî rast û dadperwer bimîne? Ma Xwedê ji nişkê ve got: «Gunehê Dawid û xerabiya wî ne xema min e!» Nexêr, Xwedê wusa negot, çimkî ew dadgerekî rast e û qet kêfa wî ji gunehan re nayê û çavên xwe li gunehan naneqîne. Lê belê çawa gunehê Dawid di çavê dadgerê rast de hat bexişandin?

Gelo tê bîra we ku Dawid di duyayên xwe de çi gotibû? Çaxê ku wî gunehê xwe nas kir, wî got:
Ya Xudan, «min ji sûcê min yekser bişo û min ji gunehê min paqij bike.
Min bi gûrizê paqij bike, ezê paqij bibim; min bişo, ezê ji berfê jî spîtir bibim.»
Xwedê emir li gelê Îsraêl kiribû ku bi çiqilên gûrizê xwîna goriyan bireşînin. Xwîna rijandî ji bo Xilaskarê ku wê bihata dinyayê, mînakek bû, çimkî ewê bi dilxwazî bimira û wê xwîna xwe birijanda, da ku gunehên me bihatana bexişandin.

Xwedê gunehên Dawid afû kirin, çimkî Dawid tobe kir û ji gunehên xwe li Xwedê vegeriya. Wî bawer kir ku hêza Xwedê heye ku wî bi mirina Xilaskarê ku wê bihata, paqij bike.
Ma Xwedê li gor rehma xwe hemû gunehên Dawid bexişandin?
Ma Xwedê dilê Dawid paqij kir û ew rast hesab kir? Erê, wî weha kir!
Sedem çi bû? Sedem ew bû ku Dawid gunehê xwe dît û ew eşkere kir û jê vegeriya, yanî wî tobe kir. Herweha wî ji peyv û sozên Xwedê bawer kir. Xwedê gotibû ku ewê Xilaskar bişîne dinyayê, da ku ew cezayê gunehan hildigire ser xwe. Ji ber ku Dawid ji vê soza Xwedê bawer kir, dilê wî şa dibû û wî di Zebûrê de nivîsî:
«Xwezî bi wî yê ku li neheqiyên wî hatiye bihûrtin û gunehên wî hatine nixumandin.
Xwezî bi wî mirovê ku Xudan ji wî re guneh hesab nake û di ruhê wî de hîle tune.» (Zebûr 32:1.2)

Guhdarên delal, gelek spas ku we qenc guhê xwe da serhatiya Dawid.
Di bernameyên ku bên de Xwedê hez bike emê li Kitêba Zebûrê binêrin û emê bibînin ku Dawid li ser Xilaskarê ku wê bihata dinyayê, da ku ji bo her û her gunehên me bibexişandan, çi pêxemberîtî kirine.

Heta hingê van gotinên Dawid bînin bîra xwe. Di Zebûrê de wî weha gotiye:

«Xwezî bi wî yê ku li neheqiyên wî hatiye bihûrtin û gunehên wî hatine nixumandin.
Xwezî bi wî mirovê ku Xudan ji wî re guneh hesab nake û di ruhê wî de hîle tune.» (Zebûr 32:1.2)

[Guhdarên hêja, de hûn jî wek Dawid xwe li ber Xwedê nizim bikin, baweriya xwe bi peyv û sozên wî bînin û ji bo ku li gunehên we jî bibihûre, rehm û keremê ji wî bixwazin. Di Nivîsarên Pîroz de dibêje: Xwedê li dijî pozbilindan disekine, lê rehmê li nefsbiçûkan dike. Xwedê we pîroz û serfiraz bike!]

Di her çar bernameyên bihûrtî de me li serhatiyên Dawid pêxember nêrî.
Me dît ku Dawid şivan bû, li çengê dixist, stran dinivîsîn, ji Peyva Xwedê hez dikir, di şerran de mêrxas bû, bû padîşahê gelê Îsraêl û pêxemberê Xwedê.
Di bernama din de me dît ku Dawid jî wek mirovên din gunehkar bû;
wî xerabiyeke pir mezin û pîs kir û ev yek li Xwedê qet xweş nehat.
Lê herweha me dît ku Xwedê gunehên Dawid bexişandin, çimkî wî ji dil û can tobe kir û ji gunehên xwe vegeriya. Dawid ji sozên ku Xwedê li ser hatina Xilaskarê dinyayê dabûn, bawer kir.

Îro em dixwazin li kitêbeke ku bi helbestkî hatiye nivîsandin, binêrin.
Ev kitêb di nîvê Nivîsarên Pîroz de tê dîtin. Ma hûn navê vê kitêbê dizanin? Erê, ev Kitêba Zebûrê ye. Di vê kitêbê de 150 zebûr an stran hene.
Xwedê ew stran bi destê çend pêxemberan di nav çend sed salan de dan nivîsandin. Mûsa, Silêman, Asaf û kurên Korax jî di nav helbestvanan de bûn.
Lê belê Dawid ji hemû pêxemberan zêdetir zebûr nivîsandin.
Îro em dixwazin li ser herdu zebûrên pêşî lêkolînê bikin.

Zebûra yekê nîşanî me dide ku li ser dinyayê du cûreyê mirovan hene: Mirovên ku di riya rastdariyê de diçin û mirovên ku di riya neheqiyê de diçin.

Di zebûra pêşî de weha nivîsî ye:

1 Xwezî bi wî mirovê ku bi şîreta xeraban rêve naçe,
Di riya gunehkaran de nasekine û di civata tinazkeran de rûnane.
2 Lê belê dilê wî bi Şerîeta Xwedê şa dibe,
Şev û roj li ser Şerîeta wî kûr difikire.
3 Ew wek dara ku li ber ava herikdar hatiye çandin e;
Ew fêkiyê xwe di demsala xwe de dide û pelên wê naçilmisin.

Her karê ku dike jî, jê re qenc pêk tê.
[4] Yên xerab  ne weha ne, lê wek kaya hûr in  a ku li ber bayê diçe.
[5] Ji ber vê yekê yên xerab  di roja hukum de
û yên gunehkar di civîna rastan de nasekinin.
[6] Çimkî çavê Xudan li  riya rastan e, lê belê riya xeraban tune dibe, diçe..

Em dibînin ku du rê hene:
Riya mirovên pîroz û bimbarekkirî û riya mirovên ku helak dibin.
Her kes dixwaze pîroz û bimbarek bibe. Tu kes tune ku bixwaze helak bibe!
Xwedê jî dixwaze ku her kes pîroz û bimbarek bibe. Ji bo ku mirov bê bimbarekkirin, divê ku ew di riya bereketê de biçe, yanî di riya ku Xwedê amade kiriye de here.
Ew riya ku bereketê dide mirovan kîjan e? Di zebûra pêşî de ew weha tê şîrovekirin:
1) Hûn di riya wan mirovên ku tinaz û tevzê xwe li Peyva Xwedê dikin de neçin.
2) Hûn kûr li ser Peyva Xwedê bifikirin, da ku hûn wê fêm bikin, jê bawer bikin û riya xilasiyê ya ku Xwedê amade kiriye, bibînin û qebûl bikin.

Eger tu ji riya rastdariya ku Xwedê amade kiriye bawer bikî û di wê de biçî, tê wek dara ku li ber ava herikdar hatiye çandin bî. Bingehê jiyana te wê Xwedê bi xwe be û berê wê jiyanê wê hezkirin, şahî, aştî û gelek tiştên din ên qenc bin.
Lê belê eger tu di riya rastdariyê de neçî, tê wek kaya hûr a ku li  ber bayê diçe, helak bibî.

Niha em pêşve herin û li zebûra diduyan binêrin.
Di vê zebûrê de Xwedê gotinên li ser Xilaskarê ku wê bihata dinyayê xistin devê Dawid pêxember. Qenc guhê xwe bidin peyama Xwedê ya bi devê Dawid.
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

[1] Çima milet di nav hev de dişêwirin û netew tiştên pûç difikirin?

2 Padîşahên dinyayê radibin û hukumdar li hember Xudan û li hember
meshkiriyê wî bi hev re şêwira xwe dikin, dibêjin:
3 «Em zincîrên wan biqetînin û em werîsên wan ji ser xwe bavêjin!»
4 Yê ku li ezmanan rûdine dikene, Xudan tevzê xwe li wan dike.
5 Hingê wê bi hêrsa xwe ji wan re bêje, wê bi xezeba xwe wan bixe tengahiyê û
bêje: 6 «Min padîşahê xwe danî ser çiyayê xwe yê pîroz Siyon.»
7 Ez fermana Xudan didim bihîstin, Wî ji min re got: «Tu kurê min î, îro tu ji
min re bûyî.
8 Ji min bixwaze û ezê bi mîrasî miletan û bi milkîtî kujên rûyê erdê bidim te.
9 Tê bi gopalê hesin serweriyê li wan bikî û wek firaxên cerîn tê wan bişkênî.»
10 Loma, ey padîşahno, şehreza bin! Ey serwerên dinyayê, werin ser hişê xwe!
11 Bi tirs ji Xudan re xizmetê bikin, bi lerizînê dilxweş bibin.
12 Kur maç bikin, da ku ew hêrs nekeve û hûn di rê de helak nebin,
çimkî hêrsa wî bi derbekê radibe. Xwezî bi hemûyên ku xwe dispêrin wî.

Gelo ma hûn fêm dikin ka Xudan Xwedê di vê zebûrê de çi diyar dike?
Tiştê ku wî got, bi rastî gelek girîng e!
Di vê zebûrê de Xwedê sê navên Xilaskarê ku wê bihata dinyayê, kifş dike.
Gelo we ew her sê navên wî yê ku wê zarokên Adem xilas bikiran, bihîstin?
Ew her sê nav ev in: Mesîh, Padîşah û Kur.
Em dixwazin li ser mana van her sê navan hinekî bifikirin, çimkî Xwedê bi devê Dawid pêxember ev nav ji me re gotin:

1) Pêşî em dibînin ku Xwedê ji Xilaskar re dibêje: Yê meshkirî, yanî Mesîh.
Mesîh peyveke Îbranî ye û mana wê ev e: Yê ku rûn bi serê wî de hatiye kirin, yanî yê ku ji aliyê Xwedê ve hatiye bijartin.
Bi navê Mesîh, Xwedê ji zarokên Adem re got ku divê her kes baweriya xwe bi Xilaskarê dinyayê bîne û wî qebûl bike. Çimkî Xwedê bi xwe, ew Xilaskar û dadgerê dinyayê bijartiye.

Lê belê di her sê ayetên pêşî de Xwedê ji pêşî ve gotiye ku piraniya zarokên Adem wî Mesîhê ku Xwedê wê bişanda dinyayê, qebûl nakin.
Em careke din van ayetên zebûra diduyan bixwînin:

1 Çima milet di nav hev de dişêwirin û netew tiştên pûç difikirin?
2 Padîşahên dinyayê radibin û hukumdar li hember Xudan û li hember meshkiriyê wî bi hev re şêwira xwe dikin, dibêjin: 3 «Em zincîrên wan biqetînin û em werîsên wan ji ser xwe bavêjin!» (Zebûr 2:1-3)

Gelo çima miletên vê dinyayê wê ew Mesîhê ku Xwedê bişanda dinyayê, qebûl nekiran?
Sedem ev e: Mesîh wê yekî pîroz bûya, ewê ji gunehan bêrî bûya û Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin: Her kesê ku xerabiyê dike, kîna wî ji ronahiyê heye; ew ber bi ronahiyê ve nayê, da ku kirinên wî xuya nebin. (Yûhenna 3:20)

Loma Cihû û miletên din ên li ser rûyê erdê bi hev re li hember Pîrozê Xwedê rabûn û ew qebûl nekirin.
Guhdarên delal, heçî hûn in, ma hûn Mesîhê Xwedê yê pîroz û peyvên wî qebûl dikin, an hûn li hember Mesîhê Xwedê radibin?
Xwedê di vê yekê de dilê we veke û şehrezayiyê bide we!

Di bernama ku bê de emê li herdu navên Xilaskar ên din binêrin û em ji bo vê yekê jî li hêviya we ne.
Heta hingê Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dest pê kir, li zebûra diduyan nêrî.
Me dît ku di vê zebûra Dawid de, ji Xilaskar re sê nav tên gotin. Ew her sê nav jî ev in: Mesîh, Padîşah û Kur.

Me dît ku Xwedê Mesih hilbijart, ku bibe Xilaskar; lê belê Xwedê di ayetên vê zebûrê de ji pêşî ve got ku Cihû û miletên din ên li ser rûyê erdê wê bi hev re li hember Pîrozê Xwedê rabin.
Ji xwe Xwedê ji destpêkê ve dizanî ku mirovan wê çi bikira û çi biceribandan.
Lê tu tişt nikare ji Xwedê re bibe asteng û daxwaza wî qet nayê guhertin û eynî dimîne: Xwedê ji destpêkê ve dixwest ku gunehkaran xilas bike.
Loma em di vê zebûrê de dixwînin:
4 Yê ku li ezmanan rûdine dikene, Xudan tevzê xwe li wan dike.

Îcar me dît ku navê pêşî yê ku Xwedê dide Xilaskar Mesîh e.
Belkî hûn dizanin ku mana peyva Îbranî Mesîh û peyva Yûnanî Xirîst eynî tişt e.
Mana herduyan ev e: Yê ku rûn bi serê wî de hatî kirin, yanî yê ku ji aliyê Xwedê ve hatî hilbijartin.

2) Navê Xilaskar ê diduyan Padîşah e. Xilaskar hem Mesîh û hem jî Padîşah e.
Bi vî navî Xwedê dixwaze hînî me bike ku Mesîh wê di dawiya dinyayê de dîwana hemûyan bike.
Rast e, piraniya mirovan vê yekê qebûl nakin, lê di Roja Dawî de her kes wê li ber wî here ser çokan, çimkî Xwedê bi xwe ew Padîşahê padîşahan û Xudanê xudanan kifş kiriye.
Ji vir em fêm dikin ku Mesîh an wê Xilaskarê min û te be, an wê dadgerê min û te be, çimkî me bivê û me nevê, yekî din ê ku Xwedê kifş kiribe, da ku her û her padîşah be, tune.

3) Beriya ku em li ser mana navê Xilaskar ê sisiyan bifikirin, divê ku em bînin bîra xwe, her tiştê ku di Zebûrê de nivîsî ye, bi rêberiya Xwedê û li gor şehrezayiya Xwedê hatiye nivîsîn.
Herweha divê ku em bînin ber çavê xwe ku carna di Nivîsarên Pêxemberan de peyv û dabaşên zehmet hene – lê belê ew dîsa rast in. Xwedê me li ser vê yekê hişyar dike û di Peyva xwe de dibêje:
Di wan de hin tişt hene ku fêmkirina wan zehmet e. Yên nezan û dilê wan xilupilo van çewt şîrove dikin û bi kirina vê yekê helakbûna xwe tînin. (Petrûs II, 3:16)
Nezanî tiştekî pir xerab e. Eger em li ser Mesîhê ku Xwedê hilbijart, da ku ew zarokên Adem ji helakbûna herheyî xilas bike, nezan bin, ev yek hê xerabtir e. Gotina pêşiyan dibêje: Nezanê neguhdar, dikeve derdê bê derman.

Niha em vegerin zebûra diduyan. Di ayeta 7’an de em dixwînin ku Mesîh dibêje:
7 Ez fermana Xudan didim bihîstin, Wî ji min re got: «Tu kurê min î, îro tu ji min re bûyî.»
Gelo we bihîst ku Xudan ji Mesîh re çi dibêje? Wî got: «Tu kurê min î, îro tu ji min re bûyî.»
Ma ev ne ecêb e? Gelo hûn dizanin Xwedê çima ji Mesîh re got: «Kurê min»? Ma hûn dizanin ku mana rast a vî navî çi ye?
Em hemû dizanin ku mana vî navî ji aliyê hin mirov ve çawa xelet tê fêmkirin, lê pirsa me ne ew e. Mana vî navî ne ew e ku Xwedê jin ji xwe re anî û wê jê re zarok anî. Fikirîna weha dûrî me be!
Yê ku weha bifikire, çêrî Xwedê dike û ewê cezayê xwe bistîne.
Xwedê ruh e û wek  ku ji mirovan re zarok çedibin, kurê wî yê wusa tune.
Madem ku wusa ye, çima Xwedê ji Mesîh re got: «Tu kurê min î.»
Şikir ji Xwedê re, çimkî Xwedê bi xwe ev yek ji me re şîrove kiriye.
Em dixwazin di Nivîsarên Pêxemberan de li sê sedeman binêrin, ka çima Xwedê ji Mesîh re got Kurê min.

Divê ku pêşî em fêm bikin ku Xwedê weha got, **çimkî Mesîh ji jor hat**, yanî ew ji ezmên hat. Her kesê ku ji Nivîsarên Pêxemberan bawer dike, dizane ku Mesîh ne ji nav mirovan rabû, lê ji Xwedê hat. Her kes dizane ku li ser vê dinyayê bavê Mesîh nebû.
Heçî dema wî ya li ser vê dinyayê ye, ew ji malbata Dawid hat, çimkî ew ji keçikekê çêbû û ew keçik ji malbata Dawid bû. Lê li ser erdê bavê wî nebû;
ji vî aliyî ve, bi tevahî Mesîh bi tenê ji Ruhê Pîroz hat. Loma gelek rast bû ku Xwedê ji Mesîh re bigota: «Tu kurê min î, îro tu ji min re bûyî.»

Ya diduyan ev e: Li gor Nivîsarên Pîroz qerektêr û xasîtiya  Xwedê û Mesîh yek in. Ew wek hev pîroz in. Kur li bavê xwe tê. Wek ku Xwedê bi xwe pîroz û paqji e, diviya ku Xilaskarê sozdayî jî pîroz û paqij bûya.
Loma Xwedê jê re got Kurê min. Niha wextê me gelek tune ku em hûr û kûr li vê yekê binêrin, lê çaxê ku em li Încîlê binêrin, emê bibînin ku Mesîh ne wek zarokên Adem ên murdar û gunehkar e.
Me gelek caran dît ku pêxemberan jî guneh dikirin, lê belê Mesîh tu caran guneh nekir. Wî her gav û bi awayekî bêkêmahî daxwaza Xwedê pêk anî. Mesîh hat dinyayê, da ku gunehkaran ji gunehên wan xilas bike; loma diviya ku ew bê guneh bûya.
Eger deynê te du milyon dolar be û deynê hevalê te jî du milyon dolar be, ma hingê tu dikarî deynê wî bidî? Ji xwe tu nikarî, çimkî tu bi xwe deyndar î!
Lê belê Mesîh ji guneh bêrî bû, tu deynê wî nebû.
Nivîsarên Pîroz li ser wî weha dibêjin: Ew pîroz, bêsûc, bêqusûr, ji gunehkaran veqetiyayî û ji ezmanan hê bilindtir e. (Îbranî 7:26)
Erê, wek ku Xwedayê ku ew şand pîroz û paqij e, Xilaskar jî pîroz û paqij e.
Ji ber vê yekê Xwedê şerm nake ku jê re bêje: Kurê min.

Ya sisiyan: Divê em bizanin ku Xwedê bi vî navî ew ji hemû pêxemberên din cihê kir. Li ser Birahîm hat gotin «Dostê Xwedê».

Ji Mûsa re hat gotin «Zilamê Xwedê». Li ser Dawid Xwedê got: «Min zilamekî li gor dilê xwe dît». Lê Xwedê ji kîjan pêxemberî re got: «Tu kurê min î, îro tu ji min re bûyî»?
Bi tenê li ser Mesîh tiştekî weha tê gotin, çimkî Mesîh tenê ji ezmên hat, ew tenê ji keçikekê çêbû û ew tenê ji gunehan bêrî bû.

Guhdarên delal, gelo ma hûn Mesîh, yanî Padîşahê ku Xwedê jê re dibêje Kur, nas dikin? Xwedê ji her kesî dixwaze ku ew baweriya xwe bi wî bîne, guhê xwe bide wî û wî qebûl bike. Dawid di dawiya vê zebûrê de weha dibêje:

[10] Loma, ey padîşahno, şehreza bin! Ey serwerên dinyayê, werin ser hişê xwe! [11]
Bi tirs ji Xudan re xizmetê bikin, bi lerizînê dilxweş bibin.
[12] Kur maç bikin, da ku ew hêrs nekeve û hûn di rê de helak nebin, çimkî hêrsa wî bi derbekê radibe. Xwezî bi wan hemûyên ku xwe dispêrin wî. (Zebûr 2:10-12)

Divê îro em li vir rawestin. Di bernameya ku bê de Xwedê hez bike emê li zebûreke din a Dawid binêrin…

Heta hingê van gotinên Dawid pêxember bînin bîra xwe. Wî di Zebûrê de got:
[10] Şehreza bin! …Werin ser hişê xwe! [11] Bi tirs ji Xudan re xizmetê bikin, bi lerizînê dilxweş bibin. [12] Kur maç bikin, da ku ew hêrs nekeve û hûn di rê de helak nebin, çimkî hêrsa wî bi derbekê radibe. Xwezî bi wan hemûyên ku xwe dispêrin wî. (Zebûr 2:10-12)

Îro jî emê li zebûreke Dawid pêxember binêrin.
Di Kitêba Zebûrê de 150 zebûr hene û cara din me li herdu zebûrên pêşî nêrî.
Ji xwe em nikarin li hemû zebûran binêrin, lê belê îro em dixwazin careke din zebûrekê ji we re bixwînin.

Zebûr 22'an gelek girîng e, ji ber ku tê de tê gotin ku Mesîh wê di nav êş û janên dijwar de bimire, da ku deynê gunehên hemû zarokên Adem bide.
Dawid li dor hezar salan beriya hatina Mesîh ev zebûr nivîsî û wî ji kêmahî ve 30 bûyerên roja mirina Mesîh ji pêşî ve di vê zebûrê de gotin.
Çaxê ku em Mizgîniyê, yanî Încîlê bixwînin, hingê emê rastî serhatiya Mesîh bên û emê bibînin ku yek bi yek her tişt li gor gotinên pêxemberê Xwedê Dawid çêbûn. Ji vê yekê em fêm dikin ku em dikarin piştrast bin ku ev zebûr ne karê hişê mirov e, lê nivîskarê vê zebûrê bi rastî Xwedê bi xwe ye.
Bi tenê Xwedê dikaribû bi vî awayî rast û rast li ser tiştên ku piştre wê çêbûna pêxemberîtî bidan kirin.

Niha emê zebûra 22'an bixwînin û lê binêrin. Di vê zebûrê de Dawid li ser fikr û ramanên Mesîh nivîsî.
Roja ku Mesîh wê cezayê gunehên mirovan hilgirta ser xwe, fikrên dilê wî wê çi bûna û wiyê çi bigota? Dawid weha nivîsiye:

1 Xwedayê min, Xwedayê min, te çima ez berdam?
Tu çima xwe ji xilaskirinê û ji nalîna min dûr dixî?
3 Lê tu Yê Pîroz î, tu di nav pesnê Îsraêl de rûdinî.
6 Ez ne mirov im, kurmê axê me; di nav mirovan de ez bêhurmet im û xelk min kêm dibîne…
14 Ez wek avê hatime rijandin û hemû hestiyên min ji movikên xwe derketine.
Dilê min wek şimayê di hundirê min de dihele.
15 Hêza min wek kafikekê hişk bû, zimanê min bi ezmanê devê min ve dizeliqe;

Te ez xistim nav toza mirinê.   (axa mirinê)
[16] Kûçikan hawirdora min rapêçan, komela xerabkeran hawirdora min girt,
Wan dest û û lingên min qul kirin.

Bi van gotinan Dawid ji pêşî ve got ku zarokên Adem wê çawa dest û lingên Mesîh qul bikin. Çaxê leşkeran ew birin ser xaçê, ew pêxemberîtî hat cih.
Lê belê Dawid di Zebûrê de çima li ser qulkirina dest û lingên Mesîh nivîsî?
Gelo Mesîh çima wê di nav êş û cefayên ewqas dijwar de bimira?
Xwedê Xilaskarê pîroz şand dinyayê, lê çima wiyê bihişta ku mirovan bi vî awayî ew bikuşta?

Peyva Xwedê bersiva van pirsan dide me. Diviya ku Mesîh êşên herî mezin û dijwar bikişandan û bi mirina tehl bimira, da ku wî cezayê gunehên me hilgirta ser xwe û ji dêla me bimira.
Cezayê gunehan mirin û di dojehê de helakbûna herheyî ye. Madem ku wusa ye, diviya ku Mesîh cefa û ezabê dojehê yê ku para me bibû, tam bikiran.
Mebesta Xwedê ew bû  ku wiyê li gor kerema xwe ya mezin Xilaskarê bêguneh bişanda dinyayê, da ku wî bi dilxwazî ji bo her kesî mirin tam bikira. (Îbranî 2:9)
Bi wî awayî Xwedê wê hem dadperwer û  hem rast bima û hem jî wê rê ji zarokên Adem re vekira, da ku hemûyên ku vê yekê qebûl bikin, afûbûna gunehan bistînin û deriyê jiyana herheyî li ber wan vebe!
Erê, Mesîh wê deynê gunehên me bida. Mirina Mesîh dibe sedem ku Yê Rast, yanî Xwedê bikare wan hemûyên ku baweriya xwe bi wî bînin, rastdar derxe.

Erê, tiştê ku Dawid li ser mirina Mesîh nivîsî, bi rastî newaze ye. Qenc li ser vê yekê bifikirin. Hezar salan beriya bûyîna Mesîh, Dawid bi hûrgilî nivîsî ku Mesîh wê çawa li xaçê bê xistin û li wir cefayê bikşîne.
Tiştê ku divê em bînin ber çavê xwe ev e:
Yên ku cezayê xaçkirinê derxistin, ji miletê Romayê bûn. Xaçkirin li gor adeta wan, cezayê kuştinê bû.

Lê belê çaxê ku Dawid ev zebûr nivîsî, hem dewleta Romayê nehatibû damezrandin û hem jî miletê Romayê nebû.
Herweha di wê demê de tu kesî li ser cezayê xaçkirinê nedizanî.
Hingê mirov bi çarmixan li xaçê nedihatin xistin!
Lê belê Xwedê peyama mirina Mesîh a li ser xaçê xist hişê Dawid pêxember û ev tiştên ha bi destê wî di Kitêba Zebûrê de dan nivîsandin. Bi vî awayî em bi zelalî dizanin ku mirina Mesîh a li ser xaçê tam li gor plan û mebesta Xwedê bû. Xwedê dixwest bi vî awayî me ji cezayê gunehan xilas bike.

Rastiya ku ev zebûr hînî me dike, zelal û kifş e û pêwist e ku her kes bi baldarî li ser wê bifikire. Lê belê mixabin her kes vê peyama Xwedê qebûl nake. Heta îro hin mirov pêxemberîtiyên ku Dawid di Zebûrê de nivîsandine, red dikin û mirina Mesîh a li ser xaçê qebûl nakin. Ew dibêjin: Xwedê nedihişt ku Mesîh bi wî awayê şermezar û zalim li ser xaçê bimira!
Lê belê ew mirovên ku weha dibêjin, Nivîsarên Pêxemberan nas nakin û plana Xwedê ya ji bo xilasbûna gunehkaran nizanin.
Guhdarên delal, hay ji xwe hebin ku hûn peyvên Xwedê û riya wî ya xilasiyê red nekin. Gotina pêşiyan weha dibêje: Nezanê neguhdar, dikeve derdê bê derman.
Û peyva Xwedê dibêje: Eger em li ber vê xilasiya evqas mezin xemsar bin, emê çawa birevin û xilas bibin? (Îbranî 2:3)
Erê, peyva li ser xaçê ji bo yên ku helak dibin bêaqilî ye, lê ji bo me yên ku rizgar dibin hêza Xwedê ye. (Korîntî I, 1:18)

Niha em dixwazin hê bêtir li ser wan tiştên ku Dawid li ser mirina Mesîh a li ser xaçê nivîsîne bizanin. Me bihîst ku Mesîh wê weha bigota:

1 Xwedayê min, Xwedayê min, te çima ez berdam?
7 Hemû yên ku min dibînin, tinazên xwe bi min dikin. Ew min şermezar dikin û
serê xwe dihejînin, dibêjin: 8 Ew xwe dispêre Xudan, bila Xudan wî xilas bike.
Eger ew ji wî hez bike, bila niha wî xilas bike.

[14] Ez wek avê têm rijandin û hemû hestiyên min ji movikên xwe derketin.
Dilê min wek şimayê di hundirê min de dihele.
[15] Hêza min wek kafikekê hişk bûye, zimanê min bi şkefta / ezmanê devê min ve
dizeliqe; te ez xistim nav axa mirinê / toza mirinê.
[16] Kûçikan hawirdora min rapêçan, komela xerabkeran hawirdora min girt,
ew dest û û lingên min qul dikin. [17] Ez dikarim hemû hestiyên xwe bijmêrim;
ew dinêrin û çavên xwe li min zîq dikin. [18] Cilên min di nav xwe de leva dikin,
û ji bo xiftanê min pişkê davêjin.

Bi van gotinan Dawid ji pêşî ve diyar kir ku wê Mesîh xaç bikin û piştre wê wî şermezar bikin, wê tevzê xwe li wî bikin, li wî bikenin û cilên wî di nav xwe de leva bikin.

Guhdarên delal, ew pêxemberîtiyên rast hêz û şehrezayî û mezinahiya Xwedê kifş dikin. Heçî Mesîh e, Xwedê qet naxwaze ku em li ser wî dudilî bibin, an kesek me bixapîne.
Di bernama ku bê de emê binêrin ka ew pêxemberîtiyên Dawid çawa hatin cih.
Heta hingê hûn bimînin di aştiya Xwedê de!

Di bernama din de me li zebûra 22’an nêrî û me dît ku Dawid di vê zebûrê de gelek pêxemberîtiyên li ser mirina Mesîh nivîsîne.
Me dît ku Dawid pêxember 1000 salan beriya hatina Mesîh zebûr nivîsîn û îro em dixwazin binêrin ka ew pêxemberîtî hatin cih an ne.

Bi rastî, piştî 1000 salan, tam li gor wan pêxemberîtiyan çêbû. Ji kerema xwe guhê xwe bidin gotinên Încîlê. Li ser mirina Mesîh, Nîvîsarên Pîroz di Încîlê, di Mizgîniya li gor Metta de weha dibêjin:
35 Piştî ku wan ew xaç kir, wan cilên wî bi pişk li xwe leva kirin. 36 Û li wir
rûniştin û çavdêriya wî kirin. 39 Yên ku di wir re derbas dibûn, serê xwe
dihejandin, Îsa şermezar dikirin 40 û digotin: «Ka teyê Perestgeh hilweşanda û di sê rojan de ava bikira! Eger tu Kurê Xwedê bî, ji xaçê were xwarê û xwe xilas
bike!» 41 Bi vî awayî serekên kahînan, Şerîetzan û rihspiyan jî tinazên xwe pê
dikir û digotin: 42 «Yên din xilas kirin, lê nikare xwe xilas bike! Ew Padîşahê Îsraêlê ye! Ka bila niha ji xaçê bê xwarê, emê baweriyê bi wî bînin.
43 Ew xwe dispêre Xwedê. Eger Xwedê ji wî hez bike, bila niha wî xilas bike. Çimkî wî got: ‹Ez Kurê Xwedê me.›»

Yanî Încîl diyar dike ku peyvên pêxemberê Xwedê Dawid çawa hatin cih.

Me di zebûra 22’an de xwend ku Mesîh wê tî bibûya û hem di bedenê de û hem jî di ruhê xwe de wê gelek cefa bikşandan. Loma Mesîh di ayeta pêşî de dike qîrîn û dibêje: Xwedayê min, Xwedayê min, te çima ez berdam?
Bersiva vê pirsê ev e: Xwedê Yê Pîroz e û qet gunehan qebûl nake. Xwedê bi xwe pişta xwe da Mesîhê ku li ser xaçê dimir û xwe ji wî dûr xist, çimkî Xwedê cezayê hemû gunehên me xist ser milê wî. Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Xwedê ewê ku guneh nedizanî ji bo me kir guneh, da ku em di şexsê wî de bibin rastdariya Xwedê. (Korîntî II, 5:21)

Lê belê şikir ji Xwedê re! Dawid di Kitêba Zebûrê de tiştekî din jî got û bi rastî ev mizgîniyeke pir şêrîn e! Di zebûra 16'an de, Dawid li ser Mesîh dinivîse û dibêje:

Tu canê min li diyarê miriyan nahêlî, tu nahêlî ku Pîrozê te rizîbûnê bibîne.
11 Ya Xudan, tu riya jiyanê ji min re didî zanîn. (Zebûr 16:10.11)

Bi vî awayî Dawid li ser vê yekê digot ku Xwedê wê li gor plana xwe çawa Mesîh ji nav miriyan rake, da ku her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, her û her li ba wî di nav rûmeta Xwedê de bijî. Loma Mizgînî, yanî Încîl dibêje:

Mesîh li gor Nivîsarên Pîroz, ji bo gunehên me mir 4 û hat veşartin û li gor Nivîsarên Pîroz roja sisiyan hat rakirin. (Korîntî I, 15:3.4)

Herweha Dawid ji pêşî ve got ku piştî rakirina Mesîh a ji nav miriyan, Xwedê wê wî hilkişîne ezmên û jê re bêje ku li aliyê wî yê rastê rûne, heta ku ew vegere vê dinyayê û dîwana hemû mirovên vê dinyayê bike. Em di Zebûra 110'an de van peyvên Dawid pêxember dixwînin, ew dibêjin:

1 Xudan ji Xudanê min re got: Li milê minê rastê rûne, heta ku ez dijminên te bikim pêgeha lingên te. (Zebûr 110:1)

Di dawiya Zebûra 22'an de, Dawid weha dinivîse:

27 Hemû kujên dinyayê wê bînin bîra xwe û li Xudan vegerin;
hemû malbatên miletan wê serê xwe li ber wî bitewînin.
30 Dûndana min wê jê re xizmetê bike, nifşên ku bên wê li ser Xudan bibihîzin.
31 Ewê rastdariya wî ji miletekî ku hê çênebûye re bidin bihîstin, çimkî wî ev yek kir. (Zebûr 22:27.30.31)

Ev Zebûra 22'an bi van peyvan xilas dibe: «… wî ev yek kir! »
Ma diviya ku Mesîh çi bikira? Ewê ji dêla hemû gunehkaran bimira.
Wiyê hemû sozên Xwedê yên ku wî dabûn Adam û Hewayê û dabûn hemû pêxemberan bianiyan cih.

Erê, ewê Xilaskarê dinyayê bûya, wiyê Adem û Hewa û dûndana wan ji cezayê gunehên wan xilas bikiran. Mesîh wê xwe bi xwe bikira goriya rast û dawî. Mesîh wê bi mirina li ser xaçê, goriyên ku bi mînakî ji gunehkarên demên berê dihatin xwestin, betal bikiran. Wek berxê ku ji dêla kurê Birahîm mir, Xilaskar wê ji dêla gunehkaran bimira û ew bi xwe wê bibûya goriya bêqusûr û dawî. Erê, ew gorî wê ji bo hemûyan her û her têrê bikira!
Mizgîniya Xwedê ji bo dinyayê ev e: Mesîh ji dêla we mir. Baweriya xwe bi wî bînin û hûnê ji xezeb û dîwana Xwedê xilas bibin.
Deriyê riya xilasiyê ji her kesê ku bawer dike re, vekirî ye!
Loma tam beriya ku bimire, Mesîh weha kir qîrîn û got: «Temam bû».
Erê, «wî ev yek kir». (Zebûr 22:31)
Xwedê ew goriya Mesîh a bêkêmahî qebûl kir û bi rakirina wî ya ji nav miriyan erê kir. Çaxê ku em li Kitêba Mizgîniyê binêrin, emê hê bêtir van tiştan fêm bikin.

Ji bo niha em vê rastiyê tînin ber çavê xwe: Hezar salan beriya hatina Îsa Mesîh, Dawid pêxember ji pêşî ve got ku gunehkar wê dest û lingên Mesîh qul bikin. Divê ku em sedemê vê mirinê ji bîr nekin: Mesîh ji dêla min û ji dêla te mir; ew ji dêla hemû gunehkaran mir, da ku her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, helak nebe, lê jiyana herheyî bistîne.
Mesîh destûr da, ku mirovên xerab dest û lingên wî qul bikin, çimkî wî bi dilxwazî plana Xwedê qebûl kir û ew pirr pirr ji min û ji te hez dike.
Ji kerema xwe guhên xwe bidinê ka Îsa Mesîh di Încîlê de çi got:
Ez jiyana xwe didim, da ku ez wê dîsa bistînim. [18] Tu kes wê ji min nastîne, lê ez jiyana xwe ji ber xwe didim. Ez dikarim jiyana xwe bidim û dikarim dîsa bistînim jî. Min ev emir ji Bavê xwe yê ezmanî stand. (Yûhenna 10:17.18)
Guhdarên delal, ma hûn ji bo şandina Mesîh ji Xwedê re şikir dikin û pesnê wî didin? Mesîh hat, da ku we ji gunehên we xilas bike!
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

Mesîh jî ji bo we cefa kişand … Wî li ser xaçê, gunehên me di bedena xwe de hilgirtin, da ku em li hember gunehan mirî bin û ji bo rastiyê bijîn. We bi birînên wî şîfa dît…Îsa di ber neheqiyên me de teslîmî mirinê hat kirin û ji bo rastderxistina me rabû… da her kesê ku baweriyê bi wî bîne helak nebe, lê jiyana wî ya herheyî hebe. (Petrûs I, 2:21.24; Romayî 4:25; Yûhenna 3:16)

Daxwaz û hêviya me ev e ku Xwedê her tiştê ku me îro xwend, ji we re şîrove bike û bi we bide fêmkirin. Gelek spas ku we guhê xwe da Kitêba Zebûran. Xwedê hez bike emê di bernameya ku bê de li serhatiya kurê Dawid Silêman binêrin.
Heta hingê li ser vê pirsê bifikirin: Gelo çima Xwedê ev gotinên ha bi destê Dawid pêxember dan nivîsandin? Peyv ev in:

Wan dest û û lingên min qul kirin. (Zebûr 22:16)

Îro em dixwazin pirsekê bikin: Eger Xwedê ji te re xuya bibûya û ji te re bigota: «Tu çi bixwazî, ji min bixwaze û ezê wî bidim te», hingê teyê çi bixwesta? Teyê jiyaneke dirêj bixwesta? Teyê dewlemendî, an navûdengî bixwesta?
An tu ji van cihêtir tiştekî din dixwazî?
Rojekê Xwedê di xewnekê de ji kurê Dawid Silêman re xuya bû û jê re got:
«Ji min re bêje ku tu dixwazî ez çi bidim te.»
Gelo hûn dizanin Silêman ji bo xwe çi hilbijart? Îro emê bibihîzin ku bersiva Silêman çi bû.

Di Kitêba Padîşahan a yekê deriyê diduyan de, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
[1] Çaxê rojên mirina Dawid nêzîk bûn, wî emir da kurê xwe Silêman û got: [2]
«Wek hemû mirovan, ezê ji vê dinyayê bar bikim. Bi zirav û mêrxas be [3] û
emrên Xudan Xwedayê xwe bigire: Li gor tiştên ku di Şerîeta Mûsa de nivîsî ne,
di riyên wî de here, da ku tu di her karê xwe de û li her aliyê ku tu berê xwe
bidiyê de, serfiraz bî. [10] Hingê Dawid mir, çû ba bav û kalên xwe û li bajarê
Dawid hat veşartin. [11] Wî çil salan padîşahtiya Îsraêl kir …[12] Îcar Silêman li ser
textê bavê xwe Dawid rûdinişt û padîşahtiya wî gelek qayîm bû.

Xudan bi şev di xewnê de ji Silêman re xuya bû û got: «Ji min re bêje ku tu dixwazî ez çi bidim te.»
Silêman got: «Ya Xudan Xwedayê min, te xulamê xwe di cihê bavê min Dawid de kir padîşah, lê ez zarokek im û ez nizanim rêberiyê bikim.
Loma dilekî fêmdar bide xulamê xwe, da ku ew bi dadperwerî hukumdarî û serweriya gelê te bike û ew ya qenc û ya xerab ji hev derxe. Çimkî ne wusa be, kî dikare hukumdariya gelê te yê mezin bike?»
[10] Ev daxwaza Silêman di çavê Xudan de qenc bû û Xudan jê re got:
[11] «Ji ber ku te ev tişt xwest û te jiyaneke dirêj, an dewlemendî, an jî helakbûna
dijminên xwe nexwest, [12] ji ber vê yekê ezê li gor daxwaza te bikim û ezê dilekî

fêmdar û şehreza bidim te. Wusa ku beriya te, yek wek te wê çênebûbe û tu
caran yekî din wek te dernakeve.
13 Û bi ser de, ezê tiştên ku te daxwaz nekirin, hem dewlemendî û hem jî rûmetê
bidim te û di hemû rojên jiyana te de tu padîşah wek te mezin nabe.
14 Eger tu wek bavê xwe Dawid di riya min de herî û li gor qanûn û emrên min
bikî, ezê rojên te dirêj bikim.»
Hingê Silêman hişyar bû û fêm kir ku ew xewn bû.
Ew vegeriya Orşelîmê û li ber Sindoqa Xudan sekinî û gorî pêşkêşkirin.

16 Piştî demekê du fahîşe hatin ba padîşah û li ber wî sekinîn. 17 Yekê ji wan got:
«Ax mîrzayê min! Ez û ev jina ha, em di eynî malê de rûdinin.
Çaxê ez bi wê re di malê de bûm, min zarokek anî.
18 Piştî ku min zarok anî bi sê rojan, wê jî zarokek anî.
Em herdu bi serê xwe bûn, tu kes li ba me nebû.
19 Bi şev kurê wê mir, çimkî ew li ser wî raza bû.
20 Nîvê şevê ew rabû û çaxê ez razam, wê kurê min ji rex min rahişt û ew xist
himbêza xwe; lê kurê xwe yê mirî xist himbêza min.
21 Sibî, çaxê ez rabûm ku ez şîr bidim kurê xwe, va ye, ew mirî bû.
Lê gava min qenc lê nêrî, min dît ku ew ne kurê min e.»
22 Lê jina din got: «Na, yê zindî kurê min e û yê mirî yê te ye.»
Lê jina pêşî got: «Na, bi rastî yê mirî kurê te ye û yê zindî kurê min e.»
Û herduyan devjenî kir.
23 Li ser vê yekê padîşah got: «Eva ha dibêje: ‹Yê sax kurê min e û yê mirî kurê
te ye!› û ya din dibêje: ‹Na, yê mirî kurê te ye û yê sax kurê min e!›»
24 Hingê padîşah got: «Şûrekî ji min re bînin!» Wan şûrek jê re anî û wî got:
25 «Zarokê sax bikin du perçe û nîvî bidin vê jinê û nîvê din bidin ya din.»
26 Lê dilê jina ku diya kurê sax bû, bi kurê wê şewitî û wê ji padîşah re got: «Ax,
mîrzayê min, bila kurê zindî bidin wê, wî nekujin!»
Lê ya din got: «Bila ew ne yê min û ne jî yê te be, bila wî bikin du perçe!» 27
Hingê Silêman biryara xwe da û got: «Zarokê zindî bidin jina pêşî.

Kurê wê nekujin. Diya wî ew e.»
[28] Çaxê ku tevahiya gelê Îsraêl li ser biryara padîşah bihîst, ji wî tirsiyan, çimkî wan dît ku bi şehrezayiya Xwedê hukumdarî kir.

Xwedê şehrezayî û gelek zanîn û wek seylaka ber behrê fêmdarî da Silêman. [30]
Şehrezayiya Silêman ji ya hemû mirovên rojhilatê û ji tevahiya şehrezayiya
Misrê meztir bû. [31] Ew ji her kesê din şehrezatir bû ... Nav û dengê wî li seranserê welatên hawirdor belav bû.  Wî sê hezar gotinên pêşiyan gotin û hijmara stranên wî hezar û pênc bûn…. [34] Mirov ji hemû miletan jî hatin, ku şehrezayiya wî bibihîzin. Ew ji aliyê hemû padîşahên dinyayê yên ku li ser şehrezayiya wî bihîstibûn ve, dihatin şandin.

Piştî vê yekê, Kitêba Pîroz li ser şahbanûya herêma Şebayê dibêje.
Wê şahbanûyê li ser şehrezayiya kûr û li ser rûmeta mezin a Silêman bihîstibû. Wê dixwest bizane ka tiştên ku li ser Silêman dihatin gotin, rast in, an ne rast in. Ev şahbanû li welatê Şebayê rûdinişt. Şeba îro li aliyê Yêmenê ye, li başûrê Siûdî Erebistanê ye. Şeba û Orşelîm li dor 2000 kîlometre ji hev dûr in. Lê belê ev riya dirêj ji şahbanûyê re nebû asteng ku ew neçûya û Silêman padîşah nedîta.

Nivîsarên Pîroz li ser wê weha dibêjin:
[1] Çaxê ku şahbanûya Şebayê li ser navûdengiya Silêman a ji bo navê Xudan bihîst, ew hat ba wî ku wî bi mamikan, yanî bi pirsên giran, biceribîne.
[2] Ew bi gelek deveyên ku bi biharat û bi gelek zêr û kevirên hêja barkirî bûn ve hat Orşelîmê; û çaxê ku ew hat ba Silêman, ew li ser her tiştê ku di hişê wê de
bû, bi wî re peyivî. [3] Silêman bersîva hemû pirsên wê da; tiştek jê re veşartî
tunebû ku nekaribû jê re şîrove bikira.
[4] Çaxê şahbanûyê, hemû şehrezayiya Silêman û qesra ku wî ava kiribû û her tiştê wî dît, ruh li wê nema.

[6] Wê ji padîşah re got: «Gotina ku min di welatê xwe de li ser karên te û li ser
şehrezayiya te bihîstibû, rast e. [7] Lê heta ku ez nehatim û min bi çavên xwe
nedît, min bawer nekir. Bi rastî, nîvê wê jî ji min re nehatiye gotin. Şehrezayî û
serfiraziya te ji tiştê ku min bihîstiye gelek zêdetir e.
[8] Xwezî bi zilamên te û xwezî bi karmendên te yên ku her gav li ber te disekinin
û şehrezayiya te dibihîzin. [9] Xudan Xwedayê te yê ku qencî li te kir û tu daniyî
ser textê Îsraêl, pîroz be. Ji ber ku Xudan her dem ji Îsraêl hez dike, wî tu kiriyî
padîşah, da ku tu bi dadperwerî û li gor rastiyê hukumdariyê bikî.»

Erê, guhdarên delal, îro bernama me li vir bi dawî dibe, lê cara ku bê emê binêrin ku Îsa Mesîh li ser Silêman padîşah û li ser şahbanûya Şebayê çi got.

Heta hingê li ser vê gotina Silêman padîşah qenc bifikirin a ku dibêje:
[10] Tirsa Xwedê destpêka şehrezayiyê ye û naskirina Yê Pîroz fêmdarî ye.
(Gotinên Silêman 9:10)

Di bernama din de me li ser kurê Dawid Silêman padîşah bihîst û me dît ku Xwedê çiqas şehrezayî da wî.
Şehrezayiya wî û navûdengiya wî derket û mirov ji welatên dûr hatin Orşelîmê serdana wî. Şahbanûya Şebayê jî di nav wan mirovan de bû û çaxê wê hemû şehrezayiya Silêman û qesra ku wî ava kiribû û xwarina sifra wî, rûniştina karmendên wî, xizmetkarên wî û cilên wan, meygerên wî û goriyên şewitandinê yên ku di Perestgeha Xudan de pêşkêş dikirin dît, ruh li wê nema û wê pesnê Xwedê da, got:
8 «Xwezî bi zilamên te û xwezî bi karmendên te yên ku her gav li ber te disekinin û şehrezayiya te bibihîzin. 9 Xudan Xwedayê te yê ku qencî li te kir û tu daniyî ser textê Îsraêl, pîroz be. Ji ber ku Xudan her dem ji Îsraêl hez dike, wî tu kiriyî padîşah, da ku tu bi dadperwerî û li gor rastiyê hukumdariyê bikî.»

Lê belê Nivîsarên Pîroz careke din li ser vê şahbanûya bi nav û deng dibêjin:
Kêm û zêde piştî 1000 salan, Mesîh li ser şahbanûya Şebayê û li ser Silêman padîşah peyivî. Wî di Încîlê de, di Mizgîniya li gor Metta de got:
«Şahbanûya Başûr wê di Roja Dawî de bi vî nifşî re rabe û wî sûcdar derxe. Çimkî ew ji wî kujê dinyayê hat, da ku guhdariya şehrezayiya Silêman bike û va ye, yekî ji Silêman meztir li vir e.» (Metta 12:42)

Gelo we bihîst ku Mesîh çi got? Wî got ku şahbanûya Şebayê li ser navûdengiya Silêman lêkolînek kir û ewê wan hemû mirovên ku li ser rûmeta Mesîh lêkolînê nakin, sûcdar derxe.
Çi ji destê şahbanûya Şebayê hat, wê kir, da ku li ser rûmeta Silêman û li ser şehrezayiya wî hîn bibe. Ji bo vê yekê, wê di çûn û hatinê de rêwîtiyeke ku 4000 kîlometre bû kir, çimkî wê dixwest ku rast bizane, ka tiştê ku wê bihîstiye, rast e, an na. Di vê yekê de ji bo me jî derseke girîng heye! Rûmet, şehrezayî û hêza Mesîh ê ku ji ezmên hatiye, ji ya Silêman gelek bilindtir e;

lê dîsa jî piraniya zarokên Adem rûmeta wî fêm nakin û naxwazin li ser wî lêkolînê bikin, ku ew rastiyê bizanin.
Loma Mesîh got: «Şahbanûya Başûr wê di Roja Dawî de bi vî nifşî re rabe û wî sûcdar derxe. Çimkî ew ji wî kujê dinyayê hat, da ku guhdariya şehrezayiya Silêman bike û va ye, yekî ji Silêman meztir li vir e.» (Metta 12:42)

Guhdarên me yên delal, gelo hûn rûmeta Mesîhê ku Xwedê şandiye, dizanin? An hûn dibêjin: «Ew jî wek hemû pêxemberên din e»?
Gelo tê bîra we ku mana Mesîh çi ye? Erê, mana navê wî ev e: Yê Rûnkirî, yanî yê ku ji aliyê Xwedê ve hatiye hilbijartin. Xwedê Mesîh hilbijart, da ku hem Xilaskar û hem jî dadgerê dinyayê be.
Lê dîsa jî gelek mirov qet bala xwe nedin Mesîh. Ew nizanin ku ew kî ye, çimkî wan tu caran di Nivîsarên Pêxemberan de lêkolîn nekirine.

Wextê me zû derbas dibe, lê beriya ku em bigihîjin dawiya bernama xwe, em dixwazin hûn bizanin ku Silêman padîşah sê kitêbên girîng û mana wan kûr nivîsandine û ew her sê kitêb ketine nav Nivîsarên Pêxemberan.
Ew her sê kitêb ev in: Kitêba Gotinên Silêman (yanî metelok û gotinên pêşiyan ên ku wî gotine û berhev kirine), Kitêba Peyvbêj û Strana Stranan. Wek ku bavê wî Dawid kir, Silêman jî çend stran gotin û ew di Kitêba Zebûrê de nivîsî ne.
Di dawiya bernameya xwe de emê ji zebûra 72’an, yanî ji zebûreke Silêman ji we re bixwînin. Di vê zebûrê de Silêman ji pêşî ve dibêje ku rojekê Mesîh wê vegere dinyayê ku li gor rastî û dadperweriyê dîwana hemû mirovan bike. Ji kerema xwe guhê xwe bidinê ku Silêman li ser padîşahê bêkêmahî yê ku di ser şehrezayî û rûmeta Silêman bi xwe re ye, çi nivîsiye:

Silêman weha got:
2 Ewê bi rastî dîwana gelê te û bi dadperweriyê dîwana belengazên te bike…

[8] Ewê ji deryayê heta deryayê û ji Çemê Firatê heta bi kujê dinyayê yê herî dûr serweriyê bike
[9] Eşîrên ku di çolê de rûdinin wê li ber wî xwe bitewînin û dijminên wî wê tozê bialîsin [10] ...
Padîşahên Şeba û Sebayê wê diyariyan pêşkêşî wî bikin
[11] Hemû padîşah wê li ber wî herin ser çokan, hemû milet wê jê re xizmetê bikin.
Çimkî ewê yê belengaz ê ku hawar dike û yê reben ê ku alîkarê wî tune, rizgar bike. [15] Bijî padîşah! …
[17] Bila navê wî her û her bimîne û nav û dengê wî heta ku roj hebe berdewam bike! Bila hemû milet wê bi wî pîroz bibin
Û wê bêjin: Xwezî bi wî!
[18] Xudan Xwedê, Xwedayê Îsraêl ê ku tenê kerametan dike, pîroz be!
[19] Navê wî yê bi rûmet her û her pîroz be! Bila tevahiya rûyê erdê bi rûmeta wî tije bibe. Amîn û amîn. (Zebûr 72:2.8.9.10.11.15.17-19)

Bi vî awayî Silêman padîşah pêxemberîtî kir û got ku rojekê hemû mirovên li ser rûyê erdê wê bi ya Mesîh, yanî bi ya Padîşahê padîşahan û bi ya Dadgerê dinyayê bikin. Ji xwe daxwaza Xwedê ew e ku her kes ne bi tenê di Roja Dawî de, lê îro guhê xwe bide Mesîh û bi ya wî bike.

Hûn li ser vê yekê çi difikirin? Gelo bi rastî hûn li gor daxwaza Xwedê dikin? Gelo hûn rûmet û desthilatiya Mesîhê ku Xwedê şandiye û wê careke din bişîne qebûl dikin? An hûn dibêjin: «Ew tam wek pêxemberên din e! Ma ewê çi ji bo me bike?»
Eger hûn amade bin ku di Nivîsarên Pîroz de lêkolînê bikin, hûnê bibînin ku Mesîh hem Xilaskar û hem jî Dadgerê dinyayê ye.
Hemû pêxember li ser wî dibêjin û şahidiya wî dikin. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

Hemû pêxember li ser wî şahidiyê dikin, dibêjin:Her kesê ku baweriyê bi wî bîne, bi navê wî efûbûna gunehan distîne» û dipirsin, dibêjin:
Ma baweriya te bi pêxemberan heye? (Karên Şandiyan 10:43; 26:27)

Dostên delal, gelek spas ku we qenc guhê xwe da serhatiya Silêman pêxember. Di bernameya ku bê de emê li serhatiya pêxemberê Xwedê Êlyas binêrin. Wî pêxember dua kir û agir ji ezmên ket erdê.

Heta bernama ku bê, careke din li ser van peyvên Mesîh bifikirin ên ku dibêjin:

Şahbanûya Başûr wê di Roja Dawî de bi vî nifşî re rabe û wî sûcdar derxe. Çimkî ew ji wî kujê dinyayê hat, da ku guhdariya şehrezayiya Silêman bike û va ye, yekî ji Silêman meztir li vir e. (Metta 12:42)

Xwedê ruhekî hişyar û dilekî ronahî û şehreza bide her yek ji we.

Di bernameya din de me ji serhatiya kurê Dawid Silêman xwend.
Me dît ku Xwedê fêmdarî û şehrezayiyeke ecêb dabû Silêman.
Di dema Silêman padîşah de, Orşelîm yek ji bajarên herî bedew bû û di vî bajarî de xaniyê herî spehî, Perestgeha Xudan Xwedê bû.
Wek ku tê bîra we, di dema Mûsa de di çolê de Konê Civînê hatibû çêkirin.
Lê niha êdî Silêman di cihê wî Konî de Perestgeheke nû da avakirin. Dused hezar karker heft salan xebitîn, heta ku ew cihê perizînê xilas bû. Heta îro jî li Orşelîmê kevirên mezin ên bingehê Perestgeha ku di dema Silêman de hatibû avakirin, tên dîtin.

Çaxê ku Perestgeh temam bû, kahînan bi hezaran berx û conega kirin gorî.
Bi vî awayî wan pîrozkirina Perestgeha Xwedê çêkir û ew gorî jî bûn mînaka wê xwîna ku Xilaskarê dinyayê wê birijanda.
Piştî gorîkirina wan heywanan, kahînan Sindoqa Peymanê ji Konê Civînê anî û ew xistin Cihê Herî Pîroz ê Perestgeha nû. Piştî ku kahîn ji Cihê Herî Pîroz derketin, di cih de rûmeta Xwedê ew ode tije kir.
Me dîtibû ku di dema Mûsa de rûmeta Xwedê di Konê Civînê de Cihê Herî Pîroz tije kiribû; tam wusa rûmeta Xwedê, Cihê Herî Pîroz ê Perestgeha nû tije kir û bi vî awayî kifş bû ku Xwedê wê li wir di nav gelê Îsraêl de rûne.

Erê, Silêman padîşahekî bi nav û deng bû û tiştên pir qenc kirin. Lê belê dema em Nivîsarên Pîroz dixwînin, em dibînin ku dawiya jiyana Silêman ne wek destpêka wê bû. Ji kerema xwe guhê xwe bidin gotinên Kitêba Padîşahan a pêşî, deriyê 11'an. Em dîsa dibînin ku Peyva Xwedê gunehên pêxemberan venaşêre, çimkî Kitêba Pîroz weha dibêje:
Silêman padîşah ji bilî keça Firewn gelek jinên biyanî ji xwe re anîn. [4] Dema ku Silêman pîr bû jinên wî, dilê wî li xwedayên din zivirandin; ew ne wek bavê xwe Dawid ji dil û can ji Xudan Xwedayê xwe re dilsoz bû.

Di wê demê de Silêman li ser çiyayên li rohjilatê Orşelîmê ji bo jinên xwe yên biyanî gorîgeh da çêkirin. Ew bi wan re perizî pûtên wan û ji wan re bixûr şewitand û gorî pêşkêş kirin. Bi vê yekê Silêman hêrsa Xwedê rakir, çimkî wî pişta xwe da Peyva Xwedayê rast û zindî. Xwedê jê re got:
«Madem ku helwesta te ev e û te peymana min negirt û te li gor emrên min nekir, eseh ezê padîşahtiyê ji destê te derînim û bidim yek ji xulamên te. [12] Lê ji bo xatirê bavê te Dawid, ez vê yekê niha nakim; ezê padîşahtiyê ji destê kurê te derînim. [13] Lê ji bo xatirê xulamê xwe Dawid û ji bo xatirê bajarê Orşelîmê ê ku min hilbijartiye, ez hemû padîşahtiyê ji destê wî dernaynim; ezê eşîrekê jê re bihêlim.»

Erê, Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku piştî mirina Silêman di nav gelê Îsraêl de dubendî û şer hebû. Wek ku Xwedê gotibû, ew 12 eşîrên ku ji zarokên Aqûb rabûbûn, ji hev cûda bûn. Edî yekîtî li Îsraêl nema, ew bûn du padîşah, yanî padîşahiya Îsraêl û padîşahiya Cihûstanê. Her deh eşîrên li bakur bi hev re bûn padîşahiya Îsraêl. Eşîra Cihûda û eşîra biçûk a Binyamîn bi hev re, bûn padîşahiya Cihûstanê. Eşîra Dawid padîşah eşîra Cihûda bû; loma ew soza Xwedê ya ku Mesîh wê ji malbata Dawid bihata, bi eşîra Cihûda ve girêdayî bû.

Nivîsarên Pîroz ji me re li ser gelek padîşahên Îsraêl û Cihûstanê dibêjin. Piraniya padîşahên wan pir xerab bûn; wan pişta xwe da Xudan û li pey dîn û diyanetên miletên li hawirdora xwe çûn. Lê belê di nav padîşahên Îsraêl de, yek hebû ku ji yên din hê xerabtir bû. Navê wî Ahab bû. Ahab piştî Silêman padîşahê heştan bû.

Nivîsarên Pêxemberan li ser wî weha dibêjin:
Ahabê kurê Omrî ji wan hemûyên ku ji berî wî bûn, zêdetir di çavê Xudan de ya xerab kir.

Bi ser de, wî Îzebêl ji xwe re anî. Ew jineke pir xerab bû û wê Peyva Xwedê ji dil û can red dikir. Herweha Ahab ji Baal re perestgeh çêkir.
Baal pûtekî mezin ê Kenaniyan û miletên din bû. Bi vî awayî Ahab hêrsa Xwedê rakir, çimkî wî gelê xwe ji riya Xwedê dûr xist. Êdî ew li pey pêxemberên derewîn û li pey dînekî pûç û çewt çûn.

Lê di wê demê de di padîşahiya Îsraêlê de zilamek hebû ku di riya Xwedê de diçû. Navê wî Êlyas bû.
Rojekê, Xwedê Êlyas şand ba Ahab padîşah.
Êlyas… ji Ahab re got: «Bi navê Xwedayê Îsraêl Xudanê zindî yê ku ez li ber radiwestim, heta ku ne bi gotina min be, di van salan de ne xûnav û ne baran wê bibare.»

Tam weha çêbû. Sê sal û nîv li Îsraêlê qet baran nebarî. Li seranserê welêt xelayeke dijwar rabû. Di Kitêba Padîşahan a pêşî, deriyê 18'an de, Nivîsarên Pîroz dibêjin:

[1] Piştî gelek rojan, di sala sisiyan de, peyva Xudan ji Êlyas re hat: «Here, xwe
nîşanî Ahab bide. Ezê baranê li ser erdê bibarînim.» [2] Îcar Êlyas çû ku xwe
nîşanî Ahab bide. …
[17] Çaxê ku Ahab Êlyas dît, wî ji Êlyas re got: «Ey zilamê ku Îsraêl xistiye
derdan, ev ma tu yî?»
[18] Êlyas got: «Ne min Îsraêl xist derdan, lê te û mala bavê te, we dev ji emrên
Xudan berdan û we xist derdan û tu li pey Baalan çuyî. [19] Niha rêke pey hemû
Îsraêl û çarsed û pêncî pêxemberên Baal yên ku ji sifra Îzebêlê xwarinê dixwin û
çarsed pêxemberên Aşêra li çiyayê Karmêlê li ba min kom bike.»
[20] Îcar Ahab rêkir pey hemû kurên Îsraêl û pêxember li çiyayê Karmêlê kom
kirin.

[21] Hingê Êlyas nêzîkî hemû gel bû û got: «Heta kengê hûnê li ser herdu aliyan bikulin? Eger Xudan Xwedê be, li pey wî herin, lê eger Baal Xwedê be, li pey wî herin.»
Gel qet bersîv neda wî.
[22] Hingê Êlyas ji gel re got: «Pêxemberê Xudan ez, tenê ez mame, lê belê
pêxemberên Baal çarsed û pêncî ne. [23] Îcar bila du conegayan ji me re bînin û
bila ew ji bo xwe conegayekî bibijêrin û wî bikin parçe parçe û wî deynin ser êzingan û bila agir danenin ser.
Ez jî, ezê conegayê din amade bikim, deynim ser êzingan û ez agir dananim ser.
[24] Îcar hûn gazî navê xwedayê xwe bikin, ez jî, ezê gazî navê Xudan bikim. Û kîjan Xwedê bi êgir bersîvê bide, Xwedê ew e.»
Hemû gel bersiv da û got: «Ev peyv qenc e.»

Guhdarên delal, bêguman Ahab padîşahekî pir xerab bû û wî bi xerabiya xwe û bi xerabiya jina xwe, gelê Îsraêl ji riya rast derxist û xapand.
Ahab padîşah bû, lê ew rêberekî derewîn bû û Xwedê ew û gelê Îsraêl bê ceza nehişt.
Lê belê daxwaza Xwedê ne cezkirin bû; nexêr, mebesta Xwedê ew bû ku gel vegere ba Xwedayê wan ê rast. Loma wî Êlyas pêxember rakir û ew zilamê mêrxas amade bû ku hem padîşah û hem jî gelê xwe hişyar bike û vegerîne ba Xwedayê Birahîm, Îshaq, Aqûb û Dawid.

Di bernama ku bê de emê bibînin, ka Xwedê an Baal wê bersiva duayên mirovan bide. Ji bo dawiya vê serhatiyê jî bi me re bin.

Xwedê aştiya xwe bide we hemûyan.

Di bernama din de me li ser Ahab padîşah bihîst. Ahab padîşahekî pirr xerab bû û ew nediperizî Xwedê, lê diperizî pûtan. Gelê Îsraêl li pey wî çû û wan jî dest pê kir, ji Baal re gorî pêşkêş dikirin û diperizîn wî.
Di wê demê de Xwedê Êlyas pêxember rakir û xelayeke pir giran şand, da ku gelê Îsraêl hişyar bibe.
Me dît ku Êlyas û pêxemberên Baal û tevahiya gel li çiyayê Karmêlê civiyan, da ku bibînin ku Xwedayê rast kîjan e. Wan biryar dabû ku hem Êlyas û hem jî pêxemberên derewîn wê ji Xwedayê xwe hêvî bikiran ku wî agir bişanda ser gorîgeha wan.
Nivîsarên Pêxemberan li ser vê yekê weha dibêjin:

25 Îcar Êlyas ji pêxemberên Baal re got: «Conegayekî ji bo xwe bibijêrin û pêşî wî amade bikin; çimkî hûn gelek in. Û gazî navê xudanê xwe bikin, lê êgir danenin ser.»
26 Wan rahişt wî conegayê ku ji wan re hatibû dayîn û ew amade kirin. Û ji sibehî heta nîvro gazî navê Baal kirin, gotin: «Ya Baal, bersîva me bide.»
Lê belê deng nehat û yekî ku bersîv bida nebû. Û li hawirdora gorîgeha ku çêkiribûn, xwe di ser hev re qevastin.
27 Nîvro Êlyas tinaz bi wan kirin û got: «Bi dengê bilindtir gazî bikin, çimkî ew xwedayek e. An ew ketiye ramanên kûr, an jî ew derketiye, rêwitiyê dike; belkî ew di xew de ye û divê bê hişyarkirin.»
28 Îcar bi dengê bilind qîriyan û li gor adetên xwe heta ku xwîn ji laşê wan
herikî, xwe bi şûr û sîxan birîndar kirin. 29 Nîvro derbas bû û heta bi dema ku
diyarî tê pêşkêşkirin, pêxemberên Baal harîtî kirin. Lê deng nehat û yê ku bersîv bida nebû.
30 Hingê Êlyas ji tevahiya xelkê re got: «De werin, nêzîkî min bibin.»

Wî gorîgeha Xudan ya hilweşayî nûvejen kir. 31 Li gor hijmara bavikên kurên
Aqûb, Êlyas rahişt diwanzdeh keviran. 32 Bi wan keviran wî bi navê Xudan
gorîgeh çêkir û li hawirdora wê xendekek çêkir.
33 Wî êzing nijilandin û conega kir parçe parçe û danî ser êzingan û got: «Çar
ceran tije av bikin û birijînin ser pêşkêşa şewitandinê û ser êzingan.»
34 Û got: «Ducare bikin!» û ducare kirin. Û got: «Sêcare bikin!» û sêcare kirin. 35
Îcar av herikî hawirdora gorîgehê û xendek jî tije av kir.
36 Di dema ku diyarî tê pêşkêşkirin de, Êlyas pêxember got: «Ya Xudan
Xwedayê Birahîm, Îshaq û Îsraêl! Bila îro bê zanîn ku tu di nav Îsraêl de Xwedê
yî û ez xulamê te me û min ev tiştên ha hemû bi peyva te kirin. 37 Bersîva min
bide, ya Xudan, bersîva min bide! Bila ev gel bizane, ya Xudan, ku tu Xwedê
yî.»
38 Îcar agirê Xudan ket; pêşkêşa şewitandinê, êzing, kevir û ax xwarin, xilas
kirin û ava di xendekê de jî alîst. 39 Gava hemû gel ev dît, deverû ketin û gotin:
«Xudan Xwedê ye! Xudan Xwedê ye!»
40 Êlyas ji wan re got: «Pêxemberên Baal bigirin, bila tu kes ji wan nereve, xilas
nebe.» Wan ew girtin û Êlyas ew daxistin geliyê Kişonê û li wir ew serjêkirin.
41 Hingê Êlyas ji Ahab re got: «Derkeve, bixwe û vexwe; çimkî dengê baraneke
giran tê.»
42 Îcar Ahab ji bo xwarin û vexwarinê derket. Êlyas hilkişiya ser mila Karmêlê û
çok da erdê û rûyê xwe xist nav çokên xwe. 43 Wî ji xizmetkarê xwe re got:
«Here û bi aliyê deryayê ve binêre.»
Ew jî derket, nêrî û got: «Tiştek tune.»
Êlyas heft caran ji wî re got: «Dîsa here!» 44 Di cara heftan de xizmetkar got:
«Va ye, ji deryayê ewrek biçûk derdikeve, wek kulma mirov.»
Êlyas got: «Here, ji Ahab re bêje: ‹Ereba xwe bikişîne û dakeve ku baran te
asteng neke.›» 45 Di wê navê de ezman bi ewran û bi bayê, tarî bû û baranek pirr
xurt barî.

Ev serhatiya newaze, bi rûmet û hêza Xwedê tije ye û ne lazim e ku em vê şîrove bikin. Lê belê beriya ku em herin serhatiyeke din, divê em qenc bala xwe bidin gotinên Êlyas. Wî ji gelê Îsraêl re çi got?
Beriya ku ew meydanê ji çar sed û pêncî kahînên derewîn ên Baal re bixwîne, Êlyas ji xelkê re got: «Heta kengê hûnê li ser herdu aliyan bikulin?
Eger Xudan Xwedê be, li pey wî herin, lê eger Baal Xwedê be, li pey wî herin.»
(Padîşah I, 18:21)

Pêşî Îsraêliyan qet bersiv neda. Lê belê gava wan dît ku Xudan çawa bersiva duyaya Êlyas da û ji ezmên agir şand ser gorîgehê, tevahiya civînê çû ser çokan û bi dengê bilind gotin:
«Xudan Xwedê ye! Xudan Xwedê ye!»
Yanî di eynî rojê de pêxemberê Xwedê Êlyas, pêxemberên derewîn li ber çavê hemûyan hetikandin û dilê Îsraêliyan li Xwedayê wan Xudan zivirî!

Çima Xwedê bersiva duaya Êlyas pêxember da? Ji ber ku Êlyas ji Xudan Xwedê hez dikir û ji peyvên wî bawer dikir.
Çima Xwedê guhê xwe neda duayên pêxemberên Baal? Ji ber ku wan Xwedayê rast û tenê yê ku xwe bi Birahîm, Îshaq û bi gelê Îsraêl dabû naskirin, nas nedikir. Wan ne li ber wî dua kir. Pêxemberên Baal peyvên Xwedê red kirin û li pey dîn û adetên xwe çûn. Ew gelek dîndar û di perizînê de bi xîret bûn, lê wan ji Xwedayê rast re xizmet nedikir – loma tevahiya xîret û dîndariya wan bê mane û pûç bû.

Lê di wê roja girîng de, Êlyas emir li gel kir ku an Xudan, Xwedayê Birahîm, Îshaq û Aqûb qebûl bikin an dînê pûç ê Baal qebûl bikin.
Wî ji wan xwest ku an rastiyê qebûl bikin an derewê qebûl bikin û ji wan re got ku an riya rastdariyê an riya neheqiyê, an Peyva Xwedê a rast an peyvên xapînok ên dînê mirovan ji xwe re hilbijêrin.

Eger Êlyas ji te pirs bike û bêje:
«Heta kengê tê li ser herdu aliyan bikulin?» bersiva te wê çi be?
Nivîsarên Pîroz dibêjin:
«Tu kes nikare xulamtiyê ji du axayan re bike; çimkî an ewê ji yekî nefret bike û ji yê din hez bike, an jî ewê qedrê yekî bigire û yê din biçûk bibîne.» (Metta 6:24)
Tu kes nikare hem ji Xwedê re û hem jî ji tiştên pûç re xulamtiyê bike. «Heta kengê hûnê li ser herdu aliyan bikulin û biryara xwe nedin?»

Guhdarên delal, gelek spas ku we qenc guhê xwe da vê serhatiyê. Di bernameya ku bê de emê li serhatiya pêxemberekî din binêrin.
Ew pêxember sê rojan ma di zikê masiyekî mezin de. Gelo ma hûn navê wî dizanin? Cara ku bê jî bi me re bin û guhê xwe bidin serhatiya wî pêxemberî …

Heta hingê li ser van gotinên Êlyas bifikirin. Wî ji gel re got:

«Heta kengê hûnê li ser herdu aliyan bikulin? Eger Xudan Xwedê be, li pey wî herin.» (Padîşah I, 18:21)

Xwedê bi we re be!

Me di bernama din de li serhatiya pêxemberê Xwedê Êlyas nêrî.
Êlyas li hember pêxemberên Baal ên derewîn rabû û li ber çavê hemûyan,
dînê wan pûç û çewt derxist. Bi vî awayî Xwedê bi rêberiya Êlyas pêxember dilê gelê Îsraêl li Xudan Xwedayê wan, yanî li xwe zivirand.

Îro em dixwazin li serhatiya pêxemberekî din binêrin. Ew piştî Êlyas rabû û navê wî Ûnis bû. Xwedê ew hilbijart û şand cihekî dûr ba miletekî din, ku wan ji bo tobekirinê hişyar bike. Lê belê ew milet dijminê gelê Îsraêl bû!

Emê niha ji Kitêba Ûnis pêxember, deriyê yekê bixwînin. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
1 Rojekê ev peyva Xudan ji Ûnisê kurê Amîtay re hat: 2 «Rabe, here Nînewê, wî bajarê mezin. Û li hember wan dengê xwe hilde, çimkî xerabiya wan gihîştiye heta ber min.»

Gelo we bihîst ku Xudan çi emir li Ûnis kir? Xwedê jê re got ku ew here bajarê Nînewê û xelkê wî bajarî ji bo tobekirinê hişyar bike. Bi rastî bajarê Nînewê peytextê Aşûriyan bû. Aşûrî jî wek wan miletên din pûtperest bûn û miletekî xerab bûn; wan dixwest ku gelê Îsraêl bindest bikin.

Çima Xudan Xwedê Ûnis şand ba wan mirovên ku ne ji gelê wî bûn?
Wan gelê Îsraêl kêm didît û ji wan nefret dikirin.
Ma Xwedê xema dijminên gelê Îsraêl dixwar? Erê, wî xema wan jî dixwar!
Xwedê dixwest ku dîwana xelkê Nînewê bike, ji ber ku guneh û xerabiya wan gihîştibû ezmên. Lê belê daxwaza Xwedê ne ew bû ku ew helak bikiran;
Xwedê naxwaze ku gunehkar helak bibin. Xwedê dixwaze ku her kes tobe bike, ji gunehên xwe vegere, ji Peyva Xwedê bawer bike û xilas bibe.
Ji ber vê yekê Xudan emir li Ûnis kir ku here Nînewê û xelkê wî bajarî hişyar bike, da ku ji bo tobekirinê fersenda wan hebe û ew xilas bibin.

Daxwaza Xwedê ew bû ku xelkê Nînewê tobe bike, da ku rehmê li wan bike.
Lê belê Ûnis dixwest ku Xwedê wan ceza bike! Wî nexwest ku wan hişyar bike
û nexwest ji bo xelkê Nînewê bibe pêxember!
Loma Ûnis kardestiya xwe qebûl nekir û dixwest ku ji Xudan Xwedê dûr keve.
Lê belê ma mirov dikare here ku derê ku ji ber rûyê Xwedê bireve û xwe veşêre?

Niha emê bibînin ku Ûnis çi kir. Nivîsarên Pêxemberan weha dibêjin:
3 Lê belê Ûnis rabû ku ji ber Xudan bireve, here bajarê Terşîşê. (Terşîş li
Spanyayê bû.) Serejêr bû, çû Yafayê û gemiyeke ku diçû Terşîşê dît. Heqê riya
xwe da û li gemiyê siwar bû, da ku bi wan re here Terşîşê û ji ber Xudan dûr
keve.
4 Lê Xudan bayekî mezin şand ser deryayê; di deryayê de bahozeke mezin çêbû,
wusa li gemiyê hat wek ku wê bişkesta.
5 Gemîvan tirsiyan, her yekî ji wan hawar kir xudanê xwe û tiştên ku di gemiyê
de bûn avêtin deryayê, da ku gemiyê sivik bikin. Heçî Ûnis bû, daketibû embara
gemiyê ya binî, razabû û ketibû xeweke giran.
6 Hingê serwerê gemiyê nêzîk bû û ji wî re got: «Hey zilamo! Tu çawa radizî!
Rabe û bangî xwedayê xwe bike! Belkî xwedê me bîne bîra xwe û em helak
nebin.»
7 Hingê wan hemûyan ji hev re got: «Werin, em pişkê bavêjin û bizanin ku ji ber
kê ev bela hatiye serê me.» Û wan pişk avêt, pişk jî li Ûnis ket.
8 Hingê ji wî re gotin: «Em hêvî ji te dikin, ji me re bêje, ev bela ku li ser me ye
ji rûyê kê ye? Karê te çi ye? Tu ji ku derê têyî? Welatê te ku der e û tu ji kîjan
gelî yî?»
9 Wî ji wan re got: «Ez Îbranî me, ez diperizim Xudan Xwedayê ezmanan ê ku
derya û bejî afirandiye.»
10 Hingê ew gelek tirsiyan û ji wî re gotin: «Eva te kirî çi ye?» (Wan zilaman
dizanibû ku ew ji ber Xudan direve, çimkî wî berî hingê ji wan re gotibû.) 11
Wan  ji wî re got: «Em çi bi te bikin, ku derya li hember me raweste?» Çimkî
çiqas dihat, derya hê bêtir dibû bahoz.

[12] Wî jî bersîv da û got: «Min hildin û bavêjin deryayê, hingê derya wê li hember
we raweste. Ez dizanim ku ev bahoza mezin ji rûyê min hatiye ser we.»
[13] Lê zilaman bêrên şidayî kişandin, da ku vegerin bejê, lê nikaribûn vegerin,
çimkî çiqas dihat derya li hember wan hê bêtir dibû bahoz. [14] Îcar wan gazî
Xudan kir û gotin: «Ax, ya Xudan, em lavan ji te dikin, ji sedemê canê vî mirovî
bila em helak nebin û xwîna bêsûc neyne ser me. Ya Xudan, çimkî çawa li te
xweş hatibe, te wusa kir.»
[15] Wan Ûnis hilda, avêtin deryayê û harbûna deryayê sekinî. [16] Li ser vê yekê ev
zilamên ha ji Xudan gelek tirsiyan, gorî ji Xudan re serjêkirin û nedir kirin.
[17] Îcar Xudan masiyekî mezin amade kir, da ku Ûnis daqurtîne û Ûnis sê şev û sê
rojan di zikê masî de ma.

Dostên delal, me dît ku Ûnis ji ber Xwedê reviya û me dît ku çawa Xwedê her gav nêzîkî wî ma. Ûnis reviya, lê ji xwe wî nikaribû ji destê Xwedê derketa.
Çima çavê Xwedê li riya Ûnis bû? Ji ber ku Xwedê ji Ûnis hez dikir.
Xwedê dixwest ku Ûnis li gor daxwaza wî bike. Loma Xwedê masiyekî mezin şand, da ku Ûnis nekuje, lê wî daqurtîne.

Îcar Ûnisê reben xwe di zikê masiyekî mezin de dît.
Ma hêz û fersenda Ûnis hebû ku xwe bi xwe ji vî halî xilas bikira?
Na, qet tiştek ji destê wî nedihat. Bi tenê hêza Xwedê hebû ku wî rizgar bike.

Di deriyê diduyan ê Kitêba Ûnis pêxember de em dixwînin ku Ûnis di zikê masî de gunehê xwe eşkere kir. Wî fêm kir ku wî neguhdarî kiriye.
Sê rojan Xwedê Ûnis di zikê masî de parast û ev yek ji bo wî bû derseke girîng.
Di duaya xwe de wî weha gazî kir û got:
«Xilaskirin babetê Xudan e», yanî «bi tenê Xudan dikare xilas bike.»
Hingê Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
Xudan li masî emir kir û masî Ûnis vereşiya, avêt bejê.
4134

Guhdarên delal, Ûnis pêxemberekî Xwedê bû, lê dîsa jî wî kurahiya hezkirina Xwedê fêm nekir.

Ûnis pêxember qenc dizanibû ku Xwedê Afirandarê hemû mirovan e. Lê belê wî fêm nekir ku Xwedê ne tenê Afirandarê hemûyan e, lê li her derê ji hemû mirovan hez dike jî.
Rast e, Xwedê nerastî û gunehên mirovan qebûl nake, çimkî ew bi xwe rast û pîroz e û qet guneh li ba wî tune. Ji ber vê yekê ew dixwaze ku mirov ji riyên xwe yên xerab vegerin û guhê xwe bidin gotinên wî.
Xwedê qenc e û naxwaze ku gunehkar di nav gunehên xwe de bimire, lê dixwaze ku ew ji gunehên xwe vegere û bijî. Eger em ji dilê xwe poşman bibin û em bixwazin ku baweriya xwe bi wî bînin û di riya rast de biçin, ew her gav amade ye ku li gunehên me bibihûre.
Ûnis pêxember wilo nexwest, çimkî wî dizanibû, ku xelkê Nînewê dijminê gelê wî ye. Belkî em jî wusa difikirin, dibêjin: «Ma çêdibe ku Xwedê ji dijminên me jî hez bike û li wan bibihûre?»
Ûnis got: «Na, bila ev yek nebe!», lê Xwedê got: «Belê, hezkirina min ji bo her kesî ye.»

Di bernama din de me dît ku Ûnis pêxember nexwest ku here Nînewê, çimkî gelê Nînewê dijminê gelê wî bû. Me dît ku ew xebitî ku ji ber Xwedê bireve, lê çavê Xwedê li ser riya wî bû. Piştî ku hat avêtin deryayê, Ûnis sê rojan di zikê masiyekî mezin de ma û hingê hat avêtin bejê.

Piştî vê yekê Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
1 Cara diduyan peyva Xudan ji Ûnis re hat: 2 «Rabe, here Nînewê û wan peyvên
ku ez ji te re bêjim, bi wan bide bihîstin.»
3 Ûnis rabû û li gor peyva Xudan çû Nînewê. 4 Wî dest pê kir ket nav bajêr,
rojekê pê ve çû û bang kir, got: «Hê çil roj hene û piştre Nînewe wê hilweşe.»
5 Îcar xelkê Nînewê bawerî bi Xwedê anî û gotin: «Bila rojî bê girtin!» û ji
mezinê wan heta biçûkê wan xirarî li xwe kirin. 6 Çaxê ev peyv gihîşt padîşahê
Nînewê, ew ji textê xwe hat xwarê, xiftanê xwe ji xwe kir, xirarî li xwe pêça û di
nav xweliyê de rûnişt.
7 Hingê wî li Nînewê kir gazî û got: «Bi fermana padîşah û giregirên wî:
Bila mirov û heywan, pez û dewar tiştekî tam nekin, neçêrin û avê jî venexwin. 8
Û bila mirov jî û heywan jî xirari li xwe bikin û bi hêz hawar bikin Xwedê.
Û bila her kes ji riya xwe ya xerab û ji zordariya di destê xwe de vegere.
9 Kî dizane? Belkî Xwedê ji vê yekê vegere û poşman bibe, ji hêrsa xwe bizivire
ku em helak nebin.»
10 Xwedê dît ku ew ji riyên xwe yên xerab vegeriyan û wî dev ji wê belaya ku
gotibû wê bîne ser wan, berda.

Erê, dilê Xwedê bi xelkê Nînewê şewitî, çimkî wan ji peyva wî ya ku wî bi devê Ûnis şandibû, bawer kir. Xelkê Nînewê tobe kir, bi nefsbiçûkî ji gunehên xwe vegeriyan û li Xudan zivirîn.
Lê belê ev yek li Ûnis qet xweş nehat. Ne bi dilê wî bû ku dilê Xwedê bi dijminê wî şewitî. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê dibêjin:

1 Lê Ûnis gelek aciz bû û enirî. 2 Wî li ber Xudan dua kir û got:
«Ax, ya Xudan, ma hê çaxê ku ez li welatê xwe bûm min ev negot?
Ji bo vê yekê di cih de min hewl da ku ez herim Terşîşê, çimkî min dizanî ku tu Xwedayekî keremdar û dilbirehm î, tu dereng hêrs dikevî, kerema te gelek e û tu dev ji cezakirinê berdidî. 3 Ya Xudan, canê min ji min bistîne! Çimkî ji bo min mirin ji jiyanê çêtir e.»
4 Lê Xudan got: «Ma tu qenc dikî ku tu hêrs dikevî?»
5 Ûnis ji bajêr derket û li rojhilata bajêr rûnişt. Li wir ji xwe re kolikek çêkir û li bin siya wê rûnişt, da ku bibîne, wê çi bi bajêr bê.
6 Û Xudan Xwedê kerçik amade kir, derxist ser serê Ûnis, da ku li ser bike sî û wî ji halê wî yê xerab rizgar bike. - Kerçik şitilekî bi pelên fireh e û zû bilind dibe; li gor hinan wek kundir an jî wek miqewr e. -
Îcar Ûnis ji bo kerçikê bi şahiyeke mezin şa bû. 7 Lê roja din çaxê bû sibeh,
Xwedê kurmek amade kir û kurm li kerçikê xist, ew jî hişk bû.
8 Û dema roj derket, Xwedê bayê rojhilat yê şewatkar amade kir.
Tavê li serê Ûnis xist û ew gêj bû û xwest ku bimire û got: «Ji bo min mirin ji jiyanê çêtir e.»
9 Lê Xwedê ji Ûnis re got: «Ma tu qenc dikî ku tu ji bo kerçikê hêrs dikevî?»
Wî got: «Heta mirinê ez qenc dikim ku ez hêrs dikevim.»
10 Îcar Xudan got: «Tu li ser wê kerçika ku te di ber de zehmet nekişandiye û mezin nekiriye têşî. Ew di şevekê de derket û di şevekê de hişk bû çû.
11 Lê ma ez li ser Nînewê, li ser wî bajarê mezin neêşim?
Ew bajarê ku di wî de ji sed û bîst hezarî bêtir mirov hene ku nikarin destê xwe yê rastê û yê çepê ji hev nas bikin û gelek jî heywan hene.»

Guhdarên delal, di vê serhatiyê de li ser rewşa dil û ramanên mirovan û li ser cewhera Xwedê gelek dersên girîng hene.
Mesele, derseke girîng ev e ku li ba Xwedê xatirgirtin tune. Yanî Xwedê cihêtiyê naxe nav mirovan.
Dilê Ûnis bi xatirgirtinê tije bû, lê dilê Xwedê tije rehm û dilovanî ye.
Dilê wî bi hemû mirovan dişewite.
Ûnis ji gelê xwe hez dikir û ji dijminên xwe nefret dikir, lê belê Xwedê hem ji gelê Îsraêl û hem jî ji xelkê Nînewê hez dikir.
Ûnis dixwest ku dijminên wî helak bibin, lê Xwedê dixwest ku ew tobe bikin, peyvên wî qebûl bikin û xilas bibin.
Li ba Xwedê xatirgirtin tune. Tu kî bî, tu çawa bî, Xwedê ji te hez dike.
Xwedê ji her miletî û ji her kesî hez dike. Ew dixwaze ku her kes tobe bike, gunehên xwe eşkere bike, guhê xwe bide rastiyê, rastiyê fêm bike, jê bawer bike û xilas bibe.

Hin mirov dibêjin: «Xwedê xema hemû mirovan naxwe. Wî hin mirov hilbijartine, ku di dojehê de bişewitin û wî hinên din hilbijartine, ku di bihiştê de di dilxweşiyê de her û her şa bibin.»
Lê belê, ev yek ne wusa ye. Xwedê tu kes ji bo ku di dojehê de bişewite, neafirandiye. Rast e, gelek mirov hene ku di nav gunehên xwe de dimirin û li benda xezeba Xwedê dimînin. Lê belê mana vê yekê qet ne ew e ku Xwedê xema wan mirovên ku helak dibin, naxwe. Bervajiyê vê, Nivîsarên Pîroz ji me re bi zelalî dibêjin ku Xudan naxwaze ku kesek helak bibe, lê dixwaze ku hemû tobe bikin. (Petrûs II, 3:9)
Lê belê heçî ew in ên ku tobekirinê red dikin, Xwedê wê dîwana wan bike, çimkî wan ji bo xilasbûna xwe hezkirina rastiyê qebûl nekir;
ew hemû yên ku baweriya xwe bi rastiyê neanîne, lê kêfa wan ji neheqiyê re hatiye, wê bên dîwankirin. (Selanîkî II, 2:10.12)

Erê, Xwedê qenc e û wî ji bo hemûyan riya xilasiyê amade kiriye. Lê ji aliyê din ve jî Xwedê pîroz û dadperwer e û ewê dîwana her kesê ku riya wî ya xilasiyê qebûl neke, bike.

Dostên delal, bila tu kes di vê yekê de we nexapîne: Kêfa Xwedê ji wê yekê re nayê ku gunehkar helak bibin.
Na, daxwaza Xwedê ew e ku her kes rastiyê bizane, jê bawer bike û xilas bibe.
Loma Xwedê di demên bihûrtî de peyvên xwe bi destê pêxemberan dan nivîsandin; çimkî ew dixwaze ku em riya xilasiyê qebûl bikin û xilas bibin.
Her kesê ku riya Xwedê ya xilasiyê qebûl bike, wê bikeve bihiştê û her kesê ku bala xwe nade vê riyê, wê helak bibe.
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
Xwedê dixwaze ku hemû mirov xilas bibin … Lê belê eger hûn tobe nekin, hûn jî, hûnê hemû wusa helak bibin. (Tîmotêyos I, 2:4; Lûqa 13:3)

Di bernameya ku bê de Xwedê hez bike emê li ser nivîsarên Îşaya pêxember lêkolînê bikin. Wî pêxemberî li dor 700 salan beriya hatina Mesîh li ser Xilaskarê dinyayê gelek tişt gotin.

Heta hingê li ser wan herdu dersên ku Xwedê hînî Ûnis pêxember kiribûn, qenc bifikirin:

1) Xilaskirin babetê Xudan e.»
2) Li ba Xwedê xatirgirtin tune. (Ûnis 2:10; Karên Şandiyan 10:34)

Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me li serhatiya Ûnis pêxember nêrî. Ûnis xebitî ku ji ber Xudan bireve, lê ji xwe ev çênedibû. Mirov nikare ji siya xwe bireve û tam wusa jî ew nikare ji rûyê Xwedê bireve. Heta bi zikê masî, Xwedê her gav bi Ûnis re bû!

Îro em dixwazin li gotinên Îşaya pêxember binêrin. Îşaya piştî Ûnis rabû û di Nivîsarên Pîroz de ew yekî bi nav û deng e.
Ew li dor 700 salan beriya hatina Îsa Mesîh jiya. Îşaya bi xwe kahînek bû û di Perestgehê de dixebitî, yanî ew di Perestgeha ku Silêman padîşah ji bo Xwedê avakiribû de dixebitî.
Di Perestgehê de Îşaya û gelek kahînên din roj bi roj heywan serjêdikirin û ji Xwedê re dikirin gorî. Ew gorî ji bo Mesîhê ku wê xwîna xwe di ber gunehên mirovan de birijanda mînak bûn.

Niha guhê xwe bidinê ka rojekê Îşaya pêxember çi dît. Wî di Kitêba Îşaya, deriyê 6'an de weha nivîsiye:
1 Wê sala ku padîşah Ûziya mir, min Xudan li ser textekî rûniştî dît; ew bi rûmet û bilind bû, hêşiyên xiftanê wî, Perestgeh tije dikirin. 2 Li ber wî Serafîm disekinîn. Şeş baskên her yek ji wan hebûn: Bi dido ji wan, wan rûyê xwe dinixumand, bi diduyan wan lingên xwe dinixumandin û bi diduyên din ew difiriyan.
3 Wan gazî hevdu dikir, digotin: «Xudanê Ordiyan pîroz e, pîroz e, pîroz e; tevahiya dinyayê bi rûmeta wî tije ye.»
4 Ji dengê wan, bingehên derîzanan veheijyan û Perestgeh bi dû tije bû. 5 Min got: «Wey li serê min! Ez helak bûm, çimkî ez zilamekî lêvmurdar im û ez di nav miletekî lêvmurdar de rûdinim. Lê belê çavên min Padîşah, yanî Xudanê Ordiyan dît.»

[6] Hingê yek ji Serafîman ber bi min ve firî, hat û di destê wî de pelekî êgir hebû; wî ew bi pelgezê ji ser gorîgehê hildabû. [7] Wî bi pelê êgir dest devê min da û got: «Va ye, ev li levên te ket; sûcê te hat rakirin û gunehê te hat bexişandin.»
[8] Li ser vê yekê min dengê Xudan bihîst ku got: «Ez kê bişînim û kî wê ji bo me here?»
Îcar min got: «Va me ez, min bişîne!»

Erê, dostên delal, Îşaya di Perestgehê de bû û Xudan Xwedê rûmet û pîroziya xwe jê re diyar kir û gazî wî kir ku Peyva Xwedê ji gelê Îsraêl re, yanî ji Cihûyan re bide bihîstin û wan di kitêbekê de ji bo feyda nifşên ku bên jî binivîse.
Kitêba Îşaya pêxember dirêj e û dabaşa wê kûr e, lê belê em dikarin peyama Îşaya pêxember bi du xalên girîng bînin ber çavê xwe.

1) Îşaya mizgîniyeke tehl ji gelê Îsraêl re got: Wî li ser gunehên wan û li ser wî cezayê ku wan heq kiribû, ji wan re got.
2) Îşaya mizgîniyeke xweş da wan: Wî li ser Mesîhê ku wê bihata dinyayê da ku cezayê gunehên mirovan hilgirta, ji wan re got.

Pêşî em dixwazin li çend ayetên ku li ser mizgînya tehl dibêjin, binêrin.
Xwedê ev peyv gotin û li Îşaya emir kir, da ku ew wan ji Cihûyan re diyar bike.
Herweha ev peyvên Xwedê ji bo hemû mirovên ku guhên wan ji bo bihîstinê hene, hatine nivîsîn.
Di deriyê 1’e de Îşaya pêxember weha nivîsî:
[2] Ey ezmanno, guhdarî bikin! Ey erd, guh bideyê! Çimkî Xudan gotiye: Min zarok xweyî kirin û ew mezin kirin, lê ew li hember min rabûn.
[3] Ga xweyê xwe nasdike û ker jî afirê xweyiyê xwe dizane, lê belê Israêl nizane, gelê min fêm nake.
[4] Ax hey miletê sûcdar, gelê ku neheqiyê dike, dûndana xirabkaran, zarokên bedkar!

Wan dev ji Xudan berda û Pirozê Israêl kêm dîtin û pişta xwe dan wî!...
13 Êdî pêşkêşên pûç neynin! Bixûr di çavê min de tiştekî mekrûh e.
Ez nikarim civînên xerab, yanî civînên heyva nû û roja Şemiyê û gazîkirina ji bo kombûnan  ragirim!
14 Canê min ji cejnên we yên heyva nû û ji cejnên rojên pîroz nefret dike;
ew ji min re bûne bar û ez ji hilgirtina wan westiyam.
15 Çaxê ku hûn [di duakirinê de] destên xwe vekin, ezê rûyê xwe ji we badim.
Hûn gelek duayan bikin jî, ez guhê xwe nadimê;

Bi vî awayî Îşaya pêxember li Cihûyan hilat, çimkî ew durû bûn. Wî gunehên wan bi vî awayî anîn ber çavên wan û got:
«Xudan dibêje: ‹Ev gel bi devê xwe rûmetê dide min, lê dilê wan ji min dûr e.
Bi pûçîtî diperizin min; di hîndariya xwe de, ew emrên mirovan hîn dikin.›»
(Metta 15:8 / Îşaya 29:13)

Piştî ku Îşaya ji ber rikdarî û gunehên Cihûyan li wan hilat, wî dest bi mizgîniya qenc kir û li ser wê ji wan re got. Erê, hêza wê mizginiyê heye ku dilê wan ên ku jê bawer dikin, paqij bike.
Niha em dixwazin di vê dema ku ji me re maye de guhê xwe bidin çend gotinên newaze ên ku Îşaya pêxember li ser Mesîhê ku wê bihata dinyayê, nivîsîne. Wî weha got:
18 Xudan dibêje: Werin, em li doza xwe binêrin:
Gunehên we wek qurmiz bin jî, wê wek berfê spî bibin;
Ew wek sîsikê qurmiz sor bin jî, wê bibin wek livayê. (Îşaya 1:18)

Xwedayê me dibêje: «Di ber dilê wan de werin, di ber dilê gelê min de werin!
3 Dengê yekî gazî dike, dibêje:
‹Li çolê riya Xudan amade bikin, li çolistanê ji bo Xwedayê me riya fereh serrast bikin!›

4 Her gelî wê tije bibin, her çiya û gir wê nizim bibin, xwehrî wê rast bibin û
cihên asê wê bibin deşt.
5 Rûmeta Xudan wê eşkere bibe û hemû mirov wê bi hev re wê bibînin…
9 Ya Siyona ku mizginiyê dide, derkeve çiyayekî bilind! Ya Orşelîma ku
Mizginiyê dide, dengê xwe bi hêz bilind bike, bilind bike û netirse! Ji bajarên
Cihûstanê re bêje:Va ye Xwedayê we. 10 Va ye, Xudan Xweyî bi hêza xwe tê!

Û dibêje:

Xudan bi xwe wê nîşanekê bide we: Va ye, keçik wê bizaro bibe û ewê kurekî bîne û wê navê wî Îmanûêl deyne. (Îşaya 7:14; Metta 1:23)

Xwedê bi devê Îşaya pêxember sireke pirr mezin eşkere kir.

Plana Xwedê ew bû ku wiyê Ruhê xwe bişanda malzaroka keçikekê û bi vî awayî Mesîh wê bihata dinyayê. Wek ku hûn dizanin, li ser vê dinyayê bavê Mesîh tunebû.

Beriya ku ew li ser vê dinyayê çêbe, ew li ezmên bû, çimkî ew ew Peyv e ya ku ji destpêkê ve li ba Xwedê bû. Li gor pêxemberîtiya Îşaya pêxember, Mesîh wê Xwedayê di bedena mirov de bûya. Ev çi rastiyeke kûr û newaze ye!

Wek ku me di destpêka bernameyên xwe de dît, Xwedê bi xwe Ruh e.

Û niha em di pêxemberîtiyên Îşaya de dibînin ku daxwaza Xwedê ew bû ku ew bi Ruhê xwe, Peyva xwe bixe malzaroka keçikekê, da ku Peyva Xwedê bibe mirov.

Îşaya pêxember li ser vê yekê weha got:

«Va ye, keçik wê bizaro bibe û ewê kurekî bîne. Û wê navê wî Îmanûêl deynin», ku bê wergerandin: «Xwedê bi me re ye.»

Guhdarên delal, bi vê pêxemberîtiya Îşaya ya newaze, bernama me ya îro bi dawî dibe. Heta cara ku bê, Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dest bi pêxemberîtiyên Îşaya pêxember kir û me dît ku Xwedê bi devê wî ji gelê Îsraêl re li ser demeke nû peyivî û bi wan da zanîn ku Xilaskar wê bi awayekî newaze ji keçikekê çêbe.

Di deriyên din de jî Îşaya gelek tişt li ser hatina Mesîh nivîsîne. Li cihekî wî weha gotiye:
[2] Ew gelê ku di tariyê de rûdine ronahiyeke mezin dît. Li ser wanên ku li diyarê siya mirinê rûdinin, ronahî derket… [6] Çimkî zarokek ji me re çêbû,
Kurek ji me re hat dayîn;seroktî wê li ser milê wî be. Navên wî wê ev bin:
Şîretkarê newaze, Xwedayê hêzdar, Bavê herheyî, Serokê aştiyê. (Îşaya 9:2)

[5] Hingê çavên koran wê vebin, guhên kerran jî wê vebin. [6] Hingê yê kulek wê wek xezalan xwe hilavêje û zimanê yê lal wê bi şahî biqîre (Îşaya 35:5-6)

Bi van gotinan Îşaya ji pêşî ve got ku Mesîh wê pîroziyê û rehma Xwedê bîne vê dinyayê. Herweha wî pêxemberîtî kir ku Mesîh wê gelek karên nedîtî bike, yanî wê kerametên ku tu kesê din qet nikare çêke, bike. Bi vî awayî wê kifş bibe ku bi rastî ew Mesîhê pîroz e yê ku ji rûmeta Xwedê hatiye. Loma Îşaya got ku navên Mesîh wê weha bên gotin:
Şîretkarê newaze, Xwedayê hêzdar, Bavê herheyî, Serokê aştiyê.

Gelek mirov hene ku difikirin, dibêjin: «Mesîh jî pêxemberek wek pêxemberên din bû.» Ew dibêjin: «Di nav wî û pêxemberên din de ferq tune.»
Lê belê ji van navên ku Îşaya pêxember li ser Mesîh gotine, bi awayekî zelal kifş dibe ku ew bi xwe ji fikrên weha re tu riyê nahêle û wan derew derdixe.
Bervajiyê van fikran, Îşaya pêxember rûmeta Xilaskarê ku wê ji rûmet û cewhera Xwedê bihata vê dinyayê, bi zelalî fêm kiribû.

Di Kitêba Îşaya de deriyeke din heye ku niah divê em qenc lê binêrin. Ew deriyê 53’an e. Ev derî di nav hemû pêxemberîtiyên ku Îşaya nivîsîne de, yê herî newaze ye, çimkî di vî deriyî de Îşaya pêxemberîtî kir ku Mesîh wê wek berxê goriyê xwîna xwe birijîne û bi wî awayî cezayê gunehên mirovan bikişîne.
Ji kerema xwe qenc guhê xwe bidin Mizgîniya ku Xwedê 700 salan beriya hatina Mesîh, da pêxemberê xwe Îşaya.

Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
1 Ma kê bi xebera ku me da bawer kir? Zendê Xudan ji kê re xuya bû?
2 Çimkî ew [yanî Mesîh] li ber wî wek tirhê ciwan û wek rayê ku ji erdê zuwa dertê, derket.
Ne dirûv û ne jî spehîtiya wî hebû ku bala me bikişanda; dîtina wî jî nebû ku dilê me biçûya wî.
3 Ew kêm hat dîtin û ji aliyê mirovan ve hat redkirin; ew zilamê êşnas û janan bû; wek yekî ku mirov rûyê xwe jê dinixumîne, ew kêm hat dîtin û me ew hesab nekir.
4 Lê bi rastî wî êşên me kişandin û nexweşiyên me hildan ser xwe;
me guman kir ku ew hat ceza kirin û ji aliyê Xwedê ve hat lêxistin û nizimkirin.
5 Lê belê ew ji ber neheqiyên me xurimî [yanî hat birîndarkirin],
ew ji ber sûcên me hat perçiqandin;
ew cezayê ku ji bo aştiya me bû, ket ser wî û bi birînên wî em sax bûn.
6 Me hemûyan wek miyan rê şaş kir, her yek ji me ket ser riya xwe bi xwe;
lê Xudan sûcê me hemûyan danî ser wî.

7 Zilim lê kirin û nizim kirin, lê wî devê xwe venekir;
wek berxê ku ji bo serjêkirinê tê birin û wek miya ku li ber cewîzan bê zimên disekine, wî devê xwe venekir.
8 Bi bêrehmî dîwana wî hat kirin û ji holê hat rakirin;
Ma di nifşê wî de kî li ser vê yekê fikirî?
Çimkî ew ji diyarê zindiyan hat rakirin; ji ber neheqiya gelê min, li wî hat xistin.

9 Bi ser ku wî zordarî nekir û hîle ji devê wî derneket jî, li ba xerabkaran gorr jê
re hat dayîn, lê dema ew mir, li ba yekî  dewlemend bû.
10 Lê belê li Xudan xweş hat ku wî biperçiqîne û bixe cefayê;
çaxê tu canê wî bikî goriya gunehan,
ewê dûndana xwe bibîne û rojên emrê xwe dirêj bike;
Bi destê wî, daxwaza Xudan wê pêk bê.
11 Ji ber keda canê xwe, dilê wî wê bi tiştê ku bibîne xweş bibe.

Bi fêmdariya xwe, Yê Rastdar, xulamê min, wê gelekan rastdar bike û ewê
sûcên wan hilde ser xwe.
12 Ji bo vê yekê ezê bi mezinan re parê bidim wî û  ewê bi yên xurt re palûtê li
xwe leva bike.
Çimkî wî canê xwe rijand, da mirin û  bi xerabkaran re hat hesabkirin; lê wî sûcê
gelekan hilgirt û ji bo xerabkaran mehder kir.

Erê, Îşaya pêxember ev tiştên ha li ser êş û cefayên Mesîh gotin. Wî bi zelalî kifş kir ku Xilaskar wê cefa bikişanda û xwîna xwe birijanda, da ku gunehên me bihatan bibexişandan. Mesîh wê deynê gunehên mirovan bida û Xwedê wê gunehên mirovan afû bikiran.
Loma Îşaya pêxember nivîsî:
Ew ji ber neheqiyên me xurimî,ew ji ber sûcên me hat perçiqandin …
6 Me hemûyan wek miyan rê şaş kir, her yek ji me ket ser riya xwe; lê Xudan
sûcê me hemûyan danî ser wî.  (Îşaya 53:5.6)

Bi wî awayî Xwedê wê hem rastdariya xwe û hem jî pîroziya xwe kifş bikira.

Bêgûman, meaşê gunehan mirin e, lê ji ber ku Mesîhê pîroz cezayê gunehan kişand û mir, gunehên mirovan dikarin bên afûkirin û bi vî awayî êdî mirov dikarin nêzîkî Xwedê bibin.

Erê, di van ayetan de em xalên herî girîng ên peyama Îşaya dibînin, yanî mizgîniya tehl û mizgîniya şîrîn:

1) Mizgîniya tehl ev e ku em hemû gunehkar in û em bi xwe nikarin xwe xilas bikin. Loma Îşaya nivîsî: [6] Me hemûyan wek miyan rê şaş kir, her yek ji me ket ser riya xwe bi xwe; lê Xudan sûcê me hemûyan danî ser wî.

2) Mizgîniya şîrîn: Plana Xwedê ji bo xilaskirina gunehkaran heye û wî ew plan bi mirin û rabûna Mesîh ve girêdaye. Loma Îşaya nivîsî: Lê belê ew ji ber neheqiyên me xurimî,ew ji ber sûcên me hat perçiqandin … û Xudan sûcê me hemûyan danî ser wî.

Dostên delal, gelo hûn fêm dikin ku gunehên we di çavê Xwedayê pîroz de çiqas mezin in? Gelo ma hûn bawer dikin ku Mesîh ji keçikekê çêbû û hat dinyayê? Gelo hûn bawer dikin ku bi rastî mana navê Mesîh «Xwedê bi me re ye»? Gelo ma hûn fêm dikin, ka çima diviya ku Mesîh wek berxê goriyê xwîna xwe birijanda?

Li ser pêxemberîtiyên Îşaya hûr û kûr bifikirin, çimkî peyvên wî jiyana herheyî pêşkêşî me dikin. Xwedê dixwaze ji bo fêmkirina van tiştan alîkariya we bike û eger pirsên we li ser van pêxemberîtiyên Îşaya hebin, ji kerema xwe ji me re binivîsin.

Gelek spas ku we qenc guhê xwe da gotinên pêxemberê Xwedê Îşaya. Heta bernameya ku bê, qenc li ser vê peyama Xwedê bifikirin a ku dibêje:
Werin, em li doza xwe binêrin:
Gunehên we wek qurmiz bin jî, wê wek berfê spî bibin;
Ew wek sîsikê qurmiz sor bin jî, wê bibin wek livayê. (Îşaya 1:18)

Di bernama din de me bihîst ku Îşaya pêxember gelek tişt li ser Mesîhê ku wê bihata vê dinyayê nivîsîne. 700 salan beriya hatina Mesîh Xwedê ji Îşaya re eşkere kir ku Xilaskarê gunehkaran wê ji rûmeta Xwedê bê, wê ji keçikekê çebe, wê jiyaneke paqij û pîroz bijî û gelek kerametên newaze û nedîtî bike.
Herweha Îşaya pêxemberîtî li ser mirin û rabûna Mesîh kir û got ku ewê wek berxê goriyê xwîna xwe birijîne û bi wî awayî cezayê gunehên dinyayê bikişîne. Îcar, çaxê ku ew bimira, wiyê mirin bindest û betal bikira û ji nav miriyan rabûya û ji her kesê ku baweriya xwe bi wî bianiya re, wiyê jiyana herheyî bida.

Îro em dixwazin li peyvên pêxemberekî din binêrin. Navê wî Yêremya bû û ew jî di nav pêxemberên Xwedê de yekî mezin û girîng bû.

Yêremya li dor 100 salan piştî Îşaya pêxember bû. Wek ku me berî niha jî dît, gelê Îsraêl êdî ne padîşahiyek tenê bû. Di wê demê de hem padîşahiya Cihûstanê û hem jî padîşahiya Îsraêlê hebû.
Di rojên Yêremya de padîşahiya Îsraêlê hatibû bindestkirin û êdî nemabû. Xwedê Îsraêliyên wê padîşahiyê dabûn destê dijminên wan, çimkî wan qet ji peyamên pêxemberên Xwedê bawer nedikirin û nedixwestin ku tobe bikin û ji gunehên xwe vegerin.
Îcar di rojên Yêremya de bi tenê padîşahiya Cihûstanê mabû. Ew li başûr bû û paytextê wê, bajarê Orşelîmê bû; Perestgeha ku Silêman padîşah avakiribû jî li wir bû. Wek ku me dît, eşîra Cihûda ji aliyê Xwedê ve hatibû hilbijartin ku Mesîh jê rabûya û pirraniya xelkê padîşahiya Cihûstanê ji eşîra Cihûda bûn.

Yêremya di gundekî biçûk de li derdora Orşelîmê hat dinyayê. Bavê Yêremya li Orşelîmê kahîn bû û di Perestgehê de dixebitî.
Di wan rojan de pirraniya xelkê Orşelîmê dîndar bû û li gor adetên bavkalên xwe dikirin, lê belê wan guhê xwe nedida Peyva Xwedayê xwe Xudan.

Lê belê Yêremya ne wusa bû; wî ji Peyva Xwedê hez dikir û li hêviya hatina Mesîh dima.

Niha em dixwazin guhê xwe bidinê ka Xwedê çawa gazî Yêremya kir û ew kir pêxember. Hingê Yêremya xortekî li dor hejdeh, bîst salî bû. Di Kitêba Yêremya de, Yêremya weha li ser vê yekê nivîsiye:

Ev peyva Xudan ji min re hat: 5 «Hê ku min di malzaroka diya te de dirûv
nedaye te, min tu nas kirî û beriya ku tu ji dayikê bibî, min tu pîroz kirî: Min tu
ji miletan re kirî pêxember.»
6 Îcar min got: «Ax, ya Xudan! Va ye, ez nizanim bipeyivim, ez zarok im.»
7 Lê Xudan ji min re got: «Nebêje ez zarok im. Çimkî ji kê re ez te bişînim,
tê herî û her tiştê ku min li te emir kiriye, tê bêjî. 8 Xudan dibêje: Ji wan netirse;
ez bi te re me, ku ez te rizgar bikim.»
9 Û Xudan destê xwe dirêj kir, da devê min û ji min re got: «Va ye, min peyvên
xwe xistin devê te. 10 Binêre, mir îro tu danî ser milet û padîşahiyan, da ku tu ji
ra ve hilkî û hilweşînî, wêran û xera bikî û da ku tu ava bikî û biçînî.»
(Yêremya 1:4-10)

Bi vî awayî Xwedê gazî Yêremya kir, ew kir pêxemberê xwe. Xwedê jê re got: Here nav Cihûyan û ji wan re bêje, ezê dîwana wan bikim. De vêca eger ew ji gunehên xwe venegeriyan û li Xudan nezivirîna û guhê xwe nedana Peyva Xwedê, hingê Xwedê wê dîwana wan bikira.
Erê, kardestiya Yêremya giran û zehmet bû, çimkî Cihûyan qet nedixwest ku yek ji wan re bêje: «Karên we yên dîndariyê û goriyên we li Xwedê xweş nayên!»
Lê belê daxwaza Yêremya ne ew bû ku li mirovan xweş bê, lê wî dixwest ku li Xwedê xweş bê. Loma wî 24 salan li Orşelîmê û li seranserê Cihûstanê peyvên Xwedê dan bihîstin û ji xelkê re got: «Xwedê ez şandime, da ku ez we hişyar bikim.

Eger hûn ji gunehên xwe venegerin û tobe nekin û guhê xwe nedin Peyva Xwedê, Xwedê wê ordiya miletê Babîlê rake û bîne ser we, da ku hem bajarê Orşelîmê û hem jî Perestgeha Xwedê bişewitînin. Ewê we bigirin û sirgûn bikin, bajon welatekî dûr.»
Erê, peyama ku Yêremya ji Cihûyên li Orşelîmê û li seranserê Cihûstanê re got ev bû.

Emê niha çend ayetan ji nivîsarên Yêremya pêxember ji we re bixwînin û hûnê bibihîzin ka wî çawa Cihûyên nifşê xwe hişyar kirin. Di deriyê 7'an de weha dibêje:

[1] Ji Xudan ev peyv ji Yeremya re hat: [2] «Di deriyê mala Xudan de raweste û li
wê derê dengê xwe hilde, vê peyvê bêje: Ey tevahiya Cihûda, yên ku di van
deriyan re derbas dibin ku biperizin Xudan, guh bidin peyva Xudan.
[3] Xwedayê Îsraêl, Xudanê Ordiyan weha dibêje:
Riyên xwe û kirinên xwe rast bikin û ezê we di vî cihî de rûnînim.
[4] Pişta xwe bi peyvên derew ve girênedin û nebêjin: Perestgeha Xudan,
Perestgeha Xudan, Perestgeha Xudan ev e.
[5] Çimkî eger hûn riyên xwe û kirinên xwe qenc rast bikin, eger hûn di navbera
mirovekî û cîranê wî de tam dadperweriyê bikin, [6] eger hûn heqê yê xerîb, sêwî
û jinebiyê nexwin û di vî cihî de xwîna bêsûc nerijînin û ji bo ziyana xwe li pey
îlahên din neçin, [7] hingê ezê we li vî cihî, li diyarê ku min ji berê heta paşê daye
bav û kalên we rûnînim.
[8] Va ye, hûn pişta xwe bi peyvên derew û bêkêr ve girêdidin. [9] Ma ne wusa ye?
Hûn diziyê dikin, dikujin, zînayê dikin, bi derew sond dixwin… û li pey
xwedayên din ên ku hûn nas nakin diçin [10] û hingê hûn tên û di vê mala ku bi
navê min tê gazîkirin de li ber min radiwestin û dibêjin: «Em xilas bûn!» û hûn
ji nû ve van hemû tiştên mekruh dikin!»

Bi vî awayî Yêremya li Cihûyan hilat û ew hişyar kirin. Wan guman dikir ku ew Xwedê nas bikin, lê belê bi kirinên xwe, wan ew înkar dikir. Di deriyê 17'an de Yêremya weha berdewam dike, dibêje:

Xudan weha dibêje:
«Yê ku li mirovan ewle dibe û benderuh ji xwe re dike piştevan
û dilê wî ji Xwedê vediqete, di bin nifrê de ye.
[9] Dil ji her tiştî zêdetir xapînek e û sax nabe.
Ma kî dikarî wî fêm bike?
Ez, Xudan, ez dil hildikewêşim û daxwazan diceribînim,
da ku ez li gor riyên her kesî û li gor berê kirinên wî bidimê.» (Yêremya 17:5.9.10)

Erê, bi van gotinan Yêremya gelê padîşahiya Cihûstanê hişyar kir û ji wan re got: «Eger hûn ji dil û can tobe nekin û li Xwedê nezivirin, ordiya Babîlê wê bê û wê hem bajarê Orşelîmê û hem jî vê Perestgehê wêran bikin û hûn jî, hûnê bibin xulam û koleyên wan.»

Guhdarên delal, di bernama ku bê de emê hê bêtir li peyama Yêremya pêxember binêrin û emê bibînin ka tiştê ku wî got, hat cih an ne.
Ji kerema xwe, di bernama ku bê de jî bi me re bin.

Di bernama din de me bihîst ku Yêremya pêxember li gor emrê Xwedê gelê Îsraêl hişyar dikir û ji wan re digot ku li Xwedayê xwe vegerin. An ne, dijminên wan wê bihatan û ew biajotan welatekî dûr.

Lê belê pirraniya wan qet guhê xwe nedida vê hişyarkirina Xwedê.
Heta kahînên Perestgehê jî ji gotinên Yêremya bawer nedikirin.
Çaxê ku wan peyama wî bihîst, wan ew girt, dan ber qamçiyan û heta êvarê ew avêtin zîndanê.
Kahînan qet nikaribûn bawer bikiran, Xwedê wê bihişta ku ordiya Babîlê biketa Orşelîmê, bajarê Orşelîmê û Perestgeha ku Silêman avakiribû, wêran bikiran.
Perestgeh, Perestgeha Xwedê bû û li gor bîr û baweriya wan, Xwedê wê tu caran nehişta ku Perestgeha wî bê xerakirin.
Loma kahîn pirr hêrs ketin, çimkî Yêremya hem pêxemberîtî dikir û hem jî ev gotinên Xwedê di kitêbê de nivîsîne.
Padîşahê gelê Îsraêl jî gotinên Yêremya red kirin!
Carekê nivîsareke Yêremya dan padîşah û jê re peyvên Xwedê xwendin.
Lê belê wî kêr derxist û nivîsar birrî, avêt êgir û ew hemû peyvên Xwedê hatin şewitandin. Erê, padîşahê Orşelîmê weha kir. Wî qet tobe nekir û wî qet gotinên Xwedê qebûl nekirin. Rast e, wî gotinên Xwedê şewitandin, lê wî nikaribû emrê Xwedê biguherta.
Xwedê bi Ruhê xwe ji Yêremya re got ku wan gotinên Xwedê ji nû ve binivîse, da ku ew winda nebin.

Em di Kitêba Yêremya pêxember de dibînin ku padîşah, kahîn û xelkê Cihûstanê gelek cefa dan Yêremya û çend caran ew avêtin zîndanê.
Carekê wan ew avêt bîreke kûr a ku av tê de nebû, herrî hebû.
Lê belê Xwedê alîkariya wî kir û bi destê zilamekî Afrîqanî ew xilas kir.

Tiştekî din heye ku divê em bînin ber çavên xwe.
Pirraniya Cihûyan guhê xwe nedidan peyvên Yêremya pêxember, lê belê mana vê ne ew e ku wan qet guhê xwe nedidan tu kesî! Naxêr. Bervajiyê vê, wan qenc guhê xwe dida wan zilamên ku ji wan re digotin: «Em pêxember in!» - lê belê ew pêxemberên derewîn bûn!
Erê, hingê gelek mirov hebûn ku xwe bi xwe dikirin pêxember.
Nivîsarên Pîroz li ser gelekan ji wan ji me re dibêjin. Bi rastî, ew ne pêxember in, lê ew mirovên durû û xapînek in, çimkî peyama wan ne ji Xwedê ye.

Pêxemberên derewîn weha ji xelkê re digotin: «Neqehirin, qet xeman nexwin! Erê, Yêremya li ser wêranbûna bajarê me dibêje, lê tiştekî weha çênabe.
Miletê Babîlê nikare Orşelîmê bindest bike. Tu kes nikare Perestgeha Xwedê wêran bike. Ji xwe, Xwedê wê me biparêze. Rihet bin û bila ji bo aştiyê kêfa we bê!»

Lê belê Yêremya dengê xwe bilind kir û ji her kesî re got:
«Xudanê Ordiyan weha dibêje:
Guhê xwe nedin peyvên wan pêxemberên ku ji we re pêxemberiyê dikin.
Ew tiştên pûç hînî we dikin; ew ne ji devê Xudan ji we re dibêjin, lê xewneroja dilê xwe dibêjin. [21] Ev pêxemberên ha ne min şandine, lê ew bi xwe bezîn hatin; min ji wan re negot, lê wan bi xwe pêxemberîtî kir.
[22] Lê eger ew di civîna min de rawestayî bûna, wan wê peyvên min bi gelê min bidan bihîstin û wê ew ji riyên wan ên xerab û ji xerabiya kirinên wan vegerandan.»

Bi vî awayî Yêremya her gav xelk hişyar dikir ku ji gotinên pêxemberên derewîn bawer nekin. Lê heyf û mixabin, pirraniya xelkê Orşelîmê guhê xwe nedida gotinên pêxemberê Xwedê Yêremya.
Wan bi şahî gotinên pêxemberên derewîn qebûl dikirin.

Lê di dawiyê de, çaxê ku êdî bûbû dereng, padîşah, kahînan, xelkê û pêxemberên derewîn jî bi çavên xwe dîtin ka kîjanî bi rastî Peyva Xwedê ji wan re gotibû û kîjanan derew ji wan re gotibûn.
Wan ev yek fêm kir, çimkî her tiştê ku Yêremya ji wan re li ser wêranbûna Orşelîmê û li ser wêranbûna Perestgeha Xwedê gotibû, tam wusa derket.
Di dawiyê de, Peyva Xwedê her gav rast derdikeve.
Ji kerema xwe guhê xwe bidin Nivîsarên Pîroz. Ew li ser vê yekê weha dibêjin:

Di sala nehan a padîşahtiya Sedekiya de ... padîşahê Babîlê Nebuqednêtsar bi xwe û tevahiya ordiya wî hat ser Orşelîmê. Wan li derveyî bajêr ordîgeh danî û li hawirdora wî çeper çêkirin. Heta bi sala yanzdehan a padîşah Sedekiya, hawirdora bajêr hat girtin.
Di meha çaran, roja nehan de, di bajêr de xela ewqas dijwar bû ku ji bo xelkê nan nema. Hingê dever li dîwarê bajêr vebû û leşkeran padîşah girt.
Wan ew bir ba padîşahê Babîlê û wî dîwana wî kir. Padîşahê Babîlê kurên Sedekya li ber çavên wî dan kuştin û hemû serwerên Cihûstanê jî li Rîblayê hatin kuştin. [11] Wî çavên Sedekiya dan korkirin û ew bi zîncîran da girêdan û ew bir Babîlê û ew heta roja mirina wî di girtîgehê de hişt. Perestgeha Xudan û qesra padîşah û hemû malên Orşelîmê şewitandin û agir berdan her mala mezin. Ordiya Kildaniyan hemû sûrên li hawirdora Orşelîmê hilweşandin.
Serdarê parêzgeran Nebûzaradan hin ji xelkê herî belengaz û yên ku di bajêr de mabûn û yên ku ji bajêr bazdabûn, bûbûn xwegirtiyên padîşahê Babîlê, bi jêmayiyê pîşekaran re sirgûn kirin.
Lê belê Nebûzaradan hin ji belengazên welêt hiştin, da ku di rez û zeviyan de bixebitin. Îcar gelê Cihûstanê ji ser axa xwe hat ajotin.

Erê, Xwedê her tiştê ku wî bi devê pêxemberê xwe Yêremya gotibû, anî cih. Hingê êdî her kesî dizanî ku peyvên Yêremya, peyvên rastiyê bûn. Lê belê zanîna wê yekê ji wan re bêkêr bû, çimkî wan dereng bawer kir û êdî ew di destên leşkerên Babîlê de bûn.

Guhdarên delal, di Roja Dawî de her kes, yanî hemû zarokên Adem wê bizanin, ka çi rast e û çi nerast e. Lê belê Xwedê naxwaze ku tu wê rojê rastiyê bizanî, ew dixwaze ku tu **niha** bizanî ka çi rast e û çi nerast e.
Eger tu bi tenê di Roja Dawî de rastiyê bizanî, wê ji te re bêkêr be, çimkî wê dereng be. Divê ku tu niha di jiyana xwe de rastiyê bizanî û qebûl bikî!
Di Roja Dawî de, fersenda tobekirinê tune. Wê rojê, mirovên ku tobe nekirine, wê di nav gunehên xwe de helak bibin.  Loma Peyva Xwedê dibêje:
Va ye, dema meqbûl niha ye; va ye, roja xilasiyê niha ye. (Korîntî II, 6:2)

Û dibêje:
Hezkirîno, ji her ruhî bawer nekin, lê ruhan biceribînin ka ew ji Xwedê ne an ne. Çimkî gelek pêxemberên derewîn derketine dinyayê. (Yûhenna I, 4:1)

Di bernameya ku bê de emê bibînin ka çi hat serê Cihûyên ku hatin ajotin, çûn Babîlê.

Heta hingê li ser soza Xwedê ya ku wî bi devê Yêremya pêxember ji me re gotiye, qenc bifikirin. Xwedê gotiye:
«Hûnê li min bigerin û eger hûn ji hemû dilê xwe li min bigerin, hûnê min bibînin.» (Yêremya 29:13)

[Di bernama ku bê de jî em bi şahî li benda we ne.]

Di bernameya din de me li ser Kitêba Yêremya lêkolînek kir.
Yêremya li dor 600 salan beriya hatina Mesîh pêxemberîtî kir.
Me dît ku wî çawa xelkê Orşelîmê û Cihûyên derdora wî bajarî hişyar dikirin û ji wan re digot: «Divê hûn tobe bikin, ji gunehên xwe vegerin û li Xwedê bizivirin; an na, ordiya miletê Babîlê wê bê û wê bajarê Orşelîmê û Perestgeha Xwedê wêran bike û we sirgûn bikin, bajon Babîlê.» Pirraniya xelkê qet guhê xwe neda gotinên Yêremya, lê belê Xwedê bi devê pêxemberê xwe çi gotibe, her tişt tam wusa derket.

Lê belê wêranbûna Orşelîmê nehat wê manê ku Xwedê dev ji gelê ku wî ji xwe re hilbijartibû berda. Ji xwe Xwedê ew peymana ku wî bi Birahîm, Îshaq û Aqûb re girêdabû, ji bîr nedikir. Wî ji Birahîm re gotibû:
Hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.
Ji xwe Xwedê plana xwe ji bîr nekir. Daxwaza wî tam wek berê bû: Wiyê Xilaskar bişanda dinyayê û ewê ji dûndana Birahîm û ji gelê Îsraêl rabûya.
Loma Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Xwedê çawa 70 salan xema Cihûyên ku li Babîlê bûn, xwar. Piştî wan 70 salan, wî ew li gor soza xwe vegerandin welatê wan, yanî welatê Îsraêl û bajarê Orşelîmê. Lê emê di bernameyeke din de li ser vê serhatiyê bibihîzin.

Îro em dixwazin li serhatiya xortekî Cihû binêrin ê ku di nav girtiyên ku hatibûn ajotin Babîlê de bû. Navê wî xortî Daniyêl bû û ew jî pêxemberekî Xwedê bû.
Mana navê Daniyêl ev e: Xwedê dadgerê min e, yanî: Xwedê hakimê min e.
Bi rastî ev navê wî li gor jiyan û şexsê wî tam rast bû. Daniyêl ji bilî wî Xwedayê ku wê di Roja Dawî de dîwana her kesî bike, ji tu kesî din neditirsiya.
Daniyêl li ser navûdengiya xwe ya di nav mirovan de nedifikirî.
Ew bi tenê li ser tiştên Xwedê difikirî. Bi rastî Xwedê dadgerê Daniyêl bû.

Hê çend sedsalan berî hingê, Silêman padîşah nivîsîbû: Tirsa mirovan xefikê vedide, lê belê yê ku li Xudan ewle dibe, tê parastin û Daniyêl tam li gor vê gotinê kir. (Gotinên Silêman 29:25)

Daniyêl pêxember jî li gor daxwaza Xwedê kitêbek nivîsiye.
Di Kitêba Daniyêl de gelek pêxemberîtiyên ecêb hene û eger ne bi hêza Xwedê be, tu mirov nikare pêxemberîtiyên weha bike. Bi tenê Xwedê dizane ku di dema dawî de wê çawa çêbe. Lê bi rêberiya Xwedê, Daniyêl li ser serhatiyên miletan nivîsiye, yanî beriya ku ew milet çêbin, wî li ser wan nivîsî!
Mesele, Daniyêl li ser padîşahiyên Fars, Yewnan û Romayiyan û li ser kirinên padîşahên wan nivîsî. Lê belê, dema ku wî ev tişt nivîsîn, mesele miletê Romayiyan hê nedihat zanîn.
Wek çend pêxemberên din, Daniyêl jî li ser hatina pêşî û li ser hatina diduyan a Mesîh nivîsî. Yanî Daniyêl nivîsî ku di dema hatina Mesîh a pêşî de, Mesîh wê ji nav gelê xwe bê birrîn, yanî wê bê kuştin. (Daniyêl 9:26)
Li ser hatina Mesîh a diduyan wî nivîsî ku ewê bi dadperwerî dîwana mirovan bike. Guhê xwe bidin van gotinên Daniyêl ên ku dîtina wî ji me re eşkere dikin:
Çaxê ku min dinêrî, text hatin danîn û yê ku rojên wî bêdestpêk in, rûnişt.
Xiftanê wî wek berfê spî bû û porê serê wî wek hiriya paqij bû; textê wî pêta êgir bû û tekerên têxt agirê gur bûn. [10] Robarekî agir diherikî, ji ber wî derdiket; bi hezar hezaran ji wî re xizmet dikirin û bi deh hezaran deh hezar li ber wî radiwestan. Hakim rûniştin û kitêb hatin vekirin.
Min di dîtiniyên şevê de dît, va ye, yekî ku mîna kurê mirov e bi ewrên ezmên hat, hat heta ba wî yê ku rojên wî bêdestpêk in û li ber wî ew nêzîk kirin.
[14] Hukumdarî, rûmet û padîşahtî
Ji wî re hat dayîn û hemû gel û milet û ziman perizîn wî.
Hukumdariya wî hukumdariya herheyî ye û derbas nabe û padîşahtiya wî nayê hilweşandin.

Ji ber ku wextê me tune ku em li tevahiya Kitêba Daniyêl binêrin, em dixwazin hinekî li serhatiyên jiyana Daniyêl binêrin, çimkî ew jî beşekî Nivîsarên Pîroz in.

Di deriyê pêşî ê Kitêba Daniyêl de em dibînin ku padîşahê Babîlê Nebûqadnetsar çend xortên Cihû hilbijartin, da ku ew ji bo xizmeta wî bên perwerdekirin.
Wî xortên herî zane û çeleng bijartin, çimkî diviyabû ku ew gelek tiştên giran û zimanê Babîlê û herfên Kildanî hîn bibûna.
Daniyêl bi sê hevalên xwe ve di nav wan xortên hilbijartî de bû.
Îcar Daniyêl di xwendegeha padîşahê Babîlê de dest bi xwendinê kir.
Lê di roja pêşî de asteng jê re derket. Padîşahê mezin ê Babîlê biryar dabû ku divê xortên xwendegeha wî ji şeraba herî xweş vexwin û ji xwarina herî qenc bixwin.
Lê belê ew şerab û xwarin beriya ku bihatan ser sifrê, ji pûtan re dihatin pêşkêşkirin.
Gelo ma ji bo Daniyêl çêdibû ku ew bi xwarina wan tiştan beşdarî perizîna pûtan bibûya? Nexêr, ew qet çênedibû. Çima çênedibû? Ji ber ku Daniyêl ji Xwedê ditirsiya. Daniyêl qet ne razî bû ku tiştek li hember Xwedayê xwe Xudan bikira û lewre ew amade bû ku li hember tiştekî weha rabe û heta bê kuştin jî.
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
Lê Daniyêl xist dilê xwe ku xwe bi xwarin û şeraba padîşah murdar neke û wî ji serwerê karmendên qesrê hêvî kir ku destûrê bide wî ku xwe murdar neke. (Daniyêl 1:8)
Ew çû ba serwer û jê re got: Ez ji te hêvî dikim, deh rojan me biceribîne, bila ji bo xwarinê pincar, yanî şînayiyê û ji bo vexwarinê avê bidin me. Bila piştî wan deh rojan hem li rûyê me û hem jî li rûyê xortên ku ji xwarina padîşah xwarine, binêrin û hingê biryara xwe bide.»
Xwedê di çavê serwer de kerem da Daniyêl û wî qebûl kir ku vê yekê biceribîne.

Piştî deh rojan rûyê Daniyêl û hevalên wî ji rûyê wan hemûyên din spehîtir bû û bedena wan jî ji yên din xurtir û qelewtir bû.
Loma serwer xwarina padîşah ya xweş û şeraba wî rakir û pincar, yanî şînayî û av da Daniyêl û hevalên wî.
Xwedê jî şehrezayî û zanastî da wan ku ji her tiştî, qenc fêm bikin.

Xwedê alîkariya Daniyêl û hevalên wî kir û ew ji vê tengahiyê xilas kirin.
Xwedê ew bimbarek û pîroz kirin û şehrezayî û fêmdarî da wan. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
Daniyêl û her sê hevalên wî dest pê kirin, ji padîşah re xizmet kirin.
Û di her pirsa ku padîşah bi wan re dişêwirî de, wî dît ku ew ji hemû sêrbaz û falvekerên padîşahiyê deh caran şehrezatir in. (Daniyêl 1:20)

Îcar Daniyêl 20 salan ji bo çar padîşahan xebitî û Xwedê di her tiştî de bi wî re bû.

Guhdarên delal, di bernama ku bê de emê careke din li jiyana Daniyêl pêxember binêrin û emê li ser serhatiyeke bi nav û deng hîn bibin. Ji bo vê yekê jî bi me re bin.

[Bila Xwedê wê şehrezayiya ku dabû Daniyêl, bide we jî.]

Di bernama din de me dest pê kir, li jiyana Daniyêl pêxember nêrî. Me dît ku ew yekî Cihû bû, lê ew li Babîlê rûdinişt, çimkî bajarê Orşelîmê ji aliyê ordiya Babîlê ve hatibû wêrankirin. Dîsa jî Daniyêl di welatê xerîbiyê de dixwest ku guhê xwe bide peyvên Xwedê û li gor emrên wî bike.

Îro em dixwazin li serhatiyeke din a jiyana Daniyêl binêrin.
Di vê serhatiyê de qenc kifş dibe ku Daniyêl ji Xwedê pê ve ji tu kesî din neditirsiya.
Karmendên padîşah li gor rastiyê nedikirin û bertîl distandin, ji ber ku di dilê wan de tirsa Xwedê nebû.
Lê belê Daniyêl her neheqî û xerabî red dikir, ji ber ku dilê wî bi tirsa Xwedê tije bû.

Di vê serhatiyê de Daniyêl xizmeta padîşah Dariyus dikir û di emrê xwe de pêşve çûbû. Padîşahiya Babîlê êdî nemabû, çimkî wek ku Daniyêl pêxemberîtî kiribû, Med û Farsan Babîl bindest kiribû û padîşahî di nav xwe de leva kiribûn.

Di deriyê 6’an de Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
1 Dariyus qenc dît ku sed û bîst satrapan deyne ser padîşahiyê, ku li hemû welêt
serweriyê bikin 2 û sê wezîran deyne ser wan. Yek ji wan Daniyêl bû. Satrapan
hesab didan wan wezîran, da ku zarar negihîşta padîşah.
3 Daniyêl ji wezîr û satrapan çêtir derket, ji ber ku di wî de ruhekî herî qenc hat
dîtin û padîşah dixwest ku wî deyne ser hemû padîşahiyê.
4 Loma wezîr û satrap li fersendê geriyan ku ji sedemê karên welêt giliyê
Daniyêl bikin, lê nikaribûn fersenda gilîkirinê, an jî sûc bibînin, çimkî ew dilsoz
bû û ne xeletî û ne jî sûcê wî peyda bû. 5 Îcar wan got: «Eger em ji ber Şerîeta
Xwedayê wî tiştekî nebînin, em li hember vî Daniyêlî fersenda gilîkirinê
nabînin.»

[6] Hingê wezîr û satrap zêriyan ba padîşah û jê re weha gotin:
«Her bijî, ya padîşah Dariyus! [7] Hemû wezîrên welêt, qeymiqam û satrap,
şîretkar û walî bi hev şêwirîn û li hev hatin ku emir û fermaneke padîşah weha
bê derxistin û mecbûrkirin: ‹Her kî heta sî rojan ji te pê ve ji xwedayekî, an jî ji
mirovekî din xwestekekê bixwaze, ya padîşah, bila bê avêtin kortala şêran.›
[8] Niha ya padîşah, li gor Qanûna Med û Farisan a ku nayê guhertin, qedexeyê
deyne, nivîsê destxet bike, ku neyê guhertin!»
[9] Padîşah Dariyûs jî ferman destxet kir.

[10] Di mala Daniyêl de, di odeya wî ya jor de, berê pencereyan li Orşelîmê bû.
Çaxê Daniyêl bihîst ku nivîs hat destxetkirin, ew çû mala xwe û di wê odê de
wek ku berê dikir, rojê sê caran çû ser çokan, dua kir û ji Xwedayê xwe re şikir
kir.
[11] Wê gavê ew zilam bi hev re çûn û dîtin ku Daniyêl li ber Xwedayê xwe dua û
lavan dike. [12] Ew çûn ber padîşah û li ser fermana wî weha gotin:
«Ma te qedexeyeke weha destxet nekir a ku dibêje: ‹Her kî heta sî rojan ji te pê
ve ji xwedayekî, an jî ji mirovekî din xwestekekê bixwaze, ya padîşah, bila bê
avêtin kortala şêran.›?»
Padîşah bersîv da û got: «Li gor Qanûna Med û Farisan a ku nayê guhertin, ev
rast e.»
[13] Li ser vê yekê wan got: «Daniyêl, yek ji sirgûnên Cihûstanê, ew hem te, ya
padîşah û hem qedexeya ku te destxet kiriye nahesibîne û rojê sê caran duaya
xwe dike.»
[14] Dema padîşah ev bihîst, gelek qehirî û xist dilê xwe ku Daniyêl xilas bike û
heta roj çû ava xebitî ku wî rizgar bike.
[15] Lê zilam bi hev re çûn ber padîşah û jê re gotin: «Ya padîşah, bizane ku li gor
Qanûna Med û Farisan tu ferman an qedexeya ku padîşah daniye, nayê
guhertin.»
[16] Îcar padîşah emir da û Daniyêl anîn û avêtin kortala şêran.

Padîşah ji Daniyêl re got: «Bila Xwedayê te yê ku bêrawestin tu jê re xizmetê
dikî, te xilas bike!»
17 Û kevirek anîn û danîn ber devê kortalê û kevir mor kirin, da ku ji bo Daniyêl
tu tişt neyê guhertin. 18 Hingê padîşah çû qesra xwe û xwarin nexwar; bêyî ku
kêf û şahiyê bide kirin, şev derbas kir û xewa wî reviya.
19 Serê sibê zû padîşah rabû û bi lez çû kortala şêran. 20 Û dema nêzîkî kortalê
bû, wî bi dengekî xemgîn gazî Daniyêl kir û got: «Ya Daniyêl, xulamê Xwedayê
jîndar, gelo Xwedayê te yê ku tu bêrawestin jê re xizmetê dikî, dikarî te ji
pencên şêran xilas bike?»
21 Daniyêl ji padîşah re got: «Padîşah her bijî! 22 Xwedayê min milyaketê xwe
şand û devê şêran girt û wan ez neêşandim; çimkî li ber wî sûcê min peyda nebû
û li hember te jî, ya padîşah, min tiştekî xerab nekiriye!»
23 Padîşah bi şahiyeke mezin dilgeş bû û emir da ku Daniyêl ji kortalê derxin û li
ser wî qet birîn* nehat ditin, çimkî ew li Xwedayê xwe ewle bûbû.
24 Hingê padîşah emir da û wan ew mirovên ku giliyê Daniyêl kiribûn anîn û ew
û jin û zarokên wan avêtin kortala şêran û hê beriya ku ew bigihîjin binê kortalê,
şêran lepên xwe avêtin wan û hemû hestiyên wan şikandin.
25 Îcar padîşah Dariyûs ji mirovên hemû gel, milet û zimanên li seranserê
dinyayê re nivîsand û got:
«Bila silameta we zêde be!
26 Ez fermanê didim ku mirovên li her derê di hemû padîşahiya min de, bila ji
Xwedayê Daniyêl bitirsin û bilerizin, çimkî ew Xwedayê jîndar e û her û her
dimîne. Padîşahiya wî xera nabe û serweriya wî her û her dikişîne.
27 Ew xilas dike û rizgar dike;
Ew li ezmanan û li erdê nîşan û kerametan dike;
Yê ku Daniyêl ji lepên şêran xilas kiriye ew e.» Amîn.

* peyva xermûç ne di ferhengokan de û ne jî di internetê de heye

Gelo we bihîst ku padîşahê pûtperest çi got? Çaxê wî dît ku Xwedê çawa Daniyêl ji devê şêran xilas kiribû, wî got:
«Ez fermanê didim ku mirovên li her derê di hemû padîşahiya min de, bila ji Xwedayê Daniyêl bitirsin. Çimkî ew Xwedayê jîndar e û her û her dimîne.»

Gelo hûn ji Xwedayê Daniyêl ditirsin? Pirs ne ew e ma em ji hevalên xwe, ji fikrên wan, ji bav û kalên xwe, ji adet û daxwazên wan ditirsin, an na.
Pirs ev e: Gelo bi rastî em ji Xwedê ditirsin? Ma tu dixwazî li Xwedê xweş bêyî û guhê xwe bidî Peyva wî ya pîroz?
Daniyêl ji  Xwedê ditirsiya, loma tirsa wî ya ji mirovan nebû.
Daniyêl qet nedixwest tiştekî ku di çavê Xwedê de nerast be, bike û ji bo vê yekê ew amade bû ku şeva xwe di nav şêran de derbas bike.
Lê belê ma tu li ser van tiştan çi difikirî? Ma tu wek Daniyêl ji Xwedê ditirsî? Ma tu wek Daniyêl ji neheqiyê nefret dikî? Ma tu wek Daniyêl ji Peyva Xwedê hez dikî?

Gelek spas ku we qenc guhê xwe da serhatiyên Daniyêl pêxember. Di bernama ku bê de emê bibînin ku Cihû çawa ji Babîlê vegeriyan welatê xwe.
Heta hingê li ser vê rastiyê qenc bifikirin a ku dibêje:

Tirsa mirovan xefikê vedide,
Lê belê yê ku li Xudan ewle dibe, tê parastin. (Gotinên Silêman 29:25)

Xwedê bi we re be û we pîroz bike!

Di bernameyeke beriya niha de me dît ku Yêremya pêxember çawa gelê xwe hişyar kir, da ku guhê xwe bidin Peyva Xwedê.
Wî ji wan re got: «Eger hûn guhê xwe nedin emir û şîretên Xwedê û tobe nekin, Xwedê wê leşkerên Babîlê bişîne ku welatê we wêran bikin û we sirgûn bikin, we bajon, bibin cihekî dûr.»
Cihûyan bala xwe nedan hişyarkirinên pêxemberê Xwedê. Loma tam wek ku Yêremya ji pêşî ve gotibû, ordiya Babîlê ji Rojhilatê hat û bajarê Orşelîmê û Perestgeha Xwedê wêran kirin, gelek Cihû girtin û birin Babîlê. Bi vî awayî gelê Cihû ji welatê xwe hat avêtin û li gelek welatan belav bû, çimkî wan qet nexwest peyvên pêxemberên Xwedê qebûl bikin.

Lê belê ma çêdibû ku neguhdariya Cihûyan ji dilsoziya Xwedê re bibûya asteng? Na, tu caran! Erê, gelê Cihû ji ber gunehên xwe li Babîlê dîl bûn, lê Xwedê ew ji bîr nekiribûn. Guhê xwe bidin peyvên Yêremya pêxember; wî ji wan re weha got:
«Xudanê ordiyan, Xwedayê Îsraêl ji wan hemûyên ku wî ji Orşelîmê ajotine Babîlê re weha dibêje: Dema ku ji bo Babîlê tam heftê sal temam bibin, ezê li we bigerim û ezê soza xwe bînim cih û ezê we vegerînim vî cihî.
Ez wan planên ku ez ji bo we li ser difikirim, dizanim; ew … planên aştiyê ne, da ku ez paşerojeke bi hevî bidim we.» (Yêremya 29:4.10.11)

Bi van gotinan Yêremya ji Cihûyan re da zanîn ku Xwedê ew ji bîr nekirine. Plana Xwedê ew bû ku piştî 70 salan ew wan vegerîne welatê bav û kalên wan. Bi rastî, Xwedê dilsoz e û li ser sozên xwe dimîne û peymanên xwe tîne bîra xwe û li gor wan pêxemberîtiyên ku dane kirin, dike.
Xwedê gotibû: Ezê hemû miletên li ser rûyê erdê bi dûndana Birahîm, Îshaq û Aqûb pîroz û bimbarek bikim. Wî ev yek ji bîr nekir.

Xwedê peyvên xwe spartin gelê Îsraêl, da ku ew di nav hemû zarokên Adem de bên bihîstin. Xwedê ev yek tu caran ji bîr nekiribû.
Me di bernameyên xwe de dît ku Xwedê çawa ji nav gelê Îsraêl pêxemberên xwe rakirin û peyvên xwe xist dev û dilê wan, da ku ew bidin bihîstin û ji bo nifşên ku bên jî bên nivîsandin.
Em dizanin ku Xwedê kitêbên Tewratê bi destê Mûsa dan nivîsandin.
Em dizanin ku Xwedê stranên Zebûrê xistin dilê Dawid.
Herweha me dît ku Xwedê peyvên xwe xistin dilê Yêşû, Samûêl, Silêman, Îşaya, Yêremya û Daniyêl û ji wan re got ku divê wan hemû tiştan li gor rastiyê binivîsin. Bi vî awayî Nivîsarên Pîroz pêk hatin.
Hem jî me dît ku hemû Nivîsarên Pîroz peyvên pêxemberên Xwedê ne û plana Xwedê diyar dikin. Yanî wan li ser vê plana Xwedê digot ku Xwedê wê Xilaskarê dinyayê bişanda û ew bi xwe wê ji gelê Îsraêl bihata.

Îro emê bibînin ku Xwedê çawa Cihû vegerandin welatê Cihûstanê, çimkî li gor plana Xwedê diviya ku Mesîh li diyarê Cihûda bihata dinyayê. Emê bibînin ku tam li gor peyvên Yêremya pêxember, gelê Cihû 70 salan li Babîlê dîl man piştre vegeriyan Orşelîmê.

Beriya ku em dest bi xwendinê bikin, divê em bînin bîra xwe ku hingê diyar û bajarê Babîlê di destê Farisan de bûn.

Niha em di Kitêba Ezra de, deriyê 1'ê dixwînin. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
1 Ji bo ku peyva Xudan a bi devê Yêremya bê cih, Xudan di sala pêşî ya padîşahê Farisan Koreş de, ruhê wî hişyar kir, wusa ku wî di tevahiya padîşahiya xwe de weha da bihîstin û hem jî da nivîsîn:
2 «Padîşahê Farisan Koreş weha dibêje: Xwedayê ezmanan Xudan hemû padîşahiyên dinyayê dan min û emir li min kir ku ez li Orşelîma Cihûstanê ji bo wî perestgehekê çêkim.

3 Ji hemû gelê wî di nav we de kî hebe, Xwedayê wî bi wî re be û bila derkeve
Orşelîma Cihûstanê û bila mala Xwedayê Îsraêl Xudan ava bike, çimkî ew li
Orşelîmê Xwedê ye. …» 5 Li ser vê yekê serekên malbatên Cihûda û Binyamîn,
kahîn û Lêwî, hemûyên ku Xwedê rûhê wan hişyar kiribû, rabûn ku herin û li
Orşelîmê mala Xudan ava bikin. 6 Hemû cîranên wan ji bilî wan hemû pêşkêşên
ku bi dilxwazî ... dan wan, bi firaxên zîv û bi zêr, bi mal û bi heywanan û bi
tiştên bi qîmet alîkariya wan kirin. 7 Bi ser de, padîşah Koreş ew firaxên ku
Nebûqadnetsar ji Orşelîmê derxistibûn û danîbûn mala xwedayên xwe deranîn û
ew dan wan.

Ma Xwedê sozên xwe yên ku wî beriya demeke dirêj bi devê pêxemberê xwe Yêremya ji Cihûyan re gotibû, anîn cih?

Erê, wî ew anîn cih. Me di bernameyên berî niha de dît ku Xwedê çawa destûr da padîşahê Babîlê ku leşkerên wî, bajarê Orşelîmê wêran bikin û Perestgeha Xwedê hilweşînin. Niha em dibînin ku padîşahê Faris Koreş emir da, ku destûra her yekî Cihû hebe ku bikare vegere welatê xwe û hem Perestgeha Xwedê û hem jî bajarê Orşelîmê ji nû ve ava bike.

Yanî Xwedê tam li gor pêxemberîtiyên Yêremya kir. Bi rastî, Xudan padîşahê padîşahan e. Her tişt di destê wî de ye. Ew dem û wextan kifş dike û her tiştê ku ew dibêje, wê çêbe jî. Silêman pêxember nivîsî:

Di destê Xudan de dilê padîşah wek cobarên avê ye; bi kîjan aliyî ve bixwaze, li wî cihî vedigerîne. (Gotinên Silêman 21:1)

Nivîsarên Pîroz ji me re diyar dikin ku komeleke Cihûyan rabû, ji welatê Farisan vegeriya welatê Cihûstanê û hat bajarê Orşelîmê. Navê rêberê wan Zerûbabel bû.

Dema ku ew gihîştin Orşelîmê, dilê wan pir xemgîn bû, çimkî tevahiya bajêr wêran bû û Perestgeha Xwedê, ya ku Silêman dabû çêkirin, hilweşandî bû.

Sûr û dîwar nemabûn, bi tenê kevirên şkênandî û xwelî hebûn.

Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin, pêşî Cihû li cihê ku di demên berê de Perestgeha Xwedê bû, li hev civiyan.
Wan ji nû ve gorîgeheke mezin çêkir û heywan kirin gorî.
Bi hev re wan şikir ji Xudan kir û pesnê wî dan, çimkî wî ew li Babîlê û di nav gelê Faris de 70 salan parastin û destûr da wan ku vegerin welatê xwe.
Bi rastî, Xwedê alîkariya wan kir û destên wan hêzdar kirin û di nav gelek tengahiyan û di nav gelek salan de wan bajarê Orşelîmê, Perestgeha Xudan û dîwarê li dor bajêr ji nû ve çêkirin.

Belkî mirov hene ku dipirsin û dibêjin: Ma ji bo me tiştekî girîng e ku Cihû vegeriyan Orşelîmê?
Dostên delal, binêrin, ev yeka ku Cihû vegerian welatê xwe, gelek girîng e; çimkî li gor soza Xwedê diviya ku Mesîh di welatê Cihûstanê de bihata dinyayê.
Pêwist bû ku Cihû vegeriyana welatê Birahîm, Îshaq û Aqûb, da ku Xilaskarê dinyayê, yanî Xilaskarê min û te li wir bihata dinyayê.

Guhdarên delal, gelek spas ku we qenc guhê xwe dayê.
Di bernama ku bê de emê li çend gotinên Zekerya pêxember binêrin.
Heta hingê Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dît ku Cihûyan ji nû ve Orşelîm û Perestgeh ava kirin.
De vêca piştî Cihû ji nû ve di welatê xwe de li Orşelîmê rûniştin, Xwedê pêxemberekî din rakir. Navê wî Zekerya bû.
Xwedê ew şand, da ku ew baweriya gelê Îsraêl xurt bike, wan li Xwedê vegerîne û sozên Xwedê bîne bîra wan. Peyama wî ew bû ku Mesîh wê li gor wextê kifşkirî bê û ew dem çiqas dihat, nêzîktir dibû. Em dizanin ku ji dema Zekerya pêxember û heta hatina Mesîh bi tenê pênc sed sal derbas bûn.

Niha em dixwazin bala xwe bidin çend gotinên ku Xwedê bi devê Zekerya ji gelê Îsraêl re gotin. Di deriyê pêşî yê Kitêba Zekerya pêxember de em weha dixwînin:
1 Ev peyva Xudan ji pêxember Zekeryayê kurê Îdo kurê Berekya re hat: 2
«Xudan li bav û kalên we gelek hêrs ket. 4 Hûn nebin wek bav û kalên xwe!
Çimkî pêxemberên berê gazî wan kirin, gotin: Xudanê Ordiyan weha dibêje:
‹Ji riyên xwe yên xerab û ji kirinên xwe yên xerab vegerin.› Lê belê wan guhdarî
nekir û bala xwe nedanê. 5 Kanê bav û kalên we, ew li ku derê ne? Û heçî
pêxember in, ma ew her û her dijîn? 6 Lê belê ew peyv û qanûnên min ên ku min
li xulamên xwe yên pêxember emir kiribûn, ma ew negihîştin bav û kalên we?»
(Zekerya 1:1.2.4.5.6)

Gelo we hişiyarkirina Zekerya pêxember bihîst? Wî ji gelê Îsraêl re got: «Xudan li bav û kalên we gelek hêrs ket. 4 Hûn nebin wek bav û kalên xwe!»
Çima Xwedê li bav û kalên Cihûyan hêrs ket?
Xwedê li wan hêrs ket, çimkî wî pêxemberên xwe dişandin ba wan, lê wan qet guhê xwe nedan wan. Loma ew ketin destê gelê Babîlê û hatin ajotin.
Bav û kalên wan dîndar bûn, lê belê Xwedê ji wan ne razî bû, çimkî wan gotinên pêxemberan avêtin pişt guhê xwe û ew înkar kirin. Cihûyên wan rojan, hinekî mîna xelkê îro bûn.

Mirovên îro jî dibêjin: «Ji xwe em ji hemû pêxemberan bawer dikin!», lê eger tu li jiyana wan binêrî, kifş e ku ew qet bala xwe nadin gotinên pêxemberan û ew nizanin ku di Nivîsarên Pîroz de çi nivîsî ye.
Erê, dînên wan hene, lê belê têkiliya wan a bi Xwedê re tune.
Heçî Cihûyên dema Zekerya pêxember bûn, tam wusa bû. Wan gotinên pêxemberan hesab nedikir. Ew bi devê xwe diperizîn Xwedê, lê dilê wan, gotinên Xwedê qebûl nedikir.
Loma Xwedê Zekerya pêxember şand, da ku ew gelê Îsraêl hişyar bike. Xwedê nedixwest ku ew di rêçên bav û kalên xwe de herin, çimkî wan bi devê xwe digot: «Ya Xwedê, ya Xwedê!», lê di dilê xwe de wan Peyva Xwedê înkar dikir û pêxemberên wî red dikirin

Piştî vê hişyarkirinê, Zekerya dest pê kir, ji Cihûyan re li ser Xilaskarê ku wê bihata nav wan, çend tişt gotin.
Di Kitêba Zekerya, deriyê nehan de, wî got ku rojekê Mesîh wê li kerekî siwarbûyî bikeve Orşelîmê. Wî got:

Ey bajarê Siyonê, gelek şa bibe, ey xelkê Orşelîmê, biqîre!
Va ye, Padîşahê te tê; ew rast û serfiraz e,
Ew bi nefsbiçûkî li kerê siwarbûyî,
Li dehşikê, yanî li dehşikê kerê siwarbûyî tê ba te. (Zekerya 9:9)

Di deriyê 11'an de, wî li ser çend tiştên newaze got, lê wextê me tune ku em hûr û kûr li wan hemûyan binêrin. Erê, li vir Zekerya gotiye ku Mesîh wê ji bo sî zîvan bê radestkirin. Wî weha nivîsiye:

Min ji wan re got: «Eger di çavê we de qenc be, meaşê min bidin min; lê eger ne qenc be, dev jê berdin.» Îcar wan sî zîv kişandin ku bibe meaşê min.
13 … Min jî ew sî zîv standin û min ew li Perestgeha Xudan ji cerçêker re avêtin.

Di deriyê 12’an de, Zekerya pêxemberîtiyeke din kir û got ku Cihû wê Mesîh bikujin! Wî got:
«Xudan weha dibêje:
Ezê ruhê keremê û lavakirinê birijînim ser mala Dawid û ser xelkê Orşelîmê.
Ewê li min, li wî yê ku wan bedena wî qul kirine, binêrin û wek yekî ku ji bo kurê xwe yê yekta şînê digire, wê ji bo wî şînê bigirin û wek yekî ku ji bo nixuriyê xwe êşê dikişîne, ewê ji bo wî êşê bikişînin.
Û eger yek ji wî re bipirse: «Ev birîn … çi ne?», ewê bêje: «Ev ew birîn in ên ku min di mala dostên xwe de standine.» (Zekerya 12:10; 13:6)

Zekerya bi van gotinan ji pêşî ve eşkere kir ku Mesîh wê bê birîndarkirin.
Kîjan endamên bedena wî wê birîndar bibûna?
Çend sed salan beriya Zekerya pêxember Dawid pêxember di Zebûrê de li ser Mesîh weha nivîsî, got:
Ew dest û lingên min qul dikin. (Zebûr 22:16)

Erê, Cihûyan wê Mesîh teslîmî Romayiyan bikira û wan wê ew xaç bikira. Ji bo vê yekê Romayiyan wê destên Mesîh bi bizmaran qul bikiran û newqa wî bi rimê qul bikiran.
Bi vî awayî her tiştê ku Zekerya pêxember û Dawid pêxember li ser Mesîh nivîsandibûn, di jiyana Îsa Mesîh de hat cih. Erê, hemû pêxemberîtiyên li ser Îsa Mesîh bi awayekî newaze li hev digirin û di jiyana wî de hatin cih.

Dostên delal, Xwedê dixwaze ku em hemû vê yekê qenc fêm bikin:
Ji bo xilaskirina zarokên Adem ji destpêkê ve plana Xwedê hebû. Parçeyê herî girîng di vê planê de ev e ku Mesîh wê li ser xaçê bimira.
Mesîhê rast wê di ber mirovên nerast û xerab de ceza bistanda û bihata kuştin.
Peyama hemû pêxemberên Xwedê ev bû. Gelo ma we ev yek qenc fêm kiriye?

Guhdarên delal, ma hûn  fêm dikin ka Zekerya pêxember û Dawid pêxember çend sed salan beriya hatina Mesîh li ser Mesîh çi gotine?
Ma bi rastî hûn baweriya xwe bi van gotinên pêxemberan tînin? Ma hûn bawer dikin ku Mesîh cefa dît, hat kuştin, ji nav miriyan rabû û bexişandina gunehan da bihîstin? Ma hûn bawer dikin ku ew jiyana herheyî dide wan hemûyên ku baweriya xwe bi wî tînin û soz dide ku Xwedê wê wan qebûl bike bihişta xwe? Peyva Xwedê dipirse, dibêje: Ma baweriya te bi pêxemberan heye? (Karên Şandiyan 26:27)

Nivîsarên Pîroz li ser peyama pêxemberan  weha dibêjin:
Pêxemberîtiyan kêm nebînin. (Selanîkî I, 5:20)
Û dibêje:
Bi vî awayî peyva pêxemberîtiyê ji me re hê bêtir qayîm hat deranîn…  Hûnê qenc bikin ku hûn bala xwe bidin peyvên pêxemberîtiyê. (Petrûs II, 1:19)

Guhdarên delal, ji bo vê dema ku we ji bo guhdarîkirinê ji me re veqetand, em gelek spas dikin. Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de li çend gotinên pêxemberekî din binêrin. Ev pêxember di nav wan zilamên Xwedê yên ku beriya hatina Mesîh kitêbeke Nivîsarên Pîroz nivîsandine de, yê dawî ye.

Heta hingê li ser vê pirsa Kitêba Pîroz qenc bifikire û bersiva rast û ji dil bide wê. Pirs ev e: Ma baweriya te bi pêxemberan heye? (Karên Şandiyan 26:27)

Demeke dirêj e ku em li ser beşê pêşî yê Kitêba Pîroz lêkolînê dikin.
Navê vî beşî, Peymana Pêşî an jî Peymana Kevin e.
Di vî beşê pêşî de, Tewrat, Zebûr û Nivîsarên Pêxemberan hene.
Wek ku me dît, Xwedê peyvên xwe dan gelek pêxemberan; ji kêmahî ve 30 pêxemberan di nav 1500 salan de kitêbên Peymana Pêşî nivîsandin.

Îro emê lêkolîna xwe ya di beşê pêşî yê Kitêba Pîroz de xilas bikin. Lê beriya ku em li deriyên dawî yên Peymana Pêşî binêrin, em dixwazin hinekî li ser dersên ku em heta niha hîn bûne, bifikirin. Em dikarin peyama hemû pêxemberên Xwedê bi van her sê xalên girîng bînin ber çavê xwe:

| | |
|---|---|
| Ya pêşî: | Xwedê pîroz û paqij e û dîwana her gunehî dike. |
| Ya diduyan: | Hemû zarokên Adem gunehkar hatin dinyayê û rojekê wê li ber dîwana Xwedê bisekinin. |
| Ya sisiyan: | Plana Xwedê ew bû ku wiyê Xilaskarekî pîroz bişanda û wî Xilaskarî wê di ber zarokên Adem de cezayê gunehan bikişanda. |

Hemû pêxemberên Xwedê li ser van her sê tiştan digotin. Em wan careke din dubare dikin:

Ya pêşî: Xwedê pîroz e û çavên xwe li gunehan naneqîne.

Ya diduyan: Mirov ne pîroz û paqij e. Dilê wî tije gunehan e û ew bi xwe qet nikare xwe ji cezayê gunehan xilas bike.

Ya sisiyan: Ji bo rizgarkirina mirovan plana Xwedê heye û li gor plana wî, daxwaza wî ew e ku gunehkaran paqij bike û wan ji dîwana Roja Dawî xilas bike.

Gelo we rastiya van her sê xalan fêm kir? Yanî ma rastiya wan her sê xalan ket hişê we? Gelo we fêm kir ku pîroziya Xwedê çiqas mezin e?
Ma we fêm kir ku sûcê gunehên we di çavê Xwedê de, yanî di çavê dadgerê hemû mirovan de çiqas mezin e?
Gelo hûn dizanin ji bo ku hûn paqij bibin û xilas bibin, plana Xwedê ji bo we heye?

Erê, rast e, Xwedê pîroz û paqji e û mirov ne paqij in. Me rastiya van herdu xalan di dersên xwe de gelek caran dîtin:

Ji ber ku Xwedê pîroz e, wî ji bo Îblîs û ji bo yên ku li pey wî diçin, agirê ku natemire çêkir.
Ji ber ku Xwedê pîroz e, wî Adem û Hewa ji baxçê Êdenê derxistin, yanî wê roja ku wan ji fêkiyê dara qedexekirî xwar, Xwedê ew ji baxçe avêtin.
Ji ber ku Xwedê pîroz e, wî ji zarokên Adem re got: Ji bo nixumandina gunehan heywanan bikin gorî û wan bişewitînin.
Ji ber ku Xwedê pîroz e, wî pêşkêşa Qayîn qebûl nekir.
Ji ber ku Xwedê pîroz e, wî di dema Nûh de bi tofanê gunehkar helak kirin.
Ji ber ku Xwedê pîroz e, wî di dema Birahîm de agir bi ser bajarên Sodom û Gomorayê de barand û xelkê wan helak kirin.
Ji ber ku Xwedê pîroz e, wî Roja Dawî kifş kir û ji ber ku ew pîroz e, ewê di wê rojê de li gor dadperweriya xwe dîwana hemû mirovan bike.

Ji kerema xwe guhê xwe bidinê ka pêxemberên Xwedê li ser pîroziya Xwedê û li ser murdariya mirovan çi gotin. Wan got:
«Em hemû bûn wek yekî murdar
û hemû kirinên me yên rast wek cilekî qirêjî ne.» (Îşaya 64:4)
Madem ku Xwedê evqas pîroz e û mirov evqas murdar e, kî wê xilas bibe?
Mirov wê çawa ji agirê dojehê yê herheyî xilas bibin?
Zarokên Adem wê çawa her û her li ba Xwedayê pîroz û paqij bimînin û bijîn?

Xala sisiyan a peyama pêxemberan, bersîva van pirsan dide.
Pêşi pêxemberan got ku Xwedê pîroz e û zarokên Adem ne pîroz in.
Piştre wan berdewam kir, dan zanîn ku plana Xwedê ya ji bo zarokên Adem heye û ew dikarin ji gunehên xwe paqij bibin.

Peyama herî girîng a Peymana Pêşî (yanî ya Peymana Kevin) ew e ku Xwedê soz da, got ku ewê xilaskarekî rast bişîne dinyayê.
Wî got ku ew xilaskar wê di ber zarokên Adem de bimire, da ku ew wan hemûyên ku baweriya xwe bi wî bînin, xilas bike.
Plana Xwedê ji destpêkê ve ev bû û heta îro jî nehatiye guhertin. Xwedê dixwaze gunehkaran xilas bike.
Ji bo vê yekê wî riyeke tenê vekir: Xwedê bi tenê bi saya xwîna Xilaskar a ku hatiye rijandin li gunehan dibihûre û gunehkaran bi xwe re li hev tîne.
Bi vî awayî Xwedê hem dadperweriya xwe û hem jî pîroziya xwe kifş dike û diparêze.

Me di bernameyên xwe yên din de dît ku beriya demeke dirêj Xwedê gazî Birahîm kiribû, da ku bi wî plana xwe pêş ve bibira. Xwedê gazî wî kir, da ku wî bike miletekî mezin. Hem pêxemberên Xwedê wê ji wî gelî rabûna û hem jî Mesîh wê ji wî gelî bihata.
Xwedê ji Birahîm re got: «Ezê te bereket bikim û hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.»
Çaxê ku Birahîm kal û pîr bû, bû bavê Îshaq û Îshaq jî bû bavê Aqûb.
Aqûb bû bavê diwanzdeh kuran û ew jî bûn bavên diwanzdeh eşîrên gelê Îsraêl.
Me dît ku Xwedê plana xwe bi Birahîm pêş ve bir, çimkî Xilaskar wê ji dûndana Birahîm û ji gelê Îsraêl bihata.

Piştî van tiştan me dît ku zarokên Aqûb çawa ji welatê Kenanê derketin, çûn Misrê ba Ûsiv. Ew li Misrê rûniştin û piştî gelek salan bûn koleyên Misriyan û tengahî û zordarî li wan hat kirin.

Lê belê Xwedê dûndana Birahîm ji bîr nekir û gazî Mûsa kir, ku ew gelê Îsraêl rizgar bike û bibe welatê ku Xwedê bi bavkalê wan Birahîm re soz dabû. Xwedê bi destê Mûsa pêxember Tewrat jî hem da gelê Îsraêl û hem jî da me hemûyan. Ew kitêb heta îro jî bingehê tevahiya peyamên Xwedê ye.

Piştî dema Mûsa, me dît ku Xwedê gelek pêxember ji nav gelê Îsraêl rakirin û ji wan re şandin, lê pir caran wan qet guhê xwe nedan gotinên wan pêxemberan. Rast e, gelê Îsraêl ne dilsoz bû û li hember pêxemberên Xwedê rabû, lê dîsa jî Xwedê dilsoz ma û plana xwe ya xilasiyê pêş ve bir. Armanca Xwedê her gav ew bû ku rojekê Mesîh bişîne vê dinyayê, loma wî Dawid hilbijart û ew kir padîşahê Îsraêl. Wî hem piraniya zebûrên ku niha di Kitêba Zebûrê de ne nivîsîn û hem jî li ser Mesîhê ku wê bihata gelek pêxemberîtî kirin. Wî got ku zarokên Adem wê cefa bidin Mesîh û dest û lingên wî qul bikin. Lê belê Dawid ne tenê li ser wan tiştên dijwar nivîsî, herweha wî got ku Mesîh wê mirinê betal bike û ji nav miriyan rabe.

Me di bernameyên xwe de dît ku ne tenê Mûsa pêxember û Dawid pêxember li ser Mesîh nivîsîn, lê hemû pêxemberan li ser hatina wî û li ser jiyana wî gotin. Mesele Îşaya pêxember ji pêşî ve got ku Mesîh wê bi awayekî nedîtî bibe mirov. Wî got:
[23] «Va ye, keçik wê bizaro bibe û ewê kurekî bîne. Û wê navê wî Îmanûêl deynin» ku bê wergerandin: «Xwedê bi me re ye.»
Îşaya pêxember ev gotin 700 sal beriya hatina Mesîh nivîsîn û em dizanin ku tu caran tu kes wek Mesîh çênebûye.

Guhdarên delal, ev pêxemberîtiyên Xwedê pirr newaze ne, lê îro bernama me li vir bi dawî dibe; Xwedê hez bike, di bernama ku bê de emê li çendên din jî binêrin.
Ji bo vê yekê ji kerema xwe di bernama ku bê de jî bi me re bin!

Di bernama din de me li peyamên pêxemberên Xwedê nêrî û me di wan de sê xal dîtin:

Ya pêşî: Xwedê pîroz e û çavên xwe li gunehan naneqîne.

Ya diduyan: Mirov ne pîroz û paqji e. Dilê wî tije gunehan e û ew bi xwe qet nikare xwe ji cezayê gunehan xilas bike.

Ya sisiyan: Ji bo rizgarkirina mirovan plana Xwedê heye û li gor plana wî, daxwaza wî ew e ku gunehkaran paqij bike û wan ji dîwana Roja Dawî xilas bike.

Niha em dixwazin li gotinên pêxemberekî din binêrin. Navê wî Mîxa bû û wî jî di dema Îşaya pêxember de peyvên Xwedê bi gel dan zanîn.

Xwedê bi devê Mîxa pêxember got ku Mesîh wê di kîjan bajarî de bê dinyayê. Qenc guhê xwe bidin van gotinên Mîxa pêxember. Wî di deriyê 5'an ê kitêba xwe de weha nivîsiye:
‹Û tu, ey Beytlehma Efrata!
Bi ser ku tu di nav malbatên Cihûda de biçûk î,
Ew ê ku bibe serwerê Îsraêl wê ji nav te ji bo min rabe!
Binyata wî ji demên berê ve, ji rojên bêdestpêk ve ye.›

Bi van gotinan Mîxa pêxember da zanîn ku Mesîh wê li bajarê Beytlehmê çêbe û wek ku tê zanîn, Beytlehm bajarê Dawid padîşah bû!
Piştî çend dersên din emê bibihîzin ku piştî çend sed salan Xwedê çawa ev pêxemberîtî anî cih, çimkî bi rastî Mesîh tam li gor gotinên Mîxa pêxember li Beytlehmê hat dinyayê.
Bêguman Xwedê hatina Xilaskarê dinyayê bi awayekî qenc amade kir!
Di Nivîsarên Pîroz ên ku Xwedê dan nivîsandin de bi sedan pêxemberîtiyên li ser hatina Mesîh û li ser jiyana wî hene.

Belkî yek wê bipirse: Çima Xwedê beriya hatina Mesîh bi devê pêxemberan ev tişt hemû ji mirovan re dan zanîn?
Bi rastî sedemê vê yekê heye: Sedemê herî girîng ev e: Xwedê bi devê pêxemberan hûr û kûr li ser Mesîh digot, da ku çaxê ew bê û wan hemû pêxemberîtiyan bîne cih, her mirov bê şik bizane ku Xilaskarê rastîn ew e û yekî din tune. Xwedê dixwaze ku her mirov qenc bizane ku Xilaskarê rastîn ji aliyê Xwedê ve hatiye şandin. Xwedê nahêle heçî kesê ku bixwaze rabe û bêje:
«Ez Mesîh im», bi gotinên xwe mirovan bixapîne.
Nexêr, Xwedê dixwaze ku ez û tu, em qenc bizanin Mesîh, yanî Xilaskarê gunehkaran kî ye, da ku em bikarin bê şik baweriya xwe bi wî bînin, li pey wî herin û ji gunehên xwe xilas bibin.
Loma wî ev kitêba newaze, yanî Peymana Pêşî, yanî Peymana Kevin da me, da ku em bikarin rastiyê û derewê ji hev derxin û rastiyê qebûl bikin.

Em dixwazin di dema xwe ya mayîn de careke din li kitêbeke Peymana Kevin binêrin. Kitêba Melaxî pêxember kitêba Peymana Kevin a herî dawî ye.
Gotinên Melaxî pêxember ji bo me pir girîng in, ji ber ku peyvên dawî yên ku Xwedê beriya hatina Mesîh ji zarokên Adem re dane zanîn, di kitêba wî de nivîsandî ne.
Çar sed salan piştî wan gotinên Melaxî pêxember, Xilaskar, yanî Mesîh hat dinyayê!

Ji kerema xwe niha qenc guhê xwe bidin gotinên Melaxî. Ev peyv di deriyê dawî yê Peymana Kevin de hatine nivîsîn. Melaxî weha gotiye:
«Xudanê ordiyan weha dibêje: Va ye, ez qasidê xwe dişînim, ewê li pêşiya min riyê  amade bike.
Hingê ji nişkê ve Xudanê ku hûn lê digerin wê bê Perestgeha xwe;
qasidê peymanê ku hûn li benda wî ne, wê bê …

Ez Xudan, ez nayêm guhertin … Lê belê ji bo we, hûn ên ku diperizin navê min, roja rastdariyê wê hilê û di baskên wê de saxbûn [yanî şifa] wê hebe.» (Melaxî 3:1.6; 4:2)

Yanî Melaxî pêxember got ku ewê di pêşiya Mesîh de pêxemberekî din bişîne, da ku ew riya Mesîh amade bike.
Gelo hûn dizanin ew pêxember kî bû? Di bernameyên ku bên de emê li wî binêrin. Emê bibînin pêxemberê ku riya Mesîh amade kir, Yûhennayê imadkar, yanî Yahya bû.
Lê belê Melaxî weha jî nivîsî û got:
Xudanê ordiyan weha dibêje: «Qasidê peymanê ku hûn li benda wî ne, wê bê … Ez Xudan, ez nayêm guhertin.» (Mal. 3:1)

Kêm û zêde 200 salan beriya van gotinên Melaxî, Yêremya pêxember weha gotibû:
31 Xudan dibêje: Va ye, ew roj tên ku ez bi mala Îsraêl û bi mala Cihûda re peymaneke nû girêdim.
32 Xudan dibêje: Roja ku min destê bav û kalên wan girt, da ku ez wan ji welatê Misrê derînim, min peymana xwe bi wan re girêda, lê peymana nû wê ne weha be. Çimkî ez xwediyê wan bûm, lê dîsa jî wan ew peymana min xera kirin.
33 Lê belê Xudan dibêje: Piştî wan rojan ew peymana ku ezê bi mala Îsraêl re girêdim, ev e: Ezê Şerîeta xwe bixim hişê wan û wê li ser dilê wan binivîsim. … Ezê xerabiyên wan bibexişînim û êdî ez gunehên wan naynim bîra xwe.
(Jer. 31:31-34)

Xwedê bi van gotinan da zanîn ku Mesîh wê peymaneke nû saz bike;
ew peymana nû wê soz, şert û emrên Peymana Pêşî bîne cih.
Ew peymana nû wê bi awayekî nû bi Xwedê ve girêdayî bûya, çimkî Xwedê wê li gor rehm û dilsoziya xwe qasidê peymanê, yanî Mesîh bişanda vê dinyayê.

Di çend hezar salan de, ji bo bexişandina gunehên zarokên Adem şertê Xwedê ew bû ku heywan bihatan gorîkirin. Xwedê Peymana Pêşî bi destê pêxemberên xwe da mirovan û gorî parçeyekî girîng ê vê Peymanê bûn.
Lê belê Mesîh wê Peymana Nû pêşkêşî mirovan bikira, çimkî wî bi xwe wê tevahiya mana goriyan bianiya cih. Loma Peymana Nû wê temam û bêkêmahî û ji Peymana Pêşî, yanî ji Peymana Kevin çêtir bûya.

Divê em vê yekê qenc fêm bikin: Mesîh nedihat, da ku gotinên pêxemberan betal bikira, lê ewê bihata, da ku hemû gotinên pêxemberan bianîna cih.
Loma Melaxî pêxember li ser Mesîh got: Ewê roja rastdariyê be.
Ka çawa Mesîh wê wek rojê bûya? Hemû pêxember wek mûman an jî wek heyvê bûn; wan di dinyayeke tarî de hinekî ronahî da û çûn. Lê belê Mesîh wek rojê ye ya ku hiltê, çimkî ew hat, da ku ew me ji tariya gunehên me derxe û me bibe ser riya rastdariyê, da ku em her û her li ba Xwedê bin!
Çaxê ku roj hiltê, ma kî êdî hewcê ronahiya heyvê an mûman e?
Bi rastî Mesîh roja rastdariyê ye!
Di dersa ku bê de emê bibihîzin ku bavê Yûhennayê imadkar Zekerya li ser Mesîh çi got. Wî got:
78 Ji rehm û dilovaniya Xwedayê me, Xudan wê ji jor, wek ku roj hiltê, bê
serdana me, 79 da ku ronahiyê bide wan ên ku di tariyê de û di bin siya mirinê de
rûniştine û ewê berê lingên me bide ser riya silametê.» (Lûqas 1:78,79)
Amîn!
Guhdarên delal, bi van gotinan em gihîştine dawiya kitêbên Peymana Pêşî. Xwedê hez bike cara ku bê, emê li Peymana Nû binêrin. Yanî emê bala xwe bidin Încîlê yanî Mizgîniyê. Di Mizgîniyê de emê bibînin ku Mesîh çawa gotinên pêxemberan rast û rast û bi tevahî anîn cih.

Heta hingê li ser van gotinên Xwedê bifikirin ên ku dibêjin:
19 Bi vî awayî peyva pêxemberîtiyê ji me re hê bêtir qayîm hat deranîn. Hûnê qenc bikin ku hûn bala xwe bidin peyvên pêxemberîtiyê. (Petrûs II, 1:19)

Xwedê bi we re be!

Cara din me dersên xwe yên li ser beşê pêşî yê Nivîsarên Pîroz, yanî dersên li ser Tewratê, li ser Zebûrê û li ser Nivîsarên Pêxemberan xilas kirin.
Îro emê li çend pirsên ku bi Peymana Pêşî, yanî bi Peymana Kevin û bi Peymana Nû, yanî bi Încîlê ve girêdayî ne, binêrin.
Pirsa pêşî ev e: Çima Xwedê Kitêba xwe ya pîroz kir du beş, yanî çima hem Peymana Kevin û hem jî Peymana Nû heye?
Ji bo vê yekê gelek sedem hene. Divê pêşî em fêm bikin ku hemû gotinên Peymana Kevin beriya hatina Îsa Mesîh hatibûn nivîsandin.
Ji aliyê din ve hemû gotinên Peymana Nû piştî hatina Mesîh hatin nivîsîn.
Loma peyama pêxemberên Xwedê di Peymana Pêşî de ev bû:
«Xwedê wê xilaskarek, yanî Mesîh bişanda!»
Lê belê peyama Peymana Nû ev e: «Xwedê li gor soza xwe û tam li gor gotinên pêxemberên Peymana Pêşî, Mesîhê xwe şand!»

Ev di nav Peymana Kevin û Peymana Nû de ferqeqe girîng e û em piştrast in ku we ev yek qenc fêm kir.

Carna hin mirov hene ku rexnan li Nivîsarên Pîroz dikin û dibêjin:
«Çima Peymana Kevin û Peymana Nû hene?»
Ew guman dikin ku mirovan dixwest kitêbên pêxemberan ên orijinal betal bikin an di cihê wan de kitêbeke nû derxin.
Lê belê rastî ne ev e. Peymana Nû qet gotinên pêxemberan ên di Peymana Pêşî de betal nake. Bervajiyê vê, Peymana nû ji me re dibêje ku Xwedê çawa gotinên wan pêxemberan û mana Peymana Pêşî anîn cih!
Di Peymana Pêşî de, hemû pêxemberan mirov hişyar kirin, gotin: «Mesîh wê bê! Rojekê, ewê bê! Xwedê wê wî bişîne!»
Lê belê di Peymana Nû de, em dibînin ku Mesîh hat. Mesîhê ku hemû pêxemberan li ser digot, êdî hatiye. Ew hat û wî her tişt pêk anî.

Ji ber vê yekê em bi dilekî şa hem ji bo Peymana Kevin û hem jî ji bo Peymana Nû pesnê Xwedê didin. Çimkî di van herdu beşên Kitêba Pîroz de em dibînin ku Xwedê li ser soza xwe ma, gotinên xwe anîn bîra xwe û li gor dilsoziya xwe her tişt anî cih.
Erê, Xwedê li gor soz û peyvên Tewratê, li gor soz û peyvên Zebûrê û li gor soz û peyvên Nivîsarên Pîroz kir û Xilaskar şand vê dinyayê.
Wek ku ji tovekî biçûk dareke mezin çêdibe, wusa jî gotinên Peymana Pêşî di Peymana Nû de digihîjin û mezin dibin.

Ji Peymana Nû re navekî din jî tê gotin. Ew nav Încîl e. «Încîl» peyveke Erebî ye û ji zimanê Yewnanî tê; mana wê «Mizgînî» yanî Mizgîniya Xwedê ye.
Û bi rastî ew tam weha ye. Încîl mizgîniyeke pir xweş e, çimkî di Încîlê de ji me re tê gotin ku Mesîh çawa gotinên pêxemberan anîn cih û ji zarokên Adem re rê vekir, da ku ew bikarin bi Xwedê re li hev bên û her û her li ba wî bijîn.

Heçî Încîl yanî Mizgînî ye, divê hûn fêm bikin ku ew ne bi destê Mesîh bi xwe hatiye nivîsîn. Wek ku Xwedê bi destê gelek mirovan Peymana Pêşî da nivîsandin, weha Xwedê bi destê gelek mirovan Peymana Nû jî da nivîsandin.
Xwedê bi destê çar zilaman serhatiya jiyana Mesîh da nivîsandin.
Ew çar zilam ev in: Metta, Marqos, Lûqa û Yûhenna.
Lê çima Xwedê li çar zilaman emir kir ku serhatiya Mesîh binivîsin?
Ma zilamekî tenê têra vê yekê nedikir?
Bi rastî ji bo vê yekê sedem heye û sedem ev e:
Xwedê dixwest ku em qenc fêm bikin ku ev peyam tam rast e û qet ne lazim e ku mirov li ser vê peyamê bikeve şikê. Em dikarin ji gotinên Încîlê piştrast bin.
Wî bi destê çar zilaman peyva xwe ya pîroz erê kir.
Mesele em bêjin: Mase bi lingekî tenê çênabe, çar ling lazim in û hingê mase qayîm disekine. Weha jî çar şahid ji şahidekî tenê çêtir in û mirov li gotinên wan bêtir ewle dibe.

Erê, Xwedê dixwest ku li ser jiyana Mesîh qet şik nemîne. Loma Xwedê bi devê çar şahidan ji me re got, da ku em bizanin di Încîlê de her tişt rast e.
Wek ku wî gotinên xwe xist hişê pêxemberan, weha wî li çar zilaman jî emir kir ku li ser jiyana Mesîh her tiştê girîng binivîsin.
Ew çar zilam di dema Mesîh de di wê herêma ku ew lê dima de dijiyan û wan li ser Xilaskarê dinyayê tiştên ku bi çavên xwe dîtin û bi guhên xwe bihîstin, nivîsandin. (Eger em rast bêjin, Xwedê ji heşt zilaman re got ku li ser serhatiya jiyana Mesîh binivîsin, çimkî nameyên Pawlosê şandî, nameyên Petrûsê şandî û yên Aqûb û Cihûda jî li ser Mesîh dibêjin – û ew hemû bi hev re bi awayekî temam û newaze li hev digirin.)

Erê, carna em dibihîzin ku mirov dixwazin li hember Mizgîniya Xwedê rabin û dibêjin: «Mirov nikare li gotinên Încîlê ewle bibe. Me bihîstiye ku Încîl hatiye guhertin. Kî dizane, belkî şaşîtî tê de hene.»
Dostên delal, yê ku bi Peyva Xwedê re şêrr bike, li hember Xwedê radibe û bi wî re şêrr dike. «Tu kes nikare bi hêkê şêrr bi latê re bike.»
Tevahiya Nivîsarên Pîroz ji Xwedê ye û em dikarin ji dil û can li peyvên wî ewle bibin, ji wan piştrast bin, wan qebûl bikin û li gor wan bikin jî.
Wek ku Peyva Xwedê di Tewratê de, di Zebûrê de û di Nivîsarên Pêxemberan de bê kêmahî ye, weha jî Încîl bê kêmahî ye.
Nivîsarên Pîroz nikarin bên betalkirin û nikarin bên şkandin. Xwedê mezin e û ew bi xwe Peyvên xwe yên pîroz diparêze. Ji bo her kesê ku ji dil û can li rastiyê digere, rastiya Xwedê di Nivîsarên Pîroz de heye. Hêza tu mirovî tune ku bikare Peyva Xwedê biguhere, çimkî Peyva Xwedê herdem dimîne û sax e.
Ew ne peyvên me ne, lê belê Xudan bi xwe di Încîlê de weha dibêje. Wî got:
Erd û ezman wê bibihûrin, lê peyvên min tu caran nabihûrin. (Metta 24:35)

Di bernama din de me li ser Melaxî pêxember bihîst.
Melaxî çar sed salan beriya hatina Mesîh pêxember bû û piştî wî, Xwedê di nav 400 salan de pêxemberekî din neşand nav gelê Îsraêl.

Çima di wê demê de dengê Xwedê nehat bihîstin?
Bersiv ev e: Xwedê tu pêxemberên din neşandin, çimkî hemû kitêb û peyamên Peymana Pêşî temam bûn. Xwedê gotinên xwe gotin û beriya ku Mesîh bê, tiştekî pêwist nemabû ku bi devê pêxemberan bihata gotin. Bi tenê diviya ku mirov li benda hatina Mesîh û li hêviya Peymana Nû biman.

Guhdarên delal, di bernama ku bê de, emê dest bi beşê diduyan ê Nivîsarên Pîroz bikin, yanî emê li Peymana Nû binêrin, çimkî wek ku Peymana Pêşî bêyî Peymana Nû ne temam e, wusa jî Peymana Nû bêyî Peymana Kevin nayê fêmkirin. Loma ji bo bernameyên ku bên jî bi me re bin.

Xwedê ji bo peyva xwe ya pîroz dilekî vekirî û ruhekî hişyar û hestyar bide heryek ji we.

Guhdarên delal, êdî wext hat ku em niha bala xwe bidin nivîsarên Peymana Nû, yanî em dest bi Încîlê bikin.

Me di bernameyên din de bihîst ku pêxemberên Xwedê li ser plana Xwedê çi gotin. Hem Îşaya pêxember û hem jî Melaxî pêxember gotin ku Xwedê wê pêxemberekî bişîne, da ku ew di pêşiya Mesîh de riya wî amade bike. Gelo tê bîra we ku navê wî pêxemberî çi bû?

Erê, navê wî Yûhenna bû, yanî Yûhennayê imadkar, an jî Yahya. Navê bavê Yûhenna, Zekerya bû. Zekerya kahîn bû û wî di Perestgehê de li ser gorîgehê gorî pêşkêşî Xwedê dikirin.

Em niha Încîlê vekin û em guhê xwe bidin gotinên Lûqa. Wî li ser bûyîna Yûhennayê imadkar di deriyê pêşî de weha gotiye:

5 Dema Hêrodês padîşahê Cihûstanê bû, kahînek ji koma Ebiya hebû. Navê wî
Zekerya bû. Jina wî ji keçên Harûn bû û navê wê Êlîzabêt bû. 6 Û herdu jî li ba
Xwedê rast bûn û li gor hemû emir û qanûnên Xudan bê kêmahî rêve diçûn. 7
Zarokên wan nebûn, çimkî zarok ji Êlîzabêtê re çênedibûn û herdu jî bi nav
salan ve çûbûn.
Rojekê 8 … wî di dora koma xwe de ji Xwedê re xizmeta kahîntiyê dikir… 10 Di
dema şewitandina bixûrê de tevahiya elaleta xelkê li derve dua dikir.
11 Hingê milyaketekî Xudan jê re xuya bû û li aliyê rastê yê gorîgeha bixûrê
rawesta. 12 Gava Zekerya ew dît, şaş bû û tirs ket dilê wî. 13 Milyaket jê re got:
«Zekerya, netirse! Çimkî duaya te hat bihîstin û jina te Êlîzabêt, wê kurekî ji te
re bîne, tê navê wî Yûhenna deynî.
14 Ewê ji te re bibe şahî û geşî û gelek wê bi bûyîna wî dilxweş bibin.
15 Çimkî ewê li ba Xudan mezin be.
Ew şerab û vexwarinên giran qet venaxwe û hê di zikê diya xwe de wê bi Ruhê
Pîroz tije be.

16 Ewê gelekan ji zarokên Îsraêl li Xudan, Xwedayê wan, vegerîne. 17 Û ewê bi
Ruh û bi hêza Êlyas pêxember li ber Xudan here, da ku ew dilê bavan li zarokan
û neguhdaran li şehrezayiya dilpakan vegerîne, da ji Xudan re miletekî pêkhatî
amade bike.»
18 Zekerya jî ji milyaket re got: «Ma ezê vê yekê bi çi bizanim? Ez pîr im û jina
min jî bi nav salan ve çûye.» 19 Milyaket lê vegerand û got: «Ez Cibrayîl im, yê
ku li ber destê Xwedê radiweste û ez hatime şandin, da ez ji te re bêjim û vê
mizgîniyê bidim te. 20 Va ye, heta wê roja ku ev tişt pêk bê, tê lal bibî û hew
bikarî bipeyivî. Çimkî te bi wan gotinên min ên ku di wextê xwe de wê bên cih,
bawer nekir.» 21 Di vê navê de xelk li hêviya Zekerya bû. Ew şaş man, ka çima
ew demeke dirêj di Perestgehê de dima. 22 Û gava ew derket derve, wî nikaribû
bi wan re bipeyive û ew têgihîştin ku wî di Perestgehê de dîtiniyek dîtiye. Wî bi
îşaretan ji wan re digot û lal ma. 23 Û gava rojên xizmeta wî temam bûn, ew
vegeriya mala xwe. 24 Piştî wan rojan jina wî Êlîzabêt bizaro bû … û wê got: 25
«Va ye, di van rojan de Xudan ev yek ji bo min kir: Wî li min nêrî û di nav
xelkê de şerma min rakir.»

Yanî em dibînin ku Xwedê çawa milyaketê xwe Cibrayîl şand ba Zekerya û jê re got ku jina wî Êlîzabêt wê kurekî bîne. Ew kur wê bibe pêxemberekî mezin û ewê di pêşiya Mesîh de riya wî amade bike.

Di dawiya vî deriyê Încîlê de, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
57 Gava dema zarokanîna Êlîzabêtê hat, wê kurek anî. 58 Cîran û mirovên wê
bihîstin ku Xudan rehmeke mezin li wê kiriye û ew jî bi wê re şa bûn. 59 Û di
roja heştan de ji bo sinetkirina kurik hatin û xwestin, navê bavê wî Zekerya lê
bikin. 60 Lê diya wî li wan vegerand û got: «Na, navê wî wê Yûhenna be.» 61
Wan jê re got: «Di nav mirovên te de kesek bi vî navî tune.» 62 Îcar wan bi
îşaretan ji bavê wî pirsî, ka ew dixwaze çi navî li wî bike 63 Wî nivîsdekek xwest
û weha li ser nivîsî: «Navê wî Yûhenna ye.» Û hemû şaş man. 64 Di cih de dev û
zimanê wî vebûn, peyivî û pesnê Xwedê da. 65 Tirs ket dilê hemûyên ku li dora

wan rûdiniştin û li seranserê çiyayên Cihûstanê li ser van tiştan hat peyivîn. [66] Û
hemûyên ku ev tişt bihîstin, ew xistin dilê xwe û gotin: «Gelo ev zarok wê bibe
çi?» Çimkî destê Xudan li ser wî bû.
[67] Û bavê wî Zekerya bi Ruhê Pîroz tije bû, wî pêxemberîtî kir û got:
[68] «Pesin ji Xudan Xwedayê Îsraêl re ku ew hat serdana gelê xwe û wî ew bi
berdêl xilas kir. [69] Wî ji mala xulamê xwe Dawid strûhekî xilasiyê - yanî
Xilaskarekî hêzdar - ji me re rakir,
[70] - Çawa ku wî hê ji berê ve bi devê pêxemberên xwe yên pîroz gotibû -
[71] Ku me ji dijminên me û ji destê hemûyên ku ji me nefret dikin, xilas bike,
[72] Da li bav û kalên me bê rehmê û peymana xwe ya pîroz,
[73] Wê sonda ku ji bavê me Birahîm re xwaribû, bîne bîra xwe
[74-75] Ku em ji destê dijminên xwe xilas bibin û bê tirs li ber wî di hemû rojên
jiyana xwe de bi paqijî û rastî biperizin wî.
[76] Û tu jî, zaroko, wê ji te re pêxemberê Yê Herî Bilind bê gotin,
Çimkî tê di pêşiya Xudan de herî, da ku tu riyên wî amade bikî
[77] Û ji bo lêbihûrtina gunehên wan, xilaskirinê bi gelê wî bidî zanîn.
[78] Ji rehm û dilovaniya Xwedayê me, Xudan wê ji jor, wek ku roj hiltê,
bê serdana me, [79] da ronahiyê bide wan ên ku di tariyê de û di bin siya mirinê de
rûniştine û ewê berê lingên me bide ser riya silametê.»

Ere, çaxê ku Yûhenna çêbû, Zekerya bi van gotinan pesnê Xwedê da, ji ber ku wî fêm kir ku êdî dema hatina Mesîh nêzîk bûye.
Yûhenna bi xwe ne Mesîh bû, lê ew qasidê Mesîh bû û ew hat, da ku hatina Mesîh bide zanîn û mirovan ji bo Mesîh amade bike.

Guhdarên delal, gelek spas ku we qenc guhê xwe da bernama pêşî ya Peymana Nû. Em ji we hêvî dikin ku hûn ji bo bernama ku bê jî bi me re bin. Hingê emê bibînin ku Xwedê milyaketê xwe Cibrayîl şand ba Meryema keçik, da ku jê re tiştekî pir girîng bêje. Di dersa ku bê de emê gelek rastiyên kûr bibihîzin, loma jê nemînin şûn de!

Heta hingê li ser van gotinên Zekerya qenc bifikirin ên ku dibêjin:

68 «Pesin ji Xudan re …,

69 Wî ji mala xulamê xwe Dawid

strûhekî  xilasiyê - yanî Xilaskarekî hêzdar - ji me re rakir,

70 - Çawa ku wî hê ji berê ve bi devê pêxemberên xwe yên pîroz gotibû.

(Lûqa 1:68-70)

[Xwedê lingên we li ser riya rastdariyê ya ku dibe jiyanê rawestîne!

Di hemû dersên berî niha de me li Nivîsarên Peymana Pêşî nêrî, yanî me li ser Tewrata Mûsa, Zabûra Dawid û Nivîsarên Pêxemberên din lêkolîn kir, çimkî ew hemû ji aliyê Xwedê ve ji mirovan re hatine dayîn.
Di bernama din de me dest bi Peymana Nû kir, yanî me li Încîlê nêrî.
Încîl peyveke Erebî ye û ji zimanê Yewnanî tê; mana wê bi Kurmancî «Mizgînî» ye.
Û bi rastî Încîl mizginiyeke pir xweş û qenc e, ji ber ku di Încîlê de ji me re tê gotin ku Xwedê tam li gor soza xwe û tam wek ku wî bi devê pêxemberan ji pêşî ve gotibû, Xilaskarê hêzdar şand vê dinyayê.

Beriya ku em dest bi xwendina Încîlê bikin, wê pir qenc be ku em careke din bînin ber çavên xwe ku çima armanca Xwedê ew bû ku Xilaskar ji zarokên Adem re bişîne.
Ma gelo tê bîra we ku Adem û Hewayê guhê xwe nedan Xwedê û hê li bîra we ye ku wê rojê çi qewimî?
Me di Tewratê de dît ku neguhdariya Adem tevahiya dûndana wî, yanî hemû mirov ji padîşahiya Xwedê dûr xistin, birin padîşahiya Îblîs.
Ji ber gunehê Adem, em hemû gunehkar tên dinyayê. Gotina pêşiyan heye, dibêjin: «Tijîkên maran ne bê jehr in.» Bi vî awayî ji wê rojê ve hevênê guneh di hemû zarokên Adem de heye. Gunehên me, me ji Xwedê vediqetînin û qet tiştek ji destê me nayê ku em xwe li ber Xwedê û Dadgerê xwe, rast û bêsûc derxin.

Lê belê şikir ji Xwedê re, çimkî dawiya Nivîsarên Pêxemberan ne ev serhatî ye. Me dîtibû ku tam wê roja ku Adem û Hewayê neguhdarî kirin, Xwedê dest pê kir û hin bi hin plana xwe ya xilasiyê dida zanîn. Xwedê dest pê kir û ji wan re got ku rojekê Xilaskar wê bê dinyayê, da ku zarokên Adem ji hêza Îblîs û ji hêza guneh azad bike.

Rast e, ew roja ku guneh ket dinyayê û ket dilê mirovan, rojeke tarî bû, lê eynî wê rojê Xwedê da zanîn ku Xilaskar wê ne ji jin û mêrekî bê, lê wê tenê ji jinekê bê. (Destpêkirin 3:15; Galatî 4:4)
Erê, ew Mesîhê ku wê xwîna xwe wek goriyeke bêkêmahî birijanda, nedikarî ji bavekî gunehkar bihata. Wek ku Xwedê pîroz û bêkêmahî ye, diviya ku ew jî pîroz û bêkêmahî bûya.
Loma Îşaya pêxember heft sed salan beriya hatina Mesîh weha nivîsî:
23 «Va ye, keçik wê bizaro bibe û ewê kurekî bîne.
Û wê navê wî Îmanûêl deynin» ku bê wergerandin: «Xwedê bi me re ye.»

Em di Kitêbên Peymana Pêşî de hîn bûn, keçikeke ku tu caran nêzîkî zilamekî nebûye wê bibûya diya wî Xilaskarî. Niha em dixwazin vegerin Kitêba Încîlê, da ku em bibînin Xwedê çawa soza xwe ya li ser hatina vî Xilaskarê pîroz anî cih. Di bernama din de me dît ku milyaket Cibrayîl çawa hat ba Cihûyekî ku navê wî Zekerya bû. Cibrayîl jê re got ku jina wî wê kurekî bîne. Navê wî kurî wê Yûhenna bûya. Wiyê di pêşiya Xilaskar de rê amade bikira.

Niha em di Încîlê de berdewam dikin û emê di Mizgîniya li gor Lûqa de ji deriyê pêşî bixwînin. Emê bibînin ku Xwedê çawa milyaketê xwe şand ba keçikeke ku navê wê Meryem bû.
Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Çaxê ku Êlîzabêt di meha şeşan de bû, 26 ….Xwedê milyaket Cibrayîl şand
bajarekî Celîlê, ku navê wî Nisret bû, 27 ba keçikeke ku dergistiya mirovekî bi
navê Ûsiv bû. Ûsiv ji mala Dawid bû. Navê keçikê jî Meryem bû. 28
Cibrayîl hat ba wê û jê re got: «Silav li te, ey keçika ku kerema Xwedê li ser e.
Xudan bi te re ye.» 29 Meryem bi vê silavê şaş ma û fikirî, ka ev çi silav e?
30 Milyaket jê re got: «Ya Meryem, netirse! Kerema Xwedê li te bûye. 31 Va ye,
tê bizaro bibî û tê kurekî bînî û navê wî Îsa deynî. 32 Ewê mezin be û wê jê re
Kurê Yê Herî Bilind bê gotin. Û Xudan, Xwedê wê textê bavê wî Dawid bide
wî.

[33] Û ewê her û her li ser mala Aqûb padîşahiyê bike û dawiya padîşahiya wî
nayê.»
[34] Meryemê ji milyaket re got: «Ma gelo evê çawa çêbe? Çimkî tu mêr nêzîkî
min nebûne.»
[35] Milyaket lê vegerand û got: «Ruhê Pîroz wê bê ser te û tê bikevî bin hêza siya
Yê Herî Bilind. Ji ber vê yekê wê ji wî pîrozê ku wê ji te çêbe re Kurê Xwedê bê
gotin. [36] Û va ye, Êlîzabêt a ku mirova te ye, ew jî bi vê pîrîtiya xwe ve bi kurekî
bizaro ye. Ya ku jê re digotin ku zarokan nayne, va ye, ew di heyva xwe ya
şeşan de ye. [37] Çimkî tu tişt li ber Xwedê ne zehmet e.»
[38] Meryemê got: «Va me, ez cêriya Xudan im. Bila wek ku te gotî, ji min re
bibe.» Piştre milyaket ji ba wê çû.

Em dixwazin hinekî li ser vê bûyerê bifikirin.
Meryem keçikeke ciwan bû û dergistiya Ûsiv bû, lê ew hê nezewicî bûn.
Hem Meryem û hem jî Ûsiv ji dûndana Dawid padîşah bûn. Bêguman tê bîra we ku pêxemberên Xwedê hem digotin ku Mesîh wê ji keçikekê bê û hem jî digotin ku ewê ji malbata Dawid padîşah bê.

Divê em tiştekî din jî bînin bîra xwe: Wek hemû mirovên din Meryem jî ji dûndana Adem bû. Wek hemû mirovên din, hevênê guneh di dilê wê de jî hebû. Divê ku em vê yekê bêjin, çimkî mirov hene, ew dixwazin Meryemê di ser mirovên din re bigirin û dibêjin: «Divê ew bê perizîn.» Ji xwe ev yek çênabe. Bêguman Meryem jineke hêjabilind bû, çimkî Xwedê ew hilbijart ku ew bibe diya Mesîh. Lê belê mana vê keremê ne ew e ku ew hêjayî perizînê ye, çimkî Nivîsarên Pîroz dibêjin:
‹Biperize Xudan Xwedayê xwe û bi tenê ji wî re xizmetê bike.› (Metta 4:10)

Îcar me di van ayetan de dît ku milyaket Cibrayîl çawa hat ba Meryemê û bi wê da zanîn ku li gor plana Xwedê ewê bibûya diya Xilaskarê ku wê bihata vê dinyayê, da ku zarokên Adem ji hêza guneh xilas bikiran.

Herweha Cibrayîl jê re got ku navê kurê wê, wê çi be.
Wî jê re got: «Va ye, tê bizaro bibî û tê kurekî bînî û navê wî Îsa deynî.»
Navê Îsa ji peyva zimanê Îbranî «Yêşû» an jî «Yêşua» tê û mana vê peyvê ev e: «Xwedê xilas dike».
Lê belê milyaket Cibrayîl ji Mesîh re navekî din jî got. Gelo we bihîst wî çi got?
Wî li ser wî got: «Kurê Yê Herî Bilind». Me bivê û nevê, milyaket Cibrayîl weha gotiye.
Me berî niha di Zebûrên Dawid de dît ku Xwedê ji Mesîh re got: «Kurê min».
Niha me bihîst ku milyaketê Xwedê Cibrayîl jî ji Mesîh re got «Kurê Xwedê».

Dostên delal, em dizanin ku gelek mirov çaxê navê «Kurê Xwedê» dibihîzin, dibêjin ku ev yek qet çênebe û dibêjin «Astaxfirullah».
Lê belê gotina pêşiyan heye, dibêjin: «Bi pirsê mirov diçe mala Xwedê», an jî dibêjin: «Pêşî guhê xwe bidê, piştre biryara xwe bide».
Yanî beriya ku em gotina «Kurê Xwedê» ecêb bibînin, divê pêşî em fêm bikin ka mana vê gotinê çi ye.

Guhdarên delal, bernama me ya îro evqas bû; lê di bernama ku bê de emê hê bêtir li mana vî navî binêrin û ji bo vê yekê jî em li hêviya we ne.
Heta hingê Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dît ku milyaket Cibrayîl hat ba Meryema keçik û jê re got ku ewê kurekî bîne. Herweha Cibrayîl bi xwe ji wî kurî re got «Kurê Yê Herî Bilind», yanî «Kurê Xwedê» û îro em dixwazin li mana vê yekê binêrin.

Di Nivîsarên Pîroz de ji sed û bîst caran bêtir ji Mesîh re «Kurê Xwedê» tê gotin.
Em bi xwe ji Nivîsarên Pîroz bawer dikin, loma destûra me tune ku em bêjin: Xwedê ji Mesîh re nabêje «Kurê Xwedê». Madem ku wusa ye, em dixwazin bizanin ku Xwedê çima ji Îsa Mesîh re dibêje «Kurê min».

Tiştê ku pêşî divê em bizanin ev e: Mana gotina «Kurê Xwedê» ne ew e ku Xwedê jinek ji xwe re anî û ji wan herduyan re kurek çêbû.
Fikrên weha dûrî me bin û her kesê ku weha dibêje an difikire, çêrî Xwedê dike.
Xwedê Yê Herî Bilind e, ew ne mirovek e û zarok jê re çênabin. Ji xwe ev fikir tam şaş û xelet e.
Em jê piştrast in ku hûn hemû vê yekê dizanin û qebûl dikin jî. Li vir peyva «kur» ne fizîkî ye.
Bi rastî ev tişt zû tê fêmkirin, çimkî di nav Kurdan de jî tê gotin: «Ez Kurd im, kurê Kurdan im, kurê welatê Kurdistanê me», lê em qenc dizanin ku welat ne bav e û ne jî jina welêt heye.
Eger yek ji te re bêje «kurê welêt», mana vê yekê ne ew e ku welat bavê te ye, lê dibêje ku tu ji Kurdistanê têyî, yanî cihê te yê esil Kurdistan e.

Heçî ew yeka ku tê gotin «Îsa Mesîh Kurê Xwedê ye», jî tam weha ye, çimkî Mesîh ji Xwedê tê; loma Xwedê jê re dibêje «Kurê min». Mesîh ji ezmên hat. Beriya ku ew li welatê Îsraêlê bê dinyayê, ew li ba Xwedê bû. Ew bi xwe Xwedê bû. Jê re tê gotin: «Ruhê Xwedê», yanî bi Erebî «Ruh Allah».

Herweha Mesîh «Kelam Allah», yanî «Peyva Xwedê» ye ya ku di destpêkê de li ba Xwedê bû. Ma we dizanibû ku hem di Quranê de û hem jî di Încîlê de bi tenê ji Mesîh re tê gotin ku ew «Peyva Xwedê» ye?

Nivîsarên Pîroz van tiştan qenc şîrove dikin û dibêjin:

[1] Di destpêkê de Peyv hebû. Peyv bi Xwedê re bû û Peyv bi xwe Xwedê bû. [2]
Ew di destpêkê de bi Xwedê re bû. [3] Her tişt bi wî afirî û bêyî wî qet tu tişt
neafirî… Û Peyv bû xwîn û goşt, bi kerem û rastiyê tije di nav me de konê xwe
danî. Me rûmeta wî, yanî rûmeta Kurê yekta yê ku ji Bav tê dît. (Yûhenna 1:1-3.14)

Erê, Mesîh Peyva Xwedê ye ya ku ji ezmên hat û bû mirov. Em hemû dizanin ku li vê dinyayê bavê Mesîh nebû. Madem ku li vê dinyayê bavê wî tunebû, nexwe ew ji ku derê hatiye? Ma ew kurê kê ye?

Ji kerema xwe careke din guhê xwe bidin peyvên milyaket Cibrayîl. Wî ji Meryemê re got: «Ruhê Pîroz wê bê ser te û tê bikevî bin hêza siya Yê Herî Bilind. Ji ber vê yekê wê ji wî pîrozê ku wê ji te çêbe re Kurê Xwedê bê gotin.»

Belkî we bihîstiye ku mirov hene, dibêjin: «Erê, em dizanin ku li ser vê dinyayê bavê Îsa nebû, lê Xwedê tenê dixwest ku hêza xwe nîşanî me bide. Xwedê di destpêkê de bê dê û bav Adem afirand. Piştre wî Hewa afirand û diya wê nebû, çimkî Xwedê ji parsûyekî ku wî ji Adem stand, Hewa afirand. Û heçî Mesîh e, Xwedê ew afirand û vê carê tenê jinek lazim bû.» Ew dibêjin: «Sedemê ku bavê Mesîh tune, tenê ev e: Xwedê dixwest hê bi awayekî din hêza xwe kifş bike.»

Dostên delal, rast e, Xwedê, Karîndarê her tiştî ye û tiştek tune ku ji destê wî neyê.

Lê belê heçî bûyîna Mesîh e, sedemê vê yekê ne tenê nîşandana hêza Xwedê bû. Nexêr, sedemeke hê gelek girîngtir hebû. Guhê xwe nedin wan mirovên ku dixwazin we bixapînin!

Sedemekî pir girîng heye, loma piştî afirandina Adem û Hewayê bi gelek hezar salan, Îsa Mesîh ji keçikekê çêbû. Ma hûn dizanin sedem çi bû?

Nivîsarên Pîroz bi zelalî vê yekê ji me re şîrove dikin û dibêjin:
«Mesîh Îsa hatiye dinyayê, da ku gunehkaran xilas bike» (Tîmotêyos I, 1:15)
Îsa bû mirov û hat vê dinyayê, da ku zarokên Adem xilas bike, çimkî ew zarokên Adem hem windabûyî bûn, hem gunehkar û murdar bûn û hem jî bê hêvî li benda dîwana Roja Dawî bûn.
Loma çênedibû ku Mesîh ji mirovên gunehkar çêbûya.
Wek ku me gelek caran dît, li gor plana Xwedê diviya ku Mesîh xwîna xwe birijanda û bi vî awayî berdêla gunehên me bida.
Wek ku di Peymana Pêşî de berxên ji bo goriyan, bêqusûr û bêkêmahî bûn, diviya ku Xilaskar bêsûc û bêkêmahî bûya, da ku ew bi xwe bibûya goriyeke temam û bêkêmahî.

Li ser vê yekê qenc bifikirin. Eger deynê te gelek be, ma tu dikarî deynê yekî din bidî? Nexêr, eger tu bixwazî deynê yekî din bidî, divê deynê te bi xwe nebe. Herweha diviya ku Mesîh ji deynê guneh bêrî bûya, da ku wî bikariya deynê gunehên zarokên Adem bidabûya.
Bi rastî Xwedê dixwaze em qenc fêm bikin ku di nav Mesîh û zarokên Adem de ferqekî bêsînor heye. Em kurên Adem in û ji ber gunehan, zarokên Adem murdar in, lê Îsa Mesîh wek barana ezmên paqij e. Wek ku Xwedê, rast, paqij û pîroz e, ew jî rast, paqij û pîroz e. Loma Xwedê şerm neke ku jê re bêje «Kurê min».
Dostên delal, em hêvîdar in ku bi van hemû tiştan niha hûn bêtir fêm dikin çima diviya ku Îsa Mesîh ji keçikekê çêbûya. Û em hêvîdar in ku hûn bêtir fêm dikin ka mana «Kurê Xwedê» çi ye, yanî çawa rast tê fêmkirin.

Em niha dixwazin serhatiya bûyîna Mesîh ji we re bixwînin.
Meryem bi zaro bû û piştî çend mehan, Xwedê milyaketê xwe careke din şand vê dinyayê, ew şand ba dergistiyê Meryemê Ûsiv. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

[18] Bûyîna Îsa Mesîh jî bi vî awayî çêbû: Diya wî Meryem dergistiya Ûsiv bû, lê
berî ku ew bizewicin û bigihîjin hev, xuya bû ku ew bi Ruhê Pîroz bizaro ye. [19]
Dergistiyê wê Ûsiv mirovekî rast bû û ji ber ku nedixwest Meryemê li ber xelkê
bide şermê, wî niyet kir ku wê bi dizî berde. [20] Ew hê li ser vê yekê difikirî,
milyaketekî Xudan di xewnê de lê xuya bû û got: «Ey Ûsivê kurê Dawid!
Netirse ku tu Meryemê ji xwe re bi jinîtî bînî. Çimkî yê ku di malzaroka wê de
çêbûye ji Ruhê Pîroz e. [21] Ewê kurekî bîne û tê navê wî Îsa deynî, çimkî ewê
gelê xwe ji gunehên wan xilas bike.» [22] Ev hemû çêbûn, da ew peyva ku Xudan
bi devê pêxember gotibû, bê cih:
[23] «Va ye, keçik wê bizaro bibe û ewê kurekî bîne.
Û wê navê wî Îmanûêl deynin» ku bê wergerandin: «Xwedê bi me re ye.»
[24] Gava ku Ûsiv ji xewê hişyar bû, wek ku milyaketê Xudan jê re gotibû kir û
Meryem ji xwe re bi jinîtî anî. [25] Lê ew neçû ba wê, heta ku wê kurê xwe anî. Û
wî navê zarok Îsa danî.

Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de hê bêtir di Mizgîniyê de li ser bûyîna Îsa Mesîh bixwînin.

Heta hingê van peyvên milyaketê Xwedê bînin bîra xwe. Wî li ser Mesîh weha ji Ûsiv re got:

Ewê kurekî bîne û tê navê wî Îsa deynî, çimkî ewê gelê xwe ji gunehên wan xilas bike.» (Metta 1:21)

[Xwedê ji bo fêmkirina vê yekê şehrezayiya ezmanî bide me hemûyan.]

Di bernama din de me di Încîlê de dît ku Xwedê çawa milyaketê xwe Cibrayîl şand bajarê Nisretê ba keçikeke ku navê wê Meryem bû. Milyaket jê re xuya bû, da ku jê re bide zanîn ku ewê bi hêza Ruhê Xwedê bi zaro bibe û wê kurekî bîne û wê navê wî Îsa deyne. Me dît ku mana navê Îsa ev e: Xudan xilas dike.
Yanî me dît ku ew wextê ku gelê Îsraêl pir li bendê bû, êdî hatibû. Xwedê hê di wê roja ku Adem û Hewayê cara pêşî guneh kiribûn de, ji wan re soz da ku Xilaskar wê bê û niha ew Xilaskar di malzaroka keçikekê de bû û wê zû bihata dinyayê.

Beriya ku em vegerin Mizgîniyê û binêrin ka Mesîh çawa hat dinyayê, em dixwazin bifikirin ku ew di demeke çawa de çêbû.
Di wan rojan de padîşahê bajarê Romayê, yanî Qeyser Awgûstos hukumdarê gelek milet û welatan bû. Gelê Îsraêl jî di bin destê wî de bû. Lê belê padîşahiya Romayê jî nikaribû ji plana Xwedê re bibûya asteng. Ma tê bîra we ku Mîxa pêxember heft sed salan beriya bûyîna Mesîh çi gotibû? Mîxa da zanîn ku Mesîh wê li bajarê Dawid Beytlehmê bê dinyayê.
Lê belê Meryem bi xwe ne li Beytlehmê, lê li Nisretê rûdinişt û ew herdu bajar kêm û zêde 150 km ji hev dûr bûn. Îcar Mesîh wê çawa li Beytlehmê bihata dinyayê?

Dostên delal, hûn qenc dizanin ku li ba Xwedê her tişt dibe û tu tişt jê re nabe asteng. Ew Xwedayê rastîn e û li gor peyva wî her tişt pêk tê. Ew bi her tiştê ku biqewime dizane. Xwedê weha kir:
Çaxê ji bo Meryemê dem hat ku kurê xwe bîne, Qeyser Awgûstos emir da û got ku divê her kes here bajarê malbata xwe û li wê derê ji bo bacdayînê navê xwe bide nivîsandin.
Ji ber vê yekê hem Meryem û hem jî Ûsiv mecbûr bûn ku herin bajarê Dawid padîşah, Beytlehmê; çimkî ew herdu jî ji dûndana Dawid bûn.

Niha emê vegerin Mizgîniya li gor Lûqa û emê ji deriyê diduyan bibihîzin ku Mesîh tam li gor soza Xwedê li Beytlehmê çêbû.

Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
[1] Di wan rojan de Qeyser Awgûstos emir da, ku hemû xelkên dinya Romayê
navên xwe bidin nivîsîn. [2] Di wê demê de, gava Kûrênyos serdarê Sûriyê bû, ev
hijmartina pêşî bû ku hat kirin. [3] Û her kes çû bajarê xwe, da ku xwe bide
nivîsîn. [4] Ûsiv jî ji bajarê Nisreta Celîlê* çû Beytlehmê, bajarê Dawid ê li
Cihûstanê, çimkî ew ji mala Dawid û ji bavikê wî bû. [5] Ew çû wê derê, da ku
xwe bi dergistiya xwe Meryemê re bide nivîsîn. Dergistiya wî jî bizaro bû. [6]
Gava ew li Beytlehmê bûn, dema zarokanîna wê hat [7] û wê kurê xwe yê nixurî
anî. Wê zarokê xwe di pêçekê de pêça û di afirekî de danî, çimkî cihê wan li
mêvanxanê tunebû.

Guhdarên delal,  ma we bala xwe dayê ku rewşa bûyîna Mesîh çi bû? Em dikarin bêjin ku Mesîh di rewşeke belengaz de hat dinyayê. Bi rastî ji bo Mesîh li Beytlehmê odeyeke xweş û amadekirî nebû ku ew li wir bihata dinyayê. Erê, rast e, Xilaskarê dinyayê û dadgerê dinyayê di afirekî de hat danîn!
Belkî hin hene, dibêjin: Ev çi tiştekî ecêb e! Eger bi rastî Îsa, Xilaskarê dinyayê û Xudanê rûmeta herî bilind û dadgerê hemû zarokên Adem be, ma çima ew ne di qesra padîşah de û  ne di nav xemlûxêleke mezin de hat dinyayê? Hingê her kesî wê bi zelalî bizaniya ku bi rastî ew padîşahê padîşahan û Xudanê xudanan e.

Dostên delal, li vir divê em rastiyeke girîng bînin bîra xwe: Fikrên Xwedê ne wek fikrên mirovan in. Rûmeta Xwedê ne wek rûmeta vê dinyayê ye. Bêguman bûyîna Îsa ne bê rûmet bû, lê belê piraniya zarokên Adem ev rûmet nedîtin, çimkî rûmeta Xwedê û rûmeta vê dinyayê gelek dûrî hev in.

Belkî te mirovên dewlemend dîtine. Tevahiya jiyana wan luks e. Ew di xaniyên mezin û xweş de rûdinin, cilên wan nerm û biha ne, gelek berdestiyên wan hene û ew, hemû daxwazên xwe pêk tînin. Rûmeta vê dinyayê ev e. Lê belê rûmeta Xwedê ne wek van tiştan e. Loma Mesîh ê ku li ba Xwedê di rûmeta ezmên de bû, ne di rewşeke xweş de û ne di xaniyekî mezin de hat dinyayê. Gelek mirovên dewlemend qet nizanin rebenî û tengahî çi ye, lê Mesîh ne wek wan bû. Nexêr, Xilaskarê ku Xwedê ew şand vê dinyayê, da ku zarokên Adem ji hêza Îblîs û ji hêza gunehan xilas bike, di halê nizim de çêbû û di afirekî de radiza. Yanî tu kes nikare bêje ku Mesîh bi tenê ji bo mirovên dewlemend hatiye û nikare bêje ku Mesîh halê teng û reben nizane.
Bervajiyê vê: Xwedê dixwaze ku her kes bizane, Xilaskarê ku hatiye dinyayê ji bo her kesî hatiye û her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, wê xilas bibe. Bila ew pîr an xort bin, bila ew jin an mêr bin, bila ew serbest an xulam bin, ferq tune, çimkî Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Hûn kerema Xudanê me Îsa Mesîh dizanin. Bi ser ku ew dewlemend bû jî, ew bû belengaz, da ku hûn bi belengaziya wî dewlemend bibin. (Korîntî II, 8:9)

Em hemû bê daxwaza xwe hatine dinyayê; Mesîh yê tenê ye ku bi daxwaza xwe hilbijart ku bê dinyayê û wî hilbijart ku di halê belengaz de bibe mirov.

Niha em dixwazin vê serhatiya bûyîna Mesîh ya newaze berdewam bikin.  û ayetên wê yên herî xweş jî bixwînin.
Wê şeva ku Îsa hat dinyayê, Xwedê milyaketên xwe şandin ba çend şivanan. Ew li dor Beytlehmê bi şev li ber keriyê xwe bûn. Niha guhê xwe bidinê û bibihîzin ka Xwedê çawa mizgîniya bûyîna Mesîh da zanîn.

Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

[8] Îcar li wê derdorê şivanan bi şev li çolê li ber keriyên xwe nobe digirt. [9]
Milyaketekî Xudan ji wan re xuya bû û rûmeta Xudan hawirdora wan kir ronahî.
Tirseke mezin ket ser wan. [10] Milyaket ji wan re got: «Netirsin! Ez hatime, ku ez
mizgîniya şabûneke mezin bidim we, ku ji tevahiya gel re ye. [11] Îro li bajarê
Dawid xilaskarek ji we re çêbûye. Ew jî Xudan Mesîh e. [12] Bila ev ji we re bibe
nîşan: Hûnê zarokekî di pêçekê de pêçayî û di afirekî de razayî bibînin.»
[13] Û ji nişkê ve ordiyeke leşkerên ezmên bi milyaket re xuya bûn, pesnê Xwedê
didan û digotin:
[14] «Li bilindahiyan ji Xwedê re rûmet
Û li ser erdê li ser wan ên ku Xwedê ji wan razî ye silamet.»
[15] Çaxê milyaket ji dora wan hilkişiyan ezmên, şivanan ji hev re got: «De werin,
em herin Beytlehmê û vî tiştê bûyî yê ku Xudan bi me daye zanîn, bibînin.» [16]
Îcar ew bi lez çûn. Wan Meryem, Ûsiv û zarokê di afir de razayî dîtin. [17] Gava
ew dîtin, wan ew xebera ku li ser zarok bihîstibûn, belav kirin. [18] Hemûyên ku
ev bihîstin, li tiştên ku şivanan ji wan re got, şaş man… [20] Şivan vegeriyan û
wek ji wan re hatibû gotin, ji bo tiştên dîtî û bihîstî pesnê Xwedê didan û rûmet
didan wî.
Amîn.

[Bila Xwedê çavê dilê her mirovî veke, ku vê rûmetê bibîne.]

Di bernama din de me dît ku di dema bûyîna Mesîh de, gelê Îsraêl di bin destê Romayiyan de bû.
Me dît ku Qeyser Awgûstos emir da ku divê her kes here bajarê malbata xwe û li wê derê ji bo bacdayînê navê xwe bide nivîsandin.
Loma Ûsiv û Meryem ji bajarê Nisretê çûn bajarê Beytlehmê, çimkî ew herdu jî ji malbata Dawid padîşah bûn. Û bi vî awayî peyvên Mîxa pêxember ên ku wî heft sed salan beriya bûyîna Mesîh gotibûn, hatin cih. Çimkî Mîxa pêxember dabû zanîn ku Mesîh wê li bajarê Dawid Beytlehmê bihata dinyayê û tam weha çêbû jî.
Herweha me dît ku Mesîh ne di qesra padîşahekî de, lê di rewşeke belengaz de hat dinyayê û di afirekî de hat danîn. Yanî ji destpêkê ve kifş bû ku Mesîh ne tenê ji bo mirovên dewlemend û bilind, lê ji bo her kesî û ji bo yên herî belengaz jî hatiye dinyayê.

Gelo ma Xwedê pêşî ji kê re mizgîniya bûyîna Mesîh da zanîn?
Ma pêşî Xwedê ji Qeyser Awgûstos re got, an ji mirovên dewlemend re, an jî ji rêberên dîn û diyanetê re got?
Nexêr, yên ku pêşî li ser bûyîna Mesîh bihîstin, mirovên belengaz bûn.
Xwedê pêşî mizgîniya bûyîna Mesîh ji şivanan re got! Bi rastî ew li hêviya hatina Mesîh bûn jî, çimkî ew di cih de rabûn û çûn Beytlehmê, da ku Îsayê zarok bibînin. Ev ji bo wan çi mizgîniyeke xweş bû!
Wan ew ê ku hemû pêxemberan li ser nivîsandibû dît: Wan Mesîh dît, wan Xilaskarê dinyayê dît, erê, wan Peyva Xwedê di pêçekê de pêçayî dît!

Em niha dixwazin di Încîlê de pêş ve herin, da ku em bibînin piştî bûyîna Mesîh çi çêbû. Me niha dît ku Xwedê çawa bi destê milyaketên xwe di nîvê şevê de mizgîniya bûyîna Mesîh bi şivanan da zanîn.

Niha emê bibînin ku Xwedê çawa mizgîniya bûyîna Mesîh bi destê stêreke mezin û şewqdar bi çend stêrnasan da zanîn. Ew stêr ji nişkê ve di Rojhilatê de li ezmên xuya bû.

Ji kerema xwe guhê xwe bidin Mizgîniya li gor Metta.

Em ji deriyê diduyan dixwînin. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

[1] Di dema Hêrodês padîşah de, çaxê Îsa li Beytlehma Cihûstanê çêbû, ji Rojhilat
stêrnas hatin Orşelîmê [2] û pirsîn: «Ka padîşahê Cihûyan ê ku çêbûye li ku derê
ye? Me li Rojhilat stêra wî dît û em hatin ku biperizin wî.»

[3] Gava ku Hêrodês padîşah ev yek bihîst, ew û hemû Orşelîm jî pê re bizdiya.

[4] Wî hemû serekên kahînan û Şerîetzan li hevdû civandin û ji wan pirsî, ka
Mesîh wê li ku derê çêbe.

[5] Wan jê re got: «Li Beytlehma Cihûstanê, çimkî bi destê pêxember weha hatiye
nivîsîn:

[6] ‹Û tu, ey Beytlehma li welatê Cihûda!
Tu di nav serwerên Cihûda de bi tu awayî ne ya herî kêm î.
Çimkî ew serwerê ku şivantiya gelê min ê Îsraêl bike wê ji te rabe!›»

[7] Li ser vê yekê Hêrodês bi dizî gazî stêrnasan kir û ji wan qenc hîn bû ku stêr
kengê xuya bûye.

[8] Di pey de wî ew şandin Beytlehmê û ji wan re got: «Herin û qenc li zarok
bigerin. Gava ku we ew dît, haya min pê bixin, da ku ez jî bêm û biperizim wî.»

Lê belê Hêrodês di dilê xwe de difikirî û nêta wî ew bû ku wî zarokî bikuje, çimkî Hêrodês qet nedixwest ku yekî din di cihê wî de bibe padîşah!

[9] Piştî bihîstina gotina padîşah ew ketin riya xwe.
Ew stêra ku li Rojhilat dîtibûn li pêşiya wan çû, heta li ser cihê ku zarok lê bû
rawesta. [10] Gava ku wan jî stêr dît, bi şahiyeke mezin dilgeş bûn.

[11] Ew ketin malê û zarok bi diya wî Meryemê re dîtin, çûn ser çokan û perizîn
wî.

Wan sindoqa xwe ya xezînê vekir û diyariyên ji zêr, cewîşêrîn û murê pêşkêşî wî kirin. [12] Piştî ku di xewna xwe de hatin tembîhkirin ku venegerin ba Hêrodês, ew di riyeke din re çûn welatê xwe.

Bi kurtî ev serhatiya bûyîna Mesîh e.

Ma em dikarin li ser van tiştên ku îro me bihîstin, çi bêjin?
Bêguman em dikarin bêjin, bûyîna Îsa Mesîh di dîroka dinyayê de bêhember e. Em dikarin li hemû padîşah, pêxember û mirovên girîng binêrin, lê zû kifş dibe ku bûyîna yek ji wan jî ne wek ya Îsa Mesîh bû.
Çima em weha dibêjin?
Ji kerema xwe van xalên girîng bînin bîra xwe:

- Me dît ku Mesîh tam li gor gotinên pêxemberên Xwedê hat dinyayê.
- Ew bi hêza Xwedê bû mirov, çimkî diya wî keçikek bû.
- Wek ku Mîxa pêxember heft sed salan beriya bûyîna Mesîh gotibû, Îsa li Beytlehmê hat dinyayê.
- Me dît ku Xwedê milyaketê xwe şand, da ku ew, mizgîniya bûyîna Mesîh bi şivanan bidin zanîn
- Me gotinên wî milyaketî bihîstin. Wî ji şivanan re got: Ez hatime, ku ez mizgîniya şabûneke mezin bidim we, ku ji tevahiya gel re ye. Îro li bajarê Dawid xilaskarek ji we re çêbûye. Ew jî Xudan Mesîh e.
- Me dît ku ordiyeke milyaketan li ezmên xuya bû û rûmeta Xudan hawirdora şivanan kir ronahî. Wan got: «Li bilindahiyan ji Xwedê re rûmet û li ser erdê li ser wan ên ku Xwedê ji wan razî ye silamet.»
- Me dît ku Xwedê stêreke mezin û şewqdar da xuyakirin, da ku li welatekî dûr bi çend stêrnasan bide fêmkirin ku padîşahê padîşahan, Xilaskarê gunehkaran, yanî Mesîh hatiye vê dinyayê. Bi rastî li gor bîr û baweriya hin pisporên dîrokê, ew stêrnas ji aliyê Kurdistana Îranê hatin ba Îsa.

Dostên delal, em li ser van tiştan çi bêjin?
Divê ku em ji dil û can bêjin:
Tu kesê ku wek Mesîh hatiye vê dinyayê, tune. Bûyîna Îsa bê hember e.
Heçî bûyîna Îsa ye, em nikarin bimînînin bûyîna yekî din.
Tu kes tune ku bikare bêje: Ez wek wî me. Îsa ji pêxemberên din gelek meztir e, çimkî hemû pêxemberên din li ser hatina wî digotin û li hêviya wî diman.
Bêguman ew, Mesîh e û Mesîh ji ezmên hat.
Dostên delal, divê ku em hinekî li ser pirseke girîng bifikirin.
Eger Mesîh wek pêxemberên din bûya, ma çima hemû pêxemberên Xwedê wê ji pêşî ve hatina wî bidan zanîn?
Ma çima milyaket ji ezmên hatin xwar, da ku bûyîna wî pîroz bikin?
Eger Îsa bi tenê pêxemberekî wek yên din bûya, ma Xwedê çima stêreke taybetî xist ezmên, da ku bûyîna wî bê eşkerekirin?
Ma çima diviya ku diya wî keçikek bûya?

Hêviya me ji we ew e ku her yek ji we kûr li ser van pirsan bifikire.

Gelek spas ku we qenc guhê xwe da serhatiya bûyîna Mesîh. Di bernameyên ku bên de, Xwedê hez bike emê bibînin ku Mesîh çawa dest bi kardestiya xwe ya li ser vê dinê kir.

Heta hingê van gotinên milyaketê Xwedê bînin bîra xwe. Wî ji şivanan re got:

«Netirsin! Ez hatime, ku ez mizgîniya şabûneke mezin bidim we, ku ji tevahiya gel re ye. [11] Îro li bajarê Dawid xilaskarek ji we re çêbûye. Ew jî Xudan Mesîh e.

[Heta hingê, hûn her şid û bextewar bin.]

Cara din me li serhatiya newaze ya bûyîna Îsa Mesîh nêrî. Me dît ku tu kesê wek Îsa hatibe dinyayê tune.

Wek ku pêxemberan ji pêşî ve gotibû, diya wî keçikek bû û ew bi hêza Xwedê li bajarê Dawid Beytlehmê çêbû.

Şeva ku Îsa ji dayik bû, Xwedê ordiyeke milyaketan şand ba çend şivanan û yekî ji milyaketan ji wan re got:

Ez hatime, ku ez mizgîniya şabûneke mezin bidim we, ku ji tevahiya gel re ye. Îro li bajarê Dawid xilaskarek ji we re çêbûye. (Lûqa 2:10.11)

Îro em dixwazin piçekê hem li zaroktiya Îsa û hem jî li xortaniya wî binêrin.

Mizgîniya Xwedê ji me re dibêje ku piştî bûyîna Îsa, çar kur û çend keç ji Ûsiv û Meryemê re çêbûn. Îsa bi wan xwişk û birayên xwe re mezin bû.

Mala wan di bakurê Îsraêlê de li bajarê Nisretê bû. Wek ku me dît, Ûsiv ne bavê Îsa bû, lê belê di çavên xelkê de, Îsa kurê Ûsiv dihat hesabkirin.

Ûsiv xerat bû û Îsa jî li mal bi xebata xeratiyê mijûl dibû. Yanî Îsa xebateke giran hîn bû.

Nivîsarên Pîroz li ser wê demê weha dibêjin: Îsa jî bi şehrezayiyê pêşve diçû û mezin dibû; ew li ber Xwedê û li ber mirovan keremdar bû.

Îsa li Nisretê mezin bû û wek zarokên din jî wî dixwar û vedixwar; ew radiza û ew dileyistî.

Lê belê ferqek mezin hebû: Îsa tu caran guneh nekir û di vê yekê de ew ne wek zarokên din bû. Tu caran xebera nebaş ji devê wî derneket. (Petrûs I, 2:22)

Tu caran ew ne mecbûr bû ku bêje: Li qusûra min nenêrin, an: Li min bibihûrin!, çimkî wî tu caran tiştekî xerab nekir. Di dilê wî de hevênê guneh nebû. Qet tu xerabî di şexsê wî de nebû.

Di her tiştê ku wî kir de, wî li gor armanc û daxwaza Xwedê kir û bi dilê Xwedê bû. Bedena wî wek bedena mirovên din bû, lê xerabî di hundirê wî de nebû.

Dema ku Îsa bû sî salî, wext hat ku dest bi kardestiya xwe bike.
Rojekê wî xatir ji mala xwe xwest û çû aliyê Çemê Urdunê.
Li wir Yûhenna peyva Xwedê bi xelkê dida zanîn û di ava çem de mirov imad dikirin.

Ma Yûhennayê imadkar tê bîra we? Ew şeş meh beriya Îsa hat dinyayê.
Xwedê ji bavê wî Zekerya re got ku Yûhenna wê di pêşiya Mesîh de here û dilê gelê xwe ji bo Mesîh amade bike.
Yûhenna xelk hişyar dikir û ji wan re digot:
«Divê hûn tobe bikin û xwe ji bo hatina Mesîh amade bikin û wî qebûl bikin, çimkî Mesîh wê bi navê Xwedê bê.»
Ji kerema xwe guhê xwe bidin van peyvên Mizgîniyê yanî Încîlê. Mizgîniya li gor Metta li ser Yûhenna weha dibêje:
[1] Di wan rojan de Yûhennayê imadkar li çola Cihûstanê derket meydanê û weha
dest bi hînkirinê kir: [2] «Tobe bikin, çimkî Padîşahiya Ezmanan nêzîk e!» [3]
Yûhenna ew e ku Îşaya pêxember weha li ser wî gotiye:
«Dengê yê li çolê gazî dike:
‹Riya Xudan amade bikin, şiveriyên wî serrast bikin!›»
[4] Cilên Yûhenna ji pirça devê bûn û qayîşeke çermîn li pişta wî girêdayî bû.
Xwarina wî kulî û hingivê çolê bû. [5] Hingê ji Orşelîmê, ji hemû Cihûstanê û ji
tevahiya herêma Çemê Urdunê dihatin ba wî, [6] gunehên xwe eşkere dikirin û di
Çemê Urdunê de bi destê wî imad dibûn.

Em dixwazin li vir hinekî bifikirin.
Gelo we fêm kir ku Yûhenna ji xelkê re çi digot?
Bi kurtî gotinên wî ev bûn:
«Ji gunehên xwe vegerin û tobe bikin. Mesîh hatiye û wê zû dest bi kardestiya xwe bike. Xwe ji bo hatina wî amade bikin û ji xerabiyê vegerin!»

Ew mirovên ku gunehên xwe li ber Xwedê eşkere kirin, ji aliyê Yûhenna ve di avê de imad bûn. Loma ji Yûhenna re «Yûhennayê imadkar» hat gotin.
Ji xwe imadbûnê nikaribû gunehên mirovan xîş bikiran, lê ew nîşana wê yekê bû ku wan ji dil û can tobe kiriye û bi wî awayî wan xwe ji bo hatina Mesîh amade kiriye ku wî Xilaskarê xwe qebûl bikin.

Di nav wan mirovên ku dihatin ba Yûhennayê imadkar de, hem Sadûqî û hem jî Fêrisî hebûn. Ew di wê demê de di nav Cihûyan de du komelên mirovên dîndar bûn. Sadûqî Cihûyên dewlemend bûn û xwe bi serwerên Romayiyan ve girêdabûn. Wan xwe zilamên dîndar hesab dikir û gelek ji wan kahîn bûn, lê wan Nivîsarên Pêxemberan red dikir û digotin ku divê bi tenê Tewrat yanî Şerîeta Mûsa bê qebûlkirin.
Fêrisî jî pisporên dîn û diyanetê bûn û xwe ji dil û can dabûn duakirin û rojîgirtinê û gelek xêr didan mirovan. Lê belê perizîna wan jî pûç bû, çimkî wan dixwest ku bi xêr û kirinên xwe yên qenc, yanî bi hewldana xwe li Xwedê xweş bên. Herweha Fêrisiyan hîndariyên xwe bi Peyva Xwedê ya rast re tevlihev dikir û wan, hemûyên din ên ku ne endamên komela wan bûn, kêm didît.
Yanî hem Sadûqî û hem jî Fêrisî bi dev diperizîn Xwedê, lê dilê wan dûrî Xwedê bû.

Niha em dixwazin bi serhatiya Yûhennayê imadkar berdewam bikin. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
7 Lê gava Yûhenna dît ku ji Fêrisî û Sadûqiyan gelek tên ku imad bibin, wî ji wan re got: «Hey têjikên maran! Kê ji we re gotiye ku hûn ji ber xezeba ku tê
birevin? 8 Îcar fêkiyê ku li tobekirinê tê, bidin. 9 Ji xwe re nebêjin: ‹Birahîm bavê me ye.› Çimkî ez ji we re dibêjim ku Xwedê dikare ji van keviran jî zarokan ji Birahîm re rake! 10 Ji xwe bivir li ser qurmê daran e! Her dara ku berê qenc nede wê bê birrîn û bê avêtin nav êgir. 11 Erê, ez we ji bo tobê bi avê imad dikim, lê yê ku piştî min tê ji min bihêztir e.

Ez ne hêja me ku çaroxa wî hilgirim. Ewê we bi Ruhê Pîroz û bi êgir imad bike.
12 Melhêba wî di destê wî de ye. Ewê bêndera xwe qenc paqij bike, genimê xwe di embarê de bicivîne, lê ewê kayê bi agirê ku venamire bişewitîne.»
13 Hingê Îsa ji Celîlê hat Çemê Urdunê ba Yûhenna, da ku bi destê wî imad bibe.
14 Lê Yûhenna xwest ku ji wî re bibe asteng û got: «Ji dêla ku divê ez bi destê te bêm imadkirin, ma tu têyî ba min?»
15 Îsa bersîv da û got: «Niha bihêle, çimkî divê em, hemû rastiyan bi vî awayî bînin cih.» Li ser vê yekê Yûhenna razî bû.
(Metta 3: 7-15)

Erê, Yûhennayê imadkar Îsa Mesîh di Çemê Urdunê de imad kir.
Belkî hin wê bêjin: Madem ku Îsa bê guneh bû, çima wî ji Yûhenna xwest ku ew bê imadkirin?
Rast e, ji bo Îsa Mesîh qet mecbûrî nebû ku ji aliyê Yûhenna ve bihata imadkirin, ji ber ku di tevahiya jiyana wî de sedemê tobekirinê peyda nedibû.
Yûhenna gunehkar imad kirin, îcar çima Îsa hat ba wî, da ku ew jî imad bibe?
Îsa li ser vê yekê çi got?
Wî ji Yûhenna re got: «Niha bihêle, çimkî divê em hemû rastiyan bi vî awayî bînin cih.»
Îsa bi imadbûna xwe ne tenê mînakek da me, lê herweha wî kifş kir ku ew hatiye, da ku wek me bijî û di ber me de bimire.

Guhdarên delal, ji bo bernama ku bê jî bi me re bin. Hingê emê li dawiya serhatiya imadbûna Îsa Mesîh binêrin.
Heta hingê, Xwedê bi we re be!

Me di bernama xwe ya din de dît ku Îsa Mesîh li Nisretê di nav xwişk û birayên xwe de mezin dibû. Îsa wek zarokên din bû, lê dîsa ferqeke mezin hebû:

Tu caran xebera nebaş ji devê Îsa derneket. (Petrûs I, 2:22)

Tu caran ew ne mecbûr bû ku bêje: Li qusûra min nenêrin, an: Li min bibihûre!, çimkî wî tu caran tiştekî xerab nekir. Di dilê wî de hevênê guneh nebû.

Îsa tu caran guneh nekir. Di her tiştê ku wî kir de, wî li gor armanc û daxwaza Xwedê kir û bi dilê Xwedê bû.

Piştî vê yekê me dît ku Îsa ji aliyê Yûhennayê imadkar ve hat imadkirin.

Ji bo Îsa Mesîh qet mecbûrî nebû ku bihata imadkirin, ji ber ku di tevahiya jiyana wî de sedemê tobekirinê peyda nebû. Lê Îsa ji Yûhenna re got:

«Niha bihêle, çimkî divê em, hemû rastiyan bi vî awayî bînin cih.»

Yanî Îsa bi imadbûna xwe hem mînakek da me û hem jî wî kifş kir ku ew hatiye, da ku wek me bijî û di ber me de bimire, çimkî mana imadê mirin e. Îsa Mesîh li ser mirina xwe weha got: Îmadeke min heye ku divê ez pê imad bibim. (Lûqa 12:50)

Di dawiya vî deriyê sisiyan de, Nivîsarên Pîroz dibêjin:

16 Îsa imad bû, ji avê derket derneket û pêre pêre ezman qelişî û wî dît ku Ruhê Xwedê wek kevokekê hat xwarê û li ser wî danî. 17 Û dengekî ji ezmanan weha got: «Ev e Kurê min ê delal. Dilê min bi wî xweş e.» (Metta 3:16-17)

Dostên delal, ev dengê kê bû ku hat bihîstin?

Erê, ev dengê Xudan Xwedê bû!

Û Xwedê çi got?

Xwedê li ser Îsa weha got: «Ev e Kurê min ê delal. Dilê min bi wî xweş e.»

Me di bernameyên berê de bihîst ku di Nivîsarên Pîroz de Dawid pêxember û milyaket Cibrayîl ji Mesîh re gotin: Kurê Xwedê. Û niha me bihîst ku Xwedê bi xwe ji Îsa re got: «Ev e Kurê min ê delal.»

Çima Xwedê weha got? Wek ku me beriya niha dît, Îsa Kurê Xwedê ye, çimkî ew rasterast ji ezmên hat dinyayê. Li ser vê dinyayê, bavê Îsa tunebû.
Xwedê Peyva xwe ya herheyî xist malzaroka keçikekê û bi vî awayî Peyva Xwedê, yanî Îsa, beden stand.
Lê li vir em sedemekî din jî dibînin ku ji Îsa re «Kurê Xwedê» tê gotin: Ew ji hemû mirovan veqetandî ye û ne wek wan e.

Îsa di çi û çi de, ne wek zarokên Adem e?
Her kesê ku ji dûndana Adem tê, gunehkar e.
Di hevênê me hemûyan de guneh heye, lê heçî Îsa ye, ew ne wusa ye.
Ew ji guneh bêrî ye. Di tevahiya jiyana xwe de, wî qet tu guneh nekir.
Di hatina wî ya dinyayê de têkiliya jin û mêrekî nebû, lê Ruhê Pîroz hebû.
Mesîh bû mirov û xasîtiya me stand, lê ew nebû yekî gunehkar.
Xasîtiya wî bêkêmahî û paqij û pîroz bû û wusa jî ma.
Loma wek ku dilê bav bi zarokekî ku bi ya wî dike, xweş e, dilê Xwedê bi wî xweş bû.

Carna tê gotin: Kur wek siya bav e. Yê ku kur bibîne, dizane ku bav çawa ye.
Herweha, yê ku Îsa nas bike, wê bizane ku Bav Xwedê çawa ye, çimkî Îsa ji Xwedê hat, da ku cewhera Xwedê, yanî xasîtiya Xwedê nîşanî me bide.
Tu kesî tu caran Xwedê nedîtiye, lê Îsa Mesîh ew bi me da zanîn.
Di nav mirovan de, Îsa yê tenê ye ku cewhera wî pîroz e, çimkî ew yê tenê ye ku ji Ruhê Xwedê yê Pîroz hatiye. Loma Xwedê şerm nekir û ji ezmên dengê xwe da bihîstin û got: «Ev e Kurê min ê delal. Dilê min bi wî xweş e.»

Niha em dixwazin bibînin ku piştî imadbûna Îsa, çi çêbû.
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
[1] Hingê Ruh Îsa bir çolê, da ku ji aliyê Îblîs ve bê ceribandin. [2] Piştî ku Îsa çil roj û çil şevan rojî girt, birçî bû [3] û yê ku diceribîne – yanî Îblîs – , hat ba wî û jê re

got: «Eger tu Kurê Xwedê bî, ji van keviran re bêje, bila bibin nan.» 4 Îsa bersîva
wî da û got: «Hatiye nivîsîn ku: ‹Mirov ne bi nên tenê dijî, lê bi her peyva ku ji
devê Xwedê derdikeve dijî.›»
5 Piştre Îblîs ew bir Bajarê Pîroz, ew danî ser birca Perestgehê û jê re got: 6
«Eger tu Kurê Xwedê yî, ka xwe ji vir bavêje xwarê. Çimkî hatiye nivîsîn: ‹Ewê
ji bo te li milyaketên xwe emir bike û ewê te li ser destên xwe hilgirin…›» 7 Îsa
bersîva wî da û got: «Ev jî hatiye nivîsîn: ‹Xudan Xwedayê xwe neceribîne.›»
8 Îcar Îblîs ew derxist serê çiyayekî gelek bilind û hemû padîşahiyên dinyayê û
rûmet û bedewiya wan nîşanî wî da 9 û jê re got: «Eger tu li ber min herî ser
çokan û biperizî min, ezê van hemûyan bidim te.» 10 Hingê Îsa jê re got: «Ji min
dûr keve, Îblîs! Çimkî hatiye nivîsîn: ‹Biperize Xudan Xwedayê xwe û bi tenê ji
wî re xizmetê bike.›»
11 Piştî vê yekê Îblîs dev ji wî berda û milyaket hatin û ji wî re xizmet kirin. (Metta 4:1-11)

Sê caran Îblîs xwest ku Îsa bixapîne û biceribîne, da ku ew guneh bike.
Sê caran jî Îsa bi ayetên Peyva Xwedê bersiva wî da.
Wek ku Îblîs di baxçê Êdenê de Adem û Hewa ceribandin, wusa jî wî Îsa Mesîh di çolê de ceriband. Lê belê Îsa qet gunehek tenê jî nekir û neket xefika Îblîs.

Çima Yê Xerab Îsa ceriband?
Bersiv ev e: Îblîs dizanibû ku Îsa bi xwe Xilaskarê pîroz e yê ku ji ezmên hatiye, da ku zarokên Adem ji hêza guneh û ji hêza wî xilas bike.
Îblîs ev yek jî dizanibû: Eger Îsa gunehek tenê jî bikira, wî nedikarî zarokên Adem ji hêza guneh xilas bikiran.
Loma nêta Îblîs ew bû ku tengahiyê bide Mesîh û her gav li hember wî bisekine û eger çêbe, wî bixapîne. Lê belê Îsa ji pêşî ve qenc bi nêta Îblîs dizanibû û ji aliyê wî ve qet tiştek qebûl nekir.

Erê, Îblîs di ceribandina dê û bavê me Adem û Hewayê bi ser ket, lê di ceribandina Îsayê pîroz de ew qet bi ser neket.
Wek ku Xwedê tu caran guneh nake, wusa jî Îsa Mesîh tu caran guneh nekir, ji ber ku ew ji Xwedê hat. Erê, kur li bavê xwe tê.
Rast e, ji Mesîh pê ve tu kes tune ku bikare me ji Îblîs û ji gunehan rizgar bike, çimkî ew yê tenê bû ku li hember Îblîs û li hember guneh bi ser ket.
Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin:
[26] Ji me re Serokkahînekî pîroz, bêsûc, bêqusûr, ji gunehkaran veqetiyayî û ji ezmanan hê bilindtir bûyî diviya. [27] Ji wî re nediviya ku ew her roj wek Serokkahînan, pêşî di ber gunehên xwe de û piştre di ber gunehên gel de goriyan pêşkêş bike. Çimkî çaxê ku xwe bi xwe pêşkêş kir, ev yek bi carekê anî cih. (Îbranî 7:26-27)

Dostên delal, em gelek spas dikin ku we qenc guhê xwe da van tiştên girîng. Em hêvîdar in ku hûnê di bernama ku bê de jî bi me re bin. Hingê emê bibihîzin ka çima çend ji şagirtên Yûhennayê imadkar êdî bi wî re nedigeriyan û li pey Îsa çûn.

Bila Xwedê dil û hişê we veke ku hûn mana dersa me ya îro qenc fêm bikin. Niha em bi van gotinên Kitêba Pîroz silavan li we dikin:

Îsa Mesîh xuya bû, da ku guneh rake; û li ba wî guneh tune. (Yûhenna I, 3:5)

[Xilaskar Îsa Mesîh bi we re be!]

Di herdu bernameyên din de me dît ku Mesîh di bûyîna xwe û di cewhera xwe de bê hember e.

- Heçî bûyîna wî bû, me bi zelalî dît ku tu kes wek wî nehatiye dinyayê û nayê jî, çimkî bavê wî yê li ser vê dinyayê nebû. Diya wî keçikek bû û Mesîh bi hêza Ruhê Xwedê çêbû.
- Heçî cewhera, yanî xasîtiya Mesîh e jî, ew bê hember e. Tu kes tu caran wek wî bi cewher û xasîtiya tam pîroz û paqij nehatiye dinyayê.
Ew bû mirov û bû wek me, lê xasîtiya wî ne wek ya me xerab û bi guneh tije bû. Îsa ji guneh bêrî bû, çimkî ew Xilaskar bû. Xwedê ew şand dinyayê, da ku ew cezayê gunehên me hilde ser xwe.

Niha em dixwazin bi xwendina Încîlê berdewam bikin û em guhê xwe bidin gotinên Yûhennayê imadkar. Yûhenna pêxemberekî Xwedê bû û ew hat şandin, da ku di pêşiya Mesîh de rê amade bike; yanî ew hat, da ku mirovan hişyar bike ku ew xwe ji bo qebûlkirina Mesîh amade bikin.
Emê niha guhê xwe bidin şahidiya wî: Di Încîlê de weha dibêje:

19 Şahidiya Yûhenna ev e: Çaxê serekên Cihûyan ji Orşelîmê hin ji kahîn û ji
Lêwiyan şandin, da ku ji wî bipirsin: «Tu kî yî?», 20 wî eşkere got, wî înkar nekir
û got: «Ez ne Mesîh im.»
22 Îcar wan jê re got: «Tu kî yî? Tu ji bo xwe çi dibêjî? Da ku em bersîvekê bidin
wan ên ku em şandine.»
23 Wî got:
«Wek ku Îşaya pêxember gotiye, ez ew deng im ku li çolê gazî dike:
‹Riya Xudan rast bikin!›
Ez bi avê imad dikim, lê yek di nav we de radiweste, hûn nizanin ew kî ye.
27 Ew e, yê ku piştî min tê, ez ne hêja me ku benên çaroxa wî vekim.»

[28] Ev tişt hemû li wî serê Urdunê, li Beytanyayê, li cihê ku Yûhenna lê imad
dikir çêbûn.
[29] Dotira rojê Yûhenna dît ku Îsa ber bi wî ve tê. Û wî got: «Va ye! Berxê
Xwedê yê ku gunehên dinyayê radike. [30] Ev ew kes e yê ku min ji bo wî gotibû:
‹Piştî min yek tê ku di ser min re ye, çimkî ew beriya min hebû.› (Yûhenna
1:19.20.22.23.26-30)

Em li vir rawestin û hinekê li ser şahidiya Yûhenna bifikirin.
Ma we bihîst ku wî li ser Mesîh çi got? Emê careke din guhê xwe bidin gotinên wî:
[29] Dotira rojê Yûhenna dît ku Îsa ber bi wî ve tê. Û wî got: «Va ye! Berxê
Xwedê yê ku gunehên dinyayê radike.»

Me di bernameyên din de dît ku pêxemberan gelek payenav li Mesîh kirin, mesele wan jê re got: Xilaskar, Padîşah, Xudan, Peyva Xwedê û hwd.
Niha em dibihîzin ku jê re «Berxê Xwedê» tê gotin.
Ev payenavekî gelek girîng e û divê em vî navî hinekî şîrove bikin.
Çima Yûhennayê imadkar got: «Îsa berxê Xwedê ye»?
Her kes dizane ku Îsa bû mirov, lê çima jê re berxê Xwedê tê gotin?
Di nav Kurdan de carna tê gotin ku yek berxê bavê xwe ye û em hemû dizanin ku mana vê yekê çi ye. Lê belê çaxê ku ji Îsa re Berxê Xwedê tê gotin, mana wê yekê çi ye?
Rast e, Îsa Mesîh delalê Xwedê bû û dilê Xwedê bi wî xweş bû, lê mana vê gotinê ne ev e.
Payenavê berxê Xwedê hem tiştekî li ser qerektêrê Mesîh û hem jî tiştekî li ser kardestiya Mesîh tîne ber çavê me.

Eger em bixwazin van gotinên Yûhenna rast fêm bikin, divê em bînin bîra xwe, ka Xwedê piştî gunehê ku cara pêşî hat kirin, çi qanûn da mirovan.

Xwedê da zanîn ku berdêla guneh mirin û dojeh e; li gor emrê Xwedê ji bo bexişîna gunehan diviya ku xwîna berxekî bêqusûr bihata rijandin. Riyeke din tunebû.
Îcar me dît ku kurê Adem û Hewayê Habîl baweriya xwe bi Xwedê anî û ji pezê xwe gorî pêşkêşî Xwedê kirin.
Çaxê ku Xwedê goriya Habîl dît, ew bi wê şa bû û Habîl bi vê baweriya xwe di çavê Xwedê de yekî rast hat hesabkirin.
Li gor Şerîeta Mûsa diviya ku berxên bêqusûr bihatan serjêkirin, da ku li gunehên gelê Îsraêl bihata bihûrtin.
Herweha em hîn bûn ku rijandina xwîna berxan têra mirovan nake ku bibe berdêla cezayê gunehan; çimkî heywan û mirov ne wek hev giranbiha û hêja ne. Berx bi tenê mînakeke Xilaskarê pîroz bû yê ku wê bihata dinyayê, da ku xwîna xwe birijanda û gunehkar ji dîwana Xwedê ya dadperwer xilas bikiran.
Beriya bûyîna Îsa bi heft sed salan, Îşaya pêxember li ser Mesîh weha nivîsî, got: Ewê wek berxê ku ji bo serjêkirinê tê birin be û got: Xudan sûcê me hemûyan danî ser wî. (Îşaya 53:7.6)
Yanî em dikarin bêjin ji dema Habîl û heta bi hatina Mesîh, ew mirovên ku ji Xwedê bawer dikirin, li gor vê qanûnê berx dikirin gorî û ew pêşkêşî Xwedê dikirin. Nuh pêxember, dostê Xwedê Birahîm, Mûsa pêxember, Dawid padîşah, Silêman padîşah û hemû pêxember û yên din ên ku Peyva Xwedê qebûl kirin, berxên bêqusûr serjêkirin û ji Xwedê re kirin gorî.
Lê belê ew hemû jî li hêviya goriya rastîn û dawî bûn.
Ew li benda roja hatina Xilaskarê pîroz bûn ê ku wê xwîna xwe birijanda û bi mirina xwe goriyeke bêkêmahî pêşkêşî Xwedê bikira. Yanî wiyê goriyeke ku her û her guneh xîş bikiran, pêşkêşî Xwedê bikira.

Dostên delal, ji ber vê yekê, çaxê Yûhenna dît ku Îsa ber bi vî ve tê, wî ji şagirtên xwe re got:
«Va ye! Berxê Xwedê yê ku gunehên dinyayê radike.»

Bi van gotinan Yûhennayê imadkar bi şagirtên xwe da zanîn ku Îsa bi rastî Mesîh e, yanî berxê Xwedê ye, çimkî Xwedê ew ji ezmên şand dinyayê, da ku ew xwe bike goriya bêkêmahî, rastîn û dawî.
Pêxemberan ji pêşî ve weha li ser Mesîh gotibû û hingê êdî ew hatibû, da ku ew di ber zarokên Adem de bimira û bi rijandina xwîna xwe gunehên me bidan bexişandin.
Loma şagirtên Yûhenna mana van gotinan qenc fêm kirin.

Nivîsarên Pîroz weha berdewam dikin, dibêjin:

35 Dotira rojê dîsa Yûhenna bi du şagirtên xwe re radiwesta. 36 Dema wî dît ku
Îsa derbas dibe, wî got: «Va ye, Berxê Xwedê!» 37 Du şagirtan gotina wî bihîst û
li pey Îsa çûn. 38 Îsa li pişt xwe zivirî û dît ku ew li pey wî tên. Wî ji wan re got:
«Hûn li çi digerin?» Wan jê re got: «Rebbî» - ku bê wergerandin: «Mamoste» -
«tu li ku derê dimînî?» 39 Wî ji wan re got: «Werin, hûnê bibînin.» Îcar ew çûn û
wan dît ku ew li ku derê dimîne û ew wê rojê li ba wî man. Wext piştî nîvro, saet
li dora çaran bû. 40 Yek ji wan herdu kesên ku Yûhenna bihîstibûn û li pey Îsa
çûbûn, Endrawisê birayê Şimûn-Petrûs bû. 41 Wî di cih de birayê xwe Şimûn dît
û jê re got: «Me Mesîh dît», ku bê wergerandin «Yê Rûnkirî» ye. 42 Wî ew anî
ba Îsa. Îsa li Şimûn nêrî û got: «Tu Şimûnê kurê Yûhenna yî. Wê bi navê Kîfas»
- ku ‹Petrûs› e û bi mana ‹lat› e - «gazî te bikin.»

Guhdarên delal, bernama me li vir bi dawî dibe. Xwedê hez bike, emê di bernama ku bê de hê bêtir li ser Mesîh û şagirtên wî yên pêşî bibihîzin.
Heta hingê Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dît ku du şagirtên Yûhenna fêm kirin ku Îsa Mesîh berxê Xwedê ye û wan biryar da ku li pey Îsa herin. Navê yek ji wan Endrawis bû. Endrawis jî di cih de birayê xwe Şimûn dît û ew anî ba Îsa. Îsa li Şimûn nêrî û navekî nû da wî, jê re got Kîfas an jî Petrûs.

Piştî vê yekê Nivîsarên Pîroz weha berdewam dikin, dibêjin:

43 Dotira rojê Îsa biryar da ku here herêma Celîlê. Wî Filîpos dît û jê re got: «Li pey min were!» 44 Filîpos ji Beytsaydayê bû, ji wî bajarê ku Endrawis û Petrûs lê dijiyan. 45 Filîpos Natanyêl dît û jê re got: «Me Kurê Ûsiv, Îsayê Nisretî dît, yê ku Mûsa di Şerîeta xwe de û pêxemberan li ser nivîsîne.» 46 Natanyêl jê pirsî: «Ma ji Nisretê tiştekî qenc dikare derkeve?» Filîpos jê re got: «Were û bibîne!»

Yanî em li vir dibînin ku şagirtên Yûhennayê imadkar li pey Îsa çûn. Çima ew mirov, êdî bi Yûhenna re neman û biryar dan ku bibin şagirtên Îsa?
Bersiv ev e: Ew li pey Îsa çûn çimkî wan gotinên Yûhennayê imadkar bihîstin û fêm kirin ku mana wan çi ye. Yûhenna eşkere got ku piştî wî Mesîh wê bê û got ku Mesîh berxê Xwedê ye. Wan fêm kir ku gotinên pêxemberan hatin cih.
Loma yek ji şagirtên Yûhennayê imdadkar ê ku navê wî Endrawis bû, çaxê wî fêm kir ku Îsa, Mesîh e, çû ba birayê xwe Petrûs û jê re got: «Me Mesîh dît».
Herweha çaxê ku şagirtekî din, yanî Filîpos fêm kir ku Îsa kî ye, ew bi şahiyeke mezin çû ba hevalê xwe Natanyêl û jê re got: «Me Îsayê Nisretî dît, yê ku Mûsa di Şerîeta xwe de û pêxemberan li ser nivîsîne.»
Erê, Endrawis, Petrûs, Filîpos û Natanyêl bi dîtina Îsa gelek dilşa bûn, çimkî wan dizanibû ku ew bi sedan sal bûn ku pêxemberan li ser hatina Mesîh digot – û hingê êdî wan ew bi çavê xwe dît! Şikir ji Xwedê re! Xilaskarê ku hemû pêxemberên Xwedê li ser digotin, êdî di nav wan de bû.
Şikir ji Xwedê re, piştî wan hemû salan êdî Mesîh hatibû!

Loma wan her çar zilaman dest pê kir li pey Îsa çûn û bûn şagirtên wî yên pêşî.

Mizgîniya li gor Metta weha berdewam dike, dibêje:

[21] Îsa ji wê derê pêşve çû, wî du birayên din jî dîtin, Aqûbê kurê Zebedî û birayê
wî Yûhenna. Wan bi bavê xwe Zebedî re di qeyikê de torên xwe vediçinîn. Îsa
gazî wan jî kir. [22] Wan jî di cih de qeyik û bavê xwe hiştin û ew li pey wî çûn.
[23] Îsa li seranserê herêma Celîlê digeriya, di kinîştên wan de hîn dikir, Mizgîniya
Padîşahiyê dida û hemû êş û nexweşiyên di nav xelkê de qenc dikirin. [24] Nav û
dengê wî li seranserê Sûriyê belav bû û xelkê hemû nexweşên ku ketibûn êş û
janên cûr bi cûr, cinoyî, atî û felcî anîn ba wî û wî hemû qenc kirin. [25] Îcar
elaletên mezin ji Celîlê, ji Dêkapolîsê, ji Orşelîmê, ji Cihûstanê û ji aliyê din ê
Çemê Urdunê li pey wî çûn.

Xwedê hez bike, emê di bernameyên ku bên de hê bêtir li hîndariyên Îsa binêrin û emê bibînin ku wî çawa xelk hîn dikir û gelek keramet jî dikirin.
Hem ji gotinên wî û hem jî ji kirinên wî wê bi zelalî kifş bibe ku bi rastî wek ku wî bi xwe jî got, ew Mesîhê Xwedê ye.

Erê di wextê ku îro ji me re maye de, em dixwazin hê bêtir li serhatiya Yûhennayê imadkar binêrin. Me berî niha dît ku şagirtên Yûhennayê imadkar yek bi yek dev ji wî berdan û li pey Îsa çûn. Ma gelo Yûhenna li ser vê yekê çi gotibû? Ma ew razî bû ku ew li pey Îsa biçin?

Guhê xwe bidin van gotinên wî. Di Încîlê de weha dibêje:

Çend mirov hatin ba Yûhenna û jê re gotin: «Mamoste, ew kesê ku li wî aliyê Çemê Urdunê bi te re bû û te jê re şahidî kir, va ye, ew bi xwe imad dike û hemû kes diçin ba wî.»

[27] Yûhenna bersîv da û got: «Eger ji yekî re ji ezmên neyê dayîn, ew nikare
tiştekî bistîne. [28] Hûn bi xwe ji min re şahid in ku min gotiye: ‹Ez ne Mesîh im,
lê ez di pêşiya wî de hatime şandin.› [29] Bûk ji bo kê be zava ew e. Lê destbirayê
zavê yê ku rawestayî ye û dengê zavê dibihîze, bi dengê wî gelek şa dibe. Îcar ev
şabûna min niha temam bûye. [30] Ji wî re mezinbûn, ji min re biçûkbûn divê.
(Yûhenna 3:26-30)

Hûn li ser vê yekê çi difikirin?
Bêguman Yûhenna pir şa bû ku şagirtên wî dev ji wî berdan, da ku ew li pey Mesîh herin! Şahiya Yûhennayê imadkar pir mezin bû û di cih de bû, çimkî wî kardestî û berpirsiyariya xwe pêk anibû. Wî mirov ji bo hatina Mesîh amade kiribûn. Yûhennayê imadkar pêxemberekî Xwedê bû û daxwaza wî tenê ew bû ku mirov bi rêberiya wî herin ba Mesîh û wî qebûl bikin!
Bi rastî di nav Yûhennayê imadkar û gelek rêberên dîn û diyanetan de ferqeke mezin heye. Mirovekî ku ji dil û can diperize Xwedê, wê her gav berê te bide Îsa Mesîh, ji ber ku ew yê tenê ye ku dikare te bibe padîşahiya ezmanan ba Xwedê. Yûhenna dizanibû ku gelek pêxember hebûn, lê belê Xilaskar yek tenê hebû.
Loma Yûhenna got:
[36] Yê ku baweriyê bi Kur [yanî bi Mesîh] tîne, jiyana wî ya herheyî heye. Yê ku
bi ya Kur nake, jiyanê nabîne, lê xezeba Xwedê li ser wî dimîne.»

Heçî dawiya jiyana Yûhennayê imadkar bû, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

[18] Bi vî awayî wî bi gelek tiştên din jî şîret li xelkê dikir û Mizgînî bi wan dida
bihîstin. [19] Lê gava Yûhenna ji ber jinbira Mîr Hêrodês Hêrodiya û ji ber hemû
xerabiyên din, yên ku wî kiribûn, li wî hilat, [20] Hêrodês li ser hemû xerabiyên
xwe ev jî bi ser de zêde kir, ku wî Yûhenna avêt zîndanê. (Lûqa 3:18.19)

Hêrodês jina birayê xwe ji xwe re anî û gava Yûhennayê imadkar jê re got ku li gor Şerîeta Xwedê ev qet çênabe, ew hat girtin û avêtin zîndanê. Di dawiyê de

Hêrodês daxwaza jina xwe û keça wê qebûl kir û serê Yûhenna da jêkirin (Marqos 6:17.27). Îcar Yûhennayê imadkar ji vê dinyayê çû dinya din, yanî çû rûmeta Xwedê.

Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Yûhennayê imadkar pêxemberekî mezin bû; erê dibêjin ku di nav hemû pêxemberên ku beriya Mesîh hatibûn de, ew yê herî mezin bû. Çima Kitêba Pîroz weha dibêje? Bersiv ev e: Hemû pêxemberên din digotin: «Mesîh wê bê û wê zû bê.»
Lê belê mizgîniya Yûhennayê imadkar tiştekî din bû. Wî digot: «Mesîh hatiye, ew di nav we de ye!» Yûhenna bi wî awayî kardestiya xwe ya hêjabilind pêk anî û mirov ji bo hatina Mesîh amade kirin.

Gelek spas ku we qenc guhê xwe dayê. Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de berdewam bikin û emê bibînin ka çima ji Îsa re hat gotin Doxtorê mezin.

Bila Xwedê hiş û dilê we veke û fêmdariyê bide we. Bi rastî ji tiştên ku divê mirov fêm bike, tiştek ji wan gotinên Yûhennayê imadkar girîngtir tune ku mirov fêm bike. Wî got:

«Va ye! Berxê Xwedê yê ku gunehên dinyayê radike.» (Yûhenna 1:29)

Em di bernameyên xwe de li dabaşên herî girîng ên Nivîsarên Pîroz dinêrin û em gihîştine Încîlê, yanî Mizgîniya Xwedê.
Di Încîlê de mizgîniya hatina Îsa Mesîh ji me re tê gotin, yanî Încîl ji me re dibêje ku Îsa Mesîh hat, da ku zarokên Adem ji hêza Îblîs û guneh azad bike.
Di bernameyên din de me bihîst ku Îsa Mesîh çawa dest bi kardestiya xwe kir yanî diçû nav gund û bajaran, xelk hîn dikir û di nav mirovan de her cûreyê nexweşan qenc dikirin. Nav û dengê wî zûka li seranserê welêt belav bû.

Îro emê bibînin ku hem hîndariya Îsa Mesîh û hem jî karên wî di nav hemûyên ku beriya wî hatibûn de, bêhember bû. Îsa Mesîh jin ji xwe re neanî û zarokên wî nebûn. Herweha xaniyê wî nebû û wî nedixwest ku ew dewlemend bibe.
Di jiyana wî de tiştek tenê girîng bû û ew jî ev bû ku ew di her tiştî de tam li gor daxwaza Xwedayê ku ew şandibû, bike. Xwedê kardestî dabû wî û daxwaza Mesîh bi tenê ew bû ku ew vê kardestiyê bi awayekî bêkêmahî pêk bîne.

Di Mizgîniya li gor Marqos de, Peyva Xwedê weha dibêje:

Îsa bi şagirtên xwe ve [21].. gihîşt bajarê Kefernahûmê. Roja Şemiyê hat û nehat,
Îsa çû kinîştê û dest bi hînkirinê kir. [22] Ew jî li hînkirina wî gelek şaş man.
Çimkî wî ne wek Şerîetzanan, lê bi desthilatî hînî wan dikir. [23] Hema hingê di
kinîşta wan de mirovek hebû ku ruhê nepak ew girtibû. Wî bi qîrîn got: [24] «Ya
Îsayê Nisretî, te çi ji me ye? Ma tu hatî ku me helak bikî? Ez dizanim tu kî yî:
Tu Pîrozê Xwedê yî!» [25] Îsa lê hilat û got: «Deng neke û derkeve!» [26] Ruhê
nepak jî ew vehejand û bi dengekî bilind qîriya û jê derket. [27] Hemû heyirîn, ji
hev pirsîn û gotin: «Ev çi kar e? Hînkirineke nû! Bi desthilatî ew emir li ruhên
nepak dike û ew jî bi ya wî dikin.» [28] Û nav û dengê Îsa zûka li hawirdora Celîlê,
li her cihî belav bû. (Marqos 1:21-28)

Hîndariya Îsa qet ne wek hîndariyên mamosteyên Şerîetê yên din bûn. Cihû ji bo ku biperizin Xwedê di xaniyên taybetî de diciviyan; navê wan xaniyan «kinîşt» bû.
Hemûyên ku guhê xwe dan gotinên Îsa, li hîndariya wî şaş man, çimkî wî ew bi desthilatî û ne wek Şerîetzanan hîn dikirin.

Kardestiya Şerîetzanan ew bû ku Tewrat, Zebûr û Nivîsarên Pêxemberên din şîrove bikin.
Lê gelekan ji wan nikaribû mana Nivîsarên Pêxemberan rast û rast eşkere bikiran, çimkî wan bi xwe ew qenc fêm nedikirin.
Wan hemûyan li ser qeyd û qanûnên dîn û li ser adetên bav û kalan qenc dizanibû, lê wan mana peyvên Xudan fêm nekir.
Ew pisporên dîn û diyanetan bûn, ew bi dev diperizîn Xwedê û rûmet didan wî, lê wan gelek caran bi kirinên xwe gotinên Xwedê înkar dikirin.
Îcar çaxê Îsa yê ku tu caran di xwendegehên dînî de nexwendibû dihat kinîştan û bi desthilatî û bi zelalî Nivîsarên Pîroz şîrove dikirin, wan Şerîetzanan şerm dikir û ew gelek aciz dibûn.
Bi ser de xelk di kinîştan de li gotinên Îsa û li kirinên wî şaş diman û ji hev pirs dikirin, digotin: Ev kî ye? Ev şehrezayiya wî ji ku derê tê?
Ev çi hîndariya nû ye? Ew çawa dikare bi ewqas desthilatî hîn bike?
Ew emir li ruhên nepak dike û ew jî bi ya wî dikin.
Tu caran, tu kesî tiştên weha nekirine!

Erê, ji rojên Adem û heta bi roja ku Îsa dest bi kardestiya xwe kir, tu kesî tu caran yekî weha nedîtibû ku hêza wî evqas mezin bûya.
Lê niha wan bi çavên xwe dît. Wan dît ku Îsa peyvek tenê got û hingê Îblîs û cin reviyan! Bi tenê Mesîhê ku ji ezmên hatibû dikaribû tiştekî weha bikira.
Gelo we bihîst ku wî zilamê cinoyî ji Îsa re çi got? Wî bi dengekî bilind got:

«Ya Îsayê Nisretî, te çi ji me ye? Ma tu hatî ku me helak bikî? Ez dizanim tu kî yî: Tu Pîrozê Xwedê yî!»

Cinan rast û rast dizanî ku Îsa ji ku derê hatiye û ew kî ye. Lê belê piraniya xelkê nizanibû ku Îsa bi xwe kî ye.

Îblîs û milyaketên wî yên xerab gelek ji Îsa Mesîh ditirsiyan, çimkî wan ji sedî sed dizanibû ku ew Peyva Xwedê ye, ya ku Xwedê di destpêkê de bi wê erd û ezman afirandine.

Wan dizanibû ku Îsa, Yê Pîroz e û desthilatiya wî heye ku wan bavêje agirê dojehê. Loma ew dilerizîn û ji navê Îsa ditirsiyan.

Niha em dixwazin di Mizgîniya li gor Marqos de di deriyê 1'ê de berdewam bikin. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

29 Îsa ji kinîştê derket derneket, bi Aqûb û Yûhenna re çû mala Şimûn û
Endrawis. 30 Xesûya Şimûn bi tayêketî radiza. Di cih de ji bo wê, ji Îsa re gotin.
31 Ew jî çû ba wê, bi destê wê girt û rakir. Tayê ew berda û jinikê ji wan re
xizmet kir. 32 Êvarê, piştî ku roj çû ava, xelkê hemû nexweş û yên cinoyî anîn ba
wî. 33 Hemû xelkê bajêr li ber derî civiyabû. 34 Îsa gelek kesên bi nexweşiyên cûr
bi cûr qenc kirin, gelek cin jî derxistin û nedihişt ku cin gotinekê bêjin. Çimkî
wan dizanibû ku ew kî ye.
35 Bi berbangê re, serê sibê zû Îsa rabû û derket, çû cihekî bêpêjin û li wir dua
kir. 36 Şimûn û yên bi wî re, li Îsa geriyan 37 û gava ku wan ew dît, jê re gotin:
«Her kes li te digere.» 38 Wî ji wan re got: «Em herin cihekî din, nav bajarên
nêzîk, da ku ez li wan deran jî hîn bikim, çimkî ez ji bo vê yekê hatime.» 39 Îcar
ew li hemû herêma Celîlê digeriya û di kinîştên* wan de hîn dikir û cin
derdixistin.
40 Û kotiyek hat, li ber Îsa çû ser çokan, lava kir û got: «Eger tu bixwazî, tu
dikarî min paqij bikî.» 41 Dilê Îsa pê şewitî, destê xwe dirêj kir, li wî da û got:
«Ez dixwazim, paqij bibe!» 42 Û di cih de kotîbûn jê çû û ew paqij bû.

(Marqos 1:29-42)

Yanî Îsa Mesîh mirovên ku bi her cûreyê nexweşiyan ketibûn, qenc dikirin, çimkî dilê wî li zarokên Adem dişewitî.
Wî dît ku ew bêhêvî û bêçare ne, bi rastî ew mirov wek miyên ku şivanê wan tune, bûn. Lê belê sedemekî din jî hebû:
Îsa her cûreyê êş û nexweşiyan qenc dikir û cin derdixistin, da ku zarokên Adem fêm bikin ku bi rastî ew Mesîh e; Xwedê soza xwe dabû ku wiyê ew bişanda vê dinyayê û pêxemberan jî her car li ser hatina wî gotibû.
Mesele me dît ku Îşaya pêxember heft sed salan beriya hatina Îsa nivîsiye ku Mesîh wê bê û
Hingê çavên koran wê vebin û
guhên kerran wê bibihîzin; (Îşaya 35:5.6)
Bi van gotinan Îşaya pêxember da zanîn ku Mesîh wê kerametên bêhember bike.
Erê, Xwedê bi destê Mûsa pêxember û bi destê Êlyas pêxember gelek keramet kirin.
Lê belê eger em kerametên wan bi kerametên Mesîh re rû bi rû bikin, kifş dibe ku wan pêxemberan hindik keramet kiribûn.
Bi ser de, qet qeweta Mûsa û Êlyas nebû ku kerametan bikin, lê belê hêza Îsa Mesîh pir mezin bû, çimkî ew bi xwe hêza Xwedê ye.

Guhdarên delal, heta bernama ku bê bimînin di aştiya Xwedê de!

Di bernama din de me dît ku Îsa Mesîh gelek mirovên nexweş qenc kirin. Ne tenê mirov li desthilatiya wî şaş man, cin jî ji wî reviyan, çimkî wan qenc dizanî ku ew kî ye û jê re gotin: «Ya Îsayê Nisretî, te çi ji me ye? Ma tu hatî ku me helak bikî? Ez dizanim tu kî yî: Tu Pîrozê Xwedê yî!»
Lê belê îro emê bibînin ku Îsa ne tenê doxtorê bedenê ye, lê doxtorê canê mirov e jî.

Emê niha di Mizgîniya li gor Marqos de berdewam bikin û careke din guhê xwe bidin gotinên Nivîsarên Pîroz. Ew dibêjin:
[1] Piştî çend rojan, dema ku Îsa vegeriya Kefernahûmê, hat bihîstin ku ew li mal
e. [2] Mirov di malê de wusa pirr civiyabûn ku heta li ber derî jî cih nemabû. Îsa
peyva Xwedê hînî wan dikir. [3] Îcar hin mirov hatin, felciyekî ku ji aliyê çar
kesan ve dihat hilgirtin anîn ba Îsa. [4] Lê gava ji ber elaletê rê nedîtin ku nêzîkî
wî bibin, wan banê xaniyê ku ew lê dima qul kir û mirovê felcî tevî nivînên wî
daxistin jêr. [5] Gava ku Îsa baweriya wan dît, wî ji yê felcî re got: «Lawo, li
gunehên te hat bihûrtin.» [6] Hinek Şerîetzan li wir rûniştibûn û di dilê xwe de
digotin: [7] «Ev mirov çima wusa dibêje? Çêran dike! Ma ji Xwedê pê ve, kî
dikare li gunehan bibihûre?»
[8] Îsa jî di cih de bi ruhê xwe bi fikrên wan hesiya û got: «Hûn çima tiştên weha
di dilê xwe de dibêjin? [9] Ma kîjan hêsanîtir e? Mirov ji yê felcî re bêje:
‹Li gunehên te hat bihûrtin› an bêje: ‹Rabe, nivînên xwe hilîne û rêve here›? [10]
Lê ji bo ku hûn bizanin desthilatiya Kurê Mirov heye ku li ser erdê li gunehan
bibihûre…» [11] ji yê felcî re got: «Ez ji te re dibêjim: Rabe, nivînên xwe hilîne û
here mala xwe.» [12] Zilam jî rabû, di cih de nivînên xwe hilanîn û li ber hemûyan
derket û çû. Hemû jî heyirî man, pesnê Xwedê dan û gotin: «Me tiştekî wusa tu
caran nedîtiye!» (Marqos 2:1-12)

Hêza Îsa ne bi tenê ji bo qenckirina bedena mirovan a nexweş hebû, lê hêza wî ji bo qenckirina canê mirovan jî hebû. Hêza wî hebû ku hevênê guneh ji dilê mirovan derxe.
Ji Îsa re tê gotin Doxtorê mezin û rast e jî, ji ber ku Îsa qenc dizanibû ku pirsgirêka wî zilamî ya herî dijwar ne lingên wî ên şil û şeht bûn, lê ew gunehê ku di dilê wî de bû. Loma pêşî Îsa jê re got: «Lawo, li gunehên te hat bihûrtin.»

Ma tê bîra we, gava Îsa ev yek got, Şerîetzan çi fikirîn? Wan ji xwe re got: «Ev mirov çima wusa dibêje? Çêran dike! Ma ji Xwedê pê ve, kî dikare li gunehan bibihûre?»
Fikrên wan hem nîv rast û hem jî nîv xelet bûn. Rast e, ji Xwedê pê ve tu kes nikare li gunehan bibihûre. Lê belê çaxê ku Şerîetzanan di dilê xwe de got ku Îsa çêran dike, ew şaş bûn, çimkî wan fêm nekiribû ku Xwedê Xilaskar şand, da ku di nav Xwedê û mirovan de bibe navberkar û ji gunehkaran re rê veke, da ku ew bi Xwedê re li hev bên.
Îsa bi xwe Peyva Xwedê ye. Loma çaxê ku Îsa got: «Lawo, li gunehên te hat bihûrtin», Xwedê bi xwe got: «Lawo, li gunehên te hat bihûrtin».
Li ser vê dinyayê, Îsa Mesîh dengê Xwedê bû! Herweha, ew hat, da ku ew jiyana xwe bide, wê bike goriyeke bêkêmahî û bi wî awayî gunehên zarokên Adem her û her bide bexişandin.
Wek ku bavek desthilatiyê dide kurê xwe ku ew bi navê wî bipeyive û bixebite, weha jî Xwedê desthilatî da Îsa ku ew li gunehan bibihûre.
Mesîh bi tenê dikare lêbihûrtina gunehan pêşkêş bike, lê Şerîetzanan bi vê yekê bawer nedikir.

Îro gelek wextê me nemaye, lê belê em dixwazin çend ayetên din jî ji wer e bixwînin.
Piştî van tiştan, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

9 Gava Îsa ji wê derê çû, wî mirovek bi navê Metta li cihê bacxanê rûniştî dît. Îsa
ji wî re got: «Li pey min were.» Metta jî rabû û li pey wî çû.
15 Gava ku Îsa li mala Metta li ser xwarinê bû, gelek bacgir û gunehkar tevî wî û
şagirtên wî li ser sifrê rûdiniştin, çimkî yên li pey wî diçûn gelek bûn. 16
Şerîetzanên ku Fêrisî bûn, dema ku Îsa bi bacgir û gunehkaran re li ser sifrê
dîtin, ji şagirtên wî pirsîn: «Çima ew bi bacgir û gunehkaran re xwarinê dixwe?»
17 Gava ku Îsa ev bihîst, ji wan re got: «Ne yên saxlem, lê yên nexweş
hewcedarê hekîm in. Ez nehatime gazî yên rast bikim, lê ez hatime gazî yên
gunehkar bikim.» (Marqos 2:15-17)

Bi van gotinan, doxtorê mezin Îsa Mesîh nîşanî Şerîetzanan da ku ew ji ber gunehên xwe li ber Xwedê nexweş in.
Lê belê wan mamosteyên dîn û diyanetê fêm nekirin ku ew gunehkar in û gunehên xwe qebûl nekirin. Bervajiyê vê, wan rexne li Îsa kirin, gotin:
«Çima ew bi bacgir û gunehkaran re dixwe? »
Lê belê Îsa tam ji bo vê yekê hatibû dinyayê, da ku ew here nav gunehkaran û wan ji gunehên wan xilas bike.

De vêca guhdarên hêja, ma hûn fêm dikin ku hûn di nav nexweşiya dijwar a gunehan de hatine dinê?
Di dilê we de jî guneh heye, loma divê ku hûn bimirin û li ber dîwana Xwedayê pîroz bisekinin. Lê şikir ji Xwedê re, doxtor heye û ew dikare min û te ji nexweşiya gunehan xilas bike û me qenc bike.
Erê, ew doxtor Îsa Mesîh e. Ew ji guneh bêrî bû û hat dinyayê, da ku zarokên Adem ji gunehên wan xilas bike.
Lê belê beriya ku ew bikare dilê te yê bi guneh qenc bike, divê tû fêm bikî ku nexweşiya te ya herî giran, guneh e.
Bi tenê ew mirovên ku dizanin ew nexweş in, diçin doxtor.

Herweha, bi tenê ew mirovên ku dizanin ew gunehkar in, wê herin ba Xilaskarê gunehkaran Îsa. Îsa, ne ji bo wan mirovên ku guman dikin ku ew rastdar in hat; lê ew hat, da ku ew wan mirovên ku gunehên xwe qebûl dikin, xilas bike.
Loma wî ji Şerîetzanan re got:
«Ne yên saxlem, lê yên nexweş hewcedarê hekîm in. Ez nehatime gazî yên rast bikim, lê ez hatime gazî yên gunehkar bikim.»

Dostên delal, Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de peyvên newaze û rast ji devê Xilaskarê gunehkaran Îsa bibihîzin.

Heta hingê qenc li ser van gotinên wî bifikirin. Wî ji mamosteyên dîn û diyanetê re got:
«Ne yên saxlem, lê yên nexweş hewcedarê hekîm in.
Ez nehatime gazî yên rast bikim, lê ez hatime gazî yên gunehkar bikim.»
(Marqos 2:17)

[Bila Xwedê ruhekî rastîhêz û dilekî nefsbiçûk bide me ku em bikarin rastiyê qebûl bikin û ji nexweşiya guneh xilas bibin û qenc bibin!]

Di bernama din de me dît ku Îsa Mesîh li welatê Îsraêlê gund bi gund, bajar bi bajar digeriya, xelk hîn dikir, nexweş qenc dikirin û cin derdixistin. Ji hînkirina wî û ji wan kerametên ku wî dikirin, hemû heyirî diman.
Îro em dixwazin di Încîlê de berdewam bikin û emê guhê xwe bidin gotinên Îsa Mesîh ên newaze. Rojekê, ew bi şagirtên xwe ve li serê çiyayekî bû û elaleteke mezin li dor wan civiyabû. Bi rastî, wextê me tune ku em her tiştê ku Îsa di wê rojê de ji xelkê re got, ji we re bixwînin, lê eger hûn bixwazin, hûn dikarin di Mizgîniya li gor Metta di deriyê 5'an heta 7'an de bixwînin.

Guhdarên delal, hûn niha li ku derê bin, li wê derê bin, ferq tune, em we vedixwînin ku hûn guhê xwe bidin gotinên Îsa Mesîh ên ku em ji wan re dibêjin „Hînkirina li Çiyê".

Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

1 Îsa elalet dîtin û hilkişiya çiyê. Çaxê rûnişt, şagirtên wî hatin ba wî. 2 Wî dest
bi hînkirina wan kir û got:
3 «Xwezî bi wan ên ku bi ruh belengaz in, çimkî Padîşahiya Ezmanan ya wan e.
4 Xwezî bi wan ên ku şîndar in, çimkî ewê bên aşkirin.
5 Xwezî bi wan ên ku nefsbiçûk in, çimkî ewê erdê par bistînin.
6 Xwezî bi wan ên ku tî û birçiyên rastdariyê ne, çimkî ewê bên têrkirin.
7 Xwezî bi wan ên ku dilbirehm in, çimkî dilrehmî wê li wan bê kirin.
8 Xwezî bi wan ên ku dilpak in, çimkî ewê Xwedê bibînin.
9 Xwezî bi wan ên ku aştîker in, çimkî wê ji wan re zarokên Xwedê bê gotin.
10 Xwezî bi wan ên ku di ber rastdariyê de mirov tengahiyê didin wan,
çimkî Padîşahiya Ezmanan a wan e.
11 Xwezî bi we, gava ku ew di ber navê min de we nizim bikin, tengahiyê bidin
we û bi bêbextî her cûreyê gotinên xerab ji bo we bêjin. 12 Şa bibin û dilgeş bin!

Çimkî xelata we li ezmanan mezin e. Ji ber ku wan bi vî awayî tengahî da wan pêxemberên beriya we jî.

[17] «Nefikirin ku ez hatime Şerîetê û nivîsarên pêxemberan ji holê rakim.
Ez nehatime ku ji holê rakim, lê ez hatime ku temam bikim.
[18] Beriya ku erd û ezman bibihûre, herfek an nuqteyeke biçûk ji Şerîetê winda
nabe, heta ku her tişt bê cih.
[19] Loma kî ku ji van emran ê herî biçûk bişkêne û bi wî awayî hînî mirovan bike,
wê di Padîşahiya Ezmanan de jê re yê herî biçûk bê gotin.
Lê kî ku van emran bîne cih û hîn bike, wê di Padîşahiya Ezmanan de ji wî re
mezin bê gotin. [20] De îcar ez ji we re dibêjim, eger rastdariya we ne di ser a
Şerîetzan û Fêrisiyan re be, hûn tu caran nakevin Padîşahiya Ezmanan.

[21] «We bihîstiye ku ji pêşiyan re hatiye gotin: ‹Nekuje! Kî ku bikuje, wê bê
dîwankirin!›
[22] Lê ez ji we re dibêjim, her kesê ku li birayê xwe hêrs bibe, wê bê dîwankirin.
Û kî ku ji birayê xwe re bêje: ‹Bêmejî!› wê li ber Dîwana Bilind bê kişandin
pirsyarê. Û kî ku bêje: ‹Ehmeq!› ewê agirê dojehê heq bike.

[27] «We bihîstiye ku hatiye gotin: ‹Zînayê neke!› [28] Lê ez ji we re dibêjim,
her kesê ku bi dilxwazî li jinekê binêre, ji xwe wî di dilê xwe de bi wê re zîna
kiriye.

[33] «We ev jî bihîstiye ku ji pêşiyan re hatiye gotin: ‹Bi derew sond nexwe û
sondên xwe li ber Xudan bîne cih.› [34] Lê ez ji we re dibêjim, qet sond nexwin!
Ne bi ezmên, çimkî ew textê Xwedê ye, [35] ne jî bi erdê, çimkî pêgeha lingên wî
ye. [37] Bila erêya we «Erê» be û naya we «Na» be. Ji vê zêdetir ji Yê Xerab e.

[38] «We bihîstiye ku hatiye gotin: ‹Çav di ber çav de, diran di ber diran de.›

[39] Lê belê ez ji we re dibêjim, li ber ê xerab ranebin. Eger yek sîleyekê li lama te
ya rastê bixe, ya din jî bide ber.
[40] Û eger yek bixwaze te bide dadgehê û kirasê te ji te bistîne, ebayê xwe jî bi
dest wî ve berde. [41] Eger yek bi zorê te kîlometrekê rêve bibe, bi wî re du
kîlometran here.

[43] «We bihîstiye ku hatiye gotin: ‹Ji cîranê xwe hez bike, ji dijminê xwe nefret
bike!› [44] Lê ez ji we re dibêjim, ji dijminên xwe hez bikin û ji bo yên ku
tengahiyê didin we dua bikin, [45] da ku hûn bibin zarokên Bavê xwe yê li
ezmanan. Çimkî ew tava xwe hem li ser xeraban û hem jî li ser qencan dertîne û
barana xwe bi ser rast û nerastan de dibarîne.
[46] Eger hûn ji wan hez bikin, yên ku ji we hez dikin, ma wê xelata we çi be?
Ma bacgir jî weha nakin? [47] Û eger hûn bi tenê silavê bidin birayên xwe,
ma hûn ji yên din zêdetir çi dikin? Ma pûtperest jî weha nakin?
[48] Loma bêkêmahî bin, çawa ku Bavê we yê li ezmanan bêkêmahî ye.

[1] «Hay ji xwe hebin, kirinên xwe yên qenc li ber çavên mirovan nekin, ji bo ku ji
aliyê wan ve bên dîtin. An na, wê ji Bavê we yê li ezmanan ji bo we xelat nebe.
[2] Loma, çaxê ku tu xêrê bikî, li pêşiya xwe li boriyê nexe, wek ku durû li kuçê û
di kinîştan de dikin, da ku pesnê wan bê dayîn. Bi rastî ez ji we re dibêjim, wan
xelata xwe standiye.
[3] Îcar çaxê ku tu xêrê bikî, bila destê te yê çepê nezane ku destê te yê rastê çi
dike, [4] da ku xêra te veşartî be. Bavê te yê ku tiştê veşartî tê kirin jî dibîne, wê
bergîdana te bide te.

[5] «Gava ku hûn dua dikin, wek ên durû nebin, çimkî ew hez dikin ku li serê
kuçeyan û di kinîştan de dua bikin, da ku ji aliyê mirovan ve bên dîtin.
Bi rastî ez ji we re dibêjim, wan xelata xwe standiye.

[6] Lê çaxê ku tu dua dikî, bikeve hundirê odeya xwe, deriyê xwe bigire û ji Bavê
xwe yê ku nayê dîtin re dua bike û Bavê te yê ku tiştê veşartî tê kirin dibîne, wê
bergîdana te bide te.
[7] «Çaxê ku hûn dua dikin, wek pûtperestan gotinên pûç pircar nekin; ew guman
dikin bi pircarkirina peyvan wê bên bihîstin. [8] Îcar hûn nebin wek wan, çimkî
Bavê we hê berî ku hûn ji wî bixwazin bi hewcedariya we dizane.
[9] «Hûn bi vî awayî dua bikin:
Bavê me yê li ezmanan,
Navê te pîroz be.
[10] Bila padîşahiya te bê.
Daxwaza te wek li ezmên, bila li ser rûyê erdê jî bê cih.
[11] Nanê me yê rojane roj bi roj bide me.
[12] Û li deynên me bibihûre, wek ku em li deyndarên xwe bihûrtine.
[13] Û me nebe ceribandinê, lê me ji Yê Xerab xilas bike.
Çimkî padîşahî, karîn û rûmet her û her ên te ne! Amîn.
[14] Eger hûn li sûcên mirovan bibihûrin, Bavê we yê li ezmanan jî wê li sûcên we
bibihûre. [15] Lê eger hûn li sûcên mirovan nebihûrin, Bavê we jî li sûcên we
nabihûre.

Erê, guhdarên delal, ev peyên Îsa Mesîh gelek bi bandor û bi hêz in. Di bernama ku bê de emê li dawiya Hînkirina li Çiyê binêrin. Ji bo hingê jî bi me re bin!

Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me guhê xwe da gotinên Îsa Mesîh, ên ku ji wan re „Hînkirina li Çiyê" tê gotin. Îsa li çiyê rûniştî bû û şagirtên wî û gelek mirovên din li dor wî civiyabûn û guhê xwe didan gotinên wî.
Emê niha bi hîndariya Mesîh a newaze berdewam bikin û guhê xwe bidin peyvên wî.
Îsa Mesîh hînkirina xwe weha berdewam kir, got:

16 «Çaxê ku hûn rojiyê bigirin, wek durûyan mirûzê xwe nekin; ew rûyê xwe tirş
dikin, da ku mirov bibînin ku ew bi rojî ne. Bi rastî ez ji we re dibêjim, wan
xelata xwe standiye. 17 Lê çaxê ku tu rojiyê bigirî, rûn li porê xwe bide û serçavê
xwe bişo, 18 da ku mirov nebînin ku tu bi rojî yî, lê Bavê te yê ku nayê dîtin
bibîne. Û Bavê te yê ku tiştê veşartî tê kirin dibîne, wê bergîdana te bide te.

19 «Li ser rûyê erdê ji bo xwe xezîneyan necivînin, ku li wir zeng û bizûzk wan
xera dikin, dixwin û diz dikevinê û didizin. 20 Lê ji bo xwe xezîneyan li ezmên
bicivînin, ku li wir ne zeng û bizûzk dikarin wê xera bikin, bixwin û ne jî diz
dikarin bikevinê û bidizin. 21 Çimkî xezîneya we li ku derê be, dilê we jî wê li
wê derê be.

22 «Çiraya bedenê çav e. Eger çavê te qenc be, wê tevahiya bedena te bibe
ronahî. 23 Lê eger çavê te xerab be, wê tevahiya bedena te di tariyê de be. Îcar,
eger ronahiya di dilê te de tarî be, ew çi tariyeke mezin e!

24 «Tu kes nikare xulamtiyê ji du axayan re bike; çimkî an ewê ji yekî nefret bike û ji yê din hez bike, an jî ewê qedrê yekî bigire û yê din biçûk bibîne. Hûn nikarin xulamtiyê hem ji Xwedê re û hem jî ji dewlemendiyê re bikin.

25 «Ji ber vê yekê ez ji we re dibêjim, ji bo jiyana xwe xeman nexwin, ka hûnê çi
bixwin, an çi vexwin û ne jî ji bo bedena xwe, ka hûnê çi li xwe bikin. Ma jiyan
ne di ser xwarinê re û beden jî ne di ser wergirtinê re ye? 26 Li teyrên ezmanan
binêrin! Ew ne diçînin, ne didirûn û ne jî di embaran de dicivînin. Dîsa jî Bavê
we yê li ezmanan wan têr dike. Ma hûn ne di ser wan re ne? 27 Îcar kî ji we bi
xemxwarinê dikare kêlîkekê bi ser jiyana xwe ve dirêjtir bike?

28 «Û hûn çima ji bo cilan xeman dixwin? Li sosinên çolê binêrin ku çawa mezin
dibin, ew ne dixebitin û ne jî rîs dirêsin. 29 Lê ez ji we re dibêjim ku Silêman jî
di hemû rûmeta xwe de wek yeke ji wan cil li xwe nekirin. 30 Îcar, eger Xwedê
giyayê çolê yê ku îro heye û sibê di tendûrê de tê şewitandin, bi vî awayî bi cil
bike, ma ew we hê bêtir bi cil nake, hey kêmîmanno? 31 Loma xeman nexwin û
nebêjin: ‹Emê çi bixwin?› an ‹Emê çi vexwin?› an jî ‹Emê çi li xwe bikin?› 32
Pûtperest li van hemû tiştan digerin. Lê Bavê we yê li ezmanan dizane ku hûn
hewcedarê van hemû tiştan in. 33 Lê hûn berî her tiştî li Padîşahiya Xwedê û li
rastdariya wî bigerin û ev hemû tişt jî wê ji we re bên dayîn.

1 «Dadbar nekin, da ku hûn jî neyên dadbarkirin. 2 Çimkî hûn bi çi awayî yên
din dadbar bikin, hûn jî, hûnê bi wî awayî bên dadbarkirin. Hûn bi kîjan pîvanê
bipîvin, wê bi wê pîvanê ji we re jî bê pîvandin. 3 Tu çima qirşikê di çavê birayê
xwe de dibînî, lê girşê di çavê xwe de nabînî? 4 An çawa tu dikarî ji birayê xwe
re bêjî: ‹Bihêle ku ez qirşikê di çavê te de derxim› hê ku girş di çavê te de ye? 5
Hey mirovê durû, pêşî girşê di çavê xwe de derxe, hingê tê zelal bibînî ku tu
qirşikê di çavê birayê xwe de derxî.
12 «Loma her çi ku hûn dixwazin xelk ji we re bikin, hûn jî wusa ji wan re bikin,
çimkî hînkirina Şerîetê û pêxemberan* ev e.

[7] «Bixwazin, wê ji we re bê dayîn; lê bigerin, hûnê bibînin; li dêrî bixin, ewê ji
we re vebe. [8] Çimkî her kesê ku dixwaze, distîne û yê digere, dibîne û yê li dêrî
dixe, jê re vedibe.

[13] «Di deriyê teng re derbas bibin. Çimkî deriyê ku dibe helakê fireh e, riya ku
diçe wê rihet e û yên ku pê ve diçin gelek in. [14] Lê deriyê ku dibe jiyanê teng e,
rê jî dijwar e û yên ku wê dibînin hindik in.

[15] «Hay ji pêxemberên derewîn hebin. Ew di postê miyan de tên ba we, lê di
hundir de ew gurên har in. [16] Hûnê wan ji berê wan nas bikin. Ma mirov ji
stiriyan tirî û ji diriyan hêjîran diçinin? [17] Bi vî awayî her dara qenc berê qenc, lê
her dara xerab jî berê xerab dide. [18] Dara qenc nikare berê xerab bide û dara
xerab jî nikare berê qenc bide. [19] Her dara ku berê qenc nede tê birrîn û avêtin
nav êgir. [20] Îcar hûnê wan ji berê wan nas bikin.

[21] «Ne ku her kesên ji min re dibêjin: ‹Ya Xudan*, ya Xudan› wê bikevin
Padîşahiya Ezmanan! Bi tenê yên ku daxwaza Bavê min ê li ezmanan dikin, wê
bikevinê. [22] Wê rojê gelek wê ji min re bêjin: ‹Ya Xudan, ya Xudan! Ma bi navê
te me pêxemberîtî nekir? Bi navê te me cin dernexistin? Ma bi navê te me gelek
keramet nekirin?› [23] Hingê ezê bi eşkereyî ji wan re bêjim: ‹Min hûn qet nas
nekirin! Ji min dûr kevin, hûn ên ku neheqiyê dikin!›

[24] «Îcar her kesê ku van peyvên min dibihîze û tîne cih, mîna wî mirovê
aqilmend e yê ku xaniyê xwe li ser latê ava kiriye. [25] Baran dibare, bahoz radibe,
lehî tên û li wî xaniyî dixin, lê ew hilnaweşe, çimkî li ser latê hatiye avakirin. [26]
Û her kesê ku van peyvên min dibihîze û nake, mîna wî mirovê bêaqil e yê ku
xaniyê xwe li ser seylakê ava kiriye. [27] Baran dibare, bahoz radibe, lehî tê û li wî
xaniyî dixin û xanî hildiweşe. Û bi hilweşîneke mezin dikeve.»

[28] Gava ku Îsa ev gotinên xwe xilas kirin, elalet li hînkirina wî gelek şaş ma. [29]
Çimkî wî ne wek Şerîetzanên wan, lê wek yekî xweyî desthilatî ew hîn dikirin.

Dostên delal, bernama me li vir bi dawî dibe. Em hêvîdar in ku hûnê di bernameyên ku bên de jî bi me re bin, da ku em bikarin bi hev re li mana van peyvên kûr û girîng binêrin. Bi rastî, Îsa ne tenê doktorê mezin e, ew mamosteyê mezin e jî.

Eger hûn bixwazin van gotinên Îsa yên newaze li ser CD'ê bistînin, hûn dikarin ji me re binivîsin û emê wê ji we re belaş bişînin.

Bila Xwedê hiş û dilê we veke, da ku hûn gotinên Mesîh qenc fêm bikin.
Heta cara ku bê, em bi van gotinên Îsa Mesîh silavan li we dikin:
Mesîh got:
Hûn berî her tiştî li Padîşahiya Xwedê û li rastdariya wî bigerin û ev hemû tişt jî wê ji we re bên dayîn. (Metta 6:33)

Di xwendina Încîlê de me dît ku Îsa Mesîh di bûyîna xwe de, di şexsiyeta xwe de û di kirinên xwe de bêhember bû û bêhember e.
Herweha me di bernama din de dît ku Îsa di hînkirina xwe de jî bêhember bû.
Tu caran tu kesî wek wî peyvên ewqas kûr û zelal negotine.
Ew xelkê ku guhê xwe dida wî, heyirî dima, çimkî wî bi desthilatî û ne wek kahîn û zanayên wan, ew hîn dikirin.
Peyvek ya ji devê Îsa ji hezar peyvên ji devê rêberên wan ên dîn û diyanetan hêjatir bû.
Ji ber vê yekê Îsa qet ne bi dilê serwerên Cihûyan bû; wan ew nexwest, ji ber ku ew ne bi tenê li hember adetên wan rabû, lê wî durûtiya wan jî li ber hemûyan eşkere kir.

Di bernama din de me peyvên Îsa Mesîh ên ku wî li çiyayekî gotibûn bihîstin, yanî me guhê xwe da „Hînkirina li Çiyê“.
Mana wê hînkirina Mesîh dikare bi pênc peyvan bê gotin û ew peyv jî ev in:
Hûn nebin wek mirovên durû!
Xwedê ji durûtiyê dienire û di nav mirovan de jî durûtî tiştekî xerab û pîs e.
Hûn dizanin ku mana durûtiyê çi ye. Eger mirov bi derew xwe bike mirovekî rast, lê di dilê wî de her cûreyê xerabiyê hebe, ew yekî durû ye.
Îsa got: Yên durû wek gorên spîkirî ne, ku ji derve xweşik xuya dibin, lê hundirê wan tije hestiyên miriyan û hemû tiştên qirêjî ne.
Lê belê mirov nikare Xwedê bixapîne. Peyva Xwedê dibêje:
13 «Tu afirîn tune ku ji wî veşartî be. Lê her tişt li ber çavê wî yê ku divê em hesab bidinê, tazî û vekirî ye.» (Îbranî 4:13)
Îsa dizane ku di dilê mirov de çi heye û wî durûtiya ku di dilê rêberên dîn, di dilê Fêrisiyan û di dilê Şerîetzanan de bû, bi zelalî dît. Ji derve ew gelek bi xîret bûn, wan dua dikir, wan rojî digirt, wan xêr didan, lê belê wan li gor emrên Xwedê nedikir û hezkirina Xwedê di dilê wan de nebû.

Loma hemû xêr û karên wan ên qenc û hemû adetên ku wan digirtin, pûç bûn. Ji ber vê yekê Îsa hînî şagirtên xwe kir û ji wan re got:
[5] «Gava ku hûn dua dikin, wek ên durû nebin, çimkî ew hez dikin ku li serê kuçeyan û di kinîştan de dua bikin, da ku ji aliyê mirovan ve bên dîtin. Bi rastî ez ji we re dibêjim, wan xelata xwe standiye. …
[2] Loma, çaxê ku tu xêrê bikî, li pêşiya xwe li boriyê nexe, wek ku durû li kuçê û di kinîştan de dikin, da ku pesnê wan bê dayîn. Bi rastî ez ji we re dibêjim, wan xelata xwe standiye.
[16] «Û çaxê ku hûn rojiyê bigirin, wek durûyan mirûzê xwe nekin; ew rûyê xwe tirş dikin, da ku mirov bibînin ku ew bi rojî ne. Bi rastî ez ji we re dibêjim, wan xelata xwe standiye.

Nebin wek ên durû …
[20] De îcar ez ji we re dibêjim, eger rastiya we ne di ser a Şerîetzan û Fêrisiyan re be, hûn tu caran nakevin Padîşahiya Ezmanan.

[3] «Xwezî bi wan ên ku bi ruh belengaz in,
Çimkî Padîşahiya Ezmanan ya wan e.
[6] Xwezî bi wan ên ku tî û birçiyên rastdariyê ne,
Çimkî ewê bên têrkirin.
[8] Xwezî bi wan ên ku dilpak in,
Çimkî ewê Xwedê bibînin…
[48] Loma bêkêmahî bin, çawa ku Bavê we yê li ezmanan bêkêmahî ye.
[13] «Di deriyê teng re derbas bibin. Çimkî deriyê ku dibe helakê fireh e, riya ku diçe wê rihet e û yên ku pê ve diçin gelek in.
[14] Lê deriyê ku dibe jiyanê teng e, rê jî dijwar e û yên ku wê dibînin hindik in. »

Îsa Mesîh mirov hişyar kirin, da ku ew ji xwe re riya teng a ku diçe jiyana herheyî hilbijêrin. Gelek girîng e ku her kes mana vê yekê qenc fêm bike.
Li gor gotinên Mesîh, eger mirov bixwaze here ezmên û Xwedê bibîne û her û her li ba wî be, divê ew çawa be? Îsa Mesîh li ser vê yekê çi got?

Bi kurtî wî got: Divê ku dilê te paqij û bêkêmahî be.

Lê belê dilê zarokên Adem çawa dikare paqij û bêkêmahî be?
Ma hevênê guneh, ne ji roja bûyîna wan ve di dilê wan de ye?
Ma tiştek heye ku bikare dilekî xerab biguhere, bike dilekî paqij, yanî bike dilekî ku li Xwedê xweş tê?
Nexêr, ji bo vê yekê qet tiştek ji destê mirovan nayê. Ew nikare dilê xwe biguhere.
Gotina pêşiyan heye, dibêjin: Marê reş spî nabe. Herweha dibêjin:
Çêleka sor nikare çermê xwe biguhêze.
Herweha em gunehkar in û em nikarin xwe paqij bikin; qet tiştek ji destê me nayê ku em li Xwedê xweş bên. Îcar ma çareyek tune?
Belê, çare heye; di wextê me yê ku dimîne de, emê bibînin, tiştê ku li ba mirovan nabe, li ba Xwedê dibe.

Ji bo vê yekê em dixwazin bala xwe bidin zilamekî ku navê wî Nîkodêmos bû.
Nîkodêmos li Orşelîmê rûdinişt û Fêrisî bû, yanî ew zilamekî dîndar bû û carekê ew nîvê şevê hat ba Îsa, da ku bi wî re bipeyive.
Îsa nîşanî wî da ku mirovekî gunehkar çawa dikare dilekî nû û paqij bistîne û ew çawa dikare jiyana herheyî bistîne.
Di Mizgîniya Yûhenna, deriyê 3’an de, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
[1] Bi navê Nîkodêmos mirovek ji Fêrisiyan hebû ku serekekî Cihûyan bû.
[2] Ev mirov bi şev hat ba Îsa û jê re got: «Mamoste, em dizanin ku tu mamosteyekî ji ba Xwedê hatiyî, çimkî ew nîşanên ku tu çêdikî, eger Xwedê ne pê re be, tu kes nikare bike.»
[3] Îsa bersîva wî da û got: «Bi rastî, bi rastî ez ji te re dibêjim ku mirovek ji nû ve çênebe, ew nikare Padîşahiya Xwedê bibîne.»
[4] Nîkodêmos jê pirsî: «Ma mirovekî ku pîr be çawa dikare ji nû ve çêbe?
Ma dikare careke din bikeve malzaroka diya xwe û çêbe?»

[5] Îsa bersîva wî da: «Bi rastî, bi rastî ez ji te re dibêjim, heta ku mirov ji avê û
ruh çênebe, nikare bikeve Padîşahiya Xwedê.
[6] Yê ku ji bedenê çêdibe beden e, yê ku ji Ruh çêdibe ruh e.
[7] Li peyva ku min ji te re got: ‹Divê hûn ji nû ve çêbin›, şaş nemîne.
[8] Ba li ku derê bixwaze lê dixe. Tu dengê wê dibihîzî, lê tu nizanî ku ew ji ku
derê tê û bi ku derê ve diçe; her kesê ku ji Ruh çêdibe weha ye.»
[9] Nîkodêmos jê re got: «Ev tişt çawa dikare çêbe?»
[10] Îsa lê vegerand û got: «Tu mamosteyê Îsraêl î û tu van tiştan nizanî?
[11] Bi rastî, bi rastî ez ji te re dibêjim, tiştê ku em dizanin, em dibêjin, tiştê ku me
dîtiye em şahidiya wî dikin; lê hûn şahidiya me qebûl nakin.
[12] Min tiştên li ser erdê ji we re got û hûn bawer nakin. Nexwe eger ez tiştên li
ezmanan bêjim, hûnê çawa bawer bikin?
[13] Ji bilî Kurê Mirov ê ku ji ezmên hatiye, tu kes derneketiye ezmên.
[14] Çawa ku Mûsa li çolê mar bilind kir, bi vî awayî divê Kurê Mirov jî bê
bilindkirin, [15] da her kesê ku baweriyê bi wî bîne, jiyana wî ya herheyî hebe.»

Guhdarên delal, bernama ma li vir bi dawî dibe; em ji we hêvî dikin ku hûn ji bo bernama ku bê jî bi me re bin. Hingê emê careke din li vê serhatiyê û li mana vê binêrin.

Heta hingê Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me bihîst ku yek ji Fêrisiyan, yanî pisporekî Şerîeta Mûsa bi şev hat ba Îsa da ku bi wî re bipeyive.
Wî ji Îsa re got: «Mamoste, em dizanin ku tu mamosteyekî ji ba Xwedê hatiyî, çimkî ew nîşanên ku tu çêdikî, eger Xwedê ne pê re be, tu kes nikare bike.»
Yanî Nîkodêmos hinekî fêm kir ku Îsa ne wek mamosteyên din bû.
Lê belê Nîkodêmos rast nizanibû ka mirov çawa dikare bikeve Padîşahiya Xwedê. Loma Îsa Mesîh bi wî re li ser vê yekê peyivî.

Bi kurtî, Îsa ji Nîkodêmos re got ku her kesê ku bixwaze Xwedê bibîne û di rûmeta wî de her û her bijî, divê ji nû ve çêbe, yanî divê du caran bê welidandin.
Mana vê yekê ne ew e ku divê em careke din ji dayik bibin.
Nexêr, mana vê yekê ew e ku divê Ruhê Xwedê min û te nû bike, yanî dilê me nû û paqij bike û bi hêza Xwedê me nûvejen bike. (Tîtos 3:5)
Divê em bi hêza ezmanî ji nû ve çêbin û ew hêz qet ne wek adet û kirinên dîn û diyanetê ye. Divê em ji hundir ve bên guhertin, yanî di dilê me de nûbûnek çêbe.

Her kesê ku ji dûndana Adem hatiye vê dinyayê, hevênê guneh di dilê wî de heye û ew nikare bikeve Padîşahiya Xwedê.
Zarokên Adem li hember vê yekê bêçare ne, hêza wan tune ku rayê gunehan ji dilê xwe derxin.
Mirov dikare darê hişk bavêjê nav avê, lê dîsa jî ew darê hişk careke din şîn nabe. Weha jî pêkanîna qeyd, adet û kirinên dîn û diyanetê tu caran nikarin dilekî xerab paqij bikin.
Divê ku Xwedê bi xwe di dilê mirov de kerametekê bike û wî nû bike, çimkî tiştê ku dirize nikare nerizîbûnê bistîne. (Korîntî I, 15:50)
Yanî wek ku Îsa ji Nîkodêmos got, em careke din bi kurtî dibêjin, «divê tu ji nû ve çêbî.»

Mesîh ev yek ji serwerekî dîn re, ji Nîkodêmos re got.
Nîkodêmos mamoste bû, lê belê zû fêm nekir. Loma wî ji Îsa pirsî, got:
Ev çawa çedibe? Çawa ez dikarim ji nû ve çebim û dilekî nû bistînim?

Îsa bersîva wî da û got:
14 «Çawa ku Mûsa li çolê mar bilind kir, bi vî awayî divê Kurê Mirov jî bê
bilindkirin, 15 da her kesê ku baweriyê bi wî bîne, jiyana wî ya herheyî hebe.»
16 Çimkî Xwedê wusa ji dinyayê hez kir ku Kurê xwe yê yekta da, da her kesê
ku baweriyê bi wî bîne helak nebe, lê jiyana wî ya herheyî hebe.» (Yûhenna 3:14-16)

Mesîh serhatiyeke bav û kalên gelê Îsraêl anî ber çavên Nîkodêmos, da ku ew fêm bike, mirov çawa dikare ji dojehê xilas bibe û jiyana herheyî bistîne.
Di dema Mûsa pêxember de, çaxê ku gelê Îsraêl pitpit kir û li hember Mûsa û Xwedê rabûn, Xwedê marên bi jehr şandin nav wan û gelek ji wan mirin.
Dema ku Îsraêliyan tobe kir, Xwedê emir li Mûsa kir ku marekî ji tûnc çêke û deyne ser rotikekî. Her kesê ku lê binêriya, wê sax bibûya û nemira.

Bi vê yekê Îsa ji Nîkodêmos re şîrove kir ku di dema Mûsa pêxember de diviya Îsraêliyan bi baweriyê li marê li ser rotik binêriya, da ku ew xilas bibûna; herweha îro jî divê zarokên Adem bi baweriyê riya ku Xwedê amade kiriye qebûl bikin, da ku ew ji dîwana herheyî xilas bibin û di Padîşahiya Xwedê de bi Xwedê re her û her bijîn.
Em hemû wek wan Îsraêliyan in ên ku maran bi wan ve dabû.
Îblîs wek marekî bi jehr e û guneh jî wek jehrê ye û mirovan dikuje.
Ji rojên Adem û Hewayê ve, jehra guneh ketiye jiyana hemû mirovan û eger Xwedê dermanekê nede me, ew jehr wê me hemûyan helak bike.
Em nikarin xwe bi xwe ji dîwana Xwedê rizgar bikin, çimkî meaşê ku guneh dide, mirin û dojeh e.

Lê belê şikir ji Xwedê re, wî di dema Mûsa pêxember de derman peyda kir û wî ji bo me hemûyan jî derman peyda kiriye, da ku zarokên Adem ji jehra guneh rizgar bibin.

Ma hûn dizanin ku plana Xwedê ji bo nûkirina dilê mirovan çi ye?
Gelo Îsa Mesîh li ser vê yekê çi got?
Wî got: Divê Xilaskarê pîroz li ser rotikekî bê bilindkirin, yanî bê bilindkirin ser xaçê, da ku ew cezayê gunehên zarokên Adem bikişîne, wusa ku «her kesê ku baweriyê bi wî bîne, helak nebe, lê jiyana wî ya herheyî hebe.»

De vêca kî wê xilas bibe? Nivîsarên Pîroz çi dibêjin? Dibêjin: «Her kesê ku baweriyê bi wî bîne, helak nabe, lê jiyana wî ya herheyî wê hebe.»
Divê em baweriya xwe bi kê bînin? Nivîsarên Pîroz dibêjin ku divê her mirov baweriya xwe bi Xilaskarê ku Xwedê şandiye, bîne. Gelo, we baweriya xwe bi wî aniye? Ma hûn di dilê xwe de bawer dikin ku Xwedê Xilaskar Îsa şand vê dinyayê, da ku ew deynê gunehên we bide? Ma hûn bawer dikin ku Mesîh hat, da ku ew li gunehên we bibihûre?
Dermanê ku Xwedê ji bo bexişandina gunehên me pêşkêşî me dike, mirina Îsa ya li ser xaçê ye. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
[21] «Xwedê ewê [yanî Mesîhê] ku guneh nedizanî ji bo me kir guneh, da ku em di şexsê wî de bibin rastdariya Xwedê.»

Dostên delal, Xwedê her gav eynî dimîne. Beriya 2000 sal, Îsa Mesîh ev peyvên girîng ji Nîkodêmos re gotin û ew îro eynî tiştî ji min û te re dibêje. Dibêje: Divê tu ji nû ve çêbî. Xwedê dixwaze dilê te paqij û nû bike, ew dixwaze bi hêza xwe jiyana te nû bike. Tiştê ku ji bo vê yekê pêwist e ew e ku tu baweriya xwe bi Mesîhê Xwedê bînî. Divê tu bawer dikî ku Îsa tu caran guneh nekiriye û dikare deynê gunehên te bide, çimkî wî cezayê wan kişandiye. Ew dixwaze vê yekê bike, da ku tu her û her li ba Xwedê bijî.

Erê, peyva Xwedê dibêje:
«Divê hûn ji nû ve çêbin … Bi rastî, bi rastî ez ji te re dibêjim ku mirovek ji nû ve çênebe, ew nikare Padîşahiya Xwedê bibîne.»
Amîn. Tam wusa ye.

Gelek spas ku we qenc guhê xwe da van peyvên Mesîh ên girîng. Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de bi rastiyên ku Îsa Mesîh gotine, berdewam bikin û emê bibînin ku ew, rastî jinekê tê ya ku pênc mêr kiribûn….

Heta hingê li ser van gotinên Îsa Mesîh bifikirin. Wî got:

7 Li peyva ku min ji te re got: ‹Divê hûn ji nû ve çêbin›, şaş nemîne.
8 Xwezî bi wan ên ku dilpak in,
Çimkî ewê Xwedê bibînin… (Metta 5:8)

Heta niha me di Încîle de dît ku Îsa Mesîh yekî bêhember e.

Heçî bûyîna wî bû, tu kes wek wî nehat dinyayê, çimkî ew bi hêza Ruhê Xwedê ji keçikekê çêbû. Herweha qerektêrê Îsa bêhempa bû, çimkî tu caran tu kes wek wî bi tebiyeta pîroz çênebûye.

Îsa di kirinên xwe de jî bêhember bû, çimkî tu kesî tu caran wek wî keramet nekirin. Wî bi tenê peyvek digot û yên nexweş sax dibûn; Îblîs û ruhên nepak nikaribûn li hember wî rabûna û ew li gunehên zarokên Adem dibihûrt.

Herweha Îsa di hîndariya xwe de bê hember bû. Di bernama din de me bihîst ku Îsa çawa bi Nîkodêmos re peyivî. Nîkodêmos zilamekî dîndar bû û Îsa jê re çend tiştên girîng şîrove kirin.

Îro emê bibînin ku Îsa bi miroveke din re dipeyive. Nîkodêmos zilam bû, lê îro emê bibînin ku Îsa bi jinekê re peyivî. Nîkodêmos yekî Cihû bû, lê ew jinik ne Cihû bû; Nîkodêmos zilamekî dîndar bû, lê ew jinik gunehkareke mezin bû; bi rastî, wê pênc mêr kiribûn.

Di çavê mirovan de Nîkodêmos yekî qenc bû û ew jinik yeke pir xerab û pîs bû. Lê belê di çavê Xwedê de ne wusa ye, çimkî Xwedê qenc dizane ku hemû zarokên Adem, hem yên qenc û hem jî yên xerab gunehkar in û ew hemû di bin hêza guneh de ne. Loma divê ku hemû zarokên Adem bi hêza Xwedê ji nû ve çêbin.

Emê niha vegerin Încîlê û guhê xwe bidin gotinên Îsa Mesîh.

Îsa bi jineke Samerî re peyivî; Samerya herêmeke di navbera herêma Cihûstanê û Celîlê de bû. Piraniya xelkê Sameryayê ne Cihû bûn û ew pûtperest dihatin hesabkirin. Ji ber vê yekê Cihû ji wan dienirîn û qet dostanî di nav wan de nebû. Lê belê li ba Îsa Mesîh tu xatirgirtin tune, çimkî li ba Xwedê jî qet xatirgirtin tune.

Îsa hat vê dinyayê, da ku li her gunehkarê ku bixwaze dilekî nû û paqij bistîne, bigere. Loma wî şerm nekir ku bi jineke Samerî ya ku pênc mêr kiribûn re bipeyive.

Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
4 Di dema rêwîtiyê de diviya ku Îsa di Sameryayê re derbas bibûya. 5 Ew hat
bajarekî Sameryayê ku navê wî Sûxar bû. Ev der nêzîkî wê zeviyê bû ku Aqûb
dabû kurê xwe Ûsiv. 6 Bîra Aqûb li wê derê bû. Îsa wusa ji rêwîtiyê westayî li
kêleka bîrê rûnişt. Wext nîvro bû.
7 Jineke Samerî hat ku avê bikişîne. Îsa ji wê re got: «Avê bide min ez
vexwim.» 8 Şagirtên wî jî çûbûn bajêr ku tiştên xwarinê bikirrin. 9 Jinika Samerî
jê re got: «Çawa dibe ku tu ji min avê dixwazî? Tu Cihû yî û ez jî jinikeke
Samerî me.» - Tu têkiliya Cihûyan bi Sameriyan re tune. - 10 Îsa bersîva wê da û
got: «Eger te bi dayîna Xwedê û yê ku ji te re dibêje: ‹Avê bide min ez vexwim›
bizaniya, teyê jê bixwesta û wiyê ava jiyanê bida te.» 11 Jinikê jê re got:
«Ezxadim, tiştekî te yê ku tu avê pê bikişînî tune û bîr jî kûr e! Tê ava jiyanê ji
ku derê bînî? 12 Ma tu ji bavê me Aqûb meztir î, yê ku ev bîr daye me? Wî bi
xwe, zarokên wî û pez û dewarên wî av jê vexwarine.» 13 Îsa bersîv da û jê re
got: «Her kesê ku ji vê avê vexwe, wê dîsa tî bibe. 14 Lê kî ji ava ku ez bidimê
vexwe, tu caran tî nabe. Belê ew ava ku ezê bidim wî, wê di dilê wî de ji bo
jiyana herheyî bibe kaniyeke ava ku diherike.» 15 Jinikê jê re got: «Ezxadim, vê
avê bide min ku êdî ez tî nebim û neyêm ji vir avê nekişînim.»
16 Îsa lê vegerand û jê re got: «Here gazî mêrê xwe bike û were vir.» 17 Jinikê
bersîva wî da û got: «Mêrê min tune.» Îsa jê re got: «Te rast got ku mêrê te tune,
18 çimkî pênc mêrên te hebûn û yê ku niha tu pê re yî, ne mêrê te ye. Te ev rast
got.» 19 Jinikê jê re got: «Ezxadim, ez dibînim ku tu pêxemberek î. 20 Bav û
kalên me li vî çiyayî perizîn, lê hûn dibêjin cihê ku divê mirov lê biperize li
Orşelîmê ye.» 21 Îsa jê re got: «Sitiyê, ji min bawer bike, wext tê, ku hûnê ne li
vî çiyayî û ne jî li Orşelîmê biperizin Bav. 22 Hûn diperizin wî yê ku hûn nas

nakin, lê em diperizin wî yê ku em nas dikin, çimkî xilasî ji Cihûyan tê. 23 Lê
belê wext tê û niha ye: Yên ku bi rastî diperizin, ewê bi ruh û bi rastiyê biperizin
Bav. Çimkî yên ku Bav li wan digere ew in ku bi vî awayî diperizin wî. 24
Xwedê ruh e û yên ku diperizin wî, divê bi ruh û bi rastiyê biperizin wî.» 25
Jinikê jê re got: «Ez dizanim ku Mesîh» - yê ku jê re ‹Yê Bijartî› dibêjin - «wê
bê û gava ku ew bê, ewê her tiştî nîşanî me bide.» 26 Îsa jê re got: «Ez ê ku bi te
re dipeyivim, ez ew im.»

27 Li ser vê yekê şagirtên Îsa hatin. Ew gelek şaş man ku ew bi jinekê re
dipeyive, lê kesî negot: «Tu çi dixwazî?» an «Çima tu bi wê re dipeyivî?» 28 Îcar
jinikê cerê xwe hişt, çû bajêr û ji xelkê re got: 29 «Werin, wî mirovî bibînin, yê
ku hemû tiştên ku min berê kiribûn ji min re gotin. Gelo Mesîh ev e?» 30 Xelk ji
bajêr derketin û ber bi Îsa ve dihatin.

39 Gelek Sameriyên ku ji wî bajarî bûn, li ser şahidiya jinikê ya ku digot:
«Hemû tiştên ku min berê kiribûn wî ji min re gotin», bawerî bi Îsa anîn. 40 Îcar
dema ku Samerî hatin ba wî, jê lava kirin ku ew li ba wan bimîne. Ew jî du rojan
li wê derê ma. 41 Gelekên din jî li ser gotina wî bawerî anîn 42 û wan ji jinikê re
got: «Êdî bawerkirina me ne li ser gotina te ye, çimkî me bi xwe bihîst û em
dizanin ku bi rastî jî Xilaskarê dinyayê ev e.»

Serhatiya jinika Samerî ev e. Bi rastî ev serhatî gelek girîng e, çimkî em hîn dibin ku jineke bênamûs çawa rastî Îsa hat û fêm kir ku Îsa Xilaskarê dinyayê ye û ji aliyê Xwedê ve hatiye şandin. Vê yekê tevahiya jiyana wê guhert. Di destpêkê hevpeyvînê de jinika Samerî nizanibû ku kî bi wê re dipeyivî.

Lê belê Îsa ji wê re çend tiştên ecêb gotin û wê hin bi hin fêm kir ku tu mirov tune ku bikare wan tiştan bizane. Tiştê ku wê ji vê yekê derxist, wê got: «Îsa yek ji pêxemberên Xwedê ye.»

Lê belê di dawiyê de çavên dilê wê vebûn û wê fêm kir ku Îsa ji pêxemberekî hê meztir e. Wê dît ku ew Mesîh, yanî Xilaskarê dinyayê ye, yê ku hemû pêxemberan li ser wî gotiye.

Çaxê ku jinika Samerî fêm kir ew ê ku bi wê re dipeyive Mesîh e, wê cerê xwe danî, rabû bi lez çû bajêr û ji her kesî re got: «Werin, wî mirovî bibînin, yê ku hemû tiştên ku min berê kiribûn ji min re gotin. Gelo Mesîh ev e?»

Li ser vê yekê xelkê bajêr derket, hatin ba Îsa û jê hêvî kirin ku li ba wan bimîne. Îsa jî du rojan ma û hînî wan kir ka ew çawa dikarin dilekî nû û paqij bistînin û li gor rastiyê biperizin Xwedê. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

41 Gelekên din jî li ser gotina wî bawerî anîn 42 û wan ji jinikê re got: «Êdî bawerkirina me ne li ser gotina te ye, çimkî me bi xwe bihîst û em dizanin ku bi rastî jî Xilaskarê dinyayê ev e.» (Yûhenna 4:41.42)

[Guhdarên delal, em ji bo guhdarîkirina we pir spas dikin; heta bernama ku bê, li ser van gotinên Îsa Mesîh qenc bifikirin. Wî got:
Her kesê ku ji vê avê vexwe, wê dîsa tî bibe. 14 Lê kî ji ava ku ez bidimê vexwe, tu caran tî nabe. Belê ew ava ku ezê bidim wî, wê di dilê wî de ji bo jiyana herheyî bibe kaniyeke ava ku diherike.]

Di bernama din de me dît ku Îsa bi jinikeke Samerî re peyivî. Ew jinik di çavên mirovan de jineke pîs û gunehkar bû. Herweha di nav Samerî û Cihûyan de tu dostanî tune bû. Lê belê li ba Îsa Mesîh tu xatirgirtin tune, çimkî li ba Xwedê jî qet xatirgirtin tune. Îsa hat vê dinyayê, da ku li her gunehkarê ku bixwaze dilekî nû û paqij bistîne, bigere. Loma wî şerm nekir ku bi Sameriyan re bipeyive û şerm nekir ku bi jineke Samerî ya ku pênc mêr kiribûn re bipeyive. Wê di destpêkê de nizanibû ku Îsa Mesîh kî ye, lê hin bi hin wê fêm kir ku Îsa ne bi tenê pêxemberek e, lê bi rastî ew Mesîh e û Xilaskarê hemû mirovan e.

Çaxê ku jinika Samerî fêm kir ew ê ku bi wê re dipeyive Mesîh e, wê cerê xwe danî, rabû bi lez çû bajêr û ji her kesî re got: «Werin, wî mirovî bibînin, yê ku hemû tiştên ku min berê kiribûn ji min re gotin. Gelo Mesîh ev e?»

Li ser vê yekê ji Sameriyan gelekên din jî li ser gotina Îsa bawerî anîn [42] û wan ji jinikê re got: «Êdî bawerkirina me ne li ser gotina te ye, çimkî me bi xwe bihîst û em dizanin ku bi rastî jî Xilaskarê dinyayê ev e.» (Yûhenna 4:41.42)

Niha em dixwazin di Încîlê de berdewam bikin û emê bibînin ku çend rojan piştî hevpeyvîna bi jina Samerî re çi çêbû. Bi rastî her kesî wek wê jinikê nekir û hemûyan Îsa Xilaskarê dinyayê qebûl nekir. Di Mizgîniya li gor Lûqa, deriyê 4'an de Nivîsarên Pîroz dibêjin:

14 Û Îsa bi hêza Ruhê Pîroz vegeriya Celîlê û li seranserê wî cihî nav û dengê wî belav bû. 15 Wî di kinîştên wan de hîn dikir û hemûyan pesnê wî dida.

16 Û ew hat Nisretê, cihê ku lê mezin bûbû û wek adeta xwe, roja Şemiyê ket kinîştê, rabû ser xwe, da ku ji wan re bixwîne. 17 Kitêba Îşaya pêxember dan wî. Gava wî nivîsara lihevpêçayî vekir, wî ew cih dît ku tê de weha nivîsandî bû:

18 «Ruhê Xudan li ser min e, çimkî wî ez mesh kirime, da ez Mizgîniyê bidim belengazan;

Wî ez şandime, da ku ez ji girtiyan re azadiyê û ji koran re vebûna çavan bidim bihîstin, bindestan azad bikim [19] û sala Xudan a keremê bidim naskirin.»
[20] Wî kitêb li hev pêça, ew da destê yê berdestî û rûnişt. Çavên hemûyên ku di kinîştê de bûn, li wî diman. [21] Îcar wî dest pê kir û ji wan re got: «Îro ev nivîsara ku we bihîst, hat cih.»

Bi van gotinan Îsa da pêş ku ew bi xwe Mesîh û ew Xilaskar e yê ku Îşaya pêxember beriya heft sed salan li ser nivîsîbû. Lê belê Cihûyên bajarê Nisretê nikaribûn qebûl bikin ku ew Îsayê ku di nav wan de mezin bûbû, Xilaskarê dinyayê ye. Loma wan ew kêmî xwe dît û gotin: «Ma ev ne kurê Ûsiv e?»

Nivîsarên Pîroz berdewam dikin û ji me re dibêjin ku Îsa xelkê Nisretê hişyar kir, da ku ew Mesihê ku Xwedê şandiya ba wan kêm nebînin û red nekin, lê belê ew hê bêtir aciz bûn û bi hêrs ketin. Loma Încîl dibêje:
[28] Gava wan kesên di kinîştê de ev yek bihîst, hemû hêrs ketin [29] û rabûn ser xwe, Îsa ji bajêr derxistin derve, birin ser kendalê girê ku bajarê wan li ser hatibû avakirin, da ku wî ji wê derê bavêjin xwarê. [30] Lê ew di nav wan re derbas bû û çû.

Yanî xelkê Nisretê dixwest ku Îsa bikujin. Ma çima wan weha kir? Bersiv ev e: Wan dixwest ku Îsa bikujin, ji ber ku wî da pêş ku ew bi xwe Mesîh e yê ku li gor gotinên pêxemberên Xwedê diviya ku bihata.
Gotina pêşiyan heye, dibêjin:
Yê ku rastiyê dibêje, wî ji heft gundan diqewirînin.

Peyvên Îsa yên rast ewqas hêrsa xelkê bajarê Nisretê rakir ku wan dixwest Îsa ji kendalekî bavêjin xwar. Lê belê wan nikaribû li gor daxwaza xwe bikin, çimkî li gor plana Xwedê ji bo mirina Îsa wextê kifşkirî hê nehatibû.
Çi bêaqiliyeke mezin e ku mirov bixwaze wî Mesîhê ku Xwedê Xilaskar û dadgerê dinyayê kifş kiriye, bikuje.

Erê, di dawiyê de mirovan wê Mesîh bikuşta, lê Xwedê wê di roja sisiyan de ew ji nav miriyan rakira. Di bernameyên ku bên de emê hê bêtir li ser vê dabaşê hîn bibin.

Niha emê çawa dabaşa vê bernamê bi awayekî kin bînin ber çavên xwe?
Me îro li ser du cûreyên mirovan bihîst. Herduyan bihîst ku Îsa da pêş ku ew bi xwe Mesîh e, lê bersiva van herdu komelan gelek ji hev ferq bû.

Pêşî me li ser jinikeke gunehkar bihîst. Îsa li ser bîrekê rastî wê hat û piştre Sameriyên din jî hatin ba Îsa. Wan hemûyan gotinên Îsa bi şahiyeke mezin qebûl kir û wan bawer kir ku Îsa, Mesîh e, yanî Xilaskarê dinyayê ye.

Lê di serhatiya diduyan de me dît ku xelkê Nisretê dîndar bû, lê belê wan peyvên Îsa kêm dîtin. Wan Îsa nas dikir, çimkî ew di nav wan de mezin bûbû, lê wan qebûl nekir ku ew bi rastî Mesîh e.
Yanî gunehkarên bajarê Sûxarê Îsa Mesîh û Xilaskarê xwe qebûl kirin, lê mirovên dîndar ên bajarê Nisretê qebûl nekirin ku ew Mesîh e yê ku ji ezmên hatiye.

Guhdarên delal, heçî hûn in, hûn ji wan herdu komelan dimînin kîjanê?
Ma hûn wek xelkê Sûxarê ne yên ku Îsa, Mesîhê xwe û Xilaskarê xwe qebûl kirin? An hûn wek xelkê Nisretê ne yên ku qebûl nekirin ku Îsa ew Mesîh e yê ku Xwedê şandiye, da ku wan ji gunehên wan xilas bike?
Ma we fêm kir ku bi rastî Îsa ew Xilaskar e yê ku hemû pêxemberan li ser nivîsîbûn? Ma we jî ew Xilaskarê xwe qebûl kiriye?

Ji kerema xwe guhên xwe bidin van peyvên Nivîsarên Pîroz. Ew li ser Îsa Mesîh weha dibêjin:

[5] Ronahî di tariyê de şewq dide û tarî nikare wê binixême.

[10] Ew li dinyayê bû û dinya bi wî afirî. Lê dinyayê ew nas nekir. [11] Ew hat
mala xwe, lê gelê wî ew qebûl nekir. [12] Lê hemûyên ku ew qebûl kirin û bawerî*
bi navê wî anîn, wî desthilatî da wan ku bibin zarokên Xwedê. [13] Ew ne ji xwînê,
ne ji xwestina bedenê û ne jî ji xwestina mirov çêbûn, lê ew ji Xwedê çêbûn.
(Yûhenna 1:5-10-13)

Dostên delal, ma hûn ji Xwedê çêbûne? Ma bi rastî we baweriya xwe bi Îsa aniye? Ma we hemûyan ew Xilaskarê xwe qebûl kiriye?

Bernama me ya îro li vir bi dawî dibe. Lê belê em ji bo bernameyên ku bên jî li hêviya we ne.

Di bernama ku bê de emê bibînin ku Îsa nîşan, yanî keramet kirin, da ku her kes bi zelalî bizane ku ew Xilaskarê dinyayê yê yekta ye.

Heta hingê li ser gotinên xelkê Sûxarê bififikirin. Wan li ser Îsa got:

**Bi rastî jî Xilaskarê dinyayê ev e**.» (Yûhenna 4:42)

Wek ku hûn dizanin, em di dersên xwe yên Nivîsarên Pîroz de li Încîlê dinêrin. Încîl Mizgîniya Xwedê ye, çimkî di Încîlê de ji me re li ser jiyan û kirinên Îsa Mesîh tê gotin. Ew Xilaskar e û hat dinyayê, da ku zarokên Adem ji hêza Îblîs, ji hêza guneh û ji helakbûna herheyî xilas bike.

Me di bernameyên xwe yên berî niha de dît ku Îsa gund bi gund û bajar bi bajar li seranserê welatê Îsraêlê digeriya, xelk hîn dikir û nexweşên wan qenc dikirin. Elaletên mezin li pey wî diçûn, lê belê rêberên dîn û diyanetê çavnebariya wî dikir, çimkî wan nikaribû şehrezayiya gotinên wî derew derxin an kerametên wî înkar bikin.

Îro emê di Încîlê de berdewam bikin û emê bibînin ku Fêrisiyan bi Îsa re li ser Roja Şemiyê gotûbêj kir. Roja Şemiyê roja heftan bû û Xwedê ew roj dabû Cihûyan, da ku piştî şeş rojên xebatê, bîhna xwe vekin û rehet bibin.

Lê belê Fêrisiyan, yanî rêberên dînî yên wê demê lome li Îsa kirin, yanî gazin ji wî kirin, gotin ku ew qanûnên Roja Şemiyê dişkêne.

Ew li hêcetan digeriyan ku xelkê li ser Îsa bixin şikê û wan ji pey wî bizivirînin, çimkî wan nedikarî di gotin û kirinên wî de xerabiyek bidîtan.

Emê niha di Mizgîniya li gor Metta de ji deriyê 12’an bixwînin.

Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

1 Hingê Îsa rojeke Şemiyê di nav dexlan re derbas dibû. Şagirtên wî birçî
bûbûn û dest pê kirin, simbil çinîn û xwarin. 2 Gava ku Fêrisiyan ev yek dît, wan
ji wî re got: «Binêre! Şagirtên te tiştê ku roja Şemiyê nabe dikin.» 3 Îsa li wan
vegerand û got: «Ma we nexwendiye ku Dawid çi kir, gava ew û yên pê re birçî
bûn? 4 Ew ket Mala Xwedê, wî û yên bi wî re nanê pêşberiyê xwarin, ku ji bo wî
û yên bi wî re çênedibû, lê bi tenê ji bo kahînan bû. 5 Ma we di Şerîetê de
nexwendiye ku kahîn di rojên Şemiyan de, di Perestgehê de roja Şemiyê xera
dikin û dîsa jî bêsûc in? 6 Lê ez ji we re dibêjim yekî ji Perestgehê meztir li vir e.

[7] Eger we mana vê gotina ‹Ez rehmê dixwazim, ne goriyê› bizaniya, weyê yên
bêsûc sûcdar dernexistana. [8] Çimkî Kurê Mirov Xudanê roja Şemiyê ye.»

(Metta 12:1-8)

Di Nivîsarên Pîroz de bi dehan nav û payenavên Îsa hene. Yek ji wan Kurê Mirov e. Îsa Mesîh gelek caran li ser xwe digot: Kurê Mirov.

Ev payenav tîne bîra me ku Mesîh xwe nizim kir û xasîtiya zarokekî Adem stand.

Herweha navê Kurê Mirov rûmeta wî eşkere dike, çimkî wî ne tenê xwe nizim kir û bû mirov, lê li ser erdê hemû desthilatî û hemû hukumdarî jî ya wî ye.

Ew di ser hemû zarokên Adem re ye, çimkî di şexsê wî de Peyva Xwedê û Hêza Xwedê û Rûmeta Xwedê hat vê dinyayê û bû mirov.

Erê, Îsa Mesîh hem Kurê Mirov û hem jî Xudanê xudanan û Xudanê roja Şemiyê ye. Lê belê Fêrisiyan qebûl nekir ku bi rastî Îsa, Mesîh bû, yê ku pêxemberan li ser wî gotibûn.

Emê niha guhê xwe bidin wê serhatiya ku piştî vê yekê çêbû.

Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

[9] Îsa ji wê derê rabû, çû kinîşta wan. [10] Li wir mirovek hebû, ku destê wî
hişkbûyî bû. Ji bo ku Îsa sûcdar bikin, wan jê pirsî: «Ma cayîz e ku mirov roja
Şemiyê nexweşan qenc bike?»
[11] Îsa ji wan re got: «Ma kî ji we miyeke wî hebe û roja Şemiyê bikeve çalê,
ew wê nagire û dernaxe? [12] Îcar mirov hê çiqas ji miyê hêjatir e! Loma roja
Şemiyê qencîkirin dibe.»
[13] Piştre Îsa ji zilam re got: «Destê xwe dirêj bike.» Wî jî dirêj kir û wek destê
din qenc bû.
[14] Lê Fêrisî derketin derve û bi hev şêwirîn ku ewê çawa Îsa bidin kuştin.
[15] Ji ber ku Îsa bi vê yekê dizanibû, xwe ji wir da aliyekî. Elaleteke mezin li
pey wî çûn û wî hemû nexweşên wan qenc kirin. (Metta 12:9-15)

Em dibînin ku Fêrisî çawa li hember Îsa rabûn, çimkî wî li gor adetên wan ên dînî nedikir.

Ev çi durûtiyeke xerab e! Dilê wan rêberên dîndar bi mirovên birçî û nexweş nedişewitî; lê tiştê hê xirabtir ew bû ku li gor hîndarî û bîr û baweriya xwe, wan ji bo adetên ku Xwedê dabûn wan, nedihişt ku di Roja Şemiyê de qencî bê kirin.

Lê belê Îsa dilê wan ê xerab dizanî û anî bîra wan ku Xwedê di Nivîsarên Pîroz de çi gotiye û ji wan re got:

«Eger we mana vê gotina ‹Ez rehmê dixwazim, ne goriyê› bizaniya, weyê yên bêsûc sûcdar dernexistana. [8] Çimkî Kurê Mirov Xudanê roja Şemiyê ye.»

Piştî vê serhatiyê, Nivîsarên Pîroz weha berdewam dikin û dibêjin:

[22] Hingê wan yekî cinoyiyê kor û lal anî ba Îsa û wî ew qenc kir, êdî hem
peyivî û hem jî dît. [23] Tevahiya elaletê şaşmayî ma û gotin: «Gelo Kurê Dawid
ev e?» [24] Lê gava ku Fêrisiyan ev bihîst, wan got: «Ev mirov bi destê mîrê cinan
Belzebûl, cinan derdixe.» [25] Îsa bi fikrên wan dizanî û ji wan re got: «Her
padîşahiya ku di nav wê de dubendî hebe wêran dibe û her bajar an mala ku di
nav wê de dubendî hebe, namîne. [26] Eger Îblîs Îblîs derxe, di nav wî de dubendî
heye. Êdî padîşahiya wî wê çawa bimîne? [27] Eger ez bi Belzebûl cinan derxim,
ma kurên we wan bi kê derdixin? Ji ber vê yekê ewê bibin dadgerên we. [28] Îcar,
eger ez bi Ruhê Xwedê cinan derdixim, hingê Padîşahiya Xwedê gihîştiye we.

(Metta 12:22-28)

Guhdarên delal, eger em bala xwe bidinê, em îro jî dibînin ku gelek rêberên dîndar hene û gelek caran dilê wan bi mirovên nexweş û reben naşewite.

Di wê demê de, mirovên dîndar difikirîn, digotin: «Eger yek nexweş be, hingê ew nexweşî cezayê Xwedê ye.»

Bi vî awayî van mirovên dîndar, yên nexweş sûcdar derxistin.

Lê belê Îsa dilê me hemûyan dizane. Ew dizane ku tu kes tune ku bê guneh be. Ji ber vê yekê ew tîne bîra me jî ku Xwedê di Nivîsarên Pîroz de çi gotiye.

Wî got: «‹Ez rehmê dixwazim, ne goriyê›. Eger we mana vê gotinê bizaniya, weyê yên bêsûc sûcdar dernexistana.»

Şikir ji Xwedê re! Ev çi peyvên şêrîn in!

Mesîh her gav tîne ber çavê me, Xwedayê ku erd û ezman afirandine, Xwedayekî dilbirehm e.

Dostên delal! Ji kerema xwe guhê xwe bidin bernameya ku bê.
Hingê emê binêrin ka çawa Îsa li Orşelîmê zilamekî ku ji sî û heşt salan ve nexweş bû, qenc kir.

Eger pirsên we li ser dabaşa îro hebin, ji kerema xwe ji me re binivîsin.
Li dawiyê, emê navnîşana xwe bidin we.

Em ji bo bernameya ku bê jî li hêviya we ne. Heta hingê, li ser vê gotina Xwedê qenc bifikirin. Wî got:

‹Ez rehmê dixwazim, ne goriyê›

Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dît ku Xwedê ji bo tengezaran dilbirehm e.
2 Li Orşelîmê, li ber Dergehê Miyê hewzeke bi pênc eywanan hebû. 3-4 Di wan
eywanan de komeke mezin a nexweşan, yanî kor, şil û şeht û felcî vedizeliyan.
Ew li benda çeliqandina avê diman.

5 Mirovek li wê derê hebû ku ji sî û heşt salan ve nexweş bû. 6 Çaxê Îsa ew
vezelandî dît û dizanibû ku ji demeke dirêj ve ye ku ew nexweş e, wî jê re got:
«Ma tu dixwazî sax bibî?»

7 Wî lê vegerand û got: «Ezbenî, kesekî min ê ku gava av diçeliqe min bixe
hewzê avê tune. Dema ku ez dikim xwe bavêjimê, yekî din beriya min xwe
davêjê.»

8 Îsa jê re got: «Rabe, doşeka xwe rake û rêve here.» 9 Di cih de mirov sax bû,
doşeka xwe rakir û rêve çû.

Îcar ew roj Şemî bû 10 û serekên Cihûyan ji wî mirovê ku qenc bûbû re gotin:
«Îro Şemî ye! Nabe ku tu doşeka xwe rakî.»

11 Wî bersîva wan da: «Wî mirovê ku ez sax kirim ji min re got: ‹Doşeka xwe
rake û rêve here.›»

12 Wan jê pirsî: «Ew kî ye ku ji te re got: ‹Doşeka xwe rake û rêve here›?»

13 Lê wî nizanibû ew kî ye, çimkî li wir gelek mirov civiyabûn û Îsa jî di nav
wan de xwe windakiribû.

14 Piştî vê yekê Îsa ew li Perestgehê dît û jê re got: «Binêre, tu sax bûyî!
Êdî gunehan neke, da ku tiştekî hê xerabtir neyê serê te.»

15 Zilam çû ji serekên Cihûyan re got: «Yê ku ez sax kirime Îsa ye.»

16 Ji bo vê yekê êdî wan tengahî dida Îsa, çimkî wî ev kar di roja Şemiyê de
dikirin.

17 Hingê Îsa ji wan re got: «Bavê min heta bi îro jî dixebite, ez jî dixebitim.»
18 Ji bo vê yekê serekên Cihûyan hê bêtir xebitîn ku wî bikujin. Çimkî wî ne bi
tenê roja Şemiyê şkandibû, lê wî gotibû: «Xwedê bavê min e» û xwe bi Xwedê
re yek girtibû.

(Yûhenna 5:1-18)

Guhdarên delal, ma çima serekên Cihûyan û rêberên dînî dixwestin ku Îsa tengezar bikin û wî bikujin?

Ma sedem ew bû ku wî di roja Şemiyê de yên nexweş qenc dikirin?

Nexêr. Ew li kuştina wî digeriyan, çimkî Îsa gotibû ku Xwedê Bavê wî ye. Wan qet nedixwest qebûl bikin ku Îsa bi xwe Mesîh e û ji ba Xwedê hatiye. Loma wan ji bo Îsa digot ku ew çêran dike û dixwestin ku wî bikujin.

Lê belê Nivîsarên Pîroz dibêjin:

19 Îsa ji wan re got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, Kur nikare tiştekî ji
ber xwe bike, lê tenê tiştên ku ew dibîne Bav dike, ew jî wan dike. Bav çi bike,
Kur jî wusa dike. 20 Çimkî Bav ji Kur hez dike û hemû tiştên ku dike nîşanî wî
dide. Ewê tiştên hê meztir nîşanî wî bide wusa ku hûn lê şaş bimînin.

21 Erê, ka çawa Bav dikare miriyan rake û jiyanê bide wan, herweha Kur jî
dikare, wan ên ku ew dixwaze, bide jiyan. 22 Bav dîwana tu kesî nake, lê hemû
desthilatiya dîwankirinê daye Kur, 23 da ku çawa hemû ji Bav re hurmetê dikin,
wusa ji Kur re jî hurmetê bikin. Yê ku ji Kur re hurmetê neke, ji Bavê ku ew
şandiye re jî hurmetê nake.

24 «Bi rastî ez ji we re dibêjim, yê ku guhê xwe dide gotinên min û ji yê ku ez
şandime bawer dike, jiyana wî ya herheyî heye; ew nayê dîwankirin, lê ew ji
mirinê gihîştiye jiyanê.

31 «Eger ez ji bo xwe şahidiyê bikim, şahidiya min ne rast e. 32 Lê yekî din
heye ku ji bo min şahidiyê dike û ez dizanim ew şahidiya ku ew ji bo min dike
rast e. 33 We mirov şandin ba Yûhenna û wî şahidiya rastiyê kir. 36 Lê şahidiya
min di ser şahidiya Yûhenna re ye.

Ew karên ku Bav spartine min da ku ez pêk bînim, ew karên ku ez dikim, ji bo
min şahid in ku Bav ez şandime. 37 Û Bavê ku ez şandime bi xwe jî ji bo min
şahidî kiriye. We tu caran ne dengê wî bihîstiye û ne jî rûyê wî dîtiye.

38 Peyva wî di dilê we de namîne, çimkî hûn ji yê ku wî şandiye bawer nakin.

39 Hûn li Nivîsarên Pîroz dikolin, çimkî li gor bîr û baweriya we jiyana we ya
herheyî di wan de ye û yên ku şahidiya min dikin jî ew in. 40 Lê hûn naxwazin
bên ba min, ku jiyana we hebe.
41 «Ez rûmeta ku ji mirov tê naxwazim. 42 Lê ez dizanim ku di dilê we de
hezkirina Xwedê tune. 43 Ez bi navê Bavê xwe hatim û hûn min qebûl nakin;
eger yekî din bi navê xwe bê, hûnê wî qebûl bikin. 45 Nefikirin ku ezê we li ber
Bav sûcdar bikim; yê ku we sûcdar dike Mûsa ye, ewê ku we hêviya xwe pê ve
girêdaye. 46 Eger we ji Mûsa bawer bikira, weyê ji min jî bawer bikira, çimkî wî
li ser min nivîsiye. 47 Lê eger hûn baweriyê bi nivîsînên wî neynin, hûnê çawa bi
gotinên min bawer bikin?» (Yûhenna 5:19-24.31-47)

Gelo we bihîst ku Îsa Mesîh çawa Fêrisî hişyar kirin? Ew li kuştina wî digeriyan, lê wî ji wan re got:

Yê ku Mesîh red bike, şahidiya gotin û kirinên Mesîh ên newaze red dike.

Yê ku Mesîh red bike, şahidiya Yûhennayê imadkar û şahidiya Mûsa û şahidiya Nivîsarên Pîroz înkar dike.

Bi kurtî, yê ku Mesîh red bike, Xwedê bi xwe red dike. Yê ku ji Kur re hurmetê neke, ji Bavê ku ew şandiye re jî hurmetê nake, çimkî Îsa bi xwe peyva Xwedê ye û Xwedê hemû desthilatî û dîwankirin da destê wî.

Eger mirov Nivîsarên Pêxemberan bizane û ji peyvên wan bawer bike,
ewê bawer bike ku kurê Meryema keçik Îsa, ji aliyê Xwedê ve hatiye şandin,
da ku bibe Xilaskarê dinyayê.

Îsa bi van peyvan li ser vê yekê got:

39 «Hûn li Nivîsarên Pîroz dikolin, çimkî li gor bîr û baweriya we jiyana we ya
herheyî di wan de ye û yên ku şahidiya min dikin jî ew in. 40 Lê hûn naxwazin
bên ba min, ku jiyana we hebe.
45 Nefikirin ku ezê we li ber Bav sûcdar bikim; yê ku we sûcdar dike Mûsa
ye…

[46] Eger we ji Mûsa bawer bikira, weyê ji min jî bawer bikira, çimkî wî li ser min nivîsiye. [47] Lê eger hûn baweriyê bi nivîsînên wî neynin, hûnê çawa bi gotinên min bawer bikin?» (Yûhenna 5:39.40.45-47)

Xwezî her yek ji me qenc li ser van gotinên Mesîh bifikiriya, çimkî Xwedê dixwaze ku em mana van tiştan bi zelalî fêm bikin. Xwedê dixwaze ku rastî di dilê me de rûne.

Eger mirovek bêje: «Ez ji pêxemberên Xwedê bawer dikim», divê ku ew wiyê ku hemû pêxemberan li ser digot, qebûl bike û baweriya xwe bi wî, yanî bi Îsa Mesîh bîne.

Dostên delal, ma hûn ji pêxemberan bawer dikin?

Em ne li ser pêxemberekî tenê dibêjin, lê em li ser şahidiya **hemû** pêxemberên Xwedê dibêjin. Bêguman şahidiya wan yek e. Ma bi rastî hûn ji vê şahidiyê bawer dikin? Di Nivîsarên Pîroz de ev pirs heye, dibêje:

Ma baweriya te bi pêxemberan heye? (Karên Şandiyan 26:27)

Bersiva te çi ye?

Guhdarên delal, divê em niha bernama xwe bi dawî bikin. Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de hê bêtir li jiyan û kirinên Mesîh binêrin….

Heta hingê, qenc li ser van gotinên Mesîh bifikirin. Wî ji Fêrisiyan re got:

Eger hûn baweriyê bi nivîsînên [Mûsa] neynin, hûnê çawa bi gotinên min bawer bikin? (Yûhenna 5:47)

Me di bernama xwe ya din de dît ku serwerên dîn dixwestin ku Îsa winda bikin, çimkî wî gotibû ku Xwedê bavê wî ye û bi van gotinan xwe bi Xwedê re yek girtibû.
Îsa bi kû ve biçûya, elaleteke mezin li pey wî diçû; wî ji nav wan mirovên ku baweriya xwe bi wî anîbûn, 12 zilam hilbijartin, da ku ew bi wî re bin, ji wî hîn bibin û Mizgîniya Xwedê bidin bihîstin. Wî payenavê wan kir Şandî.
Navên wan her diwanzdeh Şandiyan ev in: Yê pêşî, Şimûnê ku jê re Petrûs digotin û birayê wî Endrawis, Aqûbê kurê Zebedî û birayê wî Yûhenna. Filîpos û Bertolomeyos, Tûma û Mettayê bacgir, Aqûbê kurê Halfayos û Tedayos. Şimûnê Welatparêz û Cihûdayê Îsxeryotî yê ku Îsa da dest.

Ew her diwanzdeh şagirtên Îsa her gav bi wî re bûn.
Herweha hin jin jî bi wan re bûn: Meryema ku jê re Mejdelanî digotin a ku heft cin jê derketibûn û Yohana jina Xûzayê şahneyê mala Hêrodês û Sosin û gelekên din ên ku bi malê xwe alîkariya wan dikirin.

Wek ku me dît, xelk li hînkirina Îsa Mesîh şaş diman, çimkî wî ew bi desthilatî û ne wek Şerîetzanên wan hîn dikirin. Desthilatiya Îsa ne tenê di hînkirina wî de bû, lê ew bi kirinên wî yên nedîtî jî kifş dibû. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin: Padîşahiya Xwedê ne bi gotinê ye, lê belê bi hêzê ye. (Korîntî I, 4:20)

Îro emê bibînin ku hêz û desthilatiya Îsa Mesîh li ser her tiştê afirandî û li ser her hêzê hebû. Emê niha ji Mizgîniya li gor Marqos, ji deriyê 4'an bixwînin.
Nivîsarên Pîroz dibêjin:
35 Wê rojê, gava ku bû êvar, Îsa ji şagirtên xwe re got: «Em derbasî wî aliyê golê bibin.»
36 Şagirt ji elaletê veqetiyan, ketin qeyika ku Îsa tê de bû û wan ew bi xwe re bir. Qeyikên din jî bi wî re bûn.

37 Îcar bagereke mezin rabû, pêlan wusa li qeyikê dixist ku êdî ew bi avê tije
dibû. 38 Lê Îsa di paşiya qeyikê de serê xwe danîbû ser balgehekê û radiza. Wan
ew hişyar kir û gotin: «Mamoste, ma ne xema te ye ku em helak bibin?»
39 Îsa rabû, li bayê hilat û emir li golê kir: «Raweste, bêdeng be!»
Ba sekinî, bêpêjiniyeke mezin çêbû. 40 Îsa ji şagirtan re got: «Hûn çima ditirsin?
Ma hê baweriya we tune?»
41 Tirseke mezin ket ser wan û ji hevdû re gotin: «Gelo ev kî ye ku hem ba, hem
jî gol bi ya wî dikin?»

1 Ew derbasî aliyê din ê Gola Celîlê bûn û gihîştin herêma Girasîniyan. 2 Gava
ku Îsa ji qeyikê derket, wê gavê ji nav goristanê mirovek rastî wî hat ku bi ruhê
nepak ketibû.
3 Ew di nav goran de dijiya û tu kesî nikaribû bi zincîran jî wî girêde; 4 çimkî
gelek caran ew bi qeyd û zincîran girêdabûn, lê wî zincîr qetandibûn û qeyd
şkandibûn. Tu kesî nikaribû ew zeft bikira. 5 Hergav, bi şev û roj di goristanan
de, li serê çiyan diqîriya û xwe bi keviran birîndar dikir.
6 Gava wî Îsa ji dûr ve dît, bi lez hat, jê re çû ser çokan 7 û bi dengekî bilind
qîriya û got: «Ya Îsa, Kurê Xwedayê herî bilind, ma te çi ji min e? Ji bo xatirê
Xwedê, min nede ezabê!»
8 Çimkî Îsa gotibû: «Hey ruhê nepak, ji vî mirovî derkeve!»
9 Îsa jê pirsî: «Navê te çi ye?»
Wî jî got: «Navê min Lejyon e, çimkî em gelek in.»
10 Wî pirr ji Îsa lava kir ku ew wan neşîne derveyî wê herêmê. 11 Û li wir, li pala
çiyê garaneke mezin a berazan diçêriya. 12 Ruhên nepak ji Îsa lava kirin û gotin:
«Me bişîne nav berazan ku em bikevin nav wan.»
13 Wî jî destûr da wan, ruhên nepak jî derketin û ketin nav berazan. Ew garana
ku nêzîkî du hezar beraz bû, wê xwe di kaşê re avêt golê û xeniqî. 14 Gavanên
berazan reviyan û ev xeber li bajêr û li gundan belav kirin. Û xelk jî hatin ku
tiştên bûyî bibînin. 15 Ew hatin ba Îsa û wan ew mirovê ku lejyoneke cinan tê de
bû, bi cil û li ser hişê xwe û rûniştî dîtin. Hingê ew tirsiyan.

[16] Yên ev yeka ku ji wî mirovê cinoyî re hat kirin û tiştê ku bi berazan hatibû,
dîtin, ji xelkê re gotin. [17] Û wan dest pê kir lava ji Îsa kirin ku ew ji herêma wan
here.
[18] Gava Îsa ket qeyikê, ew mirovê ku cinoyî bû, jê lava kir ku bi wî re here. [19] Lê
Îsa nehişt û jê re got: «Vegere mala xwe û ji maliyên xwe re bêje ku Xudan ji bo
te çi kir û çawa li te hat rehmê.»
[20] Ew jî çû û eva ku Îsa ji bo wî kiribû, belav kir û her kes şaş ma.

[21] Gava Îsa dîsa bi qeyikê derbasî aliyê din bû, elaleteke mezin li dora wî civiya.
Ew li perê golê disekinî. [22] Yek ji serekên kinîştê ku navê wî Yayîros bû, hat ba
wî, xwe avêt ber lingên wî, [23] jê gelek lava kir û got: «Keçika min a biçûk li ber
mirinê ye. Were û destên xwe deyne ser wê, da ku ew qenc bibe û bijî.»
[24] Îsa rabû bi wî re çû. Elaleteke mezin li pey wî diçû û der û dor lê teng dikir. [25]
Û jinikek li wir hebû ku ji diwanzdeh salan ve xwîn jê diçû. [26] Wê ji destê gelek
hekîman gelek êş kişandibû û hemû hebûna xwe mezaxtibû, dîsa feyde nedîtibû,
lê hê xerabtir bûbû. [27] Jinikê tiştên ku li ser Îsa hatibûn gotin, bihîstibû. Di nav
elaletê de ji pişt ve hat û destê xwe li kirasê wî da. [28] Çimkî wê di dilê xwe de
digot: «Bi tenê ez destê xwe li kirasê wî bidim, ezê qenc bibim.»
[29] Û di cih de xwîna ku jê diçû çikiya û jinikê jî ji bedena xwe fêm kir ku ji êşa
xwe qenc bû. [30] Îsa di cih de pê hesiya ku hêzek jê çû, di nav elaletê de zivirî û
pirsî: «Kê destê xwe li cilên min da?»
[31] Şagirtên wî gotin: «Tu dibînî ku elaletê der û dor li te teng kiriye, hê jî tu
dibêjî: ‹Kê destê xwe li min da?›»
[32] Lê Îsa çav li dora xwe digerand ku bibîne, kê ev kiriye. [33] Jinik bi tirs û lerz
hat û xwe avêt ber lingên wî û hemû rastî got. [34] Îsa ji wê re got: «Keça min,
baweriya te tu qenc kirî. Bi silamet here û ji êşa xwe sax bibe.»

[35] Îsa hê dipeyivî, ji mala serekê kinîştê mirov hatin û gotin: «Keçika te mir. Tu
çima hê mamoste diwestînî?»
[36] Gava Îsa ev bihîst, wî ji serekê kinîştê re got: «Netirse, bi tenê bawer bike!»

[37] Wî nehişt ku ji bilî Petrûs, Aqûb û birayê wî Yûhenna kes li pey wî bê. [38]
Çaxê gihîştin mala serekê kinîştê, Îsa dît ku dikin qîjeqîj, digirîn û diqîrin. [39]
Gava ew ket hundir, ji wan re got: «Çima hûn dikin qîjeqîj û digirîn? Zarok
nemiriye, lê di xew de ye.»
[40] Îcar ew pê keniyan. Lê Îsa hemû derxistin derve, dê û bavê zarokê û her sê
şagirtên xwe birin û ket cihê ku zarok lê bû. [41] Destê zarokê girt û jê re got:
«Keçikê, ez ji te re dibêjim: Rabe!»
[42] Keçik di cih de rabû û geriya. Ew diwanzdeh salî bû. Îcar ew yekcar şaş man.
[43] Îsa hişk li wan emir kir ku vê yekê ji kesî re nebêjin û ji wan re got ku xwarinê
bidin keçikê.

Erê, Îsa Mesîh hemû cûreyên nexweşiyan qenc kirin.
Guhdarên delal, di bernama ku bê de emê hê li çend kerametên din binêrin û li ser mana vê hêza Mesîh bifikirin. Heta hingê Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dît ku Îsa gazî 12 zilaman kir ku ew bibin şagirtên wî. Herweha çend jin jî li pey wî diçûn û jê re xizmet dikirin.
Piştre me dît ku Îsa çawa hem bagereke mezin rawestand, hem jineke nexweş qenc kir û hem jî keçikeke mirî rakir. Bi rastî hêza Xwedê bêhember û bêsînor e.

Niha em dixwazin li çend nîşan û kerametên wî yên din binêrin. Di Mizgîniya li gor Marqos de Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

27 Gava Îsa ji wir derbas dibû, du mirovên kor li pey wî hatin û bi qîrîn gotin:
«Li me were rehmê, ey Kurê Dawid!» 28 Çaxê Îsa gihîşt malê, mirovên kor hatin
ba wî. Hingê Îsa ji wan pirsî: «Hûn bawer dikin ku ez dikarim vê bikim?» Koran
lê vegerand û gotin: «Erê, ya Xudan.» 29 Hingê Îsa destê xwe danî ser çavên wan
û got: «Bila li gor baweriya we ji we re bibe.» 30 Û çavên wan vebûn. Wî bi
hişkî tembîh li wan kir û got: «Binêrin! Bila tu kes bi vê nezane.» 31 Lê ew
derketin, wan navê wî li seranserê wê herêmê belav kir.

32 Çaxê ku ew derketin, mirovekî lal û cinoyî anîn ba Îsa. 33 Gava ku cinê wî hat
derxistin, mirovê ku lal bû peyivî. Elalet şaş ma û got: «Li Îsraêlê tiştekî weha
qet nehatiye dîtin.» 34 Lê Fêrisiyan got: «Ew bi destê mîrê cinan, cinan derdixe.»

1 Îsa ji wir derket û çû bajarê xwe. Şagirtên wî jî li pey wî çûn. 2 Çaxê bû roja
Şemiyê, wî di kinîştê de dest bi hînkirinê kir û gelekên ku ew bihîstin, gelek şaş
man û gotin: «Vî mirovî ev tişt ji ku derê anîn? Ev çi şehrezayî ye ku jê re hatiye
dayîn? Ev çi keramet in ku bi destê wî çêdibin? 3 Ma ev ne xerat e? Ma ev ne
kurê Meryemê û birayê Aqûb, Yûsês, Cihûda û Şimûn e? Ma xwişkên wî ne li
vir di nav me de ne?» Bi vî awayî ew ji wî enirîn.

4 Îsa jî ji wan re got: «Pêxemberek ji bajarê xwe, di nav mirovên xwe de û ji
mala xwe pê ve, li cihên din ne bê siyanet e.» 5 Wî li wê derê nikaribû tu
keramet bikira, bi tenê destên xwe danîn ser çend nexweşan û ew qenc kirin. 6
Îsa li bêbaweriya wan şaş ma.

Îsa li gundên hawirdorê digeriya û hîn dikir. 7 Wî her diwanzdeh gazî ba xwe
kirin û dest pê kir, ew cot bi cot şandin û li ser ruhên nepak desthilatî da wan. 8
Li wan emir kir û got:
16 «Va ye, ez we wek miyan dişînim nav guran. Loma wek maran bi aqil û wek
kevokan dilpak bin. 17 Îcar li hember mirovan hay ji xwe hebin. Çimkî ewê we
bidin destê civînên giregiran û di kinîştên xwe de bidin ber qamçiyan;
28 Ji wan ên ku bedenê dikujin, lê nikarin can bikujin netirsin. Hê bêtir ji wî
bitirsin ê ku dikare hem can û hem bedenê di dojehê de helak bike.
34 «Nefikirin ku ez hatime aştiyê bînim ser rûyê erdê. Ez nehatime ku aştiyê
bînim, lê ez hatime ku şûr bînim. 35 Çimkî ez hatime ku ‹dijraberiyê bixim
navbera bav û kur, dê û keçê, bûkê û xesûyê. 36 Dijminê mirov wê maliyên mala
wî bi xwe bin›.
37 «Yê ku dê an bavê xwe ji min bêtir hez dike, ne hêjayî min e. Yê ku kur an
keça xwe ji min bêtir hez dike jî, ne hêjayî min e. 38 Û ewê ku xaça xwe
hilneyne û li pey min neyê, ne hêjayî min e. 39 Yê ku jiyana xwe bibîne, ewê wê
winda bike; lê yê ku jiyana xwe di ber min de winda bike, ewê wê bibîne.»

Belkî hûn li van gotinên Mesîh şaş man ên ku wî got: «Ez nehatime ku aştiyê bînim ser rûyê erdê.» Îsa dizanibû, dema ku yek baweriyê bi wî bîne, xelkê mala wî mirovî wê li hember wî rabe; loma Îsa got: «Ji pêşî ve ji bo vê yekê amade bin û bi vê yekê razî bin.»

Yanî em dibînin ku Îsa Mesîh hem di gotinên xwe de û hem jî di kirinên xwe de bi hêza Xwedê tije bû. Mirovên ku li pey wî dihatin gelek şaş diman û digotin:

«Vî mirovî ev tişt ji ku derê anîn? Ev çi şehrezayî ye ku jê re hatiye dayîn? Ev çi keramet in ku bi destê wî çêdibin? (Marqos 6:2)

Guhdarên hêja, ev pirseke girîng e. Ev hêza Îsa û ev şehrezayiya wî ji ku derê hat? Bi rastî wî ew hêz û şehrezayî ne ji vî û ji yê ha standin, çimkî ew bi xwe hem hêza Xwedê û hem jî şehrezayiya Xwedê ye.
Îsa Mesîh ew hemû kerametên mezin li ber çavên mirovan kirin, da ku ew fêm bikin ku ew ji ku derê hatiye û ew kî ye.
Ji ber ku ew „Ruh Allah“ û „Kalimat Allah“ bû, yanî ji ber ku ew „Ruhê Xwedê“ û „Peyva Xwedê“ ye, desthilatiya wî li ser her tiştî hebû.
Ji ber vê yekê wî bi peyvekê dikaribû hem bahoza xurt bisekinîne û hem jî zilamê cinoyî û har qenc bike. Tevahiya hêza Xwedê ya bêsînor di şexsê wî de bû.
Ji ber vê yekê wî dikaribû jineke ku 12 salan xwîn jê diçû sax bike. Wê jinikê hemû perên xwe mezaxtibûn, dabûn doktoran û derman kirrîbûn û hê xirabtir bûbû, lê gava wê destê xwe li kirasê Îsa da, ew di cih de sax bû. Herweha gava ku Îsa destên xwe danîn ser çavên du mirovên kor, di cih de çavên wan vebûn û wan dît.
Desthilatiya wî ne tenê li ser tiştên vê dinyayê hebû. Herweha desthilatiya wî li ser yên mirî jî hebû! Loma wî keçikek ji nav miriyan rakir û li dê û bavê wê vegerand.
Desthilatiya Îsa gelek di ser desthilatiya pêxemberan re bû, çimkî ew bi xwe Peyva Xwedê ya di şiklê mirov de bû.

Erê, rast e, Peyva Xwedê ji me re dibêje ku hemû hêz û hemû desthilatî ji Îsa Mesîh re hatin dayîn. Loma eger tu baweriya xwe bi Îsa bînî û wî xilaskar û Xudanê xwe qebûl bikî, êdî ne pêwist e ku tu ji tiştekî bitirsî: Êdî ne lazim e ku tu ji mirinê an ji mercên jiyanê, an ji cinan û ruhên nepak, an ji dema niha an ji dema ku bê, an ji sêrbaz û pîrhevokan bitirsî.

Edî ne lazim e ku tu xwe bi nivîştiyan ji çavên xerab biparêzî an goriyan pêşkêşî ruhan bikî, çimkî Xudan Îsa wê te ji van hemû tiştan biperize. Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin:
9 Hemû tijetiya Xwedêtiyê bi bedenî di (şexsê) Mesîh de ye. 10 Ew serê her serwerî û desthilatiyê ye û hûn bi wî temam bûne. (Kolosî 2:9)

Dostên delal, ma hûn baweriya xwe bi wî yê ku serê her serwerî û desthilatiyê ye tînin? An hûn hê ji hêz û serwerên vê dinyayê re xizmetê dikin û dixebitin ku hûn li wan xweş bên?

Gelek spas ku we qenc guhê xwe da vê bernamê. Xwedê hez bike emê bi peyvên Încîlê berdewam bikin û emê bibihîzin ku Îsa çawa bi meseleyan xelk hîn dikir.

Bila Xwedê mana kûr a van gotinên girîng bi we bide fêmkirin. Wî li ser Mesîh weha got:
Hemû tijetiya Xwedêtiyê bi bedenî di şexsê Mesîh de ye. (Kolosî 2:9)

[Guhdarên hêja, di bernama ku bê de jî em bendewarê we ne.]

Di bernameyên din de me dît ku desthilatiya Îsa Mesîh di ser desthilatiya pêxemberan re bû. Îsa Mesîh bi xwe hêza Xwedê ya di şiklê mirov de bû. Loma wî bahoz rawestand, cin derxistin, nexweş qenc kirin, çavên koran vekirin û yên mirî jî rakirin.

Îro emê di Încîlê de berdewam bikin û emê bibihîzin ku Îsa Mesîh çawa xelk bi meseleyan hîn dikir. Îsa Mesîh gelek caran bi meseleyan li ser rastiya Xwedê got, çimkî gelek mirov hebûn ku guhê xwe nedidan peyva Xwedê. Ew bi tenê dihatin, da ku Îsa wan ji nexweşiyên wan sax bike, lê wan nedixwest ku ew dilê wan ji gunehan paqij bike. Serwerên dîn jî wek guran li pey Îsa diçûn; wan guhê xwe dida peyvên wî, lê armanca wan ew bû ku ji bo gilîkirinê fersendekê bibînin. Çaxê ku ew serwerên dîn, yanî Fêrisî û Şerîetzan nêzîkî Îsa dibûn, wî bi meseleyan ji xelkê re digot û dema ku ew bi şagirtên xwe ve bi serê xwe bû, wî ji wan re bi eşkereyî mana wan meseleyan şîrove dikir.

Bi rastî, Xwedê dixwaze ku her kes rastiya wî bizane û xilas bibe, lê eger dilê me hişk be, Xwedê rastiya xwe ji me re şîrove nake. Wek ku gelek mirov li zêr û zîv digerin, Xwedê dixwaze ku em ji dil û can li rastiyê bigerin. Kurê Dawid Silêman nivîsî û got:
Eger wek ku tu li zîv digerî û wek ku tu li defîneyan (xezîna veşartî) dikolî tu li şehrezayiyê bigerî, 5 hingê tê tirsa Xwedê fêm bikî û zanîna Xwedê bibînî.
(Gotinên Silêman 2:4.5)

Eger em mijarê bînin ser xwe, emê çi bêjin? Ma rastiya Xwedê di çavê we de ji zêr û zîv hêjatir e? Ma hûn bêtir ji peran, an ji peyvên Xwedê hez dikin? Ma Peyva Xwedê di dil û hişê we de cih girtiye?
Ma hûn dizanin ku rewşa dilê we çi ye? Gelo rewşa dilê we li ber Xwedê çawa ye? Eger hûn li ser van tiştan qenc nizanibin, ji kerema xwe guhê xwe bidin vê mesela Îsa Mesîh. Navê wê ev e: Mesela Erdê Qenc û Neqenc.

Di Mizgîniya Lûqa, deriyê 8'an de, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

4 Gava elaleteke mezin ji xelkê ji her bajarî li ba Îsa civiya, wî meselek ji wan re
got: 5 «Cotkar derket, da ku here tovê xwe biçîne. Çaxê wî tovê xwe direşand,
hinek ket tenişta rê. Xelkê pê lê kir û teyrên ezmanan ew xwarin.
6 Û hinek jê ket ser erdê kevirî û şîn bû, lê zû hişk bû, ji ber ku ew bê rewa bû.
7 Hinek ket nav stiriyan, stirî jî pê re şîn bûn û ew fetisandin.
8 Hin jî ket ser erdekî qenc, şîn bû û berê wî sed tovî bû.»
Piştî van gotinan Îsa bi dengekî bilind got: «Ewê ku guhên wî ji bo bihîstinê hene, bila bibihîze!»

9 Şagirtên wî jê pirsîn: «Ka mana vê meselê çi ye?» 10 Wî jî got:
11 «Mana vê meselê jî ev e: Tov peyva Xwedê ye.
12 Tovê ku ket tenişta rê ew in ku dibihîzin, lê Îblîs tê û wê ji dilê wan derdixe, da ku ew baweriyê neynin û xilas nebin.
13 Yên ser erdê kevirî ew in ku çaxê gotina Xwedê dibihîzin, wê bi dilxweşî qebûl dikin; lê ew bê ra ne, baweriya wan heta bi demekê ye û di wextê ceribandinê de ew ji rê derdikevin.
14 «Yên ku ketine nav stiriyan jî, ew in, yên ku dibihîzin û diçin, bi xem, dewlemendî û kêfên vê dinyayê difetisin û berê gihîştî nadin.
15 Lê yên di nav erdê qenc de ew in ku peyva Xwedê dibihîzin, bi dilekî pak û durust di dilê xwe de hiltînin û bi bîhna fireh ber didin.

Guhdarên hêja û bi rêz, ma we mana vê mesela tov û cotkar fêm kir?
Di vê meselê de tov heye û ax heye. Mana tov çi ye? Îsa Mesîh li ser tov çi got? Wî got: Tov wek Peyva Xwedê ya rast e. Û heçî ax e, wî got ku ax mînaka dilê mirov e.
Erê, Peyva Xwedê wek tovê qenc e, çimkî Peyva Xwedê wek tov sax e, yanî jîndar e û hêza wê heye ku jiyaneke nû û bereketeke rastîn bide dilê te. Lê carna dilê mirov wek erdê ziwa û kevirî ye.

Em dixwazin hinekî li ser vê yekê bifikirin. Di vê meseleyê de çiqas cûreyê axê an erdê hene? Me dît ku tov ket ser çar cûreyê erdê.

Ya yekê: Ji tov hinek ket ser rê an teniṣta rê. Ji xwe li wir erd hiṣk bû.

Ya diduyan: Ji tov hinek ket ser erdê kevirî, yanî gelek kevir an jî lat hebûn.

Ya sisiyan: Ji tov hinekî din ket nav stiriyan.

Ya çaran: Ji tov hinek jî ket ser erdê qenc.

Pêşî Îsa hînî xelkê kir ku dilê gelek mirovan wek erdê hişk ê teniṣta rê ye yê ku mirov di ser re derbas dibin.
Hin mirov hene ku dilê wan wek çîmento ye. De vêce eger tov bikeve ser rê, an ser çîmento, çi wê jê derkeve? Ma tov wê şîn bibe û ber bide? Nexêr! Ax tune ku tov dest pê bike, ra bavêje. Xelk pê lê dikin û teyar wî dixwin. Dilê gelek mirovan tam weha ye. Dilê wan hişk e û ew qet bala xwe nadin Peyva Xwedê û Nivîsarên Pêxemberan qet ne xema wan in. Loma ew bawer nakin ku Îsa Xilaskarê dinyayê ye. Ew bi tenê bi adetên bav û kalên xwe ve mijûl in an jî li gor fikrên xwe dikin. Ew tovê ku Peyva Xwedê ye, nikare di dilê wan de berê xwe bide, yanî nikare jiyana herheyî bide wan. Wek wî tovê ku ket ser rê ye, berê xwe nade û bêkêr e, Peyva Xwedê nikare di dilê mirovekî wusa de jiyana herheyî biafirîne.
Hingê Îsa li ser erdê kevirî got. Li wir axa qenc kêm bû. Erdê kevirî dimîne dilê mirovekî ku guhê xwe dide Peyva Xwedê û wê di cih de bi şahî qebûl dike, lê ew peyv di dilê wî de namîne, çimkî  Peyva Xwedê di dilê wî de bê ra dimîne. Mirovên weha dibêjin: Em bawer dikin!, lê belê di dema ceribandinê de an di tengahiyan de, ew zû ji Peyva Rastiyê vedigerin. Ew naxwazin di ber Peyva Xwedê de cefayê bikşînin.

Peyva Xwedê di dilê wan de bê ra dimîne, ji ber ku ew ji pesnê Xwedê bêtir ji pesnê mirovan hez dikin. Loma di çavê wan de Peyva Xwedê bêqîmet e û wek tovê ku ketibû ser rê, pûç û bêkêr e.

Piştre Îsa li ser erdê bi stiriyan got. Eger ax bi stiriyan tije be û tov bikeve nav wê, hingê çi wê jê derkeve? Ma tov wê berê xwe bide? Nexêr.
Bervajiyê vê, tov wê şîn bibe, lê wê ji aliyê stiriyan ve bê fetisandin.
Erdê bi stiriyan wek dilê wan mirovan e yên ku Peyva Xwedê dibihîzin,
lê xemên vê dinyayê û xapandina dewlemendî û timahiyê Peyva Xwedê difetisînin û berê gihîştî jê dernakeve.
Dilê gelek zarokên Adem wek erdê bi stiriyan e. Ew ji xwe re dibêjin:
«Erê, rojekê divê ku em li Nivîsarên Pêxemberan binêrim. Eger em vala bimînin, emê guhê xwe bidin Peyva Xwedê; îşallah emê rojekê vê yekê bikim!»

Guhdarên delal, bernama me ya îro li vir bi dawî dibe, lê di bernama ku bê de emê careke din li vê mesela girîng binêrin, da ku em fêm bikin ka mirov çawa dikare dilê xwe ji Peyva Xwedê re veke û wek mînaka axa qenc berê qenc bide.

Em bi şahî li benda we ne.
Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dest pê kir, li mesela Erdê Qenc û Neqenc nêrî.
Me dît ku dilê hin mirovan wek erdê li tenişta rê ye, an wek erdê kevirî ye, an jî wek erdê bi stiriyan e. Em dixwazin niha bi vê cûreyê erdê berdewam bikin.

Me bihîst ku stirî, xemên vê dinyayê û xapandina dewlemendî û timahiyê ne.
Ew mirovên weha bi xemên jiyana xwe mijûl dibin û Îblîs qenc dizane ku tu caran wextê wan tune ku guhê xwe bidin Peyva Xwedê. Û ji ber ku wextê wan tune, ewê tu caran sozên Xwedê fêm nakin.
Her roj derd û xemên vê dinyayê wê hiş û dilê wan mijûl bikin.
Divê ku ew abora xwe bikin, divê ku ew herin bazarê û bazirganiyê bikin, divê ku ew herin mektebê û bixwînin, divê ku ew razin û herin cihekî din.

Guhdarên delal, ma jiyana we ev e? Ma jiyana we ewqas bi xem û daxwaz û bi xeyalan tije ye ku êdî wextê we ji bo rastiya Xwedê nemaye?
Ma hûn ji dil û can li rastiya Xwedê digerin, an hûn di hemû dem û derfetên xwe de bi gelek hewcedariyên din ve mijûl dibin û ji bo wan xeman dixwin?
Ji kerema xwe bînin ber çavê xwe ku bi derbekê mirin wê bê ser we û we bibe wê dinyayê. Wê rojê hûnê bizanin ka rastî çi bû û derew çi bû.
Lê heyf û mixabin wê rojê ev zanîn wê ji bo we bêkêr be, çimkî divê ku rastî ne bi tenê bê zanîn, lê divê bê qebûlkirin jî.
Bi rastî, roja qebûlkirina rastiya Xwedê niha ye, çimkî tu nizanî tê kengê bimirî û heta kengê fersenda tobekirinê wê hebe. Nivîsarên Pîroz bi zelalî dibêjin, her kesê ku rastiya Xwedê hê ku ew sax be qebûl neke, wê here helaka herheyî.

Cûreyê çaran erdê qenc bû. Tovê ku ket ser erdê qenc ra avêt, şîn bû û berê xwe da. Ji tovek tenê, sed tovên din derketin û cotkar pê dilxweş û dilgeş bû.
Erdê qenc dilê wan mirovan in ên ku Peyva Xwedê dibihîzin û di dilekî pak û durust de hiltînin. Berê vî tovî wê rastdarî û jiyana herheyî be.

Peyva Xwedê jîndar e û her kesê ku vê peyvê bi nefsbiçûkî û bi dilekî pak qebûl bike, wê li ber Xwedê rast bê hesabkirin û wê jiyana herheyî bistîne.

Bi kurtî tiştê ku Îsa Mesîh di vê meselê de got, ev e. Peyva Xwedê wek tovekî qenc e û dilê me wek erdê hişk e. Eger erd hişk be, beriya ku tovê xwe bireşîne, divê ku cotkar çi bike? Erê, her cotkar dizane ku divê erd bê ajotin. Herweha divê dilê me jî bê amadekirin. Dilê ku li Xwedê xweş tê ew dil e yê ku Peyva Xwedê bi bawerî û bi nefsbiçûktî qebûl bike. Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin: Bila her mirov di bihîstinê de bi lez be, di peyivîn û hêrsbûnê de giran be ... her cûreyê pîsîtiyê û xerabiya ku pirr bûye ji ser xwe bavêjin. Bi nermî peyva ku di dilê we de hatiye çandin û dikare canê we xilas bike, qebûl bikin. (Aqûb 1:19.21)

Dostên delal, rewşa dilê we çi ye? Gelo ma dilê we nefsbiçûk e?
Ma hûn dixwazin tiştê ku Xwedê bi devê pêxemberên xwe di Nivîsarên Pîroz de gotiye, qebûl bikin? Ma Peyva Xwedê di dilê te de şîn dibe?
An dilê te wek erdê kevirî, an tije stirî ye û hişk e?
Peyva Xwedê tovekî qenc e, lê ew tenê ji bo wan ên ku wê qebûl dikin û bawer dikin, bibe serkaniya jiyan û bereketê.
Di dema ku ji me re maye de em dixwazin guhê xwe bidin meseleya Genim û Ziwanê. Di Încîlê de Îsa di Mizgîniya li gor Metta de weha dibêje:

24 Îsa meseleyeke din ji wan re got: «Padîşahiya Ezmanan dimîne vê yekê: Zilamekî tovê qenc li erdê xwe çand.
25 Lê çaxê ku her kes di xew de bû, dijminê wî hat, di nav genim de zîwan çand
û çû. 26 Çaxê ku genim gihîşt û ber da, hingê zîwan jî xuya bû.
27 Xulamên malxwê malê hatin û gotin: ‹Ezbenî, ma te tovê qenc di zeviya xwe de neçand? Îcar ev zîwan ji ku derê çêbû?›
28 Wî ji wan re got: ‹Dijminekî ev yek kiriye.›
Xulaman jî jê pirsî: ‹Tu dixwazî ku em herin û wan aşêf bikin?›

[29] Wî got: ‹Na, çimkî çaxê ku hûn aşêfa zîwanê bikin, dibe ku hûn genim jî pê
re hilkin. [30] Bihêlin, bila herdu bi hev re mezin bibin, heta dema dirûnê. Wî çaxî
ezê ji paleyan re bêjim: Pêşî zîwanê berhev bikin û ji bo şewitandinê bikin gurz,
piştre genim berhev bikin û bînin bixin embara min.›»

[36] Hingê Îsa elalet hişt û çû mal. Şagirtên wî hatin balê û jê re gotin: «Mana
mesela zîwana zeviyê ji me re bêje.»
[37] Wî bersîva wan da û got: «Yê ku tovê qenc diçîne Kurê Mirov e [yanî Îsa
Mesîh e].
[38] Zevî dinya ye û tovê qenc jî zarokên Padîşahiyê ne.
Zîwan zarokên Yê Xerab in [39] û dijminê ku ew çandiye jî Îblîs e.
Dirûn dawiya dinyayê ye û pale jî milyaket in.
[40] Îcar çawa ku zîwan tê berhevkirin û di nav êgir de tê şewitandin, di dawiya
dinyayê de jî wê wusa bibe. [41] Kurê Mirov wê milyaketên xwe bişîne û ewê her
tiştên ku mirov ji rê derdixin û yên ku neheqiyê dikin ji Padîşahiya wî bicivînin.
[42] Ewê wan bavêjin nav firna dadayî û li wir wê bibe girîn û qirçîna diranan.
[43] Hingê yên rast wê di Padîşahiya Bavê xwe de wek rojê şewq bidin.
Yê ku guhên wî hene bila bibihîze.

Di mesela genim û zîwanê de Îsa got ku dinya wek zeviyê ye.
Yê ku tovê qenc diçîne, Îsa Mesîh e.
Genimê zeviyê jî ew mirov in ên ku Mizgîniya Îsa Mesîh bi baweriyê qebûl kirine û bûne zarokên Xwedê.
Heçî dijmin e, ew Îblîs e. Ew di nav genim de zîwanê diçîne.
Zîwan jî ew mirov in ên ku Mizgîniya Mesîh qebûl nakin û ji Xwedê dûr ketine.
Dirûn Roja Dawî ye, yanî roja dîwanê ye.
Embara çotkar, Padîşahiya Xwedê ye û genimê berhevkirî ew mirov in ên ku heqê wan heye ku her û her li ba Xwedê bijîn.
Lê belê zîwana berhevkirî ew mirov in ên ku wê bên avêtin agirê herheyî.

Dostên delal, ma em li ser van tiştan çi bêjin?
Ma hûn wek genim in, an wek zîwanê ne? Li dilê xwe binêrin û xwe hêre bikin.
Em hemû dizanin ku Roja Dawî wê bê. Dadger li ber dêrî disekine.
Ma cesareta we heye ku hûn di Roja Dawî de rû bi rû li ber wî rawestin?
Eger hûn baweriya xwe bi Mizgîniya Mesîh bînin, qet ne lazim e ku hûn ji wê rojê bitirsin, çimkî ew Xilaskar e; yanî ew hat, da ku we ji agirê herheyî rizgar bike.
Îsa Mesîh li ser Roja Dawî weha got:

24 «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, yê ku guhê xwe dide gotinên min û ji wî yê ku ez şandime bawer dike, jiyana wî ya herheyî heye; ew nayê dîwankirin, lê ew ji mirinê gihîştiye jiyanê. (Yûhenna 5:24)

Dostên delal, gelek spas ku we qenc guhê xwe da van meseleyên Îsa Mesîh. Di bernama ku bê de emê bibînin ku Îsa çawa bi awayekî newaze bi pênc nanan û bi du masiyan 5000 mirov têr kirin.

Daxwaza me ew e ku Xwedê dilê we veke, da ku hûn gotinên Mesîh û rastiya Xwedê qenc fêm bikin. Mesîh got:

Yê ku guhên wî hene, bila bibihîze. (Metta 13:43)

Di bernama din de me dît ku Îsa Mesîh elalet hîn dikir. Wî hînkirina xwe bi meseleyan ji wan re şîrove dikir, lê belê piraniya mirovan mana kûr a van meseleyan fêm nedikir, çimkî dilê wan hişk bû. Wan rastiyên ezmanî girîng hesab nedikir û bêtir bi tişt û miştên vê dinyayê ve mijûl dibûn. Erê, gelek mirov li pey Îsa diçûn, lê sedem ne ew bû ku wan qebûl kiribû ku ew Xilaskarê gunehkaran e; ew bi tenê ji ber keramet û qenciyên wî li dor wî diciviyan.

Îro emê guhê xwe bidin çend gotinên Mesîh ên din. Herweha emê bibînin ku wî gotinên xwe bi nîşaneke newaze erê kirin. Dabaşa bernama me ya îro ev e: Nanê Jiyanê, yanî nanê ku jiyanê dide mirovan.

Emê niha di Încîlê de berdewam bikin û ji Mizgîniya li gor Marqos bixwînin. Di deriyê 6'an de Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

30 Şandî [yanî şagirtên Îsa] vegeriyan ba Îsa, her tiştê ku kiribûn û hîn kiribûn ji
wî re gotin. 31 Îsa ji wan re got: «Hûn bi serê xwe werin cihekî bêpêjin û piçekî
bîhna xwe vedin.»
Ji ber ên ku diçûn û dihatin pirr bûn, wan fersend nedidît ku xwarinê jî bixwin.
32 Îcar ew bi serê xwe ketin qeyikekê û çûn cihekî bêpêjin.
33 Lê gelek kesên ku çûna wan dîtin ew nas kirin. Ji hemû bajaran peya bi lez
ketin rê û beriya wan gihîştin wir.
34 Çaxê Îsa derket bejê, wî elaleteke mezin dît û dilê wî bi wan şewitî, çimkî
mîna miyên bê şivan bûn. Dest pê kir, gelek tişt hînî wan kir.

35 Êdî ji ber ku wext dereng bû, şagirtên Îsa hatin û jê re gotin: «Ev der cihekî
bêpêjin e, wext jî dereng e. 36 Bihêle ku ew herin gund û gundikên der û dorê û ji
xwe re tiştên xwarinê bikirrin.»

37 Îsa li wan vegerand û got: «Hûn xwarinê bidin wan!»
Şagirtan got: «Ma em herin bi du sed zîvî nên bikirrin û bi wan bidin xwarin?»
38 Îsa ji wan re got: «Herin binêrin, ka çend nanên we hene.»
Gava ku wan zanî, gotin: «Pênc nan û du masî hene.»
39 Wî emir li wan kir ku hemûyan kom bi kom li mêrgê bidin rûniştin. 40 Ew jî ji
komên ku ji sed kesî û pêncî kesî pêk hatibûn li erdê rûniştin.

41 Îsa her pênc nan û herdu masî hildan, li ezmên nêrî, şikir kir, nan şkandin û da
şagirtên xwe, da ku ew deynin ber elaletê. Û herdu masî jî li hemû elaletê leva
kir. 42 Hemûyan xwar û têr bûn. 43 Ji nan û masiyên ji ber wan mabûn diwanzdeh
selik tije parî dan hev. 44 Hijmara yên ku ji wî nanî xwarin pênc hezar mêr bû.

45 Gava ku Îsa elalet verêdikir, wî zû pêstûrî li şagirtên xwe kir ku ew li qeyikê
siwar bibin û ji beriya wî derbasî aliyê din ê golê, Beytsaydayê bibin. 46 Piştî
xatir ji wan xwest, ji bo ku dua bike, çû çiyê. 47 Dema ku bû êvar, qeyik di nava
golê de bû û Îsa jî bi serê xwe li perê avê bû. 48 Îsa dît ku şagirt di kişandina
bêrikan de gelek zehmet dikişînin, çimkî ba ji hember wan ve dihat. Nêzîkî
berbanga sibehê, Îsa li ser golê rêve çû û nêzîkî wan bû. Wî xwest ku di ber wan
re derbas bibe, 49 lê gava wan dît ku Îsa li ser golê rêve diçe, wan got qey
xeyaletekê dibînin û qîriyan. 50 Çimkî hemûyan jî ew dîtin û bizdiyan. Lê Îsa di
cih de bi wan re peyivî û got: «Bi zirav bin! Ez im. Netirsin!»
51 Hingê ew li ba wan, li qeyikê siwar bû û ba rawesta. Şagirt bi carekê şaş man,
52 çimkî wan ew bûyera li ser nên fêm nekiribû; hişê wan giran bûbû.
53 Gava ew derbasî aliyê din bûn, ketin bejê û hatin bajarê Cênîsartê û qeyik
girêdan.

22 Dotira rojê, elaleta ku li aliyê din ê golê mabû, fêm kirin ku şeva din ji
qeyikekê pê ve li wê derê nebû û Îsa bi şagirtên xwe ve li qeyikê siwar nebûbû,
lê şagirtên wî bi serê xwe çûbûn.

[23] Ji aliyê din ve, qeyikên ku ji Teberiyayê hatibûn, gihîştibûn nêzîkî wê dera ku
piştî şikirkirina Xudan, lê nan hatibû xwarin. [24] Gava elaletê dît ku ne Îsa û ne jî
şagirtên wî li wê derê ne, ew bi xwe li qeyikan siwar bûn û ji bo ku li Îsa bigerin
çûn Kefernahûmê.
[25] Gava ku wan Îsa li aliyê din ê golê dît, wan jê re got: «Mamoste, tu kengê hatî
vê derê?»
[26] Îsa bersîva wan da: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, ne ji ber ku we nîşan
dîtine, lê ji ber ku we ji nên xwar û hûn têr bûn, hûn li min digerin. [27] Ji bo
xwarina pûç nexebitin, lê ji bo xwarina ku ji bo jiyana herheyî dimîne bixebitin;
wê xwarinê Kurê Mirov wê bide we; çimkî Bav Xwedê mora xwe li wî xistiye.»

Em dixwazin hinekî li ser van peyvan bifikirin. Çima Îsa Mesîh ji elaletê re got: «Ji bo xwarina pûç nexebitin.»?

Ma mana vê yekê ev e ku ne lazim e mirov ji bo xwarina xwe bixebite? Nexêr, mana vê yekê ne ev e, çimkî Peyva Xwedê dibêje: «Eger yek nexwaze bixebite, bila xwarinê jî nexwe.» (Selanîkî II, 3:10)

Madem ku wusa ye, çima Îsa got: «Ji bo xwarina pûç nexebitin.»?

Mana van gotinên Îsa Mesîh ev e:  Eger hûn bi tenê ji bo têrkirina zikê xwe bixebitin û bi tenê li tiştên vê dinyayê bigerin, hûnê her tiştî winda bikin, çimkî hûnê bimirin û bedena we wê vegere axa erdê.

Lê belê di hundirê we de can heye û canê we wê an her û her di bihiştê de, yanî di rûmeta Xwedê ya li ezmên de be, an wê di dojehê de be. Loma Îsa Mesîh got: Ji bo xwarina pûç nexebitin, lê ji bo xwarina ku ji bo jiyana herheyî dimîne bixebitin!

Îsa bi van gotinan elalet hişyar kir, da ku ew ne tenê li xwarina pûç a vê dinyayê bigerin, lê belê bixebitin ku Peyva Xwedê ya ku tu caran derbas nabe, bibihîzin û fêm bikin.

Çimkî ‹Mirov ne bi nên tenê dijî, lê bi her peyva ku ji devê Xwedê derdikeve dijî.› (Metta 4:4)

Mana gotina Mesîh ev e.

Heyf û mixabin gelek mirovên ku li pey Îsa diçûn û li dor wî diciviyan, Peyva Xwedê diavêtin pişt guhê xwe û baweriya xwe bi Xilaskarê ku Xwedê şandibû, nedianîn. Xema wan têrkirina zikê wan bû û wan nedixwest ku dilê wan bi rastiya Xwedê têr bibe. Wan fêm nedikir ku rastiya Xwedê dikare wan ji dîwana Roja Dawî xilas bike. Loma Îsa Mesîh ji wan re got:

[27] Ji bo xwarina pûç nexebitin, lê ji bo xwarina ku ji bo jiyana herheyî dimîne bixebitin; … [28] Û wan jê pirsî: «Divê em çi bikin, ji bo ku em karên Xwedê bikin?» [29] Îsa bersîva wan da: «Karê Xwedê ev e ku hûn baweriyê bi wî kesê ku wî şandiye bînin.»

Guhdarên delal, divê ku em li vir bernama xwe bi dawî bikin. Gelek spas ku ew guhê xwe da van gotinên Mesîh.

Heta bernama ku bê, careke din qenc li ser van gotinên Mesîh bifikirin. Wî got:

«Karê Xwedê ev e ku hûn baweriyê bi wî kesê ku wî şandiye bînin.»

Daxwaza me ew e ku destê Xwedê yê hêzdar her gav we biparêze.

Di bernama din de me bihîst ku Îsa çawa bi pênc nan û du masiyan elaleteke mezin têr kir. Lê belê wan mana vê kerametê fêm nekir û wan fêm nekir ku Îsa çima hatiye vê dinyayê.

Loma Îsa Mesîh ji wan re got:

27 Ji bo xwarina pûç nexebitin, lê ji bo xwarina ku ji bo jiyana herheyî dimîne bixebitin; …

28 Û wan jê pirsî: «Divê em çi bikin, ji bo ku em karên Xwedê bikin?»

29 Îsa bersîva wan da: «Karê Xwedê ev e ku hûn baweriyê bi wî kesê ku wî şandiye bînin.»

Divê ku em piçekê li ser vê yekê bifikirin:

Erê, divê ku em çi bikin ku em li Xwedê xweş bên?

Ma zarokekî Adem ê ku hevênê guneh di dilê wî de ye, çawa dikare li Xwedê xweş bê? Ma em dikarin bi xêr û kirinên xwe yên qenc Xwedê razî bikin?

Ma em dikarin riyekê bibînin ku em xwe bi xwe ji hêza Îblîs û ji guneh û ji dojehê xilas bikin?

Ma em dikarin ji xwe re dilekî nû û bêkêmahî, yanî dilekî li gor daxwaza Xwedê peyda bikin? Na, em tu caran nikarin van tiştan bikin.

Gotina pêşiyan rast dibêje: Çêleka sor nikare rengê xwe biguhere.

Madem ku wusa ye, zarokekî Adem çawa dikare bi dilê Xwedê be?

Îsa Mesîh li ser vê yekê çi got? Wî got:

«Karê Xwedê ev e ku hûn baweriyê bi wî kesê ku wî şandiye bînin.»

Heta ku mirovek baweriya xwe bi Xilaskarê pîroz ê ku Xwedê şandiye, neyîne, ew tu caran li Xwedê xweş nayê.

Heyf û mixabin, di dema Îsa Mesîh de gelekan ji wan mirovan ew Xilaskarê xwe qebûl nekir û bawer nekirin ku ew ji aliyê Xwedê ve hatiye şandin.

Loma wan jê re got:
30 «Îcar tê çi nîşanê çêkî, da ku em bibînin û ji te bawer bikin? Tê çi karî bikî? 31
Bav û kalên me li çolê Manna xwarin. Çawa ku hatiye nivîsîn: ‹Wî ji bo xwarina
wan, ji ezmên nan da.›»
32 Îsa ji wan re got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, ew ne Mûsa bû ku ji
ezmên nan da we, lê Bavê min e ku nanê rastîn ji ezmên dide we.
33 Çimkî nanê Xwedê ew e ku ji ezmên tê xwar û jiyanê dide dinyayê.»
34 Wan jê re got: «Ezbenî, hergav vî nanî bide me.»
35 Îsa ji wan re got: «Nanê jiyanê ez im. Yê ku bê ba min, qet birçî nabe û yê ku
baweriyê bi min bîne, tu caran tî nabe.

Îsa bi van gotinan ev rastiya Xwedê anî ber çavên wan: Wek ku Xwedê çil salan ji ezmên xwarin da gelê Îsraêl, da ku ew di çolê de nemirin, wusa jî Xwedê ji hemû mirovan re nanê jiyana herheyî şandiye, da ku em di nav gunehên xwe de helak nebin.

Ew nan li ku derê ye? Ma nan heye ku em jê bixwin û hingê her û her di rûmeta Xwedê de bijîn? Na, nanekî weha tune. Lê belê ew nanê ku jiyana herheyî dide, çi ye? Îsa Mesîh çi got?
Wî got: 35 «Nanê jiyanê ez im. Yê ku bê ba min, qet birçî nabe û yê ku baweriyê
bi min bîne, tu caran tî nabe. 36 Lê wek ku min ji we re got, we ez dîtim, lê hê
hûn bawer nakin. 37 Hemû yên ku Bav dide min, wê bên ba min û yê ku bê ba
min, ez wî qet nazivirînim. …
40 Erê, daxwaza Bavê min ev e, ku her kesê Kur bibîne û baweriyê bi wî bîne,
jiyana wî ya herheyî hebe. Û di Roja Dawî de ezê wî rakim.»

41 Îcar Cihûyan li pey wî kirin pitepit, çimkî wî got: «Nanê ku ji ezmên hatiye
xwar ez im.» 42 Wan got: «Ma ev ne Îsayê kurê Ûsiv e ku em diya wî û bavê wî
nas dikin? Ma çawa dibe ku ew niha dibêje: ‹Ez ji ezmên hatime xwar›?»

43 Îsa bersîv da û ji wan re got: «Di nav xwe de nekin pitepit.
44 Tu kes nikare bê ba min, heta Bavê ku ez şandime wî ber bi min ve nekişîne.
Û di Roja Dawî de ezê wî rakim. 45 Di nivîsarên pêxemberan de hatiye nivîsîn:
‹Hemû wê ji aliyê Xwedê ve hînkirî bin.› Her kesê ku ji Bav dibihîze û hîn dibe,
tê ba min.
46 Ev nayê wê manê ku kesekî Bav dîtiye. Bi tenê yê ku ji Xwedê ye, wî Bav
dîtiye. 47 Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, yê ku baweriyê tîne jiyana wî ya
herheyî heye. 48 Nanê jiyanê ez im.
49 Bav û kalên we li çolê Manna xwarin, lê ew mirin. 50 Ew nanê ku ji ezmên
hatiye xwar, da her kesê ku jê bixwe nemire, ev e. 51 Ew nanê jîndar ê ku ji
ezmên hatiye xwar ez im. Eger yek ji vî nanî bixwe, wê her û her bijî û nanê ku
ezê ji bo jiyana dinyayê bidim, bedena min e.»

60 Gelek ji şagirtên wî, dema ku ev peyv bihîstin, gotin: «Ev peyv gelek dijwar
e! Kî dikare guh bide wê?»
61 Lê Îsa dizanibû ku şagirt li ser vê yekê pitepitê dikin, wî ji wan re got:
«Ma dilê we bi vê yekê dimîne? 62 Nexwe eger hûn bibînin ku Kurê Mirov
derdikeve cihê ku berê lê bû, wê çawa be...?
63 Yê ku jiyanê dide Ruh e; beden qet bi kêrî tiştekî nayê. Peyvên ku min ji we
re gotine, ruh û jiyan in. 64 Lê yên ku di nav we de baweriyê naynin hene.»
Çimkî Îsa ji destpêkê ve dizanibû ku kê bawerî neaniye û kî wê wî bide dest» …

66 Ji ber vê yekê, ji şagirtên wî gelek kes zivirîn û êdî bi wî re nedigeriyan. 67
Îcar Îsa ji diwanzdehan pirsî: «Ma hûn jî dixwazin ku herin?»

68 Şimûn-Petrûs bersîva wî da: «Ya Xudan, emê herin ba kê? Gotinên jiyana
herheyî bi te re ne. 69 Û me jî bawerî aniye û em dizanin ku Pîrozê Xwedê tu yî.»

Erê, gelek şagirtan dev ji Îsa berda û êdî li pey wî neçûn, çimkî hînkirina wî ne bi dilê wan bû û ji bo fêmkirina wan zehmet bû.
Lê belê ew ên din ji Îsa dûr neketin, çimkî wan dizanibû ku Îsa, Mesîhê Xwedê ye, yanî Pîrozê Xwedê û Nanê Jiyanê ye, yanî nanê ku jiyana herheyî dide mirovan e.

Rast e, bêguman weha ye. Çaxê ku tu fêm bikî ku Îsa kî ye û ji bo te çi kiriye, êdî yekî din yanî mîrzayekî din nikare dilê te şa bike. Çimkî ji bilî Îsa Mesîh, tu serkaniya jiyana herheyî tune. Yê ku dilê mirov têr bike, bi tenê ew e.
Yekî din nikare ewledariya xilasbûnê bide min û te.
Eger tu birçiyê xilasiyê bî, yekî din nikare te têr bike.
Yê ku têkiliya kûr a di nav te û Xwedê de peyda bike, bi tenê ew e, yanî Îsa Mesîh e.

De vêca, em li ser xwe bi xwe çi difikirin? Ma tu tî û birçiyê jiyana herheyî yî? Ma tu bêriya Xwedê û jiyana herheyî dikî? Ma tu li ewledariyê digerî?
Eger wusa be, li ser van gotinên Îsa Mesîh bifikire. Wî got:
«Werin ba min, ey hemû yên westayî û bargiran, ezê rihetiyê bidim we…
«Nanê jiyanê ez im. Yê ku bê ba min, qet birçî nabe û yê ku baweriyê bi min bîne, tu caran tî nabe. (Metta 11:28; Yûhenna 6:35)
Amîn.

Dostên delal, em gelek spas dikin ku we qenc guhê xwe dayê. Cara ku bê emê bibînin ku di nav xelkê de ji ber Îsa çawa devjenî derket.

Heta hingê li ser van gotinên Îsa Mesîh bifikirin ên ku dibêjin:

«Nanê jiyanê ez im. Yê ku bê ba min, qet birçî nabe û yê ku baweriyê bi min bîne, tu caran tî nabe. (Yûhenna 6:35)

[Destê Xwedê li ser we be!]

Di bernama xwe ya din de, me dît ku Îsa Mesîh bi pênc nan û du masiyan ji pênc hezar mirovan bêtir xelk têr kirin.
Dotira rojê elaleteke mezin li dor Îsa civiya, lê Îsa bi dilê wan dizanî û ji wan re got:
«Jji ber ku we ji nên xwar û hûn têr bûn, hûn li min digerin. [27] Ji bo xwarina pûç nexebitin, lê ji bo xwarina ku ji bo jiyana herheyî dimîne bixebitin. …
«Nanê jiyanê ez im. Yê ku bê ba min, qet birçî nabe û yê ku baweriyê bi min bîne, tu caran tî nabe. » (Yûhenna 6:26.27.35)

Lê heyf û mixabin hingê gelek mirov ji pey Îsa vegeriyan û êdî li pey wî neçûn, çimkî wan, xwarina ji bo bedenê ji xwarina ku ji bo canê wan bû girîngtir hesab kir. Lê belê hin mirovên din jî hebûn: Wan berdewam kir, li pey Îsa çûn, çimkî wan ji dil û can bawer kir ku Îsa, Mesîhê Xwedê yê pîroz e û serkaniya jiyana herheyî ye.

Îro dîsa em dixwazin bi xwendina Încîlê berdewam bikin û emê bibînin ku Şerîetzanan çawa li hember Îsa rabûn û çawa di nav serwerên dîn de li ser Îsa dubendî û devjenî derket.
Beriya ku em dest bi xwendinê bikin, girîng e ku em vê yekê bînin bîra xwe:
Pisporên dîn û diyanetê, yanî Şerîetzanan û gelek Cihûyan jî li gor adetên bav û kalan dikirin. Mesele, çaxê ku ew ji bazarê vedigeriyan mal, bêyî ku destên xwe bi awayekî taybetî bişon, wan tiştek nedixwar.
Gelek adetên din jî hebûn, mesele diviya kas an senî an cer li gor adetan bihatan şuştin, da ku bikariyan helal bihatan hesabkirin.
Niha ji kerema xwe guhên xwe bidin van gotinên ji Mizgîniya li gor Metta. Di deriyê 15'an de weha nivîsandî ye:

[1] Hingê ji Orşelîmê hinek Fêrisî û Şerîetzan hatin ba Îsa û jê pirsîn:

[2] «Ma çima şagirtên te adetên bav û kalan dişkênin? Beriya xwarinê ew destên
xwe naşon!»
[3] Îsa li wan vegerand û got: «Îcar hûn jî çima ji bo adetên xwe emrê Xwedê
dişkênin? [4] Çimkî Xwedê gotiye: ‹Qedrê dê û bavê xwe bigire›  û ‹Yê ku tiştê
xerab ji dê û bavê xwe re bêje, divê bê kuştin.›  [5] Lê hûn dibêjin: ‹Eger yek ji dê
an jî ji bavê xwe re bêje: Ew alîkariya ku wê ji min bigihîşta te, ji Xwedê re
hatiye dayîn, [6] êdî ew ne mecbûr e ku qedrê bavê xwe bigire.› Bi vî awayî we ji
bo adetên xwe peyva Xwedê rakiriye. [7] Hey durûno! Îşaya li ser we rast
pêxemberîtî kiriye:
[8] ‹Ev gel bi devê xwe rûmetê dide min, lê dilê wan ji min dûr e.
[9] Bi pûçîtî diperizin min; di hîndariya xwe de, ew emrên mirovan hîn dikin.›»

Gelo we dît ku Îsa çawa durûtiya Fêrisî û Şerîetzanan li ber hemûyan derxist meydanê? Serwerên dîndar dixebitîn ku di çavê mirovan de rastdar bên hesabkirin, lê Îsa Mesîh dizanî ku di dilê wan de çi heye.

Dest û lingên wan û rûyê wan paqji bibûna jî, dîsa dilê wan murdar û bi guneh tije bû. Di çavê Xwedê de dilê paqij ji destên paqji girîngtir e!

Xweşuştin û destnimêj dilê we paqij nakin!

Mesele em bêjin beroşa mirovekî hebe û hindurê wê qirêjî be. Eger ew derveyê beroşê paqij bike jî, çi feyde heye? Tu dikarî bi saetan derveyê wê paqij bikî, lê belê beroş dîsa qirêjî dimîne, çimkî hundirê wê ne paqij e.

Bi vî awayî jî adetên dîn û diyanetan nikarin guneh ji dilê mirovan derxin û nikarin mirovan paqji bikin. Loma Îsa ji wan re got:

[7] Hey durûno! Îşaya li ser we rast pêxemberîtî kiriye:
[8] ‹Ev gel bi devê xwe rûmetê dide min, lê dilê wan ji min dûr e.
[9] Bi pûçîtî diperizin min; di hîndariya xwe de, emrên mirovan hîn dikin.›»

[10] Îsa elalet gazî ba xwe kir û ji wan re got: «Guh bidinê û fêm bikin. [11] Tiştê ku
di dev re diçe hundirê mirov, wî murdar nake, lê tiştê ji dev dertê, ew mirov
murdar dike.»
[12] Hingê şagirt nêzîkî wî bûn û jê pirsîn: «Ma tu dizanî gava ku Fêrisiyan ev
bihîst, enirîn?»
[13] Îsa li wan vegerand: «Her şitilê ku Bavê min ê li ezmanan neçandiye, ewê ji ra
ve bê rakirin. [14] Dev ji wan berdin! Ew kor in, rêberên koran in. Eger kor
rêberiya yê kor bike, herdu jî wê bikevin çalê.»

[15] Hingê Petrûs jê re got: «Mana vê meselê ji me re bêje.» [16] Îsa ji wan re got:
«Ma hûn jî hê fêmkor in? [17] Ma hûn fêm nakin her tiştê ku dikeve dev, diçe zik û
ji wê derê dertê derve? [18] Lê tiştên ku ji dev derdikevin, ji dil tên û ew mirov
murdar dikin. [19] Çimkî fikrên xerab, kuştin, zîna, fuhûşî, dizî, şahidiya derewîn û
çêr ji dil dertên. [20] Tiştên ku mirov murdar dikin ev in, lê xwarina bi destê
neşuştî mirov murdar nake.»

[29] Îsa ji wê derê derket û hat ber Gola Celîlê. Ew hilkişiya çiyayekî û li wir
rûniştî. [30] Elaleteke mezin hat ba wî. Bi xwe re şil û şeht, kor, seqet, kerr û lal û
gelek nexweşên din anîn û ew li ber lingên wî dirêj kirin û wî ew qenc kirin. [31]
Gava ku elaletê dît lal dipeyivin, seqet sax dibin, şil û şeht rêve diçin û kor
dibînin, şaş man û pesnê Xwedayê Îsraêl dan.

[1] Hingê Fêrisî û Sadûqî hatin ba Îsa û ji bo ku wî biceribînin, jê xwestin ku ji
ezmên nîşanekê raberî wan bike.
[2] Wî li wan vegerand û got: «Gava ku dibe êvar, hûn dibêjin ‹Hewa wê xweş be,
çimkî ezman sor e!› [3] Îcar serê sibê hûn dibêjin: ‹Îro hewa wê nexweş be,
çimkî ezman sor e û ewr belek in.› Hûn li ezmên dinêrin û dizanin ku hewa wê
çawa be; ma hûn nîşanên deman fêm nakin?

[4] Nifşê xerab û zînakar li nîşanekê digere, lê ji nîşana Ûnis pêxember pê ve,
nîşanek jê re nayê dayîn.
[40] Çawa ku ‹Ûnis sê roj û sê şevan di zikê masiyê mezin de ma›, wusa jî Kurê
Mirov wê sê roj û sê şevan di dilê erdê de bimîne. [41] Di Roja Dawî de xelkê
Nînewê wê bi vî nifşî re rabe û wî sûcdar derxe. Çimkî wan bi danezana Ûnis
tobe kir û va ye, yekî ji Ûnis meztir li vir e.

Îsa bi vê yekê ji pêşî ve li ser rastiyeke newaze got; wî got:

«Wek ku Ûnis pêxember sê rojan di zikê masiyekî mezin de ma, Mesîh wê sê rojan di gorê de bimîne.»

Û wek ku Ûnis piştî sê rojan ji zikê masî derket, weha jî Mesîh wê di roja sisiyan de ji nav miriyan rabe. Bi vê yekê her kesî wê bi zelalî bidîta ku Mesîhê ku ji Xwedê hatiye, ku mirovan ji hêza guneh, ji hêza mirinê û ji hêza dojehê rizgar bike, ew bi xwe ye.

Guhdarên delal, bernama me ya îro li vir bi dawî dibe.

Cara ku bê emê hê bêtir bibînin ku çawa di nav serwerên dîn de li ser Îsa dubendî û devjenî derket.

Heta hingê careke din qenc li ser van gotinên Îsa Mesîh bifikirin ên ku dibêjin:

Eger kor rêberiya yê kor bike, herdu jî wê bikevin çalê.

û:

Yekî ji Ûnis meztir li vir e.

Îro jî em dixwazin di Încîlê de berdewam bikin û bibînin ku pisporên dîn û
diyanetê qet dev ji nebaweriyê bernedan. Nivîsarên Pîroz di Mizgîniya li gor
Yûhenna de weha dibêjin:
1 Piştî vê yekê Îsa li Celîlê digeriya. Wî nedixwest ku di Cihûstanê de bigere,
çimkî serekên Cihûyan li kuştina wî digeriyan. 2 Gava Cejna Holikçêkirinê ya
Cihûyan nêzîk bû, 3 birayên wî jê re gotin: «Ji vir derkeve û here Cihûstanê,
da ku şagirtên te karên ku tu dikî bibînin. 4 Çimkî mirovê ku dixwaze bi eşkereyî
xwe bide naskirin, kirinên xwe venaşêre.» 5 Çimkî birayên wî jî bawerî pê
nedianîn.
6 Îsa ji wan re got: «Wextê min hê nehatiye, lê ji bo we wext herdem rast e. 7
Dinya nikare ji we nefret bike, lê ji min nefret dike, çimkî ez şahidiyê dikim ku
kirinên dinyayê xerab in. 8 Hûn bi xwe herin vê cejnê, lê ez nayêmê. Çimkî hê
wextê min bi tevahî nehatiye.» 9 Ew weha peyivî û li Celîlê ma.
10 Lê piştî ku birayên wî çûn cejnê, ew jî rabû çû, lê belê ne bi eşkereyî, ji dizî
ve. 11 Di vê navê de Cihû di cejnê de lê digeriyan û digotin: «Ew li ku derê ye?»
12 Di nav elaletê de li ser wî gelek tişt dihatin gotin. Hinekan digot: «Ew
mirovekî qenc e», hinekan jî digot: «Na, ew xelkê dixapîne.»
13 Lê ji tirsa serekên Cihûyan, kesî nediwêrî bi eşkereyî li ser wî bipeyiviya.

14 Di nîvê cejnê de Îsa derket Perestgehê û dest bi hînkirinê kir.
15 Cihû lê şaş mabûn û digotin: «Ev mirovê ku li ser nivîsaran nehatiye hînkirin,
çawa evqas bi wan dizane?»
16 Îsa bersîva wan da û got: «Hînkirina min ne ji min, lê ji yê ku ez şandime tê. 17
Eger mirovek bixwaze ku daxwaza Xwedê bike, wê bizane ka hînkirina min ji
Xwedê ye, an ez ji ber xwe dibêjim. … 19 Ma Mûsa Şerîet neda we? Dîsa jî kes
ji we Şerîetê pêk nayne. Çima hûn li kuştina min digerin?»

20 Elaletê bersîva wî da: «Tu bi cinan ketiyî! Kî li kuştina te digere?»

21 Îsa li wan vegerand û got: «Min karekî nedîtî kir, hûn hemû lê şaş man. 22
Mûsa sinet da we û hûn roja Şemiyê mirovekî sinet dikin. 23 Madem ji bo ku
Şerîeta Mûsa xera nebe, hûn roja Şemiyê mirov sinet dikin, ji bo ku min di roja
Şemiyê de mirovek yekser sax kiriye, hûn çima li min hêrs dibin? 24 Li gor
dîtinê dadbar nekin, lê li gor rastiyê dadbar bikin.» …
30 Li ser vê yekê ew xebitîn ku Îsa bigirin, lê kesî dest neavêt wî, çimkî hê saeta
wî nehatibû.
31 Lê gelekan ji elaletê bawerî bi wî anî û gotin: «Ma gava ku Mesîh bê, wê ji
kirinên vî bêtir nîşanan çêke?»

32 Fêrisiyan tiştên ku elaletê li ser Îsa dikirin pisepis bihîst. Li ser vê yekê Fêrisî
û serekên kahînan ji bo girtina wî parêzger şandin.

37 Di roja dawîn û herî girîng a cejnê de Îsa ji piyan rawesta û bi dengekî bilind
got: «Eger yek tî be, bila bê ba min û vexwe. 38 Yê ku baweriyê bi min bîne, wek
ku di Nivîsara Pîroz de hatiye gotin: ‹Wê ji dilê wî çemên ava ku jiyanê didin
biherikin.›» 39 Îsa ev peyv li ser wî Ruhê Pîroz got, yê ku wan ên bawerî bi wî
dianîn wê bistandana. Çimkî Ruh hê nehatibû dayîn, ji ber ku hê Îsa nehatibû
birûmetkirin.

40 Dema ku wan ev gotin bihîstin, hinekan ji elaletê got: «Bi rastî jî ev ew
pêxember e.»
41 Hinekan jî got: «Ev Mesîh e», lê hinekên din jî gotin: «Ma Mesîh wê ji Celîlê
bê? 42 Ma Nivîsara Pîroz nabêje ku Mesîh wê ji dûndana Dawid û ji gundê
Dawid, ji Beytlehmê bê?» 43 Loma di nav elaletê de, li ser wî dubendî çêbû. 44
Hinekan ji wan xwest wî bigirin, lê tu kesî dest neavêt wî.

45 Di vê navê de parêzger vegeriyan ba Fêrisî û serekên kahînan. Wan ji
parêzgeran pirsî: «We çima ew neanî?»
46 Wan got: «Tu mirov, tu caran mîna vî mirovî nepeyiviye!»

47 Fêrisiyan got: «Nexwe, hûn jî hatin xapandin? 48 Ma ji serekan û ji Fêrisiyan
kesekî bawerî bi wî aniye? 49 Na, lê ev elaleta ku bi Şerîetê nizane, xezeblêbûyî
ye.»
50 Nîkodêmos, yê ku berê çûbû ba Îsa û ji Fêrisiyan bû, ji wan re got:
51 «Gelo Şerîeta me, heta ku guhdariya mirovekî neke û nezane ku ew çi dike,
ma wî dadbar dike?» 52 Wan jê re got: «Nexwe tu jî ji Celîlê yî? Lê bikole, tê
bibînî ku ji Celîlê tu pêxember dernakevin.» 53 Û her kes çû mala xwe,

Dostên delal, me dît ku kahîn, Şerîetzan û Fêrisî li hember Îsa rabûn.
Wan dixwest ku wî bigirin û bidin kuştin, lê tiştek ji destê wan nedihat, çimkî dema Mesîh ya kifşkirî hê nehatibû.
Li gor plana Xwedê, Îsa Mesîh wê bihata kuştin, da ku ji bo gunehên mirovan bibûya gorî, lê ev yek wê ne li gor dem û plana mirovan çêbûya, lê wê li gor daxwaza Xwedê çêbûya.
Heyf û mixabin, dilê piraniya serwerên Cihûyan ên dîn û diyanetê hişk bû.
Wan Îsa kêm didît û digotin ku her kesê ku Îsa, Mesîhê Xwedê qebûl bike, bila ji kinîştan bê avêtin.
Loma li ser Îsa di nav Cihûyan de devjenî derket. Êdî mirovan nediwêrî ku bi eşkereyî li ser Îsa tiştekî bêjin, çimkî ew ji kahîn û Şerîetzanan ditirsiyan.
Bi dizî û bêyî ku yên din bibihîzin, wan ji hev re digot: «Îsa mirovekî qenc e.»
Yên din digotin: «Nexêr, ew mirovan dixapîne!»
Û gelek şaş man, digotin: «Ma gava ku Mesîh bê, wê ji kirinên vî mirovî bêtir nîşanan çêke?»

Dostên delal, hûn li ser Îsa çi dibêjin? Di gumana we de Îsa kî ye?
Ma hûn bawer dikin, Mesîhê ku hemû pêxemberan li ser nivîsandiye, Îsa ye?
An hûn dibêjin, Îsa bi tenê pêxemberekî wek hemûyên din bû?
Bila tu kes we di vê pirsê de nexapîne! Rewşa te ya di dinya din de bi vê pirsê ve û bi bersiva te ve girêdayî ye!

Ma tu dizanî Îsa Mesîh kî ye û ew çima hatiye vê dinyayê? Guhê xwe bidin van gotinên Îsa. Wî li ser xwe weha got:
«Rê, rastî û jiyan ez im. Heta ku ne bi destê min be, tu kes nayê ba Bav [Xwedê]. Ez ji bo vê yekê ji dayik bûme û ji bo vê yekê hatime dinyayê, da ku ez ji rastiyê re şahidiyê bikim. Her kesê ku ji aliyê rastiyê be, guhê xwe dide dengê min.»

Dostên delal, hûn ji aliyê kê ne?
Gelo hûn amade ne ku hûn xwe bi rastiyê bigirin?
Belkî xelkê mala we biryara we qebûl nake, lê Îsa Mesîh li ser vê yekê weha got: [37] «Yê ku dê an bavê xwe ji min bêtir hez dike, ne hêjayî min e. (Metta 10:34-37)

Erê, Îsa Mesîh aştî û hezkirin anî nav mirovan, lê li vir mana gotina wî ev e:
Ew dibêje: Ji bo vê yeka ku maliyên we li hember we rabin, dev ji baweriya xwe bernedin û ji pêşî ve ji bo vê yekê amade bin.

Gelek spas ku we guhê xwe da vê bernamê. Xwedê hez bike cara ku bê emê bibînin ku Îsa çawa zilamekî ku ji zimakî ve kor bû, qenc kir.

Heta hingê bila ev gotinên Îsa Mesîh di bîra we de bin. Wî got:
Her kesê ku ji aliyê rastiyê be, guhê xwe dide dengê min.» (Yûhenna 18:37)

Me di bernama din de dît ku kahîn, Şerîetzan û Fêrisiyan Îsa ceriband û dixwestin ku wî bigirin û bikujin. Lê belê tu kesî nikaribû destê xwe dirêjî Îsa bikira, çimkî wextê ku Xwedê kifşkiribû ku ew ji bo gunehên mirovan bibe gorî, hê nehatibû.

Niha dîsa emê di Încîlê de berdewam bikin û emê bibihîzin ku Îsa çawa bersiva wan ên ku li hember wî derketin da û ew tekdîr kirin, yanî li wan hilat. Herweha emê bibînin ku Îsa çawa mirovekî ku ji zikmakî ve kor bû, qenc kir. Mijara bernama me ya îro Ronahiya Dinyayê ye.

Di Mizgîniya li gor Yûhenna de, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

2 Serê sibê zû ew dîsa vegeriya Perestgehê, xelk hemû hat ba wî.
Ew rûnişt û wî dest pê kir û ew hîn kirin.
12 Îsa bi wan re peyivî û got: «Ez ronahiya dinyayê me; yê ku li pey min bê, tu caran di tariyê de rêve naçe, lê wê bibe xweyî ronahiya jiyanê.»
13 Fêrisiyan lê vegerand û gotin: «Tu, şahidiya xwe dikî; şahidiya te ne rast e.» 14
Îsa bersîv da û ji wan re got: «Eger ez bi xwe şahidiya xwe bikim jî, şahidiya min rast e; çimkî ez dizanim ku ez ji ku derê hatim û diçim ku derê.
Lê hûn nizanin ku ez ji ku derê têm an diçim ku derê…
Hûn ji jêr in, ez ji jor im; hûn ji vê dinyayê ne, lê ez ne ji vê dinyayê me.
24 Loma min ji we re got ku hûnê di nav gunehên xwe de bimirin.
Eger hûn bawer nekin ku Ez Ew im, hûnê di nav gunehên xwe de bimirin.»
25 Îcar wan jê pirsî: «Tu kî yî?»
Îsa ji wan re got: «Ez tam ew im, yê ku min ji destpêkê ve ji we re gotiye. …
Çaxê hûn Kurê Mirov rakin jorê, hingê hûnê bizanin ku Ez Ew im û min qet tu tişt ji ber xwe nekiriye; lê ev tiştên ha wek ku Bav hînî min kirine ez dibêjim. 32
Hingê hûnê rastiyê bizanin û rastî wê we azad bike.»

33 Wan bersîva wî da: «Em ji dûndana Birahîm in û tu caran em neketine bin
nîrê tu kesî. Çawa tu dibêjî: ‹Hûnê azad bibin›?»
34 Îsa li wan vegerand û got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, her kesê ku
gunehan dike, ew xulamê guneh e. 35 Xulam her û her di malê de namîne,
lê kur her û her dimîne. 36 Loma, eger Kur we azad bike, bi rastî hûnê azad
bibin.
37 Ez dizanim ku hûn ji dûndana Birahîm in, lê dîsa jî hûn li kuştina min digerin.
Çimkî hûn di dilê xwe de cih nadin peyva min. 38 Ez ji tiştên ku min li ba Bavê
xwe dîtine dipeyivim û hûn jî tiştên ku we ji bavê xwe bihîstine dikin.»
39 Wan bersîva Îsa da û jê re got: «Bavê me Birahîm e.»
Îsa ji wan re got: «Eger hûn zarokên Birahîm bûna, weyê kirinên Birahîm
bikirana. 40 Lê niha hûn li kuştina min - li kuştina wî mirovê rastiya ku ji Xwedê
bihîstî ji we re gotiye - digerin. Birahîm ev yek nekir. 41 Hûn karên bavê xwe
dikin.»
Wan ji wî re got: «Em ji zînayê çênebûne! Bavekî me heye, ew jî Xwedê ye.» 42
Îsa ji wan re got: «Eger Xwedê Bavê we bûya, weyê ji min hez bikira, çimkî ez
ji ba Xwedê hatime û niha ez li vir im. Ez ji ber xwe nehatime, lê wî ez şandime.
43 Çima hûn tiştên ku ez dibêjim fêm nakin? Ji ber ku hûn peyva min ranagirin.
44 Hûn ji bavê xwe Îblîs in û hûn dixwazin xwestekên bavê xwe bînin cih.
Ew ji destpêkê ve mêrkuj bû û tu caran li ser rastiyê nemaye, çimkî rastî li ba wî
tune. Çaxê ku ew derewan dike, ji tiştên xwe bi xwe dibêje; çimkî ew derewkar
e û bavê derewan e. 45 Lê ji ber ku ez rastiyê dibêjim, hûn ji min bawer nakin. 46
Kî ji we dikare nîşan bide ku guneh li ba min heye? Madem ez rastiyê dibêjim,
çima hûn ji min bawer nakin?
47 Yê ku ji Xwedê be, gotinên Xwedê dibihîze; ji ber ku hûn ne ji Xwedê ne,
hûn nabihîzin.»
48 Cihûyan bersîva wî da û gotin: «Ma heqê me tunebû, dema ku me got, tu ji
Sameryayê yî û tu bi cinan ketiyî?»

49 Îsa ji wan re got: «Ez bi cinan neketime, bervajiyê vê, ez siyaneta Bavê xwe
digirim, lê hûn min bê siyanet dikin. 50 Ez li rûmeta xwe nagerim, lê yekî ku lê
digere û dîwanê dike heye. 51 Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, eger yek
gotina min bigire, ew tu caran mirinê nabîne.»
52 Li ser vê yekê Cihûyan jê re got: «Niha em dizanin ku tu bi cinan ketiyî!
Birahîm jî mir, pêxember jî mirin. Û niha tu dibêjî: ‹Eger yek gotina min bigire,
tu caran mirinê tam nake.› 53 Nexwe tu ji bavê me Birahîm meztir î? Ew mir.
Pêxember jî mirin. Ma tu xwe kî dibînî?»
54 Îsa bersîv da: «Eger ez rûmetê bidim xwe, rûmeta min ne tiştek e; yê ku
rûmetê dide min Bavê min e ku hûn jê re dibêjin: ‹Ew Xwedayê me ye.›
55 Hûn wî qet nas nakin, lê ez wî nas dikim. Eger min bigota ku ez wî nas
nakim, ez jî wek we dibûm derewker; lê ez wî nas dikim û gotina wî digirim.
56 Bavê we Birahîm bi hêviya ku wê roja min bibîne gelek şa bû; wî ew dît û
dilgeş bû.»
57 Cihûyan jê re got: «Hê tu ne pêncî salî yî! Ma te Birahîm jî dîtiye?»
58 Îsa ji wan re got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, ji beriya bûyîna
Birahîm ez heme.» 59 Îcar wan kevir hildan, da ku bavêjin wî, lê Îsa xwe veşart
û ji Perestgehê derket derve.

1 Gava ku Îsa derbas dibû, wî mirovek dît ku ji zikmakî ve kor bû.
2 Şagirtên wî jê pirsîn: «Mamoste, kê guneh kir ku ev mirov kor hat dinyayê?
Wî bi xwe an dê û bavê wî?»
3 Îsa bersîva wan da: «Ne wî guneh kir, ne jî dê û bavê wî, lê ji bo ku karên
Xwedê li ser wî bên dîtin ew kor hat dinyayê.
4 Hê ku roj e divê em karên ê ku ez şandime bikin.
Şev tê, hingê kes nikare karekî bike. 5 Heta ku ez li dinyayê me, ez ronahiya
dinyayê me.»

[6] Wî weha got û tif kir erdê, ji tifê herrî çêkir û ew li çavê wî mirovî da [7] û jê re
got: «Here xwe di hewzê Sîlwamê de bişo» ku bê wergerandin: «Hatiye şandin».
Ew jî çû serçavê xwe şuşt û bi çavên vebûyî vegeriya.
[8] Cîranên wî û kesên ku berê dîtibûn ku wî pars dikir, gotin: «Ewê ku rûdinişt û
pars dikir, ma ne ev e?»
[9] Hinekan digot: «Ev ew e», hinekan jî digot: «Ne ew e, lê dimîne wî.»
Lê wî bi xwe digot: «Ez ew im.»
[10] Îcar wan jê pirsî: «Nexwe çavên te çawa vebûn?»
[11] Wî bersîva wan da: «Mirovê ku jê re dibêjin Îsa, herrî çêkir û li çavên min da
û ji min re got: ‹Here hewzê Sîlwamê û xwe bişo.› Ez jî çûm, min serçavê xwe
şuşt û çavên min vebûn.»
[12] Wan jê pirsî: «Ew li ku derê ye?»
Wî got: «Ez nizanim.»

Guhdarên delal, divê ku em li vir bernama xwe bi dawî bikin, lê cara ku bê emê dîsa li vê serhatiyê binêrin û emê bibînin ku hem korîtiya çavan û hem jî korîtiya çavên dil heye. Yanî mirov bibîne jî, carna çavên wî ji bo rastiya Xwedê kor in û ew korîtiya dil ji korîtiya çavan hê xerabtir e.

Heta hingê qenc li ser vê rastiya ku Îsa Mesîh ji Fêrisiyan re got, bifikirin.
Wî got:
Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, eger yek gotina min bigire, ew tu caran mirinê nabîne.
Yanî ew bi mirina diduyan namire, naçe dojehê, lê ewê her û her bijî!

Me di bernama din de dît ku Îsa zilamekî ku ji zikmakî ve kor bû, sax kir. Gelek mirov li ser vê kerametê şaş man, lê gelekên din jî bawer nekirin ku bi rastî ew zilamê kor sax bûye.

13 Wan ew mirovê ku berê kor bû, anîn ba Fêrisiyan. 14 Ew roja ku Îsa herrî çêkir
û çavên wî vekirin, Şemî bû.
15 Fêrisiyan jî jê pirsî, ka çavên wî çawa vebûne?
Wî mirovî ji wan re got: «Wî herrî li çavên min da, min serçavê xwe şuşt û niha ez dibînim.»
16 Hinekan ji Fêrisiyan got: «Ev mirov ne ji Xwedê ye, çimkî ew Şemiyê nagire.»
Lê hinekan jî got: «Ma mirovekî gunehkar çawa dikare nîşanên weha çêke?»
Û di navbera wan de dubendî derket.
18 Serekên Cihûyan bawer nekirin ku ew kor bû û çavên wî vebûne, heta gazî dê
û bavê wî nekirin 19 û ji dê û bavê wî nepirsîn: «Ma kurê we yê ku we digot kor hatiye dinyayê, ev e?»
20 Wan got: «Em dizanin ku ev kurê me ye û kor hatiye dinyayê.
21 Lê em nizanin ku niha ew çawa dibîne û em nizanin kê jî çavên wî vekirine. Ji wî bipirsin, êdî ew mezin e, bila ew ji bo xwe bêje.»
22 Ji ber ku ji wan ditirsiyan weha peyivîn. Çimkî ji xwe serekên Cihûyan gotina xwe kiribûn yek: Her kesê ku bigota ew Mesîh e, ewê ji kinîştê bihata avêtin.
23 Ji ber vê yekê dê û bavê wî gotin: «Êdî ew mezin e, ji wî bipirsin.»

24 Îcar wan cara diduyan gazî wî mirovê ku berê kor bû kir û jê re gotin:
«Li ber Xwedê rastiyê bêje! Em dizanin ku ev mirov gunehkar e.»
25 Wî got: «Ez nizanim ka ew gunehkar e, an ku ne gunehkar e, lê tiştê ku ez dizanim ev e, ez kor bûm û niha ez dibînim.»
26 Îcar wan jê pirsî: «Wî çi bi te kir? Wî çawa çavên te vekirin?»

[27] Wî ji wan re got: «Min niha ji we re got, lê we guhê xwe nedayê.
Çima hûn dixwazin dîsa bibihîzin? Ma hûn jî dixwazin ku bibin şagirtên wî?»
[28] Wan ew nizim kir û gotin: «Tu yî şagirtê wî, lê em şagirtên Mûsa ne.
[29] Em dizanin ku Xwedê bi Mûsa re peyivî ye, lê heçî ev mirov e, em nizanin ku ew ji ku derê tê!»

[30] Wî mirovî ji wan re got: «Ev tiştekî ecêb e! Hûn nizanin ew ji ku derê tê, lê wî
çavên min vekirin. [31] Em dizanin ku Xwedê dengê gunehkaran nabihîze. Lê eger
mirovek biperize Xwedê û daxwaza wî bike, Xwedê dengê wî mirovî dibihîze.
[32] Tu caran nehatiye bihîstin ku kesekî çavên mirovekî ku kor hatî dinyayê
vekirine. [33] Eger ev mirov ne ji Xwedê bûya, nikaribû tiştek bikira.»
[34] Wan ji wî re got: «Tu bi tevahî di nav gunehan de hatiyî dinyayê, ma tê hînî me bikî?»
Û ew ji kinîştê avêtin derve.

[35] Gava Îsa bihîst ku ew avêtine derve, wî ew dît û jê re got: «Tu baweriyê bi Kurê Mirov tînî?»
[36] Zilam lê vegerand û got: «Ezbenî, ew kî ye? Bêje, da ku ez baweriyê pê bînim»
[37] Îsa jê re got: «Te ew dît û yê ku niha bi te re dipeyive ew e.»
[38] Wî got: «Ya Xudan, ez bawer dikim!» û ji Îsa re çû ser çokan.
[39] Îsa jî got: «Ez ji bo dîwankirinê hatime vê dinyayê, da yên ku nabînin bibînin û yên ku dibînin jî kor bibin.»
[40] Hinek ji Fêrisiyên ku li ba wî bûn jê re gotin: «Nexwe em jî kor in?»
[41] Îsa got: «Eger hûn kor bûna, gunehê weyê tunebûya. Lê niha hûn dibêjin: ‹Em dibînin›, îcar gunehê we dimîne.

Bi vî awayî Îsa Mesîh Fêrisî şermezar kirin, çimkî ew di fêmkirina xwe de kor bûn. Bi rastî korîtiya dil û hişê wan rêberên dîn, ji korîtiya çavan xerabtir bû.

Wan bi çavên xwe didît, lê belê dilê wan kor bû û wan nedixwest ku bibînin, loma wan ji bo kuştina Mesîh kevir hildan.
Wan zilamên oldar, çavên dilê xwe digirtin, wusa ku wan rastiya ku Îsa Mesîh ji wan re digot, fêm nedikir. Wan qet nedixwest bawer bikin ku Îsa hem Mesîh û hem jî ronahiya dinyayê ye. Wan qet nexwest qebûl bikin ku Îsa ji beriya Birahîm pêxember hebû. Wan Mesîh red kir û bawer nekirin ku ew Peyva Xwedê ye. Yanî wan qet nedixwest ku rastiyê bibînin.

Di bernama xwe ya îro de me du cûreyên korîtiyê dîtin. Mirov hene ku çavên wan kor in û hin mirovên din hene ku dil û hişê wan kor e. Korîtiya dil û hişê mirov ji korîtiya çavan  hê xerabtir e:
Eger çavên te kor bin, tu nikarî tiştên vê dinyayê bibînî, lê eger dil û hişê te kor bin, tu nikarî di vê dinyayê de rastiyê fêm bikî û ne jî tu dikarî tiştên dinya din bibînî û wan fêm bikî.

Peyva Xwedê ji me re dibêje, dil û hişê hemû zarokên Adem ji zikmakî ve kor in.
Ji ber gunehê Adem, em hemû di tariya gunehan û di tariya nezaniyê de hatin dinyayê.
Çaxê ku tu odeyekê ronahî dikî, hemû kêzik direvin û ji hev belav dibin.
Bi vî awayî em jî ji rastiya Peyva Xwedê direvin û em razî ne ku em di tariyê de karê xwe bikin û bijîn. Erê, gotina pêşiyan dibêje: Nezanê neguhdar dikeve derdê bê derman.
Herweha Xwedê bi destê Hoşêya pêxember nivîsî, got:
Guhê xwe bidin peyva Xudan: … Gelê min ji nezaniyê helak bû. Madem ku we zanîn red kir, ez jî, ezê we red bikim … (Hoşêya 4:1.6)
Lê belê mizgîniyeke xweş heye: Xwedê naxwaze ku yek ji me di tariya guneh û nezanînê de helak bibe. Loma ew hat serdana me, yanî wî Îsa Mesîh şand nav mirovan.

Zekerya pêxember weha li ser Mesîh got:
Xudan wê ji jor, wek ku roj hiltê, bê serdana me,
79 Da ronahiyê bide wan ên ku di tariyê de û di bin siya mirinê de rûniştine; ewê
berê lingên me bide ser riya silametê.» (Lûqa 1:78.79)

Pêxember hemû wek stêran bûn; wan di tariyê de ronahî dida.

Lê Mesîh wek roja ku hiltê ye. Wek ku roj ronahî û jiyanê dide hemû tiştan, weha jî Îsa Mesîh ronahî û jiyanê dide hemû yên ku baweriya xwe bi wî tînin.

Dostên delal, ma çiqas stêr hene? Û çiqas roj hene ku ronahiya xwe didin me?

Erê, gelek stêr hene, lê belê roj yek tenê ye!

Ma Xwedê çiqas Xilaskar ji ezmên şandin erdê, da ku ew gunehkaran ji tariya guneh û ji dojêhê xilas bikin? Xwedê yek tenê şand.

Lê belê piraniya zarokên Adem vê yekê fêm nakin; loma ew hê di tariya gunehan de diçin û diterpilin. Nivîsarên Pîroz li ser Îsa Mesîh weha dibêjin:

5 Ronahî di tariyê de şewq dide û tarî nikare wê binixême. …
10 Ew li dinyayê bû û dinya bi wî afirî. Lê dinyayê ew nas nekir. (Yûhenna 1:5.10)

Guhdarên delal, pirseke girîng heye. Ew jî ev e:

Gelo Îsa Mesîh çavên dil û hişê te vekirine? An tu hê di tariya guneh û nezaniyê de virde û wêde diçî?

Gelek spas ku we qenc guhê xwe dayê. Xwedê hez bike, di bernameyên ku bên de emê bi xwendina Încîlê berdewam bikin û emê bibînin ku rojekê rûmeta Xwedê di jiyana Mesîh de bi awayekî pir newaze kifş bû, bû wek ronahiya rojê.

Heta hingê li ser van gotinên Îsa Mesîh bifikirin ên ku dibêjin:

«Ez ronahiya dinyayê me; yê ku li pey min bê, tu caran di tariyê de rêve naçe, lê wê bibe xweyî ronahiya jiyanê.» (Yûhenna 8:12)

Me di bernama din de bihîst ku Îsa Mesîh çawa çavên zilamekî ku ji zikmakî ve kor bûn, vekirin. Erê, tiştekî ku li ba Îsa nebe, tune, çimkî ew bi xwe Peyva Xwedê ye ya ku hatiye vê dinyayê. Ji ber vê yekê desthilatiya Îsa li ser ba û avê, li ser cin û nexweşiyan û li ser mirinê jî hebû.

Îsa Mesîh biçûya ku derê, li her derê elaletên mezin li dor wî diciviyan, lê bi tenê hinekan ji wan mirovan fêm kir ku bi rastî ew kî yê.

Piraniya wan digotin ku ew pêxemberek e, lê wan fêm nedikir ku hemû tijetiya Xwedêtiyê bi bedenî di şexsê wî de ye.

Hişê wan nedistand ku Îsa Xudanê rûmetê ye û ji ezmên hatiye.

Di bernama me ya îro de kifş dibe ku Îsa Mesîh bi rûmet û ronahiya Xwedê tije bû. Emê bibînin ku rojekê, çaxê ew bi şagirtên xwe ve li ser serê çiyayekî bû, ew rûmeta wî ji bo demeke kin eşkere bû û hat dîtin.

Emê niha ji Încîlê bixwînin. Di Mizgîniya Lûqa deriyê 9’an de, Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

18 Carekê, gava wî bi tenê dua dikir, şagirtên wî li ba wî bûn û wî ji wan pirsî û got: «Li gor gotina xelkê ez kî me?» 19 Wan lê vegerand û gotin: «Hin dibêjin Yûhennayê imadkar e, hinek dibêjin Êlyas e û hinekên din jî dibêjin ku yek ji pêxemberên berê rabûye.»

15 Îsa ji wan re got: «Lê hûn çi dibêjin? Bi ya we ez kî me?» 16 Şimûn-Petrûs bersîv da û got: «Tu Mesîh î, Kurê Xwedayê jîndar î.» 17 Îsa lê vegerand û got: «Xwezî bi te, ey Şimûnê kurê Ûnis, çimkî yê ku ev ji te re vekiriye ne xwîn û goşt e, lê Bavê min ê li ezmanan e.»

Em li vir hinekê bisekinin û li ser vê pirsa Îsa Mesîh piçekê bifikirin.

Wê rojê Îsa bi serê xwe bû, bi tenê şagirtên wî li ba wî bûn. Wî ji wan pirsî û got: Li gor xelkê ez kî me?

Şagirtan bersiv da, gotin: Piraniya mirovan dibêjin ku tu yek ji pêxemberan î.

Hingê Îsa Mesîh careke din pirsî, got: «Lê hûn çi dibêjin? Bi ya we ez kî me?» [16]
Şimûn-Petrûs bersîv da û got: «Tu Mesîh î, Kurê Xwedayê jîndar î.»
Bi rastî ev pirsa Îsa Mesîh pirseke gelek girîng e. Divê her yek ji me bersiva vê pirsê bide!
Guhdarên delal, hûn li ser Mesîh çi dibêjin? Gelo, hûn dibêjin ku Îsa Mesîh yek ji pêxemberan e?
An hûn peyvên Petrûs qebûl dikin? Wî got: «Tu Mesîh î, Kurê Xwedayê jîndar î.»
Hûn li ser Îsa Mesîh çi difikirin?
Beriya demeke dirêj, roja ku dê û bavê me Adem û Hewayê guneh kiribûn, Xwedê soz dabû ku rojekê Xilaskar wê bihata dinyayê.
Ma hûn bawer dikin ku Îsa ew Mesîhê Xwedê ye? Hûn li ser Îsa çi dibêjin?
Ma hûn bawer dikin ku Îsa Kurê Xwedayê jîndar, yanî Peyva Xwedê ye û ji ezmên hat nav mirovan?

Wek ku hûn qenc dizanin, gelek mirov heta îro qebûl nakin ku Îsa Kurê Xwedê ye. Ew difikirin, dibêjin: Mana wê yekê ev e ku Xwedê jin ji xwe re anî û ji wan re zarok çêbû. Lê belê mana vê yekê qet ne ev e. Rûmeta Xwedê ji van tiştan sed caran bilindtir e!
Xwedê ne mirov e, ew ruh e û  wek ku di nav mirovan de çêdibe, tiştê wusa li ba Xwedê qet tune.
Lê belê Xwedê dîsa jî ji Îsa re dibêje: Kurê min. Me ev tişt di bernameyeke din de şîrove kir. Eger yek ji te re bêje: Tu kurê Kurdistanê yî, mana vê yekê ne ev e ku Kurdistan zilam e û jin ji xwe re anî û tu ji wan re çêbûyî.
Nexêr, mana kurê Kurdistanê ew e ku tu ji Kurdistanê têyî û tu yekî Kurdistanî yî..
Çaxê ku ji Îsa Mesîh re Kurê Xwedê tê gotin jî, ev tam weha ye.
Mesîh ji keçikekê çêbû, lê belê beriya ku ew bê dinyayê, ew li ezmên bû.
Ew «Kalimat Allah», yanî Peyva Xwedê û «Ruh Allah», yanî ruhê Xwedê ye.

Bi tenê Îsa Mesîh hêjayî van peyvan e; ji wî pê ve tu kes tune ku navê wî Kurê Yê Herî Bilind be, çimkî ew tenê ji destpêkê ve Peyva Xwedê bû.
Erê, ev sireke mezin e, lê ew ne tenê sirek e, ew rastiyeke mezin e jî.
Xwedê Kurê xwe şand vê dinyayê, ne tenê ku me ji gunehên me xilas bike, lê belê da ku ew nîşanî me bide ka Xwedê çawa ye.
Mesîh xasîtiya Xwedê nîşanî me da. Yê ku Kur nas bike, dizane ku Bav çawa ye. Yê ku Îsa nas bike, dizane ku Xwedê çawa ye.
Ji Îsa re Kurê Xwedê tê gotin, ji ber ku ew ji Xwedê hat, ji ber ku ew wek Xwedê ye û ji ber ku ew bi xwe Peyva Xwedê ye.
Em nikarin Peyva Xwedê ji Xwedê veqetînin; loma bila mirov vê yekê qebûl bike an red bike, rastî ev e û eynî dimîne: Îsa Kurê Xwedayê jîndar e.

Niha em dixwazin bi Mizgîniya li gor Metta berdewam bikin û emê bibihîzin ku piştî vê şahidiya Petrûs çi çêbû. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
21 Ji hingê ve Îsa dest pê kir nîşanî şagirtên xwe da, ku divê ew here Orşelîmê û ji destê rihspî, serekên kahînan û Şerîetzanan gelek cefayê bikişîne, bê kuştin û roja sisiyan rabe.
22 Petrûs ew kişand aliyekî, lê hilat û got: «Ev ji te dûr be, ya Xudan! Ev tişt tu caran bi te nayê!»
23 Lê Îsa zivirî û ji Petrûs re got: «Xwe bide pey min, Îblîs! Tu ji min re dibî asteng; çimkî tu ne tiştên xwedayî, lê tiştên mirovî difikirî.»
(Metta 16:21-23)

Ma we bihîst ku Îsa ji şagirtên xwe re çi got? Wî got ku divê ew here Orşelîmê û ji destê rihspî, serekên kahînan û Şerîetzanan gelek cefayê bikişîne, bê kuştin û roja sisiyan rabe. Yanî Îsa ji pêşî ve da zanîn ku ewê xwîna xwe birije û bi vî awayî deynê gunehên me bide.
Lê belê Petrûs nikaribû vê yekê qebûl bike. Petrûs dizanibû ku hêz û desthilatiya Îsa Mesîh li ser her tiştî heye. Fikra Petrûs ev bû: Mesîh wê çawa destûr bida serwerên Cihûyan ên xerab ku ew bigirtan, ceza bidan wî û ew bikuştan?

Loma Petrûs ji Îsa re got: «Ev ji te dûr be, ya Xudan! Ev tişt tu caran bi te nayê!»
Lê belê Îsa dizanibû, ew hatiye dinyayê da ku xwîna xwe birije û bibe gorî, da ku gunehên mirovan bên bexişandin.
Loma wî ji Petrûs re got: «Xwe bide pey min, Îblîs! Tu ji min re dibî asteng; çimkî tu ne tiştên xwedayî, lê tiştên mirovî difikirî.»

Îsa dizanibû ku ew ji bo çi hatiye dinyayê. Wek ku pêxemberên Xwedê beriya demeke dirêj li ser wî digotin, ew hat, ku jiyana xwe bide, yanî ew hat, ku xwîna xwe di ber gunehkaran de birije.
Îsa hat, da ku ew mînaka berxên ji bo goriyan nemîne mînak, lê bêlê bê cih û her tişt temam bibe.
Guhdarên delal, eger pêwist be ku ji bernama îro tiştek tenê di bîra we de bimîne, bila ew jî ev be: Îsa Mesîh hatiye dinyayê, da ku bibe gorî û di ber gunehên min û te de bimire.

Xwedê hez bike, piştî çend bernameyên din, emê bibînin ku ew pêxemberîtiya ku Îsa bi hûrgilî li ser mirina xwe ya li Orşelîmê kiribû, hat cih.
Heta hingê li ser vê pirsa Îsa Mesîh qenc bifikirin.
Wî got: «Bi ya we ez kî me?»

Xwedê bersiva rast a vê pirsê bixe dilê we hemûyan!

Me di bernama din de li ser du xalên gelek girîng bihîst. Ew jî ev bûn:

- Daxwaza Xwedê bi xwe ew bû ku Mesîh li ser xaçê bimira û tu kes tune ku bikare daxwaza Xwedê biguhere.
- Îsa Mesîh bi hemdê xwe hilbijart ku bibe goriya herî mezin û herî dawî. Wî ev yek kir, ji ber ku ew pir ji min û ji te hez dike û ew nexwaze ku em helak bibin.

Mirovên din çi bêjin, bila bêjin; eger peyama wan bi peyama Îsa Mesîh û bi peyamên pêxemberên Xwedê re li hev negire, peyama wan ne rast e, û rastiya li ser mirina Îsa Mesîh û li ser rabûna wî bi gotinên mirovên din nayê guhertin.

Niha em dixwazin binêrin, piştî ku Îsa ji şagirtên xwe re got ku ewê canê xwe feda bike, bi heftiyekê çi çêbû. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
[1] Piştî şeş rojan Îsa Petrûs, Aqûb û birayê wî Yûhenna bi xwe re birin û ew bi
serê xwe derxistin çiyayekî bilind. [2] Li wir, li ber wan dîtina wî hat guhertin.
Rûyê wî wek rojê şewq da û cilên wî wek ronahiyê çîlspî bûn…
[30] Û va ye, du zilam pê re dipeyivîn. Ew Mûsa û Êlyas bûn. [31] Ew di nav rûmetê
de xuya bûbûn û li ser mirina wî, ya ku wê li Orşelîmê pêk bihata, dipeyivîn.

[4] Petrûs ji Îsa re got: «Ya Xudan, qenc e ku em li vir in! Eger tu bixwazî, ezê li
vir sê holikan çêkim. Yekê ji te re, yekê ji Mûsa re û yekê jî ji Êlyas re.»
[5] Hê ew dipeyivî, ewrekî ronahîdar li ser wan kir sî û dengek ji êwr hat û got:
«Ev e Kurê min ê delal. Dilê min bi wî xweş e. Guhdariya wî bikin!» [6] Gava
şagirtan ev bihîst, ji tirsan deverû ketin erdê. [7] Lê Îsa hat, destê xwe li wan da û
got: «Rabin, netirsin!» [8] Gava şagirtan çavên xwe hildan, wan ji Îsa pê ve tu kesî
din nedît.

9 Çaxê ji çiyê dihatin xwarê, Îsa li wan emir kir û got: «Heta ku Kurê Mirov ji nav miriyan ranebe, tiştên ku we dîtin, ji kesî re nebêjin.»

Ma we fêm kir ka li ser serê wî çiyayî çi çêbû? Ev tiştekî pir newaze û ecêb bû! Me xwend ku dîtina Îsa hat guhertin: Rûyê wî wek rojê şewq da û cilên wî wek ronahiyê çîlspî bûn. Li wî çiyayê, ew ronahiya rewnaq û paqij a ku ji rûyê Îsa Mesîh şewq dida, eynî ew ronahî bû ya ku li ezmên ji Xwedê derdikeve û li dor textê wî şewq dide.
Dema ku Mûsa pêxember di çolê de bi gelê Îsraêl re bû, ronahiya Xwedê û rûmeta wî daket ser Konê Perizînê û Cihê Herî Pîroz tije kir. Ma ev tê bîra we? Eynî ew rûmet di hundirê Îsa de bû, lê belê ew rûmeta newaze ji ber çavên mirovan veşartî dima. Tenê wê rojê Xwedê ji bo demeke kin rûmeta xwe ya şewqdar a ku di şexsê Îsa de veşartî bû, eşkere kir.
Eynî di wê demê de Xwedê ji ezmên du pêxember şandin, yanî Mûsa pêxember û Êlyas pêxember û ew bi Îsa re li ser mirina wî ya li Orşelîmê peyivîn.
Herweha me bihîst ku ewrekî ronahîdar li ser wan kir sî û dengek ji êwr hat û got: «Ev e Kurê min ê delal. Dilê min bi wî xweş e. Guhdariya wî bikin!»

Ji bo van hemû tiştan sedem çi bû? Çima Xwedê ev tiştên newaze li ber çavên Petrûs, Yûhenna û Aqûb kirin? Sedem ev bû: Xwedê dixwest ji wan sê şahidan re bi zelalî eşkere bike ku bi rastî Îsa ji ezmên hatiye û ew bi xwe Kurê Xwedê yê herheyî ye û divê ku her kes guhdariya wî bike.
Nivîsarên Pîroz vê yekê bi van peyvan didin zanîn û dibêjin:
Yê ku ji Kur re hurmetê neke, ji Bavê ku ew şandiye re jî hurmetê nake. (Yûhenna 5:23)
1 Di demên berê de Xwedê gelek caran û bi gelek awayan, bi rêberiya pêxemberan ji bav û kalan re gotiye.
2 Lê di van rojên dawîn de, ew bi Kurê xwe yê ku ew kiriye wêrisê her tiştî û bi destê wî erd û ezman çêkirine, ji me re peyivî. 3 Ew şewqa rûmeta Xwedê û xuyabûna rastîn ya cewhera wî ye. Ew her tiştî bi peyva xwe ya hêzdar hildigire.

Piştî ku wî paqijbûna gunehan pêk anî, ew li jorê, li milê Yê Mezin ê rastê rûnişt. (Îbranî 1:1-3)

Guhdarên delal, hûn li ser Îsa çi dibêjin? Li gor bîr û baweriya we Îsa kî ye? Gelo hûn bawer dikin ku Îsa Xudanê rûmetê ye û ji ezmên hatiye?
An hûn dibêjin: Ew jî wek pêxemberên din e. Rast e, gelek mirov weha dibêjin, lê belê beriya ku em xatiran ji we bixwazin, em dixwazin guhdariya çend gotinên Petrûs û Yûhenna bikin. Ew bi xwe wê rojê bi Îsa re li ser serê wî çiyayî bûn û wan rûmeta Xwedê ya ku ji bedena Îsa derketibû dît. Piştî çend salên din, Petrûs di Nivîsarên Pîroz de weha nivîsî:
16 Çaxê ku me hêz û hatina Xudanê me Îsa Mesîh bi we da zanîn, em neketin pey çîrokên ku bi qurnazî ji ber xwe hatine çêkirin, lê me bi çavên xwe mezinahiya wî dît.
17 Çimkî gava ji rûmeta herî bilind dengekî weha jê re hat û got:
«Kurê min ê delal ev e. Dilê min bi wî xweş e»,
hingê wî ji Bav Xwedê rûmet û siyanet stand. 18 Û gava em bi wî re li ser çiyayê pîroz bûn, ev dengê ku ji ezmên hat, me bi xwe bihîst. (Petrûs II, 1:16-18)

Heçî Yûhenna ye, wî weha nivîsiye:
1 Ev Peyva ku em bi we didin bihîstin, Peyva jiyanê ye. Ew ji destpêkê ve hebû, me bihîstiye, me bi çavên xwe dîtiye, me lê nêriye û dest daye wê. Ev jiyan xuya bû, me ew dît û em jê re şahidiyê dikin … Me rûmeta wî, yanî rûmeta Yê Yekta yê ku ji Bav tê dît. (Yûhenna I, 1.2; Yûhenna 1:14)

Herweha wî di dawiya Mizgîniya li gor Yûhenna de nivîsî û got:
30 Erê, Îsa li ber şagirtên xwe hê gelek nîşanên din jî çêkirin ku ew di vê kitêbê de nehatine nivîsîn. 31 Lê ev hatine nivîsîn, da ku hûn bawer bikin ku Îsa Mesîh e, Kurê Xwedê ye û bi vê baweriyê jiyana we bi navê wî hebe.

Ma hûn dibêjin ku ev tişt pir zehmet in?
Bi rastî Xwedê dixwaze dilê we veke, da ku hûn bikarin rastiya van tiştên newaze fêm bikin. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
Mirovê nefsanî tiştên Ruhê Xwedê qebûl nake, ev jê re bêaqilî ne. Nikare wan bizane jî, ji ber ku ev tişt bi riyên ruhanî tên fêmkirin. (Korîntî I, 2:14)
6 Erê, em di nav yên gihîştî de şehrezayiyê dibêjin. Lê ev şehrezayî ne ya vê dinyayê ye û ne jî ya serokên wê ye, yên ku wê ji holê bên rakirin.
7 Lê belê em şehrezayiya Xwedê ya bi sir û veşartî dipeyivin, a ku Xwedê ji beriya dem û zemanan ve ji bo rûmeta me kifş kiriye.
8 Tu kesî ji serokên vê dinyayê bi vê nezanî. Eger bizanibûna, wê Xudanê rûmetê xaç nekirana. (Korîntî I, 2:6-8)

Bila Xwedê bi xwe mana vê rastiya ku di bernama me ya îro de ye, ji we re şîrove bike!

Heta careke din, li ser van gotinên Xwedayê Karîndarê her tiştî bifikirin. Çaxê ku Îsa Mesîh li ser serê wî çiyayî disekinî, Xwedê ji ezmên got:

«Ev e Kurê min ê delal. Dilê min bi wî xweş e. Guhdariya wî bikin!» (Metta 17:5)

Di bernama din de me dît ku Îsa bi sê şagirtan ve çûbû serê çiyayekî.
Ji nişkê ve rûmeta Xudan Îsa eşkere bû: Rûyê wî wek rojê şewq da û ji cilên wî ronahiyeke çîlspî, rewnaq û paqij derket.
Ji bo demek kin ew rûmeta Îsa ya ku rûmeta Xwedê bi xwe bû, hat dîtin.

Îro em dixwazin di Încîlê de berdewam bikin û emê bibihîzin ku Îsa Mesîh ew mirovên ku li pey wî diçûn, mînandin miyên bêxem.
Me beriya niha bihîst ku Xwedê di Nivîsarên Pêxemberan de çend caran ji zarokên Adem re got: miyên windabûyî yên bê şivan.
Lê belê Xwedê naxwaze ku zarokên Adem wek miyên windabûyî helak bibin.
Ji ber ku ji bo mirovan şivanê qenc nebû, wî Şivanekî hêzdar ji ezmên şand, da ku ew hem di riya aştiyê de rêberê me be û hem jî me ji dijminên herî xerab, yanî ji Îblîs, ji guneh û ji dojehê xilas bike.
Ma hûn navê wî Şivanê qenc ê ku Xwedê şand vê dinyayê, dizanin?
Eger hûn nezanin, ji kerema xwe qenc guhdariya bernama îro û bernama ku bê jî bikin.

Em niha di Mizgîniya Yûhenna de dest pê dikin û emê ji deriyê 10’an ji we re bixwînin. Rojekê elaleteke mezin li dor Îsa civiya. Wî ji wan re got:
[1] «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, ew kesê ku di derî re nakeve hevşiyê miyan, lê di cihên din re dikevê, ew diz û rêbir e. [2] Lê yê ku di derî re dikevê, ew şivanê miyan e.»
[6] Îsa ev mesele ji wan re got, lê wan fêm nekir ku ew çi ji wan re dibêje.
[7] Li ser vê yekê Îsa dîsa ji wan re got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, ez deriyê miyan im. [9] Derî ez im; yê ku bi destê min bikeve hundir, ewê xilas bibe. Ewê bikeve hundir, jê derkeve û çêrê bibîne.
[10] Diz bi tenê ji bo dizîn, kuştin û telefkirinê tê. Lê ez hatim ji bo ku ji wan re jiyan hebe, jiyaneke bi firehî hebe.

[11] «Ez şivanê qenc im. Şivanê qenc ji bo miyan canê xwe dide.
[12] Yê ku bi peran hatiye girtin û ne şivan e, kesê ku ne xwediyê miyan e, dema
ku dibîne gur tê, miyan dihêle û direve. Gur jî li wan dixe û wan belav dike.
[13] Ew direve, çimkî ew bi peran hatiye girtin û xema miyan naxwe.
[14] Ez şivanê qenc im. Ez ên xwe nas dikim û yên min jî min nas dikin, [15] wek ku
Bav Xwedê min nas dike û ez jî wî nas dikim. Ez ji bo miyan canê xwe didim.
[17] Bav ji ber vê yekê ji min hez dike, çimkî ez jiyana xwe didim, da ku ez wê
dîsa bistînim. [18] Tu kes wê ji min nastîne, lê ez jiyana xwe ji ber xwe didim.
Ez dikarim jiyana xwe bidim û dikarim dîsa bistînim jî.
Min ev emir ji Bavê xwe stand.»

[19] Li ser van gotinan dîsa di nav Cihûyan de dubendî derket. [20] Gelekan ji wan
digot: «Ew bi cinan ketiye û ew dîn e. Çima hûn guhdariya wî dikin?»
[21] Hinekên din jî gotin: «Ev ne gotinên yekî ne ku bi cinan ketiye. Ma cin
dikarin çavên koran vekin?»

[24] Cihû li dora wî civiyan û jê pirsîn: «Ma tê heta kengê me di şikê de bihêlî?
Eger tu Mesîh bî, ji me re bi eşkereyî bêje!»
[25] Îsa bersîva wan da: «Min ji we re got. Lê hûn bawer nakin. Karên ku ez bi
navê Bavê xwe dikim, ji min re şahidiyê dikin. [26] Lê hûn bawer nakin, çimkî hûn
ne ji miyên min in. [27] Miyên min dengê min dibihîzin, ez jî wan nas dikim û ew
li pey min tên. [28] Ez jiyana herheyî didim wan û ew tu caran helak nabin û tu kes
nikare wan ji destê min derxe. [29] Bavê min ê ku ew dane min, ji hemûyan meztir
e û tu kes nikare wan ji destê Bavê min derxe. [30] Ez û Bav yek in.»
[31] Cihûyan dîsa kevir hildan ku wî bidin ber keviran.
[32] Îsa ji wan re got: «Min ji Bav Xwedê gelek karên qenc nîşanî we dan.
Hûn ji ber kîjanî min didin ber keviran?»
[33] Cihûyan bersîva wî da: «Em te ne ji ber karekî qenc didin ber keviran,
lê em te ji ber çêran didin ber keviran! Çimkî tu mirov î, lê tu xwe dikî Xwedê.»

[34] Îsa bersîva wan da: «Ma di Şerîeta we de nenivîsiye ku Xwedê gotiye:
‹Hûn xwedê ne›? [35] Em dizanin ji wan kesên ku peyva Xwedê ji wan re hatiye,
‹xwedê› hatibe gotin jî, Nivîsara Pîroz xera nabe.
[36] Bav ez kirim veqetandiyê pîroz û ez şandim dinyayê, îcar ji ber ku min got:
‹Ez Kurê Xwedê me›, hûn çawa ji min re dibêjin: ‹Tu çêran dikî!›
[37] Eger ez karên Bavê xwe nekim, ji min bawer nekin. [38] Lê eger ez wan dikim,
bi ser ku hûn ji min bawer nakin jî, dîsa bi karên min bawer bikin, da ku hûn
bizanin û fêm bikin ku Bav bi min re ye û ez bi Bav re me.»
[39] Hingê dîsa wan xwest ku Îsa bigirin, lê Îsa ji destê wan derket.

Ma we bihîst ku Îsa ji Cihûyan re çi got? Ji ber ku wextê me kêm e û em nikarin hemû gotinên Îsa şîrove bikin, emê li du navên ku Îsa Mesîh ji xwe re gotin, binêrin.
Ma we ew nav bihîstin? Yê pêşî ev e: Deriyê miyan, û yê diduyan jî ev e: Şivanê qenc.

Pêşî me bihîst ku Îsa zarokên Adem mînandin miyan û hingê wî ji xelkê re got: Ez deriyê miyan im. Yê ku bi destê min bikeve hundir, ewê xilas bibe. Çima Îsa li ser xwe got: Ez deriyê miyan im?
Di wan rojan de adeta şivanan ew bû ku wan bi kevirên mezin an jî bi stiriyan ji bo miyan hevşiyek çêdikir; ji bo ku mî bikevin hundir, derhevşiyek tenê hebû.
Ber îvarê şivan bi miyan re dihat û hemû mî diketin hevşiya xwe.
Piştre şivan di derhevşî de radiza, dibû dergehvan û miyên xwe diparastin.
Yanî beriya ku gur an dehbeyekî din bikariya biketa hevşiyê miyan û mî bixwaran, diviya di derhevşî re, yanî di cihê ku şivan lê radiza re biketa hundir.
Îcar hingê şivan hişyar dibû û diket pey dehbe û nedihişt ku ew dehbe ziyanê bide miyan.
De vêca bi vî awayî bi rastî şivan dibû deriyê miyan.

Erê, guhdarên hêja, Îsa Mesîh ji xwe re got: Deriyê miyan.
Mana vê yekê ew e ku Îsa hemûyên ku li pey wî diçin, xweyî dike.
Herweha mana vê yekê ew e ku ne bi riya Îsa Mesîh be, tu kes nikare bibe miyeke keriyê Xwedê.
Hemûyên ku bixwazin ji xefikên Îblîs, ji cezayê guneh, ji hêza mirinê û ji ezabê dojehê yê herheyî xilas bibin, divê ku di vî deriyî re derbas bibin.
Mana vê yekê ew e ku Mesîh bi tenê deriyê ku dibe xilasiyê ye.
Yên ku bixwazin xilas bibin, divê ku ew Îsa Mesîh şivanê xwe qebûl bikin.
Loma Peyva Xwedê dibêje:
12 Xilasî bi tu kesî din tune; çimkî di bin ezmên de, di nav mirovan de, navekî din nehatiye dayîn ku em bikarin pê xilas bibin.» (Karên Şandiyan 4:12)

Erê, ji Îsa Mesîh pê ve, deriyekî din ê ku dibe xilasiyê tune.

Guhdarên delal, bernama me li vir bi dawî dibe. Xwedê hez bike cara ku bê emê li navê din ê ku Îsa Mesîh ji xwe re got, binêrin. Ew nav jî ev e: Şivanê qenc.

Heta hingê careke din li ser van gotinên Nivîsarên Pîroz bifikirin ên ku dibêjin:
12 Xilasî bi tu kesî din tune; çimkî di bin ezmên de, di nav mirovan de, navekî din nehatiye dayîn ku em bikarin pê xilas bibin.» (Karên Şandiyan 4:12)

Di bernama din de me dît ku Îsa Mesîh ji xwe re got Deriyê miyan.
Hemûyên ku bixwazin ji xefikên Îblîs, ji cezayê guneh, ji hêza mirinê û ji ezabê dojehê yê herheyî xilas bibin, divê ku di vî deriyî re derbas bibin. Mana vê yekê ew e ku Mesîh bi tenê deriyê ku dibe xilasiyê ye. Yên ku bixwazin xilas bibin, divê ku ew Îsa Mesîh şivanê xwe qebûl bikin. Loma Peyva Xwedê dibêje:
12 Xilasî bi tu kesî din tune; çimkî di bin ezmên de, di nav mirovan de, navekî din nehatiye dayîn ku em bikarin pê xilas bibin.» (Karên Şandiyan 4:12)

Gelo Nûh pêxember û tofana di demê wî de tê bîra we?
Xwedê emir li Nûh kir ku di gemiyê de derî çêke. Ew gemî wê ji bo wan hemûyên ku bixwestan ji helakkirina tofanê xilas bibûna, bibûya cihê xilasiyê. Li gor emrê Xwedê, çend derî di wê gemiyê de hebûn? Erê, bi tenê deriyek hebû. Her kesê ku bixwesta ji tofanê xilas bibûya, mecbûr bû ku di wî deriyê tenê re derbas bibûya. Her kesê ku di wî deriyî re ketibû hundirê gemiyê, xilas bû. Lê yên din hemû helak bûn!
Heçî Roja Dawî ye, Nivîsarên Pîroz ji me re kifş dikin ku Xwedê li ber zarokên Adem ji bo xilasbûnê deriyekî tenê vekiriye. Ew derî jî Mesîh bi xwe ye.
Ew destûrê dide mirovan ku ew jiyana herheyî bistînin. Loma Îsa Mesîh got:
«Derî ez im; yê ku bi destê min bikeve hundir, ewê xilas bibe... Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, ew kesê ku di derî re nakeve hevşiyê miyan, lê di cihên din re dikeviyê, ew diz û rêbir e.» (Yûhenna 10:9.1)

Navê din ê ku Îsa Mesîh ji bo xwe got, ji yê pêşî ne dûr e. Îsa ne tenê Deriyê miyan e, ew Şivanê qenc e jî. Îsa Şivanê qenc e, çimkî ew ji me hez dike û wî di ber me de jiyana xwe da. Erê, bi rastî, ew şivanekî pir qenc û newaze ye!
Di Zebûrê de Dawid li ser vî Şivanê qenc weha nivîsand û got:

1 Xudan şivanê min e, tiştek ji min kêm nabe.

2 Ew min li nav mêrgên şîn dide mexel û li ber ava  nerm rêve dibe.
3 Ew dilê min nû dike û ji bo navê xwe, di riya rast de rêberiya min dike.
4 Erê, ez di geliyê siya mirinê de bigerim jî, ez ji xerabiyê natirsim,
Çimkî tu bi min re yî.
Gopal û şivdarê te dilgeşiyê didin min.
5 Li pêş dijminên min, tu sifrê datînî ber min.
Tu rûn li serê min didî. Fincana min tije ye, ser re tavêje.
6 Erê, di hemû rojên jiyana min de qencî û dilovanî wê bi min re bin
Û her roj ezê di mala Xudan de rûnim. (Zebûr 23)

Erê, divê em vê qenc bizanin, ew şivanê qenc ê ku Dawid li ser wî nivîsîbû, Mesîh bi xwe ye. Loma Îsa got:  Ez şivanê qenc im; Ez û Bav Xwedê yek in. (Yûhenna 10:11.30)

Lê belê çaxê ku Îsa got ku ew û Bav yek in, Cihûyan got: «Ew çêran dike» û dixwestin wî bidin ber keviran.

Wan nikaribû qebûl bikira ku Îsa, Xwedayê di bedena mirov de ye. Heta îro jî gelek zarokên Adem van gotinan fêm nakin û li wan şaş dimînin. Hin guman dikin, dibêjin: «Madem ku Îsa û Xwedê yek in, hingê divê ku du Xwedê hebin.»

Lê belê rastî ne ev e, çimkî Nivîsarên Pêxemberan bi zelalî kifş dikin dibêjin. Xudan Xwedayê me yek e. (Dubarekirina Şerîetê 6:4)

Erê, Xwedê yek e, lê belê ev ji Xwedê re nebû asteng û wî xwe di dirûvê mirov de li ser rûyê erdê eşkere kir.

Belkî em dikarin vê yekê bi meseleyekê hê bêtir şîrove bikin.

Em hinekê li ser roja ku hem ronahiyê dide me û hem jî me germ dike, bifikirin.

Ma çend rojên weha hene? Erê, roj bi tenê yek e. Roj li ku derê ye?

Erê, ew gelek dûrî me di fezayê de, yanî di valahiyê de ye.

Herweha ew li ser vê dinyayê ye jî û bi ronahî û germa xwe jiyana me hemûyan xweyî dike.

Goka êgir û tava li ser rûyê erdê, herdu eynî roj in.

Madem ku wusa ye, ma tiştekî ecêb e ku Xwedê û Îsa yek bin?

Îsa got: «Ez û Bav Xwedê yek in.» (Yûhenna 10:30)

Îsa Mesîh hat vê dinya me, da ku ronahiya Xwedê ya hezkirinê û ya xilasiyê ji me re bide xuyakirin.

Nivîsarên Pîroz li ser Xwedê û li ser Îsa Mesîh weha dibêjin:

Xwedayê me agirek e ku dixwe û tune dike (Îbranî 12:29)

Ew di ronahiya ku tu kes nikare nêzîk bibe de rûdine (Tîmotêyos I, 6:16)

Tu caran, tu kesî Xwedê nedîtiye, lê Kurê yekta, Xwedayê ku li ber singê Bav e, wî bi xwe ew da zanîn (Yûhenna 1:18)

Ew şewqa rûmeta Xwedê û xuyabûna rastîn ya cewhera wî ye. Ew her tiştî bi peyva xwe ya hêzdar hildigire. Piştî ku wî paqijbûna gunehan pêk anî, ew li jorê, li milê Yê Mezin ê rastê rûnişt (Îbranî 1:3)

Li Xwedê xweş hat ku hemû tijetiya wî di şexsê wî de be; hemû tijetiya Xwedêtiyê bi bedenî di şexsê Mesîh de ye. (Kolosî 1:19; 2:9)

Erê, Peyva Xwedê bi eşkereyî dibêje:

Hemû tijetiya Xwedêtiyê bi bedenî di şexsê Mesîh de ye. (Kolosî 2:9)

Ji ber vê yekê heqê Îsa Mesîh hebû ku bigota: «Ez û Bav Xwedê yek in.» (Yûhenna 10:30)

Îsa Mesîh Şivanê qenc e yê ku ji ezmên hatiye, ew bû mirov, li ser rûyê erdê jiya û jiyana xwe ya pîroz di ber me de da, da ku me ji nifra gunehên me xilas bike. Herweha ew ji nav miriyan rabû û jiyana herheyî pêşkêşî hemûyên ku baweriya xwe bi wî tînin, dike.

Ji ber vê yekê heqê Îsa hebû ku bigota:

[14] Ez şivanê qenc im… Ez ji bo miyan canê xwe didim… ez jiyana xwe didim, da ku ez wê dîsa bistînim. [18] Tu kes wê ji min nastîne, lê ez jiyana xwe ji ber xwe didim. Ez dikarim jiyana xwe bidim û dikarim dîsa bistînim jî.

Min ev emir ji Bavê xwe stand.» (Yûhenna 10:14-18)

Bêguman Îsa Şivanê qenc e; çimkî hezkirina wî ewqas mezin bû ku wî bi dilxwazî jiyana xwe di ber me de da.

Beriya ku em bernama xwe bi dawî bikin, em dixwazin careke din guhê xwe bidin van gotinên Îsa Mesîh ên newaze. Wî got:
9 «Derî ez im; yê ku bi destê min bikeve hundir, ewê xilas bibe.
10 Diz bi tenê ji bo dizîn, kuştin û telefkirinê tê. Lê ez hatim ji bo ku ji wan re jiyan hebe, jiyaneke bi firehî hebe.
11 Ez şivanê qenc im. Şivanê qenc ji bo miyan canê xwe dide.
12 Yê ku bi peran hatiye girtin û ne şivan e, kesê ku ne xwediyê miyan e, dema ku dibîne gur tê, miyan dihêle û direve. 14 Ez şivanê qenc im…
27 Miyên min dengê min dibihîzin, ez jî wan nas dikim û ew li pey min tên.
28 Ez jiyana herheyî didim wan û ew tu caran helak nabin û tu kes nikare wan ji destê min derxe.» (Yûhenna 10:9-12.14.27.28)

Guhdarên delal, ma hûn li pey kê diçin? Ma hûn li pey Şivanê qenc, an li pey yekî din diçin?

Gelek spas ku we qenc guhê xwe da van gotinên Îsa Mesîh.

Heta bernama ku bê, bila ev peyvên Îsa Mesîh li bîra we bin. Wî got:

«Derî ez im; yê ku bi destê min bikeve hundir, ewê xilas bibe…
Ez şivanê qenc im. Şivanê qenc ji bo miyan canê xwe dide.» (Yûhenna 10:9.11)

Me di hemû bernameyên xwe yên li ser Nivîsarên Pêxemberan de dît ku Xwedê hem pîroz û hem jî rastdar e û tu caran guneh qebûl nake.
Herweha me dît ku ew dilbirehm û dilovan e. Ev yek ji bo me mizgîniyeke pir şêrîn e, çimkî bêguman em hewceyê rehma wî ne. Em hemû li hember Xwedê rabûn, me hemûyan Xwedê êşandin; neheqî û gunehên me di çavê Xwedê de mekrûh in û eger rehma Xwedê li me neyê kirin, emê li gor gunehên xwe bên dîwankirin û helak bibin.
Îro û di bernama ku bê de em dixwazin du meseleyên ku Îsa ji xelkê re gotin, ji we re bixwînin. Bi van herdu meseleyan emê li ser dilovaniya Xwedê hîn bibin û emê bibînin ku gunehkar çawa dikarin rehm û kerema Xwedê bistînin.
Di mesela pêşî de emê li du zilaman binêrin.
Yekî ji wan rehma Xwedê nestand, lê yê din ew stand.
Yek ji wan herduyan ji nav komela Fêrisiyan bû; ew di duakirinê de, di rojiyê de û di dayîna xêran de gelek bi xîret bû. Di çavê mirovan de, ew ji Xwedê ditirsiya û zilamekî pirr dîndar bû.
Zilamê din bacgir bû û di çavê mirovan de ew gunehkarekî mezin bû, çimkî piraniya bacgiran ne dilsoz bûn.

Niha ji kerema xwe guhê xwe bidin mesela yê Fêrisî û Bacgir. Emê ji Mizgîniya Lûqa, deriyê 18’an bixwînn. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
9 Îsa ev mesele jî ji hinekên ku ji rastdariya xwe piştrast in û yên din kêm dibînin
re got: 10 «Du mirov hilkişiyan Perestgehê, da ku dua bikin. Yek ji wan Fêrisî bû
û yê din bacgir bû. 11 Yê Fêrisî li ser piyan rawesta û ji xwe re weha dua kir:
‹Ya Xwedê, ez şikir ji te re dikim ku ez ne wek mirovên din im: Ez ne rêbir, ne
neheq, ne zînakar, an jî ne wek vî bacgirê ha me. 12 Ez di heftiyê de du caran
rojiyê digirim û dehyeka hemû derameta xwe didim.› 13 Lê yê bacgir ji dûr ve
rawesta û nedixwest çavên xwe jî ber bi ezmên ve hilde; wî li singê xwe dixist û
digot: ‹Ya Xwedê, li min gunehkarî were rehmê!›

[14] Ez ji we re dibêjim: Ne yê Fêrisî, lê yê bacgir rastdar çû mala xwe. Çimkî her kesê ku xwe bilind bike, wê bê nizimkirin; lê yê ku xwe nizim bike, wê bê bilindkirin.» (Lûqa 18:9-14)

Dersa ku Îsa bi vê mesela kin hînî me dike, çi ye?
Bi kurtî, Îsa hîn kir ku Xwedê li wan ên ku sûc û neheqiya xwe qebûl dikin, tê rehmê. Ji aliyê din ve ew dîwana wan dike ên ku xwe di çavên xwe de li ber Xwedê rastdar hesab dikin. Nivîsarên Pîroz vê yekê weha şîrove dikin dibêjin: «Xwedê li hember pozbilindan disekine, lê keremê li nefsbiçûkan dike.» (Petrûs I, 5:5)
Tiştê ku di çavê mirovan de hêja ye, Xwedê kêm dibîne.
Mirov hene, dibêjin:
«Ez mirovekî rast im! Ez duayên xwe dikim! Ez ji malê xwe xêr û xêratan dikim! Ez diçim mizgeftê. Ez diçim dêrê! Ez vî tiştî dikim û vê jî dikim.»
Ma Xwedê wê wan mirovên ku weha pesnê xwe didin, qebûl bike?
Ma bi dilê Xwedê ye ku mirov bêje: «Ez û ez û ez!»?
Nexêr, Xwedê bi xêr û karên ku ji dilekî pozbilind tên, şa nabe.

Xwedê ji dilê pozbilind û qure nefret dike.
Gelo tê bîra we ku nixuriyê Adem Qayîn bi hewldana xwe dixwest nêzîkî Xwedê bibe? Ma Xwedê goriya wî qebûl kir? Na, Xwedê goriya wî qebûl nekir. Û heta îro jî dilê Xwedê bi hewldana mirov şa nabe, çimkî hemû hewldanên mirov di çavê Xwedê de ne temam in û ew bi qusûr in.
Xwedê ne li hewldana me dinêre, lê ew dixwaze ku em rewşa xwe, yanî gunehkariya xwe qebûl bikin. Bacgir li sîngê xwe xist û got: «Ya Xwedê, li min gunehkarî were rehmê!»
Dilekî weha şkestî, bi dilê Xwedê ye. Lê ew ji pozbilindiya wan ên ku xwe ji yên din qenctir dibînin, nefret dike.

Yê Fêrisî xwe bi yê bacgir re rû bi rû kir û ji xwe re got: «Ya Xwedê, ez şikir ji te re dikim ku ez ne wek mirovên din im: Ez ne rêbir, ne neheq, ne zînakar, an jî ne wek vî bacgirê ha me.»
Xwedê wê çawa mirovekî weha qebûl bike?

Yê Fêrisî fêm nekir ku di Roja Dawî de Xwedê wê me ne bi gunehkarên hê xerabtir re rû bi rû bike. Nexêr, lê ewê bala me bikişîne ser Şerîeta xwe ya pîroz û bêkêmahî, ya ku dibêje: Kî ku tevahiya Şerîetê pêk bîne û di tiştekî tenê de bikeve, li ber tevahiya wê sûcdar e. (Aqûb 2:10)
Çimkî Xwedayê ku gotiye: «Zînayê neke», gotiye jî: «Şahidiya derewîn neke». Îcar, eger tu zînayê nekî, lê tu şahidiya derewîn bikî, te Şerîeta Xwedê şkandiye. Madem ku wusa ye, tu nikarî bikevî bajarê ezmanî, yanî tu ji aliyê Xwedê ve nayêyî qebûlkirin bihiştê, çimkî Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Qet tiştekî murdar nakeve nav bajêr. Û yên ku pîsîtiyê dikin û derewan dikin jî, nakevin nav wî. (Peyxama Yûhenna 21:27)
Loma hemû zarokên Adem hewceyê rehm û dilovaniya Xwedê ne.
Hevalên delal, ma we jî wek bacgirê di vê meselê de, rehm û dilovaniya Xwedê standiye? An hûn hê diceribînin ku hûn bi hewldana xwe rastdar bibin?

Bi rastî dersa bernama îro ev e: Mirov çiqas hewl bide, ew nikare bi hêza xwe li Xwedê xweş bê û rastdar bê hesabkirin. Çimkî tu kes tune ku bikare tevahiya Şerîeta Xwedê pêk bîne. Mirov çiqas dîndar û bi xîret be jî, ew di çavê Xwedê de, ne bêkêmahî û bê qusûr e.
Loma Xwedê dixwaze ku her kes gunehkariya xwe bibîne û qebûl bike ku ew hewceyê rehma Xwedê ye. Û Xwedê rehma xwe bi vî awayî li me dike: Wî Îsa Mesîh şand dinyayê, da ku di ber gunehên me de bimire û bi vê yekê ji me re riya tobekirinê veke.
Di Nivîsarên Pîroz de tobekirin bi pêşkêşkirina goriyekê ve girêdayî ye û me gelek caran dît ku Îsa Mesîh hat dinyayê, da ku jiyana xwe bide û bibe goriya

herî dawî û goriya tam bêkêmahî. Loma di Încîlê de tobekirin her gav bi Îsa Mesîh ve girêdayî ye. Ew hat, da ku em bikarin ji dil û can tobe bikin û jiyaneke nû bistînin.

Guhdarên delal, çaxê ku mirov gunehên xwe eşkere dike û ji Xwedê rehmê dixwaze, Xwedê jê re dibêje: «Ez ji te hez dikim û ez bi şahî rehmê li te dikim, çimkî eger tu Îsa Mesîh Xilaskarê xwe qebûl bikî, gunehên te bi saya xwîna Mesîh paqij dibin û tu li ber min rastdar î.»

Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de li mesela diduyan binêrin.

Di vê meselê de emê bibînin ku dilê Xwedê wek dilê bavekî ku ji zarokên xwe hez dike ye. Navê vê mesela bi nav û deng ev e: Kurê windabûyî. Emê bibînin ku dilê Xwedê çiqas li mirovekî ku tobe bike, dişewite.

Em hêvîdar in ku hûn di vê bernamê de jî bi me re bin.

Heta hingê bila ev gotinên Nivîsarên Pîroz li bîra we bin:

Kî ku tevahiya Şerîetê pêk bîne û di tiştekî tenê de bikeve, li ber tevahiya wê sûcdar e. (Aqûb 2:10)

«Xwedê li hember pozbilindan disekine, lê keremê li nefsbiçûkan dike.» (Petrûs I, 5:5)

Bernama me ya din li ser mesela Yê Fêrisî û Yê Bacgir bû.
Niha em dixwazin herin ser meseleya diduyan, mesela Kurê Windabûyî.
Di Mizgîniya Lûqa, deriyê 15'an de dibêje:
1 Hemû bacgir û gunehkar ber bi Îsa ve hatin, da ku guhdariya gotinên wî bikin.
2 Lê Fêrisî û Şerîetzanan kirin pitepit û gotin: «Evê ha, gunehkaran qebûl dike
û bi wan re dixwe!»
3 Îsa ev mesele ji wan re got:
«Du kurên mirovekî hebûn.
12 Kurê biçûk ji bavê xwe re got: ‹Bavo, ka ji malê
xwe wê para ku ji min re dikeve, bide min.› Wî jî malê xwe li wan leva kir.
13 «Piştî çend rojan kurê biçûk her tiştê xwe da hev û çû welatekî dûr.
Li wir wî bi serserîtî malê xwe tert û bela kir.
14 Piştî ku wî her tiştê xwe mezaxt, xelayeke dijwar bi ser wî welatî de hat.
Ew ket tengahiyê
15 û çû xwe li yekî ji xelkên wî welatî girt; wî jî ew şand nav
erdên xwe, ber berazan.
16 Îcar ew minêkar bû ku zikê xwe bi wê xernûfa ku berazan dixwar, têr bike,
lê kesekî ew jî nedidayê.

17 Çaxê aqilê wî hat serê wî, wî got: ‹Ewqas palên bavê min hene ku xwarin ji
ber wan dimîne, lê ez li vê derê ji nêzan dimirim.
18 Ezê rabim, li bavê xwe
vegerim û jê re bêjim: Bavo, min li ber te û li hember ezmên guneh kiriye.
19 Êdî
ez ne hêja me ku ji min re ‹kurê te› bê gotin. Min bike wek yekî ji paleyên xwe.›

20 Ew rabû û li bavê xwe vegeriya. Lê hê ji dûr ve bavê wî ew dît û dilê wî bi
kurê wî şewitî. Ew bi lez ber bi wî ve çû û ew da ber singê xwe û ramûsand.
21 Kurê wî jê re got: ‹Bavo, min li ber te û li hember ezmên guneh kiriye. Êdî
ez ne hêja me ku ji min re kurê te bê gotin.›
22 Lê bav ji xulamên xwe re got: ‹Bilezînin û herin xiftanê herî qenc bînin û li
wî bikin, gustîlkekê bikin tiliya wî û pêlavekê bixin lingên wî.

[23] Conegayê dermalekirî bînin û serjêkin, da ku em bixwin û şahiyê bikin, [24]
çimkî ev kurê min mirî bû û va ye, rabûye, ew windabûyî bû û va ye, hatiye
dîtin.›
Û dest bi şahiyê kirin.

[25] «Di wî çaxî de kurê wî yê mezin li zeviyê bû. Gava wî dengê stran û govendê
bihîst, [26] wî gazî xulamekî kir û jê pirsî, ka çi bûye?
[27] Xulam jê re got: ‹Birayê te hatiye, bavê te conegayê dermalekirî serjêkiriye,
çimkî ew sax û silamet vegeriyaye.›
[28] Birayê mezin hêrs ket û nexwest ku here hundir. Bavê wî derket û jê hêvî kir.
[29] Lê wî ji bavê xwe re got: ‹Binêre, evqas sal in ku ez xizmeta te dikim û ez
tu caran ji gotina te derneketim, lê te tu caran karikek jî neda min, ku ez bi
dostên xwe re pê şa bibim. [30] Lê gava ev kurê te, yê ku malê te bi fahîşeyan re
xwar, vegeriya, te conegayê dermale ji wî re serjêkir.›
[31] Bav lê vegerand û got: ‹Lawo, tu hergav bi min re yî û her tiştê min, yê te ye.
[32] Lê diviya em şa bibûna û me şahî bikira, çimkî ev birayê te mirî bû û rabû, ew
windabûyî bû û hat dîtin.›»

Di vê meselê de sê zilam hene: Bav, kurê biçûk û kurê mezin.

- Pêşî em dixwazin li kurê biçûk binêrin.
Kurê biçûk li gor kêf û xwestina xwe kir û di welatekî dûr de bi serserîtî malê xwe tert û bela kir.
Lê di dawiyê de wî fêm kir ku wî li hember Xwedê û li hember bavê xwe sûc
kiriye. Dilê wî li ser gunehên wî xemgîn bû û wî got: «Ezê rabim, li bavê xwe
vegerim û jê re bêjim: Bavo, min li ber te û li hember ezmên guneh kiriye. [19] Êdî
ez ne hêja me ku ji min re ‹kurê te› bê gotin. Min bike wek yekî ji paleyên xwe.»
Yanî aqilê wî hat serê wî, wî dev ji berazan berda û vegeriya, çû mala bavê xwe.

- Eger em li helwesta bav binêrin, emê li ser wî çi bêjin? Ma ji ber ku kurê wî, malê wî tert û bela kiribû, ew hêrs bû û wî ew qebûl nekir? Nexêr! Îsa Mesîh got:
«Hê ji dûr ve bavê wî ew dît û dilê wî bi kurê wî şewitî. Ew bi lez ber bi wî ve çû û ew da ber singê xwe û ramûsand… Wî ji xulamên xwe re got: ‹Bilezînin û herin xiftanê herî qenc bînin û li wî bikin, gustîlkekê bikin tiliya wî û pêlavekê bixin lingên wî. [23] Conegayê dermalekirî serjêkin, da ku em bixwin û şahiyê bikin, [24] çimkî ev kurê min mirî bû û va ye, rabûye, ew windabûyî bû û va ye, hatiye dîtin.›.»

Li vir ders ji bo me ew e ku Xwedê tam wek wî bavî ye, çimkî dilê bav bi rehm û dilovaniyê tije bû.
Erê, Xwedê ji gunehkaran hez dike û dixwaze rehm û dilovaniya xwe li her yekî ji wan bike, lê ew li hêviya wan e heta ku her yek ji gunehên xwe vegere, tobe bike û biryara xwe bide ku di riya rastdariyê de here.

- Heçî kurê mezin e, me di helwesta wî de tiştekî ecêb dît.
Dilê wî ne wek dilê bavê wî bû. Dilê wî li birayê wî neşewitî. Bervajiyê vê, ew pir hêrs ket û nexwest ku bikeve hundir û lome ji bavê xwe kir, got:
«Evqas sal in ku ez xizmeta te dikim û ez tu caran ji gotina te derneketim, lê te tu caran karikek neda min, ku ez bi dostên xwe re pê şa bibim.»
Kurê mezin qet fêm nedikir ku daxwaza bavê wî ne ew bû ku kurê wî wek koleyekî keda xwe bide.
Daxwaz û hêviya bavê wî ew bû ku kurê wî ji dil û can ji bavê xwe hez bike û bi dilxwazî xizmeta wî bike.

Heta îro gelek mirov xwe bi tenê xulamên Xwedê hesab dikin. Lê belê Xwedê dixwaze ku em bibin kur û keçên wî.

Nivîsarên Pîroz li ser wan ên ku Mesîh Xudan û Xilaskarê xwe qebûl kirine, dibêjin:
We ruhê xulamtiyê yê ku careke din we dibe tirsê nestand, lê belê we ruhê kurîtiyê stand. Û em bi vî Ruhî «Abba - Bavo!» gazî dikin. (Romayî 8:15)
Erê, bi mana ruhanî em dibin kur û keçên wî!

Dostên me yên delal, ma hûn xwe xulamên Xwedê, an kur û keçên Xwedê hesab dikin?
Gelo ma hûn wek kurê biçûk in? Wî gunehê xwe dît û rehma bavê xwe stand.
An hûn wek kurê mezin in? Wî wek koleyekî ji bo bavê xwe keda xwe da.

Bi rastî, Xwedê naxwaze ku em wek koleyan bê dilê xwe xizmetê bikin û dilê me tije tirs be. Daxwaza Xwedê ew e ku hûn wek kur û keçên wî bin û ji dil û can ji wî hez bikin û bi dilxwazî emrên wî bînin cih.
Xwedê ji we hez dike û ew li benda we ye, da ku rehm û dilovaniya xwe li we bike. Ew li hêviya we ye ku hûn tobe bikin û li wî bizivirin.
Îşaya pêxember li ser van tiştan weha gotiye:
Xudan bêriya wê yekê dike ku keremê li we bike;
Ewê rabe ku rehmê li we bike.
Çimkî Xudan, Xwedayê dadperweriyê ye.
Xwezî bi wan hemûyên ku li hêviya wî dimînin. (Îşaya 30:18)

Xwedayê dilbirehm li benda te ye ku tu bi nefsbiçûkî dilê xwe bişkênî, bêyî ba wî û tobe bikî. Eger tu weha ji hemû dilê xwe li Xwedê bigerî, piştrast be ku ewê rastî te bê. Çimkî dilê wî ji dilê bavekî qenc bêtir bi rehm û dilovaniyê tije ye.

Guhdarên delal, em ji bo guhdarîkirina we gelek spas dikin. Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de binêrin ka Îsa çawa zilamekî mirî rakir.

Bila Xwedê ji bo fêmkirina dersên îro hiş û dilê we hemûyan veke. Û hûn vê yekê ji bîr nekin:

«Xwedê li hember pozbilindan disekine, lê keremê li nefsbiçûkan dike.»
(Petrûs I, 5:5)

Me di lêkolîna xwe ya Încîlê ya heta niha de dît ku gelek payenavên Mesîh, yanî yên Îsa hene. Ev payenav ji bo naskirina Îsa alîkariya me dikin. Me bihîst ku ev payenavên ha ji Îsa re tên gotin: Peyva ku di destpêkê de bi Xwedê re bû, Kurê Yê Herî Bilind, Kurê Mirov, Berxê Xwedê, Xilaskar, Nanê Jiyanê, Ronahiya Dinyayê, Xudanê Rûmetê, Derî û Şivanê Qenc.
Îro emê li du payenavên din binêrin. Ew jî ev in: Vejîn û Jiyan.

Me dît ku Îsa li seranserê welatê Cihûyan digeriya û xelk hîn dikir, qencî dikir, yên nexweş, yên kor, yên şil û şeht, yên felcî û yên cinoyî sax dikirin.
Elaletên mezin li pey wî diçûn, lê belê pisporên dîn û diyanetê, yanî Fêrisiyan, çavnebariya wî dikir. Wan nedikarî ne şehrezayiya hîndariya wî û ne jî kerametên nedîtî yên ku wî dikirin, înkar bikin.

Îro dîsa em dixwazin bi bûyerên Mizgîniya Xwedê, yanî bi bûyerên Încîlê berdewam bikin. Emê bibînin ku Îsa çawa kerameteke newaze kir û bi vê yekê rûmeta Xwedê ya ku di hundirê wî de bû eşkere kir, da ku mirov baweriya xwe bi wî bînin.
Emê niha ji Mizgîniya li gor Yûhenna, deriyê 11'an bixwînin. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

[1] Mirovek bi navê Lazar nexweş bû. Ew ji Beytanyayê, ji gundê Meryemê û
xwişka wê Mertayê bû. [2] Lazarê nexweş birayê Meryemê bû, ya ku rûnê
bîhnxweş li Xudan dabû û bi pora xwe lingên wî paqij kiribûn. [3] Herdu xwişkan
ji Îsa re xeber şandin û gotin: «Ya Xudan, yê ku tu jê hez dikî nexweş e.» [4] Lê
dema ku Îsa ev yek bihîst, wî got: «Ev nexweşî ne ji bo mirinê ye, lê belê ew ji
bo rûmeta Xwedê ye, da ku Kurê Xwedê pê bi rûmet bibe.»
[5] Îsa ji Mertayê, ji xwişka wê û ji Lazar hez dikir. [6] Lê dema bihîst ku Lazar
nexweş e, ew du rojên din jî li wî cihê ku lê bû ma.

(Ji xwe Îsa dizanibû ku Lazar wê bimira. Lê mebesta Îsa ew bû ku ew bi mirina Lazar, hêza Xwedê ya ku di hundirê wî de bû, eşkere bike, da ku xelk bawer bike ku ew ji ezmên hatiye nav wan.)

[7] Paşê - yanî piştî du rojan – wî ji şagirtên xwe re got: «Em dîsa herin Cihûstanê.»
[8] Şagirtan jê re got: «Mamoste, hê niha bû Cihû li kevirkirina te digeriyan, ma tu dîsa diçî wê derê?»
[9] Îsa bersîva wan da: «Ma di rojekê de diwanzdeh saet tunin? Dostê me Lazar bi xew ve çûye, lê ez diçim wî hişyar bikim.»
[12] Şagirtan jê re got: «Ya Xudan, eger ew ketibe xewê, ewê qenc bibe.»
[13] Îsa li ser mirina wî digot, lê wan guman kir ku ew li ser razana wî dibêje. [14] Li
ser vê yekê Îsa bi eşkereyî ji wan re got: «Lazar miriye. [15] Û ji bo we ez dilşa me
ku ez ne li wê derê bûm, da ku hûn bawer bikin. De niha rabin, em herin ba wî.»
[16] Hingê Tûmayê ku jê re Cêwî digotin, ji hevalên xwe yên şagirt re got: «Em jî herin, da ku em bi wî re bimirin.»
[17] Dema ku Îsa hat, wî dît ku beriya çar rojan Lazar kirine gorê. [18] Beytanya
nêzîkî Orşelîmê bû û li dora sê kîlometreyan jê dûr bû. [19] Gelek Cihû hatibûn ba
Merta û Meryemê, da ku ji ber mirina birayê wan di ber dilê wan de bên.
[20] Gava Mertayê bihîst ku Îsa tê, ew çû pêşiya wî. Lê Meryem li malê ma. [21]
Mertayê ji Îsa re got: «Ya Xudan, eger tu li vir bûyayî, birayê min nedimir. [22]
Niha jî ez dizanim tu çi ji Xwedê bixwazî, ewê bide te.»
[23] Îsa ji wê re got: «Birayê te wê dîsa rabe.»
[24] Mertayê lê vegerand: «Ez dizanim Roja Dawî, RojaVejînê ewê dîsa rabe.»
[25] Îsa ji wê re got: «Vejîn û jiyan ez im. Yê ku bawerî bi min anîbe, miribe jî
ewê bijî. [26] Û her kesê ku dijî û baweriyê bi min tîne, qet namire. Tu vê yekê
bawer dikî?»
[27] Mertayê ji wî re got: «Erê ya Xudan, ez bawer dikim ku tu Mesîh î, Kurê Xwedê yî, yê ku wê bihata dinyayê.»

28 Piştî ku wê ev got, çû gazî xwişka xwe Meryemê kir û bi dizî got: «Mamoste
li vir e û ew gazî te dike.» 29 Gava ku Meryemê ev bihîst, zû rabû çû ba Îsa… 32
Dema ku Meryem hat cihê ku Îsa lê bû, ew dît, xwe avêt lingên wî û got: «Ya
Xudan, eger tu li vê derê bûyayî, birayê min nedimir.»

33 Gava ku Îsa çav bi giriyê wê û bi giriyê Cihûyên ku pê re hatibûn ket, ji kûr ve
naliya û kederê ruhê wî girt. 34 Wî ji wan pirsî: «We ew li ku derê veşart?»
Wan jê re got: «Ya Xudan, were û bibîne.»
35 Îsa giriya. 36 Hingê Cihûyan got: «Binêrin, çiqas ji wî hez dikir!»
37 Lê hinekan ji wan got: «Ma yê ku çavên ê kor vekirin, nikaribû tiştekî bike ku
ev mirov jî nemire?»
38 Li ser vê yekê Îsa dîsa ji kûr ve naliya û gihîşt ser gorê. Gor şkeftek bû û
kevirek li ber derê wê bû. 39 Îsa got: «Kevir rakin.»
Xwişka yê mirî Mertayê ji wî re got: «Ya Xudan, êdî bîhn ketiyeyê, ev çar roj e
ku ew miriye.»
40 Îsa ji wê re got: «Ma min ji te re negot, eger tu bawer bikî, tê rûmeta Xwedê
bibînî?»
41 Îcar kevir rakirin. Îsa çavên xwe ber bi jor ve hilda û got: «Bavo, ji ber ku te
ez bihîstim, ez ji te re şikir dikim. 42 Ez dizanim ku tu hergav min dibihîzî, lê
min ev ji bo elaleta li hawirdorê rawestayî got, da ku bawer bikin ku te ez
şandime.»
43 Piştî ku wî weha got, ew bi dengekî bilind qîriya: «Lazar, were derve!»
44 Yê mirî, dest û ling bi caw pêçayî û serçavê wî bi destmalekê nixamtî derket
derve. Îsa ji wan re got: «Wî vekin û bihêlin bila here.» (Yûhenna 11:1-44)

Erê, guhdarên hêja, Îsa Mesîh zincîrên mirinê şkênandin!
Beriya ku em bala xwe bidin dawiya vê serhatiyê, wê qenc be ku em hinekî li
ser vê kerameta mezin bifikirin.

Ji damezrandina dinyayê û heta îro jî tu kesî nebihîstiye ku hêza yekî hebe ku sê an çar rojan piştî mirina mirovekî bikare wî ji nav miriyan rake.
Me bihîst ku Lazar çar rojan di gorê de ma û bîhn jî ketibû wî. Lê belê Îsa Mesîh tam ev yek kir: Wî Lazarê mirî piştî çar rojan ji nav miriyan rakir.

Hêza mirinê ji Îsa Mesîh re nebû asteng, çimkî ew bi xwe hem Peyva Xwedê bû û hem jî ew bi xwe Jiyan e  û ji ezmên hatiye.
Wî jiyana xwe ji tu kesî nestandiye. Wek ku Xwedê bi xwe jiyan e, wusa jî Mesîh bi xwe jiyan e. Herweha, wek ku Xwedê dikare mirovên mirî ji nav miriyan rake, wusa jî, Mesîh dikare li gor daxwaza xwe can bide her kesî, çimkî ew bi xwe Serkaniya Jiyanê ye.
Loma çaxê ku Îsa gazî Lazar kir ku ji gorê derkeve, laşê wî nûvejen bû, ew rabû û li ber çavên hemûyan ji gorê derket. Ji ber vê yekê Îsa ji xwişka Lazar re gotibû: «Vejîn û jiyan ez im. Yê ku bawerî bi min anîbe, miribe jî ewê bijî.»

Guhdarên delal, ma hûn ji wan gotinên Îsa Mesîh ên newaze bawer dikin?
Ma we baweriya xwe bi Mesîh aniye û jiyana we ya herheyî heye?

Di bernama ku bê de Xwedê hez bike emê li dawiya vê serhatiyê binêrin. Ji bo vê yekê jî bi me re bin!

Heta hingê qenc li ser van gotinên Îsa bifikirin. Wî got:
«Vejîn û jiyan ez im. Yê ku bawerî bi min anîbe, miribe jî ewê bijî.»

Di bernama din de me bihîst ku Îsa çawa li ber çavê gelek mirovan Lazarê mirî ji nav miriyan rakir.
Me dît ku bêguman hêza Îsa Mesîh heye ku ew bikare yên mirî jî rake, çimkî ew bi xwe serkaniya jiyanê ye.

Niha emê li dawiya vê bûyerê binêrin, da ku em bibihîzin piştî ku Cihûyan dît ku Îsa çawa Lazar ji nav miriyan rakir, wan çi kir.
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
45 Gelek Cihûyên ku hatibûn ba Meryemê û tiştên ku Îsa kiribûn dîtin, bawerî bi
wî anîn. 46 Lê hinek ji wan jî çûn ba Fêrisiyan û tiştên ku Îsa dikirin ji wan re
gotin. 47 Îcar Fêrisî û serekên kahînan, civîna giregiran gazî ba hev kirin û gotin:
«Emê çi bikin? Ev mirov gelek nîşanan çêdike. 48 Eger em wî weha bihêlin,
hemû kes wê baweriyê bi wî bîne û Romayî jî wê bên, wê hem cihê me yê pîroz
û hem jî miletê me ji holê rakin.»

49 Yekî ji nav wan, Qeyafayê ku wê salê Serokkahîn bû ji wan re got: «Hûn qet
tiştekî fêm nakin. 50 Ma hûn nafikirin, ji bo ku tevahiya milet helak nebe, di
oxira gel de mirovek bimire, ji bo we çêtir e.» 51 Wî ev ji ber xwe negot, lê ji ber
ku ew Serokkahînê wê salê bû, wî pêxemberîtî kir ku Îsa wê ji bo milet bimire.
52 Ne tenê di oxira wî miletî de, lê ewê ji bo civandin û yekîtiya zarokên Xwedê
yên belavbûyî jî bimira. 53 Îcar ji wê rojê ve şêwira kuştina Îsa kirin.
54 Loma Îsa êdî bi eşkereyî di nav Cihûyan de negeriya. Lê ew ji wê derê derket,
çû herêmeke nêzîkî çolê, bajarê ku jê re Efrayîm digotin û bi şagirtên xwe ve li
wê derê ma.

55 Cejna Derbasbûnê ya Cihûyan nêzîk bû. Gelek kesên ji gundên hawirdor, ji bo
ku li gor adetan xwe paqij bikin, beriya Cejna Derbasbûnê hilkişiyan Orşelîmê.
56 Ew li wê derê li Îsa digeriyan û gava li Perestgehê radiwestan, ji hevdû

dipirsîn: «Hûn çi dibêjin? Ma ew qet nayê cejnê?» [57] Fêrisî û serekên kahînan jî emir derxistibûn ku, eger kesek bizane ew li ku derê ye, bila haya wan pê bixe, da ku wî bigirin. (Yûhenna 11:45-57)

[1] Îcar şeş roj beriya Cejna Derbasbûnê, Îsa hat Beytanyayê; Lazarê ku Îsa ew ji nav miriyan rakiribû li wir rûdinişt. [2] Li wê derê wan ziyafetek da wî. Mertayê xizmet dikir. Lazar jî yek ji wan kesan bû, yên ku bi Îsa re li ser sifrê rûdiniştin.
[3] Meryemê ji rûnê narda xurû yê pirr hêja lîtrek Romayî bi lingên Îsa de kir û di pey de bi porê xwe lingên wî zuwa kirin. Tevahiya malê bi bîhna rûnê nardê tije bû. [4] Lê yekî ji şagirtên wî, Cihûdayê Îsxeryotî - yê ku wê paşê ew bida dest - got: [5] «Çima ev rûnê bîhnxweş bi sê sed zîvî nehat firotin û li belengazan nehat belavkirin?»
[6] Wî ev ne ji bo ku xema belengazan dixwar, lê ji ber ku ew diz bû got. Xelîtka peran bi wî re bû û tiştê ku diketê jê didizî.
[7] Îsa got: «Dev ji jinikê berde. Bila vî ji bo roja ku ez bêm veşartin hilîne. [8] Belengaz hergav di nav we de ne, lê ez hergav ne li ba we me.»

[9] Dema ku elaleteke mezin ji Cihûyan bihîst ku Îsa li wê derê ye, ew hatin; ew ne bi tenê ji bo Îsa hatin, lê ji bo ku Lazarê ku wî ji nav miriyan rakiribû jî bibînin. [10] Îcar serekên kahînan şêwira kuştina Lazar jî kirin. [11] Çimkî ji rûyê wî gelek Cihû diçûn bawerî bi Îsa dianîn. (Yûhenna 12:1-11)

Îro gelek wextê me nemaye, lê beriya ku em xatiran ji we bixwazin, wê qenc be ku em li ser xaleke girîng bifikirin.
Gelo tê bîra we gava rêberên dîn û diyanetê li ser kerameta ku Îsa kiribû bihîstin, wan çi kir?
Rakirina Lazar nîşaneke mezin bû û tu kesî ji wan Fêrisiyan newêribû ku ev keramet înkar bikira, çimkî her kesî bi çavê xwe dît ku Lazar ji nav miriyan rabû û dîtin ku ew zindî ye. Îcar serekên kahînan û giregirên din çi kirin?

Ma wan tobe kir, ji gunehên xwe vegeriyan û bawer kirin ku bi rastî Îsa ew Mesîh e yê ku ji ezmên hatiye. Nexêr, wan tobe nekir.
Hemû kerametên nedîtî û hemû nîşanên wî nebûn sedem ku kahînan û giregirên gel tobe bikiran, ji gunehên xwe vegeriyan û Îsa hem Mesîh û hem jî Xilaskarê xwe qebûl bikiran.

Madem ku wusa ye, serekên kahînan çi kirin?
Bi rastî, wan hê bêtir ji Îsa nefret kir û şêwirîn ku ewê çawa wî bikujin.
Ne tenê ev, lê wan dixwest ku Lazarê ku Îsa ew rakiribû jî bikujin, çimkî ji ber rabûna wî ya ji nav miriyan, gelek Cihûyan dev ji kahînan berda û li pey Îsa çûn.
Dilê wan rêberên dîn û diyanetê çiqas ji Xwedê dûr bû! Durûtiya wan çiqas mezin bû! Wan ne ji Xwedê û ne jî ji rastiyê hez dikir.
Wan çavên xwe li kerametên Îsa, yanî li nîşan û delîlên ku wî pêşkêşî wan dikir, neqandin. Ew bi tenê li ser navûdengiya xwe, li ser siyaneta xwe û li ser adetên bav û kalên xwe difikirîn.
Îcar wan şêwira kuştina Îsa dikir, çimkî tirsa wan ew bû ku hemû Cihû wê dev ji wan berdin û li pey Îsa biçin. Loma wan nexwest ku Îsa sax bimîne.

Dostên delal, hûn li ser wan rêberên dîn û diyanetê çi difikirin?
Ma kê ev kîn û nefreta ji Îsa Mesîh xist hişê wan?
Kê daxwaza kuştina Mesîh xist dilê wan? Bi rastî di van tiştan de rêberê wan Îblîs bû.
Îblîs ji Xwedê û ji Mesîh nefret dike. Îblîs guman dikir ku ewê bikare bi kuştina Îsa, plana Xwedê pûç derxe. Wî dizanibû ku daxwaza Xwedê ji destpêkê ve ew bû ku zarokên Adem ji hêza Îblîs xilas bibûna. Loma mebesta Îblîs ew bû ku rêberên gel Îsa bikuştan.
Lê belê Îblîs qet fêm nedikir ku li gor plana Xwedê, mirina Mesîh pêwist bû, da ku zarokên Adem ji hêza Îblîs xilas bibûna. Erê, plana Xwedê ya sereke ew bû ku Mesîh ji bo me bimira!

Herweha Îblîs û yên ku li pey wî diçûn qet fêm nekiribûn ku hêza Îsa Mesîh ji hêza mirinê meztir e. Mirinê nikaribû ew bindest bikira û gorê jî nikaribû ew bigirta, çimkî Îsa hem vejîn û hem jî jiyan e. Loma wî ji xwişka Lazar re tam rast got. Wî got: «Vejîn û jiyan ez im. Yê ku bawerî bi min anîbe, miribe jî ewê bijî. [26] Ma tu bi vê yekê bawer dikî?» (Yûhenna 11:25.26)

Bernama me li vir bi dawî dibe, lê em bi şahiyeke mezin li benda we ne ku hûn di bernamên ku bên de jî bi me re bin. Emê di xwendina Încîlê de berdewam bikin û emê bibînin ku Îsa Mesîh çawa ket Orşelîmê û bi vê yekê careke din gotinên pêxemberan anîn cih.

Çaxê ku hûn li ser mana van gotinên Mesîh bifikirin, bila Xwedê bi xwe mamosteyê we be. Mesîh weha got:

«Vejîn û jiyan ez im. Yê ku bawerî bi min anîbe, miribe jî ewê bijî. Ma tu bi vê yekê bawer dikî?» (Yûhenna 11:25.26)

Me di bernameyên beriya niha de dît ku Îsa Mesîh çawa zilamekî ku çar rojan di gorê de mabû, ji nav miriyan rakir.
Hêza mirinê ji Îsa re qet nebû asteng, çimkî ew bi xwe vejîn û jiyan e.
Îro emê bibînin ku Îsa çawa ket Orşelîmê.
Îsa ji pêşî ve her tiştê ku li wî bajarî wê bihata serê wî dizanî:
Wî dizanî ku rêberên dînê Cihûyan wê ew radestî Romayiyan bikira, da ku cefayê bidin wî û wî xaç bikin. Lê dîsa jî wî biryara xwe da ku here Orşelîmê.
Încîl li ser vê yekê weha dibêje:
51 Çaxê rojên hilkişandina wî nêzîk dibûn, Îsa berê xwe da Orşelîmê, da ku here wê derê. (Lûqa 9:51)
Dema ku Îsa ber bi Orşelîmê ve diçû, wî ji şagirtên xwe re got:
Imadeke min heye ku divê ez pê imad bibim û ez çiqas reht im, heta ku ew temam bibe. (Lûqa 12:50)
Me beriya niha dîtibû ku mana imadê carna mirin e û bi van gotinan, Îsa Mesîh ji şagirtên xwe re diyar kir ku ewê li Orşelîmê bimire, yanî wê bê xaçkirin.

Çima Îsa ji dil biryar da, ku here Orşelîmê? Bi rastî ew çû Orşelîmê, da ku jiyana xwe radestî wan ên ku wê ew bikuştan, bike. Ev çiqas ecêb e!

Eger hûn bizanin ku di bajarekî de mirovên ku bixwazin cefayê bidin we û li kuştina we bigerin hene, ma bi rastî hûnê biryara xwe bidan ku herin wî bajarî? Tiştê ku Îsa Mesîh kir, tam ev bû. Îsa dizanî, ew hatiye dinyayê, da ku di ber gunehên dinyayê de bibe gorî. Îsa nehat vê dinyayê, da ku bi kêfa jiyana vê dinyayê şa bibe, lê ew hat, da ku ew gotinên pêxemberan bîne cih.
Pêxemberan digot: Mesîh wê cefayê bikişîne û li çiyayê ku Birahîm ji dêla kurê xwe berx kiribû gorî, xwîna xwe birijîne.
Diviya ku mînak û nîşana gorîkirina berxan di mirina Îsa de bihata cih.

Loma Îsa çû Orşelîmê û bi rastî ew bajar ji bo wî wek kortala şêrên birçî bû, yên ku li benda nêçîrê bûn.

Niha emê xwendina Încîlê berdewam bikin. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
32 Ew li ser rê bûn û hildikişiyan Orşelîmê.
Îsa li pêşiya wan diçû, şagirt ecêbmayî diman û ew kesên li paş dihatin ditirsiyan. Îsa dîsa her diwanzdeh kişandin aliyekî û dest pê kir ew tiştên ku wê bihatana serê wî ji wan re got. (Marqos 10:32)
Wî got: «Va ye, em derdikevin Orşelîmê û hemû tiştên ku bi destê pêxemberan li ser Kurê Mirov hatine nivîsîn, wê bên cih. (Lûqa 18:31)
Kurê Mirov wê bê dayîn destê serekên kahînan û Şerîetzanan.
Ewê cezayê mirinê li ser wî bidin û wî bidin destê miletan.
34 Ewê tinazên xwe bi wî bikin, tif bikinê, bidin ber qamçiyan û wî bikujin.
Û piştî sê rojan ewê ji nav miriyan rabe.» (Marqos 10:33.34)

34 Lê şagirtan tu tişt fêm nekir. Ev peyv ji wan re veşartî ma.
35 Çaxê Îsa nêzîkî Erîhayê dibû, yekî kor li tenişta rê rûniştibû û pars dikir. 36
Gava wî bihîst ku elaletek dibihûre, pirsî û got: «Ev çi ye?»
37 Lê vegerandin û gotin: «Îsayê Nisretî dibihûre.»
38 Yê kor kir qîrîn û got: «Ya Îsa, Kurê Dawid, li min were rehmê!»
39 Û yên ku di pêşiyê de diçûn, lê hilatin, da ku ew dengê xwe bibire; lê wî hê bêtir kir qîrîn û got: «Ya Kurê Dawid, li min were rehmê!»
40 Îsa rawesta, emir kir, ku yê kor bînin ba wî. Û gava yê kor nêzîk bû, Îsa ji wî
pirsî: 41 «Tu çi dixwazî ku ez ji te re bikim?»
Wî got: «Ya Xudan, bila çavên min bibînin.»
42 Îsa jî ji wî re got: «Bila çavên te bibînin, baweriya te tu xilas kirî.»
43 Wî jî di cih de dît, li pey Îsa çû û pesnê Xwedê da û hemûyên ku ev yek dîtin, rûmet dan Xwedê. (Lûqas 18:34-43)

1 Gava ku ew nêzîkî Orşelîmê bûn û hatin Beytfacê li ba Çiyayê Zeytûnê, Îsa du
şagirtên xwe şandin û 2 ji wan re got: «Herin gundê pêşberî xwe, hema hûnê li
wir kereke girêdayî ya bi dehşik bibînin. Wan vekin û ji min re bînin. 3 Eger
kesek tiştekî ji we re bêje, jê re bêjin: ‹Ew ji Xudan re lazim in û ewê zû wan bi
şûn de bişîne.›»
4 Ev wusa çêbû, da ew peyva ku bi devê pêxember hatibû gotin, bê cih: 5«Ji
bajarê Siyonê re bêjin:
‹Va ye, Padîşahê te bi nefsbiçûkî li kerê siwarbûyî,
Li dehşikê, yanî li dehşikê kerê siwarbûyî tê ba te.›»

6 Şagirt çûn û wek ku Îsa ji wan re gotibû kirin. 7 Wan ker û dehşik anîn,
cilên xwe danîn ser wan û Îsa siwar bû.
8 Elaleteke mezin cilên xwe li ser rê raxistin. Hinekên din jî ji daran çiqil birrîn û
avêtin ser rê. 9 Elaleta ku li pêşiya wî diçû û yên ku li pey dihatin weha diqîriyan
û digotin: «Hosanna ji Kurê Dawid re! Yê ku bi navê Xudan tê pîroz be!
Li bilindahiyên herî jorîn Hosanna!» (Metta 21:1-9)

39 Hin ji Fêrisiyên ku di nav wê elaletê de bûn, ji Îsa re gotin: «Mamoste, dengê
xwe li şagirtên xwe hilde!»
40 Îsa li wan vegerand û got: «Ez ji we re dibêjim: Eger ew bêpêjin bimînin,
kevir wê dengê xwe hildin.»
41 Çaxê Îsa nêzîk bû, bajar dît û li ser wî giriya 42 û got: «Xwezî îro te jî ev tiştên
ku ji bo aştiya te ne bizaniyana! Lê niha ew ji ber çavên te hatine veşartin…
çimkî te wextê serdana xwe nezanî.» (Lûqas 19:39-41.44)

10 Gava Îsa ket Orşelîmê, tevahiya bajêr hejiya û gotin: «Ev kî ye?»
11 Elaletê got: «Ev Îsa pêxember e! Ji bajarê Nisreta Celîlê ye.»
12 Îsa ket Perestgehê û hemû yên ku li wê derê kirrîn û firotin dikirin, avêtin
derve. Maseyên pereguhêran û kursiyên kevokfiroşan gêr kirin.

[13] Wî ji wan re got: «Hatiye nivîsîn: ‹Wê ji mala min re mala duayê bê gotin.› Lê hûn wê dikin ‹şkefta rêbiran›.»

[14] Li Perestgehê, kor û şil û şeht anîn ba wî û wî ew qenc kirin.
[15] Lê gava ku serekên kahînan û Şerîetzanan karên nedîtî yên ku Îsa dikirin dîtin
û dengê zarokan bihîstin ên ku di Perestgehê de digotin: «Hosanna ji Kurê
Dawid re!», hêrs bûn [16] û gotin: «Ma tu nabihîzî ku ev zarok çi dibêjin?»
Îsa li wan vegerand û got: «Belê, ma we ev yek qet nexwendiye: ‹Te ji devê
zarokên biçûk û yên li ber şîr pesin deranî.›» (Metta 21:10-16)

[18] Serekên kahînan û Şerîetzanan ev bihîstin û dest pê kirin li riyên kuştina wî geriyan. Ew ji wî ditirsiyan, çimkî tevahiya elaletê li hînkirina wî gelek şaş dima. (Marqos 11:18)

Guhdarên delal, me îro dît ku Îsa çawa li dehşikê kerê siwarbûyî ket Orşelîmê. Xelkê Orşelîmê pesnê wî dida û dixwestin ku ew bibe padîşahê wan.
Lê belê wan fêm nekir ku Îsa çima hat bajarê wan û şagirtên wî jî li mana vê yekê şaş man û fêm nekirin ku çi wê çêbûya.
Hêviya wan ew bû ku Îsa wê gelê Cihû ji destê dijminên wan rizgar bikira. Lê belê Îsa nehat ku hukumdariya Romayiyan helak bike, lê ew hat ku hukumdariya Îblîs helak bike. Ew nehat ku vê dinya xerab biguhere, lê ew hat ku dilê mirovan ê bi guneh biguhere.

Dostên hêja, em ji bo bernama ku bê jî li hêviya we ne.
Heta hingê Xwedê bi we re be!

Me di bernama din de dît ku Îsa êdî li seranserê welêt negeriya, lê hat paytextê welatê Îsraêl, yanî hat bajarê Orşelîmê.
Xelkê bajêr ew bi dilekî şa qebûl kir, lê wan qet fêm nekir ku Îsa Mesîh çima hatiye bajarê wan. Herweha şagirtên wî jî li mana vê yekê şaş man û fêm nekirin ku çi wê çêbûya.
Loma Îsa Mesîh careke din ji wan re tiştên ku wê bihatan serê wî, şîrove kirin û ji wan re got:
23 «Saeta ku Kurê Mirov bê birûmetkirin hat. 24 Bi rastî, bi rastî ez ji we re
dibêjim, heta ku liba genim nekeve erdê û nemire, bi tenê dimîne, lê eger ew bimire, gelek ber dide.
27 «Niha dilê min ketiye tengiyê. Ez çi bêjim? Ma ez bêjim: ‹Bavo, min ji vê
saetê xilas bike›? Na, ji bo vê yekê ez hatime vê saetê. 28 Bavo, navê xwe bi
rûmet bike.»
Li ser vê yekê dengek ji ezmên hat [û got]: «Min ew bi rûmet kir û ezê dîsa wî bi rûmet bikim.»
29 Ew elaleta ku li wê derê rawesta bû û ev bihîst, got: «Ezmên kir xurexur.»
Hinekan jî digot: «Milyaketek bi wî re peyivî.»
30 Îsa bersîv da û got: «Ev deng ne ji bo min, lê ji bo we hat. 31 Niha dema
dîwana vê dinyayê ye; niha serokê vê dinyayê wê bê avêtin derve. 32 Çaxê ku ez
ji erdê ber bi jor ve bêm hildan, ezê hemûyan ber bi xwe ve bikişînim.»
33 Wî bi vê gotinê îşaret kir, ka ewê bi mirineke çawa bimire. (Yûhenna 12:23-24.27-33)

Guhdarên delal, me di bernama din de dît ku Îsa çawa li dehşikê kerê siwarbûyî ket Orşelîmê. Me bihîst ku xelkê Orşelîmê pesnê wî dida û dixwestin ku ew bibe padîşahê wan.
Lê belê wan fêm nekir ku Îsa ne ji bo vê yekê hatibû dinyayê.

Îsa nehat ku hukumdariya Romayiyan helak bike, lê ew hat ku hukumdariya Îblîs helak bike. Ew nehat ku vê dinya xerab biguhere, lê ew hat ku dilê mirovan ê bi guneh biguhere.
Dostên delal, gelek mirov rabûn û hukumdariya filan kes û bêvan kes xera kirin û ji bo demekê dîroka dinyayê guhertin. Lê bi rastî ji Îsa Mesîh pê ve tu kes tune ku soz dabe mirovan ku ewê dilê me biguhere û tu kes tune ku bikare dilê me biguhere jî.
Erê, rast e, rojekê Îsa Mesîh wê vegere vê dinyayê û hingê ewê dîwana hemû miletan bike û ewê vê dinyayê nûvejen bike.
Lê belê çaxê ku ew cara pêşî hat dinyayê, ew hat ku bimire, yanî ew hat, ku jiyana xwe bike gorî.
Ew li gor soza Xwedê hat, da ku zarokên Adem ji cezayê gunehên wan xilas bike. Û wek ku me di gelek bernameyên beriya niha de dît, ew demeke dirêj bû ku pêxemberên Xwedê ev yek didan zanîn.

Nivîsarên Pîroz berdewam dikin û weha dibêjin:

[47] Îsa her roj di Perestgehê de hîn dikir. Serekên kahînan, Şerîetzan û giregirên
gel dixebitîn ku wî bikujin, [48] lê wan nikaribû tiştekî bibînin ku bi wî bikin,
çimkî tevahiya xelkê ji dil guhdariya wî dikir.

[1] Rojekê, çaxê wî di Perestgehê de xelk hîn dikir û Mizgînî dida, serekên
kahînan, Şerîetzan û rihspî tevde bi ser de hatin [2] û jê re gotin: «Ji me re bêje, tu
van tiştan bi çi desthilatiyê dikî, an yê ku ev desthilatî daye te kî ye?» [3] Îsa li
wan vegerand û got: «Ez jî, ezê tiştekî ji we bipirsim, ka ji min re bêjin: [4]
Imadkirina* Yûhenna* ji ezmên bû, an ji mirovan bû?» [5] Ew bi hevdû şêwirîn û
gotin: «Eger em bêjin: ‹Ji ezmên e›, ewê bêje: ‹Çima we ji wî bawer nekir?› [6] Û
eger em bêjin: ‹Ji mirovan e›, ji xwe tevahiya xelkê wê me bide ber keviran,
çimkî ew qenc bawer dikin ku Yûhenna pêxember e.» [7] Îcar wan lê vegerand û

gotin: «Em nizanin ji ku derê ye.» 8 Îsa ji wan re got: «Ez jî ji we re nabêjim ku
ez van tiştan bi çi desthilatiyê dikim.»

9 Îsa dest pê kir, ev mesele ji xelkê re got:
«Mirovekî rezek çand, ew bi kirê da rezvanan û ji bo demeke dirêj çû welatekî
din. 10 Û di demsala rêz de wî xulamek şand ba rezvanan, da ku ji berê rêz bidin
wî. Lê rezvanan li wî xist û ew destvala şandin. 11 Hingê wî xulamekî din şand,
wan li wî jî xist, riswa kirin û destvala şandin. 12 Yê sisiyan jî şand, ew jî
birîndar kirin û avêtin derve.
13 Xwediyê rêz jî got: ‹Gelo ez çi bikim? Ezê kurê xwe yê delal bişînim, belkî
ew siyaneta wî bigirin.›
14 Lê gava rezvanan ew dît, bi hevdû şêwirîn û gotin: ‹Ev wêris e. De werin, em
wî bikujin, da ku mîras ji me re bimîne.›
15 Wan ew avêt derveyê rêz û kuştin. Ma îcar xwediyê rêz wê çi bi wan bike? 16
Ewê bê, van rezvanan helak bike û wê rêz bide hinekên din.»
Gava wan ev yek bihîst, gotin: «Xwedê neke!»
17 Lê Îsa li wan nêrî û got: «Nexwe eva ku hatiye nivîsîn çi ye?
‹Ew kevirê ku hostayan red kir bû kevirê serê rikin.›
18 Her kesê ku bi ser wî kevirî de bikeve, wê bibe perçe perçe û ew kevir bi ser
kê de bikeve, wê wî hûrhûr bike.»
19 Şerîetzan û serekên kahînan xwestin ku di cih de dest bavêjin wî, çimkî wan
fêm kir, ku Îsa ev mesele anî ser wan, lê ew ji xelkê tirsiyan. (Lûqa 19:47-20:19)

Îsa bi vê mesela rêz û rezvanên xerab, ew ên ku li kuştina wî digeriyan, hişyar kirin.

Ma hûn mana vê meselê qenc fêm dikin? Bi rastî şîrovekirina wê ne zehmet e.

Di vê meselê de xwediyê rêz Xwedê ye.

Rez bi xwe gelê Îsraêl e.

Rezvanên xerab, rêberên dîn û diyanetê yên gelê Cihû ne.

Xulamên xwediyê rêz ên ku wî şandin ku berê rêz bistînin, pêxemberên Xwedê ne. Rezvanan, yanî rêberên gelê Cihû tengahî dan wan hemûyan.
Îcar kurê xwediyê rêz ê ku ji aliyê rezvanên xerab ve hat kuştin, Îsa Mesîh e.

Çaxê ku em mana vê meselê rast bizanin, hingê zû kifş dibe ku kahîn û Şerîetzan çima ewqas hêrs ketin. Wan bi zelalî fêm kir ku Îsa li ser wan got. Wan dît ku Îsa ew bi rezvanên xerab ên ku li xulamên xwediyê rêz xistin û di dawiyê de kurê wî kuştin re rû bi rû kirin.
Îsa ew gunehbar kirin, ji wan re got ku ew ne tenê gotinên pêxemberan înkar dikin, lê ewê Kurê Yê Herî Bilind Mesîh jî bikujin.
Herweha Îsa ne tenê ev mesele ji wan re got, lê wî ayeteke Zebûrê jî ya ku li ser Mesîh dibêje, anî bîra wan û got:
‹Ew kevirê ku hostayan red kir bû kevirê serê rikin.›
18 Her kesê ku bi ser wî keviri de bikeve, wê bibe perçe perçe û ew kevir bi ser kê de bikeve, wê wî hûrhûr bike.

Bi van gotinan wî bi awayekî veşartî ji wan re got ku ew bi xwe Mesîh e. Wî ew hişyar kirin û nîşanî wan da ku ew Xilaskarê ku Xwedê şandiye – yê ku wan înkar dikir û dixwestin bikujin – rojekê wê dadgerê wan be.

Dostên delal, wextê me derbas dibe û em ji bo guhdarîkirina we gelek spas dikin.
Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de hê bêtir li ser Îsa Mesîh û serwerên dîn û diyanetê bibihîzin.

Heta hingê li ser van peyvên Încîlê bifikirin. Nivîsarên Pîroz li ser Mesîh weha dibêjin:

Ew li dinyayê bû û dinya bi wî afirî. Lê dinyayê ew nas nekir. (Yûhenna 1:10)

Di bernama me ya din de me dît ku Mesîh, yanî Îsa çawa ket Orşelîmê. Wî dizanî ku Orşelîm bajarê wan kahîn û Şerîetzanan e, yên ku li kuştina wî digeriyan.
Wî her tiştê ku wê bihata serê wî dizanibû, lê ev yek jê re nebû asteng ku neçe Orşelîmê. Îsa dizanî ku ew hatiye dinyayê, da ku jiyana xwe ji bo gunehên mirovan bike gorî. Wî dizanî ku piştî çend rojên din, kahînan wê ew bigirta û xaç bikiran.

Loma, guhdarên delal, hûn îro li ku derê bin, li wê derê bin, em ji we hêvî dikin ku hûn qenc bala xwe bidin gotinên Îsa Mesîh.
Emê bibihîzin ku wî çawa serwerên Cihûyan hişyar kirin û ew li ser durûtî û xerabiya wan haydar kirin.

Wek ku me dît, Îsa ket Orşelîmê û her roj diçû Perestgehê û xelk hîn dikir.
Û her roj Şerîetzan û serwerên dîn û diyanetê li fersendekê digeriyan ku wî bi gotina wî bigirin û derxin ber dîwanê, da ku wî bikujin.
Lê belê ew ji xelkê ditirsiyan, çimkî xelkê bi dilxwazî guhê xwe dida her gotina Îsa.

Di Mizgîniya li gor Lûqa, deriyê 20’an de Nivîsarên Pîroz dibêjin:
20 Çavê Şerîetzan û serekên kahînan li Îsa bû û wan casûsên ku xwe rast nîşan
didan, şandin ba wî, da ku ew wî bi xebera wî bigirin û derxin ber dîwan û
desthilatiya walî. 21 Wan ji wî pirsî û gotin: «Mamoste, em dizanin ku tu rast
dibêjî û hîn dikî. Tu cihêtiyê naxî nav mirovan, lê belê tu riya Xwedê rast hîn
dikî. 22 Îcar ma ji bo me çêdibe ku em bacê bidin Qeyser an na?»
23 Lê Îsa bi qurnaziyên wan hesiya û bi durûtiya wan dizanibû û got: «Çima hûn
min diceribînin? Ji min re zîvekî bînin ku ez bibînim.»
16 Wan jê re zîvek anî.

Wî ji wan pirsî: «Ma ev resm [wêne]  û nivîsîn ên kê ne?»
Wan got: «Yên Qeyser in.»
25 Îsa jî ji wan re got: «Madem ku wusa ye, tiştên Qeyser bidin Qeyser û tiştên
Xwedê bidin Xwedê.»
26 Wan nikaribû wî li ber xelkê bi gotina wî bigirin, ew li bersîva wî şaş man û
devê xwe girtin. (Lûqa 20:20-26)

23 Eynî rojê Sadûqiyên ku digotin vejîna miriyan tune, hatin ba Îsa 24 û jê pirsîn:
«Mamoste, Mûsa got: ‹Eger yekî ku zarokên wî nebin bimire, divê birayê wî
jina wî bîne û dûndanê ji birayê xwe re rake.›
25 Îcar li ba me heft bira hebûn. Yê pêşî jin anî û mir. Ji ber ku zarokên wî
çênebûn, jina xwe ji birayê xwe re hişt. 26 Eynî tişt hat serê yê dido û yê sisiyan
jî, heta bi yê heftan, hemû mirin. 27 Piştî hemûyan jin jî mir.
28 Îcar Roja Vejînê, ji her heftan ew jin wê bibe ya kê? Çimkî hemûyan ew
anîbû!»
29 Îsa li wan vegerand û got: «Hûn şaş dibin, ji ber ku hûn Nivîsarên Pîroz û
hêza Xwedê nizanin. (Metta 22:23-29)
Zarokên vê dinyayê jinê tînin û mêr dikin. 35 Lê ew ên ku hêja hatine dîtin ku
bigihîjin wê dinyayê û vejîna miriyan, ne jinê tînin û ne jî mêr dikin; 36 ew
careke din nikarin bimirin, ew eynî wek milyaketan in; ew zarokên Xwedê ne,
çimkî ew zarokên vejînê ne.
37 Mûsa jî da xuyakirin, ku mirî wê ji nû ve rabin. Ew di serhatiya diriyê de navê
Xudan hildide û dibêje: ‹Xwedayê Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûb.›
38 Îcar ew ne Xwedayê miriyan e, lê Xwedayê zindiyan e, çimkî hemû ji wî re
sax in.» (Lûqa 20:34-38)
33 Gava ku elaletê ev yek bihîst li hînkirina wî gelek şaş ma.

34 Gava Fêrisiyan bihîst ku Îsa devê Sadûqiyan girtiye, li hev civiyan.
35 Ji nav wan yekî Şerîetzan ew ceriband û pirsî: 36 «Mamoste, di Şerîetê de emrê
herî mezin kîjan e?»

37 Îsa lê vegerand û got: «‹Ji Xudan Xwedayê xwe bi hemû dilê xwe, bi hemû
canê xwe û bi hemû hişê xwe hez bike.› 38 Emrê pêşî û mezin ev e.
39 Yê diduyan jî wek vî ye: ‹Wek ku tu ji xwe hez dikî, ji cîranê xwe hez bike.›
40 Hemû Şerîet û pêxember li ser bingeha van herdu emran in.»

41 Gava ku Fêrisî li hev civiyabûn Îsa ji wan pirsî: 42 «Hûn li ser Mesîh çi
difikirin? Ew kurê kê ye?»
Wan lê vegerand û gotin: «Ew kurê Dawid e.»
43 Îsa ji wan re got: «Nexwe çawa Dawid bi saya Ruh navê Xudan hildide û
dibêje: 44 ‹Xudan ji Xudanê min re got: Li milê min ê rastê rûne heta ku ez
dijminên te bikim bin lingên te.›
45 Eger Dawid ji wî re bêje ‹Xudan›, çawa ew dibe kurê wî?»
46 Îcar tu kesî nikaribû peyvekê bersîva wî bide. Û ji wê rojê pê ve tu kesî
newêribû ku tiştekî jê bipirse. (Metta 22:33-46)

1 Hingê Îsa ji elaletê û ji şagirtên xwe re got: 2 «Şerîetzan û Fêrisî li ser kursiyê
Mûsa rûdinin. 3 Loma her tiştê ku ji we re dibêjin, bikin û bînin cih. Lê li gor
kirinên wan nekin, çimkî ew dibêjin û nakin: 4 Ew barên giran û hilgirtina wan
zehmet girêdidin û datînin ser pişta mirovan, lê ew bi xwe naxwazin ji bo
rakirina wan baran tiliya xwe jî bilebitînin.
5 «Hemû tiştên ku dikin ji bo dîtina mirovan e. Bazbendên xwe pehn dikin û
rêşiyên kirasên xwe dirêj dikin.
6 Di ziyafetan de ji cihên jorîn, li kinîştan jî ji kursiyên pêşî hez dikin.
7 Hez dikin ku di sûkan de silav li wan bê kirin û ji aliyê xelkê ve jî bi awayê ‹ya
mamoste› bên gazîkirin. 8 Lê bila ji we re nebêjin ‹mamoste›, çimkî Mamosteyê
we yek e û hûn hemû bira ne. 9 Û li ser rûyê erdê ji tu kesî re nebêjin ‹Bavo›,
çimkî Bavê we yek e, Bavê ezmanî ye. 10 Ne jî bila kes ji we re bêje ‹rêber›,
çimkî Rêberê we yek e, Mesîh e.

11 Di nav we de yê herî mezin bila bibe xizmetkarê we. 12 Çimkî kî xwe bilind
bike, wê nizim bibe û kî xwe nizim bike, ewê bilind bibe.

Guhdarên delal, Xwedê ne li tiştên derveyî dilê mirovan, lê li dilê mirovan dinêre.

Ji ber vê yekê Îsa Mesîh ji durûtiyê nefret dikir û şagirtên xwe hişyar kirin ku wek Fêrisî û Şerîetzanan nekin.

Îsa li ser wan mirovên dîndar got: «Hemû tiştên ku ew dikin ji bo dîtina mirovan e.» Yanî gotinên wan û kirinên wan, ne ji bo pesnê Xwedê bûn, lê ji bo pesnê wan bi xwe bûn.

Dostên delal, Xwedê li dilê me jî dinêre. Gelo di Roja Dawî de ewê li ser min û te çi bêje?

Încîl şîretan li me dike û weha dibêje:

Hûn her çi bikin, wek ku hûn ne ji mirovan re, lê ji Xudan re dikin, bi dil û can bikin.

Herweha dibêje:

Her tiştê ku hûn dikin, bi gotinê be an bi kirinê be, bi navê Îsa bikin û bi saya wî ji Xwedê re şikir bikin.

Di bernama ku bê de emê ji Încîlê li ser vê dabaşa durûtiyê hê bêtir bibihîzin. Heta hingê bila ev gotinên Îsa Mesîh li bîra we bin. Wî got:

Di nav we de yê herî mezin bila bibe xizmetkarê we. Çimkî kî xwe bilind bike, wê nizim bibe û kî xwe nizim bike, ewê bilind bibe.

[ Bila Xwedê vê nefsbiçûkiya giranbiha bide me hemûyan!]

Gotinên ku îro emê bibihîzin, tehl in, lê ew rast in. Erê, carna bihîstina rastiyê, me diêşe, lê gotina pêşiyan rast dibêje: „Rastî tehl e“. Îro emê gelek gotinên hem rast û hem jî dijwar bibihîzin.

Îsa Mesîh bi hînkirina xwe berdewam kir û li ser durûtiyê weha got:

[13-14] «Wey li we hûn Şerîetzan û Fêrisîno! Hûn durûno! Hûn Padîşahiya Ezmanan li ber mirovan digirin. Hûn bi xwe nakevinê û ne jî hûn dihêlin ên ku dixwazin bikevinê, derbas bibin.

[15] «Wey li we hûn durûno! Hûn derya û bejê li hev didin, da ku hûn yekî bînin ser baweriya xwe, lê gava ku we ew anî jî, hûn du caran ji xwe bêtir wî dikin kurê dojehê.

[23] «Hey hûn durûno! Hûn dehyeka pûng, rizyan û kîmyona xwe didin, lê hûn tiştên Şerîetê yên hê girîngtir, yanî dadperwerî, rehm û baweriyê dihêlin. Diviya ku we ev bikirana û dev ji yên din jî bernedana. [24] Hey rêberên kor! Hûn pêşûyê dipalînin, lê devê dadiqurtînin.

[25] «Wey li we hûn durûno! Hûn derveyî tas û sêniyan dişon, lê hundirê wan ji tiştên talankirî û çavbirçîtiyê tije ye. [26] Hey Fêrisiyê kor! Pêşî hundirê tas û sêniyan bişo, wê derveyê wan jî paqij bibe.

[27] «Wey li we hûn Şerîetzan û Fêrisîno! Hey hûn durûno! Hûn wek gorên spîkirî ne, ku ji derve xweşik xuya dibin, lê hundirê wan tije hestiyên miriyan û hemû tiştên qirêjî ne. [28] Bi vî awayî hûn jî ji derve wek ên rast li mirovan xuya dibin, lê ji hundir ve hûn tije durûtî û neheqî ne.

[29] «Wey li we hûn durûno! Hûn gorên pêxemberan ava dikin û qubên mirovên rast dixemilînin. [30] Û hûn dibêjin: ‹Eger em di dema bav û kalên xwe de bijiyana, meyê bi wan re xwîna pêxemberan nerijanda.› [31] Bi vî awayî hûn li hember xwe şahidiyê dikin ku hûn kurên wan in ên ku pêxember kuştine. [32] De hûn jî rabin, çapa xerabiya bav û kalên xwe tije bikin!

33 «Hey marno! Hûn têjikên maran! Hûnê ji cezayê dojehê çawa birevin?
37 «Wax Orşelîm, heywax Orşelîma ku pêxemberan dikuje û yên ku ji wê re
hatine şandin dide ber keviran. Ka çawa mirîşk çîçikên xwe di bin çengên xwe
de dicivîne, çend caran min jî xwest ku ez zarokên te bicivînim, lê we nexwest.
(Metta 23:1-15.23-27)

1 Gava ku Îsa ji Perestgehê derket û çû, şagirtên wî nêzîkî wî bûn û xwestin ku
bala wî bikişînin ser avahiyên Perestgehê.
2 Wî ji wan re got: «Hûn van hemûyan dibînin? Bi rastî ez ji we re dibêjim, li
vir kevir li ser kevir namîne. Qet tiştek namîne ku neyê hilweşandin!»
3 Çaxê Îsa li Çiyayê Zeytûnê rûdinişt, şagirtên wî bi serê xwe hatin ba wî û jê re
gotin: «Ji me re bêje, ka ev tişt wê kengê bibin? Çi wê bibe nîşana hatina te û
dawiya dinyayê?»
4 Îsa bersîva wan da û got: «Hay ji xwe hebin, ku tu kes we nexapîne. 5 Çimkî
gelek wê bi navê min bên û bêjin: ‹Mesîh ez im› û wê gelekan bixapînin. 6 Hûnê
dengê şeran û li ser şeran bibihîzin. Binêrin! Hûn netirsin. Tiştên weha divê
bibin, lê hê dawî nehatiye. 7 Milet wê li hember miletan, padîşahî li hember
padîşahiyan rabin. Û wê li cih cihan xela û erdhejîn çêbin. 8 Lê ev tiştên ha
hemû destpêka janan in.
9 «Hingê wê we teslîm bikin, da ku êşê bi we bidin kişandin û we bikujin. Ji ber
navê min hemû milet wê ji we nefret bikin. 10 Hingê gelek wê ji rê derkevin,
hevdû bidin dest û ji hev nefret bikin. 11 Û gelek pêxemberên derewîn wê
derkevin û gelekan bixapînin.
23 Hingê eger yek ji we re bêje: ‹Va ye, Mesîh li vir e!› an jî: ‹Wa ye, ew li wir
e!›, bawer nekin. 24 Çimkî mesîhên derewîn û pêxemberên derewîn wê derkevin,
wê nîşan û karên mezin çêkin, wusa ku eger bibe, ewê bijartiyan jî bixapînin.
25 Va ye, min ji pêşî ve ev ji we re got. 26 Îcar, eger yek ji we re bêje: ‹Wa ye,
Mesîh li çolê ye!› dernekevin derve, an bêje: ‹Va ye, li oda hundir e!›, bawer
nekin. 27 Çawa ku birûsk ji Rojhilat davêje û heta Rojava ronahî dike, hatina
Kurê Mirov jî wê bi vî awayî be.

29 «Di pey tengahiya wan rojan de, di cih de, roj wê tarî bibe û heyv ronahiya
xwe nade.
Stêr wê ji ezmên bikevin û rojgêranên ezmanan wê ji riya xwe derkevin.
30 Hingê nîşana Kurê Mirov wê li ezmên xuya bibe û hemû miletên li ser erdê
wê li xwe bixin. Ewê bibînin ku ‹Kurê Mirov bi hêz û rûmeta mezin li ser ewrên
ezmên tê.› 31 Ewê milyaketên xwe bi boriya dengbilind bişîne û milyaket wê
bijartiyên wî ji çar aliyan, ji perekî ezmanan heta perê din bicivînin. (Metta 24:1-11.23-31)

31 «Gava ku Kurê Mirov bi rûmeta xwe ve bê û hemû milyaket pê re, hingê ewê
li ser textê xwe yê rûmetê rûne. 32 Hemû milet wê li ber wî bicivin û ewê wan ji
hevdû veqetîne, wek ku şivan miyan ji bizinan vediqetîne. 33 Ewê miyan bide
aliyê xwe yê rastê, bizinan bide aliyê xwe yê çepê. 34 Hingê Padîşah wê ji yên li
aliyê xwe yê rastê re bêje: ‹Werin, hûn pîrozên Bavê min, wê Padîşahiya ku ji
damezrandina dinyayê ve ji bo we hatiye amade kirin, bistînin.
41 «Hingê wê ji yên li milê xwe yê çepê re jî bêje: ‹Ji min dûr bikevin, hûn ên ku
nifir lêbûyî, herin agirê herheyî yê ku ji bo Îblîs û milyaketên wî hatiye
amadekirin.
46 Îcar evên ha wê herin ezaba herheyî, lê yên rast wê herin jiyana herheyî.»
(Metta 25:31-34.41.46)

Guhdarên delal, îro divê ku em li vir rawestin.

Tiştên girîng ên ku me niha bihîstin ev bûn ku Îsa Mesîh serwerên dîn û diyanetê li ser durûtî û hişkbûniya dilê wan haydar kirin.

Herweha me bihîst ku Îsa şagirtên xwe li ser wan ên ku wê piştî wî bên û wê bêjin ku ew pêxember in, hişyar kirin; çimkî ewê gelekan bixapînin.

Û di dawiyê de me bihîst ku rojekê ewê vegere vê dinyayê, yanî ewê bi milyaketên hêzdar ve ji ezmên bê, ku dîwana mirovan bike. Yanî ew mirovên ku qet naxwazin Mizgîniya Xwedê ya li ser Mesîh, yanî li ser Xilaskarê gunehkaran qebûl bikin, wê ji aliyê wî ve bên dîwankirin.

Erê rast e, me îro çend gotinên dijwar bihîstin; lê belê ew gotinên qenc in, çimkî ew rast in. Û ji bo hemû yên ku baweriya xwe bi Îsa Mesîh tînin, ew gotin peyvên newaze ne, çimkî Îsa Mesîh got:
Hûnê rastiyê bizanin û rastî wê we azad bike.» (Yûhenna 8:32)

Guhdarên delal, gelek spas ku we qenc guhê xwe da van peyvên Mesîh. Em bi hêvî ne ku hûn di bernama ku bê de jî bi me re bin. Hingê emê bibihîzin ku yek ji şagirtên Îsa Mesîh çû ba serekên kahînan ku Îsa bide destê wan ên ku li kuştina wî digeriyan.

Heta hingê li ser van gotinên Îsa Mesîh bifikirin ên ku dibêjin:

«Hûn şaş dibin, ji ber ku hûn Nivîsarên Pîroz û hêza Xwedê nizanin lê rastî wê we azad bike.» (Metta 22:29; Yûhenna 8:32)

[Xwedê ji bo vê rastiya ku ji her tiştî bêtir pêwist e, hiş û dilê her mirovî veke!]

Ev demek e ku em di xwendina xwe ya Nivîsarên Pîroz de gihîştin Încîlê, yanî Mizgîniya Xwedê.

Mizgîniya Xwedê ji me re şîrove dike, dibêje: Îsa, Mesîh e, yanî Xilaskarê pîroz e yê ku hatiye vê dinyayê, da ku zarokên Adem ji desthilatî û hukumdariya Îblîs rizgar bike.

Me dît ku Xilaskar ji hemû mirovên din cihê ye. Ew, Peyva Xwedê ye ya ku di destpêkê de bi Xwedê re bû, ew bû mirov û hat vê dinyayê.

Îsa Mesîh di bûyîna xwe de bêhember bû, çimkî ew bi hêza Ruhê Xwedê ji keçikekê çêbû, yanî diya wî keçikek bû.

Herweha qerektêrê Îsa Mesîh bêhember bû, çimkî xasîtiya wî tam pîroz û paqij bû. Ew ji guneh bêrî bû û wî tu caran guneh nekir.

Karên wî jî bêhember bûn; tu kes tune ku wek wî kerametên ewqas mezin kiribin. Hêza Îsa Mesîh li ser Îblîs, li ser cinan, li ser ba û ava golê, li ser nexweşî û mirinê hebû.

Heçî hînkirina wî bû, ew jî bêhempa bû; neyarên wî jî ev yek qebûl kirin û gotin: «Tu mirov, tu caran mîna vî mirovî nepeyiviye!» (Yûhenna 7:46)

Erê, rast e, Îsa Mesîh di bûyîna xwe de, di qerektêrê xwe de, di karên xwe de û di peyvên xwe de bêhember bû. Lê dîsa jî hemûyan fêm nekir ku ew, ew Xilaskar e, yê ku ji ezmên hatiye.

Piraniya zarokên Adem fêm nekirin ku bi rastî Îsa kî ye. Wan Îsa pêxember hesiband, lê wan fêm nekir ku Xwedê bi xwe hatiye serdana wan.

Heçî rêberên dîn û diyanetê yên Cihûyan bûn, wan ne tenê fêm nekir ku Îsa kî ye, herweha ew şêwirîn ku çawa wî bikujin!

Herweha me dît ku Îsa ji ber durûtî û xerabiya wan, li Şerîetzan û rêberên dîn hilat. Wan gotinên wî bihîstin, lê dîsa jî wan tobe nekir. Bervajiyê vê, nêt û daxwaza wan bi tenê ev bû ku Îsa bê kuştin!

Îsa Mesîh dizanî ku ewê li Orşelîmê bihata kuştin; wek ku me dît, Îsa ji şagirtên xwe re got ku kahîn û Şerîetzan wê cezayê mirinê li ser wî bidin. Wî gotibû ku wanê ew radestî Romayiyan bikira, da ku tinazên xwe bi wî bikiran, tif bikiran wî, li wî bixistan û ew xaç bikiran. Lê piştî sê rojan ewê ji nav miriyan rabûya. Lê belê Îsa ne tenê ji pêşî ve got ku ewê çawa bimire û li ku derê bimire, lê belê îro emê bibînin ku hem jî Îsa got ku ewê kengê bimire.

Niha em dixwazin ji Mizgîniya li gor Metta, ji deriyê 26'an bixwînin û emê bibînin ku Îsa çawa şagirtên xwe li ser mirina xwe ya li ser xaçê haydar kirin. Nivîsarên Pîroz dibêjin:
1 Gava ku Îsa ev hemû peyvên ha xilas kirin, ji şagirtên xwe re got: 2 «Hûn dizanin ku piştî du rojan Cejna Derbasbûnê ye. Wê Kurê Mirov bidin dest, da ku bê xaçkirin.» (Metta 26:1-2)

Ma we bihîst ku Îsa ji şagirtên xwe re çi got? Wî bi wan da zanîn ku zarokên Adem wê wî di roja Cejna Derbasbûnê de xaç bikin.
Dema ku me di Tewratê de lêkolîn kir, em li ser Cejna Derbasbûnê hîn bûn. Cejna Derbasbûnê di meha pêşî ya Cihûyan, yanî di Adar an di Nîsanê de dihat pîrozkirin. Her sal di vê Cejnê de Cihûyan dianî bîra xwe ku di dema Mûsa pêxember de çi çêbû. Hingê gelê Îsraêl li Misrê di bin destê Firewn de bû û ew di tengahiyeke mezin de bûn. Di wê demê de Xwedê li gor plana xwe ya xilasiyê û li gor dadperweriya xwe biryar da ku li Misrê her nixurî bimire.
Lê ji bo wan ên ku ji wî bawer dikirin û li gor peyva wî kirin, riya xilasiyê hebû. Xwedê emir li wan kir ku di nav gelê Îsraêl de di her malê de berxekî bêqusûr bê serjêkirin û xwîna wî li deriyên xaniyên wan bê xistin. Xwedê soz dabû wan û gotibû:
Çaxê ez xwînê bibînim, ezê di ser we re derbas bibim. (Derketin 12:13)
Gelê Îsraêl li gor vî emrê Xwedê kir û nixuriyên wan nemirin, lê ew hemû xilas bûn. Xwedê ew bi xwîna berxekî xilas kirin.

Kêm û zêde ew hezar û pênc sed sal bû ku Cihûyan her sal di Cejna Derbasbûnê de berx serjêdikirin, da ku bînin bîra xwe, Xwedê li Misrê çawa ew ji wê belaya mirinê xilas kiribûn.
Lê belê, Xwedê nexwest ku ew bi tenê paş ve binêrin û tiştekî derbasbûyî bînin bîra xwe. Bi destê wan berxên ku dihatin gorîkirin, Xwedê dixwest ku ew li rojên ku bên jî binêrin û li hêviya hatina Mesîh bimînin.
Çimkî rojekê, xwîna  Mesîh jî wê bihata rijandin. Ew xwîna ku Mesîh rojekê li ser xaçê birijanda, wê gunehkar ji belaya herî xerab, yanî ji agirê herheyî yê dojehê xilas bikiran.
Ew mirina Xilaskar a li ser xaçê wê goriya bêkêmahî û herî dawî bûya.
Wê goriyê wê tevahiya Şerîeta Xwedê bianiya cih. Xwedê li gor şehrezayiya xwe dixwest ku Xilaskar xwîna xwe di roja Cejna Derbasbûnê de birijîne, da ku mane û mînaka kûr a van berxên ku dibûn gorî, bê cih.
Me dît ku ji destpêkê ve plana Xwedê ew bû ku gunehkar ji dîwana Roja Dawî xilas bibûna û êdî dem hatibû ku Xilaskar Îsa Mesîh ev plana Xwedê pêk bianiya.

Niha emê vegerin Nivîsarên Pîroz û emê careke din ji Încîlê bixwînin.
[1] Gava ku Îsa ev hemû peyvên ha xilas kirin, ji şagirtên xwe re got: [2] «Hûn
dizanin ku piştî du rojan Cejna Derbasbûnê ye. Wê Kurê Mirov bidin dest, da ku
bê xaçkirin.»
[3] Hingê serekên kahînan û rihspiyên gel, li qesra Serokkahînê ku navê wî Qeyafa
bû civiyan [4] û bi hev şêwirîn ku Îsa bi hîle bigirin û wî bikujin. [5] Lê wan digot:
«Bila ne di cejnê de be, da ku di nav xelkê de hengame çênebe.»
[14] Hingê yek ji diwanzdehan, ku jê re Cihûdayê Îsxeryotî digotin, çû ba serekên
kahînan [15] û ji wan pirsî: «Eger ez wî bidim destê we hûnê çi bidin min?»
Îcar wan jî sî zîv hijmartin û danê. [16] Ji wê demê ve Cihûda li keysekê digeriya
ku Îsa bide dest. (Metta 26:1-5.14)

[12] Di roja pêşî ya Cejna Nanê Şkeva de, roja serjêkirina goriya Cejna
Derbasbûnê şagirtan ji Îsa pirsî: «Tu dixwazî ku em herin, şîva Cejna
Derbasbûnê li ku derê amade bikin, ku tu bixwî?»
[13] Îsa du şagirtên xwe şandin û ji wan re got: «Herin bajêr. Mirovek wê rastî we
bê ku cerekî avê hildigire, li pey wî herin wî xaniyê ku ew bikevê. [14] Ji xwediyê
wê malê re bêjin: ‹Mamoste ji te dipirse: Ka ew oda min a mêvanan a ku ez bi
şagirtên xwe re li wê şîva Cejna Derbasbûnê bixwim li ku derê ye?› [15] Hingê
ewê li qata jor odeyeke mezin a raxistî û amadekirî nîşanî we bide; li wê derê ji
bo me şîvê amade bikin.»
[16] Şagirt ketin rê, hatin bajêr û wan hemû tişt wek ku Îsa ji wan re gotibû dîtin. Û
wan şîva Cejna Derbasbûnê amade kir. (Marqos 14:12-16)

Dostên delal, di van ayetan de bi zelalî kifş dibe ku Îsa ji pêşî ve li ser mirina xwe dizanibû û şagirtên xwe li ser vê yekê haydar kirin. Herweha wî careke din bi awayekî newaze nîşanî wan da ku ew ji hemû mirovan cihê ye û tiştên ku wê çêbin jî dizane.
Di bernama ku bê de emê li mana kûr a vê şîva Cejna Derbasbûnê binêrin.
Hingê jî bi me re bin!

Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dît ku Îsa şagirtên xwe şandin nav bajêr, da ku cihekî ji bo pîrozkirina Cejna Derbasbûnê amade bikin.
Herweha me dît ku Îsa ji pêşî ve qenc dizanî ku ewê di Cejna Derbasbûnê de radestî Romayiyan bê kirin û bê xaçkirin. Loma beriya mirina wî, ev şîva wî ya dawî bû û gelek bi mane bû.

14 Gava bû çaxê şîvê, Îsa bi Şandiyan re li ser sifrê rûnişt 15 û ji wan re got:
«Hê ji berî ku ez cefayê bikişînim, dilê min gelek xwest ku ez bi we re vê şîva
Cejna Derbasbûnê bixwim. 16 Çimkî ez ji we re dibêjim, heta ku di Padîşahiya
Xwedê de pêk neyê, ez tu caran ji vê cejnê naxwim.» (Lûqa 22:14-16)

18 Çaxê li ser sifrê rûniştibûn û xwarin dixwarin, wî got: «Bi rastî ez ji we re
dibêjim, yek ji we wê min bide dest - yekî ku bi min re xwarinê dixwe.» 19 Ew
xemgîn bûn û destpêkirin yek bi yek ji Îsa pirsîn: «Gelo ez im?» 20 Wî ji wan re
got: «Yek ji diwanzdehan e ku nanê xwe bi min re li firaxê dixe. 21 Ji xwe, Kurê
Mirov wek ku li ser wî hatiye nivîsîn, wê here. Lê wey li wî mirovê ku Kurê
Mirov bide dest! Wê ji bo wî çêtir bûya ku ew nehata dinyayê.» (Marqos 14:18-21)
25 Hingê Cihûdayê ku wê ew bida dest, got: «Mamoste, ma ew kes ez im?» Îsa
bersîv da: «Erê, te bi xwe got.» (Metta 26:25)
30 Gava ku Cihûda pariyê nên stand, di cih de derket derve. Û şev bû.
(Yûhenna 13:30)
22 Gava wan xwarin dixwar, Îsa nan hilda, şikir kir, ew şkand, da şagirtan û got:
«Bigirin, ev bedena min e, ya ku di ber we de hatiye dayîn. Vê yekê ji bo
bîranîna min bikin.»
23 Piştre wî kasek hilda, şikir kir û da wan. Hemûyan jî ji wê vexwar. 24 Îsa got:
«Ev xwîna min a Peymanê ye ku di ber gelekan de tê rijandin.»
(Marqos 14:22; Lûqas 22:19)

Bi vî awayî Nivîsarên Pîroz ji me re li ser Şîva Xudan a ku Îsa bi şagirtên xwe re xwar, dibêjin. Beriya ku Îsa xwîna xwe birijanda û xwe bikira gorî, ew şîva wî ya dawî bû û wî bi şagirtên xwe da zanîn ku yek ji wan wê wî bide dest. Ew şagirt Cihûdayê Îsxeryotî bû. Di çavên mirovan de Cihûda şagirtekî qenc bû, lê di dilê wî de timahî û xwestekên qezenckirina peran û tiştên vê dinyayê hebûn. Loma ew çû ba serekên kahînan û ji wan re got: «Eger ez wî bidim destê we hûnê çi bidin min?» Li ser vê yekê kahînan sî zîv hijmartin û danê. Bi vî awayî gotinên Zekerya pêxember hatin cih: Wî çend sed salan beriya hingê nivîsîbû ku Mesîh wê bi heqê sî zîvan bihata radestkirin. (Zekerya 11:12.13)

Lê belê di vê serhatiyê de tiştên herî girîng peyvên Îsa ne. Ma tê bîra we, çaxê ku Îsa nan leva kir û kas da şagirtên xwe, wî çi got? Em careke din wan peyvên girîng bixwînin:
22 Gava wan xwarin dixwar, Îsa nan hilda, şikir kir, ew şkand, da şagirtan û got: «Bigirin, ev bedena min e.» 23 Piştre wî kasek hilda, şikir kir û da wan.
Hemûyan jî ji wê vexwar. 24 Îsa got: «Ev xwîna min a Peymanê ye ya ku di ber gelekan de tê rijandin. (Marqos 14:22-24)

Yanî em dibînin ku Îsa du nîşan dan şagirtên xwe: nîşana nên û nîşana kasê. Nanê ku Îsa li şagirtên xwe leva kir, nîşana bedena wî ye, çimkî wî wê bedena xwe bida, ew bikira gorî.
Kas nîşana xwînê ye, yanî nîşana xwîna Îsa ye ya ku wê bihata rijandin, da ku deynê gunehên zarokên Adem bihata dayîn û wan destûr bistanda ku bikariyan biketan padîşahiya Xwedê.

Yanî bi van herdu nîşanan, bi nîşana nên û bi nîşana kasê, Îsa hînî şagirtên xwe kir ku ew hatiye dinyayê, da ku jiyana xwe, yanî bedena xwe û xwîna xwe bide û ew bi xwe di ber gunehkaran de bibe gorî.

Li ser vê dinyayê her kes hewcedar e ku bixwe û vexwe, an ne, ew nikare bijî. Herweha, her kesê ku bixwaze her û her li ba Xwedê bijî, divê bawer bike ku Îsa Mesîh bedena xwe da û xwîna xwe rijand, da ku em bikarin jiyana herheyî bistînin. Ji Îsa Mesîh pê ve tu kes nikare jiyana herheyî pêşkêşî me bike û ji xwîna wî pê ve tu derman tune ku bikare min û te ji nifira ku guneh aniye ser me, rizgar bike.

Ey guhdarên delal, eger pêwist be ku ji dabaşa îro bi tenê tiştek di bîra we de bimîne, bila ew jî ev be:
Îsa Mesîh hat vê dinyayê da ku barê gunehên me hilgire. Mizgîniya pêxemberên Xwedê ev e. Mana berxê ku Birahîm ji dêla kurê xwe ve kir gorî, ev e.
Riya bexişandinê, ev riya goriya bêkêmahî ye. Erê, Xwedê dikare bi saya goriya Xilaskarê pîroz, gunehên min û te bibexişîne, çimkî wî xwîna xwe ji bo min û te rijand. Ew bi sedan û bi hezaran sal bû ku li gor emrê Xwedê diviya ku heywan bihatan gorîkirin, da ku wî çavên xwe li gunehên zarokên Adem bineqandan. Peymana Kevin a ku Xwedê spartibû pêxemberên xwe ev bû. Lê belê Îsa Mesîh Peymana Nû anî. Ew hat, da ku mana goriyan kifş bike û goriyên mînakî bi goriya rastîn pêk bîne. Îsa Mesîh bi xwe berxê Cejna Derbasbûnê yê dawî bû. Ew hat xaçkirin, da ku her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, ji dîwana Xwedê ya dadperwer xilas bibe. Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Berxê me yê Cejna Derbasbûnê Mesîh, hatiye gorîkirin. (Korîntî I, 5:7)
Û dibêjin:
21 Xwedê ewê ku guneh nedizanî ji bo me kir guneh, da ku em di şexsê wî de bibin rastdariya Xwedê. (Korîntî II, 5:21)
Tiştekî din tune ku ji xwîna Îsa giranbihatir be. Guhê xwe bidin van gotinên Kitêba Pîroz. Peyva Xwedê li ser (hêza paqijkirinê ya) xwîna Îsa Mesîh weha dibêje: Xwîna Îsa, me ji her gunehî paqij dike. (Yûhenna I, 1:7)

Û dibêje: [18] Çimkî hûn dizanin ku hûn ne bi berdêla tiştên pûç ên wek zêr an zîv ji jiyana vala ya ku ji bav û kalên we maye, hatine kirrîn, [19] lê belê bi berdêla xwîna Mesîh a hêja û wek berxekî bêleke û bêkêmahî, hûn hatine kirrîn. [20] Hê berî damezrandina dinyayê ew hat destnîşankirin, lê di dawiya deman de di ber we de xuya bû. [21] Bi saya wî hûn baweriyê bi wî Xwedayê ku ew ji nav miriyan rakiriye û rûmet daye wî tînin, wusa ku bawerî û hêviya we bi Xwedê be.
(Petrûs I, 1:18-21)

Niha ji kerema xwe qenc li ser gotinên bernama îro bifikirin, çimkî Xwedê dixwaze dilê we ji bo fêmkirina van rastiyên mezin veke. Di bernama ku bê de emê dabaşa Şîva Xudan bi dawî bikin û emê bibînin ku rêberên dîn û diyanetê çawa Îsa bigirin, da ku wî bikujin.

Heta hingê li ser mana van ayetên Kitêba Pîroz qenc bifikirin. Peyva Xwedê dibêje:
Xwîna Îsa, me ji her gunehî paqij dike. (Yûhenna I, 1.7; Yûhenna 1:29)

Di bernama din de em li ser Şîva Xudan hîn bûn. Îsa ew şîv, beriya ku ew bimire bi şagirtên xwe re xwar. Me bihîst ku Îsa ji diwanzdeh şagirtên xwe re got: «Yek ji we wê xayîn derkeve û wê min radestî neyarên min bike.»
Me dît ku Îsa nan û kas da şagirtên xwe; wî ji wan re got:
«Şkandina nên mînaka şkandina bedena min e û kasa ku we jê vexwar mînaka xwîna min e ya ku wê di ber gelekan de bê rijandin.»
Bi vî awayî Îsa careke din bi şagirtên xwe da zanîn ku ew hatibû dinyayê, da ku jiyana xwe bide, yanî bibe ew goriya dawî û bêkêmahî ya ku gunehan xîş dike û jiyana herheyî pêşkêşî mirovan dike.

Îro em dixwazin guhdariya çend gotinên Îsa yên din bikin.
Ew jî wek ên din pirr manedar û newaze ne.
Şeva beriya ku parêzgerên Perestgehê bên ku wî bigirin, wî ew peyv ji şagirtên xwe re gotin. Emê niha ji Mizgîniya Yûhenna, ji deriyê 14’an bixwînin.
Îsa dizanibû wextê wî hat, ku jiyana xwe bide. Loma wî ji wan re weha got:

1 «Bila dilê we reht nebe. Baweriya xwe bi Xwedê bînin û baweriya xwe bi min
jî bînin. 2 Di mala Bavê min de gelek ode hene. Eger wusa tunebûya, ma minê ji we re bigota ku ez diçim ji we re cih amade bikim?
3 Dema ku ez çûm û min ji we re cih amade kir, ezê dîsa bêm û we bibim ba
xwe, da ku cihê ez lê bim, hûn jî li wê derê bin. 4 Hûn riya wî cihê ku ez diçimê
dizanin.»
5 Tûma jê re got: «Ya Xudan, em nizanin tu diçî ku derê, emê çawa rê bizanin?»
6 Îsa ji wî re got: «Rê, rastî û jiyan ez im. Heta ku ne bi destê min be, tu kes nayê
ba Bav. 7 Eger we ez nas bikirama, weyê Bavê min jî nas bikira. Îcar ji niha ve hûn wî nas dikin û we ew dîtiye.»
8 Filîpos jê re got: «Ya Xudan, ka Bav nîşanî me bide, ev têra me dike!»

[9] Îsa jê re got: «Ey Filîpos, evqas dem ez bi we re me, ma hê jî te ez nas
nekirime? Yê ku ez dîtime, Bav dîtiye; tu çawa dibêjî: ‹Bav nîşanî me bide›? [10]
Ma tu bawer nakî ku ez bi Bav re me û Bav jî bi min re ye? Gotinên ku ez ji we
re dibêjim, ez ji ber xwe nabêjim. Lê Bavê ku bi min re dimîne, karên xwe dike.
[11] Ji min bawer bikin ku ez bi Bav re me û Bav jî bi min re ye. Lê qet nebe, ji ber
van karan bawer bikin.

[15] «Madem hûn ji min hez dikin, hûnê emrên min bînin cih. [16] Û ezê ji Bav
bixwazim û ewê Alîkarekî din bide we, da ku her û her bi we re bimîne. [17] Ew
Ruhê Rastiyê ye; dinya nikare wî qebûl bike, çimkî ne wî dibîne û ne jî wî nas
dike. Lê hûn wî nas dikin, çimkî ew bi we re dimîne û ewê di dilê we de be.
[18] «Ez we sêwî nahêlim; ezê dîsa bêm ba we. [19] Piştî demeke kurt, êdî dinya min
nabîne, lê hûnê min bibînin. Madem ez dijîm, hûn jî, hûnê bijîn. [20] Wê rojê hûnê
bizanin ku ez bi Bavê xwe re me, hûn bi min re ne û ez jî bi we re me.
[21] «Yê ku emrên min qebûl dike û wan tîne cih, ew e yê ku ji min hez dike. Yê
ku ji min hez dike, ewê ji aliyê Bavê min ve bê hezkirin. Ez jî, ezê ji wî hez
bikim û xwe ji wî re eşkere bikim.»

[22] Cihûda - ne yê Îsxeryotî - ji wî re got: «Ya Xudan, ev çawa dibe ku tê xwe ji
me re eşkere bikî, lê xwe ji dinyayê re eşkere nakî?»
[23] Îsa bersîva wî da û got: «Eger yek ji min hez bike, wê gotina min bigire. Bavê
min jî wê ji wî hez bike û emê bên ba wî û li ba wî cih bigirin. [24] Yê ku ji min
hez nake, gotinên min jî nagire. Gotina ku hûn dibihîzin ne ya min e, lê ya wî
Bavî ye, ku ez şandime. [25] Hê ez li ba we, min ev tişt ji we re gotin. [26] Lê Alîkar
- Ruhê Pîroz - yê ku Bav wê bi navê min bişîne, ewê hemû tiştî hînî we bike û
wê her tiştên ku min ji we re gotine, bîne bîra we.
[27] «Ez aştiyê ji we re dihêlim; ez aştiya xwe didim we. Ez wek ku dinya dide we
nadim. Bila dilê we reht nebe û netirsin! (Yûhenna 14:1-11.15-21.23-27)

Bi van gotinan Îsa di ber dilê şagirtên xwe de hat û ew ji bo tiştên ku wê çêbûna, amade kirin.
Ma we bihîst ku wî li ser Alîkar çi ji wan re got?
Bi rastî gelek girîng e ku hûn van peyvên Îsa bi zelalî fêm bikin, çimkî îro mirov hene, dixwazin mana wan gotinan xelet bidin bawerkirin. Ew dibêjin ku Îsa li ser hatina pêxemberekî din got.
Lê belê mana peyvên Îsa ne ew bû. Îsa ne li ser pêxemberekî din got, çimkî li gor peyvên Îsa ew Alîkar ne mirovek e, lê belê ruhekî ku nayê dîtin e. Ewê bihata dilê şagirtên Îsa Mesîh ên rastîn.

Gelo ew Alîkar kî ye? Îsa Mesîh qet şikê nahêle û bi zelalî dibêje ku ew kî ye. Ji kerema xwe careke din guhdariya peyvên Îsa Mesîh bikin. Wî got:

16 Û ezê ji Bav bixwazim û ewê Alîkarekî din bide we, da ku her û her bi we re bimîne.
17 Ew Ruhê Rastiyê ye; dinya nikare wî qebûl bike, çimkî ne wî dibîne û ne jî wî nas dike. Lê hûn wî nas dikin, çimkî ew bi we re dimîne û ewê di dilê we de be.
18 «Ez we sêwî nahêlim; ezê dîsa bêm ba we.
Alîkar - Ruhê Pîroz - yê ku Bav wê bi navê min bişîne, ewê hemû tiştî hînî we bike û wê her tiştên ku min ji we re gotine, bîne bîra we. (Yûhenna 14:16-18.26)

Careke din pirsa me eynî ev e: Alîkar kî ye? Îsa li ser kê dibêje û soza hatina kê dide şagirtên xwe?
Alîkar Ruhê Pîroz e, yanî Ruhê Xwedê ye. Eynî ew ruh di hundirê Îsa Mesîh de bû. Mesîh got ku Xwedê wê Ruhê Pîroz bixe dilê hemûyên ku wê baweriya xwe bi Mesîh bînin û wî Xilaskar û Xudan qebûl bikin. Îsa Mesîh soz da şagirtên xwe ku piştî mirin û rabûna wî ya ji nav miriyan, ewê vegere ezmên û wê Ruhê xwe yê pîroz bişîne dilê wan, da ku ew wan nûvejen bike, wan paqij bike, hêzê bide wan û wan ber bi hemû rastiyê ve bibe. (Yûhenna 16:13; herweha li Tîtos 3:4-7 binêre)

Xwedê hez bike, piştî çend dersên din emê bibînin ku her tişt tam li gor van gotinên Mesîh çêbû: Wek ku Îsa soz dabû, deh rojan piştî hilkişîna wî ya ezmanan, Ruhê Pîroz ji jor hat û dest pê kir, di dilê hemû şagirtên Îsa de rûnişt û rêberiya wan kir.
Di bernameyeke din de emê hê bêtir li ser wî Alîkarî, yanî li ser Ruhê Pîroz hîn bibin, çimkî ew dikare dilê mirovekî ezperest biguhere, bike mirovekî ku ji Xwedê hez bike û bixwaze li gor emir û daxwazên wî rêve here.
Lê cara ku bê em dixwazin vegerin Mizgîniyê, da ku em bibînin, di wê şeva taybet de piştî Şîva Xudan çi çêbû.
Heta hingê qenc li ser van gotinên Îsa Mesîh bifikirin; wî got:

18 «Ez we sêwî nahêlim; ezê dîsa bêm ba we.
Alîkar - Ruhê Pîroz - yê ku Bav wê bi navê min bişîne, ewê hemû tiştî hînî we bike û wê her tiştên ku min ji we re gotine, bîne bîra we. (Yûhenna 14: 18.26)

Di bernama din de me bihîst ku Îsa Mesîh li ser Ruhê Pîroz, yanî li ser Ruhê Rastiyê ji şagirtên xwe re peyivî û soz da wan, ku Ruhê Pîroz wê zû bê dilê wan. Herweha wî ji wan re got ku Ruhê Pîroz wê her tiştî hînî wan bike û wê wan ber bi hemû rastiyê ve bibe.

Lê belê niha em dixwazin bibînin, di wê şeva taybet de piştî Şîva Xudan çi çêbû. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

[30] Piştî ku wan zebûrek strand, derketin Çiyayê Zeytûnê.
[31] Hingê Îsa ji wan re got: «Îşev hûnê hemû li ser min dudilî û sist bibin,
çimkî hatiye nivîsîn: ‹Ezê li şivên bixim û miyên kerî wê belav bibin.›
[32] Lê piştî ku ez ji mirinê rabim, ezê beriya we herim Celîlê.»
[33] Petrûs lê vegerand û got: «Hemû jî li ser te dudilî û sist bibin, ez tu caran
dudilî û sist nabim.»
[34] Îsa ji wî re got: «Bi rastî ez ji te re dibêjim, hema îşev, berî ku dîk bang bide,
tê sê caran min înkar bikî.»
[35] Petrûs got: «Eger lazim be ku ez bi te re bimirim jî, ez tu caran te înkar
nakim.» Hemû şagirtan jî weha got.

[36] Hingê Îsa bi şagirtên xwe ve çû cihê ku jê re ‹Gêtşemanî› digotin û ji wan re
got: «Hûn li vir rûnin, heta ku ez herim dera ha û dua bikim.» [37] Wî Petrûs û
herdu kurên Zebedî bi xwe re birin û dest pê kir, keder û diltengiyê ew girt. [38]
Hingê wî ji wan re got: «Dilê min gelek teng dibe, ez dikim bimirim. Li vir bin û
bi min re hişyar bimînin.»
[39] Hinekî pêşve çû, xwe deverû avêt erdê, dua kir û got:
«Ya bavê min, eger bibe bila ev kasa tehl ji min derbas bibe.
Lê bila ne wek ez dixwazim, lê wek ku tu dixwazî be.» (Metta 26:30-39)

Em dixwazin li vê derê hinekî bisekinin û fêm bikin ku ew kasa tehl, yanî kasa cefayê ya ku diviya Îsa vexwara, çi bû?
Çima ewqas keder û diltengiyê ew girt ku wî got: Ez dikim bimirim?
Îsa di vî halê teng û dijwar de bû, çimkî wî dizanî, wext hat ku barê cezayê gunehên hemû zarokên Adem hilde ser xwe.
Saeta ku hemû pêxemberên Xwedê li ser digotin, êdî hatibû. Mirovan êdî wê zû tengahî bidan Xilaskar û wanê ew xaç bikira, lê ya herî tirsehêz ew bû ku Îsa dizanî, Xwedê, yanî Bavê wî yê ezmanî wê cezayê gunehên hemû mirovan bida wî. Loma Îsa dua kir, got:
«Ya bavê min, eger bibe bila ev kasa tehl ji min derbas bibe. Lê bila ne wek ez dixwazim, lê wek ku tu dixwazî be.» Bi van gotinan Îsa Mesîh eşkere kir ku daxwaza Bav Xwedê jî wek ya wî ew bû ku ew ji bo zarokên Adem bimire, da ku li gunehên wan bê bihûrtin.

Piştî vê yekê Nivîsarên Pîroz dibêjin:

40 Piştre ew vegeriya ba şagirtan û ew di xew de dîtin. Ji Petrûs re got: «Ma we nikaribû hûn saetekê jî bi min re hişyar bimînin? 41 Hişyar bimînin û dua bikin, da ku hûn nekevin ceribandinê. Erê, ruh bi daxwaz e, lê beden lewaz e.»
42 **Cara diduyan** ew çû û dua kir: «Ya Bavê min, eger bêyî ku ez vê kasa tehl vexwim, ew ji min derbas nebe, bila daxwaza te bibe.»
43 Îsa vegeriya û ew dîsa di xew de dîtin, çimkî çavên wan ji xewê diçûn serhev.
44 Wî ew hiştin, careke din dûr ket, **cara sisiyan** dua kir û eynî peyv gotin. 45
Paşê vegeriya ba şagirtên xwe û ji wan re got: «Ma hûn hê jî radizin û bîhna xwe vedidin? Va ye, saet hat; Kurê Mirov dikeve destê gunehkaran. 46 Rabin, em herin. Va ye, yê ku min dide dest nêzîk bû.»

47 Hê ew dipeyivî **Cihûdayê Îsxeryotî** yê ku yek ji diwanzdehan bû hat. Bi wî re elaleteke mezin a bi şûr û daran hebû. Ev ji aliyê serekên kahînan û rihspiyên gel

ve hatibûn şandin. [48] Îcar ê ku ew bida dest bi wan re li ser îşaretekê li hev
hatibû: «Ez kê ramûsim ew e, wî bigirin.»
[49] Cihûda sererast hat ba Îsa û got: «Silav li te, mamoste!» û ew ramûsa.
[50] Îsa lê vegerand û got: «Heval, tu ji bo çi hatibî, wê bike.»
Hingê ew mirov nêzîk bûn, dest avêtin Îsa û ew girtin.
[51] Li ser vê yekê, yekî ku bi Îsa re bû, şûrê xwe kişand, li xulamê Serokkahîn
xist û guhê wî pekand. (Metta 26:-40-51)

Lê Îsa destê xwe danî ser guhê wî û ew qenc kir. (Lûqa 22:51)
[52] Hingê Îsa got: «Şûrê xwe bixe kalanê wî. Çimkî her kesê ku şûr bikişîne,
ewê bi şûr bê kuştin. [53] Ma tu dibêjî qey ez nikarim ji Bavê xwe bixwazim û
ew jî di cih de ji diwanzdeh lejyonan zêdetir milyaketan bigihîne min?
[54] **Lê hingê Nivîsarên Pîroz ên ku dibêjin divê weha bibe, wê çawa bên cih?**»

[55] Wê gavê Îsa ji elaletê re got: «Ma ez rêbirek im ku hûn bi dar û şûran hatine
ku min bigirin? Her roj ez li Perestgehê rûdiniştim û min hîn dikir, lê we ez
negirtim. [56] **Lê ev hemû çêbûn, da ku nivîsarên pêxemberan bên cih**.»
Hingê hemû şagirtan ew hişt û reviyan.
[57] Yên ku Îsa girtin, ew birin ba Qeyafayê Serokkahîn. Li wir Şerîetzan û rihspî
civiyabûn. (Metta 26:-52-57)

Yanî me îro dît ku Îsa Mesîh xwe teslîmî destê wan kir ên ku li kuştina wî digeriyan.
Belkî hin wê bipirsin, bêjin: Çima Îsa hişt ku ew bikeve destê dijminên xwe? Ma wî bager nesekinand? Ma wî cin dernexistin? Ma wî yên kor sax nekirin? Ma wî yên mirî ranekirin? Çima wî xwe ji destê dijminên xwe xilas nekir?
Bi rastî, Îsa sedemê vê yekê ji me re got. Gava ku yek ji şagirtên wî şûrê xwe kişand, dixwest ku wî biparêze, Îsa jê re got:

«Şûrê xwe bixe kalanê wî. Çimkî her kesê ku şûr bikişîne, ewê bi şûr bê kuştin.
[53] Ma tu dibêjî qey ez nikarim ji Bavê xwe bixwazim û ew jî di cih de ji
diwanzdeh lejyonan zêdetir milyaketan bigihîne min? [54] Lê hingê Nivîsarên
Pîroz ên ku dibêjin divê weha bibe, wê çawa bên cih?» (Metta 26:52-54)

Çima Îsa Mesîh hişt ku dijminên wî, wî bigirin?
Bersiv sivik e. Wî bi vî awayî pêxemberîtiyên pêxemberên Xwedê anîn cih. Wan digot ku Mesîh wê cefayê bikişîne û wê xwîna xwe birijîne. Ewê bibe gorî, da ku gunehên mirovan bên bexişandin.
Diviya ku Xilaskarê pîroz û rastdar bimira, da ku zarokên Adem bikariyan li Xwedê vegeriyan. Îsa Mesîh hat dinyayê, da ku gotinên pêxemberan bîne cih. Ew hat, ku mana berx, gorî û pêşkêsan bê cih. Ew hat, ku min û te ji gunehên me xilas bike. Loma wî destûr da û hişt ku ew ji aliyê dijminan ve bê girtin.
Îsa ji bo min û te jiyana xwe da. Şikir ji Xwedê re, çimkî wî Xilaskarekî weha dilovan şand vê dinyayê!

Dostên delal, em li vir bernama xwe bi dawî dikin.
Em hêvîdar in ku hûn cara ku bê jî bi me re bin. Hingê emê bibînin ka çawa serekên kahînan, serwerên gel û xelkê Orşelîmê bûn yek, dîwana Îsa kirin û cezayê mirinê li ser wî dan. Bi vî awayî wan jî gotinên pêxemberan anîn cih.

Heta cara ku bê li ser van peyvên Îsa Mesîh qenc bifikirin. Wî ji şagirtên xwe re got:
Ez jiyana xwe didim, da ku ez wê dîsa bistînim. [18] Tu kes wê ji min nastîne,
lê ez jiyana xwe ji ber xwe didim. (Yûhenna 10:17.18)

Xwedê we pîroz û serfiraz bike!

Ev demeke dirêj e ku em di Nivîsarên Pîroz de lêkolînê dikin û me gelek caran dît ku pêxemberên Xwedê çawa plana xilasiyê didan zanîn.
Wek ku me bihîst, Xwedê ev plana xilasiyê amade kir, da ku gunehkaran ji helaka herheyî xilas bike.
Lê belê, ma ev plana xilasiyê çi bû? Bi rastî plana Xwedê ya xilasiyê ew bû ku Mesîh wê li ser xaçê bimira û ew mir.
Pêxemberên Xwedê şahidî kirin ku divê Mesîh bimire û xwîna xwe di ber hemû mirovên nerast û neheq de birijîne, yanî diviya ku wî cezayê hemû gunehên me hilgirtan ser xwe, wek berxekî bêqusûr ê ku dibû gorî, bibûya pêşkêsa gunehên mirovan.
Bi tenê bi vê riyê Xwedê li gunehên me dibihûre. Bi tenê bi vê riyê rastdarî û dadperweriya Xwedê tên parastin; yanî bi riya goriyeke bêkêmahî hem rastdariya Xwedê û hem jî hezkirina wî ya ji bo me li hev digirin û pêk tên.
Êdî em di xwendina Kitêba Pîroz de hêdî hêdî digihîjin serhatiya ku di nav hemûyan de ya herî girîng e.
Xwedê hez bike emê îro û di çend bernameyên din jî bibînin ku Îsa Mesîh çawa gunehên mirovan hildan ser xwe û bi mirina xwe gunehên me bexişandin, ew xîş kirin.

Di bernama din de me dît ku serekên kahînan pere dan şagirtekî xayîn ê ku navê wî Cihûdayê Îsxeryotî bû. Wî rêberiya wan kir û ew birin wî cihê ku Îsa bi şagirtên din ve lê bû. Herweha me dît ku wan çawa Îsa girt, destên wî girêdan û birin bajarê Orşelîmê.
Ev çi tiştekî ecêb e! Çima Îsa, yê ku ew bi xwe hêza Xwedê bû, hişt ku dijminên wî, wî bigirin? Erê, wî xwe teslîmî wan kir, da ku Nivîsarên Pêxemberan bên cih, çimkî wan digot ku Mesîh wê cefayê bikişîne û bimire û di roja sisiyan de ji nav miriyan rabe. Bi vî awayî her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, wê afûbûna gunehan bistîne.

Tam wek ku pêxemberan digot, Mesîh wê bibûya wek berxê ku ji bo serjêkirinê tê birin. (Îşaya 53:7)

Niha em dixwazin bi xwendina Încîlê berdewam bikin, da ku em bibînin di vê şeva reş û tarî de, yanî piştî girtina Îsa Mesîh çi çêbû.
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
53 Îsa birin ba Serokkahîn. Hemû serekên kahînan, rihspî û Şerîetzan li wir
civiyabûn. 54 Petrûs ji dûr ve li pey wî çû, heta ku ew gihîşt hundirê hewşa
Serokkahîn. Li wir bi parêzgeran re li ber êgir rûniştibû û xwe germ dikir. 55 Îcar
serekên kahînan û hemû civîna giregiran, ji bo ku biryara kuştina Îsa bidin, li
hember wî li şahidiyê digeriyan, lê peyda nedikirin. 56 Gelekan li ser wî şahidiya
derewîn da, lê şahidiya wan hevdû nedigirt.
57 Hingê hinek rabûn û li ser wî şahidiya derewîn dan û gotin: 58 «Me bihîst
ku vî mirovî got: ‹Ezê vê Perestgeha ku bi dest hatiye avakirin, hilweşînim û di
sê rojan de ezê Perestgeheke din a ku ne bi dest hatiye çêkirin, ava bikim.›»
59 Lê dîsa jî şahidiya wan hevdû negirt. 60 Serokkahîn rabû, li navendê rawesta û
ji Îsa pirsî: «Ma tu bersîvê nadî? Ev çi şahidî ye ku evên ha li ser te didin?»
61 Lê Îsa tu tişt negot û deng nekir. Serokkahîn dîsa ji wî pirsî: «Ma tu Kurê Yê
Pîroz Mesîh î?»
62 Îsa got: «Ez im. Û ‹hûnê bibînin ku Kurê Mirov li milê rastê yê hêza Xwedê
rûniştî ye û bi ewrên ezmên tê.›»
63 Hingê Serokkahîn cilên xwe çirandin û got: «Êdî çi hewcedariya me bi
şahidan heye? 64 We çêrkirina wî bihîst! Hûn çi dibêjin?»
Hemûyan jî ew sûcdar dît û gotin ku ew yê kuştinê ye. 65 Hingê hinekan dest pê
kir û tif kirin wî, rûyê wî nixamtin, dan ber kulman û jê re gotin:
«Ka pêxemberîtiyê bike!»
Parêzgeran jî ew girt û dan ber sîleyan.

66 Gava Petrûs li jêr li hewşê bû, ji xizmetkarên Serokkahîn keçikek hat ba wî. 67
Gava wê dît ku Petrûs xwe li ber êgir germ dike, çav lê zîq kirin û got: «Tu jî bi
yê Nisretî re, bi Îsa re bûyî.»
68 Lê wî înkar kir û got: «Ez nizanim û fêm nakim ku tu çi dibêjî.»
Piştre derket derveyî hewşê û dîk bang da. 69 Gava ku keçika xizmetkar ew li wê
derê dît, wê dîsa ji yên wê derê re got: «Evê ha jî yek ji wan e.»
70 Lê Petrûs dîsa înkar kir. Piştî gavekê yên ku li wir bûn dîsa ji Petrûs re gotin:
«Bi rastî tu jî ji wan î, çimkî tu ji Celîlê yî.»
71 Lê wî dest bi nifiran kir, sond xwar û got: «Ez wî mirovê ku hûn li ser
dipeyivin nas nakim.»
72 Di cih de dîk cara diduyan bang da. Û Petrûs gotina Îsa ya ku ji wî re gotibû,
anî bîra xwe: «Berî ku dîk du caran bang bide, tê sê caran min înkar bikî.»
Li ser vê yekê dest pê kir û giriya. (Marqos 14:35-72)

1 Çaxê bû sibe hemû serekên kahînan û rihspiyên gel ji bo ku Îsa bikujin bi hev
şêwirîn. 2 Ew girêdan, birin û dan destê Pîlatosê walî.
3 Hingê Cihûdayê ku Îsa dabû dest, gava dît ku çi biryar li ser wî hat dayîn,
li kirina xwe poşman bû û sî zîv li serekên kahînan û rihspiyan zivirandin û got:
4 «Min guneh kir. Ez bûm sedemê xwîna bêsûc.»
Wan lê vegerand û gotin: «Me çi ji vê ye? Tu bifikire.»
5 Cihûda zîv avêtin nav Perestgehê û derket. Ew çû û wî xwe daleqand.
(Metta 27:1-5)

28 Îcar Îsa ji ba Qeyafa birin qesra walî. Serê sibê zû bû û Cihû neketin qesrê, da
ku adetên paqijiyê yên dînî xera nekin û bikarin xwarina Cejna Derbasbûnê
bixwin. 29 Loma Pîlatos derket derve, hat ba wan û pirsî: «Hûn vî mirovî bi çi
sûcdar dikin?»
30 Wan bersîva wî da û got: «Eger ev ne mirovekî xerabkar bûya, me ew teslîmî
te nedikir.»

[31] Pîlatos ji wan re got: «Hûn bi xwe wî bibin û li gor Şerîeta xwe dîwana wî
bikin.»
Cihûyan lê vegerand û gotin: «Destûra me tune ku em tu kesî bikujin.»
[32] Ev çêbû, da ku gotina Îsa ku pê îşaret kiribû, ka ewê bi mirineke çawa bimire,
bê cih.
[33] Hingê Pîlatos dîsa ket qesra walî, gazî Îsa kir û jê pirsî: «Ma tu Padîşahê
Cihûyan î?»
[34] Îsa lê vegerand û got: «Tu vê ji ber xwe dibêjî an hinekên din ev yek li ser min
ji te re gotine?»
[35] Pîlatos got: «Ma ez Cihû me? Miletê te bi xwe û serekên kahînan tu dayî destê
min. Te çi kiriye?»
[36] Îsa bersîv da û got: «Padîşahiya min ne ji vê dinyayê ye; eger padîşahiya min
ji vê dinyayê bûya, ji bo ku ez nekevim destê Cihûyan, xizmetkarên min wê li
ber xwe bidana. Lê padîşahiya min ne ji vê dinyayê ye.»
[37] Pîlatos jî jê re got: «Nexwe tu padîşah î?»
Îsa bersîv da û got: «Tu ji bo min dibêjî ku ez padîşah im. Ez ji bo vê yekê ji
dayik bûme û ji bo vê yekê hatime dinyayê, da ku ez ji rastiyê re şahidiyê bikim.
Her kesê ku ji aliyê rastiyê be, guhê xwe dide dengê min.»
[38] Pîlatos jê pirsî: «Ma rastî çi ye?»
Piştî vê pirsê, Pîlatos dîsa çû derve ba Cihûyan û ji wan re got: «Ez tu sedemê
sûcdarkirina wî nabînim. (Yûhenna 18:28-38)

Erê, Pîlatos got: Ez tu sedema sûcdarkirina Îsa Mesîh nabînim!

Guhdarên delal, îro bernama me li vir bi dawî dibe. Cara ku bê Xwedê hez bike emê bibînin ku Pîlatos çawa emir kir ku Mesîh bê xaçkirin. Heta hingê Xwedê bi we re be!

Ji bo bernama ku bê, em li benda we ne.

Di bernama din de me dît ku tam li gor gotinên Îsa Mesîh, Petrûs mamosteyê xwe sê caran înkar kir.
Me dît ku Cihûdayê Îsxeryotî gava dît ku ji xayîntiya wî çi derket, çû xwe kuşt.
Herweha me bihîst ku walî Pîlatos got: Tu sedem tune ku Îsa bê xaçkirin.
Lê belê xelkê ew yek qebûl nekir. Nivîsarên Pîroz weha berdewam dikin, dibêjin:
5 Lê ew li ser ya xwe man û gotin: «Vî mirovî milet li seranserê Cihûstanê,
ji Celîlê û heta vir bi hînkirina xwe rakiriye ser lingan.»
6 Gava Pîlatos ev bihîst, wî pirsî û got: «Ma ev mirov ji Celîlê ye?»
7 Gava ew hîn bû ku ew ji wê dera ku di bin hukumdariya Hêrodês de ye, wî ew
şand ba Hêrodês. Hêrodês bi xwe jî di wan rojan de li Orşelîmê bû.
8 Gava Hêrodês Îsa dît, ew gelek şa bû. Hê ji mêj ve wî dixwest ku wî bibîne,
çimkî wî gelek tişt li ser Îsa bihîstibûn û hêvî dikir, ku Îsa li ber wî kerametekê
bike. 9 Wî jî gelek pirs li ber Îsa danîn, lê Îsa qet bersîva wî neda.
10 Serekên kahînan û Şerîetzan li ser piyan rawestan û giliyê xwe li hember Îsa
giran kirin. 11 Hêrodês û leşkerên wî jî ew kêm dîtin û tinazên xwe pê kirin.
Wan cilekî spehî yê ku diçirisî lê kir û careke din ew vegerandin ba Pîlatos.
12 Di wê rojê de Pîlatos û Hêrodês, yên ku beriya hingê dijminahî bi hev re
dikirin, dostanî bi hev re danîn.

13 Pîlatos gazî serekên kahînan, serweran û xelkê kir 14 û ji wan re got:
«We ev mirovê ha anî ber min û we got ku ew gel ji rê derdixe. Min jî ew li ber
we kişand pirsyariyê û min tu sûcê ku we dixistin stûyê wî, li ser wî nedîtin.
15 Hêrodês jî nedît. Ji ber vê yekê wî ew li me vegerand. Û binêrin, vî mirovî
tiştek nekiriye ku bê kuştin. (Lûqa 23:5-15)

39 Lê adeta we ye ku ez di Cejna Derbasbûnê de yekî girtî ji bo we berdim.
Ma hûn dixwazin ku ez ji bo we padîşahê Cihûyan berdim?»

[40] Li ser vê yekê wan bi qîrîn got: «Ne vî mirovî, lê Barabas berde!»

(Yûhenna 18:39-40)

[19] Heçî Barabas bû, ew ji ber serhildaneke di bajêr de û ji ber mêrkujiyê ketibû
zîndanê. [20] Pîlatos careke din bi wan re peyivî, çimkî wî dixwest Îsa berde.
[21] Lê wan kir qîrîn û gotin: «Wî xaç bike, wî xaç bike!»
[22] Hingê wî cara sisiyan ji wan re got: «Ka vî mirovî çi xerabî kiriye? Min tu
sedemê kuştina wî nedîtiye. Loma ezê wî bidim ber qamçiyan û berdim.»

(Lûqa 23:19-22)

[1] Hingê Pîlatos Îsa girt û da ber qamçiyan. [2] Leşkeran jî ji stiriyan tacek
honandin û dan serê wî û xiftanekî binefşî lê kirin. [3] Îcar dihatin pêş wî û
digotin: «Bijî padîşahê Cihûyan!»
Û sîle li wî dixistin. [30] Tif kirinê, çîtik ji dest standin û li serê wî xistin.
[4] Pîlatos dîsa derket derve û ji wan re got: «Va ye, niha ez wî tînim derve ba we,
da ku hûn bizanin ku min tu sedemê sûcdarkirina wî nedîtiye.»
[5] Li ser vê yekê Îsa bi taca serê xwe ya ji stiriyan çêkirî û bi xiftanê binefşî yê li
xwe kirî ve derket derve. Pîlatos ji wan re got: «Va ye, ew mirov!»
[6] Dema ku serekên kahînan û parêzgeran ew dît, qîriyan û gotin: «Wî li xaçê
bixe, wî li xaçê bixe!»
Pîlatos ji wan re got: «Hûn bi xwe wî bibin li xaçê bixin. Ez bi xwe tu sedema
sûcdarkirina wî nabînim.»
[7] Cihûyan bersîva wî da û gotin: «Şerîeta me heye û li gor Şerîetê divê ew
bimire. Çimkî wî xwe kiriye Kurê Xwedê.»
[8] Dema ku Pîlatos ev gotin bihîst, ew hê bêtir tirsiya. [9] Ew dîsa çû hundirê qesra
walî û ji Îsa re got: «Tu ji ku derê yî?»
Lê Îsa bersîva wî neda. [10] Pîlatos jî jê re got: «Ma tu bi min re napeyivî? Ma tu
nizanî ku desthilatiya min heye ku ez te berdim û desthilatiya min heye ku ez te
li xaçê jî bixim?»
[11] Îsa lê vegerand û got: «Eger ji jor ji te re nehata dayîn, tu desthilatiya te wê li
ser min tunebûya. Ji ber vê yekê gunehê wî yê ku ez dam destê te meztir e.»

12 Hingê Pîlatos dixebitî ku Îsa berde, lê Cihû qîriyan û gotin: «Eger tu vî mirovî berdî, tu ne dostê Qeyser î! Her kesê ku xwe bike padîşah, li hember Qeyser serî hildaye!» (Yûhenna 19:1-12; Metta 27:30)

24 Gava Pîlatos dît ku tiştek ji destê wî nayê, lê hê bêtir hengame çêdibe, wî av hilda, li ber elaletê destê xwe şuşt û got: «Ez ji xwîna vî mirovî bêrî me. Ev karê we ye.»
25 Hemû xelkê bersîv da: «Bila xwîna wî di stûyê me û zarokên me de be!»
(Metta 27:24-25)
15 Pîlatos xwest ku elaletê razî bike û Barabas ji wan re berda. Û Îsa da ber qamçiyan û da destê wan, da ku bê xaçkirin. (Marqos 15:15)

Guhdarên delal, her tişt tam wek ku Îşaya pêxember heft sed salan beriya hingê gotibû, derket. Wî li ser vê yekê weha nivîsîbû:
7 Zilim lê kirin û nizim kirin, lê wî devê xwe venekir;
Wek berxê ku ji bo serjêkirinê tê birin
û wek miya ku li ber cewîzan bê zimên disekine, wî devê xwe venekir. (Îşaya 53:7)

Îşaya li ser Mesîh weha jî gotibû:
Min pişta xwe da wan ên ku li min dixin;
Min lama xwe da wan ên ku riha min hilkirin,
Min rûyê xwe ji tinazan û ji tifkirinê veneşart. (Îşaya 50:6)

Îro me bihîst ku rêberên Cihûyan ên dîn bi girtina Mesîh gotinên pêxemberan anîn cih. Çaxê ku wan cefa û tengahî dan Mesîhê Pîroz û biryara kuştinê dan, wan tam li gor gotinên pêxemberên Xwedê kir.
Lê belê çima rêberên dîn weha kirin?
Bersiv ev e: Wan ronahiya rastiyê qebûl nekir. Îsa rastî bi wan da zanîn, lê wan ew rastî qebûl nekir, çimkî wê rastiyê, durûtî û xerabiya wan derxist holê.

Îsa Mesîh bi xwe rastî û ronahî bû. Ronahî hatibû dinyayê, lê xelkê ji ronahiyê bêtir ji taristaniyê hez dikir, çimkî kirinên wan xerab bûn.

Vêca ji ber ku zarokên Adem nedixwestin ronahiya rastiyê qebûl bikin, bi tenê ev ji wan re ma ku ew ronahiyê bitemirînin. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

5 Ronahî di tariyê de şewq dide û tarî nikare wê binixême. 8 Tu kesî ji serokên vê
dinyayê bi vê nezanî. Eger bizanibûna, wê Xudanê rûmetê xaç nekirana.
10 Ew li dinyayê bû û dinya bi wî afirî. Lê dinyayê ew nas nekir. 11 Ew hat mala
xwe, lê gelê wî ew qebûl nekir. 12 Lê hemûyên ku ew qebûl kirin û bawerî bi
navê wî anîn, wî desthilatî da wan ku bibin zarokên Xwedê.

(Yûhenna 1:5; Korîntî I, 2:8; Yûhenna 1:10-12)

Dostên delal, ji kerema xwe di bernama ku bê de jî bi me re bin. Hingê emê bibînin ku zarokên Adem çawa gotinên Dawid pêxember anîn cih. Dawid pêxember di Zebûrê de li ser Mesîh weha gotibû:

Wan dest û lingên min qul kirin. (Zebûr 22:16)

Heta hingê li ser van gotinên Îşaya pêxember kûr bifikirin ên ku li ser Mesîh weha dibêjin:

7 Zilim lê kirin û nizim kirin, lê wî devê xwe venekir;
Wek berxê ku ji bo serjêkirinê tê birin
û wek miya ku li ber cewîzan bê ziman disekine, wî devê xwe venekir.
(Îşaya 53:7)

[Aştiya Xwedê li ser we be!]

Di bernama din de me dît ku rêberên Cihûyan ên dîn bi şev Îsa girtin û ew birin mala Serokkahîn; wan şahidên derewîn anîn û ew sûcdar kirin. Piştre wan ew anîn ba walî Pîlatos, da ku ew bê xaçkirin. Leşkeran Îsa dan ber qamçiyan, ji stiriyan tacek çêkirin û dan serê wî, ew riswa kirin, li rûyê wî xistin, tif kirin wî û bi çîtikekê li serê wî xistin.
Bi vî awayî zarokên Adem, Yê Rast, yanî Xudanê rûmetê yê ku ji ezmên hatibû, nas nekirin û ew înkar jî kirin.
Ew mirovên ku cefa dan Îsa Mesîh, bi gotinên pêxemberan nizanibûn, lê dîsa wan ew pêxemberîtiyên ku digotin, divê Mesîh bi destê gunehkaran cefayê bibîne, anîn cih.

Em niha bi xwendina Încîlê berdewam dikin û emê bibînin ku Îsa Mesîh çawa tengahî dît û li ser xaçê mir û bi vî awayî plana Xwedê ya xilasiyê pêk anî. Beriya ku em dest bi xwendinê bikin, divê hûn bizanin ku di dema Îsa de li Îsraêlê waliyê Romayiyan hukumdarî dikir. Li gor adetên Romayiyan, hin xerabkarên sûcgiran ên ku dihatin kuştin, bi bizmaran li darekî an jî li xaçekê dihatin xistin û ew li wir dihiştin, heta ku ew bimiran. Ev cûreyê mirinê, mirineke pirr tehl, dijwar û şermezar bû û bi tenê tawanbar û xerabkarên herî mezin bi vî awayî dihatin kuştin.

Belkî di nav we de hin wê bêjin:
Ma bi rastî Xwedê dixwest ku Mesîhê pîroz bi mirineke evqas êşdar û şermezar bimira?
Li ser vê yekê em dikarin weha bêjin:
Mirina Îsa mirineke ewqas tirsehêz û dijwar bû ku mirina jê zehmetir nebû, çimkî guneh sûcekî gelek tirsehêz û mezin e. Tevahiya dinyayê di bin barê guneh de ye. Em hemû gunehkar in û di çavên Xwedayê rast û pîroz de, gunehên me, sûcê herî xerab e.

Ji bo ku Xwedê li gunehên me bibihûre, divê gunehên me li gor rastî û dadperweriyê bên dadkirin. Xwedê, gunehan bi her awayî nabexişîne, yanî ew bi awayekî ne dadperwer li gunehan nabihûre çimkî ew dadgerekî rast û dadperwer e; ji ber vê yekê ew her gunehî wek ku pêwist e ceza dike.
Cezayê guneh mirin û agirê dojehê ye. Divê ew ceza bê dayîn.
Mizgînî ev e ku Xwedê Xilaskarekî rast û pîroz şand dinyayê, da ku cezayê gunehên me bi awayekî bêkêmahî bikişîne. Ew Xilaskarê rast û pîroz Îsa bi xwe ye.
Sedemê xezeba Xwedê ew e ku me hemûyan li hember wî guneh kiriye. Lê Xilaskar hat, da ku cezayê gunehên me bikişîne, da ku xezeba Xwedê nekeve ser me.

Dostên delal, ji kerema xwe ji dil û can guhê xwe bidin peyvên Încîlê. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

[16] Hingê Pîlatos Îsa teslîmî wan kir, da ku li xaçê bixin.
Li ser vê yekê wan Îsa bir. [17] Îsa bi xwe xaça xwe hilgirt û derket wî cihê ku jê
re ‹Cihê Qoqê Serî› - bi Îbranî ‹Golgota› - digotin. (Yûhenna 19:16-17)

[26] Gava ew dibirin, wan Şimûnê ku ji Kûrênê bû û ji zeviyê vedigeriya, girtin.
Xaç danîn ser pişta wî ku ew wê li pey Îsa bibe. [27] Elaleteke mezin ji xelkê li pey
Îsa diçû, di nav wan de pîrek jî hebûn ku li singê xwe dixistin û li ser Îsa digirîn.

[32] Û du mirovên din ên sûcdar jî dibirin, da ku ew jî bi Îsa re bên kuştin. [33] Çaxê
ew gihîştin wî cihê ku Qoq jê re digotin, wan ew û herdu sûcdar xaç kirin, yek li
milê wî yê rastê û yê din li milê wî yê çepê.
[34] Hingê Îsa got: «Ya Bavê min, li wan bibihûre, çimkî ew nizanin ku ew çi
dikin!»

35 Xelk jî li wê derê rawestabû û temaşe dikir. Serwerên Cihûyan jî henekên xwe
bi Îsa dikirin û digotin: «Wî kesên din xilas kirin; eger ew Mesîhê bijartiyê
Xwedê be, de bila xwe xilas bike!»
36 Leşkeran jî tinazên xwe pê dikirin, sihik jê re anîn 37 û gotin: «Eger tu
padîşahê Cihûyan bî, de xwe xilas bike!» (Lûqa 23:26-27.32-37)

19 Pîlatos depikek nivîsî û bi xaçê ve danî. Tiştê nivîsî ev bû: «ÎSAYÊ NISRETÎ,
PADÎŞAHÊ CIHÛYAN.» 20 Gelek Cihûyan ev nivîsdek xwend, çimkî cihê ku
Îsa li xaçê xistibûn nêzîkî bajêr bû û ew bi Îbranî, Latînî û Yewnanî hatibû
nivîsîn. 21 Lê serekên kahînên Cihûyan ji Pîlatos re gotin: «Nenivîse ‹Padîşahê
Cihûyan›! Binivîse ku ‹Vî mirovî got: Ez Padîşahê Cihûyan im.›»
22 Pîlatos bersîv da: «Min çi nivîsîbe, min nivîsiye.»
23 Piştî ku leşkeran Îsa li xaçê xistin, wan cilên wî hildan, kirin çar par, da ku ji
her yekî re parek bikeve. Kirasê wî jî hildan. Kiras ji serî heta binî honandî û
bêdirûtin bû. 24 Îcar ji hevdû re gotin: «Werin em vî nedirînin, em pişkê bavêjin,
ka wê ji kê re bikeve.» Ev çêbû, da ku ew peyva Dawid a di Zebûrê de bê cih:
«Cilên min di nav xwe de leva kirin û ji bo xiftanê min pişk avêtin.»
Hingê leşkeran tam evên ha kirin. (Yûhenna 19:19-24)

39 Yekî ji wan sûcdarên daleqandî jî, Îsa şermezar kir û jê re got: «Ka, ma tu ne
Mesîh î? De ka xwe û me xilas bike!»
40 Lê yê din lê hilat û got: «Ma tu ji Xwedê natirsî? Ma ne va ye, tu bi xwe jî di
bin eynî cezayî de yî? 41 Hema heçî em in, ev heqê me ye, çimkî em bergîdana
wan tiştên xerab ên ku me kirine, distînin. Lê wî tiştekî nerast nekiriye!»
42 Û ji Îsa re got: «Ya Îsa, çaxê tu bigihîjî Padîşahiya xwe, min bîne bîra xwe!»
43 Îsa jî lê vegerand û got: «Bi rastî ez ji te re dibêjim ku tê îro bi min re di
bihiştê de bî!» (Lûqa 23:39-43)

[33] Piştî nîvro saet ji diwanzdehan heta saet sisiyan tarî ket ser seranserê welêt. [34]
Û saet di sisiyan de Îsa bi dengekî bilind qîriya: «Êloyî, Êloyî, lama sabaxtanî?»
ku bê wergerandin: «Xwedayê min, Xwedayê min, te çima ez berdam?»
[35] Gava hinan ev bihîst, gotin: «Binêrin, ew gazî Êlyas dike.» [36] …[Yekî din
got]: «Bihêlin, em bibînin, ka Êlyas wê bê ku wî bîne xwarê?»

(Marqos 15:33-36)

Xelkê weha got, çimkî wan fêm nekir ka Îsa çi gotibû û wan fêm nekir ku di wê saetê de çi çêbû jî.

Încîl ji me re dibêje ku ji nîvro heta saet sisiyan tariyeke mezin tevahiya welêt girtibû.

Di wan saetên tarî de Xwedê tevahiya cezayê gunehên zarokên Adem danî ser milê Xilaskarê pîroz û bi wî da kişandin, da ku her kesê ku baweriya xwe bi Xilaskar bîne, tu caran helak nebe.

Bi rastî, hişê mirov nikare kûrahiya cefa û tengahiya ku Îsa di ber me de kişand, bistîne.

[28] Piştî vê yekê êdî Îsa dizanibû ku her tişt pêk hat. Ji bo ku Nivîsara Pîroz bê
cih, wî got: «Ez tî me.»
[29] Firaxek ji sihikê tijekirî li wê derê bû. Avgirek li nav sihikê xistî bi serê darikê
gûrizê ve danîn û dirêjî devê wî kirin. [30] Gava ku Îsa sihik vexwar, wî got:
«Temam bû» û Îsa bi dengekî bilind kir qîrîn û got: «Ya Bavê min, ‹ez ruhê xwe
didim destên te!›»
Piştî ku wî ev gotina xwe got, wî ruhê xwe da. (Yûhenna 19:28-29; Lûqa 23:46)

Erê, guhdarên delal, Xilaskarê dinyayê bi vî awayî ji bo gunehên mirovan jiyana xwe da û mir. Ji bo cara ku bê, em li benda we ne.

Di bernama din de me dît ku Îsa Mesîh li ser xaçê ji bo me mir, bû gorî.

38 Hingê perda Perestgehê ji serî heta binî çiriya û bû du perçe. 39 Sersedê ku li
pêşberî Îsa rawesta bû, gava dît ku Îsa çawa ruhê xwe da, got: «Bi rastî jî, ev
mirov Kurê Xwedê bû!»
40 Jinên ku ji dûr ve li vê yekê temaşe dikirin hebûn. Meryema Mejdelanî,
Meryema diya Yûsês û Aqûbê ciwan û Seloma jî di nav wan de bûn.
41 Dema ku Îsa li Celîlê bû, li pey wî diçûn û jê re xizmet dikirin.
Ji van pê ve, gelek jinên din jî li wir hebûn ku bi Îsa re hatibûn Orşelîmê.

(Marqos 15:38-41)

31 Ji ber ku roja Amadekirinê bû û diviya roja Şemiyê cesed li ser xaçê nemînin -
çimkî ew Şemî rojeke gelek girîng bû - serekên Cihûyan ji Pîlatos daxwaza
şkandina teşkên ên xaçkirî kirin, da ku ew bên rakirin.
32 Îcar leşker hatin; pêşî teşkên yekî û di pey de teşkên ê din ên ku bi wî re
hatibûn xaçkirin, şkandin. 33 Lê gava ku ew hatin ba Îsa û dîtin ku ew ji xwe
miriye, wan teşkên wî neşkandin. 34 Lê dîsa jî ji leşkeran yekî newqa wî bi rimê
qul kir û di cih de av û xwîn herikî. 35 - Yê ku ev dît şahidî kir, da ku hûn jî
bawer bikin. Şahidiya wî rast e û ew dizane ku ew rastiyê dibêje. - 36 Ev çêbû, da
ku ew nivîsar bê cih:
«Tu hestiyê wî nayê şkandin.»
37 Û dîsa nivîsareke din weha dibêje:
«Ewê li wî yê ku bedena wî qul kirine binêrin.»

38 Piştî vê yekê, zilamekî dewlemend, Ûsivê ji Arîmetyayê yê ku şagirtê Îsa û ji
tirsa serekên Cihûyan xwe eşkere nekiribû, daxwaza rakirina cesedê Îsa ji
Pîlatos kir û Pîlatos destûr dayê. Îcar Ûsiv hat û cesedê Îsa rakir. 39 Nîkodêmos jî
hat, yê ku cara pêşî bi şev hatibû ba Îsa; wî nêzîkî 35 lîtran ji mur û dara ûdê

tevlihevkirî anî. [40] Wan cesedê Îsa hilanî, li gor adetên Cihûyan ên veşartina miriyan, giyayên bîhnxweş lê dan û bi cawên keten ew pêçan. [41] Li cihê ku Îsa lê hatibû xaçkirin baxçeyek hebû û di nav baxçe de jî goreke nû hebû ku hê tu kes lê nehatibû veşartin. [42] Ji ber ku roja Amadekirinê ya Cihûyan bû û gor jî nêzîk bû, Îsa li wê derê dirêj kirin. (Yûhenna 19:31-42)

Dostên delal, xwendina me ya îro li vir bi dawî dibe, lê belê şikir ji Xwedê re, serhatiya jiyana Mesîh bi veşartina wî bi dawî nabe!
Loma em hêvî ji we dikin ku hûn di bernama ku bê de jî bi me re bin, çimkî hingê dabaşa me wê li ser rabûna Îsa Mesîh be.

Tiştê ku me îro bihîst, bi rastî newaze ye û mirov li ser vê yekê şaş dimîne.
Me dît ku zarokên Adem Mesîh kêm dîtin, wan Xudanê jiyanê xaç kirin.
Lê belê divê ku em bînin bîra xwe ku mirina Mesîh, plana Xwedê ya xilasiyê bir sêrî. Tiştê ku Xwedê ji destpêkê ve plan kiribû, hingê êdî hat cih.

Gelo we bihîst Îsa Mesîh beriya ku bimire çi got? Wî li ser xaçê got:
«Temam bû». Çima wî got: «Temam bû»?
Wî got: «Temam bû», çimkî êdî wî karê xilaskirinê xilas kiribû.
Eger em li dîn û diyanetên din binêrin, bi rastî ew nabêjin: «Temam bû.»
Bervajiyê vê, ew dibêjin: «Tu tişt hê temam nebûye.»
Ew dibêjin: «Divê hûn xwe bi xêr û kirinên qenc xilas bikin. De rabin, dest pê bikin! Dev jê bernedin! Tu tişt hê xilas nebûye!»
Ew dibêjin: «Eger hûn bixwazin bikevin bihiştê, divê ku hûn bixebitin,
divê ku hûn goriyan bidin, divê ku hûn hemû adetên dînê xwe pêk bînin,
divê hûn rojiyê bigirin, divê hûn dua bikin û xwe biwestînin …»
Ma peyama dîn û diyanetan ne ev e? Belê ev e.
Lê belê mizgîniya Xwedê ji bo mirovan ev e: «Temam bû!!!»
Dibêje: Bawer bikin û hûnê xilas bibin. Mesîh deynê gunehên te da;

wî tam ji bo vê yekê xwîna xwe rijand.
Xwîna Mesîh dikare gunehkarê herî xerab paqij bike û jiyana wî biguhere.
Loma heqê Îsa hebû ku ji sûcdarê daleqandî re bigota:
«Bi rastî ez ji te re dibêjim ku tê îro bi min re di bihiştê de bî!» (Lûqa 23:43)

Dostên delal, ji bo ku em ji cezayê gunehên xwe xilas bibin, tiştê ku pêwîst bû bibe, bi tevahî hatiye pêkanîn. Gorîbûna Îsa Mesîh têrê dike. Xwedê razî ye. Tiştekî ku divê bê zêdekirin tune. Êdî ne lazim e ku em wek bav û kalên xwe goriyan pêşkêşî Xwedê bikin. Ew beriya hatina Mesîh pêwist bûn, lê ji me re bi tenê ev dimîne ku em ji peyvên Xwedê bawer bikin. Xwedê li ser Mesîh û goriya wî weha got: «Temam bû».
Îsa Mesîh her tiştê ku pêxemberên Xwedê li ser cefa û mirina Xilaskarê pîroz digotin, anî cih. Heft sed salan beriya hatina Mesîh, Îşaya pêxember weha nivîsî:

9 Bi ser ku wî zordarî nekir û hîle di devê wî de peyda nebû jî,
li ba xerabkaran gor jê re hat dayîn.
Lê dema ew mir, li ba mirovekî dewlemend bû.
5 Lê belê ew ji ber neheqiyên me xurimî, yanî hat birîndarkirin;
Ew ji ber sûcên me hat perçiqandin;
Ew cezayê ku ji bo aştiya me bû, ket ser wî û bi birînên wî em sax bûn.
6 Me hemûyan wek miyan rê şaş kir, her yek ji me ket ser riya xwe;
Lê Xudan sûcê me hemûyan danî ser wî. (Îşaya 53:9.5.6)

Guhdarên delal, ma bi rastî hûn bi gotinên pêxemberan bawer dikin?
Ma hûn bawer dikin ku Îsa karê xilaskirinê yê ku pêxemberan li ser digot, anî cih?
Ma hûn niha fêm dikin ku çima Xilaskarê rast li ser xaçê mir?
Sedem hem ez û hem tu yî. Ew di ber gunehên me de mir. Di ber me de ew bû gorî û wek berxekî bêqusûr mir, bû gorî.

Diviya ku **em** biketana agirê dojehê, lê Xwedê li gor hezkirina xwe ya mezin, Îsa Mesîh şand, da ku ew cezayê me bikişîne û di ber me de bimire. Kitêba Pîroz li ser vê yekê weha dibêje:
[7] Kêm caran yek ji bo mirovekî rast dimire. Ji bo mirovekî qenc belkî yek mirinê
bide ber çavê xwe, [8] lê belê Xwedê hezkirina xwe ya ji me bi vê kifş dike ku hê
em gunehkar bûn, Mesîh ji bo me mir. (Romayî 5:7.8)
[21] Xwedê ewê ku guneh nedizanî ji bo me kir guneh, da ku em di şexsê wî de bibin rastdariya Xwedê. (Korîntî II, 5:21)

Şikir ji Xwedê re! Dilê wî bi rehm e û ew dilovan e! Loma em dikarin bêjin: «Temam bû!»
Me li goriya Birahîm nêrî û me dît ku ew mînaka goriya Mesîh bû. Xwedê ev yek anî cih: Birahîm li çiyayekî ji dêla kurê xwe ve berxek serjêkir û li eynî cihî, Xilaskarê ku ji guneh bêrî bû, yanî Îsa Mesîh, jiyana xwe ji bo me da, da her kesê ku baweriyê bi wî bîne helak nebe, lê jiyana wî ya herheyî hebe.
(Yûhenna 3:16)

Guhdarên delal, gelek spas ku hûn qenc guhdariya bernameyên me dikin.
Eger pirsên we li ser mirina Îsa Mesîh û li ser vê goriya bêkêmahî hebin, ji kerema xwe ji me re binivîsin.
Heta cara ku bê, li ser van gotinên Îsa bifikirin. Wî li ser xaçê weha got:
«Temam bû» (Yûhenna 19:30)

Di bernama din de me dît ku Îsa Mesîh çawa li ser xaçê xwîna xwe rijand, da ku deynê gunehên mirovan bide û riya ku dibe aştiya herheyî li ber me gunehkaran veke.
Her tişt tam wek ku pêxemberên Xwedê gotibûn, hat cih: Mesîh hat riswakirin, wan ew da ber qamçiyan û piştre ew xaç kirin. Wek ku berxê bêqusûr di cihê kurê Birahîm de mir, wusa jî Xilaskarê bêguneh Îsa, di ber me hemûyan de mir. Beriya ku bimire, Îsa gazî kir, got: Temam bû.
Erê, hezar caran şikir ji Xwedê re, Îsa Mesîh plana Xwedê bir serî, ew temam kir.

Mirina Mesîh a li ser xaçê di Kitêba Pîroz de bûyera herî girîng e.
Çimkî bi saya mirina Îsa, Xwedê bêyî ku dadperweriya xwe xera bike, dikare li gunehên me bibihûre.
Wek ku me beriya niha bihîst, piştî mirina Îsa, leşkerekî bi rimê newqa wî qul kir û di cih de av û xwîn jê herikî; bi vê yekê kifş bû ku bi rastî Îsa miribû. Piştre zilamekî dewlemend laşê Îsa hilda û xist goreke nû a ku wî ji bo xwe di latê de kolabû. Kevirekî mezin ê girovir li ber devê gorê hat gindirandin û ew hat girtin. Yanî her tişt tam wek ku pêxemberên Xwedê gotibûn, hat cih.
Piştre Mizgîniya Xwedê weha dibêje:
62 Dotira rojê serekên kahînan û Fêrisî çûn ba Pîlatos û gotin: 63 «Ezbenî,
di bîra me de ye, hê ku ewê xapînok dijiya, gotibû: ‹Piştî sê rojan ezê rabim.› 64
Ji bo vê yekê emir bide, da ku gor heta sê rojan bê parastin. An na, şagirtên wî dikarin bên cesedê wî bidizin û ji gel re bêjin ku ew ji nav miriyan rabûye. Hingê xapandina dawîn wê ji ya pêşî xerabtir be.»
65 Pîlatos got: «Nobedarên di emrê we de hene. Herin û hûn çawa dizanin, wusa gorê biparêzin.»
66 Ew jî çûn gor parastin, kevir mor kirin û nobedar danîn ber. (Metta 27:62-66)

[1] Piştî Şemiyê, roja pêşî ya heftiyê serê sibê zû Meryema Mejdelanî û
Meryema din çûn ku li gorê binêrin. [2] Ji nişkê ve erdhejîneke mezin çêbû.
Çimkî milyaketekî Xudan ji ezmên hat xwar, çû ser gorê, kevir gêr kir û li ser
rûnişt. [3] Dîtina wî wek birûskê bû û cilên wî wek berfê spî bûn.
[4] Nobedar ji tirsa wî lerizîn û bûn wek miriyan. (Metta 28:1-4)

Îcar gava jin gihîştin gorê, [2] wan dît ku kevirê ser gorê ji cihê xwe gindiriye,
[3] lê gava ew çûn nav wê, wan cesedê Xudan Îsa nedît. [4] Gava ew ji ber vê yekê
hê şaş diman, ji nişkê ve du zilamên ku şewq ji cilên wan diçû li ba wan
rawestan. [5] Jinan ji tirsa serê xwe kirin ber xwe.
Zilaman ji wan re got: «Çima hûn di nav miriyan de li yê sax digerin?
[6] Ew ne li vê derê ye, ew rabûye. Bînin bîra xwe, çaxê ku ew hê li Celîlê bû,
wî çi ji we re digot: [7] ‹Divê Kurê Mirov bikeve nav destên gunehkaran,
bê xaçkirin û roja sisiyan dîsa rabe.›»
[8] Û jinan jî gotinên Îsa anîn bîra xwe. [9] Ew ji ser gorê vegeriyan û çûn, ji her
yanzdeh şagirtan û ji hemûyên din re her tişt gotin. [10] Yên ku xeber ji Şandiyan
re anîn, ev in: Meryema Mejdelanî, Yohana, Meryema diya Aqûb û hinekên din
ên ku bi wan re bûn. [11] Ev yek li ber çavên Şandiyan wek çîrokeke pûç xuya bû
û wan ji jinan bawer nekir. Çimkî şagirtan hê ji Nivîsara Pîroz fêm nedikir ku
diviya Îsa ji nav miriyan rabe.
[12] Lê Petrûs rabû ser xwe û bezî ser gorê. Gava wî xwe bi ser de xwar kir,
wî ji kefenan pê ve tu tiştê din nedît. Ew çû mala xwe û li vî tiştê bûyî şaş dima.
(Lûqa 24:2-12; Yûhenna 20:9)

[13] Di wê rojê de dido ji wan diçûn gundekî ku navê wî Emwas bû. Ev gund
bi qasî yanzdeh kîlometreyan ji Orşelîmê dûr bû. [14] Herdu ji xwe re li ser
wan hemû tiştên bûyî dipeyivîn. [15] Îcar gava ew hê ji xwe re dipeyivîn û ji hev
dipirsîn, Îsa bi xwe nêzîkî wan bû û bi wan re çû. [16] Lê çavên wan dihatin girtin,
da ku ew wî nas nekin.
[17] Îsa ji wan re got: «Ev çi gotin in ku hûn di rê de ji hev re dibêjin?»

Ew bi xemgînî rawestan [18] û yekî ji wan, ku navê wî Klêpas bû, lê vegerand û
got: «Ma tu yê bi tenê yî ku li Orşelîmê dimîne û nizane ku li wê derê di van
rojan de çi çêbûye!»
[19] Wî ji wan pirsî û got: «Çi çêbûye?»
Wan got: «Ew tiştên ku li ser Îsayê Nisretî, yê ku pêxember bû û bi gotin û
kirinê li ber Xwedê û li ber tevahiya gel hêzdar bû [20] û çawa serekên kahînan û
mezinên me, ji bo ku cezayê mirinê bidinê, ew dan dest û wan ew xaç kir?
[21] Lê me hêvî dikir, ku yê Îsraêl xilas bike, ew e. Ji bilî van hemûyan jî, va ye,
îro roja sisiyan e ku ev tişt bûne. [22] Bi ser de çend jinên ji nav me em şaş kirin.
Ew hê sibê zû li ser gorê bûn, [23] û cesedê wî tê de nedîtin. Ew vegeriyan û gotin
ku milyaket li ber çavên wan xuyabûn û gotin ku ew dijî. [24] Li ser vê yekê
hinek ji yên ku bi me re ne, çûn ser gorê û çawa ku jinan gotibû, wusa dîtin.
Lê wan ew bi xwe nedît.»
[25] Îsa ji wan re got: «Hey hûn bêhişno, hûn ên ku bi derengî bi wan hemû
gotinên pêxemberan bawer dikin. [26] Ma nediviya ku Mesîh ev tişt bikişandana û
biketa rûmeta xwe?»
[27] Îcar wî ji Mûsa û hemû pêxemberan dest pê kir û ji wan re tiştên ku li ser wî
di hemû Nivîsarên Pîroz de hatibûn nivîsîn, şîrove kirin.

[28] Gava ew nêzîkî wî gundê ku ew diçûnê, bûn, Îsa wek ku ewê hê wêvetir
biçûya kir. [29] Lê wan li ber wî da û jê re gotin: «Li ba me bimîne, çimkî berêvar
e û roj li ber ava ye!»
Îsa bi wan re çû û derbasî hundir bû, da ku li ba wan bimîne. [30] Û gava ew bi
wan re li ser sifrê rûnişt, wî rahişt nên, şikir kir, şkand û da wan.
[31] Hingê çavên wan vebûn û wan ew nas kir. Lê ew ji ber çavên wan winda bû.
[32] Wan ji hev re got: «Çaxê ku ew di rê de bi me re dipeyivî û Nivîsarên Pîroz ji
me re şîrove dikirin, ma gotinên wî agir bi dilê me nedixistin?»
[33] Û hema di wê saetê de herdu rabûn û vegeriyan Orşelîmê. Wan her yanzdeh
şagirt û yên din ên bi wan re li hev civiyayî dîtin. [34] Wan ên din digotin: «Xudan
bi rastî rabûye û xwe nîşanî Şimûn [Petrûs] daye.»

35 Wan herduyan jî got ku di rê de çi çêbû û gava ku Îsa nan şkand, wan çawa
ew nas kir.

36 Hê ew wusa bi hev re dipeyivîn, Îsa bi xwe di nav wan de rawesta û got:
«Silamet li ser we be!»
37 Lê ew bizdiyan û tirsiyan, wan guman kir ku ew ruhekî li ber çavên xwe
dibînin. 38 Îsa ji wan re got: «Çima hûn şaş mane û dudilî ne?
39 Li dest û lingên min binêrin, ez bi xwe me. Destên xwe li bedena min bidin û
bibînin; çimkî ruh bê goşt û hestî ye, lê wek ku hûn dibînin, ez bi goşt û hestî
me!»
40 Û gava wî ev ji wan re got, wî dest û lingên xwe nîşanî wan dan. 41 Lê wan ji
şabûnê hê bawer nekiribû û şaşmayî bûn. Îcar wî ji wan re got: «Ka tiştekî
xwarinê li ba we heye?»
42 Wan jî perçek ji masiyekî biraştî dan wî. 43 Wî ew ji destê wan rahişt û li pêş
wan xwar.

Bêguman Îsa Mesîh ji nav miriyan rabû – şikir ji Xwedê re! Her tişt temam bû.

Di bernama din de me dît ku bi rastî Îsa Mesîh rabûye û me dît ku wî çawa xwe nîşanî şagirtên xwe kir. Lê belê yek ji şagirtan hê Îsa nedîtibû û hê jî bawer nekiribû. Încîl weha berdewam dike, dibêje:

44 Îsa ji wan re got: «Ha ew gotinên min ên ku gava hê ez bi we re bûm,
min ji we re gotibûn, ev in: Divê ew hemû tiştên ku di Şerîeta Mûsa,
di Nivîsarên Pêxemberan û di Zebûran de li ser min hatine nivîsîn, bên cih.»
45 Hingê wî hişê wan vekir, da ku ew bikarin Nivîsarên Pîroz fêm bikin.
46 Û wî ji wan re got: «Weha hatiye nivîsîn, Mesîh wê cefayê bikişîne û wê roja
sisiyan ji nav miriyan rabe 47 û ji Orşelîmê bigire heta hemû miletên dinyayê,
bi navê wî tobe û efûbûna gunehan, wê ji wan re bê danbihîstin. 48 Hûn şahidên
van tiştan in.» (Lûqa 24:13-48)

24 Tûmayê ku yek ji diwanzdehan bû, gava ku Îsa hat, ne bi wan re bû. 25
Şagirtên din ji wî re gotin: «Me Xudan dît.»
Lê Tûma ji wan re got: «Heta ku ez di destên wî de cihê bizmaran nebînim,
tiliya xwe li cihê bizmaran nedim û destê xwe daneynim ser newqa wî, ez qet
bawer nakim.»
26 Piştî heşt rojan, şagirtên Îsa dîsa li malekê bûn û Tûma jî bi wan re bû.
Derî girtî bûn, lê Îsa hat, di nav wan de sekinî û got: «Silamet li ser we be.»
27 Di pey de ji Tûma re got: «Tiliya xwe bîne vir û li destên min binêre.
Destê xwe jî dirêj bike û deyne ser newqa min. Êdî bêbaweriyê neke, lê belê bi
bawerî be!»
28 Tûma lê vegerand û got: «Xudanê min û Xwedayê min!» 29
Îsa ji wî re got: «Ji ber ku te ez dîtim tu bawer dikî? Xwezî bi wan ên ku
nabînin, lê dîsa bawer dikin!»

[30] Erê, Îsa li ber şagirtên xwe hê gelek nîşanên din jî çêkirin ku ew di vê kitêbê
de nehatine nivîsîn. [31] Lê ev hatine nivîsîn, da ku hûn bawer bikin ku Îsa, Mesîh
e, Kurê Xwedê ye û bi vê baweriyê jiyana we bi navê wî hebe. (Yûhenna 20:24-31)

Erê, bi rastî ev bûyer gelek xweş û newaze ye! Îsa ji nav miriyan rabû.
Mirin dijminê mirovan ê herî xurt e, lê Îsa ew bindest kir.
Mirinê nikaribû ew bigirta. Wek ku pilîtank ji qalikê xwe derdikeve, Îsa jî di roja sisiyan de cawên keten ji xwe kirin û ji gorê derket. Di gorê de bi tenê ew cawên keten û ew destmala ku li serê Îsa hatibû pêçandin man.
Îsa Mesîh bi bedeneke nû ya bi rûmet rabû û hemû yên ku baweriya xwe bi wî bînin, wê rojekê bedeneke weha bistînin. Loma Nivîsarên Pîroz dibêjin:
[20] Rastî ev e ku Mesîh ji nav miriyan hatiye rakirin û ew berê pêşî yê razayiyan e
[yanî ew yê pêşî ye ku ji nav miriyan rabûye].
[21] Madem ku mirin bi destê mirov hat, rabûna miriyan jî bi destê mirov çêbû. [22]
Çawa ku hemû bi Adem dimirin, wusa jî hemû wê bi Mesîh bên vejandin.
(Korîntî I, 15:20-22)

Îsa bi rabûna xwe kifş kir, wek ku wî gotibû, bi rastî ew Mesîhê Xwedê ye.
Ma tê bîra we ku Îsa gotibû: «Vejîn û jiyan ez im. Yê ku bawerî bi min anîbe, miribe jî ewê bijî.» (Yûhenna 11:25)
Erê, Îsa soz da ku ewê jiyana herheyî bide wan hemûyên ku baweriya xwe bi wî tînin – lê eger wî mirin bindest nekira, wiyê çawa em ji hêza mirinê, ji hêza guneh û ji dojehê xilas bikiran?
Belkî em dikarin vê yekê bi mînakekê hê bêtir şîrove bikin. Mesele em bêjin kurikek heye, di deryayê de sobayiyê dike. Ji nişkê ve herikîneke avê ya xurt kurik bi xwe re dibe û ew ji qeraxê dûr dikeve. Hêza kurik têrê nake ku vegere û eger yek neyê hawara wî, ewê bixeniqe yanî bifetise. Şikir ji Xwedê re, zilamek heye, ew vî kurikî dibîne û di cih de gazî dike, dibêje: «Kuriko, netirse! Ezê bêm û ezê te rizgar bikim!» Zilam jî zû zû dikeve avê û hêdî hêdî nêzîkî kurik dibe;

lê belê herikîn evqas xurt e ku tiştek ji destê wî nayê û di dawiyê de hem zilam û hem jî kurik di avê de difetisin.
Daxwaza zilêm hebû ku kurik rizgar bike, lê hêza wî têrê nedikir.
Herweha em dengê gelek mirovan dibihîzin ên ku dibêjin: «Li pey me werin, em rê dizanin û emê we bibin bihiştê!» Ew xwe xilaskar hesab dikin û bêguman daxwaza hinan ji wan qenc e, lê ew nikarin soza xwe bînin cih.
Bi rastî, ew nikarin xwe bi xwe jî rizgar bikin, çimkî qet hêza wan tune ku guneh an jî mirinê bindest bikin. Hêza mirinê ji hêza wan gelek xurttir e û çaxê ew dimirin, ewê bên veşartin û laşê wan wê di gorê de birize. Wek hemûyên din, ewê li benda Roja Dawî bimînin.

Lê belê Îsa Mesîh ne weha ye. Wî li ser xwe rast got.
Îsa ji pêşî ve çi gotibe, her tişt tam wusa derket. Îsa mir û bû gorî, da ku gunehan rake, ew hat veşartin û di roja sisiyan de ew rabû û ji gorê derket.
Tu pêxember din tune ku piştî mirina xwe bi sê rojan ji nav miriyan rabûbe û her û her sax be! Îsa Mesîh mirin û diyarê miriyan bindest kirin. Wî hem guneh, hem Îblîs, hem mirin û hem jî dojeh bindest kirin.
Lê mizgîniya herî qenc û newaze ev e: Hemû yên ku ji vê mizgînî û bûyera mirin û rabûna Îsa Mesîh bawer dikin, wê her û her di Padîşahiya Xwedê de hevparên rûmeta Îsa Mesîh bin.
Piştî ku Îsa ji nav miriyan rabû, wî got: 17 «Netirse, ez Yê pêşî û Paşî me.
18 Û Yê Zindî ez im. Ez mirî bûm, lê va ye, ez her û her dijîm. Û miftên mirinê û yên diyarê miriyan bi min re ne.» (Peyxama Yûhenna 1:17.18)

Xwedê Îsa Mesîh rakir, da ku hûn rast û rast bizanin ew ji aliyê Xwedê ve hem Xilaskar û hem jî dadger hatiye kifşkirin. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
12 Xilasî bi tu kesî din tune; çimkî di bin ezmên de, di nav mirovan de, navekî din nehatiye dayîn ku em bikarin pê xilas bibin.» (Karên Şandiyan 4:12)

Xwedê rojek kifş kiriye û ewê di wê rojê de bi destê zilamê ku wî destnîşan kiriye bi dadperwerî dîwana dinyayê bike. Bi rakirina wî ya ji nav miriyan, Xwedê ewlehî da hemûyan, ku Îsa Mesîh ji bo vî karî hatiye destnîşankirin.»

(Karên Şandiyan 17:31)

[9] Eger tu bi devê xwe eşkere bikî ku Îsa Xudan e û di dilê xwe de bawer bikî ku Xwedê ew ji nav miriyan rakiriye, tê xilas bibî. [13] Çimkî: «Her kî ku gazî navê Xudan bike, wê xilas bibe.» (Romayî 10:9.13)

Dostên delal, em ji bo guhdarîkirina we gelek spas dikin. Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de bi xwendina Încîlê berdewam bikin û emê bibînin ku Îsa Mesîh piştî rabûna ji nav miriyan çil rojan ji şagirtên xwe re xuya bû, bi gelek delîlan xwe sax nîşanî wan da û hingê hilkişiya ezmên.

Bila Xwedê ji bo fêmkirina dersa îro dil û hişê we veke. Û bila ev gotinên ji Nivîsarên Pîroz li bîra we bin. Ew dibêjin:

Îsa di ber neheqiyên me de teslîmî mirinê hat kirin û ji bo rastderxistina me rabû.

(Romayî 4:25)

Ev demeke dirêj e ku em li gelek bûyer û serhatiyên jiyana Xilaskarê mezin Îsa Mesîh dinêrin.
Me dît ku mana navê Îsa ev e: Xwedê xilas dike, yanî Xwedê rizgar dike.
Herweha me dît ku li gor zimanê Yewnanî mana Mesîh ev e: Yê ku hatiye rûnkirin, yanî yê ku ji bo kardestiyeke bilind hatiye kifşkirin. Xwedê, Îsa Mesîh kifş kir ku zarokên Adem ji desthilatiya guneh xilas bike.

Lê belê me dît ku piraniya xelkê fêm nekir ku bi rastî Îsa kî ye.
Hinan digot ku ew pêxember e, lê ew tênedigihîştin ku ew bi xwe Peyva Xwedê ye ya ku ji ezmên hatiye û di nav mirovan de li ser vê dinyayê bûye mirov.
Serekkahîn û rêberên Cihûyan çavnebariya wî dikirin û di dawiyê de ew dan xaç kirin.
Lê belê Xwedê ji pêşî ve bi van hemû tiştan dizanî û li gor plana xwe ew rêz kiribûn. Mirina Mesîh a li ser xaçê tam li gor plana Xwedê bû; loma wî bi devê pêxemberan ji zû ve li ser van tiştan digot.
Di bernama din de me dît ku Xwedê di roja sisiyan de Îsa ji nav miriyan rakir.
Îsa xwîna xwe rijand û bi vî awayî deynê gunehên zarokên Adem da.
Ew mir, da ku mirovan ji hêza guneh, ji tirsa mirinê û ji cezaya dojehê xilas bike û rabûna Îsa Mesîh a ji nav miriyan kifş dike ku Xwedê ew yeka ku Mesîh xwe kir gorî, ji bo bexişandina gunehan qebûl kir.

Piştî ku Îsa rabû, ew ji şagirtên xwe re xuya bû. Wî di dest û lingên xwe de birînên bizmaran nîşanî wan dan. Herweha me xwend ku Îsa bi şagirtên xwe re xwar, da ji wan re kifş bibe ku ew zindî ye.
Încîl dibêje ku Îsa di nav çil rojan de ji şagirtên xwe re xuya bû û ji wan re li ser Padîşahiya Xwedê peyivî. Carekê çaxê Îsa ji wan re xuyabû, ji pênc sed mirovan bêtir civiya bûn. (Korîntî I, 15:6)

Lê belê ji bo vejîna Îsa Mesîh delîlê herî mezin ew e ku ew di dilê bawermendan de rûdine. Yanî eger mirovek baweriya xwe bi Îsa bîne, Îsa wê bikeve dilê wî.

Îro em dixwazin li ser desthilatiya Mesîh bipeyivin. Xwedê bi xwe ew desthilatiya mezin daye wî û emê bibînin ku wî çawa xatir ji şagirtên xwe xwestin û hilkişiya ezmên.

Ji bo vê yekê emê dest bi deriyê herî dawî yê Mizgîniya li gor Metta bikin.
16 Her yanzdeh şagirt çûn Celîlê, wî çiyayê ku Îsa ji wan re gotibû herinê. 17
Gava ku wan ew dît, perizîn wî; lê hinek ji wan dudilî bûn. 18 Hingê Îsa nêzîkî
wan bû û ji wan re got: «Li erdê û li ezmên hemû desthilatî ji min re hatiye
dayîn. 19 Loma herin û hemû miletan bikin şagirtên min: Wan bi navê Bav, Kur
û Ruhê Pîroz imad bikin, 20 hemû tiştên ku min li we emir kirine, hînî wan bikin,
da ku pêk bînin. Va ye, ez herdem heta dawiya dinyayê bi we re me.» (Metta
28:16-20)

Gelo we bihîst ku Îsa ji şagirtên xwe re çi got? Wî got: «Li erdê û li ezmên hemû desthilatî ji min re hatiye dayîn. Loma herin û hemû miletan bikin şagirtên min.» Çima Mesîh got: «Li erdê û li ezmên hemû desthilatî ya min e?»

Me di Tewratê de dît ku Xwedê çawa mirovê pêşî Adem afirand.

Me xwend ku Xwedê desthilatî da wî ku ew bibe serwerê her tiştê ku Xwedê li ser erdê afirandibû.

Daxwaza Xwedê ew bû ku Adem hem li ber Xwedê bijî û hem jî bi Xwedê re her û her serwertiyê bike. Lê belê roja ku Adem guhê xwe neda emrê Xwedê û ji fêkiyê dara zanîna qencî û xerabiyê xwar, wî ew desthilatî winda kir.

De vêca em hemû zarokên Adem in û em dizanin ku «nexweşiya vegir li ser nexweşê pêşî tenê namîne»; loma me jî ev berbijarî winda kir û em bi vî halê xwe ve nikarin li ber Xwedê bijîn û bi wî re serwertiyê bikin.

Wek Adem em hemû gunehkar in; em dûrî Xwedê û dûrî rûmeta wî di bin hukumdariya guneh de çêbûne.

Lê belê, em şikir ji Xwedê re dikin, çimkî wî di Kitêba Pîroz de nîşanî me kir ku wî li gor plana xwe ya xilasiyê li ber me deriyek vekir, da ku em di wî deriyî re li Xwedê vegerin û bibin hevparên rûmeta wî.
Ew derî Mesîhê pîroz bi xwe ye. Ew ji ezmên hat, wî xwîna xwe rijand û jiyana xwe kir gorî, da ku me ji gunehên me paqij bike û me li Xwedê vegerîne.
Wek ku Adem hatibû ceribandin, Îsa Mesîh jî ket ceribandinê, lê Îsa Mesîh qet tu caran guneh nekir.
Wek ku Xwedê bêkêmahî, bêqusûr û pîroz e, Îsa Mesîh bêkêmahî, bêqusûr û pîroz bû. Loma Xwedê şerm nekir ku jê re bêje Kurê min. Îcar piştî ku Îsa jiyana xwe da, kir gorî û bi vî awayî guneh xîş kirin, Xwedê ew ji nav miriyan rakir, ew kir Xudanê xudanan û li erdê û li ezmên hemû desthilatî da wî.

Belkî hin wê bipirsin: «Eger bi rastî Îsa Xudanê her tiştî be, çima ev dinya ha hê tije xerabî, tengahî û guneh e?»
Ji kerema xwe guhê xwe bidin Nivîsarên Pîroz ku ew çi bersîvê didin. Ew dibêjin:

22 Çawa ku hemû bi Adem dimirin, wusa jî hemû wê bi Mesîh bên vejandin. 23
Lê her kes di dora xwe de: Berê pêşî Mesîh; piştre, di hatina Mesîh de yên wî wê
rabin. 24 Piştre, çaxê ku Mesîh her hukumdarî û her desthilatî û hêzê betal bike û
padîşahiyê bide destê Bav Xwedê, wê bibe dawî. (Korîntî I, 15:22-24)
4 Ewê ji çavên wan hemû hêstirên wan paqij bike û êdî mirin wê nebe. Êdî şîn û
girîn, êş û elem jî wê nebin; çimkî tiştên berê bihûrîn.» (Peyxama Yûhenna 21:4)

Ji van peyvan û ji gelek ayetên din em hîn dibin ku Xwedê hemû desthilatî da Îsa Mesîh, da ku ew li ser hemûyan serwertiyê bike û bibe dadgerê hemûyan.
Lê belê heta îro hê wî serwertiya xwe eşkere nekiriye û wî hê dest bi dîwankirina mirovên vê dinyayê jî nekiriye.

Lê belê em vê yekê dizanin: Rojekê Îsa Mesîh wê vegere û di wê rojê de serwertiya wî wê li ber çavê hemûyan eşkere bibe, ewê bibe padîşahê tevahiya dinyayê û ewê her tiştî nû bike.

Loma, hûn kî bin û hûn li ku derê bin, Xwedê emir li we dike ku hûn tobe bikin, ji gunehên xwe vegerin, li wî bizivirin û ji mizgîniya xilasiyê bawer bikin.
Wek ku hûn dizanin, mizgînî jî ev e ku Îsa Mesîh di ber me de mir û ji nav miriyan rabû.
Eger mirov ji dil û can bawer bike, Xwedê wê bi navê Îsa li hemû gunehên wî bibihûre û bi hêza Ruhê Pîroz dilê wî nû bike. Eger hûn baweriya xwe bi Mesîh bînin, ewê bi Ruhê Pîroz bê dilê we û wê li wir padîşahiya xwe saz bike.
Heta ku Mesîh bi xwe vegere û dîwana dinyayê bike, ew vê dinyayê naguhere. Lê belê ew dixwaze û dikare niha dilê te û jiyana te biguhere! Gelo tê destûrê bidî wî ku di dilê te de padîşahiya Xwedê damezirîne?

Dostê delal, Xwedê ji te re xilaskar şand û ew xilaskar dikare barê gunehên te ji milê te rake û dilekî nû û paqij bide te.
Bi rastî tu dikarî bizanî ku tê her û her di Padîşahiya Xwedê de li ba wî bî.
Şert bi tenê ev e: Ji rastiyê bawer bike, yanî baweriya xwe bi Xilaskar Îsa Mesîh ê ku Xwedê şand, bîne.

[Destê Xwedê yê ku alîkariyê dike, li ser we hemûyan be.]

Di bernama din de me dît ku Xwedê ji me re xilaskar şand û ew xilaskar dikare barê gunehên me ji ser milê me rake û dilekî paqij bide me.
Erê, em dikarin bizanin ku emê her û her di Padîşahiya Xwedê de li ba wî bin.
Şert bi tenê ev e ku em baweriya xwe bi Xilaskar Îsa Mesîh ê ku Xwedê şand, bînin.
Vê yekê jî qenc bizane: Eger tu Xilaskarê ku Xwedê şandiye dinyayê qebûl nekî û wî înkar bikî, hingê ewê bibe dadgerê te. Kitêba Pîroz weha dibêje:
Gava Xudan Îsa bi milyaketên xwe yên bihêz ve di pêta êgir de ji ezmên xuya
bibe, [8] hingê ewê heyfê ji wan ên ku Xwedê nas nakin û ji wan ên ku bi ya
Mizgîniya Xudanê me Îsa nakin, bistîne. [9] Ew mirov wê ji ba Xudan û ji rûmeta
qeweta wî bên avêtin û cezayê helakbûna herheyî bikişînin. (Selanîkî II, 1:7-9)

Guhdarên hêja, Peyva Xwedê zelal e û xelet neyê fêmkirin. Peyva Xwedê ji me re dibêje: Hemûyên ku Mizgîniya Xwedê ya li ser mirin û rabûna Îsa Mesîh qebûl bikin, wê xilas bibin. Lê belê, hemûyên ku ji Mizgîniya Xwedê bawer nekin, dîwana wan wê bê kirin.
Îsa jiyana xwe kir gorî û xwîna xwe rijand, da ku gunehên te paqij bibin.
Lê belê eger tu ji hemû dilê xwe bawer nekî, ew xwîna ku Îsa Mesîh rijand, ji bo te bêkêr e.
Nivîsarên Pîroz dibêjin: [18] Yê ku baweriyê bi wî tîne, sûcdar nayê derxistin;
lê yê ku baweriyê nayne, ji xwe sûcdar bûye, çimkî wî bawerî bi navê Kurê Xwedê yê yekta neaniye. (Yûhenna 3:18)

Erê, eger mirovek ji Mizgîniya Îsa Mesîh bawer bike, ewê xilas bibe, lê eger ew bawer neke, ewê di nav gunehên xwe de helak bibe.
Mizgîniya xilasiyê ya ku Xwedê bi zarokên Adem da zanîn, ev e. Ji bo vê yekê
Îsa li şagirtên xwe emir kir û got: [18]«Li erdê û li ezmên hemû desthilatî ji min re
hatiye dayîn. [19] Loma herin û hemû miletan bikin şagirtên min. (Metta 28:18.19)

Niha em dixwazin dabaşa xwe berdewam bikin.
Piştî ku Îsa ji nav miriyan rabû, ew di nav çil rojan de ji şagirtên xwe re xuyabû.
Nivîsarên Pîroz dibêjin:
[4] Gava ku Îsa bi wan re bû, wî tembîh li şagirtan kir ku ji Orşelîmê dernekevin,
lê li hêviya soza Bav bin. Wî got: «We ev soz ji min bihîstiye. [5] Yûhenna bi avê
imad kir, lê piştî çend rojan hûnê bi Ruhê Pîroz imad bibin.» (Karên Şandiyan 1:4-5)

Gelo we bihîst ku Îsa çi got? Me berî niha bihîst ku Îsa ji şagirtan re soz dabû ku Bavê wî yê ezmanî wê Alîkar, yanî Ruhê Pîroz bişanda ser wan, da ku ew di dilê wan de bijiya, ew paqij bikiran, ew nûvejen bikiran, hêz bida wan û di hemû rastiyê de rêberiya wan bikira.
Niha em dibihîzin ku Îsa emir li şagirtên xwe kir ku ew li Orşelîmê li hêviya Ruhê Pîroz bimînin. Xwedê hez bike, emê di bernameyên ku bên de bibihîzin ku tam li gor soza Mesîh, Ruhê Pîroz çawa ji ba Xwedê hat û dilê hemû şagirtên Îsa tije kir.

Emê niha ji we re bixwînin ku Îsa çawa xatir ji şagirtên xwe xwest û hilkişiya ezmên. Nivîsarên Pîroz dibêjin:

[6] Îcar gava ku ew hatin ba hev, wan ji Îsa pirsî: «Ya Xudan, ma tê di vê demê de
padîşahiyê bi şûn de bidî Îsraêl?» [7] Îsa li wan vegerand û got: «Ev ne karê we ye
ku hûn wan wext û demên ku Bav bi hukumdariya xwe biryar dide, bizanin.
[8] Lê gava ku Ruhê Pîroz bê ser we, hûnê hêzê bistînin û li Orşelîmê, li tevahiya
Cihûstanê, li Sameryayê û heta bi kujê dinyayê yê herî dûr bibin şahidên min.»

[9] Çaxê wî ev tişt gotin, hê wan lê dinêrî, ew bi ezmên ve hat hilkişandin û ewrekî
ew ji ber çavê wan stand. [10] Gava Îsa diçû û wan zîq li ezmên dinêrî, ji nişkê ve
du mirovên cilspî li ba wan rawestan. [11] Wan got: «Celîlîno, çima hûn li vir
radiwestin û li ezmên dinêrin? Ev Îsayê ku ji nav we ber bi ezmên ve hat
hilkişandin, çawa we dît ku ew hilkişiya ezmên, wusa jî wê vegere.» (Karên Şandiyan 1:6-11)

Îcar Îsa Mesîh bi vî awayî çû ezmên û vegeriya rûmeta Bavê xwe. Kêm û zêde beriya 33 salan ew ji wir hatibû vê dinyayê.
Ew Îsayê ku ew sê sal bû şagirtên wî li pey wî diçûn, bêguman ew Mesîhê Xwedê bi xwe bû. Hemû pêxemberan li ser wî digot û Îsayê Nisretî di bûyîna xwe de, di jiyana xwe de, di mirina xwe de, di veşartina xwe de, di rabûna xwe de û di çûyîna xwe ya ezmanan de hemû pêxemberîtiyên mirovên Xwedê anîn cih.
Erê, Dawid pêxember bi xwe di Zebûrê de li ser çûyîna Mesîh a ezmanan gotibû!
Dostên delal, ma hûn dizanin ku îro Îsa Mesîh li ku derê ye? Nivîsarên Pîroz ji me re dibêjin ku Îsa Mesîh hilkişiya ezmên, li milê Xwedê yê rastê ye û milyaket, desthilatî û hêz bi ya wî dikin. (Petrûs I, 3:22)
Erê, Îsa li ezmên li ba Xwedê ye, Xwedê ew bilind kir, ew li milê wî yê rastê rûdine û milyaket, desthilatî û hêz bi ya wî dikin.
Hemû benderuh û xulamên Xwedê yên rast bi ya Xudan Îsa Mesîh dikin.
Gelo ma hûn jî di nav wan xulamên wî de ne? Ma hûn jî bi ya Îsa Mesîh dikin?
Xwedê ew hilbijart, da ku ew hem Xilaskar û hem jî Dadgerê dinyayê be.

Wek ku me beriya niha xwend, piştî ku Îsa hilkişiya ezmên, du milyaket xuya bûn û ji şagirtên wî re gotin:
Çima hûn li vir radiwestin û li ezmên dinêrin? Ev Îsayê ku ji nav we ber bi ezmên ve hat hilkişandin, çawa we dît ku ew hilkişiya ezmên, wusa jî wê vegere.»
Rast e, rojekê Îsa Mesîh wê bi ewran re vegere. Gelo ma we xwe ji bo vê rojê amade kiriye? Wê rojê her kes wê wî bibîne û her kes wê bizane ku Xwedê ew hem Xilaskar û hem jî Dadgerê dinyayê kifş kiriye.
Nivîsarên Pîroz li ser Mesîh weha dibêjin:
6 Ew, bi ser ku di xasîtiya Xwedê de bû jî, wî wekheviya bi Xwedê re xenîmetek hesab nekir.

7 Lê belê wî mezinahiya xwe ji xwe xist, xasîtiya xulam stand û bû mîna
mirovan, di şiklê mirovan de xuya bû.
8 Wî xwe nizim kir, îtaet kir û çû mirinê heta çû mirina li ser xaçê.
9 Ji bo vê yekê Xwedê ew gelek bilind kir û navê di ser her navî re da wî.
10 Da ku bi navê Îsa, hemû yên li ezmên, li erdê û di bin erdê de, herin ser çokan
11 û ji bo mezinahiya Bav Xwedê, her ziman eşkere bike û bêje ku Îsa Mesîh
Xudan e. (Filîpî 2:6-11)

Guhdarên delal, em bi hêvî ne ku hûn di bernama ku bê de jî bi me re bin. Hingê emê bibînin ku Xwedê çawa Ruhê xwe yê pîroz şand dilê şagirtên xwe. Bi rastî ew ne tenê di dilê wan de rûdine, lê ew di dilê wan hemû mirovan de ye yên ku Îsa Mesîh Xudan û Xilaskarê xwe qebûl kirine.

Heta hingê li ser gotinên wan herdu milyaketan bifikirin ên ku gotin:

Ev Îsayê ku ji nav we ber bi ezmên ve hat hilkişandin, çawa we dît ku ew hilkişiya ezmên, wusa jî wê vegere. (Karên Şandiyan 1:11)

Di çend bernameyên me yên berî niha de me ji Încîlê bihîst ku Îsa Mesîh her tiştê ku pêxemberên Xwedê ji pêşî ve li ser mirin û rabûna wî gotibûn, anî cih. Me dît ku Îsa xwîna xwe ya pîroz li ser xaçê rijand, da ku deynê gunehê zarokên Adem bide. Herweha me dît ku wan ew ji xaçê anî xwar û ew di goreke ku di latê de kolandî bû, hat veşartin. Lê belê di roja sisiyan de Xwedê ew ji nav miriyan rakir. Piştî ku Îsa rabû, ew di nav çil rojan de ji şagirtên xwe re xuyabû û bi gelek delîlan eşkere kir ku bi rastî ew zindî ye.
Li ser vê yekê me di bernama xwe ya din de dît ku Îsa çawa li ber çavên şagirtên xwe hilkişiya ezmên

Gelo tê bîra we, beriya ku ew vegere ezmên, Îsa li şagirtên xwe çi emir kir?
Em dixwazin vê yekê careke din bixwînin:
4 Gava ku Îsa bi wan re bû, wî tembîh li şagirtan kir ku ji Orşelîmê dernekevin,
lê li hêviya soza Bav bin. Wî got: «We ev soz ji min bihîstiye. 5 Yûhenna bi avê
imad kir, lê piştî çend rojan hûnê bi Ruhê Pîroz imad bibin. .. gava ku Ruhê
Pîroz bê ser we, hûnê hêzê bistînin û li Orşelîmê, li tevahiya Cihûstanê, li
Sameryayê û heta bi kujê dinyayê yê herî dûr bibin şahidên min.»
9 Çaxê wî ev tişt gotin, hê wan lê dinêrî, ew bi ezmên ve hat hilkişandin û ewrekî
ew ji ber çavê wan stand. 10 Gava Îsa diçû û wan zîq li ezmên dinêrî, ji nişkê ve
du mirovên cilspî li ba wan rawestan. 11 Wan got: «Celîlîno, çima hûn li vir
radiwestin û li ezmên dinêrin? Ev Îsayê ku ji nav we ber bi ezmên ve hat
hilkişandin, çawa we dît ku ew hilkişiya ezmên, wusa jî wê vegere.»
12 Hingê [şagirtên Îsa] ji dera ku jê re digotin Çiyayê Zeytûnê vegeriyan
Orşelîmê. Ev çiya bi qasî kîlometreyekê ji Orşelîmê dûr bû. 13 Gava ku ew ketin
bajêr, çûn oda jorîn a ku lê rûdiniştin. Petrûs, Yûhenna, Aqûb, Endrawis,
Filîpos, Tûma, Bertolomeyos, Metta, Aqûbê kurê Halfayos, Şimûnê welatparêz
û Cihûdayê kurê Aqûb li wir bûn. 14 Van hemûyan hergav bi hev re, tevî hinek
jinan, bi Meryema diya Îsa û birayên wî re, xwe dan duakirinê.

(Karên Şandiyan 1:6-14)

Îcar Îsa ji ba şagirtên xwe çû, vegeriya bihiştê, yanî zivirî wî cihê ku jê hatibû dinyayê. Ew li milê Xwedayê herî bilind ê rastê rûnişt û ew di rûmeta ezmanî de ye heta wê rojê ku ew vegere û dîwana dinyayê bike.
Gelo we bihîst ku Îsa li şagirtên xwe çi emir kir? Beriya ku vegere ezmên, wî ji wan re got: Li Orşelîmê bimînin heta ku hûn ji ezmên hêza Ruhê Pîroz bistînin.

Belkî hin wê bipirsin bêjin: Ew Ruhê Pîroz kî ye?
Ruhê Pîroz hem Ruhê Xwedê û hem jî Ruhê Îsa Mesîh e. Ew bi Bav Xwedê re û bi Kur, yanî bi Îsa re yek e, lê dîsa jî ji wan cihê ye. Ew di bêdestpêkê de û ji beriya afirandina erd û ezmên ve bi Bav û bi Kur re hebû.
Wî Ruhê Xwedê di demên berê de rêberiya pêxemberan dikir û peyvên Xwedê bi wan dida zanîn. Pêxemberan bi saya Ruhê Pîroz hem peyvên Xwedê nivîsandin û hem jî ji xelkê re digotin. Ruhê Pîroz Ruhê Yê Herî Bilind e; Ruhê Pîroz hat ser Meryema keçik, da ku ew bibe diya wî zarokê pîroz Îsa.
Ew Ruhê Pîroz di hundirê Mesîh Îsa de bû. Îsa li ser wî digot û soz da şagirtên xwe ku piştî hilkişîna wî ya ezmanan, ewê Alîkarekî, yanî Ruhê Pîroz bide wan. Wî li ser vê yekê weha got:
16 Ezê ji Bav bixwazim û ewê Alîkarekî din bide we, da ku her û her bi we re
bimîne. 17 Ew Ruhê Rastiyê ye; dinya nikare wî qebûl bike, çimkî ne wî dibîne û
ne jî wî nas dike. Lê hûn wî nas dikin, çimkî ew bi we re dimîne û ewê di dilê
we de be. (Yûhenna 14:16.17)

Bi rastî girîng e ku em van peyvên Îsa Mesîh ên li ser hatina Alîkar bi zelalî fêm bikin. Carna mirov dibêjin ku Îsa bi van gotinan soz dabû ku pêxemberekî din wê bê. Lê belê ji gotinên Îsa kifş dibe ku wî ne li ser mirovekî digot. Wî got ku Alîkar wê ne mirov be, lê wê ruh be; wî got ku tu kes nikare Ruhê Pîroz bibîne û got ku ewê di dilê şagirtan de be. Îcar Ruhê Pîroz kî ye?

Ruhê Pîroz ew ruh e yê ku Xwedê dide hemûyên ku baweriya xwe bi Mesîh tînin. Wek ku ew ji nû ve bên dinyayê, ew wan mirovên ku Mesîh qebûl dikin, nû dike. Ew wan paqij dike, ew hêzê dide wan, ew wan dike zarokên Xwedê û di rûmeta Xwedê de parê dide wan.

Di bernama ku bê de emê bibînin ku Xwedê çawa di roja Pentîkostê de Ruhê xwe yê pîroz şand ser şagirtên Îsa Mesîh. Roja Pentîkostê cejneke mezin a gelê Îsraêl bû. Ew cara pêşî di dema Mûsa pêxember de hat pîrozkirin û hûn dikarin li ser vê yekê di Tewratê de bixwînin. Di wê rojê de gelê Îsraêl di dema dirûna genim de ji Xwedê re ji bo hemû bereket û pîrozbahiyê şikir dikir.
Lê belê îro mana herî girîng a cejna Pentîkostê ew e ku Xwedê di wê rojê de Ruhê Pîroz şand, da ku ji wê rojê pê ve di dilê hemû bawermendên Mesîh de rûne.
Cejna Roja Pentîkostê 50 rojan piştî Cejna Derbasbûnê çêbû û plana Xwedê ew bû ku Ruhê Pîroz 50 rojan piştî mirin û rabûna Îsa Mesîh bişanda ser şagirtan.
Emê di bernama ku bê de hê bêtir li bûyera wê rojê binêrin, lê niha em dixwazin xaleke pir girîng bînin ber çavê xwe:

Di wê Roja Pentîkostê ya piştî mirin û rabûna Îsa Mesîh de Civîn, yanî civîna bawermendên Îsa Mesîh hat sazkirin. Hingê êdî Mesîh ne di nav wan de bû, çimkî ew hilkişiyabû ezmên. Lê wê rojê Xwedê hêza Ruhê xwe yê pîroz şand ser şagirtên Mesîh û ew bûn civîna bawermendên Mesîh a pêşî.
Bi rastî civîna bawermendan ne avahiyek e, yanî ne dêrek e û ne jî dîn an diyanet e. Peyva Yewnanî ya ji bo Civînê «eklêsiya» ye û mana vê ev e: «Yên ku hatine gazîkirin», yanî civîn ji wan mirovan pêk tê yên ku ji aliyê Îsa Mesîh ve hatin gazîkirin ku bibin şagirtên wî û li pey wî biçin.
Xaniyê perizînê an dêra wan şagirtên pêşî tune bû. Ew hem li malên xwe û hem jî di eywanên Perestgehê de diciviyan.

Erê, Civîna Îsa Mesîh a rastîn ji wan mirovan pêk tê yên ku ji Roja Pentîkostê ve û heta îro jî ji malbata Adem derbasî malbata Mesîh bûne.
Ew hemû bi vê yekê tên naskirin: Wan hemûyan ji dil û can goriya Mesîh a bêqusûr û bêkêmahî qebûl kiriye.
Guhdarên delal, bawermendê Mesîh ne ew e ku heftiyê carekê an du caran diçe dêrê. Bawermendê Îsa Mesîh ew e yê ku Ruhê Pîroz di dilê wî de ye; yên Mesîhî dizanin ku ew zarokên Xwedê ne, çimkî Îsa Mesîh gunehên wan bexişandine û jiyaneke nû daye wan. Loma ew ji dil û can li hêviya vegerîna Îsa Mesîh in.

Guhdarên delal, heta bernama ku bê, bila li ser van gotinên milyaketan kûr bifikirin. Wan got: Ev Îsayê ku ji nav we ber bi ezmên ve hat hilkişandin, çawa we dît ku ew hilkişiya ezmên, wusa jî wê vegere.

[ Em ji bo we bextewarî û serfiraziyê dixwazin. ]

Di bernama din de em li ser Ruhê Pîroz peyivîn. Niha em dixwazin bibînin ku di Cejna Roja Pentîkostê de çi çêbû. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

1 Gava ku Roja Pentîkostê hat, ew hemû bi hev re li derekê civiyabûn.
2 Ji nişkê ve ji ezmên dengek wek rabûna bayekî xurt hat û ew mala ku ew lê
rûdiniştin tije kir. 3 Zimanên wek pêlên agir di nav wan de xuya bûn û li ser her
yekî ji wan danîn. 4 Hemû bi Ruhê Pîroz tije bûn û bi gotina ku Ruhê Pîroz dabû
wan, dest pê kirin bi zimanên din peyivîn.
5 Hingê li Orşelîmê, Cihûyên xwedêtirs ji hemû miletên ser rûyê erdê hebûn.
6 Li ser vî dengî elaleteke mezin civiya û tevlihev bû, çimkî her kesî dibihîst ku
bi zimanê wî dipeyivin. 7 Matbûyî û şaşmayî pirsîn:
«Ma ev hemû yên ku dipeyivin ne ji Celîlê ne? 8 Ma çawa çêdibe ku her yek ji
me zimanê xwe yê dê dibihîze?... Em dibihîzin ku ev bi zimanên me li ser karên
Xwedê yên mezin dibêjin.» 12 Hemû şaş û heyirî man û ji hev pirsîn: «Ma ev çi
ye?»
13 Lê hinekên din jî tinazên xwe dikirin û digotin: «Ev bi şeraba nû serxweş
bûne.»

14 Lê Petrûs bi yanzdehan ve rabû, dengê xwe bilind kir û ji wan re got:
«Gelî Cihûyan û hûn hemû yên ku li Orşelîmê ne! Guh bidin peyvên min.
Ev ew e ku bi devê Yoêl pêxember hatiye gotin:
17 ‹Di rojên dawîn de, Xwedê dibêje: Ezê ji Ruhê xwe bi ser hemû mirovan de
birijînim. Kur û keçên we wê pêxemberîtiyê bikin…
21 Hingê, her kî ku gazî navê Xudan bike, wê xilas bibe.›
22 «Gelî Îsraêliyan, Îsayê Nisretî, ji aliyê Xwedê ve ji we re bi kerametan, bi
karên mezin û nîşanan hat erê kirin. Hûn bi xwe bi karên ku Xwedê bi destê wî,
di nav we de kirine dizanin. 23 Li gor armanc û pêşzanîna Xwedê ew ji aliyê we
ve hat girtin û we ew bi destê yên ku Şerîetê nas nakin li xaçê xist û kuşt.

24 Lê Xwedê ew vejand û êşên mirinê rakirin, çimkî îmkan nebû ku ew ji aliyê
mirinê ve girtî bima. 25 Dawid [pêxember] jî li ser wî weha dibêje:
‹Min Xudan hergav li pêşiya xwe dît, ew li milê min ê rastê ye, da ku ez
veneleqim. 26 Ji ber vê yekê dilê min geş û zimanê min gelekî şa bû.
Bedena min jî wê bi hêviyê bijî. 27 Çimkî tu canê min li diyarê miriyan nahêlî
û tu nahêlî ku Pîrozê te rizîbûnê bibîne…
29 «Birano bavê me Dawid hem mir û hem jî hat veşartin û gora wî jî heta îro li
ba me ye. 30 Lê ji ber ku ew pêxember bû, wî dizanibû ku Xwedê ‹jê re sond
xwariye ku wê yekî ji dûndana wî li ser textê wî bide rûniştin.› 31 Dawid ev ji
pêşî ve dît û li ser vejîna Mesîh got: ‹Ew ne li diyarê miriyan hat hiştin û ne jî
bedena wî rizîbûn dît.›
32 Xwedê ev Îsa ji nav miriyan rakir û em hemû şahidên vê yekê ne.
33 Îcar ew hatiye hilkişandin milê Xwedê yê rastê û ji Bav soza Ruhê Pîroz stand
û çawa ku hûn dibînin û dibihîzin ew rijandiye. 34 Erê, Dawid hilnekişiya
ezmanan, lê ew bi xwe dibêje:
‹Xudan ji Xudanê min re got: Li milê min ê rastê rûne,
35 Heta ku ez dijminên te bikim pêgeha lingên te.›
36 Îcar bila hemû mala Îsraêl qenc bizane ku Xwedê ew Îsayê ku we xaç kir,
hem kiriye Xudan û hem Mesîh.»
37 Gava ku wan ev bihîst, wek ku tîrek li dilê wan ketibe, ji Petrûs û Şandiyên
din re gotin: «Birano! Ma em çi bikin?»
38 Petrûs ji wan re got: «Tobe bikin û bila her yek ji we bi navê Îsa Mesîh imad
bibe, da ku li gunehên we bê bihûrtin û hûnê diyariya Ruhê Pîroz bistînin.
39 Çimkî ev soz ji bo we, ji bo zarokên we û ji bo hemûyên ku dûr in; ji bo her
kesî ye ku Xudan Xwedayê me gazî wî dike.»
40 Wî hê bi gelek peyvên din şahidî kir, ew şidandin û got: «Xwe ji vî nifşê
jirêderketî xilas bikin.» (Karên Şandiyan 2:1-17. 21-27. 29-40)

Guhdarên hêja, ma we bihîst ku Petrûs çi got? Bi kurtî wî bi xelkê da zanîn ku Xwedê li gor soza xwe û tam li gor gotinên pêxemberan Mesîh, yanî Îsa şandibû dinyayê. Wî ji wan re got: «We Mesîhê ku Xwedê şandibû nav we, kêm dît, we ew xaç kir û kuşt, lê belê Xwedê ew ji nav miriyan rakir. Em hemû şahidên van tiştan in. Xwedê Îsa bilind kir û ew li milê xwe yê rastê rûnand. Wî li gor soza xwe Ruhê Pîroz şand. Loma tobe bikin û li Xwedê vegerin! Ji gotinên pêxemberan û ji mizgîniya Xwedê bawer bikin. Baweriya xwe bi Îsa bînin!
Hemû pêxember
li ser wî şahidiyê dikin, her kesê ku baweriyê bi wî bîne, bi navê wî efûbûna gunehan distîne.» (Karên Şandiyan 10:43)
Bi van gotinan Petrûsê Şandî Mizgîniya xilasiyê da zanîn û got:
«Her kesê ku baweriya xwe bi Îsa Mesîh bîne, wê xilas bibe.»
Gava xelkê peyvên Petrûs bihîstin, şewt ji dilê wan çû, çimkî ji nişkê ve wan fêm kir, ew Îsayê ku wan kêm didît û nefret jê dikirin, Mesîhê ku Xwedê bi devê pêxemberan li ser hatina wî gotibûn, bû.
Loma di vê rojê de gelekan tobe kir, ji gunehên xwe vegeriyan, li Xwedê zivirîn û baweriya xwe bi navê Îsa Mesîh anîn.
Ew şagirtên nû di avê de imad bûn û bi vî awayî eşkere kirin ku wan baweriya xwe bi Mesîh aniye. Imadbûna wan nîşaneke berbiçav bû ku êdî dilê wan ji gunehên wan hatibû paqijkirin.

Nivîsarên Pîroz weha berdewam dikin, dibêjin:
41 Îcar yên ku peyvên [Mizgîniyê] qebûl kirin imad bûn û wê rojê li dora sê hezar mirov beşdarî wan bûn. 42 Wan herdem xwe da hîndariya Şandiyan, hevpariya ruhanî, şkandina nên û duakirinê.
Îcar şagirt bi şabûnê û bi Ruhê Pîroz tije bûn. (Karên Şandiyan 2:41.42; 13:52)

Dostên delal, belkî hin wê bêjin: «Bi rastî ev ne xema me ye. Em ne di nav wan mirovên ku Mesîh xaç kirin de bûn. Ev sûcê Romayî û Cihûyan bû. Tu têkiliya me bi vê yekê re tune.»
Lê belê Peyva Xwedê ji me re dibêje ku Mesîh ji ber neheqiyên me xurimî (hat birîndarkirin), ew ji ber sûcên me hat perçiqandin. (Îşaya 53:5)
Guneh û neheqiyên me bûn sedem ku Îsa hat xaçkirin. Loma Xwedê hişt ku mirov Hezkiriyê Wî xaç bikin.
Erê, mirovan Îsa xaç kir, lê belê Xwedê ew ji nav miriyan rakir, da ku ew bibe Xilaskarê hemûyên ku baweriyê bi wî bînin û bibe dadgerê hemûyên ku bawer nakin.
Loma Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

Niha Xwedê li her derê li hemû mirovan emir dike ku tobe bikin. [31] Çimkî wî rojek kifş kiriye û ewê di wê rojê de bi destê zilamê ku wî destnîşan kiriye bi dadperwerî dîwana dinyayê bike. Bi rakirina wî ya ji nav miriyan wî ewlehî da hemûyan, ku ji bo vî karî ew mirov hatiye destnîşankirin. (Karên Şandiyan 17:30.31)

Dostên delal, heta cara ku bê, bila ew peyvên Petrûsê Şandî li bîra we bin.
Wî got:
Hemû pêxember li ser [Mesîh] şahidiyê dikin, her kesê ku baweriyê bi wî bîne, bi navê wî efûbûna gunehan … û diyariya Ruhê Pîroz distîne.» (Karên Şandiyan 10:43; 2:38)

Îro em di xwendina Nivîsarên Pîroz de dest bi bernama 88'an (176'an) dikin. Me di lêkolîna xwe ya ku me bi rêzê ve şopandiye de dît ku Ruhê Pîroz kêm û zêde di navbera hezar û pênc sed salan de peyvên beşê pêşî yê Kitêba Pîroz xistin dilê pêxemberan, da ku wan binivîsin. Bi vî awayî Tewrat, Zebûr û kitêbên pêxemberan pêk hatin. Navê vî beşê pêşî Peymana Kevin e. Di Peymana Kevin de hemû pêxemberan mizgîniya Xwedê bi mirovan didan zanîn û digotin ku Xwedê pîroz û rast e û dîwana her gunehî dike. Ji aliyê din ve Xwedê tije rehm e û naxwaze ku zarokên Adem di nav gunehên xwe de helak bibin. Loma Xwedê bi devê pêxemberên xwe soz dabû ku Xilaskarek, yanî Mesîh wê bihata vê dinyayê, wê ji keçikekê çêbûya, wê bi awayekî bêkêmahî pîroz û paqij bijiya û xwîna xwe li ser xaçekê birijanda, da ku li gunehên zarokên Adem bihata bihûrtin. Erê, wek ku me dît, (hemû) pêxemberên Peymana Kevin li ser hatina vî Mesîhê Xwedê nivîsandin.

Di beşê Nivîsarên Pîroz ê diduyan de, yanî di Peymana Nû de, di Încîlê de me dît, di dema ku Xwedê kifş kiribû de, wî Xilaskarê dinyayê Mesîh li gor soza xwe û li gor nivîsarên pêxemberan şand. Mesîh jî Îsayê Nisretî bû. Tu kes wek wî li ser vê dinyayê nebû, çimkî ew bêqusûr, bêkêmahî û tam pîroz û paqij bû. Îsa bi hêza Xwedê tije bû, çimkî ew bi xwe Peyva Xwedê ya di bedena mirov de bû. Xwedê li ser wî got: «Ev e Kurê min ê delal. Dilê min bi wî xweş e.» (Metta 3:17)

Lê belê mirovên wê demê Pîrozê Xwedê xaç kirin û kuştin. Lê belê di roja sisiyan de Xwedê ew ji nav miriyan rakir û piştre ew ji aliyê gelek şahidan ve hat dîtin. Piştî 40 rojan Xwedê ew hilkişand ezmên û cihê herî bilind da wî. Lê belê plana Xwedê bi vê yekê xilas nebû.

Destpêka serhatiya Riya Rastdariyê hebû û me lê nêrî. Lê herweha dawiya serhatiya Riya Rastdariyê jî heye. Vê dinya xerab dawiya karên Îsa Mesîh hê nedîtiye.

Peyva Xwedê ji me re dibêje ku Îsa wê vegere û wê Îblîs û milyaketên wî yên xerab bavêje agirê dojehê. Herweha ewê vegere ku di Roja Dawî de dîwana zarokên Adem bike û vê dinyayê nûvejen bike.
Dabaşa bernama me ya îro ev e:  Îsa wê (zû) vegere.

Îro emê ji kitêba dawî ya Peymana Nû, yanî ji Peyxama Yûhenna bixwînin. Peyxama Yûhenna kitêbeke kûr û bi bandûr e, çimkî Xwedê di vê kitêbê de ji me re dibêje ku di dawiya vê dinyayê de çi wê çêbe. Di Peyxama Yûhenna de 22 derî hene û ew li ser serketina bi serfiraz a hemû bawermendên Mesîh dibêje. Lê belê ji bo wan ên ku bawer nakin, ev kitêb tije bûyerên tirsdar e, çimkî di vê kitêbê de kifş dibe, eger mirovek nexwaze ku Îsa Mesîh Xilaskarê xwe qebûl bike, di dawiyê de Îsa Mesîh wê dadgerê wî mirovî be. Eger em berxê Xwedê qebûl nekin, emê rastî şêrê Xwedê bên, çimkî Îsa Mesîh ê ku xwe kir berxê goriyê, wê vegere û wê wek şêrekî dîwana mirovan bike. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin: Ev wê weha be: Gava Xudan Îsa bi milyaketên xwe yên bihêz ve di pêta êgir de ji ezmên xuya bibe, [8] hingê ewê heyfê ji wan ên ku Xwedê nas nakin û ji wan ên ku bi ya Mizgîniya Xudanê me Îsa nakin, bistîne. (Selanîkî II, 1:7.8)

Niha em dixwazin guhdariya çend perçeyên Peyxama Yûhenna bikin. Piştî ku Îsa Mesîh vegeriya ezmên, wî milyaketê xwe şand ba Yûhennayê şandî û jê re tiştên ku wê di dawiya vê dinyayê de çêbin, şîrove kirin. Di deriyê pêşî de Yûhenna weha nivîsiye:
[1] Ev peyxama Îsa Mesîh e ya ku Xwedê da wî, da ku wan tiştên ku divê di nêzîk de çêbin nîşanî xulamên wî bide. Û wî ev bi destê milyaketê xwe şand û ew bi xulamê xwe Yûhenna da zanîn. [2] Yûhenna jî li ser wan hemû tiştên ku wî dîtibûn şahidî kir, yanî li ser peyva Xwedê û li ser şahidiya Îsa Mesîh. [3] Xwezî bi wî yê ku van peyvên pêxemberîtiyê dixwîne û xwezî bi wan ên ku guhdariya wan dikin û tiştên ku di wê de hatine nivîsîn digirin. Çimkî wext nêzîk e.

4 Ji Yê ku Heye, Yê ku Hebû û Yê ku Wê Bê û ji heft ruhên ku li ber textê wî ne,
kerem û aştî li ser we be.
Rûmet û karîn her û her ji wî re be, yê ku ji me hez dike û bi xwîna xwe em ji
gunehên me azad kirine û em ji Bavê xwe Xwedê re kirine padîşahî û kahîn.
Amîn.
7 Va ye, ew bi ewran re tê. Her çav wê wî bibîne, heta ew ên ku bedena wî qul
kirine jî. Û hemû gelên dinyayê wê li ser wî li xwe bixin. Erê. Amîn.
8 Xudan Xwedê, Yê ku Heye, Yê ku Hebû û Yê ku Wê Bê, Karîndarê her tiştî,
dibêje: «Alfa û Omêga Ez im.» (Peyxama Yûhenna 1:1-8; kinkirî)

Di deriyê 19'an de wî weha got:
1 Piştî van tiştan, min li ezmên dengekî bilind bihîst, wek dengê elaleteke mezin
bû û digot: «Helêlûya! Xilasî, rûmet û hêz, yên Xwedayê me ne!
2 Çimkî dîwankirina wî rast û dadperwer e. (Peyxama Yûhenna 19:1.2)
«Padîşahiya dinyayê bû ya Xudanê me û ya Mesîhê wî.
Ewê her û her padîşahiyê bike». (Peyxama Yûhenna 11:15)

11 Hingê min ezman vebûyî dît. Va ye, hespekî boz. Ji siwarê wî re Dilsoz û yê
Rast tê gotin; ew di şer û dîwankirinê de dadperwer e. 12 Çavên wî wek pêta êgir
in û li ser serê wî gelek tac hene. Navekî wî yê nivîsî heye ku ji wî pê ve tu kes
nizane. 13 Û cilek li xwe kiriye ku li xwînê hatiye xistin û navê wî ‹Peyva
Xwedê› ye. 14 Ordiyên li ezmên ên ku bi kitanê hêja yê spî û paqij hatibûn
wergirtin, li ser hespên boz li pey wî dihatin. 15 Şûrekî tûj ji devê wî derdikeve,
da ku li miletan bixe û ew bi xwe wê bi gopalê hesin serweriyê li wan bike. Ew
bi xwe wê mahsera şeraba xezeba Xwedayê karîndarê her tiştî ya dijwar
biguvêşe. 16 Li ser cilê wî û li ser kemaxa wî navekî nivîsî heye:
PADÎŞAHÊ PADÎŞAHAN Û XUDANÊ XUDANAN. (Peyxama Yûhenna 19:11-16)

[1] Û min milyaketek dît ku ji ezmên dihat xwarê; di destê wî de mifta kortala
bêbinî û zincîreke mezin hebû. [2] Wî ejder, marê kevin ê ku Îblîs e, girt û ew
hezar salî girêda. [3] Wî ew avêt kortala bêbinî, ser wî girt û mor kir, da ku heta
hezar sal temam bibin êdî miletan nexapîne. Piştî vê yekê divê ku ew demeke
kurt bê berdan.
[4] Min text dîtin û ew li ser wan rûniştin, desthilatî ji wan re hat dayîn, ku ew
dîwanê bikin. Îcar min canê wan ên ku ji ber şahidiya Îsa û ji ber peyva Xwedê
serê wan hatiye birrîn dîtin… Ew vejiyan û wan bi Mesîh re hezar salî padîşahî
kir.

Guhdarên delal, erê hêza Îblîs her û her namîne, çimkî bi rastî Îsa Mesîh ew bindest kiriye. Şikir ji Xwedê re!
Bernama me ya îro li vir bi dawî dibe, lê Xwedê hez bike cara ku bê emê bibînin ku piştî van hezar salan çi wê çêbe. Heta hingê Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me bihîst ku Îsa Mesîh wê bibe padîşah û wê Îblîs heta ku 1000 sal temam bibin, bigire. Piştî vê yekê, Nivîsarên Pîroz weha berdewam dikin û dibêjin:

7 Çaxê hezar sal temam bibin, Îblîs wê ji zîndanê bê berdan. 8 Ewê derkeve,
da ku wan miletên ku li ser her çar riknên erdê ne bixapîne û ji bo cengê wan li
cihekî bicivîne. Hijmara wan wek seylaka ber deryayê ye. 9 Ew derketin ser
pehnahiya erdê û hawirdora wargehê pîrozan û bajarê hezkirî girtin.
Lê ji ezmên agir hat xwarê û ew xwarin. 10 Îcar ew Îblîsê ku ew ji rê derxistine,
hat avêtin nav gola êgir û kewkurtê, cihê ku cenawir û pêxemberê derewîn tê de
ne. Bi şev û roj, her û her ezab wê li wan bê kirin.

11 Hingê min textekî mezin ê spî û yê li ser wî rûniştibû dît. Erd û ezmên ji ber
wî bazdan û cihek ji bo wan peyda nebû. 12 Û min yên mirî, yên biçûk û mezin,
li ber text sekinî dîtin. Kitêb vebûn û kitêbeke din a ku Kitêba Jiyanê ye vebû.
Mirî, li gor kirinên xwe yên ku di kitêban de nivîsî bûn, hatin dîwankirin.
13 Û deryayê ew miriyên ku di wê de bûn dan; mirinê û diyarê miriyan jî ew
miriyên ku di wan de bûn, dan. Û her yek li gor kirinên xwe hat dîwankirin.
14 Hingê mirin û diyarê miriyan hatin avêtin nav gola êgir. Ev gola êgir mirina
diduyan e. 15 Û navê kê di Kitêba Jiyanê de nivîsî nehatibe dîtin, hat avêtin nav
gola êgir. (Peyxama Yûhenna 20:1-5. 7-15; kinkirî)

1 Hingê min erdekî nû û ezmanekî nû dîtin; çimkî ezmanê pêşî û erdê pêşî
bihûrîn û êdî derya tunebû. 2 Min dît ku Bajarê Pîroz, Orşelîma nû wek bûka ku
ji bo mêrê xwe hatiye xemilandin, ji nav ezmên ji Xwedê dihat xwarê.
3 Û min ji text dengekî bilind bihîst ku digot: «Va ye, konê Xwedê di nav
mirovan de ye û ew bi xwe wê bi wan re bijî. Ewê gelên wî bin û Xwedê bi xwe
wê bi wan re be û Xwedayê wan be.
4 Ewê ji çavên wan hemû hêstirên wan paqij bike û êdî mirin wê nebe.

Êdî şîn û girîn, êş û elem jî wê nebin; çimkî tiştên berê bihûrîn.»
5 Hingê yê ku li ser têxt rûniştibû got: «Va ye, ez her tiştî nû çêdikim.»
Û got: «Binivîse, çimkî ev peyvên ha dilsoz û rast in».
6 Û ji min re got: «Her tişt çêbû. Ez Alfa û Omêga, Destpêk û Dawî me.
Ezê ji kaniya ava jiyanê belaş bidim yê ku tî bûye. 7 Yê ku bi ser bikeve
wê ji van tiştan parê bistîne û ezê Xwedayê wî bim û ewê kurê min be.
8 Lê heçî yên tirsonek in, yên bêewle, yên di nav pîsîtiyê de ne, yên kuştinê
dikin, yên zînakar, yên sêrbaz, yên pûtperest û hemû yên ku derewkar in, para
wan di wê golê de ye, ya ku bi êgir û kewkurtê dişewite. Mirina diduyan ev e.»
(Peyxama Yûhenna 21:1-8)

1 Hingê milyaket çemê ava jiyanê nîşanî min da. Ew wek cama zelal bû û
ji textê Xwedê û Berx derdiket û di nava kolana bajêr de diherikî.
2 Li herdu aliyên çem dara jiyanê hebû; diwanzdeh cûreyên fêkî pê ve tên û ew
her meh fêkiyê xwe dide. Û pelên darê ji bo saxbûna miletan in.
3 Êdî tiştê nifirlêbûyî wê qet nebe.
Textê Xwedê û Berx wê di nav bajêr de be û xulamên wî wê xizmetê ji wî re
bikin. 4 Ewê rûyê wî bibînin û navê wî wê li ser eniya wan be.
5 Û êdî nabe şev û hewcedariya wan bi ronahiya çirayê û bi ronahiya rojê
namîne, çimkî Xudan Xwedê wê ronahiyê bide wan û wê her û her padîşahiyê
bikin.
6 Milyaket ji min re got: «Ev peyvên ha dilsoz û rast in. Xudan, Xwedayê ku
Ruhê xwe dide pêxemberan, milyaketê xwe şand, da ku tiştên ku divê di nêzîk
de çêbin, nîşanî xulamên xwe bide.»
Îsa Mesîh dibêje: 12 «Va ye, ez zû têm û xelata min di destê min de ye, da ku ez
li gor kirinên her yekî bidim wî. 13 Alfa û Omêga, Yê Pêşî û Yê Paşî, Destpêk û
Dawî ez im.»
14 «Xwezî bi wan ên ku xiftanê xwe şuştine, da ku heqê wan hebe, ku bên dara
jiyanê û di dergehên bajêr re bikevin hundir! 15 Yên ku … ji derewan hez dikin û
derewan dikin, ew li derve ne.

[16] «Ez Îsa, min milyaketê xwe şand, da ku ew ji bo civînên bawermendan li ser
van bûyeran ji we re şahidiyê bike. Ez ra û dûndana Dawid im, ez stêra sibê ya
şewqdar im.»
[17] Ruh û bûk dibêjin: «Were!» Û yê dibihîze bila bêje: «Were!» Û yê tî bûye
bila bê; yê dixwaze bila belaş ava jiyanê bistîne.
[18] Ez ji her kesê ku peyvên pêxemberîtiyê yên vê kitêbê dibihîze re şahidiyê
dikim: Eger mirovek tiştekî li ser van zêde bike, Xwedê wê van belayên ku
di vê kitêbê de nivîsî ne bîne serê wî. [19] Û eger mirovek ji peyvên pêxemberîtiyê
yên vê kitêbê derxe, Xwedê wê para wî ji dara jiyanê ya ku di vê kitêbê de nivîsî
ye û ji Bajarê Pîroz derxe.
[20] Yê ku şahidiyê ji van tiştan re dike, dibêje: «Erê, ez zû têm». Amîn.
Were, ya Xudan Îsa.
[21] Kerema Xudan Îsa li ser we hemûyan be.

Bi vî awayî Xwedê Kitêba Pîroz bi dawî dike û sozê dide ku rojekê Îsa Mesîh wê vegere vê dinyayê. Ewê vegere, da ku wan ên ku baweriya xwe bi wî anîne, bi xwe re bibe ezmên û dîwana hemûyên ku baweriya xwe bi wî neanîn, bike.
Dostên delal, ma hûn bi cesaret li benda vegerîna Îsa Mesîh dimînin?
Ma hûn di nav wan mirovan de ne yên ku Îsa Xilaskar û Xudanê xwe qebûl kirine?
Ma hûn di dilê xwe de bawer dikin ku Xwedê gunehên we danîn ser milê Îsa Mesîh ê ku ji guneh bêrî bû? Ma hûn dizanin ka Xwedê wê we rastdar hesab bike, an hûn nizanin? Gelo navê we di Kitêba Jiyanê de nivîsî ye?
Têkiliya we bi Îsa Mesîh re çawa ye?
Ma ew Xilaskarê we ye? An ewê dadgerê we be?

Dostên delal, ma we xwe ji bo vegerîna Mesîh amade kiriye? Eger hûn îro dengê Xwedê bibihîzin, dilê xwe hişk nekin, çimkî Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Ji bîr nekin ku li ba Xudan rojek wek hezar salî ye û hezar sal jî wek rojekê ne.

9 Wek ku hinek guman dikin, Xudan di soza xwe de bi derengî nakeve, lê belê bîhna xwe li we fireh dike û naxwaze ku kesek helak bibe, lê dixwaze ku hemû tobe bikin. (Petrûs II, 3:8.9)
Va ye, dema meqbûl niha ye; va ye, roja xilasiyê niha ye. (Korîntî II, 6:2)
Eger em li ber vê xilasiya evqas mezin xemsar bin, emê çawa birevin û xilas bibin? (Îbranî 2:3)

Guhdarên delal, em ji bo guhdarîkirina we gelek spas dikin.
Duaya me ev e ku her peyva ku we li ser Riya Rastdariyê bihîstiye, ji we re pîrozbahiyek be. Em ji Xwedê hêvî dikin ku ew bi xwe riya xilasiya newaze ya ku wî ji bo hemû mirovan amade kiriye, nîşanî we bike.
Ew xilasî ji hemûyên ku ji dil û can ji Peyva wî bawer dikin re bi firehî tê pêşkêşkirin.
Eger tu bixwazî tevahiya Kitêba Mizgîniya Xwedê bistînî, ji kerema xwe ji me re binivîse. Navnîşana me di dawiya bernameyê de tê dayîn.

Heta cara ku bê Xwedê bi we re be û bila ew peyvên Îsa Mesîh ên ku di Peymana Nû de yên herî dawî ne, li bîra we bin. Îsa Mesîh got:
«Erê, ez zû têm». (Peyxama Yûhenna 22:20)

Di bernama ku bê de jî em li benda we ne. Xwedê bi we re be!

Guhdarên delal! Silameta Xwedê bi we re be!
Em bi navê Xwedayê aştiyê silavan li we dikin.
Daxwaz û armanca Xwedayê silametê ev e ku her kes riya rastiyê fêm bike û wê qebûl bike. Wî ew rê kifş kir, da ku em heta hetayê bi wî re di silameta rastîn de bijîn. Em gelek dilgeş in ku em dikarin îro li ser *Riya Rastdariyê* ji we re bipeyivin.

Piştî ku Îsa Mesîh ji nav miriyan rabû, wî ji şagirtên xwe re got: «**Herin her çar aliyên dinyayê û Mizgîniyê li hemû afirînê bidin bihîstin.**» (Marqos 16:15)

Û piştî ku Îsa Mesîh hilkişiya ezmên, zilamekî ku navê wî Pawlos bû, nivîsî, got:
«Xwedê ez veqetandim, da ku ez **Mizgîniya Xwedê** ya ku hê ji berê ve, wî bi devê pêxemberên xwe di Nivîsarên Pîroz de soz dabû, belav bikim…
Ez ji ber **Mizgîniyê** şerm nakim. Ji ber ku ew ji her kesê ku bawer dike re ji bo xilasiyê hêza Xwedê ye… Çimkî di **Mizgîniyê** de rastdariya ku ji Xwedê ye, tê eşkerekirin. Ew ji destpêkê heta dawiyê bi baweriyê ye.»

Sê caran ew dibêje: **Mizgînî, Mizgînî, Mizgînî!** Ev Mizgîniya ku Kitêba Pîroz gelek caran ji me re li ser wê dibêje, çi ye?
Bi alîkariya Xwedê, îro em dixwazin li ser vê **Mizgîniya Xwedê** bipeyivin a ku di Kitêba Pîroz de li ser wê tê hînkirin. Lê belê beriya ku em bala xwe bidin **agahiya qenc,** yanî beriya ku em bala xwe bidin **Mizgîniyê**, lazim e em **agahiya xerab** bînin bîra xwe.

**Agahiya xerab** çi ye? Belkî tê bîra we ku di destpêka Kitêba Pîroz de dibêje: «Xwedê erd û ezman û her tiştê tê de afirandin.» Wî Adem û Hewa jî afirandin û ji bo wan baxçê Êdenê amade kir.

Xwedê mirov afirandin, da ku ew bikarin Xwedê nas bikin, jê hez bikin, guhê xwe bidin wî û heta hetayê pesnê wî bidin.
Xwedê ji bo ku mirov biceribîne, wî ji Adem re got: «Ji her dara baxçe tu dikarî bixwî, lê ji dara zanîna qencî û xerabiyê ya di navenda baxçe de nexwe. Çimkî gava ku tu ji wê bixwî, eseh tê bimirî.»

Erê, agahiya xerab ev e ku Adem û Hewa guhê xwe dan Îblîs û wî ji wan re got: «Ji xwe hûn dikarin ji fêkiyê vê darê jî bixwin.»
Gunehê Adem û Hewayê zehmetî û mirin anî dinyayê. Ew bi xwe bûn gunehkar û tevahiya dûndana wan jî bû gunehkar.

Peyva Xwedê vê mizgîniya tehl eşkere dike û dibêje:
«Ji bo mirovan carekê mirin û **piştî wê dîwanbûn neçar e**…Va ye, Xudan tê, da ku dîwana hemûyan bike û ji bo hemû kirinên nepak û ji bo hemû tiştên hişk ên ku gunehkarên nepak li hember Xudan gotine, bala her yekî bikişîne ser sûcê wî.» (Îbranî 9:27; Cihûda 15)

Loma **agahiya xerab** ev e ku **em hemû gunehkar in û Xwedê wê li gor rastî û dadperweriya xwe dîwana me bike!**

Lê belê **agahiya qenc, yanî Mizgînî** ev e ku Xwedayê dilbirehm hê di baxçê Êdenê de soz da ku rojekê ewê kesekî bê guneh bişîne dinyayê. Wî got ku ew kesê pîroz wê ji keçikê çêbe û wê xilaskarê rastdar be. Ewê bi dilxwazî xwe bike gorî û di ber gunehên Adem û tevahiya dûndana wî de mirinê qebûl bike.
Cezayê ku biketa ser me, wê biketa ser wî xilaskarê dilpak û bê guneh.
Mizgîniya ku Xwedê da ev e. Wî ev Mizgînî hê wê roja ku Adem û Hewayê guneh kiribûn, ji wan re gotibû.

Xwedê bi rêberiya gelek mirovan hatina wî xilaskarî, yanî hatina **Mesîh** ji berê ve da zanîn. Pêxemberên Xwedê hin bi hin gelek tişt li ser Mesîh didan bihîstin, da ku çaxê ew bê, her kes wî nas bike û bizane ku Xwedê ew şandiye.

Mesele, Îşaya pêxember heft sed salan beriya hatina Îsa got ku Mesîh wê çawa bê dinyayê. Wî got:
«Va ye, keçik wê bizaro bibe û ewê kurekî bîne.
Û wê navê wî Îmanûêl deynin» ,
ku bê wergerandin: «Xwedê bi me re ye.» (Metta 1:23; Îşaya 7:14)

Pêxemberekî din, Mîxa got ku Mesîh wê ji ezmên bê û di gundê **Beytlehmê** de çêbe. Bi rastî cihê ku Îsa Mesîh lê hat dinyayê, tam ev gund bû. Lê belê Mîxa ev yek çend sed salan beriya hatina Îsa gotibû!

Pêxemberan ne tenê li ser bûyîna Mesîh digotin, lê herweha wan di pêxemberîtiyên xwe de diyar dikir ku **Mesîh wê cefayê bikişîne û di ber gunehkaran de bimire.**
Mesele, Dawid nivîsî ku xelk wê Mesîh nizim bikin, wî riswa bikin, dest û lingên wî qul bikin û wî bikujin. Bi rastî Dawid ne tenê li ser mirina Mesîh pêxemberîtî kir, lê ji pêşî ve got ku **Xwedê wê Mesîh ji nav miriyan rake** jî.
Bi vê yekê wê kifş bibûya, xilaskarê ku Xwedê bişanda, ku zuriyeta Adem ji cezayê gunehên wan xilas bikira, tenê wê ew bûya.

Li ser bûyîna Îsa Mesîh dubendî kêm in, lê belê di nav gelek mirovan de li ser mirin û rabûna wî tevlihevî derdikevin. Ew qenc fêm nakin ka çima Xwedê destûr da mirovan ku xerabiyê li Mesîhê wî bikin.
Gelek mirov tênagihîjin ku eynî Xwedê hem ji me hez dike û hem jî Mesîh şand, da ku **di ber gunehên me de** bimire.
Pêxemberan ev yek rast û rast dan bihîstin. Îşaya pêxember got: «Li Xudan xweş hat ku wî biperçiqîne û bixe cefayê... **Xudan sûcê me hemûyan danî ser wî**.»
(Îşaya 53:6.10)

Ma em ji pêxemberan bawer dikin? Erê, em dibêjin ku em bawer dikin.
Eger bi rastî wusa be, **divê em ji gotinên wan jî bawer bikin**. Îşaya pêxember heft sed salan beriya hatina Mesîh ev tiştên ku me niha gotin, li ser wî nivîsîn.

Divê ku em bînin bîra xwe ku pêxemberan ne li gor fikir û bîr û baweriya xwe digotin. Xwedê rastiya xwe xist ser zimanê wan û wan got.
Loma, eger em gotinên pêxemberan red bikin, bi rastî em **Xwedê** jî red dikin – çimkî wî peyvên xwe xistin devê wan, da ku pêxemberîtiyê li ser Mesîh bikin û bêjin ku ewê bimire, bibe goriya ku gunehan radike.

Xwedê ji vê dinyayê hez dike û naxwaze ku mirov ji ber gunehê xwe helak bibin. Loma plana wî ev bû ku Mesîh bimire. Diviya ku yekî rast û bêsûc û bêguneh ji bo mirovên gunehkar bimira, da ku ew ji xezeba Xwedê xilas bibûna. Di demên berê de mana gorîkirina mî û bizinan tam bi vê yekê ve girêdayî bû. **Îsa Mesîh** li gor daxwaza Xwedê û li gor hezkirina Xwedê ya ji bo me bûye **goriya bêkêmahî û herî dawî.**

Ji ber ku ev goriya temam ji bo gunehên her çaxî hatiye dayîn, êdî ne lazim e ku em xwe bi goriyên ku ne bêkêmahî ne, biwestînin.
Ma tê bîra we Îsa Mesîh li ser xaçê çi got? Beriya ku ew bimire wî got: «**Temam** bû!» Yanî wî got: Her tiştê ku diviya bê kirin, êdî pêk hat, temam bû.
(Yûhenna 19:30)
Erê, wî bi carekê deynê gunehên me da. Ji bo me bi tenê ev dimîne ku em bikin: Divê em **bawer bikin** ku ew di ber gunehên me de miriye.
Wek ku me di destpêka vê bernameyê de dît, Kitêba Pîroz dibêje: Mizgîniya mirin û rabûna Îsa Mesîh «**ji her kesê ku bawer dike** re ji bo xilasiyê hêza Xwedê ye.» (Romayî 1:16)

Erê, di peyva Xwedê de dibêje: Ji bo rastdariyê bi dil tê bawerkirin û ji bo xilasbûnê jî bi dev tê eşkerekirin.

Di bernameya bihûrtî de me li ser mana Mizgîniyê gotibû û me dîtibû ku Mizgînî çawa bi hatina Mesîh, bi mirina wî û bi rabûna wî ve girêdayî ye.

Heyf û mixabin gelek mirov qet naxwazin baweriya xwe bi Îsa Mesîh bînin û dibêjin ku serhatiya mirin û rabûna wî tenê çîrokek e ku ji ber xwe hatiye çêkirin.
Lê belê eger em Mizgîniyê, yanî Încîlê bixwînin, emê bibînin her tiştê ku pêxemberan li ser Mesîh gotiye, di jiyana Îsa Mesîh de **hat cih**.
Heçî bûyîna wî, jiyana wî, mirina wî, rabûna wî û hilkişîna wî ya ezmên e, **her tişt** li gor gotinên pêxemberan rast derket.
Loma Mizgînî eşkere dike ku «Mesîh li gor Nivîsarên Pîroz yanî li gor gotinên pêxemberan ji bo gunehên me mir û hat veşartin û li gor Nivîsarên Pîroz roja sisiyan hat rakirin.» (Korîntî I, 15:3-4)

**Her tişt wek ku pêxemberan gotibû, tam wusa derket.** Yên ku ji Îsa nefret dikirin, ew nizim kirin, riswa kirin û ew kuştin. Yên ku ji wî hez dikir ew veşartin. Lê belê îmkan nebû ku ew ji aliyê mirinê ve di gorê de girtî bima. Me dît ku roja sisiyan piştî xaçkirina wî, çend jin sibê zû rabûn û çûn gora ku Îsa tê de hatibû veşartin. Lê wan dît ku gor vekirî ye û vala ye!
Piştî ku Îsa mir û rabû, wî çil rojan xwe nîşanî şagirtên xwe da. Ji pênc sed mirovan bêtir piştî rabûna wî, ew dîtin. Erê, ew rabû!
Îsa Mesîh bi rastî dijminê mirovan ê herî mezin, yanî mirin, bindest kir. Rabûna Îsa Mesîh kifş kir ku Xwedê gorîbûna Îsa qebûl kir. Îsa deynê gunehên zarokên Adem bi tevahî da û her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, jiyana herheyî distîne.

Agahiya qenc yanî Mizgînî ev e. **Îsa Mesîh mir, da ku gunehên we xîş bike û di roja sisiyan de ew ji gorê derket, da ku jiyana herheyî bide we.**

Peyama ku Mizgînî dide, ev e: Her kesê ku bawer bike, wê xilas bibe. Loma pirs ji bo te ev e: «**Ma tu bawer dikî?**»

Peyva Xwedê dibêje: «Roja xilasbûnê niha ye. Eger îro hûn dengê wî bibihîzin, dilê xwe hişk nekin!» Dilê xwe vekin û bawer bikin!

Xilasbûn û jiyana herheyî ne encama kirinên me ye, çimkî **tu kes tune ku bikare bi zêdekirina karên xwe yên qenc, bihiştê qezenc bike.** Xwedê xilasî û jiyana herheyî tu caran nafiroşe. Ew dixwaze vê **bide** te, ew **diyarî** ye. Kirinên qenc, dua, nimêj û rojîgirtin belkî dilê te rihet dikin, lê belê ew têra wê rastdariya ku Xwedê dixwaze nakin.

Eger tu bixwazî bikevî bihiştê, bi tenê ev rê heye:

1) Divê tu **qebûl bikî** ku tu gunehkar î û qeweta te tune ku tu bi kirinên xwe li Xwedê xweş bêyî.
2) Divê tu **bawer bikî**, Îsa Mesîh ew Xilaskar e yê ku Xwedê şandiye. Xwedê ew şand, da ku li ser xaçê ji bo bexişandina gunehên me bimire. Bawer bike û piştrast be ku Xwedê ew ji nav miriyan rakir, da ku jiyana herheyî bide te.

Eger tu ji vê Mizgîniyê bawer bikî, **tu dikarî piştrast bî ku piştî mirinê, tê bikevî bihiştê,** çimkî Xwedê bi xwe di Kitêba Pîroz de weha got: Eger hûn **baweriya** xwe bi Îsa Mesîh bînin, hûnê **bizanin** ku jiyana we ya herheyî heye.

(Yûhenna I, 5:9-13)

Niha ez dixwazim ji we re bêjim ku min çawa baweriya xwe bi Îsa Mesîh anî. Di xortaniya xwe de, min di rojekê de pênc caran nimêj dikir û di Remezanê de min rojî jî digirt. Dîsa jî min nizanibû ku piştî mirinê, ezê herim ku derê. Min li ser vê yekê ji gelek mirovan pirs kir, lê tu kesî bersîva zelal neda min.

Çaxê ku min Încîl, yanî Mizgîniya Xwedê xwend, ez rastî van peyvên Îsa hatim, ew weha dibêje:

«Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, yê ku guhê xwe dide gotinên min û ji wî yê ku ez şandime bawer dike, **jiyana wî ya herheyî heye; ew nayê dîwankirin, lê ew ji mirinê gihîştiye jiyanê.**» (Yûhenna 5:24)

Wî weha jî gotiye:

«Vejîn û jiyan ez im. Yê ku bawerî bi min anîbe, miribe jî **ewê bijî.**»

(Yûhenna 11:25)

Min fêm kir ku bersîva pirsa min heye û tam ev e. Ez dikarim bizanim ezê piştî mirinê herim ku derê.

Loma min ji vê yeka ku min dixwest, ez xwe bi xwe xilas bikim, tobe kir û min baweriya xwe bi Mesîh anî. Çimkî hemû pêxember li ser wî şahidiyê dikin, dibêjin: «**Her kesê ku baweriyê bi wî bîne, bi navê wî efûbûna gunehan distîne.**» (Karên Şandiyan 10:43)

Min tevahiya hêviya xwe bi Îsa Mesîh ve girêda. Ji wê rojê û pê ve, Xwedê silamet da dil û ruhê min. Wijdana min êdî ez sûcdar nekirim. Ji ber kirinên Îsa Mesîh, êdî min dizanî ku paşeroja min wê ronahî be.

Bi vî awayî ez bûme şagirtekî Mesîh. Rast e, di ber baweriya min de carna tengahî û cefa hene, çimkî hemû heval û maliyên min, baweriya min qebûl nakin, lê silameta Xwedê dil û ruhê min rihet dike. Ew silamet diyariya Mesîh e; wî got: «Eger dinya ji we nefret bike, bizanin ku beriya we, ji min nefret kiriye... Ez aştiyê ji we re dihêlim; ez aştiya xwe didim we. Ez wek ku dinya dide we nadim. Bila dilê we reht nebe û netirsin!» (Yûhenna 15:18; 14:27)

Hevalên delal, tiştê ku Xudan ji bo min kiriye, ew dikare ji bo we jî bike.

Daxwaza wî tenê ev e ku mirov **dilê xwe jê re veke, wî xilaskarê xwe qebûl bike.**

Tiştê mayî ew bi xwe wê bike. Îsa Mesîh got: «Werin ba min, ey hemû yên westayî û bargiran, ezê rihetiyê bidim we.Nîrê min deynin ser stûyê xwe û ji min hîn bibin, çimkî ez nerm û ji dil nefsbiçûk im û hûnê rihetiyê ji bo canê xwe bibînin.» (Metta 11:28-29)

**Ma tu ji ber gunehên xwe westayî û bargiran î?** Ma tu dixwazî ji canê xwe re rihetiyê bibînî?
Eger tu ji Mizgîniya Xwedê bawer bikî, yanî eger tu bawer bikî ku Mesîh ji bo te mir û ji bo te ji nav miriyan rabû jî, hingê Xwedê wê gunehên te afû bike û ewê navê te di Kitêba Jiyanê de binivîse. Eger tu bi vê Mizgîniyê bawer bikî, Xwedê wê bibe bavê te yê ezmanî û wê Ruhê Îsa bixe dilê te. Ew Ruhê Pîroz wê dilê te û tevahiya jiyana te biguhere.
Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Nexwe eger yek di yekîtiya Mesîh de be, ew afirînekî nû ye; tiştên kevin derbas bûn û çûn, va ye, yên nû çêbûn.»

Guhdarê delal, tu li ku derê bî, hal û rewşa te çi be, tu jin bî an tu mêr bî, tu xort bî an tu pîr bî, **eger tu baweriya xwe bi Îsa Mesîh bînî**, ewê jiyaneke nû bide te. Ew mir, da ku tu her û her li ba Xwedê bijî. **Ma tu bi vê Mizgîniyê bawer dikî?**

Bila gotina me ya dawî ayeteke ji Încîlê be. Ew ayet li ser piştrastbûniyê dibêje ya ku Xwedê dide hemûyên ku hêviya xwe bi wî ve girê didin. Mizgîniya Xwedê weha dibêje:

**Xwedê em xilas kirin û ji bo pîroziyê gazî me kir,**
**Ne ji ber kirinên me, lê li gor mebest û kerema xwe.**
**Ev kerem bi destê Mesîh Îsa, ji beriya destpêka deman ve ji me re hat dayîn.**
**Lê niha ew bi xuyabûna Xilaskarê me Mesîh Îsa eşkere bû; wî mirin betal kir, jiyan û nemirinî bi Mizgîniyê derxist ber ronahiyê.** (Tîmotêyos II, 1:9-10)

Xwedê bi we re be!

Îro û di bernama ku bê de em dixwazin tiştek nû bikin. Em dixwazin bi we re li çend pirsên ku me ji we, yanî ji guhdarên bernameyên xwe standine, binêrin. Di bersîvên xwe de, emê bi tenê Nivîsarên Pîroz bi kar bînin, çimkî bi tenê Peyva Xwedê dikare di tariyê de ronahiyê bide me. Di Zebûrê de li ser vê yekê weha dibêje: Peyva te çira gavên min û ronahiya riya min e. (Zebûr 119:105)

Niha em tên ser pirsên we. Îro hevalekî hat studyoyê ku di vê yekê de alîkariya me bike.

1) Gelek sipas. Pirsa pêşî ya ku me di nameyekê de stand, ev e: Dînê wan mirovên ku bernameyên Riya Rastdariyê diweşînin, çi ye?

Ev demeke dirêj e, Xwedê xist dilê me ku em li rastiyê, yanî li rastiya Xwedê bigerin. Daxwaza me ew bû ku em bi xwe peyvên Xwedayê rastîn bizanin. Loma me Kitêba Pîroz, yanî Tewrat, Zebûr, Nivîsarên Pêxemberan û Încîl, xwend. Me fêm kir ku Îsa Mesîh ew Xilaskar e yê ku hemû pêxemberan li ser nivîsandiye. Îsa Mesîh goriya dawî û bêqusur e û wî deynê gunehên zarokên Adem da û wan xîş dike. Her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, wê her û her li ba Xwedê bijî. Îsa Mesîh ji Xwedê hat û ew bi tenê dikare me bibe ba Xwedê. Me hemû hêviya xwe bi wî ve girêdaye.

Îcar em kî ne? Em şagirtên Îsa Mesîh in. Di Quranê de ji me re tê gotin: «Ahl al-kitab», yanî yên «Xweyî Kitêb». Hinên din ji me re dibêjin: «Mesîhî», yanî «bawermendên Mesîh». Ev jî rast e, lê belê em dixwazin bînin bîra xwe ku gelek mirov hene, ji xwe re dibêjin «Mesîhî» (an jî «Xirîstiyanî»), lê belê mana vê yekê ne ew e ku ew bi xwe bawermendên Mesîh in.
Eger mirovek bi tenê bi adetên Mesîhiyan bike, mana vê yekê ne ew e ku ew di dilê xwe de yekî Mesîhî ye. Mirov li gor adetên dîn û diyanetê bike jî, ev yek nikare têkiliya di nav Xwedê û wî mirovî de pêk bîne.

Bi tenê Îsa Mesîh dikare mirovekî bibe ba Xwedê.
Şikir ji Xwedê re ku Mesîh, hem Xilaskarê me ye û hem jî Xudan û dostê me ye.
Wî em nêzîkî Xwedê kirin û li pêşberî mirinê cesaret û piştrastiyê dide me.
Her roj ew dilsoziya xwe û hezkirina xwe nîşanî me dide.
Bi saya Îsa Mesîh, Xwedê her tiştê ku bi jiyana herheyî ve girêdayî ye, daye me.
Bi Mesîh, hemû hewcedariyên dilê me pêk tên.

2) Gelek sipas. Pirseke din heye û ew pirseke gelek girîng e û divê bersîveke zelal bê dayîn. Yekî din weha nivîsiye:
Tiştek heye, min gelek aciz dike. Min di Quranê de xwend ku pêxemberê me Mihemed li me hemû Misilmanan emir kir ku em ji Tewratê û ji Încîlê bawer bikin. Ez bi xwe siyaneta Tewrat, Zebûr û Încîlê digirim û min dest bi xwendina wan kir. Lê belê hevalên min ji min re dibêjin ku em nikarin ji wan kitêban piştrast bin, çimkî ew hatine guhertin û xera bûne. Ew dibêjin ku mesele Încîla ku ez dixwînim, ji Încîla eslî cihê ye. Hûn li ser van tiştan çi dibêjin?

Beriya ku em bersîva vê pirsê bidin, çend pirsên me jî hene. Rast e, mirov hene ku dibêjin «Kitêbên kevin ên pêxemberan hatine guhertin û xera bûne.»
Lê belê ma serkaniya fikrên weha ji çi ye? Kê gotiye ku Încîl hatiye guhertin?
Bi rastî ev rexneyeke pir giran e! Ma ji bo vê yekê îspat hene?
Ma kesek heye ku bikare bêje, Încîl kengê hatiye guhertin?
An ma kesek heye ku bizane, ew ji aliyê kê ve hatiye guhertin? Û ew li ku derê hatiye guhertin? Ma kesek heye ku bikare bêje, çi hatiye guhertin?
Bi rastî ma kesek heye ku bikare îspat bike, bêje, Încîl hatiye guhertin?

Eger hûn ji dil û can li rastiyê bigerin, hûnê bibînin ku Xwedê, Peyva xwe ya pîroz parastiye. Wî bi xwe peyvên xwe xistin dilê pêxemberan û wan ew bi rêzê ve nivîsandin.
Ew mirovên ku dibêjin: «Încîl hatiye guhertin», baweriya xwe bi kurt û pistên pûç û vala tînin. Qet delîl tune ku Încîl an Nivîsarên Pîroz hatibin guhertin.

Lê belê gelek delîl hene ku Nivîsarên Pîroz nehatine guhertin:
Îro di kitêbxaneyên muzeyên mezin û xwendegehên bilind de bi hezaran destnivîsarên kevin ên Încîlê û yên tevahiya Peymana Nû hene.
Gelek ji van destnivîsaran beriya bûyîna Mihemed hatine nivîsandin.
Herweha destnivîsarên Peymana Kevin, yanî destnivîsarên Tewrat, Zebûr û Nivîsarên Pêxemberan beriya dema Mihemed hatine nivîsandin.
Eger hûn van destnivîsarên kevin bi kitêbên îro re rû bi rû bikin, hûnê zû bibînin ku Xwedê çiqas qenc Peyva xwe parastiye. Her kes dikare bi çavên xwe bibîne ku tiştek nehatiye guhertin.

Wek ku me gotibû, pêxemberên Xwedê peyvên Xwedê nivîsandin.
Hingê hê kitêb nebûn, lê ew li ser çermê mî û bizinan, an jî li ser kaxezên ji papîrosê dihat nivîsandin.
Nivîsvanên yanî katibên Cihûyan ew nivîsarên pêxemberan kopî dikirin. Ew nivîsvan ji bo vê xebatê dihatin perwerdekirin û wan bala xwe dida herf û nuqteyên herî biçûk jî.
Mesele di her nivîsarê de herf dihatin hijmartin û herfa di navenda kitêbekê de dihat îşaretkirin, da ku kifş bibe kopî tam wek nivîsara orijînal e.
Eger di kopiyekê de xeletî bihata dîtin, tevahiya wê kopiyê dihat şewitandin!
Ew nivîsvanên Cihûyan ji Xwedê ditirsiyan û wan qenc dizanibû, mirovê ku peyva Xwedê biguhere, li hember Xwedê bi xwe radibe û xezeba wî tîne ser xwe.
Belkî we li ser destnivîsarên Qumranê bihîstiye? Ew destnivîsarên bi nav û deng di sala 1947’an de li çolê di şkeftekê de hatin dîtin. Ew destnivîsar, destnivîsarên Peymana Kevin in, yanî destnivîsarên Tewrat, Zebûr û Nivîsarên Pêxemberan in. Ew sed an du sed salan beriya hatina Îsa hatine nivîsandin.
Lê belê ew destnivîsar tam wek wan destnivîsaran in ên ku 1000 salan piştre hatine nivîsandin. Bi rastî Kitêba Pîroz nehatiye guhertin!

Dema mirov qenc bifikire, hingê wê kifş bibe ku tu kes nikare Kitêba Pîroz biguhere. Eger mirovekî bixwesta ku ew biguherta, diviya ku wî hemû Kitêbên Pîroz ên ku li her derê ne, biguhertan. Ev yek wê çawa çêbe?
Hê beriya bûyîna Mesîh, Peymana Kevin a Îbranî li zimanên Aramî û Yewnanî dihat wergerandin û beriya rabûna Mihemed, Încîl ji kêmahî ve li heşt zimanên din hatibû wergerandin û li her derê belav bûbû.
Îro perçeyên Kitêba Pîroz ji kêmahî ve bi 2000 zimanan hene. Erê, Xwedê Peyva xwe ya pîroz parast û xulamên Xwedê, wê werdigerînin zimanên hemû miletan, çimkî Xwedê dixwaze ku her kes bikare peyvên wî bi guhê xwe bibihîze, wan di dilê xwe de qebûl bike û xilas bibe.

Guhdarên delal, Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de hê bêtir li ser vê dabaşê bipeyivin. Heta hingê em li hêviya we ne. Xwedê bi we re be!

Cara din me bihîst ku Xwedê Peyva xwe ya pîroz çawa parast da ku neyê guhertin.
Ji xwe em dizanin ku ji destpêkê ve Îblîs dixebitî ku di hişê mirovan de peyvên Xwedê biguhere û heta îro ew weha dike. Mesele, di kitêba Tewratê ya pêşî de me bihîst ku Xwedê got: «Çaxê ku hûn ji fêkiyê vê darê bixwin, eseh hûnê bimirin.»
Lê belê Îblîs ew gotinên Xwedê înkar kirin û ji Adem û Hewayê re got:
«Ji xwe hûn namirin!»
Bi vî awayî Îblîs dixwest ku Peyva Xwedê biguhere û wek ku hûn dizanin, Adem û Hewayê guhê xwe dan Îblîs û ji fêkiyê wê darê xwarin. Wê rojê, dil û canê wan ji Xwedê dûr ket û bedena wan hêdî hêdî ber bi mirinê ve çû. Tiştê ku Xwedê gotibû, hat cih.
Dostên delal, Peyva Xwedê saxlem e û qayîm e; şik jê re tune. Îblîs derewkar û xapînek e. Ew dixwaze mirovan bixapîne û wan li ser Kitêba Pîroz bixe şikê. Ew dixwaze baweriya wan bîne ku Încîl hatiye guhertin. Lê belê Îsa Mesîh got: Nivîsara Pîroz xera nabe. (Yûhenna 10:35)
û got: Erd û ezman wê bibihûrin, lê peyvên min tu caran nabihûrin. (Metta 24:35)

3) Niha em tên ser pirsa sisiyan: Çima hûn ji Îsa Mesîh re dibêjin «Kurê Xwedê»? Dê û bavê Xwedê tune û herweha zarokên wî jî tunin. Loma çênabe ku Îsa «Kurê Xwedê» be.

Erê, me çend caran li ser vê yekê peyivîn, lê wê qenc be ku em careke din lê binêrin.
Di tiştên weha de nezanîn dikare bibe sedemê mirinê! Gotina pêşiyan dibêje: Nezanê neguhdar, dikeve derdê bê derman.
Wî guhdarî got: Çima hûn ji Îsa Mesîh re dibêjin «Kurê Xwedê»?
Divê pêşî em bînin bîra guhdarên xwe ku ne em in ên ku weha dibêjin.

Ne me ji Îsa re payenavê «Kurê Xwedê» daye, Xwedê bi xwe ev payenav daye Îsa! Xwedê bi xwe ji Îsa re got «kurê min».

Ya diduyan jî ev e: Mana «Kurê Xwedê» ne ew e ku Xwedê jin ji xwe re anî û ji wî re kur çêbû. Wek ku me dît, di Kitêba Pîroz de bi dehan nav û payenavên Îsa hene. Ew nav alîkariya me dikin ku em bêtir fêm bikin ku Îsa kî ye û çawa ye. Mesele wî li ser xwe digot ku ew «derî» ye, lê belê kifş e ku ew ne deriyekî ji dar an ji hêsin e.

Payenavekî wî yê din ev e: «Nanê Jiyanê», lê belê mana wê ne ew e ku Îsa nan an xwarin e. Pêxemberên Xwedê ji Îsa re gotin «Berxê Xwedê», lê belê mana wê ne ew e ku ew berxek e. Herweha, gava Xwedê ji Îsa re dibêje «Kurê min», mana wê ne ew e ku Xwedê jinek ji xwe re anî û wê jê re zarok anîn.

Fikrên weha di çavê Xwedê û di çavê hemû mirovan de jî çêr in, yanî sixêf in. Eger yek ji min re bêje «kurê Kurdistanê», mana wê ew e ku ez ji Kurdistanê me, lê tu kes nabêje, mana wê ew e ku Kurdistanê jin ji xwe re anî û ji wan re zarok çêbûn! Herweha, hem pêxember û milyaketan û hem jî Xwedê bi xwe ji Mesîh re gotin «Kurê Xwedê», çimkî ew ji hundirê Xwedê derketiye.

Îsa ji keçikekê çêbû û li ser vê dinyayê bavê wî tune. Hê beriya ku ew bihata dinyayê, ew li ezmên bû, çimkî ew bi xwe Peyva Xwedê ye û ew peyv di destpêkê de bi Xwedê re bû. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

1 Di destpêkê de Peyv hebû. Peyv bi Xwedê re bû û Peyv bi xwe Xwedê bû. 2
14 Û Peyv bû xwîn û goşt, bi kerem û rastiyê tije di nav me de konê xwe danî.
Me rûmeta wî, yanî rûmeta Kurê yekta yê ku ji Bav tê dît. 18 Tu caran, tu kesî
Xwedê nedîtiye, lê Kurê yekta, Xwedayê ku li ber singê Bav e, wî bi xwe ew da
zanîn. (Yûhenna 1:1.14.18)

Îsa Kurê Xwedê yê herheyî ye, yanî Peyva Xwedê ye û hat dinyayê û di bedena mirov de xuya bû.

Gelo Peyva Xwedê çi ye? Belkî hûn dibêjin: Peyva Xwedê, Kitêba Pîroz e, çimkî wî, ew Nivîsarên Pîroz bi destê pêxemberan dan nivîsandin.

Bersîva we rast e.
Nivîsarên pêxemberên Xwedê, ji bo me wek nameyeke Xwedê ne.
Bi destûra we, emê pirseke din jî ji we bipirsin. Mesele em bêjin, dostê te dûrî te di bajarekî din de rûdine. Ma ji te re xweştir e ku ew carna nameyekê ji te re bişîne, an ku ew bi xwe bê serdana te?
Ji xwe ji me hemûyan re çêtir e ku ew bi xwe bê û em bikarin rû bi rû bi hev re bipeyivin.
Xwedê mezin e û tiştek jê re nabe asteng. Madem ku daxwaza wî ew e ku mirov bizane ka ew kî ye û çawa ye û daxwaza wî ya ji bo me çi ye, ma hingê tu dibêjî ewê bi tenê çend nameyan ji me re bişîne, an ew bi xwe wê bê serdana me?
Dostên delal, mizgîniya ku pêxemberên Xwedê didan zanîn ew bû ku Xwedê bi xwe wê bihata, wê bihata serdana mirovên gunehkar!

Di Încîlê de em dibînin ku Xwedê Peyva xwe şand dinyayê da ku bibe mirov û di nav mirovan de bijî û wan ji gunehên wan xilas bike. Erê, Îsa Mesîh hem Peyva Xwedê ye û hem jî bû mirov. Îsa hêja ye ku jê re «Kurê Xwedê» bê gotin, çimkî ew Peyva Xwedê ye û ji destpêka destpêkê ve li ba Xwedê bû.
Îsa kurê Xwedê yê herheyî ye, wî qerektêrê Xwedê ji mirovan re eşkere kir.
Em gelek caran li ser xortan dibêjin: «Kur li bavê xwe tê».
Ev yek ji bo Îsa tam rast e. Yê ku Îsa nas dike, Xwedê nas dike. Yê ku Îsa dibîne, dizane ku Xwedê çawa ye. Loma Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
1 Di demên berê de Xwedê gelek caran û bi gelek awayan, bi rêberiya
pêxemberan ji bav û kalan re gotiye. 2 Lê di van rojên dawîn de, ew bi Kurê xwe
yê ku ew kiriye wêrisê her tiştî û bi destê wî erd û ezman çêkirine, ji me re
peyivî. 3 Ew şewqa rûmeta Xwedê û xuyabûna rastîn ya cewhera wî ye.
Ew her tiştî bi peyva xwe ya hêzdar hildigire. Piştî ku wî paqijbûna gunehan pêk anî, ew li jorê, li milê Yê Mezin ê rastê rûnişt. (Îbranî 1:1-3)

Tiştekî din heye ku divê em ji bîr nekin: Xwedê nabêje ku divê em ji sedî sed fêm bikin ka ew çima ji Îsa re dibêje «Kurê min»; Xwedê dibêje ku divê tu bi vê yekê bawer bikî.

Bînin bîra xwe ku Xwedê xist dilê Dawid ku di Zebûrê de weha binivîse:

12 Kur maç bikin, da ku ew hêrs nekeve û hûn di rê de helak nebin,
çimkî hêrsa wî bi derbekê radibe. Xwezî bi wan hemûyên ku xwe dispêrin wî.

(Zebûr 2:12)

Eynî wî Xwedayî xist dilê Yûhennayê Şandî ku di Încîlê de weha binivîse:

30 Erê, Îsa li ber şagirtên xwe hê gelek nîşanên din jî çêkirin ku ew di vê kitêbê
de nehatine nivîsîn. 31 Lê ev hatine nivîsîn, da ku hûn bawer bikin ku Îsa, Mesîh
e, Kurê Xwedê ye û bi vê baweriyê jiyana we bi navê wî hebe. (Yûhenna 20:30.31)
36 Yê ku baweriyê bi Kur tîne, jiyana wî ya herheyî heye. Yê ku bi ya Kur nake,
jiyanê nabîne, lê xezeba Xwedê li ser wî dimîne.» (Yûhenna 3:36)

Dostên delal, em ji bo guhdarîkirina we gelek spas dikin. Xwedê hez bike, di bernama ku bê de emê li çend pirsên din binêrin.

Heta hingê li ser vê gotina Kitêba Pîroz qenc bifikirin a ku dibêje:

Hemû mirov wek giyê ne û hemû rûmeta wan jî wek kulîlka giyê ye.
Giya hişk dibe û kulîlka wî dikeve. Lê peyva Xudan her û her dimîne.»

(Petrûs I, 1:24.25)

Îro jî emê li çend pirsên din binêrin û bersiva wan bidin.
Lê belê, beriya ku em dest pê bikin, divê em we li ser tiştekê haydar bikin.
Em bi xwe bersivên pirsên we nizanin, lê Xwedê dizane û wî bersivên xwe di Nivîsarên Pîroz de dane me.
Îcar niha emê vegerin ser pirsên we. Îro jî em gelek şa dibin ku hevalek hat ku di vê yekê de alîkariya me bike.

> 1) Gelek spas. Guhdarek dinivîse, dibêje: We di bernameyekê de got ku Xerabî nikare ji Xwedê be. Ez vê yekê qebûl nakim, çimkî ez bawer dikim ku Xwedê pêşî tiştên xerab û piştre tiştên qenc afirandin.

Dostê delal, ji kerema xwe bihêle ku em bi pirsekê bersiva pirsa te bidin.
Nivîsarên Pîroz dipirsin, dibêjin: Ma ji çavkaniyekê hem ava şêrîn û hem jî ava tehl derdikeve? (Aqûb 3:11)
Nexêr, ev qet çênabe. Wek ku ji çavkaniyekê hem ava şêrîn û hem jî ava tehl dernakeve, wusa jî Xwedê ne serkaniya hem xerabiyê û hem jî qenciyê ye.
Guh bidinê, Nivîsarên Pîroz çi dibêjin:
Xwedê ronahî ye û li ba wî qet tarî tune. Gava ku tê ceribandin, bila tu kes nebêje: «Ez ji aliyê Xwedê ve têm ceribandin.» Çimkî Xwedê bi tiştên xerab nayê ceribandin û ew bi xwe jî tu kesî naceribîne. Lê her kes ji aliyê xwesteka xwe ve tê kaşkirin, xapandin û tê ceribandin …
Birayên min ên hezkirî, neyên xapandin! Her dayîna qenc û her diyariya bêkêmahî ji jor e, ji Bavê ronahiyê tê xwar. Li ba wî guherîn û siya zivironekiyê tune. (Aqûb 1:13.14.16-17)

Pêxemberê Xwedê Habaqûq nivîsiye: Ya Xudan, … çavên te ji nêrîna xerabiyê paqij in û tu nikarî neheqiyê ragirî. (Habaqûq 1:12.13)

Madem ku Xwedê nikare neheqî û xerabiyê ragire, em çawa dikarin bêjin ku Xwedê ya xerab afirandiye? Ji xwe ev çênabe.
Xwedê Adem afirand, lê Adem bû gunehkar, çimkî wî ji xwe re hilbijart ku guhê xwe nede Xwedê. Peyva Xwedê hînî me dike ku Îblîs û dilê xerab ê mirovan serkaniya xerabiyê ye, lê belê Xwedê û Peyva wî ya pîroz serkaniya qenciyê ne.

> 2) Em tên ser pirsa diduyan. Pirs ev e: Eger Xwedê hem pîroz û hem jî dilbirehm be, çima ew ji ezmên çavnêriya xerabî, pevçûn, kuştin û şerrên li ser vê dinyayê dike, lê wan tiştan nade sekinandin? Gelek mirov hene ku di tengahiyên mezin de ne. Ma Xwedê nikare alîkariya wan bike?

Erê, Xwedê Xudanê rehm û keremê ye û bi rastî tiştê ku ji bo alîkariya mirovan pêwist e, wî ji mêj ve kiriye! Wî Xilaskarê rastdar Îsa Mesîh şand dinyayê, da ku bi destê wî me bi xwe re li hev bîne û mirov bi xwe jî li hev bên. Loma Mesîh di ber gunehên mirovan de mir.
Lê belê beriya ku mirov bikarin ji dil û can li hev bên, divê ew baweriya xwe bi Îsa Mesîh bînin û wî Xilaskarê xwe qebûl bikin.
Eger têkiliya di nav me û Xwedê de rast be, hingê têkiliya di nav me û mirovên din de jî dikare rast bibe. Lê eger ne wusa be, li ser rûyê erdê aştiya rastîn çênabe.
Bi rastî, her tişt bi vê yekê ve girêdayî ye ku em çi bersivê didin Xwedê.
Pêwist e ku em wê riya ku Xwedê pêk aniye, qebûl bikin.
Herweha divê em bînin bîra xwe ku rojekê Xwedê wê dîwana vê dinyayê bike.
Xwedê wê dîwana her xerabiya mirovan bike. Peyva Xwedê dibêje ku Xudan Îsa Mesîh wê di dawiya demê de vegere û wê dîwana wan hemû mirovan bike yên ku guhê xwe nedan rastiyê û rastî qebûl nekirin.
Îsa Mesîh wê hemû dijminên Xwedê bindest bike û hingê ewê erd û ezmên û her tiştê afirandî nû bike. Hingê ew gotina Nivîsarên Pîroz wê bê cih ya ku dibêje:

Êdî tiştê nifirlêbûyî wê qet nebe. Ewê ji çavên wan hemû hêstirên wan paqij bike û êdî mirin wê nebe. Êdî şîn û girîn, êş û elem jî wê nebin; çimkî tiştên berê bihûrîn.» (Peyxama Yûhenna 22:3; 21:4)

3) Pirsa sisiyan ev e: Tiştek heye ku ez pê gelek aciz dibim. Hûn dibêjin: Adem di bihiştê de guneh kir û ew gunehê wî ji wî gihîşt hemû dûndana wî û loma Xwedê wê zarokên Adem ceza bike. Ma ev rast e?

Gotina pêşiyan dibêje: «Nexweşiya vegir li ser nexweşê pêşî tenê namîne.»
Ev gotina pêşiyan, rast dibêje û em dixwazin vê yekê hinekî şîrove bikin:
Eger zarokên we hebin û ew di mala we de mezin bibin, qerektêrê wan wê li gor dê û bavê wan derkeve, qenc an xerab; wek ku dê û bav dibêjin, zarok wê wusa bêjin; tiştê ku dê û bav dikin, zarok wê wusa bikin. Zarok ji dê û bavê xwe hîn dibin û heta bandûra hewldanên dê û bavan, wê li fikrên wan jî bibe.
Em hemû ji malbata Adem û Hewayê ne. Dê û bavê me guhê xwe nedan emrê Xwedê. Gelo ma em ne wek bav û kalên xwe ne?
Ma kî ji me dikare bêje: «Ez tu caran ji riya Xwedê dûr neketime», an:
«Min her gav li gor emrên wî kiriye»?
Nexêr, em nikarin weha bêjin; di van tiştan de em hemû sûcdar in.
Çaxê ku em hatin dinyayê, hevênê guneh di dilê me de hebû. Dilê me zû ji Xwedê dûr dikeve û em zû emrên wî dişkênin. Xasîtiya me weha ye, tije guneh e. Lê belê me ev xasîtiya xwe ji ku derê stand? Erê, me xasîtiya xwe ji Adem stand. Wek nexweşiyeke vegir, gunehê Adem di nav me hemûyan de belav bû. Me bivê an me nevê, rewş ev e.
Peyva Xwedê weha ji me re dibêje:
«Guneh bi destê yek mirovî, mirin jî bi destê guneh ket dinyayê; bi vî awayî mirin derbasî hemû mirovan bû, çimkî hemûyan jî guneh kir.» (Romayî. 5:12)

Lê şikir ji Xwedê re, hêvî heye, çimkî Peyva Xwedê weha jî dibêje:
Ka çawa bi neheqiya yek mirovî, [yanî bi neheqiya Adem] hemû mirov sûcdar derketin, wusa jî bi karê rastdariyê yê yekî, [yanî bi rastdariya Îsa Mesîh] ji bo hemû mirovan rastdarî û jiyan hat. (Romayî 5:18)

Em niha tên ser pirsa çaran: Çima di Kitêba Pîroz de du beş, yanî Peymana Kevin û Peymana Nû hene?

Bi kurtî em dikarin weha bersiva vê pirsê bidin: Her tiştê ku pêxemberan beriya hatina Mesîh di Nivîsarên Pîroz de nivîsandiye, di Peymana Kevin de ye.
Her tiştê ku di Peymana Nû de nivîsî ye, piştî bûyîna Mesîh hatiye nivîsandin.
Yanî peyama pêxemberên Xwedê ya di Peymana Kevin de ev bû: Xwedê wê Mesîh bişanda vê dinyayê.
Lê belê peyama Peymana Nû ev e: Wek ku Xwedê bi devê pêxemberan gotibû, wî Mesîh şand! Ew li gor soza Xwedê hat!
Loma em şikir ji Xwedê re dikin ku di Nivîsarên Pîroz de du beş hene: Peymana pêşî û Peymana nû. Çimkî em dikarin bi vî awayî bi zelalî bibînin ku hemû sozên Xwedê çawa hatin cih. Erê, bi rastî Xwedê Xilaskar şand vê dinyayê.
Îsa Mesîh tam li gor pêxemberîtiyên Tewrat, Zebûr û Nivîsarên Pêxemberan hat.
Wek ku hemû çem û rûbar diherikin heta ku digihîjin deryayê, wusa jî Nivîsarên Pêxemberan di hatina Mesîh de gihîştin armanca xwe û hatin cih.

Em dixwazin ku armanca Xwedê di jiyana we de jî bê cih. Xwedê bi we re be!

Îro emê cara dawî li çend pirsan binêrin û bersiva wan bidin.

> 5) Hevalek weha dibêje: Gelek mirov dibêjin, qet çênabe ku mirov bizane ka ewê bikeve bihiştê, an wê bikeve dojehê, çimkî tenê Xwedê vê yekê dizane. Lê belê hûn dibêjin: Eger em îro bimirin, em dizanin ku emê herin ezmên. Ma mirov çawa dizane ku Xwedê wê di vê yekê de çi biryarê bide?

Em dixwazin di bersiva xwe de dest bi pirseke din bikin.
Pirs jî ev e: Ma dibe ku Xwedê li ser soza xwe nemîne? Ma ewê peyva xwe û soza xwe bîne cih, an neyne cih? Peyva Xwedê li ser Mesîh weha dibêje: Hemû pêxember li ser wî şahidiyê dikin, her kesê ku baweriyê bi wî bîne, bi navê wî efûbûna gunehan distîne. (Karên Şandiyan 10:43)
Û dibêje: Ez van tiştan ji we re, ji yên ku baweriyê bi navê Kurê Xwedê tînin re, dinivîsim, da ku hûn bizanin jiyana we ya herheyî heye. (Yûhenna I, 5:13)

Madem ku Xwedê bi xwe di Peyva xwe de gotiye ku em dikarin bizanin, ka jiyana me ya herheyî heye an na, emê çawa bêjin ku mirov nikare bizane ku ewê piştî mirinê here ku derê?
Dostê delal, rast e, tu dikarî bizanî ku piştî mirinê tê herî ku derê.
Pirs bi tenê ev e: Gelo ma tu ji dil û can baweriya xwe bi Îsa Mesîh tînî û goriya wî qebûl dikî? An tu ji xêr û kirinên xwe piştrast î?
Erê, ew ên ku ji dil û can ji Mesîh bawer dikin, dizanin û dikarin bêjin: «Piştî mirinê emê her û her li ba Xwedê bin. Jiyana me ya herheyî heye.»

> 6) Gelek spas. Guhdarekî din weha dipirse: Îsa da zanîn ku piştî wî Alîkar, yanî Paraklêtos wê bê. Îsa li ser kê gotiye?

Paraklêtos peyveke Yewnanî ye û mana vê peyvê ev e: Alîkar, şîretkar an jî piştevan. Di Nivîsarên Pîroz de ev nav hem ji Îsa re û hem jî ji Ruhê Pîroz re tê gotin. Me di bernameyeke din de dît ku Îsa beriya hilkişîna xwe ji şagirtên xwe re li ser hatina Ruhê Pîroz soz da û got:

«Ezê ji Bav bixwazim û ewê Alîkarekî din bide we, da ku her û her bi we re bimîne. Ew Ruhê Rastiyê ye; dinya nikare wî qebûl bike, çimkî ne wî dibîne û ne jî wî nas dike. Lê hûn wî nas dikin, çimkî ew bi we re dimîne û ewê di dilê we de be.    Alîkar - Ruhê Pîroz - yê ku Bav wê bi navê min bişîne, ewê hemû tiştî hînî we bike û wê her tiştên ku min ji we re gotine, bîne bîra we.

[Loma hûn] ji Orşelîmê dernekevin, lê li hêviya soza Bav bimînin.

We ev soz ji min bihîstiye. Yûhenna bi avê imad kir, lê piştî çend rojan hûnê bi Ruhê Pîroz imad bibin.» (Yûhenna 14:16.17; 16:8.9; Karên Şandiyan 1:4.5)

Îsa Mesîh got ku ew Alîkar ne mirovek e, lê ruhekî ku nayê dîtin e, yanî Ruhê Xwedê yê pîroz e. Îsa ji şagirtên xwe re got ku ewê pêşî vegere ezmên û hingê Xwedê wê Ruhê Pîroz bişîne nav wan û ewê di dilê wan de bimîne. Me di bernameyeke din de dît ku ew pêxemberîtiya Îsa Mesîh di Roja Pentîkostê de hat cih. Deh rojan piştî hilkişîna Mesîh, Ruhê Xwedê hat ser şagirtan.

Bi kurtî, Alîkar Ruhê Mesîh e. Ew tê dilê hemûyên ku ji Mizgîniya Xwedê bawer dikin. Eger tu ji dil û can baweriya xwe bi Îsa Mesîh bînî, Ruhê Pîroz wê bê û wê dilê te nû û paqij bike, wê te bike zarokekî Xwedê û mîrasa te wê her û her li ezmên di rûmeta Xwedê de be.

Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

Gava we peyva rastiyê, Mizgîniya xilasiya xwe bihîst û bawerî bi wî anî, hûn jî bi Ruhê Pîroz, di şexsê Mesîh de hatin morkirin. Ruh, heta dema rizgariya wan ên ku yên Xwedê ne, destberiya mîrasa me ye. Şikir ji rûmeta Xwedê re!

(Efesî 1:13.14)

Ji bo me hemûyan, yanî ji bo her bawermendê Mesîh, Ruhê Pîroz alîkar e, rêberê me ye, hêza me ye, mamosteyê me ye û ew ji bo me hê gelek tiştên din jî dike.
Ew di duayên me de alîkariya me dike. Di nav gotinên jiberkirî yên ku her roj tên dubarekirin û duayeke ku ji dilê mirov tê û digihîje Xwedê de, ferqek mezin heye. Ruhê Pîroz alîkariya me dike ku em li ber Xwedê duayên rast û ji dil bêjin. Di Kitêba Pîroz de dibêje:
Ruh jî di qelsiya me de alîkariyê dike. Çimkî em nizanin ka divê em çawa dua bikin; lê belê Ruh bi xwe bi nalînên ku nayên îfadekirin ji bo me mehderê dike. (Romayî 8:26)
Di dilê hemû bawermendên Mesîh de Ruhê Pîroz rûdine. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin: Kesê ku Ruhê Mesîh pê re tune be, ew ne yê Mesîh e. (Romayî 8:9)

7) Em bala xwe bidin pirsa dawî: Yekî din dinivîse: Min ji hîndariya we fêm kir ku eger ez Îsa Mesîh xilaskarê xwe qebûl bikim, ezê piştî mirinê herim bihiştê. Pirsa min ev e: Gelo ma mana vê yekê ew e ku ez dikarim li gor kêfa xwe bijîm û li gor daxwaza xwe tiştên xerab jî bikim û dîsa jî ez dikarim li ba Xwedê bêm qebûlkirin û herim bihiştê?

Guhdarên delal, di Încîlê de bersiva vê pirsê bi zelalî tê dayîn. Ew dibêje:
Nexwe em çi bêjin? Ma ji bo ku kerem zêde bibe, em di nav guneh de berdewam bikin? Na, tu caran! Em ên ku li hember guneh mirine, êdî çawa em dikarin di nav guneh de bijîn? (Romayî 6:1.2)
Divê ku em vê yekê qenc fêm bikin: Îsa Mesîh li ser xaçê mir û piştî sê rojan ji nav miriyan hat rakirin, da ku ew li gor plana Xwedê, mirovan ne tenê ji cezayê guneh xilas bike, lê wan ji hêza guneh jî rizgar bike.
Eger hûn ji dil û can baweriya xwe bi Mizgîniya Xwedê bînin, eynî di wê gavê de Xwedê wê li gor hîndariya peyva xwe di dilê we de du tiştan pêk bîne.
Ya pêşî: Xwedê wê li gor soza xwe bi navê Mesîh li hemû gunehên we bibihûre.

Ya diduyan: Xwedê wê Ruhê Pîroz bide we û ewê dilê we nû bike. Hingê hûnê dest pê bikin ji rastiyê hez bikin û ji xerabiyê nefret bikin, çimkî Xwedê wê xasîtiya xwe ya pîroz bixe dilê we. Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
Nexwe eger yek di yekîtiya Mesîh de be, ew afirînekî nû ye; tiştên kevin derbas bûn û çûn, va ye, yên nû çêbûn. (Korîntî II, 5:17)
Û dibêje: Wî xwe ji bo me feda kir, da ku me ji her neheqiyê rizgar bike û ji xwe re paqij bike û bike gelê ku ji bo kirinên qenc bi xîret e. (Tîtos 2:14)

Eger mirovek ji dil û can baweriya xwe bi Îsa Mesîh bîne, ewê dev ji xerabiyan berde, çimkî Xwedê wê Ruhê xwe yê pîroz bide wî û em dizanin ku berê Ruh, hezkirin, şahî, aştî, bîhnfirehî, dilovanî, qencî, dilsozî, nermî û xwegirtin e. (Galatî 5:22.23)

Guhdarên delal, Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de hê bêtir li vê dabaşê binêrin. Çimkî gelek girîng e ku em bizanin, şagirtekî Mesîh çawa dikare di jiyaneke nû de bijî.

Heta hingê em bi gotineke Dawid silavan li we dikin. Dawid pêxember di Zebûrê de weha gotiye:

Heçî Xwedê ye, riya wî bêqusûr e. Gotina Xwedê safî ye.
Ew ji bo hemûyên ku xwe bi wî digirin, mertal e. (Zebûr 18:30)

Xwedê bi we re be!

Wek ku me di bernama din de got, em dixwazin niha jî li ser vê pirsê bifikirin: Ew jiyana ku li Xwedê xweş tê, jiyaneke çawa ye? Ew mirovên ku dixwazin li pey Îsa Mesîh herin, divê ew çawa bijîn?
Bi kurtî em dikarin weha bêjin: Baweriya ku di dilê şagirtên Mesîh de ye, divê di tevahiya jiyana wan de, yanî di gotina wan de, di fikirîna wan de û di kirinên wan de kifş bibe.

Beriya ku em zêdetir li ser van tiştan bêjin, wê qenc be ku em careke din bînin bîra xwe ku mirov çawa dikare bibe şagirtekî Îsa Mesîh. Ya pêşî: Wek ku me dît, şagirtên Îsa Mesîh ew in ku qebûl bikin ku ew di çavê Xwedê de gunehkar in û tiştek ji destê wan nayê û ew nikarin bi hewldanên xwe bikevin bihiştê.
Ya diduyan: Ew ji plana Xwedê bawer dikin; hemû pêxemberên Xwedê li ser vê plana Xwedê digotin û plana wî jî ev e ku li gunehên zarokên Adem bê bihûrtin. Li gor vê plana Xwedê, Îsa hat dinyayê û li ser xaçê ji bo gunehên mirovan mir. Xwedê, Xilaskarê bêqusûr di ber gunehên me de radestî mirinê kir û [piştî mirinê bi sê rojan] ew ji nav miriyan rakir, da ku ew me li ber Xwedê rastdar derxe.

Bi kurtî, şagirtên Îsa Mesîh ji dil û can Mizgîniya Xwedê qebûl dikin û baweriya xwe bi Îsa Mesîh  tînin. Ew dizanin ku li gor soza Xwedê hemû gunehên wan hatine bexişandin. Xwedê, mirovên weha bi mana ruhanî dike zarokên xwe. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin: Hemûyên ku ew qebûl kirin û bawerî bi navê wî anîn, wî desthilatî da wan ku bibin zarokên Xwedê. 13 Ew ne ji xwestina mirov çêbûn, lê ew ji Xwedê çêbûn. (Yûhenna 1:12.13)

Dostên delal, Xwedê dixwaze ku tu vê yekê qenc bizanî: Eger tu baweriya xwe bi Mesîh û bi goriya wî bînî, tê bibî zarokekî Xwedê û tu, tu caran helak nabî; ewê desthilatiyê dide te ku tu her û her li ba wî di bihiştê de bijî!

Belkî hin mirov hene ku dibêjin: Bi rastî, eger ji bo şagirtên Îsa Mesîh rewş evqas sivik be ku ew bikarin bikevin bihiştê, ma hingê ew dikarin li gor kêf û daxwaza xwe jî bijîn û guneh û tiştên xerab jî bikin?
Ma ev tê vê manê ku ew tu caran ji dîwana Xwedê natirsin, çimkî Xwedê hemû gunehên wan êdî bexişandine!
Dostên delal, ji xwe helwesteke weha bêaqilî û bêhişî ye!
Bi rastî yên ku weha difikirin qet fêm nekirine ka guneh çi ye û qet Xwedayê pîroz jî nas nekirine.
Guneh tiştekî xerab û pîs e. Îsa Mesîh hat, da ku me ji hêz û desthilatiya guneh xilas bike. Ew nehat, da ku em di gunehên xwe de berdewam bikin! Her kesê ku baweriya xwe bi Îsa Mesîh tîne, êdî ne xulamê guneh e. Em dikarin weha bêjin: Bi tenê ew mirovên ku li pey Îblîs diçin û zarokên wî ne dikarin bi guneh kêfxweş bibin. Lê belê dilê wan ên ku Xwedê ew xilas kirine, hatiye guhertin. Xwedê dilê wan ên ku xilas dibin, dişo û paqij dike. Ew mirovên ku bi xwîna Îsa Mesîh hatine paqijkirin, xwe ji gunehan û ji her xerabî û pîsîtiyê dûr dixin.
Nivîsarên Pîroz vê yekê weha şîrove dikin û dibêjin:
Nexwe eger yek di yekîtiya Mesîh de be, ew afirînekî nû ye; tiştên kevin derbas bûn û çûn, va ye, yên nû çêbûn. (Korîntî II, 5:17)

Ji kerema xwe li ser vê yekê bifikirin: Eger hûn cilekî nû yê spî wergirin, ma hûnê di cihekî qirêjî û di nav herriyê de rûnin? Na, ji xwe hûnê xwe ji her tiştê ku cilê we yê nû qirêjî bike, dûr bixin. Halê her kesê ku ji aliyê Xwedê ve ji gunehên xwe hatiye paqijkirin jî ev e. Ew êdî naxwaze wan tiştên ku ne bi dilê Xwedê bin, bike. Ew êdî dixwaze li Xwedê xweş bê. Em dikarin meseleyeke din bêjin: Eger deynê te hebe û ew deyn pir mezin be û hevalekî te bê û deynê te bibe, ma tu dixwazî vî hevalî biêşînî? Nexêr, lê belê tu dixwazî wî razî bikî.

Herweha, çaxê ku Xwedê deynê gunehên te yê mezin rake û te ji agirê herheyî xilas bike, ma tê nexwazî ku heta dawiya jiyana xwe ji wî re şikir bikî û bi kirin û gotinên xwe siyaneta wî bigirî?
Ji kerema xwe guhên xwe bidin van gotinên Încîlê. Ew li ser bawermendên Îsa Mesîh weha dibêje:
[3] Demekê em bi xwe jî bêfêm, neguhdar, xapiyayî, xulamên kêf û xwestekên cûr
bi cûr bûn. Me jiyana xwe bi xerabî û çavnebariyê derbas dikir; her kesî ji me
nefret dikir û cênika me jî ji hev diçû. [4] Lê çaxê ku qencî û hezkirina Xilaskarê
me Xwedê xuya bû, [5] wî em, ne ji ber kirinên rast ên ku me kirine, lê li gor
rehma xwe, em bi şuştina jinûveçêbûnê û bi nûkirina Ruhê Pîroz xilas kirin. [6]
Xwedê, bi destê Xilaskarê me Îsa Mesîh, ew Ruh bi zêdehî bi ser me de rijand, [7]
da ku bi kerema wî em rastdar derkevin û li gor wê hêviyê em bibin wêrisên
jiyana herheyî. (Tîtos 3:3-7)
Û dibêje: [14] Wek zarokên guhdar bin û li pey xwestekên xwe yên dema nezaniyê
neçin. [15] Lê belê, çawa yê ku gazî we kiriye pîroz e, hûn jî di hemû rabûn û
rûniştina xwe de pîroz bin. [16] Ji ber ku hatiye nivîsîn: «Pîroz bin, çimkî ez pîroz
im.» (Petrûs I, 1:14-16)

Em çawa dikarin bi kurtî jiyana şagirtekî Îsa Mesîh şîrove bikin?
Belkî em dikarin weha bêjin: Xwedê dixwaze ku di jiyana zarokên wî de cewher, qerektêr û xasîtiya wî kifş bibe. Yanî Xwedê dixwaze ku zarokên wî wek wî bi xwe bin. Hingê pirs ev e: Cewhera Xwedê çawa ye? Me di xwendina xwe ya Nivîsarên Pîroz de dît ku bi taybetî du babetên Xwedê yên berçav hene: Pîrozî û paqijiya wî û hezkirina wî.
Xwedê Yê Pîroz e. Herweha Xwedê hezkirin e.
Îcar ma daxwaza Xwedê ji bo wan ên ku baweriya xwe bi wî anîne çi ye?
Ew dixwaze ku em wek wî pîroz bin û dixwaze, wek ku ew ji me hez dike, em jî ji hevdû hez bikin.

Jiyaneke pîroz û dilekî tije hezkirin wan ên ku zarokên Xwedê ne, ji mirovên din cuda dike.

Încîl li ser vê yekê weha dibêje:

Heçî kirinên nefsê ne, ew eşkere ne: Ew fuhûşî, pîsîtî, şehwet, [20] pûtperestî, sêrbazî, dijminahî, pevçûn, çavnebarî, hêrs, hevrikî, dubendî, partîkarî, [21] zikreşî, serxweşî, kêfkirina bi harîtî û sefahet û tiştên wek van in. ...

[22] Lê berê Ruhê Xwedê, hezkirin, şahî, aştî, bîhnfirehî, dilovanî, qencî, dilsozî, [23] nermî û xwegirtin e. ... [24] Heçî yên Mesîh Îsa ne, wan nefs bi xwestek û daxwazên wê ve birine ser xaçê.

Guhdarên delal, de vêca ma em bi xwe çawa ne? Eger em li jiyana xwe binêrin, ma emê berê nefsa xwe, an berê Ruhê Xwedê bibînin?

Xwedê hez bike, emê di bernama ku bê de hê bêtir li vê dabaşê binêrin. Heta hingê bila ev peyvên Xwedê li bîra we bin; ew dibêjin:

[14] Wek zarokên guhdar bin û li pey xwestekên xwe yên dema nezaniyê neçin. [15] Lê belê, çawa yê ku gazî we kiriye pîroz e, hûn jî di hemû rabûn û rûniştina xwe de pîroz bin. [16] Ji ber ku hatiye nivîsîn: «Pîroz bin, çimkî ez pîroz im.» (Petrûs I, 1:14-16)

Di bernama din de pirsa me ev bû: Jiyana ku li Xwedê xweş tê, jiyaneke çawa ye?

Me dît ku Kitêba Pîroz li ser vê yekê du tiştên bingehîn dibêje:

- Xwedê pîroz û paqij e û ew hezkirin e.
- Loma ew dixwaze ku bawermendên wî jî pîroz û tije hezkirin bin.
  Ew dixwaze ku em wek wî pîroz bin û dixwaze, wek ku ew ji me hez dike, em jî ji hevdû hez bikin.

Bi kurtî em dikarin weha bêjin: Baweriya ku di dilê şagirtên Mesîh de ye, divê di tevahiya jiyana wan de, yanî di gotina wan de, di fikirîna wan de û di kirinên wan de kifş bibe.

Peyva Xwedê li ser vê yekê weha dibêje:

10 Zarokên Xwedê û zarokên Îblîs bi vê yekê ji hev kifş dibin: Her kesê ku
rastiyê nake ne ji Xwedê ye û yê ku ji birayê xwe hez nake jî ne ji Xwedê ye.
11 Çimkî kerema Xwedê ya ku ji hemû mirovan re xilasiyê tîne, xuya bû 12 û me
perwerde dike ku em nepakiyê û xwestekên dinyayê red bikin û rast, sergiran û
bi tirsa Xwedê li vê dinyayê bijîn 13 û li benda hêviya pîroz û xuyabûna rûmeta
Xwedayê mezin û Xilaskarê xwe Îsa Mesîh bimînin. 14 Wî xwe ji bo me feda kir,
da ku me ji her neheqiyê rizgar bike û ji xwe re paqij bike û bike gelê ku ji bo
kirinên qenc bi xîret e. (Tîtos 2:11-14)

Û dibêje:

25 Loma derewan ji xwe dûr bixin û «her yek ji we bi cîranê xwe re rastiyê
bipeyivin» , çimkî em endamên hev in.
26 «Hêrs bibin, lê guneh nekin»; bila roj li ser hêrsa we neçe ava.
27 Ne jî rê bidin Îblîs.
28 Yê ku dizî kiriye, divê êdî diziyê neke, lê bila bi destê xwe tiştê qenc bike û
bixebite, da ku tiştekî wî hebe ku bide yê hewcedar.

[29] Bila qet gotina xerab ji devê we dernekeve, lê belê ji bo perwerdekirinê çi
qenc be - wek ku lazim e - wê bêjin, da ku ew ji guhdaran re keremdar be.
[30] Ruhê Xwedê yê Pîroz ê ku hûn ji bo roja rizgariyê bi wî hatine morkirin,
xemgîn nekin.
[31] Bila bi her xerabiyê re her tehlî, hêrs, xezeb, qîrîn û buxtan ji we dûr kevin.
[32] Li hember hev keremdar û dilovan bin û wek ku Xwedê bi Mesîh li we
bihûrtiye, li hevdû bibihûrin. (Efesî 4:25-32)

[1] Ji bo vê yekê, wek zarokên delal mîna Xwedê bikin. [2] Çawa ku Mesîh ji me
hez kir û ji bo me xwe feda kir û xwe wek pêşkêş û goriyeke bîhnxweş pêşkêşî
Xwedê kir, hûn jî wusa di hezkirinê de rêve herin.
[3] Bi awayê ku li pîrozan tê, divê di nav we de, navê fuhûşiyê û her cûreyê
nepakî an çavbirçîtiyê qet neyê gotin jî.
[4] Û divê peyivîna bêedebî û bi ehmeqî, an henekên zir, yanî tiştên ku ne hêja ne,
nebin, lê hê bêtir hûn şikirdar bin.
[5] Vê yekê qenc bizanin ku di Padîşahiya Mesîh û Xwedê de mîrasa tu mirovê
fuhûşker, nepak an jî mirovê çavbirçî yanî pûtperest, tune.
[6] Bila tu kes we bi peyvên pûç nexapîne, çimkî xezeba Xwedê ji ber van tiştan tê
ser kurên neguhdariyê. [7] Îcar hûn nebin hevparên wan.
[8] Demekê hûn tarî bûn, lê niha hûn bi Xudan ronahî ne. Îcar wek zarokên
ronahiyê rêve herin. (Efesî 5:1-8)
[7] Hezkirîno, em ji hevdû hez bikin; çimkî hezkirin ji Xwedê ye û her kesê ku hez
dike, ji Xwedê çêbûye û Xwedê nas dike.
[20] Eger yek bêje: «Ez ji Xwedê hez dikim» û ji birayê xwe nefret bike, derewkar
e. Çimkî yê ku ji birayê xwe yê ku dibîne hez neke, nikare ji Xwedayê ku nabîne
hez bike. [21] Emrê ku me jê standiye ev e: Yê ku ji Xwedê hez dike, bila ji birayê
xwe jî hez bike. (Yûhenna I, 4:7.20.21)

Erê, tiştê ku Nivîsarên Pîroz li ser jiyana şagirtên Îsa Mesîh dibêjin, ev e.

Di bernama din de me dît ku Mesîh gunehên şagirtên xwe, yanî gunehên bawermendên xwe bexişandine û jiyaneke nû daye wan.
Gelo ma ev yek tê wê manê ku êdî qet çênabe ku bawermendên Mesîh gunehekî jî bikin? Ma ew her gav wek xwe ji cîranê xwe hez dikin?
Nexêr, ew hê jî carna gunehan dikin, lê êdî ew di nav gunehan de nasekinin. Çimkî ew dizanin ku Îblîs her gav dixwaze wan bixapîne û dixwaze wan ji riya rast dûr bixe. Êdî kêfa wan ji gunehan nayê.
Eger ew gunehan bikin, ew dikarin vê soza Peyva Xwedê bînin bîra xwe ya ku dibêje:
[7] Xwîna Kurê wî Îsa, me ji her gunehî paqij dike.
[8] Eger em bêjin: «Gunehê me tune», em xwe dixapînin û rastî bi me re tune. [9] Lê
eger em gunehên xwe eşkere bikin, ew dilsoz û rastîparêz e ku li gunehên me bibihûre û me ji her neheqiyê paqij bike. (Yûhenna I, 1:7.8.9)
Amîn!
Kitêba Pîroz li vir bi zelalî sê xalan diyar dike:

Ya pêşî: Tu mirov tune ku bikare bêje: «Gunehê min tune». Pêxember nikarin weha bêjin û bawermendên Îsa Mesîh jî nikarin weha bêjin. Di jiyana her mirovî de guneh heye.

Ya diduyan: Heta ku mirov bixwaze gunehên xwe veşêre, li wan nayê bihûrtin. Di Zebûrê de Dawid li ser vê yekê weha nivîsiye:
[1] Xwezî bi wî yê ku li neheqiyên wî hatiye bihûrtin û gunehê wî hatiye nixumandin.
[2] Xwezî bi wî mirovê ku Xudan ji wî re xerabiyê hesab nake û di dilê wî de hîle tune.
[3] Çaxê ku min gunehên xwe eşkere nekirin, tevahiya rojê hestiyên min ji nalîna min lewaz bûn.
[4] Ji ber ku şev û roj destê te li ser min giran bû; terbûniya min bû wek zuwayiya havînê.

5 Min gunehê xwe ji te re got û neheqiya xwe veneşart.
Min got: «Ezê zêdegaviya xwe ji Xudan re eşkere bikim» û tu li sûcê gunehê min bihûrtî. (Zebûr 32:1-5)

Ya sisiyan: Guneh bi xwîna Îsa Mesîh tê paqijkirin. Çaxê ku Îsa Mesîh jiyana xwe da, wî deynê gunehên me daye. Wî xwîna xwe di ber gunehên me mirovan de rijand û bi vê yekê em dikarin ji gunehên xwe paqij bibin.

Guhdarên delal, ji kerema xwe li ser van pirsan hinekî bifikirin:
Kî wê deynê gunehên we bide?
Ma hûn dibêjî ku hûn dikarin deynê gunehên xwe bidin?
Gunehên we wê çawa paqij bibin? Ma ji bo vê yekê tiştek ji destê me tê? Nexêr, tiştek ji destê me nayê, lê şikir ji Xwedê re, çimkî wî Îsa Mesîh şand vê dinyayê, da ku gunehên mirovan paqij bike û deynê wan bide.

Dostên delal, heta bernama ku bê, careke din li ser van gotinên Kitêba Pîroz bifikirin ên ku dibêjin:
Xwîna Kurê wî Îsa, me ji her gunehî paqij dike. (Yûhenna 1:7)
Min gunehê xwe ji te re got û neheqiya xwe veneşart.
Min got: «Ezê zêdegaviya xwe ji Xudan re eşkere bikim» û tu li sûcê gunehê min bihûrtî. (Zebûr 32:5)

Îro careke din dabaşa me ev e: Jiyana ku li Xwedê xweş tê, jiyaneke çawa ye? Kitêba Pîroz li ser vê yekê du tiştên bingehîn dibêje:

- Xwedê pîroz û paqij e û ew hezkirin e.
- Xwedê dixwaze ku bawermendên wî jî pîroz û tije hezkirin bin.
  Ew dixwaze ku em wek wî pîroz bin û dixwaze, wek ku ew ji me hez dike, em jî ji hevdû hez bikin.

Baweriya ku di dilê şagirtên Mesîh de ye, divê di tevahiya jiyana wan de, yanî di gotina wan de, di fikirîna wan de û di kirinên wan de jî kifş bibe.
Herweha me dît ku Xwedê dilsoz e û li gunehên me dibihûre. Şert tenê ev in ku em qebûl bikin ku Îsa di ber gunehên me de xwîna xwe rijandiye û em gunehên xwe veneşêrin, lê wan eşkere bikin, yanî wan bêjin.

Eger yek bibe şagirtekî Îsa Mesîh, yanî bibe bawermendê wî, ev yek ne wek dîn an diyanetekê ye. Nexêr, lê belê ev têkiliyeke nû ye. Eger mirovek Îsa Mesîh qebûl bike û bibe yê wî, têkiliyeke nû di nav wî mirovî û Xwedayê pîroz de dest pê dike. Adem û Hewa ji ber gunehê xwe ji Xwedê dûr ketin, lê bi saya xwîna Îsa Mesîh ya ku wî li ser xaçê rijand, em dikarin ji nû ve nêzîkî Xwedê bibin. Xwedê êdî neheqiyên me nayne bîra xwe, çimkî Îsa deynê gunehên me daye.
Bi saya têkiliya di nav me û Îsa Mesîh de, Xwedê dibe bavê me yê ezmanî û em dibin zarokên wî. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
Bi rêberiya [Mesîh] em … dikarin bi yek Ruhî derkevin ber Bav. 19 Îcar êdî hûn ne xerîb û biyanî ne, lê belê hûn … maliyên Xwedê ne. (Efesî 2:18.19)

Şagirtên Îsa Mesîh hem li ser rûyê erdê bi têkiliyeke kûr a bi Xwedê re şa dibin û hem jî li benda mîrasa herheyî ya li ezmanan dimînin.
Lê belê belkî hûn dipirsin, dibêjin: Mirov çawa li ser rûyê erdê bi têkiliya bi Xwedê re şa dibe? Ev têkilî çawa dikare xurt û hê kûrtir bibe?

Peyva Xwedê li ser vê yekê çar şîretan li  me dike. Berpirsiyariya me ev e ku em wan bînin bîra xwe û li gor wan bikin. Ew şîret wê ji bo fêmkirina daxwaza Xwedê alîkariya me bikin, da ku em bikarin wek ku li zarokên Xwedê tê, jiyaneke rast bijîn û di her tiştî de li wî xweş bên û di zanîna Xwedê de pêş ve herin.

Şîret û berpirsiyariya pêşî ev e: Peyva Xwedê peyva jiyanê ye û nanê me yê rojane ye. Her roj li ser Peyva Xwedê bifikirin, wê bistînin dilê xwe û li gor gotinên wê bikin jî. Nivîsarên Pîroz daxwaza Xwedê ji me re didin zanîn. Xwedê bi riya gotinên Kitêba Pîroz bi me re dipeyive. Peyva Xwedê ji bo ruhê me xwarineke newaze ye û hêzê dide me.
Eger mirovek ji Xwedê hez bike, ji xwe ew dixwaze an guhdariya peyvên Xwedê bike, an jî wan bixwîne, çimkî wek ku ew birçiyê nanê rojane ye, ewê birçiyê Peyva Xwedê be jî.
Eyûb pêxember got: Min ji nanê rojane zêdetir peyvên [Xwedê] hilanîne.
(Eyûb 23:12)

Şîret û berpirsiyariya diduyan dua ye. Xwedê bavê me yê ezmanî ye û di duayê de em bi wî re dipeyivin. Yê ku bixwaze di baweriyê de pêş ve here, wê bixwaze gelek caran bi Xwedê re bipeyive.
Wek ku tu bi dostê xwe re dipeyivî, weha şagirtekî Îsa Mesîh dikare bi Xwedê re bipeyive. Wextên taybetî yên ku divê em dua bikin tunin. Divê bila roj be, an divê bila şev be, her gav em dikarin bi Bavê xwe yê ezmanî re bipeyivin. Bi rastî ya qenc ew e ku tu caran fikrên me dûrî Xwedê nekevin û her gav haya me ji Xwedê hebe. Ew dixwaze ku em her gav ji bo her tiştê ku wî ji bo me kiriye pesnê wî bidin û wî ji bo hezkirin, dilovanî, dadperwerî û rehm û kerema wî bilind bikin. Herweha destûra me heye ku em bi hemû xem û derdên xwe ve herin ber wî. Şagirtên Îsa Mesîh dizanin ku dua gelek bi bandûr e.
Îsa bi xwe ji şagirtên xwe re ev soz da û got:
4 Eger hûn bi navê min tiştekî ji min bixwazin, ezê wî bikim. (Yûhenna 14:14)

Û di Încîlê de dibêje: [6] Ji bo tu tiştî xeman nexwin. Lê belê di her tiştî de bila daxwazên we bi dua û lavan û bi şikirkirinê ji Xwedê re bên gotin. (Filîpî 4:6)

Şîret û berpirsiyariya sisiyan ev e ku em bi şagirtên Îsa Mesîh ên din re bicivin. Eger peleke êgir bi serê xwe be, ew zû vedimire, lê eger ew bi pelên din re bimîne, ew zû bi zû venamire. Bi vî awayî pêwist e ku em bi mirovên din ên ku ji Îsa Mesîh hez dikin û baweriyê bi wî tinîn re bicivin. Bi dostaniya mirovên weha, baweriya me xurt dibe û em dikarin cesaretê bidin bawermendên din jî, da ku ew jî di jiyana xwe de nêzîkî Xwedê bimînin.
Peyva Xwedê dibêje:
Em hay ji hev hebin, ku em hevdû ji bo hezkirin û kirinên qenc bişidînin. [25] Wek ku hinekan ji xwe re kiriye adet, em dev ji civînên xwe bernedin, lê çawa ku hûn dibînin Roja Xudan nêzîk dibe, hê zêdetir cesaretê bidin hevdû. (Îbranî 10:24.25)

Şîret û berpirsiyariya çaran ev e ku em bibin şahidên Îsa Mesîh. Ji kerema xwe guhê xwe bidin van gotinên Îsa Mesîh. Beriya ku ew hilkişe û vegere ezmên, wî got: «Weha hatiye nivîsîn, Mesîh wê cefayê bikişîne û wê roja sisiyan ji nav miriyan rabe [47] û ji Orşelîmê bigire heta hemû miletên dinyayê, bi navê wî tobe û efûbûna gunehan, wê ji wan re bê danbihîstin. [48] Hûn şahidên van tiştan in.» (Lûqa 24:46-48)

Erê, şagirtên Îsa Mesîh ji mirovên din re li ser Xilaskarê xwe dibêjin û Mizgîniya Xwedê ji wan re şîrove dikin. Îsa Mesîh ji bo hemû mirovan mir, da ku hemû baweriya xwe bi wî bînin û bi vî awayî her û her li ba Xwedê bin.
Ji xwe şahidiya me wê ne tenê bi dev be, lê divê ku hem jiyana me ya pîroz û paqij û hem jî hezkirina me, şahidiya me erê bikin. Eger kifş bibe ku Îsa Mesîh dilê me guhertiye, şahidiya me wê bi jiyaneke nû hê xurtir bibe. Çimkî Nivîsarên Pîroz dibêjin: Padîşahiya Xwedê ne bi gotinê ye, lê belê bi hêzê ye. (Korîntî I, 4:20)

Guhdarên delal, ma di jiyana we de rojek wusa çêbûye ku we Îsa Mesîh Xilaskarê xwe qebûl kiriye? Ma wî gunehên we bexişandine û dilekî nû daye we? Ma jiyana we bi hezkirina Xwedê û bi pîrozî û paqijiya Xwedê tije bûye? Gelo, ma hûn şagirtên Îsa Mesîh ên rastîn in?

Gelek spas ku we guhdariya vê bernamê kir.
Heta cara ku bê, bila ev gotinên Nivîsarên Pîroz li bîra we bin: Kitêba Pîroz dibêje:

Xwedê ronahî ye û li ba wî qet tarî tune. 6 Eger em bêjin: «Hevpariya me bi wî re heye» û hê jî em di tariyê de rêve herin, em derewan dikin û em li gor rastiyê nakin. (Yûhenna I, 1:5.6)

Ev demeke dirêj e ku em li ser Nivîsarên Pêxemberan lêkolîneke kûr dikin.
Bi alîkariya Xwedê em dixwazin îro û di sê bernameyên ku bên de careke din bi kurtî li dabaşên herî girîng û bingehîn ên Nivîsarên Pîroz binêrin.
Dabaşa dersa îro ev e: Pirsgirêka guneh.

Em niha dixwazin vegerin bingehê pêşî yê ku Xwedê daniye, yanî em bên ser Tewratê. Ruhê Pîroz Tewrat bi destê Mûsa pêxember da nivîsandin.
Gelo ma ayeta pêşî a Tewratê tê bîra we?
Ayeta pêşî dibêje: Di destpêkê de Xwedê erd û ezman afirandin.
Di vê ayetê de me dît ku beriya afirandina gerdûnê, beriya afirandina milyaket û mirovan, bi tenê Xwedê hebû. Xwedê Xudanê herheyiyê ye, ew Ruhê herheyî ye. Destpêk û dawiya wî tune. Ew Karîndarê her tiştî ye; ew her tiştî dibîne û her tiştî dizane.

Di deriyê pêşî de me xwend ku Xwedê di nav şeş rojan de erd û ezman, derya û her tiştê ku tê de ye, afirandin. Xwedê erd ji bo mirovên ku hê tune bûn amade kir. Loma Xwedê di roja şeşan de got:
«Niha em di sûretê xwe de, wek ku mîna me be, mirovan çêkin. Bila ew bibin serwerê masiyên avê, teyrên ezmên, heywanên kedî, serwerê hemû erdê û hemû heywanên ku li ser rûyê erdê dişêlin.»
27 Îcar Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand.» (Destpêkirin 1:26.27)

Ji her tiştê afirî, mirov yê herî giranbiha û girîng e. Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand. Mebesta Xwedê ew bû ku di nav wî û mirovan de têkiliyeke şêrîn û kûr hebe. Loma wî ruh da herdu mirovên pêşî Adem û Hewayê, da ku ew bikarin Xwedê nas bikin; wî dil da wan, da ku ew bikarin ji Xwedê hez bikin û wî azadiya hilbijartinê da wan, da ku ew bikarin ji xwe re hilbijêrin ka ew dixwazin guhê xwe bidin Xwedê an naxwazin.

Di deriyê diduyan de me xwend ku Xwedê ji mirovê pêşî Adem re baxçeyekî xweş û bedew amade kir û ew danî wir; di wî baxçeyî de gelek darên bi fêkiyê xweş û şêrîn hebûn; ew li çavan spehî xuya dibûn û ji bo xwarinê xweş bûn. Herweha me dît ku Xwedê ji parsûyekî ku ji Adem standibû jinek çêkir û jê re anî. Adem navê wê kir Hewa. Xwedê ew herdu pîroz û bimbarek kirin û her tiştê ku ji wan re lazim bû, da wan.

Erê, Xwedê her tişt da wan, lê Xwedê dixwest tiştekî ji wan jî bistîne.

Gelo Xwedê ji wan herdu mirovên ku di sûretê wî de hatibûn afirandin, çi dixwest? Daxwaza wî ew bû ku ew herdu mirov bi hemû hişê xwe, bi hemû dilê xwe û bi hemû hêz û daxwaza xwe ji wî hez bikin, da ku di nav wî û mirovan de têkiliyeke şêrîn hebe. Xwedê nedixwest ku ew têkilî bi mecbûrî be û me dît ku Xwedê ceribandinek danî ber Adem, da ku helwesta dilê wî kifş bibe.

Xwedê li Adem ev emir kir û got:

«Ji her dara baxçe tu dikarî bixwî, 17 lê ji dara zanîna qencî û xerabiyê, nexwe.
Çimkî gava ku tu ji wê bixwî, eseh tê bimirî.» (Destpêkirin 2:16.17)

Bi vî awayî Xwedê Adem ceriband û herweha wî ew hişyar jî kir. Diviya ku wî qenc bizaniya berê neguhdariyê wê ew bûya ku ewê bimira, yanî ewê ji Xwedê bihata veqetandin.

Di deriyê sisiyan de Nivîsarên Pîroz dibêjin ku rojekê milyaketê ku li hember Xwedê rabûbû, yanî Îblîs, di şiklê marekî hîlebaz de nêzîkî Adem û Hewayê bû. Wî ji jinê re got:

«Ma bi rastî Xwedê gotiye: ‹Qet ji fêkiyê dareke baxçe nexwin?›»

2 Jinê ji mar re got: «Em dikarin ji fêkiyê darên li baxçe bixwin; 3 lê heçî fêkiyê
dara ku di navenda baxçe de ye, Xwedê gotiye: ‹Jê nexwin û dest nedinê, an
naxwe hûnê bimirin.›»

4 Mar ji jinê re got: «Hûn qet namirin. 5 Çimkî Xwedê dizane gava ku hûn ji wê
bixwin, hingê çavên we wê vebin, hûnê bibin wek Xwedê û qencî û xerabiyê
bizanin.» (Destpêkirin 3:1-5)

Ma Xwedê ji Adem û Hewayê re çi gotibû? Eger wan ji fêkiyê dara zanîna qencî û xerabiyê bixwara, çi wê bihata serê wan?
Wî ji wan re gotibû: «Eseh hûnê bimirin!»
Ma Îblîs ji wan re çi got? Wî got: «Hûn qet namirin.»
Gelo Adem û Hewayê guhê xwe dan gotinên kê? Wan çi ji xwe re hilbijart?
Wan ji xwe re peyvên Xwedê yên rast an peyvên Îblîs ên derew bijartin?
Bi rastî, wan peyvên dijminê Xwedê Îblîs hilbijartin!

Gelo piştî vê yekê Xwedê çi kir? Ma Xwedê li xwe zivirrî û got: «Wan xeletî kir, lê xem tune, ne tiştekî giran e»?
Nexêr. Xwedê ew hişyar kiribûn û wî tam li gor gotina xwe kir.
Wî gazî wan kir, dîwana wan kir, ceza da wan û ew ji wî baxçeyê xweş û bedew ê ku ji bo wan amade kiribû, derxistin.
Wê rojê Adem û Hewa ji Xwedê, yanî ji serkaniya jiyanê, hatin veqetandin.
Ji bilî mirinê û ji bilî helakbûna herheyî wan nikaribû li benda tiştekî din bimînin; çimkî tam wek ku Xwedê gotibû, cezayê guneh helaka herheyî ye.

Bi rastî guneh felaketeke pir dijwar e. Ji ber gunehekî tenê hem Adem û hem jî tevahiya dûndana wî ji Xwedê hatin veqetandin. Me got ku guneh dikare bi nexweşiya AIDS'ê re bê hemberkirin. Wek ku hûn dizanin, AIDS ji mirovekî diçe mirovê din. Ev bela li tevahiya dinyayê belav bûye.
Çaxê ku AIDS bikeve hundirê mirov, ew tu caran jê dernakeve. Mirovên ku bi vê nexweşiyê ketine, carna AIDS derbasî zarokên wan jî dibe; mesele çaxê ku hê zarok di malzaroka diya xwe ya nexweş de ye, AIDS carna zarok digire.
AIDS mirovan dikuje û heta îro jî ji bo vê nexweşiyê derman tune.
Guneh jî wusa ye. Ev bela di tevahiya dinyayê de belav bûye. Ew mirovan dikuje û her û her helak dike.

Mirov bi xwe di vê rewşê de bê çare ye, lê şikir ji Xwedê re ku ji bo gunehkaran li ba wî çare heye!
Xwedê bi xwe çare peyda kir û eger em vê çareyê qebûl bikin, emê ji guneh paqij bibin.
Gelo ma ew soza Xwedê ya newaze ya ku wî eynî wê roja ku Adem û Hewayê guneh kiribûn, da wan, tê bîra we? Erê, tam wê roja ku guneh ketibû dinyayê, Xwedê soz dabû ku wiyê Xilaskarekî pîroz bişanda, da ku wî zarokên Adem ji hêza Îblîs û guneh xilas bikiran.
Herweha me xwend ku Xwedê got, ew Xilaskar wê tenê ji keçikekê çêbûya, çimkî çênedibû ku Xilaskarê gunehkaran ji zarokên Adem ên gunehkar bihata. Diviya ku ew ji Ruhê Xwedê yê pîroz bihata.

Îcar me di Încîlê de dît ku çend hezar salan piştî vê sozê, ew wextê ku Xwedê kifş kiribû hat û mirovek rastdar û bêkêmahî hat vê dinyayê. Li ser rûyê erdê bavê wî nebû; ew ji keçikekê çêbû. Navê wî Îsa bû û mana vî navî ev e: Xwedê xilas dike.
Erê, Îsa Mesîh ew Xilaskarê pîroz e yê ku Xwedê wê roja ku Adem û Hewayê guneh kiribûn, li ser gotibû. Xilaskar ew bi xwe ye û yekî din tune.

Guhdarên delal, di bernama ku bê de jî bi me re bin; hingê emê careke din bi kurtî li serhatiya Qayîn û Habîl binêrin. Heta hingê hûn bimînin di xêr û xweşiyê de.
Xwedê bi we re be!

Cara din me bi kurtî li serhatiya afirandina mirovên pêşî nêrî.
Me dît ku Xwedê çawa Adem û Hewa afirandin û baxçê Êdenê ji bo wan amade kir û her tiştê ku ji wan re lazim bû, da wan.
Herweha me dît ku Adem û Hewa ji aliyê Îblîs ve hatin ceribandin, çimkî Îblîs dixwest ku wê têkiliya şêrîn a di nav Xwedê û mirovan de xera bike.

Niha em dixwazin vegerin wê roja ku guneh cara pêşî ket dinyayê.
Gelo ma tê bîra we piştî ku Adem û Hewayê ji fêkiyê dara zanîna qencî û xerabiyê xwarin, çi kirin? Wan pelên hêjîran dirûtin û ew ji xwe re kirin berkoşk, da ku şerma wan veşêrin; çimkî beriya ku ew guneh bikin, ew tazî bûn, lê şerm nedikirin, yanî şerma wan nebû.

Ma Xwedê ew cilên ku wan ji xwe re çêkiribûn, qebûl kirin?
Na, wî ew qebûl nekirin!
Çima Xwedê ew cil qebûl nekirin? Ji ber ku Xwedê dixwest hînî Adem û Hewayê bike, tiştek tune ku mirov bikare bi wî gunehên xwe ji ber Xwedê veşêre.
Lê belê Xwedê bi xwe ji bo mirovan tiştek kir. Me dît ku Xwedê ji çermê heywanên bêqusûr ji bo Adem û Hewayê cil çêkirin.
Bi vî awayî, Xwedê hînî wan kir ku «meaşê ku guneh dide, mirin e».
Xwedê ne tenê heywan gurandin, lê wî emir li wan kir ku ew jî heywanên bêqusûr bikin gorî, da ku li gunehên wan bê bihûrtin. Vî emirî heta dema hatina Xilaskarê ku Xwedê wê bişanda, kişand.

Bi van tiştan Xwedê bi zelalî nîşanî wan kir ku riya xilasiyê yek e û riyeke din tune. Ji bo bexişandina gunehan diviya goriyên bêqusûr bihatan serjêkirin û pêşkêşkirin.

Riya Rastdariyê ya ku li gor daxwaza Xwedê bû, ew bû ku mirovan heywanên bêqusûr hilbijartan, ew bigûrandan û bikiran goriyên ku gunehê mirovan dinixumandin. Ev gorî mînaka Xilaskarê pîroz bûn, çimkî ew Xilaskar wê bihata dinyayê û wê xwîna xwe li ser xaçê birijand, da ku deynê gunehê zarokên Adem bida.

Ew gorî li ber çavên mirovan nîşana Îsa Mesîh bûn. Mesîh wê bibûya goriya bêkêmahî û ya herî dawî û bi vê yekê wê guneh xîş bikiran û rakiran.

Bi vî awayî Xwedê dadperweriya xwe kifş kir, da ku ew bi xwe rastdar be û yê ku baweriyê bi Îsa bîne, rastdar derkeve. (Romayî 3:26)

Piştî serhatiya gunehê pêşî û soza Xwedê ya newaze ya ku wê Xilaskarek bişanda, me di deriyê çaran ê Kitêba Destpêkirinê de, li ser herdu zarokên Adem ên pêşî xwend. Me dît ku Habîl li gor emrê Xwedê ji pezê xwe heywanên bêqusûr serjêkirin, kirin gorî.

Lê heçî birayê wî Qayîn bû, wî dixwest ku li gor daxwaza xwe nêzîkî Xwedê bibe û wî ji berê erdê nifirlêbûyî pêşkêşî Xwedê kir.

Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêje:

Xudan bi Habîl û bi pêşkêşa wî şa bû. 5 Lê bi Qayîn û bi pêşkêşa wî şa nebû.

(Destpêkirin 4:4.5)

Ka çima Xwedê pêşkêşa Qayîn qebûl nekir? Wek ku me dît, li gor Riya Rastdariyê ya ku Xwedê amade kiribû, ji bo bexişandina gunehan gorî pêwist bûn. Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.»

(Îbranî 9:22)

Qayîn wusa nekir. Qayîn xwest ku wek yekî bawermend bê hesabkirin, lê kirinên wî kifş kirin ku baweriya wî ne li gor daxwaza Xwedê bû. Wî heywanek serjê nekir, wî xwîn nerijand. Dilê wî ji Xwedê dûr bû. Loma Xwedê ew qebûl nekir.

Lê belê Xwedê bi goriya Habîl şa bû, çimkî Habîl baweriya xwe bi peyva Xwedê anî û li gor daxwaza Xwedê heywan kirin gorî. Ji ber vê yekê Nivîsarên Pîroz dibêjin: Bi baweriyê, Habîl goriyeke ji ya Qayîn çêtir pêşkêşî Xwedê kir.

Bi wê baweriyê ew mirovekî rast hat erêkirin, çimkî Xwedê diyariyên wî erê kirin.
Habîl mînaka wan mirovan e yên ku ji aliyê Xwedê ve rast tên hesabkirin, ji ber ku ew baweriya xwe bi Îsa Mesîh tînin ê ku ji bo bexişandina gunehên wan xwîna xwe rijand.
Qayîn mînaka wan mirovan e yên ku dixwazin bi hewldana xwe di çavê Xwedê de mirovên oldar bin. Lê belê ew wê goriya Xilaskarê ku Xwedê şandiye ser rûyê erdê qebûl nakin.
Heta îro jî bi tenê ew herdu rê hene: Riya Habîl û riya Qayîn.
Gelo hûn di kîjan riyê de diçin?
Ma we riya Habîl, yanî riya rastdariyê qebûl kiriye? Bingehê wê riyê goriya Îsa Mesîh e yê ku Xwedê şand ser rûyê erdê.
An hûn hê di riya Qayîn de diçin? Riya wî, riya neheqiyê ye û bingehê wê xêr û kirinên mirovan û daxwazên dîn û diyanetê ne.

Guhdarên delal, vê yekê qenc bizanin: Xwedê rast e û qet tu gunehî qebûl nake.
Xwedê ji Adem û Hewayê re negot: «Ez dizanim ku we guneh kiriye, lê xem tune, ew ne tiştekî girîng e û her tişt wê qenc be; ezê zû ji bîr bikim çimkî we tenê carekê guneh kiriye.»
Ma Xwedê bi vî awayî li guneh bihûrt? Nexêr! Eger Xwedê weha kiribûya, gunehkaran wê çawa fêm bikira ku Xwedê pîroz û paqij û dadperwer e?
Bi rastî, Xwedê dadgerekî rast e û ew guneh ceza dike.
Cezayê guneh jî mirin e!
Ji ber vê yekê diviya ku Xilaskarê pîroz di ber me û gunehên me de bimira.
Çaxê ku wî li ser xaçê jiyana xwe da, wî deynê gunehên min û te da.

Ji kerema xwe guhê xwe bidin van gotinên Mizgîniyê, yanî Încîlê. Xwedê li ser riya rastdariyê di Nivîsarên Pîroz de weha dibêje:

«Guneh bi destê yek mirovî, mirin jî bi destê guneh ket dinyayê; bi vî awayî mirin derbasî hemû mirovan bû, çimkî hemûyan jî guneh kir.» (Romayî. 5:12)
Çimkî tu cihêtî tune: [23] Hemûyan guneh kir û ji rûmeta Xwedê bêpar man.
[24] Ew bi kerema wî [yanî bi kerema Xwedê], bi rizgariya ku bi Mesîh Îsa hatiye, bê berdêl rastdar derdikevin. [25] Xwedê ew ji bo wan ên ku baweriyê bînin, wek goriyeke kefaretê bi xwîna wî pêşkêş kir. Wî ev kir, da ku dadperweriya xwe nîşan bide, çimkî wî bi sebra xwe çavên xwe li wan gunehên ku berê hatibûn kirin neqand.
[26] Wî ev yek kir, da ku di dema niha de rastdariya xwe eşkere bike û ew bi xwe rastdar be û yê ku baweriyê bi Îsa bîne, rastdar derkeve. (Romayî 3:22-26)
[23] Çimkî meaşê ku guneh dide, mirin e; lê diyariya Xwedê, bi Xudanê me Mesîh Îsa jiyana herheyî ye. (Romayî 6:23)

Gelek spas ku we qenc guhdariya vê bernamê kir.
Xwedê hez bike cara ku bê emê careke din li peyama pêxemberan binêrin û emê bînin bîra xwe ka Xwedê çawa gazî Birahîm kir, da ku ew di plana Xwedê de cihê xwe bistîne.

Heta hingê kûr li ser van peyvên girîng ên Peyva Xwedê bifikirin. Bi rastî, ew peyv dikarin jiyana we biguherin. Ew weha dibêjin:

[23] Meaşê ku guneh dide, mirin e; lê diyariya Xwedê, bi Xudanê me Mesîh Îsa jiyana herheyî ye. (Romayî 6:23)

[Erê, bi diyarî û kerema Xwedayê rastdar bin û her şad û bextewar bin!]

Îro em dixwazin bi kurtvebirra peyama pêxemberên Xwedê berdewam bikin. Peyama pêxemberan serhatiyek e, yanî serhatiya plana Xwedê ye.
Ev peyam ji me re dibêje ku Xwedê çi kir, da ku li zarokên Adem ên windabûyî bigire û wan ji gunehên wan rizgar bike. Bi kurtî peyama pêxemberên Xwedê ev e ku mirovên nerast çawa dikarin li ber Xwedayê rast û dadperwer rastdar derkevin. Loma bi rastî peyama wan mizgîniyeke pir xweş e.
Dabaşa bernama me ya îro ev e: Mirov bi baweriyê li ber Xwedê rastdar derdikeve.

Wek ku destpêk û dawiya her serhatiyê heye, destpêk û dawiya serhatiya plana Xwedê jî heye. Di bernama din de me li destpêka vê serhatiyê nêrî û me di Tewratê de dît ku mirovê pêşî Adem çawa biryara xwe da ku li pey dijminê Xwedê Îblîs biçe. Ev gunehê Adem bû sedem ku hemû zarokên wî û tevahiya dûndana wî di bin hukumdariya guneh de bên dinyayê û ji zaroktiya xwe ve di wê riya ku diçe dojehê de herin.
Hin mirov hene ku vê yekê qebûl nakin û dibêjin: «Gunehê Adem derdê wî ye. Ev ne xema me ye! Em ne di bin bandora gunehê bavkalê xwe de ne.»
Lê belê ew mirovên ku weha dibêjin, Nivîsarên Pêxemberan înkar dikin, çimkî ew Nivîsar dibêjin: «Guneh bi destê yek mirovî, mirin jî bi destê guneh ket dinyayê; bi vî awayî mirin derbasî hemû mirovan bû, çimkî hemûyan jî guneh kir.» (Romayî. 5:12)
Gotina pêşiyan rast dibêje; ew dibêje: «Nexweşiya vegir li ser nexweşê pêşî tenê namîne.» Û dibêje: «Mişkek heft kûpa diherimîne.» Yanî çirûskeke biçûk dikare daristaneke mezin bişewitîne!
Bi vî awayî gunehê Adem li ba Adem tenê nema, lê di nav me hemûyan de belav bû, bû wek nexweşiyeke vegir an wek agirekî mezin. Gunehê pêşî ê Adem bû sedem ku ji roja bûyîna wan ve, di dilê hemû mirovan de hevênê guneh hebe.

Bi rastî «Çêlîkên maran ne bê jehr in» û «Çêleka sor nikare çermê xwe biguhêze.»
Xasîtiya Adem ya gunehkar, bû mîrasa me hemûyan. Û qet şik tune ku ev xasîtiya me ya gunehkar wê bibe sedemê helakbûna me – an nexwe divê ku Xwedê ji me re riyeke xilasiyê peyda bike.
Mizgîniya Xwedê ev e ku Xwedê riyek amade kir. Me di Tewratê de xwend ku eynî roja ku Adem û Hewa guneh kiribûn, Xwedê li gor rehm û kerema xwe ya mezin soz dabû wan mirovên pêşî. Wî gotibû ku wiyê Xilaskarekî pîroz bişanda vê dinyayê û gotibû ku ewê ji keçikekê çêbûya. Wiyê xwîna xwe li ser xaçê birijanda û jiyana xwe bikira gorî, da ku deynê gunehên zarokên Adem bidabûya.

Çaxê ku li gor plana Xwedê wext hat, wî soza xwe anî cih û Xilaskarê sozdayî şand dinyayê. Ma ew Xilaskarê ku ji ezmên hat, kî bû? Erê, ew Îsa Mesîh ê bêkêmahî û rast bû.
Ji kerema xwe guhê xwe bidin van ayetên Nivîsarên Pîroz. Ew bi me didin zanîn ku di nav Ademê gunehkar û Mesîh ê ku qet guneh nekir de, çi ferq heye.
Mizgîniya Xwedê dibêje:
Çimkî eger mirinê, ji ber neheqiya yek mirovî û bi wî, hukumdarî kiribe, yên ku kerema Xwedê ya zêde û diyariya rastdariyê distînin, wê bi yekî, yanî bi Îsa Mesîh di jiyanê de çiqas bêtir hukumdariyê bikin. [18] Îcar ka çawa bi neheqiya yek mirovî, hemû mirov sûcdar derketin, wusa jî bi karê rastdariyê yê yekî, ji bo hemû mirovan rastdarî û jiyan hat. [19] Û çawa bi neguhdariya yek mirovî gelek bûn gunehkar, wusa jî bi guhdana yekî gelek wê rastdar bên derxistin. (Romayî 5:17-19)

Erê, Nivîsarên Pîroz li ser zarokên Adem û li ser wan zarokên Adem ên ku bi saya Îsa Mesîh bûn zarokên Xwedê, weha dibêje.

Em hemû di sûretê Adem de çêbûne. Lê Xwedê gazî zarokên Adem dike, da ku ew ji nû ve çêbin, dilekî nû bistînin û êdî di sûretê Adem de nemînin, lê li sûretê Îsa Mesîh bên guhertin. (Korîntî II, 3:18)
Ev yek çawa çêdibe? Bi rastî ev yek bi tenê bi baweriyê çêdibe.
Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Eger hûn di dilê xwe de bawer bikin ku Îsa Mesîh deynê gunehên we daye, Xwedê wê jiyaneke nû bide we, yanî hûnê ji nû ve çêbin, ewê dilê we paqij bike û hêza Ruhê Pîroz wê we vejîne. Bi yekîtiya bi Îsa Mesîh re hûnê bibin afirînekî nû. Êdî hûnê ne ji bo xwe bijîn, lê hûnê ji bo wî yê ku ji bo we mir û rabû, bijîn.

Niha em dixwazin vegerin Tewratê û em bi kurtvebirra peyama pêxemberan berdewam bikin. Pêşî emê bînin ber çavê xwe ku Xwedê piştî Adem û Hewayê çawa plana xwe pêşve bir. Me li herdu kurên Adem ên pêşî Qayîn û Habîl nêrî. Habîl ji soz û emrên Xwedê bawer kir û li hêviya hatina Xilaskar dima.
Lê belê dilê Qayîn ji Xwedê dûr bû. Xwedê gazî wî kir ku ew hesabê wî tiştê ku kiriye bide û tobe bike, lê bervajiyê vê, hêrsa Qayîn rabû, ew çû û birayê xwe yê biçûk kuşt.

Piştî vê serhatiyê me dît ku piraniya mirovan di şopa Qayîn de çûn û bi gunehkirinê kêfxweş bûn. Loma çaxê ku em tên dema Nûh, em dibînin ku Nivîsarên Pîroz weha dibêjin: 5 Xudan dît ku xerabiya mirovan li ser erdê gelek e. Her roj hemû nêt û fikrên dilê wan tenê pîs bûn. (Destpêkirin 6:5)
Me dît ku mebesta Xwedê ew bû ku zarokên Adem bi lehiyekê, yanî bi tofaneke mezin helak bike. Di wê dema xerab û tarî de, bi tenê Nuh ji soz û emrên Xwedê bawer kir.
Ji ber vê yekê Xwedê emir li Nuh kir ku gemiyeke mezin çêke, da ku ji bo mala wî û ji bo gelek heywanan bibe cihê xilasiyê. 100 salan Xwedê bîhna xwe li gunehkaran fireh kir û di wê demê de Nuh bi kurên xwe ve gemî çêdikir. Lê belê ji bilî Nuh û mala wî, tu kesî guhê xwe neda peyva Xwedê û tu kesî tobe nekir.

Xwedê tu caran derewan nake û her car gotina xwe pêk tîne. Wî di dema Nûh de jî tam li gor gotina xwe kir. Loma di dawiyê de wî hemû mirovên ku nexwestin bikevin gemiyê ji rûyê erdê xîş kirin. Cihê xilasiyê ji bo wan amade bû, lê wan ew xilasî qebûl nekir û helak bûn.

Piştî vê yekê me dît ku zarokên Nuh li ser erdê zêde dibûn, lê hêdî hêdî wan Peyva Xwedê ji bîr kir, çimkî ew jî zarokên Adem bûn û ji roja bûyîna wan ve, di dilê wan de hevênê guneh hebû.

Hingê me li ser birca Babîlê bihîst. Me dît ku mirovan dixwest ku hemû li cihekî bicivin, li wir bajarekî mezin ava bikin û birceke bilind jî çêkin. Bi vî awayî ew li hember Xwedê rabûn, çimkî Xwedê emir li wan kiribû, ku ew li tevahiya dinyayê belav bibin.

Loma Xwedê dîwana wan kir, yanî wî zimanê wan tevlihev kir, wusa ku ew ji hev dûr ketin û li ser rûyê erdê belav bûn.

Erê, guhdarên delal, Xwedê tu caran derewan nake û her car gotina xwe pêk tîne. Çimkî Xwedê dilsoz û dadperwer e.

Dostên delal, em hêvîdar in ku hûn di bernama ku bê de jî bi me re bin. Hingê emê li destpêka serhatiya Birahîm binêrin. Heta hingê Xwedê bi we re be!

Cara din me li ser serhatiya birca Babîlê got û niha em dixwazin li serhatiya Birahîm pêxember binêrin, çimkî di plana Xwedê de cihê Birahîm gelek girîng bû.
Bavê Birahîm yekî pûtperest bû û Birahîm bi xwe jî wek hemû zarokên Adem yekî gunehkar bû. Lê belê Xwedê li gor plana xwe ji Birahîm re xuya bû û jê re got ku divê ew ji mala bavê xwe û ji welatê xwe derkeve.
Xwedê weha gazî Birahîm kir û got:
«Ji welatê xwe, ji ba gelê xwe û ji mala bavê xwe derkeve û here wî welatê ku ezê nîşanî te bidim. [2] Ezê te bikim miletekî mezin û ezê te bereket bikim.
Ezê navê te mezin bikim û tê pîroz bî. [3] Yên ku te pîroz bikin, ezê wan pîroz bikim. Û yên ku nifirê li te bikin, ezê nifirê li wan bikim. Hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.» (Destpêkirin 12:1-3)

Çima Xwedê li Birahîm emir kir ku ji welatê xwe bar bike, here welatekî din?
Bersiv ev e: Daxwaza Xwedê ew bû ku ji dûndana Birahîm miletekî nû rabe.
Lê çima Xwedê dixwest ku ji dûndana Birahîm miletekî nû derkeve?
Bersiva vê jî ev e: Xwedê dixwest ku ji vî miletî pêxemberan rake, da ku ew Nivîsarên Pîroz binivîsin.
Herweha Xwedê dixwest ku Xilaskar bişîne dinyayê û li gor plan û daxwaza Xwedê, Xilaskar wê ji wî gelê nû bihata. Loma Xwedê soz da Birahîm û got:
«Tê pîroz bî …û hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.»

Ma Xwedê li gor soza xwe ya ku wî dabû Birahîm, kir? Erê, wî soza xwe anî cih. Çaxê ku Birahîm 100 salî bû û jina wî Sara 90 salî bû, Xwedê li gor soza xwe Îshaq da wan. Îshaq bû bavê Aqûb û Aqûb jî bû bavê diwanzdeh kuran.
Ji wan diwanzdeh kurên Aqûb, diwanzdeh eşîr, yanî gelê Îsraêl derket.

Yên ku Nivîsarên Pîroz dixwînin, qenc dizanin ku bi rastî Xilaskarê mirovan ji gelê Îsraêl hat, çimkî hem diya wî Meryem û hem jî Ûsiv ê ku jê re bû wek bav, ji dûndana Birahîm bûn.
Ji ber vê yekê di Încîlê de ayeta pêşî weha dibêje:
Kitêba malbata Îsa Mesîhê kurê Dawid ê kurê Birahîm ev e. (Metta 1:1)
Heçî eslê Îsa Mesîh ê dinyayî yanî yê mirovî ye, ew ji dûndana Birahîm, Îshaq û Aqûb hat.
Lê heçî eslê wî yê ezmanî yanî yê xwedayî ye, ew Kurê Yê Herî Mezin e;
ew Peyva Xwedê ye û ji ezmên hat, da ku li ser erdê bibe mirov.

Niha pêwist e ku em tiştekî din bînin bîra xwe. Me dît ku Birahîm wek hemû zarokên Adem ên din gunehkar hat dinyayê. Lê belê Nivîsarên Pîroz bi me didin zanîn ku îro Birahîm li ezmên di rûmeta Xwedayê pîroz de ye û wê her û her li wir bimîne!
Îcar pirs ev e: Birahîm, ji bo ku Xwedê li gunehên wî bibihûre, wî rastdar derxe û wî qebûl bike ezmên, çi kir?
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
Birahîm ji Xudan bawer kir û wî ev yek jê re rastdarî hesab kir. (Destpêkirin 15:6)

Birahîm ji Xwedê bawer kir. Yanî Birahîm ji wan tiştên ku Xwedê jê re gotibû, bawer kir û Xwedê ev yek jê re rastdarî hesab kir.
Guhdarên delal, gelo hûn wek Birahîm ji Peyva Xwedê bawer dikin?
Qenc guhê xwe bidinê. Em napirsin: Ma hûn bawer dikin ku Xwedê heye, an tune? Em napirsin: Ma Xwedê yek e, an ne yek e?
Îblîs jî dizane ku Xwedê heye û Xwedê yek e.
Xwedê tiştekî din dixwaze. Ew dixwaze ku tu ji peyvên wî yên li ser riya rastdariyê bawer bikî. Xwedê ev rê ji bo xilaskirina mirovan vekiriye û ev rê bi baweriyê ve girêdayî ye. Birahîm bawer kir û wî ji me re got ku çi pêwist e.
Birahîm wê roja ku wî ji dêla kurê xwe ve berxek kir gorî çi got?

Gelo tê bîra we? Wî got: «Kurê min, Xwedê bi xwe wê berxê ji bo goriya şewitandinê peyda bike.» (Destpêkirin 22:8)
Û piştî ku wî berx serjê kir û kir gorî, wî navê wî çiyayî kir Yahwê Yîrêh ku tê wergerandin: «Xudan wê peyda bike.» (Destpêkirin 22:14)
Çima Birahîm got: «Xudan wê peyda bike»? Ma Xwedê hingê peyda nekir? Belê, Xwedê ji bo Birahîm û Îshaq peyda kiribû, lê Birahîm, pêxember bû jî. Çaxê ku wî got: «Xudan wê peyda bike», wî li ser rojeke din got. Di wê roja ku wê bihata de, Xilaskar wê li wir xwîna xwe birijanda, da ku wî ew hemûyên ku bawerî bi wî bianiyan, ji dîwana Xwedê ya rast û dadperwer xilas bikiran.

Me di bernameyên xwe de gelek caran di Încîlê de xwend û me dît ku Îsa Mesîh kêm û zêde 2000 salan piştî Birahîm hat vê dinyayê. Me dît ku ew hat, da ku ew vê pêxemberîtiya Birahîm bîne cih.
Erê, derveyî bajarê Orşelîmê, li ser çiyayê ku Birahîm ji dêla kurê xwe ve berx kiribû gorî, Xilaskar Îsa Mesîh xwîna xwe rijand, da ku zarokên Adem rizgar bike.
Erê, wan Îsa bi bizmaran li xaçê xist, lê beriya ku bimire, wî bi dengekî bilind weha got: «Temam bû!»
Ji xwe mana temam ev e ku tiştekî kêm nemaye. Çima Îsa got: «Temam bû!» Bi rastî wî weha got, ji ber ku bi mirina wî ya li ser xaçê, plana Xwedê çû serî û tiştek jê kêm nema. Xwedê di nav gelek sed salan de bi devê pêxemberên xwe li ser vê plana xilasiyê gotibû û mirina Îsa Mesîh mana goriya Birahîm a kûr û mana hemû goriyên din jî pêk anî. Ji bo bexişandina gunehan tiştek nemaye, ku pêwist be bê kirin.

Guhdarên delal, gelo hûn bawer dikin ku Îsa Mesîh goriya dawî û bêkêmahî ye? Ma hûn bawer dikin ku ew ji ezmên hat, da ku bibe berxê Xwedê? Ma baweriya we jî wek ya Birahîm heye?
Kitêba Pîroz li ser baweriya Birahîm weha dibêje:

1 Nexwe em li ser Birahîmê ku li gor bedenê bavkalê me ye çi bêjin?
2 Eger Birahîm ji ber kirinên xwe rastdar derketibe, heqê wî heye ku pesnê xwe
bide, lê belê ne li ber Xwedê. 3 Ma Nivîsara Pîroz çi dibêje? Dibêje: «Birahîm ji
Xwedê bawer kir û ev yek jê re rastdarî hat hesabkirin.»
22 Ji ber vê yekê baweriya wî «jê re rastdarî hat hesab kirin.» 23 Îcar gotina «jê re
rastdarî hat hesab kirin» ne tenê ji bo Birahîm hat nivîsîn, 24 lê belê ji bo me jî
hatiye nivîsîn. Ji me re jî bawerî wê rastdarî bê hesabkirin, em ên ku baweriyê bi
wî yê ku Xudanê me Îsa ji nav miriyan rakir, tînin. 25 Îsa di ber neheqiyên me de
teslîmî mirinê hat kirin û ji bo rastderxistina me rabû. (Romayî 4:1-3; 22-25)
Amîn!

Gelek spas ku we qenc guhdariya vê bernameya girîng kir. Em bi hêvî ne ku hûn di bernama ku bê de jî bi me re bin. Hingê emê li pêxemberekî din binêrin, çimkî ew jî ji bo amadekirina hatina Xilaskarê dinyayê hatibû hilbijartin.
Navê wî pêxemberî Mûsa ye.

Bila Xwedê dil û hişê we veke, da ku hûn van gotinên Nivîsarên Pîroz bi zelalî fêm bikin. Ew weha dibêjin:

«Birahîm ji Xwedê bawer kir û ev yek jê re rastdarî hat hesabkirin.» (Romayî 4:3)

Îro em dixwazin bi kurtvebirra peyama pêxemberan berdewam bikin, yanî emê careke din li Mizgîniya Xwedê binêrin, çimkî ew nîşanî me dike ku mirov çawa dikarin li ber Xwedê rastdar derkevin.
Em hê li Tewratê dinêrin. Wek ku hûn dizanin, Xwedê kitêba Tewratê bi destê Mûsa pêxember da nivîsandin. Me di gelek bernameyên beriya niha de dît ku Tewrat ji bo hemû mirovên ku dixwazin rastiyê bizanin, gelek girîng e. Xwedê di Tewratê de bingehê peyama xwe danî, da ku em bikarin hemû hindariyên din bi rastiya Tewratê re rû bi rû bikin û bizanin ka ew rast in û ji Xwedê ne, an ne ji Xwedê ne.

Di destpêka Tewratê de me dît ku bavkalê me Adem çawa guneh kir.
Sûc û gunehê wî ji wî derbasî hemû dûndana wî bû û bû wek nexweşiyeke vegir. Wek ku Xwedê ji pêşî ve gotibû, guneh gelek êş, girîn, mirin û helakbûna herheyî anî ser mirovan. Lê belê şikir ji Xwedê re, Nivîsarên Pîroz dibêjin:
Li dera ku guneh lê zêde bûye, kerem[a Xwedê] hê bêtir zêde bûye. (Romayî 5:20)
Erê, rast e, çimkî hê di wê roja ku gunehê pêşî hat kirin de, Xwedê li gor dilovanî û hezkirina xwe da zanîn ku rojekê ewê Xilaskarekî bişîne vê dinyayê, da ku ew zarokên Adem ji nefret û nifira ku guneh aniye ser mirovan, rizgar bike.

Di bernama me ya din de me dît ku Xwedê gazî Birahîm kir. Xwedê soz da wî ku dûndana wî wê bibe miletekî mezin. Ji wî gelî hemû pêxember wê rabûna û Xilaskar jî wê ji wî gelî bihata. Îcar Birahîm bû bavê Îshaq, Îshaq bû bavê Aqûb û Aqûb bû bavê diwanzdeh kuran û ji wan kurên wî diwanzdeh eşîrên gelê Îsraêl rabûn.

Niha em dixwazin bi kurtvebirra xwe berdewam bikin, da ku em bibînin ka Xwedê çawa bi mînaka dûndana Birahîm hînî mirovan kir ku ew bizanin Xwedê çawa ye û divê ew çawa ji xwe re riya xilasiyê hilbijêrin, da ku ew ji dîwana Xwedê ya rastîn xilas bibin.
Loma dabaşa me ya îro Şerîeta Xwedê ya pîroz e.

Me di xwendina xwe ya Tewratê de dît ku Xwedê hişt ku gelê Îsraêl li Misrê çar sed salan bikeve bin koletiyê. Xwedê ev yek ji pêşî ve ji Birahîm re gotibû û tam wusa jî derket. Lê gava ku wextê Xwedê hat, wî Mûsa şand ba gelê Îsraêl. Mûsa bi xwe ji gelê Îsraêl bû û di qesra padîşahê Misrê Firewnê xerab de mezin bûbû.

Xwedê Mûsa şand ba Firewn, da ku jê re bêje: Xudan Xwedê dibêje: Bihêle ku gelê min derkeve û biperizin min. Lê Firewn tinazên xwe bi wan kir û got: Ev Xudan kî ye? Ez tu caran nahêlim ku gelê Îsraêl ji Misrê derkeve!
Li ser vê yekê Xwedê hêz û rûmeta xwe bi Firewn û bi gelê Misrê da zanîn: Neh belayên pir xerab hatin ser xelkê welêt, lê gelê Îsraêl tu ziyan nedît. Firewn ew hemû nîşan û kerametên Xwedê dîtin, lê dîsa jî wî tobe nekir û li gor gotinên Mûsa nekir.
Îcar Xwedê ji Mûsa re got: Ezê hê belayeke din bînim serê Firewn û miletê wî. Piştî vê belayê, ewê bihêle ku hûn herin!
Ma tê bîra we ku ew bela çi bû? Erê, ew kuştina hemû nixuriyan bû.

Yanî me dît ku Xwedê hem nixuriyê mala Firewn û hem jî nixuriyên hemû malên Misriyan kuştin. Lê belê nixuriyên gelê Îsraêl hatin parastin, çimkî wan li gor emrê Xwedê xwîna berxan li serderiyên malên xwe dabûn.
Xwedê bi xwe gotibû: Ew xwîna li ser xaniyên ku hûn tê de ne, wê ji we re bibe nîşan; çaxê ez xwînê bibînim, ezê di ser we re derbas bibim û çaxê ez ji bo helakkirinê li welatê Misrê bixim, bela wê di nav we de nebe. (Derketin 12:13)

Îcar ji ber xwîna berxan Xwedê di ser xaniyên gelê Îsraêl re derbas bûbû û nixuriyên wan nekuştibûn. Bi vî awayî Xwedê gelê Îsraêl ji destê Firewn rizgar kir.

Wek ku me dît, mana hê kûrtir a vê serhatiyê heye. Erê, gelê Îsraêl ji hukumdarî û zordariya Firewn xilas bû, lê belê Nivîsarên Pîroz dibêjin:
11 Ev tiştên ha bi mînaktî hatin serê wan û ji bo ku ji me yên ku gihîştin dawiya deman re bibin şîret, hatine nivîsîn. (Korîntî I, 10:11)
Serhatiya xwîna berxan a ku Îsraêliyan li serdera deriyên xwe dan, da ku Xwedê nixuriyên wan ji mirinê biparêze û ji Firewn rizgar bike, mînakek e, yanî mînaka riya xilasiyê ye. Xwedê ev rê peyda kir, da ku bi vê riya xilasiyê gunehkar ji destê Îblîs xilas bibin, çimkî bi rastî Îblîs zordarekî ku hezar caran ji Firewn xerabtir e.

Peyva Xwedê ji me re diyar dike ku hemû zarokên Adem xulam in û ketine bin koletiyê. Belkî hin ji we dibêjin: «Erê, em evdên Xwedê, yanî xulamên Xwedê ne!»
Lê belê ev gotin bi peyva Îsa Mesîh re li hev nagire. Îsa Mesîh di Încîlê de weha got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, her kesê ku gunehan dike, ew xulamê guneh e. (Yûhenna 8:34)
Madem ku wusa ye, yanî madem ku hemû zarokên Adem xulamên guneh in, ew hemû xulamên Îblîs in jî, çimkî mîrê guneh yanî serkaniya guneh Îblîs e.
Û bi rastî, yê ku xulamê guneh û Îblîs be, qet nikare xwe ji destê wan xilas bike. Ma xulam çawa dikare xwe ji xulamtiyê rizgar bike? Ma kole wê çi bide mîrê xwe ku azad bibe û bê berdan? Ma mîr wê destûra wî bide?
Erê, belkî mîrekî rast û qenc wê xulamekî qenc berde, lê belê Îblîs ne mîrekî rast û qenc e!
Îblîs jî wek Firewn, tu caran bi dilxwazî qebûl nake ku yek ji xulamên wî azad bibe. Nexêr, ew tu caran qebûl nake!

Wey li me, erê, wey li me çimkî em hemû zarokên Adem in û bi rastî em ketine bin nifireke dijwar. Îblîs em kirine xulamên xwe.
Ma yek heye ku bikare me ji hêz û desthilatiya Îblîs rizgar bike?
Erê, şikir ji Xwedê re, Xilaskar heye! Xwedê Rizgarkar şand vê dinyayê û hêza wî heye ku me hemûyan azad bike. Ew Xilaskarê rast û hêzdar Îsa Mesîh e; ew ji ezmên hat dinyayê û hemû pêxember şahidên wî ne.

Me di Tewratê de xwend, Xwedê soz dabû ku rojekê Xilaskarê pîroz ê ku wê ji keçekê çêbûya, wê serê Îblîs biperçiqanda.
Herweha me di Kitêba Zebûran de bihîst ku Dawid pêxember çi got. Wî got: Xwedê wê ji wî Xilaskarî re bêje Kurê min; wî got ku ew Xilaskar wê bi awayekî pir dijwar bê kuştin, wê cefayê bikişîne û dest û lingên wî wê bên qulkirin.
Di Încîlê de me li ser vî Xilaskarê newaze gelek tişt xwendin.
Ew Îsa ye, kurê Meryemê ye; jiyana wî pîroz û paqij bû û di dawiyê de ew di ber gunehên me de li ser xaçekê mir û piştî sê rojan ji nav miriyan rabû û ji gorê derket.
Erê, Îsa Mesîh ev hemû gotinên pêxemberên Xwedê anîn cih. Xilaskarê gunehkaran ê ku pêxemberan li ser wî nivîsandibû, bi rastî ew bi xwe bû.

Guhdarên delal, bernama me li vir bi dawî dibe, lê Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de bi vê dabaşa girîng berdewam bikin.
Heta hingê Xwedê bi we re be!

Di bernama din de me dît ku Îsa Mesîh hemû gotinên pêxemberên Xwedê anîn cih. Xilaskarê gunehkaran ê ku pêxemberan li ser wî nivîsandibû, bi rastî ew bi xwe bû. Ev yek di hemû tiştan de kifş e:

Peyva Xwedê ji Îsa Mesîh re dibêje: Berxê Xwedê. Wek berxên ku di roja Cejna Derbasbûnê de hatin serjêkirin, Îsa xwîna xwe rijand, da ku me ji dîwana Roja Dawî xilas bike.
Kêm û zêde 1500 salan piştî ku Xwedê gelê Îsraêl bi saya xwîna berxan di Cejna Derbasbûnê ya pêşî de xilas kir, Xwedê destûr da zarokên Adem ku Mesîhê rastdar Îsa, bi bizmaran li xaçekê bixin.
Erê, Îsa Mesîh di roja Cejna Derbasbûnê de hat xaçkirin. Îcar tam wek ku Îsa mana goriya Birahîm yanî mana Cejna Qurbanê anî cih, wî mana berxê Cejna Derbasbûnê jî anî cih.
Ew mirovên ku hingê Îsa xaç kirin, ev yek bi nezanî kirin, lê belê ew yeka ku Mesîh wê bibûya gorî ji destpêkê ve di plana Xwedê de tiştê herî girîng bû. (Karên Şandiyan 3:17)

Îsa ji bo gunehan goriya dawî û bêkêmahî ye. Îsa Mesîh bi rijandina xwîna xwe, tevahiya deynê gunehan da. Loma tiştek nemaye ku ji xîşkirina gunehan re bibe asteng û bi vî awayî zarokên Adem dikarin ji hukumdariya guneh xilas bibin. Nivîsarên Pîroz vê yekê weha şîrove dikin:
Çimkî berxê me yê Cejna Derbasbûnê Mesîh hatiye gorîkirin. (Korîntî I, 5:7)
Xwedê hezkirina xwe ya ji me bi vê kifş dike ku hê em gunehkar bûn, Mesîh ji bo me mir. (Romayî 5:-8)

Em niha dixwazin pêş ve herin û bînin bîra xwe ka em li ser Şerîeta Pîroz a ku Xwedê dabû gelê Îsraêl, çi hîn bûne.

Me di Tewratê de dît ku Xwedê di nav êgir û xurexura ewran de daket ser serê çiyayê Sînayê û Deh Emrên Mezin û gelek qanûnên din dan gelê xwe. Ji wan hemû emir û qanûn re Şerîeta Mûsa tê gotin. Xwedê emir li Îsraêliyan kir û got: «Ji Xudan Xwedayê xwe bi hemû dilê xwe, bi hemû canê xwe û bi hemû hişê xwe hez bike:
Li pêşberî min divê tu xwedayên te yên din nebin! Ji xwe re qet pûtekî çêneke. Navê Xudan Xwedayê xwe badîhewa neyne ser devê xwe! Divê roja Şemiyê li bîra te be, da ku ew ji te re veqetayî û pîroz be!
Wek ku tu ji xwe hez dikî, ji cîranê xwe hez bike:
Qedrê dê û bavê xwe bigire
Kuştinahiyê neke! Zînayê neke! Diziyê neke! Li hember cîranê xwe şahidiya derewîn neke! Çavê xwe neavêje mal û milkê cîranê xwe!»
Xwedê li ser van hemû emran ev peyv bi ser de zêde kirin û got: «Kî ku tevahiya Şerîetê pêk bîne û di tiştekî tenê de bikeve, li ber tevahiya wê sûcdar e.» (Aqûb 2:10)

Guhdarên delal, niha me bihîst ku Şerîeta Xwedê çi ji zarokên Adem re dibêje. Ma we fêm kir ku Xwedê dixwaze her yek ji me ji roja bûyîna xwe û heta bi roja mirina xwe, vê Şerîeta pîroz bi awayekî bê kêmahî pêk bîne? Yanî Xwedê dixwaze ku em di tevahiya jiyana xwe de di fikrên xwe de, di gotinên xwe de û di kirinên xwe de bêqusûr bin.
Her roj û her saet divê ku em bi hemû dilê xwe, bi hemû canê xwe û bi hemû hişê xwe ji Xudan Xwedayê xwe hez bikin. Herweha divê wek ku tu ji xwe hez dikî, tu ji cîranê xwe jî hez bikî.
Ma we ev Şerîeta pîroz pêk aniye? Eger em bi wijdan bin, em hemû dizanin ku me ev Şerîet pêk neaniye. Nivîsarên Pîroz vê yekê erê dikin û dibêjin:
Tu kesê rast tune, tenê yek jî tune. (Romayî 3:10)
Tu kesî ji me tu caran her tiştê ku Xwedê dixwaze pêk neaniya, çimkî di dilê me hemûyan de ji roja bûyîna me ve hevênê guneh heye.

Belkî hin hene ku dibêjin: «Madem ku wusa ye, ma çima Xwedê ev emir dan me? Ma Xwedê dixwaze ku hemû helak bibin?»
Nexêr, Xwedê hezkirin e û naxwaze ku kesek helak bibe! Wî di Nivîsarên Pîroz de li ser armanc yanî li ser mebesta Şerîetê weha gotiye: «Bi kirina Şerîetê tu kes li ber Xwedê rastdar dernakeve. Ji ber ku bi Şerîetê guneh tê zanîn.
(Romayî 3:20)
Yanî bi Şerîetê em dizanin guneh çi ye.

Xwedê emrên xwe yên pîroz spartin gunehkaran, da ku ji me re guneh û qusûrên me kifş bike.
Di nav hemûyên ku li ser rûyê erdê çêbûn de, bi tenê Îsa Mesîh hemû emrên Xwedê bêkêmahî pêk anîn. Loma em hemû hewcedarê Îsa Mesîh in; çimkî wî ew nifira ku guneh anî ser me, ji ser me rakir, hilda ser xwe.
Me dît ku di nav Îsa Mesîh û hemû zarokên Adem de ferqek mezin heye, çimkî xasîtiya Mesîh ji guneh bêrî bû. Îsa Mesîh Peyva Xwedê ya herheyî ye;
ew ji ezmên hat vê dinyayê, ji keçikekê çêbû û bedena mirovan stand.
Ew bû mirov, lê ew nebû gunehkar. Loma wî weha got:
17 «Nefikirin ku ez hatime Şerîetê û nivîsarên pêxemberan ji holê rakim.
Ez nehatime ku ji holê rakim, lê ez hatime ku temam bikim. (Metta 5:17)
Gelo hûn fêm dikin ku mana wê çi ye?
Tiştê ku me tu caran nikaribû ku em bikin, wî bi xwe ji bo me kir.
Wî Şerîeta Xwedê ya pîroz temam kir, ew pêk anî û piştre wî xwîna xwe li ser xaçê rijand, da ku nifira Şerîetê nekeve ser me, lê bikeve ser wî û ew me ji dîwana Xwedê ya dadperwer xilas bike.

Tu sedem nebû ku Îsa Mesîh bimira, çimkî wî tu caran tu guneh nekiribû.
Lê belê Îsa dixwest ku plana Xwedê ya xilasiyê pêk bîne û ji ber vê yekê wî jiyana xwe di ber me de da.

Me dît ku Xwedê bi devê pêxemberan soz dabû ku riya xilasiyê wê vebûya û weha çêbû. Piştî ku Îsa Mesîh xwîna xwe rijand, yanî deynê gunehên me da, Xwedê ew di roja sisiyan de ji nav miriyan rakir.
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
[1] Ji bo wan ên ku bi Mesîh Îsa re ne, tu sûcdarderketin tune. [2] Çimkî ew tiştê ku Şerîetê nikaribû bike, Xwedê kir: Wî Kurê xwe di şiklê bedena gunehkar de şand, da ku bibe goriya gunehan. (Romayî 8:1.2.3)

Guhdarên delal, ma hêviya we Mizgîniya Xwedê ye? Ma bi rastî hûn hêviya xwe bi Xilaskarê rastdar ve girê didin ê ku cezayê gunehên we kişand?
An hûn hê jî hêvî dikin ku xêr û kirinên we yên qenc wê Xwedê razî bikin?
Ji kerema xwe ji bîr nekin ku Peyva Xwedê dibêje:
Hemû yên ku pişta xwe bi kirina Şerîetê ve girêdane, di bin nifirê de ne.
Ji ber ku weha hatiye nivîsîn: «Her kesê ku di hemû tiştên ku di Kitêba Şerîetê de nivîsî ne, nesekine û neke, di bin nifirê de ye.»
Lê belê [13] Mesîh, em bi berdêl ji nifira Şerîetê kirrîn û rizgar kirin. Ew ji bo me ket bin nifirê, da her kesê ku baweriyê bi wî bîne helak nebe, lê jiyana wî ya herheyî hebe.» (Galatî 3:10.13; Yûhenna 3:16)

Gelek spas ku we qenc guhdariya van tiştên girîng kir.

Di bernama ku bê de Xwedê hez bike emê careke din bi kurtvebirra xwe berdewam bikin û emê bibînin ku Îsa Mesîh deriyê xilasiyê vekir û ji zarokên Adem re aştî anî.

Heta hingê bila ew soza Mizgîniya Xwedê di bîra we de bimîne; ew soz ev e:

Ji ber vê yekê, niha ji bo wan ên ku bi Mesîh Îsa re ne, tu sûcdarderketin tune.

(Romayî 8:1)

Me di şeş bernameyên beriya niha de dest bi kurtvebirra peyama pêxemberên Xwedê kir.

Wek ku me dît, Xwedê Kitêba Pîroz kir du beş: Beşê pêşî Peymana Kevin e û beşê diduyan Peymana Nû yanî Încîl e.
Heçî Peymana Kevin e, ew ji Tewrat, Zebûr û ji Nivîsarên Pêxemberan pêk tê.
Me di beşê Kitêba Pîroz ê pêşî de dît ku bavkalê me Adem guhê xwe neda Xwedê û bi vê yekê hemû dûndana xwe xist bin padîşahiya Îblîs.
Lê belê em hîn bûn ku Xwedê soz dabû ku rojekê wiyê Xilaskarekî hêzdar bişanda nav zarokên Adem. Ew Xilaskar wê bihata, da ku wî ew ên ku baweriya xwe bi wî bianîna, xilas bikiran û ew vegerandan Padîşahiya Xwedê.
Di Peymana Kevin de ev soza newaze, dabaşa herî girîng bû.

Erê, plana Xwedê ew bû ku wiyê Xilaskar bişanda dinyayê. Loma wî gazî Birahîmê pîr kir û jê re got: Ezê te bikim miletekî mezin û … hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.» (Destpêkirin 12:2.3)
Îcar me dît ku Xwedê Birahîm çawa kir bavê gelê Îsraêl.
Heçî ew gel bû, Xwedê Nivîsarên Pêxemberan spartin wan. Di nav 1500 salan de wî bi devê gelek pêxemberan peyva xwe ji gelê Îsraêl re şand.
Xwedê bi Ruhê Pîroz peyva xwe xist hişê wan pêxemberan û ji Mûsa bigire û heta bi Yûhenna, peyva xwe bi destê wan da nivîsandin.
Xwedê bi rêberiya van pêxemberan mirov hişyar dikirin û xerabî û neheqiya zarokên Adem dianî ber çavên wan.
Herweha wî soza hatina Xilaskarê rastdar ê ku wê xwîna xwe birijanda, da ku deynê gunehên wan bida, dida wan.

Bi ser de me dît ku di dema Peymana Kevin de ji bo bexişandina gunehan serjêkirina heywanan, yanî gorî pêwist bûn.
Xwedê peymana xwe bi gelê xwe re girêdabû û li gor vê peymanê ev qanûn hebû ya ku digot: Bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin, çimkî meaşê ku guneh dide, mirin e.
Loma mirovên ku ji Xwedê ditirsiyan ji destpêkê ve gorî pêşkêşî Xwedê dikirin. Lê belê goriya heywanên wan nedikarîn guneh xîş bikiran, çimkî heywan ne wek mirovan hêja û giranbiha ne.
Mesele em dibêjin, tirimbêla kurê min a leyîstokê heye; ma kurê min dikare here cihê firotina tirimbêlên mezin û ji firoşkar re bêje: Ji kerema xwe, ji dêla tirimbêla min a leyîstokê, vê Mersedesê bide min.
Nexêr, ji xwe ev çênabe, çimkî qîmetê tirimbêla leyîstokê yek an du lîra ye, lê qîmetê Mersedesê çend hezar in.
Herweha goriyên heywanan nikaribûn gunehên mirovan rakin, çimkî qîmetê mirov û qîmetê heywanan ne yek e. Ew gorî tenê mînakên goriya rastîn bûn a ku wê bihata dayîn. Ew wextê ku Xwedê goriya rastîn, yanî Xilaskarê rastdar bişanda vê dinyayê wê bihata. Û bi hatina wî Xilaskarî, Peymana Nû wê dest pê bikira. Goriyên heywanan tenê ji bo demekê bûn, çimkî guneh bi pêşkêşkirina wan her û her nedihat xîşkirin.

Beşê Kitêba Pîroz ê diduyan Încîl e, bi Kurdî jî Mizgînî ye. Di Mizgîniyê de em dibînin ku Xwedê çawa peymaneke nû bi mirovan re girê dide. Ev peymana nû bi xwîna Xilaskarê ku ji ezmên hatiye ve, girêdayî ye.
Di Încîlê de jiyana Îsa Mesîh ji me re tê gotin. Îsa Mesîh ew Xilaskarê pîroz e û wî mana wan hemû goriyan anî cih û ew temam kirin.
Wî xwîna xwe li ser xaçê rijand û bi vî awayî wî rê li ber me vekir ku li gunehên me bibihûre.
Çima diviya ku Xilaskar ji ezmên bihata?

Bersiv sivik e: Her zarokê Adem gunehkar e û di bin hukumdariya gunehan de ye. Yekî gunehkar nikare gunehkarekî din xilas bike. Eger çewalê birinc ê li ser milê te 50 kîlo be, tê çawa çewalê hevalê xwe jî hildî ser milê din?
Yekî gunehkar nikare cezayê gunehkarekî din hilde ser xwe. Lê belê li ser milê Xilaskar Îsa Mesîh tu barê guneh nebû, çimkî ew Kurê Xwedê yê ruhanî bû, yanî Peyva Xwedê bû û ji destpêkê ve bi Xwedê re bû. Ew ji keçikekê çêbû û bû mirov; bedena wî wek ya me bû, lê di xasîtiya wî de, tu guneh nebû. Barê guneh li ser milê wî tunebû. Loma Xwedê dikaribû ku barê gunehên me hemûyan daniya ser milê wî. Îsayê pîroz di ber hemû neheqiyên me de mir û piştî sê rojan ew ji nav miriyan rabû, da ku jiyaneke nû bide me.
Şikir ji Xwedê re, wî mirin, gor, Îblîs û guneh bindest kirin!

Em hemû di çala gunehan de hatine dinyayê û ji bilî Îsa Mesîh ê ku ji ezmên hat, tu kes tune ku bikare alîkariya me bike. Eger hûn baweriya xwe bi wî bînin, ewê we ji çala gunehan hilkişîne û xilas bike. Ew ji ezmên hat, da ku zarokên Adem ji gunehên wan xilas bike. Piştî ku wî ev yek kir, ew vegeriya ezmên, da ku ji bo wan ên ku baweriya xwe bi wî tînin, mehderê (yanî şefaetê) bike. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:

[5] Çimkî tenê Xwedayek heye û di nav Xwedê û mirovan de jî bi tenê aştîkerek heye, ew jî Mesîh Îsa ye, [6] yê ku xwe ji bo hemûyan kir berdêl. (Tîmotêyos I, 2:5.6)
[26] Çimkî ji me re Serokkahînekî pîroz, bêsûc, bêqusûr, ji gunehkaran veqetiyayî diviya. Piştî ku wî paqijbûna gunehan pêk anî, ew li jor, li milê Yê Mezin ê rastê rûnişt. (Îbranî 7:26; 1:3)

Mirovên ku fêm kirin Îsa Mesîh kî ye, bi vê yekê gelek şa û dilgeş bûn. Wan dizanibû ku bi hezaran salan pêxemberên Xwedê li ser hatina Mesîh digotin û hingê êdî wan ew bi çavên xwe dît! Me bihîst ku di nav şagirtên Îsa Mesîh de hin çûn ba maliyên xwe û ji wan re gotin:

«Me Mesîh dît!» «Me Îsayê Nisretî dît, yê ku Mûsa di Şerîeta xwe de û pêxemberan li ser nivîsîne.» (Yûhenna 1:41.45)

Lê heyf û mixabin piraniya mirovên di dema Îsa de fêm nekirin ku bi rastî ew kî ye. Loma Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:
2 Peyv di destpêkê de bi Xwedê re bû. 14 Û Peyv bû xwîn û goşt, bi kerem û rastiyê tije di nav me de konê xwe danî.
5 Ronahî di tariyê de şewq dide û tarî nikare wê binixême. 10 Ew li dinyayê bû û dinya bi wî afirî. Lê dinyayê ew nas nekir. 11 Ew hat mala xwe, lê gelê wî ew qebûl nekir. (Yûhenna 1:2.14.5.10.11)

Wek ku me dît, gelek mirov bûn şahidên nîşan û kerametên Mesîh ên mezin. Hêza Îsa di ser hêza bager, nexweşî, cin, guneh û mirinê re bû, lê dîsa jî mirovan fêm nekir ku Îsa kî ye, çimkî Îblîs hiş û çavên dilê wan kor kiribûn. Elaletên mezin li dor Mesîh diciviyan û destê xwe li wî didan, lê wan nizanibû ku ew kî ye!
Di gumana wan de ew pêxemberekî wek pêxemberên din bû, lê wan fêm nekir ku hemû tijetiya Xwedêtiyê bi bedenî di şexsê wî de bû.

Guhdarên delal, ma we ronahiya Xwedê Îsa Mesîh qebûl kiriye?

Heta bernama ku bê kûr li ser van gotinên Xwedê bifikirin ên ku dibêjin:

5 Ronahî di tariyê de şewq dide û tarî nikare wê binixême.
10 Ew [yanî Mesîh] li dinyayê bû û dinya bi wî afirî. Lê dinyayê ew nas nekir.

Di bernama din de me dît ku gelek mirov bûn şahidên karên Îsa Mesîh ên newaze, lê heçî rêberên dîn û diyaneta Cihûyan bûn, me dît ku wan ji dil û can Îsa red kir. Wan hesûdî û çavnebariya wî kir û biryar dan ku divê ew bê kuştin. Wan ew radestî Romayiyan kir û di dawiyê de wan Mesîh birin ser xaçekê.
Lê belê me dît ku ji destpêkê ve plana Xwedê tam ew bû. Mirina Îsa Mesîh tam li gor plana Xwedê çêbû. Wî ev yek ji demeke dirêj ve bi devê pêxemberan diyar kiribû. Wê şeva ku xulamên serekên kahînan hatin ku wî bigirin, Petrûs dixwest ku mamosteyê xwe bi şûrê xwe biparêze. Lê Îsa ji wî re got:
[53]« Ma tu dibêjî qey ez nikarim ji Bavê xwe bixwazim û ew jî di cih de ji [heftê hezaran] zêdetir milyaketan bigihîne min? [54] Lê hingê Nivîsarên Pîroz ên ku dibêjin divê weha bibe, wê çawa bên cih?» (Metta 26:53.54)

Îsa qenc dizanî ka ew çima hatibû dinyayê. Wek ku pêxemberên Xwedê ji zû ve gotibûn, ew hat, da ku jiyana xwe bide û xwîna xwe ji bo gunehkaran birijîne. Îsa hat, da ku mana goriya Birahîm û mana hemû goriyan bê cih û di goriya wî de temam bibe. Gelo ma tê bîra we ku Îsa li ser xaçê çi got? Beriya ku ew ruhê xwe bispêre Bav Xwedê, wî bi dengekî bilind gazî kir û got: «Temam bû!» û hingê ew mir. Gava ku ew mir, di Perestgehê de perdeya Cihê Herî Pîroz ji serî heta binî çiriya, bû du perçe. Tam di wî cihî de xwîna goriyan dihat reşandin, da ku gunehên gel bên bexişandin!
Çima Îsa got: «Temam bû!»? Û çima perdeya Perestgehê, yanî perdeya Cihê Herî Pîroz çiriya, bû du perçe?
Xwedê ev perde ji serî heta binî çirand û Îsa got: «Temam bû!», da ku her kes bizane ku bexişandina gunehan bi xwîna Îsa Mesîh e. Xwedê bi vî awayî li gunehên zarokên Adem dibihûre û heq dide wan ku ew bikarin her û her di rûmeta Xwedê de bin!

Îsa bi mirina xwe peyvên pêxemberan û mana goriyan anîn cih.

Û rabûna wî ya ji nav miriyan kifş kir ku Xwedê goriya wî qebûl kir.
Erê, Îsa Mesîh deynê hemû gunehan daye. Tiştek kêm nemaye û ew gorî her û her hem têra dadperweriya Xwedê dike û hem jî têra bexişandina gunehên me dike.
Îsa Mesîh goriya bêkêmahî û bêqusûr e. Xwedê ew şand, da her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, helak nebe, lê jiyana wî ya herheyî hebe!

Guhdarên delal, em dixwazin vê kurtvebirra peyama pêxemberan bi çend ayetên Peyva Xwedê bi dawî bikin. Ew ayet mana goriya Îsa Mesîh a temam û bêkêmahî ji me re şîrove dikin. Ji kerema xwe qenc guhdariya wan ayetan bikin, ji ber ku ew bi zelalî şîrove dikin û dibêjin ku Mesîh çima xwîna xwe li ser xaçê rijand.
Nivîsarên Pîroz weha dibêjin:

1 Şerîet tu caran nikare bi wan eynî goriyên ku hergav sal bi sal tên pêşkêşkirin,
[gunehkaran] bigihîne bêkêmahîtiyê. 2 Nexwe, eger paqij bibûna, wanê dev ji
pêşkêşkirina wan berda. Çimkî eger yên ku diperizin bi carekê ji gunehên xwe
paqij bibûna, êdî di wijdana wan de qet sûcdarkirina guneh nedima. 3 Lê belê ew
gorî sal bi sal gunehên mirovan tînin bîra wan. 4 Çimkî xwîna conega û nêriyan
nikare gunehan rake.

5 Loma çaxê ku Mesîh hat dinyayê, wî got:
«Te gorî û pêşkêş nexwestin, lê te ji min re bedenek amade kir.
6 Tu bi goriyên şewitandinê û bi goriyên ku di ber guneh de tên dayîn, razî nebûyî.
7 Hingê min got: ‹Wek ku di Kitêbê de li ser min hatiye nivîsîn:
Ya Xwedê, va ye, ez hatim da ku ez daxwaza te bînim cih.›»
10 Li gor vê daxwazê bi pêşkêşbûna bedena Îsa Mesîh ya bi carekê, em hatin pîrozkirin.

[11] Her kahîn roj bi roj radibe, xizmetê dike û gelek caran eynî goriyên ku qet
nikarin guneh rakin, pêşkêş dike. [12] Lê viyê ha ji bo her û her tenê goriyek di ber
gunehan de pêşkêş kir û li milê Xwedê yê rastê rûnişt.
Çimkî wî bi pêşkêşiyekê ew ên ku tên pîrozkirin, her û her gihandine
bêkêmahîtiyê.
[15] Ruhê Pîroz jî li ser vê yekê şahidiyê dike û dibêje:
[16] «Xudan dibêje: ‹Piştî wan rojan, peymana ku ezê bi wan re girêdim ev e:
Ezê qanûnên xwe bixim dilê wan û ezê wan li ser hişê wan binivîsim.
[17] Êdî ez gunehên wan û neheqiyên wan tu caran naynim bîra xwe.›»
[18] Îcar li dera ku lêbihûrtina van heye, êdî pêwistiya pêşkêşa di ber guneh de
namîne.

[19] Ji bo vê yekê birano, bi xwîna Îsa em dikarin bi cesaret bikevin Cihê Herî
Pîroz. [22] Em, bi piştrastiya temam a baweriyê, bi dilekî rastîn nêzîkî Xwedê
bibin. [23] Em, hêviya ku em eşkere dikin hişk bigirin; çimkî ew ê ku soz daye
ewledar e. [24] Û em hay ji hev hebin, ku em hevdû ji bo hezkirin û kirinên qenc
bişidînin. …
[26] Çimkî, piştî ku em gihîştin zanîna rastiyê, eger em bi zanîn guneh bikin, êdî ji
bo gunehan tu gorî namîne, [27] lê tenê libendêmayîneke tirsehêz ya dîwanê û
agirê kelegerm ê ku dijminan dixwe û tune dike, dimîne. [28] Yê ku Şerîeta Mûsa
bişkanda, li ser şahidiya dido an sê kesan, bê rehm dihat kuştin. [29] Îcar di
gumana we de yê ku Kurê Xwedê di bin lingan de biperçiqîne, xwîna Peymanê
ya ku ew pê hatiye pîrozkirin, pîs bibîne û Ruhê keremê nizim bike, ewê
cezayekî hê çiqas xerabtir heq bike? [30] Çimkî tiştekî tirsehêz e ku mirov bikeve
destê Xwedayê jîndar. (Îbranî 10)

Eger em li ber vê xilasiya evqas mezin xemsar bin, emê çawa birevin û xilas
bibin? (Îbranî 2:3)

Bi van gotinan, Xwedê her kesî ji me hişyar dike, da ku em li hember riya xilasiyê ya tenê ne xemsar bin, çimkî xilasî bi tenê bi Îsa Mesîhê ku xwîna xwe rijand, tê dîtin û tê bi dest xistin.
Her kesê ku wê goriya ku Xwedê bi xwe amade kiriye, kêm bibîne, divê bizane ku ji bo bexişandina gunehên wî tu gorî din tune. Mirovên ku weha bifikirin, tenê dikarin li benda dîwana Xwedê ya dadperwer bimînin û di wê dîwanê de rehm tune, dadperwerî heye.
Îsa Mesîh goriya bêqusûr e û wî can û jiyana xwe li gor plana Xwedê kir gorî. Her kesê ku baweriya xwe bi wî bîne, helak nabe, lê jiyana wî ya herheyî heye. Li ser xaçê Îsa Mesîh got: «Temam bû!» Me dît ku Îsa Mesîh bi xwe Peyva Xwedê ye; ji ber vê yekê Xwedê bi xwe got ku her tişt «Temam bû!» Sê rojan piştî vê yekê, Xwedê Îsa vejand û kifş kir ku goriya Îsa Mesîh ya ji bo bexişandina gunehan tam li gor daxwaza wî bû û hat qebûlkirin.

Dostên delal, ma hûn fêm dikin ku Îsa Mesîh deynê gunehên we daye? Ma hûn bawer dikin ku Îsa Mesîh karê xilasiyê ji bo we aniye cih û temam kiriye? An hûn hê li xêr û kirinên xwe yên qenc ewle dibin?

Gelek spas ku we qenc guhdariya vê bernamê kir. Heta cara ku bê, qenc li ser van herdu peyvên Îsa Mesîh bifikirin. Wî li ser xaçê got:

«Temam bû!» (Yûhenna 19:30)

Xwedê bi we re be!

# 97 A **Dojeh 1** **4900 – corrected by Cemil**

Guhdarên delal, silameta Xwedê bi we re be!
Em bi navê Xwedayê aştiyê silavan li we dikin.
Daxwaz û armanca Xwedayê silametê ev e ku her kes riya rastiyê fêm bike û wê qebûl bike. Wî ew rê kifş kir, da ku em heta hetayê bi wî re di silameta rastîn de bijîn. Em gelek dilgeş in ku em dikarin îro li ser *Riya Rastdariyê* ji we re bêjin.

Nivîsarên Pîroz dibêjin:
«Heçî yên tirsonek in, yên bêewle, yên di nav pîsîtiyê de ne, yên kuştinê dikin, yên zînakar, yên sêrbaz, yên pûtperest û hemû yên ku derewkar in, para wan di wê golê de ye, ya ku bi êgir û kewkurtê dişewite.» (Peyxama Yûhenna 21:8)
«Ewê bên avêtin nav tariya derve … nav agirê herheyî yê ku ji bo Îblîs û milyaketên wî hatiye amadekirin ... li wê derê wê bibe girîn û qirçîna diranan.» (Metta 8:12; 25:41)
«Evên ha wê herin ezaba herheyî, lê yên rasdar wê herin jiyana herheyî.» (Metta 25:46)

Tu kes hez nake ku li ser **Dojeh** bêje. Em qet naxwazin li ser vê yekê bifikirin. Lê belê îro emê li vê dabaşê binêrin, çimkî di Kitêba Pîroz de Xwedê bi sedan gotin li ser hişyarkirinê gotine, da ku em nekevin wî cihî.
Îro û di bernameyên ku bên de em dixwazin hîn bibin ka Nivîsarên Pîroz hem li ser dojehê û hem jî li ser ezmên, yanî li ser bihiştê çi dibêjin.

Gelek mirov dibêjin: Tu kes nikare bizane di dinya din de çi wê bê serê wî û ewê heta hetayê li ku derê be.
Ew weha difikirin, ji ber ku ew hem riya xilasbûnê ya ku Xwedê amade kiriye, nizanin û hem jî bi sozên Xwedê yên newaze nizanin.

Ma Kitêba Pîroz ji me re dibêje ka em çawa dikarin bizanin ku emê bikevin bihiştê? Bêguman dibêje!

Peyva Xwedê dibêje:
«Ez van tiştan ji we re,  hûn ên ku baweriyê bi navê Kurê Xwedê tînin re, dinivîsim, da ku hûn bizanin jiyana we ya herheyî heye.» (Yûhenna I, 5:13)

Guhdarê delal,  ma wek ku Peyva Xwedê dibêje, tu dizanî ku jiyana te ya herheyî heye, an na? Roja ku tu bimirî, ma tu dizanî ku tê herî ku derê? Ma tu piştrast î ku tê bikevî bihiştê û tu nayî şandin dojehê?
Eger tu ji van tiştan ne piştrast bî, bernameya îro wê ji te re gelek balkêş be.

Çaxê ku Îsa li ser vê dinyayê bû, wî gelek caran li ser ezmên û li ser dojehê jî hîn dikir. Lê bi rastî Îsa ji ezmên bêtir li ser dojehê digot, çimkî ew dizane ezabê dojehê çawa ye û çiqas tirsehêz e û ew naxwaze ku qet mirovek jî bikeve wî cihê tarî.
Em niha bala xwe bidin Mizgîniyê, ji kerema xwe guhê xwe bidin peyvên Îsa. Di Încîla Lûqa de, di deriyê 16’an de, wî ji xelkê re li ser mirina du mirovan got, wî got:
«Mirovekî **dewlemend** hebû ku cilên binefşî û ji kitanê tenik li xwe dikir. Wî her roj dixwar, vedixwar û ew bi kêf û şahî dijiya.  Bi navê **Lazar** yekî **belengaz** jî hebû, ku li ber deriyê yê dewlemend dihat dirêjkirin. Bedena wî tije kûnêr bû. Ew minêkar bû ku xwe bi wan bermayiyên ku ji sifra yê dewlemend diketin, têr bike. Heta kûçik jî dihatin û kûnêrên wî dialîstin.
Roj hat ku yê belengaz mir û milyaketan ew bir û xistin **himbêza Birahîm**. Yê dewlemend jî mir û hat veşartin.  Û gava wî di **diyarê miriyan** de ezab dikişand, çavên xwe hildan, wî ji dûr ve Birahîm û Lazarê ku di himbêza wî de bû dît. »

Em li vir hinekî bisekinin. Ma te fêm kir ku çi hat serê zilamê dewlemend û Lazarê belengaz?
Çaxê ku yê belengaz mir, ew çû ku derê? Di cih de canê wî di **bihiştê** de li ba Xwedê bû. Pêxemberê Xwedê Birahîm jî ew demeke dirêj bû, li wir bû.

De vêca ma zilamê dewlemend, çû ku derê? Di cih de ew çû cihê ezabê û li wê derê ew ket nav derd û cefa.

Çima Lazarê belengaz ket bihiştê û zilamê dewlemend ket cihê ezabê?
Pêşî qenc bizane ku xilasbûn ne bi belengaziyê ve girêdayî ye. Eger tu belengaz bî, mana vê ne ev e ku tê bikevî bihiştê û eger tu dewlemend bî, mana vê ne ev e ku tê helak bibî.
Lazarê belengaz ket bihiştê, ji ber ku wî bala xwe dabû riya xilasbûnê ya ku Xwedê di nivîsarên pêxemberan dabû kifşkirin.
Heçî yê dewlemend bû, wî pişta xwe dabû Peyva Xwedê. Îro jî gelek mirovên mîna wî mirovê dewlemend hene. Ji derve ew dîndar tên hesabkirin. Ew dizanin ku Xwedê yek e û dizanin ku kitêbên pêxemberan hene. Dîsa jî ew li ser riya ku dibe dojehê rêve diçin, ji ber ku wan tu caran riya xilasbûnê qebûl nekiriye. Ew nizanin an jî înkar dikin ku hemû pêxemberan li ser vê riyê gotine. Wek ku wî mirovê dewlemend kir, di çavê wan de jî kêfa vê dinyayê û dewlemendbûn pir girîng e û wextê wan tune ku guhê xwe bidin peyva Xwedê ya ku dikare wan xilas bike.

Îsa berdewam kir, got:
«Û gava wî di diyarê miriyan de ezab dikişand, çavên xwe hildan, wî ji dûr ve Birahîm û Lazarê ku di himbêza wî de bû dît. Wî gazî kir û got: ‹Ya bavê me Birahîm, rehmê li min bike! Lazar bişîne, bila ew serê tiliya xwe bixe nav avê û zimanê min hênik bike; çimkî ez di nav vê guriya êgir de ezabê dikişînim.›
Lê Birahîm lê vegerand û got: ‹Lawo, bîne bîra xwe ku çi tiştên qenc hebûn, te di jiyana xwe de distandin û çi tiştên xerab hebûn, digihîştin Lazar. Lê niha li vir di ber dilê wî de tê hatin û tu ezabê dikişînî. Û ji vê pê ve jî, di navbera me û we de geliyekî mezin hatiye danîn, da yên ku dixwazin ji vê derê bibihûrin ba we û yên ku dixwazin ji wê derê bibihûrin ba me, nekarin.›

Wî jî got: ‹Nexwe, ya bavê me, ez ji te lava dikim ku tu wî bişînî mala bavê min. Çimkî pênc birayên min hene, bila ew wan hişyar bike, da ku ew jî neyên vî cihê ezabê.›

**Lê Birahîm ji wî re got: ‹Mûsa û pêxemberên wan hene, bila guhdariya wan bikin**.›

Wî got: ‹Na, ya bavê me Birahîm, eger yek ji nav miriyan rabe û here ba wan, ewê tobe bikin.›

Birahîm ji wî re got: ‹**Eger ew guhdariya Mûsa û pêxemberan nekin, yek ji nav miriyan jî rabe, ew bawer nakin.**›»

Bi rastî, cihê ku zilamê dewlemend ketibûyê, cihekî tirsehêz e. Li wir rehm tune. Yê dewlemend ezab dikişand û tu kes nebû ku alîkariya wî bikira. Heta ku dilopek av jî nestand! Lê bi rastî ya herî xerab ev e ku ew mirov heta îro jî eynî di wî cihî de ye. Ew li benda Roja Dawî ye û hingê ewê bê avêtin cihekî ku jê re **gola êgir** tê gotin. Ewê her û her li wê golê bimîne. Û hemûyên din ên ku gotinên pêxemberan, yanî Mizgîniya Îsa Mesîh red kirin û li gor wan nekirin, wê hevaltiya wî bikin.

Kitêba Pîroz bi van gotinan vê yekê diyar dike, dibêje:

«Û navê kê di Kitêba Jiyanê de nivîsî nehatibe dîtin, hat avêtin nav gola êgir… bi êgir û bi kewkurtê ezab wê li wî bê kirin û dûmana ezaba wan her û her dû dike… şev û roj rihetiya wan tune.» (Peyxama Yûhenna 20:15; 14:10-11)

# 97 B **Dojeh 2** **5010**

Di Bernameya xwe ya berî niha de me li ser dojehê gotibû û me dîtibû ku «navê kê di Kitêba Jiyanê de nivîsî nehatibe dîtin, hat avêtin nav gola êgir… bi êgir û bi kewkurtê ezab wê li wî bê kirin û dûmana ezaba wan her û her dû dike… şev û roj rihetiya wan tune.» (Peyxama Yûhenna 20:15; 14:10-11)

Qenc bala xwe bide van gotinên sergiran. Her kesê ku riya xilasiyê ya ku Xwedê ji bo me amade kiriye, red bike û bikeve dojehê, wê **her û her** li wir bimîne, **tu caran nikare** jê derkeve û agir jî **tu caran** venamire.

Hin dibêjin: Gunehkar wê demekê di dojehê de cefa bibînin, lê piştre ewê derkevin û herin bihiştê. Lê belê ev fikir qet ne li gor Peyva Xwedê ye. Nivîsarên Pîroz dibêjin ku dojeh «ezaba herheyî » ye. (Metta 25:46)

Ji ber vê yekê di Kitêbên Pêxemberan de tu caran nayê gotin ku mirov ji bo yên mirî dua bike. Duayên ji bo miriyan qet nikarin ezabê wan kêm an sivik bikin û ew nikarin wan di Roja Dawî de xilas bikin. Û heçî ew mirovên ku li ezmanan in, qet hewcedariya wan tune ku em ji bo wan dua bikin. Ew li ba Xwedê ne û tiştek ji wan kêm tune.

Guhdarên delal, ez hêvî ji we dikim, **nehêlin ku yek bi gotinên pûç we bixapîne**. Mirov hene ku dibêjin: «Ji xwe Xwedê qenc e; wê çawa mirovan biafirîne û piştre wan di dojehê de bişewite. Ewê rehmê li me hemûyan bike û me hemûyan qebûl bike, bibe bihiştê.»
Yên ku weha dibêjin, ew guhê xwe nadin Peyva Xwedê. Ew bala xwe nadin riya xilasiyê ya ku Xwedê amade kiriye û ew dixwazin wijdana xwe rihet bikin.

Eger ew ji fikrên xwe yên xelet venegerin, nezivirin ba Xwedê û baweriya xwe bi riya rastdariyê ya ku Îsa Mesîh pêk aniye neynin, rojek wê bê û hingê ewê bizanin ku bi rastî dojeh heye. Lê hingê wê **dereng** be û fersenda tobekirinê ji wan re namîne.
Gelo, te bihîst ku mirovê dewlemend ji Birahîm çi xwest? Wî jê hêvî kir ku Lazar bişîne ba her pênc birayên wî ku wan hişyar bike, «da ku ew jî neçin wî cihê ezabê.»

Bersîva Birahîm çi bû? Wî jê re got:
«**Mûsa û pêxemberên wan hene, bila guhdariya wan bikin!**»
Lê belê mirovê dewlemend got:
«Na, ya bavê me Birahîm, eger yek ji nav miriyan rabe û here ba wan, ewê tobe bikin.»
Birahîm jê re got: «**Eger ew guhdariya Mûsa û pêxemberan nekin, yek ji nav miriyan jî rabe, ew bawer nakin**.»

Hevalê delal, qenc guhdarî bike! Ma tu Mizgîniya pêxemberên Xwedê ya ku dikare te ji dojehê xilas bike, dizanî?
Bi kurtvebirîn ew Mizgîniya pêxemberan ev e ku Xwedê wê xilaskarekî pîroz bişanda. Ewê li ser xaçê bimira û bi vê yekê wê deynê gunehên me bida û wê di roja sisiyan de ji nav miriyan rabûya.
**Eger tu ji dil û can bawer bikî ku ew di ber gunehên te de jî mir, tu naçî dojehê**. Ew Mizgîniya ku wê te ji dîwana Xwedê ya dadperwer û ji xezeba wî xilas bike, ev e.

Xwedê dojeh ne ji bo mirovan, lê ji bo Îblîs û milyaketên wî yên xerab afirand. Ji ber gunehê bavkalê me Adem, em hemû dûrî Xwedê, di padîşahiya Îblîs de çêbûn û bivê nevê, em ketine riya fireh a ku diçe dojehê.
Eger Xwedê rê ji me re venekira, bêguman hevênê me yê gunehkar wê em hemû bibiran helakbûnê – çimkî meaşê, yanî bergîdana guneh mirin û dojeh e.

Bi hêza xwe em qet nikarin ji dojehê xilas bibin. Lê belê şikir ji Xwedê re, wî li gor plana xwe rê amade kir ku li gunehên me bibihûre.
Plana wî çi ye?
Plana wî ev bû ku Mesîhê pîroz ji bo mirovan bimira. Çaxê ku Îsa li ser xaçê mir, Xwedê cezayê gunehên me xist ser wî. Wek ku hatiye nivîsîn: «Xwedê Mesîhê ku guneh nedizanî **ji bo me kir guneh**, da ku em di şexsê wî de bibin rastdariya Xwedê. » (Korîntî II, 5:21)

Xelkê cefa da Îsa, ew dan ber qamçiyan, stirî honandin û dan serê wî, ew nizim kirin, lê xistin, tif kirin wî û ew bi xaçê ve bizmar dan. Xwedê hişt ku xelk bi vî awayî zordariyê li Mesîhê bêguneh bike, da ku kifş bibe ku gunehên me çi ceza heq kirine.
Her xerabiya ku xelkê li Îsa kir, diviya ku li me bihata kirin, çimkî yên gunehkar **em** in. Lê ji ber ku Xwedê ewqas ji me hez dike, wî cezayê gunehên me danî ser Mesîhê pîroz, yanî danî ser Kurê xwe yê delal.

Bîne bîra xwe ku cefayên wî yên li ser xaçê çiqas giran bûn; ne tenê cefayên ji aliyê mirovan ve bûn, lê  Nivîsarên Pêxemberan weha ji me re şîrove dikin:
Çaxê ku Îsa li ser xaçê cefa dît, Xwedê cefayekî din da wî ku bi rastî hişê mirov nikare têbigihîje wî cefayî: Xwedê cezayê gunehên me danî ser wî, yanî **cezayê me yê dojehê hingê li ser wî bû**!

Eyûb pêxember li ser van cefayên Mesîh weha got:
«Xwedê ez teslîmî mirovên bêwijdan kirim, ez avêtim destê mirovên xerab...
***Xwedê bi hêrsa xwe ez qelaştim  û diranên xwe li min qirçandin; neyarê min çavên xwe li min tûj dike***.»  (Eyûb 16:11.9)

Cezayê ji bo gunehan ew e ku mirov bimire, Xwedê wê xezeba xwe bîne ser wî û ewê bikeve tariya dojehê. Erê, Xwedê wê wan hemûyên ku naxwazin baweriya xwe bi Mizgîniyê bînin, bavêje dojehê.

Lê belê Îsa Mesîh ji dêla me ve xezeba Xwedê li ser xwe girt, da ku em rehm û kerema Xwedê bistînin.
Çaxê ku Îsa li ser xaçê mir, ji nîvro heta saeta sisiyan wek ku di dojehê de tarî ye taristaniyeke kûr ket ser tevahiya welêt. Di nav wan saetan de Îsa Mesîh bi dengekî bilind kir qîrîn, got: «***Xwedayê min, Xwedayê min, çima te ez berdam?***»
Çima Xwedê Mesîhê xwe yê delal li ser xaçê berda? **Sedema vê yekê tu yî û ez im**. Erê, sedema vê yekê gunehên me bûn.

Çaxê ku Îsa li ser xaçê bû, Xwedê cezayê hemû gunehên me xist ser wî, **çûna me ya dojehê** xist ser wî. Erê, mirov nikare kûrahiya vê rastiyê tam fêm bike.
Lê belê em ji sedî sed vê yekê dizanin: **Eger tu ji dil û can baweriya xwe bi Îsa Mesîh bînî, tê xilas bibî û tu caran tu nakevî dojehê.** Xwedê wê te rast hesab bike, çimkî Xilaskar Îsa Mesîh cezayê te kişandiye.
Wek wî beranê ku ji dêla kurê Birahîm ve hat pêşkêşkirin û ew ji mirinê xilas kir, wusa Îsa Mesîh mir, da ku tu ji mirina herheyî ya di dojehê de xilas bibî.

Xwedê cezayê dojehê xist ser Îsa Mesîh. Ma tu ji vê yekê bawer dikî? Gelo tu bawer dikî ku Îsa Mesîh, yanî Yê Rastdar, ji dêla te ve deynê gunehên te da? An tê herî dojehê, da ku tu bi xwe heta hetayê deynê wan gunehan bidî?
Biryar ya te ye. Tê çi ji xwe re hilbijêrî? Ma tê ji xwe re bihiştê an dojehê hilbijêrî?

Di bernameya xwe ya ku bê de, Xwedê hez bike, emê binêrin ka cihê herî xweş, yanî bihişt çawa ye û mirov çawa dikare here wê derê.
Niha em bi van peyvên Îsa Mesîh silavan li we dikin: Wî got:
«Di deriyê teng re derbas bibin. Çimkî deriyê ku dibe helakê fireh e, riya ku diçe wê rihet e û yên ku pê ve diçin, gelek in. Lê deriyê ku dibe jiyanê teng e, rê jî dijwar e û yên ku wê dibînin hindik in.» (Metta 7:13-14)

Xwedê bi we re be!

Riya Rastdariyê 98 A - **Bihişt** **5000**

Em bi navê Xwedayê aştiyê silavan li we dikin.
Daxwaz û armanca Xwedayê aştiyê ev e ku her kes riya rastiyê fêm bike û wê qebûl bike. Wî ew rê kifş kir, da ku em her û her bi wî re di aştiya rastîn de bijîn. Em gelek dilgeş in ku em dikarin îro dîsa bên ser dabaşa Riya Rastdariyê.

Cara din em li ser cihê ezabê herheyî peyivîbûn. Dojeh cihekî tirsehêz e û ew der ji bo Îblîs û milyaketên wî hatiye çêkirin. Herweha hemû yên ku bala xwe nedin riya xilasiyê ya ku Xwedê amade kiriye jî wê herin wî cihê tarî. Loma Kitêba Pîroz dibêje: «Navê kê di Kitêba Jiyanê de nivîsî nehatibe dîtin, hat avêtin nav gola êgir.» (Peyxama Yûhenna 20:15)

Bêguman dojeh cihê herî tirsdar e, lê belê îro em dixwazin li cihê herî xweş binêrin: Îro emê li ser ezmên, yanî li ser bihiştê bipeyivin.

Di nav mirovan de gelek cûreyên fikrên hem li ser ezmên û hem jî li ser wê yeka ku divê, mirov çi bike ku bikeve bihiştê, hene.
Mesele, gelek mirovên Rojhilatê bawer dikin ku gelek ezman hene û hemû ne wek hev xweş in. Mirov wê li gor xêr û kirinên xwe, an here ezmanekî bilind an jî ezmanekî nizim.
Hin din dibêjin ku pêşî divê mirov di dojehê re derbas bibe û piştî ku ew deynê xwe bide, destûra wî wê hebe ku here bihiştê.
Hinên din jî dibêjin ku bihişt ji bo mirovên qenc hatiye amadekirin, yanî ji bo wan ên ku hemû tembîh û qanûnên olê xwe bi dilsozî pêk anîne. Ew dibêjin bihişt cihê kêf û dilxweşiyê ye, cihekî bi xwarin û vexwarina qenc e.

Hê gelek fikrên din jî li ser bihiştê hene, lê belê em niha naxwazin li ser fikrên xelkê bêjin. Na, em dixwazin bizanin ka Xwedê di Peyva xwe ya Pîroz de li ser bihiştê çi dibêje.

Di kitêbên pêxemberan de gelek navên bihiştê hene. Jê re tê gotin «ezman», «textê Xwedê», «mala Xwedê», «cihê Xwedayê pîroz», «bajarê pîroz», «bajarê Xwedayê jîndar», «Orşelîma ezmanî», «cihê milyaketên pîroz û Berx» (yanî Îsa Mesîh), «cihê Xudan Îsa û rûmeta wî ya mezin», «mala zarokên Xwedê yên ku navên wan li ezmên hatine nivîsîn».
Îsa jê re got: «Mala Bavê min», çimkî beriya ku bê dinyayê, ew li wir bû.

Ji van navan kifş dibe ku bihişt ew cih e ku Xwedê lê rûdine. Em dizanin ku Xwedê li her derê ye, lê belê cihê wî yê taybetî jî heye û ew der pîroz, şewqdar û pir xweş e.
Li wê derê Kurê Yê Herî Bilind li ser text li aliyê rastê yê Xwedayê Karîndarê her tiştî rûdine heta ku ew ji bo dîwankirin û ji bo nûkirina dinyayê vegere. Bihişt jî ew der e ku bi hezaran milyaket li dor textê Xwedê disekinin. Li wir elaleta mezin a ji hemû mirovên ku Xwedê ji xwe re bi xwîna Îsa Mesîh kirrîne û bi destê wî hilbijartine, li ber text dicivin.

Li dawiya Încîlê, di Peyxama Yûhenna de, di herdu deriyên herî dawî de, em dixwînin ku Xwedê destûr da Yûhenna ku Bajarê Pîroz ê bihiştê bibîne. Xwedê ew bajar ji bo wan ên ku navê wan di Kitêba Jiyana Herheyî de hatiye nivîsîn, amade kiriye.
Ji kerema xwe guhê xwe bidin tiştên ku Kitêba Pîroz li ser Bajarê Bihiştê dibêje:
«Wî ez bi Ruh birim çiyayekî mezin û bilind û Bajarê Pîroz nîşanî min da …
Di nav wî de rûmeta Xwedê şewq dida; ronahiya wî wek kevirê hêja bû, wek kevirê yêşîm yê ku ronahî tê re xuya dike. Dîwarê wî yê mezin û bilind hebû, diwanzdeh dergeh û li ber dergehan diwanzdeh milyaket hebûn…
Çar riknên bajêr hebûn, dirêjahiya bajêr wek pehnahiya wî bû. Bingehên dîwarê bajêr, bi her cûreyê kevirên hêja hatibûn xemilandin… Diwanzdeh dergeh diwanzdeh dur bûn, her dergehek ji durekê bû û kolana bajêr zêrê xas ê wek cama zelal bû.

Min di bajêr de Perestgeh nedît; çimkî Xudan Xwedayê karîndarê her tiştî û Berx (yanî Îsa Mesîh) Perestgeha wî ne. Ne hewce ye ku roj û heyv bajêr ronahî bikin, çimkî rûmeta Xwedê wî ronahî dike û Berx çira wî ye. Milet wê di ronahiya wî de rêve herin… Tu rojan dergehên wî nayên girtin, çimkî li wê derê nabe şev. Lê qet tiştekî murdar nakeve nav bajêr. Û yên ku pîsîtiyê dikin û derewan dikin jî, nakevin nav wî. Bi tenê yên ku di kitêba Berx ya jiyanê de hatine nivîsîn, wê bikevin nav wî.
Hingê milyaket çemê ava jiyanê nîşanî min da. Ew wek cama zelal bû û ji textê Xwedê û Berx derdiket û di nava kolana bajêr de diherikî. Li herdu aliyên çem dara jiyanê hebû; diwanzdeh cûreyên fêkî pê ve tê û ew her meh fêkiyê xwe dide. Êdî tiştê nifirlêbûyî wê qet nebe… û êdî mirin wê nebe. Êdî şîn û girîn, êş û elem jî wê nebin… Textê Xwedê û Berx wê di nav bajêr de be û xulamên wî wê xizmetê ji wî re bikin. Ewê rûyê wî bibînin û navê wî wê li ser eniya wan be. Û êdî nabe şev û hewcedariya wan bi ronahiya çirayê û bi ronahiya rojê namîne, çimkî Xudan Xwedê wê ronahiyê bide wan û wê her û her padîşahiyê bikin.»

(ji Peyxama Yûhenna 21 û 22)

Xwedê ev bajar ji bo wan ên ku riya wî ya xilasiyê qebûl dikin, amade kiriye û bi vî awayî nîşanî Yûhenna da.

Niha em dixwazin bizanin ka Peyva Xwedê li ser riya ku diçe bihiştê çi dibêje. Çawa em dikarin piştrast bin ku emê bikevin bihiştê û em neyên avêtin dojehê?

Çaxê ku Îsa Mesîh li ser vê dinê bû, wî ji şagirtên xwe re li ser mala Xwedê û li ser riya ku diçe wir weha got:
«Bila dilê we reht nebe. Baweriya xwe bi Xwedê bînin û baweriya xwe bi min jî bînin. Di mala Bavê min de gelek ode hene. Eger wusa tunebûya, ma minê ji we re bigota ku ez diçim ji we re cih amade bikim?
Dema ku ez çûm û min ji we re cih amade kir, ezê dîsa bêm û we bibim ba xwe, da ku cihê ez lê bim, hûn jî li wê derê bin.

Hûn riya wî cihê ku ez diçimê dizanin… Rê, Rastî û Jiyan ez im. Heta ku ne bi destê min be, tu kes nayê ba Bav», yanî nayê ba Xwedê. (ji Yûhenna 14)

Tiştê ku Îsa Mesîh got, ev e. Ew bi xwe Rê ye. Ne bi destê Xilaskarê pîroz Îsa Mesîh be, tu kes nikare here ber Xwedayê pîroz. Qet tu caran nakeve wî cihî! Nivîsara Pîroz li ser vê yekê weha dibêje:

«Xilasî bi tu kesî din tune; çimkî di bin ezmên de, di nav mirovan de, navekî din nehatiye dayîn ku em bikarin pê xilas bibin.» (Karên Şandiyan 4:12)
«Çimkî tenê Xwedayek heye û di nav Xwedê û mirovan de jî bi tenê aştîkerek heye, ew jî Mesîh Îsayê ku bûye mirov e, yê ku xwe ji bo hemûyan kir berdêl.» (Tîmotêyos I, 2:5-6)

Îsa Mesîh, yanî aştîkerê ku ji Xwedê hat, Riya Xilasiyê ye; ewê me bibe bihiştê. Îsa hat dinyayê, li ser rûyê vê erdê jiyaneke pîroz û paqij jiya, xwîna xwe rijand, bû goriya bêkêmahî ya ji bo gunehan û roja sisiyan ji nav miriyan rabû, da ku gunehkaran bibe ba Xwedê. Ne bi destê wî be, tu kes nikare here ber Xwedê. Ma tu bi vê yekê bawer dikî? Ma tu dibînî ku ji bilî Îsa Mesîh tu riya din tune ku mirovên gunehkar pê herin bihiştê? Ma tu qebûl dikî, riya ku diçe ba Xwedê, tenê ew bi xwe ye?

Riya Rastdariyê 98 B - **Bihişt** **4550**

Em bi navê Xwedayê aştiyê silavan li we dikin.
Daxwaz û armanca Xwedayê aştiyê ev e ku her kes riya rastiyê fêm bike û wê qebûl bike. Wî ew rê kifş kir, da ku em her û her bi wî re di aştiya rastîn de bijîn. Em gelek dilgeş in ku em dikarin îro jî li ser Riya Rastdariyê ji we re bipeyivin.

Di bernameya din de me dît ku Îsa hat vê dinyayê, li ser rûyê vê erdê jiyaneke pîroz û paqij jiya, xwîna xwe rijand, bû goriya bêkêmahî ya ji bo gunehan û roja sisiyan ji nav miriyan rabû, da ku gunehkaran ji gunehên wan xilas bike, wan li ber Xwedê bide qebûlkirin û wan bibe ba Xwedê.
Me dît ku ne bi destê wî be, tu kes nikare here ber Xwedê.

Belkî em dikarin rastiya vê yekê bi çîrokeke biçûk a ku mînakek e, şîrove bikin.

Mirovek hebû, ew di gundekî biçûk de di nav çiyan de rûdinişt. Mirov cotkar bû, pir belengaz bû, cilên wî paçik û qerpal bûn. Erdê wî hebû, lê pir hindik bû. Rojekê axayek hat û erdê wî bi darê zorê jê stand û ew bêhal hişt. Tu kes nebû ku alîkariya wî bike û perên wî jî tunebûn ku here ba ebûqat.

Padîşahê wî welatî mirovekî rast û dilbirehm bû. Loma ew zilamê reben fikirî, ji xwe re digot: Ezê herim bajêr û ji Padîşah hêvî bikim, ku alî min bike.
Cotkar rabû, qonax qonax çû heta ket bajarê Padîşah. Wî tu caran bajar nedîtibû, şaş ma ku bajar çiqas mezin e û qesra Padîşah çiqas spehî ye. Ew hat dergehê qesrê, lê çaxê dixwest ku bi halê xwe ve bikeve hundir, nobedar gazî wî kir, got: «Hêê, ka tu çi dixwazî?!»
Zilamê reben got: «Ez dixwazim Padîşah bibînim.»
Nobedar got: «Li vir her kes nikare wek ku bixwaze bikeve hundir.Wê çawa bihêlin zilamekî nîvtazî, bi paçik û qerpalan ve here ba padîşah? Ji wir dûr keve, an naxwe, emê te bavêjin zîndanê!»

Cotkarê reben zivirî çû, lê belê ziravê wî neqeta. Ji sibê zû û heta nîvro wî pars kir, hingê çû xiftanekî erzan ji xwe re kirî, li xwe kir û vegeriya qesra Padîşah.
Li ber dergeh, eynî nobedar jê re got: «Ez dibînim xiftanê te heye, lê evê ha têra dîtina Padîşahê welêt nake. Û bi rastî, eger xiftanê te pir spehî be jî, dîsa tu nikarî bikevî hundir. Ji bo dîtina Padîşah lazim e tu destûra taybetî bistînî. Heqê te tune ku tu bikevî hundir. Êdî dev ji dîtina wî berde û here!»
Hêviya zilamê reben şkest. Ji xwe re got: «Çi feyde heye? Min evqas zehmet dît, lê dîsa jî min nikaribû ku ez nêzîkî Padîşah bibim!» Bi dilekî xemgîn ew li rexê rê rûnişt.
Lê belê Padîşah û kurê xwe, ev tişt hemû ji qesra xwe dîtin. Padîşah ji kurê xwe re got: «Here, jê bipirse ka çi çêbûye, ma ew çi dixwaze?»
Kurê wî çû, li rex cotkarê reben rûnişt û jê re got:
«Heval, ma tiştek ji te re lazim e? Tu çima hatiyî vir û çima tu aciz bûyî?»
Mirovê belengaz jê re got: «Min dixwest ku ez Padîşah bibînim, lê çênebû. Hemû keda min pûç derket û tiştek ji destê min nayê.»

Kurê Padîşah jê re got:«Ez kurê Padîşah im. Bavê min ez şandime ba te ku ez alî te bikim. Kerem ke, bi min re were.»
Cotkar şaş ma, lê ew di cih de rabû û ew bi hev re çûn û çaxê ew hatin dergeh, eynî nobedarê ku nehiştibû cotkar bikeve hundir, bi hurmeta mezin silav da wan û ew herdu ketin hewşê.
Di qesrê de kurê Padîşah xiftanekî bedew da cotkar û bi hev re ew ketin oda mezin a Padîşah.
Bi vî awayî cotkar ket qesra Padîşah û ew dît – çimkî kurê Padîşah bi wî re bû û alîkariya wî kiribû.

Guhdarên delal, hal û rewşa wan ên ku dixwazin herin bihiştê ber Padîşahê padîşahan tam weha ye: Xwedayê erd û ezmên pîroz, bilind û bi rûmet e. Her kes nikare li gor kêfa xwe bikeve hizûra wî. Bi hemû hewldana xwe em tu caran nikarin destûra taybetî ya ku ji bo dîtina wî lazim e, peyda bikin.

Em hemû wek wî cotkarê reben in. Tiştek ji destê me nayê. Em zehmet dibînin, lê çi feyde heye?
Nivîsarên Pîroz dibêjin: «Em hemû bûn wek yekî murdar. Hemû kirinên me yên rast wek paçikên qirêjî ne.» (Îşaya 64:6)
Bihişt cihekî pîroz e û «qet tiştekî murdar nakeve nav wê û yên ku pîsîtiyê dikin û derewan dikin jî, nakevin nav wê.» (Peyxama Yûhenna 21:27)
Ji bilî Yê Pîroz ê ku ji wî cihî hat, tu kes nikare me bibe wî cihê pîroz.
Ew kesê pîroz ê ku dikare me bibe ba Xwedê, Îsa Mesîh e, Kurê Xwedayê herî bilind û Berxê Xwedê ye. Ew ji bihiştê hat, bû gorî û mir, da ku gunehan rake; piştre ew ji nav miriyan rabû û vegeriya bihiştê.

De îcar bifikirin, kî wê bikeve bihiştê? Bi tenê ew mirovên ku baweriya xwe bi Îsa Mesîh anîne û bi xwîna wî ji gunehên xwe paqij bûne, ewê bikevin bihiştê.

Nivîsara Pîroz vê yekê zelal diyar dike û dibêje:
«Tu cihêtî tune: Hemûyan guneh kir û ji rûmeta Xwedê bêpar man. Ew bi kerema wî, bi rizgariya ku bi Mesîh Îsa hatiye, bê berdêl rastdar derdikevin. Xwedê ew ji bo wan ên ku baweriyê bînin, wek goriyeke kefaretê bi xwîna wî pêşkêş kir.»
Nivîsarên Pîroz weha jî dibêjin:
«Eger em şahidiya mirovan qebûl bikin, şahidiya Xwedê hê meztir e; çimkî ev, şahidiya Xwedê ya li ser Kurê wî ye. Yê ku baweriyê bi Kurê Xwedê tîne, ev şahidî di dilê wî de ye. Yê ku ji Xwedê bawer nake, wî ew derewker kiriye, çimkî wî bawerî bi şahidiya ku Xwedê li ser Kurê xwe kiriye, neaniye. Şahidî ev e: Xwedê jiyana herheyî daye me û ev jiyan bi Kurê wî ye. Yê ku Kur di dilê wî de ye, jiyana wî heye; yê ku Kurê Xwedê di dilê wî de tune, jiyana wî tune. Ez van tiştan ji we re, hûn ên ku baweriyê bi navê Kurê Xwedê tînin re, dinivîsim, da ku hûn bizanin jiyana we ya herheyî heye.» (Yûhenna I, 5:9-13)

Guhdarê delal, ma tu dizanî ku jiyana te ya herheyî heye? Gelo tu dizanî ku tê herî bihiştê û tê heta hetayê li ba Xwedê şa bibî?
Gelo te baweriya xwe bi Kurê Xwedê aniye? Navê te di Kitêba Jiyanê de hatiye nivîsîn?

Ji kerema xwe qenc li ser tiştên ku te bihîstin bifikire, ji ber ku Xwedê dixwaze ji bo wan tiştan dil û hişê te veke.

Guhê xwe bide peyvên Nivîsarên wî yên pîroz: «Tiştên ku çavan nedîtine û guhan nebihîstine û di fikra mirov re derbas nebûne,
Xwedê ew ji bo wan ên ku ji wî hez dikin, amade kirine.»

Xwedê we pîroz û bereket bike!

Ev demeke dirêj e ku em di Nivîsarên Pêxemberan de lêkolînê dikin, da ku em li ser riya rastdariyê hîn bibin. Xwedê ew rê amade kiriye, da ku gunehkar li ber wî rastdar bên hesabkirin.
Me dît ku Îsa Mesîh çawa gotinên pêxemberên Xwedê anîn cih.
Îro û di sê bernameyên ku bên de em dixwazin careke din li rûmeta Mesîhê ku hemû pêxemberan li ser wî digot, binêrin.
Loma di xwendina Nivîsarên Pîroz de dabaşa her çar bernameyên me yên dawî ev e: Hûn li ser Îsa Mesîh çi difikirin?

Di xwendina xwe ya Încîlê de me dît ku Îsa ji xelkê pirs kir û got: «Hûn li ser Mesîh çi difikirin? Ew kurê kê ye?» (Metta 22:42)
Bi rastî, di jiyana me de pirsa herî girîng ev e û divê em bersîva vê pirsê bidin. Her tişt û rewşa we ya di dinya din de bi vê bersîvê ve girêdayî ye.
Îsa Mesîh wê zû vegere û wek ku wî ji xelkê wê demê pirsî, ewê ji we jî bipirse, bêje: «Hûn li ser min çi difikirin?»

Armanca me ew e ku em bi we bidin zanîn ka bi rastî Îsa kî ye. Û ji bo we daxwaza me ya herî mezin ew e ku tu kes di vê yekê de we nexapîne.
Divê baweriya we li ser Mesîh ne ew be ku hûn bêjin: «Ew jî yek wek pêxemberên din e, an jî mirovekî qenc e wek gelekên din.»
Nexêr, ew yek e û bê hember e. Tu kes wek wî ne li vê dinyayê û ne jî li wê dinyayê heye.
Hûn li ser wî çi difikirin? Li gor bîr û baweriya we, ew kî ye?
Hûn li ser wî çi dibêjin? Li ser Îsa Mesîh deh pirs hene ku em dixwazin ji we bipirsin. Di bernama îro de emê li pirsên pêşî binêrin û yên din emê bihêlin bernameyên ku bên.

1) Pirsa pêşî ev e: Hûn li ser bûyîna wî ya bi rûmet û newaze çi difikirin?

Tu caran welidandina tu kesî nebûye wek ya wî. Ew Îsayê kurê Meryemê ye. Hûn dizanin ku Yûhenna kurê Zekerya ye, Silêman kurê Dawid e û Îsmaîl kurê Birahîm e.
Her kes navê kurîtiya xwe ji bavê xwe distîne an jî navê bavê xwe li ser navê xwe zêde dike. Lê belê çima Îsa ji diya xwe nav standiye?
Bersiv ev e: Ji ber ku bavê wî yê dinyayî tune bû. Ew ji Meryema keçik çêbû. Ew bi hêza Xwedê çêbû. Berî ku ew çêbe bi heft sed salan, Îşaya pêxember gotibû ku ewê çawa çêbe.
Wî li ser vê yekê ev pêxemberîtî nivîsî: «Va ye, keçik wê bizaro bibe û wê kurekî bîne û wê navê wî Îmanûêl deyne.» «Îmanûêl» peyveke Îbranî ye û mana wê ev e: «Xwedê bi me re ye». (Îşaya 7:14; Metta 1:23)

Xwedê bavê me Adem ji axa erdê çêkir; em hemû û pêxember jî, em tev ji Adem çêbûne.
Em ji axê hatine û em dinyayî ne. Lê belê Xudan Îsa ji ezmên hat xwar.
Em hemû ji dinyayê ne û ji ber gunehê xwe, em hemû murdar in. Lê belê Îsa wek berf û barana ku ji ezmên tê, bê kêmahî û paqij e.
Em di Încîlê de dixwînin ku «Mesîh Îsa hatiye dinyayê, da ku gunehkaran xilas bike.» (Tîmotêyos I, 1:15)
Berî ku Îsa bê xwar, ew bi Xwedê re bû, çimkî ew Peyva Xwedê ye.
Wî bi xwe biryara xwe da, ku bedena mirovan bistîne û bê vê dinyayê, da ku me xilas bike. Ew ji ezmên hat ser rûyê vê erdê.

Carekê du zilam ketibûn çaleke kûr.
Yekî ji yê din re got: «Min ji vê herriya pîs xilas bike!»
Yê din lê vegerand û got: «Xeşîmo, ezê çawa bikarim te xilas bikim? Ez bi xwe jî wek te di eynî pîsîtiyê de me.»
Herdu jî di çalê de bûn û yekî nedikarî alîkariya yê din bikira.
Wî çaxî werîsek ji jor hat û dengek jî hat û got: «Xwe bi wêrîs bigirin!»

Tenê yekî ku neketibû çalê dikaribû alîkariya wan bike. Ew alîkariya ku bi destê yekî din ji jor hatibû şandin, dikarî ew xilas bikiran.

Pêxemberê herî qenc jî nikaribû me ji çala gunehan xilas bike, çimkî ew hemû jî gunehkar bûn. Lê belê Îsa ji xasîtiya mirovan a bi guneh bêrî bû. Ew ji jor hat û ji keçikekê çêbû.
Herweha me dît ku Xwedê milyaket şandin û stêrekî mezin xist ezmên, da ku mizgîniya bûyîna Mesihê pîroz, yanî mizgîniya welidandina Xilaskarê dinyayê bidin. Ev bûyer çiqas mezin û newaze bû! Mesîh di bûyîna xwe de bê hember e, çimkî tu kes tu caran wek wî nehatiye dinyayê. Em nikarin wî bi mirovekî din re deynin ber hev. Lê belê mezinahiya Îsa Mesîh ne bi tenê di bûyîna wî de kifş dibe. Îsa Mesîh di şexsiyeta xwe de jî bê hember e.
Loma pirsa me ya diduyan ev e:

2) Hûn li ser şexsiyeta wî çi difikirin?
Îsa Mesîh kamil bû, yanî bêkêmahî bû. Wî carek bi tenê jî guneh nekir.
Ew tu caran hewce nebû ku lêbihûrtinê bixwaze, çimkî wî tu caran tu şaşîtî nekirin. Hemû pêxemberan ji Xwedê bexişandina gunehan dixwest.
Tu dikarî di Kitêba Pîroz û di Quranê de heta tu bêjî bes bigerî û carekê jî tu nabînî ku Îsa bexişandina gunehan xwestiye. Bexişandin jê re ne lazim bû, çimkî wî tu caran tu guneh nekir.
Hem şagirtên wî û hem jî dijminên wî qebûl kirin ku tu guneh li ba wî nehat dîtin.
Dostên delal, tu kesî din tune ku bê guneh be. Îsa Mesîh ji pêxemberan meztir e. Ew Peyva Xwedê ye û ew ji ezmên hat dinyayê.
Erê, Îsa di şexsiyeta xwe de tenê ye û bêhember e. Lê belê hê tiştekî din heye ku divê em fêm bikin: Îsa di peyvên xwe de jî bêhember e.

3) Hûn li ser peyvên wî çi difikirin?

Carekê dijminên wî leşker şandin ku wî bigirin. Wan guh dan peyivîna wî û piştre bêyî ku wî bigirin, ew vegeriyan çûn, ecêbmayî man û gotin: «Tu kes tu caran mîna wî mirovî nepeyiviye!» (Yûhenna 7:46)

Qenc li ser van gotinên Mesîh bifikirin. Wî got: «Ez ronahiya dinyayê me; yê ku li pey min bê, tu caran di tariyê de rêve naçe, lê wê bibe xweyî ronahiya jiyanê.» (Yûhenna 8:12)

Pêxember wek heyvê û stêran in. Ew di tariyê de ronahî didin, lê ronahiya wan nikare tariyê ji dinyayê derxe. Lê belê Îsa wek rojê ye.
Gava roj hiltê û ronahî dide, kî wê li heyvê an li stêran binêre û bêje: «Ez hewcê ronahiya wan im?»
Pêxemberan ji Îsa re gotin: «Roja rastdariyê». (Melaxî 4:2)
Heyva nîvçe tam wek pêxemberekî ye. Ew bêtir û bêtir ronahî dide, heta ku ew bibe tam heyv û piştre kêm dibe û dimire.
Îsa roj û ronahiya rastiyê ye. Te qet dîtiye ku roj kêm bûye? Na, ew qet namire. Ew ji bo her kesî li hemû dinyayê ye. Îsa wek rojê ye. Ew tu caran kêm nabe. Ew ji bo her welatî û ji bo her mirovan e.
Wî weha jî gotiye: «Rê, rastî û jiyan ez im.» (Yûhenna 14:6)

Îsa qet ne wek rêbirên din ên dîn û diyanetan e. Pêxember hemû hatin û gotin: «Li gor vê hînkirinê bikin! Ev riya Xwedê ye.»
Lê belê Îsa got: «Ez rê me. Baweriya xwe bi min bînin û li pey min werin! Hingê heqê we wê hebe ku hûn her û her di Padîşahiya Xwedê de bin.»
Îsa bi xwe Riya rast e.

Guhdarên delal, bernama me li vir bi dawî dibe.
Heta bernama ku bê, bila ev gotina Îsa Mesîh li bîra we be; wî got: Rê, rastî û jiyan ez im.
Heta careke din Xwedê bi we re be!

Cara din me dest bi çend pirsên guhdarên bernameyên xwe kir û di dawiyê de me dît ku Îsa Mesîh ji mirovan re negot: «Rê ev e!», lê got: «Rê ez im!»

Bi destûra we em dixwazin vê yekê bi meseleyekê şîrove bikin:
Kurikekî biçûk li bajarekî mezin şaş bûbû. Ew ji welatekî din bû û nikaribû xwe qenc bide fêmkirin. Wî hêvî ji polîsekî kir ku riya malê şanî wî bide.
Polîs jê re got: «Di vê enîşkê re here, bizivire enîşka diduyan ya aliyê rastê, piştre here enîşka sisiyan ya ku diçe aliyê rastê, ji pirê bibihûre, li zîvroneka çara bizivire û di nîvê wê riyê de...»
Kurik dest pê kir girî. Polîs riya rast şanî wî dabû, lê kurik westiyabû û ditirsiya ku nikare li gor îşaretkirina wî here.
Wê kêlîkê mirovek ji gundê kurik hat. Mirov rahişt destê kurik û ew bi hev re çûn. Gava kurik westiyabû û nikaribû rêve here, zilêm rahişt wî û ew hilgirt heta mal.
Polîs rê şanî kurik dabû, lê belê mirovê din wek rê bû.
Îsa got: «Ez rê me, ez riya mala Xwedê me.»
«Rê, rastî û jiyan ez im. Ne bi destê min be, tu kes nayê ba Bav Xwedê.»
(Yûhenna 14:6)
Tu kes tu caran wek Îsa Mesîh nepeyiviye. Ew yek e. Ew bê hember e.
Tu kes wek wî tune, ne li erdê ne jî li ezmên. Lê belê Îsa ne tenê di bûyîna xwe de, di şexsiyeta xwe de û di peyvên xwe de bê hember e. Ew di kirinên xwe de jî bêhember e.

4) Hûn li ser karên Îsa Mesîh ên mezin çi difikirin?
Ew dikare her tiştî bike. Hemû hêz, karîn, qudret û desthilatî ji wî re hatiye dayîn. Çaxê ku Îsa li ser rûyê erdê bû, tu karên Xwedê neman ku wî nekirin.
Ji bilî Xwedê kî dikare bayê bisekinîne? Îsa ba sekinand.
Ji Xwedê pê ve, kî dikare miriyan rake? Îsa mirî rakirin.

Ji Xwedê pê ve kî dikare çavên koran veke? Îsa ev tiştên ha hemû kirin.
Wî her cûreyên nexweşiyan qenc kirin. Wî cin û ruhên nepak bi peyvekê derdixistin. Wî jiyana mirovan diguhert û ew ji gunehan xilas dikirin.
Xwedê ji çend pêxemberan re hêza baweriyê da, ku ew çend cûreyên kerametan bikin.
Lê belê Îsa Mesîh bi hêza xwe keramet dikirin. Îsa li ber yekî felcî sekinî, li çavên wî dinêrî û got: «Ez ji te re dibêjim, rabe nivînên xwe hilîne û here mala xwe.» (Lûqa 5:22)
Ew mirov jî rabû, çû mala xwe û pesnê Xwedê da! Îsa ne bi dermanan an jî bi sêrbaziyê mirov qenc dikirin. Wî tenê bi hêza xwe û bi desthilatiya xwe mirovên nexweş qenc dikirin.

Mirovekî ku navê wî Lazar bû mir û hat veşartin. Gava Îsa hat wir, ew çar roj bû ku Lazar hatibû veşartin. Lê Îsa çû gorê û got: «Lazar, were derve!» (Yûhenna 11:43)
Ew jî ji gora xwe derket derve. Îsa li ser hêz û karîna xwe ya ku dikaribû miriyan rake, qet şik ji me re nehiştiye. Wî got: «Vejîn û jiyan ez im» yanî: «Qiyamet û jiyan ez im.» (Yûhenna 11:25)
Rojek wê bê, hemû yên ku di goran de ne, wê dengê wî bibihîzin û wê derkevin derve. Guhdarê delal, eger hingê tu mirî bî, tu jî, tê ji gora xwe derkevî.
Lê belê Îsa Mesîh niha dikare jiyana nû bide te, yanî jiyana herheyî ya ku destûrê dide te ku tu her û her di bihiştê de bî.
Baweriya xwe bi Îsa Mesîh bîne û wî Xilaskarê xwe û Xudanê xwe qebûl bike.
Ew îro li hemû derên dinyayê jiyana mirovan nû dike. Ew dikare dil û jiyana te jî biguhere.
Ma tu li ser Îsa çi difikirî? Tu li ser karên wî yên mezin çi dibêjî? Ew yek e; ew Karîndarê her tiştî ye û tu kes nabe hemberê wî.
Beriya ku em vê bernamê bi dawî bikin, pirseke din jî heye ku em dixwazin li ser bifikirin:

5) Hûn li ser nav û payenavên wî çi difikirin?
Wek ku me di Nivîsarên Pêxemberan de dît, bi dehan nav û payenavên Îsa hene. Ev nav û payenav alîkariya me dikin ku em bêtir fêm bikin ka Îsa kî ye. Mesele jê re tê gotin: Mesîh ... Îmanûêl ... Peyv, yanî Peyva Xwedê ... Kurê Mirov ... Berxê Xwedê ... Xilaskar ... Nanê Jiyanê ... Mêwa rastîn ... Şivanê qenc ... Ronahiya dinyayê ... Xudanê rûmetê ... Vejîn ... Alfa û Omêga ... Yê Pêşî û Yê Paşî ... Derî ... Rê, Rastî û Jiyan ... û Kurê Xwedê!

Me dît ku ji Mûsa re tê gotin: «Zilamê Xwedê». Ji Birahîm re tê gotin: «Dostê Xwedê». Lê belê tenê ji yekî re tê gotin «Kurê Xwedê» - ew yek jî Îsa Mesîh e.

Niha bêjin: Mirov ji kîjanî bêtir hez dike, ji hevalê xwe an ji kurê xwe?
Kîjan têkilî ya herî kûr e? Têkiliya di nav mirov û hevalê wî de, an têkiliya di nav mirov û kurê wî de?
Bi wijdan bin û bihêlin, bila dilê we rast bersîvê bide.
Erê, ji Îsa re tê gotin «Kurê Xwedê». Em di Încîlê de dibînin ku Xwedê li ser Îsa gotiye: «Ev e Kurê min ê delal. Dilê min bi wî xweş e. Guhdariya wî bikin!» (Metta 17:5)
Mana vê gotina Xwedê çi ye? Em dibêjin ku kur siya bavê xwe ye.
Kur sûretê bavê xwe ye. Bi vî awayî Îsa nîşanî me dide ku Xwedê çawa ye.
Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
Tu caran, tu kesî Xwedê nedîtiye, lê Kurê yekta, Xwedayê ku li ber singê Bav e, wî bi xwe ew da zanîn. (Yûhenna 1:18)
Ma hûn dixwazin Xwedê tam nas bikin?
Ma hûn dixwazin di nav we û Xwedê de têkiliyeke kûr û şêrîn hebe ya ku tu caran xilas nebe? Eger wusa be, werin ba Îsa Mesîh ê ku Xwedê jê re gotiye: «Kurê min ê delal.»
Kur dikare li cihê bavê xwe bipeyive. Çaxê ku Îsa li ser rûyê erdê bû, wî tam wusa kir. Ji ber vê yekê ji wî re tê gotin «Îmanûêl», yanî «Xwedê bi me re ye».

Hin dibêjin: «Çênabe ku Xwedê di şiklê mirov de bê vê dinyayê.»
Lê belê yên ku weha difikirin, hê fêm nekirine ku plana Xwedê ya ji bo xilaskirina gunehkaran çi bû.
Plan û mebesta Xwedê ew bû ku Kurê Xwedê yê herheyî bê dinyayê, bibe mirov, xwe bi zarokên Adem bide naskirin û wan ji destê Îblîs xilas bike.
Dostên delal, Xwedê mezin e û ew çi bixwaze, dike; tiştek jê re nabe asteng. Xwedê dixwaze ku her kes wî nas bike. Loma ew hat dinyayê, bû mirov û li ser rûyê erdê jiya.

Guhdarên delal, hûn li ser nav û payenavên Îsa Mesîh çi dibêjin? Ew bêhember e. Hûn li ser bûyîna wî, li ser şexsiyeta wî û li ser karên wî çi dibêjin. Li gor bîr û baweriya we ew kî ye?
«Hûn li ser Mesîh çi difikirin? Ew kurê kê ye?» (Metta 22:42)

Îro wextê me nemaye, lê Xwedê hez bike emê di bernama ku bê de bi pênc pirsên din û bi bersîvên wan berdewam bikin û rêwîtiya xwe ya ji bo fêmkirina Nivîsarên Pîroz bi dawî bikin.

Heta hingê li ser van gotinên Încîlê kûr bifikirin:
Hemû tijetiya Xwedêtiyê bi bedenî di şexsê Mesîh de ye. Ew serê her serwerî û desthilatiyê ye û hûn bi wî temam bûne. (Kolosî 2:9.10)

Cara din me pirs kir, got ka hûn li ser bûyîna Îsa Mesîh ya newaze, li ser şexsiyeta wî ya pîroz, li ser karên wî yên nedîtî, li ser hêza wî û li ser nav û payenavên wî yên hêjabilind çi difikirin.
Îro çend pirsên din hene ku em dixwazin li wan binêrin.
Pirsa pêşî ev e:

~~6)~~ Hûn li ser mirina Îsa Mesîh çi dibêjin?
Ma hûn dizanin ku hûnê li ku derê bimirin? An hûn dizanin ku hûnê çawa bimirin? An ma hûn dikarin ji me re bêjin ku hûnê kengê bimirin?
Ez û tu, em li ser van tiştan qet tiştekî nizanin, ew di destê Xwedê de ne.
Lê belê Îsa dizanî û ji pêşî ve got ku ewê li Orşelîmê (yanî li Qudsê) bimire.
Herweha wî ji pêşî ve ji şagirtên xwe re got ku mirina wî wê çawa be. Wî got: «Va ye, em derdikevin Orşelîmê û hemû tiştên ku bi destê pêxemberan li ser Kurê Mirov, yanî li ser Mesîh, hatine nivîsîn, wê bên cih: Ewê bê xistin nav destê miletan, wê tinazên xwe bi wî bikin, wê wî riswa bikin, wê tif bikin wî, wê wî bidin ber qamçiyan û wê wî bikujin û ewê roja sisiyan ji nav miriyan rabe.»
(Lûqa 18:31-33)
Herweha Îsa ji şagirtên xwe re got ku ewê kengê bimire, yanî di roja cejnê de çaxê ku her kesî berxek dikir gorî, yanî dikir qurban. Hingê ewê bimira, çawa ku ew bi xwe berxê Xwedê bû, yê ku wê bibûya gorî, da ku gunehên hemû mirovan xîş bikiran.
Mirina Îsa Mesîh qet ne wek mirina mirovên din bû. Wî got: «Tu kes nikare jiyana min ji min bistîne, lê ez jiyana xwe ji ber xwe, yanî bi daxwaza xwe, didim. Ez dikarim jiyana xwe bidim û ez dikarim dîsa bistînim jî. Min ev emir ji Bavê xwe stand.» (Yûhenna 10:18)
Wî qet guneh nekiribû; ji ber vê yekê ew ne mecbûr bû ku bimira. Loma, eger wî bixwesta, bêyî ku ew bimire, wî dikarî ku hilkişiya ezmanê ku ew jê hatibû. Wî ji xwe re hilbijart ku bimire. Sedem jî hezkirina wî ya ji mirovên gunehkar bû. Wî ji bo me jiyana xwe da. Wî hişt ku mirov wî bi xaçê ve bizmar bidin. Ew

mir, da ku li gunehên me bê bihûrtin. Ew ji bo min û te mir, da ku em bikarin bikevin Padîşahiya Xwedê.

Li dor heft sed salan beriya hatina Mesîh, pêxemberê Xwedê Îşaya şîrove kir, ka çima divê ku Xilaskar bimire. Wî got:

Lê belê ew ji ber neheqiyên me xurimî (yanî hat birîndarkirin),
ew ji ber sûcên me hat perçiqandin;
ew cezayê ku ji bo aştiya me bû, ket ser wî û bi birînên wî em sax bûn.
Me hemûyan wek miyan rê şaş kir, her yek ji me ket ser riya xwe;
lê Xudan sûcê me hemûyan danî ser wî. (Îşaya 53:5.6)

Sedemê mirina Îsa Mesîh ez im û tu yî.

Ew şivanê qenc e yê ku bi dilxwazî jiyana xwe ji bo miyên xwe daye. Tu caran mirina tu kesî ne wek ya wî bû. Ew bi tu kesî re nayê hemberkirin. Di nav mirovan de ew yek tenê ye.

Pirseke din a gelek girîng ev e:

~~7)~~ Hûn li ser rabûna wî ya ji nav miriyan çi dibêjin?

Îsa mir û hat veşartin. Dijminên wî her tişt kirin, ku ew di gorê de bimîne.
Wan kevirekî mezin gêr kir ber devê gorê. Wan kevir mor kir û li hawirdora gorê nobedarên çekdar danîn. Mirovan her tişt dikirin, ku ew di gorê de bimîne.
Lê belê ew kirinên wan ji Îsa re nebûn asteng.
Bi rastî ew di roja sisiyan de ji nav miriyan rabû û xwe nîşanî şagirtên xwe da; piştre ew carekê ji zêdeyî pênc sed kesî re xuya bû.
Van mirovan ew dît, destê xwe li wî dan û bi wî re xwarin.
Wî birînên destên xwe, yên lingên xwe û tenişta xwe nîşanî wan dan.
Ew rabû çawa ku wî gotibû ku ezê rabim. Xwedê Îsa ji nav miriyan rakir û bi vê yekê nîşanî hemû dinyayê da ku wî mirina Îsa ya li ser xaçê qebûl kiriye.
Îsa xebata xwe pêk anî; ew bû goriya bêqusûr û goriya herî dawî ya ku deynê gunehan dide.

Mirin dijminekî mezin e. Bav û kalên me mirin. Pêxember jî mirin û termên wan di gorê de mirî man. Rojekê em jî, emê bimirin.
Lê belê şikir ji Xwedê re, ku Îsa Mesîh mirin bindest kiriye. Ew îro dijî.
Ew Xilaskar e û sax e û dikare wan hemûyan xilas bike yên ku bi navê wî tên ba Xwedê; çimkî ew dijî û ji bo wan ên ku baweriya xwe bi wî tînin, mehderê, yanî şefaetê dike.
Ma pêxemberekî din heye ku piştî mirina xwe îro sax be? Nexêr, tu kes tune.
Mesîh yê bi tenê ye ku ji mirinê rabû û mirin bindest kir.
Loma ew mirovên ku baweriya xwe bi wî tînin, ji mirinê natirsin. Ji bo wan, mana mirinê ew e ku ewê herin ba Xudanê xwe yê ezmanî.
Erê, Îsa bêhember e û bi tu kesî re nayê hemberkirin.
Tu kes wek wî, ne li erdê heye û ne jî li ezmên.

Pirseke me ya din ev e:

~~8)~~ Hûn li ser çûyîna wî ya ezmên çi difikirin?
Îsa piştî rabûna xwe di nav cil rojan de çend caran ji şagirtên xwe re xuya bû. Piştre wî xatirê ji wan xwest, hilkişiya ezmên û li milê Xwedê yê rastê rûnişt.
Ew der cihê siyaneta herî mezin e û bi vê yekê kifş dibe ku Îsa ji hemû milyaketan, ji hemû pêxemberan û ji hemû mirovan meztir e. Nivîsarên Pîroz li ser vê yekê weha dibêjin:
«Xwedê ew gelek bilind kir û navê di ser her navî re da wî, da ku bi navê Îsa, hemû yên li ezmên, li erdê û di bin erdê de herin ser çokan û ji bo mezinahiya Bav Xwedê, her ziman eşkere bike û bêje ku Îsa Mesîh Xudan e.» (Filîpî 2:9-11)
Erê, Îsa Mesîh bê hember e û tu kes wek wî tune!

Pirseke din heye ku bi vê dabaşê ve girêdayî ye:
~~9)~~ Hûn li ser hatina wî ya diduyan çi difikirin?

Îsa Mesîh wê dîsa bê. Wî bi xwe ev gotiye. Pêxemberan ev dida zanîn. Milyaketan jî ev gotiye. Hemû bawermendên wî yên rast li hêviya hatina wî disekinin. Ewê bê, da ku bijartiyên xwe bi xwe re bibe ezmên.
Ewê bê, ku li dîwana mirovan bike û li ser erdê hukumdariyê bike.
Ewê padîşahê dinyayê be. Ewê hukumdariyê bike, heta hemû dijminên wî bikevin bin lingê wî. Erê, ewê zû vegere. Hingê hemû wê bêjin ku ew Padîşahê padîşahan e, Xudanê xudanan e û Serdarê serdaran e.
Rast e, rojekê ez û tu, emê li ber wî bisekinin. Hingê ewê hakimê hemûyan be. Gava ku tu wî rû bi rû bibînî, ewê ji te bipirse: «Ma bîr û baweriya te li ser min çi bû?»
Hingê tê çi bersîvê bidî wî?
Eger tu bêjî: «Ez difikirîm ku tu yek ji pêxemberan bûyî», ewê ji te bipirse: «Ma çima tu li pey emrên min neçûyî?» û tê bêyî hukumkirin, ji ber ku te bi gotinên wî bawer nedikir û te bi gotinên pêxemberên Xwedê jî bawer nedikir. Wî bi xwe got û pêxemberan nivîsî ku ew Kurê Xwedê ye û ji ezmên hatiye û Xilaskarê tenê ye.
Îsa Mesîh wê bê û ewê hakim, yanî dadger be. Xwedê bi rakirina wî ev yek bi zelalî da fêmkirin. Qet şik tune. Ewê vegere.
Çavên hemûyan wê wî bibînin. Her çok wê li ber wî bitewe.
Her ziman wê eşkere bike û bêje ku Îsa Mesîh Xudan e.

Dostên delal, ma we ji bo vê rojê xwe amade kiriye?
Guhdarên delal, em hêvîdar in ku hûn di bernama Riya Rastdariyê ya dawî jî bi me re bin. Xwedê bi we re be!

Em gihîştine bernama Riya Rastdariyê ya herî dawî û niha emê bên ser pirsa xwe ya dawî:

~~10)~~ Hûn dibêjin ku ewê çi şertan deyne ber we?

Îsa Mesîh dibêje: «Werin ba min, ey hemû yên westayî û bargiran, ezê rihetiyê bidim we. Nîrê min deynin ser stûyê xwe û ji min hîn bibin, çimkî ez nerm û ji dil nefsbiçûk im û hûnê rihetiyê ji bo canê xwe bibînin.» (Metta 11:28.29)
Ew îro gazî te dike û dixwaze ku tu li pey wî biçî.
Mana vê ne ew e ku divê tu dev ji mala xwe an ji xebata xwe berdî, lê belê Îsa dixwaze ku tu tevahiya jiyana xwe radestî wî bikî. Ew dixwaze ku tu baweriyê bi wî bînî ku ew xilaskarê te ye û dixwaze ku tu wî bikî serwerê jiyana xwe.
Ew her tiştî dixwaze – dilê te, hişê te, bedena te û canê te. Madem ku ew Afirandarê te ye, hingê şertên wî jî wê di cihê xwe de bin.

Îsa Mesîh di bûyîna xwe de, di qerektêrê xwe de, di jiyana xwe ya bê leke de, di hînkirina xwe de, di kirinên xwe yên mezin de, di nav û payenavên xwe de, di hêz û karîna xwe de, di cefa û mirina xwe de, di rabûna xwe ya ji nav miriyan de, di hilkişîna xwe ya ezmên de û di hatina xwe ya diduyan de yek e û bê hember e. Tu kes wek wî tune ku bikare dilê zarokên Adem biguhere.
Ew îro sax e. Ew li ba wan e, yên ku baweriya xwe bi wî tînin. Ewê di nêzîk de vegere.
Ji ber vê yekê ew dixwaze ku di jiyana te de bibe Padîşah û Serdar.
Îsa Mesîh li ser xaçê jiyana xwe da û ji nav miriyan rabû , da ku Xilaskar û Xudanê te be. Hêza wî heye ku gunehên te xîş bike û jiyaneke nû bide te.
Ew dikare dilê te paqij bike û bi saya hêza Ruhê Pîroz dilê te nûvejen bike.
Ew dixwaze têkiliyeke nû û newaze di nav te û Xwedê de çêke.
Lê belê divê ku tu hêviya xwe bi wî û bi goriya wî ve girê bidî û baweriya xwe bi wî bînî.

Dostên delal, tiştekî bêkêr e ku mirov bêje: «Ez bawer dikim ku Îsa Mesîh pêxemberekî mezin e».
Divê ku tu Peyva Xwedê qebûl bikî. Xwedê dibêje: «Îsa Mesîh Xudanê hemûyan e» û dibêje: «Îsa Mesîh li ser xaçê di ber te û di ber gunehên te de mir.»
Em hemû zarokên Adem in û pirsgirêka me ya mezin guneh e.
Xwedê li gor rehm û kerema xwe ya mezin ev pirsgirêka guneh çareser kir, lê belê divê ku em çareseriya wî qebûl bikin.
Mesele em dibêjin ez nexweş im. Ez diçim ba doxtor û ew dermannameyê dide min ku dermanekî taybetî ji min re lazim e. Îcar ez diçim dermanxanê û vî dermanî dikirrim. Hingê ez vedigerim mal, ez dermanê xwe datînim ser masê û ez li dermên dinêrim û derman jî li min dinêre. Ma ezê bi vê yekê sax bibim? Nexêr. Eger ez bixwazim sax bibim, divê ez vî dermanî bixim destê xwe û wî li gor dermannameyê daqurtînim.
Dermanê ku Xwedê pêşkêşî me dike, da ku em ji gunehên xwe xilas bibin, gorîbûna Îsa Mesîh e û xwîna wî ye, ya ku wî li ser xaçê rijand.

Belkî hin mirov hene dipirsin: «Ma emê çawa wî dermanê Xwedê yê ku ji bo gunehên me ye, bistînin û daqurtînin?»
Bi rastî, ev yek ne tiştekî zehmet e.
Ji Xwedê re bi eşkereyî bêje: «Ya Xwedê, ez yekî gunehkar im.
Karên min ên qenc jî li ber te wek cilekî qirêjî ne û qet tiştek ji destê min nayê ku ez xwe ji dîwana te ya rast xilas bikim.»
Di dilê xwe de bawer bike ku Îsa Mesîh cezayê gunehên te hildane ser xwe. Îsa Mesîh deynê gunehên te tam temam daye. Wî di ber gunehên te de xwe kiriye gorî û Xwedê ev gorî qebûl kiriye û êdî ji bo te dîwankirin nemaye.
Eger tu ji dil û can bawer bikî ku Mesîh mir û ji nav miriyan rabû, da ku gunehên te bibexişîne û te xilas bike, hingê Xwedê wê gunehên te bibexişîne,

wê Ruhê xwe yê pîroz bixe dilê te û wê desthilatiyê bide te ku tu her û her di Padîşahiya wî de bijî.
Şikir ji Xwedê re, eger tu bawer bikî, tu dikarî îro li ber Xwedê rastdar derkevî!

Guhdarên delal, gelo we ew çareseriya ku Xwedê pêk aniye, qebûl kiriye?
Ew dikare we ji nexweşiya gunehan sax bike û ji agirê herheyî yê dojehê xilas bike.
Lê belê yê ku dermanê Xwedê kêm bibîne, bila bizane ku dermanekî din tune ku bikare mirov ji nexweşiya gunehên wî qenc bike. Qet tu dermanê din tune!
Xwedê riyeke din amade nekiriye ku gunehkar pê paqij bibin û bigihîjin Padîşahiya Xwedê.

Nivîsarên Pîroz li ser riya rastdariyê ya ku Xwedê ji bo gunehkaran amade kiriye, weha dibêjin:
Bi kirina Şerîetê tu kes li ber Xwedê rastdar dernakeve.
Lê niha, bêyî şerîetê, rastdariya Xwedê eşkere bû û Şerîet û Nivîsarên Pêxemberan jî jê re şahidiyê dikin. Ev rastdariya ji Xwedê ya ku bi bawerkirina bi Îsa Mesîh e, ji bo wan hemûyan e ku bawer dikin.
Tu cihêtî tune: Hemûyan guneh kir û ji rûmeta Xwedê bêpar man. Ew bi kerema wî, bi rizgariya ku bi Mesîh Îsa hatiye, bê berdêl rastdar derdikevin.
Hûn bi riya baweriyê, bi keremê xilas bûn û ev ne ji we ye, diyariya Xwedê ye.
Ev ne ji kirinan e, da ku tu kes pesnê xwe nede...
Eger tu bi devê xwe eşkere bikî ku Îsa Xudan e û di dilê xwe de bawer bikî ku Xwedê ew ji nav miriyan rakiriye, tê xilas bibî. Çimkî: «Her kî ku gazî navê Xudan bike, wê xilas bibe.»

Dostê delal, gelo ma te gazî navê Xudan kiriye?
Ma te diyariya Xwedê, yanî xilasiya canê xwe ji destê wî standiye?
An tu hê dixebitî ku tu xwe bi xêr û kirinên xwe xilas bikî?

Em ji te hêvî dikin ku tu Riya Rastdariyê ya ku Xwedê ji bo xilaskirina me hemûyan amade kiriye, red nekî.
Xwedê dilê te dizane. Li ber wî qebûl bike ku tu gunehkar î û te emrên wî yên pîroz şkênandine.
Jê re bêje: «Ya Xwedayê min, eger ne bi kerema te be, ez dizanim heqê min ew e ku tu dîwana min bikî, lê tu rehmê li min bike.»
Hingê şikir jê re bike ku wî Xilaskarê pîroz û bêguneh şand. Wî Xilaskarî bi dilxwazî di ber te de cefa kişand û cezayê te yê herheyî kişand û tu ji wî cezayî xilas kirî. Ew bi serfirazî ji nav miriyan rabû û ji gorê derket!

Dostê delal, divê ku tu bi Riya Rastdariyê ya ku Xwedê amade kiriye herî ba wî – an na, tu qet nikarî nêzîkî wî bibî.
Xwedayê dilbirehm û dilovan gazî te dike û te vedixwîne ba xwe.
Îro were, gazîkirina wî qebûl bike û xilas bibe.

Eger te baweriya xwe bi wî yê ku hemû pêxemberan li ser şahidî kiriye anîbe, ji kerema xwe ji me re binivîse û bi me bide zanîn, da ku em jî bi te re şa bibin.

Guhdarên delal, me hûr û kûr li Nivîsarên Pîroz nêrî û em spas dikin ku hûn di vê yekê de bi me re bûn. Em niha dixwazin bi van gotinên duayekê, xatiran ji we bixwazin. Ew dua di Peyva Xwedê de nivîsî ye û dibêje:

Xilaskarê me Xwedayê tenê, dikare we ji ketinê biparêze û bi şahiyeke mezin, bêleke we derxe ber rûmeta xwe; bila ji beriya deman ve, niha û her û her, bi destê Xudanê me Îsa Mesîh rûmet, mezinahî, karîn û desthilatî jê re be. Amîn.

(Cihûda 1:24.25)